ENSTÎTUYA KURDÎ YA STENBOLÊ

FERHENGA BIWÊJAN

MUSTAFA BORAK



MUSTAFA BORAK

FERHENGA BIWÊJAN

ENSTÎTUYA KURDÎ
STENBOL 1992

Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê | 42
Rêzeya Ferhengsaziyê | 3
Ferhenga Biwêjan | Mustafa Borak

Desteya Şêwrê | Zana Farqînî, Samî Berbang
Rûpelsazî | Aysel Çetin

Çapa Yekem | Pûşper 2005
Çapxane | İmaj Matbaacılık

ISBN | 975-8262-38-X

© Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê

ZEND BİLİM KÜLTÜR EĞİTİM BASIN YAYIN LTD. ŞTİ.
Çınar Mh. İstanbul Cd. İlhanlar İşhanı No: 57 Kat: 6-7 Bağcılar/İST
Tel: (0212) 634 62 79 - 634 18 83 **Fax:** (0212) 634 58 25
Web | www.enstituyakurdi.org **- Mail** | info@enstituyakurdi.org

PÊŞEK

Dewlemendiya zimanekî tenê bi piraniya peyvan û wateyên wan ên cuda nayê hesibandin. Biwêj ji vî aliyî ve xwedî taybetiyeke girîng in. Ji ber ku biwêj gencîneyên zengîn ên ziman û zargotina wî zimanî ne, divê ku ew jî di nav vê hesibandinê de be. Bi saya biwêjan, bi mirov re hêza vegotinê zêdetir dibe. Bi biwêjan mirov hîn bêhtir dikare hest û nestên xwe, hizir û ramanên xwe bide der. Bi biwêjan mirov hêza xwe ya vegotinê geştir dike. Bi gotina kin û kurt, biwêj xeml û rewşa ziman in. Bi wan ziman dixemile. Bi saya wan mebest û armancên mirov xweştir tên fêmkirin.

A ji ber van sedeman û yên din, hewcedariyeke mezin bi ferhenga biwêjan heye. Bi qasî ferhengê nebe jî, ji bo zimanê nivîskî û ji bo bipêşveçûn û geşbûna zimên, pêwîstî bi ferhenga biwêjan jî heye. Ew jî amrazeke jênager e.

Ev ferhenga biwêjan, di warê xwe de tekane ye. Ferhengên biwêjan ên ku heta niha li bakur û Tirkiyeyê hatine çapkirin, hem aliyê qewareyê (hecmê) ve biçûk bûn û hem jî bi du zimanan bûn. Lê ev ne wisan e, hem ferhengeke biwêjan a berfireh e û hem jî yekzimanî, ne duzimanî ye. Ango ev ferhenga hanê bi kurdî-kurdî ye. Bi gotineke din li hemberî biwêjên bi kurmancî bergind an jî raveka wan a bi kurmancî hatiye dayîn. Li hember her biwêjekê, çend wateyên wê hebin ferq nake, şîroveya wê bi kurmancî hatiye kirin û berginda wê ya bi kurmancî hatiye dayîn. Ji lew re, ji vî aliyî ve taybetiyeke vê ferhenga biwêjan a cihê heye.

Ev xebata ku ji aliyê endamê enstîtuya me Mustafa Borak ve hatiye kirin, encama xebateke dûr û dirêj û kedeke mezin e. Ev bi salan e ku birêz Borak bêwest û rawest li ser mijara biwêjên kurdî serê xwe diêşîne û di nav keftûleftekê de ye.

Ji bilî ku birêz Mustafa Borak di ber amadekirina wê de kedeke mezin daye û xwêdaneke mezin rêtiye, her wisa hevala me Aysel Çetin jî nêzî pênc mehan li ser sekinî û ji aliyê ziman ve jî sererast kir û ediland. Li aliyê din hevalên me Zana Farqînî û Samî Tan jî, ji bo amadekirina vê berhemê şêwirmendî kirin.

Em wek Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, ji ber amadekirin û weşandina vê berhemê xwe serbilind dibînin û em pê şanaz in ku em berhemeke wiha pêşkêş dikin.

ENSTÎTUYA KURDÎ YA STENBOLÊ

PÊŞGOTIN

Tê zanîn ku ferheng bîra gelan in. Girêdayî vê gotinê, mirov dikare bibêje ku biwêj û gotinên pêşiyan jî dîroka bîr û bawerî û kesayetiya gelan in. Çimkî yên ku bikaribin baş mêze bikin, dikarin di van gotinan de rewş û timtêla gelan bibînin.

Wer tê xuyan ku heya mirovahî hebe, pêdiviya nasandina civakê jî dê tim xwe bide pêş. Ji bo nasandinê jî folklora gelan ango giyan û rewşa gelan a hundirîn jî tu car pêwîstiya xwe winda nake. Di vê derbarê de gelek tişt hatine gotin, wê bên gotin jî.

Wekî ku tê zanîn, zargotin, bi evîna dilan, bi lorîn û axîna dayîkan, bi lîstikên zarokan, bi mêrxasiya lehengan û bi îxaneta xayînan hatiye honandin. Zargotin, bi agirên Newrozan, bi têkoşîna li hemberî zordaran jî kemiliye. Bi li ser kulavê bavê keçan rûniştinê, bi gazinên kal û pîran, bi şerê xesû û bûkan xemiliye. Zargotin, bi hena destê bûk û zavayan, bi stranên li ser şîn û şahiyan hatiye hasilkirin. Bi geşa li ser kahniyan, bi deng û rengê bêrîvanan, bi şîretên kal û bavan hatiye kelandin.

Loma zargotin pir girîng e. Loma tê zanîn ku zargotin, jiyana borî û encama rihê îroyîn e. Çimkî zargotin eynika giyanê ye, çimkî zargotin kesayeta gelan e.

Ev taybetmendî ji bo zargotina hemû gelan rast in. Lê ji bo kurdan taybetiyeke zargotinê ya cuda heye. Ew jî ew e: Derfetên kurdan ên nivîsandinê zêde çênebûne; ji ber wê jî giraniya xwe bi xwezayî dane ser huner û wêjeya devkî. Her çi hebe li wê bar kirine. Dîroka xwe, wêjeya xwe, baweriya xwe derd û kulên xwe, şîn û şahiyên xwe sîtem û zanînên xwe de avêtine nava wê. Zargotin ji xwe re xistine kewar, xistine bîra heyînên xwe. Zargotin bûye arşîv û hatiye bi hewariya kurdan ve. Bi vî awayî di nav wêjeyên dinyayê yên devkî de ya kurdan bi dewlemendiya xwe cihekî bilind girtiye. Gelê kurd digel ew qas dijwarî û zextan, hebûna xwe ya îroyîn deyndarî vê zargotina zengîn e.

Mixabin rewşenbîr û rêxistinên kurdan heya niha jî zêde guh nedane van nirxên hêja. Îro ew bermahiyên ku zêde nemane jî ji dest me diçin. Bêguman di vê derbarê de her lêkolîn û lêgerîn wê ji bo ronîkirina pêşerojê ji me re bibe fanoseke hêja. Ji bo wê jî divê rewşenbîrên kurdan di nav wê bîrê de doç bibin, bigerin û wan xezîneyan derxînin ser rûyê erdê, binirxînin û bikin xizmeta kurdan û mirovahiya cîhanê.

Gelek şaxên zargotinê hene. Ji wan şaxan berî ku em derbasî mijara biwêj û gotinên pêşiyan bibin, divê em girîngî û hêjahiya stran û dengbêjan carek din bi giramî destnîşan bikin. Gelek bûyerên dîrokî, wêje, tore, hest û kesayetiya kurdan di van stranan de hatine honandin. Di gelek stranan de rewş wekî ku bi kamerayê hatibe kişandin, bi awayekî bedew li ber çavan hatine raxistin. (Bi taybetî divê televîzyonên kurdan cih û rêzê bidin dengbêjan. Lê sed carî heyf ku di vê derbarê de îro TV'yên kurdan di nav çewtiyeke xeternak de ne.)

Heke em bi gelemperî qala biwêj û gotinên pêşiyan bikin, em dikarin vê bibêjin: *Biwêj û gotinên pêşiyan der barê duristayî, sextekarî, şadî û hêrsê, ewled û exrebeyan, merdî û timahkariyê, zexelî û dilovaniyê de, der barê dê û bavan, jin û mêran, cîran û dostan de bi kurtasî der barê jiyanê de rewşa xwezayê û psîkolojiya mirovan bi awayekî bedew û watedar diyarî me dikin.*

Bi awayekî din em dikarin bibêjin ku biwêj û gotinên pêşiyan, der barê dad û dîrokê, çand û zanînê, felsefe û ferasetê, edet û toreyan de, der barê psîkolojî û aboriya civakê de, agahiyan didin. Asta wêje û hunerê, asta rêveberî û sebra gel bi me didin ronîdardikin. Kesayetiya civakê diyar dikin. Bi kurtasî biwêj û gotinên pêşiyan pileya hêzên berhemdar û tekiliyên hilberînên civakê radixin ber çavên me.

Ev gotinên hêja ku bi tecrubeya hezar salan hatine parizandin; nifş bi nifş di karvaniyê de hatine ceribandin, dû re bûne berhemên civakî. Tov û rengê gelan in, giyan û keda civakê ne. Bi gotineke din karpêkên dest û lepên gel bi xwe ne. Loma jî wisa fotografê wan nîşanî me didin. Ji ber wê tê gotin ku ev gotin nirxên gelan in. Bi van nirxan rewş û ramana gelan dixuye.

Di naveroka biwêjan de jî helbet nasandina civakê heye; lê bi taybetî nasandina ziman zêdetir xwe dide der. Çêj, feraset, huner û estetîka zimanan di biwêjan de xwe bi xeml û moçikeke bedew li ber çavan radixin. Zanebûn û erka li ser ziman bi taybetî xwe di bikaranîna biwêjan de nîşan didin. Zanebûna ziman, bi zanebûn û têgihîştina biwêjan tê pîvan. Biwêj ji bo zanebûna zimanan wekî qeyseke sereke tê dîtin. Çimkî kûrahî û rihê zimanan di biwêjan de veşartî ye. Yên ku ji biwêjên zimanekî fêm nekin, nikarin bibêjin em ji wî zimanî baş fêm dikin.

Bawer im ku hêz û kelîja nivîskaran bi van gotinan bêhtir dikemile. Çimkî bi biwêjan hêza nivîsê xurttir dibe. Ji bo şayesên xurt, biwêj dibin reng û giyan, di nav gotinê de şax vedidin. Bi van gotinên bijarte û taybet lingê şayesan erd digire, rihê ziman şad dibe û bi vî awayî zêdetir kaw û kubariya ziman xwe dide der. Lê mixabin divê bê destnîşankirin ku nivîskarên kurd di vê derbarê de hê jî qels in.

Heke zimanekî wekî zimanê kurdî ku bi salan qedexe be û ji bilî qadên rojane di hêla wêje, zanyarî û hwd. de zêde neyê bikaranîn, qels dibe, nuxs dibe û çirûsa xwe winda dike. Gelek caran jî dikeve ber sekerata mirinê.

Îro ev derfet û firsendên ku gelê kurd bi bedelên giran bi dest xistine, rûmet û baleke zêde dixwaze. Pêwîst e, rista vê yekê baş bê nirxandin. Çi dibe bila bibe, divê bi her awayî û di her qadê de ev ziman bê xurtkirin, bedewiya wê bê berzkirin û moçik bi moçik bê neqişandin.

Bêguman ev pêşveçûn jî girêdayî pêşvebirin û geşkirina wêjeya nivîskî ye. Jixwe geşedan û kemilandina ziman jî girêdayî pêşvebirina nivîsê ye. Heya ku di her warê jiyanê de ev ziman bi awayekî nivîskî neyê bikaranîn, kêmasî neyên temamkirin, pêşeroja me ji xeteriyan xelas nabe. Ev zimanê tîbûyî ancax bi nivîsê bê avdan û geş bibe.

Di nav mijarên çand û ziman de xebatên wekî biwêj û gotinên pêşiyan xebatên pir dijwar in. Ne tenê dijwar, di heman demê de xebatên nankor in jî. Berî her tiştî xebatên wer, demeke gelekî dirêj dixwazin. Berhevkirin û sinifandina wan demeke gelekî dirêj digirin. Lê digel wê dijwariyê, berhemên xwe jî wisa zû nadin. Mîna roman, çîrok, helbest û hwd. zû belav nabin. An jî zû nayên serfkirin û nayên xwendin. Lê wekî gelek berheman jî zû bi zû nayên jibîrkirin. Berhemên bingehîn in. Gelek caran bêyî wan jî nabe. Divê tim di bin destê nivîskar, lêgerîner û lêkolîneran de cihê xwe bigirin. Her çiqas giran bên talepkirin jî, bi salan bandora wan kêm nabe, lê her ku diçe zêde jî dibe.

Divê dîsa dubare bikim ku xebatên wer, xebatên saziyên birêkûpêk in. Xebatên kom û ekîban in. Pêwîst e bi organîzosyoneke mezin ev karan bên meşandin. Herêm bi herêm, gund bi gund lêgerîn û lêkolînên zanîstî bên pêkanîn. Ev lêkolîn û lêgerîn pêwîst e ji hêla komek zanyar ve bên darivandin û tasnîfkirin. Lê mixabin ku derfet û zerengiya me hê negihîştiye wê radeyê, yan jî rêxistin, rêveber û pêşengên me jî zêde girîngî nedane van mijaran.

Bawer im ku rojek wê bê ev xebat jî tevî xebatên bi vî cureyî dê baştir bê nirxandin. Ji nav hinek gotin dê bên derxistin û gelek tiştên nû jî dê lê bên zêdekirin.

Wekî mînak di vê derbarê de xebatên ferheng, gotinên pêşiyan û biwêjên tirkî balkêş in. Di destpêkê de TDK (Saziya Zimanê Tirkî) bi serê peyvan pere dane û gotinên pêşiyan û biwêjên xwe civandine. Bi vî awayî ferheng amade kirine. Bi pêvajoya demê re ev xebat di çav re hatine derbaskirin û guherandin. Kêmasiyên wan hatine têkûzkirin û ev pirtûk ji nû ve hatine birêkûpêkkirin. Gelek caran nêzîkî nîvê pirtûkan hatine derxistin ango betalkirin. Wekî mînak ji 29.000 biwêj û gotinên pêşiyan, yên ku bi zanyarî hatine pejirandin, tenê li dorhêla 8.000'an in.

Ev yek jî dide xuyandin ku di vê derbarê de hê riyeke dirêj li pêşiya me ye. Bawer im ku ev xebat jî wê di pêvajoya demê de ji layê zimanzan, wêjezan û nifşên nû ve bê guherandin, bê têkûztirkirin.

Bi hêviya wan rojên berhemdar, azad û geş...

Mustafa Borak
Sermawez 2004

DER BARÊ VÊ XEBATÊ DE ÇEND AGAHÎ

Ji ber gelek sedeman divê der barê vê xebatê de hinek agahiyan bidim. Di sala 1993'yan de min dest bi vê xebatê kir. Di van heft salên dawî de giraniya dema min tenê li ser vê xebatê derbas bû. Mixabin der barê vê yekê de ango li ser gotinên pêşiyan û biwêjan xebateke birêkûpêk bi taybetî li hêla Bakur tune ye. Yên heyî jî gelekî qels û tevlihev in. Min kijan xebat da destê xwe, hema bigire nîvî biwêj nîvî jî gotinên pêşiyan bûn. Ji ber wê min ev xebat jî wekî xebata min a li ser gotinên pêşiyan tenê li ser biwêjan pêk anî, lê helbet ji ber hebûna kompûter û hin derfetên din ev xebat ji ya din têkûztir bû.

Di xebatên ku heya niha hatine weşandin de kesî biwêj wekî vê xebatê bi wate û bi mînak nenivîsîne. Her çiqas di xebata *Ahmet Cengîz Çamlibel* a bi navê *"Îdyomên Kurdî"* de tenê mînak hatibin dayîn jî, lê mixabin ew jî xebateke pir qels e. Ji ber wê gelek caran der barê wateya biwêjên di pirtûk, kovar û rojnameyan de gelek astengî hate kişandin.

Li hêla bakûrê welat ev xebat, ligel xebata *Ferhenga Tirkî-Kurdî* ya yekemîn e. Di vê pêşveçûnê de bi taybetî kelîja *Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê* û xebatên wê yên li ser ferhengan gelekî sûdewar bûm.

Îro li Tirkiyeyê tenê li ser gotinên pêşiyan ên tirkî ji 700'î zêdetir xebat hatine weşandin. Li dinyayê di vê mijarê de gelek xebatên girîng tên pêkanîn. Li gorî lêkolînan li dinyayê gotinên pêşiyan ên nivîskî cara yekemîn li Mezopotamyayê hatine bidestxistin. Ev yek jî divê ji me re bibe moral û hêzek. Bêguman ji van agahiyan jî diyar dibe ku hê riya me dirêj e û binbariya me zêde ye.

Mijareke din jî têkilî û danûstendina çanda di nav gel û neteweyan de ye. Di pêvajoya vê xebatê de min hinek gotin û biwêjên azerî, ûrisî û bi taybetî jî yên tirkî jî ji di çav re derbas kirin. Der barê vê yekê de mirov dikare bibêje ku di dinyayê de tu zimanek an jî çandeke ji sedî sed saf û xweser tune ye. Çawa ku cîran di nav têkiliyeke danûstendinê de ne, her wisa çanda gelan jî di nav têkiliyeke wisa de ye. Bi taybetî têkiliya kurd û tirkan balkêştir e. Ji ber ku li Tirkiyeyê kurdî qedexe ye û zimanê tirkî fermî ye, kurd dema ku dipeyîvin, bi taybetî biwêj û gotinên pêşiyan werdigerînin zimanê tirkî. Lê ligel wê, gelek caran kurd jî biwêj û gotinên pêşiyên tirkan werdigerînin kurdî. Her çiqas her du çand jî ji hev û din bikelijînin jî, bi dîtina min di vê hêlê de qedexebûna kurdî zêdetir zimanê kurdî xistiye astengiyan.

Ji bilî wê, ji ber ku lêkolîner û lêgerînerên tirk dema ku lêkolîn û lêgerînan dikin, girêdayî zagona *"Mîsak-i Millî"* xebatên xwe li dorhêla Kurdistanê jî dimeşînin. Ev yek jî dibe sedema bi tirkî nîşandina gotinên kurdî.

Ji ber heman mantiq û ramanê çand û ponijandina gelan nêzîkahiyê nîşanî hev didin. Di gelek zimanan de biwêj û gotinên pêşiyan bi heman wateyê û bi heman şayesê tên nirxandin. Wekî mînak berê biwêja *"Çavê xwe girtin devê xwe vekirin"* min wekî biwêjeke tirkî nirxand û ew nexiste nav vê xebatê. Lê piştî ku min di antolojiyeke nivîskarên kurd a başûrê Kurdistanê de ew biwêj dît, dû re min ew nivîsî. Her wekî wê gelek gotinên wer ên ku min bi wê gumanê hilnedane nav vê xebatê hene.

Li gorî dîtinên gelek pisporan, biwêj zêdetir ji bûyeran derketine. An jî bi gotineke din

çîrok an jî serboriya gelek biwêjan heye. Di vê xebatê de ji bo zêde berhevkirina çîrokên biwêjan jî min gelek hewl da xwe, lê bawer im ku di pêşerojê de ez ê li ser vê mijarê jî hê bi kûrayî bixebitim. Çimkî ev çîrok ji bo çand û hunera gelê me nirxên giranbuha ne. Li hêla din biwêjên ku çîrokên wan bên zanîn, zû bi zû nayên jibîrkirin û kelîja wan hê zêdetir dibe.

Di vê xebatê de ji sedî zêdetir çîrokên biwêjan cih girtine. Ji wan hinek cefen (fabl) in, hinek wekî çîrçîrokan in, hinek jî serpêhatiyên rast û kifş in ku hinek ji wan li ku derê û ji aliyên kê ve hatine jiyîn nav bi nav kifş in. Yên ku ez bi xwe nas dikim jî hene.

Min bi xwe, zor da xwe ku biwêjên ku çîrokên wan hene bi dest bixim, lê yên ku min bi dest nexistin gelek in. Divê ev nirxên hêja bên berhevkirin. Çimkî di wan çîrokan de feraset û zanîneke bêhempa û aqilmendiyeke bilind heye. Çimkî bêguman ev çîrok bi hiş û estetîkeke hevpar ji aliyê gelek kesên jîr ve û di pêvajoya demê de hûrik hûrik hatine honandin. Bi hişmendiyeke tûj ji aliyê gelek kesan ve hatine parastin û bi bedewiyeke spehî gav bi gav hatine kemilandin. Di pêvajoya demê de hin tiştên din lê hatine zêdekirin û wisa gihîştine dema me. Dema ku mirov wan dixwîne, bi rastî jî lê hewes û hejmekar dimîne.

Çîrok û cefenên biwêjan, min hema di binê biwêjê de nivîsîn. Armanc di cihê cih de bi germî hewisandin û di dil de helandina wan e. Ji wan hinek wek çîrçîrokên xweser û dirêj in. Bawer im ew dê ji nifşên nû re bibin sedema nasandina nirx û demboriya kal û bavên wan.

Di vê xebatê de serê sêrî ji ferhenga *Zana Farqînî* û *Îzolî* min gelek sûd wergirt. Ji bilî wê, her du cildên dorfireh ên li ser zargotina kurdî ku *Celîlê Celîl* û *Ordîxanê Celîl* amade kirine, dîsa pirtûka *A. Balî*, *Amed Tigrîs*, *Huseyîn Denîz*, *Ahmed Cengîz Çamlibel* û hwd. ji min re bi kêr hatin.

Bilî wê hinek çavkaniyên *Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê*, *Rojnemaya Azadiya Welat*, *Hawar*, kovarên wekî *Rewşen*, *Jiyana Rewşen*, *Nûbihar*, *Kurmancî*, *Gulîstan* û her cure pirtûkên bi zimanê kurdî hatine nivîsandin ji min re bûn çavkanî. Disa xebata *Firat Cewerî* ya bi navê *"Antolojiya Çîrokên Kurdî"*, ji bo mînakdayîna hinek nivîskaran bû serbarê ser xebatê. Ji bo keda van nivîskarên ku me li jor qala wan û berhemên wan kir, spasdar im. Ji bilî wê ji rêveber û xebatkarên *Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê* re û bi taybetî jî ji keda wê ya ji bo redaksiyonê ji *Aysel Çetin* re spasiyên xwe pêşkêş dikim. Spasdar im ji wan kesan re ku bi kurdî dinivîsin û dibin sedema kemilandina zimanê kurdî.

Tevî xebatên li ser pirtûk, rojname û kovaran, ez bi xwe jî di dema pêvajoya amadekirinê de bi pey van gotinan ketim. Berî her tiştî bi malbatên Kurdistanê yên cure cure, bi taybetî jî di nav civatên jinan de min gelek biwêj bi dest xistin. Min di van civînan de yên di dest xwe de xwendin da ku bên bîra wan û ew jî yên nû bidin ser. Ew her hebin, wan her dem dewlemendiya xwe ya çandî bê şik nîşan dan. Ji bilî wê di dawet, serxweşî (taziye) û mewlûdan de pênûs di destê min de, ez bûm bendewarê biwêj û gotinên pêşiyan.

Bêguman, ev xebat di heman demê de bi her awayî xuyanga rewşa folklora kurdan e. Ji bo wê jî carinan li ser hinek efsane, dîtin, bawerî, edet, tore, kesayet û cira kurdan jî agahiyên kurt cih digirin. Wekî mînak: *Beran berdan, destê yekî şiv girtin, li ser Newrozê, li ser bext, li ser toreyên şerê eşîran, li ser efsane û feraseta zivistanê û hwd.* Bawer im ku ev agahî ji bo xebateke wiha pêwîst in. Bêguman ev agahî ji bo nifşên nû û yên pêşerojê dê bibin çavkanî û rêber.

Helbet ji bo her biwêjekê jî nivîskarên kurd mînakek dayîn xweş tê xuyan, lê ev yek ji gelek aliyan ve ne guncan e. Hela ku rewşa wêjeya kurdî ya nivîskî ku mirov dide ber çavan rewş baştir tê fêmkirin. Lê dîsa jî di vê xebatê de ji heş sedî (800) zêdetir mînak, ji pirtûk û nivîsên nivîskarên kurd hatine dayîn. Ev heşsed mînak ji dusedî (200) zêdetir nivîskarî hatine hilgirtin û navên wan hatiye nivîsandin.

LI SER BIWÊJ Û GOTINÊN PÊŞIYAN

Berî her tiştî divê cudatî û taybetiyên biwêj û gotinên pêşiyan bên zelalkirin. Lê berî ku derbasî vê mijarê bibim, dixwazim qala hevpariyeke wan bikim. Her çiqas ji hev û din cudatir bin jî, carinan mirov di jihevveqetandina biwêj û gotinên pêşiyan de dikeve tengasî û dudiliyê.

Bi rastî jî hinek gotin hene ku hem wekî gotinên pêşiyan, hem jî wekî biwêjan tên xuyan. Mirov dikare wan gotinan ji bo her du hêlan jî binivîse. Wekî mînak:

"Kal bû, tehl bû."
"Nizanim, rehetcan im."
"Ziman e, ne kaş e, ne kendal e."
"Ji yekî re jî ho, ji hezarî re jî ho."
"Ez kor, tu kor, kî (dê) mehîrê bibe jor?!"
"Ez axa tu axa, kî golikan bibe nav baxan."
"Dayîk hat ji der ve, Xwedê rabû di ber de."
"Zimanê sor e, pêşiyê ne gelî ye, ne zihor e."
"Xîret avêtine ber segan, segan qebûl nekiriye (nexwariye)."
"Mirîşk nikulê xwe di avê de dike, berê xwe ber bi Xwedê ve dike."

Taybetî û cudatiyên gotinên pêşiyan

Bi gelemperî di hêla têşe, peyam û şêwaza gotinê de biwêj û gotinên pêşiyan gelekî ji hev û din cuda ne. Heke ku mirov taybetî û cudatiyên gotinên pêşiyan û biwêjan bide ber hev dikare ji bo her yekê gelek xalên bingehîn rêz bike.

Ji bo gotinên pêşiyan mirov dikare van cudatî û taybetiyên jêr bîne ziman:

1. Berî her tiştî di gotinên pêşiyan de darizandin heye. Hukim dide ku ev yek wiha wiha û wiha ye. Bi gotineke din, rewşê dinirxîne, sentezan dike û biryara erênî yan jî neyînî dide nîşandan. Wekî mînak:

"Dinya dûv e, aqil kêr e."
"Alimek ji ber alemekê ve ye."
"Goştê mêran ne bi kişandinê ye."
"Kinc têne pînekirin, gotin nayên pînekirin."
"Heciyo, neçe hecê, solan neqetîne li rê, hec ew e ku tu lê."
"Bela mirovekî xerab li gundekî, ya gundekî li heft gundan dikeve."
"Kinca ku kete ber pîneyan, serê ku kete ber şîretan, xêr jê nayê." û hwd.

2. Taybetiya duyemîn gotinên pêşiyan bi girêdayî van biryar û darizandinan pend û şîretan dikin, ango rê nîşanî mirov didin. Wekî mînak:

"Nêvî, jê meke hêvî."

"Hevalê te şekir be xelas neke."
"Mêrê bêhext pir be di ser re derbas nebe."
"Li her siya rovî de nebe, bila şêr te bixwe."
"Tu dohn nexî çirayê, çira ronî nade." û hwd.
"Tu ku çûyî gundekî heke hemû kes bi çavekî be, tu jî çavekî xwe derxîne."
"Bi qîzan re neçin qîz ter in, bi jinebiyan re neçin zehf digerin, bi dayîkên dergûşan re herin, zû vegerin."
"Yek, deq e; dudu ne, ben li stû ne; sisê ne, bi hev asê ne; çar in, bi hev neyar in; pênc in, bi hev sênc in; şeş in, bi hev xweş in."

3. Taybetiyeke din; gotinên pêşiyan giyan û naverokeke gerdûnî jî di xwe de disêwirînîn. Gelek ji wan ji bo hemû mirovahiyê û ji bo hemû deverên dinyayê rastiyeke gelemperî tînin ziman û ew biryar an jî nirxandin gelek caran ji bo her însanî û li her devera dinyayê rast in. Wekî mînak:

"Zor zora zorê dibe."
"Berê darê darê dixemilîne."
"Çavê kul, ji çavê kor çêtir e."
"Yê ku kete govendê, wê bilîze."
"Av heta girik nebe, zelal nabe."
"Zor zane, zêr zane, zanîn zane."
"Barê biaqilan, li pişta bêaqilan"
"Çil heramî nikarin rûtekî bişêlînin."

4. Gotinên pêşiyan bi gelemperî fermanê didin mirov. Dibêjin divê tu vê bikî yan jî nekî. Wekî mînak:

"Kerê ketî raneke."
"Her çi çû, nede dû."
"Tu bû mîr, Xwedê neke ji bîr."
"Ger tu nizanî, bipirse ji cîranî."
"Bide netirse, bistîne şerm neke."
"Yan neke nericife yan jî (tu) dikî nericife."
"Nan bidin nanpêjan, nanekî jî zêde bidin."
"Tu duduyê xwe dibêjî, yeka hevalê xwe jî bibêje." û hwd.

5. Wate û naveroka gotinên pêşiyan, bi gelemperî ne. Zêde têkiliya wan bi herêman ve tune ye. Zêdetir mijar û gotinên rasteqîn û mayînde destnîşan dikin. Wekî mînak:

"Qencî qenciyê tîne."
"Dara xweziyê şîn nabe."
"Axirî heya derê gorê ye."
"Barê ketî li erdê namîne."
"Malê dinê li dinê dimîne."
"Axiriya xêr ji sibê de xêr e."
"Tu çi bikî ew ê bê pêşiya te."
"Çiya hewceyî çiyayan dibin."

6. Ji ber ku tim şîretan dike, ferman û biryaran dide, taybetiyeke din a gotinên pêşiyan jî ew e ku hevok zêdetir di dema fireh de tên bikaranîn. Wekî mînak:

"Bêxîret bêîman in."
"Zikê diyan buxçe ye."
"Gihayê hewşê tehl e."
"Werîs ku diqete, dibe çar serî."
"Bêyî Xwedê dibe, bêyî xwedî nabe."
"Zor zane, zêr zane, devê tivinga mor zane."
"Salê herî siltanî, mehê herî mêvanî, her roj herî, li cihê sanî."
"Mala bavan zeynet in, ava cêrê wan şerbet in, dayîk ku dimirin, zeyî tên bal jinbiran, bêrûmet in."

7. Xaleke din jî ew e ku carinan ji teşe zêdetir, raman girîng dibe. Ango hinek gotin bi teşe naşibin gotinên pêşiyan, lê ramana ku didin a gotinên pêşiyan e. Bi gotineke din, gotinên pêşiyan ne rewşekê lê ramanekê, fikrekê, biryarekê yan jî dîtinekê tînin ziman. Wekî mînak:

"Şerbik teze ye, av şîrîn e."
"Berdana jinê edeta dinê."
"Li ku derê komek, li wir kedek."
"Ne mêrê şermok, ne jina kenok."
"Bext bextê pêşîn, war warê hêşîn."
"Dem bi demê re her dem bi Xwedê re."
"Ez geriyam li Şam û dinê, xelas nebûm ji mirinê."
"Dinê kê xwar? Jin û mêrê ku ji hev û din re bûn yar."

8. Ne tenê yên biwêjan, lê her wisa hindik be jî hinek çîrokên gotinên pêşiyan jî hene. Ji ber çîrokên wan min ew jî hildan nav beşa biwêjan. Wekî mînak:

"Eslî hû, neslî hû."
"Piştî kêfê kêfaret e."
"Ji jinan dotmam, ji şûran şûrê Şam."
"Heya tu ya tehl nexwe, ya şîrîn bi ser de nayê."
"Rasta salox û sewal tune, xwar ê belaya xwe bibînin."
"Zimanê bigere bê dor, dike lingê mirov gîzmên sîp û sor."
"Hoste necar, rabe rûnê weke her car, Xwedê yeke derge hezar."

9. Gotinên pêşiyan jî wekî biwêjan gotinên xweser û taybet in. Ji bo wê jî peyvên wan û teşeyên wan wekî qaliban cihê xwe girtine û nayên guherandin. Heke bên guherandin, jixwe taybetmendî û reseniya (orjînalîta) wan namîne. Heke peyvek jê derkeve yan jî peyveke din bikeve nav, ango ew qalibê wan î ku bi xwezayî cihê xwe girtiye nebe, peyama xwe bi cih nayîne. Wekî mînak :

"Berxê nêr, ji bo kêr."

Vê gotinê mirov nikare wergerîne, "Peza nêr, ji bo kêr" yan jî bibêje: "Berxê nêr, ji bo şerjêkirinê ye."

"Kerê ketî raneke."

Ev gotina pêşiyan jî dîsa wekî, *"Hepsê ketî raneke."* nayê qulibandin.

"Her teyr bi baskên xwe difire."

Wekî ku me li jor anî ziman, ev gotin jî wekî: *"Her çûk, bi baskên xwe difire."* (yan jî) *"Her çivîk bi baskê xwe difire."* nayê guherandin. Heke ku wer bê gotin bandora wê û bedewiya wê namîne.

10. Gotinên pêşiyan jî gelek caran bi awayekî mecazî peyaman didin. Bi gotineke din, di gotinê de destnîşanî hinek tiştan dikin, lê esas mijar li ser tiştên din in. Ango di gotinê de qala tiştekî dikin, lê peyam ji bo mirov û jiyanê û tiştên hê bi gelemperî ne. Wekî mînak:

"Berxê nêr, ji bo kêr."

Di vir de mebest ne berx an jî beran e, lê zayenda nêr û bi taybetî mêr e.

"An barek mewûj an jî kelemekî tûj."

Di vê biwêjê de mijar ne mewûj û kelem in, lê berevajîtiya helwestê ye.

"Aş digere, çeqçeq diranê xwe dişkîne."

Di vir de jî ji bo kesên bêdenge û kar û vatiniyên xwe nizanin mînaka aş û çeqçeq tê dayîn.

"Adarê seg kete binê darê."

Di vê biwêjê de jî mijar helbet ne ketina segan a bin daran e, lê rewşa hewayê ya destpêka biharê tîne ziman.

"Zimanê bigere bêdor, dike lingê mirov gîzmên sîp û sor."

Dîsa di vê gotinê de mebest gizmên sor an jî tiştekî din nîn e, lê bedelên gotinên xerab û ne di cih de kişandinê tîne ziman.

"Xwaro bi erdê re, rasto bi Xwedê re."

Helbet ne xerab bi erdê re dikişin, ne jî yên baş diçin bal Xwedê. Peyama vê gotinê ew e ku mirovê xerab ziyanê dibînin, ên baş jî serbilind û serfiraz in.

"Wexta xêran hat, gûyê sêwiyan hat."

Bêşansiya sêwiyan tîne ziman.

"Ker tevî barê xwe direqise."

Di vê gotina pêşiyan de jî dîsa qala reqasa kerê na, lê qala huner û qoçaxiya mirov çawa be, li gorî wê xwe dide xuyandin û rûmetê dibîne dike.

11. Gotinên pêşiyan wekî biwêjan rojane hema li her derê nayên bikaranîn. Zêdetir ji bo rewşên taybet, axaftinên zanyarî, di dema nesîhetkirinê de tên xebitandin.

Lewma me di destpêkê de bi taybetî ji bo nivîskaran girîngiya biwêjan anî ziman.

Taybetî û cudatiyên biwêjan

Berevajî gotinên pêşiyan, rewş an jî teşeyên biwêjan gelek cudatiyan nîşan didin. Heke em van cudahî û taybetiyan destnîşan bikin, dikarin van xalên jêrîn rêz bikin:

1. Berî her tiştî biwêj ji aliyê têşeyî ve xwediyê awayên cihêreng in an jî ya hê rasttir, biwêj têşeyeke hevpar zêde nadin xuyandin. Hinek tenê ji du gotinên kurt pêk tên. Wekî mînak:

"Dil neçûn"
"Enî qelîşîn"
"Dil nekirin"
"Çav lê bûn"
"Çav berdan"
"Agir teqandin"

2. Hinek biwêj bi serê xwe wekî kurteçîrokan dirêj in. Tê de çîroka bûyerekê tê xuyan. Ango mirov dikare di serê xwe de wê çîrokê dirêj dirêj xeyal bike. Wekî mînak:

"Got: 'Bavo ez ê te bifiroşim.' Got: 'Lawo mirov qet bavê xwe difiroşe?' Got: 'Bavo ez ê buhayekî wisa bibêjim ku tu kes nikaribe te bistîne.'"

"Mîr gote diya xwe: 'Xwezî tiştê mê nebûna li dinê.' Dê lê vegerand: 'Ku çêlek nebûya, dê gayê cot nebûya, ku bizin nebûya dê konê reş nebûya, ku ez nebûma dê mîrê wek te nebûya.'"

"Got: 'Ez li zikê te dixim, tu dibêjî, wey pişta min!' Got: 'Wekî kesek li pişta min hebûya te nikaribû li zikê min bixista.'"

"Got: 'Ziyaretê, min gelek caran bi te derew sond xwar, te tiştek bi min nekir.' Got: 'Min ji gelek caran mala te xera kir, haya te jê tune.'"

"Gotin: 'Gayê te dizîn!' Got: 'Wey dikê min.' Gotin: 'Çima wisa dibêjî?' Got: 'Wekî min li dikê xwe bipirsiya, gayê min nediçû.'"

"Gur got: 'Te li pîreka xwe bixista, wê jî li qîza xwe bixista, hinek mû (bend) birista, lingê kerê reş bixista, min jî li van sirtan ew nekuşta.'"

"Gotin: 'Kul hatiye gund wê ji her malê du kesan bibe.' Hemû kesî li çavên xulam nihêrî. Xulam got: 'Belê yek ez lê ka yê din?'"

"Navbera min û kîjan cinarên min xera bibe jina min diçe li ber deriyê wan teşiya xwe dirêse."

3. Gelek biwêj ji bo ku rewş û helwestekê yan jî mijarekê şîrove bikin, ne di hevokê de, lê ji bo binavkirinê bi têşeya raderî tên bikaranîn. Wekî mînak:

"Balgî kirin"
"Bar hilgirtin"
"Kûkekûk kirin"
"Wekî diya bûka bêcihêz, li hev çûn û hatin"
"Ne bi azana mele, ne jî ji zirîna kerê bawer kirin"

4. Hinek biwêj di forma pirsê de ne. Lê di bin wê pirsê de rewş û ramaneke balkêş heye. Wekî mînak:

"Ba ji tehtê çi dibe?!"
"Tîr li ku, das li ku?!"
"Şam dû re, ma mişar jî dûr e?!"
"Ma dar tehl e, berê darê şîrîn e?!"
"Ma paniya diya min pê xwîn bûye?!"
"Merzelê ji nêzdan miriyan li ku ye?!"
"Ma qey tu ji xatûnê, ez ji cêriyê me?!"
"Ma morikên diya min li wir qetiyane?!"
"Ma di nav çiyayan de derziya diya min winda bûye?!"
"Dermanê her tiştî xwê ye, lê xwê xera bibe dermanê wê çi ye?!"

5. Carinan hinek biwêj jî ji bo kesên ku ew nebihîstibin, tenê wekî çend peyvên bêwate tên xuyan. Bi gotinekê din carinan em rastî biwêjinên wisa tên ku wekî biwêj dîtin li aliyekî, mirov nikare tu encamekê ji wan derxe. Wekî mînak :

"Hela çê"
"Lê dibêje."
"Guro hejaro!"

"Egela ji te re!"
"Eyşikê, ji xwe şikê"
"Hay lo lo, hay loo!"
"Ling havê min ling!"
"Aha gulê bihar, aha gulê zivistan."

6. Ji bo ku armanca xwe bidin fêmkirin, biwêj hinek caran jî wekî helbestan bi awayekî hevdeng, li hev hatî û bi aheng tên gotin. Biwêj bi şêwazeke wisa xweş tên xemilandin ku tu dibêjî bi wê xweşikahiya xwe dikin ku xwe bigihînin asta fêrbûna mêjiyan a herî bilind. Wekî mînak:

"Ax nezanî nezanî, nezanî tu dizanî."
"Çima razim li cihê kaş, çima bibînim xewnên şaş."
"Elhodan, elhodan, van şêx û mela(yan), mala me dan."
"Apê sorvirçî, ji destê wî gurî derket, kete destê wî hirçî."
"Hat nav malan tirî, Zeyno da bêjingê li dor bênderê zivirî."
"Nêçîrvano, rabe kêrê tûj (bi)ke, di bintara te de hem xezal e, hem kêrgûşk e."
"Dayê belayê, xwîşkê talhişkê, jinê erekolika minê, te bigerînim li dora dinê."
"Feleka find û finaz, firindê piçûk û baz, geh da me şahê gerdan, ew jî bi minet û naz."
"Kî dibêje: 'Were kar.' Li dilê min dibe azar. Kî dibêje: 'Were taştê.' Li dilê min gelek xweş tê."
"Hat Hemoyê Takî, rêxa wî ya gayekî, di mala wî de nîn e arvanê xewarekî, her roj xwe digihere bi awayekî."
"Heta qeliya me hebû, mamik bûka me bû; roja qeliya me xelas bû, mamik çirtek da xwe ji me derbas bû."

7. Hinek biwêj tenê bi dubarekirina peyvan pêk tên. Wekî mînak:

"Zar û zêç"
"Axir soxir"
"Kozî kulfet"
"Bilebil kirin"
"Nizenîz kirin"
"Kutekut kirin"
"Pirtepirt kirin"
"Porteport kirin"

8. Pirî caran şibandin jî dikarin peywira biwêjan bi cih bînin. Wekî mînak:

"Wekî tava teyrokê bûn"
"Mîna marê nig di zik de"
"Wekî holika golikan bûn"
"Wekî hîva çardehşevî bûn"
"Nola gayê di nav golikan de"
"Wekî kefa devê seyê har bûn"
"Nola gayê di nav golikan bûn"
"Mîna kevirê li nav heriyê ketî"
"Mîna cêwrikê li şûna wara mayî"
"Wekî mêşa ku bikeve nav lepê koran"
"Mîna deveya ku ji hamidê (barê) xwe bixwe"

9. Wekî ku me di destpêkê de jî got. Li gorî dîtinên gelek pispor û wêjezanan, biwêj zêdetir ji bûyeran derketine. Bi gotineke din, çîrok an jî serboriyên gelek biwêjan hene. Dema ku mirov çîrok an jî serboriya biwêjekê hîn bibe, ew biwêj bandoreke xurt li mirov dike û di mêjî de kûrtir cihê xwe digire. Wekî mînak:

"Erê, Gulê ez ne mele bûm, te ez kirim mele."

Mirovekî xizan hebûye, navê jina wî Gulê bûye. Ji ber ku rewşa wan a aborî ne xweş bûye, Gulê mala xwe bar dike û diçe welatekî din. Bi zorê bi mêrê xwe melatiyê dide pejirandin. Li wî welatî mêrê xwe wekî melayekî meşhûr dide xuyandin.

Piştî demeke dirêj ku mêrê wê ji ber nivîşt û diayan jinan dişêlîne; hinek jê aciz dibin û ji melatiya wî guman dikin. Dixwazin fêl û sextekariya wî derxin.

Carekê ku dibihîzin mela wê bê malekê, berê diçin gulekê dikin bin kulavê ku mela li ser rûnê. Dema ku mela li ser kulav rûdine, ji helwest û rewşa wan ên li wir aciz dibe. Ji wan dikeve şik û gumanan. Ji ber ku Gula jina wî ew kiriye nava wê tirholkê ji wê hêrs dibe. Diqehire û bi dengekî bilind dibêje: "Erê, Gulê ez ne mele bûm, te ez kirim mele!"

Yên wir nizanin ku navê jina wî Gulê ye, lewma wer dibêje. Hew dizanin ku wî bi kerameta xwe fêm kiriye ku gul di binê kulav de heye, ji dilnizmiya xwe dibêje: "Erê, Gulê ez ne mele bûm, te ez kirim mele!" Bi vê gotinê re yên ku gul kirine bin kulavê mele, ecêb dimînin. Xwe diavêjin lingê wî û lêborîna xwe dixwazin da ku li wan nefiran neke. Ji wê rojê bi şûn de mêrê Gulê bi reheti melatiya xwe didomîne...

"Heleb, teze bû Heleb."

Li gundekî jinikeke pîrebî û kurekî wê hebûn. Kurê pîrê jê re zehf baş bû û ji gotina wê zû bi zû dernediket. Kurê pîrê ji ber ku bazirganî dikir, tim diçû Helebê û dihat.

Her dema ku ji Helebê dihat diya wî jê dipirsî:

"Lawo, qet li Helebê çi heye çi tune ye?" Kurik jî bersiv dida û digot:

"Dayê tiştek tune ye, hema wekî we çi bihîstiye ew e."

Lê diya wî ew pirs ew qasî jê pirs dikir ku kurik aciz dibû. Rojekê lawik bi hevalekî xwe şêwirî û got: "Ev çi hal û hewalê diya min e? Hema wisa wê pirsê ji min dike."

Hevalê wî rewş fam kir û jê re got: "Careke din ku diya te ew pirs ji te kir, tu bibêje: "Dayê, padişahê Helebê ferman daye ku qîzan bidin kalan, pîrê wekî te jî bidin xortan. Ka diya te wê çawa bike û çi bibêje?"

Cara din ku lawik ji Helebê tê bi pirçî li mal rûdine û diya wî dîsa jê dipirse:

"Lawo qet li Helebê çi heye, çi tune ye?" Lawik dibêje:

"Dayê Xwedê Helebê tep bike! Paşeyê wê ferman daye, qîzan didin kalan, pîrê nola te jî didin xortan."

Hema di wê gavê de reng û rûyê pîrê diguhere, fîtika diavêje û dibêje:

"Heleb teze bû Heleb!"

10. Taybetiyeke biwêjan a din jî ev e ku şibandinên pir awarte û mecazî dihewînin. Ya ku tê ziman û ya ku tê destnîşankirin ji hev cuda ye. Şibandin û diyarkirinên ku tên gotin û peyama ku tê dayîn, ne wekî hev in. Wekî mînak:

"Enî qelişîn" (Şerm kirin)

"Di erdê de çûn xwarê" (Pir fedî kirin)

"Çavên (yekî) çûn nava serî" (Mat û şaşwazî man)

"Cil û kulav ji hev pişkivandin" (Cudayetî kirin nav kesan)

"Canê xwe zer kirin" (Ji bo xebatê yan jî kirina karekî aciz bûn)

"Dendikên xwe çizirandin" (Li kêfa xwe mêze kirin. Kar baş meşîn)

"Canê xwe ji segan deyn kirin" (Li hemberî her rêgezên jiyanê qewîn bûn)

"Qûna xwe ji bin bar derxistin" (Xwe ji berpirsyarî yan jî pirsgirêkekê rizgar kirin)

"Agir bi qûna (yekî) ketin" (**1.** Ji ber ziyan an jî xapandinekê pir xemgîn bûn **2.** Pir hêrs bûn)

11. Biwêj jî wekî gotinên pêşiyan xwedî form û taybetmendiyekê ne. Mirov nikare bi awayekî din bibêje yan jî cihê peyvan biguhere. Heke ku bi awayekî din bê gotin, form û qalibê wê winda dibe, wate û taybetmendiya wê namîne. Wekî mînak:

"Poz lê neşewitîn"
Li şûna wê em nikarin bibêjin, *"Çav lê neşewitîn"* an jî *"Dest lê neşewitîn"*

"Canê xwe zer kirin"
Mirov nikare ji bo vê biwêjê bibêje, *"Canê xwe sor kirin"* yan jî *"Canê xwe şîn kirin"* û hwd.

"Xwedê bibêje kanê, ez bibêjim hanê."
Mirov nikare vê biwêjê wekî, *"Xwedê bêje ka bide min ez bibêjim ha ji te re."* yan jî bi awayekî din nayê guherandin.

12. Rewş û ramana ku biwêj dixwazin bidin fêmkirin, rasterast diyar nakin. Wê wekî gotinên pêşiyan bi biryar nayînin ziman. Ango wekî gotinên pêşiyan nirxandinan him jî nirxandinên tund pêk nayînin. Zêdetir rewşekê şîrove dikin, helwest û bûyerekê tînin ber çavan. Bi awayekî çîrokî, helbestkî yan jî hevdengî dixwazin mirov ji wan bûyer û rewşan dersê ji xwe re derxin. Wekî mînak:

"Hewana xwe dayîn cem hevalan, nanê xwe bi minet xwarin."
"Bi roj ji qulika misînan ditirse, êvarê kefenê miriyan datîne."
"Apê Merdan, kerî surî tev berdan, di dest de maye xeberdan."
"Şeb û şekir çûn Diyarbekir; şekir rûnişt dengê xwe nekir; şeb rabû pesnê xwe kir."
"Gotin: 'Pisîka xalo hate te, ha pisîka xalo hate te!' Got: 'Ca berdin bila pisîka xalo bê min lo!'"
"Hezretî Mûsa gur şîret dikir; gur got: 'Zû bike tu dê çi bibêjî bibêje, wa ye keriyê pêz qulibî.'"
"Gotin: 'Jina te zehf digere.' Got: 'Derewan mekin, heke wisa bûya wê rojekê jî bihata mala min.'"
"Gotin: 'Dijmin hat.' Kor got: 'Min qeraltiyek dît.' Topal got: 'Em birevin.' Ker got: 'Min dengek bihîst.'"
"Zilamek hebû, dema nanê wî hebû, dewê wî tune bû, dema dew hebû, nan tune bû; dema her du jî hebûn ew ne li mal bû."

13. Hinek caran biwêj jî li gor bawerî û mantiqa gel, nifir an jî dia ne. Wekî mînak:

"Kindir qetîn"
"Kezeb lê reş bûn"
"Esmanê hêşîn bi ser de girtin."
"Înşelah, kalîna pêz li ber derê te neyê!"
"Derpiyê sor di bin balgiyê xwe de nedîtin."
"Agir bi te bikeve, ha jî bi hewara te ve bê."
"Ez ji te xelas bim, tu ji emelê xwe xelas nebî."

Ji bo diayan çend mînak:

"Gula geş bî, neçilmisî."
"Agir li ber piyê te bibe av."
"Tu bikî nekî Xwedê bide te."
"Dostê te dost be, dijminê te kor be."
"Bila diaya ziyareta Gulheyranê li te be."

14. Taybetiyeke biwêjan jî hinek ji wan herêmkî ne, li herêmên din zêde nayên zanîn. Ji xwe kêm an jî zêde li her herêmê biwêjên ku wê wateyê tînin ziman hene. Lê bawer im ku bi xebatên wiha di navbera herêman de ev gotin dê bên bikaranîn û pejirandin. Ev yek jî ji bo zengîniya çanda kurdan dê bibe derfet û bingeheke kêrhatî. Wekî mînak:

"Guro hijaro" (Mêrdîn)
"Bûn îşê Apê Ûs." (Dêrsim)
"Serhingî di barê kerê de ye." (Îdir)
"De here ku tu Osman î." (Dêrsim)
"Bila çil mêrê Şêxadî dergê xêran li te veke." (Kurdên Rewn-Erîwan)
"Evdilxebûr e, ji rehma Xwedê dûr e, koda wî piçûk e, çirnika wî kûr e." (Tendûrek)
"Ev pîvaza mezin, ev nanê genimî ev jî ava cemidî; dîsa jî dibêjin Eliyê Sino malê xwe naxwe." (Sêwerek)
"Ez dibêjim, bibim qaymeqamê Gîhadînê ku ew nebe, gavaniya Cûcanê destê min paç dike." (Cûcan gundekî girêdayî Gîhadîna Agiriyê ye.)

15. Hevpariyeke biwêjan jî ew e ku berî peyama bingehîn hinek gotinên hevdeng tên gotin ku hem gotinê xweş bikin hem jî balê bikişînin. Wekî mînakên jêrîn:

"Dinê di dinê de, Mendo di jinê de."
"Hay ho hay ho, kanê xwediyê xêra do!?"
"Ecêba min ser ecêbê, keç dibin, dê lingê xwe dike rikêfê."
"Bendikê rûto dudu ne, çavê wî li min, çavê min jî li yekî/a din e."
"Dayika du dotan, li xwe dide du lotan, ne li vir, ne li Cizîra Botan."
"Ji mêran mêr im, ji şêran şêr im, darekî bînin ez ê stêrkan ji esmên bînim."
"Derdikevim dîwarê Qurqurikê, deng tê dengê tûtikê; ax li min derdê zûtikê."
"Hayê li min hayê, hevirmiş hatiye bi livayê, xwediyê livayê kor e, dil bernayê."

16. Lê hinek caran li gorî herêman bi guhertokên cuda cuda tên bikaranîn. Wekî mînak:

"Hayê li min hayê, hevrişim hate bi livayê, liva ber bi hevrişim ve nayê."
"Hayê li min hayê, hevirmiş hatiye bi livayê, xwediyê livayê kor e, dil bernayê."
"Hayê li min hayê, hevirmiş hatiye bi livayê, çavê xwiyê livayê birije, dil bernayê."

***

"Ji xelkê re edet e, ji me re erbet e."
"Ji xelkê re edet e, ji min re qebhet e."

***

"Kurn bi te re me, şerbik tu guhdar be."
"Diwaro ji te re dibêjim, bûkê tu fêm bike."
"Diwaro ji te re dibêjim, bûkê li te eyan be."
"Dîwaro min ji te re got, piştdiwaro tu guhê xwe bidiyê."
"Deriyo ji te re dibêjim, piştderiyo tu guh bidiyê."

***

"Ez singekî dikutim, ew tûrekî pê de dike."
"Ez singekî dikutim, tu hebinekî diavêjiyê."
"Ez sirkekê dikutim, tu hespekî lê girê didî."

***

"Ji xelkê re gul e, ji xwe re derd û kul e."
"Ji xelkê re hêkan dike, ji xwe re zilqan dike."

"Ji xelkê re jîr e, ji xwe re kor e."
"Ji xelkê re pispor e, ji xwe re kor e."
"Ji xelkê re masîgiro, ji xwe re kûsîgiro."
"Ji xelkê re pirbêjo, ji xwe re ker û gêjo."
"Ji xelkê re purşûnga şîr e, ji xwe re mişkê kor e."
"Ji xelkê re hût e, ji xwe re kût e, hevalê tucarê rût e."

***

"Bûkê ziman tune, xesûyê îman tune."
"Bûkê tune zar ziman, xesûyê tune dîn îman."

***

"Bi roj miriyan dişêlîne bi şev ji qurquroneka dêrî ditirse."
"Bi ro ji qulika misînan ditirse, êvarê kefenê miriyan datîne."
"Bi roj kefenê miriyan jê dike, bi şev ji bulqebulqa kûzan ditirse."

17. Her çiqas biwêj wekî gotinên pêşiyan rasterast şîretan nekin jî di gelekan de di encamê de ji bûyer an jî rewşa biwêjê şîretek ango dersek ji bo mirovan heye. Ku li van mînakên jêr baş bê nêrîn, wê bê dîtin ku di van biwêjan de jî pend û şîret hene û mesajan didin ku mirov jê bibin taqî û dersan jê bigirin. Mînak:

"Bejn tît e, mal mecît e."
"Got: 'Malo Xwedê bi te re.' Got: 'Xwediyê min jî.'"
"Di malê de tune arvan e, navê jinikê Gulgînan e."
"Qazî bi xwe çû pêk neanî, mûyek ji ruyê xwe bi rê kir."
"Qaz bi qaz re, baz bi baz re, mirîşka kor bi dîkê kulek re."
"Dibê: 'Darê das hate te.' Dibê: 'Wekî destî ji min nebe, bi min nikare.'"
"Got: 'Kûçiko te çi kir bi xwe kir. Te simek bir, lê lingê xwe ji ji vir kir.'"
"Got: 'Apo, şorbeya we pir xweş e.' Got: 'Lawo rojekê li mala me, rojekê li mala we.'"

18. Ji ber ku di biwêjan de şayes, mînak, şibandin, şîrove û destnîşankirina bûyer û rewşê heye, zehf zêde tên bikaranîn. Wekî gotinên pêşiyan ku zêdetir di demên girîng de tên gotin nîn in. Mezin û piçûk hema bigire her kes ji wan beşekê dizane û wan dixebitîne. Wekî mînak:

"Dil şikestin"
"Çav pê ketin"
"Rûyê xwe reş kirin"
"Serê xwe netewandin"
"Serî gêj bûn"
"Qafê xwe xwarin"
"Çav lê sor bûn"
"Dil jê sar bûn"

Biwêjek li gorî rewşê hin caran rengdêr e, hin caran navdêr û hin caran jî dibe lêker. Wekî mînak:

"Stûxwar" (rengdêr)
"Stûxwarî" (navdêr)
"Stûxwar bûn" (lêker)

Lê her sê jî ji aliyê wateyê ve biwêj in.

Mustafa Borak

DER BARÊ BIKARANÎNA FERHENGA BIWÊJAN DE

Me biwêj bi awayê rêza alfabetîk dane. Bi gotineke din, me peyva pêşîn a biwêjê ji xwe re esas girt û rêza alfabetîk wisan pêk anî. Wekî mînak:

"Di agirê (yekî) de şewitîn"
"Dil herdan (yekî)"
"Dilê xwe mor kirin"
"Dilgiran bûn"

Heya ji me hat, me gotin wekî orjînala wê nivisîn, ji ber wê jî carinan hinek şêwaz dibe ku li hinekan çewt bên, lê bi dîtina me ya rast ev şêwaz bû. Me piraniya biwêjan di rewşa raderî (mestar) de dan. Lê hin biwêj hene ku ew tenê ancax di şewaya kişandî de tên bikaranîn, me jî ew wisan dan.

Piştî dayîna biwêjan, li bin îcar me şîroveya wê kir û paşê jî me hevokên nimûneyî dan. Eger ew hevoka nimûneyî ji nivîskarekî/ê hatibe girtin, li dawiya hevoka nimûneyî, me navê nivîskar da. Li aliyê din, eger biwêj ji wateyekê zêdetir wateyên wan hebin, bi awayê **1.**, **2.**, **3.** ... hatine rêzkirin, piştî şîroveyên wan li gorî heman rêzê me hevokên wan ên nimûneyî dane. Hevokên nimûneyê bi stêrekê (*) hatine nîşandan û jêgiriyên (îqtibasa) ji nivîskaran jî di nav dunikê (" ") de hatine dayîn. Hevoka nimûneyî ya pêşîn ji bo madeya **1.**, hevoka duyemîn a nimûneyî, ji bo madeya **2.**, hevoka sêyemîn jî, ji bo madeya **3.** û hwd. hatiye dayîn. Her wiha me hevoka nimûneyî *îtalîk* û di nav hevoka nimûneyî de biwêj jî *îtalîk-**bold*** daye.

Bi xwe hesîn

1. Di hêla zayendî (cinsî) de gihîştin. **2.** Hay ji xwe û rewşa rasteqînî bûn. **3.** Ji xewê hişyar bûn. **Îsal Omer ***bi xwe hesiyaye****, ma tu nabînî ji pey keçikan naqete.* **Ew ***bi xwe hesîn*** *ku dê wê şevê bi ser mala wan de bigirin û ji wir revîn.* ** "Tebîetekî wî yê xerab hebû ku gava ew ***bi xwe bihesiya****, careke din nikaribû di xew re hiçûya."* Enver Karahan

Hinek biwêjên herêmî jî me kirin nav vê xebatê, ji bo pêşerojê dibe ku ew jî li gelek deveran bi saya nivîskaran, biguherin û rengekî neteweyî bigirin, li her derê belav bibin û bên bikaranîn. Girêdayî vê yekê, biwêj li gorî gotinên wan ên resen (orjînal) hatine nivîsîn. Wekî mînak: Carinan peyva *"cih"* me wekî *"cî"* jî bi kar aniye. Dîsan li gorî herêm û orjînalîteya wê peyvê, me dest nedaye şêweya *"ar"* û *"arî"* ku hemwateya peyva agir in. Her wiha gelek mînakên din jî hene, tenê ji aliyê rastnivîsê me guherîn di wan de kirin.

Ji bo ku pirtûk zêde stûr nebe, gelek biwêjên hemwate bi kurtenivîsa *bnr.* hatine nişankirin. Bi vî awayî, xwendevan dikarin ji gelek biwêjên hemwate û guhertoyên deverên cuda cuda jî agahdar bin. Biwêjên ku bi vî awayî kurt hatine nivîsandin, ji du hezarî (2000) zêdetir in.

Me çîroka hin biwêjan jî di bin rûpel de nivîsand û di dawiya biwêjê de, "bnr. çîrok" nivîsand.

Der barê **(yek)**, **(yekê)** û **(yekî)** de, ku me ev di nav kevanê de dane, divê em çend gotinên raveker bibêjin.

Hejmara *"yek"* ku hem di şûna cînavka nebinavkirî ya yekejimar de tê bikaranîn û hem jî dema mirov bixwaze heyîneke nediyar bide nîşandan, tê bikaranîn. me ew di şûna kesê sêyemîn ê yekejimar ê nediyar de bi kar anî. Wekî mînak:

Serê sihir (yek) bûn
Biesl û bingeh bûn. **Belê, gelek di nav wî karî de ne, lê esas **serê sihir Şîrîn Xanim e**.*

Hejmara *"yek"* a ku me di nav kevanê de bi awayê **(yekê)** daye, tenê ji bo zayenda mê ye (ango ew biwêja ku *"yekê"* tê de derbas dibe, bi tenê ji bo jinan tê bikaranîn). Wekî mînak:

Bedena (yekê) şîn bûn
Zarokên kesekê çêbûn. **Çiqas derzî û derman lê xistin jî **bedena Sîdarê şîn nebû**.*

Her wiha hejmara "yek" ku îcar me bi awayê **(yekî)** daye, di şûna her du zayendan de ye. Ango ew hem ji bo jinan û hem jî ji bo mêran e. Jixwe di zimanê me yê devkî de, hejmara "yek" zayend çi dibe bila bibe, di şûna cînavka nediyar û heyîneke nediyar a yekjimar de tê bikaranîn. Me jî li cihê her du zayendan ev awa tercîh kir û da ser wê şopê. Wekî mînak:

Xwîn ji dilê (yekî) çûn
Li ber xwe ketin, gelekî xemgîn bûn. **Îro **xwîn ji dilê wê diçe**, lê ez nikarim tiştekî bikim.*

Agir bi mala (yekî) ketin
Ketin rewşeke bixeter, rastî qeza û belayekê hatin. **Jixwe **agir bi mala wî ketiye**, tu jî zêde bi ser de neçe.*

Di nav kevanê de bikaranîna sê xalan **(...)**: Ev jî, ji bo biwêjên ku ne ji bo kesekî, lê belê ji yekî zêdetir tên gotin, me bi kar aniye. Wekî mînak:

Av di navbera (...) de neçûn
Têkilî pir xweş û geş bûn. **Nizanim li ser çi ew qasî li hev û din dikin, maşelah **av di navbera Wardek û Cewalirê de naçe**.*

Çavên (...) li hev ketin
Hev û din dîtin. **Di mîhricana muzîkê de carekê çavên me li hev ket, lê dû re me hev û din winda kir.*

Bi tenê nîşandana sê xalan **...** : Ev şêwe jî di cihê *"tiştekî"* yan jî *"deverekê"* de hatiye bikaranîn. Wekî mînak:

Aveke sar bi ser ... de vexwarin
Ziyan dîtin, ji xisarê rizgar nebûn. **Êdî ew pereyên te çûn, nema vedigerin, tu **aveke sar bi ser wan pereyan de vexwe**.*

Avêtin ser ...
Erîşkirina li ser cihekî. **"...ji nişkê ve **avêtin ser mala me**..."* Medenî Ferho

Ez vê berhemê ji pêşiyên me re ku ev zargotina dewlemend ji me re hiştine, ji bavê xwe Osê û diyên xwe Fayze û Zelîxanê re, ji nifşên nû, ji neviyên xwe Hêlîn, Med Serfîraz, Mîr Aras û ji Sûdenazê re pêşkêş dikim.

A

A devê (yekî) gotin guhê wî nebihîstin

Hay ji gotina xwe tune bûn. Gotinên giran gotin. **Tu guh mede wî,* ***ya ku devê wî dibêje, guhê wî nabîhîze****.*

A di binê zimanê xwe de gotin

A rastî gotin. *"- ... tu* ***ya di binê zimanê xwe de bibêje****, karê min heye divê ez derkevim."* Ronî War

A di dilê xwe de negotin

Rast û durist neaxaftin. Xwe bi awayekî din nîşan dan. **Erê, Rihan wisa dide nîşandan, lê ez bawer im ku* ***ya di dilê xwe de nabêje****.*

A di mal de, yê min tê de

bnr. A ji min wê de, yê min tê de."

A dil nîşan nedan

bnr. A dilê (yekî) di dilê wî de bûn

A dilan ketin çavan

Bi her awayî armanca xwe daxuyandin. **Wa ye,* ***ya dilan ketiye çavan****. Ew nebêje jî, bi her awayî armanc û rewşa wî xwe dide xuyandin.*

A dilê (yekî) di dêv de bûn

A ku di dil de disêwire aşkere gotin. **Divê kes ji Îpo nexeyîde, hema* ***ya dilê wê di dêv de*** ye.

A dilê (yekî) di dilê wî de bûn

Niyeta xwe tenê di dilê xwe de sêwirandin. **Her ez dizanim çi qewimiye û çi cibiriye,* ***ya dilê min bila di dilê min de be****.*

A dilê (yekî) gotî, devê wê negotin

A di dil de disêwire xuya nekirin. *****Ya dilê wî dibêje, devê wî nabêje****, lê ez dizanim bê armanca wî çi ye û çi nîn e.*

Λ dilê min bila ji min re be, ya zarê min bila ji te re be.

A rastî veşartin, negotin. **Lawê min, wisa li her derê xwe eşkere meke. Çi gotine:* ***"Ya dilê min bila ji min re be, ya zarê min bila ji te re be."***

Λ dilê xwe bi cih anîn

Armanc û niyeta dilê xwe pêk anîn. **Xalê Tahar di dawiyê de ji xwe re hespekî ereb kirî û* ***ya dilê xwe bi cih anî****.*

Λ dilê xwe danîn wê derê

Ne wekî hestên xwe, tenê wekî ya rasteqîniyê yan jî pêwîst kirin. **Ez dizanim çi ji dilê te re derbas dibe, lê tu* ***ya dilê xwe dayne wê derê****, ji min re ya rastiyê bibêje.*

Λ dilê xwe veşartin

Niyeta xwe ya rastî xuya nekirin. **" ... bes* ***a dilê xwe veşêre*** *û bes dilê min xweş bike, ji te pêvetir, kes hindî min nizane..."* Kerim Cemîl Biyanî

Λ dîzikê, wê her bibêje kasikê.

Di nav hewldaneke berevajî û çewt de bûn. **Ew gêj nizane gilî û gazinan jî bike. Diçe* ***ya dîzikê, wê her bibêje kasikê****.*

Λ ji min kêm, guhar û xizêm

Ji bo rewşa hêj xerabtir tê gotin. **Dibêjin lawê min ê biçûk jî dest bi cixareyê kiriye;* ***ya ji min kêm, guhar û xizêm****, jixwe hema ew tenê mabû.* (qerf)

Λ ji min wê de, yê min tê de

Rewşa xwe bi awayekî din nîşan dan. Xwe xapandin. **Ya te jî bûye meseleya şivanê ku gotiye:* ***"Ya ji min wê de, yê min tê de."*** (bnr. çîrok)

Λ ku hat bîra min, hat serê min.

Tiştekî ne baş lê qewimîn. **Min çi zanibû* ***ya ku hat bîra min wê bê serê min****?!*

Λ ku hate serî, bila neyê serê Eyubê kurmanxwarî.

bnr. A ku hatiye serê (yekî), neyê serê gurê serê çiyan.

Λ ku hatiye serê min, bila neyê serê dijminê min.

bnr. A ku hatiye serê (yekî), neyê serê gurê serê çiyan.

Λ ku hatiye serê (yekî), neyê serê gurê serê çiyan.

Ji bo rewşa xerab tê bikaranîn. **"Ji kirina mirovan* ***ya hatî serê min bila neyê serê gurê çiyan****."* Feqî Huseyîn Sağnıç

" A ji min wê de, yê min tê de"

Du heb şivanên hevalên hev, bi hev re pêz diçêrînin. Ji şivanan yek gelek caran destûrê ji hevalê xwe digire û jê re dibêje: *"Ez diçim bal qiza paşê û tevî wê radizêm."* Hevalê wî jî jê bawer dike û li ber pêz disekine ku heya hevalê wî bê. Lê demekê bi şûn de hevalê li ber pêz, jê dikeve şikê û rastiya vê yekê pir meraq dike. Rojekê dîsa dema ku hevalê wî destûrê dixwaze û dibêje:

"Ez ê herim bal qiza paşê." Hevalê wî yê ku her tim li ber pêz disekine bi dizî wî dişopîne. Lê dinihêre ku hevalê wî gelek erd çû û çû, hat nêzîkî qesra paşa û ji dûr ve li pencereyekê nihêrî û got:

"A ji min wê de, yê min tê de!.. A ji min wê de, yê min tê de!.." Çend caran dubare kir û dîsa vegeriya ber bi keriyê pêz ve."

Li gori guhertoyeke din jî ev biwêj ***"A di mal de, yê min tê de!"*** ye.

Λ ku (yekî) pê girtin

Ya ku tê pejirandin. Rêbaz û azîneya ku tê meşandin. **Ya ku Mamoste Helîm pê girtibû, em tu car bi ser nediketin.*

Λ ku te xwar, di zikê te de dê tu zikrê bike?!

Ya ku te kir, ma gelekî zêde û girîng e? **Te ji bo nefsa xwe çima wisa xwe rezîl kir, ma **ya ku te xwar, di zikê te de dê tu zikrê bikira**?*

Λ (yekî) lê hatin

Karê yekî bi erênî pêk hatin. ****A Yekbûnê baş lê hat**, ji wê dojehê xelas bû.*

Λ (yekî) pê man

Bi tenê bûna xwediyê/a xirabiya xwe. **Ma bi wê fesadiyê çi kete destê wî? Hema **ya wî pê ma**.*

Λ rastî pere nekirin

Carinan rasteqînî bi kêrî berjewendiyên hinekan nayê. **Belê çi bûbû min ew got, lê mixabin **a rastî pere nekir**.*

Λ rastî pê ketin (mabûn)

Carinan jî ya rast gotin dibe astengî û binbariyeke giran. **Bi şahidiya xwe poşman bûm. Bibêje bêqaf, ma **ya rastî bi te ketibû**?*

Λ (yekî) tê de man

Bi mirazê xwe şad nebûn. **Wê çaxê ew jî gelekî bi min re kire xirecir lê **ya wê jî tê de ma**.*

Λ tîr di binî de ye.

Ya sexte û xerab wê dû re bê, yan jî ya xerab di binî de ye. **Ew hê nizane **ya tîr di binî da ye**.*

Λ xerab tê de hatin

Nifîr. **Belkî **ya xerab di wî de bê**, jixwe her tişt di rûyê wî devgemarî de wisa bû.*

Λ xwe gotin

Armanc û berjewendiyên xwe derxistin pêş. **Ez wî baş dinasim, ew tenê **ya xwe û ji bo xwe dibêje**.*

Λ xwe kirin yek

Li ser yek gotinê li hev kirin. Ji bo tevgerekê yek biryar girtin. **Ew **a xwe dixine yek**, kes jî nikare zêde tiştekî bibêje.*

Λ xwe nezanîn

Di derka berjewendî û kirinên xwe de nebûn. **Heke Zînê **ya xwe bizanibûya** niha cihê wê ne ev der bûn.*

Λ xwe pîne kirin

Xeta û kêmasiyên xwe veşartin. **Ez wî baş nas dikim, ew tim **a xwe pîne dike**, hela bila yên li bal wî bûn bên, ka ew çi dibêjin tu bibîne.*

A zarê te ji min re, ya dilê te ji te re

Ya dil bi zelalî nayê dîtin, ji bo wê jî cure û teşeyê gotinê girîngtir e. **Zarxweş bûn taybetiyek pir girîng e. Ji bo wê min jê re got,* ***a zarê te ji min re, ya dilê te ji te re.***

Abor dayîn ebûrê

Ji bo debara xwe ya aboriyê ebûr û şanaziya xwe ji bêgavî hinekî bi paş ve dan. **Meryemê di dawiyê de* ***abor da ebûrê*** *û ji bêgavî çû di bîrexaneyekê de di nav serxweşan de bû garson.*

Abûra(*) rû neman

bnr. Abûra rûyê xwe hirşandin

Abûra rûyê xwe avêtin

bnr. Abûra rûyê xwe hirşandin

Abûra rûyê xwe hirşandin

Bêşerm û bêheya bûn. **Fêrgîn* ***abûra rûyê xwe hurşandiye.*** *Gotinên ku wî li ba xezûrê xwe gotin, min di ber wî de şerm kir.*

Abûra xwe danîn bin piyê xwe

Xwe li bêşermiyê danîn. **Edûlê* ***abûra xwe da bin piyê xwe*** *û ji bo zarokên xwe dest bi parsê kir.*

Aciz û hiznî bûn

bnr. Zivêr bûn

Ad û aşît di xwe de anîn

Sond xwarin. **Çîmen* ***ad û aşîtê di xwe de tîne*** *û dibêje: "Min ew yek nekiriye".*

Adar bi toz, nîsan bi baran, gulan bi ba, mala xwediyê debaran bû ava.

Her sê mehên biharê, her yekê taybetiyeke wê heye, lê taybetiya wan a hevpar ew e ku, bibereket in. *****Adar bi toz, nîsan bi baran, gulan bi ba, mala xwediyê debaran bû ava.*** *Hinek aliyên wan yê neyînî jî hene, lê dîsa jî hersê mehên biharê xweş in.*

Adarê berf giha guliyê darê, nema danê êvarê.

Meha adarê hewa ber bi germê ve diçe. *****Adarê berf giha guliyê darê, nema danê êvarê.*** *Xeman nexwe evdê Xwedê, ev berf wê zû bihele.*

Adarê dew li darê, ne li bîrik û bêdarê, li Gova Şatirê(**) û Kiraxîla Xwarê.(***)

Li Gova Şatirê û Kiraxîla Xwarê meha adarê jî wekî gelek tiştên din hinekî cuda ye, ne wekî herêm û cihên din e. **Heyran ne wekî ya te ye.* ***Adarê dew li darê, ne li bîrik û bêdarê, li Gova Şatirê û Kiraxîla Xwarê.***

(*) **Abûr:** Avrû

(**) **Gova Şatirê:** Şikefteke, li hêla Heskîfê ye. (Taybetiya van gundan ew e ku zivistana wan hinekî dirêj e. Angoo sir û sermaya wan li gorî herêmê hinekî zêde ye.)

(***) **Kiraxîla Xwarê:** Gundê Heskîfê ye.

Adarê seg kete binê darê.
Meha adarê hewa xweş dibe. **Carinan germa adarê pir diqijirîne. Çi gotine: "**Adarê seg kete binê darê.**"*

Afatê lê xistin
Rastî bela û qotikê hatin. *****Afatê li mala Hacî Hiso xist****, kes lê nema.*

Afara behîv û gûzan kirin
Ji bo karên bêencam tê bikaranîn. **Ya ku ew dikin, **afara behîv û gûzan kirin e**.*

Afira xwe arizî kirin
bnr. Firaqên xwe arizî kirin

Afirê gamêşan bû warê gelşa mêşan.
Her tişt li gorî rewş û naveroka xwe encam dide. *****Afirê gamêşan dibe warê gelşa mêşan.***
Ma te çi hêvî dikir? Ji jinên wisa bêpêşk jî encamên wisa der tên.

Agir agirê qoncan (qurman)
bnr. Agirê xweş, agirê darê hişk

Agir avêtin devê xwe
Li hember tawanbariyê sondxwarin. **Xanê **agir davêje devê xwe** û dibêje min negotiye, lê Besra dîsa jî jê bawer nake.*

Agir barandin
1. Pir hêrs bûn. **2.** Li ser hev gule berdan **Dema ku pez diket nav zeviya wan, xaltiya Horê **agir dibarand.** *Qoriciyên gundên me, ku bi şev reşaliyek bidîtana, hema **agir dibarandinê**.*

Agir berda komê, xwe da fêza zomê.
Xinisî û fesadî kirin, lê bi xwe jî ji ziyan û teşqeleyê dûr sekinîn. **Eliyê Qaşo **agir berda komê, xwe da fêza zomê.***

Agir berda kayê, xwe da ber bayê.
Fesadî kirin, lê wekî ku ne têkildar e jî xwe dayîna aliyekî. **Her kes dizane ew çima çû, wî **agir berda kayê, xwe da ber bayê.***

Agir berda malê, revî xwe da palê.
bnr. Agir ber da komê, xwe da fêza zomê

Agir berdan nav kozê
Karekî xerab kirin. **Wî bêxwedêyî ji bo eferimekê, **agir berda nav koza** mala Koço.*

Agir berî dilê (yekî) dan
Bûn sedema xemgîniya kesekî. **"*Wan ji lawê xwe pir hez dikir, lê hal û hewalê Temo jî **agir bera dilê wan dida**."* Mehmet Uzun

Agir berî kezeba (yekî) dan
bnr. Agir berî dilê (yekî) dan

Agir bêdû vêxistin
Pir kone û zana bûn. **Tu wî baş nas nakî, ew* ***agir bêdû vêdixe****.*

Agir bi canê (yekî) ketin
1. Dil şewitîn. **2.** Ji ber nexweşiyê agirê laş zêde bûn. **Hema kê ew dîmena bi xeter didît,* ***agir bi canê wan diket****. *Nîvê şevê* ***agir bi canê keçika min ketibû****, me zor gihande nexweşxaneyê.*

Agir bi çiyê xistin
bnr. Agir li heriyê xistin

Agir bi dawa (yekî) ketin
bnr. Agir bi qûna (yekî) ketin

Agir bi dil û hinavên (yekî) ketin
bnr. Agir di nav hinavên (yekî) ketin

Agir bi dilê (yekî) girtin
Xemgîn bûn, dil şewitîn. **"****Agir bi dilê wî girtibû****, nizanibû çawa bikira."*

Agir bi dilê (yekî) ketin
1. Dil şewitîn. Li ber xwe ketin. **2.** Aşiq bûn, dilînî bûn. **Dema ku ji nav wê daristanê darek tê birîn agir bi dilê min dikeve. *Serwêr çawa ku Rihan dît, luş ji sêrî çû û* ***agirek li dilê wî yê ciwan ket****.*

Agir bi dinê bikeve, gurzek gîhayê wî naşewite.
bnr. Agir lê erdê bikeve gurzek pûşê wî naşewite.

Agir bi erdê ketin
Ji bo salên ku baran nabare, çêre şîn nabe û debara heywanan baş pêk nayê tê gotin. **Îsal çi saleke bêbêlun û bêbereket e, tu dibêjî* ***agir bi erdê ketiye****.*

Agir bi erdê keve, gurzek pûşê wî naşewite.
Ji bo kesên bêxem tê gotin. **Welehî qet xema wî nîn e,* ***agir lê erdê keve gurzek pûşê wî naşewite****.*

Agir bi erdê xistin
bnr. Agir li heriyê xistin

Agir bi hundirê (yekî) ketin
Ji bo rewşa xeternak û xemgîn tê gotin. **"Şehriyar jî ji rik û qehran xwînê ber çavên wî girt,* ***agirek ket hundirê wî****, ferman da ji bo cara axirîn deriyê zindana bi mişk û maran dagirtî ya jêrzemîna qesrê heta ser piştê vekin û ji yê mêjûnûs re got ku wê şevê nexe deftera jiyana malbata wî û mêjûya hemû dinyaya wê dem û dewranê da ku di ser re biqevêze."* Mem

Agir bi kezeba (yekî) ketin
bnr. Agir bi dilê (yekî) ketin

Agir bi lingên (yekî) ketin

Xwe şaş kirin. Dest û ling li hev piçikîn. **Bi bihîstina wê bûyerê re **agir bi lingên Baran ket**, nizanibû ku çawa bike.*

Agir bi mala derewînan ket, kesî jê bawer nekir.

Derewîn bêbaweriyê diafirînin. *****Agir bi mala derewînan ket, kesî jê bawer nekir**. Heyder got: "Min azmûna zanîngehê qezenc kiriye"; me jê bawer nekir, lê rast derket.*

Agir bi mala (yekî) ketin

Ketin rewşek xeter, rastî qeza û belayekê hatin. **Jixwe **agir bi mala wî ketiye**, tu jî zêde bi ser de neçe.*

Agir bi mala (yekî) ketibû, (yekî) jî li ber firîkên xwe diqelandin.

bnr. Agir li serê min ketiye, tu jî li ber rûnê xwe diqijirînî.

Agir bi mala te keve, haya tu kesî jê nebe.

Xerabiyek bi serê te were û tu kes bi alîkariya te neke. ***Înşelah **agir bi mala te keve, haya tu kesî jê nebe**.* (nifir)

Agir bi mitêlê[*] ketin

Rastî belayekê hatin. ***Înşelah **agir bi mitêlê keve** ku ev tax ji wî xelas bibe.* (nifir)

Agir bi qûna (yekî) ketin

1. Ji ber ziyan an jî xapandinekê pir xemgîn bûn. **2.** Pir hêrs bûn **Wexta ku qaçaxan keriyek pêzê wî dizîn, welehî **agir li qûna Hecî Şito ket**. *Çawa ku Yasîn ew di wî halî de dît, **agir bi qûna wî ket**, destê xwe xiste qirika keçika xwe.* (argo)

Agir bi ser (yekî) de barandin

1. Zilm û tade kirin. **2.** Bi çekan gule berdan. **Mele Sofî Mîrzo her roj **agir bi ser xulamên xwe de dibarîne**.* *Leşkeran **agir bi ser gerîlayan de barandin**.

Agir bi ser ... de barîn

Di nav rewşeke pir xirab de bûn. ***Îsal **agir bi ser Dewrêşê reben de barî**, ji destê derd û kulan çavên xwe venekirin.*

Agir bi ser serê (yekî) de barandin

bnr. Agir li ser piştê dadan.

Agir bi serê (yekî) ketin

1. Pir hêrs bûn. **2.** Ji ber derd û kêşeyekê êşîn *****Agir bi serê Kindo ketibû**, me jina wî bi zorê ji nav dest û lepên wî xelas kir. *Çima ku guran beranê qemer belav kirin, **agir bi serê bavê min ket**.*

Agir bi serê min ketiye, tu jî li ber rûnê xwe diqijirînî.

Hinek ligel felaketa hinekên din dikevin heyra kar û berjewendiyên xwe. **Lo bêbavo! Tu mirovekî çawa yî? Va ye **agir bi serê min ketiye tu jî li ber rûnê xwe diqijirînî**.*

---

[*] **Mitêl:** Lihêf

Agir bi serê yekî ketibû, yê din jî digot: "Hela neçe, ez ê cixareya xwe vêxim."
bnr. Agir bi serê min ketiye, tu jî li ber rûnê xwe diqijirînî.

Agir bi te bikeve, ba jî bi hewara te ve bê.
Tu têkevî rewşeke hê xerabtir. **Ez ji te re çi hêjim sebav, ji Xwedê dixwazim* ***agir bi te bikeve û ba jî bi hewara te ve bê.*** (nifir)

Agir bi (yekî) xistin
Mirovek kirina nav guman û tatêlan. **Wê gotina xwe got û çû lê tu were lê binêre,* ***agirekî çawa bi Nazîma Hecî Hiso xist.***

Agir bikeve dehlê, qevdek pûşê min tune ye.
Tu tiştekî min nîn e. **Ji min re çi,* ***agir bikeve dehlê, qevdek pûşê min tune ye.***

Agir birîn
bnr. Agir rawestandin

Agir dan ber barûdê
Rewş anîna radeyeke bixeter. **Jixwe wan fesadan jî tam* ***agir dane ber barûdê.***

Agir danîn bin sîtilê
Fesadî kirin. **Laleş dîsa* ***agir daye bin sîtilê,*** *dê dîsa gund li nav hev bixe.*

Agir di çavan de çûrisîn
Bi bûyer an jî nûçeyeke pir erênî dilgeş bûn. Şa bûn, serfiraz bûn. **Dema ku Tîrêj bi çav Berfînê dikeve,* ***agir di çavên wî de diçirûsin.***

Agir di malê de lemelem e, cih ji kêç û mişkan re nema.
Ji bo kesên pir xizan tê bikaranîn. **Ka çiyê wî heye ku bidizin?* ***Agir di malê de lemelem e, cih ji kêç û mişkan re nema.***

Agir di nav hinavên (yekî) ketin
Ji bo tiştekî pir xemgîn bûn. **"Dê bêjî agirê* ***di nav hinavên wan da ket,*** *bi lezîn ka dê kengî dijmin nêzîk bît da çeperêt pêşî destpê biken."* Kovanî

Agir girte mala yekî, yê din got: "Tu bi Xwedê bikî venemirîne, da ku ez kewên xwe bibirêjim."
bnr. Agir bi serê min ketiye, tu jî li ber rûnê xwe diqijirînî

Agir girtibû mala (yekî), (yekî) jî ser û pê li ber dikizirandin.
bnr. Agir bi serê min ketiye, tu jî li ber rûnê xwe diqijirînî

Agir gur kirin
1. Şer zêde kirin, hadandin. **2.** Fesadî kirin **Piştî agirbesta gerîlayan, çima ku dewletê bersiveke erênî neda, gerîlayan* ***agir gurtir kirin.*** **Jixwe ew li hincetan digerin, tu jî lap (herî)* ***agir gur dikî.***

Agir jê barîn
Gelekî hêrs bûn. *"*Gelekî hêrs bûbû. **Agir jê dibariya**. Rûyê wê, dêmên wê sor bûbûn.*" Roşan Lezgîn

Agir jê çûn
bnr. Agir ji dêvê (yekî) barîn

Agir jê rijîn
bnr. Agir ji dêvê (yekî) barîn

Agir jê pekîn
bnr. Agir ji dêvê (yekî) barîn

Agir ji ber (yekî) çûn
bnr. Agir ji dêvê (yekî) barîn

Agir ji dawa (yekî) barîn
bnr. Agir ji dêvê (yekî) barîn

Agir ji dêvê (yekî) çûn
bnr. Agir ji dêvê (yekî) barîn

Agir ji dêvê (yekî) pekîn
bnr. Agir ji dêvê (yekî) barîn

Agir ji devê (yekî) barîn
Pir bihêrs bûn. *"*Bi wê hêrs û bi wê kelê, **agir ji devê me dibariya**. Delîl li halê pisîkan bû.*" Felat Dilgeş

Agir ketin binê (yekî)
Di nav tatêl û fîkarê de mayîn. **Ji wê nûçeyê pê ve **agir ketiye binê Simko,** rebenî nizane serî li kê bide.*

Agir ketin çavên (yekî)
bnr. Agir ji dêvê (yekî) barîn

Agir ketin (yekî)
1. Pir hêrs bûn. **2.** Di hêla cinsî de pir dilxwaz bûn. **3.** Ketina nav tatêl û fikaran **Dema ku Şilanê bihîst ku havê wê pirtûkên wê şewitandine agir pê ket û porê xwe verût. **Piştî nozdeh saliyê **agir ketiye** Hesen, heya êvarê li pey keçikan digere. **Wexta ku bihîst li polêsxaneyê navê wî jî hatiye gotin, **agir ket** Xelîl û nizanibû ku çi bike.*

Agir kirin
Bnr. Bombebaran kirin

Agir ku vêket, çi hewceyî pifê ye.
Ji bo helwestên vala û ne di cih de tê gotin. **Ezbenî êdî tu dev jê berde, wa ye karê wan sererast bûye, **agir ku vêket, çi hewceyî pifê ye*?

Agir lê barandin
Rezîl û riswa kirin. *"*Jinan dema ku li ser kaniyê av tijî kirin, serê giliyên xwe bi Xeyalê vekirin û* ***agir lê barandin.***" Mûsa Vazgalî

Agir lê barîn
Rastî derd, kul û belayan hatin. **Belengaza Simbilê, îsal mîsala Xwedê* ***agir lê barî****, karekî wê sererast neçû.*

Agir lê reşandin
1. Der barê kesekî de tiştên ne xweş gotin, gef xwarin. **2.** Bi çekan gule avêtin **Zeza Simko* ***agir li Leylê direşand****, kesî nikaribû bide ker kirin.* **Leşkeran di wê tariyê* ***agir lê reşandin****, lê bereket ew dîsa bi silametî xelas bû.*

Agir li ber çavan pekandin
Bi lêdanê gelekî êşandin. **Dema ku Ferzende ji Xwedê şerm nekir û şeqamek da bin guhê lawik,* ***agir li ber çavên wî pekand****.*

Agir li ber kulîna xwe dadan
Bi xwe ziyan dayîna xwe. **Xecêya reben nikarîbû tiştekî bi wî bike, hema bi xwe* ***agir li ber kulîna xwe dada****.*

Agir li ber piyan bûn av
Ji bo mirovên pir paqij û baş tê gotin. **Ne Şêxmûs e, milyaketekî Xwedê ye, welehî ez bawer im ku* ***agir wê li ber piyê wî bibe av****.* (dia)

Agir li gûzika (yekî) danîn
Mirovek êşandin, tirsandin an jî di nav tatêlê de hiştin. **Min ji Bozan re got jina te ji bo te û wê hevala te ketiye şikê. Min* ***agir li gûzika wî danî.***

Agir li heriyê çûn
Rewş xerabe bûn. Pêk nehanîn. **Wê çawa be? Di dema wî bedoxirî de* ***agir li heriyê çû****.*

Agir li heriyê xistin
Ji bo helwesta vala û têkçûyî tê gotin. **Me got Faysal wê tiştekî pêk bîne lê wî jî* ***agir li heriyê xist*** *û destevala berê xwe da me.*

Agir li ser pişta (yekî) dadan
Zilm û eziyeteke mezin li yekî kirin. **Baran wekî dijminan heya êvarê* ***agir li ser pişta Fethulahê birayê xwe dadida****.*

Agir li ser serê (yekî) vêxistin
bnr: Agir li ser piştê dadan

Agir pê girtin
bnr: Agir pê (yekî) ketin.

Agir pê ketin
1. Xemgîn bûn. **2.** Pir hêrs bûn. **3.** Nexweş ketin. **Dema ku Gulê di halî de dît,* ***agir pê***

***ket**. *Wexta ku Salo bihîst qîza wî reviyaye, **agir pê ket**. *Sermayê wisa li Medî xistibû ku **agir pê ketibû**.*

Agir pekandin
Pir hêrs bûn. **Kef bi devê Avdilmecît Beg ketibû, **agir dipekand** gundiyên xwe.*

Agir pê bikeve bêhna bîso jê nayê.
Pir feqîr û xizan bûn. **Cemîlê Seydo di rewşek wisa de ye ku **agir pê bikeve bêhna bîso jê nayê**.*

Agir rawestandin
Şer rawestandin. Çek bi kar neanîn. **Kurdan di şerê dawî de çiqas **agir rawestandin** jî, lê dijminên wan hersiveke baş nedan wan.*

Agir reşandin
bnr. Bombebaran kirin

Agir tefandin
bnr. Agir vemirandin

Agir têber (gur) bûn
Ketina şik, guman û wesweseyan. **Ji ber ku rewşa keçika wê van rojan hatiye guherandin, **agir têberî dilê** Guharê bûye.*

Agir û alaf pê ketin
Ji bo nexweşiya agirî tê gotin. **Em bi şev rabûn ku **agir û alaf bi keça me ketiye**.*

Agir û barûd bûn
1. Jêhatî bûn. 2. Bihêrs bûn. **Bahadîn wekî agir û barûdê ye, di şeran de kes bi wî nikare. *Ji ber derengmayî xwîşka min, bavo îro wekî **agir û barûdê ye**.*

Agir û barûd nêzîkî hev kirin
Hadandin, kişkiş kirin. Rewş xerabtir kirin. **Karê wî jî fesadî ye. Hema **agir û barûd nêzîkî hev dike.***

Agir û bizot bûn
Gelekî çalak û nehs bûn. **Ev neviyê min î mezin **agir û bizot e**.*

Agir vemirandin
Bûyerên xeter sekinandin. **Xwedê jê razî be Sûto Axa ket navberê û ew **agir vemirand**, naxwe şerekî mezin dê di nav wan eşîretan de derketa.*

Agir xistin dawa xwe
Bi tiştên xeter ve mijûl bûn. **Gurzo **agir xistiye dawa xwe** û digere, ka hela dawiya wî dê çawa be.*

Agir xweş kirin
bnr. Agir gur kirin

Agirê cinan pê girtin

Wekî dînan bûn. **Tu dibêjî **agirê cinan pê girtiye**, wer har dibe.*

Agirê (yekî-tiştekî) daketin

1. Xeterî kêm kirin. **2.** Agirê nexweşekî kêm kirin **Di doza tevgera azadiya Kurdan de piştî Rezbera 1999'an, **agirê şer daket**.* *Piştî ku **agirê wî daket**, Aso çavên xwe vekirin.

Agirê ... geş kirin

Rewş xweş bûn. Kar pêşdetir birin. * "*Gelê kurd ev peyam baş wergirtiye, lewre jî di serî de jin û ciwanên kurd, gelê kurd daketiye kolanan û li gorî banga 'Êdî wateya gotinê nema, dem dema çalakiyan e' **agirê azadiyê geş dikin.***" Samî Berbang

Agirê kulê li mala bavê ketin (Agirê kulê li malê ketin)

Tiştekî xerab bi serî de hatin. *****Agirê kulê li mala bavê Silo bikeve**, dema ku hespê çal tije dikir, erd li ber dihejiya.* (nifir)

Agirê Xwedê bûn (Arê Xwedê bûn)

Dir û yeman bûn. **Serhatê çi ye, **agirê Xwedê ye**, ji ber nehsiyên wî serê min bi cînaran re ketiye belayê.*

Ah û zar kirin

Ji ber derd û kulan ax û fîxan kirin. **Ji dest Mistoyê dînik, Gulçînê **ah û zar dikir**.*

Aha aş, aha çirçirik!

Tiştên ku we digotin ev in, ha ji we re! Her tişt eşkere ye. **Heyran çi ye we gulhê min bir, **aha aş aha çirçirik!**.*

Aha gulê bihar, aha gulê zivistan!

Ji bo zû derbasbûna demê tê bikaranîn. **Dem zû derbas dibe. Çawa digot Apê Heso: "**Aha gulê bihar, aha gulê zivistan.**"*

Aha va ye teze çavên te sor bûne, pirça te gij bûye, boçika te bûye xeleq, kevir li ber lingên te dipekin û qûna te diavêje.

Ew tiştên ku te digotin va ye nû pêk hatin. (Tu ne xercê van karan î.) **Berê na, lê **aha va ye teze çavên te sor bûne, pirça te bijî bijî bûye û qûna te diavêje**.* (bnr. çîrok)

Aha va ye teze çavên te sor bûne, pirça te gij bûye, boçika te bûye xeleq, kevir li ber lingên te dipekin û qûna te diavêje."

Rovî û sihor demeke dirêj birçî dibin. Mêze dikin ku nikarin tu tiştekî bi dest bixin, diçin bal şêr ku alîkariyekê ji wan re bike. Şêr alîkariya wan dipejirîne û wan dibe ser girekî bilind. Li hawîrdor mêze dike û dibîne ku wa ye kerwanek tê. Dema ku kerwan nêzîk dibe, şêr ji rovî û sihor re dibêje: *"Berî ku ez nêçîra xwe bikim hinek şertên min hene, divê ez wan bînim cih."* Şêr xwe gij dike, dihejîne, diricilîne û ji wan dipirse:

"Pirça te ame mm gij bûye?" Her du bi hev re dibêjin:

"Bele gij bûye!"

"Çavên mm sor bûne?"

"Bele sor bûne!"

"Boçika min bûye xeleq?"

"Erê bûye xeleq!"

"Kevir ji ber lingên mm dipekin?"

"Bela dipekin!"

Ahê ... li çavên (yekî) girtin

Neheqiyên ku berê hatine kirin xenîm bûn. **Kê çi dibêje bila bibêje, lê ez baş dizanim ku* ***ahê ked û xwîna min wê li çavên wî bigire****.*

Ajotin ber derê malê (hundir)

Bêdestûr û bi darê zorê ketina derekê. **Hema me hew dît ku leşkeran* ***ajotin hundir*** *û her der tar û mar kirin.*

Ajotin derve

Ji mijarê dûr ketin. Ji binbarî û divêtiyê xwe dûr girtin. **Ez çiqasî wî vedixwînim ser mijarê, ew jî ew qasî* ***dajo der****.*

Alifê vala bûn

1. Bêserî û bêsermiyan bûn. **2.** Ji nêrtiyê ketin. Xedim bûn. **Ew bûne* ***alifê vala*** *êdî zor bi pêş de herin. *Her kes dizane ku Hesen yekî* ***alif vala ye****.*

Aliyê Xwedê jê standin

Bi her awayî mafdar bûn. **Ew qet nikare tiştekî bibêje, Memê* ***aliyê Xwedê jê standiye****.*

Alîkarê barê ketî bûn

Ji kesên di tengasiyê de û hewcedar re alîkarî kirin. **Xalid Axa tim* ***alîkarê barê ketî ye****.*

Aliyekî cendek helal, yek heram bûn

Ji bo exrebe û lêzimtiyê tê gotin. **Lawo tu li ba min ji birayê min re giliyên ne baş dibêjî. Ma alîkî cendek helal yek heram e?*

Am û tam bûn

Bêsûc û bêguneh bûn. **Bi wê bûyerê Nado tawanbar dikin, lê Xwedê jî dizane ku ew mirovekî* ***am û tam e****.*

"Qûna min diavêje?" Her du bi hev re dibêjin:

"Belê diavêje."

Di vê navberê de kerwan lap nêzîk dibe. Şêr bi wê hêzê xwe diavêje nav kerwan. Yên li dor kerwan ji tirsan direvin. Şêr xwe diavêje kerekî, zikê wî didire. Tê bal wan. Dema ku kerwan ji wir dûr dikeve, her sê diçin ser cendekê kerê û heya ji wan tê dixwin. Bi vî awayî demeke dirêj rovî û sihor pê debara xwe dikin.

Piştî wê carek-du caran dîsa diçin bal şêr û şêr ji wan re dîsa wer alîkarî dike. Demekê bi şûn de dîsa dikin ku herin, lê rovî ji sihor re dibêje: *"Tu meraqan meke, em azîna şêr dizanin. Vê carê ez ê weki wî nêçirê bikim."*

Sihor her çi qas dike ku wî şîvar bike, lê rovî qet guh nade wî û dîsa derdikevin ser girekî. Rovî ji sihor re dibêje:

"Ka meze bike, pirça canê min gij bûye?" Sihor dibîne ku rewşeke eletewş e. Ji rovî re dibêje:

"Na pirça canê te biji biji nebûye." Rovî hêrs dibe û jê re dibêje:

"Hırsa nabe, bibêje belê gij bûye!" Sihor, weki gotina wî dibêje:

"Belê bila weki gotina te be, belê gij bûye." Rovî dîsa dipirse:

"Çavên min sor bûne?" Sihor ji bêgavî dibêje:

"Belê, sor bûne."

"Boçika min bûye xeleq?"

Bi kurtasî tiştên ku şêr dibêje ew jî dubare dike. Dû re xwe diavêje nav kerwan. Xwediyê kerwan mêze dikin ku roviyek dixwaze xwe biavêje heywanên wan. Bi şîvên xwe bi dû rovî dikevin. Her yek di aliyekî de dorê lê digirin, bi şivan didine eyarê rovî. Rovî di nav xwîn û xwedanê de zor xwe digîhîne bal sihor. Bi hilkehilk xwe li erdê dirêj dike

Sihor li pêş rovî disekine, lê dinihêre û jê re dibêje:

"Hevalê rovî, aha wa ye teze çavên te sor bûne, pirça te gij bûye, boçika te bûye xeleq, kevir li ber lingên te dipekin û qûna te diavêje."

Am û xas pê hesîn

Dinya û alem pê hesîn. **Am û xas hesiyan, hêj ev lawê min ê sist nizane.*

An bi pakî yan jî bi xerabî

Her ew yekê dê pêk bê; heke bi başî û pakî nebe, vêca wê bi xirabî û bi zorê bibe. **Ew qûna xwe di ava sar de bike jî ew televîzyon dê bê; **yan bi pakî, an jî bi xerabî**.*

An em bixemilînin, an em biqelînin.

Ji her du tiştên berevajî yek hilbijartin. An xweşiktir kirin an jî tune kirin. **Mixabin ji bilî wê rê ji me re nemaye, divê **yan em bixemilînin, an em biqelînin**.*

An eşhed, an nan û to

An ev dinya û mal û milk, an jî dinya din, nimêj û taet û dîn û îman. **Divê tu biryara xwe bidî, **yan eşhed, an jî nan û to**.*

An ez ê xwe li têrek mewûj bixim, an xwe li kelemekî tûj bixim.

Yan a herî baş an jî ya herî xirab wê bê serê min. **Mixabin zêde vebijark li pêş min tune ne. **An ez ê xwe li têrek mewûj bixim, an xwe li kelemekî tûj bixim.***

An hero an mero

Ji bo rewş û biryara vebirî kifşkirinê tê bikaranîn. **Êdî bes e ev dudiliya te, **yan hero yan mero**.*

An hirç kor e yan jî garis bêserî ye.

Rewş ne asahî ye, nakokiyek tê de heye. ****An hirç kor e yan jî garis bêserî ye**. Çawa firsendeke wisa ketiye dêst, çawa pêk neaniye?*

An ji kerê, yan ji Perê

bnr. An hero, an mero

An ji text, yan ji bext

Divê ji her du vebijarkan yek bê hilbijartin. **Kalê jê re got: "Lawê min **yan ji text, yan ji bext**."*

An li vî alî yan jî li wî alî

1. Divê rewş kifş be. **2.** Derk nîn e, ferq nake *****An li vî alî yan li wî alî**, divê tu refên xwe hilbijêrî. *Tu derka wî nîn e **yan li vî alî yan li wî alî**.*

An mirin an felat

Ji bo serxwebûn û azadiyê, mirin dayîna pêş çavên xwe. **Me her tişt daye pêş çavên xwe, **yan mirin an felat**.*

An mirin an mayîn

bnr. An mirin an felat

An naçe aş an jî diçe aşvan dikuje.

Di nav hewldanên tund û bêdenge de bûn. **Faraşîn mirovekî pir balkêş e, **yan naçe aş an jî diçe aşvan dikuje**.*

An naçe diziyê yan jî diçe şivên dikuje.

bnr: An naçe aş yan jî diçe aşvan dikuje.

An nanê te genim an zarê te genim

Ji bo debarê divê yan malê te zêde hebe yan jî zarê te pir xweş be. **Min ji te re got ew qas ne hêsan e.* ***Divê yan nanê te genim an jî zarê te genim be.***

An pîr e, yan tîr e.

Rewş berevajî ye, divê ji her du seriyên berevajî yek pêk bê. **Cihê ku wekî wan hê negihîştine îstikrarê,* ***yan pîr e, yan tîr e.***

An tu dê dil hilînî, yan gurçikê.

Divê ji her du vebijarkan yekî hilbijêrî. **Mixabin tiştekî ku ez bikim nîn e,* ***yan tu dê dil hilînî, yan gurçikê.***

An wisa yan wisa

Ha bi vî awayî ha bî wî awayî, divê ew yek pêk bê. **Êdî veger ne guncan e. Ev heyf wê bê hildan* ***an wisa yan jî wisa.***

An xelat e, yan celat e.

Rewş tam berevajî ye, yan herî baş an jî herî xirab e. **Bi rastî ez jî nizanim wê çawa bibe.* ***An xelat e, yan celat e.***

An xew e, yan jî kew e.

Bi her du awayan jî neyînî bûn. **Ev meş qet baş nayê xuyan.* ***An xew e, yan jî kew e.***

Ancax kapeka me têra mala me bike.

Ancax em debara xwe bikin. **Karê me bi kesî tune qurban,* ***ancax kapeka me têra me bike.***

Anî cihê xwe, rakir rûyê xwe.

Ji bo kesên ku alîkarî jê re tê kirin, lê ew di dawiyê de bitrî dibe û ji xwediyê qenciyê re xirabiyê dike re tê gotin. ****Anî cihê xwe û rakir rûyê xwe.*** *Heke min ew qas qencî lê nekira, wî ev xerabiya han li min nedikir.*

Anî ji deriyan, da xêra miriyan.

Hesab û tevgera xwe nezanîn. ****Anî ji deriyan, da xêra miriyan.*** *Xeloyê Misto li Stenbolê bi çi zehmetî qezenc kir, îro jî li vir bêhesab belav dike.*

Anîn ber çavan

Xeyal kirin, bi bîr anîn. **"Leşkerên dewletê bi kuştina wan jî ranawestin, serê wan jî jê dikin, dixin telîsan û ji bo ku xelk çavtirsandî bibe, nîşanî xelkê didin. Ji vî alî ve wehşeta leşkerên tirk* ***tîne ber çavan.***" Süleyman Çevik

Anîn ser kewna berê

Anîn ser rewş û radeya berê. **Wextekî pir cuda bûbû lê Cewdet ew* ***anî ser kewna berê.***

Anîn ser gotina xwe

Di encamê de bi awayekî wekî gotina xwe dan pejirandin. **Wardekê xwe li şel û pelan xist, di dawiyê de ew **anî ser gotina xwe**.*

Anîn ser gotinê

1. Guftugo anîn ser wê mijarê, qala wê mijarê kirin. **2.** Wekî daxwaz û gotina xwe pêk anîn **Serkar çawa kir kir, bi awayekî dîsa mijar **anî ser wê gotinê**. *Min dizanîbû, Bêrîvan dê îleh wî **bîne ser gotina xwe**.*

Anîn ser hişê xwe

Şiyar kirin, durist kirin. **Siltan ketibû rewşeke aloz û sosret, lê Rehmanî ew bi evîna xwe **anî ser hişê xwe**.*

Anîn ser rê

bnr. Anîn li ser tasê

Anîn ser tasê

Yek îkna kirin. Xistina bin bandora ramana xwe. **Heta me Rizgar **anî ser tasê**, me got, ya felek!*

Anîn ser xwe

1. Li xwe mukir hatin, îtiraf kirin. **2.** Sererast kirin, têkûz kirin. **3.** Şiyar kirin. **4.** Hildana ser xwe, xwe wekî berpirsyar daxuyandin **Berê qet qal nedikir, niha êdî **tîne ser xwe**. *Heke Ferîdûn nebûya, Nûr Endam zû bi zû **nedihate ser xwe**. *Bi wê gotina min a bi peyam ew **hate ser xwe**, naxwe, karê me wê tevlihev bibûya. *Heke ku Dîlawer **neda ser xwe**, wî ew erebe bi deyn nedida Mehemed.*

Anîn ser zimên (zar)

1. Qal kirin. **2.** Ji bo gotin û dîtina peyvekê hewldan **"Belê, niha heke em niha di vê rûpelê de der heqê vê mijarê de nivîsan diweşînin û pirsgirêkan **tînine zimên**, dême mesele hene."* Kemal Orgun

Apê (apkê) faris, niha tu nemirî tu yê bêyî nav garis.

Rojekê tu yê hewcedarî min bibî. **Apê Faris, tu nemirî, niha tu yê bêyî nav garis. Tu wisa bêminetiyan bike, Xwedê ji min û te re jî kerîm e.*

Apê Faris, ha li vir ha li ber garis (Apê Faris, çi li mal çi li ber garis)

Tu derk û cudatî tune. **Ji bo Keleş derk nîn e, **Apê Faris, ha li vir ha li ber garis**.*

Apê Merdan, kerî surî[*] tev berdan, di dêst de maye xeberdan.

Hemû mal û milk winda kiriye, tenê bi bîranên wan xwe dixapîne. **Apê Merdan, kerî surî tev berdan, di dêst de maye xeberdan. Jixwe her tişt belav kiriye, tenê qala bîranînên xwe dike.*

Apê sorvirçî, ji destê wî gurî derket kete destê wî hirçî.

---

[*] **Surî:** Kerî

Ketina rewşa hêj xerabtir. *_**Apê sorvirçî, ji destê wî gurî derket, kete destê wî hirçî.** Min got, ez herim gund westa xwe hildim, lê ji destê kar min çavên xwe venekirin._

Apê Xidir e, her roj li vir e.

Her dem heman tişt kirin. *_Ma ew tiştekî cuda dike? **Apê Xidir e, her roj li vir e**._

Apo kal e, lê galegal e.

Belê kal e, lê hêj jî jîr û bimerîfet e. *_Hûn li rûyê wî yê spî û qerpalên wî yên rizyayî menêrin, **apo kal e, lê galegal e**._

Apo ne gêj e, tiştan dizane (dibîne), nabêje.

Divê biryar wekî xuyangê neyên dayîn, çimkî carinan di bin hinek xuyangan de tiştên pir berevajî der tên. *_Erê lawo hûn tinazên xwe bi min bikin. **Apo ne gêj e lê tiştan dibîne, nabêje.**_

Apo te divê goştê pîran bixwe, te divê yê ciwanan û te divê lib û lib sêvan jî bi ser de bixwe.

bnr: Goştê ciwanan dixwî tu dizanî, goştê pîra dixwî tu dizanî; na dilê te dişewite tirşikan jî dixwî tu zanî.

Apo tu pişta xwe bide ber dîwêr heta min pere stendin.

Ji karê ne têkûz tê bikaranîn. *_Karê ku Cindo û birayê kirihûn jî hema ew bû ku digot, **apo tu pişta xwe bide ber dîwêr, heta min pere stendin**._

Aqil ajotin

Şîrove kirin. Li ser mijarekê bi kûrayî ponijîn. *_Zordestî, çewisandin û mantiqa yekgirtî zerengiya **aqil ajotinê** jî qels dike._

Aqil bi dînan çi bike, çav bi koran çi bike?!

Ji bo tiştên bêîmkan tê bikaranîn. *_**Aqil bi dînan çi bike, çav bi koran çi bike?!** Min got, lê dizanim bi kêr nayê._

Aqil dayîn (yekî)

Rê nîşan dan. Pend kirin. *_Ew wan dereceyan nedifikirî, lê dixuye ku hinekan **aqil danê**._

Aqil firotin

Xwe bi aqil hesab kirin. *_Ma aqilê wî têra wî kiriye, vêca **aqil difroşe** xelkê jî?_

Aqil hilnedan

bnr: Di hiş de rûneniştin

Aqil jê stendin

Bi yekî şêwirîn. *_Divê Emîn here **aqil ji jina xwe jî bistîne**, naxwe biryara vebirî nikare bigire._

Aqil qebûl nekirin

Bimantiqî nebûn. *_Bi rastî jî ya ku wê kiriye, tu **aqil qebûl nake**._

Aqilê (yekî) bi ser kum ketin

Hişê yekî li cihekî din bûn. Ji rasteqîniyê dûr ketin. **Qet rewşa Cindiyê Zal pirs neke, **aqilê wî bi ser kumê wî ketiye**.*

Aqilê (yekî) di nav çokan de bûn

1. Kêmaqilî bûn. **2.** Ji bo kesên doxînsist tê gotin. **Ez jî nizanim çiqasî rast e, lê dibêjin, **aqilê mirovên ku bejna wan zelîf dirêj e di nav çokên wan de ye**. *Heke ku **aqilê wî di nav çokên wî de nebûna**, ew bênamûsîtî bi wê keçikê nedikir.*

Aqilê (yekî) di nav gavên wî de bûn

Ji bo kesên doxînsist tê bikaranîn. **Ku **aqilê Rûto ne di nav gavên wî de bûna**, dikaribû tiştên birûmet jî bifikiriya.*

Aqilê (yekî) firîn

bnr. Hiş û aqil ji serî çûn

Aqilê (yekî) gihîştin

Fêmdar bûn, hatina aşta têgihîştinê. **Êdî ne zarok e, **aqilê wê jî digihîje**.*

Aqilê hebûyî jî çûn

Bêhtir xwe şaş kirin, ê hindik mayî jî ji şûnê çûn. **Piştî zewacê, **aqilê ku hebûyî jî çû**.*

Aqilê (yekî) jê birîn

Bi awayekî erênî pê bawer bûn. **Bi rastî Botan lawekî baş e ku **aqilê min jê nebiriya** min ew dida ser vî karê girîng?*

Aqilê (yekî) jê girtin

1. Ecibandin. **2.** Pê şêwirîn *****Aqilê min jî ji wê keçikê girt**, em dikarin wê hildin kar. *Ew dîsa çû ku **aqil ji Kazo bigire**, nikare bi serê xwe tiştekî bike.*

Aqilê (yekî ji serî birin

Di bin bandora kesekî yan jî tiştekî de man. **Nizanim li wir çi bû, kê çi kir, lê piştî ku çû metropolê, **aqilê kurê min ji serî birin**.*

Aqilê (yekî) ji serî çûn

1. Pir hêrs bûn. **2.** Ji eşqan an jî ji kerban xwe şaş kirin. **Dema ku ew di wî halî de dît, **aqilê Rojber ji serê wî çû.** *Hema çawa ku Memê li çav Zînê ket **aqilê wî ji serê wî çû**.*

Aqilê (yekî) lê kirin av

Têgihîştin, hiş tevlîhev bûn. **Wê jinika bî, **aqilê Serwêr kiriye av**.*

Aqilê (yekî) li cihekî din bûn

Bala xwe dan cihekî din. **Ez ji wê re çiqasî tiştên xweş jî dibêjim, lê mixabin **aqilê wê li cihekî din e**.*

Aqilê (yekî) li hev ketin

Xwe şaş kirin. Mantiq neşuxilîn. **Bi wan pirsên matematîkê,* ***aqilê Dozdarê li hev ket.***

Aqilê (yekî) li hev qelibîn

bnr. Aqil li hev ketin.

Aqilê (yekî) li serî bûn

Hay ji xwe hebûn. **Wê demê aqilê wê li serî bû, heya ez çûm bazarê hatim ji devgerîn ketibû jî.*

Aqilê kurî (law) bi teyran (çûkan) re firî.

Aqilê ciwanan ji bandor û guherandinan re vekiriye. *****Aqilê kurî bi teyran re firî;*** *Gevez hê şanzdeh salî ye, ev helwesta wê jî tiştekî asahî ye.*

Aqilê kurî, ceniya dêl birî.

bnr. Aqilê kurî bi teyran re firî.

Aqilê kurî, risqê bitanê

bnr. Aqilê kurî bi teyran re firî.

Aqilê kurî, seg tê de birî.

Aqilê nekemilî bi kêrî tiştekî nayê. *****Aqilê kurî seg tê de birî****. Lawekî min dibe bila bi aqil be.*

Aqilê min dibire, aqilê gilika min nabire.

Nepejirandin. **Heyran tu baş dibêjî, xweş dibêjî, ez jî dixwazim bawer bikim,* ***lê aqilê min dibire, aqilê gilika min nabire****.*

Aqilê (yekî) negihîştin

Nehatina asta fêmkirinê, tênegihîştin. **Hêj piçûk e,* ***aqilê wê negihîştiye****, tu çend salan şûn de li rewşa wê mêze bike.*

Aqilê pîrê, şîreta pîrê

Her kes li gorî aqil û zanebûna xwe rê nîşanî mirov dide. **Ez çawa bikim ji dest min jî ew tê,* ***aqilê pîrê, şîreta pîrê.***

Aqilê qîza tiyê min, destê min dihêle tê riyê min.

Ji bo helwesta ne di cih de û kesên firofeşî tê bikaranîn. *****Aqilê qîza tiyê min, destê min dihêle tê riyê min****. Ev xwarziya min jî nizane wê çi bike.*

Aqilê (yekî) sekinîn

Mat man, ecêp man. **Mirov ku li xeml û nexşa stranên dengbêjan dinêre,* ***aqilê mirov disekine.***

Aqilê serxweşan, tira gamêşan

Mirovên serxweş, hay ji xwe tune ne. *****Aqilê serxweşan, tira gamêşan.*** *Ma te çi ji wî serxweşî hêvî dikir?* (argo)

Aqilê sivik, barê giran

Mirovên kêm aqil, karê xwe yê hêsan jî giran û zêde dikin. **Aqilê sivik barê giran.* *Tu çi bibêjî feyde nake, wî çi kir bi xwe kir.*

Aqilê (yekî) şaş kirin

Xwe winda kirin. **Di wî şerî de tam di kêlîka serkeftinê de, daxuyaniya agirbesê* ***aqilê pêşmergeyan şaş kir****.*

Aqilê (yekî) temam bûn

Hatina asta têgihîştin û fêmkirinê. **Êdî* ***aqilê wê temam e****, dikare wî karî jî pêk bîne.*

Aqilê (yekî) têrê nekirin

Di radeya têgihîştina wê astê de nebûn. **Keçika min, hê* ***aqilê te têra naveroka wê yekê nake****.*

Aqilê xwe avêtin

Hiş ne li serî bûn. Xwe şaş kirin. **Ji wî nexeyîde, ma tu nabînî, va ye* ***aqilê xwe avêtiye****?*

Aqilê xwe berdan ser ...

Li ser mijarekê kûr bûn. **Zilfînaz îsal hema bi tenê* ***aqilê xwe berdide ser dersa xwe****.*

Aqilê xwe bi nan û dew xwarin

Xwe şaş kirin. **Bawer nakim, çima mêrê te* ***aqilê xwe bi nan û dew xwariye*** *ku wisa bike?*

Aqilê xwe bi nan û pîvazê xwarin

bnr. Aqilê xwe bi nan û dew xwarin

Aqilê xwe çeliqandin (Aqilê xwe çelq kirin)

Mêjî baş neşixulîn. Serî tevlihev bûn. **Ew qas li pey wê keçikê çûyî hatî, çûyî hatî, di dawiyê de te* ***aqilê xwe çeliqand****.*

Aqilê xwe danîn serê xwe

bnr. Aqilê xwe topî serê xwe kirin

Aqilê xwe guhertin

Bi awayekî din fikirîn. **Bi Xwedê heta ew wî* ***aqilê xwe yê tenê li ser xeyalan neguhere,*** *tu car nabe mal û hal.*

Aqilê xwe pê re winda kirin

Zehf zêde pê re mijûl bûn, girîng girtin û pê ve girêdayî bûn. **Vî biraziyê min ê dînik,* ***aqilê xwe bi vê keçikê re winda kiriye****.*

Aqilê xwe nas kirin

Têgihîştin, fêmdar bûn, kamil bûn. **Heta wî* ***aqilê xwe nas kir****, dê û bavê wî jî dîsa hatin ba hev.*

Aqilê xwe revandin

bnr. Aqilê xwe winda kirin

Aqilê xwe şeqandin
bnr. Aqilê xwe winda kirin

Aqilê xwe şixulandin
Bi awayekî aqilane û erênî tevgerîn. **Heke min di wê çaxê de **aqilê xwe bişuxilanda,** niha ev rewş ne rewşa min bû.*

Aqilê xwe topî serê xwe kirin
Riya rast dîtin. Bi rasteqînî ponijîn. **Dawiya dawî Rêzan **aqilê xwe topî serê xwe kir** û dev ji araqê berda.*

Aqilê xwe winda kirin
Xwe şaş kirin. Hay ji xwe nebûn. **"Mirov digot wext e ew **aqilê xwe winda bike**." **Mahmut Baksi***

Aqilê xwe xebitandin
bnr. Aqilê xwe şixulandin

Aqilê xwe xwarin
bnr. Aqilê xwe bi nan û dew xwarin

Aqilê (yekî) tijî kirin
Weki armanc û daxwaza xwe yek îkna kirin. **Nizanim jê re çi gotibû lê Gulnûrê **aqilê Sedayê tam ji bo cihêbûnê tijî kiribû**.*

Aqilsivik
Kêmaqilî, kêmhiş. **Heci Heyder dê çawa wê keça xwe çawa bide Nizoyê **aqilsivik**?*

Aqilsivik e, lingçapal e.
Ji bo kesên bêpergal û kêmaqil tê bikaranîn. **Çawa xweş gotine, **aqilsivik e, lingçapal e**. Keçik ne bedew e, lê hê di ser de zimanê wê jî pir tûj e.*

Aqûbet li serî bûn
Eynî encam hatin serê yekî. **Ez çi bibêjim? Yên ku bi min dikenin, ji Xwedê Teala dixwazim, **aqûbeta min li serê wan be**.*

Ar bi cilên (yekî) ketin
Ziyan dîtin, gelekî aciz bûn. **Ji wê bûyerê şûn de **agir bi cilên Osê jî ket**, mala xwe bar kir û ji vî welatî çû.*

Ar ji laş çûn
bnr. Ar bi cilên (yekî) ketin

Ar û pelûr e, xûy (xwedî) qebûl e.
Baş an jî xerab çi dibe bila bibe, malê min e, ez dipejirînim. **Apo, çi ye tu hema qala kêmasiyên jina min dikî? **Ar pelûr e, xûy qebûl e.***

Aramî bi dest xistin

Rehet bûn. **Piştî pêncî salî hinek **aramî bi dest xist**, lê wê demê jî ciwanî jê dûr ketibû.*

Ardekê (ardefk) agir bûn

1. Bûn mehne û hinceta bûyerekê. **2.** Ji bo berjewendiyên hinekan ziyan dîtin **Jixwe li hev û din mehneyan digerîn, ez jî ji xwe re kirim **ardekê agir.** *Evdo û Xidir pereyên jinikê xwarin, ji xwe re kêf kirin, ez jî **bûm ardekê agirê** wan.*

Ardê cehinî (bûn)

1. Bêdawî bûn. **2.** Bêkalîte û bênirx bûn. **Tu nekeve tatêlê, ew **ardê cehinî** ye. *Ew **ardê cehinî** ka wê çiqasî berdewam bike?*

Aresêçî[1] kirin nav

Di navbera kes û tiştan de cudayetî kirin. **Amojina min tim **aresêçiyê dike nav** wan xwarziyên xwe.*

Arê hûr di hewana xwe de dîtin

Bitrî bûn. **Hecî Kerem piştî ku bû qoricî, tu dibêjî **arê hûr di hewana xwe de dîtiye**, ji bilî leşkeran bi ser her kesî de dike hurtehurt.*

Arê kewan e, risqê betan e.

Her tişt li gorî rewş û rêçikên xwe encam digire. **Ma te çi jê hêvî dikir? Tu jî dizanî **arê kewan e, risqê betan e.***

Arê kewarê risqê biharê

Heke tu di demê de tedbîra xwe bibînî, tu nakevî nav tengasiyan. ****Arê kewarê risqê biharê.** Ma ev kewara tijî ji bo kîjan rojê ye?*

Arê xwe bêtin, kapeka xwe rêtin (Arê xwe pehtin, ariya xwe rêtin)

1. Karê xwe ji zû de qedandin. **2.** Ji zû de zewicîn. **Dev ji min berde dayê, min **arê xwe petiye, kapeka xwe rêtiye.***

Arê zêran pê çêbûn

Pir dewlemend bûn. **Şêx Xalid ne hevalê wan dewlemendên din e. Maşelah wisan e ku **arê zêran pê çêdibe**.*

Arîka (ariya) tenûran, serê pismaman û gir û hûran

Heke rewşa kesekî di hêla aborî de baş be, kêr digihîje lêzim û hawirdora wî jî. ****Arîka tenûran, serê pismaman û gir û hûran.** Ku ew bibe endazyar helbet wê ji me re jî tiştekî bike.*

Arkolk tevdan

Bi karên ne pak û ne xêr re mijûl bûn. **Heyran çi karê te pê ketiye, tu **arkolkê tev didî**?*

Arodc arode gerîn

---

[1] **Aresêçî:** Cudayetî

Bêkar û bêşuxil bûn. **Rodiyê Fehîm îsal dibistan jî berdaye, hema heta êvarê* ***arode arode li van kuçeyan digere****.*

Arvanê sala teng bûn (Arvanê sala xerab bûn)

1. Dostên rojên reş bûn. **2.** Debara demên dijwar bûn. **Şêxmûs* **arvanê salên xerab e**. **Em çi zanin li pêşiya me rojên çawa hene, ji bo wê ew* ***arvanê sala me ya teng e****.*

Arvanê xwe li êş kirin

Vala û pûç axaftin **Ma hûn Osê nas nakin? Heta ku* ***arvanê xwe li êş neke*** *nikare bisekine.*

Arvanê (yekî) qedîn

Mirin. **Lawo, tu hesabê xwe çewt meke, hela hê şikir ji Xwedê re* ***arvanê min neqediya ye.***

Asasê li ser berfê bûn

Ji bo kar û helwesta bêkêr tê gotin. **Bi dîtina min ev karê ku tu dixwazî pêk bînî, hema wekî* ***asasê li ser berfê ye****.*

Asaxa zimanê xwe zanîn

Hay ji gotinên xwe hebûn. **Mineta min bi Şoreş tune, ew* ***asaxa devê xwe dizane****.*

Asê bûn

1. Ji rê derketin. **2.** Xwedê nas nekirin. **3.** Astengî derxistin, pir biinyat bûn. **4.** Înkar kirin **5.** Ketina nav tengasiyek an jî cihekî ku jê derketin pir dijwar e. **Kazim* ***asê bûye****, heya êvarê li pey matoşqeyan digere. Me hemûyan lavayî kir lê ew* ***asê bûye*** *nayê rayê. *Yaqûb hema asê bû û ew pereyên min nedan. *Ew di wir de wisa* ***asê bûye*** *ku Riza jî wî bi zorê rizgar bike.*

Astar ji rû bihatir bûn

bnr. Bi pênc qurişan kûçik dişo, bi deh qurişan destê xwe helal dike

Aş berdaye, bi pey çeqçeqê ketiye.

Dev ji ya mezin û girîng berdan, bi ya piçûk girtin. **Wey mala minê, Nisoyê Şemê* ***aş berdaye bi pey çeqçeqê ketiye****. Piştî wê hebûnê, bi pey gurzek gîha direve.*

Aş betal kirin

Dawî li kar anîn. **Berê karê wan pir baş dimeşiya, lê piştî ku zarokên wî tevî gerîlayan bûn, wî jî* ***aş betal kir****.*

Aş bi xeyalekî, aşvan bi xeyalekî

Her kes li gorî rewş û berjewendiyên xwe tevdigere. **Erê xweha min! Her kesek armancek xwe heye;* ***aş bi xeyalekî, aşvan bi xeyalekî.***

Aş çûye, çeqçeq maye.

1. Pergal xerab bûye. **2.** Ji tiştên mezin û zêde tiştekî piçûk man. **"Kalê Heso pir ketiye,* ***aş çûye, çeqçeq maye.*****" Dilawer Zeraq** ****Aş çûye, çeqçeq maye,*** *piştî wê serweta Mexsût Axa ev hespê kor maye.*

Aş çûye, tu pirsa çeqçeqê dikî. (Aş ji dest çûye, pirsa çeqçeqê dike.)
bnr. Aş berdaye, bi pey çeqçeqê ketiye.

Aşek nehiştiye ku arvanê xwe lê bike.
Li tu cihî bawerî, giramî û rûmet nehîştin. **Lawê min, tu çi dikî bike, lê wisa bike ku bila* ***aşek hebe da ku tu arvanê xwe lê bikî!***

Aşê betalan bûn
Karê bêkaran bûn. Ji xwe re vala gerîn. *****Aşê betalan e****, ez benî tu çi ji wî teralî hêvî dikî?*

Aşê nokan
1. Ji bo kesên zêde çilek tê gotin. **2.** Ji bo kesên zêde dipeyivin jî tê bikaranîn. **Sifreya xwe zû hildin ku ew* ***aşê nokan*** *bê, ji yên din re tiştekî nahêle. ****Aşê nokan*** *va ye dîsa dest pê kiriye, dipeyive.*

Aşê xwe bi ava (yekî) gerandin
Bi alîkarî û rêveberiya kesekî karê xwe meşandin. **Xelîl* ***aşê xwe bi ava Seyad digerîne****.*

Aşê xwe gerandin
Debara xwe kirin. **Mêrik* ***aşê xwe digerîne*** *heyran, dev jê berdin.*

Aşêv kirin
Ji derd û belayan rizgar kirin. **Adar ku ji vê belayê* ***aşêv bibe****, ez ê qurbanekê bidim.*

Aşiqê çavên beqê bûn
Ji bo karên ne li rê tê gotin. **Ew jî sekinî sekinî çû* ***bû aşiqê çavê beqê****.*

Aşiqê sila sergînê bûn
bnr. Aşiqê çavên beqê bûn

Aşît bi ser (yekî) de anîn
Ketin rewşeke xeternak. **"Min xwest serekî bidim vir.* ***Aşîtê bi ser neyarên we de bînim.***"
Nevzat Nurullah (Nifir)

Aşîta Xwedê bûn
Dir û yeman bûn. **Heçî Azadê Osê,* ***aşîteke Xwedê ye****, li rastî me hatiye.*

Aşo tu bi çi digerî, bi avê; kuro tu li çi digerî, li ser senetê dê û bavê.
Bi gelemperî zarok jî huner û pîşeyê dê û bavên xwe berdewam dikin. *****Aşo tu bi çi digerî, bi avê; kuro tu li çi digerî, li ser senetê dê û bavê.*** *Ezbenî ma tu nizanî te çi perwerde û pîşe hînî wî kiriye?*

Aqilê xwe xebitandin
bnr. Aqilê xwe şixulandin

Aşt û bariştbûn
Dilşad, rehet û serfiraz bûn. **Kurdên Kafkasyayê yan jî hi gotinek din yên Sovyeta berê vê biwêja* ***aşt û bariştbûnê*** *bi kar tînin.*

Atar anîn serî (yekî)
Dek û fen li yekî kirin. *Serhat **atar anî ser me** lê bi ser neket.*

Atara (yekî) li serê (yekî) bûn
Ketin rewşeke erênî. ***Atara min li serê te be**, tu derd û kulan nebînî.*

Atara (yekî) qelîn
Ketina rewşek xerab. ***Atara wî di serî de qeliyaye**, ma çi tê de maye?*

Av di ser ... re çûn
Bêkêr bûn, xêr tê de neman, winda bûn. *Welehî **av di ser wê pirtûka te re çû**, ya xêr ew e ku tu êdî wê ji hîr bikî.*

Av berî binê (yekî) dan
Karê yekî xerab kirin. *Kerîmê zavayê me dike ku li fabrîqayê jî **avê berî binê Mazlûm bide**.*

Av bêyî hev venexwarin
Gelekî girêdayî hev bûn.*Hevaltiya Remzî û Nadir wisan e ku **bêyî hev avê venaxwin**.*

Av bi çokên (yekî) de çûn
Ferq kirin. *Çawa ku min ew wêneyê wan dît, **av bi çokên min de çû.***

Av bi devê (yekî) ketin
2. Dil bijandin tiştekî. Gelekî ecibandin. *Dema ku xwarinên li ser maseyê amadebûyî ditin, **av bi devê Soro ket**.*

Av bisekine, ew nasekine.
Çi dibe bila bibe ew ê wî karî pêk bîne. *Xebera ku tu bibî pir girîng e, ji vê deqeyê bi şûn de divê **av bisekine, tu nesekinî.***

Av çûn binê (yekî)
Kar xerab bûn. *Ew jî dizane ku hingî Cezmî hatiye, **av diçe binê wî**.*

Av çûn binê qûna (yekî)
Ketina nav tatêl û heyecanê, tirsîn, ketina fikaran. *Ew jî dizane ku ji wê nûçeyê bi şûn de **av çûye bin qûna Rohat**, hê jî bi ser de diçe.*

Av di gerdenê de xuya kirin
bnr. Av di sûret de xuya kirin

Av di hestî de gerandin
Eziyet lê kirin, di bin zor û zextê de hiştin. *Wan seghavan di hepsan de bi salan **av di hestiyên wî de gerandin**.*

Av di gerdena (yekê) de xuya kirin
Pir bedew û spehî bûn. *"Gurî li devê derê qesrê li ser kursî rûniştiye, bala xwe daye

Gulperiyê qîza Hesen Axa, bînaye hûva çardeşevî, ***avê ku vedixwe, di gerdena wê de xuya dike.***" Celîlê Celîl, Ordîxanê Celîl

Av di gunikên (yekî) gerîn
Di hêla zayendê de bi xwe hesîn. **Xuya ye ku* ***av di gunikên Elî geriyaye****. Van rojan çawa li pey qîzan bûye tirik?*

Av di qirika (yekê) de xuya kirin
bnr. Avê di sûretê (yekê) de xuya kirin

Av di sûretê (yekê) de xuya kirin
Pir bedew bûn. **Maşelalı bûka Zero wisa ne ku av* ***di sûret de xuya dike****.*

Av di navbera (...) de neçûn
Têkilî pir xweş û geş bûn. **Nizanim li ser çi ew qasî li hev û din dikin, maşelalı* ***av di navbera Wardek û Cewahirê de naçe****.*

Av ku di ser de qelaptî, ya bihostek, ya çartilî
Mirov ku nok bû nav, kêm an jî zêdebûn êdî ferq nake. **"****Av di ser de qelaptî, ya bihostek, ya çartilî.*****"** Zana Farqînî

Av ji devê (yekî) çûn (kişîn)
Bêzereng û tune bûn. ***Av ji devê wî dikişe****, ew çi dikare wî karî bibe serî?*

Av ji kaniyê nan ji baniyê
Ji bo kesên belaş û bêked dijîn tê gotin. ***Av ji kaniyê, nan ji baniyê,*** *ew ji rûmeta ked û xebatê çi fêm dike?*

Av li Nerwanê(*), feyde Taqyanê(**)
Li cihekî ku tiştekî kêrhatî pêk bê, hemû hawirdor, pê sûdewar dibe. ***Av li Nerwanê, feyde Taqyanê.*** *Ez bawer im ku kêra wê pireyê dê gelekî çêbibe.*

Av ji peleguhê kişîn
Pir sist û gêj bûn. **Malxirabî ka çawan e ,* ***av ji peleguhê dikişe.***

Av ketin şeqoqan
bnr. Av di gunikan gerîn

Av kirin girara (yekî)
Karê yekî xerab kirin. **Mîrxan bi çi zehmetî ew xebat pêk anîbû, lê Dara* ***av kire girara wî*** *û dawî lê anî.*

Av kolan(din)
Di nav helwesteke vala de bûn. **Ev kirinên Hemîd tenê* ***av kolan e****, tu bawer bike, tu kêreke wan nîn e.*

(*) **Nerwan:** Gundekî Silopiyê ye.
(**) **Toqyan:** Gundekî Silopiyê ye.

Av lê germ bûn germ bûn

Rewş xweş bûn. **Wa ye Yasîn ji xwe re kamyonek jî kiriye, xuya ye ku* ***ava wî germ e.***

Av li ber dilê xwe werdan

Ji bo helwesta dilê xwe ferah girtinê tê bikaranîn. **Tu qet wisa* ***avê li ber dilê xwe wernede****, hê dawî kifş nebûye.*

Av li ber hêlikên xwe werdan

Xwe ji bo tiştekî baş amade kirin, an jî ji bo tiştekî xweş hêvîdar bûn. **Hevalê Şemdîn qet* ***avê li ber hêlikên xwe wernede****, ez wê firsendê nadim te.*

Av li binî werdan

Qedandin. **Çend qurişê min, ên ku min ji bo rojên xerab hildabûn, wî lawê min ê bêxêr, av li binê wan jî warda.*

Av li dest nekirin

Ne hempa bûn. **Malxirabo tu çawa Evînê dikî tayê Xezalê? Ma tu jî nizanî Evîn qet* ***nikare avê destê Xezalê bike****?*

Av li gewriyê, gewrî xeniqî.

Êdî li ber xwe nedan, qedîn. **Evqas sal in min li ber xwe da, lê êdî* ***av li gewriyê, gewrî xeniqî.***

Av li hev venexwarin

1. Ji hev û din netirsîn. **2.** Gunchê xwe bi hev du neanîn. **Reso û Dilovan* ***avê li hev venaxwin,*** *ji destê wan bê wê xwîna hev du fîr bikin.*

Av li ser birîn

Bêguman hîştin. **Neyaran wekî masiyên ku tu* ***avê li ser bibirî****, ji bo gerîla lê nesêwirin gundê wê hêlê hemû şewitandin.*

Av li ser masî, masî hişk bû ji tînan.

Carinan derfet û hebûnên mirov hebin jî mirov nikare ji wan derfetan sûdewar be. *****Av li ser masî, masî hişk bû ji tînan.*** *Belê mal û milkê Serkarê Simko bêhesab e, lê tenê dikare kartolên kelandî bixwe.*

Av li ser şêlî kirin

Rewş û rêç winda kirin. A rasteqînî dan veşartin. **Heke wî bêbavî wisa* ***av li ser şêlî neki-ra****, niha em hîn bûbûn ku ya rast çi ye yan jî çi nîn e.*

Av li ser xwe zelal kirin

Ji bo ku kes nizanibe, şopa xwe birandin, winda kirin. **"Bê bi sê dengan ji wê re lîland, halan da, dîsa neçû. Jixwe roj bi baran silav danîbû û zû de çûbû,* ***av li ser xwe zelal kiribû.***" Fevzi Bilge

Av li pey xwe zelal kirin

bnr. Av li ser xwe zelal kirin

Av li ser zelal kirin

1. Rewş roni kirin, aşkere kirin. **2.** Pirsgirêk çareser kirin. **Dema ku wî di zanîngehê de dixwend, piştî gelek lêkolîn û lêgerînan* ***av li ser meseleya me Kurdan zelal kir****. *Dîsa yê ku* ***avê li ser vê pirgirêkê zelal bike****, hevalê Xetîp e.*

Av li şekokan gerîn

bnr. Av di gunikên (yekî) gerîn

Av lê gerîn

bnr. Av di gunikên (yekî) gerîn

Av nade gûzikê

Têra tiştekî nekirin. Pir qels û feqîr bûn. **Ji bo Baran gelek tiştên xweş dibêjin, lê ku tu baş mêze bikî, tu dibînî ku* ***av nade gûzikê****.*

Av pê germ bûn

Ji bo kesên pêkhatî tê gotin. **Mûso Axa ferman da ku di navîna rojekê de ji eşîra Kotîkan mêrekî ku* ***av pê germ dibe*** *bê kuştin.*

Av rabû, sirik (bend) belav bû.

Plan û bername tevlihev bûn. **Pêşnûmayên me yên xweş hebûn, lê bi hatina Cimo re* ***av rabû, bend belav bû****.*

Av reşandin gunê (yekî)

bnr. Av reşandin qûna (yekî)

Av reşandin qûna (yekî)

Ji serketina yekî re astengî dexistin. **Xêro digot ezê îleh bibim şaredarê bajêr, lê rûnişt-vanan di hilbijartinan de* ***av reşandin qûna wî****.*

Av şolî kirin

Karekî ku ber bi çêbûnê ve diçe tevlihev kirin, xerab kirin. Fesadî kirin. **Li ser wê mese-leyê em ê tam bigihîştana encamê. Lê Zekiyê Suxir ji nişka ve ji wir derket û* ***av şolî kir****.*

Av tê gerîn

bnr. Kamil bûn

Av tê werdan

Dawî lê anîn, qedandin. **Edeta wî ye, heta ku* ***avê tê wernede*** *nikare bisekine.*

Av û av çûn

bnr. Çem û çem çûn

Av were li ser e, ba were li ber e.

Kone bûn, tim bi ser ketin. **Hay lo! Ew çi mêrek e,* ***av were li ser e, ba were, li ber e****.*

Av xistin bêjingê

Bi karên pûç re mijûl bûn. **Ya ku Salo dike hema* ***av xistina bêjingê ye.***

Ava aşekî ji devê (yekî) çûn

1. Şaşwazî û ecêb man. **2.** Dil kişandina (bijiyandina) tiştekî. **Xalê Ehmed gava ku dît wa ye ew keçik û lawik di nivê sûkê hev du miz didin û maç dikin,* ***ava aşekî ji dêv kişiya.*** **Dema ku Zezê li çav wan xwarinan ket,* ***ava aşekî ji devê wê çû.***

Ava baranê vexwarin

Ji bo kesên famkor tê gotin. **Wî* ***ava baranê vexwariye*** *tu çi ji wî hêvî dikî?*

Ava bibinik bûn

bnr. Ava bin kayê bûn

Ava bin kayê bûn

Ji bo kesên ku bi pinî û bi dizî karan dimeşînin û xinisiyê dikin tê bikaranîn. **Tahar* ***ava bin kayê ye****, kes bi wî nikare.*

Ava (...) di coyekê de neherikîn (neçûn)

Bi hev û din re debar nekirin. **"Ji dema tofana Nûh û vir ve ji her şeytanî û cazgiriya zarokan tu carî* ***ava zirnevan û zarokan di coyekê de neherikiye.***" Adnan Alp

Ava hêdî, me ecêbên giran jê dî.

Divê mirov ne ji kesên pirbêj û lafek, lê ji yên bêdeng û zexel xwe biparêze. *****Ava hêdî, me ecêbên giran jê dî****. Ez baş wî nas nakim, lê ya rastî, bêdengiya wî hinekî min ditirsîne.*

Ava heft şorbeyan (giraran) ji dêv çûn

Eware bûn, sist û teral bûn. **Heçiya Ûsiv nîn e,* ***ava heft giraran jî ji dêv dikişe****, nikare qûna xwe ji erdê rake.*

Ava heyatê vexwarin

Bêmirin bûn. Zînde û zingirî bûn. **Tu dibêjî* ***ava heyatê vexwariye****, di wî temenî de tu li çalakbûna wî mêze bike hela.*

Ava qûna cêr bûn

Ji bo kesên ku tu çi qenciyê lê bikî vala û bêkêr diçe tê gotin. **Qenciya ku tu ji Zerîfê re biki hema* ***ava qûna cêr e****.*

Ava reş bi çavan de hatin

bnr. Ava reş hatin ser çavên (yekî)

Ava reş hatin ser çavên (yekî)

Kor bûn. **Belengazê Hafiz Nedîm hema şev û roj Qur'an xwend, di dawiyê de* ***ava reş hate ser çavên wî****.*

Ava reş a rûyê, bi ser çi de çûyê?!

bnr. Ava sarê, di ser çi de diçî xwarê

Ava rûyê (yekî) qetîn

Şerma xwe wenda kirin. **Qet qala Gulê ji min re nekin, bi rastî jî* ***ava rûyê wê qetiyaye****.*

Ava rû rijîn
bnr. Ava rûyê (yekî) qetîn.

Ava rû çûn
bnr. Ava rûyê (yekî) qetîn.

Ava rûyê xwe hurşandin
bnr. Ava rûyê (yekî) qetîn

Ava rûyê xwe rêtin
bnr. Ava rûyê (yekî) qetîn.

Ava sar kirin girara xwe
Karê xwe xera kirin. **Wê jî nizanibû bi wê kirinê dê* ***ava sar têxe girara xwe****, lê her dît ku bûye jî.*

Ava sar tê de çûn
Li hember tiştekî şaşwazî û metel man. **Dema ku Nefelê ew gotin bilûstin,* ***ava sar tê de çû****.*

Ava sar tê de hatin xwarê
bnr. Ava sar tê de çûn

Ava sarê, bi ser çi de diçî xwarê?!
Ji bo helwestên berevajî û sexte tê gotin. *****Ava sarê tu bi ser çi da diçî xwarê!..*** *Min ji vê bûka xwe tu tiştek fêm nekir. Ew qas ji kûr dinale, lê ji kêvir nermtir çi hebe jî dixwe.* (bnr. çîrok)

Ava ser berûyan, wekî zavayê bi dilê xesûyan
Tiştên ku li hev tên tîne zimên. **A rastî ev biryara ku partiyê di vê dawiyê de da, hema wekî gotina:* ***"Ava ser berûyan, wekî zavayê bi dilê xesûyan."*** *di cih de bû.*

Ava serê (yekî) germ kirin
Amadekariya ziyan an jî kuştina kesekî kirin. **Hêzên paşverû nihêrîn ku Vedat Aydin xebateke xurt dike, biryara* ***germkirina ava serê wî*** *dan.*

Ava serê (yekî) gerîn
Yek nêzîkî qeda û bela bûn. **Kifş e ku* ***ava serê Cananê digere****, lê ka kengê dê lê biqewime bibe.*

Ava serê (yekî) germ bûn
bnr. Ava serê (yekî) gerîn

"Ava sarê, bi ser çi de diçî xwarê?!":

Bûka maleke dewlemend ji ber zêdebûn û çetinaya karê malê, xwe li nexweşiyê datîne. Dema ku kes ne li mal be, ji nav ciyên xwe radibe û bi lez ji xwe re hevrîşkê çêdike û dixwe. Dû re, dev û lêvên xwe paqij dike û dîsa dikeve nav ciyên xwe. Lê ji ber ku têr e û bi rûnî xwarîye dilê wê zehf avê dikişîne. Ji ber wê jî zû bi zû avê vedixwe.
Dema ku avê vedixwe ji bo ku kes şikê nebê, bi awayekî zelûlî dilorîne û tim wer dibêje: "Ava sarê, bi ser çi de diçî xwarê."

* Di guhertoyeke din de jî ev biwêj wer tê gotin: *"Ava reş a rûyê, bi ser çi de çûyê?"*

Ava (yekî) di cihê xwe de nekişîn
Karê yekî xerab çûn. **Îsal rewşa Sîdar baş nîn e.* ***Ava wî di cihê xwe de nakişe.***

Ava (yekî) zû kelîn
Hêrsa yekî zû hatin. **Divê tu hinekî sebir bikî, tu dizanî ku* ***ava Zeyno zû dikele.***

Ava zer zayîn
Di hêla tenduristiyê de ketina rewşek bixeter. Birîn tê de hatin. **Belkî* ***ew ava zer bizê****, ev xirabî hemû di rûyê wê de hatin serê me.*

Avek bi ser êgir de kirin
Pêşiya şer û xirabiyê girtin. Pirsgirêk çareser kirin. **Xwedê jê razî be Hecî Talıar lıat û* ***avek bi ser vî agirî de kir****.*

Aveke kel bi ser (yekî) de kirin
Matmayî û pozîde kirin. **Wexta ku Narînê ew xeber bihîst, te digot qey* ***aveke kel bi ser wê de kirin****.*

Aveke sar bi ser ... de wer kirin
bnr. Avek bi ser êgir de kirin

Aveke sar bi ser ... de vexwarin
Ziyan dîtin, ji xisarê rizgar nebûn. **Êdî ew pereyên te çûn, nema vedigerin, tu* ***aveke sar bi ser wan pereyan de vexwe****.*

Avreşî ketin navberê
Têkiliyên germ winda bûn. **Berê ne wisa bû lo! Ev çend meh in ku* ***avreşî ketiye navberê****.*

Averê bûn
1. Ji rê û dirban derketin. **2.** Jê qetîn. Di aliyekî din de çûn. **Wan heval û hogirên xerab, Keleş ji êl û eşîra xwe* ***averê kirin****. *Em tev dihatin ew ji me* ***averê bû****, nizanim bi ku de çû.*

Avê aş bir, tu li şeqşeqoyê digerî.
Tu di nav hewldaneke pûç û derengmayî de yî. **Malxirabo tu çi dikî?* ***Avê aş bir, tu li şeqşeqoyê digerî****.*

Avê da navê.
Ji ber rewş û bûyerên xerab êdî xwe ranegirtin. *****Avê da navê.*** *Êdî sebra min nema.*

Avê da qirikê.
bnr. Avê da navê

Avê daye kapa kûsî.
Ji bo rewşa xweşî û başiyê tê gotin. **Ka çi ji Osê kêm maye? Maşelah* ***avê daye kapa kûsî.***

Avê di ser serê (yekî) re avêtin
Di bin derd û pirsgirêkan de man. **Jixwe* ***avê di serê wî re avêtiye****, hûn jî ji aliyekî de bi ser de neçin.*

Avê ku da serî, çi bihostek çi çartilî

Mirov ku kete nav êdî ji wê şûn de zêde ne xem e. **Êdî ji min re derka wê nîn e, jixwe ketime nav.* ***Avê ku da sêrî, çi bihostek çi çar tilî.***

Avêtin ber hev(*)

1. Bi alîkarî kar kirin. **2.** Bi dorê lêdan an jî hinciqandin. **3.** Bi dorê kilam gotin an jî axaftin. **Ciwanên gund, kuleşê Mirdêsiyê* ***avêtin ber hev****, li patosê xistin û qedandin jî. *Nijadperestan, yekî çepgir girtin* ***avêtin ber hev*** *û heya tu bêjî bes, lêdan. *Her du dengbêjan di daweta Mîrxan û Rewşenê de heya berbangê* ***avêtin ber hev.***

Avêtin ber dêrî

Qewirandin. Ji mal berdana yekî. **Piştî ku jinek ciwan jixwe re anî, Hecî Dono jina xwe ya mezin* ***avête ber derî.***

Avêtin cêvê (berîk)

Bertîl girtin, an jî dan. **Hema ji bo karekî piçûk be jî divê tu tiştekî* ***biavêjî cêvê****, naxwe ew memûrê nifûsê karê te çênake.*

Avêtin devê derî

bnr. Avêtina ber derî

Avêtin devê (yekî)

1. Ji bo lêdan û gevizandina yekî, derfet amade kirin. **2.** Bi awayekî ne rasterat, gotin bi kesî dane gotin. **3.** Ji bo bertîldanê jî tê gotin. **Şêx Şebedînê Cindî ew avêt devê du bêbavan, wan ew lawik xincî xincî kirin. *Bişar ew gilî* ***neavêtina*** *dêv ew ji wê belayê xelas nedibû. *Heke min pere* ***neavêtana devê wî*** *karê me pêk nedihat.*

Avêtin hundirê xwe

1. Derd û pirsgirêka xwe eşkere nekirin. **2.** Bi xwe hundirê xwe xwarin. **Çi hebe jî ew nabêje,* ***diavêje hundirê xwe.*** **Keçika min a piçûk çi hebe* ***diavêje hundirê*** *xwe loma wisa heliyaye.*

Avêtin nav dilê xwe

Pê xemgîn bûn, bi xwe hundirê xwe xwarin. Derdê xwe ji kesekî re negotin. **Ew nabêje, hema çi hebe* ***diavêje nav dilê xwe.***

Avêtin nav êgir

Ketina di nav zilm û zorê. **Li ser rewşa zava baş lêgerînek nekirn. Hema destê keçika belengaz girtin û* ***avêtin nav êgir.***

Avêtin Newala Waweylo(**)

Avêtina cihekî xerab. **Cevdet* ***avêtine Newala Waweylo****. Heya ji wir derkeve, ya felek.*

(*) **Avêtin ber hev:** Bi dorê stran gotina dengbêjan. Dewra berê, di odeyên gundan de, di qonax û qesrên axa û began de dengbêjan kilam digotin. Gelek caran strangotin wekî pêşbaziyan dihat lidarxistin û bi şev û rojan berdewam dikir. Ev çalaki bi awayekî coş û piroz dihat pêşwazî kirin û rûmeteke zêde digirt. Gelek axa û mîrên mezin wekî qadroyên daîmî ji xwe re dengbêj digirtin û her hewcedariyên wan didîtin. Dîsa di dawetan de aliyê bûk û zavê ji xwe re dengbêj dianîn û dengbêjê kijan ali bi ser biketa ev ji bo wê hêlê dibû şanaziyeke bêhempa. Xelatên dengbêjan jî gelek caran ga, zêr û her wekî din diyariyên giranbuha bûn.

(**) **Newala waweylo:** Cihê herî kûr

Avêtin paş gewriyê
Zêde xwarin û vexwarin. **Ew jî wisa ye, hema **diavêje paş gewriyê**.*

Avêtin piştguhê xwe
Girîng negirtin, guh nedan. **Heke partiyê di serê sêrî de pirsgirêka ziman **neavêta piştguhê xwe**, bawer im ku niha rewş cuda bû.*

Avêtin qulpa paşîn
Taqeta dawîn xerc kirin. **"Ji çûyînê re min **avêtiye qulpa paşîn**. Li nava buroya germ germokê digerînim."* Musa Vazgali

Avêtin ser ...
1. Erîşkirina li ser cihekî yan jî kesekî. **2.** Tawan an jî bar avêtin stûyê yekî. **"...ji nişkê ve **avêtin ser mala me**..."* Medenî Ferho

Avêtin stûyê (yekî)
Tawan avêtina ser kesekî din. **Yê ku mêrê wan kuştibû Serto bû, lê çima ku diranê wan di wî de nediçikiya, çûn **avêtin stûyê** Memê Xalitê bêsûc û bêguneh.*

Avis bûn
Li benda yekî zêde sekinîn. **Tu li ku mayî? Ez li benda te **avis bûm**.*

Avî çû, hawî çû.
1. Bi awayekî vala û belasebeb xerc bûn. **2.** Winda bûn. **Min ji bo qenciyê ew pereyên xwe dan, lê **avî çû û hawî çû.** *Erebeya Cimşît a ku bi şev dizîn, çû lê **avî çû, hawî çû**.*

Aviya kulîlka bûn
Li pey yekî çûn û venegerîn. **Çeto **bû aviya kulîlkan**, çû wisa ji holê winda bû ku tu kesî xeberek jê negirt.*

Avpîvazî kirin
Ji bo zarokan an jî ji bo pezê ku xwarinê naxwe tê gotin. **Diya Serfîrazê neviyê min **avpîvazî kiriye** diya wî dike nake tiştekî naxwe.*

Avrî avêtin (Awir avêtin)
bnr. Awir dan

Avrî (awir) li (yekî) dan
Di demeke kurt de bi bandor li derekî yan jî li tiştekî nihêrîn. **"Em gihîştin rasta xwendingeha wê û ez bi tenê hêlam, berî li derî berze bît, **avriyek li min da û çû**..."* Îsmet Mehemed Bedel

Awir pê ve dan
bnr. Awir dan

Awir tê de çûn
Bi awayekî baldar lê nihêrîn. **Awirên min wisa **di wê de çûn** ku pê aciz bû û rûyê xwe guhast.*

Awirên şewat avêtin

Bi awayekî xemgîn û keser nihêrîn. **Dema ku di hucreya zîndanê de ez bi wî halî dîtim, awireke **şewat avête** min.*

Awirên tûj avêtin

bnr. Awriyên tirş avêtin

Awirên xwe jê dûr xistin

bnr. Çavê xwe jê revandin

Awirên xwe ji ser hilnedan

Xistina bin bandora xwe. Tim şopandin. **Min çawa kir, Canxwas **awirên xwe ji ser min hilnedan**.*

Awirên xwe tûj kirin

Bi armanceke neyînî yan jî xerab li kesekî nihêrîn. **Sosinê **awirên xwe tûj kirine**, dixuyê ku dê tiştinên xerab bibêje.*

Awir (avrî, avrû) lêdan

bnr. Awir dan

Awirên tirş avêtin

Bi awayekî xcrab û bi niyeteke nebaş nihêrîn. **Salo wisa **awireke tirş avêtê** ku Temo*

Ax di destê (yekî) de bûn zêr

Ji bo kesên zereng û hunerwer tê bikaranîn. ****Ax di destê Selîm de dibe zêr.** Her tişt ji destê wî tê.*

Ax giran bûn

1. Teral û sist bûn. **2.** Birûmet û giranbuha bûn. **3.** Ji bo kesên ku zêde nayên hezkirin jî tê gotin. **Sîncar mirovekî **ax giran e**, nikare xwarina devê xwe jî baş bixwe. *Yezdan mirovekî **ax giran e**, ji bo çi here her deriyê kê kes wî destvala venagerîne. *Seyîdxan mirovekî **ax giran e**, kes ji bo wî peyveke baş nabêje.*

Ax ketin çavan

Mirin. **Di dawiyê de **ax kete çavan** û ew jî ji jana wan birînan rizgar bû.*

Ax kirin, bendê piştê qetîn

1. Poşman bûn. **2.** Gelekî li ber xwe ketin û xemgîn bûn. **Mexpûla Sûsê hatiye dawiya emrê xwe lê hê jî, çima ku bi Eliyê Xano re nezewicî, **ax dike; bendê piştê diqete**. *Edûla Cimo ji bo mirina birayê xwe **ax dike, bendê piştê diqete.***

Ax di çavên (yekî) ketin

Mirin. **Heya ax **di çavên wî nekeve**, ew ê li pey jinan be.*

Ax nezanî nezanî, nezanî tu dizanî.

Yên ku nezan in lê hê bêhtir xwe zane dihesibînin. ****Ax nezanî nezanî, nezanî tu dizanî!***

Hevalê Geylanî di tu mijarekê de ne pispor e, lê di her mijarê de jî, ji pisporan zêdetir dipeyive.

Ax û eman kirin
bnr. Ax û wax kirin

Ax û fîxan kirin
bnr. Ax û wax kirin

Ax û tiraf kirin
Belawela kirin, perîşan kirin. **Lawê min ê navîn mala min* ***tev ax û tiraf kir.***

Ax û wax kirin
Ji dest derd û êşan feryad kirin. **Li pey keçika xwe ya ku bi xortekî biyan, yê leşker re revî, Zerê gelekî* ***ax û wax kir.***

Ax û wax lingên min, janê girtiye dilê min, ji destê kêmaqiliya min.
Ji destê kêmasiyên xwe ziyan dîtin. **Qudretê hema tim dubare dikir û digot:* ***"Ax û wax lingên min, janê girtiye dilê min, ji destê kêmaqiliya min."***

Axa bi xulam, xulam bi olam, olam bi tentene
bnr. Axa bi xulam, xulam bi tûtikê

Axa bi xulam, xulam bi tûtikê
Xulam jî bi bandor û pirestîja axê ve kar didin kirin. **Wî gava ku bandora kehyayê Surmê Axa dît, axîn kir û got:* ***"Heyran axa bi xulam, xulam bi tûtikê."***

Axa (xaka) bin gû bûn
Bê bîhn û bê bereket bûn. Bi tiştekî re kêr nehatin. **Karên dinyayê carinan berepaşkî ne, xuyanga Zerîfê baş tê xuyan, lê karê wê* ***axa bin gû ye.***

Axa bixulam e, xulam biolam e.
bnr. Axa ji xulamê xwe re got, xulam ji kûçikê xwe re got, kûçik jî ji boçika xwe re got

Axa bixulam e, xulam bitûltajî ye.
bnr. Axa bi xulam, xulam bi tûtikê

Axa bû Homo, xwelî li serê me komo.
bnr. Axayê me bil e xwerê me serkul e.

Axa cêwrik mezin kir, bû kûçik, axa dirand.
Carinan qencî û başî ji bo mirov dibe asteng û xirabî. *****Axa cêwrik mezin kir, bû kûçik, axa dirand.*** *Rebenî di wê roja tengasiyê de dest avête wê, lê ew qencî jê re bû xerabî.*

Axa gote mirtib: "Ez ê li te xim!" Mirtib got: "Axayê min ez ê rûnim."
Divê mirov hedê xwe bizanibe û carinan dengê xwe meke. *****Axa gote mirtib: "Ez ê li te xim!" Mirtib got: "Axayê min ez ê rûnim."*** *Wekî ku dibêjin carinan rev jî ji mêraniyê ye.*

Axa ji êlê xeyîdiye, êl hay jê tune.
Hin caran hinek mirov xwe bi xwe dixapin. *Kî wan biryarên Rizo bibihîze wê bibêje: ***"Axa ji êlê xeyidiye, êl hay jê tune."***

Axa ji xulamê xwe re got, xulam ji kûçikê xwe re got, kûçik jî ji boçika xwe re got.
Her kes erka xwe li ser yê ji xwe piçûktir û bêhêztir pêk tîne. *Ew gotina ku dibêjin: ***"Axa ji xulamê xwe re got, xulam ji kûçikê xwe re got, kûçik jî ji boçika xwe re got."***, *bûye meseleya min û vî kûrê min ê mezin.*

Axa li kêfê ye, mal maye li bin berfê ye.
Tenê li berjewendî û rewşa xwe fikirîn. *Ew mirovekî bêwijdan e. ***Axa li kêfê ye, mal maye li bin berfê ye.***

Axa li kêfê ye, xulam di nav zicrê[1] ye.
Di nav çînan de cudatiyek bêdad û mezin heye. ****Axa li kêfê ye, xulam di nav zicrê ye.*** *Hinek di nav jiyanek xweş de ne, hinek jî di nav roja reş de dijîn.*

Axa rabûn hingurman (pevçûn), feqîr û xizan çûn li ber lingan.
Dema ku hêzên mezin şer dikin, ên piçûk ziyanê dibînin. ****Axa rabûn hingurman, feqîr û xizan çûn li ber lingan.*** *Li xwe miqate bin! Hûnê di nav lingê wan de biperçiqin!*

Axa riyan tev dizane, lê qenciya gel nizane.
Berjewendiyên xwe li pêş girtin. **Hay lo! Ew şeytan e.* ***Ew axa riyan tev dizane, lê qenciya gel nizane?***

Axaftina xwe bi avê de berdan
Li soza xwe xwedî derneketin. **"Ma tu min nas nakî Îsif?* ***Axiftinêt xwe di avê de bernede."*** Hesen Silêvanî

Axatî kirin
1. Mezinayî û serwêrî kirin. **2.** Merdî kirin. **3.** Tehdayî, zordarî û zulm kirin. **Bi lihevanîna wan her du birayan Simkoyê Zerdeşt* ***axatiyeke mezin kir.*** **Çi dibe,* ***axatiyekê bike****, ji bo vî karê dikanê hinek pere bi deyn bide min.* **Huso hingî di partiyê de cih girtiye, li ser serê me* ***axatiyê dike****.*

Axayê bêxulam bûn
Belê xulamên wî nîn in, lê bi xwe mirovekî wekî axayan mezin, zana û rêzdar e. **Heyfa Rojen, Xwedê dizane ew* ***axayekî bêxulam e****.*

Axayê mala xwe bûn
Di mala xwe de birûmet û bibandor bûn. **Erê ligel wan dibe ku bêrûmet be, lê ew jî* ***axayê mala xwe ye****.*

Axayê me bil e xwerê me serkul e.
Heke rêveberê me ku ev be, rewşa me jî wê wer xerab be. **Me hinekî jî heq kiriye.* ***Axayê me bil e xwerê me serkul e.***

---

[1] **Zicir:** Zilm û zext

Axayê me bû pilo, şîva kerê me bû çilo.
bnr. Axayê me bil e xwerê me serkul e.

Axayê me Om e, xwelî li serê me kom e.
bnr. Axayê me bil e xwerê me serkul e.

Axayê min, wax çavê min kor bin ji bo hespê boz. (*)
Ji bo gotinên sexte û xapînok tê bikaranîn. **Çi ye, tu wekî wî xulamê ku tim gotiye: **"Axayê min wax çavên min kor bin ji bo hespê boz."** eynî tiştî dubare dikî?* (bnr. çîrok)

Axir soxir (Axirî soxirî)
Di dawiya dawî de. **Min nizanibû, lê vê dawiyê hîn bûm ku tûjbûna bi her awayî **axir soxir** ziyanê tîne.*

Axirî bi xêr hatin (xêr bûn)
Di dawiyê de bi ser ketin. **Serfirazê Eşref kedek bêhempa da wî karî, **axirî jî bi xêr** hat û rewşa wî maşelah pir xweş bû.*

Axirî pê re hatin
bnr. Axirî bi xêr hatin

Axiriya xwe bi xwe re anîn
Karê xwe yê destpêkirî heya dawiyê bi sererastî birin. **Ji ber ku mêtingeran pesenga wan dane şaş kirin, kesên bindest, gelek caran axiriya xwe bi xwe re naynin.*

Axiriya xwe gû kirin (Axiriya xwe rêx kirin)
Dawiya karê xwe baş pêk neanîn. **Azad berê baş dest pê kir, lê dû re **axiriya xwe gû kir**.*

Axîn kişandin
Ji ber hesretan, derd û kulan xemgîn bûn **Ji ber hesreta keça xwe ya di girtîgehê de û lawê xwe yê li serê çiyê dayika Gulê tim **axîn dikişîne**.*

Axîn rahilandin (Axîn rahilîn, Axîn rahîştin)
bnr. Axîn kişandin

Axme taxme kirin
Tar û mar kirin. Belawela kirin. **Di dawiya sala du hezaran de dewleta Tirk çepgirên di girtîgehê de **axme taxme kirin**.*

Axozî bûn
Bitrî û sosret bûn. Ji rê û dirban derketin, dîn û har bûn. **Îboyê Dewrêş, **axozî bûye** her roj li jina xwe dixe û malbata xwe xistiye rewşek bixeter.*

(*) ***"Axayê min, wax çavê min kor bin ji bo hespê boz."***

Axayek hespekî wi yê boz û pir xurt hebûye. Hesp li ber dilê axê gelekî biqîmet bûye. Rojekê çawa dibe hespê axê banz dide (dimire). Xulamê axê ji şelalî (riyakarî) xwe gelekî xemgîni diavêje. Her roj tam dema ku xwarin tê, xulam li ser sifreyê axinek kûr radikişîne û dibêje: "Axayê min, wax çavê min kor bin ji bo hespê boz." Ji vê gotinê bi şûn de axa xemgîn dibe û xwarinê naxwe. Xulam di vê valahiyê de zikê xwe bi hemû xwarinê baş têr dike. Ji ber wê jî ev biwêj di wateya xapandin û şelafiyê tê bikaranîn.

Axreta xwe qezenc kirin

Xwediyê xêr, qencî, nimêj û taetê bûn. **Bi dîtina min, bi vê nimêj û taetê û bi van xêr û xêratan Xelîlê Cemîl **axreta xwe jî qezenc kiriye**.*

Axûrê xwe xera kirin

Bi xwe, ziyan gihandina xwe. **Karê wî pir baş bû, lê wî bi xwe **axûrê xwe xera kir.***

Ayîkê (yekî) kişandin

Ji ber neheqiya kesekî ceza kişandin. **Ew îro ayîkê wê bûkê dikişîne.*

Azara ker û lalan pê de hatin

Şaş û metel man. **Li hember wê bûyerê azara ker û lalan bi Yargul Xanimê de hatibû.*

B

Ba bi ber ketin

Bêhn bi ser ketin. **Çima ku di nav wan hemûyan de **ba bi ber ket**, ji şerman çû û car din nehat.*

Ba bi bin (yekî) ketin

Pir şad bûn. **Dema ku Zeynebê bihîst di azmûna zanîngehê de bi ser ketiye, **ba bi bin ket**.*

Ba çandin, bahoz çinîn

Mirov ku xerabiyekê bike, dê rastî xerabtirînê bê. **Zû nebe jî lê gelek caran kesên ku **ba biçînin, wê bahozê biçinîn**.*

Ba derî girtin, ba derî vekirin

Ji bo malên ku rûyê mêvanan nabînin tê gotin. **Bi rastî jî deriyê Riza **ba digire û ba vedike**. Loma jî dost û hevalekî wî nîn e.*

Ba di guhê (yekî) re çûn

Gotin bi tiştekî hesab nekirin. **Min got lawo wisa neke, lê mixabin gotinên min wekî **ba di guhê kurê min re diçin**.*

Ba dibêje mêrik: "Derî veke ez kayê bînim"; mêrik dibêje: "Ji min dûr here, kara ji min re bikî ne lazim e."

Jê guman û hêviya baş nekirin. **Min xêra te navê qurban. Ma te nebihîstiye? Dibêjin: **"Ba gotiye mêrik: "Derî veke ez kayê bînim"; mêrik gotiye: "Ji min dûr here kara ji min re bikî ne lazim e."***

Ba girtin

Pêşiya xwe nedîtin, lezgîn û bêaram bûn. Hay ji xwe tune bûn. **Kemal **ba girtiye** diçe; înşelah bi wî bayî li cihekî nakeve.*

Ba hat, baran jî bi xwe re anî.

Ew bi xwe kêm bû, îca yekî nola xwe jî bi xwe re anî. **Jixwe hema ew mabû. **Ba hat, baran jî bi xwe re anî.***

Ba hat, bereket lê hat û bi ser ket.
Bi saya lihevhatin û şans bi ser ketin. **Ji dûr ve bi awayekî din tê xuyan, lê* ***ba hat, bereket lê hat û bi ser ket.***

Ba ji ber çûn
bnr. Ba bi ber ketin

Ba ji ber serê xwe berdan
Bêhna xwe berdan, rehet bûn. **"Êdî dinya xweş dibe, min got em ji zû de bi hev re derneketine derekê, ger te dil hebe di dawiya hefteyê de em ji xwe re herin ber avê. Wilo em* ***bayekî ji ber serê xwe berdin.***" Ronî War

Ba ji berfê re dibêje: "Ez bidim pey te, dê tu xwe li ku bixî?"
Gef xwarin û tehdîta yên ji hêza xwe bawer tîne zimên. **Ba ji berfê re dibêje: "Ez bidim pey te, dê tu xwe li ku bixî?" Belengazo, tu bi çi aqilî, bi min re kap davêjî?*

Bar ji ser xwe avêtin
Ji ber binbariyê revîn. **Zêde bi wî bawer nebin, a wî kifş nabe, lûn ê hew bibînin ku* ***bar ji ser xwe avêtiye*** *ha.*

Ba jî ji te, baran jî ji te
Bi her awayan jî tu bi xwe dikî. **Ez çi ji vê helwesta te re bibêjim heyran,* ***ba jî ji te, baran jî ji te.***

Ba ji zinar çi dibe?! (Ba ji tehtê çi dibe?!)
Tiştên an jî kesên bêhêz nikarin bandorê li yên bihêz bikin. **Ew pariyekî piçûk e, çi dibêje bila bêje. Ma* ***ba ji zinar çi dibe****?!*

Ba (bal) lê anîn
Ji bo têkbirin û serkeftinê, keys bi dest xistin. **Xêro ancax* ***ba li wî aniye,*** *heya ku pişta wî daynene erdê nasekine.*

Ba lê ketin
Felç bûn; kûd, şil û şehitî bûn. **Ew keça çapik û çeleng, piştî ku* ***ba lê ket,*** *bû komek hestî.*

Ba li ber guhê (yekî) ketin
1. Di nav hest û zena tişt bihîstinê de bûn. **2.** *Di ber xwe de hin tişt li hev anîn. *Min tiştek negot,* ***ba li ber guhên te ketiye.*** **Na lo ew êdî kal bûye, tim* ***ba li ber guhê wî dikeve.***

Ba lê ketin, kûçik li pey ketin
Ji bo rewşa eletewş tê bikaranîn. **Qet qala wî belengazê Seydo mekin,* ***ba lê ketiye, kûçik jî li pey ketiye.*** (qerf)

Ba rakirin
Pirole kirin, têfirandin, mubaxele kirin. **Dema ku Ebdilkerîm dipeyîve* ***bayekî wisa radike,*** *yên ku wî nas nakin devê wan ji hev dimîne.*

Ba tê, her kes bi kumê xwe li serê xwe digire.

Di dema tengasî û zorê de her kes çareya serê xwe dinêre. *_Mixabin, ku **ba tê, her kes bi kumê xwe li serê xwe digire**._

Ba û babelîsk lê hatin

Bela, şer û qeza bi ser de hatin. *_Îsal ji bo me saleke pir xerab bû, hema **ba û babelîsk bi ser me de hatin**._

Ba û bahoz lê hatin

bnr: Ba û babelîsk lê hatin

Baban bûn

bnr: Xwe kuşevekirin

Babax bûn

bnr: Xwe babax kirin

Babelat bi ser de hatin

bnr: Ba û babelîsk lê hatin

Bade çûn

Vala çûn. *_Ya ku ez li ber dikevim ew e ku ew qas ked û zehmeta min tev de **bade çû**._

Badek li xwe xistin

Helwesta xwe eşkere negotin û li hincetan gerîn. *_Piştî ku rewşa xezûrê wî guherî, wî jî **badek li xwe xistin** û devê xwe guherand._

Badilhewa çûn

1. Pir erzan firotin. **2.** Bêkêr û vala çûn. *_"...xwe avête dest û piyên wî, lavayiyên der û dinê lê kirin û lê xiste arzarî, lê belê her tişt **badilhewa çû**._ Musa Vazgali

Badilhewa xeber dan

Tiştên vala peyivîn. *_Gulcan û Şênaz hema tên mala Zezê bi hev re heta êvarê tiştên **badilhewa xeber didin**._

Bajarî, li erdê narî.

Wek tirane û henek ji bo xwe nazik nîşandayîna bajariyan tê gotin. *_Heyran ew bajarî ye, mirovek nazik û nazelîn e, ma we nebihîstiye ku dibêjin **bajarî li erdê narî**?_

Bal kişandin

Ji ber cudatî û awartebûnê, ango pir xweşik an jî xerabbûnê li çavan ketin. *_"Wisa dixuya ku heyîna heykel, ji min pê ve **bala tu kesê din nekişandibû**. Belkî jî ji ber ku ez tenê biyaniyê wê derê bûm, loma..."_ M. Ali K.

Bal kişandin ser ...

Girîngiya mijarekê li ber çavan raxistin. *_Wî tim **bal kişande ser girîngî û rista ziman**, lê mixabin em baş tênegihîştin._

Bal lê ketin

Bala yekî kişandin. Awir tê de çûn. **Nizanim ji ku **bala min lê ket**, xwezî min qet nedîta.*

Bala (yekî) li dereke din bûn

Hişê yekî li ser tiştekî din bûn.**Min jê re ramanên xwe yên di wê derbarê de jê re digotin, lê min mêze kir ku **bala wî li dereke din bû**.*

Bal û pal bûn

Pêşve çûn, xwe avêtin, mezin bûn. **Maşelah keçika te îsal baş **bal û pal bûye**.*

Bala xwe berdan ser

Li ser kesekî, mijarekê yan jî tiştekî bi kûrahî sekînin. **Heke tu **bala xwe baş berdî ser**, tu yê jî bibînî ku her tişt wekî gotina min e.*

Bala xwe dan

Bi baldarî lê mêze kirin. **"Keçikê dîsa **bala xwe da** deryayê û ma."* İbrahim Aydoğan

Bala xwe dan ser

Bi kûrahî li ser sekinîn. **Wan tev de **bala xwe dabûn ser** wê mijarê.*

Balgî derxistin[*]

Di pêşbaziyê de yekemîn hatin. **"Min di gelek dewetên Bayîzdiyan de **balgî derxist**, tu neda kesî. Ya wê hespê min biteqiya yan jî min hewara mizgîniyê û şahiyê yeqîn digihande zavê.* Veysel Çemlibel

Balgî kirin

Ewle kirin. **Mala Hecî Hemed bi salan dijminên xwe wisa **balgî kirin** ku piştî wê kompoloya mezin, her kes şaşwazî ma.*

Balix bûn

bnr. Av di gunikên (yekî) gerîn

Balte li gûzikê xistin (Balte di gûzikê de dan)

Tiştekî ne li rê kirin an jî gotinek ne di cih de gotin. **Armanca min ne ew bû, lê min çi zanibû ku min **balte li gûzikê xistiye**?*

Balte li kêvir xistin

bnr. Balte li gûzikê xistin

Ban qul e, binban şil e.

Ji ber ku bingeh ne têkûz e, li hêla din jî ji wê xerabtir e. **Ma jixwe rewşa mirovên bêtedbîr û perîşan ne xuya ye? **Ban qul e, binban şil e.***

Banek e bagurdanek e.

---

[*] **Balgî derxistin**: Li hêla Serhedê demа ku bûkan siwar dikin, pêşbaziyeke hespan li dar dixin. Di wê pêşbaziyê de ji siwarên yekemîn re *"balgî derxist"* tê gotin. Siwarê ji xwe bawer balgiyê cihêz ji mala zavê re tîne, hin xelatan jî distîne.

Yek bûn, ji bilî wê tu çare û vebijark (alternetîf) tunebûn. **Em çawa bikin ezbenî? Kes nikare tiştekî zêde bibêje,* ***gundek e, bagurdanek e.***

Banê me yek ban e, aliyek deşt e, yek zozan e.

Di nav heman cihî de helwestên cur be cur û berevajî pêk tên. ****Banê me yek ban e, aliyek deşt e, yek zozan e.*** *Maşelalı her yek ji me li pey partiyekê digere û serê carê tiştekî dibêje.*

Bar giran bûn

Pirsgirêk û binbarî zêde bûn. **"Gulê mehrûmê...Temo, lawo...dotino, birano... şagirtino, qedirgiran û çelengino...* ***Barê min giran,*** *derdê min bêeman e."* Mehmed Uzun

Bar hildan ser milê xwe

bnr. Bar hilgirtin

Bar hilgirtin

Binbarî pejirandin. **"Dema mirov dike* ***barekî hilgire****, lazim e li gorî hêza xwe wî* ***barî hilgire****. Lê belê, barê gelê xwe hilgirtin jî ne hêsan e."* Süleyman Çevik

Bar ji ser xwe avêtin

bnr. Bar ji stûyê xwe avêtin

Bar ji stûyê xwe avêtin

Ji binbarî û berpirsyariyê revîn. **Di dawiyê de Haran ji wê partiyê îstifa kir û ew* ***barê bêxîretiyê ji stûyê xwe avêt****.*

Bar ketin ser milan

Binbarî û vatinî li parê ketin. **"Hesen ev çend meh in ku çûbû leşkeriya tirkan, dîsa* ***barê giran ketibû ser milên wê****."* Fatma Savcı

Bar li ser mil man

Ji bêgavî binbarî hildan. **"Ku ji nişkê de bavê min girtin,* ***bar ma li ser milên*** *dayîka reben."* Medenî Ferho

Bar min naêşîne, serbar min dêşîne.

Gelek caran tiştên mezin na, lê tiştên piçûk mirov aciz dikin. ****Bar min naêşîne, serbar min dêşîne.*** *Hemû derd têne kişandin, le derdê vî zarokî nayê kişandin.*

Bar na lê serbar min dikuje.

bnr. Bar min naêşîne, serbar min dêşîne.

Bar naçe ber kerî, ker diçe ber barî.

Karê çiloçepî kirin. **Êdî bes e, dev ji van karên çiloçepî berde lawê min,* ***bar naçe ber kerî, ker diçe ber barî.***

Bar nalenal e, serbar dinale.

bnr. Yê li bin deng nake, yê li ser qareqar dike

Bar sivik kirin

Ji karê yekî re alîkarî kirin. *"*Va vî kesî jî hinek ji gunehên min bir, barê min hinekî sivik kir.*" Fewaz Ebdê

Bar sivikayî kirin

1. Kêmaqilî û bêhişî kirin. **2.** Kar hêsan kirin. *"*Ji **bar sivikayî wî bi şûr êrîşî guleyê kir.**" Dilawer Zeraq *Baro di wî karî de **bar sivikayîke wisa ji min re kir** ku nayê gotin.*

Bar û cemek derew hatiye dinê, bar para wî/wê ketiye, cem jî para dinê.

Ji kesên pir derewan dikin re tê gotin. ***Bar û cemek derew hatiye dinê, bar para wî ketiye, cem jî li dinê belav kirine.** Malxirabî tu dibêjî karê wî tenê derewkirin e.*

Baran hat, qulên keviran tijî bûn.

Ji bo xeta û çewtiyên ku dem di ser re derbas dibe û bi demê re tên jibîrkirin tê gotin. ***Baran hat, qulên keviran tijî bûn;** ka kî dizane ku Îsmaîl Çawuş li vî welatî çi bûyer pêk anîne?*

Baran ji ewrê (yekî) nebarîn

Xêr jê nehatin. *Tu qet li hêviya wî mesekine, **baran ji ewrê wî nabare**.*

Barana havînan, şil kir binê kulînan (kadîn).

Tiştê ku ne di dema xwe de pêk bê, zêde bibandor nabe. ***Barana havînan, şil kir binê kulînan.** Ev karê ku hûn dikin jî eynî wisa ye.*

Baranê erd şil kir, zîpikê erd qul kir.

Tiştên hê xerabtir û bihêztir jî hene. *Şêx Qaso ji xwe re hesabekî din dikir, lê **baranê erd şil kir, zîpikê erd qul kir.***

Barek dirav, an barek derew

Ji her du berevajiyên tund yek divê, ne ya asahî. *Heyran niha kîjan ji bo vî karî divê, **barek dirav, an barek derew**?*

Barê (yekî) ceh an jî genim bûn

Bi kêrhatin an jî nehatin xuya bûn. Erênî yan jî neyînî kifş bûn. *Heke em bi wî re bikarihin têkiliyan daynin, emê têbigihîjin bê ka **barê wî ceh e, an jî genim e**.*

Barê ceh û genim ji hev kifş bûn

bnr. Qûna reş û spî ji hev kifş kirin

Barê deveyê li ser pişta kurmoriyê bûn

bnr. Barê kerê li ser pişta deveyê bûn

Barê (yekî) giran kirin

Astengî ji yekî re derxistin. *Van kirinên wê **barê Hemîd giran kir**.*

Barê giran, li ser mil bûn

Di bin berpirsyariyeke girîng de bûn. *Zêde têkildarî lawê min Azad nebin, jixwe **barekî giran li ser milê wî ye.***

Barê gulan nehanîn

Ew tiştê baş (!) ku dikir, bila ji vir bi şûn de meke. **Mala minê! Bila êdî ji vir bi şûn de barê gulan ji min re neyne.* (qerf)

Barê heft deveyan kişandin

Di nav rewşeke dijwar de bûn. Gelekî betilîn. **Malavayo, wisa qilincê xwe kiriye ku tu dibêjî qey te **barê heft deveyan kişandiye**.*

Barê (yekî) takêş bûn

Karê yekî rast neçûn. **Belengazê Salo dike nake, **barê wî tim takêş e**.*

Barê keran xistin ser pişta şêran

Ji bo helwest û hewldana ne di cih de û ne layîq tê gotin. **"Belê nema dikarim, ji ber ku tu dixwazî min biêxî şûna hesinê Solingen û bi min qelema xwe tûj bikî, pelên kitêbên xwe vekî. **Tu dixwazî barê keran bikî pişta şêran.**"* Celadet Alî Bedirxan

Barê kerê li ser pişta deveyê bûn

Ji bo tiştên nelayîq û binakokî tê bikaranîn. **Çi bikim dayê? Qedera Xwedê ye, carinan jî, **barê kerê li ser pişta deveyê ye**.*

Barê ketiyan rakirin (hilgirtin)

Ji kesên hewcedar re alîkarî kirin. **Ew mirovekî wisan e ku **barê ketiyan rakirin**, ji bo wî tiştekî asahî ye.*

Barê pişta (yekî) bûn

1. Ji karên olam û suxre re tê gotin. **2.** Ji bo karên ji bêgavî divê bên kirin re jî tê gotin. **Ew ê jî ji ber ku rûyê min nerm dîtiye, ew yek jî kiriye **barê pişta min**. *Ez jî dizanim ku ew **barê pişta min e**, divê ez pêk bînim.*

Barê xwe dagirtin

Bi heramî û neheqiyê di hêla aborî de pêşve çûn. **Wî jî **barê xwe dagirtiye**, bawer im ku ew ê jî di demeke kurt de bireve derveyî welat.*

Barê xwe danîn

1. Zarok anîn, hemla xwe danîn. **2.** Ji binbarî û giraniyekê rizgar bûn. **Piştî heft salan dema ku bûka wan hemla xwe danî, hemû malbat şad bû. *Dema ku Şewqî dîplomeya xwe girt, weke ku **barekî giran ji ser pişta xwe dayne** rehet bû.*

Barê xwe giran kirin

Ji ber çewtî, nezanî û kêmasiyan ziyan dîtin. **Keçika min, bi van kirinên xwe yên ne di cih de te **barê xwe hê girantir kir**.*

Barê xwe girtin

bnr: Barê xwe dagirtin

Barê xwe hilgirtin

Binbariya xwe bi cih anîn. **Wî guh neda kesî, barê xwe hilgirt û hew*

Barê xwe li (yekî) din kirin
Karê xwe xistina stûyê hinekên din. **Nesîm mirovekî pir qûn boş e, hema yekî digere* ***ku barê xwe lê bike****.*

Barê xwe li tajiyê kirin
bnr. Holika xwe li golikê kirin

Barê xwe li yê yekî din xistin
Bi yekî din re rekabet kirin. *****Barê xwe li yê yekî din xistin****, di her mercê de ne rast e.*

Barê xwe pê rast kirin
Karê xwe pê dîtin. Tenê ji bo berjewendiyên xwe bi kar anîn. **Wî* ***barê xwe bi me rast kir****, dû re jî piştа xwe da me û çû.*

Barê xwe sivik kirin
Kar ber bi qedandinê ve birin. **Seyranê bi çi zehmetî zarokên xwe mezin kirin, lê êdî ji vir û bi şûn de* ***barê wê dê sivik be****.*

Barê xwe zanîn
Ji rewş û berpirsyariya xwe agahdar bûn. Di derka binbariya xwe de bûn. **Rast e, îro hinek kêmasiyên min hene, lê ez* ***barê xwe dizanim.***

Barê (yekî) kifş kirin
Zêdetir ji bo çendaniya qelenê bûkê yan jî berpirsyariya kesekî zelalkirinê tê bikaranîn. **Heyran me qebûl e, lê divê hûn* ***barê me kifş bikin*** *ku em li gorî wê xwe amade bikin.*

Barê (yekî) rast bûn
Karê yekî baş meşîn. **Şikir ji Xwedê re ev çendek e, êdî* ***barê lawê min rast bûye.***

Barê (yekî) rast kirin
Alîkarî dan yekî. **Dîsa di tengasiyan de Rewşen* ***barê min rast dike.***

Barê (yekî) teqilandin
Rewş û armanca yekî seh kirin. **Qet meraq nekin, min* ***barê wî teqilandiye*** *û ez baş dizanim di barê wî de çi heye.*

Barê (yekî) tesele kirin
bnr. Barê (yekî) teqilandin

Barê (yekî) xwar bûn
Karê yekî xera bûn. **Xwedê* ***barê kesekî xwar neke****, îro* ***barê wî xwar bûye****.*

Bargiranî kirin (derxistin)
Zehmetî û astengî kirin. **"Kerê din ne wekî yê pêşîn bû; wî bargiraniyeke mezin ji xwediyê xwe re dernedixist."* Zinar Soran

Bask lê sist bûn
Pozîde bûn, hêvî şikestin. **Bi bihîstina wê nûçeyê re* ***baskê Ferzende sist bûn****.*

Bask lê şikandin
bnr. Bask rûçikandin.

Bask rûçikandin
Perîşan kirin. Ji hêz xistin. **Çima ku Sulho li hemberî Mûso Axa çend tişt gotin, wisa kirin ku* ***baskên wî rûçikandin***.

Baskên firindan dixurînim, destê cehşa naqurînim.
Ez ê tiştên herî zor bikim, lê nakevim bin mineta kesên xerab. **Hûn çi dikin bikin, ez* ***baskên firindan dixurînim lê destê cehşan naqurînim***.

Basko kirin
Yek xistin rewşek xerab. **Heke ew hinekî jî pêş de here, ezê wî* ***basko bikim***.

Baş li me nagerin, pîs jî ji me venagerin (danegerin).
Kesên baş na, lê yên xirab dev ji yekî bernadin. **Lê mixabin,* ***baş li me nagerîn, pîs jî ji me venagerin***.

Baş e, baş e, lê hebekî qûna wî/ê li paş e.
Ji bo tirene kirin û neecibandinê tê gotin. **Erê, Hezîme Xanim* ***baş e, başe, lê hebekî qûna wê li paş e.*** (qerf, argo)

Bav harsim dixwe, diranên kur disekihin (diseqin).
Bi hev ve têkildar bûn. **Wisa ne hêsan e hevalo! Çi gotine:* ***"Bav harsim dixwe, diranên kur disekihin."***

Bav Îsa ye, çiqas dirûne (rûdine) dîsa ye.
Ew ew e, zêde nayê guherandin. **Kê çi dibêje bila bibêje, ma wisa hêsan e,* ***bav Îsa ye, çiqas dirûne dîsa ye***.

Bav ji êş tê, kur jê pirsa bajêr dike.
Her kes di nav heyr û xeyalên xwe de ye. **Her kesek derd û daxwazeke wan heye.* ***Bav ji êş tê, kur pirsa bajêr jê dike***.

Bav ji êş tê, kur saloxan dide.
Carinan yên bêked û bedel nedayî ji yê kedkar zêdetir derdikevin pêş. **Ev jî tiştekî wisa ecêb e heyran,* ***bav ji êş tê, kur saloxan dide***.

Bav ji gorê rakirin
bnr. Bavê hev du ji gorê derxistin

Bav ji hev re çêkirin
bnr. Bavê hev du ji gorê derxistin.

Bav ku ev bav be, ewledê ku jê bikeve gelo wê çawa be?!
Ji xeraban xerabtir dikeve. **Hema ez metel im!* ***Bav ku ew bav be, ewledê ku jê bikeve gelo wê çawa be?***

Bav kuştî dê kuştî

Inyat kirin. Israr kirin. *"*Min pihîn lêda,* ***bav kuştî dê kuştî****, tu car naçime xwendinê."* Veysel Çamlıbel

Bav ling hilanî, kur deh li şûnê danî.

Ji bo şibandinê tê bikaranîn. **Heçiya Berzan e, welehî hema* ***bav ling hilanî ye, kur deh ling li şûnê danî ye****.*

Bav rezek da law, law guşlek tirî neda bav.

Ji bo fedakarî û girêdana dê û bavan tê gotin. **Ev jî tiştekî xwezahî ye her hal.* ***Bav rezek da law, law guşlek tirî neda bav.***

Bavê (yekî) cendirme bûn

Çavbel û kone bûn. **Lawo ma* ***bavê te cendirme ye****, tu wisa xwe didî pêş?*

Bavê feqîran bûn

Ji feqîr û xizanan re alîkarî kirin. **Bi rastî jî ev Mamoste Resûl, tam* ***bavê feqîran e.***

Bavê felekê bûn

Bişans û qismet bûn. **Maşeleh, Delîl* ***bavê felekê ye****. Karê wî tim baş dimeşe.*

Bavê hev anîn pêş çavê hev

bnr. Bavê hev du ji gorê derxistin

Bavê hev du ji gorê derxistin

Hev û din rezîl kirin. Çêr kirin. **Dema ku Çîlê û Gulçînê berê xwe dane hev,* ***bavê hev du ji gorê derxistin****.*

Bavê hev şewitandin

Zirar gihandina hev û din. **Ji dest wan her û du aliyan jî bê, wê* ***bavê hev û din bişewitînin****.*

Bavê Naso naxirvan e, ker û golik berdane, di dest de maye xeberdan e.

bnr. Merdan, kerî surî gişk derdan, di dest de maye xeberdan

Bavê qîzan, wekî rûnê hîzan

Ji ber ku derfet di destê wan de ne, bavê qîzan serdest in. ***Bavê qîzan, wekî rûnê hîza.*** *Mêrikî bavê qîzê ye, divê hûn hinekî bi hurmet nêzîk bibinê.*

Bavê Seyro bang kirin

Kêf û şahî kirin. **Zarokên wan şer dikirin, wan jî* ***Bavê Seyro bang dikirin****.*

Bavê te mirê mûyek e, birayê te mirê mûyek e, te çi bi ser de kûkekûk e.

Ji ber teralî û canheziyê, kar û xebat di serê xwe de mezin kirin. **Diya min ji bo mirovên wiha teral tim digot:* ***"Bavê te mirê mûyek e, birayê te mirê mûyek e, te çi kûkekûk e."*** (bnr. çîrok)

"Bavê te mirê mûyek e, birayê te mirê mûyek e, te çi bi ser de kûkekûk e."

Bûk ji ber şehkirina hinek mûyan pir aciz dibe û li ber çavê xwe gelekî mezin dike. Tim di ber xwe de dike çineçin, dest û piyên wê li hev dipiçikin. Xwe aciz dike. Nikare ji nav wî karê piçûk derkeve. Canê xwe gelekî zer dike. Xesûya wê ku vê rewşê dibîne, hêrs dibe û jê re wer dibêje: *"Bavê te mirê mûyek e, birayê te mirê mûyek e, te çi bi ser de kûkekûk e?"*

Bavê xwarinê bûn

Tenê li berjewendiyên xwe fikirîn. **Ew tenê **bavê xwarinê ye**, ji bilî wê bi kêrî tiştekî naye.*

Bavê xwe kuştiye, bi gorê sond dixwe.

Ji bo tiştekî an jî karekî bedelên giran dan. **Hûn dibêjin Fesîh jina xwe bi behîvan xwedî dike. Kuro ma hûn nizanin ku **wî bav kuştiye ku bi gorê sond bixwe**?* (bnr. çîrok)

Bavê xwe nas nekirin

1. Pir hêrs bûn. **2.** Eslê xwe winda kirin. *Dema ku hêrsa Berzencî tê, qet bavê xwe jî nasneke. **Kemal ew mirov e ku bavê xwe nas nake, tu yê çi ji wî bigirî?*

Bavê (yekî) Xwedê bûn

Pir bişans û biderfet bûn. *****Bavê te Xwedê ye**, ma tu êdî çi dixwazî?*

Bavkuştiyê mirov bûn

Dijminê herî mezin bûn. **Çi dibe bila bibe, **bavkuştiyê mirov be** jî bila bi namûsê terbiye nebe.*

Bavo bavo kirin (Bavî bavî kirin)

Hewarî kirin, alîkarî xwestin. **Di dawiyê de wî jî **bavo bavo kir**, lê mixabin pir dereng mabû û tu kes pê nehesiya.*

Bavo bavo! Pisîkê donê simbêlê te xwar.

Xwe ji rewşa xwe ya rasteqînî cudatir û şimşat nîşan dan. **Got, **bavo bavo pisîkê donê** simbêlê **te xwar**. Rohat hewayeke zengîn li ba me difûrand lê jina wî defa wî dirand.* (bnr. çîrok)

Bavo hûn çima ker ker xeber nadin? (Bavo ka hinekî ker ker xeber bidin. "Qala wê meseleya ker tê de bikin")

Li gor çîroka biwêjê tê wateya dilxweşkirinê. **Bibexşînin, lê wekî ku lawik ji malbata xwe re gotiye: **"Bavo, hûn çima ker ker xeber nadin?"** Ka hûn jî çima qala dibistana min nakin?* (bnr. çîrok)

---

*"**Bavê xwe kuştiye, bi gorê sond dixwe.**"*

Xortekî ku simbêlên wî nû xweh dide, bala xwe didiyê ku gelek mirov dema ku sond dixwin hema dibêjin: *"Na, bi gora bavê xwe", "Erê, ez bi gora bavê xwe", "Tobe, ez bi gora bavê xwe kim", "Bi gora bavê xwe ez haj pê nîn im."* û her wekî din. Ev sond gelekî li xort xweş tên, lê ji ber ku bavê wî sax e ew nikare bi gora bavê xwe sond bixwe. Lawik lê mêze dike ku wer nabe, heya ku bavê wî nemire ew nikare bi gora wî sond bixwe. Rojekê bal lê tîne û bavê xwe bi awayekî dizî dikuje. Êdî ji wê rojê bi şûn de bi eşq û bi serbilindî dibêje: *"Erê, ez bi gora bavê xwe kim!.."Na, ez bi gora bavê xwe kim, ez haj pê nîn im! Ez bi gora bavê xwe..."*

*"**Bavo bavo! Pisîkê donê simbêlê te xwar.**"*

Miroveki pir bifors, tirpewa û fîtoz hebûye. Di heman demê de gelekî jî feqîr bûye. Ev mirov hinek donê bizinan bi dest dixe û hildide cihekî bilind ku destê kesî negihîjiyê. Her dem çaxa ku wê ji mala xwe derkeve here nav civatê, ji wî rûnî hinekî tîne li simbêlên xwe yên pal dide, dibiriqîne, şeh dike û dîsa hildide cihê wî. Bi vê helwestê dixwaze ku yên wî dibînin, bila him wî xweşik û bedew bibînin, him jî bibêjin: *"Wa ye mêrik di mala xwe de qelî yan jî xwarinên birûn dixwe ku simbêla wî di rûn de maye."* Bi wê simbêla xwe ya birqonek gelekî xwe qure dike û forsê dike. Malbata wî hemû jî dizanin ku donê simbêlên wî pir girîng e. Ji bo wê jî kesek newêre destê xwe jî bidiyê. Rojekê dîsa ew kes di nav civatê de rûniştiye û simbêlên xwe bi awayekî serbilindî ba dide. Ji nişkê ve keçika wî bi hewar dikeve hundir û diqîre: *"Bavo, bavo! Pisîkê donê simbêlên te xwar!.."*

"Bavo hûn çima ker ker xeber nadin?"

(Qala meseleya ker tê de kirin. Bavo ca hinekî ker ker xeber bidin.): Malekê pir feqîr hebûye. Ji mal û milkê dinê tenê kerekî

Bavo, min bivirek dît. Got: "Kanê?" Got: "Min winda kir."

Ji bo tiştên derew û bêbingeh tê gotin. **Heyran ev gotina te wekî meseleya ku dibêjin, lawik gotiye:* ***"Bavo, min bivirek dît. Got: "Kanê?" Got: "Min winda kir."***

Bavo pîvaz naxwe, dibêjin şekir bixwe.

Ev biwêj, ji pîvazê hezkirina Kurdan tîne ziman. **Tu li min û vî yê bêfêm binêre,* ***bavo pîvaz naxwe, dibêje şekir bixwe****.*

Bavwindayî (bûn)

1. Eslê xwe winda kirin. **2.** Ji bo kesên esil û esasê wan ne kifş e jî tê gotin. **Di dawiya dawiyê de em man gumana wî bavwindayî... *Belasebeb ji wî re nabêjin bavwindayî, bi rastî ew bi xwe ji nizane ji ku hatiye.*

Bawelî bûn

Xwe winda kirin. Wekî serxweşan bûn. **Ev çend roj in ku rewşa Zînê baş xuya nakê, tu dibêjî* ***bawelî bûye****; qet haya wê ji wê tune ye.*

Bawerî dan

bnr. Hêvî dayîn

Bawerî pê anîn

Pê ewle bûn. **Me got baş e, me* ***baweriya xwe pê anî*** *lê di paşila wî de jî xaçek derket.*

Bawerî pê dan

bnr. Bawerî pê anîn

Bawerî pê hatin

bnr. Bawerî pê anîn

Bayê anî, bagerê bir

Çawa bê, wisa jî diçe. **Jixwe her tişt wekî kok û binyata xwe encam dide.* ***Bayê anî, bagerê jî bir.***

Bayê bêndera (yekî) hatin

Şans baş meşîn, kar baş bi rê ve çûn. **Qet destê xwe medinê, îro roj roja Mehmed e, îro* ***bayê bêndera wî hatiye.***

Bayê birûskê lê xistin

bnr. Bayê cinan lê xistin

---

wan hebûye. Lawekî malê yê berzewac jî hebûye. Zewaca wî jî wê demê ji rojevê qet nakeve. Her roj dibêjin: *"Em ê kera xwe bifroşin, pê destmîgariya kurê xwe bikin.. Em ê kerê bifroşin, pê mesrefa defû dewatê bibînin. Em ê kera xwe bifroşin qelenê bûka xwe bidin û hwd..."*

Rojekê malbat dîsa sohbet dike lê qet kes qala kerê û zewaca xortê malê nake. Ev rewş li xort xweş nayê. Di dawiyê de dipeqe û dibêje: *"Bavo, hûn çima qet ker ker xeber nadin."*

Di guhertoka din de jî xort dixwaze ku dîsa qala zewaca wî bikin, lê mixabin wê şevê her kes ketiye halê xwe û qet napeyive. Lawik ji diya xwe re dibêje: *"Dayê hûn çima qet naaxivin?"*

Dayîk bi awayekî bê xem dibêje: *"Lawo em westiyane, halê me tune. Ka em ê qala çi bikin?"*

Lawik ne bi awayekî rasterast lê bi îma wer diya xwe dibersivîne: *"Qala wê meseleya ker tê de bikin."*

Bayê dilan pê girtin

Ji ber evîn û dildariyê ketina rewşên eletewş. **Zef zêde jî bi ser de neçin, ma lûn nabînin, wa ye **bayê dilan bi wî girtiye**.*

Bayê ecem e, çend qurişên me li cem e.

Ji bo rewşa ne zelal, bêbawer û girêdayî rasthatinan tê gotin. **De weleh ez çi bibêjim, **bayê ecem e, çend qurişên me li cem e**, de ka çawa, her Xwedê dizane.*

Bayê felekê li ber guh ketin

Rastî rewşek neyînî hatin. *"*Çi sûc û gunehên wan zarokan hebû? Çima **bayê felekê li ber guhên wan ketibû**."* Mehmed Uzun

Bayê hebanê li ber çûn

Şek şikestin, sênc û moral xerab bûn. **Bavê Zelêxê xwe gelekî diwerimand, lê piştî ku fêlên wî derketin holê, **bayê hebana wî li ber çû**.*

Bayê kalikê (yekî) vemirîn

Kêf û coş tunebûn. **Lawo çi ye **bayê kalikê te vemiriye**, ma îro roja sekinandinê ye?*

Bayê kîr li serê (yekî) xistin

Ji bo mêrên ku di hêla zayendî de pir daxwazkar in tê gotin. **Dixuye ku **bayê kîr li serê Silo xistiye**, ka hela zaxirî li ku bisekine.*

Bayê lê xist, bir çû ber tira golikan.

Bêrûmet bûn. **Piştî ku zavayê xwe hilda mala xwe, **bayê li Tefîqê Reşo xist bire ber tira golikan**.*

Bayê sar lê ketin

Dest û pê negirtin. Felç bûn. **Piştî ku **bayê sar lê ket**, te digot ew çûye û yekî din hatiye.*

Bayê şîn pê ketin (Bayê şîn ketin dêst)

Dest seqet bûn, şil bûn. **Ma **bayê şîn ketiye destê te** ku tu nikarî avekê jî vexwî?*

Bayê tu anî, bagerê tu anî?

Tu ji ku derketî? **Qurban tu ji ku derketî, **bayê tu anî, bagerê tu anî**?*

Bayê xortaniyê lê hatin

Ji ber hêz û geşa ciwaniyê coşîn. **Dem dema wî ye, **bayê xortaniyê lê hatiye**, divê mirov zêde jê xeber nede.*

Bayê (yekî) bilind bûn

1. Rewşa yekî baş bûn. **2.** Xwe qure kirin. **Maşelah îsal bayê Xêredîn baş **bilind bûye**.* **Bayê Gulistanê bilind bûye** kesî pêş xwe wek mirovan nabîne.*

Bayê (yekî) lê hatin

Wekî berjewendî û daxwaza yekî bûn. **Wa ye îro **bayê Sînan lê hatiye**, ka wê sibehê çawa bibe?*

Bayê (yekî) li ber çûn

1. Pesin vala derketin. Derewa yekî derketin meydanê. **2.** Piştî hêrs û acizbûnê hinekî sakîn bûn. **Roja ku hespê wî ew pêşbaziya fermî winda kir,* ***bayê Marûf li ber çû.*** **Ji ber lawê xwe duh gelekî hêrs bibû, lê va ye îro hinekî* ***bayê wî li ber çûye.***

Bayê (yekî) rabûn

Karê yekî baş çûn. Siûd lê hatin. **Şikir ji Xwedê re êdî* ***bayê Tajdînê min rabûye.***

Baz bi bazan, qaz bi qazan, mirîşka kor bi dîkê kulek re

Her kes hunkuf û hempayê xwe dibîne. **Lawo helbet tu yê bizewicî lê divê mirov hempayê xwe bibîne. Çi gotine?* ***Baz bi bazan, qaz bi qazan, mirîşka kor bi dîkê kulek re.***

Bazar qewîn bûn

bm: Bazara cihûyan kirin

Bazara cihûyan kirin

Di danûstendinê de gelekî tund û hişk bûn. **Eman bi Xalê Heşto re mekevin bazarê,* ***bazara wî bazara cihûyan e.***

Bazara xwe xweş kirin

Karê xwe bi pêş ve birin. **Maşelah Azad* ***bazara xwe xweş kiriye,*** *karê wî baş dimeşe.*

Bazinê stûyê (yekî) şikestin

Rastî belayekê hatin. **Lawo te ez şewitandim; ez ji Xwedê dixwazim ku* ***bazinê stûyê te bişikê!*** (nifir)

Bazirgan bêxwedî ye, kes nizane para kê ye.

Malê ku xwediyê wî lê xwedî dernekeve, ji xelkê re dimîne. ****Bazirgan bêxwedî ye, kes nizane para kê ye.*** *Tu ku baş lê xwedî dernekevî, helbet wê ji xwe re tar û mar bikin.*

Bedena (yekê) şîn bûn

Zarokên kesekî çêbûn. **Çiqas derzî û derman lê xistin jî lê* ***bedena Sîdarê şîn nebû.***

Bedewê çav kil kir, dilê xortan tev kul kir.

Bandora jinên nazdar, şeng û bedew li ser mêran gelekî çêdibe. **Loma gotine:* ***"Bedewê çav kil kir, dilê xortan tev kul kir."*** *Vê keçikê aqilê lawê min ji serê wî biriye.*

Bedewê here, xêr ji bazara te nayê.

Daxwaz û helwestên neyînî nepejirandin. **Lê dema ku ez armanca wê hîn bûm, min got,* ***bedewê here xêr ji bazara te nayê!***

Begîtiya mîrê min heya êvara reş e.

Ji bo kesên dawiya karên wan pûç in tê bikaranîn. **Min ji we re negot, gelekî wisa hêvîdar nebin û piştê pê girê nedin,* ***begîtiya mîrê min heya êvara reş e.***

Behra aqilan bûn

Ji bo kesên zêde ne jîr tê bikaranîn. **Xwedê biparêze keça Silêman* ***behra aqil e****, ev sê sal in ku di eynî sinifê de dimîne.* (qerf)

Behra şîn e, av tê de nîn e.

Ji derve ve xweş xuyakirin, lê di hundir de qelsî hebûn. **Ji derve ve kî li me dinêre, niha dibêje: "Bextewar li serê wan be", lê nizanin ku* ***behra şîn e, av tê de nîn e****.* (qerf)

Behrek jê girtin

Jê kêrek girtin. **Ma ew jî însan e ku* ***mirov behrekê jê bigire****?*

Behsa gur e, gur hazir e.

Tiştê ku mirov gelekî qalê bike û têkildar be, bi mirov diqelibe. ****Behsa gur e, gur hazir e.*** *Rosto ji yara xwe re qala jina xwe dikir, hema di wê demê jî jina wî li wan derket.*

Bejî bejî xeberdan

bm: Çelderen pelderen xeberdan

Bejn biriqî, dil xeriqî

Bi xuyang û birqonekiyê xapîn. ****Bejn biriqî, dilê Kemo xeriqî****, çawa ku çav bi Dîlanê ket hema wê êvarê dilînî bû.*

Bejn di erdê de çûn

Gelekî şerm û fedî kirin. **Dema ku diya wî derî vekir û ew di wî halî de dît, hema* ***bejna Serdar di erdê de çû xwarê.***

Bejn şehr e, mal jehr e.

bm: Bejna min şehr e, dilê min jehr e

Bejn lal e, (bila) nebêjin tiral e.

Ji derve ve xwe xweş xuyan dan. ****Bejn lal e, bila nebêjin tiral e.*** *Hema rewşa Mûsa tam jî wisa ye.*

Bejn revandin

Bejn zehf dirêj bûn. **Di nava van şeş mehan de* ***bejna Erez tu dibêjî revandin****.*

Bejn tît e, mal mecît e.

Ji bo kesên ku di mal de nanê xwarinê nîn e, lê ji derve ve bejn û bala xwe pir xweş çêdikin û forsê davêjin tê bikaranîn. **Rast e ser û guhê xwe û forsa xwe baş mêze dike, lê* ***bejn tît e, mal mecît e****.*

Bejn û bal avêtin

Mezin û gir bûn, bejndirêj bûn. **Maşelah îsal Xebûr baş* ***bejn û bala xwe avêt****.*

Bejn wekî şitla rihanê bûn

Bejnzirav bûn. **"Beriya ku tevlî karê şoreşê bibe,* ***bejnzirav wekî şitla rihanê bû****."* Samî Berbang

Bejn zêrezer dil jehrezer e.
bnr: Bejna min şehr e, dilê min jehr e.

Bejna heyranê her kiras lê tê.
Di nav helwesta baş de jî xirab de jî cih girtin. **Wekî ku dibêjin:* ***"Bejna heyranê her kiras lê tê."*** *Maşelah ew jî kete her boyaxê.*

Bejna (yekî) li erdê ketin
Mirin. **Weyla* ***bejna wî li erdê ketî****, wî wisa kir ku rûyê me gştî reş derket.*

Bejna min şehr e, dilê min jehr e.
Ji derve ve bi awayekî din, ji hundir ve awayekî din bûn. **Belê bavo tu wekî van cil û kincên min yên rengîn rewşa min nenirxîne.* ***Bejna min şehr e, lê dilê min jehr e.***

Bejna xwe li ber (yekî) xwar kirin (tewandin)
Rêz û rûmet nîşan dan. **Siyasetmedarên kurd, yên li serê çiyan, ne wekî yên din bûn, bi rastî jî gel* ***bejna xwe li ber wan xwar dikir****.*

Bejna xwe nîşan dan
Zêdetir ji bo hewldana xuyangê tê bikaranîn. **Edeta Mûsayê Şemê ye, li her derê heta* ***bejna xwe nîşan nede****, wê bibehece.*

Bejna xwe nû kirin
Cil û kincên nû li xwe kirin. **Wa ye Hesoyê Dîno jî* ***bejna xwe nû kiriye****.*

Bejna (yekî) pîvandin
Zerengî û naveroka yekî fêm kirin. **Piştî hevaltiya demekê bi şûn de Rizgo* ***bejna Simko pîvand*** *û bi rewşa wî ya rasteqîn hesiya.*

Bejna zirav, seriyê bêçav
Ji bo kesên di hêla fizîkî de bedew, lê bêmerîfet û bêaqil tê bikaranîn. **Erê rast e, bedew e, lê çi bikim* ***bejna zirav, seriyê bêçav****?*

Bekoyê Ewan bûn
Sixur û fesad bûn. **Ev lawê Çeto hema wekî* ***Bekoyê Ewan e****, tu bawer bike ku çi dibîne û dibihîze, digihîne diya xwe.*

Bela anîn ber derê xwe
Bi destê xwe ve ziyan gihandin xwe. **Wî jî nizanibû wê wisa bibe, lê mixabin wî bi xwe* ***bela anî ber derê xwe****.*

Bela derketin (hatin)ber piyan
Ji nişka ve li rastî qeza, bela û xirabiyan hatin. **Kamûran ew qasî xwe bi her kesî hil dikir, di dawiyê de* ***bela hate ber piyê wî*** *jî.*

Bela jê hatin
Tiştekî baş jê derneketin. **Hevaltiya wî ne hewce ye, tenê* ***bela ji wî tê****.*

Bela li ber ling bûn

bnr. Belaya (yekî) li ber deriyê wî bûn

Bela li ser serî gerîn

Di nav xeteriyê de bûn. **Xwedê biparêze, van rojanan* ***bela li ser serê Fazîlê digere****, ka dawî wê çawa bibe.*

Bela li serê xwe vekirin

Bi destê xwe, xwe xistin nav xeteriyan. **Miho li dor jinikê çû û hat, çû û hat heta ku* ***bela li serê xwe vekir****.*

Bela tê gerîn

Ketin nav pirsgirêkan, kul û derdan. **Bela ku di mirov gerî, rewş zor dibe.*

Bela û aşît bûn

Nojek û dir bûn.. **Heyran Gurzo* ***bûye bela û aşît*** *û bi ser me de girtiye.*

Belaya (yekî) li ber deriyê wî bûn

Bi kar û barên bixeter ve mijûl bûn. **Pêdiviya tiştekî din nîn e, jixwe* ***belaya Şerefedîn li ber derê wî ye****.*

Belaya xwe li hev dan

Bi hev û din re teşqele derxistin, bi hev du ketin. **Bi hev û din re baş bûn, lê wa ye wan jî* ***belaya xwe li hev dane****.*

Belaya (yekî) li xwe dan

Bi hemd an jî bêhemd bi kesekî re ketin nav rewşeke neyînî. **Wî rebenî jî nizanibû, hema bêhemdî xwe çû* ***belaya wî rezîlî li xwe da****.*

Belaya xwe dîtin

Li rastî xirabiya ku heqkirî hatin. **Wê ew qas anî serê bûka xwe, lê Xwedê jî ji heqê wê hat, wê jî ji hêla qîza xwe ve* ***bela xwe dît****.*

Belaya xwe firotin

bnr. Belaya xwe jê venekirin

Belaya xwe jê venekirin

Bûn belaya serî. Rehet bernedan. **"Tu, pisîka sorbelek, pir qirêj û gemar; kêç û şêj, tu çima* ***belaya xwe ji van mişkên reben û belengaz venakî****?"* Dr. Cuwan Batû

Belaya xwe ji Xwedê xwestin

Bi karên xeter re mijûl bûn. **Ya ku wî pê girtiye, hema tenê* ***belaya xwe ji Xwedê xwestin e****, ji bilî wê ne tu tiştekî din e.*

Belaya xwe pê gerandin

bnr. Belaya xwe jê venekirin

Belaya xwe jê venekirin
Xeterî gihandin yekî. **Zaharê Şero kir û nekir Qaso* ***belaya xwe jê venekir*** *û di dawiyê de ji ew bi xwe bi ser belaya xwe ve bû.*

Belaya xwe dehfandin ber derê hevalê xwe
bnr. Bela xwe rêçî ber derê yekî din kirin

Belaya xwe rêçî ber derê (yekî) din kirin
Pirsgirêka xwe avêtin stûyê hinekên din. **Berfo lê mêze kir pêk ku nayîne,* ***belaya xwe rêçî ber derê Ruhanê kir****.*

Belaya Xwedê bûn
bnr. Bela û aşît bûn

Belaya xwe tê dan
bnr. Belaya xwe jê venekirin

Belaya yekî têrdon li xwe dan
Ketina belayeke pir mezin. **Rewşa Îbo vê carê xerabtir e, vê carê tam* ***belaya yekî têrdon li xwe daye****.*

Belaya sibehê, qedaya êvarê
Yê ku li belayê bigere û karên xirab bike, di dawiyê de wê ziyanekê bibîne. ****"Belaya sibehê qedaya êvarê."*** *Me çiqasî got fêm nekir, di dawiyê de jî rastî wê belayê hat.*

Belaya xelkê ji çol û çiyan tê, ya min belengazê bi Xwedê ji ber lingên min tê.
Bêşans û bêrozgar bûn. **Qedera min qedereke reş e.* ***Belaya xelkê ji çol û çiyan tê, ya min belengazê bi Xwedê ji ber lingên min tê.***

Belaya zimanê xwe kişandin
Ji destê neyînî axaftinê xwe xistin nav zehmetiyan. **Qet destê nediyê, wî ew ceza heq kiriye, bi tenê* ***belaya zimanê xwe dikişîne****.*

Belaya bidon bûn
Belaya dijwar bûn. **Ev lawê Gemşo* ***bûye belaya bidon*** *û ketiye riya min.*

Belayê neyê neyê, dema tu hatî li ser seran û li ser her du çavan.
Ji belayê bireve heya ji te tê. lê heke tu mecbûr mayî jî, heya ji te tê baş bixebite ku tu bi ser bikevî. **Gotine:* ***"Belayê neyê neyê, dema ku tu hatî, li ser seran û li her du çavan."*** *Lawê min, tim ji belayê bireve, lê heke ku tu çareya te tune be, hilde bide ser serê xwe.*

Belayê! Çavên reş û belek min ji te re kil dane.
Jixwe min jî xwe ji bo rojeke wiha amade kiriye. **Piştî ew qas derd kul û hêrsê, ew jî hatiye belaya xwe li min dide.* ***Belayê! Çavên reş û belek min ji te re kil dane.***

Belengazê aqilê xwe bûn
Ji ber kêmasî û çewtiyên xwe ziyan dîtin. **Heqê Qaso tune ye ku kesekî din tawanbar bike, hema ew bi xwe* ***belengazê aqilê xwe ye****.*

Belengazê Xwedê bûn

Bêzirar, sist, bêdeng û di halê xwe de bûn. **Bi neheqî sûc dikin stûyê Gevezê, her kes dizane ku ew* ***belengazeke Xwedê ye*** *tiştekî wisa nake.*

Belika guhê (yekî) xwê nedan

Qet paxav û talaş nekirin. **Dinya tev bişewite jî,* ***belika guhê Vedoyê Çarsim tu caran xwê nade.***

Belkî dengê dergûşa kurîn nekeve guhê te.

bnr. Belkî dergûşa kurîn nedî ber hembêza xwe

Belkî dergûşa kurîn nedî ber hembêza xwe.

Tu nebî xwedî zaroka kurîn! *****Belkî ew dergûşa kurîn nede ber hembêza xwe****, ev derdê giran wî anî ber derê me.* (nifir)

Belkî teyrok zeviya te bikute.

Çi ji destê min tê?* ***Belkî teyrok zeviya te bikute.* (nifir)

Belo ji Elo re got, ez ji çavê te yê kor bikim.

Ji bo rewşa ji hev zêde nedûr tê gotin. **Xwezî ew jî ji wî çêtir bûya li min zor nedihat, lê got,* ***Belo ji Elo re got, ez ê ji çavê te yê kor bikim.***

Ben bi lingan neketin

Bêrê û bêûsil û bêperwerde bûn û wekî zagon û rewşê hereket nekirin. **Min çawa ku ew dît, min fêm kir ku* ***ben bi lingên wî neketiye.***

Ben ji lingan ketin

Ji bin bandorê (kontrolê) derketin. **Dev ji Qafo berdin heyran, di vê dawiyê de rewşa wî guheriye,* ***ben ji lingên wî ketiye.***

Ben li serê neêşandî girê dan

Li cihê sekinî jixwe re pirsgirêk derxistin. **Ez ne gêj im ku li cihê sekinî* ***benekî li serê xwe yê neêşandî girê bidim.***

Ben li serê (yekî) alandin

Li serê (yekî) fek û tele çêkirin. **Min got ez herim hinek alîkariyê bikim, lê min nizanîbû ku ew ê* ***ben li serê min jî bialînin.***

Bend bizdandin

Ji tengasiyê rizgar bûn. **Belê, wan gelekî îşkence dît, lê di dawiyê de* ***bend bizdandin.***

Benderfêlî kirin

Bi binî ve û bi mebesteke nebaş karê xwe meşandin, zexelî kirin. **Dibe ku wan ji tay-betiyên din re çavên xwe bigirim, lê ji benderfêliya wî re çi bibêjim?*

Bendikê rûto dudu ne, çavê wî li min, çavê min jî li (yekî) din e.

Her kes li gorî rewş û armancên xwe bendî kesekî yan jî tiştekî ye. **Çi gotine?* ***"Bendikê***

rûto dudu ne, çavê wî li min, çavê min jî li yekî din e." *Belê, rewşa min û Fetulah jî hema rewşeke wisa ye.*

Benê (yekî) berdan

Yek serbest hiştin. **Min benê wê berdaye**, *çawa dike ew dizane.*

Benê li dû şûjinê bûn

Di bin bandora hinekan de bûn. **Wekî mirîdên şêxan, Evdo jî li pey wî bûye benê li dû şûjinê.*

Benê pişta (yekî) qetîn

Di bin zor û zerpê de man. **Dibe ku ji dûr ve hêsan bê xuyan, lê ya rastî heta min ew kar bi dawî anî, benê pişta min qetiya.*

Benê piya bûn

Asteng û bergir bûn. **Kengê firsendeke girîng ji bo min derket, kurdbûna min tim bû benê piyê min.*

Benê (yekî) ragirtin

bnr. Hefsarê yekî kişandin

Benê xwe qetandin

Ji rewşa tengasî û xerabe rizgar bûn. **Di dawiyê de wan jî çavên xwe vekirin û benên xwe qetandin, bi tenê em man li vê hêlê.*

Bengîn e, xew lê nîn e.

Mirovên bengîn (aşiq) tim di nav xiroş û tatêlê de ne. **Bila kes ji wî re tiştekî nebêje, ew mirovekî bengîn e û xew jê re nîn e.*

Benik di guh re kirin

Şiyar kirin. **Heke te benik di guhê wê re nekira, wê qet xwe amade nedikir.*

Benik kirin stûyê (yekî)

bnr. Benik li stû danîn

Benik li stû danîn

1. Zewicandin. **2.** Xistin bin bandora xwe. **Di dawiyê de diya wî qîza xwîşka xwe jê re xwest û benik li stû danî. **Mala xezûrê Serkar, benik stû danî û ew ji dê û bavên wî qetandin.*

Benikê li pey hebanê bûn

Yek tim aciz kirin. **Ev jî bûye benikê li pey hebanê, dikim nakim nikarim xwe jê xelas bikim.*

Benîşt cûtiye, xem û xeyal ji dilan çûye.

Xwe li bêxemî û bêariyê danîn. **Ji Belgînê re çi, hurmetê benîştê xwe cûtiye, xeyal ji dilan çûye.*

Benîştê devê xelkê bûn

Bûyîna mijara gotegot, qerf û qala gelek kesan. *\"Azmûna lîseyê nêzîk bûbû, min nema karibû daketama nav xelkê. Bûbûm ***benîştê devê*** endamên partiyan...\" Helîm Yûsiv

Benîştê xwe, bi awayê xwe cûtin

Her kes li gorî awa û rêbaza xwe tev digere. *Hûn çi ji Tahar dixwazin? Ew jî ***benîştê xwe bi wî awayî dicû***.

Benîştê xwe cûtiye, bi netika xwe ve daniye.

Xwe li bêariyê danîn. Bêar û bêşerm bûn. *Ji Belgîn re çi, wê ***beniştê xwe cûtiye û bi netika xwe ve daniye***.

Benîştê xwe lê danenîn

Girîng negirtin. *Ew kî ye kuro? Ez ***benîştê xwe jî lê danaynim***.

Beq xesandin

bnr: Kêç xesandin

Beqa nekirin

Bêdeng û bêhes (his) mirin. *Mirina Rizgar jî wekî jiyana wî bû, qet ***beqa nekir***.

Beqê çav da çêlekê, zikê wê teqiya.

Yên ku li gorî zerengiya xwe tevnegerin, ziyanê dibînin. *Ezbenî, her kes li gorî hempayê xwe; ***beqê çav da çêlekê, zikê wê teqiya***.

Ber avêtin

bnr: Ber ji ber ketin

Ber bi eceIê xwe ve revîn

Di nav tevger û helwesteke pir xeter de bûn. *Xwedê axiriyê xêr bike, ya ku Sêvo pê girtiye, hema ***ber bi ecelê xwe ve revîn e***.

Ber bi dil ve hatin

Li ber gerîn. Dilê yekî hênik kirîn. *\"Kûrekûra zarokan bû, digiriyan. Min pişta xwe vedikir, her du zarok jî dikirin paşila xwe, germ dikirin û ***ber bi dilê wan de dihatim***, ku negirîn.\" Erebê Şemo

Ber bi mino, hay ji xwe tino

Ji bo min hin tiştan difikirc, lê hesabê xwe baş nekiriye, hay ji rewşa rasteqînî jî nîn e. *Berbî mino, lê hay ji xwe tino... Bila ew xwe wisa amade bike, lê ditirsim ku bi xwe dawiya xwe nebîne.

Ber bi (yekî) ve çûn

Li hemberî yekî tavîz dan. Ji lihevhatin û têkiliyên erênî re nêzîk bûn. *Selehedîn mafdar bû, lê dîsa jî ew ***ber bi Reşo ve çû***.

Ber bi xwe ve kişandin

1. Berjewendiyên xwe li pêş girtin. **2.** *Ji bo alîgiriya hêla xwe, di nav hewldanan de bûn.*

Gawirê Xalitê tucar hema çi hebe **ber bi xwe xwe ve dikişîne. *Di hilbijartinên şaredariyê de partiya nijadperest ji bo gel **ber bi xwe ve bikişîne** gelek bertîl dan.*

Ber dasa xwe fireh kirin

Karê xwe pêşve birin. **Xêro pêşî bi erebeya destan dest bi kar kir, dû re pêl bi pêl **ber dasa xwe fireh kir**.*

Ber dayîna hespê xwe

Pesnên xwe dan, têfirandin. **Rast e. Çetoyê Fezende gelekî **bera dide hespê xwe**, lê rewş ne wekî gotina wî ye.*

Ber dil girtin

Bi hindik xwarinê birçîbûna xwe kêm kirin. **"Ji bo ku ber dilê min bigire, min pariyek nan xwar."* Zana Farqînî

Ber ji ber ketin

Ji bo însan an jî heywanên ku di dema xwe ya asahî de nazên, loma jî çêlikên wan dimirin tê gotin. **Wê hûkê ji ber ku qet guh nedida xwe, di axiriyê de **ber ji ber ket**.*

Ber[1] li serî, yan serî li berî, her serî wê bişkê.

A girîng encam e. ****Ber li serî, yan serî li berî, her serî wê bişkê.** Tu çawa dibêjî bibêje, di dawiyê de ev ziyan li serê min e.*

Ber negirtin

Hemle nebûn, zêde nebûn. **Ev çend sal in ku ev çêleka me ya reş **ber nagire**.*

Ber piyê (yekî) kirin

Yek arasteyî cihekî kirin. **Ew zelîf xebitî ku min **ber piyê wê bike**, lê min xwe nêzîkî wê nekir.*

Ber xwe nedîtin

Firsend nedîtin, serî pir qelebalix bûn. **Ka rebenî **ber xwe nedît** ku bi pirsgirêka wê keçikê re jî mijûl bibe.*

Beran çû zozanan, got ez ê xwe qelew bikim, rabû her du storên (qiloç) xwe jî li ser danî.

bnr. Çû heyfa bavê, qûna dê jî da ser

Beranê bisko bûya dê di nav pezê bavo de bûya.

Heke ya me bûya dê li ba me cih bigirta. **Dibêjin hunermend Farisê Dengzêrîn jî ji me ye, ez jî dibêjim, heke **beranê bisko bûya dê di nav pezê bavo de bûya**.*

Beranê çargurçikî bûn

Ji bo pesndayînê tê bikaranîn. **"Ez **beranê çar gurçik im**."* Çiya Mazî

---

[1] **Ber:** Ev peyv bi gelemperî di wateya berhemê de tê bikaranîn. Lê di heman demê de di wateya kevir de jî tê xebitandin. Di vir de di wateya kevir de ye.

Beranê zivistanê, mîna ava pizdanê

Di werza zivistanê de geşbûn û şeka mêraniyê jî kêm dibe. ***Beranê zivistanê, mîna ava pizdanê.*** *Bibore, lê vê zivistanê rewşa te jî hema ketiye heman encamê.*

Beravêtî kirin

1. Çêlika (zarok) xwe bi awayekî neasahî xistin. **2.** Gelekî zerp û zor lê xistin. **3.** Ji bo kesên ku tiştekî dixwin, lê nadin ê ku çavê wan lê ye tê gotin. **Wî hêbavî wisa li bizinê xistibû ku bizin* ***beravêtî kiribû.*** **Me çiqas got jî wî kurikê bêînsaf, ji çikolateya xwe, neda birayê xwe û ew* ***beravêtî kir.***

Berazî û Bagazî li vê navê bûne xal û xwarzî.

bnr. Yekî qerazî, yekî berazî, ji hev û din re bûne xal û xwarzî

Berbend girê dan (çêkirin)

Li çareyeke vebirî û mezin gerîn. **Xaltîka Şerîfe mêze kir nabe, dev ji niviştan berda,* ***berbend girê dan.***

Berbiçav bûn

Balkêş û bedew bûn. **"Keçika Hecî Silêman keçikeke* ***berbiçav e.*** *Çavê her kesî li ser e.*

Berde bila biçêre

Dev jê berde, çawa dibe bila bibe. **Tu çi ew qasî xwe aciz dikî lo!* ***Berde bila biçêre.*** (argo)

Berdest danîn

Tiştek ji bo ku dema lazim bibe, li cihekî nêzîk û kifş danîn. **Ji ber ku her tim lazim dibe, wî Ferhenga Kurdî-Tirkî* ***berdest datanî.***

Beredayî berdan

Serbest berdan. Bêserî berdan. **Na ne wisa ye, Zekî êdî ew* ***beredayî berdaye.***

Beredayî gerîn

Bêkar û bêemel bûn, teralî kirin. **Ne mal e, ne hal e, Amedê Xalid hema ji xwe re* ***beredayî beredayî li van kuçeyan digere.***

Bereket jê dûr ketin

Di nav helwestên nebaş de bûn. **Bawer im ku piştî wan kirinên wî,* ***bereket ji berê zêdetir ji Robar dûr ketiye.***

Bereket li emir ketin

Emir dirêj bûn **Lawo* ***bereket li emrê te bikeve,*** *tu nebûyayî, niha ez li wê holê mabûm.* (dia)

Bereketa dêw, (dew) di destê diya min de ye.

Merîfet û huner a pêkaniyan e. **Qet bila kes avê li ber hêlikê xwe wer nede, bereketa dêw di destê diya min de ye.*

Bereketa Îbrahîm Xelîlulah li ser ... bûn

Ji bo zêdehî û şêkirandinê dua kirin. **Me têr xwar, **bereketa Îbrahîm Xelîlulah li ser sifra we be**.*

Bereta li ser beretayan gerîn

bnr. Bûn bereta li ser beretayan

Berdeberdê (bûn)

Ji bo tevlihevî û xilaportê tê bikaranîn. Kî çi dike kifş nebûn. **Di wê **berdeberdeyê** de min qet nedît ew di ku de çû.*

Berederî kirin

Avêtin, qewirandin. **"Eger tu wiha tev bigerî, ez dê te **berederî kuçeyê bikim**."* Zana Farqînî

Berepaş çûn

1. Paşve çûn, rewş xerabtir bûn. **2.** Ketin nav rewşeke eletewş û ecêb. **Xelk hemû pêşve çûn, ew jî **berepaş çûn**. *Ew mirovnên sosret in, wisa **berepaş diçin** û mirov didine şermê.*

Berexêr bûn

Ber bi başbûn û silametbûnê ve çûn. **Apê Kerem pir nexweş bû, lê dibêjin ev çend roj in ku **berexêr bûye**.*

Berê gotinê diçe ku, zanebûn

Hay ji gotina xwe hebûn. **Tu qet nekeve tatêla wê, ew **dizane berê gotina wê diçe ku**.*

Berê gotinê guhartin

Piştî hin gotinan bi şûn de bi awayekî din peyivîn. **Nizanim çi fikirî dû re **berê gotina xwe guhart**.*

Berê heyvê li te be, stêrkên dorê çi ne?!

Heke derfet û hêza xurt li piştê mirov be, alîkarî û pêdiviya hêzên qels ne hewce ye. ****Berê heyvê li te be, stêrkên dorê çi ne?** Tu berde wan gede û gûdeyan, ê girîng Zeydan Axa ye.*

Berê merezî bû îcar teresê jî lê xist.

bnr. Berê rez ne tu rez bû, terezê jî lê xist.

Berê pir bigul bû, baranê lê xist şil bû.

bnr. Berê rez ne tu rez bû, terezê jî lê xist.

Berê rez ne tu rez bû, terezê jî lê xist.

Ji berê jî xerabtir bûn. *Wekî ku gotine: ***"Berê rez ne tu rez bû, îcar terezê jî lê xist."*** *Jixwe yeke tengezar bû, vêca ya ku hat serî jî rewşa wê hê xerabtir kir.*

Berê şekir û şîr, paşê şûr û tîr.

Berê bi xweşikayî, heke ku nebe dû re zor divê. **Bavê min digot: **"Berê şekir û şîr, paşê şûr û tîr."** Lê bi dîtina min divê em zêdetir bi azîna şekir û şîr bi ser kêşeyan de herin.*

Berê tevşo dan xwe

Tenê berjewendiyên xwe li pêş girtin. **Ehmedê Kemo wisa bû, hema **berê tevşo tim dida xwe**.*

Berê (yekî) bi ku de bikî, nabêje na.

Ji bo kesên rûnerm û milayîm tê gotin. **Ev Zerîn wek milyaketan e, **tu berê wê bi ku bikî nabêje na**.*

Berê xwe dayîn hev

Bi hev û din re pev çûn, li hember hev têkoşîn kirin. **Huso û Sertîf ji bo du gurz gîha **berê xwe dane hev** û hev û din rezîl kirin.*

Berê xwe dayîn oxirê, pişta xwe dayîn felekê

Ligel hemû zor, bela û xerabiyan dîsa jî karê xwe meşandin. Bi tewekulî ketina nav kar. **"Siwar dibe Deybqiran, Elebacaxî şêw destkêş dike û dertêye, **berê xwe dide oxirê, pişta xwe dide li felekê** ye."* Celîlê Celîl, Ordîxanê Celîl

Berê xwe dayîn (yekî)

1. Ji kesekî alîkarî xwestin. Xwe avêtina ber bextê yekî. **2.** Bi kesekî re pevçûn an jî devejenî kirin. **"Hingê hemûyan lêvên xwe digestin û biseyr **berê xwe didanê**."* Celal Mustefa **Belgîn jineke rezîl e, her roj **berê xwe dide cîranekê**.*

Berê xwe jê ba dan

Jê xeyidîn. Têkiliya xwe birîn **Heke wî **berê xwe ji me baneda**, karê me dê bibûya.*

Berê xwe jê guherîn

Têkilî sar kirin, rû nedan. ****Pişti wê bûyerê, Besrayê **berê xwe ji Nado guherî**.*

Berê xwe pê de kirin

1. Pê re têkildar bûn. **2.** Alîkarî kirin an jî xwestin. **Çima ku keçika wî revîbû, ancax piştî şeş salan **berê xwe bi qîza xwe de kir**.*

Berf barî û qulên keviran tijî kirin

Ji ber sedemekê, çewtî û guneh niximîn. **Çi xirabî anîn serê wan, lê piştî wê bûyerê **berf barî û hemû qûlên keviran tijî kirin**, îro jî wekî dostan xwe nîşan didin.*

Berf hatiye ku ling bicemide. (Berf hatiye ku lingan bicemidîne.)

Her tişt li gorî xwe bandorekê dike û encamekê dertîne. **Li ber xwe bide hevalê delal! **Berf hatiye ku lingan bicemidîne**.*

Berf heliya, ling weşiya.

Heya çare hate dîtîn, a xirab jî qewimî. *****Berf heliya, ling weşiya**, heya zarok mezin bûn jixwe emrê me jî qediya.*

Berf jî spî ye, lê kûçik li ser pîsiyê xwe dikin.

bnr. Berf jî spî ye, lê tam lê tune ye

Berf jî spî ye, lê tam lê tune ye.

Dibe ku hin tişt ji hêla xuyangê ve bişibin hev, lê ev nayê wê wateyê ku naverok û zerengiya wan jî wekî hev e. **Xwe şaş meke xorto!* ***Berf jî spî ye, lê tam lê tune ye.***

Berfa ber derê xwe rêçî ber derê cînarê xwe kirin

1. Binbarî û karê xwe xistina stûyê hinekên din. **2.** Tawana (sûcê) xwe kirin stûyê yên din. **Îsmaîl di qereqolê de ji bo ku xwe xelas bike,* ***berfa ber derê xwe rêçî ber derê cînarê xwe kir*** *û Cindoyê belengaz kir nav tirholka xwe.*

Berfa hûr, paşî (dawî) dûr

Ji bo kesên pir zana tê gotin. ****Berfa hûr, paşî dûr.*** *Tu wisa li wî mêze neke. Hay lo lo! Ew çi derya ye.*

Berfa hûr, xwe avêt ranê stûr.

Tiştên biçûk û zirav carinan bi awayekî kûr bandorê dikin. ****Berfa hûr xwe avêt ranê stûr.*** *Kesî ji wan ev hêvî nedikir, lê herî zêde wan deng veneda.*

Berfê girte serê çiya, ziravê hirçê bêderb çiriya.

Tiştên ku ziyanê didine mirov, dibin sedema tirsê jî. **Ew tirs jî girêdayî jiyanê û berjewendiyê ne,* ***berfê girte serê çiya, ziravê hirçê bêderb çiriya****.*

Bergiya devê xwe nezanîn

Bêhesab û bêbaldarî peyivîn. **Tu guh nede gotinên wî, ew* ***bergiya devê xwe nizane****.*

Bergîr bi ceh qayîl nabe, meya (mehîn) bi dest naxe.

Yên baş û hêja bi dest naxin, yê ne hêja jî tê de kêf dikin. **Qurbana Xwedê me, ev jî çaremûsa wî ye,* ***bergîr bi ceh qayîl nabe, meya bi dest naxe****.*

Bergîrê dixwest birêveçûna kihêlê bike, ya xwe jî ji bîr kir.

Yên ku bi rewş û sirûşta xwe qayîl nabin, dikevin halên xerabtir. **Divê mirov rastiya xwe bipejirîne,* ***bergîrê xwestiye birêveçûna kihêlê bike, ya xwe jî ji bîr kiriye****.*

Berhev dikim bi çoçikan, wekî bidim kûçikan.

Ji bo keda bêkêr tê bikaranîn. ****Berhev dikim bi çoçikan, wekî bidim kûçikan.*** *Erê didim, lê tu were ji min bipirse.*

Berhewa kirin

1. Bûn sedema valaçûna tiştekî. **2.** Belawela kirin, li nav hev xistin, tevlihev kirin. **3.** Peqandin, înfilaq kirin. **Wî kurapê min ew keda min a ew qas salan tev de* ***berhewa kir****. *Polêsan mala Xêro tev de* ***berhewa kirin****. *Me her ew dît ku tûp ew* ***berhewa kir****.*

Berhingarî kirin

Li hember sekinîn, li ber xwe dan. **Heke rêxistina wan wisa berhingarî li wan nekira, rewşa wan dê hê xerabtir bûya.*

Berik, li lawê tenik

Star û alîgirî ji yên jar û xizan re pêwîst e. ****Berik, li lawê tenik.*** *Belê starî ji her kesî re divê, lê berê ji yên hewcedar re pêwîst e.*

Beriya sicûrê xwe diavêje tenûrê.
Bêsebrî kirin. **Rojzerîn hema her tiştî wê gavê dixwaze,* ***beriya sicûrê xwe diavêje tenûrê.***

Berê (yekî) dayîn hevrazan
Astengî derxistin. **Hecî Wehabê zalim, bi wan biryaran berê lawikê belengaz dide hevrazan.*

Berî emrê xwe xeber dan
bnr. Ji emrê xwe zêdetir xeber dan

Berî hev dan
1. Ji bo lêdan û dijminahiyê hadandin. Fesadî kirin. **2.** Hev û din qewirandin. **Melîkcanê bûka xwe û lawê xwe wisa* ***berî hev dan****, hema hindik mabû ku hev du berdin. *Her du jî nîvekarê dikanê bûn, lê hema herduyan jî* ***berî hev didan****.*

Berî ku bibêje, dipêje.
Bi baldarî û zanayî axivîn. Bandora gotina xwe berî gotinê pîvandin. **Ew çi mêrekî zana ye, gotina xwe* ***berî ku bibêje, dipêje****.*

Berî ku bipêje, dirêje.
Berî ponijandinê hema çi bê ber dev gotin. **Divê mirov gotina xwe berê biteqilîne û bipîve, dû re bibêje; lê hinek* ***berî ku bipêjin, hema dirêjin****.*

Berî, kirin herî
Kar baş pêk neanîn. **Me got bila ew here wî karî biqedîne, lê maşelah ew jî çû* ***berî kire herî.*** (qerf)

Berî nav dilê xwe dan
1. Xwe pê qehirandin, pê hundirê xwe xwarin. **2.** Derdê xwe ji kesekî re negotin. **Adar derdê xwe ji kesî re nabêje, hema çi hebe* ***berî nav dilê xwe dide****. *Ez jî têdigihîjim ku derdekî wî heye, lê mixabin tenê* ***berî nav dilê xwe dide*** *û ji me re nabêje.*

Berî nava xwe dan
bnr. Berî nav dilê xwe dan

Berî pêsîra hev dan
Bi fesadî hinek berî hevdan. Bûn sedema şerkirina hinekan. **Jixwe edeta Seyranê bî, heya hinek* ***berî pêsîra hev*** *nedana, nikaribû bisekine.*

Berî ser hev dan
1. Ji bo lêdanê hadandin, fesadî kirin. **2.** Bûn sedema têkiliya zayendî yan jî ji bo wê derfet amade kirin. **Wî fêlbazî ew xort* ***berî ser hev dan****, xwîn herikî. *Wê jinikê axirî ew lawik û jina cîranê xwe* ***berî ser hev dan****.*

Berî ser pişta (yekî) dan
Li pey kesekî revîn, dan ser pişta yekî. **Zekî heya ber derê wî* ***berî ser pişta lawê Bahadîn da****.*

Berî ser xwe dan

Bi kesekî re ketina têkiliya zayendî. **Dema ku mêrê wê diçû karê xwe, jinikê xulamê xwe her roj* ***berî ser xwe dida****.*

Berî û neqeb ji xelkê re man.

Mîrate ji û tiştên girîng ji hinekên din re man. **Înşelah* ***berî û neqebên wê ji xelkê re bimînin****.* (nifir)

Bero ji çeftê (qalik) xwe derket, go: "Devî çere ye!"

bnr. Berû ji qalikê xwe baz da û got: "Magî devî çawa ye!"

Beroşê got:"Ez qûnzêrîn im." Hesikê got: "Ez di nav te de me."

Yên ku beled in dizanin bê rewş çawa ye. **Yên ku bi rewşê dizanin, rastiyê dertînin holê. Beroşê got:* ***"Ez qûnzêrîn im." Hesikê got: "Ez di nav te de me."***

Bersiva xwe girtin

bnr. Cawa' xwe girtin

Berû da bizinê, dest avête qarçikê.

Carinan ketina heyra hinek derfet û berjewendiyên piçûk, dibe sedema ziyanên mezin. *****Berû da bizinê, dest avête qarçikê.*** *Mahar çi dizanîbû ku ji bo kêfa şevekê wê ew qas belayê bînin sêrê wî.*

Berû ji qalikê xwe baz da û got: "Magî devî çawa ye!"

Ji esil û esasê xwe revîn an jî fedî kirin. *****Berû ji qalikê xwe baz da û got: "Magî devî çawa ye!.."*** *Dibêjin lawê Wesîleyê hingî ji Stenbolê hatiye ji bav û diya xwe re bi tirkî dipeyîve.*

Bervemiraz bûn

Li ber zewacê bûn. Gihîştina dema zewacê. **Keçê devê te li kevirê reş bikeve, tu çawa ji vî xortê* ***bervemiraz*** *re nifiran dikî?*

Berx an jî beranbûn, kifş bûn

Xurtbûn an jî ne xurtbûn kifşbûn. **Îro kî çi bibêje, vala ye, di wê roja pêşbirkê de kî* ***berx e, kî beran e, wê kifş bibe****.*

Berx teslîmî gur kirin

Karê berevajî û pir bixeter kirin. **Ya ku wan kir jî maşelah tam tedbîr e ha (!), ma tu nabînî* ***berx teslîmî gur kirine****?*

Berxa ber çêlekê, mala sermiyan yek, ava bû gelek.

Cihê ku lihevkirin û yekîtî lê hebe, bîn û bereketa wê jî zêde dibe. *****Berxa ber çêlekê, mala sermiyan yek, ava bû gelek.*** *Di malbatê de ku lihevkirin û hizûr hebe, her tişt geştir dibe.*

Berxa li ber du makan bûn

Xwedî derfetên zêde bûn. **Helbet pişta wê nayê erdê, her kes dizane ku ew ew* ***berxa li ber du makan e****.*

Berxa li ber kozê bûn

Ji bo yên ku nazik in û ji hêla dê û bavî ve zêde tên parastin tê gotin. **Xaltiya min, keçika xwe ya piçûk* ***xistiye berxa ber kozê****, nahêle jê biqete.*

Berxa li ber miyê, wek beranê bêriyê

Ku dê hebe, zarok hê baştir pêşve diçin û geş dibin. **Dê di jiyana zarokan de pir girîng e. Lewma gotine:* ***"Berxa li ber miyê, wek beranê bêriyê."***

Berxik spartin gur

bnr. Berx teslîmî gur kirin

Berxîbet kirin

Bi neheqî yek tawambar kirin. **Ya rastî, Gulê zelîf xebitî ku Rodî* ***berxîbet bike****, lê çi kir jî bi ser neket.*

Berzeqî bûn

Li hemberî mezinan di nav helwestek neyînî de bûn. **Ev lawê Berzan wisa* ***berzeqî bûye*** *ku derdê wî nayê kişandin.*

Berzûrî Xwedê bûn

Lava kirin. **Diya Sîdarê ji ber nexweşiya keçika xwe, her sibe* ***berzûrî Xwedê dibû****.*

Beşera (yekî) xweş bûn

1. Moral xweş bûn. **2.** Hêdî hêdî ji nexweşiyê rizgar bûn. **Tu qet meraqan meke, ku Berfîn ku hê û pê re biaxive dê* ***beşera wî jî xweş bibe****. *Îro min dît,* ***beşera Guharê xweş bûye****, rabûye pê jî.*

Beşervekirî bûn

Bifem û feraset bûn. **Min ji we re negot Zerîfe jineke* ***beşervekirî ye****?*

Betal wetal gerîn

Vik û vala û bêkar bûn. **Karê wî jî heta êvarê betal wetal gerîn e.*

Betalî, xerabmalî

Mirovên bêkar û bêemel, rewşa wan bi her awayî xera dibe. **Loma gotine:* ***"Betalî, xerabmalî."*** *Hingî Nado bêkar maye, aboriya wî jî moralê wî jî û aramiya malbata wî jî xera bûye.*

Betê hêk kir, hevalek ji xwe re çêkir.

Her kes hempa û hunkufê wekî xwe dibîne. ****Betê hêk kir, hevalek jixwe re çêkir.*** *Ew jî çû ew qasî geriya, hevalekî wekî xwe dît.*

Bext jê re tune bûn

Bawerî pê nebûn. **Jixwe Remzî mirovekî wisa ye ku tu* ***bext jê re tune ye****.*

Bext pê anîn

Bawerî pê anîn. **Min* ***bext pê anî****, malê xwe sipartiyê, lê ew bêbext derket.*

Bext pê hatin
Pê bawer bûn. *Her kes bêşik **bext pê tîne** ku Rizgar karên wiha xerab nake.*

Bext pê nebûn
Bawerî pê nebûn. *Keça min tu çiqasî sefêk î, qet **bext bi wî bedûm û bêbavî dibe**?*

Bextê (yekî) girê dan
Zewaca keç an jî xortekî asteng kirin. *Wê jinika cezû bi niviştû fêlfîstikan **bextê keça min girê daye**.*

Bextê (yekî) vebûn
1. Şans vebûn. **2.** Ji bo zewacê derfetên nû derketin. *Şikir **bextê min vebûye**, van rojan karê min baş e. *Hîvron hema hema ber bi pîrbûnê ve bû ku di dawiyê de **bextê wê jî vebû**.*

Bextê mêran şewitandin
A rastî negotin. Bêbextî kirin. *Kuro lawo mirov **bextê mêran naşewitîne**, tu çima wan qenciyên ku wî kirine jî nabêjî?*

Bextê (talihê) xelkê reş e, lê yê min reş û beş e.
Ji bo bêşansî û rewşa xerabtirîn tê gotin. *Ez ji qedera xwe ne razî me. Ezbenî min di jiyana xwe de rojeke xweş nedît, **bextê xelkê reş e, yê min reş û beş e**.*

Bextê xwe avêtin
bnr. Bextê xwe xera kirin

Bextê xwe reş kirin
Nankorî kirin, bêbextî kirin. *Li ser vê baweriyê **bextê xwe reş mekin.*** Celadet Bedirxan

Bextê xwe xera kirin
Li soz û peymana xwe xwedî derneketin, xayînî û qeleşî kirin. *"...mîna gotin û galgalên Hecî Silê ku **bextê xwe xera kir**, di fermana filehan de di sala 1915'an de ku Suryanî dibêjin 'seyfo', bext da gundiyên bêzar û neçar; piştre bi êmnatî ji çek kirin û gundekî Suryaniyan bi kişumatî kuştin, kit ji wan nehiştin..."* Medenî Ferho

Bextewariya xwe pê anîn
Rewşa kesekî daxwaz kirin. *Ez jî **bextewariya xwe bi wê demê tînim**, lê mixabin êdî ew rewş bi dest min nakeve.*

Bextreş bûn
1. Di hêla zewacê de bêşans bûn. **2.** Di nav jiyaneke xerab de bûn. ***Bextê vê keçika min reş e**, ev mêrê sisêyan e ku dev jê berda. *"Narîn bawer nedikir ku bigihîje mal û dest bi girî dikir lê çawa **bextê wê wisa reş e**, hêstirên wê wekî ba û baranê dihatin xwar; çimkî xort ew nas nekir."* Qado Şêrîn

Bez girtin
1. Zengîn bûn. **2.** Qelew bûn. *Hecî Xosrof wisa **bez girtiye** ku hesabê pez û dewarê xwe ew bi xwe jî nizane. *Maşelah takara stûyê Bedran wisa **bez girtiye** ku nazivire.*

Bez spartin pisîkê

Ji bo rewşa berevajî û helwesta çewt tê bikaranîn. **Heyran we **bez spartiye pisîkê**, îja hûn hatine gazinên xwe dikin.*

Beza mirîşkê, heta kadînê

Her kes dikare heya derekê bireve û xwe biparêze, ji wê bi şûn de çi ji dest bê dikare bike. **Ew feqîrê Xwedê wê heya kengê xwe biparêze? **Beza pisîkê jî heta kadînê ye.***

Bezê li ser dil helîn

1. Gelekî xemgîn bûn. **2.** Pir jar bûn. **Çima ku keça wî bi yekî mirtib (Roman) re revî, **bezê li ser dilê Hemdiya heliya**, ket rojeke reş.*Piştî nexweşiyê **bezê li ser dilê Hevgulê heliya** û komek hestî ma.*

Bê anî, babelîskê bir.

bnr. Bayê anî, bagerê bir.

Bê di aliyekî re lê xistin, di aliyê din re derbas kirin

Pejmûrde, perîşan û bêsitar bûn. **Xaniyê wê wekî çadireke peritî ye; **ba di aliyekî re lê dixe di aliyê din re derdixe.***

Bê malê, malxweyê malê, neyê malê qeda salê.

Bibe wê baş be, lê nebe jî ne xem e. **Welehî ez kurt dibêjim: **Bê malê, malxweyê malê, neyê malê qeda salê.***

Bêbav bûn

1. Zalim û bêinsaf bûn. **2.** Esil û esas belî nebûn. **Fesîlhê çi **bêbavek e**, zilma ku li zarokên xwe dike nayê gotin. *Remezan yekî **bêbav e**, ji ku hatiye û kurê kê ye ne kifş e.*

Bêbext bûn

Bêbawer û bêewle bûn. **Min çend caran ji te re got ew mirovekî **bêbext e** pê bawer nebe?*

Bêbingeh bûn

Vala û pûç bûn. **Erê Mihemedê Reşo xweş diaxive, lê gotinên wî **bêbingeh in**.*

Bêceger bûn

Newêrek bûn. **Rûşen wisa **bêceger e**, ne bi tenê bi şev, carinan bi roj jî newêre here hinek cihan.*

Bêcih û bêwar bûn

Bêmal û bêsitar bûn. **Belengazê Cimo ew qasî dixebite lê hê jî **bêcih û bêwar e**.*

Bêçav û bêrû bûn

Bêheya û bêterbiye bûn. **Ev lawê min bûye bîst û yek salî, hê jî **bêçav û bêrû ye**.*

Bêdeng mirin

Haya kesî ji mirina yekî nebûn. **Rehmetiyê Fazilê Zeyno wisa **bêdeng mir** ku qet der û cinar jî pê nehesiyan.*

Bêdeng bûn

Ji bo kesên sernerm, zêde napeyivin û di halê xwe de ne û tê bikaranîn. *\"Mirovekî pirhêj nebû. **Bêdeng bû**. Lê belê bêdengiya wî, bêdengiyeke rûmet û serbilindiyê bû...\" Rojan Hazim

Bêdeng û bêhes man

Dengê xwe dernexistin. Tu helwest nîşan nedan. *Hesenê Seyrê li hemberî wan bênamûsan **bêdeng û bêhes ma**.

Bêderd û bêkul bûn

Pirsgirêkên girîng tune bûn. *Çi telaşa Sêvdîn e, mirovekî **bêderd û bêkul e**. Dinya bişewite gurzek gîhayê wî naşewite.

Bêdev û bêziman bûn

Ji bo mirovên bêdeng, nerm û sist tê gotin. *Zavayê Xelef ê piçûk mirovekî **bêdev û bêziman e**.

Bêdilî bûn

Dil nexwestin, nehecibandin. (Zêdetir ji bo têkiliya keç û xortan tê bikaranîn). *Her çi qas Nîgar **bêdilî bû** jî lê bavê ew bi zorê da mêr.

Bêdiran bûn

bnr. Bêjehr bûn

Bêdîn û bêîman bûn

Zalim û xedar bûn. *Çûye Hecê jî, lê Hecî Sebrî mirovekî **bêdîn û bêîman e**.

Bêedeb û bêerkan bûn

Rê û dirb nezanîn. *Bi van mirovên **bêedeb û bêerkan** re ka em çi dikarin bikin?

Bêemel bûn

1. Jar û lawaz bûn. **2.** Bêkar û bêşixul bûn. *Zaroka Dîbayê wisa **bêemel e** ku, tu dibêjî damara rûviya ji qûnê kişandine. *Ji ber ku nêzîkî şeş mehan e Delîl **bêemel e**, zarokên wî perîşan in.

Bêesil û bêfesil bûn

1. Esil û esasê yekê kifş nebûn. **2.** Bêbingeh bûn. *Ev zavayê Îzet mirovekî **bêesil û bêfesil e**. *Hate xuyan ku ew gotinên ku wan digotin, hemû jî tiştên **bêesil û bêfesil in**.

Bêewled û bêtewled bûn

Bêzarok bûn. *Ew qas mal û milkê Zal heye, lê mixabin bi xwe jî **bêewled û bêtewled e**.

Bêfesal lê xistin

Pir bi bandor lê xistin. *Xelîl derbeke **bêfesal li Zeydan xist**. Zeydan hê jî bi ser xwe de nehatiye.

Bêgav hiştin

Mecbûr kirin. *Zerdayê bi wan kirinên xwe ew **bêgav hişt** ku wê yekê bike.

Bêguman bûn
Ji bo kesê ku qencî jê nayê û alîkariya tu kesî nake tê gotin. **Ew mirovekî wisa **bêguman e** ku ji yên herî hewcedar re jî xwe aciz nake.*

Bêguman man
Bêderfet û bêhêvî man. **Mirov ku **bêguman ma** pir zor e.*

Bêgurçik bûn
Bêcesaret bûn. **Ew yekî **bêgurçik e**, ma ew qet bi we re tê?*

Bêhefsar bûn
bnr. Bêser û bêber bûn

Bêhefsar hiştin
Bêserî û beredayî hîştin. **Jixwe birayê wê tune bûn, piştî ku bavê wê jî mir, Safînaz tam **bêhefsar ma**.*

Bêhemdî xwe xeber dan
Di derka axaftina xwe de nebûn. **"Lê ez herime mektebê, bavê min neyê? **Bêhemdî xwe min gote** diya xwe."* Emerîkê Serdar

Bêhesab bûn
Bêdenge û bêmêzîn bûn. **Ma tu nizanî Rosto mirovek **bêhesab e**, dê çi bike kifş nabe.*

Bêhesab û bêkitêb bûn
Bêpêşk û bêsîstem bûn. **Medenî yekî **bêhesab û bêkitêb** e, wê çawa bibe mal û hal?*

Bêhiş ketin
Ji xwe ve çûn, hay ji xwe tune bûn. **Zekiya çawa ku ew xebera reş bihîst, hema di cihê xwe de **bêhiş ket**.*

Bêjehr bûn
Bêhêz û bêbandor bûn. **Piştî ku eşîra wan ji bajêr derket, malbata Xelîlê Pêrûza **bêjehr bû**.*

Bêkar û bêemel bûn
Vala û bêşixul bûn. **Ew mirovekî **bêkar û bêemel e**, heya êvarê li qehwexaneyan e.*

Bêkaro, dil li malê saro
Kesên bêkar û bêemel ji ber ku nikarin alîkariyekê bikin, ji mala xwe jî sar dibin. *****Bêkaro, dil li malê saro.*** *Hingî ji kar derketiye, destê Diyar ji malbatê jî sar bûye.*

Bêkelek û gemî li avê siwar bûn
Ji mirovên pir bimerîfet û pêkhatî re tê gotin. **Ew mirovekî wisa ye ku, **bêkelek û gemî li avê siwar dibe**.*

Bêmal û bêwar bûn
Bêkes û bêcih bûn. **Celîl mirovekî **bêmal û bêwar e**.*

Bêmed (bûn)
Sinc (sênc) şikestin. Moral xerab bûn. *"*Li ser **bêmediya** hevalan êdî min nexwest li wir bimînim."* Osman Sebrî

Bêmefer man
Bêkeys û bêderfet man. **Dema ku wê ez wisa li nîvê rê hiştim, **bêmefer mam** û destê min ji esmanan qetiya.*

Bêmeymenet (bûn)
Rê û dirb, edet û tore nezanîn. **Tu dixwazî, lê ez hez nakim bi wî **bêmeymenetî** re bibim kirîv.*

Bêmêjî bûn
Bêaqil bûn. **Keçika min qet ji vî birayê xwe nexeyîde, ew mirovekî **bêmêjî ye**.*

Bêminet bûn
1. Bêtirs bûn. **2.** Hewcedar û deyndarê tu kesî nebûn. **3.** *Bêhurmet û bêterbiye bûn. *Baran mirovekî **bêminet e**, qet ji tu kesî re serî natewîne. *Faris **bêminet e**, kes nikare wî tawanbar bike. *Çi dibe bila bibe, divê li hemberî xezûrê xwe wisa **bêminet nebûya**.*

Bênan û bêav bûn
Feqîr û xizan bûn. **Korayî ji mala Qasim Begê ku îro **bênan û bêav maye**.*

Bênan û bêxwê bûn
Bêwefa û bêbext bûn. **Hay ji Xelîl hebin, ew kesekî **bênan û bêxwê ye**.*

Bênav bûn
Bênav û deng, bêreng û bênasname bûn. **Bingeha radeya doza me ya îroyîn, bêguman şehîdên **bênav in**.*

Bêperde bûn
Bêşerm û bêheya bûn. **Elo mirovekî **bêperde ye**, tiştên nedîtî dike û dibêje.*

Bêpere û bêmiz bûn
Di hêla aborî de di nav rewşeke xeter de bûn. **Qet mereqan neke, ew yekî **bêpere û bêmiz** e. Ma wê bi ku de here?*

Bêpişik bûn
Tirsonek bûn. **Evdilkerîmê reben bi tenê kurekî wî heye, ew jî yekî **bêpişik e.***

Bêpişt bûn
Bêkes û tenê bûn. **Heke ez mirovekî **bêpişt nebûma**, niha ew hatibûn bal min.*

Bêyom û bêoxir bûn
bnr. Bêxêr û bêoxir bûn

Bêqanûn û bêzagon (bûn)
Tu rêbaz û rêçik tunebûn. **Di nav wê rewşa **bêqanûn û bêzagon** de lûn çawa dikarin qala demokrasiyê bikin?*

Bêqeyd bêşert bûn

Tu mercek tune bûn. Bêgotin û bêbervêdan (îtîraz) bûn. **Gerîlayan di sala hezar û not û nehan de* ***bêqeyd û bêşert*** *agirbes pêkanîn.*

Bêqeyd û bêbend bûn

Bi serê xwe bûn. Serbest û azad bûn. **Ji wî re çi? Ew mirovekî* ***bêqeyd û bêbend e****, dikare here her derê.*

Bêqeys û bêqirar bûn

Bêbiryar û bêrêz bûn. **Mirov dikare bibêje ku jiyana* ***bêqeys û bêqirar, di heman demê de jiyanek bêberhem e*** *jî.*

Bêqeza û bêbela bûn

Bêpirsgirêk û paqij bûn. **Ma jiyaneke* ***bêqeza û bêbela ji bo kê guncav e****?*

Bêqulbe bûn

Bêhawa bûn û bawerî pê bûn. **Xelo mirovekî* ***bêqulbe ye****, tu çawa bi wî bawer dikî?*

Bêqulp bûn

Bêbawerî û bêrê bûn. **Ew yekî* ***bêqulp e****, tu qanûn û zagoneke wî tune ye, eman pê ewle nebe.*

Bêrê bûn

Wekî edet û toreyan nebûn. **Ev zavayê Silto mirovekî* ***bêrê ye****, tu çi bêjî jê tê hêvîkirin.*

Bêrê man

Tu çareseriyek nedîtin. **Ji wê demê bi şûn de ez* ***bêrê mam****, min nizanîbû ku ez çawa bikim.*

Bêrêtî kirin

Çewtî û bêusûlî kirin. **Belê her kes çewtiyan dike, lê ya ku wan kir jî tam* ***bêrêtiyeke ecêb kir.***

Bêrû bûn

Bêar û bêşerm bûn. **Kes wekî vî lawê Silo* ***bêrû nîn e****. Ne ji mezinan, ne jî ji piçûkan vedikişe.*

Bêser û bêber bûn

Bêsazûman û tevlihev bûn. **Min ji wê perwerdehiyê fêm nekir, zêde* ***bêser û bêber e****.*

Bêserî û bêşûn çûn

bnr. Bêserî û bêberate çûn

Bêserî û bêberate çûn

Bênîşan, bêşahad û bêîspat winda bûn. **"Yê bêxeta hate kuştin, ê dîl girtin* ***bêser û bêberate çûn****, ê Ava Reş her xwe bir, ê ji birçiya li serê çiyayan mir."* Rizaliyê Reşît

Bêserî û bêberî man

Bêxwedî û bêrêveber li holê man. **Bav na, lê dema ku dayîka zarokan dimire, zarok* ***bêserî û bêberî li holê dimînin****.*

Bêserî û bêbinî (bûn)

1. Pir mezin bûn. **2.** Tevlihev û belawela bûn. **Amed bajarekî **bêserî û bêbinî ye**. *"Ji tevan ecêbtir ew bû ku ew xelkên **bêser û bêbin** tê de derbas dibûn..."* Îbrahîm Ehmed

Bêserî û bêçav bûn

Hov, nenazik û tênegihîştî bûn. **Ew yekî **bêserî û bêçav e**. Ji te tika dikim, xwe neke hevalê wî.*

Bêserî û bêçav xwe avêtin nav ...

Bi awayekî netêkûz nêzîk bûn. **Wê **bêserî û bêçav xwe avête nav wî karî**, loma jî pêk neanî.*

Bêserî û bêkerî bûn

Bêpergalî, û bêsîstem bûn. **Wê malbata **bêserî û bêkerî** jixwe re çi kiriye ku ji me re jî bike?*

Bêserî, xwe lê qewimandin

bnr. Xwe lê asê kirin

Bêşert û şurid bûn

bnr. Bêqeyd û bêşert bûn

Bêşerman dikin hebanan, lingên xwe di hingilan de derdixin.

Mirovên bêşerm tu çawa bikî, wê bi awayekî bêariya xwe bidin xuyandin. **Çareya wê nîn e, **bêşerman dikin hebanan, lingên xwe di hingilan de derdixin**.*

Bêşêwr û bêbêwr (bûn)

1. Hay ji hev û din tune bûn. **2.** Di navberê de tu soz û peyman tune bûn. **Vî birayê min hema **bêşêwr û bêbêwr** çû ket nav bazirganiyeke wisa giran. *Qet nîvekarî wisa **bêşêwr û bêbêwr** dibe?*

Bêşivan çêrîn, bêxwedî mezin bûn

Bêperwerde û bêrê bûn. **Ew lawê Osmanê Husniyê Paşê Kêçan ê navîn, wekî hespên êxrî, **bêşivan çêriyaye û bêxwedî mezin bûye**.*

Bêtewl û bêhefsar bûn

bnr. Bêşivan çêrîn, bêxwedî mezin bûn

Bêxêr û bêoxir bûn

Jê xirabî û nepakî hatin. **Mistoyê Berzan mirovekî **bêxêr û bêoxir e.** Roja ku derkeve pêş mirov, ew roj reş dibe.*

Bêxwedî û bêsermiyan bûn

Bêmezin û bêrêber bûn. **Xêr ji wê keçikê nayê, ew di maleke **bêxwedî û bêsermiyan de mezin bûye**.*

Bêxweyî û bêxwedan bûn

Bêkes bûn. **Jixwe kal û bavên wî ji hêla Kurdistana Îranê ne, loma wisa li vir **bêxweyî û bêxwedan e**.*

Bêxwîn bûn
Bêbext, bêbawer û xayîn bûn. **Hecî Elî mirovekî* ***bêxwîn e****, ew nakeve nav doza welat.*

Bêxwîn û goşt bûn
Pir jar û lawaz bûn. **Piştî wê nexweşiyê wisa* ***bêxwîn û goşt bû****.*

Bêzar û bêziman (bûn)
Sefîl, bêdeng û belengaz bûn. **Ez tênegihîştim, ew ji wê keçika belengaz a* ***bêzar û bêziman*** *çi dixwazin?*

Bêzirav bûn
bnr. Bêpişik bûn

Bêzirne reqisîn
Ji bo pêkanînê amade ye û ji bo wê jî li pey hincetan e. **Mûso zêde li sedeman jî nagere, camêrî hema* ***bêzirne direqise****.*

Bêzuriyet bûn
bnr. Bêewled û bêtewled bûn

Bêar ji çi ar dike, kumê xwe tim xwar dike
Ji bêaran re hewa tim xweş e. *Fazilê qebrax helbet şerm nake. ***Ma bêar ji çi ar dike, kumê xwe tim xwar dike.***

Bêbavtî kirin
Karê ne li rê kirin. **Bahadîn li hemberî jina xwe* ***bêbavtî kir****.*

Bêbext derketin
Bi yekî bawer bûn lê bawerî vala derketin. **Me got mirov e, însan e, em pê ewle bûn, lê ew jî* ***bêbext derket****.*

Bêbextî avêtin (yekî)
bnr. Bêbextî tê de anîn

Bêbextî li (yekî) kirin
Bêrêtî û xayînî ji yekî re kirin. **"Ma qey bav û kalên me di riya şaş û çewt de bûne? Na kes nikare vê* ***bêbextiyê li wan bike****."* Feqî Huseyn Sağnıç

Bêbextî tê de anîn
Bi neheqî yek tawanbar kirin. *****Bêbextiya ku wê di min de anî****, ez tu caran ji bîr nakim.*

Bêçar man
Çareserî nedîtin. Di nav tengasiyê rizgar nebûn. **"Soz didim ku nehêlim pênûsa min zuha bibe û bêhn vede, pênûsê digel tivingê bikim yara jiyana xwe. Hew bimînim xemsar,* ***nemînim bêçar****."* Diljiyan

Bêdengan diya pirbêjan gaye.
bnr. Keran serê pirbêjan jê kiriye.

Bêgumanî kirin
Alîkarî nekirin. **Di wê tengasiyê de divê Xelîl ew qas* ***bêgumanî nekira****.*

Bêhn bi ser ketin
bnr. Ba ji ber çûn

Bêhn di qûnê re derketin
Pir betilîn, di nav zor û zerpê de man. **Xemgîn heta ew bar bir wir, bêhna wî* ***di qûnê re derket****.*

Bêhn hatin ber (yekî)
Westa xwe hildan, rehet bûn. **"Em çil salî li Sûsizê man. Em bûn xwedî mal-halê nû.* ***Bêhna me hate ber me****, lê bextê me li wê derê jî lê neanî."* Rizaliyê Reşît

Bêhn ... hildan
Di derkê de bûn. **Ew ku* ***bêhna berjewendiyekê hilde****, tu car dev jê bernade.*

Bêhn lê çikandin
bnr. Bêhna fisan bi ser xistin

Bêhn lê teng bûn
Sebr û aram kêm bûn. **"Tu bi xwe jî dizanî* ***bêhn li min teng dibe*** *û xwe nagirim. Di dawiyê de dilê hemû hevalan ji min dimîne."* Osman Sebrî

Bêhn pê derketin
Pê hizûr dîtin. Rehet bûn. *****Bêhna wê her bi Rosto derdikeve.***

Bêhn rakirin
bnr. Bêhn hildan

Bêhn xweş bûn
bnr. Dil vebûn

Bêhnefiskî kirin
Xinisî kirin. Bi dizî û neyînî nêzîk bûn. **Her kes dizane ku Zekî ji Aso re* ***bêhnefiskiyê dike****.*

Bêhn hatin ber
Rehet bûn. *****Pişti*** *ku lawên wî mezin bûn, bêhna Xalê Remo* ***hat ber****.*

Bêhn hildan
Îşareta tiştekî hildan. Şop dîtin. **Jixwe ev çend roj in kifş bû ku wan* ***bêhn hildane****, dibêjin îro jî ew zeft kirine.*

Bêhn lê çikandin
bnr. Cih lê teng kirin

Bêhn lê çikîn
1. Ketin rewşeke teng û dijwar. **2.** Nefes derneketin. **"Ew her dipirsin û dixwazin her*

tiştî, digel her celeb kît-kîtê bizanibin. Yanî ew bîhn li min diçikînin." Mehmed Uzun **Heta ez derketim wê jorê* ***bêhn li min çikiya.***

Bêhn pê derketin

Pê rehet bûn, jê hezkirin. *****Bêhna Apê Mamoste hema bi her du neviyên wî derdikeve.***

Bêhnteng bûn

1. Bêaram bûn, aciz bûn. **2.** Pir betilîn. **Zêde bi ser Cangulê de neçin ew pir* ***bêhnteng bûye.*** **Çend rojan bi vî awayî hev du gerandin, her du jî westayî û bêhnteng bûn. Feqî Huseyîn Sağnıç

Bêhna barûdê li pozê (yekî) ketin

Pir hêrs bûn. Ji şer û belayê re amade bûn. **Dîsa* ***bêhna barûdê li pozê Zoro*** *ketiye dike borebor.*

Bêhna bîso jê hatin

Şik û guman jê çêbûn. **Guneh di stûyê gotiyan de be, lê li gorî ku dibêjin, der barê wê diziyê de* ***bêhna bîso ji Celadetê Cemşît tê.***

Bêhna cehenemê (pîs) ji devê (yekî) hatin

Ji yê zarçors û kufirbaz re tê gotin. **Wî kûçikê Lezgîn nedin xeberdan,* ***bêhna cehenemê ji devê wî tê.***

Bêhna gû ji devê (yekî) hatin

bnr. Bêhna cehenemê ji dêv hatin

Bêhna kiz tê ji mala diz

Her kar û pîşe li gorî naveroka xwe encam dide. *****Bêhna kiz tê ji mala diz.*** *Her kes bi çi re mijûl be, wekî wê bandorê dide dora xwe.*

Bêhna şîr ji devê (yekî) hatin

Piçûk û bêtaqî (tecrûbe) bûn. **Hê* ***bêhna şîr ji devê wî tê****, ew çi zane dinya di ku re hatiye, û wê di ku re here?*

Bêhna fisan bi ser xistin

Di rewşeke zor de hiştin. Westandin. **Serhat û Fadil gulaş girtin, Serhat* ***bêhna tir û fisan bi ser Fadil xist.***

Bêhna nan ji malê nehatin

Pir xizan bûn. **İnşelah* ***bêhna nan ji mala te neyê.***

Bêhna (yekî) teng kirin

Aciz kirin. Asteng kirin. **Cindo* ***bêhna Çîmenê teng kiriye****, lê ne mafdar e.*

Bêhna xortan jê hatin

Gihîştin radeya xortaniyê. **Şikir êdî* ***bêhna xortan ji Miradê biraziyê min tê.*** *Ji bo birayê min jî dê bibe piştgir.*

Bêhna xwe berdan

Westa xwe hildan, piştî hinek xebat an ji dijwariyê rawestîn. **Evdal ew qas saet xebitî, lê hi tenê carekê* ***bêhna xwe berda.***

Bêhna xwe fireh girtin

Bi sebir û bi aramî tevgerîn. **Heke Kejê di wê serdemê de* ***bêhna xwe fireh negirta,*** *tu bawer be niha em ne di vê radeyê de bûn.*

Bêhna xwe jê girtin

Ji kesekî xeyidîn. Ji têkiliya kesekî revîn. **Ev çend roj in ku Sercan* ***bêhna xwe ji Keleş digire.***

Bêhna xwe stendin

Bêhnvedan, westa xwe hildan. **Koçeran nêzîkî zeviya me du rojan* ***bêhna xwe stendin*** *û dû re çûn.*

Bêhna xwe vedan

Navber dayîn. Rehet bûn. **"Di rê de li ber dîwarekê rûnişt, da ku* ***bêhna xwe vede."*** Nizar Mehemed Seîd

Bêhna xwe vekirin

bnr. Bêhna xwe vedan

Bêhna xwînê hilkirin (hildan)

Di nav hewldanên bixeter de bûn. Nêzîkî qeza û belayê bûn. **"Wî carekê* ***bêhna xwînê hilkiribû*** *û talaşa xwe tu kesî nedigirt."* Musa Vazgali

Bêîmanî kirin

Bêînsafî û bêdadî kirin. **Wê jinikê* ***bêîmanî kir*** *û ew keçika ciwan da wî mêrikê kal.*

Bêje bêje zimanê te direj e.

Ji bo kesên rezîl tê gotin. *****Bêje bêje, zimanê te dirêj e.*** *Her kes dizane tu çi yî û çi nîn î.*

Bêje bimire bimire, bêje bimîne bimîne.

Tu car ji gotina yekî derneketin. **Serokê tevgera azadî ya kurd, çi bibêje ew e;* ***bêje bimire bimire, bêje bimîne bimîne.***

Bêminetî kirin

Li hemberî başî û qenciyê helwestek ne baş nîşan dan. **Di dawiyê de li hemberî bavê xwe jî* ***bêminetî kir.***

Bêhna xwe dan

bnr. Bêhnvedan

Bêhnefişk dan xwe

Hêrs bûn. **Wisa* ***bêhnefişk didane xwe*** *ku ez tirsiyam, min got wê eseh serê xwe têxe belayê.*

Bênamûsê ilmê xwe bûn

Di karê xwe (yê xerab) de pir serkeftî bûn. **Weleh bi vê bi wê nizanim, lê divê em hemû qebûl bikin ku mêrik bênamûsê ulmê xwe ye.*

Bêperdetî kirin

Karê bêrê û bêûsil kirin. **Ew helwesta Selîm a li hemberî meta wî, bi rastî jî* ***bêperdetî bû****.*

Bêrîka xwe tijî kirin

bnr. Tûrê xwe tijî kirin

Bêserî berdan

Serbest berdan. Bi serê xwe hiştin. **Min lê nihêrî ku nabe, hema min* ***bêserî berda û çû****.*

Bêş hat serê maldaran, avêtin serê jaran.

Her dem neheqî û nepakî tê serê feqîran. **Qedera feqîran e, tim barê herî giran dikeve ser milê wan.* ***Bêş hat serê maldaran, avêtin serê jaran.***

Bêşîr bûn

Ne dirust û ne bawer û bêesil bûn. **Ew mirovekî* ***bêşîr e****, çi bibêjî ji wî tê.*

Bêvil ne paqij bûn

Ji bo kesên ku bi karên neyînî re mijûl dibin tê gotin. **Erê heyran tu Bedir pêşniyar dikî, lê tu jî dizanî ku bêvila wî* ***ne paqij e.***

Bêvila xwe daliqandin

bnr. Pozpirçî bûn

Bêvila xwe girtin

bnr. Bêvila xwe hildan

Bêvila xwe hildan

Ji kesekî xeyidîn. **Herhal jinayî jê re hin tişt gotine, ev çendek e ku Selîm* ***bêvila xwe ji min hildaye.***

Bêvila xwe lê hil kirin

Neecibandin. **Hemdemê lawê min çawa ku li çav wan kincan ket* ***bêvila xwe lê hil kir****.*

Bêvila yekî miz dan (pozê yekî miz dan)

1. Li yekî xistin, an jî êşandin. **2.** Di heqê yekî de derketin. **Cindî çend xortên xwe şandin pêş Faro û bêvila wî* ***mizdanê da****. *Rewşenê zelîf xwe gir dikuşt, lê Evînê bêvila wê* ***miz da****.*

Bêvil li axê ketin

1. Mirin. **2.** Ketin nav rewşeke pir xerab. **Nifirên meta Horê qebûl bûn,* ***bêvila Faroyê Dizek li axê ket****. *Ew kirinên Welîdê jê re neman,* ***bêvila wê wisa li axê ketiye*** *ku kes nikare wê ji wî derdî xelas bike.*

Bêvila xwe bilind kirin
Xwe qure kirin. **Van rojan Xelîl wisa* ***bêvila xwe bilind dike*** *ku tu dibêjî qey kurê Kor Hisêyîn Paşa ye.*

Bêvila xwe hildan
Ji kesekî xeyidîn. **Ez nizanim Emîn çi bihîstiye, ev çendeke* ***bêvila xwe ji min hildaye****.*

Bêvila xwe kirin
bnr. Pozpirçî bûn

Bêvila yekî firikandin
bnr. Bêvila yekî mizdan

Bêvila yekî gemirandin
bnr. Bêvila yekî mizdan

Bêxwedêtî kirin
Neheqî, zilmkarî û xirabî kirin. **Heke Kamil Axa* ***bêxwedêtî nekira****, ew lawik wê ji wî cezayî xelas bibûya.*

Bêxwedî û bêkes bûn
bnr. Bêxwedî û bêxwedan bûn

Bêxwîn bûn
Bêxîret û bêbext bûn. *Zohatê Xelîl tam mirovekî* **bêxwîn û bêşeref** e.

Bêxwedî û bêxwedan bûn
Bi tena serê xwe, bêçare li holê man. **Bi rastî jî di nav sîstema feodal de* ***bêxwedî û bêxwedan bûn*** *rewşek bixeter e.*

Bêyî (werî) derî ji te re vekiriye, herî rê ji te re vekirî ye.
Tu çi dikî serbest î. **Min carekê got:* ***"Bêyî derî ji te re vekiriye, herî rê ji te re vekirî ye."*** *Dû re pir poşman bûm, lê ew bû çewtiya jiyana min a herî mezintirîn.*

Bêyî dilê xwe peyîvîn
Wekî daxwaza negotin. **"Te digot qet* ***bêyî dilê xwe dipeyivî****. Dengê wê û peyvên wê şikil dida rûyê wê yê ku ji tariyê baş nedixuya."* İbrahim Seydo Aydoğan

Bêyî hev tasek av venexwarin (Bêyî hev firek ava sar venexwarin)
Dostî û hevaltiyeke ji dil domandin. **Memê û Nûro ji hev du re wisan in ku* ***bêyî hev tasek av venaxwin****.*

Bêyî hev loqek (pariyek) nan nexwarin
bnr. Bêyî hev tasek av venexwarin

Bêyî hev neqedandin
Zehf zêde bi hev du ve girêdayî bûn. **Ew her du jî wisan in,* ***bêyî hev naqedînin****.*

Bêyî mala me, tê bibînî halê me.
bnr. Were mala me, bibîne rewşa me.

Bêyom û bêpêpar bûn
bnr. Bêxêr û bêoxir bûn.

Bi ad û wade
Bi soz û qirar (sond). **Bi ad û wade, heke careke din jî tu wihe derkevî pêş min, ez gunehê xwe bi te nayînim.*

Bi agir re lîstin
Bi karên xeternak re mijûl bûn. **Min ji wî re got, heyran tu **bi agir re dilîzî**, lê têgihîşt.*

Bi agir paqij kirin
bnr. Bi agir şûştin

Bi agir şûştin
Ketin rewşeke xerabtirîn. **Bê jinikê tu **bi agir bêyî şûştin**, ma te nikaribû dest biavêta destê qundaxa min?* (nifir)

Bi agirê (yekî) şewitîn
Ji ber sedema hinekên din ziyan dîtin. **Xwedê jî dizane ku tu sûc û gunehê wî tune bû, lê hema ew **bi agirê Sofî Silêman şewitî**.*

Bi ahûzarê çûn
Jiyan di nav eziyet û bêaramiyê de derbas bûn. **Erê ew qas sal jiya, lê nixabın ew jiyana wî hemû **bi ahûzarê çû.***

Bi aliyekî dev xeber dan
Gotina xwe ne ji dil û bi ne bi awayekî zelal gotin. **Wê **bi aliyekî dev xeber da**, lê min fêm kir ku armanca wê çi ye.*

Bi aliyekî din de ba dan
1. Dev ji soz û biryarên berê berdan. **2.** Ji kar an jî pêkanîna tiştekî revîn. **Rast e, me berê li hev kiribû, lê Mehmûd dû re bi aliyekî din de ba da. *Tam di dema xebatê de, Zerda **bi aliyekî din de ba dide**.*

Bi axûrê xwe de rîtin
bnr. Bi dîwarê xwe de mîstin

Bi av û donê xwe qijilîn
Bi xwe debara xwe kirin. Bi xwe rewşa xwe îdare kirin **Zêde pêwîstiya kesekî nîn e, ew bi xwe **bi av û donê xwe diqijile**.*

Bi ava danûyan bihecîn
1. Di ber tiştekî pûç de xisareke mezin dîtin. **2.** Firşik teng bûn, bêsebrî kirin. **Ew bêşans li wir jî **bi ava danûyan behecî**. *Heyderê Tircunî hema ji bo tiştekî piçûk jî **bi ava danûyan dibehece**.*

Bi ava golegeniyan tê xwarin (vexwarin)

Milayîm û lihevhatî bûn. **Kî hebe dikare pê re debarê bike, ew keçeke wisan e ku **bi ava golegeniyan tê xwarin**.*

Bi ava zemzemê şûştin

Paqij kirin, ji xeta û gunehan dûr xistin. **"Yek galgaleke ku dilê min pê xweş bibe heta niha ji devê wî derneket. Tu dibêjî qey ew **bi ava zemzemê hatiye şûştin** û ez heram, genî û lewitî me."* Ronî War (qerf)

Bi avê de çûn

1. Gelekî erzan bûn. **2.** Vala çûn, bêkêr bûn. **Bavê min erebeya me firot, lê hema **bi avê de çû**. *Ew qas ked û zehmetê meta min tev **bi avê de çû**.*

Bi ave rê çûn

Bêkêr û vala çûn. **Heyfa wê keda min ku gişt tev **bi ave rê çû**.*

Bi baranê re hatin, bi lehiyê re çûn

Ji bo tiştên demborî ku pêkhatina wan jî ji holê rabûye tê bikaranîn. **Jixwe tiştekî bêbingeh bû; **bi baranê re hat, bi lehiyê re çû**.*

Bi barek Quran sond bixwe, kes jê bawer nake.

Ji bo kesên derewîn tê bikaranîn. **Ya rastî, ew Tajdîn **barek Quran sond bixwe welehî ez dîsa jî jê bawer nakim**.*

Bi bavê xwe nedan

Pir jê hez kirin. Rûmeteke zêde dan. **Rast e, dike şer, lê dide, lê îro dike şer, sibê dîsa **bi bavê xwe jî nade**.*

Bi bayê bezê çûn

Pir bi lez û bez çûn. **"Di sikura xaniyan re qulibî ser Newala Kanoşka. **Bi bayê bezê li kendalê Alkîsê qiyame bû**."* Adar Jiyan

Bi bayê re hat, bi baranê re çû.

bnr. Bi bayê tê bi baranê diçe

Bi bayê tê bi baranê diçe.

Ji bo tiştên bêked û bêzehmet û demborî tê gotin. **Tiştên wisa ku **bi bayê bên û bi baranê herin** jî wisa dibin.*

Bi benckî xav yek girê dan

Yek xistin rewşek neyînî yan jî eletewş. **Resûl **bi benekî xav Rihan girê daye**, rebenê nizane ku çawa bike.*

Bi ber bayê dilê xwe ketin

Di bin bandora hestên xwe de man. **Ez îro **bi ber bayê dilê xwe ketime**.*

Bi ber bayê (yekî) ketin

Di bin bandora yekî de man. Wekî daxwaza kesekî kirin. *Heke Nûran **bi ber bayê Besê neketa**, niha ev rewş ne rewşa wê bû.*

Bi ber bê de berdan

Vala çûn, pûç bûn. *"*Di xortaniya xwe de, hêza afirandina ku di dilê wî de dikeliya, bi nivîsîna romanên erzan ku îro jî tu kes pê nizane, **bi ber bê de berda**."* Osman Özçelik

Bi ber guh ketin

Bi awayekî ne zelal bihîstin. *Nizanim kê niçandiyê, lê xuya ye ku ev yek **bi ber guhê Zeynelebdîn jî ketiye**.*

Bi ber ketin

Têgihîştin, fêm kirin. *A rastî Zozan zarokek jîr bû, loma jî zû **bi ber diket**.*

Bi ber lehiyê ketin

Ketin rewşeke pir xeternak. *Xwedê kesî nexe wî halî, malbata wî tev de ji ber wî deynî **bi ber lehiyê ket** û perîşan bû.*

Bi ber pişika xwe ve çûn

Xwe qure kirin, zêde hesibandin. *Ew îro **bi ber pişika xwe ve diçe**, lê bawer im ku ew ê jî di dawiyê de poşman bibe.*

Bi berxtî têr şîr venexwar, bi kavirtî têr gîha nexwar.

Ji bo kesên ku jiyana wan di serê serî de di nav zor û dijwariyê de derbas bûye tê gotin. *Roja wî ya reş, îro dest pê nekiriye, **wî bi berxtî têr şîr venexwar, bi kavirtî têr gîha nexwar.***

Bi bextê mêrê berê

bnr. Bi qewl û qirarê mêrê berê

Bi bêhna lingê hepsê revîn

Ji tirsan bi lezgînî revîn. *Dema ku wan ew çekên agiravêj dîtin, **bi bêhna lingê hepsê revîn**.*

Bi bêjingê dan hev, bi seradê belav kirin

Bi dijwarî berhev kirin, lê bi hêsanî xerc kirin. Bi ya xwe nezanîn. *Karê Zozanê jî wisa eletewş e, **bi bêjingê dide hev, bi seradê belav dike**.*

Bi bêjingê av anîn

Ji karên pûç re tê gotin. *Ya rastî ev helwesta Zinar jî hema **bi bêjingê av anîn e**.*

Bi bêvila (yekî) girtin

Xistina bin bandora xwe. *Qet destê xwe medê, Mendo wisa **bi bêvila wê girtiye** ku nikare xwe bilebitîne jî.*

Bi bin ketin

Têk çûn, şikestin. *Em **bi bin ketin**. Ev kar zêdetir girêdayî hêz û qewetê ye.*

Bi bin erdê ketin
Pir fedî kirin. **Piştî wan gotinên xwe yên şelişî Mexpûle kengê ku li çav Berfo diket, wê watrê ku **bi bin erdê diket**.*

Bi bihayê îmana xwe gotin
Gelekî biha firotin. **Hecî Kerem, zivistanê debara heywanan **bi bihayê îmana xwe dibêje**.*

Bi bihayê misqalekê nebûn
Ji bo tiştên pir piçûk û bênirx tê gotin. **Tu bawer bike ew kirinên wî li ba min **bi bihayê misqalekê jî nîn in**.*

Bi boçika xwe lîstin
1. Bitrî bûn. **2.** Pir şa bûn. **Ew wisa **bi boçika zwe dilîze**, lê wê rojekê bikeve jêr. *Ji ber ku Serkar zanîngeh qezenc kiriye, malbata wî **bi boçika xwe dilîze**.*

Bi boçika (yekî) girtin
Keys û firsend bi dest xistin. **Serdar **bi boçika Bager ancax girtiye**, qet wî berdide?!*

Bi canê xwe ketin
Pir hêrs ketin. Ziyan dan xwe. **"Ez ê rasterast bi çolan bikevim! Har bibim û **bi canê xwe bikevim**!.." Sedat Yurtdaş*

Bi cehenemê şad bûn
Ç'ûn cehenemê. Mirin. **Wî gelek mirov êşandin, loma wisa zû **bi cehenemê şad bû**.*

Bi cêrê yekî din (xelkê) çûn avê
Li gorî dîtin û daxwaza yekî din kirin. **Jixwe tu ku **bi cêrê yekî din herî avê**, karê te tu car bi ser nakeve.*

Bi cih anîn
Pêk anîn. **Mirov ku tiştek got, divê **bi cih bîne**.*

Bi cih ve hatin girê dan
Ji ber nexweşiyekê ji cih derneketin. **Belengazê apê min ji ber lingê xwe yê şikestî, ev çend mehin ku **bi cih ve hatiye girêdan**.*

Bi cila canê xwe re li hev nekirin
bnr. Bi cila canê xwe re şer kirin

Bi cila canê xwe re şer kirin
Bieks, bêsebir û bêhnteng bûn. **Bila kes ji Salih re tiştekî nebêje, jixwe ew **bi cila canê xwe re şer dike**.*

Bi cilan ketin
bnr. Kincê (yekê) hatin

Bi cuna (cinan) ketin

1. Pir hêrs bûn. **2.** Dîn bûn. **Dema ku Teyro ew bi wî halî dît,* ***bi cuna ket.*** **Hingî* ***bi cuna ketiye,*** *me ew bir ser gelek şêx û meleyan.*

Bi çar çavan li bendê bûn

Bi xiroşeke mezin li hêviya kesekî yan jî tiştekî bûn. **Cezmî* ***bi çar çavan li benda peyama dergistiya xwe bû.***

Bi çar çavan girîn

Ji bo kesên ku rewşa xwe ya aborî gelekî xerabtir nîşan didin tê gotin. **Malxerabo! Rewşa wî ew qasî jî ne xerab e,* ***lê bi çar çavan digirî.***

Bi çar çavan lê nihêrîn

Bi awayekî cidî lê miqate bûn. Bi baldarî lê mêze kirin. **Tu qet mereqan meke, ez bawer dikim ku ew e* ***bi çar çavan lê dinihêre.***

Bi çar destan girtin

Girîng dîtin. **Keçikê piştî revîna dergistiyê pêşîn,* ***bi çar destan bi dergistiyê xwe yê nû girtibû.***

Bi çar qurişan distînim, bi sê qurişan didim, Xwedê hezar bereketê bidiyê.

Ji bo kesên hesabê xwe nizanin tê gotin. **Maşelah hesabê Keskoyê bûrayê min jî, wekî yê ku gotiye:* ***"Bi çar qurişan distînim, bi sê qurişan didim, Xwedê hezar bereketê bidiyê."*** (qerf)

Bi çar qurişan nekirin

bnr. Bi pênc qurişên qul nekirin

Bi çavan ketin

Heyf pê hatin. Xesîsî (temahkarî) kirin **Min got ji min re hinek penêr bişîne,* ***bi çavan ketî*** *bi tenê gilêyek piçûk şandiye.* (nifir)

Bi çavan mirov xwarin

1. Nezerî kirin. **2.** Dexesî û xayînî kirin. **3.** Zehf çavçilî kirin. **Ew malbata mala Jehro hema wisa* ***bi çavan mirovan dixwin.*** **Ji ber ku rewşa me hinekî baş bûye van cînaran* **em bi çavan xwarin.** **Ev Nisret, tu dibêjî ji xelayê derketiye,* ***bi çavan mirovan dixwe.***

Bi çavekî baş lê nihêrîn

Bi awayekî erênî nirxandin. **Raramana wan nizanim, lê ez bi xwe bi çavekî* ***baş li wê bûyerê dinihêrim.***

Bi çavekî biçûk lê nihêrîn

Piçûk dîtin. Rewşa rasteqîn nenirxandin. **"Em wisa bawer bûn ku ew* ***bi çavekî piçûk li me zarokan dinihêre."*** Mahmud Baksî

Bi çavekî lê nihêrîn

bnr. Bi çavekî biçûk lê nihêrin. **Tu wisa* ***bi çavekî li wî menihêre,*** *dema ku derbasî ser kompîturê dibe tu mêze bike ka çi hunerên wî hene.*

Bi çavekî kêm lê nihêrîn
bnr. Bi çavekî biçûk lê nihêrîn

Bi çavekî mezin lê nihêrîn
Girîng girtin. **Gêloyê Silto **bi çavekî mezin li keça xwe dinihêrî**, lê ew wekî hêviya wî derneket.*

Bi çavekî na, bi çar çavan li hêviyê (bendê) bûn
Bi hêvî û hewcedariyeke zêde li benda tiştekî yan jî kesekî bûn. **Bi tenê gumana wan ew bû, ji bo wê jî **bi çavekî na, bi çar çavan li hêviya wî zilamî bûn**.*

Bi çavekî xwar lê nihêrîn
bnr. Bi çavekî biçûk lê nihêrîn

Bi çavekorî bi rê ve çûn
Ne bi pergal û zaneyî, bi tevekelî û bi texmîn tevgerîn. **Mixabin ev saziyên me kurdan **bi çavekorî bi rê ve diçin**.*

Bi çavên biratiyê lê nihêrîn
bnr. Bi çavên baş lê nihêrîn

Bi çavên serê xwe dîtin
Bi awayekî zelal û bi xwe dîtin. **"Ez xwe ji werta Avsîra derxim, ez ê jiyaneke nû bibînim û **bi çavên serê xwe li dinyayê binêrim**."* Ridwanê Elî

Bi çavên baş lê nihêrtin
Bi erênî nirxandin. **Vê gavê pirsgirêk tune ye, ji ber ku Reşîd **bi çavekî baş li Gulê nanihêre**, dibe ku dû re kêşe derkevin.*

Bi çavên dijminatiyê lê nihêrîn
Bi armanceke neyarî nêzîk bûn. **"Ew di nîveka dinyayê de ne û dinya li dora wan dizivire. **Bi çavên dijminatiyê li civatê dinihêrin.**"* Cemil Denli

Bi çavên xêl lê nihêrîn
Bi niyeteke xerab lê mêze kirin. **Bi her awayî dixuye ku Resûl **bi çavên xêl li lawê min dinihêre**.*

Bi çavên (yekî) nihêrîn
Li gorî rewş û armanca kesan xuyang û encam jî cuda cuda ne. **Gotin: "Jina te qet ne bedew e." Wî got: "Hûn werin carekê jî **bi çavên min lê binihêrin**."*

Bi çavên serê xwe dîtin
bnr. Bi çavên xwe dîtin

Bi çavên xwe dîtin
Bêşik û bêguman bûn. Bi xwe şahad bûn. **"Ew, kirin cinawirekî wisa ku benî adem ne tê de, dirûvê her tiştî pê diket. Şehrezada dayika wî ku ew **bi çavên xwe dît**, ji hêrs û heyecanê yekser ji hişê xwe çû."* Mem

Bi çengurê (yekî) girtin

Bi guhê yekî girtin û avêtin. **Lê mêze kirin ku, ew zelîf ser û guhê xwe ba dike,* ***bi çengurê wî girtin*** *û ew avêtin derve.*

Bi çir û dûvan rê dirêj kirin

Li hincet û mehneyan gerîn. **Armanca Mîrşan tiştekî din e, loma wisa li ber me* ***bi çir û dûvan rê dirêj dike****.*

Bi çiraya hesin lê gerîn

Bi bi hêvî û armanceke mezin daxwaz kirin. **Erê ew* ***bi çirayeke hesin li wê digerîn****, lê mixabin gelekî dereng mabûn.*

Bi çopekî pê nesekinîn

Tu alîkarî jê nedîtin. Guman pê nebûn. **Ew wisan e, xweş dipeyive, lê pêdiviyeke te çêbibe, tu nikarî* ***bi çopekî pê bisekinî****.*

Bi dabaşa xwe de ketin

Bi tenê bi mijara xwe re mijûl bûn. **Gulhên wî û çavên wî ne li cihên din in, ew bi tenê* ***bi dabaşa xwe de ketiye****.*

Bi darikê xwe gû tev dan

Wekî rêbaza xwe karên neyînî û fesadî kirin. **Karê wî xirabî û teşqele ye, bi tenê* ***bi darikê xwe gû tev dide****.*

Bi darê zorê

Ne bi xweşikayî, bi zor û zextê... **"... ew raperîn* ***bi darê zorê*** *têne şikandin û tepeserkirin."* Samî Berbang

Bi darî hev ketin

Hatin rûyên hev , rûbar bûn. **Wî qet ew yek nedixwast, lê hema li serê kolanê* ***bi darî hev ketin****.*

Bi darî (diyarî) (yekî) ketin

1. Hewcedarî yekî bûn. **2.** Bi yekî re hevdîtin çêkirin. **Ji salan, mehan carekê ez* ***bi darî wî ketim****, lê di wê de jî tu alîkarî nekir.* **Piştî neh salan* ***bi diyarî Reşo ketim****, nizanîbû çawa bikira.*

Bi dawa xwe nekarîn

Ji bo jinên ku di hêla zayendî de daxwazkar in tê gotin. **Jinikê* ***bi dawa xwe nikaribû****, heya ku xwe di nav gund de rezîl kir.*

Bi dawî anîn

Bi encam kirin, axirî lê anîn. **Dibistana wî zelîf zêde dirêj kişand, lê hemd ji Xwedê re ku* ***bi dawî anî****.*

Bi def û delkan

bnr. Bi humehum û gumegum

Bi derdê bêderman ketin
Rastî pirsgirêkek girîng hatin. **Qet halê Şêrko pirs nekin. Ew bi derdê bêderman ketiye.*

Bi derdê dilê xwe şewitîn
bnr. Di timtêl û hewalê xwe de şewitîn

Bi derdê eşqê şewitîn
Ji ber evîndariyê li ber xwe ketin, xemgîn bûn. **"Mem cuda û Zîn cuda, her yek **bi derdê eşqê dişewitîn**."* Mele Mehmûdê Beyazîdî

Bi derziyê çûn ser şûjinê
bnr. Bi kulmê çûn direşê

Bi derziyê bîr kolan
1. Bi biryar û bi kedeke mezin li ser karekî xebitîn. **2.** Bi karekî vala re mijûl bûn. **Em deyndarên wan kesan in ku wekî **bi derziyê bîrê kolane** û ji bo welatê me xebitîne. *Ya ku ew dike jî hema **bi derziyê bîrkolan e** lo.*

Bi dest berî hev dan
Bi çekan gule berî hev dan. **Bi roj nîvro, her du cîranan **bi dest berî hev dane**.*

Bi dest ketin
Ji hal ketin. Pir jar bûn. **Li welatê me, dewarên feqîran zivistanê tim **bi dest diketin**.*

Bi dest kirin, bi dev xwarin
Bi xwe karê xwe kirin. **Elî **bi dest dike, bi dev dixwe**. Heya jê tê nakeve bin mineta tu kesî.*

Bi dest neketin
1. Pir bi qiymet bûn. **2.** Zû bi zû peyda nebûn. **Ew ne tiştekî wisa bêqîmet e ku zû bi zû **bi dest bikeve**. *Ji bo çêkirina xwarinên mewlûdê, divê em sê beroşên mezin **bi dest bixin**.*

Bi dest û lepan (dest û dev) bi nav ketin
1. Bi her awayî tê de gut (nok) bûn. **2.** Bêpêşk û bêpergal bûn. **Meryem **bi dest û piyan wisa bi nav wî karî ketiye** ku feleka wê şaş bûye. *Yezdan wisa **bi dest piyan bi nav ket** ku her der lewitand.*

Bi dest xistin
Tiştên ku lê tê gerîn dîtin. **Ez gelekî li vî parçeyê kompîturê geriyam, di dawiyê de min li cem xurdeciyan **bi dest xist**.*

Bi destan dawo, bi piyan li pey geriyawo
bnr. Bi tetikan dayîn, bi pepikan li pey gerîn

Bi destan dayîn bi lingan li pey gerîn
bnr. Bi tetikan dayîn, bi pepikan li pey gerîn

Bi destan kirin, bi lingan li pey ketin
bnr. Bi destê xwe kirin, bi stûyê xwe kişandin

Bi destê (yekî) girtin

Alîkarî kirin. **Xwedê jê razî be, heke Faris **bi destê wê jinika belengaz negirta**, kî dizane dawiya wê dê çawa bûya.*

Bi destê (yekê) girtin

Ji bo zewacê, keçek hilbijartin an jî keçikek kirin bûka xwe. **Şexmûsê Bedran jî heke **bi destê qîza Ferman negirta** wê di mal de bimaya.*

Bi destê neşûştî bi nav ketin

1. Bi awayekî ne nazik û hovane nêzîk bûn. **2.** *Ked û karê amadebûyî xera kirin. *Wî pîsê heram ku wisa **bi destekî neşûştî bi nav ket**, medê me revî. *Evdile **bi destekî neşûştî bi nav ket**, keda min a bi salan û tar û mar kir.*

Bi destê rastê dayîn, bi destê çepê standin

Sextekarî kirin. **Ev dewlet ji karmendên xwe re tim wisa dike, **bi destê rastê dide, bi destê çepê distîne**.*

Bi destê xwe av tê werdan

Bi awayekî ne li rê dawî li tiştekî xwe anîn. (Firotin an jî xelas kirin.) **Şengê **bi destê xwe av tê werda** û bi awayekî melûl ji nav derket.*

Bi destê xwe dan

Bi xwe bi rizaya xwe kirin. **Ezbenî, te qîza xwe **bi destê xwe daye**, heqê te tune ye ku tu kesekî tewanbar bikî.*

Bi destê xwe ketin telê

Ji ber sedema çewtiyên xwe ketin rewşek xeter. **Kekê Fexrî ji ber çewtiya xwe **bi destê xwe kete telê**.*

Bi destê xwe kirin, bi stûyê xwe kişandin

Bi xwe çewtî kirin û bi xwe cezayê xwe jî kişandin. **Huso nikare ji kesî gazincan bike, **bi destê xwe kiriye, wê bi stûyê xwe jî bikişîne**.*

Bi destê xwe mala xwe xera kirin

Çewtiyeke mezin kirin. **Bengîn bi wê helwesta xwe, **bi destê xwe mala xwe xera kir**.*

Bi destê xwe, xwe avêtin nav agirê sor

Ji destê xwe çewtî û kêmasî kirin an jî ji bêgavî xwe xistin rewşeke dijwar. **Zilfoya Hecî Baro dît ku dê xwîn birije, **bi destê xwe, xwe avête nav agirê sor** û bi kurê Mehemed re zewicî.*

Bi destê xwe, xwe xistin belayê

bnr: Bi destê xwe, xwe avêtin nav agirê sor

Bi destê (yekî) ve berdan

Erk an jî derfet winda kirin. **Zeynikê gelekî li ber xwe da, lê di dawiyê de dîsa ew doz **bi destê parêzerê li dijî xwe ve berda**.*

Bi destê zorê
bnr. Bi darê zorê

Bi destê zorê pîrê diavêjin bîrê (gorê).
Ji bo rewşa dijwar tê bikaranîn. **Çawa ku dibêjin:* ***"Bi destê zorê pîrê davêjin bîrê."*** *Hema ez jî ketime eynî rewşê.*

Bi destên hev girtin
1. Bi hev du re zewicîn. **2.** Ji hev û din re alîkarî kirin. **Wan* ***bi destên hev girtine****, Xwedê li ser halgiyekî wan kal û pîr bike. *Wan her du birayan* ***bi destên hev girtin****, wisa ji wê tengasiyê rizgar bûn.*

Bi destên ketiyan girtin
Ji kesên feqîr û hewcedar re alîkarî kirin. **Jixwe ew miroveke wisa ye, tim* ***bi destên ketiyan digire****.*

Bi dev xwe mezin kirin
Pesnê xwe dan. **Ew jî lunerek e, jinikê* ***bi dev xwe mezin kir****.*

Bi dev xweş bûn, bi dil reş bûn
Sextekar û durû bûn. **Tu wisa li zarê wê yê xweş menihêre. Ew jinikeke* ***bi dev xweş, bi dil reş e****.*

Bi devê bavê kesî neketin
Kes zû bi zû nikare wê pêk bîne. **Tu metirse, wisa* ***bi devê bavê tu kesî neketiye*** *ku bê wê yekê jî bike.*

Bi devê heftê û heft bavê (yekî) neketin
Hedê tu kesî neketin. *****Bi devê heftê û heft bavê kesî neketiye*** *ku were, wî hesabî bi min re bibîne.*

Bi devê tivingê li hev du nihêrîn
Bi hev û din re kîn û buxz ajotin. **"...mala apê Remo û ya xalê min Mecîd jî li ser mersela revandina dotmameke me di navbera wan de dijminayî hebû.* ***Bi devê tivingê li hev du dinihêrîn.***" Cemil Denli

Bi devê (yekî) din xeber dan
Ne ya xwe, lê li gorî daxwaz û bandora hinekên din, axivîn. **Ez jî dizanim ku ew* ***bi devê hinekên din xeber dide****.*

Bi devê vala xeber dan
Ji tiştên pûç xeber dan. **Hemedan dîsa* ***bi devê vala xeber dide****.*

Bi devê xwe karîn
Raz, sir girtin. **Rewşen* ***bi devê xwe dikare****, tu dikarî sira xwe jê re bibêjî.*

Bi devê xwe ketin belayê (Bi devê xwe, xwe xistin belayê)
Axaftineke çewt kirin. **Ronî baş xeber da, lê di dawiyê de* ***bi devê xwe, xwe xiste belayê****.*

Bi devê xwe ketin suxleyan
bnr. Bi devê xwe şehitîn (şepilîn)

Bi devê xwe şehitîn (şepilîn)
Bi gotinên xwe yên bêhemd ve ketin rewşek neyînî. **Heyran tu kesî tiştek gotiye? Ew **bi xwe bi devê xwe şehitî**.*

Bi devê xwe xeber nedan
Li gorî daxwaz û fermana hinekên din peyivîn. **Tu wî bi gotinên wî nenirxîne, ew **bi devê xwe xeber nade**.*

Bi dê û bav mezin bûn
Bi awayekî asahî û serfiraz mezin bûn. **Xwedê wî **bi dê û bav mezin bike**, zarokekî pir secîh (jîr) e.*

Bi devê (yekî) re gihîştin
Hatin radeya alîkariyê. **Her du zarokên Cimo jî şikir **bi devê wî re gihîştine**.*

Bi dilê sax
Bi niyeteke baş. *****Bi dilê sax**, min gelek razên xwe jê re gotin, lê wî ji hinekên din re gotin.*

Bi dilê xwe bûn
Wekî daxwaz û gotina xwe kirin. Ji bo pêkanînê serbest bûn. **Keçika min, tu **bi dilê xwe yî**, min rewş ji te re got, êdî biryar ya te ye.*

Bi dilê xwe hespê xwe bezandin
Wekî daxwaza xwe kirin. *****Piştî çûyîna dê bavê wî, Cembelî di mal de li ser xwîşk û birayên xwe bi dilê xwe hespê xwe bezand**.*

Bi dilekî germ nêzîk bûn
Bi dilovanî têkildar bûn. **Ez **bi dilekî germ nêzîkî wî bûm**, lê dû re têgilûştim ku ew ne hempayê min e.*

Bi dilopan dan ser hev
Hindik hindik û bi zehmet berhev kirin. **Min **bi dilopan da ser hev**, hûn werin ji min bipirsin, bê ka min çi zehmetî kişandin.*

Bi diranan civandin
Bi zor û zehmeteke mezin pêk anîn. **Erê îro rewşa wî hinekî baş e, lê her kes dizane ku wî **bi diranan ew mal civand**.*

Bi dizgînên (yekî) girtin
Di bin kontrola xwe de girtin, zeft kirin. **Heke Remo **bi dizgînên wê negire**, kî dizane wê rojê xwe bi çend kesan re hil ke?*

Bi dîwarê xwe de mîstin
Bi xwe karê xwe xera kirin. **Sûcê tu kesekî nîn e, Cimşoyê Gemşo, bi helwesta xwe ya vê dawiyê, bi xwe **bi dîwarê xwe de mîst**.*

Bi dora (yekî) ketin

Ji bo xapandin û ziyanê li dor yekî çûn û hatin. *"***Bi dora jinikê ket**, *pereyên wê jê stendin û ew anî."* Zana Farqînî

Bi dû ketin

1. Hişê xwe, ked û bala xwe dan ser. **2.** Li pey çûn. **Xembar **bi dû wê pirsgirêkê ketiye**, *heya ku baş fêm neke, dev jê bernade.* **Ew keçik **bi dû hezkiriyê xwe ket** û heya Ewrûpayê çû.*

Bi dûranî, bi şîranî

bnr. Dûro bi gul û nûro

Bi dûşelkan li dû ketin

Der barê kesekî de tiştên neyînî gotin. Paşgotiniya yekî kirin. **Balır **bi dûşelkan li dû Çîlê ketiye**, *Xwedê axiriyê xêr bike.*

Bi eleg û bêjing kirin

Bi kûrayî li ser sekinîn. **Heke wan wisa **bi eleg û bêjing nekirana**, *derbaskirina wê ew qas zor nedibû.*

Bi elequlemiyan çûn (yekî)

Li dû yekî di nav hewldanên dek û dolaban bûn. *"*Bi elequlemiyan hate min û ez xapandim."* Zana Farqînî

Bi elequlemiyan li dû (yekî) ketin

bnr. Bi elequlemiyan çûn (yekî)

Bi emrê Xwedê çûn (mirin)

Bêyî qeza û bêyî bûyereke balkêş mirin. **Em dîsa şikir dikin ji Xwedê re ku bavê me digel di wê serdema lûzbilşeytanan de bi emrê Xwedê çû.*

Bi endaze (hendaze) axaftin

Bi tedbîr, zaneyî û pîvan axaftin. **Seyîdxan li wir wisa **bi endaze axivî** ku heçî kesê ku ew guhdarî dikir; ew mafdar dît.*

Bi erdê re kaş bûn

1. Perîşan bûn. **2.** Pir dirêj bûn. **Xezal kete rewşeke wisa ku **bi erdê re kaş bû**. **Dêrê herhûkê jî bi erdê re kaş dibû.*

Bi erdê ve bûn yek

1. Tar û mar bûn. **2.** Hurmeteke bêhempa nîşan dan. **3.** Gelekî fedîkar bûn. **4.** Ji kesekî re şêlafî kirin. *Di operasyonan de leşkeran ew gundên li newalê tev **bi erdê ve kirin yek**. **Mihyedîn ji bo rehetiya mêvanan, xwe **bi erdê ve dike yek**. **Heke zarokên min vê yekê bibihîsin, ez ê **bi erdê ve bibim yek**. **Doxtorê beşa me yê asîstan, ji bo ku bibe pispor, xwe li ber profesor **bi erdê ve dikir yek**.*

Bi erdê ve zelîqîn

bnr. Bi erdê ve yek bûn

Bi ererê xwe qebûl kirin

1. Bi xwe wekî ya dilê xwe pejirandin. **2.** Ji rewşa xwe razî bûn. **Wî **bi ererê xwe ev yek qebûl kir**. *Heyran, ew **bi ererê xwe qebûl dike**, hûn çi dixwazin?*

Bi eşqên mewîjan, dil diçe guwîjan.

Ji dêvla kesekî yan jî tiştekî, tiştekî din ecibandin. **Ew di nav rewşeke wisa dijwar de bû ku **bi eşqên mewîjan, dilê wî diçû guwîjan**.*

Bi ezmanan ketin

bm: Ji dîn û îman derketin

Bi ezraîl re şad bûn

Bi tiştên şer, bela û xeteriyê re pir mijûl bûn. **Baladîn **bi Ezraîl re şad dibe**, ka bi vê meşê dawiya wî li ku disekine.*

Bi Ezraîl re şer bûn

1. Li hemberî newweşiyê li ber xwe dan. **2.** Ji bo kesên pir jêhatî û têkoşer tê gotin. **Ew îro **bi Ezraîl re şer e**, bawer im ku dê bi ser bikeve. *Ew mêrekî wisan e ku **bi Ezraîl re şer e**.*

Bi felekê re ketin dewê (dozê)

bm: Bi felekê re xeber dan

Bi felekê re xeber dan

Xwe zêde hesibandin. **Eman bi ser wî de neçin, va ye ew **bi felekê re xeber dide**.*

Bi firê ketin

Mezin bûn. Bi kêrî xwe hatin. **Me got êdî zarokên me **bi firê ketine** û em ê rehet bin, lê îcar em bi derdên zarokên wan re em mijûl dibin.*

Bi firê xistin

Mezin kirin, bi qasî ku li ser piyên xwe bisekinin, gihandin. ****Piştî mirina mêrê xwe**, Xezalê zarokên xwe yek bi yek **bi firê xistin** û dû re zewicî.*

Bi fisê bi hev ve bûn

Bingeh û naverok vala û pûç bûn. **"Îskeleya wan, îskeleyek e ku bi fisê bi hev ve ye."* Zana Farqînî

Bi fita Hesenê Hewêrî

Ew destûr û zagona ku Hesenê Hewêrî daniye, ez bi wê bi kim. **Camêrî **bi fita Hesenê Hewêrî** rê ji xwe re vedike.*

Bi ga nikarîbû, baz da golikê.

bm: Bi kerê nikarîbû, baz da deşikê

Bi galegalan ketin

bm: Ketin gilî û şêwran

Bi gef û gur
Bihêrs û bihêz bûn. **Bawer **bi gef û gur** çû Resûl, lê heya gîha wir, perça wî danî.*

Bi gijika hev girtin
Ji bo pevçûna jinan tê gotin. **Remziye û Eyşanê **bi gijika hev girtin**, cîranan bi zorê ew zeft kirin.*

Bi gopalekî hesinî û bi soleke hesînî lê gerîn
Bi armancek dûvdirêj û bi biryareke vebirî daxwaz kirin. **Lawo, welehî tu **bi gopalekî hesinî û bi soleke hesinî lê bigerî**, tu keçikeke wekî Zelîxanê nikarî di dinê de bibînî.*

Bi gotegota ... çûn
Tiştek tim dubare kirin, lê pêk neanîn. **Rebenê Mamoste Sîraç jî wê **bi gotegota: "Perwerdeyek akademîk û azad" here**.*

Bi gotinan êşandin
Bi peyvên neyînî aciz kirin. **Xwedê dizane li şûna min kî hebûya, dê **bi wan gotinan biêşiya**.*

Bi guh hildan
1. Bal kişandin. **2.** Bi bîranîn. **Ku Mîr Sîtav gotina min **bi guh hilneda**, tu wê çaxê lê binêre. *Îro me tim rewşa wan **bi guh hilda**.*

Bi gur re dixwe, bi şivên re şînê dike.
bnr. Bi gur re dixwe, bi xwedî re şînê dike.

Bi gur re dixwe, bi xwedî re şînê dike.
Di nav helwesteke kone, durû û sexte de bûn. **Tu wisa bi çavekî li wî menêre, ew **bi gur re dixwe, bi şivên re şînê dike**.*

Bi gur re goşt dixwe, bi xwedî re şînê dike.
bnr. Bi gur re dixwe, bi xwedî re şînê dike.

Bi gurmistê bezîn şûjinê
Di nav hewldaneke çewt de bûn. **Helwesta Remzî jî gelekî çewt e, **bi gurmistê dibeze şûjinê**.*

Bi gûyê xwe re şer kirin
Ji bo kesên cirnexweş tê gotin. **Ew **bi gûyê xwe re şer dike**, jê dûr bikeve.*

Bi gûyê xwe ve bûn yek
1. Di nav rewşeke xerab de bûn. **2.** Pir bi qilêr û pasaxî bûn. **Piştî mirina mêrê xwe Rihan **bi gûyê xwe ve hû yek**. *Lawo ka hinekî dest û piyên xwe bişo, li xwe mêze bike, va ye tu **bi gûyê xwe ve bûyî yek**.*

Bi gûzanan ketin
Ji cihên hêvînekirî derbe xwarin. **Cihê ku em herî zêde pê bawer bûn, em **bi gûzanan ketin**.*

Bi halê xwe ketin

Tenê di nav tekoşîna rewşa xwe de bûn. **Tu niha çi bibêjî, ew têkildar nabe, ew tenê* ***bi halê xwe ketiye****.*

Bi hev û din ketin

Minaqeşe kirin, pevçûn. **Piştî kuştina Egîtê Cimşît her du eşîret jî wisa* ***bi hev û din ketin*** *ku nayê gotin.*

Bi hêçeta (hinceta) kurikê, dixwe virikê.

Bi hinek hincetan hinek mirov karên xwe pêk tînin û xwe bi rê ve dibin. *****Bi hêçeta kurikê dixwe virikê.*** *Heke ew zarok nebûya, ew bûk wê di rewşeke xerab de bûya.*

Bi heft avan şûştin

Xwe ji sûc û gunehan paqij kirin. **Welehî ew xwe* ***bi heft avan bişo****, dîsa jî eynî ew mirov e.*

Bi heft kilîtan girêdayî

Saxlem û qewîn kirin. **Ya ku ez dizanim, ew xwe di bin deriyên* ***bi heft kilîtan girêdayî*** *de veşêre jî ji dest Rodîcan nafilite.*

Bi heft lingan jê dûr bûn

Tu têkilî tune bûn. **"Xwîn ketibû navbera min û xewê. Xew* ***bi heft lingan*** *ji min dûr direviya."* H. Kovan Baqî

Bi heft werîsan nehatin girêdan

1. Ji bo kesên pir hêrsbûyî tê gotin. **2.** Ji bo zarokên pir nehis û şûm tê bikaranîn. **Remo ku hêrs dibe,* ***bi heft werîsan nayê girêdan****. *Maşelah lawekî Gulanê heye,* ***bi heft werîsan nayê girêdan****.*

Bi heqê xwe zayîn

Ji bo rewşa normal, mafdar û xwezayî tê gotin. **Heyran, bila* ***bi heqê xwe bizên****, em tiştekî zêde ji wan naxwazin.*

Bi her du çavan girîn

Gunehê xwe bi xwe anîn. **Ew qas mal û milkê Yezdan jî heye, lê hema tu wî kengî bileqînî,* ***bi her du çavan digirî****.*

Bi her çar qîl û pîlan ketin nav

Bi awayekî xeternak ketin nav karekî neyînî. **Malbata Dîlanê* ***bi her çar qîl û pîlan ketibû nav*** *elequlemiyên Nusret.*

Bi her zimanî axaftin

Wekî rewş û daxwazê xwe nîşan dan an jî guherandin. **Maşelah mêrik wekî margîsê (bûqelemûn)* ***bi her zimanî diaxive****.*

Bi her du çavên xwe dîtin

Ji sedî sed jê bawer bûn. **Weleh ez bi xwe jî metel im, heke min* ***bi her du çavên xwe nedîta*** *min jî tu caran bawer nedikir.*

Bi her du destan pê girtin
Girîng girtin. **Keçikê **bi her du destan lawik girtibû**, lê birayê wê nehişt ku ew bizewicin.*

Bi her du lepan bi nav ketin
Tevlihev kirin. Hewlogewloyî kirin. **Gulîzer **bi her du lepan bi nav ket**, wisa xera kir ku bîzê kesî neçûyê ku bixwe.*

Bi her du piyên paşîn ve girê dan
Bêçare û firsend man. **Ka belengazê Rêzdar wisa **bi her du piyên paşîn ve hatibû girêdan** ku tiştek ji dest nedihat.*

Bi hev du ketin
Bi hev du re debar nekirin. **Berê ji hev du re pir baş bûn, lê dû re wisa **bi hev du ketin**, ku xelk hate sêra wan.*

Bi hev du re debar nekirin
Hev û din aciz kirin. Bi hev nekirin. **Salek di ser re derbas nebûbû, **bi hev du re debar nekirin** û hev û din berdan.*

Bi hev du re bûn desteg
Bi hev û din re alîkarî kirin. * Ew exrebeyê hev in, pêwîst e, zêdetir bi hev û din re bibin desteg.

Bi hev du re kal û pîr bûn
Tim li ba hev jiyîn. **Jixwe ji bilî wê rêyeke wan tune bû, **bi hev du re kal û pîr bûn**.*

Bi hev germ bûn
Têkilî xweş bûn. **Berê hinekî bi hev nedikirin, lê dû re **bi hev germ bûn**.*

Bi hev girtin
Bi hev û din re tifaq kirin. **Jixwe heke wan **bi hev negirtana**, niha ji zû ve mehf bibûn.*

Bi hev ketin
Bi hev û din re şer kirin, devejenî avêtin hev. **Dema ku ew her du eşîr **bi hev bikevin**, Xwedê neke lê mêr wê bên kuştin.*

Bi hev re bihartin
Bi hev re derbas kirin, bi erênî nêzîkî hev bûn. **"Jin û mêr xweş **bi hev re dibihêrin**."* Zana Farqînî

Bi hev re dan û stendin
Di derbarekê de yan jî di hin derbaran de bi hev û din re têkildar bûn. **Bi salan e li ser bazirganiyê **bi hev didin û distînin**.*

Bi hev re derbasî kirin
Bi hev re baş debar kirin, têkilî meşandin. **Bi rastî ev demeke pir dirêj e **bi hev re baş derbaskirina** jin û mêran zêde ne gumcan e.*

Bi hev re gihîştin

Di heman demê de mezin bûn. **Hezîma qîza Nisoyê Hêlik Çortan, çima ku zêde dem nekiriye navberê, zarokên wê hemû **bi hev re gihîştine**.*

Bi hev re leqleq kirin

Li ser tiştên pûç û vala peyivîn. **Karê wan jinên taxa me jî ew e, hema heta êvarê **bi hev re leqleq dikin**.*

Bi hev re qarewar kirin

Devjenî avêtin hev. Teşqele derxistin. **Berê navbera wan baş bû, lê ev çend car in **bi hev re qarewar dikin**.*

Bi hev sekinîn

Ji hev û din re alîkarî kirin, desteg bûn. **Ew cînar in, helbet wê bi hev bisekinin.*

Bi hev şirîn bûn

Têkilî baş bûn. **"Berê bi hev sar bûn, ez dêhna xwe didimê va ye dîsa **bi hev şîrîn dibin**." Zana Farqînî*

Bi hev û din re meşîn

Li ser mijarekê li hev kirin, tifaq kirin. **Ev çend sal in ku ew her du bi awayekî bi bir-yar **bi hev û din re dimeşin**.*

Bi hev û din hilketin û daketin

bnr. Heta êvarê hev û din xwarin

Bi hev û din re sax bûn

Bi hev û din re durist û girêdayî bûn. **Du heval ku **bi hev û din re sax bin**, ê sisiyan Xwedê ye.*

Bi hev ve girê dan

1. Vir û derew li hev anîn. **2.** Ji bo karekî yan jî xeberekê gelek kes têkildar kirin. **Şîndar hema li cihekî ku rûdinê, deh derewan **bi hev du ve girê dide** û radibe. *Wî lawikê ji rojhilata Kurdistan, di îfadeya xwe de gelek kes **bi hev du ve girêdan**.*

Bi hev ve girêdayî bûn

Ji hev û din re sax û dilsoz bûn. **Bi rastî jî ew malbateke **bi hev du ve girêdayî ye**.*

Bi hev ve neman

Pir jar û lawaz bûn. Têkûzî û pergal xera bûn. **Belengazê Rezaqê Serhing piştî wê nexweşiyê wisa bûye ku **bi hev ve nemaye**.*

Bi hev xistin

1. Dest bi pêkanîna karekî kirin. **2.** Tevlihevî kirin, fesadî kirin. **Smayîlê Kamilê Ker nû karê xwe **bi hev xistiye**. *Wê ev taxa me hemû **bi hev xist** û çû.*

Bi hev zanîn

Hev û din nas kirin. Bi hev û din beled bûn. *Tu çi zêde dipeyivî, ma tu nizanî ku ez û ew em **bi hev û din dizanin**.

Bi hevalan re hat, bi guran re çû.
Bi dostîtî nêzîk bûn, lê dijminatî pê kirin. *Me jî wer hêvî nedikir, hema **bi hevalan re hat, bi guran re çû**.

Bi hewa ketin
1. Gelekî şad bûn. **2.** Gelekî bihêrs bûn. *Dema ku Şêngulê bihîst jê re neviyeke qîzîn bûye, **bi hewa ket**. *Ferzende çawa ku hîn bû keça wî bi lawê Xusrev re reviye, ji kerban **bi hewa ket**.

Bi hewa xistin
1. Dilşad kirin. Ji erdê rakirin. **2.** Bi buhayekî pir zêde firotin. *Eferim te bi qezenckirina wê dibistanê re diya xwe **bi hewa xist**. *Maşelah te ew hespa xwe ya taqurî **bi hewa xistiye**.

Bi hewla canê xwe ketin
Ketina heyra canê xwe. *Di wê xilaportê de kî li mal û milk difikire, ew bi tenê **bi hewla canê xwe ketibûn**.

Bi heyr û hejmekar **man**
Gelekî ecibandin, *"Gava Evdo ji der de anîn, yên ku di otaxê de rûniştibûn, li wî dinihêrîn, îlahî jina keşîş. Wê **bi heyr û hejmekar li wî tifalî dinihêrî.**" Tîtal Mûradov

Bi heyran û qurban (Bi can û qurban)
1. Bi dil û can û bi zarekî şirîn têkildar bûn. **2.** Lavayî kirin, li ber gerîn. ***Bi heyran û qurban**, axaftina wî devê min li ber wî girê da. ***Bi heyran û qurban**, me ancax Birûsk anî rê.

Bi hinceta kulîlkan, çûne şûlikan.
Ji bo pêkanîna hinek tiştan, hinek tişt ji xwe re kirin hincet. *Wisa nebûya nedibû, em **bi hinceta kulîlkan, çûne şûlikan**.

Bi hineminê tu xelas nabî ji gotina jinê.
bnr. Bi mineminê dernakeve ji ber hukmê jinê.

Bi hişkebere xwe avêtin nav
Bêyî hesab, kitab û lêkolîn ketin nav karekî. *Lawo te hema **bi hişkebere xwe avête nav** vî karî.

Bi humehum û gumegum
Bi dengî, bi şahî, bi hêwirze û qelebalix. *Ji hepsê derketina Bêrîvana mala Biro, wisa **bi humehum û gumegum** bû ku her kes ecêbmayî ma.

Bi Îsa re nan dixwe bi Mihemed re selewatan dike (tîne, dikişîne).
Ji bo kesên sextekar, kone û durû tê gotin. *Bender mirovekî wisa ye ku **bi Îsa re nan dixwe, bi Mehemed re selewatan dikişîne**.

Bi jehrê ketin
Jehrî bûn. **Ew ji ber wê xwarinê* ***bi jehrê ketin***.

Bi jehrê pingihîn (pingahî bûn)
Gelekî bihêrs û kîndar bûn. Firşik teng bûn. **Keçê jina wî çawa derdê wî dikişîne? Mêrik* ***bi jehrê pingihiye*** *lê.*

Bi jehrê av dan
bnr. Bi jehrê pingahî bûn

Bi kapêkekî Ûris nekirin
Ji bo mirovên bêkêr û xirab tê bikaranîn. **Ev Ezîzê Guharê bi kapêkekî Ûris jî nake.*

Bi keda (qezenc) milan îdare kirin
Bi tenê bi xebata fizîkî debara xwe kirin. **Tu pîşe û xwendina bavê min nîn e, ew bi tenê* ***bi keda milên xwe debara me dike***.

Bi kerê nikare, dibeze kurtên.
bnr. Bi kerê nikarîbû, baz da deşikê.

Bi kerê nikare, diçe kuriyê.
bnr. Bi kerê nikaribû, baz da deşikê.

Bi kerê nikarîbû, baz da deşikê.
Yên ku bi zorê nagihîjin kesên mezin û bihêz, di dêvla wê de yên qels hildidin hemberî xwe. *****Emirê Xelîl bi kerê nikarîbû, baz da deşikê.***

Bi kevçiyan berhev kirin, bi hesikan belav kirin
Bi zor û zehmetê kom kirin, lê ji bo tiştên ne hêja û bi hêsanî belawela kirin. **Jixwe gelek caran wisa dibe. Bavê Adar jî* ***bi kevçiyan ve berhev kir, bi hesikan ve bela kir***.

Bi keys kirin
Bi ser hev du de anîn. Têkûz û sererast kirin. **Wan mal û milkê xwe di serî de careke din* ***bi keys kirin***.

Bi kêfa xwe bûn
Wekî daxwaza dilê xwe bûn. **Min dîtinên xwe gotin; êdî ji vir û bi şûn de tu* ***bi kêfa xwe yî****, tu çawa dikî tu serbest î.*

Bi kêreke ko şerjê kirin
Li hemberî kesekî pir bikîn û hêrs bûn. **Xwedê dizane heke ji destê Sûsanê bê, wê Xezalê* ***bi kêreke ko şerjê bike***.

Bi kêrî xwe nehatin
Ji bo kesên bêzereng tê gotin. **Kuro ew* ***bi kêrî xwe nayê****, wê çawa* ***bi kêrî te bê****?*

Bi kinco, were qunco, bi qerpalo here malo.

Kinc û berg jî di rûmeta mirovan de bandorê dikin. **Divê mirov li ser û guhê xwe baş binêre, ma pêşiyan negotiye ku:* ***"Bikinco, were qunco, biqerpalo here malo."***

Bi kirasê canê xwe re şer kirin
bnr: Bi xwe xwe re şer kirin

Bi kîrekî kulavî ve lê gayîn
Eziyet lê kirin. **Qet nebêje qurban, welehî ev lawê me yê piçûk* ***bi kîrekî kulavî li me digê***. (argo)

Bi kîrê kerê li defê xistin
Kêf û eşq kirin. **Ji wan re çi, ew* ***bi kîrê kerê li defê dixin***. (argo)

Bi kîrê xelkê mîz kirin
Li gorî gotin û kelîja hinekên din hereket kirin. **Heya ku ew* ***bi kîrê xelkê nûz bike****, kes wî bi tiştekî hesab nake.*

Bi kom û kulfet
Bi tevayî, bi girseyî. **Malbata Receb* ***bi kom û kulfet*** *çûne geştê.*

Bi ku de biavêjî, wekî çar tuxt e.
Di hemûyan de eynî encam der tê. **Min jî tiştek ji vê yekê fêm nekir;* ***bi ku de biavêjî, çar tuxt e****.*

Bi ku de diajom, eynî rê ye.
Derk tune bûn. **Ez jî metel im,* ***bi ku de diajom eynî rê ye****.*

Bi kula xwe azane bûn
Bi derdê xwe zanîn. Hay ji rewşa xwe hebûn. **Heyran, hûn jî ji min re defeke din lê nexin, ez* ***bi kula xwe azane me****.*

Bi kula xwe nemirin
Wekî rewş, hêz û zerengiya xwe nekirin. **Ew qas derd û kul li ser serî hene, lê ew dîsa jî* ***bi kula xwe namire*** *û forsa xwe qet kêm nake.*

Bi kulmê çûn dirêşê[*]
Bi hesabê xwe nezanîn. **Kuro lawo, ya ku Kerem dike bêaqilî ye, mirov qet* ***bi kulmê diçe dirêşê****?*

Bi kulzikî xeber dan
Bi ten û niç, bi kîn û azar xeberdan. **Nizanim çi bi kêleka (teêla) Salo girtiye, îro hema* ***bi kulzikî xeber dide****.*

Bi kûr de çûn
Ketin kitkiteyan, bi awayekî dorfireh li ser sekinîn. **Heke ew li ser wê mijarê ew qasî* ***bi kûr de neçûya****, ev yek jî nedihatin serê wî.*

[*] **Dirêş**: Alavekî ji şijûnê dirêjtir û stûrtir e. zêdetir goşkar (soldirû) bi kar tînin.

Bi lêvê ve man

Li benda soz û axaftina yekî man. *\"Qenciya çi ? Hatime ber dergehê te... Min xazokî kiriye. Çi ye? Vê serê siharê **tu mayî bi lêva min ve**, hay hilo, hay hilo.\"* Nizar Mehemed Seîd

Bi lingekî geriya gundekî.

Ji bo yên ku çalak in û zef digerin tê gotin. ***Bi lingekî geriya gundekî.** Zezêya Almastê wekî çerxê li nav gund dizivire.*

Bi lingê xwe ketin telê

Bi destê xwe ketin dafikê. ***Pêdiviya pilan û pêşnûmayên mezin nema, Fêrgîn **bi lingê xwe hat û kete telê**.*

Bi lingê gur girtin û avêtin nav koza berxan

Karê herî xeter kirin. Daxwaza daxwazkaran a herî tund bi cih anîn. ***Maşelalı, jixwe wê jî tiştekî wisa dixwest, te jî tam **bi lingê gur girtiye û avêtiye nav koza berxan**.***

Bi lingê rovî girtin û avêtin nav holîtka mirîşkan

bnr: Bi lingê gur girtin û avêtin nav koza berxan

Bi (yekî) lîstin

Yek di hêla namûsê de şermî xistin. ***Ew hêbav **bi keçikê lîst**, dû re jî pê re nezewicî û ew li ortê hişt.***

Bi mehne çareser kirin

bnr: Li mehneyan gerîn.

Bi mehne derxistin

bnr: Li mehneyan gerîn.

Bi mehneya lorikê dixwe klorikê.

bnr: Bi mehneya sergînan çû gundê Mexîna.

Bi mehneya sêlê, gerî li nav êlê.

bnr: Mehneya sergînan çû gundê Mexîna.

Bi mehneya sergînan, çû gundê Mexîna.

Bi hinek hincetan, daxwaza xwe bi cih anîn. ***Jixwe kifş bû ku hinceta wê tiştekî din bû. **Bi mehneya sergînan, çû gundê Mexîna.***

Bi min xurto, li min xurto

Bi saya min bihêz bûye, lê hêz û zora xwe li ser min diajo. ***Bi min xurto, li min xurto.** Erê lawo, min kire meriv û însan, lê niha jî li min zilmê dike.*

Bi mineminê dernakeve ji ber hikmê jinê.

Ji bo kesên ku di bin bandora jina xwe de ne tê gotin. ***Dema hêrsa diya min ji kekê min û jina wî dihat digot: **\"Bi mineminê dernakeve ji ber hikmê jinê.\"***

Bi mineminê, rovî naçe kunê.

Çawa bikim a asahî jî pêk nayê. **Bi mineminê, rovî naçe kunê.* *Tu li şansê min mêze bike, ya ku her dem dibe jî pêk nayê.*

Bi minet, naçim cinet.

Min minet navê. **Lo lo! Çavên xwe veke li min binêre, ez xweha Seydo me,* ***bi minet naçim cinet.***

Bi mirazê xwe şad bûn

1. Gihîştin armanca xwe. **2.** Zewicîn. **Qet meraqan meke, ez ê wê erebeyê ji te re bistînim û bi mirazê xwe şad bibe. *Îdrîsê min jî* ***bi mirazê xwe şad bû.*** *Edî ez bimirim jî ne xem e.*

Bi mirinê re lîstin

Bi karên xeter re mijûl bûn. **Ezbenî tu* ***bi mirinê re dilîzî,*** *aqilê xwe topî serê xwe bike.*

Bi mirinê şad bûn

Ji ber derd û kulan, daxwaza mirinê kirin. **Di dawiyê de Meleknas kete rewşek wisa ku,* ***bi mirinê şad bû.***

Bi mirinê re şer bûn

Bi nexweşiyeke giran ketin. **Adar tehl nexweş bû, lê wî* ***bi mirinê re şer kir*** *û di dawiyê de jî bi ser ket.*

Bi mirîşkan re dihere lûs.

Zehf zû razan. **"Şemso nikare bê şevbuhêrkê, jixwe* ***bi mirîşkan re dihere lûs."*** Dilawêr Zeraq

Bi misînê vala çûn destmêjê

Ketin nav xeyalên pûç û vala. **Ya Memê ew e ku hema* ***bi misînê vala diçe destmêjê.***

Bi namûsa (yekî) lîstin

Bi jina yekî re bûn. **Dadger got: "Te çima ew kuşt?" Serhing got: "Ew* ***bi namûsa min lîst*** *loma min kuşt!"*

Bi namûsê terbiye bûn

Di hêla namûsê ketin rewşeke dijwar. **Diya min tim digot: "Yên din ez nizanim, lê Xwedê* ***bi namûsê kesî terbiye neke."***

Bi nan û av kirin

Xwarin û vexwarin dan. **Mirdêsiyê, mêvanê xwe qet nas nedikir, lê dîsa jî heta ew* ***bi nan û av nekir,*** *berneda.*

Bi nanê (yekî) lîstin

Ji debara yekî ya aborî re astengî derxistin. **Yezdan gelek caran Koço şiyar kir û got:* ***"Bi nanê min nelîze!"*** *Lê wî fêm nekir û di dawiyê de canê xwe jî da ser.*

Bi nav cih û nivînên xwe neketin

1. Neçûna mala xwe. **2.** Bi jina xwe re neketina têkiliya zayendî. **Ez nizanim ev lawê min ê seserî bi ku de çûye, ev sê roj in ku **bi nav cih û nivînên xwe neketiye**. *Erê mehra wan jî hatiye birîn, lê ev du sal in ku Salih hê jî **bi nav cih û nivînên xwe neketiye**.*

Bi nav guhê hev ketin

Li hev xistin. **Hew me dît ku Tahar û Şewqî **bi nav guhê hev ketine**.*

Bi navikê bi hev ve girêdayî bûn

Ji bo kesên zêde bi hev û din re têkildar in tê gotin. **Tu dibêjî navika wan **bi hev du ve girêdayî ye** Rindo û Adar tim bi hev du re ne.*

Bi nefsa xwe nekarîn

bnr. Li nefsa xwe hakim nebûn

Bi nepikan dan hev

Bi awayekî hûr û hêdî pêk anîn. **Ya wê jî wisa ye, hema **bi nepikan karê xwe dide hev**.*

Bi nermikayî nêzîk bûn

Bi şêwazeke şîrîn û xweşik têkildar bûn. **Heya ku tu **bi nermikayê nêzîkî wê nebî**, tu carî tu nikarî ya xwe bi wê bidî kirin.*

Bi neynûkan civandin

Bi zor û zehmeteke mezin pêk anîn. **Ev tiştên ku wê dane ber hev, Xwedê dizane ku **bi neynûkan xwe civandine**.*

Bi neynûka (yekî) nebûn

bnr. Nebûn şekala yekî

Bi nikulê (yekî) girtin

Firsend bi dest xistin. **Ancax **bi nikulê wî girtiye**, êdî qet ber dide?*

Bi nikulê xwe diçêre, bi lingê xwe digere.

Bi xwe karê xwe pêk tîne. **Talaşa wî ye ew **bi nikulê xwe diçêre, bi piyê xwe digere**.*

Bi niyeta baş nêzîk bûn

Di dil de tiştekî xirab tune bûn. **Ez bi **niyeteke baş nêzîkî wan bûm**, lê mixabin a wan wisa nebû.*

Bi nîvdevî gotin

Bêbiryar û nezelal axaftin. **Selîm ez jî vexwendim, lê bi rastî hinekî **bi nîvdevî got**, ji ber wê ez jî naxwazim herim wir.*

Bi parsê ketin

Gelekî feqîr bûn. **Bedirê Xanekorê ketiye rewşeke wisa ku tu dibêjî qey **bi parsê ketiye**.*

Bi paş ketin

bnr. Bi şûn de çûn

Bi paş ve vekişîn

1. Têkçûn. **2.** Dev jê berdan, pêk neanîn. **Li hember gulebarîna leşkeran, şervanên Simko **bi paş ve vekişiyan**. *Me mêze kir ku ew dengê xwe nakin, em jî **bi paş ve vekişiyan**.*

Bi paş de xistin

Bi şûn de xistin. Ji rewşa heyî xerabtir kirin. **Van têkiliyên hanê aboriya malbata me **bi paş de xistin**.*

Bi paşpaniyan ketin

Ji cihê hêvînekirî derbe xwarin. **Me wisa bawer nedikir, lê me hew dît ku em **bi paşbaniyan ketine** jî.*

Bi pencirûkan bi gûyê xwe ketin

Xwe winda kirin. Ketin nav rewşek eletewş. **Ma **bi pencirûkan bi gûyê xwe ketiye** ku ew qasî xwe rezîl bike?*

Bi pereyan lîstin

Zehf dewlemend bûn. **Malavawo, ne wisa hindik, mêrikî **bi pereyan re dilîze**.*

Bi pêçiya (tiliya) xwe tevdan

bnr. Bi tiliyan behr şolî (şil) kirin

Bi pênc qurişan kûçik dişo, bi deh qurişan destê xwe helal dike.

Ji bo karên bêhesab tê bikaranîn. **Min tiştek ji karê vî kurapê xwe fêm nekir. **Bi pênc qurişan kûçik dişo, bi deh qurişan destê xwe helal dike.***

Bi pênc qurişên qul nekirin

Ji bo kes an jî tiştên nebaş û xerab tê gotin. **Ew mase û kursiyên ku bavo kirîne welehî **bi penc qurişên qul jî nakin**.*

Bi pêsîrê girtin (Di pêsîrê de darda bûn)

Doza daxwaz û mafê xwe kirin. **Selahedîn heya **bi pêsîra wî negirt** û nehejand, tu heqek bi dest nexist.*

Bi pêsîra hev du girtin

bnr. Bi qirika hev girtin

Bi pêş ketin

bnr. Bi pêş ve çûn

Bi pêş de derxistin

Girîng girtin. **Jixwe wan jî ji wê radeyê şûn de ew mijar pêşde derxistin.*

Bi pêş ve birin

Kemilandin, geş kirin. **Niha ne wekî berê ye, di vê dawiyê de wê lêdana ensturmana xwe pir **bi pêş ve biriye**.*

Bi pêş ve çûn
Di mijarekê de kemilîn, zêdetir bi ser ketin. **Ew welat bi saya aboriyê ew qas* ***bi pêş ve çûne****.*

Bi pêş (yekî) ve sond xwarin
Ji ber bawer bûnê ji bo kesekî bûn wekîl. Bi pêş yekî ve her binbarî pejirandin. **Ez dikarim* ***bi pêş Teyro ve sond bixwim*** *ku wî ev yek nekiriye.*

Bi pêş (yekî) ve şerm kirin
Ji bo kesên bêşerm tê bikaranîn. **Giliyên ku ji wî re gotin wisa giran bûn ku* ***bi pêş wî ve min şerm kir****, lê qet talaşa wî nîn bû.*

Bi piçûkan re piçûk, bi mezinan re mezin bûn
Dilnizm bûn, bi her kesî re têkiliyên xweş danîn. **Mamoste Mistefa* ***bi mezinan re mezin, bi piçûkan re piçûk e****.*

Bi pifê bi hev ve danîn
Bi awayekî sist û ne saxlem ava kirin. **Ez baş dizanim, wan ew têkiliya xwe jî* ***bi pifê bi hev ve danîne****.*

Bi pişt guhê xwe re avêtin
Girîng negirtin, rûmet nedan. **Heta ku tu van gotinên min* ***bi pişt guhê xwe re biavêjî****, tu nikarî zêde pêş de herî.*

Bi piyê xwe ketin telê
Ji ber kêmasî û çewtiyên xwe ketin rewşeke xeternak. **Mixabin, ji ber bandora dozîna xwe* ***bi piyê xwe kete telê****.*

Bi piyê xwe re kaş kirin
Jê gelekî zêdetir û xweşiktir bûn. Di bin bandor û kelîja yekî de kêm û qels man. **"Jinikê bi hedewiya xwe keçik* ***bi piyê xwe re kaş dikirin****."* Zana Farqînî

Bi piyên xwe hatin
Bi xwe daxwaza xwe pejirandin. **Min ji we re negot, ew ê rojekê* ***bi lingên xwe bê****?*

Bi polekî (polikekî) nekirin
bnr: Bi pênc qurişên qul nekirin

Bi pozika sola xwe derê mîr û hakiman vekirin
Pir birûmet û bibandor bûn. **Ma apê min hevalê wan bû, wî* ***bi pozika sola xwe derê mîr û hakiman vedikir****.*

Bi qaqa reş asê kirin
Di nav zerp û zorê de hiştin. **"Hêvî û pêşeroja min* ***bi qaqa reş asê dike****."* Musa Vazgali

Bi qarçikê (boçik) girtin
Xistin bin bandora xwe. **Êdî bi serê havê wî kim ew ji dest Qudretê xelas nabe, ji ber ku bi* ***bi qarçikê girtiye****.*

Bi qasî bêhna cixareyekê
Demeke kurt. **Hûn kerem bikin rûnin, heya* ***bi qasî bêhna cixareyekê*** *bavê min wê bê.*

Bi qasî kîrê kerê bûn
Mezin bûn. *****Bi qasî kîrê kerekî bûye****, hê jî ji tiştekî fêm nake.* (argo)

Bi qasî ku dev gerîn
Heya ku hêz hebûn, li gorî taqet û behreya xwe. **Wî rebenî jî* ***bi qasî ku devê wî geriya*** *got, lê li hember wê cezûyê pir qels dima.*

Bi qasî kuriya derziyê mezin kirin
Ji bo tiştên pir piçûk tê bikaranîn. **Carinan tiştên* ***bi qasî kuriya derziyê mezin dike,*** *carinan jî tiştên pir mezin pir piçûk dibîne.*

Bi qasî riya Hecê bûn
Pir dûr bûn. **Tu jî li ber çavê xwe zelf zêde dikî lo, ma* ***bi qasî riya Hecê ye****?*

Bi qasî serê nîskê tê de neçûn
Serhişk û biinyat bûn. İkna nebûn. **Evdirehman mirovekî serhişk e,* ***bi qasî serê nîskê tê de naçe****.*

Bi qewl û qerarê mêrên berê (Bi soza mêrên berê)
Soz û bextê bibawer. **Ez soz didim we,* ***bi qewl û qerarê mêrên berê*** *ku ez ê ji we re wê makînê bînim.*

Bi qewlê mêrên qenc
bnr. Bi qewl û qerarê mêrên berê

Bi qeyd kirin
Asteng kirin. Sînor dan ber. **Wê malbatê keçika xwe* ***bi qeyd kirine****, nahêlin here mala cînaran jî.*

Bi qirika hev girtin
Pevçûn, bi hev du re teşqele derxistin. **Evdilkerîm û Brahîm hema li cihê sekinî* ***bi qirika hev girtin****.*

Bi qirika (yekî) girtin
Bi yekî re pevçûn, ji bo doza tiştekî hesab pirsîn. **Nizanim li ser çi bû, lê Ûsivê Seyîd* ***bi qirika Seyad girtibû****.*

Bi qirmika zimanê (yekî) girtin
Gotina yekî berî wî gotin. **Ew qas jî nabe lo, camêrî hema bi qirmika zimanê Têkoşer girt.*

Bi qirtan ketin
Bêpere û bêîdare man. **Ew Saloyê beredayî, van rojan jî lap* ***bi qirtan ketiye****, li kuçeyan digere.* (argo)

Bi qîma xwe bûn
Wekî daxwaza xwe bûn. **Êdî ez çi bibêjim, êdî tu **bi qîma xwe yî**, çawa dikî tu dizanî.*

Bi qîzanî mîr bû, bi jinanî pîr bû.
Di qîzaniyê de serdest, azad û nazdar bû, lê bû jin di bin barê mêr û zarokan de perîşan bû. **Te jî dît ku, ew **bi qîzanî mîr bû, bi jinanî pîr bû**.*

Bi qumqume û wurşedar
bnr: Bi humehum û gumegum

Bi qûna (yekî) girtin
Gelekî li pey tiştekî yan jî kesekî ketin. **Hingî ku Mehmûd **bi qûna Qaso girtiye** û bernade, ew jî xwe bi tiştekî dihesibîne.*

Bi qûna (yekî) kenîn
Bi yekî tiranê xwe kirin. **Berê ew **bi qûna Huso kenîn**, dû re bi xwe jî ketin wê rewşê.*

Bi qûna tazî, tembûrê dixwazî.
Di ser rewşa xwe ya xirab de, daxwaza tiştên bikêf û fîtoziyê kirin. ****Bi qûna tazî tembûrê dixwazî!** Di nexweşxaneyê de di bin xwe de dirî, îcar dibêje ji bo ku maçê bişopînim, ji min re televîzyonekê bînin.*

Bi qûna xwe bawer nebûn
Ji bo pêkanîna karekî bi xwe bawer nebûn. **Ya herî girîng, Aso **bi qûna xwe ne bawer e**.*

Bi qûna xwe hesab nekirin (nehesibandin)
Rûmet nedan. **Hesabê xwe baş bike. Gêjo, wa ye ew jinik te **bi qûna xwe hesab nake**.*

Bi qûna xwe xeber dan
Yê li hemberî xwe bi tiştekî nehesibandin. **Va ye mêrik **bi qûna xwe pê re xeber dide;** ew hê jî tênagihîje.*

Bi qûna ziwa filitîn
Bêyî zerar û ziyan xwe xelas kirin. **Çawa kir nizanim, lê bi rastî jî Nûro bi merîfeteke mezin xwe ji wir **bi qûna ziwa filitand**.*

Bi qûnê ketin nav çala genim
Di nav rewşeke pir xweş û erênî de bûn. **Huso qîza xwe da lawê Temo. Welehî qîza wî **bi qûnê ketiye nav çala genim**.*

Bi qûnê ketin nav kodika jajerûnê
bnr: Bi qûnê ketin nav çala genim

Bi qûnê ve zeliqîn
bnr: Li pey tirikî bûn

Bi qurişekî kerê dixesînin, bi du qurişan destê xwe dişon.
bnr: Bi pênc qurişan kûçik dişo, bi deh qurişan destê xwe helal dike.

Bi rastê ketin

Ji alozî û nexweşiyan xelas bûn. **Mendo pir nexweş bû, lê niha rewşa wî baş e, va ye êdî* ***bi rastê ketiye****.*

Bi (yekî) re bi rê ve neçûn

Bi yekî re debar nekirin. **Me kir û nekir; Arîmed* ***bi Yargulê re bi rê ve neçû****.*

Bi (yekî) re bûn

Di nav têkiliyên cinsî de bûn. **Dibêjin Cindo* ***bi yekê re bûye****, jina wî bi ser heselıesan ketiye, loma çûye mala bavê xwe.*

Bi (yekî) re hilketin û daketin

Bi kesekî re tim gengeşî kirin. **Yên ku* ***bi kesên wisa xerab re hilkevin û dakevin,*** *dawiya wan jî wê wiha be.*

Bi (yekî) lîstin

1. Henek û tinazê xwe bi yekî kirin. **2.** Li serê yekî fend û fûnd çêkirin. **Kuro bi wê de here, ez ne zaroka te me,* ***bi min nelîze****. *Kerem wisa* ***bi Seyad lîstiye*** *ku feleka wî şaş bûye.*

Bi reşekurmancî lê li ba ketin

Ji bi awayekî hovane nêzîkbûna tiştan re tê gotin. **Xalidê Şeşmexelî wisa* ***bi reşekurmancî li wê sifrê li ba ket*** *ku min li şûna wî şerm kir.*

Bi rê kirin

Yek bi cihekî de şandin. **Me piştî Zozanê jî Rûken* ***bi rê kir****.*

Bi rê ve birin

Bi rêxistin kirin, îdare kirin. **"...Şêx Mihemedê Berzencî ku şagirtê mamoste û mezinê gelek alimên Kurdistanê bû li herêma Soran û Hewreman rêxistineke ku ji heşt tabûran pêk hatî, bi navê "Leşkerê Quran" li dar xist û* ***bi rê ve bir****."* Mele Silêman Şoreş

Bi rêganî çûn

Rê bi derekê ketin. Ji riyekê derbasî riyeke din. **Armanca me ew der nebû, bi tenê em* ***bi rêganî çûne*** *wir.*

Bi ringering hatin

Bi bandor bûn. **Dîsa tê, lê vê carê* ***bi ringering tê****.*

Bi ro de çûn

1. Erzan bûn. **2.** Vala û bi ba de çûn. **Ew zeviya me ya girê sor, hema* ***bi ro de çû****. *Ew qas keda ku min ji bo wê dersê da, hemû* ***bi ro de çû****.*

Bi roj ji qulika misînan ditirse, êvarê kefenê miriyan datîne.

Her dem bi awayekî bûn. Teptepî bûn. **Hay lo lo! Ew çi afat e ez pê dizanim,* ***bi roj ji qulika misînan ditirse, êvarê kefenê miriyan datîne****.*

Bi roj bilbil e, bi şev pişkul e.

Her gav bi awayekî din bûn. **Jixwe tu kes ji wê tiştekî fêm nake,* ***bi roj bilbil e, bi şev pişkul e****.*

Bi roj kefenê miriyan jê dike, bi şev ji bulqebulqa kûzan ditirse.
bnr: Bi roj ji qulika misînan ditirse, êvarê kefenê miriyan datîne.

Bi roj miriyan dişêlîne bi şev ji qurquroneka derî ditirse.
bnr: Bi roj ji qulika misînan ditirse, êvarê kefenê miriyan datîne.

Bi roj ronahî li ber min neke.
Ji bo helwesta bêkêr û ne li cih tê bikaranîn. **Bavo qurbana te me, tu jî* ***bi roj ronahî li ber min neke****.*

Bi roj li dêrê ye, bi şev li nêçîrê ye.
bnr: Bi roj li dêrê ye, bi şev mizgeftê ye.

Bi roj li dêrê ye, bi şev li mizgeftê ye.
Ji bo kesên durû û sextekar tê gotin. **Mirov ku li kirinên wî dinêre, mirov jê ecêb dimîne,* ***bi roj li dêrê ye, bi şev mizgeftê ye****.*

Bi ruhê xwe re lîstin
bnr: Li ecelê xwe gerîn

Bi rû û rehman bûn
Gihîştî û qert bûn. **Heyran tu* ***mirovekî bi rû û rehman î****, tu şerm nakî xwe dixî hevalê lawê min ê piçûk?*

Bi rûnê xwe qelîn
Bi xwe çarcya serê xwe dîtin. **Tu qet meraqa wî neke, ew bi xwe* ***bi rûnê xwe diqele****.*

Bi rûspîtî ji hev du xelas bûn
Bêyî qeza û bela kar birin serî. **Ez gelekî ji wê têkiliya wan ditirsiyam, lê şikir va ye* ***bi rûspîtî ji hev du xelas bûn****.*

Bi rûvîkî awiqîn
Êş û jan kişandin. Qolincî bûn. **Înşelah ew jî* ***bi rûvîkî biawiqe*** *ku bizanibe qolinc çawan e.*

Bi rû (rûyan) neketin(*)
1. Ji şerman an jî ji bo rûmetdayînê zû bi zû li ber çavên yekî neketin. **2.** Ji ber tawanekê li ber çavê yê mexdûr neketin. ** "Qismê taîfa jinên mislimanan hemû mestûre û veşartî bûn;* ***bi rûyê namehrem û biyaniyan nediketin****."* Mele Mehmûdê Beyazîdî**Celal du mêr ji wan kuştine, ku bêşeref nebûya, qet wisa bêminet* ***bi rûyê wan diket****?*

(*) **Li rû neketin**: Di çanda kurdan de dema yekî ji malbatekê mêrek kuştibe yan jî tiştekî pir xerab û girîng kiribe, cezayê xwe kişandibe jî, bedela xwîna xwe dabe jî ango li hev hatibin jî dîsa zû bi zû li ber çavên wê malbata mexdûr nakeve. Riya ku ew tê re diherin naçiyê. Heke rastî hev û din bên riya xwe diguhere. Ev yek, him ji bo rûmetdayîna êşandin û liberxweketinê, him jî ji bo hadandin û xiroşma yê li hember tê kirin.

Bi rûyekî spî ji nav derketin
bnr. Bi rûspîtî ji hev du xelas bûn

Bi salan û mehan, carekê mêvanê xalan, ew jî derbas bû bi kulzikî û gazinan.
Ji bo carekê, lê careke bi neyînî derbasbûyî re tê gotin. ***Bi salan û mehan, carekê mêvanê xalan, ew jî derbas bû bi kulzikî û gazinan.***

Bi saxîtî kirin gorê
Zilm û eziyeteke mezin lê kirin. * *"Ez nekuştim,* ***bi saxîtî ez kirim gorê****, wilo nîv saxî, çavên min bel, kêl danîne ser sînga min, bêax û bêtemirandî."* Medenî Ferho

Bi ser av û ar ketin
Dîn û har bûn. **Yekta* ***bi ser av û ar ketiye****, em nizanin ka em wî çawa zeft bikin.*

Bi ser avê ketin
Eşkere bûn. **Wan şerê di navbera xwe û zavayê xwe de ji exrebeyên xwe jî veşartin lê di dawiyê de her tişt* ***bi ser avê ket****.*

Bi ser avê nexistin
Eşkere nekirin. **Helbet gelek derd û kulên wan jî hebûn lê* ***bi ser avê nedixistin****.*

Bi ser belaya xwe ve bûn
Ji ber bitrîbûnê cezayê xwe girtin. **Wî gelekî serê xwe û qûna xwe li ba dikir, di dawiyê de* ***bi ser bela xwe ve bû****.*

Bi ser belaya zimanê xwe ve bûn
Ji ber axaftinên neyînî û xeter ketin astengiyan. **Ji ber wan axaftinên bejî,* ***bi ser belaya zimanê xwe ve bû****.*

Bi ser çi de mîz bike wê zuha bibe.
Ji bo kesên bêom û bêoxir tê gotin. **Eman qala wî nekin, ew* ***bi ser çi de mîz bike wê zuha bibe****.*

Bi ser (yekî) de çûn
1. Di mijarekê de yek zêde asteng kirin. **2.** Di hêla leşkerî de bi ser de girtin. **3.** Yek ziyaret kirin, hal û xatir pirsîn. **Tu ku ew qas* ***bi ser de herî****, tu yê wê jî bidî revê.* **Leşker dîsa bi operasyoneke giran* ***bi ser gerîlayan de çûn****.* **Ew her du xwarziyên wî jî rojekê* ***bi ser wî xalê xwe yê nexweş de neçûn****.*

Bi ser (yekî) de derketin
Zêdetir bi awayekî rasthatinî, tiştekî balkêş û girîng dîtin. **Eyşan û Evdal di newalê de di ser hev de bûne, kekê min* ***bi ser wan de derketiye****.*

Bi ser ... de girtin
1. Ji bo ziyanê dor lê girtin. **2.** Bêagahî çûn balê. **Tîmên taybet bi dilqên gerîlayan* ***bi ser gundan de digirtin****.* **Me hew dît ku bavê min, diya min û meta min* ***bi ser me de girtin****.*

Bi ser (yekî) de gul vedan
Lê xwedî derketin. Dilsozî nîşan dan. **Van rojan Xezal gelekî **bi ser Xasê de gul vedide**, Xwedê dawiyê xêr bike.*

Bi ser (yekî) de hil bûn
Bi awayekî hêrs bi ser yekî de çûn. **Celaledîn ji nişka ve **bi ser bûka xwe de hil bû**.*

Bi ser (yekî) de hurtehurt kirin
Bi ser kesekî de hêrs bûn. Çewisandin. **Evdilkerîm her êvar **bi ser jina xwe de hurtehurt** dike. Dengê wî tê bi heta mala me jî.*

Bi ser de kalekal kirin
bnr: Di ser de gul vedan

Bi ser (yekî) de qelibîn
Lê li ba ketin, Dan ber xwe. **Me hew dît ku leşker **bi ser me de qelibîn** û em dan ber guleyan.*

Bi ser (yekî) de ristin
Têkiliyeke zêde germ û nêzîk nîşan dan. **Van rojan Yasîn **bi ser Hesen de gelekî dirêse**, Xwedê dizane, karekî wî ketiye hêla Hesen.*

Bi ser (yekî) de şîr vedan
bnr: Bi ser (yekî) de gul vedan

Bi ser de tehm (def) dan
bnr: Bi ser de gêr kirin

Bi ser (yekî) de xistin fisildûman
Zor lê xistin. Asteng kirin. **Zelîxanê wisa **bi ser mêrê xwe de xiste fisildûman** ku mêrik riya xwe şaş kir.*

Bi ser (yekî) de xûz bûn
1. Wekî daxwaz û armanca kesekî nêzîk bûn. **2.** Lê xwedî derketin, girîngî û rûmet nîşan dan. **Her çiqas ramana me ne wekî hev bû jî dîsa ez **bi ser wê de xûz bûm**. *Kesekî bi destê wê negirt, bi tenê Ferhatê Memê **bi ser wê de xûz bû**.*

Bi ser de zêde kirin
Têfirandin. Tiştên derew û zêde jî dayîn ser. **Hesenê biraziyê min, heta tiştên ku hatiye gotin **bi ser de zêde neke**, tu car rehet nake.*

Bi ser hemdê xwe de hatin
Hiş hatin serî. **Du saet herê rewşa wî gelekî xerab bû, lê şikir va ye, **bi ser hemdê xwe de hat**.*

Bi ser hesehesan ve bûn
Rewş fêm kirin. **Heta em **bi ser** hesehesan **ve bûn**, wî keçik biribû gundekî din û mehra xwe biribû jî.*

Bi ser hev de anîn

Barsivik bûn. Nêzîkî xelasbûna tiştekî bûn. *"... *tenê çar miyên kelax derketine biharê. Arê me jî bi ser hev de hat, diya min pê re negihand arê teze bikire."* Emerîkê Serdar

Bi ser hev de çûn û hatin

Têkilî berdewam kirin, li halê hev pirsîn. **Erê dereng be jî em dîsa **bi ser hev de diçin û tên**.*

Bi ser hev de hatin

Ber bi xelasbûnê ve çûn. **Pirtûka min a dawîn jî **bi ser hev de hat**.*

Bi ser hev de ketin

1. Gelekî zêde bûn. **2.** Bê hêz ketin. **Zeviya me ya genim maşelah îsal wisa geş bûbû ku **di ser hev de diket**. *Îpo piştî wê riya dirêj, xwe gihande mal, lê hema **di ser hev de diket**.*

Bi ser hev de ristin

Piştgiriya hev û din kirin. **Nizanim sedema wê çi ye, lê Xezal û Gogerçîn ev çend roj in gelekî **bi ser hev de dirêsin**.*

Bi ser hişê xwe ve hatin

Hişyar bûn. **Heta ew bi ser hişê xwe ve hat, yê din li holê ta bûn jî.*

Bi ser ketin

Pêk anîn, têk birin, erk bi dest xistin. **Bi rastî jî bindest nikarin bi hêsanî **bi ser bikevin**.*

Bi ser kurmê (yekî) ve bûn

Cir û xeysetê yekî hîn bûn. **Piştî du salan ez **bi ser kurmê jina xwe ve bûm**.*

Bi ser lingan ketin

1. Dest bi rêveçûnê kirin (ji bo zarokan.) **2.** Ji nexweşiyeke giran hêdî hêdî rizgar bûn. **Dema ku keçika min **bi ser lingan ket** û gavên xwe avêtin wek îro di bîra min de ye. **Şikir va le Xalê Koço dîsa **bi ser lingan ketiye**.*

Bi ser perên esmanan ketin

bnr. Li ser perên esmanan sekinîn

Bi ser re bûn

Di êqil de hinekî qelsî hebûn. **Ew mirovekî **bi ser re ye**, guh mede gotinên wî. (argo)*

Bi ser serê (yekî) de qiyamet rakirin

Yek xistin rewşeke zor. **Ji bo wê meseleyê Yaqûb **bi ser serê me de qiyamet rakir**.*

Bi ser serê (yekî) de tasek ava sar rêtin

Mat û ecêbmayî hiştin. **Hema bi wê gotinê re, te digot **bi ser serê Mexpûleyê de tasek ava sar rêtin**.*

Bi ser serê xwe de kirin

Tiştek bi awayekî hovane vexwarin. *Mehmûd bêminet ew şûşa reqiyê, bi carekê re **bi serserê xwe de kir**.

Bi ser stûyê (yekî) de gêr kirin

Avêtin stûyê yekî. *Zana mêze kir ku karekî pir dijwar e, ew kar **bi ser stûyê Farûq de gêr kir**. (argo)

Bi ser û binê hîvê ketin[*]

Ji bo nexweşiyeke zarokan tê gotin. *Azadê kurê min di zarokatiyê de carekê dîsa nexweş ketibû û diya min digot, **bi ser û binê hîvê ketiye**.

Bi ser û guhê xwe ketin

Hêrs bûn. *Niha dewlet **bi ser û guhê xwe ketiye** û dibêje van çawa ew qalikê xwe yê hişk şikênandin?

Bi ser tiliya kul de mîz nekirin

Tu alîkarî nekirin. *Keçê tu çi ji wî hêvî dikî? Ma tu nizanî ew **bi ser tiliya kul de mîz nake**.

Bi ser ve çûn

1. Hay ji xwe tune bûn. **2.** Ji xêza asahî derxistin. Zêde pêşve çûn. **3.** *Bitrî bûn *Îbo dema ku qala wan rojên tekoşînê dike, hê jî ji eşqan **bi ser ve diçe**. *Me ew qas jî negotibû, lê ew tam **bi ser ve çû**. *Gunehê min pê hat, min ew kir şûna meriv û însanan, lê **ew bi ser ve çû**.

Bi ser ve hatin

bnr. Bi ser ve çûn

Bi ser ... ve kirin (Bi ser ve kirin)

1. Tiştek bi zorê dan. **2.** Tiştek avêtin yekî. **3.** Di hêla hejmarî (mîktar) de lê zêde kirin. Danîn ser. **4.** Yek xapandin; tiştekî sexte yan jî ne baş wekî saxlem û baş dan yekî. **5.** Derew kirin, têfirandin, ji ya rasteqînî zêdetir nîşan dan. *A rastî wî ew keçik nedixwest, lê hema jinapa wî ew keçika **bi ser wî rebenî ve kir**. *Min kevirek **bi ser ve kir**, lê negirt. *Min dîsa hinek **bi ser ve kir**, dû re hate radeya parçeya din. *Wî hêbavî, ew erebeya teqeze **bi ser wî gundiyê reben ve kir** û ji holê winda bû. *Heke Cejnê ew qasî **bi ser ve nekira**, me jî hesabê xwe wisa çewt nedikir.

Bi ser xistin

1. Bi ser ketin, serketî bûn. **2.** Di hêla hejmarî (mîktar) de lê zêde kirin. *"Bi dû de beziya. Ket, westiya û **tişt bi ser nexist**..." Helîm Yûsiv *Keça xwe şand dersxane û qursan, di dawiyê de **bi ser xist**. *Dilnazê ew parçe jî **bi ser nexista** têrê nedikir.

Bi ser xwe re (tu) kes nas nekirin

bnr. Di ser xwe re tu kes nedîtin

Bi ser xwe ve hatin

1. Ji westandin û acizbûna astengiyê dûr ketin. Bêhn vedan. **2.** Hişyar bûn, hay ji rewşa

[*] **Bi ser û binê hîvê ketin:** Ji bo nexweşiyeke zarokan tê gotin. Sedem û bûyîna vê nexweşiyê bi rewşa hîvê ve tê girêdan. Carinan ji bo axaftina bêserûber û bêhemdi ya mezinan jî tê bikaranîn.

rasteqîn bûn. **3.** Nexweş, xewirî ango yên jixweçûyî baş bûn. *\"*Deh salên Nûdemê ez westandibûm. Ez welê westiyabûm ku min bawer nedikir ez ê zû bi zû **bi ser xwe ve werim**.\"* Firat Cewerî *\"*Mala te ava ji ber tu bûyî sedem ku ez **bi ser xwe ve hatim**. Min qalikê xwe yê gemar bi saya serê te şikandibû.\"* Salihê Kevirbirî **Selahedîn ji nişka ve ji xwe çû, lê zû **bi ser xwe ve hat**.*

Bi serê (yekî) de hatin
Berê ew tişt jiyîn. **Ma ez ji serê xwe li hev tînim? Ew mesele **bi serê min de jî hatiye**, loma dibêjim.*

Bi serê (yekî) de pitpit kirin
Tim bi axaftin û kutekutê yek aciz kirin. *\"*Mamoste gelekî bi diltengî bi Şêrînê de xeyîdî û **bi serê wê de pitpit kir** û got: ...\"* Keça Kurd

Bi serê (yekê) girtin
Bi yekê re zewicîn. **Qîza Xanemîr di mal ma heta çil salî jî kesî **bi serê wê negirt**.*

Bi serê lêvê axaftin
Bêyî dilê xwe, nîvco peyivîn. **Erê diaxivî, lê hema **bi serê lêvê diaxivî**.*

Bi serê lêvê kenîn
Bi zorê û ne ji dil kenîn. Nîvkenî bûn. **Erê ew jî bi **serê lêvê xwedigiravî dikenî**.*

Bi serê lêvê pirsîn
Xeyîdîn, tingijîn. **"Û ji bêdengiya diya wî, ji tirsê newêrî navê wan jî bibêje, lewre **bi serê lêvê pirsî**: 'Çi diviyan?'\"* Fazil Umer

Bi serê poz pê re dan û stendin
Têkiliyeke bi zorê û nîvco ajotin. **Erê, piştî wê bûyerê bi tenê **bi serê poz pê re dide û distîne**.*

Bi serê poz xeber dan
bnr. Bi serê lêvê axaftin

Bi serê pozê xwe nêrîn
Ji kesên qure û xwe zêde diecibînin re tê gotin. **Ew lawê Xefûr jî xwe tiştekî zêde dihesibîne, **bi serê pozê xwe li mirov dinêre**.*

Bi serê şûrê xwe sond xwarin
bnr. Bi serê zompê xwe sond xwarin

Bi serê xwe berdan
Serbest berdan. **Dilo digot: "Ya ku tu dikî ne rast e, heke tu zarokan **bi serê xwe berdî**, kî dizane wê çawa bibe?"*

Bi serê xwe bûn
1. Tenê bûn. **2.** Azad bûn. **Li wir ez du mehan **bi serê xwe bûm**. *Ez **bi serê xwe me**, naxwazim bikevim bin bandora hinekên din.*

Bi serê xwe hereket kirin
Wekî daxwaz û dîtina xwe tevgerîn. **Ew jî wisan e,* ***bi serê xwe hereket dike.***

Bi serê xwe hiştin
1. Tenê hiştin. **2.** Serbest berdan. **Rast e, min ew* ***bi serê xwe hişt*** *da ku baş bifikire û jiyanê binase. *Êdî bavê min ew* ***bi serê xwe hiştiye****, çi karî bike serbest e.*

Bi serê xwe bi rê ve çûn
bnr: Bi serê xwe hereket kirin

Bi serê zompê xwe sond xwarin
Tenê ji lêdanê fêm kirin. **Heçî Rosto ye, ji tu tiştî fêm nake, tenê* ***bi serê zompê xwe sond dixwe****.*

Bi serê (yekî) de hatin
Ew rewşa qewimî berê jî jiyîn. **Bi rastî jî ez hema hema wekî doxtoran bi nexweşiya mîdeyê dizanim, ji ber ku* ***bi serê min de hatiye****.*

Bi serê (yekî) sond xwarin
Rêz û rûmet jê re nîşan dan. Zehf jê hez kirin. **Belê, li vir tu kes wê nas nake, lê li herêma wê her kes* ***bi serê wê sond dixwe****.*

Bi seriyek sîr (pîvaz) nekirin
Ne hêjayî nirxeke zêde bûn. **Tu ji bo wê li ber xwe dikevî, lê ew* ***bi seriyek sîr nake****.*

Bi serî digirî qûn diçe, bi qûnê digirî serî diçe.
Ji bo kesên nexweş an jî pir sist tê gotin. **Ez çawa bikim nizanim,* ***bi serî digirî qûn diçe, bi qûnê digirî serî diçe****.*

Bi serî kirin
Zewicandin. **Berê zarok di temenekî piçûk de* ***bi serî dikirin****.*

Bi serî xistin
1. Fêr kirin. **2.** Îkna kirin. **Di dawiyê de mamoste ew ders* ***bi serê Zerdê xist****. *Tenê malbata wê dikare* ***bi serê wê bixe****.*

Bi sibehê neketin
Heya sibehê mirin, bi sibê re negihîştin. **"Gundî li hev diçûn û dihatin, wan ji bengizê nexweş tê derxistin, wekî ew* ***bi sibehê nakeve****."* Xelîl Mûradov

Bi sibê re negihîştin (Bi serê sibehê re negihîştin)
Heya sibehê mirin. **Înşelah ew* ***bi sibê re nagihîje****.* (nifir)

Bi siwarî dayîn ser xanî
1. Çi tiştê ku dizane eşkere kirin. **2.** Bêûsil û bêrê xeber dan. **Binevşê, sira xwe jê re got, lê Şengê* ***bi siwarî da ser xanî*** *û çi hebû got. *Zerîcan hekê pekê nizane hema* ***bi siwarî dide ser xanî****.*

Bi siya xwe re li hev nekirin
Bi tu kesî re debar nekirin. **Ka kî dikare bi wî re debar bike? Ew **bi siya xwe re li hev nake**.*

Bi siya xwe re şer kirin
bnr: Bi siya xwe re li hev nekirin

Bi siya xwe re rê neçûn
bnr: Bi siya xwe re li hev nekirin

Bi siya xwe re li hev xistin
bnr: Bi siya xwe re li hev nekirin

Bi sînor kirin
Bi hinek zagonan ve asteng kirin. **Divê hinek caran mirov zarokan jî **bi sînor bike**.*

Bi sînorê xwe zanîn
Hedê xwe zanîn. **Ez li gotina wan nanihêrim, ez **bi sînorê xwe dizanim**.*

Bi sonda qesemê sond xwarin
bnr: Sonda qesem li canê xwe dan.

Bi soz û peyman
bnr: Bi qewl û qerar

Bi soz û qerar
bnr: Bi qewl û qerar

Bi şans û bextê xwe
Ew bi wijdan û însafa xwe. **"Bêtirs wî lîla şeştiran xwe ber bi xelkê ve kiriye û car û caran ber bi şeqamê ve gulan direşîne, vêca kî bi ber ket ew **bi şans û bextê xwe**."*
İbrahîm Ehmed

Bi şermiyê ketin
Ji ber gotin an jî kirinekê ketin rewşa fedîkar. **Bi rastî bi wan gotinên xwe ez **bi şermiyê ketim**.*

Bi şev dixeniqînî heft xesî, bi roj ji qurquroneka derî ditirsî.
bnr: Bi roj ji qulika misînan ditirse, êvarê kefenê miriyan datîne.

Bi şev rêwî li riyan, qede li ber piyan
Rêwîtiya bi şev, karekî xeternak e. **Ezbenî, min ji te re negot, **bi şev rêwî li riyan, qede li ber piyan**.*

Bi şev şemamok e, bi roj pîrebok e. (Bi roj pîrhevok e, bi şev şemamok e.)
bnr: Bi roj bilbil e, bi şev pişkul e.

Bi şeytên re kap (qapa) lîstin
bnr: Bi şeytên re hevaltî kirin

Bi şeytên re kap avêtin
bnr: Bi şeytên re hevaltî kirin

Bi şeytên re kirîvatî danîn
Bi karên pir xeter û xerab re mijûl bûn. **Divê em li hemberî Cezmiyê sextekar çavên xwe vekin, wî **bi şeytên re kirîvatî daniye**.*

Bi şeytên re hevaltî kirin
Pir kone û zana bûn. **Hey hûn nizanin ew çi ecêb e, **ew bi şeytên re hevaltiyê dike**.*

Bi şîrê dayika xwe de mîstin
Ji bo kesên ku karên neyînî dikin tê gotin. **Me çi zanibû ku ew ê here hema **bi şîrê dayika xwe de bimîze** û serê me hemûyan têxe belayê.*

Bi şûn de çûn
Bi paş ve çûn, rewş xerabtir bûn. **Di rûyê wê jinikê de em **bi şûn de çûn**.*

Bi şûn de xistin
bnr: Bi paş ve xistin

Bi ta û derzî vekirin
Bi kitkiteyan her tişt daxuyandin **Dilnazê, gotinên min **bi ta û derzî ji xesûya min re vekiribûn**.*

Bi tamara qûnê ve xwe dayîn
Ji bo pêkanîna karekî hemû hêza xwe dayîn. **Bi rastî jî Cimo **bi tamara qûnê ve xwe didiyê**, bawer im ku ev keda wî naçe badilhewa.*

Bi tasa zêr jehr vexwarin
Di nav derfetên pir xweş de jiyanek ne xweş jîn. **Erê rast e, pir dewlemend e, lê **bi tasa zêr jehrê vedixwe**.*

Bi tayekî Remezan xwarin
Ji ber sedemeke piçûk dev ji bawerî û karên mezin berdan. **Tu çawa bi wê bawer dibî, ew **bi tayekî Remezanê dixwe**.*

Bi tayê xav ve girêdayî bûn (girêdan)
Ji bo têkilî yan jî karên sist û demborî tê bikaranîn. **Ji ber ku **bi tayê xav ve girêdayî ye**, têkiliya wan zef nadome.*

Bi tayekî xav xapandin
Bi hêsanî xapîn. **"Carekê, çima Kurd zû talurîk (fît) dibin, çima ew qas bi heyecan in, zû digirîn, zû şad dibin; **bi takî xav têne xapandin** û tim xapînosk in!"* Sebahattin Korkmaz

Bi te xweş e, bi min bîst û şeş caran xweş e.
bnr: Ji te re dirêj be ji min re bi erdê re dikişe.

Bi tedbîr dikolin bîr.
Karên zor û girîng tedbîrekê zêde dixwaze. **Lawo ji bîr nekin ku* ***bi tedbîr dikolin bîr****.*

Bi tenî, bû xenî.
Dewlemend bûn zêdetir girêdayî xebat û çetinayê ye. **Wisa li cihê sekinî kes dewlemend nabe. Çi gotine:* ***"Bi tenî, bû xenî."***

Bi tepan bi serê xwe ketin
Poşman bûn. **Kengê ku lawê wî ji dibistanê revî, dû re Cimşît* ***bi tepan bi serê xwe ket****.*

Bi teqil xeber dan
Bi zanayî û bi bandor axaftin. **Almasta Şêxê wisa* ***bi teqil xeber da*** *ku yên di wê civînê de bûn şaşwazî man.*

Bi têra dilê xwe
Heya ku dixwaze, heya ku qîm pê hatin. **Min bi* ***têra dilê xwe*** *pê re sohbet kir.*

Bi teşikên xwe de rîtin
Zêde tirsîn. **Dema ku Salo ew li pêş çavên xwe dît,* ***bi teşikên xwe de rît****.*

Bi tetikan dayîn, bi pepikan li pey gerîn
Qencî kirin lê li hemberî qenciya xwe xirabî dîtin. **Min* ***bi tetikan da, bi pepikan li pey gerîm****. Çend caran bûm kefil, lê ez tim poşman bûm.*

Bi tiliyan nîşan dan
bnr: Bi tilîkan rê hev dan

Bi tilîkan rê hev dan
Pir cuda, balkêş û zêde bûn. **Serhat di nav dibistanê wisa balkêş bû ku her kesî ew* ***bi tilîkan rê hev dida****.*

Bi tiliyan behr şolî (şil) kirin
Bi tiştekî piçûk karekî mezin xera kirin. Fesadî kirin, tevlihev kirin. **Zaharê Sixur* ***bi tiliya behr şolî kir*** *û karê me xera kir.*

Bi tira xwe re quzilqurt gotin
Bi tu kesî re debar nekirin. Bi kesî re li hev nekirin. Bi eks û cirnexweş bûn. **Tu nikarî bi wî re nîvekariyê bikî,* ***ew bi tira xwe re quzilqurt dibêje****.*

Bi tira ziya (zuha) filitîn
Bêyî ziyan xelas bûn. **A rastî, zû bi zû ez hernedidam, lê bi saya wê vira xwe ez* ***bi tira ziya filitîm****.*

Bi tiştekî hesab nekirin (nehesibandin)
Girîng negirtin. **Her kes ji Sedulah ditirsiya, lê Eyvaz ew* ***bi tiştekî nedihesiband****.*

Bi (yekî) ve zeliqîn

Bi awayekî bêar û bêyî dilê yekî xwe nêzîkî yekî kirin. **Zekî rû nadiyê jî lê Nûredîn xwe **pê ve dizeliqîne**.*

Bi vê andê, bi vê sondê

Sond xwarin. **Min got heyran, **bi vê andê, bi vê sondê**, ne wekî gotina wan e, rewş wiha û wiha ye, dû re ji min bawer kir.*

Bi vê qûnê, tu naçî meyqûnê.

bnr. Bi vê qûne, tu naxwî hêkerûnê.

Bi vê qûnê, tu naçî şûnê.

bnr. Bi ve qûne, tu naxwî hêkerûnê.

Bi vê qûnê, tu naxwî hêkerûnê.

Xwe gihandin daxwaz û armancên qels bûn. **Min ji te re got zelîf bixebite, naxwe **bi vê qûnê tu naxwî hêkerûnê**.*

Bi vê qûşê, tu naçî (nagihî) Mûşê.

bnr. Bi ve qûnê, tu naxwî hêkerûnê.

Bi viran sond bixwin, serî naêşe.

Ji bo rewşa sexte tê bikaranîn. **Zekî û Sadiq lîstikeke wisa çêkirine ku **bi viran sond bixwin jî, serê wan naêşe**.*

Bi vî destî dayîn, bi wî destî stendin

bnr. Bi destê rastê dayîn, bi destê çepê stendin

Bi vî hişî, tu nagihêjî tu par û pişî.

Ji bo ramana ne li gorî serkeftinê tê bikaranîn. **Min ji te re got, azîna te çewt e, **bi vî hişî, tu nagihêjî tu par û pişî**.*

Bi westiyayî kir, bi vesiyayî xwar.

Belê ked da, lê bêminet û bi dilekî rehet jî xwar. **Her tiştek bedeleke wê heye, camêrî **bi westiyayî kir, bi vesiyayî xwar**.*

Bi xasûkî barê xwe gerandin

Karê xwe bi konevanî bi rê ve birin. **Ew çi zana ye, di demeke kurt de **bi xasûkî barê xwe gerand.***

Bi xwarinê ketin

1. Ji bo destpêkirina xwarin xwarina zarokan tê gotin. **2.** Ji ber zêde xwarin xwarinê aciz bûn. **Maşelah qûndaxa me zû **bi xwarinê ket**. *Min got lawo ew qas bêfesal nexwe, di dawiyê de **bi xwarinê ket**.*

Bi xwe de pûkandin

bnr. Bi xwe xwe de jenîn

Bi xwe de rîtin

1. Tirsîn. **2.** Xwe zêde qure kirin. **3.** Di nav helwestên ecêb û qels de bûn. **Heya Emîn ji wir derbas bû,* ***bi xwe de rît.*** **Erê, me hemûyan pesin dayê, lê wî teresî jî* ***bi xwe de rît*** *lo. *Erê mirov li ber xwe dikeve, lê bi rastî Fatimê* ***bi xwe de rît.***

Bi xwe de rîtibû, digot: "Min bi rewş bişon!"

Hem xwedî xeta û qusûr bûn, hem jî xwe qure kirin. **Hûn li daxwaza wî ya ecêb binêrin, hem* ***bi xwe de rîtiye, hem jî dibêje: "Min bi rewş bişon."***

Bi xwe ferx bûn

Xwe zêde dîtin, xwe qure kirin. **Mirov ku ew qas* ***bi xwe fexr bibe,*** *helbet dê bibe pêşkeniyê xelkê.*

Bi xwe baz e, lê nêçîra wî ji xelkê re ye.

bnr. Ji xelkê re xerat e, jixwe re malmîrat e.

Bi xwe bi birîna xwe nalîn

Ketin halê xwe. Bi xwe li çareya serê xwe nihêrîn. **Ew reben jî hema* ***bi xwe bi birîna xwe dinale.***

Bi xwe bi nanê xwe lîstin

Di nav helwesta li hemberî berjewendiyên xwe de bûn. **Hakoyê biraziyê min jî* ***bi xwe bi nanê xwe dilîze.***

Bi xwe bi ser belaya xwe ve bûn

Bi xwe cezayê xwe dîtin. **Keremê zilmkar, dema ku tivinga xwe paqij dikir, guleyek li singê wî ket û* ***bi xwe bi ser bela xwe ve bû.***

Bi xwe bilandin

Bi xwe ketin, li hev piçikîn. **Ji ber ku bi xwe biliyaye, hay ji bûyeran jî nîn e.*

Bi xwe bilî bûn

bnr. Bi xwe heyirîn

Bi xwe birîna xwe derman kirin

Bi xwe li çareya serê xwe nêrîn. **Di vir de min* ***bi xwe birînên xwe derman kirin.***

Bi xwe bûn dizê sola xwe

Ji bo karên berevajî tê gotin. **Tiştinên wisa ecêb anîne serê min ku hew min dît ku ez* ***bi xwe bûme dizê sola xwe.***

Bi xwe çareya serê xwe dîtin

bnr. Bi xwe birîna xwe derman kirin

Bi xwe di halê xwe de gotin

bnr. Di timtêl û hewalê xwe de şewitîn

Bi xwe distirê, bi xwe tew dike.
bnr. Bi xwe li defê dixe, bi xwe dilîze.

Bi xwe distirê, bi xwe ditewîne.
bnr. Bi xwe li defê dixe, bi xwe dilîze.

Bi xwe gotin, bi xwe bihîstin (guhdarî kirin)
Soz û bandor derbas nebûn. **Berzencî ya rastî tîne ziman lê ew **bi xwe dibêje, ew bi xwe guhdarî dike**.*

Bi xwe gûyê xwe paqij kirin
Çewtî û kêmasiyên xwe bi xwe çareser kirin. **Lawo te bi xwe lewitandiye, divê tu **bi xwe gûyê xwe paqij bikî**.*

Bi xwe hatin ziman
Dest bi peyivînê kirin. **Mirovekî ker û lal bû, lê di wê mijarê de **bi xwe hate ziman** û xweşik jî derdê xwe da fêm kirin.*

Bi xwe hesîn
1. Di hêla zayendî (cinsî) de gihîştin. **2.** Hay ji xwe û rewşa rasteqînî bûn. **3.** Ji xewê hişyar bûn. **Îsal Omer **bi xwe hesiyaye**, ma tu nanihêrî ji pey keçikan naqete. *Ew **bi xwe hesîn** ku dê wê şevê bi ser mala wan de bigirin û ji wir revîn. * "Tebîetekî wî yê xerab hebû ku gava ew **bi xwe bihesiya**, careke din nikaribû di xew re biçûya."* Enver Karahan

Bi xwe hundirê xwe xwarin
Êş û pirsgirêka xwe avêtin hundirê xwe. **Qet hewcedariya nexweşiyan tune ye, jixwe Rewşen **bi xwe hundirê xwe dixwe**.*

Bi xwe karibûn
Hakimî nefsa xwe bûn. Vîn bi hêz bûn. **Heke te **bi xwe bikaribûya**, tu ew qasî nediketî.*

Bi xwe ketin
Bi kar û barê xwe û bi derd û kulên xwe re mijûl bûn. **Dest nedin wê qijika belengaz, ew ancax **bi xwe ketiye**.*

Bi xwe kiro, dermanan pê re xêr nekiro
Ji bi xwe kirinan re çare û derman nîn e. ****Bi xwe kiro, dermanan pê ra xêr nekiro.** Ma dikare ji kê re çi bibêje?*

Bi xwe lê xistin, bi xwe lîstin
bnr. Bi xwe li defê dixe bi xwe dilîze

Bi xwe li defê dixe, bi xwe dilîze.
Tenê wekî gotin û daxwaza xwe kirin. **Ew jî wisa ecêb e, **bi xwe li defê dixe, bi xwe dilîze**.*

Bi xwe ne tişt e, hespê şah bazar dike.
Ji bo kesên li gorî hêz û hempayê xwe tevnagerin tê gotin. **Hela tu li min û Rostem mêze*

bike. ***Bi xwe ne tiştek e, hespê şah bazar dike.***

Bi xwe pir rez bû, terezê jî lê xist.
bnr. Berê rez ne tu rez bû, terezê jî lê xist.

Bi xwe re kaş kirin
Bi ne dilê yekî xistin nav karan. **Bi xwe çûye, ew rebenî jî* ***bi xwe re kaşî wan deran dike.***

Bi xwe re nedîtin
1. Ji bo kirina karekî di xwe de hêz nedîtin. **Divê min gihayê baxçe biçiniya û gul avdana, lê îro min* ***bi xwe re nedît.***

Bi xwe serê xwe xwarin
Bi xwe bûn sedema canê xwe, ango mirina xwe. **Gelek li pey wî bûn ku wî bikujin, lê di dawiyê de wî* ***bi xwe serê xwe xwar.***

Bi xwe têra xwe kirin
Bi xwe karê xwe hel kirin. **Ew ne mêrekî wisa ne, pêdiviya we ne pêwîst e,* ***bi xwe têra xwe dike.***

Bi xwe tir kiriye, bi xwe dixeyide.
bnr. Mendê tir kiriye, Mend a naz e.

Bi xwe tune, nav heye.
Bi nav û deng bûn, lê naverok vala bûn. **Tu li nav û dengê wî nenihêre, ew* ***bi xwe tune, navê wî heye.***

Bi xwe ve hatin
Hatin ser hemdê xwe, zingirî bûn. **Piştî ku qasekê bêhna xwe da,* ***bi xwe ve hat,*** *dû re dîsa axaftina xwe berdewam kir.*

Bi xwe ve man
Şaş û metel man, şok bûn. **Li hemberî wê dîmenê Gulîzer* ***li xwe veman.***

Bi xwe wekî mêşê ye, deng dengê şeşê ye.
Ji bo kesên ji hêz û xuyanga xwe zêdetir şerûdî û rezîliyê derdixin tê gotin. ****Bi xwe wekî mêşê ye, deng dengê şeşê ye.*** *Mirov ku rezîltiya wî dibîne, ji wî gewdeyî bawer nake.*

Bi xwe, xwe dan dest
1. Bi daxwaz û vîna xwe teslîm bûn. **2.** Bêhemdî xwe, bi sedema çewtiyekê sûc û gunehê xwe diyar kirin. **Malbata wî nedixwest, lê Qurdo* ***bi xwe, xwe da dest.*** **Wî dixwest ku tiştekî din bibêje, lê ji ber wê gotinê wî* ***bi xwe xwe da dest.***

Bi xwe, di xwe de jenîn
bnr. Di halê xwe de gotin

Bi xwe, xwe de portepot kirin
bnr. Di halê xwe de gotin

Bi xwe, ji xwe razî bûn
Xwe bi xwe ecibandin. **Mêrikî **bi xwe ji xwe razî ye**, talaşa wî jî nîn e bi gotinên hinekên din.*

Bi xwe, bi xwe re şer kirin
Bêhn teng bûn, astengî derxistin. **Hewcedariya rexnekirina wê nîn e, jixwe ew **bi xwe bi xwe re şer dike**.*

Bi xwe, xwe xapandin
Di nav helwest û dîtineke ne rast de bûn. **Hema ew tenê **bi xwe, xwe dixapîne**.*

Bi xwe, bi xwe kirin
Bi xwe ziyan dayîna xwe. **Ka wî bi kê çi kir? Çi kir **bi xwe, bi xwe kir**.*

Bi xwêdana eniya xwe qezenc kirin
Bi ked û zehmetê bi dest xistin. Heq kirin. **Wê wekî gelekan bi bertîlan na, **bi xwêdana eniya xwe ew azmûn qezenc kir**.*

Bi xwîna xwe firotin (Bi bihayê xwîna xwe firotin)
Gelekî biha firotin. **Etarê ku tê gundê me, tiştan **bi bihayê xwîna xwe difroşe**.*

Bi xwîna xwe qezenc kirin
Gelek zor û zehmetî bi dest xistin. **Erê me mal û erebe kirîn, lê Xwedê dizane, me **bi xwîna xwe ew qezenc kirin**.*

Bi xwîna xwe xeber dan
Gotinên girîng û xerab gotin. **Kuro, ev kûçik **bi xwîna xwe xeber dide**, heqê wî azîneyeke din e.*

Bi xwînê av dan
Bi mirin an jî şehîdbûnê bi dest xistin. **Me ev welat **bi xwîna xwe av daye**, em tu caran dev ji vê dozê bernadin.*

Bi ya xwe kirin
Wekî daxwaz û gotina xwe kirin. **Belê dibe ku ez raman û daxwazên hinekan bipirsim an jî guhdarî bikim, lê di dawiyê de ez tenê **bi ya xwe dikim**.*

Bi ya xwe zanîn
Bi berjewendî û pêdiviyên xwe baş zanîn. **Tu qet destê xwe mediyê, Heyder **bi ya xwe baş dizane**.*

Bi zar û zimanê (yek) girê dan
Bi mafdariya xwe pêşiya kesan girtin. **Armanca wan ên li hember tiştekî din bû, lê Xalê Celîl **bi zar û zimanê xwe ew girê dan**.*

Bi zarê xwe debara xwe kirin
bnr. Bi zimanê xwe ve xwe bi rê ve birin

Bi zarî kirin
Lasayî (texlît) kirin. **Zarokên wê taxê tev reklamên televîzyonê* ***bi zarî dikin.***

Bi zêr kil kirin
Pir xweş û spehî pêk anîn. **Wisa xweş xemilandibû ku te digot* ***bi zêr kil kirine.***

Bi zikekî têr, bi deh zikan birçî bûn
Ji bo kesên xizan tê bikaranîn. **Ka di rewşeke çawa de ne?* ***Bi zikekî têr in, lê bi deh zikan birçî ne.***

Bi ziman anîn ser hev du
Bi peyvandinê ava kirin. **Ma te çi hêvî dikir? Wî ev yek tev* ***bi ziman aniye ser hev du.***

Bi zimanê xwe, xwe dan dest
Bi peyivandina xwe ya bêhemdî xwe tawana xwe dan xuyandin. **Hema li cihê xwe sekinî, Gogê* ***bi zimanê xwe, xwe da dest*** *û serê xwe xiste belayeke bisîr.*

Bi zimanê xwe karibûn
Hay ji gotina xwe hebûn. **Merd ne mirovekî bêhesab e,* ***bi zimanê xwe dikare.***

Bi zimanê xwe ketin
Ji ber gotinek ne di cih de ketin astengiyekê. **Min baş fêm kir ku bi rastî jî* ***bi zimanê xwe ketin****, rewşek xerabtirîn e.*

Bi zimanê xwe, li xwe şahidî dan
bnr. Bi zimanê xwe, xwe dan dest

Bi zimanê xwe şihitîn (şehitîn)
bnr. Bi zimanê xwe, xwe dan dest

Bi zimanê xwe (yek) girê dan
Bi gotinên xwe ve yek xistin bin bandora xwe. **Hay lo lo" Ew çi canbazek e, ew tenê* ***bi zimanê xwe wî girê dide.***

Bi zimanê xwe, xwe girê dan
Bi gotineke ne di cih de xwe xistin astengiyê. **Wê wisa* ***bi zimanê xwe, xwe girê da*** *ku êdî nikaribû ji soza xwe jî dagere.*

Bi zimanê xwe, xwe bi rê ve birin
Bi zar xweşî yan jî bi lafekiyê karên xwe pêk anîn. **Welehî Kemalê Gemşo hema gelek caran* ***bi zimanê xwe ve xwe bi rê ve dibe.***

Biabor û birûmet bûn
1. Bişeref û bişanaz bûn. **2.** Di hêla aborî de halxweş bûn. **Eferîm ji wê xwarziya te re, keçeke* ***biabor û birûmet e.*** **Berê ji birçînan dimir, lê va ye îro* ***biabor û birûmet bûye.***

Biavêjî ber segan, seg naxwin.

Ji bo kesên nerind, nebedew û di rewşa pejmûrde de ne tê gotin. **Keledoşa Eyşê* ***biavêtana ber segan, segan nedixwar.*** " Dilawer Zeraq

Bibal û pal bûn

bnr. Xwe avêtin

Bibe baran erdê şil nake. (Bibe baran erd pê şil nabe.)

Di asta hêza ziyandayînê de nebûn. Bêhêz, bêzereng û pêknehatî bûn. **Ma kî wî çi dihesibîne? Xwedê wekîl e,* ***bibe baran erdê şil nake.***

Bibe baran li aliyê me nabare. (Bibe baran bi ser me de nabare.)

Tu kêra wî nagihêje me. **Tu xêr ji rûyê wî yê sefêk nayê, ew* ***bibe baran li aliyê me nabare.***

Bibe nebe mirov goştê kewan jî dixwe.

Carinan bi rasthatinî tiştên pir xweş tên serê mirov. **Jiyan bi nakokiyan dagirtiye,* ***bibe nebe, mirov goştê kewan jî dixwe.***

Bibî teyr û bi esmanan bikevî dîsa jî ji destê min xelas nabî.

Ji destê min xelasbûna te ne mimkun e. **Tu* ***bibî teyr û bi esmanan bikevî dîsa jî ji destê min xelas nabî.***

Bicih û nivîn bûn

Ji bo nexweşên di nav cih û nivînan de tê gotin. **Ne nexweşiyeke wisa hêsan bû, jinik hema tam* ***bicih û nivîn bû.***

Bicir û cedêl bûn

Cirnexweş û bêdebar bûn. *Ew mirovekî* **bicir û cedêl e**. *Kî dikare bi wî re debarê bike?*

Biçe Bitlîs, wê bilîz.

Heke wî karî bike, wê xwe ji wê encamê re jî amade bike. **Ez çawa bilcim, zagon wisa ye.* ***Biçe Bitlîs, wê bilîz.***

Biçe ser kaniyê, kanî wê ziwa bibe.

Ji bo kesên bêşans tê bikaranîn. **Ev şansê ku bi min ve ye,* ***ez herim ser kaniyan kanî wê ziwa bibin.***

Biçîzî, neçîzî qencelîz î.

Çi dibêjî û çi dikî bike tu ew î, qet xwe înkar meke. **Ez bi te dizanim, tu* ***biçîzî neçîzî, qencelîz î.***

Biçûkê malê, kûçikê malê

Karên angarya tim li para piçûkan dikevin. **Di malbatên feodal û nezan de azîn ev e:* ***Biçûkê malê, kûçikê malê*** *ye.*

Bide nanê xwe, berde canê xwe.

Gelek caran ji yekî re qencî dikî, li dêvla wê xerabiyê dibînî. ****Bide nanê xwe, berde canê xwe.*** *Ma qencî jî sûc e? Ma min xerabî lê bikira?*

Bidem û dezgeh bûn

Bi sazî û sîstem bûn. Têkûz bûn. **Hê jî saziyên me bi xweşikî **bi dem û dezgeh nebûne**.*

Bidendik bûn

Cirnexweş, biberzeq bûn. **Tu wê nas nakî bê ew yeka çawa **bi dendik e**.*

Bidest û pê (dest û lep) bûn

Di hêla fizîkî de mezin û gir bûn. **Kalikê min mirovekî wisa **bi dest û pê bû** ku wekî pêlewanan dixuya.*

Bidestar bûn

Bi xwe re nedîtin. Teral û caneza bûn. **Jixwe Rozerîn keçeke **bidestar e**.*

Bidev û ziman bûn

1. Zêde peyivîn, lafek bûn. **2.** Ji ber axaftinê betilîn. **Ew jineke **bidev û ziman e**, kes zû bi zû bi wê nikare. *Piştî ew qas axaftinê nûnerê wê rêxistinê **bidev û ziman bû**.*

Bidil û xatir bûn

Dilnizm û baş bûn. **Bi rastî jî Baro xortekî wisa **bidil û xatir e** ku mirov lê hewes û hejmekar dimîne.*

Bidiyê û jê bireve.

Ziyan jê tê, çi dibêje bike û heya ji te tê jê dûr be. **Eman lawo bi wî re mekeve têkiliyê, **bidiyê û jê bireve**.*

Bidî çîzan nedî çîzan, tu yê bidî heqê gûzan. (Bide çîzan nede çîzan, wê bide heqê gûzan.)

Tu çawa bikî, nikarî ji vê yekê xelas bibî. **Welehî çare nîn e. **Bidî çîzan nedî çîzan, tu yê bidî heqê gûzan.***

Bidî lortikan, nedî lortikan tu yê bidî heqê dizîkan.

bnr. Bidî çîzan nedî çîzan, tu yê bidî heqê gûzan.

Bidin û birevin

Jê dûr bisekinin, ji wî tenê zirar tê. **Ev gûyê hişk dicûn dicûn, li eniya mirov didin. Eman lawo **bidin û birevin** ji van.*

Biedeb û erkan bûn

Têkûz û li gorî nirxên civakê bûn. **Eferîm ji wê dayîkê re. Zarokên xwe **biedeb û erkan in**.*

Biesil û esas bûn

Ji hêla sulale û malbatê ve ji cihekî zadegan û esîl bûn. **Xwedê dizane ku bûka wî camêrî ji cihekî **biesil û esas e**.*

Biha ... şikandin

Bihayê tiştekî kêm kirin, erzan kirin. **Heke wê firinê wisa **bihayê nan neşikênanda**, me nikaribû wisa nan erzan bikiriya.*

Bihar çû, ji kerê nêr û pîreka xerab re.

Ji ber ku ker û pîreka teral û pêknehatî tedbîra debara xwe nakin, bihar ji bo wan ne girîng e. **Her kes li gorî rewşa xwe.* ***Bihar çû, ji kerê nêr û pîreka xerab re.***

Bihar e, zirîna keran tê.

bnr. Bihar e, ker har e.

Bihar e, dew li dar e.

Biharê şîr û mast tim heye. *****Belê bihar e, dew li dar e****, lê kar û emel jî wekî wê zêde ye.*

Bihar e, keç har e.

Biharê xwîna ciwanan hê bi coş dikele û evîn dike pirkepirk. *****Bihar e, keç har e.*** *Ciwan diçin çol û çiyan, evîn wekî çeman diherike.*

Bihar e, ker har e.

Biharê çêre hêşîn dibe û ker baş zikê xwe têr dike, gelekî kêfxweş dibe. **Êdî çêre derket, her der şîn bû,* ***bihar e, ker har e****.*

Bihar e, rewş ne diyar e.

1. Avûhewaya (îklîma) biharê serê carekê bi awayekî dibe, ji ber wê jî bêîstikrar e. **2.** Heta rewşa biharê xuya nebe, ya debarê (êm, ka û gîha) jî xuya nabe. *****Bihar e, rewş ne diyar e****, Xwedê dizane ew debar têrê bike yan na.*

Biharê girt û lê kir, payîzê jê kir.

Ji bo fêkî û çandiniyê tê gotin. Dema her tiştekî heye. **Çi gotine,* ***biharê girt lê kir, payîzê jê kir.***

Biharê pez, payîzê rez, zivistanê ez

Yên ku biharê pez xwedî bikin û payîzê jî bi bax û rezan re mijûl bibin, dê zivistanê ji xwe re kêf bikin. **Rehmetiyê bavê min digot:* ***"Biharê pez, payîzê rez, zivistanê ez."***

Biedeb û erkan bûn

Têkûz û li gorî nirxên civakê bûn. **Eferîm ji wê dayîkê re. Zarokên xwe* ***biedeb û erkan in****.*

Biheq e, wekî deq e.

Bêşik û bêguman e. Mafekî eşkere û nîşankirî ye. **Ma kî dikare înkar bike? Belê rast e,* ***biheq e, wekî deq e****.*

Bihiş û hidam bûn

Ji başî û qenciyê jî ji nebaşî û xirabiyê fêm kirin. Gihîştî bûn, kamil bûn. **"Her du jî neşibîn maran. Her wekî ku* ***bihiş û hidam bûn****, başî û xirabî fêm dikirin."* Feqî Huseyn Sağnıç

Bihişkebazar bûn

Di dan û stendina bazirganiyê de pir qewîn û tund bûn. **Bavê min çi mirovekî* ***bihişkebazar e****, heta bi saetekê bazar neke nakire.*

Bihîstiye malan bar kiriye, lê nizane li ku danîne.

1. Bêtêkilî bûn, bêagahî bûn. **Têkiliya xwe ji zû de biriye, ew e ku* ***bihîstiye malan bar kiriye, lê nizane li ku danîne***.

Bihîstiye Mardo miriye lê nizane li ku derê çal kirine.

bnr: Bihîstiye malan bar kiriye, lê nizane li ku danîne.

Bihostek li ser zêde bûn

Kêfxweş bûn. **Dema ku neviyê min xwe diavêje hembêza min,* ***bihostek li ser min zêde dibe***.

Bihuşta ku ez ne tê de bim bila ker tê de vegevizin.

Tiştên ku berjewendiyên min tê de tune bin çawa dibe bila bibe. **Ma tu xêreke wê ji min re heye.* ***Bihuşta ku ez ne tê de bim bila ker tê de vegevizin.***

Bija xwe şikênandin

Bi hinek xwarin an jî derfetên piçûk daxwaza dilê xwe derbas kirin. **Hemayîlê hema bi wan her du tîkeyên goşt* ***bija xwe şikênand***.

Bikel bûn

Bihêrs û rakêşandî bûn. **Zerîn di rewşeke wisa* ***bikêl bû*** *ku min nexwest ez pê re bipeyivim.*

Bikozî û kulfet bûn

Xwedî mal û zarok bûn. **Êdî ew jî* ***bikozî û kulfet bûne***.

Bila avis be, kengê dizê bila bizê.

Ku bingeh saxlem û bi kêr be zû yan jî derengbûn ne xem e. **Heyran ez tiştekî nabêjim,* ***bila avis be, kengê dizê bila bizê***.

Bila bibêjin xençera Xaço heye.

Ji bo nav û deng, ji bo xuyangê di nav tevgereke sexte de bûn. **Sedema ew qas xilaport derxistina wî ew e ku,* ***bila bibêjin, xençera Xaço heye***.

Bila bela te li ber deriyê te be.

Ji me nebîne,* ***bila bela te li ber deriyê te be*. (nifir)

Bila bi heqê xwe bizê ya zêde naxwazim.

Tenê mafê xwe yê asahî dixwazim. **Na qurban zêde ne hewce ye, tenê* ***bila bi heqê xwe bizê ya zêde naxwazim***.

Bila çil mêrê Şêxadî dergê xêra li te veke.

Ez ji dil dixwazim ku* ***bila çil mêrê Şêxadî dergê li xêrê te veke*. (dia)

Bila daxek be, li destê min be.

Soz êdî divê tu car ez wê yekê ji bîr nekim. Tovbe kirin. **Ev kirina Hesen jî* ***bila daxek be, li ser destê min be***.

Bila diaya ziyareta Gulheyranê li te be.
Keçika min **bila diaya ziyareta Gulheyranê li te be, te gelekî zehmeta min kişand.* (dia)

Bila ew jî daxa li ser daxan be.
bnr. Bila daxek be, li destê min be.

Bila ew jî nehikê li ser dehan be.
Bila ew jî bi ser ve be, xem nake. **Ya ku niha kiriye jî **bila nehikê li ser dehan be**.*

Bila ew mêr bitirse ku jina wî bimire û dişa wî tune be.
Piştî mirina jinê, diş, vebijarkeke zewacê ya amade ye. **Evdal ji dişa xwe re çavê xwe qirpand û got: **"Bila ew mêr bitirse ku jina wî bimire û dişa wî tune be."***

Bila ew ji parxanan netirse, ez ji diranan natirsim.
Ji pêşwazî û tekoşînê re amade bûn. **Ew kengî û li ku dixwaze ez amade me. **Bila ew ji parxanan netirse, ez ji diranan natirsim.***

Bila ez ne biçûkê birayan bûma, bila ez kûçikê kuçeyan bûma.
bnr. Bila kûçikê gundan bim, ne piçûkê birayan bim

.

Bila ew rê ji min re bibe riya qantirçiyan.
Careke din divê eynî tişt nebe. **Carekê ew yek hate serê me, lê carek din **bila ew rê ji min re bibe riya qantirçiyan**.*

Bila hindik, bila rindik
Bila hindik be lê bila xweş be. **Ezbenî min ji te re got, ez zêde naxwazim. **Bila hindik, bila rindik.***

Bila kûçikê sa bim, ne piçûkê bira bim.
bnr. Bila kûçikê gundan bim, ne piçûkê birayan bim.

Bila li pê bim, li dîwarê qebrê bim.
Bila zû bimirim, ku zêde kesî aciz nekim. **Naxwazim bikevim nav cih û balgiyan û bûk û zaroyên xwe jî aciz bikim. **Bila li pê bim, li dîwarê qebrê bim.***

Bila ne li ber agirê min be, bila li ber agirê mala bavê min be.
bnr. Bila ne di min de be, bila di diya min de be.

Bila ne di min de be, bila di diya min de be.
Tenê berjewendiyên xwe li pêş girtin. **Kamilê Seyîdxan hema dibêje: "**Bila ne di min de be, bila di diya min de be."***

Bila razana te hebe, rabûna te tune be!
*Înşelah razana te hebe, rabûna te tune be! (nifir)

Bila rezê min li nav rezan be, bila tirî li min heram be.
1. Dexesî û çavnebarî kirin. **2.** Naverok na, lê tenê xuyang girîng girtin. **Xalê Reşo hema*

digot: "Lawo bila dijmin şad nebin. ***Bila rezê min li nav rezan be, bila tirî li min heram be.*** *" *Ez ne li pey tiştekî din im,* ***bila rezê min li nav rezan be, bila tirî li min heram be.***

Bila şûrê xwe yê tûj biavêje gûzika (kap) min.
Mineta xwe jê negirtin. Jê netirsîn. **Dibêjin Boran gelekî gef li min xwarine, hema* ***bila şûrê xwe yê tûj biavêje gûzika min****.*

Bila xweş be, gula siwaran be.
bnr. Bila xweş be, gula govenda be.

Bila xweş be, gula govendan be.
Ji ber vê rewş û taybetiya te divê tu xweş bijî. **Bi rastî jî yê wekî wî zû bi zû bi dest nakevin.* ***Bila xweş be, gula govendan be.***

Bila ya dehan jî li ser a nehan be.
Qet ne xem e, hinekî zêde be jî tiştekî nabe. **Xidir jî dixwaze barê min hê girantir bike, lê* ***bila ya dehan jî li ser a nehan be****.*

Bila zikê mela bel be, bila gîha û pel be.
Ji bo çavçiliya meleyan jî tê gotin. **Kuro bînin bînin hema we çi dît bînin.* ***Bila zikê mela bel be, bila gîha û pel be.***

Bila zikê wan têr be, bejna wan nû be.
Ji bo kesên ku tenê di heyra xwarin, vewarin û lixwekirinê de ne û bêxem in tê bikaranîn. **Ji wan re çi, tenê* ***bila zikê wan têr, bejna wan nû be****, wekî din nexem e.*

Bilebil kirin
Ji bo kesên ku zêdetir di tengasiyê de nikarin zelal bipeyivin tê bikaranîn. **Dema ku ew di destê min de dît, Amed* ***bilebil kir****.*

Bilbil xistine qefesa zêrîn, gotiye: "Ka gula min a bibêhn?"
Her tişt û her kes di nav xwezaya xwe û di nav egerên xwe de xweş e.**Li vî welatê xerîb her çiqas derfet zêde bin jî bêhna welat pir cuda ye.* ***Bilbil xistine qefesa zêrîn, gotiye: "Ka gula min a bibêhn?"***

Bilbil xistine qefesa zêrîn, gotiye: "Axxx welatê min"
bnr. Bilbil xistine qefesa zêrîn. Gotiye: "Ka gula min a bibêhn?"

Bilind firîn
Xwe zêde dîtin. **Zerê gelekî* ***bilind difire****, lê nizane yê ku* ***bilind difirin*** *dawiya wan dibe çi?*

Bilind firîn, nizim ketin
Yên ku xwe zêde dihesibînin, di dawiya dawî de rûmeta wan kêmtir dibe. **Divê te bizanibûya, yên ku* ***bilind difirin, nizim dikevin****.*

Bilûr di ber piştê re kirin
Qewirandin, karê wî bi dawî kirin. **Wî gelek karên nebaş kirin, wan jî* ***bilûra wî di ber pişta wî re kir****.* (qerf)

Bilûra li ber ga, çiraya li ber koran bûn

Ji kar û hewldana vala û bêkêr re tê gotin. **Qet xwe newestîne, tu çi bikî wekî **bilûra li ber ga, çiraya li ber koran e**.*

Bimal û hal bûn

Xwedî mal û milk bûn. **Heya ku ev lawê min **bimal û hal bibe**, boçika deveyê jî wê bigêhêje erdê.*

Bimij û moran bûn

Tevlihev bûn, xilaport û teşqele bûn. **Van rojan serê mala Cemo **bimij û moran e**.*

Bimîne, bibîne

Heke ku tu bijiyî, tu yê gelek tiştên balkêş bibînî. **Îro ez çi bibêjim bêkêr e. Ya rast ew e ku, bimîne, bibîne.*

Bimirî, ya axa sar î, bimînî ya min î.

Çi dibe bila bibe, di her şert û mercê de ez ê te bistînim. (Xort ji dilketiya xwe re dibêjin.) **Sosin, *çi dibe bila bibe ez ê bi te re bizewicim. Tu **bimirî ya axa sar î, bimîne ya min î.***

Binan û xwê bûn

Xwedî xêr û qencî bûn. **Ew ne ji malbatek wisa xalî ye, mala bavê wê maleke **binan û xwê ye**.*

Binax kirin

1. Mirin. **2.** Veşartin. **Dema ku bavê wê **binax kirin**, hêsirên çavên wê nesekinîn. *Wan çeteyan, xwîna ew qas welatparêzan û mal û mîlkên wan feqîr û fiqaran hemû **binax kirin** û çûn.*

Binav û deng bûn

Navdar bûn. Ji layê her kesî ve hatin naskirin. **"Bavê wî şêxekî **binav û deng bû**, ditirsiya ku Resûl di dibistanan de xisletê wî hîn xerabtir bibe..."* Ridwanê Elî

Bincil kirin

Veşartin, nixamtin. **Gogê hemû kirinên qîza xwe **bincil kirin**, şûşt û da mêr.*

Binçav kirin

Di bin çavdêrî û kontrolê de bûn. **Polêsan ji wan kesan çar bi tene **binçav kirin** û heya sibehê li wan xistin.*

Bindest bûn

Nuxs, pêknehatî, ne li ser xwe û sist bûn. **Heke ew mirovekî **bindest nebûya**, ew ên din jî ew qas bi ser de nedihatin.*

Binecih bûn

Bi awayekî demdirêj li cihekî mayîn. **"Helbestkar di nava mekanekî dîwarkirî de, di nava dewreke dabeşbûyî de li ser fayên xwe **binecih bûbû**."* Remezan Alan

Binê beroşê rakirin
Xwarin kuta kirin. **Maşelalı heta me ser û çavên xwe şûştin, Memo **binê beroşê rakir** jî.*

Binê diranan negirtin
Ji xwarina gelekî hindik re tê gotin. **Ew xwarina ku te da min, qet **binê diranên min jî negirt**.*

Binê guhê (yekî) xwêdan nedan
Helwest nîşan dan. **We wisa hêvî nedikir, lê we dît ku **binê guhê camêrî xwêdan neda**.*

Binê hûrê (yekî) negirtin
Ji bo xwarina hindik tê gotin. **Kuro ew çi xwarine te da ber Reşîtê Guro? Heyran ew qet **binê lûrê wî nagire**.*

Binê satilê qul bûn
Bêtedbîr û bêsexbêr bûn. **Tu çiqasî şîretan jî lê bikî, **binê sîtila wî qul e**, ew nayê rayê.*

Binê tasê dalistin
Pir nefsek bûn. **Heydoyê Xoşo jî hema **binê beroşê dadilêse**.*

Binê tûr qul bûn
Bêsexbêr û bêtedbîr bûn. *****Binê tûrê wî qul e**, ew ji vir bi şûn de jî zor bibe mal û hal.*

Binê xwe şil kirin
1. Tawanek kirin. **2.** Tirsîn. **3.** Mîstin. **Ew jî dizane ku wî **binê xwe şil kiriye**. *Di rûyê qoriciyên gund de, zarokên me **binê xwe şil dikin**. *Mamoste, lawê min sêzdeh salî ye, lê hê jî **binê xwe şil dike**.*

Binê (yekî) kolan
Di eleyhê yekî de xebitîn. **Beko bi şev û roj dixebite ku **binê Delîl bikole**, lê bi ser nakeve.*

Binê ziman şil bûn
Ji bo peyivandinê amade bûn, daxwaza axaftinê kirin. ****Binê zimanê Robar şil bûye,** ka wê ji me re çi tiştên balkêş bibêje.*

Bingeh girtin
Wekî esas û xîm hesibandin. Girîngî dayîn. **"Kedê **bingeh bigire**. Kesê ku kedê wek bingeha dayîn û standinê esas bigire, nirxa herî mezin bide kesên kedkêr, ew di felsefeya Zedeştiyê de mirovekî bilind e û mezin e."* Ehmed Huseynî

Binî pîso, serî sîso
Naverok û bingeh xerab bûn, lê xuyang rengîn û xweş xuyandin. **Tu wisa li forsa wê menêre, rasteqîniya wê, **binî pîso, serî sîso** ye.*

Binê ... xuya kirin
Hindik bûn, ji qedandinê re hindik mayîn. **Te digot bîst kîlo ye, lê va ye **binê torbe xuya dike**.*

Binkoka jiyanê bûn

Bingeha jiyanê bûn. *"*Hezar hizir û bîran, di mişţoxê wî de, şerenîx dikir; destengî, hevalên bêsoz, xudanên hizir û bîrên babelîskê, xelkê dilovanî jibîrkirî, diravê* ***bûye binkoka jiyanê****, ji bilî dabêşa fêrxazan..."* Fazil Umer

Binkol bûn

bnr. Ji binî ve bûn

Binkoliya (yekî) kirin

Bi dizî û bi niyeteke xerab nêzîk bûn. **Bi rastî heke wî* ***binkoliya me nekira****, me dê ev kar bi dest bixista.*

Binpê kirin

Bêrûmet kirin. Bi tiştekî nehesibandin. **Wardeka meta min ji bo aştiya wan çû, lê wan ew* ***binpê kir*** *û li hev nehatin.*

Bipîr û pergal bûn

bnr. Bipîr û pêşk bûn

Bipîr û pêşk bûn

Bi sîstem û aheng bûn. **Bi rastî jî ez heyran û hişmekarê* ***pîr û pêşkê*** *vê bûka Gêlo me.*

Bipîr û war bûn

bnr. Bi pîr û pêşk bûn

Birayo, tu çima wekî hewleya (helaw) bêxwê dihujhujî.

Di wateya pirs û lêgerînê tê bikaranîn. **Wekî ku jinikê gotiye:* ***"Birayo, tu çima wekî hewleya bêxwê dihujhujî?"*** *Tu jî dixwazî ji min bersiva wê pirsê bigirî?* (bnr. çîrok)

Birayek dîn, yek hişyar, dan mûyekê neqetandin.

Her du jî ji hev xerabtir bûn, tiştek pêk neanîn. ***Birayek dîn, yek hişyar, dan mûyekê neqetandin.*** *Her du jî ji qêf seqet in û tune ne.*

Birayê min bimire, ne yek jî te du tir kirin.

Ji bo kesên ku ji ber tiştên piçûk jî zû dixeyîdin û didin tîzan tê gotin. **Tu çima xolî dibî? Ya rastî bixwazî wekî gotina keçikê:* ***"Birayê min bimire, ne yek jî te du tir kirin."*** (bnr. çîrok)

"Birayo tu çima wekî hewla bêxwê dihujhujî?"

Li gundekî mêrê jinikê ji jinikê dixwaze ku jê re hewleyê çêbike. Jinik hinek tiştan dizane, lê nizane gelo xwê dixin hewleyê yan na. Mala wan ji gund hinekî dûr lê li ser rêyekê bûye. Jinik derdikeve ber derî û li ser rê diponije. Demekê bi şûn de siwariyek derbas dibe. Jinik rasterast nikare pirs bike. lê bi awayekî peyamî ji mêrik re dibêje:

"Rêwiyo tu çima wisa wekî hewleya bêxwê dihujhujî (ji xwe ve diçî)?" Mêrikê rêwî mirovekî kone bûye, rewşê fam dike û ji jinikê re dibêje:

"Xweha min, xwê nakeve nav hewleyê, here hewleya xwe çêke."

"Birayê min bimire, ne yek jî te du tir kirin."

Berê keç û xortên ku dergistiyên hev bûn, ancax di gelek mercên zor de dikaribûn hev û din bibînin. Di wê demê de du heb dergistî piştî gelek dijwariyê rojekê firsend dibînin û tên bal hev. Her du dergistî demekê bi hev şad dibin, lê çawa dibe ba ji ber lawik diçe, angu tir dike. Ji şerman lawik radibe dike ku here, lê keçik li ber digere û dibêje:

Birayê ji dê ye, silavan dide li pê ye; ew jî ji bo lomê xelkê ye. (Birayê ne ji dê yo, silavan dide li pê yo; ew jî lomê xelkê yo.)
Kes an jî tiştê ne heqîqî û ne surişt be, zêde mayînde nabe. **Tiştên ne surişt cuda ne.* ***Birayê ji dê ye, silavan dide li pê ye; ew jî ji bo lomê xelkê ye.***

Birayê mîna te, bila ji gorê rabin.
Ji bo birayên bêkêr tê gotin. **Ma tu jî bira yî?* ***Birayê mîna te, bila ji gorê rabin.***

Birayekî bêpar bûn
Ji bo hevalên fedakar û baş tê gotin. **Xwedê dizane Nûro* ***birayekî bêpar e.***

Birçî bû têr nabe, têr bû birçî nabe.
Ji bo kesên bêîstikrar tê bikaranîn. **Ev xaltiya min jinek ecêb e ku* ***birçî bû têr nabe, têr bû birçî nabe.***

Birêk û pêk bûn
bnr: Bipîr û pêşk bûn

Birîn çelitandin
bnr: Derd dereve (der) kirin

Birîn herişandin
bnr: Derd dereve (der) kirin

Birîn teze kirin
bnr: Derd dereve (der) kirin

Birîna hevalan, tîra kendalan
Derdê mirov, ji bo yên din zêde ne xem e. **Erê her kes gotinên xweş dibêje, lê* ***birîna hevalan, tîra kendalan.***

Birîna min, bi min keder tê.
Derd û kul her xwediyan dêşînin. **Bila sax bin, dost û lêzim gelek in, lê* ***birîna min, bi min keder tê.***

Birîna xwe xurandin
Bi xwe derdê xwe derman kirin. **Ew reben jî ancax dikare* ***birîna xwe bixurîne.***

Birîna (yekî) der kirin
bnr: Derd dereve kirin

Birîna (yekî) derman kirin
Ji derdê yekî re çare dîtin. **Heke ew dikare bila berê* ***birînên xwe derman bike.***

"Tiştek nake, ev yek tê serê hemû mirovan. Ne xem e, em hevalên hev in. Sibê em ê bibin mêr û jinên hev û ev tiştên wisa ji bo min û te tiştên asahî ne." Lê keçik çiqas li ber dergistiyê xwe digere, çi dibêje û çi dike, nikare wî îkna bike. Di dawiyê de keçik dinêre ku ne mimkun e, wa ye dergistiyê wê dide ser rê û diçe; keçik hêrs dibe û wiha dibêje:
"Birê min bimire, ne tirek jî te du tir kirin."

Biro biro kirin

1. Hewar û gazîn kirin. **2.** Di halê xwe de gotin. **Bedir wisa **biro biro kir** ku hemû cînar bi dengê wî şiyar bûn. **Derd û kulên wê gelek in, ew hem dixebite, hem jî **biro biro dike**.*

Birq û birûskê lê xistin

Ji nişkê ve ji holê winda bûn. ***Birq û birûskê lê xist**, Seyad û Laleş ji holê winda bûn.*

Birûsk li şêmîgê ketin

Înşelah **birûsk li mala wî bikeve, ev bela hemû di rûyê wî fesadî de hatin serê me.* (Nifir)

Birûska esmanê heftan lê xistin

Belayeke pir mezin lê ketin. **Kuro belkî **birûska esmanê heftan li te bixe**!*

Birûyê min şeh dikî, çavê min jî derdixî.

Ji kêrê zêdetir ziyan kirin. **Ev çawa alîkariye kuro? Tu **birûyê min şeh dikî, çavê min jî derdixî.***

Birz bi bedenê (yekî) ketin

Derdekî giran lê peyda bûn. **Belengaza Zozanê **birz bi bedena wê ketiye**.*

Biserî bûn

bnr. Serî girê dan

Bisingir û pingur bûn

Bi givir û goşt bûn. **Keçik pazdeh salî bû, lê **bisingir û pingur bû**.*

Biskê xwe şeh kirin

Xwe çêkirin. Xwe bedew kirin. **Dîsa Şengê **biskê xwe şeh kirine**, gelo wê mala kê xera bike?*

Bismilah gotin

Dest pê kirin. **Hê min **negotibû bismilah** wê bi nîvî kir jî.*

Bismilah teze, neyê bi ser me de (yekî) şerpeze.

Înşelah ji vê radeyê bi şûn de tiştekî hê xerabtir nebe. **Ez çi biêjim? **Bismilah teze, neyê bi ser me de yekî şerpeze.***

Bivirvan dar birî, yê li ser darê guman ji Xwedê nebirî.

Divê di demên herî teng de jî mirov hêvî û gumana xwe winda meke. **Dayê, sebir bike ka hela Xwedê çawa dike. **Bivirvan dar birî, yê li ser darê guman ji Xwedê nebirî.***

Bi xwe bilî bûn

Bi hawirdor re têkilî tune bûn. **Jixwe ew mirovek wisa xerîbilet e, **bi xwe bilî bûye**.*

Bixwî çavekî min, nexwî her du çavên min.

Nexwî çêtir e. (Bi henek tê gotin.) **Min ji te re got bixwe, lê dîsa jî bibêjim: **Bixwî çavekî min, nexwî her du çavên min.***

Bizarî bûn

1. Ducanî bûn, avis bûn. **2.** Bênikah bi zarokekî bîj hemîle man. **Ji ber ku bûka wê **bizarî** ye, Almast pir kêfxweş e.*

Bizin bizin e, berê cihê xwe pêkol dike dû re mexel tê.

Divê şûna mirovan paqij û têkûz be. **Min çend caran ji te re got, hema qet nebe, dora qûna xwe paqij bike. **Bizin bizin e, berê cihê xwe pêkol dike dû re mexel tê.***

Bizin firot bi heftan, bezê wê kirî bi heştan.

Hesabê xwe nizanibûn. **Kuro ew efterekî Xwedê ye, **bizin firot bi heftan, bezê wê kirî bi heştan**.*

Bizin ketiye derdê serê xwe, şivan ketiye derdê bezê bizinê.

Her kes di haya xwe de û li pey berjewendiyên xwe ye. **Her kes di heyra xwe de ye. **Bizin ketiye derdê serê xwe, şivan ketiye derdê bezê bizinê.***

Bizin mir, gir damirî.

bnr. Bizin mir, gir vemir.

Bizin mir, gir vemir.

Ew bûyer qewimî, her tişt li cihê xwe edilî. Jixwe pirsgirêk ji bo wê bû, ew jî qediya. **Doz hemû li ser wê erseyê bû, kalikê min jî ew firot, her tişt qediya. **Bizin mir, gir vemir.***

Bizina kol elimiye danûkan.

Her dem û her car tiştên xweş nabin. ****Bizina kol elimiye danûkan.** Te hew dizanibû dîsa wekî berê ye?*

Bizina kol, hîn bûye daniyên şor.

bnr. Bizina kol elimiye danûkan.

Bizina pep hêşîn e, pepikan neweşîne, dîsa rehme li ya pêşîn e.

Bi gelemperî dîsa yên pêşîn baştir in. **Zahîdê li kirinên bûka xwe ya piçûk mêze kir û got: **"Bizina pep hêşîn e, pepikan neweşîne, dîsa rehme li ya pêşîn e."***

Bizina reş e, her roj nexweş e.

bnr. Mirîşka reş e, her roj nexweş e.

Bizina xwe bi miyê guhertin

Ji bo kesên çavbel û sextekar tê gotin. **Ew çi zana ye, heta **bizina xwe bi miyê neguhere**, nasekine.*

Bizina xwe şerjê kiriye, postê xwe bi dar de kiriye.

Karê xwe qedandiye, êdî dema wî derbas bûye. **Dev ji wî berdin lo, wî **bizina xwe şerjê kiriye, postê xwe bi dar de kiriye**.*

Bizinên (yekî) dîsa çûne çolê.

Mêzîna xwe winda kirin. Hêrs bûn. Din bûn. **Wa ye dîsa **bizinên Sefkan çûne çolê**. Qet nizane çi dipeyive.*

Bizot bûn

1. Pir yeman, dir û rezîl bûn. **2.** Pêkhatî bûn. **Jînik nîn e **bizotek e**, eman bidin û jê birevin.* **Rêzan nîn e, **bizotek e**, dikeve nav kîjan karî wek bizotê lê diqelibe û di dawiyê de jî bi ser dikeve.*

Bizrê kuliyê bûn

Zehf zêde bûn. **Di kolanê de zarok wekî **bizrê kuliyê bûn**. Li her derê dixuyan.*

Bîjê li ber tendûran bûn

Bêserî, bêberî û bêesil bûn. **Kuro ew kî ye ku xwe dixe hempayê min? Ew **bîjê li ber tendûran e**.*

Bîr birin

Ketin bîrê, hatin hiş. **"Wî qet **bîr nedibir** ku bapîrê wî nexweş bikeve û kes di malê de li halê wî pirs neke yan jî wî nebe cem doktor."* Mehemed Dehsiwar

Bîra bêav, kesê bênav

Ev her du jî tiştên neyînî ne. **Nav û deng girîng e ezbenî. **Bîra bêav, kesê bênav.***

Bîst û yekê adarê, milyaket hatin xwarê, hela kirin li biharê.

Bîst û yekê adarê êdî destpêka biharê ye. **Êdî qet mereqan meke, va ye bihar hat. **Bîst û yekê adarê, milyaket hatin xwarê, hela kirin li biharê.***

Bîter kirin

Bidestxistin, dîtin, peyde kirin. **Kingê ku ez ji mêrê xwe tiştekî bixwazim, çi dike dike, lê daxwaza min **bîter dike**.*

Bîz jê kirin

bnr. Bîz lê rûneniştin

Bîz jê çûn

bnr. Bîz lê rûneniştin

Bîz kişandin

Dil, xwarinek an jî tiştek xwestin. ****Bîzê min kişand** *ku ez çend kevçiyan tevî Sercan bixwim, lê min fedî kir.*

Bîz lê rûneniştin

Xwarin, xuyang an jî kesek lê xweş nehatin. **Nè di destê min de ye, dikim nakim **bîzê min lê rûnane**.*

Bîz lê nehatin

bnr. Bîz lê rûneniştin

Bîz li hev ketin

bnr. Bîz lê rûneniştin

Bobelat hatin serê (yekî)
Li rastî bela û qotikan hatin. **Jixwe* ***bobelat hatiye serê wî****, tu çi jê dixwazî?*

Boçika (yekî) bernedan
Şopandin. Bi daxwazeke yek alî zêde xwe nêzîkî kesekî kirin. **Ez bi vê û wê nizanim, lê ev keçik* ***boçika wî lawikî zû bi zû bernade****.*

Boçika (yekî) ketin qûnê
Têkçûn, bi şermiyê ketin. **Piştî ew qas ked û xebatê, boçika Filît kete qûnê û serê wî berjêr bû.*

Boçik li ba kirin
bnr. Çimik li hev dan

Boçik di bin lingên (yekî) de bûn
Di bin bandor û minetê de bûn. **Boçika wî* ***di bin lingên Misto de ye****, loma wisa xeber dide.*

Boçik ketin nav lingan
bnr. Boçik ketin qûnê

Boçik kirin gustîl
Mirin. Ketin rewşek dijwar. **Şivan çawa gule berdayê, sixurê şerê Girîdaxê Mîrzeyê Ecem,* ***boçika xwe kire gustîl****.* (argo)

Boçik kirin sing
bnr. Boçik kirin gustîl

Boçik lê hejîn
Li ber mirinê bûn an jî di rewşeke pir xerab de bûn. *****Boçika Heyder lê diheje****, kes bawer nake ku derkeve biharê.* (argo)

Boçik lê riciîn
bnr. Boçik lê hejîn

Boçik lê xurîn
1. Ji bo bela û qotikan zemîn amade kirin. **2.** Dil têkiliya cinsî xwestin. **Dîsa va ye* ***boçik lê dixure****, Ûso heya zompe nexwe rehet nabe.* ****Boçika Eyşa Nado lê dixure****, dîsa ji pey Seyadê Kemal naqete.*

Boçik pê ve girê dan
1. Kêmasî û qisûr jê re dîtin. Bi tiştên nekirî tawanbar kirin. **2.** Lê zêde kirin. **Almast ku* ***boçikekî pê ve girê nede****, wê bibehece.* **Çîlêya Qûnsepet wê* ***deh boçikan jî pê ve girê bide*** *wisa bibêje.*

Boçika deveyê gihîştin erdê
Ji bo tiştên bêguncav tê gotin. *****Boçika deveyê bigihîje erdê*** *jî ev dewlet tiştekî pak ji bo me pêk nayîne.*

Boçika gur qetiya, pire ma li wî aliyê avê.
Hemû tişt tevlihev bûn û rewş guherîn. **Boçika gur qetiya, pire ma li wî aliyê avê.* *Êdî kes nizane wê çawa bibe.*

Boçika mişk di malê de biarvan nebûn
Ji bo malên xizan û bêeşya tê gotin. **Maşelah maleke wê wisa heye ku* ***boçika mişk di malê de biarvan nabe.***

Boçika xwe li (ber) ba kirin
1. Xwe li ber şîrîn kirin. **2.** Xwe nazandin. **Van rojan ji ber ku hewcedariya Mehemed heye, li ber Piling* ***boçika xwe li ba dike.*** **Dîsa qîza Kemalê Çîpxwar* ***boçika xwe li ba dikir*** *û hemû xortên taxê bi pey xwe dixistin.*

Boçika xwe bilind girtin
bnr. Boçika xwe dayîn ser milê xwe

Boçika xwe dayîn ser milê xwe
Li ber çewisandin û zorê bi awayekî mêrxasî sekinîn. **Li wê rawestgeha texsiyan çiqas şofêr hebûn, li ser serê Gebar kom bûn, lê wî wekî şêran* ***boçika xwe da ser milê xwe*** *û serê xwe li ber wan netewand.*

Boçika xwe rakirin
1. Bitrî bûn. **2.** Di hêla zayendî de daxwazkar bûn. **Piştî ku dewlemend bû, Reşo* ***boçika xwe rakir.*** **Ew ku wisa* ***boçika xwe rake,*** *helbet mêr jî dê wisa li pey rêz bibin.* (argo)

Boçika xwe tê de rast kirin
Di hêla aborî yan jî derbareke din de rewşa xwe xweş kirin. **Xelefê Mûsa boçika xwe* ***di wî karê Mitahîtê Çerkez de rast kir.*** (argo)

Bombebaran kirin
Lê bombe reşandin. **Di wî şerî de herî zêde komandoyên taybet, gund* ***bombebaran kirin.***

Borebor kirin
Gef xwarin. Qelebalixî û teşqele derxistin. **Gelo dîsa diranê wî di kê de çikiyaye ku ew qas* ***borebor dike?***

Bû çala bi derziyê vedayî.
Ji bo karên zor û zehmet tê gotin. **Ew serkeftin, wekî çala* ***bi derziyê vedayî,*** *bi kedê pêk hat.*

Bû gur, heft golik jî xwarin.
Ji bo zû gihandin û pêşveçûna ne asahî tê gotin. **Weleh hema her kes pê ecêb ma, mêrikî* ***bû gur heft golik jî xwarin.***

Bû pariyek nan û hilat.
Ji nişka ve winda bûn. **Em hemû ecêb man, Hewê hema* ***bû pariyek nan û hilat.***

Bû pevek xweş, nebû qîra reş.
Nebûn tiştekî xerab, erênî, baş û xweş bûn. **Qet nekeve tatêla wê, ew* ***bû pevek xweş, nebû qîra reş.***

Bû warê mişk û maran, pişta xwe neda neyaran.
Ligel gelek dijwariyan dîsa jî bi mêrxasî li ber xwe dan. **Kesên wisa di dîrokê de zor derdikevin.* ***Bû warê mişk û maran, pişta xwe neda neyra.***

Bû xerman, nebû derman.
Digel ew qas derfetan, tu xêrek negihîştin kesî. **Qurbana Xwedê me, nizanim çima derfetan dide yên wisa?* ***Bû xerman, nebû derman.***

Bûk anî bi lez, da ga û pez, sivika malê dîsa ez.
bnr. Bûkek anî ji Hezro, tê da ga û pezo, dîsa sivika malê ezo.

Bûk bi dilê zavê ye.
Kar baş dimeşe. **Şikir ji Xwedê re,* ***bûk bi dilê zavê ye,*** *pirsgirêkên din ne girîng in.*

Bûk bi dilê zavê ye, çi hêlehêla mele ye.
A girîng ecibandina xwediyê sikurê ye, yên din ne girîng in. *****Bûk bi dilê zavê ye, çi hêlehêla mele ye?*** *Kuro ew çi dike kastekast?*

Bûk bi dilê zavê ye, çi kul bi dilê xelkê ye.
bnr. Bûk bi dilê zavê ye, çi hêlehêla mele ye.

Bûk di sorikê de, dergûş di lorikê de
Ji bo jinên bêxem tê bikaranîn. **Va ye bûka we nabe xwedî zarok jî.* ***Bûk di sorikê de, dergûş di lorikê de.***

Bûk hat, dawet hilat.
Pêkhatina rêgeza herî girîng, gelek caran di heman demê de dawiya wê pêvajoyê jî. **Êdî ew pêvajo jî xelas bû,* ***bûk hat, dawet hilat.***

Bûk ji yekî tûtik ji yekî bûn
Xwe xapandin. **Karê wê wisa ecêb in.* ***Bûk ji yekî tûtik ji yekî*** *wisa xwe dixapîne.*

Bûk siwar kirin
1. Karê xwe qedandin. **2.** Bûk birin mala zavê. **Me êdî* ***bûka xwe siwar kiriye,*** *kes bi me nikare. *Heta min* ***bûka xwe siwar kir,*** *mehfa min hat.*

Bûk şerm dike rû digire, (lê) zik vedike.
Ji bo karên çiloçepî tê bikaranîn. **Maşelah çi avrû ye, çi heya ye,* ***bûk şerm dike rû digire lê zik vedike.***

Bûka apê kete kapê, bûka xalê delaliya malê
Lêzimî û exrebetiyên jinê ji yên mêr girîngtir in. **Erê lawo ez baş dizanim;* ***bûka apê kete kapê, bûka xalê delaliya malê.***

Bûka bavan li ber çavan

Va ye her tişt eşkere li holê ye. **Bûka bavan li ber çavan.* *Ma her tişt ne xuya ye?*

Bûka malê rewşa malê

Heke di malekê de bûkek hebe, di wê malê de paqijî, pergal, rêkûpêkî, reng û giyana ciwaniyê ji heye. **Bûka malê rewşa malê ye.* *Bi her awayî ev yek xwe di mala Seyad de dide der.*

Bûka malê stûr e, birîna pîrê pir kûr e.

Heke mirov li rastî kesên nenazik û nedilovan bê, dikeve nav rewşeke nebaş. **Erê bi gelemperî pîr paşverû û cezû ne, lê dîsa jî* ***bûka malê stûr e, birîna pîrê kûr e.***

Bûka malê xweş xebitî, ker girê da dehş filitî.

Ji bo kesên bêzereng û pêknehatî tê xebitandin. **Erê lo erê Xwedê bixefrîne,* ***bûka malê xweş xebitî, ker girêda deş filitî.*** (qerf)

Bûka malê, qeşmera malê

Di malê de ya ku tirane lê tê kirin û qehran dikişîne, zêdetir bûka malê ye. **Dibêjîn:* ***"Bûka malê, qeşmera malê."*** *Lê xwezî wisa nebûya.*

Bûka me no ye, karê wê to ye.

Ji bo kesên dir û rezîl lê xebatkar tê bikaranîn. **Em çawa bikin, ew jî şansê me ye,* ***bûka me no ye, karê wê to ye.***

Bûka metê, bêrûmetê

Carinan exrebeyên nêzîk zêdetir bêrûmet dibin. **Çawa ku dibêjin gîhayê hewşê tal e, ev jî wisa ne.* ***Bûka metê, bêrûmetê.***

Bûka metê, her roj li dawetê

Ji bo kesên lêzimtiyê ji xwe re dikin hincet tê bikaranîn. **Xwedêgiravî exrebe ye,* ***bûka metê, her roj li dawetê.***

Bûka salê dîna malê

bnr. Bûka salê meha nîsanê

Bûka salê meha nîsanê

Çi kar û bar, çi derd û kul çi xirabî û tawanbarî hebe di stuyê bûka nû de ye. *****Bûka salê meha nîsanê.*** *Divê tu heya demekê derdê wan dîn û dêwan bikişînî keça min.*

Bûka salê, berda malê. (Bûka salê berdane nav malê.)

Bûka nû divê zêde nexebite. *****Bûka salê, berda malê.*** *Ew hê tor e, piçûk e, parastin hewce ye.*

Bûkê ji te re dibêjim, dîwaro tu fam bike.

bnr. Deriyo ji te re dibêjim, piştderiyo tu guh bidiyê.

Bûkê meymûnê, mal kire gola xwînê.

Ji bo kesên ne xweşik û fesad tê gotin. ***Bûkê meymûnê, mal kire gola xwînê.*** *Bûka Keremê Ker jî hema tam wekî wê gotinê ye.*

Bûkê ne zar û ne ziman e, xesûyê ne dîn e, ne îman e.

Bi gelemperî bûk mexdûr û bindest in, xesû jî serdest in. ***Bûkê ne zar û ne ziman e, xesûyê ne dîn e, ne îman e.*** *Vê bêbavê jî qet ji mirovahiyê nesîbê xwe hilnedaye.*

Bûkê pê pêpar[*], şivano dar gopal

Oxir û şansê şivanan û bûkan pir girîng e. ***Bûkê pê pêpar, şivano dar gopal;*** *Xwedê bi ya wî bike, ev şivanê me yê îsal pêpara wî pir baş bû.*

Bûkê pêpar, şivan ço û dar

bnr. Bûkê pê pêpar, şivano dar gopal

Bûkê têxine reşiyê, pîrê têxine xweşiyê.

Li gorî hawir û derfetan carinan ên nexweşik xweşik dibin, yên bedew jî bed tên xuyan. *Gotine: ***"Bûkekê têxine reşiyê, pîrekê têxine xweşiyê."*** *Mala felekê bişewite, ma ez wiha bûm, xwezî te di çaxa min da ez bidîtama.*

Bûkê pişta xwe da kulînê.

Ji bo kesên bi int û bi eks tê gotin. *Weleh ***bûkê pişta xwe daye kulînê,*** *karê we zehf zor e.*

Bûkê tunc zar ziman, xesûyê tunc dîn îman. (Bûkê ziman tune, xwesûyê îman tune.)

bnr. Bûkê ne zar û ne ziman e, xesûyê ne dîn e, ne îman e

Bûkê xêlî avêt, rû ma bêşerm û fihêt.

Ji bo rewşa eletewş û çewt tê gotin. *Ew bûka Resêyê Çelê çi ecêb bû lo? ***Bûkê xêlî avêt, rû ma bêşerm û fihêt.***

Bûkê xeniqandiye heft xesî (xesû), ji bulqiniya cêr ditirsî.

Ji bo helwesta berevajî û demborî tê bikaranîn. *Heyran min jî tiştek ji vê fêm nekir. ***Bûkê xeniqandiye heft xesî, ji bulqiniya cêr ditirsî.***

Bûkek anî ji Hezro, tê da ga û pezo, dîsa sivika malê ezo.

Di mal de zêde karkirina xesûyan diyar dike. *Min got ez bûkekê bînim belkî hinekî rehet bibim, lê min ***bûkek anî ji Hezro, tê da ga û pezo, dîsa sivika malê ezo.***

Bûme bûk, bûme pepûk.

Bûk reben, qehirkêş û bindest in. *Ji dûr ve li min gelekî xweş dihat, lê ya rastî dema ku ***bûme bûk, bûme pepûk.***

---

[*] **Pêpar:** Di wateya şans, qird, oxir û rozgarê de tê bikaranîn. Di çanda kurdan de bi taybetî pêpara bûkê ya zarokan û ya şivanên wê salê pir girîng e. Ji bo hizûr û arama malbatê, ji bo aborî û pêşerojê, ji bo bext û miraz û hwd. pêpar girîng tê dîtin. Bi taybetî ji bo herêmên ku bi ajalvaniyê re mijûl dibin pêpara şivan girîng e.
Di pêvajoya ku bûkeke nû were malbatê de, şivanê wê salê ku hatiye girtin, an jî zaroka ku nû çêbûye pêşveçûn û berexêrbûn an jî bûyerên neyînî çêbûn bi kurtasî her tiştên girîng gelek caran bi pêpara wan tê girêdan. Ji bo wê jî li gorî encamê gelek caran dua yan jî nifir jî li wan tê kirin.

Bûme dîkê sor.
Kifş û navdar bûn. **Nizanim ev çi bû hat serê min?* ***Li vî welatî bûme dîkê sor.***

Bûn agir û bi canê xwe ketin
Bi destê xwe, ziyan gihandin xwe. **Bi rastî sedema wê jî ne xuya ye, lê ev keçik* ***bûye agir û bi xwe canê xwe ketiye.***

Bûn agirê qurman
Qewîn û demdirêj bûn. **Debara me ya îsal* ***bûye agirê qurman,*** *xelas nabe.*

Bûn agirê sor
Pir dir, yeman û bizot bûn. **"Êdî min dît, tu nebînî.* ***Gula gewr bû agirekî sor."*** Selman Dilovan

Bûn aşiqê guhdirêj
Ji ber girêdan û evîna tiştekî bi çavan dinya nedîtin. Xwe winda kirin. **Bahadîn* ***bûye aşiqê guhdirêj,*** *tu çi bibêjî nakeve serê wî.*

Bûn av û dêlav
Zehf zêde bûn. **Maşelah îsal mêweyên baxçeyê me* ***bûne av û dêlav.***

Bûn avrûya mêran
Ji bo jinên ku bi mêran re zêde dikevin têkiliyên zayendî tê gotin. **Xatûna çi ye, hema* ***bûye avrûya mêrên*** *taxa me.*

Bûn bazara gayê ecem
Ji bo rewşa tevlihev û sergêjiyê tê bikaranîn. **Ev karê xwe* ***bû bazara gayê ecem,*** *ez bi xwe nikarim ji nav derkevim.*

Bûn benîşt, pê ve zeliqîn
Ji bo kesên bêar tê bikaranîn. **Heyran nizanim ew ji ku derket, hema* ***bûye benîşt, bi min ve zeliqiye*** *û dev ji pêsîra min bernade.*

Bûn bereta li ser bereteyan
Winda bûn. Tarûmar bûn. **Me got bila qet nebe birayê piçûk wer nebe, lê mixabin ew jî* ***bû bereta li ser bereteyan.***

Bûn berkê şitrencê
Ketin nav rewşeke zor û neyînî. **"Kî xem û derdê me dizanî, keçê ez* ***bûm berkê şitrencê*** *di destê wan de."* Enwer Mehemed Tahir

Bûn bilûra ber guhê ga
Ji bo tiştên vala û bêkêr tê bikaranîn. **Maşelah gotina Kerem wisa giran e, hema* ***bûye bilûra ber guhê gê.***

Bûn birayê tehlo
Wekî mirovê xerab xuya kirin. **Ew reben jî* ***bûye birayê tehlo.***

Bûn bûka baranê
Pir qels, piçûk û jar bûn. **Rebena bûka Seyad di destê xesûya xwe de* ***bûye bûka baranê****.*

Bûn cêwrikê (kûçik) Şedadan
Ji bo kar û rewşa berevajî yan jî eletewş tê gotin. **Rewşa zarokên wê jî* ***bûye ya kûçikên Şedadan****, çiqas mezin dibin, ew qas bêmerîfet dibin.* (bnr. çîrok)

Bûn çerm û hestî
Zehf jar û lawaz bûn. **Qirika Hefzê ji bo lawê xwe yê çiyê,* ***bû çerm û hestî****.*

Bûn çiraya ber koran
Ji bo hewldana vala tê gotin. **Ew keda min hemû* ***bû çiraya ber koran****.*

Bûn çîranok (çîrok, çîronek, çîrvanok)
Ji bo dûvdirêjbûna gelemşeyekê ku zehf dirêj dibe û zû bi zû bi dawî nabe tê gotin. **Ev meseleya te û vê jinikê jî hema* ***bûye çîranok****.*

Bûn çîroka deynê qiyametê
Zehf zêde dirêj bûn. **Kuro lawo, ev meseleya we* ***bû çîroka deynê qiyametê****.*

Bûn çîroka li ber tendûran
Ji bo gotinên vala û pûç tê gotin. **Li min bihorîne, lê ew tiştên ku tu dibêjî, hemû* ***çîrokên li ber tendûran in****.*

Bûn çîroka qulingê
bnr. Bûn çîranok

Bûn çîroka şûjinê
bnr. Bûn çîranok

Bûn çîroka vivirokê
bnr. Bûna çîranok

Bûn darikê hewedelê (Bûn darikê hewedelê û tevdan)
Fesadî kirin. **Karê wî bênamûsî jî wekî* ***darika hewedelê tevdan e.***

Bûn darikê miradan
Ji bo kesên alîkariya mirovan dikin tê gotin. **Wesîle* ***bûye darika miradan****.*

Bûn darikê nav tirafê
Fesadî û şeytanî kirin. **Ew jî* ***bûye darikê nav tirafê*** *li gundê me.*

"Bûn cêwrikê (kûçik) Şedadan"

Şedadan eşîreke koçeran e. Kûçikên wan dema ku piçûk in, pir jîr in, gelek caran guran dikujin. Lê dema ku mezin dibin, ji rêveçûna xwe aciz dibin. Gelek caran dema koç bar dikin, nikarin bi rê ve herin. Xwediyên wan, wan didin ser barên keran û wer wan digihînin waran.

Bûn dasiyê masiyan
bnr. Bûye destiyê dasê

Bûn dehşika dest gavanan
Ji bo jinên bi rojê bi yekî re radizên tê gotin. **Xêra wê tune, her kes dizane ku ew **bûye dehşika dest gavanan**.* (argo)

Bûn destmala ser destan
Birûmet bûn.

Bûn destmala ser destê xortan
1. Ji bo keçik an jî jinên gelekî bi mêran re têkildar in tê gotin. **2.** Ji bo kesên zêde kaw, kubar, bedew û bijare jî tê gotin. **Heyran keça Riza yeke wisa bêar e ku **bûye destmala ser destê xortan**. *Zîne keçeke wer delal e ku **bûye destmala ser destê xortan**.*

Bûn destiyê dasê
Bûn navgîna hincetan. **Jixwe armanca wî ne baş bû, ew helwesta Zînê jî **bû destiyê dasê**.*

Bûn dizê sola xwe
Di dawiya dawî de bi xwe sûcdar derketin. **Helal be welehî ew qas tişt hatin serê min, di dawiyê de jî ez bi xwe **bûme dizê sola xwe**.*

Bûn efendiyê tûtikan
Ji bo yên ku xwe tiştekî zêde dihesibînin tê bikaranîn. **Erê bavo, ez çi bikim, ew jî ji min re **bûye efendiyê tûtikan**.* (qerf)

Bûn filehê Kovarî (Kawarî)
Ji bo kesên zordest û bêînsaf tê bikaranîn. **Kuro ev Baro jî li ser serê me **bûye filehê Kovarî** lo.*

Bûn filehê sor
bnr. Bûn filehê Kovarî (Kawarî)

Bûn gayê nav golikan
Ji bo kesên ku bi xwe mezin in, lê dikevin nava yên piçûk û bi wan re mîjûl dibin tê gotin. **Rebenê Huso **bûye gayê nav golikan**, heya êvarê bi wan re mijûl e.*

Bûn gola req û beqan
Ji bo cihên pir bideng, hêwirze, xirecir û qerebalix tê gotin. **Mala Sofî Mûsa eynî **bûye gola req û beqan**, ji dengê zarokan mirov ker dibe.*

Bûn gola xwînê
Xwîn zehf herikîn. Zêdetir ji bo şerên giran tê bikaranîn. **Dibêjin ji ber şerê her du eşîran ew qad **bûye gola xwînê**.*

Bûn goşt û neynok
Zêde nêzîkî hev bûn, bi hev ve kelijîn. **Mixabin tim em dibêjin em **bûne goşt û neynok**, lê xuya ye ku pêdiviyek û armanceke serdestan a wisa nîn e.*

Bûn goştê ga

Ji bo xwarina ku zû nakele tê gotin. **Ev xwarina te jî* ***bûye goştê ga****, nakele.*

Bûn heska hemû giraran

Pêwîst an jî ne pêwîst bi her karî re têkildar bûn. **Malxirabê Geylanî hema* ***dibe heska hemû giraran****.*

Bûn hevalbendê (yekî)

Dost û yar bûn. Alîkar bûn. **"Ka nivîsarê çi qasî ez kişandime nava xwe û ez* ***bûme hevalbendê*** *ruh û derûniya nivîskêr?"* Dilawer Zeraq

Bûn hevaltiya birakosa

Ji bo hevaltiya nebaş tê bikaranîn. **Hevaltiya wan jî* ***bû ya birakosa*** *lo!*

Bûn heyva îdê

Ji bo kesên ku zêde li benda kesekî disekinin tê gotin. **Ferzendeyê Cango* ***bû heyva îdê,*** *lê ew dîsa jî nehat.*

Bûn hêka (teyrê) Neman

Gelekî hesas û nazik bûn; hema bi mehneyeke pir piçûk şikestin û xeyîdîn. **Qet qala wî mekin, hema* ***bûye hêka teyrê Neman*** *û ji her tiştî dilê xwe digire.*

Bûn hêlekana li ser avê

Hêrs bûn, di xwe de qicqicîn. **Li ser wan gotinan Elî* ***bû hêlekana li ser avê****.*

Bûn hîmê Gurdemîr

bnr. Hîm hîmê Gurdemîr bûn

Bûn hîva bin ewr

1. Zêde derneketin derve. **2.** Winda bûn. *Kuro lawo tu bûyî hîva bin ewr? Ev çend roj in ku em li te digerin lê em nikarin te bibînin. *"*Keçên ku çûn, êdî ne li derekê xuya kirin û ne jî bi şûn ve hatin... Heyhat!* ***Bûne heyva bin ewr****."* Talip Kalın

Bûn îsota alman

Pir tûj bûn. **Tu dibêjî* ***bûye îsota alman****, hêsir ji çavan anî.*

Bûn îşê Apê Ûs

Ji bo karên ecêb tê bikaranîn. **Karê te jî* ***bûye îşê Apê Ûs****, qet naqede, niha em ê bibînin ka dê çi di binî de derkeve.* (bnr. çîrok)

"Bûn îşê Apê Ûs"

Li Mêzgirê bi navê Apê Ûs mirovekî navsere lê azep hebûye. Apê Ûs tim ji holê winda dibe, çend rojan dixuye, dîsa winda dibe. Kî ku jê dipirse û dibêje: *"Tu bi ku de diçî û karê te çi ye?"* Ew hema ji wan re dibêje: *"İşê min heye."* Tê dîsa winda dibe, dîsa jê dipirsin ew jî hema dibêje: *"İşê min heye."* Û hew...

Piştî demeke dirêj Apê Ûs ji xwe re jinebiyeke pîr dibîne û tîne. Tê fêmkirin ku Apê Ûs ji bo zewacê û wê jinebiya pîr geriyaye. (Li Kurdistanê bi gelemperî li gelek cihan bi jinebiyan re zewicîn zêde wekî helwestek erênî nayê dîtin.)

(Ev biwêj li héla Dêrsimê li herêma Mêzgirê tê bikaranîn.)

Bûn karê kerxesan

Ji bo karên vala û bêkêr tê bikaranîn. **Maşelah çi kar e, çi kar e, bi rastî jî tam* ***bûye karê kerxesan****.*

Bûn kavirê beş

bnr. Ez golika beş im herime ku kifş im

Bûn kevirê serê rê

Li ber lingan çûn. Bêrûmet û bêxwedî bûn. **"Wekî dibêjin,* ***em bûne kevirê serê rê****; em hi kîjan aliyî de diçin, dikevin ber piyan. Lingê kê ji kîjan aliyî ve li me ket, em bi wir de gilol dibin."* Rizaliyê Reşît

Bûn keferehman

Ji holê winda bûn. **Em çûn lê bisêwirin, lê me mêze kir ku ew otêl* ***bûye keferehman****.*

Bûn kerê çolê

bnr. Bûn kerê qiyametê

Bûn kerê qiyametê

Pir bedcure û bêteşe bûn. **Te digot* ***bûye kerê qiyametê****, mirov nedixwest li rûyê wî binêre.*

Bûn kevçiyek xwîn, ketin pêşiya (yekî)

Belaya xwe li yekî dan. **Ecelê Felat pê girtiye,* ***bûye kevçiyek xwîn ketiye pêşiya min****.*

Bûn kevirê li kevir ketî

Xerabtirîn bûn. **Wê wisa bawer nedikir, lê yê nû ji we re* ***bû kevirê li kevir ketî****.*

Bûn kevirê takêşê[*]

Dilovan û dirist bûn û ji yên hewcedar re alîkarî kirin. **Ew tim* ***bû kevirê takêşê*** *û tim alîkariya ketiyan dikir.*

Bûn kêfa guran

Ji bo rewşa xweş û geş tê bikaranîn. **"Lê belê aş carekê hînî hêrînê bûbû û çeqçeqok jî bêkêmasî werdigeriya. Di demên weha de kêfa diya wî* ***dibû kêfa guran****."* Dilawer Zeraq

Bûn kûra viran

Gelekî derew kirin. **Erê gelek mirov derewan dikin, lê kes ne wekî Edoyê Zurbe ye, ew tam* ***bûye kûra viran****.*

Bûn lîstoka zarokan

1. Pir hêsan bûn. **2.** Bêrûmet bûn, tim heman tişt kirin. **Ma ew jî karek e, ji bo min* ***lîstoka zarokan e****. *Ev nivîsar jî ji wan re* ***bûye lîstoka zarokan****.*

---

[*] **Kevirê takêşê:** Wekî ku tê zanîn, barên ku li ker, ga yan jî li hespan dikin, ji du felqan pêk tên. Ji her felqekê (beşekê) *"cem"* tê gotin.

Dema di rê de li ser pişta barbiran cemek hinekî ji yê din siviktir be, bar takêş dibe, ango xwar dibe û dikeve. Gelek caran ji bo ku bar rast bibe, kevirekî dixin ser cemê sivik da ku bar nekeve û rast bibe. Ji wî kevirê ku bar rast dike re *"kevirê takêşê"* tê gotin.

Bûn maniyê nanê (yekî)

Ji bo debar û jiyana yekî astengî derxistin. **Binêre ji te re dibêjim,* ***nebe maniya nanê wî rebenî****, ji bo te qet baş nabe.*

Bûn marê di bin şinbêlê de

bnr. Bûna marê di tûr de

Bûn marê di qûçê de

bnr. Bûn marê di tûr de

Bûn marê di tûr de

Bi xinisî û konevanî tevgerîn. **Seyad* ***bûye marê di tûr de****, wê kingê bi me vede em nizanin.*

Bûn marê nîvkuştî

1. Karek pir dirêj kirin, dawî lê nehanîn. **2.** Bihêrs û bikîn bûn. **Ew karên te wekî* ***marê nîvkuştî ye****, ne diqede, ne jî tu dev jê berdidî. *Xaltiya Mexpûle wekî* ***marê nîvkuştî****, kete pêsîra wan leşkeran.*

Bûn mesceleya teke ev pezê kê ye?!

Ji bo rewşa li gorî şert û mercan tê guherandin tê gotin. **Meseleya vî xwarziyê min jî eynî* ***bûye meseleya teke ev pezê kê ye?*** (bnr. çîrok)

Bûn mîza şeytên ketin riya (yekî)

Belaya xwe ji mirov venekirin. **Ez çi bikim ji vî serxweşê heram? Va ye li ber derê min* ***bûye mîza şeytên û ketiye riya min****.*

Bûn motika (yekî)

Jê neqetîn, tim li dû yekî bûn. **"Ji min re* ***bûye motik****, dûvê min bernade."* Musa Vazgali

Bûn nêriyê tov

Ji bo kesên di zewacê de dereng mane tê gotin. **Lawo helbet divê tu jî bizewicî, ma* ***tu bûyî nêriyê tov****?*

Bûn paleyê pûş

Bi karên vala û bêkêr re mijûl bûn. **Me gelekî hewl da, lê dû re me fêm kir ku em bi tenê* ***bûne paleyê pûş****.*

"Bûn meseleya teke ev pezê kê ye"

Dema ku çêre nû şîn dibe, heywan ji devê zivistana reş a giran dertên, jîndar zingirî dibin, hewa xweş dibe û zozanvan pêz dibin zozanan. Dema ku keriyê pêz bi rê dikeve, tekeyekî (nêrî) ciwan jî daye pêşiya pêz û bi eşq bi coş û bi serbilindî dimeşe. Ji teke dipirsin û dibêjin:

"Teke ev pezê kê ye?" Teke ji hêz û heyecana xwe dike binnebirin, bi awayekî geş û coş û bi dengekî pir berz wan dibersivîne:

"Ma him nabînin ev pezê min e." Dû re dem derbas dibe. Dema ku dibe payîza dereng, hewa sar dibe, çêre tune dibe, koçer malê xwe ber bi bajêr ve dadigerînin, vê carê keriyê pêz ber bi deştê ve, teke vê carê li pey pêz dihujhuje û nikare xwe bigihîne keriyê xwe, dîsa jê dipirsin û dibêjin:

"Teke ev pez pezê kî ye?" Teke bi awayekî ji canê xwe bêzar û westiyayî û bi hêrs dibêje:

"Ez çi zanim, ez gora bavê xwediyê pêz bigêm. Ka ez dikarim xwe bigihînim ku bizanibim pezê kî ye jî."

Bûn pelewanê fisfis
Hundir vala bûn. **Me jî got qet nebe ew ê jî ji xwe re karekî bike, lê tu nebêjî li metropolê **bûye pelewanê fisfis**.*

Bûn pêşkeniyê xelkê
Ji ber kêmasiyan bûn nîşana tirane û henekan. **Heke di rûyê te de ez neketama nav wê tirholkê, **nedibûm pêşkeniyê xelkê** jî.*

Bûn pincara hemû giraran
bnr. Bûn xwêya hemû giraran

Bûn pira paşiya koçê
Ji bo rewşa gelek derengmayî tê gotin. **Dev ji wan berde lo, jixwe ew **bûne pira paşiya koçê**.*

Bûn qijika perbelek
Ketin rewşek xeter. **Înşelah ew **bibe qijika perbelek***

Bûn qîra qiyametê
Bi awayekî kelijî û bêar pê ve zeliqîn. **Heyran ez ê ji dest vê jinikê bi ku de herim? **Bûye qîra qiyametê** û bi min ve zeliqiye.*

Bûn qîra sîr
bnr. Bûn qîra qiyametê

Bûn risas
Şaş û metel bûn. **"Wexta ser milê xwe vegeriyam, di cih de **bûme risas**." Babayê Keleş*

Bûn riya mala mirinê
Karekî pir xeter bûn. **Kuro ew qasî canê xwe zer neke. Ma tu **bûyî riya mala mirinê**?*

Bûn rûreşka (yekî)
Li pêş hinekên din xwe tawanbar nîşan dan. **Hela tu bi Xwedê! Ez jî **bûme rûreşka wî**. Bi xwe dike û bi xwe jî dike navê min.*

Bûn selika ser kîran
Ji bo jinên bi her mêrî re dikevin têkiliya zayendî tê gotin. **Jinika çi ye hema **bûye selika ser kîran**.* (argo)

Bûn seriyekî keran
Ma gelekî mezin û bi qiymet bûye? **Çi ye hûn ew qas wî mezin dikin? Ma ew **bûye seriyekî keran**?* (qerf)

Bûn sotika agir
Pir germ bûn. **Şev ez hişyar bûm ku Lawikê min **bûye sotika êgir**.*

Bûn şadikê şivanan
Rezîl bûn, pêşkenî bûn. **"Ez **bûm şadikê şivan**, gavan û bêrîvanên çolê..." Zinar Soran*

Bûn şewaşa şevereşan

Ji bo helwest û hewldana vala û nefermî tê bikaranîn. **Lawo ya ku te kir mixabin hemû **bû** şewaşa **şevareşan**.*

Bûn ta û derzî

Gelekî jar bûn. **"Kela girî kete qirikê. Rih dirêj kir. Xew lê bû hesret, **bû ta û derzî**."* Helîm Yûsiv

Bûn tajiya nava kuçeyan

Ji bo kesên bêserî û bêkar û arode arode digerin tê gotin. **Xembar hingî zanîngeh xelas kiriye, hema **bûye wekî tajiyê kuçeyan** û li van deran digere.*

Bûn teniya bidon

bnr. Bûn qîra sîr

Bûn tifa li ser hevrazan

1. Ji bo karên çiloçepî û nerast tê gotin. **2.** Pirsgirêkek bixeter û bêçare bûn. **Ya ku dikî, hema tenê **tifa ser hevrazan e.** *Ez çawa bikim? **Tifa li ser hevraz e**, tû dikim, tifa min dîsa tê ser çavê min.*

Bûn tirba dêris

Şepirze û perîşan bûn. **Rebenê ji dest wê bûka xwe **bû tirba dêris**.*

Bûn tolê cendirmeyan

Beredayî û serserî bûn. **Belê Şiyar ew qas sal jî xwend, lê ji kengî ve ye hema **bûye tolê cendirmeyan** û li van derdoran digere.*

Bûn werîsê şixrê

Bi awayekî bêteşe li ser hev dirêj bûn. **Ew dolaba we jî **bûye werîsê şixrê,** parçe parçe li pey hev dirêj dibe.*

Bûn xana xerabe

Ketin rewşa bêkêriyê. **Êdî xêra wê nemaye, hema **bûye xana xerabe**.*

Bûn xesûya segan

Ji bo rewşa xerab tê bikaranîn. **Qet li halê wê nepirse, ew **bûye xesûya segan**.*

Bûn xwedî heq

Gihîştin asta mafekî. **"Gelên ku li gorî şertên dinyayê hereket nekirin, li ser navê nijada xwe nebûn xwediyê tu heqî."* Süleyman Çevik

Bûn xwelî

1. Bêkêr, nuxs û bêrûmet bûn. **2.** Zehf zêde bûn. **3.** Zehf erzan bûn. **Lawê min di navîna salekê de di destê wê jina xwe de **bû xwelî.** *Li bal me, zebeş **bûne xwelî**, kes li rûyê wan nanêre. *Di dema vê hukumetê de ajal **bûne xwelî**.*

Bûn xwêya hemû giraran (Ji hemû giraran re bûn xwê)

Li nav her karên li stû neferz be jî têkildar bûn. Tevlî her karî bûn. *_Maşelah Gulê, çi belayek reş e, hema hewcedar be, nebe,_ ***dibe xwêya hemû giraran***.

Bûn zengilê şeran

Bi şer re gelekî mijûl bûn. Ji pevçûnê re her dem amade bûn. *_Şefîq,_ ***zengilê şeran e,*** _hema li hendê ye ku şer derxe._

Bûne dîk û mirîşk, li ber hev sekinîne.

Tim bi hev û din re şer kirin. Tim bi hev û din re aliqîn. *_Delal û Riqyete_ ***bûne dîk û mirîşk, li ber hev sekinîne***.

Bûtik fetiqîn

Ji bo derbûn, bijiqîn û vebûnê tê bikaranîn. ****Bûtika xwendekarên me yên piçûk nû fetiqî.***

Buxz buxza deveyan bûn

Zêde kîndar bûn. *_Xwedê kesî li ber çavê Şêx Mehemed reş neke,_ ***buxza wî buxza devê ye***.

Bûye mîza şeytên, dipeke her derê.

Xeterî û bela li her derê weşandin. *_Huseyînê Bawa_ ***bûye mîza şeytên, dipeke her derê,*** _rojê bi yekî re şer dike._

Bûye al, ketiye mal.

Ji bo rewşa xweş û erênî tê gotin. *_Êdî tu ji wê zêdetir çi dixwazî,_ ***bûye al, ketiye mal***.

Bûye beranê qemer.

1. Ji bo mêrên xurt û pêkhatî tê bikaranîn. **2.** Ji bo kesên bi karên zayendî re zêde mijûl dibin jî tê bikaranîn. *_Weysî_ ***bûbû wekî beranê qemer,*** _kete nav wan û ew mirov gişt ji hev belav kirin._ *_Biroyê Xidir_ ***bûye beranê qemer,*** _heya êvarê li pey jinan digere._

Bûye berboq û dipeqe.

Ji bo kesê bihêrs û bêsebir tê gotin. *_Piştî ku ji hezkiriya xwe ya dawîn jî qetiya, Ordîxan_ ***bû berboq û dipeqe***.

Bûye birîna Heydo.[*]

Ji bo derd û pirsgirêkên hêsan tê bikaranîn. *_Erê, erê birîna te jî_ ***bûye birîna Heydo***.

Bûye cil, ketiye mil.

Êdî ji bêgavî û neçariyê ketin binbariya vatinî û karekî. *_"Vêca em fikirîn, me got hebe tune be yê ku bikaribe me ji vê tengasiyê derxîne bi tenê wê Mihemed Efendî be. A wele niha em li te tifiqîne." Çi bikim?_ ***Bûye cil ketiye mil.*** _Wele rabûm çûm Îngilîstanê..."_

Rojen Barnas

Bûye cirm, ketiye mil.

Ji bo hinekên din bar û asteng bûn. *_Xwedê qebûlnekiro, ev ê sist hema_ ***bûye cirm, ketiye mil***.

---

[*]**Bûye birîna Heydo:** Ev biwêj bi taybetî li hêla Farqînê tê bikaranîn.

Bûye cirm, ketiye mil.
Ji bo hinekên din bar û asteng bûn. **Xwedê qebûlnekiro, ev ê sist hema* ***bûye cirm, ketiye mil****.*

Bûye çêleka sor, şîrê xwe dide, di dawiyê de lingê xwe lêdixe û dirêje.
Ji bo karên berevajî û ne li cih tê gotin. **Karê vê keçika min jî wekî yê* ***çêleka sor e, şîrê xwe dide, di dawiyê de jî lingê xwe lêdixe û dirêje****.*

Bûye çerxa li nav malan.
bnr. Bûye tajiya li nav kuçeyan.

Bûye çiyayê Sîpanê, serê xwe danaxe (natewîne).
1. Xwe zêde hesibandin. Xwe nepixandin. **2.** Pir biînyad bûn. **Hingî Celîl zanîngelha Stenbolê beşa tibê jî qezenc kiriye,* ***bûye çiyayê Sîpanê, serê xwe danaxe****. *Em gişt yek bi yek li ber geriyan lê ew* ***bû çiyayê Sîpanê û serê xwe netewand****.*

Bûye dîkê qoqo.
Xwe nepixandin, xwe qure kirin. **Tu dibêjî Oro* ***dîkê qoqo ye****, xwe wer di ser me re dinepixîne.*

Bûye edaleta rovî û şêr.
Ji bo bêdadiyê, ango bêedaletiyê tê gotin. **Maşelah a ku tu dibêjî jî tam* ***dibe edaleta şêr û rovî****.*

Bûye Eliyê xemxwar.
Ji bo kesên zêde xemxwar tê gotin. **Ev keçika min jî* ***bûye Eliyê xemxwar****, hema her tiştî ji xwe re dike derd.* (bnr. çîrok)

Bûye findiqa li ser nêrgizê.
Pir birûmet bûn. **Na lo, ya te jî* ***bûye findiqa li ser nêrgizê****.* (qerf)

Bûye gayê cot, ne kişî mêşên li ser xwe dike ne jî yê cîranan.
Teral, linggiran û kêrnehatî bûn. **Ev lawikê min î piçûk,* ***bûye gayê cot, ne kişî mêşên li ser xwe dike, ne jî yê cîranan****.*

Bûye girara gavanan.

"Bûye Eliyê xemxwar."

Li gundekî bi navê Elî, mirovekî pir xemxwar û dilweswase hebûye. Elî, tim li cihê tune her tişî ji xwe re dike xem û keder. Wisa dibe ku, êdî malbata wî jî ji dest wê cira wî ahûzar dike. Di dawiyê de Elî soz dide malbata xwe ku carek din her tiştî ji xwe re neke xem. Hema eynî wê rojê deına ku xwarin tê ber wan. Elî hê nû çend kevçiyan li savarê dixe, lawê wî dikeve hundir û bi tatêl dibêje:
"Bavo tu dizanî çi bû ye?" Elî dibêje:
"Çi bûye lawo?" Law dibêje:
"Kera cîranê me za ye û dehşeke bêterî jê re çêbûye." Bi vê gotinê re Elî hinekî difikire, dû re hema kevçiyê xwe di nav savarê de diçikîne. Bi awayekî xemgîn û pozîde ji ser sifrê vedikişe û dibêje:
"De wêca were vê keratiyê bixwe! Niha hê ew dehşik dê bibe ker û xwediyê wê dê kurtan bide ser û bibe êzingan, lê gava ku ew ker di bin êzingan de biçerixe û bikeve; ka xwediyê wê dê rahêle ku dera wê ku ji erdê rake?"

Bûye gola gamêşan.
bnr. Bûye girara qereçiyan

Bûye gurê di ber (bera) segan de mirî.
Di nav helwesteke çewt de bûn. **Kêra wî ne gilûşt neteweya wî ne jî ya dijminê wî, her **bû gurê di ber segan de mirî**.*

Bûye hirça devê geliyan.
Perîşan û pejmûrde bûn. **Gulşalı **bûye hirça devê geliyan**. Wer hatiye guherandin ku gunehê gawiran pê tê.* (bnr. çîrok)

Bûye kaniya Xizir, xelas nabe.
Bibêhn û bereket bûn. *Maşelah ev komira me ya îsal, bûye kaniya Xizir xelas nabe.

Bûye kerê bûtê, yek salî bû du kêl hilgirtin, du salî bû kêlek hilgirt.
Ji bo karên berevajî û bêdenge tê gotin. **Ew xwarziyê Bariyê Etmanîkê jî **bûye wekî kerê bûtê, yek salî bû du kêl hilgirtin, du salî bû kêlek hilgirt**.*

Bûye kevir, xwîn jê nayê.
1. Xwîn sar, qecer û bêînsaf bûn. **2.** Timahkarî kirin. **3.** Alîkarî nekirin. **Xwedêgiravî, apê wê ye, lê **bûye kevir, xwîn jê nayê**, ew rojekê li mala xwe de xwedî nekir. *Me ji bo wî yê seqet û feqîr pere top dikirin, Hecî Silhedîn **bû kevir xwîn, jê nehat**. *Me gelek tişt ji wî hêvî dikirin, lê maşelah **bû kevir, xwîn jê nehat**.*

Bûye kirkirka (kirkirkê) êzîdiya.n
Ji bo rewşa vebirî û bêfita tê gotîn. **"Ey bajaro! Bila veger bi min **bibe kirkirkên êzîdiyan.**"* **Musa Vazgali** (Qerf)

Bûye meseleya mêrga çi ji min re?!
Karê xwe li hêviya hinekên din hiştin. **Meseleya paqijkirina vê meydana mezin **bûye meseleya mêrga çî mi ra?!*** (bnr. çîrok)

"Bûye hirça devê geliyan."

Li zozanan mal bar dikin. Ji wan malan malek, berî ku koça xwe bar bike, goşt dipêjin û dixwin. Lê bûka malê ya ku hemîle ye kes tîkeyek goşt nadiyê. Ji ber ku hemîle ye, dilê wê zehf goşt dikişîne. Bêhna goştê pehtî ji pozê wê dernayê. Dilê wê wisa dibije goşt ku hemû bedena wê pê diheje. Demekê bi şûn de wexta ku endamên malê beşekî malê li tarisan (li ga û keran) dikin û dibin, ew tenê dimîne.

Ji dibijiya goşt li ber xwe nade û di vê navbera ku kes li wir tune ye de, tûleyê piçûk digire, diavêje nav agirê sêlê ku bipije û goştê wî bixwe. Lê hê goştê tûle nepijiye xezûrê wê tê malê, ji bo ku cixareya xwe vêxe nêzîkî agir dibe û tûle dibîne, lê wekî ku qet nedîtiye û fêm nekiriye eynî xwe nayne.

Bûk dizane ku xezûrê wê têgihîşt ku wê xwestiye tûle bipêje ku goştê wî bixwe. Gelekî fedî dike û di dilê xwe de dibêje: *"Ma ez ê çawa li rûyê xezûrê xwe binihêrim? Ya rebî tu min biki hirça devê geliyan ku careke din ez li rûyê xezûrê xwe nekevim!.."*

Wisa ji dil dixwaze ku Xwedê daxwaza wê dipejirîne û hema di wê demê de dibe hirç û bi çol û geliyan dikeve...

"Bûye meseleya mêrga çi ji min re"

Di navbera heft gundan de mêrgeke pir mezin, berhemdar û xweş hebûye. Ew gund hemû jî wê mêrgê ji xwe re bi kar tînin û hewcedariyên xwe pê dibînin. Salekê koça gundekî xerîb tê li wê mêrgê datine. Ew her heft gund jî li bendî hev dimînin ku yek ji wan ên din li hemberî wan ên xerîb derkeve û wan biqewirîne, lê mixabin ji wan heft gundan her heft jî li benda hev û din dimînin û qet yek jî dengê xwe nake. Her gund dibêje:

"Çi ji min re!.."

Tu kes li wê mêrga xweşik, berhemdar û mezin xwedî dernakeve. Bi vî awayî çend sal derbas dibin. Di dawiya dawî de ew gundê xerîb dibe xwediyê wê mêrgê.

Bûye pisîka gûyê xwe veşartî.
Xwe tiştekî zêde hesab kirin. **Çima di dibistanê de hinekî bi ser ket,* ***bû pisîka gûyê xwe veşartî****.*

Bûye riya kadizê.
Ji bo tiştên kifş û xuya tê gotin. **Jixwe ew der* ***bûye riya kadizê****, ma kî pê nizane?*

Bûye roviyê mirîşk ji xwe re mezin kirî.
Pir fenok û jîr bûn. **Hay lo lo! Tu hay ji wî nîn î, ew tam* ***bûye roviyê mirîşk ji xwe re mezin kirî.***

Bûye şivanê mirîşkan.
Ji bo kesên bêkar û bêemel tê bikaranîn. **Çeto wê çi bike? Ev çend meh in ku* ***bûye şivanê mirîşkan****.*

Bûye tirba dêrisê.(*)
Bêbandor, bêhêz û perîşan bûn. **Na lo! Ew qas jî na, ma* ***bûye tirba dêrisê****?*

Bûye werîsê Gazoyan.(**)
Ji bo karûbarên dirêj tê gotin. **Keça min ev meseleya te* ***bûye werîsê Gazoyan****, qet xelas nabe.*

Bûye xweliya êrgûn
1. Tune bûn, bêerk û bêbandor bûn. **2.** Pir lawaz û jar bûn. **Di mal de Aran* ***bûye xweliya êrgûn****, gotina gêziyê derbas dibe, ya wî derbas nabe. *Şîlan wisa çilmisiye ku* ***bûye xweliya êrgûn****.*

(*) **Bûye tirba dêrisê:** Ji bo merzelên ku tenê xwelî li ser e. bi xweşikayê nehatine nixamtin û çêkirin û ji demekê bi şûn de ji holê winda dibin tê gotin.

(**) **Gazo:** Navê gundekî ku girêdayî Çêrmûga Amedê ye. (Werîsên vî gundî pir dirêj in.)

C

Ca(*) bihêlin ez jî anaxazekê(**) bihêrim.
Ka dorê bide min, ez jî çend gotinan bibêjim. **Qurban hema bi tenê lûn dipe**yîv**in, **ca bihêlin ez jî anaxazekê bihêrim**.*

Ca tu jî şekirekî bişkêne.
Ka tu jî hinekî biaxive. **Xemgîn, te îşev qet tiştek negot, **ca tu jî şekirekî bişkêne**.*

Camêrî jê hatin
Mirovatî û merdî kirin. **Rast e, hinekî bihêrs e, lê ya rastî, **camêrî jî jê tê**.*

Camêrî kirin
bnr: Camêrî jê hatin

Camiyê, ji te ye, ne ji min e. (Camiyê ji te bû, ne ji min bû.)
Ne sûcê min e, min binbariya xwe bi cih aniye, êdî sûcê te ye. **Wekî ku dibêjin: **"Camiyê ji te bû, ne ji min bû."** Min dora xwe kir, sûc ji stûyê min derket, ji vê demê bi şûn de binbarî ya te ye.*

Can canê çivîkê bûn
Pir lawaz, jar û piçûk bûn. **Ma tu nabînî **can canê çivîkê ye**, lawo tu çi ji wê dixwazî?*

Can canê segan bûn
bnr: Canê xwe ji segan deyn kirin.

(*)**Ca:** Ka

(**) **Anaxaz**: Ji bo genimê hindik tê bikaranîn. Genimê di derbekê de tê hêran. Dema ku di êş de genim dihêrin ê ku genimê wî hindik be dibêje: *"Genimê min anaxaz ke; hema wê ew gav xelas bibe. Heke hûn destûr bidin, ez ji navberê derkevim."*

"Camiyê ji te ye, ne ji min e!"
Mirovekî ku di jiyana xwe de qet nimêj nekiriye û neçûye camiyê; ji ber gelek rexne û gazinên mezinan, rojekê serê xwe hildide û diçe camiyê ku nimêj bike yan jî ew çi dikin ew jî wê bike. Lê ji ber ku ew dem ne dema nimêjê bûye, dibîne ku derê camiyê kilîtkirî ye. Li vî alî wî alî mêze dike, dibîne ku tu kes tune ye.
Ew bi xwe nizane ku rojê pênc caran û ji bo her carê jî saetek an jî demeke nimêjê heye. Ji bo wê jî bi wê watrê ku wî bi xwe binbariya xwe bi cih aniye, lê camiyê ew derfet nedayê ku nimêj bike û binbariya xwe bîne cih.
Bi kilîtbûna mizgeftê dilşad dibe, çawa hebe ew hatiye û sûc ji stûyê xwe derxistiye. Heke binbarî û tawanek hebe ew jî ya camiyê ye. Bi dilekî germ û bi xwe bawer dibêje:
"Camiyê ji te ye, ne ji min e!"

*Ev biwêj bi awayê *"Camiyê ji te bû, ne ji min bû."* jî tê gotin.

Can dan
bnr: Canê xwe teslîmî rehma Xwedê kirin

Can (yekî) derketin
Pir êşîn, zor û zerp dîtin. **Heta min ew bar bir*; ***canê min derket***.

Can jê çûn
bnr: Canê xwe teslîmî rehma Xwedê kirin

Can jê kişîn
bnr: Canê xwe teslîmî rehma Xwedê kirin

Can spartin Xwedê
bnr: Canê xwe teslîmî rehma Xwedê kirin

Canbazî kirin
Di kar û barê xwe de dirust nebûn. Li serê miroṿan ***dek û dolab vekirin.*** **Heyran min ji te re got, êdî van* ***canbaziyan neke***.

Canbêzar bûn
Aciz bûn. **Ji destê vî cînarê xwe yê şerxweş êdî em* ***canbêzar bûn***.

Cançûyî bûn
Ji bo her tiştî gelek ked dan an ji girîng girtin. **Almast, jineke gelekî* ***cançûyî ye***, *hema ji bo qerpalekê jî li ber xwe dikeve.*

Canezatî kirin
bnr: Canê xwe zer kirin

Canê (yekî) derxistin
Zilm û zext li yekî kirin. **Wî bêbavî di navîna du salan de* ***canê bûka xwe derxist***.

Canê xwe bi ser de danîn (Canê xwe danîn ser)
Di doza derbarekê de ji canê xwe jî bûn. **Me got bi wî karê xeter re mijûl nebe, guh neda me, heta ku* ***canê xwe jî di ser de danî***.

Canê canê bûn
Pir ji hev û din hez kirin. **Heya êvarê* ***canê canêya wan e***, *hela ka çiqasî berdewam dike.*

Canê xwe danîn ber çavê xwe
Ji bo kesekî yan jî ji bo tiştekî ji fedekariyeke mezin re amade bûn. **Cûma ji bo serokê xwe* ***canê xwe danîbû ber çavê xwe***, *lê piştî fermana wî vegeriya.*

Canê xwe di ber de danîn
bnr: Canê xwe danîn ber çavê xwe

Canê xwe di oxirê de danîn
bnr: Canê xwe danîn ber çavê xwe

Canê xwe ji segan deyn kirin
Li hemberî her rêgezên jiyanê qewîn bûn. **Tu dibêjî **canê xwe ji segan deyn kiriye**, piştî ew qas êş û îşkenceyê, dîsa jî wekî gamêşan zingirî ye.*

Canê xwe li erdê dîtin
Tenduristiya xwe girîng negirtin. **Malşewitî tu dibêjî **canê xwe li erdê dîtiye**, rojê çar pakêtên cixareyê dikişîne.*

Canê xwe teslîm kirin
bnr. Canê xwe teslîmî rehma Xwedê kirin

Canê xwe teslîmî rehma Xwedê kirin
Mirin. **Hê gelekî ciwan bû, lê di wê qezayê de **canê xwe teslîmî rehma Xwede kir**.*

Canê xwe zer kirin
Ji bo xebatê yan jî kirina tiştekî aciz bûn. **Ne yekî din bavê wî jî ji Fêris îskanek av bixwaze, **canê xwe zer dike**.*

Cangiran (bûn)
Ji bo deyndarê ku deynê xwe giran dike tê gotin. **Erê, ez dizanim ku Egît mirovekî **cangiran e**, lê dîsa jî ew eşyayên ku pêwîst in min danê.*

Cano min tu danî, kesî tu hilneanî.
Her kes ancax bi xwe canê xwe xwedî derdikeve. **Kes nakeve gora kesî, loma jî gotine: **"Cano min tu danî, kesî tu hilneanî."***

Canpola bûn
bnr. Cegerpola bûn

Cansivik bûn
Dest sivik, çapik û çeleng bûn. **Gulçîn qîzeke **cansivik e** paqijiya wê mala giran, di rojekê de diqedîne.*

Carê xwe berdan
Derew û lafekî kirin. **Wa ye Elî dîsa **carê xwe berdide**, yên ku wî nas nakin jî jê bawer dikin.*

Carekê bi kuwarekê(*)
Bila carek be, lê bila xweşik be. **Ez jî zehf zêde naxwazim. Hema **carekê, bi kuwarekê**.*

Carinan dibe kûra kirêcê, carina dibe dîwarê bûzê.
Di nav helwestên berevajî de bûn. **Min ji Yekta tu tişt fêm nekir. **Carinan dibe kûra kirêcê, carina dibe dîwarê bûzê.***

Carinan dimisrûn e, carina qetilxwîn e.
bnr. Carina dibe kûra kirêcê, carina dibe dîwarê bûzê

(*) **Kuwar:** Şaneya (peteg) hingiv, ya mêşan

Carinan mirov ji mecbûrî goştê kewan jî dixwe.
Carinan bi rasthatinan tiştên xweş jî tên serê mirov. **Hema her dem tiştên xirab nabin, **carinan mirov ji mecbûrî goştê kewan jî dixwe**.*

Carinan mirov ji yarê diya xwe re dibêje: "bavo"
Di hinek demên zor de mirov ji bêgavîtiyê tavîz jî dide. **Ev dinyayeke wilo ye hevalo, **carinan mirov ji yarê diya xwe re dibêje: "bavo"***

Caw cawê we ye, cawbir cawbirê we ye.
Her du hêl jî yê we ne, hûn çawa dixwazin wer bikin. **Mafê kesekî tune ye ku tiştekî bibêje. **caw cawê we ye, cawbir cawbirê we ye**.*

Caw gemar kirin
bnr. Çerm gemar kirin

Cawên şil firotin
Çewtiyek an jî sûcek kirin. **Ez baş dizanim ku wî **cawên şil firotine**, ew îşev nayê malê.*

Ceger kirin
Cesaret kirin. **"Erê di destê min de gelek pirtûkên bi kurdî hebûn, lê min **ceger nekir** ku ez li Tirkiyê wan biweşînim."* Jîr Dilovan

Ceger lê şewitîn (Ceger şewitîn)
bnr. Kezeb peritîn

Cegerpola bûn
Pir wêrek, qewîm û berk bûn. **Kendal **cegerpola ye**, li hemberî ew qas hêz û gotinan, wekî zinaran li ber xwe da.*

Ceger qul kirin
Di nav rewşeke pir xerab de bûn. **Wî **ceger qul kir** lê nebû tiştek.*

Ceger sotin
bnr. Kezeb peritîn

Cegerê bêmeferê bira kuştin (mirê) neçû serê.
Ewled jî birayan jî pêşdetir û şîrîntir in. **Helbet bira jî pir şîrîn in, lê çi gotine: **"Cegerê bêmeferê bira kuştin neçû serê."***

Ceh dayîn, genim standin
Ji bo kesên çavbel, zexel û sextekar tê gotin. **Ma tu nizanî ew çi canbaz e, heta **ceh nede û genim nestîne** qet dibe?*

Ceh û garis tevlihev kirin
Ya baş û xirab tevlihev kirin. **Wê **ceh û genim tevlihev kirine**, lewre ew bi xwe ziyanê dibîne.*

Ceh û genim li hev xistin
bnr. Ceh û garis tevlihev kirin

Cehenem li ser serî gerîn
Bela li pey gerîn. **Eman bela xwe ji wî segî vekin, jixwe va ye* ***cehenem li ser serî digere****.*

Cehenem tevî gor
Çi dibe yan jî çiqas xerabî û ziyan hebe jî tev de danîn ber çavan. ****Cehenem tevî gor.*** *Me soz daye em ê têkevine nav.*

Cehenema li rûyê dinê bûn
Pir xeter û xerab bûn. **Dikarim bibêjim ku ew der* ***cehenema li rûyê dinê bû****.*

Cehê (yekî) kêm bûn
Ji bo têkiliya zayendî daxwazkar bûn. **Zeydan dîsa bi kuçeyan ketiye, tê xuyan ku* ***cehê wî kêm bûye****.*

Cehnem û cirik kirin
bnr. Bûkê pişta xwe da kulînê

Cendek li aliyekî, serî li aliyekî man
Serî jê bûn. **Celad çawa şûr avêt stûyê mêrik,* ***serî li aliyekî, cendek li aliyekî ma****.*

Cendek li axa sar ketin
Mirin. (Wekî nifir jî tê bi kar anîn.) **Înşelah cendekê wî li* ***axa sar bikeve****.*

Cendek li ber xwînê çûn
Şerekî giran. **Di wî şerî de* ***cendek li ber xwînê çûn****, lê telaşa Hecî Cindî nîn bû.*

Cendek li erdê ketin
bnr. Cendek li axa sar ketin

Cendek sêla reş bûn
Zehf lêdan xwarin. **Wisa li Kendal dabûn ku* ***cendekê wî bûbû sêla reş****.*

Cerd lê xistin
Talan kirin. **Sidîq heta* ***cerda xwe li wan nexe****, qet bela xwe ji wan vedike?*

Cerg di dev re hatin
"Înşeleh* ***cerga te di devê te de bê**."* **Qahir Bateyî** (nifir)

Cewa avê, av hate birîn, ma li ber tavê.
Ji bo kesên ku berê biderfet û zengîn in, lê dû re dikevin tunebûnê tê bikaranîn. ****Cewa avê, av hate birîn, ma li ber tavê.*** *Li rewşa wê ya berê binêre, li ya niha binêre.*

Cewaba xerab anîn
Nûçeyek, xeberek an jî agahiyeke neyînî ragihandin. **Heyder her tim* ***cewabên xerab tîne****.*

Cewaba (yekî) xistin dest
Li hemberî helwest an jî gotineke neyînî bersiveke çak dan. **Canxwas tam di dema wê de* ***cewaba Simko wisa xiste dest*** *ku Simko reş-hêşîn bû.*

Cewaba xwe dan

1. Ji bin binbariya xwe derketin. **2.** Li hemberî mezinan derketin û bêyî hêvotin kirin. **3.** Bersivandin. **Tu qet nekeve tatêla wê, ew çi bike dikare bi rehetî* ***cewaba xwe bide****. *Bav û diya wî tu terbiye nedanê ku heya* ***cewaba xwe nede****, wê bibehece. *Welat pûanek bilind hêvî dike, çimkî bi tenê* ***cewaba du pirsan nedaye****.*

Cewaba xwe girtin

Li hemberî helwesta neyînî, bersiva heqkirî dîtin. **Nûredîn dixwest wî bi şermê bixe, lê nizanibû wê wisa* ***cewaba xwe baş bigire****.*

Cezayê xwe dîtin

Li hemberî xeta û tawana xwe li rastî bela û qotikekê hatin. **Wê gelek zilm li Kazim kir, lê di dawiyê de wê jî* ***cezayê xwe dît****.*

Cezayê xwe girtin (hildan)

bnr. Cezayê xwe dîtin

Cezayê xwe kişandin

Li hemberî tewanekê bedel dayîn. **Erê Mexpûlê mêrê xwe kuşt, lê* ***cezayê xwe jî kişand****.*

Cezayê zimanê xwe kişandin

Ji ber axaftinên xwe yên neyînî bedel dan. **Wê ew gilî kirin, dû re jî* ***cezayê zimanê xwe kişand****.*

Cezûtî kirin

bnr. Fêl fistik kirin

Cih dan

1. Rûmet û giramî pê nîşandan. **2.** Xistin derekê, tê de edilandin. **Me* ***cih dayê*** *lê ew ne layîq bû ku li ser hurmeta xwe nesekinî. *"Ji bilî nivîsaran, kovar gelek caran* ***cih dide*** *rexnegiriyê jî."* Selman Dilovan

Cihê (yekî) di beriya (yekî) de hebûn

Jê pir zêdetir, xweşiktir û baştir bûn. *"Tu Menaf nas nakî,* ***cihê Hesen di beriya Menaf de heye****."* Zana Farqînî

Cih girtin

Di derekê de xwe edilandin. **Heke bavo ew* ***cih jî ji me re negirta****, gelo halê me dê çawa bûya?*

Cih lê teng bûn

Ketin rewşeke xerab. **Piştî wan çewtiyên min, min hew dît ku* ***cih li min teng bûye****.*

Cih lê teng kirin

Xistin nav zerp û zorê. Asteng kirin. **Leşkeran* ***cih li qaçaxan teng kiribû****.*

Cih li tu derê tune bûn

bnr. Cih ne li erdê ne li esman hebûn

Cih û war lê teng bûn

bnr. Cih ne li erdê ne li esman hebûn

Cih û war li vê dinyayê tune bûn

1. Feqîr û xizan bûn. **2.** Gunehkar bûn. **Rûşen feqîrekî belengaz e, tu **cih û warê wî li vê dinyayê tune ye**. *Wî ew qas xirabî kiriye ku **cih û warê wî li vê dinyayê tune ye**.*

Cihê bûn

Ji bo mala xwe ji mala bavê qetandina lawan tê gotin. **Mixabin li Kurdistanê law, bi hêsanî nikarin **cihê bibin**.*

Cihê dehl û dêşa

Cihê destpêneketî, cihê bakîr. **Cihê ku wî biriye, **cihekî dehl û dêşa** ye.*

Cihê jinan xera kiriye, hîn ava ye.

Jin fesad û afat in. **Erê, navê mêran derketiye, lê **cihê ku jina xera kiriye, hîn ava ye**.*

Cihê ku mirin lê heye, tirs çi ye.

Ma ji mirinê bi wê de jî çi xerabî û dijwarî heye? **Çi ye, tu ew qasî ditirsî? **Cihê ku mirin lê heye, tirs çi ye?***

Cihê ku tu diçiyê, ez jê têm.

Ez ji te baştir dizanim. **Zêde pesnê xwe nede, cihê ku tu diçiyê, ez jê têm.*

Cihê (yekî) ne li erdê ne li esman hebûn

Xerabiyeke mezin kirin. **Ya ku dibêjin heke rast be, **cihê Sercanê Zerîfeyê ne li erdê, ne jî li esmên heye**.*

Cihê ku pakî lê heye, xirabî çi ye?!

Divê tim pakî bê kirin. **Ji xerabiyê xerabî tê, **ciyê ku pakî lê heye, xirabî çi ye?***

Cihê piyên xwe kirin

Xwe li cihekî yan jî di karekî de edilandin. **Li dora wan çû hat, heya ku **cihê piyên xwe kir**.*

Cihê (yekî) girtin

1. Derfetên yekî ji dest girtin. **2.** Bi zerengî û hunera xwe wekî yê berê kar pêk anîn. **Çawa ku ez nexweş ketim, wê **cihê min girt**. *"Li hemberî vê pirsê ez ê îtirafekê bikim. Mixabin heta niha kesê ku dê bikaribe **cihê min bigire**, min peyda nekiriye."* Sabah Kara

Cihê (yekî) şehitandin

Kar û barê yekî xera kirin. **Ew çû wî welatê dûr, lê li wir jî nesekinî û **cihê yekî Polon şehitand**.*

Cihê xwe dîtin

Li rastî radeya layiqî xwe hatin. **Qet destê xwe medinê, şûna wî ew der e, wî **cihê xwe dîtiye**.*

Cihê xwe lê bi keys kirin

Xwe tê de edilandin. **Candilê **cihê xwe lê bi keys kiriye**, êdî ji vir naçe.*

Cihê xwe xweş kirin
bnr: Qûna xwe germ kirin

Cihê (yekî) tijî nebûn (vala man)
Li şûna yekî tu kesî negirtin. **Bi vê meşê ez bawer nakim ku* ***cihê Ordîxan tijî bibe****.*

Cihê (yekî) xuya bûn
Tunebûna kesekî xuya kirin. **Ev bûn du roj ku Mem çûye, lê binêre,* ***cihê wî çiqasî xuya ye****?*

Cihû, (ka) te bibim bihiştê. Got: "Na îro şemî ye bi kêr nayê."
Carinan hinek derfetên mezin dertên, lê hin kes ji dest xwe direvînin. **Xwedê dide hinekan, nikarin bixwin. Got:* ***"Cilû te bibim bihiştê." Got: "Na îro şemî ye bi kêr nayê."***

Cil û kulav ji hev pişkivandin (pişkavtin)
Cudayetî kirin nav kesan. **Armanca min heya dawî wekhevî bû, lê wisa tê xuya ku havê keçikê* ***cil û kulav ji hev dipişkêve****.*

Cila şil bûn
Teral, sist û bêzereng bûn. **Fazilê çi ye, hema* ***cila şil e****.*

Cila şil e, ketiye mil e.
Li stûyê hinekên din bûn bar û astengî. **Ez çawa bikim nizanim. Ev lawê min* ***cila şil e, ketiye mil e****.*

Cila xwe ji avê derxistin
Bi xwe çareya serê xwe dîtin. **Tika dikim, destê xwe mediyê, bila hîn bibe, ew bi xwe bila* ***cila xwe ji avê derxe****.*

Cilên canê min, kulên serê min
1. Ez mirovekî bêşans im. **2.** Mirovên min yên herî nêzîk ji min re astengiyan derdixin. **Ew jî qenciya min û rozgara min e,* ***cilên canê min, kulên serê min****.* ****Cilên canê min, kulên serê min.*** *Ez alîkariyê jî ji wan naxwazim, lê mixabin ew li min nasekinin.*

Cilên xwe beriya baranê şil kirin
Di nav helwestek berevajî de bûn. **Ew jî ew çend xurt e,* ***cilên xwe beriya baranê şil dike****.*

Cilika (yekî) xwar bûn
Rewş xera bûn. Kar baş nemeşîn. **Rewşa Akîf'ne wekî ya berê ye, êdî* ***cilika wî jî xwar bûye****.*

Cilika xwe li cehenemê raxistin
Çewtiyeke mezin kirin. **Belê hûn wer dibêjin, lê divê em baş bifikirin. Dû re em* ***cilika xwe li cehenemê ranexin****?*

Cin ji dorê çûn
Sakîn û biaram bûn. **Va ye* ***cin ji dora Zalîdeyê çûne****, tu yê çi bibêjî niha jê re bibêje.*

Cin lê taştê kirin

Tirsandin. Pir êşandin. **Xwezî çend sîle lê xista, lê ew wisa tirsandiye ku* ***cin li lawik taştê kiriye.***

Cinan di ser re baz dan

Gelekî jar û lawaz bûn. **Perwer wisa jar bûye ku tu dibêjî* ***cinan di ser re baz daye.***

Cinan pê girtin

bnr. Bi cinan ketin

Cinê mala Cin Tahar lê xistin

Ketin rewşek xerab. **Ma* ***cinê mala Cin Talıar li wê xistiye?***

Cinobet gerîn

1. Di nav helwesteke neyînî de bûn. **2.** Ji bo kesên ku dikevin têkiliya zayendî, lê ava xuslê bi ser xwe de nakin tê gotin. **Kuro, lawo min ji te re got, ji vî yê ku sibê heta êvarê* ***cinobet digere*** *tu xêr nayê. *Lawo qet ji bîr meke, mirov ku* ***cinobet bigere,*** *bed û bereketa mala wî namîne.*

Cira (yekî) xweş bûn (Cirxweş bûn)

1. Ehlaq û xislet xweş bûn. **2.** Moral geş bûn. *****Cira qîza Seyranê xweş e****, dikim ku ji lawê xwe re bixwazim. *Van rojan* ***cira Seydo xweş dixuyê.***

Cira kaniyê ji pûngê ne xweş bû, çû di çariya kaniyê de hêşîn bû.

Carinan hin rasthatin bi awayekî eks û balkêş pêk tên.*****Cira kaniyê ji pûngê ne xweş bû, çû di çariya kaniyê de hêşîn bû.*** *Carinan tiştên wer ecêb jî dibin.*

Cirecir kirin

Gelekî axaftin. **Heya êvarê* ***cirecir dike****. Ev xisletê wî ruhê min distîne.*

Cirma (yekî) kişandin

Ji ber tawana yekî din bedel dan. **Zagrosê bêsûc û bêguneh,* ***cirma wî birayê xwe yê serserî jî dikişîne.***

Cirma stû bûn

Bûn barê yekî yê olamî û aciz kirin. **Derdê min hindik bû, ew jî bû cirma stûyê min û kete stûyê min.*

Civat li mala pîrê, pîrê li mala xelkê ye?!

Ji bo helwesta berevajî tê bikaranîn. **Ev tiştekî ecêb e,* ***civat li mala pîrê, pîrê li mala xelkê ye.***

Ciwan bûn nezan bûn, pîr bûn kislan bûn; ez poşman bûm?!

Mirov dema ku kal û pîr dibe, pê poşman jî bibe, lê di pêvajoya jiyanê de bi xwezayî gelek çewtî û nezanî jî pêk tên. *****Ciwan bûn nezan bûn, pîr bûn kislan bûn; ez poşman bûm.*** *Lê dîsa jî divê ew bibûna.*

Ciwanekî biavêjin reşiyan, pîrekê biavêjin xweşiyan.

Li gorî hawir û derfetan rewş jî tê guherandin. Yên baş û xweş di derfetên neyînî de xirab,

yên xirab jî di derfetên erênî de baş û xweşik dibin. **Ciwanekî hiavêjin reşiyan pîrekê hiavêjin xweşiyan*, dibînî Meta Hacê li Evrûpayê çawa bedew û zingirî bûye.

Ciwanî bizaniya, pîrî bikariya

Ciwan zana û bitecrûbe bûna, kal û pîr jî bihêz bûna. Wê demê mirov wê mukemel bûna. **Ciwanî bizaniya, pîrî bikariya.* Te wê demê bidîta rewşa dinyayê.

Cizo mizo nêzana. (çîzo mîzo nizanim)

Ji min re li sedem û hincetan negerin. **Qet xwe nexapînin, hûn ê wê pirtûkê bînin; ez **cizo mizo nêzana**.*

Cîgera (yekî) bi pênc pere nekirin

Ji bo mirovên nebaş tê gotin. **Xwedê dizane **cîgera Xelef bi pênc pereyan nake**.*

Cîgera xwe petin

Dil pir qewîm bûn. Xemsar bûn. **Vê qîzxaltiya min **cîgera xwe petiye**, ev salek e qîza wê çûye gund, hê jî jê re telefonek venekiriye.*

Cotê (yekî) çar ga bûn

Dewlemend û zengîn bûn. **Hingî cotê Selîm **çar ga bûye**, pozê wî jî bilind bûye.*

Cotar li ber bi mal e, kebanî nû ber bi kar e.

Ji bo teralî û bêbinbariya jinan tê gotin. **Erê erê, maşelah gelekî xurt e (!), **cotar li bervî mal e, kebanî nû bervî kar e**.*

Cotê xwe dayîn kevir

Di gotina xwe de israr kirin. **Dewrêş **cotê xwe daye kevir**, dibêje: "Îleh ew xelat wê bê."*

Cotê xwe kutan erdê

bnr. Ling dayîn erdê

Cotê xwe li kevir asê kirin

bnr. Cotê xwe dayîn kevir

Cotek diran di dev de tune bûn

Kal û pîr bûn. **Cotek diran tune di dev de, hatiye dewa qîza çardeh salî dike.*

Cotyaro ew çi ye tu diçînî? Got: "Dema hêşîn bû tê bibînî."

Her tişt demeke wê heye. **Hê ew hay ji rewşê nîn e. Got: **"Cotyaro ew çi ye tu diçînî? Got: "Dema hêşîn bû te bibînî."***

Cûmîcelat bûn. (Cûm û celat bûn.)

Ji nişkà ve winda bûn. **Nizanim çawa bû lê her min mêze kir ku qîz û dê **cûmîcelat bûn**.*

Cûne dixwe heft libê sabûnê, lê cûna nayê qanûnê.

Ji bo kesên ku rastbûn û duristbûna wan ne guncan be tê bikaranîn. **Min ji te re got ezbenî, ev nabe mirov û însan. Cûne dixwe heft libê sabûnê, lê cûna nayê qanûnê.*

Ç

Ça (çawa) saw e, gur e, lê law e.
Ev çito dubendî ye, qet tirs û dilovanî li ba hev dibe? **Heyran min tiştek ji we fêm nekir.* ***Ça saw e, gur e, lê law e.***

Çakûçê (yekî) bedew bûn
Şikil û şemala yekî xweşik bûn. *****Çakûçê vê keçikê bedew e*** *ku mezin bibe, wê gelek dilan bişewitîne.*

Çala (yekî) kolan
Ji bo xirabî gihandina kesekî di nav hewldanê de bûn. **Reso çiqasî ji bo xêra wî hewl dida xwe jî wî tim di pişt de* ***çala wî dikola.***

Çalim firotin
Fors kirin. **Tu dibînî, lawê Hecî Xosrof di nava çarşiyê de* ***çalimeke çawa difroşe?***

Çapik û çeleng bûn
Pir çalak û pêkhatî bûn. **Maşelah Rênasê Bedir wer* ***çapik û çeleng e*** *ku hewesa mirov jê re tê.*

Çar çav hilkirin
Li ser tiştekî gelekî baldar bûn. **Heta ku ew ji wir çûn xwediyê dikanê* ***çar çav hilkirin.***

Çar kêm, çar zêde
Di hêla tibab (çendanî) de nêzîkî hev bûn. ****Çar kêm, çar zêde*** *êdî em ê li hev bikin.*

Çarçav(î) bûn
1. Xwe şaş kirin, di nav bêbiryarî û dubendiyê de bûn. **2.** Li ser tiştekî gelekî baldar bûn. **Dema ku polês ketine hundirê mala wî, Filît* ***çarçavî bû****, nizanibû çi bike û çi bibêje.* **Zubêt bi* ***çar çavî*** *li bendî riya hezkiriya xwe bû.*

Çarçive (çarçove) lê teng kirin
Dor lê birîn, xistin rewşek dijwar. **"Paşê di encama zordestiya rejîma Iraqê de, dema*

***çarçive li wan hate tengkirin**, destûr ji karê wan re nehat dayîn û qedexe kirin."* Mela Silêman Şoreş

Çareya serê xwe dîtin
Bi xwe derdê xwe derman kirin. **Dayê, tu qet meraqa wê meke, ew dikare **çareya serê xwe bibîne**.*

Çargopal lê xistin
Bi lez û çapik pêk anîn. **Zerîfe **çargopalî lê dixe**, lê bawer im ku dîsa jî xwe bi Tahar re nagihîne.*

Çargurçikî (bûn)
Pir bicesaret û wêrek bûn. **"Mêrxasên şerê Agiriyê şêr û pilingên kurdan, di wan çiyayan de bi çi karî li ber xwe dane û bi çi tehrî jiyan e gelo? Êsan Nûriyê zana û cengawer, Biroyê **çargurçikî**?"* Veysel Çamlıbel

Çav berdan nanê (yekî)
Daxwaza bidestxistina debara yekî kirin. **Wî kûçikî **çav berdaye nanê min**, înşelah destê min bi xwînê nade.*

Çav beredan (berdan)
Ecibandin. **"Ne axir, berî ji hev dûrketinê Temo tiştek texmîn kiribû ku gelek xortên di ser wî re **çav berdane wê**, lê ew tenê wî dixwaze bibîne."* Temûrê Xelîl

Çav berî namûsa (yekî) dan
Li pey namûsa yekî gerîn. **Wî yê bîj **çav berî namûsa Silto daye**, lê bawer im ku dê vê carê belaya xwe bibîne.*

Çav bi serê (yekî) ve hebûn
Bifêm û feraset bûn. ***Çav bi serê wan ve jî heye** lawo. Tu nekeve tatêlê, helbet ew ê jî tiştên ku pêwîst in dê bikin.*

Çav çirisîn
bnr. Çav birbisîn

Çav çûn ser serî
bnr. Çavên (yekî) çûn nava serî

Çav dan (yekî)
Wekî hinekên din kirin. **Ne bi xêr, lawê min jî **çav da apê xwe**, wer bû cixarekêş.*

Çav dan hev
1. Mirin. **2.** Xwezî bi hev anîn. Wekî hev ango heman tişt kirin. **Dema ku rehmetiyê xalo **çavên xwe dan hev**, neviyekî wî jî li jiyanê çavên xwe vekirin. **Wan jî **çav dane hev**, her yekî erebeyeke Ewropî kirîn.*

Çav derketin ser serî
bnr. Çavên (yekî) çûn nava serî

Çav di (yekî) firandin

Ne bi awayekî rasterast, lê bi peyam û îşaretan yek şiyar kirin. **Xalit **çav di Hesen firand**, rewş da fêm kirin.*

Çav di serê kerê de jî hene.

Her hebûn nayê eynî wateyê. *****Çav di serê kerê de jî hene**, lê fêm û têgihîştina wê tune ye.*

Çav jê birîn

1. Ecibandin. **2.** Ji pêkanîna xwe bawer bûn. **Ew qas qîzên zanîngeha wan hebûn, **çavê Rêzdar her ji Binevşê birî**. ****Çavê Diyar wisa jê birîbû** ku hew dizanibû wê bi şeqamekê wî li erdê dirêj bike.*

Çav jê girtin

bnr. Çav jê birîn

Çav jê re girtin (Çavên xwe jê re girtin)

Ji bo kesên ku bi zanetî naxwazin hinek tiştan bibînin tê bikaranîn. **Heke Zeynebê **çav jê re negirta**, wî jî ew qas cesaret nedikir.*

Çav ji çavan şerm kirin

Dema ku mirov rû bi rû dimîne, bandor hê zêdetir dibe. *****Çav ji çavan şerm dikin**, heke ew bi xwe nehatana bal wê, bawer nakim ku bipejiranda.*

Çav ji serî derketin

bnr. Çav ji dewsê derketin

Çav ji xwe borandin (bihurandin)

Ji bo ku nezerî nekin, xwe bi awayekî din nîşan dan. **Na keçê, tu li gotinên wê menêre, ew **çavan ji xwe diborîne**.*

Çav kil e, dawî şil e.

Her çiqas dîmen xweş bê xuyan jî bingeh ne wisa ye. **Erê xuyang xweşik e, lê **çav kil e, dawî şil e**.*

Çav kirin (yekî)

1. Bi dizî ji yekî re îşaret kirin. **2.** Yek ecibandin, jê hez kirin. **Çawa ku **çav kire** Razdarê, hema wê gavê derkete derve. *Yezdan **çav kiriye** qîza Sîncarê Metê, tim li pey e.*

Çav kirin ...

Tiştek ecibandin. **Wî **çav kiriye wê erebeyê**, heta nestîne, rehet nabe.*

Çav kutan destê (yekî)

Ji bo pêdiviya hewcedariyan li benda dayîna hinekên din bûn. **Bi xwe rojekê naxebite, hema **çav dikute destê xelkê**.*

Çav kutan hev

Li bendî hev û din bûn, hev û din texlît kirin. **Wan **çav kutane hev**, yek çi dike, yê din jî eynî tiştî dike.*

Çav lê badan (Çav badan)

Di daxwaza têkiliyê de nebûn. *"*Avrûyên çep avêtin. Zilamê li ber tiştên xwe rûniştî,* ***çav lê badan*** *û bi sarî got..."* Nizar Mehemed Seîd

Çav lê bûn (Çavê (yekî) lê bûn)

1. Daxwaz kirin. **2.** Li kesekî yan jî li tiştekî miqate bûn. **Cevdet* ***çav lê bû*** *ku bibe rêvebirê saziyê. *Şirînê got,* ***çavê min dê lê*** *be, lê heta ku ez hatim, zarokan baxçeyê min tarûmar kiribûn.*

Çav lê gerandin

Dêhna xwe dan, çav pê xistin. *"*Gava piştî heft-heşt salên weşana Nûdemê. Min* ***çavek li çîrokên Nûdemê gerand****, min dît ku tibabek çîrok hatine weşandin."* Firat Cewerî **Min hinekî li wê pirtûkê* ***çavê xwe gerand****, lê bi mîn xweş nehat.*

Çav lê gewr kirin

Zilm û zext lê kirin. **Xesû tû qîzan* ***çav li wê bûka qirik gewr kirin****.*

Çav lê qurş (quriş, qurîşk)[*] bûn

1. Pir temahkar û çikûs bûn. **2.** Ji bo demeke dirêj li benda tiştekî man. **Eman ji bo wê merşa piçûk jî* ***çavên Emînê lê qurîşk bûn****. *Şikak wisa li benda Simko bû ku* ***çav lê qurş bûn****.*

Çav lê reş bûn

Ji ber nexweşî yan jî kar û barekî pir eziyet û tadeyî dîtin. **Ji ber kar û barên mala axê,* ***çav li Fexredîn reş bûn****.*

Çav lê reş kirin

Li yekî xistin. **Hê tiştek negotî,* ***çav lê reş kirin****, lê gelo bigota wê çawa bûya?*

Çav lê sor bûn

Di hêla zayendî de, pir pêş de çûn. **Ji çil salî bi şûn de* ***çav li mêran sor dibin*** *û nizanin xwe biavêjin kulîna kê.*

Çav lê tarî bûn

Gelekî hêrs bûn. ***Çav li Bavê Bêrîvanê tarî bûbûn****, der û cînaran jina wî bi zorê ji destên wî xelas kirin.*

Çav lê têr nebûn

Çavçilî kirin, qanix nebûn. **Ji melûrê çiqas xwar jî lê* ***çav lê têr nebûn****.*

Çav lê tirsandin

Cesaret şikandin. **Heke min* ***çav li wî netirsanda****, niha emana me di dest wî de nemabû.*

Çav lê xistin

Tesele kirin. Seh kirin. **Min ji te re negot, ka* ***çavê xwe lê xe****, binêre qet rewşa wan çawa ne?*

[*] **Qurş**: Navê stêrkekê ye. Nêzîkî berbangê hiltê. Tenê payîzê û biharê tê xuyan. Taybetiya wê ew e ku stêrka herî dereng derdikeve ew e.

Çav lê zer bûn

Eziyetcke mezin dîtin. **Wisa xebitî ku **çav lê zer bûn**.*

Çav li ber ... delîn

Ji ber xweşikayî û spehîbûnê çav teyisîn, biriqîn. ****Çavên gundiyan li ber bedewiya bûka Silêmanê Şemê delîn.***

Çav li berê venebûn

Zehf xweşik û bedew bûn. **Maşelalı qîzeke Rênas heye **çav li berê venabin**.*

Çav li der bûn

Ji bo mêrên ku zewicî ne lê li pey jinên din digerin tê bikaranîn. *******Pêşiyan rast gotine: "Mêr **çav li der e**, jinik xwelî li ser e."*

Çav li dû man

bnr. Çav li pey man

Çav li (yekî) ketin

Yek dîtin. **Husoyê Çavqelîşî, kengê ku **çav li wê keçikê dikeve**, firofeşî dibe.*

Çav li pey (yekî) bûn

Ji bo bidestxistinê li dû tiştekî bûn. *******"**Çav li pey min in**, ku bibînin ez di vê babetê de bi te re diaxivim û raporta xwe hildin û li ber navê min binivîsînin "Kurdî" wê hêviya min a dawî bimire."* Fewaz Ebdê

Çav li pişt man

Di fikar û heyra tiştekî yan jî kesekî de bûn. **Erê min dikana xwe hişt li hêviya wî, lê tu bawer bike **çavên min li pişt min man**.*

Çav li rê qerimîn

bnr. Çavên (yekî) li rê req bûn

Çav li savarê kir, silav ji bîr kir.

Tenê li berjewendiyên xwe fikirîn. **Xêr ji rûyê wî nayê, ew ê çavçil **çav li savarê kir, silav ji bîr kir**.*

Çav li serê (yekî) fireh bûn

Ecêb û şaşwazî man. *******"Serê xwe nerm rakir û ferman da kesên li dora xwe. 'Serê min jê bikin û di binê Wezuf de çal bikin!' **Çav li serê wan fireh bûn**."* Talip Kalın

Çav li serî ketin

Yek dîtin. **Heke rojekê **çavê min li serê wî bikeve**, hûn mêze bikin ka ez ê jê re çi bibêjim.*

Çav li serî tarî bûn

Pir hêrs bûn. *******"**Çav li serî tarî bûn** û careke din weke ku şûr ji ber xwe bikişîne, bi kelekelekê kumla xwe rakir."* Zana Serwer

Çav li xwe dan

Ji bo xapandinê hewl dan. **Cemîl* ***çav li xwe dabû*** *ji bo wê keçikê, lê rewş wekî ku wî hêvî dikir nebû.*

Çav mişt (bûn)

Çav tijî bûn. Girîn. **"Bi* ***çavên mişt*** *pirs li dewsa guhê windayî nêrî."* Helîm Yûsiv

Çav pê neketin

Xuya nebûn. **Ev çend roj in ez* ***çav bi Sertîf neketim****, gelo bi ku de çûye?*

Çav pê xistin

Bala xwe dayîn, lê mêze kirin. **Min çiqas* ***çavên xwe bi rojnameyên rojane xistin*** *jî ez li rastî nûçeyeke wisa nehatim.*

Çav qirpandin

1. Bi hev û din re erê kirin. **2.** Henek kirin. **3.** Ji bo daxwaza zayendî dilxweziya xwe kifş kirin. **Wî ji min re* ***çav qirpand****, ez dizanim ku ew ê dikanê bide min. *Qet* ***çavên xwe neqirpîne****, min armanca te fêm kir. *Li ber çavên min Evînê ji mêrik re* ***çavên xwe diqirpand*** *û îşaret dikir.*

Çav rijîn

1. Di bin zor û zextê de man. **2.** Kor bûn. **Xezala belengaz heta ew yek pêk anî* ***çavên wê rijîn****. *Înşelah* ***çavên wê birijin*** *ku aqil bê sêrî.* (nifir)

Çav tê de man

bnr. Çav li pey man

Çav tirsandin

bnr. Çavtirsî kirin

Çav tiştek nedîtin

1. Ji hêrsan, mêzîna xwe winda kirin. **2.** Merd û destvekirî bûn. **3.** Ji bilî mijarekê yan jî kesekî li tiştekî din nefikirîn. *****Çavên Demdar tiştek nedidît****, çi dikete dest dişkênand. *Mirov ku têketa tepûşa wî,* ***çavê wî tiştek nedidît****, çiqas pere xerc bikira nedihate ber çavên wî. ****Çavên Delavê ji bilî Kazim tiştekî nabîne****.*

Çav û birûyên (yekî) bi qelemê kişandin

Pir bedew û sipehî bûn. **Keçika Faris wer bedew e ku tu dibêjî* ***çav û birûyên wê bi qeleman hatine kişandin****.*

Çav û rûyê (yekî) neman

1. Bêrûmet bûn. **2.** Bêar û bêfedî bûn. **Erê tu dibêjî bila Ûsiv here, lê li balwan* ***çav û rûyê wî jî nemaye****. *Ka* ***çav û rû pê re nemaye*** *ku şerm bike.*

Çavan çav nedîtin

Pir tarî bûn. Şeva reş bûn. **"Ji ber bager û tîpiyê* ***çav çavan nabîne****. Dengê berf û ba û bahozê wekî dengê loriyê tê guhê mirovan."* Mehmed Serhedî

Çavan jê girtin
1. Nezerî kirin. **2.** Ecibandin. **Çavan ji hespa me ya hêşînboz girt, loma lingê wê şikest.* **Çavê min ji wê dolabê girtiye, çi dibe bila bibe, ez ê ji xwe re bikirim.*

Çavan lê vedan
Nezerî kirin, çavînokî kirin. **Li wî gundî* ***çavan li keçika min veda.***

Çavan ji serî baz dan
Şaşwazî man. **Çaxa ku Talıar ew di wê rewşê de dît,* ***çavan ji serî baz dan.***

Çavan şemal dan
bnr. Çav birbisîn

Çavbel bûn
bnr. Çav vekirî bûn

Çavçil bûn
Çav têr nebûn. **A rastî Dîlan keçeke pir* ***çavçil e****. Ji ber vê rewşê ez fedî dikim.*

Çavçilî kirin
Ji pêdiviyê zêdetir daxwaz kirin. **Heke ew dîsa* ***çavçiliyê neke****, em ê zû ji wir derbas bibin.*

Çavdêrî kirin
bnr. Di bin çavan de girtin

Çavek kor be, mirov destê xwe dide ber ê din
Divê mirov li yê heyî xwedî derkeve. **Lawo em çawa bikin? Ji yê çûyî re çare nîn e.* ***Çavek kor be, mirov destê xwe dide ber ê din.***

Çavekî seriyan bûn
Pir kêrhatî, xurt û baş bûn. **Serlıatê çi ye,* ***çavekî seriyan e****, tu çi bibêjî nabêje na.*

Çavê (yekî) derxistin
1. Dexesî û çavnebarî kirin. **2.** Zilm û tadeyî kirin. **Ji çavreşiyan heke ji destê bê, wê* ***çavê Sûtê derxe****. *Ciwannaz dema ku li mala meta xwe bû, metê* ***çavê wê derdixist****.*

Çavê dê û bavan li ewladan, ê ewladan li Çiyayê Qaf
Dilê dê û bavan tim li ser ewledan e, lê ewled ne wisan in. **Rewşa dinyayê wisa ye,* ***çavê dê û bavan li ewladan, ê ewladan li Çiyayê Qaf****.*

Çavê (yekî) jê av vexwarin
Bi pêkanîn û serketina xwe bawer bûn. **Ji ber ku* ***çavê wî gelekî ji min av vedixwar****, hema bêyî navber erîşî min kir.*

Çavê (yekî) li destê (yekî) bûn
Hewcedarî yekî bûn. **Çawa bike, rebenê* ***çavê wê jî li destê wî ye****.*

Çavê (yekî) lê man

1. Daxwaza xwedîbûnê di dil de sêwirîn. **2.** Li benda tiştekî bûn. **Bi rastî* ***çavê min li wê televîzyonê ma.*** **"Xwe di nava cilikan de ker kir û dasekî tûj ji destê xwe de girt û* ***çavê wê ma li dêrî.*** *Ma li benda dizê xwe."* İsa Eskin

Çavê (yekî) pê ketin

1. Nezerî kirin. **2.** Di demeke pir kurt tiştek an jî kesek dîtin. **Çawa ku* ***çavê wî pê ket,*** *aqil jî ji serê wî derket.* **"Kelogirî çavê wî li rê bû, gelo dibe ku diya wî di wê re derbas bibe,* ***çavê wî bi dayîka wî bikeve*** *û wê têr bibîne û ramûse."* Tîtal Mûradov

Çavê (yekî) pê ranebûn

Dexesî pê kirin. *****Çavê Zeynebê pê ranabe*** *ku here Fazîla qîzxaltiya xwê pîroz bike.*

Çavê pisîkê digire, nan dixwe.

Ji bo kesên çikus, ango temahkar tê bikaranîn. **Ew mirovekî wisa ye ku* ***çavê pisîkê digire, nan dixwe.***

Çavê (yekî) qul bûn

Di derkê de bûn, dîtin. **Heke* ***çavê Tahar hinekî qul bûya,*** *ew nikaribû ew qasî jî derketa ser serê wî.*

Çavê (yekî) tê de bûn (hebûn)

1. Ecibandin. **2.** Xwedîbûna tiştekî yan jî kesekî daxwaz kirin. *****Çavê Rizgar di goştê masiyan de bû,*** *lê tenê tîkeyek xwar.* *****Çavê Hemîd di keçika tirk de bû,*** *lê qîzxala wî jê re xwestin.*

Çavê xwe neşikandin

Netirsîn, venekişîn. **Her çiqas li hemberî wî ew sê kes bûn jî, Rosto dîsa jî qet* ***çavê xwe neşikand.***

Çavên (yekî) bi bijûnê qul kirin

Ji yên naverok û rasteqîniyê fêm nakin û nabînin re tê gotin. **Weyla min* ***çavên wî bi bijûnê qul kirî,*** *ew çi fêm dike ji huner û bedewiyê?*

Çavên (yekî) bi xweliyê têr bûn

Ancax piştî mirinê çavçilî bi dawî dibe. Ji bo kesên zêde çavçil tê gotin. **Xwedê dizane* ***çavên wî ancax bi xweliyê têr bibin.***

Çavên (yekî) birbisîn

Şad bûn, kêfxweş bûn. **Bi hatina Peldayê re* ***çavên Mîrxan birbisîn.***

Çavên (yekî) bûn sotika êgir

Pir hêrs bûn an jî bi baleke kûr mêze kirin. **Ji her wan gotinan* ***çavên Evdilselam bûne sotika êgir***

Çavên (yekî) çûn nava serî

1. Dexesî kirin. **2.** Ecêb man. **Wan cînaran dema ku ew erebeya min a xweşik dîtin,*

*çavên wan çûn nava serî. *"Tiliyên wî li şûna guhê wî yê çepê vala çûn û hatin. Remo vecimqî. **Çavên wî çûn nava serê wî**, diya wî bi her du piyên wî girt."* Helîm Yûsiv

Çavên (yekî) çûn ser hev

Xew hatin. **Diya min mêze kir ku **çavên mêvanan diçin ser hev**, ji bo razanê ciyê wan danî.*

Çavên (yekî) derxistin

1. Ji kesekî dexesî kirin. **2.** Zilm û eziyet li yekî kirin. **Erê exrebeyên hev in, lê ya rastî, Fesîh ji her dewlemendiya wî dixwaze **çavên Bahadîn derxe**. **Di navîna şeş mehan de Zohat Axa **çavên wî şivanî derxistin**.*

Çavên (yekî) di ava aravê de şûştin

Ji bo kesên ku rastiyê nabînîn an jî tênagihîjin tê gotin. **Ez **çavên te di ava aravê de bişom**, ma te fêm nekir ku ew hewldan ji bo çi ye?*

Çavên (yekî) di kort de çûn

Jar û lawaz bûn. **Piştî wê bûyerê **çavên Nalînê di kort de** çûn û bû wekî eciniyekê.*

Çavên (yekî) di nav serî de sor bûn

Pir hêrs bûn. **Kengî ku **çavên Seydo di nav serî de sor dibin**, ez direvim derve.*

Çavên (yekî) di sêrî de lîstin

Çav bel bûn. **"**Çavên wî di nav serê wî de dileyîstin.** *Tu car li cihê xwe ranediwestî. Tebat û lebat nedihatê."* Felat Dilgeş

Çavên (yekî) di serî de reqisîn

1. Pir jîr û pêkhatî bûn. **2.** Di hêla zayendî de daxwazkar bûn. **Hay lo lo! **Çavên wê wisa di ser serî de direqisin**, kî dikare wê bixapîne? **Çavên mêrik di serî de direqisîn**, bi wan gotinên wî jinik ji şerman sor dibû.*

Çavên (yekî) dîtin devê wî nedîtin

Ji bo tiştên hindik tê gotin. **Kindo ew qas qeysî anîbûn ku **çavên me dît, devê me nedît**.*

Çavên (yekî) fireh bûn

Şaşwazî bûn. **Li hember wê dîmenê, **çavên Delavê fireh bûn**.*

Çavên (yekî) giran bûn

Xew hatin. **Çima ku îşev baş ranezam, **çavên min giran dibin**.*

Çavên (yekî) girê dan

Bi awayekî hunerwer sextekarî kirin. Xapandin. **Nizanim çawa kirin, **çavên min wisa girê dan** ku min fêm nekir ew yek çawa pêk hat.*

Çavên her kesî li ser ... bûn

Bala her kesî lê bûn. **Ji ber ku xwediyê sikurê ew bûn. **Çavên her kesî li ser helwesta mala Xalid Begê bû**.*

Çavên hev derxistin

1. Tim bi hev û din re şer kirin, pevçûn. **2.** Ji hev û din dexesî û çavnebarî kirin. **Her sê zarokên min heya êvarê* ***çavên hev û din derdixin***. **Jixwe wisa ne, exrebeyên nêzîk* ***çavên hev û din derdixin***.

Çavên (yekî) ji dewsê derketin

1. Pir biperoş bûn. Ecêb man. **2.** Zêde hêrs bûn. **Bi nûçeya efûya hepsê,* ***çavên Dilînê ji dewsê derketin***. **"Lê min dêna xwe dayê,* ***çavên general ji dewsê derketine***, *agir dibarîne..."* Veysel Çamlıbel

Çavên (yekî) ketin hev

1. Ji birîn an jî êşê çav baş venebûn. **2.** Di xew re çûn. **Xemgîn wisa xebitîbû ku* ***çavê wî ketibûn hev***. **"...çû oda xwe û li ser ciyê xwe vezela. Bêlıneke* ***çavên wî ketin hev***." İbrahîm Ehıned

Çavên (yekî) lalijîn

Ji bo çilekiyê çavê xwe gerandin. ****Çavê Zeynel hema dilalijin***, *digere ku li derekê cerdekê lêxe.*

Çavên (yekî) lê bar nebûn

Dexesî, hesûdî û pexilî kirin. **Çima ku lawê Sînemê dixwîne,* ***çavên jintiya wê lê bar nabin***.

Çavên (yekî) lê fireh bûn

Li hember rewşa hêvînekirî ecêb man. **Li ber wê xuyangê* ***çavên Çîlê lê fireh bûn***.

Çavên (yekî) lê girtin

Ecibandin. ****Çavê wan li keçika me girtiye*** *ku xwezgînî şandine.*

Çavên (yekî) lê kort bûn

Jar û lawaz bûn. **Piştî wê nexweşiyê* ***çavên wê wisa lê kort bûn***.

Çavên (yekî) li benda (yekî) bûn

Li hêviya tiştekî bûn. ****Çavên me li benda mêrê wê bû***, *lê heya nîvê şevê jî nehat.*

Çavên (yekî) li derê xelkê bûn

Bi hêviya tiştekdayîna xelkê bûn. Çavçil bûn. **Mal û milkê wî jî heye, lê dîsa jî* ***çavên wî li derê xelkê ye***.

Çavên li deriyan, xwelî li seriyan

Yên ku çavên wan tim li destê xelkê ne, jixwe ji belengazî û xizaniyê ji xilas nabin. ****Çavên li deriyan, xwelî li seriyan.*** *Ew bi vê meşê tu caran nabe mal û hal.*

Çavên (yekî) li destan bûn

1. Hewcedar bûn. **2.** Çavçil bûn. **Bavê wê mir, wisa* ***çavên wê zarokê jî li destan ma***. **Mixabin* ***çavên wî tim li destan e***.

Çavên (yekî) li devê (yekî) man

1. Lê mat man. **2.** Hewaskarê yekî/ê bûn. ***Çavên Dilgeşê bi hewas û hezmekar li devê wê mabû.** *"**Çavên hemûyan mane li devê wî.**" Celal Mustefa

Çavên (...) li hev ketin

Hev û din dîtin. **Di mîhricana muzîkê de carekê **çavên me li hev ket**, lê dû re me hev û din winda kir.*

Çavên (yekî) li hêviya destan bûn

Li benda dayînê bûn. **Dema ku **çavên min li hêviya destan bin**, bila Xwedê ruhê min bistîne.*

Çavên (yekî) li malê dinê bûn

Gelek rûmet dan malê dinê. **Apê Fêris qet li dinyaya din nafikire, hema bi tenê **çavên wî li malê dinê ye**.*

Çavên (yekî) li nav serî gerîn

Jîr û çavbel bûn. **Hay lo lo! Ew çi kone ye, ma nabînî, **çavên wî li nav serî digerin**.*

Çavên (yekî) li pey ... man

Tiştek an jî kesek pir ecibandin, daxwaz kirin, lê bi dest nexistin. **Ya rastî **çavên min li pey wê tabloya xweşik man**.*

Çavên (yekî) li rê bûn (man)

Li bendê bûn. **"Sibê hetanî êvarê **çavên wê li rê bûn**, hêsir ji çavên wê xalî nedibûn."* Emerîkê Serdar

Çavên (yekî) li rê req bûn

Demeke dirêj li benda kesekî yan jî tiştekî bûn. Bê navber lê nihêrîn **"Ha! Tu nehatî **çavên min li rê req bûn**." Enwer Mehemed Tahir*

Çavên (yekî) li ser (yekî) bûn

Bi çavên xwe ve tim tesele (kontrol) kirin. **"Şêxmûs hew xwe girt, bi hinceta destavê çû vagoneke din. Lê jî wî wê ye ku **çavên her kesî li ser wî ne**."* Hesen Kaya

Çavên (yekî) li ser serî lîstin (reqisîn)

Pir şeytan û çalak bûn. **Qet aqilê min ji wê keçikê nebirî, **çavên wê gelekî li ser serê wê dilîzin**.*

Çavên (yekî) malê dinê nedîtin

Mal û milk zêde girîng negirtin. Merd û destvekirî bûn. **Na ezbenî, ne wekî gotina wan e, **çavên wî qet malê dinê nabînin**.*

Çavên (yekî) ne li mal û milkê dinê bûn

Mal û milk girîng negirtin. ***Çavên wî ne li mal û milkê dinê ye**, hema dibêje bila keçika min baş star bibe û hew.*

Çavên (yekî) nebirîn

Ji bo pêkanîna tiştekî bi xwe bawer nebûn. **Hema bigire di her derbarê de bi xwe bawer bû, lê di wê derbarê de xuya bû ku* ***çavên wî nebirîn****.*

Çavên (yekî) neçûn ser hev

Ramezan. **Ezîzeyê ji bo mêrê xwe ketibû rewşeke wisa ku* ***çavên wê çar rojan neçûn ser hev****.*

Çavên (yekî) peqpeqonk bûn

Şaşwazî bûn. **Bi wan gotinên Yezdan re* ***çavên Ferhat peqpeqonk bûn****.*

Çavên (yekî) pûç bûn

Çav kor bûn. **Kesî tiştek jê fêm nekir, hema me hew dît ku* ***çavên Mistefê pûç bûne*** *jî.*

Çavên (yekî) qewartin

Eziyet û tadeyî lê kirin. *****Çavên wê qewartin****, wê dîsa jî rojekê gazinên xwe nekirin.*

Çavên (...) rastî hev hatin

Hev û din dîtin. **"Ku* ***çavên me rastî hev were*** *jî, hêstirên dilgeşiyê ji çavên wê diherikin..."* R. Karakaya

Çavên (yekî) reşeve hatin

1. Pir hêrs bûn. **2.** Serî gêj bûn. **Ji wan gotinên wê bi şûn de* ***çavên min reşeve hatin*** *û ez xewirîm. ****Çavên Yadê reşeve hatin*** *û hema li ber lingên leşkeran dirêj bû.*

Çavên (yekî) rê kişandin

Zûr mayîna çavan a li noxteyekê. **Va ye* ***çavên Dildarê rê dikişîne****, mêvanê we wê bên.*

Çavên (yekî) seh kirin

Baş dîtin û têgihîştin. **"Êvar e û diwîkêl e û* ***çavên wê seh nakin****... Di hizrê xwe de xeware bû."* Serferaz Elî Neqşebendî

Çavên serî lê gir bûn

1. Pir hêrs bûn. **2.** Şaşwazî û şoq bûn. **Hema bi wê gotinê re* ***çavên serî lê gir bûn*** *û xwe gihande lawik. *"Pirça wî li wî gij bû /* ***Çavên serî lê gir bûn.***" Firat Cewerî

Çavên (yekî) sor bûn

Pir hêrs bûn. *****Çavên Osman Sebrî sor bûne,*** *îro qet bavê xwe jî nas nake.*

Çavên (yekî) tarî bûn

1. Ji ber birçîbûn an jî nexweşiyê aciz bûn. **2.** Pir hêrs bûn. **Ji ber birçîbûnê, ji nişka ve* ***çavên wê tarî bûn****. ****Çavên Mîrşan tarî bûne****, tu tiştekî li pêş xwe nabîne.*

Çavên (yekî) têr kirin

Tiştê ku jê zêde tê daxwaz kirin an jî hez kirin têra xwe dan kesekî. **Tu çiqas mêweyan bidî Mirado, tu nikarî* ***çavên wî têr bikî****.*

Çavên (yekî) tijî bûn

Ji ber sedemekê dil xera bûn, ji girînê re amade bûn. ***Çavên min jî tijî bûn**, lê min xwe bi zorê girt.*

Çavên (yekî) tijî xwîn bûn

Zehf zêde hêrs bûn. **Çavên Veysel tijî xwîn bûn* û dest avête tivingê.*

Çavên (yekî) tu kes nedîtin

1. Rûmet nedan. Bi tiştekî nehesibandin. **2.** Hêrs bûn. **Erez wisa xwe mezin dihesibîne ku **çavên wî tu kesî nabînin**. **Çavên Kazim tu kes nedidîtin**, kî dikete ber bi çoyê xwe lê dixist.*

Çavên (yekî) vebûn

Şiyar bûn. **Heta **çavên me vebûn**, jixwe her kesî barê xwe girtibû jî.*

Çavên (yekî) vekirin

Haya yekî bi rasteqîniyê xistin. **Tu sax bî, heke te **çavên min venekira**, ez ê têketama nav pirsgirêkeke xeternak.*

Çavên (yekî) wekî şekir spî bûn

Heke min ew telefona we ya destan dîtiye, **çavên min wekî şekir spî bin.* (Sond)

Çavên (yekî) wekî tasa xwînê bûn

Pir hêrs bûn. **Dema ku min ew dît, **çavên wî wekî tasa xwînê bûn** û bi lez diçû.*

Çavên xwe bel kirin

Bala xwe bi awayekî kûr dayîn ser tiştekî. **Va ye Medîneyê dîsa **çavên xwe bel kirine**, kî dizane li benda çi ye.*

Çavên xwe beliqandin

bnr. Çavên xwe bel kirin

Çavên xwe berdan nav şeqên xwe

Tenê têkiliya zayendî fikirîn. **Weleh Apê Zubêd xurifiye, hema **çavên xwe berdane nav şeqên xwe** û hew.*

Çavên xwe çêrandin

Bi awayekî bêtatêl li dor xwe mêze kirin. **Li ber behrê, xalê min jî **çavên xwe hinekî çêrandin**.*

Çavên xwe dan hev

1. Ji bo razanê xwe amade kirin. **2.** Mirin. **Hema ew bû ku min **çavên xwe dabûn hev**, min nihêrî ku li derî dan. **Piştî ew qas eziyetê Xalê Kamûran bi berbanga sibehê re çavên xwe dane hev*.*

Çavên xwe danegerandin

Çavên xwe jê neqetandin, tim li derekê nihêrîn. **"... lê hîç wî **çavên xwe ji ser vê axa çilmisî ya li ser erda hemamê ya rût û sar komkirî danedigerandin!"* Jan Dost

Çavên xwe daxistin
Fedî kirin. **Dema ku min ew peyv gotin, Tajdîn* ***çavên xwe daxistin****.*

Çavên xwe gerandin
1. Ji bo hewcedariyekê tesele kirin. **2.** Bi gelemperî lê nêrîn. **Ji bo lawê xwe* ***çavên xwe digerîne****, lê hê qîzeke di hunkufê wî de nedîtiye. * "****Çavên xwe bi ser xwendekarên hevalê me yên dibistanê de bigerîne*** *û bizane ka çend ji wan gihîştine wê dereceyê ku ..."* Îbrahîm Ehmed

Çavên xwe germ kirin
Demeke kurt razan. ** "Ez hinekî* ***çavên xwe germ bikim*** *da ku bêm ser xwe."* Zana Farqînî

Çavên xwe gewr kirin
1. Rûreşî kirin. **2.** Gelekî ked û zehmet kişandin. **Rebena Sozdarê ji bo ku wî lawê xwe mezin bike,* ***çavên xwe gewr kirin****, lê tu li kirinên wî binêre.*

Çavên xwe girtin
Daxwaza dîtina tiştekî nekirin. **Ewropa, Emerîka û dewletên din, gelo çima ji bo tevkujiya Helepçeyê wisa* ***çavên xwe girtin*** *û xwe ker kirin?*

Çavên xwe girtin û destên xwe pelandin
Bi awayekî ne têkûz û bê pergal pêk anîn. **Bi* ***çavên xwe girtin û destên xwe pelandinê*** *mirov dikare heta ku derê here?*

Çavên xwe girtin, devê xwe vekirin
Ji hêrsan çi bê ber dev gotin. Çêr kirin. ** "Qîr dikir jina xwe: "Kanî Şêxo?..." "Va ye Hecî va ye"* ***Çavên xwe digirtin û devê xwe vedikir.*** *"* Helîm Yûsiv

Çavên xwe girtin, qûna xwe vekirin
bnr. Çavên xwe girtin devê xwe vekirin

Çavên xwe jê neqetandin
bnr. Çav li ser bûn

Çavên xwe jê qetandin
Awirên xwe jê dûr xistin. ** "****Çavên xwe ji wêneyên xwezayê qetandin*** *û li wêneyê wî mirovî nihêrî."* Musa Vazgali

Çavên xwe jê re dirandin (qelişandin)
Dexesî û diltengî kirin. **Bûka reben hê çend meh bûn ku hatibû, lê xesû û baltûzên wê* ***çavên xwe jê re diqelişandin****.*

Çavên xwe ji kulê re nedan hev
Netirsîn, wêrek bûn. **Maşelah, yekî wisan e ku* ***çavên xwe ji kulê re nade hev****.*

Çavên xwe ji şêr neniqandin
Netirsîn, mineta xwe ji kesekî negirtin. **Ew mêrekî wisan e ku, qet* ***çavên xwe ji şêr jî naneqîne****.*

Çavên xwe kirin kurîşk

Çavên xwe miç kirin. **"**Çavên xwe kirine kurîşk** û serhevraz berê xwe da rêkê."* İbrahim Selman

Çavên xwe kor kirin

Çewtî û qusûreke mezin kirin. **Axxx! Ez çawa bikim, roja ku min ji xwezgîniyên wê re got "erê", aha wê rojê min **çavên xwe kor kirin**.*

Çavên xwe kutan ...

1. Bala xwe dan ser tiştekî yan jî kesekî. **2.** Teqlît kirin. **3.** Dexesî kirin. **Zînê **çavê xwe kutabû nexşeyên xalîçeyê** ku bi xwe jî hîn bibe. *Silo mînakê wan e, wan tev de **çavên xwe kutane mala wî**. *Çeto **çavê xwe kutaye mala birayê** xwe yê piçûk, lê pê re jî nagihîne.*

Çavên xwe kutan destên (yekî)

Bi hêviya alîkarîdayîna hinekên din bûn. **Mahar mirovekî bêxîret e, tim **çavên xwe dikute destê zavayê xwe**.*

Çavên xwe kutan hev

1. Ji hev û du dexesî kirin. **2.** Bi bandor li hev nihêrîn. **Wan her du malbatan **çavên xwe kutane hev**, yek çi dike, ya din jî dike ku eynî tiştî ji wan bêhtir bike. *Nizanim di navbera wan de çi hebû, hema **çavên xwe kutabûn hev**.*

Çavên xwe lê gerandin

Bi baldarî lê mêze kirin. **"Kî dizane çend kesan bi wan destên narîn girtin. Çend kesan **çavên xwe li bejna bedew gerandin**. Çend kesan zebûnî neqişand dilê wê û çend kesan ew ji jiyanê sar kir."* Gülay Ersoy

Çavên xwe li dinyayê girtin

Mirin, çûn ber dilovaniya Xwedê. **Roja ku min **çavên xwe li dinyayê girtin**, ew yek jî xelas bû.*

Çavên xwe li dinyayê vekirin

Ji dayîk bûn. **Jiyana Seyda Cegerxwîn roja ku **çavên xwe li dinyayê vekiriye**, heya ku girtiye, bi dijwarî derbas bûye.*

Çavên xwe miç kirin

Bi baldarî lê mêze kirin. **Pîrê **çavên xwe miç kirin** ku min nas bike, lê herhal tê dernexist.*

Çavên xwe nedan ser hev

Qet ranezan. **Ji bo ku tiştek bi hespê wî neyê min heya sibehê **çavên xwe nedane ser hev**.*

Çavên xwe niqandin

Di ber çavên xwe re derbas kirin. **"**Çavêt xwe niqandin**, mezela wê ya êkane, lîvank, darê meşkê, kuçk û doşk, goşkê av êli ser berbankî, landika kurkî, kotana berxa û..."* Serferaz Elî Neqşebendî

Çavên xwe nîvkêşî (nîvkêşkî) kirin

Bi zaneyî xwe xwazî ve kirin. Xwe xewirandin. **Wê jinikê **çavên xwe nîvkêşkî kirin** û ew zilam kir koleyê xwe.*

Çavên xwe pispisandin

Bi baldarî û tund lê nêrîn. **"Hîn berî ku li wan guhdarî bike kire niçeniç, **çavên xwe pispisandin**, lêva xwe gezt û da nava diranên kurmî."* Fevzi Bilge

Çavên xwe qirpandin

1. Henek kirin. **2.** Ji bo daxwaza zayendî dilxweziya xwe kifş kirin. **Qet **çavên xwe neqirpîne**, min armanca te fêm kir. *Li ber çavên min Evînê ji mêrik re **çavên xwe diqirpand** û îşaret dikir.*

Çavên xwe qîq kirin

Bi awayekî bê navber û bi bandor lê mêze kirin. **"Hema wek di filmên sînemayê de wî **çavên xwe di yê keçikê de qîq kirin**, bişirî, destekî xwe avêt porê wê û yê din avêt pişt stûyê wê û ew her bi xwe ve kişand, xwest wê ramûse."* Şahînê Bekirê Soreklî

Çavên xwe reşeve kirin

Hêrsa xwe anîn. Tehdît kirin. **Qet niyeta Reso tune bû ku gotina xwe ya dadgehê vegerîne, lê Emînê cinî çawa ku **çavên xwe jê re reşevekir,** rewş hate guherandin.*

Çavên xwe revandin

Di daxwaza têkiliyê de nebûn. **Min çiqas çavên xwe dikutandin çavên wê bêbavê, wê jî ew qas **çavên xwe ji çavên min direvandin**.*

Çavên xwe rijandin

bnr. Çavên xwe kor kirin

Çavên xwe rikê kirin

Li derekê bi bandor mêze kirin. **Wê wisa **çavên xwe rikê kiribûn** ku keçik pê aciz bû.*

Çavên xwe şikandin

Tirsîn. **"Lê ku piçekî bi pêş de gav biavêtana, wê **çavên xwe neşikanda** û nukilê çifteyê bikişanda."* Harbi Soylu

Çavên xwe veke, li min mêze bike.

Herhal tu min baş nas nakî, baş bizanibe ku ez ne mirovekî wisa hêsan im. **Lawo **çavên xwe veke, li min mêze bike** û min neşibîne hinekên din.*

Çavên xwe vekirin

1. Şiyar bûn. Rastî dîtin. **2.** Ji nexweşên ku berexêr dibin re tê gotin. **Heya wan **çavên xwe vekirin**, hasil gihaye Mûsilê jî. *Piştî du rojan Pelşînê ku **çavên xwe vekirin**, dê û bavê wê ji şabûnê giriyan.*

Çavên xwe zîl kirin

Bala xwe zêde dayîn. **"**Çavên xwe pitir zîl kirin**, kir û nekir neşiya xaniyê xwe bibîne."* Serferaz Elî Neqşebendî

Çavên xwe zoq kirin
bnr. Çavê xwe bel kirin

Çavên (yekî) zûq bûn
Matmayî man, şoq bûn. *"*Jinikê destê xwe avêt newqa Şîrfiroş û berê wî da odeya razanê... Xortê belenaz devvekirî ma, her du **çavên wî zûq bûn**..."* Ebdulbaqî Huseynî

Çavbelek bûn
Delalî û pir biqiymet bûn. **Ma Robar **çavbelek e** ku ew bixwe û em li çavê wî binêrin?*

Çavbirçî bûn
Zik têr be jî mêjî têr nebûn. **Ne ku zikê wî birçî ye, esas **çavên wî birçî ne**.*

Çavgirtî bûn
Nezan û xerîb bûn. **Ez wê demê mirovekî xerîb û **çavgirtî bûm**, min ne rê dizanibû, ne jî dirb.*

Çavgirtî xwe avêtin nav
Bê lêgerîn, bê bername, bê sebir û bê fesal ketin nav karan. **Qafûr qet ji wî karî fêm nedikir jî lê bi **çavgirtî xwe avête nav**.*

Çavgirtî xwe lê qerase kirin
bnr. Çav girtî xwe avêtina nav

Çavhevdel bûn
Ji bo kesên ne bedew tê gotin. **Maşelah, Lehî jî keçeke **çavhevdel e** ha.* (qerf)

Çavînokî bûn (Çavokî bûn)
Nezer lê ketin. **Qundaxa Almastê, **çavînokî bûbû**, tenê bi ava moriya nezerê pak bû.*

Çavînokî kirin
Yek nezerî kirin. **Ji ber ku dergûşa me **çavînokî kir**, êdî me bihedurandiba.*

Çavnebarî kirin
Dexesî û hesûdî kirin. **Çîçekê tim ji keçika min **çavnebarî dikir**, îro jî dike.*

Çavpehn bûn
Ji bo kesên di hêla namûsê de nepaqij in û bi bênamûsiyê re têkildar in tê gotin. **Heke ne mirovekî **çavpehn bûya**, min jî meraq nedikir.*

Çavqûnek bûn
Di hêla zayendî de zêde daxwazkar bûn. **Ew **çavqûnek** dîsa di kuçeyê de digere.*

Çavqurîşk bûn
Temahkar û çikûs bûn. **Hûn bi navê Xwedê bikin, qala wî **çavqurîşkî** ji min re nekin.*

Çavreş bûn
Delalî û xweşik bûn. **Keçika Berzencî ya piçûk yeke **çavreş e**.*

Çavreşî kirin
Dexesî û hesûdî kirin. **Ji ber ku Med **çavreşî dikir**, tim li xwîşka xwe ya yeksalî dixist.*

Çavsorî li (yekî) kirin
Zor û serdestî lê kirin *"*Bedo **çavsoriyan li Xelîl dike**."* Adar Jiyan

Çavşeytan(î) bûn
Pir jîr û fesad bûn. **Wey lo lo! Wisa bi çavekî li wê menêre, ma tu nabînî ew çi **çavşeytan e**?*

Çavşikandî bûn
Nuxs û tirsonek bûn. *"*Mirovê ku bi meqamê xwe piçûk e, **çavşikênandî dibe**. Ew li ku be, xwe kêm dibîne. Loma jî Şêxmûsko bi rûniştina li odeya axê di nav şekalan de dima."* Bavê Nazê

Çavşor bûn
Ji bo mêrên gelekî li pey jinan digerin tê bikaranîn. **Heşîm mirovekî **çavşor e**.*

Çavteng bûn
Çavbirçî û temahkar bûn. **Ji **çavtengiyan**, Yezdan têkiliya xwe bi hemû exrebe û lêzimên xwe qetand.*

Çavtengî kirin
Temahkarî û xesîsî kirin. **Ronîdar **çavtengiyan dike**, lewma ji ew qas qeysiyan hinekan nade zarokên birayên xwe ku ew jî bixwin.*

Çavtêrnebûyî bûn
Qaneet nekirin. **Xwedê hemû tişt dayê, lê ew mirovekî **çavtêrnebûyî ye**.*

Çavtirsî kirin (Çavtirsandî kirin)
Cesaret şikandin. **Wisa Delîl **çavtirsî kiribûn** ku newêribû derkeve ber devê derî.*

Çavtirsonek (bûn)
Newêrek bûn. **Wî **çavtirsonekî** di navîna du rojan de lawê me jî tirsek kir.*

Çavvekirî bûn
Jîr biaqil û çavbel bûn. *"*Şewêş kurê şivanekî ye. Ew bi xwe deh salî ye, zarok e, lê belê pir **çavvekirî ye**."* Fûad Temo

Çavvekirî çûn
Bi hesreta kesekî yan jî tiştekî mirin. **Ji ber ku lawê xwe nezewicand, Wardek **çavvekirî çû**.*

Çavvekirî man
Matmayî man. **Li hemberî wê xuyangê ez **çavvekirî man**.*

Çavxezal bûn
Pir bedew bûn. **Ew bûka **çavxezal**, di taxê de bibû çirayeke rengîn.*

Çavxwînî bûn

Ji bo mirovên bihêrs û cirnexweş tê gotin. **Cemo, wer **çavxwînî ye,** kes naxwaze pê re hevaltiyê bike.*

Çavzer bûn

Xwediyê çavên nezerê bûn. **Emînê Xezalê yekî pir **çavzer e**. Ku tiştek eciband, belayekê lê dixe.*

Çaw(*) kirin stûyê (yekî)

Yek kirin bin bandora xwe. **Maryetê **çawek kiriye stûyê mêrê xwe** û wekî daxwaza xwe wî bi kar tîne.*

Çawa bê dêv wisa gotin

Bêhesab û bêmêzîn peyivîn. **Ehmed mirovekî bêhesab e, hema **çawa tê dêv wisa dibêje**.*

Çawa dirêse, wilo ba dide.

Li gorî reng û rewşê li hev anîn. **Ma hûn jî Zîrek nas nakin? Hûn jî nizanin ku ew **çawa dirêse, wilo ba dide**?*

Çawa got kew, zanibû nikulê wê jî sor e.

Hê di destpêkê de rewş fêm kirin. **Camêrî ne mirovekî nezan e. **Çawa got kew, wî zanibû nikulê wê jî sor e.***

Çawa hatin, wisa jî çûn.

Tu guherînek çênebûn, tu encamek negirtin. ****Çawa hat wisa jî çû.** Ez tê negihîştim ku gelo armanca wî çi bû?*

Çawa ku zirika te hat, niha jî tirika min tê.

Te çawa astengî derxistin, ez ê jî wisa derxînim. **Her tişt bi dorê ye, **çawa ku zirika te hat, niha jî tirika min tê**.* (bnr. çîrok)

(*)Çaw: Li hinek zozanên ku gîha lê tê çinîn, ji bo ku gîha belawela nebe wekî gurzan tê girêdan. Ji bo benê girêdana wan jî gihayê nerm û dirêj wekî werîsan bi çirçirkê tê badan. Ji wî gihayê ku wekî werîsan hatiye badan û li nîvê gurzê gîha tê girêdan re "çaw" tê gotin.

"Çawa ku zirika te hat, niha jî tirika min tê."

Kerek û deveyek zehf zêde jar dibin û pîr dibin, xwediyê wan mêze dike ku kêrekê (sûd) ji wan nagire, wan diavêje derve. Her du heval ango deve û ker, serê xwe hildidin û diçin nav mêrg û zeviyan. Ji hev û din re dibin alîkar û hev û din diparêzin. Li gorî daxwaz û pêdiviyên xwe dijîn.

Piştî demeke dirêj bi şûn de û di nav derfetên azad û xwezahî de pêşve diçin û bi ser xwe ve tên, qelew dibin û hêza wan tê cih.

Her du heval bi awayekî azad ji xwe re di mêrg û zeviyan de diçêrin. Jiyaneke pir serfiraz û rehet didomînin. Rojekê dîsa ji xwe re diçêrin. Ker ji deveyê re dibêje:

"Birakê deve, ez ê bizirim." Deve dibêje:

"Birakê ker va ye em bi serfirazî ji xwe re dijîn. Heke em bêtedbîriyê bikin, serê me dê têkeve xerabiyan. Heke tu bizirî, dengê te bilind e, dibe ku hinek mirov bibihîzin û bên me bibin û me dîsa têxin nav wê ezîyetê." Ker wê inga xwe ya navdar digire û dibêje:

"Na weleh, ez çawa bikim, ji dilê min de tê, ez ê bizirim."

Deve li ber digere, tika dike, her çawa dike, bi kerê nikare. Ker heya ku dengê wî derdikeve dizire.

Hema di wê demê de bazirganek jî di wir re derbas dibe. Xwediyê bazirgan dengê zirîna kerê dibihîze û ji mirovên xwe re dibêje:

Çawa sûk e, gaz piçûk e.

Ji bo kar an jî tiştên berevajî û ne layîq tê gotin. **Ez tênegihiştim,* ***ev çawa sûk e, gaz piçûk e.***

Çawa sûk e, wisa jî bûk e.

Ji bo tiştên lihevhatî tê bikaranîn. **Ji wê rewşê re ev yek hewce ye.* ***Çawa sûk e, wisa jî bûk e.***

Çaxa ku gul dibarin ez diçim bal keran.

Ez mirovekî bêşans im. **Bi qurbana Xwedê me, tu roj jî rozgar daye min.* ***Çaxa gul dibarin ez diçim bal keran.***

Çaxê maza, Pîvo raza.

Di dema ne di cih de kar kirin. **Ez çi bikim? Ev tiştên wer ecêb jî rastî min tên.* ***Çaxê maza, Pîvo raza.***

Çaxê nêçîra min tê, gûyê tejiya min tê.

Tam di dema firsendê de astengî derketin. **Kuro ev çi şans e? Tam* ***çaxê nêçîra min tê, gûyê tejiya min tê.***

Çaxê piçûk bûm ji mezinan ditirsiyam, mezin bûm ji piçûkan ditirsim.

Di her demê de her tişt li gorî xwe crênî û neyîniyên wan hene. **Heta ku mirov bi xwe nejî, di derka hin tiştan de nabe;* ***çaxê piçûk bûm ji mezinan ditirsiyam, mezin bûm ji piçûkan ditirsim.***

Çelderen pelderen xeber dan

Vala û ne di cih de axaftin. **Kewo çelderen pelderen xeber da lewma serê me gêj kir.*

Çek berdan

1. Teslîm bûn. **2.** Agirbes kirin. **Di dawiya dawî de wan* ***çek berdan*** *û hatin ketin bin milê dewletê. *Partiyê ji bo sê mehan biryar da ku* ***çekan berde.***

Çek li erdê nehiştin

Tol girtin, doz berdewam kirin. **"Min soz da li ser canê xwe, heya ku xwîn di demarên canê me de bigere û jenên dilê me bilebitin, serê xwe qet daynenim û ranewestim, kar û xebat û* ***çeka wan li erdê nehêlim*** *û tol û heyfa wan hilînim û armanc û daxwaziyên wan bi cih bînim."* Diljan

---

"Dengê zirîna kerekî hat, kuro hela li piştwirê binihêrin ew çi ye."

Mirovên bazirgan mêze dikin ku wa ye kerek û deveyekî bêxwedî û bêxwedan ji xwe re diçêrin. Hema wan herduyan jî digirin, tinin bar dikin, didin pêşiya xwe û dibin.

Di rê de ji ber ku tehma azadiyê jî hilgirtiye ker naxwaze barê xwe hilgire û bi wan re here, xwe diavêje erdê. Xwediyê bazirgan barê wî didin ser barbirên din, lê vê carê jî ker bi xwe jî naçe. Piştî gelek hewldanê lê dinêrin ku nabe, kerê jî didin ser barê deveyê hevalê wî û rê berdewam dikin.

Deveya ku di bin barê giran de di nav xwêdanê de maye, bi giraniya hevalê xwe ker jî hê dikeve nav zorê. Dema ku tên ber geliyekî kûr, deve ji kera li ser pişta xwe re dibêje:

"Birakê ker tirika min tê!" Ker bi tatêl dibêje:

"Tu henekan dikî herhal, ku tu li vir bidî tirikan ez ê bikevim û parçeyên min namînin." Deve bi biryar dubare dike:

"Çawa bikim? Çawa berê zirika te dihat, niha ji tirika min tê."

Hema bi wê gotinê ve deve çirtikê diavêje û ker ji ser piştê dişiqite diçe binê geliyê kûr.

Çile sar e, cilik ne qahr e.
bnr. Sar e, cilik sitar e, gerın e, cilik şerın e.

Çem tim nayê qirş û qal li ber nayê.
Dayîk her dem zarokên kurîn nayînin. **Keça min, rûmeta neviyê min bizanibe.* ***Çem tim nayê qirş û qal li ber nayê.***

Çem û çem çûn
Bê veger çûn. **Kazimê Evdilê Kor, ji ber ku keça wî zikê xwe tijî kiribû, şevekê mala xwe bar kir û* ***çem û çem çû****.*

Çemika (çema) stûyê xwe xurandin
Poşman û pozîde bûn. **Di dawiyê de Kawayê Mele Farûq nihêrî ku nabe,* ***çemika stûyê xwe xurand****, da rê û çû.*

Çend hestî avêtin ber (yekî)
Bi hin berjewendiyên piçûk, bêdeng hiştin. Bertîl dan. **Memûrên dewletê ketine rewşek wilo ku tu* ***çend hestiyan biavêjî ber wan****, tiştê ku nekin namîne.*

Çend nîsk ji serî kêm bûn
Ji êqil hinek kêmasî hebûn. **Tu gotinên wî girîng negire,* ***çend nîsk ji serê wî kêm in****.*

Çend texte ji serî kêm bûn
bnr. Çend nîsk ji serî kêm bûn

Çencya (yekî) ketin hev
1. Ji ber nexweşiyê di radeya mirinê de bûn. **2.** Gelekî serma kirin. **Heta Medînê gihandin bal doxtor,* ***çeneya wê kete hev*** *jî. *Di wê serma Qersê de* ***çeneya Kezîbanê kete hev****.*

Çene kutan
Gelekî xeber dan. **Em li mayîna xwe ya li wir poşman bûn, ji ber ku jinikê heya sibehê* ***çene kutan****.*

Çene qerimîn
bnr. Çene kutan

Çenge avêtin
Li ber mirinê bûn. Mirin. **Dema ku wê dê* ***çenge biavêta****, lawê wê gihîşte ser.*

Çengek xwelî bi zêrekî zer bi dest neketin
Ji dil daxwaza mirinê kirin. **"El eman sed eman, ji derdê? Mubela dilan, çavên wî sor bûn, xwîn rijiyanê,* ***çengek xwelî bi zêrekî bi destê wî nakeve*** *ku li serê xwe ke."* Celîlê Celîl, Ordîxanê Celîl

Çep çûp avêtin ber (pêşiyê)
Li hincetan gerîn. **Heyran qet nebe! Ya rastî ji min re bibêje, ji te tika dikim,* ***çep çûpan neavêje ber****.*

Çep lê xistin, rast vegerandin

Di nav rewşeke pir xeternak û zor de hiştin, lêdan. *"*Her çiqas di pêşgotina pirtûkê de, hatiye diyar kirin ku 'bi Kurdî nîvîsandin ji bo vî hevalî gaveke baş e'* (Mehmed Uzun) *ew ji vê rewşê re nabe hincet ku mirov* ***çep lêbixe, rast vegerîne****..."* Kawa Nemir

Çep û rast belav kirin

Pere yan jî malê xwe bi awayekî bê hesab xerc kirin. **Çawa be ne keda wî ye, rûmetê nadiyê hema* ***çep û rast belav dike****.

Çepeçep lê nihêrîn

Bi hêrs û xayînî lê nihêrîn. **Bavê Meryemê wisa* ***çepeçep lê nihêrî*** *ku lundir lê qetand.

Çepilê xwe hejandin (li ba kirin)

Betal gerîn. Tu karek nekirin. **Tu kar û emelê Şikak tune ye, heya êvarê* ***çepilê xwe dihejîne*** *û li van kuçeyan digere.

Çerkezê simbêlboş e, totika dibêje çargoşe, rûn dikire lê nafiroşe.

Ji bo kesên lafek, fortavêj û bêkêr tê gotin. **Ew jî yekî wekî* ***Çerkezê simbêlboş e, totika dibêje çargoşe, rûn dikire lê nafiroşe****.

Çerm gemar kirin

Kar xera kirin. **Me lun tiştên baş jê hêvî dikirin, lê ew çû, wî* ***çerm gemar kir****.

Çermê (yekî) qalind bûn

1. Pir qelew bûn. **2.** Zengîn û dewlemend bûn. **Dilo van rojan zêde dixwe,* ***çermê wî qalind bûye****. **Ji erebeya wî ya rind kifş e ku* ***çermê wî qalind bûye****.

Çerm tijî ka bûn

Kêmaqil û bêxîret bûn. **Belê ew qas mezin û gir e, lê tenê* ***çerm tijî ka ye****.

Çermê (yekî) tijî ka kirin

Zêde li yekî dan an jî kuştin. **Heya me xwe gihandê, me mêze kir ku* ***çermê Îso tijî ka kirine*** *jî.

Çermê rûyê (yekî) qetîn

Bêar û bêheya bûn. **Ji te tika dikim, xwe nexe tayê wî, jixwe* ***çermê rûyê wî qetiyaye****.

Çerx çep zivirîn

Kar û bar serrast neçûn, kêmasî û bela li ser hev bi ser de hatin. **Xwedê axiriyê xêr bike, lê îsal mîsala Xwedê* ***çerxa me çep ziviriye****.

Çerxa ... di destê (yekî) de bûn

Xwedî erk bûn, bibandor bûn. **"Di demên weha de di bin çavan de diran li min diqir-içandin, lê belê zêde feyde nedikir; çimkî* ***çerxa otêlê di destê min de bû****."* Felat Dilgeş

Çerxa felekê çep gerîn

Kar baş neçûn. **Ez çawa bikim û çi bibêjim êdî bêfeyde ye. Îsal* ***çerxa felekê ji bo me çep geriya****.

Çêj jê stendin
Lê xweş hatin. Tam jê girtin. **Bi rastî jî me ji cîrantiya îsal a zozanan* ***çêj ji êla xwe stend****.*

Çê kiro bi xwe kiro, xera kiro bi xwe kiro
Qenc an jî xirab bi destê xwe kirin. **Heyran lûn çi bibêjin li bejna hespê min tê,* ***çê kiro bi xwe kiro, xera kiro bi xwe kiro****.*

Çêl û dotin, kezwan û kelotin ne vêk ketî ne.
Tiştên ku ne layîqî hev bin û li hev neyên bi hev re nabin. **Heyran a ku tu dibêjî nabe. Ma tu nizanî, çêl û dotin, kezwan û kelotin ne vêk ketî ne.*

Çêleka me avis be wê rojekê bizê.
Bingeh ku saxlem be, ji wê bi şûn de ne girîng e. **Heyran lûn qet destê xwe nedinê,* ***çêleka me ku avis be wê rojekê bizê****.*

Çêlekê di doxa bivir de rêx kir.
Kar xera bûn. **Gelek plan û pêşnûmayên me hebûn lê bi vê bûyerê* ***çêlekê di doxa bivir de rêx kir****.*

Çêlekê didoşe Xatê, to dixwe Fatê.
Hinek dikin, hinek jî dixwin. **Ev çi bêdadî ye, çi qeder e?* ***Çêlekê didoşe Xatê, to dixwe Fatê.***

Çêlekê rêx kiriye bi ser destiyê bivir de.
bnr: Çêlekê di doxa bivir de rêx kir.

Çên çênê mêşê ye, deng dengê gamêşê ye.
bnr: Bi xwe wekî mêşê ye, deng dengê şeşê ye.

Çênî çênî kirin
Parçe parçeyî kirin. ** "Baş zanibû ku bi dest wan bikeve ew ê wî çênî çênî bikin û kûçikên li kuçeyên Mêrgalmedê wê goştê canê wî bixwin."* Selahattin Bulut

Çêrê dizî, arizî
Dawiya derewan pûç e. (Virekê virekan bûn.) **Ew qas jî nabe keçê!* ***Çêrê dizî arizî.***

Çerm û hestî man
Pir lawaz û jar bûn. *****Piştî girtîgelhê Mizgîn wisa bû ku bi tenê çêrm û hestî ma****.*

Çermê golikê li ber me, wê xwedî bê ser me.
Di dawiya karên xeter de xisar jî çêdibe. *****Çermê golikê li ber me, wê xwedî bê ser me.*** *Xeterî hê neqediyaye.*

Çi bikî hêç bûn
Çi bikî bi tiştekî hesêb nebûn. **Xwedê dizane ez* ***çi ji vê xweha xwe re bikim hêç e****.*

Çi bikim, jêr rû ye, jor simbêl e.
bnr: Hevraz tû dikim simbêl e, berjêr tû dikim rih e.

Çi bikim xwîşka min, ne nanek şewitî ne nanek şehitî.

Ji bo kesên çikûs û temahkar tê bikaranîn. **Tu jî wekî wê jinika temahkar dibêjî* ***çi bikim xwîşka min, ne nanek şewitî ne jî nanek şehitî***. (bnr. çîrok)

Çi bûyî kundir, çi jî stûyê te dirêj bû?!

Ji bo yên ku di demeke kin de bi awayekî ne asahî tên guherandin tê gotin. **Kuro min fêm nekir, tu* ***çi bûyî kundir, çi jî stûyê te dirêj bû?!***

Çi giriya ku çi jî behecî?!

bnr: Çi xwar ku çi jî pê vereşî?!

Çi îman e, çi wîjdan e, bazara serbest e, kilîtê xwe cizdan e.

Ji bo sextekarî, bûjenî û bêdadiya bazirganiyê ango kapîtalîzmê tê gotin. **Vê piyaseya serbest rewş hê aloztir kir.* ***Çi îman e, çi wîjdan e, bazara serbest e, kilîtê xwe cizdan e.***

Çi ji dest tê texsîr nekirin (Ya ji dest tê texsîr nekirin)

Tiştê guncav bi kar anîn. **Ez diçim, de hema* ***çi ji destê te jî tê, tu bi Xwedê texsîr meke***.

Çi ji min re dixwazî bila bikeve kodika te.

Bila her kes wekî daxwaz û niyeta xwe encamê bigire. **Ez çi ji te re bibêjim,* ***tu çi ji min re dixwazî, bila bikeve kodika te***.

Çi xema quling e ku Mûrad rabûye.

Yên ku ji bo wan ew yek hêsan e, xemê nakişînîn. **Bila yên ku ne xwedî erebe ne, bifikirin,* ***çi xema quling e ku Mûrad rabûye***.

Çi xwar ku çi jî pê vereşî (vereşe)?!

Ka çi qewimî, çi pêk hat ku çi encam jî bide? ****Ka çi xwar ku çi jî pê vereşe?!*** *Tu ew qas mezin dikî, lê tu tiştek li meydanê tune ye ku em pê mijûl bibin.*

Çi xwelî li serê xwe kirin

Tu çareserî peyda kirin. **Dibêjin zimanê kurdî wê bê serbest kirin, lê me amadekariyeke baş nekiriye, ka em ê* ***çi xweliyê li serê xwe bikin?***

Çiyê feqîran, dergê mîran

Her kes li gor hempayê xwe. **Kalikê min digot hedê xwe bizanibe.* ***Çiyê feqîran li dergê mîran?***

Çi zû bûyî kundir, te çi zû şax veda?!

bnr: Çi bûyî kundir, çi jî stûyê te dirêj bû?!

"Çi bikim xwîşka min, ne nanek şewitî, ne nanek şehitî"

Du heb xwîşk hebûne. Yek xizan bûye, yek jî dewlemend. Her yek li gundekî dimîne. Rojekê xwîşka xizan diçe mala ya dewlemend. Her du li mala ya dewlemend nan dipêjin. Xwîşka xizan birçî bûye û dixwaze nanekî bixwe lê fedî dike ku ji xwîşka xwe bixwaze. Ya dewlemend têdigihîje ku xweha wê birçî ye û çavên wê li nanxwarinê ye, lê ji çikûsî nabêje ku *"Ha ji te re nan bixwe."* Pehtina nên diqede. Ya dewlemend ji xwîşka xwe re dibêje:
"Çi bikim xwîşka min, ne nanek şewitî, ne nanek şehitî."

Çiçikê diya xwe jê kirin

Ji bo kesên tolaz û serserî tê bikaranîn. **Heçiya ew lawê Berces e, hema bûye yekî* ***çiçikê diya xwe jêkirî*** *û ketiye kuçeyan.*

Çil kor bi gopalekî

Bi hezaran kes bi rêveberî û serokatiya kesekî tên îdare kirin. **Helbet her kes ne wekî hev e,* ***çil kor bi gopalekî****.*

Çil sal kul û qotik li gund bû, ecel hat hîna mir.

Her tişt dikişîne dema xwe. **Her tişt radeyek û demekê wê heye.* ***Çil sal kul û qotik li gund bû, ecel hat hîna mir.***

Çilka wê, silka wê

Tenê li nefsa xwe fikirîn. **Ma ji bilî xwarin û vexwarinê Şenyar çi difikire? Hema* ***çilka wê ye, silka wê ye****.*

Çilkek, milkek

Her tişt hindik hindik zêde dibe. **Hinekî sebir bike, sebir;* ***çilkek, milkek****.*

Çiloçepî bûn

Tevlihev û berevajî bûn. **Karên vî mêrê min hema wiha gelek caran* ***çiloçepî ne****.*

Çima bidim bi tetikan, çima li pey bigerim bi pepikan?!

bnr. Bi tetikan dayîn, bi pepikan li pey gerîn

Çima dan û dûyên me ji hev û din tên xwestin?!

Ma çi tiştê me yê ku bi hev du neyê parvekirin heye? **Emê ji bo çi devê hev û din tal bikin? Ma dan û dûyên me ji hev û din tên xwestin?!*

Çima, (ma) destê min pîvazan hûr dike?!

Çima ez ê jî vala bisekinim? Ma ez seqet im? **Helbet min jî lê xist.* ***Çima destê min pîvazan hûr dike?!***

Çima erş û kurş dizanî, çima goştê bin birinc nizanî?!

Çima tiştên mezin û dûr dizanî û dibînî, çima yê li ber çavên xwe nabînî û nizanî? **Madem tu tiştên ew qas girîng dizanî, çima yên piçûk nizanî?* ***Çima erş û kurş dizanî, çima goştê bin birinc nizanî?!*** (bnr. çîrok)

"Çima erş û kurş dizanî, çima goştê bin birinc nizanî?"

Rojekê melayekî misliman dibe mêvanê axayekî êzidiyan. Li mala axê şêxekî êzidiyan jî rûniştiye. Axa berî ku xwarin û vexwarinê bîne ji wan dipirse:

"Hun her du ji zanayê me ne û der barê olê ji de pispor in. Hûn qet çi dibînin, gelo rewş çawa ye?" Şêxê êzidiyan pitepit dike, pifînî dike, geh li esmanan dinêre û geh li pirtûka pêş xwe dinêre. Di dawiyê de dibêje:

"Wa ye li esmanan milyaketan dane kêr û qeman û bi hev ketine, şer dikin." Axa bi van gotinan sehm digire û vê carê jî dizivire ser melayê misliman û ji wî dipirse:

"Mela hûn qet çi dibînin?"

Mela li hevraz û berjêr dinêre, li Qurana dest xwe dinêre, lê mixabin tu tiştî serederî nake û di dawiyê de dibêje :

"Welehî axayê min ez qet tu tiştî nabînim." Axa tiştekî nabêje û diçe ji xulam û xizmetkarê xwe re fermana xwarinanînê

Çima, (ma) ev tira henekan e?!
bnr: Ma ev gûyê henekan e?!

Çima, (ma) ez kumê sor im, li ser serê her kesî bi dor im?!
Ma her kes girêdayî min e? Hûn çi ji min dixwazin, ma bêyî min nabe? **Heyran çi ye, hema çavê her kesî li min e?* ***Çima ez kumê sor im, li ser serê her kesî bi dor im?!***

Çima, (ma) filehan daye pey te?!
Ji yê zêde ecele dikin re tê gotin. **Mala te neşewitiyo, ew qas jî nelezîne,* ***ma filehan daye pey te****?!*

Çima, (ma) kevir avêtiye, mil êşiyaye?!
Ji bo bidestxistinên bêked tê bikaranîn. **Lawo şikiriya xwe ji Xwedê re bîne.* ***Çima te kevir avêtiye milê te êşiyaye?!***

Çima, (ma) me destmala sorgevez şandiye pey?!
Ma me jî gelekî hez dikir ku ew bê? **Nayê bila neyê,* ***çima me desmala sorgevez şandiye pey****?!* (qerf)

Çima, (ma) me sêva sor şandiye pey?!
bnr: Çima, (ma) me destmala sorgevez şandiye pey?!

Çima, (ma) min serê xwe daniye?!
Çima, ma ez mirime? Çima, ma ez ji bo kîjan rojê me? ****Çima, ma min serê xwe daniye*** *ku ew bên ronîvro keçikê ji vir bibin?!*

Çima razêm li newala kûr, çima bibînim xewna dûr?!
bnr: Çima razêm li cihê kaş, çima bibînim xewnên şaş?!

Çima razêm li cihê kaş, çima bibînim xewnên şaş?!
Ji bo astengiyan nekişîne, divê mirov xwe ji tiştên xeter biparêze. **Divê mirov hinekî jî hay ji xwe hebe.* ***Çima razêm li cihê kaş, çima bibînim xewnên şaş.***

Çima, (ma) seyek nikare, cendedekî bi devê xwe bigire?!
Ma mêrek nikare zikê jina xwe têr bike? **Tu nekeve tatêla wan.* ***Çima ma seyek nikare, cendedekî bi devê xwe bigire?!***

Çimik li hev dan
Li ber kesekî şêlavî kirin. **Te bidîta li ber jinikê çawa çimik li hev didan.* (argo)

---

dide. Lê dibêje:
"Goştê melayê misliman bidin ser birinc, lê yê şêx têxin bin birinc ku bila qet neyê xuyan." Dema ku sifre tê, şêx li rewşê dinêre ku li ber melayê misliman goşt tijî ye lê li ber wî qet tîkeyek jî goşt tune ye, tenê birinc xistine tasê. Ev yek gelekî lê zor tê û pir ditengije. Nikare li ber xwe bide, ji axê re dibêje:
"Ev çi ye, tu melayê misliman ji min zêdetir digirî? Te goşt tijî her wî kiriye, lê qet tîkeyek jî nexistiye tasa min?" Axa bi hêrs şêx dibersivîne:
"Şêxê min, çima tu erş û kurş dizanî, çima goştê bin birinc nizanî?"

Çineçin kirin
bnr. Pitpit kirin (Pitepit kirin)

Çînek li ser mil xistin
Madalya û xelatek dan. **Wî hew dizanibû ku piştî îxanetkirina wî wê* ***çînekî li ser milan bixin****, lê karê wan pê xelas bû, guleyek jî berî serê wî dan.* (qerf)

Çiqas dinya li hev dikeve, tiştek ji me re bi ser dikeve.
Tevlihevî carinan ji bo hinekan encamên erênî jî dertîne. **Jixwe tiştekî ku em winda bikin nemaye,* ***çiqas dinya li hev dikeve, tiştek ji me re bi ser dikeve****.*

Çiqas dûr e, bigul û nûr e.
bnr. Dûro bigul û nûro

Çiqasî li ser erdê ye, ew qasî jî li bin erdê ye.
Ji bo yên bejnkinik û pirzane tê gotin. **Tu wisa li bejna wî ya kin menihêre,* ***ew çiqasî li ser erdê ye, ew qasî jî li bin erdê ye****.*

Çira (yekî) birin
Yek têk birin, mexlûb kirin. **Wî çi kir kir; di dawiyê de* ***çira Cindî Begê bir****.*

Çira çavan bûn
Zehf hindik bûn. **Xwedê jê razîbûyê, te digot* ***çira çavan e****, nedixwest hinekî bide destê zarokan.*

Çira (yekî) tefandin
1. Hêvî şikandin. **2.** Xerabiyeke mezin li yekî kirin. **Hêlîn berê zelîf hêvîdar bû, lê Narînê* ***çira wê tefand****. *Min ew qas jî jê hêvî nedikir, ew ê matoşqeyê* ***çira bavê xwê yê reben tam tefand****.*

Çira li ber koran, tembûra (defa) li ber keran
Ji bo ked û hewldana bêkêr tê gotin. **Hevalo, ma tu tênagihîjî?* ***Ev kirina te çira li ber koran, tembûra li ber keran e.***

Çira li koran çi bike, şîret li pîran çi bike?!
Ji bo hewldanên bêkêr tê gotin. **Qet xwe newestîne.* ***Çira li koran çi bike, şîret li pîran çi bike?!***

Çira xizanî ji nezanî
Sedema feqîriyê, zêdetir nezanî ye. **Min ev yek baş fêm kir ku* ***çira xizanî ji nezaniyê ye****.*

Çirax kirin
Parastin, pêk anîn. **Tu meraqan meke, Rehmanî dikare wî karî* ***çirax bike****.*

Çirik lê badan
Xistin rewşek dijwar. **"Tirsê li vî bajarî* ***çirik li min bada****. Ez xistime nav pencên xwe, dike ku min mûna dêwekî hûf bike."* Musa Vazgali

Çirî ye û çirî ye, mal teyr û tajî ye.
Di meha çiriyê de, rewşa hewayê zor e. **Ma te nebihîstiye ku dibêjin:* ***"Çirî ye û çirî ye, mal teyr û tajî ye."***

Çirîseyê serî girtin
Agir pê ketin, dil şewitîn. **"**Çirîseyê serên me girtin** û em mendehoş kirin û têkşilqandin."* Sidqî Hirorî

Çirpîn bi dilê (yekî) ketin
Pir bixaşok û heyecan bûn. **"...kûr û dûr li Asê temaşe bû. **Çirpîn bi dilê Asê ket** û çûka dilê wê lê da."* Talip Kalın

Çirteçirt lê xistin
Zor lê xistin. **Zoro di wê gulaşê de **çirteçirt li Seydo xist**.*

Çirteçirt bi paşiyê ketin
Ketin rewşeke teng û dijwar. **Her sê xortan wisa kirine ku **çirteçirt bi paşiya Arda xistine**.*

Çirtekê bi pêş de neçûn
Zêde bi pêş de neçûn. **Wan ew qas hewl dan, lê mixabin **çirtekê jî bi pêş de neçûn**.* (qerf)

Çirtik avêtin
Şad bûn, kêfxweş bûn. **Çima ku dergistiyê wê ji metropolê hatiye, Kewo **çirtikan diavêje**.*

Çirtik avêtin (yekî)
Jê aciz bûn, nexwestin. **Kengî mêrik zengîn bû, **çirtik avêtin jina xwe**.*

Çirtovirto (pirtoyî) kirin
Hewlogewloyî kirin, bêpergal pêk anîn. **Kevok tim karên **çirtovirto dike**.* (argo)

Çiv dan xwe
1. Xwe vedizîn, veşartin. **2.** Ji vatinî û binbariyê revîn. **Tam di dema kar de Miraz **çivek da xwe** û ji holê winda bû.*

Çivîk çivîk e, avê vedixwe, li ser xwe re li Xwedê dinêre.
Hinek be jî wîjdan û însaf divê. **Kuro, hinek bi merhemet bike. **Çivîk çivîk e, avê vedixwe, li ser xwe re li Xwedê dinêre.***

Çivîka wîlwîlanî ez kor bûm min nezanî, te (çima) mala xwe xera kir, konê min jî pê re danî.
Ji bo karên bêwext û ne li rê tê gotin. Ango, te ziyan hem da xwe, hem jî da min. **Ma ji wê kirina te kê kêrek dît? Wekî got: **"Çivîka wîlwîlanî ez kor bûm min nezanî, te mala xwe xera kir konê min jî pê re danî!"*** (bnr. çîrok)

"Çivîka wîlwîlanî ez kor bûm min nezanî, te (çima) mala xwe xera kir, konê min jî pê re danî."

Mirovekî xwedî pez ji bo ku derkeve zozanan li benda dengê pepûkê ye. Çimkî dema ku pepûk dikin kûkekûk (pûkepûk), her kes dizane ku dema derketina zozanan e. Salekê dem hê tam ne dema derketina pêz e. lê mirov mêze dike ku dengê pepûkê

Çivîka Xwedê rûçikandin

Tawanek an jî karekî xerab kirin. **Çima, ma min **çivîka Xwedê rûçikandibû** ku ew qas xirabî hatin pêşiya min?*

Çivîkan lê wîq negotin

Ji cihê xalî ango kes lê tune re tê gotin. **Mala wî li cihekî wisa ye ku, **çivîkan lê wîq negotiye**.*

Çiya dan milê xwe

Fedakarî û keda bêsînor dan. **Ji bo ku debara zaokên xwe bike, Fêris **çiya didan milê xwe**.*

Çiya dayîn pişta xwe

bnr: Çiya dana milê xwe

Çiya golik anîn

Jê hêviyek û hêzeke mezin kirin, lê encameke pir piçûk derketin. **Me hêviyeke pir mezin jê dikir, lê di dawiyê de **çiya golik anî**.*

Çizînî ji dilê (yekî) çûn

Gelekî xemgîn bûn. **"Destê sibehê Melîha bi êşa stûyê xwe hişyar bû. Dema ku çav bi mêrê xwe û neviyê xwe yê razayî xist, çizînî ji dilê wê çû."* Mehmet Dicle

Çizinî bi dilê (yekî) ketin

bnr. Çizînî ji dilê (yekî) çûn

Çizînî li kezebê ketin

bnr: Çizînî ji dilê (yekî) çûn

Çîk jê weşîn

Pir hêrs bûn. **Apê Îsmet wer bûbû ku **çik jê diweşîn**.*

Çirînî û pirînî (tirînî) ji hev û din kifş bûn

bnr: Heyfa dêreyê te ye dayê, neqelişîne, çirînî û pirînî ji hev û din kifş e. *(*bnr: çîrok)*

Çok danîn erdê

Welidîn, zarok anîn. **Diyarî ji bo wan dayîkan ku ev zimanê şîrîn parastine, **çok dane erdê** û ev mirovên çê anîne..."* Zana Farqînî

---

tê. Derdikeve li ber dêrî bi çavên xwe dibîne ku pepûkeke melonestoyî bi rastî jî dike kûkekûk. Mêrik her çiqas hinekî ecêbmayî jî dimîne, lê dizane ku rewşa xwezayê çûk û sewal baştir dizanin. Diçe hundir û ji jina xwe re dibêje:
"Jmik wa ye pepûk dike kûkekûk, êdî dema derketina zozanan hatiye. Rabe em haziriya xwe bikin." Mêrik tevî malbata xwe amadekariya xwe dike, keriyê pezê xwe dibe zozanan û konê xwe vedigire. Lê ji ber ku hê ne dema derketina zozanan bûye, hewa ji nişkê ve xera dibe û di demeke kurt de pezê wî ji ber hewaya sar, sir û seqemê dicemide, winda dibe, dibe xwerê gur û çeqelan û bi vî awayî nîvê keriyê wî telef dibe. Ji ber bayê zexm konê wî dikeve, stûnên wî dişikin û tevî malbata xwe perişan dibe. Piştî hinek kêmbûna ba û bagerê mêrik derdikeve ku li rewşê mêze bike, lê dinêre ku wa ye ew pepûka ku li ber derê wî kûkekeûk dikir û bûbû sedema zûderketina wî, ji ber sir û sermayê miriye û li ber hebinên kon dirêj bûye. Xwediyê pêz tê ser laşê pepûkê, bi hêrs û xemgînî dibêje:
"Çivîka wilwîlanî, ez kor bûm min nezanî, te çima) mala xwe xera kir, konê min jî pê re danî."

Çok kutan erdê
Inyat kirin. **Wan kir û nekir Kindo **çok kuta erdê** û dev ji gotina xwe berneda.*

Çok lê lerizîn
1. Tirsîn, xof girtin. **2.** Ketin nav xiroş û heyecanê. **Çawa ku çav bi wî ket, ji tirsan **çokên wê lerizin**. *Ez ku wê keçikê dibînim, **çokên min dilerizin**.*

Çok lê sist bûn
1. Westîn, betilîn. **2.** Hêvî şikestin, moral xerab bûn. **Pişti ew qas riyê,* **çokên min sist bûn** *û ez di cih de ketim. *Wî çawa ku ew nûçe bihîst, **çok lê sist bûn**.*

Çok (çong) lê şikestin
1. Moral xerab bûn. **2.** Bêhêz man. **Dema ku jinikê mêrê xwe di milê wê jinika çûr de dît, **çok lê şikestin**. *"Dilê wê bi xurtî lê da, **çong lê şikestin** û kete rewşeke wiha ku nema karibû gavên xwe biavêje."* Bavê Nazê

Çok şidandin
Lezandin, bi lez meşîn. **Heke me **çok neşidandina**, em ê bimana nîvê şevê.*

Çoka (çonga) xwe kutan
Poşman bûn. **Piştî ku keçika wî revî, **çoka xwe kuta** lê mixabin ku çivîk ji hêlînê qetiyabû.*

Çoka xwe dayîn ber zikê xwe
Li hember birçîbûnê li ber xwe dan. **Helbet tu **çiqas çoka xwe bidî ber zikê xwe** jî tu ji birçîbûnê xelas nabî.*

Çoka xwe dayîn erdê
Pir biinyat bûn.**Me kir û nekir; wê **çoka xwe danî erdê** û bi gotina xwe kir.*

Çokên (yekî) nesekinîn
Bêhêz bûn, xwe şipê negirtin. **Ez dibêjim **çokên wî nasekinin**, tu qala çi dikî.*

Çokên xwe nerm kirin
Xwe rehet kirin. (Ji lîstinê têr bûn.) **Daweta Delîl xweş bû, me **çokên xwe baş nerm kirin**.*

Çol û hol kirin
Belawela kirin. **Moxolan bi erîşên xwe yên hov her der **çol û hol kirine**.*

Çolbir lê xistin
Kurt birîn. Di riya herî kurt de çûn. **Wan gelekî dirêj kir lê Kamer hema **çolbir lê xist** û dawî lê anî.*

Çomax kirin qula mozan
bnr. Tiliya xwe xistina qula mêşan

Çomaxê xwe bi ser (yekî) de hejandin
Gef xwarin, tehdît kirin. **Belgînê wisa **çomaxê xwe bi ser mêrê xwe de hejand** ku ez jê tirsiyam.*

Çomaxê xwe li defa (yekî) xistin

Bi karên hinekên din re têkildar bûn. Xwe li stûyê hinekên din ferz kirin. **Heyran tu çima **çomaxê xwe li defa wan dixî**, berde bila ew bi xwe karê xwe bimeşînin.*

Çov di ser çov re kirin

Gelekî israr kirin. **Wan ew qas **çov di ser çov re kirin** ku di dawiyê de me jî pejirand.*

Çov li kewê neket, kew li çov ket.

bnr. Kevir li kewê neket, kew li kêvir ket.

Çov nagihandin xwe

Xetayekê nake ku kes zirarekê bidiyê yan jî rexne bike. ** "Sê kerê min hene û niha li xanê girêdayî ne. Yek ji wan gelekî xurt e, **çov nagihîne xwe**." Zinar Soran

Çovê (yekî) giran bûn

Bibandor bûn. **Hûn wisa bi çavekî li wî mêze nekin, **çovê wî li wê herêmê pir giran e**.*

Çovê xwe di bin çovê kesî re nekirin

Xwe zehf zêde hesibandin. **Ew mirovekî balkêş e, tu car **çovê xwe di bin çovê kesî re nake**.*

Çovê xwe tûj kirin

Xwe ji şer re amade kirin. **Xembar **çovê xwe jê re yeman tûj kiribû** lê Gulanê xwe nexist hevala wî axozî.*

Çû bajêr û got: "Baba kenger nerede biter?"[*]

Ji bo kesên ku ji xwe biyan dibin, eslê xwe winda dikin tê gotin. **Ew meseleya ku dibêjin, **çû bajêr û got: "Baba kenger nerede biter?"** bûye ya Xosrof.*

Çû bêhna kebaban, nihêrî keran dax dikin.

Bi hêviya tiştekî baş çûn lê laqî tiştên nebaş hatin. **Bawa, hew dizanîbû hema li wî welatî zêran belav dikin, lê **çû bêhna kebaban, nihêrî keran dax dikin**.*

Çû dermanê mîzê, gû lê esirî.

Li rastî ya hê xerabtir hatin. **Zeydan got, ez herim Stenbolê ku jiyana zarokên xwe xilas bikim, lê **çû dermanê mîzê, gû lê esirî**.*

Çû Gergerê, hat dîsa ew kerê berê.

Tiştek nehat guherandin. **Me got dibe ku piştî Ewropa û ew qas xwendinê bibe tiştekî, lê **çû Gergerê, hat dîsa ew kerê berê**.*

Çû gundê nenas pesnê xwe da bêqiyas.

Ji ber ku kes nas nake, li cihê xerîb pesnê xwe dan, derew kirin. **Çawa hebe kes wî nas nake. **Çû gundê nenas pesnê xwe da bêqiyas.***

---

[*] **Baba kenger nerede biter?:** Bavo kereng li ku hêşîn tên?

Çû hecê kêr, vegeriya gûzan
Hê xerabtir bûn. *_Me got piştî hecê wê baş bibe, lê **çû hecê kêr, vegeriya gûzan**._

Çû heyfa bavê, qûna dê jî da ser. (Çû ji bo heyfa dê, qûna bavê jî da ser.)
Bi armanca pêkanînê çûn, lê bi ziyaneke hê girantir vegerîn. *_Ew reben jî **çû ji bo heyfa dê, qûna bavê jî da ser**._

Çû karê, bizin da bi karê.
bnr: Çû heyfa bavê, qûna dê jî da ser.

Çû karê kar jî nebû, bi tayê jî ket.
bnr: Çû heyfa bavê, qûna dê jî da ser.

Çû Rewanê birinc, ji sawarê malê jî bû.
bnr: Çû heyfa bavê, qûna dê jî da ser.

Çû ser darê, dara bin xwe birî.
Ji bo karên bêhesab û berevajî tê gotin. *_Elîşer hesabê baş nekir, çû ser darê, dara bin xwe birî._

Çûk e, diçe li ser hêkên betan rûdine.
Zerengî û hempayê xwe nezanîn . *_Ezbenî dîvê mirov cih û warê xwe bizanibe, bi xwe **çûk e, diçe li ser hêkên betan rûdine**._

Çûkên Xwedê peritandin
Tawaneke girîng kirin. *_"-Xwedêyo, ma min **çûkên te peritandibûn**, te ev anî serê min..."_
Qado Şêrîn

Çûkan zimanê (yekî) xwarin
Ji bo kesên ku napeyivin tê bikaranîn. Xeber nedan. *_Te digot qey **çûkan zimanê wê xwariye**, qet sewt li ser neket._

Çûkan xem e, Xabûr çem e.
Ji bo kesên ku bi hêsanî pêk tînin, ne pirsgirêk e. *_Ev ê porkur, hay ji hêz û zerengiya wan nîn e, nizane ku **çûkan xem e, Xabûr çem e**._

Çûkeçûk kirin
Tim bi kesekî de yan jî bi xwe de jenîn. Porteport kirin. *_Zelalê lingî hêrs bûbû heta êvarê bi ser zarokên xwe de **çûkeçûk kir**._

Çûkê bira(yan), çêlikê guran
bnr: Bila kûçikê gundan bim, ne piçûkê birayan bim

Çûm li serê çiya(yan), zûriyam weke gura(n), birazî nabin bira.
Birazî jî nêzîk in, lê dewsa birayan nagirin. *_Şûna birayan cuda ye, loma gotine: **"Çûm li serê çiya, zûriyam weke gura, birazî nabin bira!"**_

Çûme derve Fatekor, hatim hundir Xatekor.
Ji bo rewşa monoton û wekî hev tê bikaranîn. **Ez hetikîm, nizanim ku çi bikim,* ***diçim derve Fatekor, têm hundir Xatekor.***

Çûme mala apê xwe ketime kapê xwe.
Bi hêviyeke baş çûn, lê li rastî rewşeke baş nehatin. ****Çûme mala apê xwe, ketime kapê xwe.*** *Min çi hêvî kir, li rastî çi hatim?*

Çûn dewsa miriya(n), hemû kes li miriyê (ji bo miriyê) xwe giriya.
Her kes bi halê xwe dişewite. **Lawo erê, vatinî û şertên cînariyê jî hene lê got:* ***"Çûn dewsa miriya, her kes ji bo miriyê xwe giriya."***

Çûn tolana segan, li hestiyan geriyan.
Ji bo karên vala û pûç tê gotin. **Ma ya ku ew dikin jî aqil e?* ***Çûne tolana segan li hestiyan digerin.***

Çûn welatê keran, anîn barê per(ey)an.
Kesên jîr û çavbel, bi saya mirovên saf û nezan derfetan bi dest dixin. ****Çûn welatê keran, anîn barê peran.*** *Ên xêvik û hişsivik nebin, ew ê çawa debara xwe bikin?*

Çûn aliyê din
Mirin. **Min got, bi ew qas guleyan ew* ***naçe aliyê din****. Bi rastî jî şeş mehan bi şûn de ew bû wekî berazan.* (argo)

Çûn ber darê sêpikê
Çûn ber darê êxdamê. **Li hemberî wan kirinên xwe ew* ***çû ber darê sêpikê****, lê dîsa vegerî.*

Çûn ber gêris
bnr. Çûn ber tira golikan

Çûn ber golikan
bnr. Çûn ber tira golikan

Çûn ber kapê mirinê
bnr. Çûn ber darê sêpikê

Çûn ber kindir
bnr. Çûn ber darê sêpikê

Çûn ber ocaxa (yekî)
Ji malekê qîz xwestin. **Şirînê got: "Me hûn ji xwe re hempa nedîta* ***em nedihatin ber ocaxa we?"***

Çûn ber pêlavan
Bêrûmet bûn. **Li wir, di navîna salekê de Seyîd* ***çû ber pêlavan****.*

Çûn ber rehma Xwedê (Çûn ber emrê Xwedê)
bnr. Çûn aliyê din

Çûn ber tira golikan

Bêrûmet û bêqedir bûn. **Berê gelekî rûmet didan wî zavayê xwe, lê dû re ew jî **çû ber tira golikan**.*

Çûn ber tira dehşikan (keran)

bnr: Çûn ber tira golikan

Çûn çolê

Li hêla Serhedê ji bo kesên ku tevî refên gerîlayan dibin tê gotin. **Ev çendek e ku lawê Mamoste Tajdîn nayê xuyan, dibêjin ew jî **çûye çolê**.*

Çûn dest û piyên (yekî)

Lavayî kirin. **Di wî emrê xwe de rebenê Şêxmûs **çû dest û piyê wê**, dîsa jî nepejirand.*

Çûn dinyayeke din

Çûn an jî ketin nav hest, hawir û rewşeke din. **"Ji kêliya ku min ew xeber bihîst û piştre, êdî min hew dikaribû axaftina Lûqman bibihîsim. Ez **çûme dinyayeke din**. Min nikaribû, bigirîm jî."* Hêvîdar Zana

Çûn ber agirê (yekî)

Ji bo keçik xwestinê çûn mala bavê keçikê. **Em **çûne ber agirê Mala Çetoyê Guro**, wî jî em neşikandin.*

Çûn li ber kapê xwe sekinîn

1. Berpirsyarî yan jî vatiniya xwe bi cih anîn. **2.** Sûcê xwe pejirandin. **Wî jî gelekî çiv dane xwe, lê di dawiyê de çû li ber kapê xwe sekinî. *Lê mêze kir ku bi înkarê nabe, ya rastî pejîrand û **çû li ber kapê xwe sekinî**.*

Çûn ber rehma Xwedê

bnr: Canê xwe teslîmî rehma Xwedê kirin

Çûn ser cihên xwe

Ji bo mêrên ku bi jina xwe re dikevin têkiliya zayendî tê gotin. **Mêrik, rewşa bûka me û lawê me ne baş e, ev meh û nîv e ku lawik **neçûye ser cihên xwe**.*

Çûn ser serê (yekî)

Li ser stûyê yekî bar bûn. **Wî jî lê nihêrî ku xebat ne hêsan e, **çû ser serê lawê xwe**.*

Çûn lingên (yekî)

Ji kesekî re ji mecbûrî yan jî ji ber têkçûnê rûmet nîşan dan. **Ez **çûme lingên wî kûçikî**, lê dîsa jî tiştek nebû, êdî ez çi bikim?*

Çûn perê esmanan

Çûn cihekî dûr ku bi dest neketin, şûn qewîn bûn. **"Bi leza ba dilezî. Ji bejn û bala wî min got hebe nebe yê duhî ye, îro heke **biçe ber perên esmanan** jî ji destê min xilas nabe."* Eladdîn Secadî

Çûn pişta (yekî)
Alîkariya yekî kirin. **Heke mala Şemê* ***neçûya pişta Seyîd****, halê wî perîşan bû.*

Çûn ser cih (nivînê)
Ketin têkiliya zayendî. **"-Yabo ez nikarim jinbira xwe bînim. Ez ê çawa* ***biçim ser nivîna hirayê xwe****?"* Kamîran Haco

Çûn ser gulên sor
Çûn nav rewşeke pir xweş? **Ma ez ê* ***herim ser gulên sor****? Ez baş dizanim ku ew der ji vir jî xerabtir e.*

Çûn ser kirasê (yekî)
Şibandina yekî, xwe weke yekî kirin. **Zezê jî* ***çûye ser kirasê Fadîmeyê****.*

Çûn ser kurmê (yekî)
Wekî cir û xisletê yekî tevgerîn. **Heyder jî hema* ***çûye ser kurmê bavê xwe****.*

Çûne heyfa Koço, qafê Helo jî dane ser.
bnr: Çû heyfa bavê, qûna dê jî da ser

Çûr qûr kirin
Bi awayekî hovane dest dan ser tiştekî. **Ew hat, ew qezenca me ya şeş mehan* ***çûr qûr kir*** *û bir çû.*

Çûye ji miriyan re kefen bîne.
bnr: Mirî mirin, Egît bişînin kefen.

Çûye ji nexweşan re berfê bîne.
bnr: Mirî mirin, Egît bişînin kefen.

Çûyîn ew çûyîn bûn
Carek din xuya nekirin. *****Çûyîn ew çûyîn bû****, careke din tu kesî ew nedît.*

Çûyîn hebûn, hatin tune bûn
Lawo înşelah* ***çûyîna te hebe, hatina te tune be**.* (nifir)

Çûyîn ji me, hatin ji Xwedê.
Çûn jixwe va ye pêk tê, lê veger ne xuya ye. **Ez çi bibêjim lawo?* ***Çûyîn ji me, hatin ji Xwedê!***

D

Da bi tetikan, li pey gerî bi pepikan. (Da kitikan, geriya bi pepikan.)
bnr. Bi tetikan dayîn, bi pepikan li pey gerîn

Da kes weke wî bi şev li kerê xwe nagere.
Ji bo kesên ku karên çiloçepoyî dikin tê bi kar anîn. **Na heyran, **da kes wekî Xembar bi şev li kerê xwe nagere.*** (qerf)

Da min mistek, xistim pistek.
Ji bo tiştekî piçûk ketin bin mineteke mezin. **Segê min bi mineta wê de, **da min mistek, xistim pistek.***

Da tu bizanibî dew birayê mast e!
Tu bizanibe ku ka kî li piştê kê ye, kî dost û kî dijmin e. **Belê min ew yek eşkere kir da ku **tu bizanibî dew birayê mast e.***

Dan ez dikutim, lê intîn ji wî tê.
Hinek kedê dikin, hinek jî xwe wekî kedkir nîşan didin. **Kuro ew Hecî Şemsî çi fasiq e, **dan ez dikute, intîn ji wî tê.***

Dan ber bîna xwe
Ji yekî re ekis çûn. **Vê mamostayê, lawê min **daye ber bîna xwe** û pê re baş têkildar nabe.*

Dan ber çavên xwe (çavan)
1. Rewş nirxandin. **2.** Xwe ji her tiştî re amade kirin. **3.** Ji ber çavê xwe neqetandin. **Min jî rewş **da ber çavên xwe**, bi rastî jî karekî ne xerab e. *Wî ew rîsk hemû **dane ber çavên xwe**. *Ew **dabû ber çavên** xwe ku kes nebe.*

Dan ber daran
Lêdan, li yekî xistin. **Kazim ji keçikê re dabû xeberan, birayê keçikê jî ew **dabû ber daran.***

Dan ber qefesa xwe
Parastin. **Ew qas dilnexwazên Xunavê hebûn, lê xalê wê ew **da ber qefesa xwe** û nehişt tu xerabiyê pê bikin.*

Dan ber rûyê xwe

Pê rewşa xwe ya nebaş xelas kirin. **Dema mêvanên min tên, hema ez wan hêkên mirîşkên xwe* ***didim ber rûyê xwe*** *û xwe ji rezîliyê xelas dikim.*

Dan ber xwe

Bi ser de qelibîn, lê li ba ketin, tapan kirin. **Mêrên malbata Şêrgo, yên din* ***dane ber xwe*** *û ew li çiyê asê kirin.*

Dan bin baskên xwe

Parastin, lê xwedî derketin. **"Kesekî ku wê* ***bide ber per û 'baskên xwe*** *û biparêze tune bû. Asê kelogirî bû."* Talip Kalın

Dan bin dêla hev (Dayîn bi boçika hev û din)

Bi hev û din re pev çûn. **Çend mehan ji hev û din re baş bûn, lê dû re* ***dane bin dêla hev.***

Dan bin piçenga (yekî)

Pesnê yekî dan, têfirandin, nepixandin. **Çîmen û Gulbiharê wisa* ***dane bin piçenga Kevokê*** *ku di encamê de ew li belayê asê kirin.*

Dan bin guhên hev û din

Li hev du dan, li hev du xistin. **Herduyan jî wisa* ***dane bin guhên hev û din*** *ku nayê gotin.*

Dan ser dilê (yekî)

Dilê yekî zêde kelijandin. **Reva keçika Seyad* ***da ser dilê wî.***

Dan ser pişta (yekî)

bnr. Li pey kesekî revîn

Dan ser rê

Dest bi çûyîna rê kirin. **Wan* ***dan ser rê*** *û çûn, ez jî zivirîm malê.*

Dan şek û pekan

Dest bi fend û fûtan kirin. **Zeydan mêze kir ku pê nikare, xwe* ***da şek û pekan.***

Dan û standin

1. Di nav têkiliyê de bûn. **2.** Bazirganî kirin. **"Min xwend demekî. Pê re jî hevalan, dostan û her çi kesên ku çi dizanibûn me bi wan re* ***da û stend."*** Şivan Perwer **Mirov zêdetir ku* ***bidin û bistînin*** *dikarin dewlemend bibin.*

Danavî kirin

bnr. Goştê canê yekî xwe xwarin

Danî di dizmencekê de nekelîn

Li hev nekirin, bi hev û din re debar nekirin. **"Her ji destpêkê de* ***daniyên wê ligel ên mala babê Camêr di dîzmencekê de nedikelîn."*** Îbrahîm Ehmed

Danîn dewsa meriv û însanan

Rûmet dan. **Min ew **danî dewsa meriv û însanan**, lê wî kirina min fêm nekir.*

Danîn ber berê reş

Reben û perîşan kirin, mal û milk belawela kirin. **Bavê keçikê bi qelenê qîza xwe Kemal wisa şofand ku **da ber berê reş**.*

Danîn ber dêrî

Qewirandin. **Min ji te re negot ew ê di demeke kurt de te **bide ber dêrî**?*

Danûk berdan dawa sêwiyan, kîrê wan rabû.

Yên ku nedîtek bin, dema ku dibînin xwe winda dikin. *****Danûk berdan dawa sêwiyan, kîrê wan rabû.*** *Yên ku di dema bingehîn de bi xwezahî têr nebûbin wer dibin.*

Dar bitû ye, xwedî bitûle ye.

Yên ku malên wan hebin, hêza wan a xwe parastinê jî heye. **Mal û milk dibe sedema hêzê jî, çand û zanebûnê jî. **Dar bitû ye, xwedî bitûle ye.***

Dar bir verotinê, mirov bi gotinê

Bi axaftinê ve mirov dikare tiştinan bide fêr kirin. **Bi xweşikahiyê bibêje lawo! **Dar bir verotinê, mirov bi gotinê.***

Dar dikeve, (gelo) berî bi ku ve?! (Dar dikeve gulî bi ku de?!)

Dawî wê çawa be, li ku bisekine, kes nizane. **Wisa pêşîn xeber nede, ka hela **dar dikeve gelo berî bi ku ve**?!*

Dargopalê xwe danîn

Dev ji dozê berdan. Têkoşîn nekirin. **Keçikê mêr kir, dû re dargopalê xwe danî û qala welat nekir.*

Dar li kewê neket, kew li darê ket.

bnr. Kevir li kewê neket, kew li kêvir ket.

Dar xistin qula mêşan

bnr. Tiliya xwe xistin qula mêşan

Dara bin xwe birîn

bnr. Çû ser darê, dara bin xwe birî.

Dara ku berê wê naxwim, av nadim.

Tenê li berjewendiyên xwe fikirîn. **Ji min re çi, pêşeroj, mêşeroj, **dara ku berê wê naxwim, av nadim**.*

Dara mirazê, mirazê (yekî) kirin

Daxwaza yekî bi cih anîn. *****Dara mirazê, mirazê wî kiriye**, êdî ji wê zêdetir çi dixwaze?*

Dara pûç bûn

Her çiqas xuyang xweş bê xuyan jî naverok vala bûn. *"*Çav bi bejn û bala kurê xwe ketine, lê nizanin **dara pûç e**. Yekî bêhiş û feresat e."* Sîme Semend

Dara qetlê bûn

Bûn bela, dev jê bernedan. **Ez çawa bikim, ev **bûye dara qetlê**, dev ji min bernade.*

Dara şikestî bûn

Bêhêz, bêderfet, û qels bûn. **Heta ku jin **"dara şikestî" be**, civak jî ji şikestinê rizgar nabe.*

Darbiro daran bibir, gumana xwe ji Xwedê nebir.

Divê hêvî her tim hebe. ***Darbiro daran bibir, gumana xwe ji Xwedê nebir.** Çi dibe bila bibe, divê mirov bêhêvî nebe.*

Darek girtin, hezar dar hejandin

Ji bo doz û pirsgirêka kesekî, gelek kesên din ê ne têkildar jî tevlî kirin. **Lawo, tu **darekê digirî, hezar daran dihejînî**, ji wî re hêrs dibî, tu çima zarokên din tevlî şerê xwe dikî?*

Darê piştê bûn

Bi gelemperî ji bo exrebeyên zêde nêzîk tê bikaranîn. **Têkiliyên we qet ne baş in, qaşo hûn **darê pişta hev in**?*

Darekê têxe (dixe) qûna wî, kulîlkekê dide ber bêhna wî.

Ji bo helwestên berevajî tê bikaranîn. **Ew çawa helwest e, min tiştek jê fêm nekir. **Darekê dixe qûna wî, kulîlkekê dide ber bêhna wî.***

Darinde bûn

Alîkarî kirin. **Xwedê jê razî be, heke Almasta Yargulê **darinde nebûya**, gelo halê me dê çawa bûya?*

Darikê xwe xistin nava gû û tev dan

Fesadî kirin. **Ji xwe karê wî tevdan e, hema çawa hat, **darikê xwe xiste nava gû û tev da**.*

Darî xwar e, hosteyî rast e.

Derfet zêde ne baş bin jî, hosteyî bihuner e. ***Darî xwar e, lê şikir ji Xwedê re ku hosteyî rast e**.*

Daro şikesto, xwaro besto

bnr. Rasto bi rastiyo, xwaro darê şikestiyo

Darqûn kirin

1. Qewirandin. **2.** Rezîl kirin. **Hê şeş meh temam nebûbûn, Gulîzer **darqûn kirin** û ew şandin mala bavê wê. **Di navbera sê mehan de hûka xwe **darqûn kirin**.*

Das lê neketin (Das lêneketî bûn)

bnr. Nexeritandî bûn

Dasek û dehlek

Mirov bi derfeteke pir piçûk nikare tiştên pir mezin pêk bîne. **İnsaf kuro lawo însaf! **Dasek û dehlek?** Ev ê çawa ew qas barî hilgire?*

Daşandin (yekî)

Li yekî xistin. **Faysalê Şemso hema ji Xwedê şerm nekir, çend heb **daşandin Bengînê**.* (argo)

Datika[1] (yekî) gayîn

Xistin rewşeke xerab. **Xelef **datika wî ga** û ew pereyên ku qezenc kiribûn hemû ji xwe re hildan.*

Dawa (yekî) hilgirtin

Eyba yekî derxistin der. **Pelşînê **dawa wê hilgirt** û ew di nav êl û alemê de rezîl kir.*

Daw û delingên xwe hildan (çikandin, hilgaftin)

Xwe ji bo hewldanekê amade kirin. **"Her tim te didît ku **daw û delingên xwe çikandine** û li ber çem e."* Selman Dilovan

Dawa xwe dayîn ser serê xwe

Ji bo jinên bêar û bêheya tê bikaranîn. **Çi ye dîsa vê jinikê **dawa xwe daye ser serê xwe**, derketiye meydanê, ma xwediyên vê tune ne?*

Dawa xwe xistin devê xwe

Amadekariya revê kirin. **Evîndê **dawa xwe xiste devê** xwe û baz da.*

Dawê agir girtin

bnr. Agir bi qûnê ketin

Dawet daweta mîran, agir ketiye feqîran.

Tatêl û xiroşa zengîn û began feqîr dikişînin. *****Dawet daweta mîran, agir ketiye feqîran.** Heyran ji te re çi derdê wan?*

Dawet firikî (fetikî, fetilî) berbû(k) hetikî.

Her kes li kêfa xwe dinêre, bar di stûyê berpirsyar de ye. **Berpirsyarî zor e, **dawet firikî, berbûk hetikî**.*

Daweta duduyan e, gera qûna hemûyan e.

bnr. Daweta duduyan e, girê hemûyan e.

Daweta duduyan e, girê hemûyan e. (Daweta du kesan e, agir ketiye hemû kesan e.)

Gelek caran hin tiştên balkêş ji xwediyê sukurê zêdetir, yên li der û dor têkildar dikin. **Ew jî taybetiyek mirovan e. **Daweta duduyan e, girê hemûyan e.***

Daweta mirtiban e, mirtib bi xwe lê didin.

---

[1] **Datik**: Dayik, dê, mak

Jixwe tiştên ku lê digerin hatiye li ber derê wan, çawa pêk neyînin? Ango, ya xwezayî ew e, ew jî dibe. **Got kor ji Xwedê dixwest çavek, Xwedê dayê du çav.* ***Daweta mirtiban e, mirtib bi xwe lê didin?***

Dawiya kadîna xwe rê (nîşanî) her kesî nedan

Sir û razên xwe ji kesî re eşkere nekirin. **Ew ne mirovekî wisan e ku* ***dawiya kadîna xwe rê her kesî bide.***

Dawî betal bûn

bnr. Dawî pûç bûn

Dawî bi xêr hatin

bnr. Dawî bi xwe re anîn

Dawiya (yekî) bi xwe re anîn

Encam erênî bûn. **Di destpêkê de rewşa zarokên Barî ne baş bû, lê şikir ji Xwedê re* ***dawiya wan bi xêr hat.***

Dawî lê anîn

1. Kuta kirin. **2.** Heya dawiyê bi serkeftî pêk anîn. **Heya me xwe gihandê wê,* ***dawî lê anîbû*** *jî. *Min got nikare pêk bîne, lê eferim, Rizgar* ***dawî lê anî.***

Dawî pê re hatin

bnr. Dawî bi xwe re anîn

Dawî ... pûç bûn

Encam vala derketin. **Tu çi dikî bike, karên ne rast û ne dirist* ***dawiya wan pûç e.***

Dawî ... tune bûn

Ji bo karên bêencam û neyînî tê bikaranîn. **Lawo min ji te re negot* ***dawiya wan karên sexte tune ye?***

Dawo, geriyawo

Yê ku dide, gelek caran bi xwe aciz dibe. *****Dawo, geriyawo****, min ji te re negot nede?*

Dax be û li destê sax be.

Bila ehed û şerd be. **Heke ez carek din wer bikim;* ***bila dax be û li destê sax be.*** (sond)

Daweşandin eyarê (yekî)

Li yekî dan, lê xistin. **Çima ku lawik ji keça wan re dabû xeberan, birayê keçikê* ***daweşande eyarê gede.*** (argo)

Daxilê (yekî) bûn

Ketin ber bext û bandora yekî. *****Ez daxilê te me****, divê tu vê pirsgirêka min çareser bikî!*

Daxwaza (yekî) di zik de hiştin

Armanc û daxwaz asteng kirin. **"... di dema erîşa leşkerê Ûrisan de leşkerekî xwestiye*

ku xirabiyê bi xaltiya Hewê bike, feqet wê ev ***daxwaza leşker di zikê wî de liştiye.***" Nûbar Asan

Dayê belayê, xwîşkê talhişkê, jinê erekolika minê, te bigerînim li dora dinê.
Ji bo kesên ku gelekî di bin bandora jina xwe de dimînin tê gotin. *Çi gotine: ***"Dayê belayê, xwîşkê tallişkê, jinê erekolika minê, te bigerînim li dora dinê."*** *Ji bo Eliyê Goze Qûnekê tenê jina wî ye, yê din hemû hûr û pizûr in.*

Dayê buhikê, jinê ruhikê
bnr. Dayê belayê, xwîşkê talhişkê, jinê erekolika minê, te bigerînim li dora dinê

Dayê, ya ku tu dibêjî min derda ye.
Kar ji kar(î) derbas bûn, dereng man. *Tu rast dibê jî ***dayê, lê ya ku tu dibêjî min derda ye.***

Dayîk hat ji der ve, Xwedê rabû di ber de.
Rûmeta dayîkan zehf zêde ye. ****Dayîk hat ji der ve, Xwedê rabû di ber de.*** *Bi rastî jî di vê dinê de divê cihê dayîkan pir cuda û bilind be.*

Dayika du dotan, li xwe dide du lotan, ne li vir, ne li Cizîra Botan.
Dayîktiya qîzan karekî dijwar e. ****Dayika du dotan, li xwe dide du lotan, ne li vir, ne li Cizîra Botan.*** *Rastî jî dayîktiya keçan zor e.*

Dayîn ber bayê
Ked û qezenc vala çûn. *Wî bêmirazê Zubêt ew keda me tev ***da ber bayê*** û çû.

Dayîn ber çavan
Nîşan dan, li ber çavan raxistin. *"*Li ser van gotinên pêşiyan, nêrînên Bedîuzeman Seîdê Kurdî ku nêzîkî sed sal berê di Munazarata xwe de aniye ziman û rewşa îro* ***didim ber çav****, tu cudatiyeke nabînim."* M. Rauf Çiçek

Dayîn ber dilê xwe
Pê sebir û tebatiya xwe anîn. *Cemîleyê jî ew yek ***da ber dilê xwe*** û dozdeh salan wer debara xwe kir.*

Dayîn ber hev
Qiyas kirin. Li gorî hev nirxandin. *Ez difikirim û ***didim ber hev****; bi rastî jî ev jinik ji bo min şansekî mezin e.*

Dayîn boçika xwe
Bitrî bûn, mineta xwe negirtin. *İsal bûka Newrozê ***daye boçika xwe,*** çi be jî ji xesûya xwe re dibêje.*

Dayîn çoyê xwe
Li hember sekinîn, li ber rabûn. *"*Her weha notilî berpirsyarekî dilxwaz ji bo gel û welatê xwe dixebite. Û li hember bişavtin û tunekirinê* ***dide çoyê xwe.***" Ahmet Kaya

Dayîn dest

Teslîm kirin. Êxbar kirin. **Heke wî sebavî birazîyê min* ***nedaye dest****, niha li dibistana xwe dixwend.*

Dayîn stûyê xwe

bnr. Hildan ser xwe

Dayîn nav avê

Giut (noq) bûn nav derd û kulan. **Enîs* ***daye nav avê****, êdî wê ji çi bitirse?*

Dayîn pey

1. Li dû şopa yekî çûn, girêdayî kesekî yan jî armancekê bûn. **2.** Ji bo girtinê erîşî ser kesekî kirin. **Zinar here ku ew jî* ***dide pey****. *Serkan revî, Faris* ***da pey****, best û beyar dane ber wî.*

Dayîn ser dilê (yekî)

Ji tiştekî yan jî ji kesekî zêde êşîn, aciz bûn. **Wê êdî* ***da ser dilê min****, ji îro şûn de rewş dê cuda be.*

Dayîn ser xênî

1. Rê û dirb nezanîn. **2.** Raz û sir gotin. **Nisret hekê pekê nizane, hema* ***dide ser xênî*** *û diçe. *Xwezî min jê re negota, wî* ***da ser xênî*** *û çi hebû yeko yeko rêz kir.*

Dayîn ser xatirê (yekî)

Ji bo rûmeta kesekî daxwazî (lavayî) wî kirin. **Weleh min ew* ***da ser xatirê te****, naxwe tu kesî nikarîbû ew ji nav lepên min xelas bikira.*

Dayîna Xwedê bûn

Her çi hebe erênî yan jî neyînî Xwedê kiriye. **"De were, madem te ev qencî bi min kiriye, ez û tu em ê xezîneyê derxin, heta em sax bin, besî me ye. Ev jî* ***dana Xwedê ye****."* Emin Ekinci

De bixwe, kero çawan e?

Tu niha ketî derka ya xerabtir? **"De bixwe, kero çawan e?...Xwedê dabû te, te nizanibû bixwara. Ma tu nizanî ku pestûrî ji gayê cot re jî namîne?"* Rojen Barnas

De here ku tu Osman î!

Madem ku wisa ye, tu ji wan î, de îja bibîne halê xwe. **Madem ku tu kurê wê qehpikê yî, de bigire xwe,* ***de here ku tu Osman î****.* (*bnr. Têbiniya *"Wele ku tu Osman î, çemê Pêrê."*)

De ka kuman daynîn, pirsan jê bikin.

Ka binirxînin û têbigihîjin, ev mesele çi ye. *****Ka kuman daynin, pirsan jê bikin****, ev kul çima hate ber derê me?*

De were ji çêlekê re erbaneyê lê bixe.

bnr. De were vî kerî di vê avê re derbas bike.

De were, kuman dayne, pirsan jê bike.

De were rewşê fêm bike. **Piştî vê hûyerê rewşeke din derket.* ***De were, kuman dayne, pirsan jê bike.***

De were vî hişî di qula vê derziyê re derbas bike.
bnr: De were vî kerî di vê avê re derbas bike.

De were vî kerî di vê avê re derbas bike.
Ji bo tiştên bêîmkan û bêkêr re tê gotin. **Ev çi karekî ecêb e, îja* ***de were vî kerî di vê avê re derbas bike.***

De were vî nîrî hilgire ser vî milî.
bnr: De were vî kerî di vê avê re derbas bike.

Decal (Tecal) rabûn
1. Ji bo tiştên ne guncan tê gotin. **2.** Dawiya dinyayê ango mehşer hatin. **Heke ew ku derewan neke, tu bizanibe ku* ***Decal wê rabe.*** **Kengê* ***Decal rabû****, ew ê wê demê tiştên baş bifikire.*

Def di destê (stûyê) min de ye, çomax tu lê dixî.
Erk û xuyang wekî hev nebûn. **Min lê mêze kir ku* ***def di destê min de ye, lê ew dikin çomax lêxin****, min dev ji rêvebiriyê berda.*

Def û zirne berdaye, bi kendalê abes girtiye.
Ya rind û xweşik berdaye, bi tiştên bêkêr û bêreng re mijûl dibe. **Lawo ev çi aqil e, te pê girtiye? Te def û zirne berdaye bi kendalê ebas girtiye.* (qerf)

Defa hewarê lê xistin
Nûçeyek an jî agahiyek li her derê belav kirin. **Me got bila haya kesî ji vê pirsgirêka me nebe, lê du rojan bi şûn de Hezîmê* ***defa hewarê lê xist*** *û her kes pê hesand.*

Defa (yekî) dirandin
Moral û şewka yekî şikandin. Tawan û sextekariya yekî eşkere kirin. **Heyder bi derewîn pesnê xwe dida, lê Hacerê bi awayekî sergirtî* ***defa wî dirand****.*

Defa (yekî) lê xistin
Piştgiriya yekî kirin. Wekî gotin û daxwaza yekî kirin. **Çima keçikê jî* ***defa diya xwe lê-xist,*** *mêrikê reben, stûxwar li ortê ma.*

Defeke din lê xistin
Qal û doza tiştekî din, vebijarkeke din derxistin holê. **Heyran me tam xwe ji bo wê amade kiribû, lê xinamiyan vê carê jî* ***defeke din lê xistin****.*

Deftera (yekî) di nav a mişkan de nehatin xwendin
Tu erk û rûmetek tune bûn. **Xwedê dizane, heke xezûrê wî nebûya,* ***deftera Mûrad di nav a mişkan de jî nedihate xwendin****.*

Deh li ser yekê danîn
Derew kirin. Ji bo kesên lafek û têfîrander tê gotin. **Ew ku dehan bibêje, tu yekê fêm bike, çimkî ew* ***dehan li ser yekê datîne****.*

Deh mal in, dozdeh rîspiyên wan hene.

Ji her seriyekî de dengek derketin. **Deh mal in, dozdeh rîspiyên wan hene. Mirov nikare ji wan re solan biqetîne.*

Deh pîn li gorê xistin

Ji yê din xerabtir bûn. **Erê, em ji yê din bigazin bûn, lê tu yeqîn bike, vî yê piçûk* ***deh pîn li gora yê mezin xistine.***

Deh serî jêkirin, dîsa her kes beziya serê xwe hilda.

Hema bigire her kes ji aqilê xwe razî ye. **Ew jî dayîneke Xwedê ye herhal,* ***deh serî jêkirin, dîsa her kes beziya serê xwe hilda.***

Deh siwar çûn pêşiya rûtekî, rût bi silametî ji nav derket.

Yê ku tu tiştekî wî tune be, tu yê çi jê bistînî? *****Deh siwar çûn pêşiya rûtekî, rût bi silametî ji nav derket.*** *" Çi yê min heye ku ji min çi bistînin?*

Deh tiliyên xwe li ber şewitandin

Jê re fedakariyeke mezin kirin. **Na lo!* ***Tu deh tiliyên xwe li ber bişewitînî*** *dîsa jî ew bi tiştekî nahesibîne.*

Dehê kanûnê, rojê berê xwe da havînê.

Ji meha kanûnê bi şûn de bandora zivistanê dişikê. **Erê pêşiyan gotine:* ***"Dehê kanûnê, rojê berê xwe da havînê."*** *Lê bi rastî gelek caran ew dem hê xerabtir dibe.*

Dehl baranê tîne yan baran tehl tîne?!

Hêk ji mirîşkê yan mirîşk ji hêkê çêdibe. Kîjan berî kîjanê ye gelo? **Ev meseleyeke bigirêk e, ez çi zanim* ***dehl baranê tîne yan baran tehl tîne.***

Dek û dolab li dora (yekî) gerandin

Sextekarî û komplo kirin. **"Wî ji mêj ve dijmijnatî li Tahar Xan dikir û digel ku ew meriv û pismamê Tahar Xan bû,* ***dek û dolab li dora Tahar Xan digerand."*** Mehmed Uzun

Dek lê kirin

bnr. Dek û dolab li dora (yekî) gerandin

Delala/ê li ber dilê (yekî) bûn

Li bal kesekî gelekî birûmet û girîng bûn. **"Hîn nû têgihîşt ku ev xezal xezala wî bû. Hîn nû têdigihîşt ku* ***delala ber dilê wî bû."*** A. Rahman Çelik

Delal berê defal bû, kerê delal jî winda bû.

Fors û hewa wî bi dawî bû. **Te çend salan berê ew bidîta,* ***delal berê delal bû, kera delal jî winda bû.***

Delalê min ji şîr jî ji şekir jî şirîntir e.

Pir birûmet û hêja ye. **Bawer im, Baharê ji bo evîndarê xwe digot:* ***"Delalê min ji şîr jî ji şekir jî şirîntir e."*** (qerf)

Delalî rabûn

Bi delalî û bi nazikî mezin bûn. **Bavê Şemdîn ew delalî rakiriye, ne yê zor û zehmetê ye.*

Delav qam kirin

Ji rewşê haydar bûn. **Heta Hoso **delav qam kir**, wan jî karê xwe xelas kir.*

Delinga (yekê) li delinga mêran neketin

Ji bo keçikên ku nezewicîne tê bikaranîn. **Bi vê meşê here, tu caran **delinga wê li delinga mêran nakeve**.* (nifir)

Delîdûmanî bûn

Pir xişîm, çalak û tor bûn. **Lawê Misto yê piçûk xortekî **delîdûmanî ye** lê bi rastî pir jî şîrîn e.*

Delîl li hal bûn

Di nav rewşeke dijwar de bûn. **"Bêguman di vê navê de, xizmet û peyivîna katibê resepsiyonê gelek girîng bû. Heke tiştekî ku li xweşa Hecî naçe bikira, **delîl li halê wî bû**."* **Felat Dilgeş**

Dema aqil belav dikirin, wî/ê basme[*] dibirî.

Wekî tirane ji kesan re di wateya "tu bêaqil î" de tê gotin. **Delîl ji Zekî pirsî: **"Lawo dema aqil belav dikirin, te li bênderê basme dibirî?"*** (argo)

Dema aqil belav dikirin tu li ku bûyî?!

bnr. Dema aqil belav dikirin, wî/ê basme dibirî.

Dema hebe bol e, ger tune be çol e.

bnr. Dema hebe to dixwe, tune be gû dixwe.

Dema hebe to dixwe, tune be gû dixwe.

Ji bo helwesta berevajî tê bikaranîn. **Ev Rosto mirovekî ecêb e. **Dema hebe to dixwe, tune be gû dixwe.***

Dema mirinê di guh de bang kirin

Ji bo gotin û kiryarên girîng û taybet ku bi hesretê hatiye mayîn tê gotin. **Ji bîr nekin **dema ku ez mirim di guhê min de bang bikin**, bibêjin." Bibêjin: "Te zûriya keça xwe ji bîr kir an na?*

Dema siûd hat serî, bila bizire wekî kerî, dîsa jî xelk dê bibêje aferî(n).

Şans û rozgara mirov ku hebe, hema bigire her tişt baş û xweş tê xuyan. **A girîng şans e şans. **Dema siûd hat serî, bila bizire wekî kerî, dîsa jî xelk dê bibêje aferî.***

---

[*] **Basme**: Ji ber ku li hêla Serhedê ajalvanî pir pêşde ye û hewa jî pir sar e, zivistanê pez û dewar di hundir de tê xwedîkirin. Ji bo ku dewar li ser cihekî paqij mexel bê û rehet bike, paqijiya tewlê her roj tê kirin. Ew terxa (rêxa) dewêr a ku her roj tê kom kirin, li der ve bi bilindahiya wekî panzdeh bîst santîman tê rûkirin. Ew terx bi hev ve digire û bi pêvajoya demê re hişk dibe. Ji wê xermana rêxê re *"basme"* tê gotin. Dû re bi bêran tê birîn. Ev kermeyên ku ji basmê dertên, ji bo şewata zivistanê li der ve tê cêrgekirin.

Dema xêr û şeran hatin
Dema hesab pirsîna heqî û neheqiyê hatin. **Mela dibêje **dema xêr û şeran wê bê**, lê ka kengî? Ma ev neheqî wê heta çi çaxê bidome?*

Dema xwe pê derbas kirin
Pê mijûlahiya xwe kirin. **Bi rastî heke min **dema xwe bi Farisê kor re derbas nekira**, ez ê bibihecîma.*

Demana darê jê xwestin
Tiştekî ne guncav xwestin. **Kuro lawo, te jî wisa xwe nazî xist ku tu dibêjî (qey) **demana darê ji te dixwazin**.*

Demek a gulê ye, yek a şîlanê.
Her tişt demekû doreke wê heye. **Bisebir be hevalo!.. **Demek a gulê ye, yek a şîlanê.***

Demîna xwe girtin
Wekî her car kirin, wekî hînbûnê her dem kirin. **Wî **demîna xwe girtiye**, tu nebêjî jî wê dîsa bike.*

Dena heşê pelaştin
bnr. Di nav de rîtin

Dendikê kulê bûn
Dir û yeman bûn. **Cîhangîrê çi ye, **dendikê kulê ye**, ya ku wî kir, tu kesî nekir.*

Dendikê li ser defan bûn
Bêîstikrar û bêsebir bûn. Zû ketin bin bandora tiştan. **Lezgînê lawê min bûye bîst û pênc salî, lê hê jî wekî **dendikê li ser defan e**.*

Dendikên xwe çizirandin
Li kêfa xwe mêze kirin. Kar baş meşîn. **"...rewşa patiyê bi pêş de diçe... û li benda pêşerojeke çêtir em **dendikên xwe diçizirînin**." Helîm Yûsiv*

Deng belav bûn
bnr. Deng vedan

Deng birin xwe
Gotin kirin, a gotî pêk anîn. **Welat mirovekî rûmeriu e, **deng dibe xwe**.*

Deng çûn (yekî)
Fêm kirin, têgihîştin. **Lawo tu dibêjî, lê ka gelo **deng diçe wê**?*

Deng dan
bnr. Deng vedan

Dengê di qûnê re derketin
Di bin zor û zerpeki de bûn. **Fadil heta ew çuwalê fêkiyan bir malê, **dengê wî di qûna wî re derket**.*

Deng di serî de neçûn

Fêm nekirin. **Kuro dikim nakim kurê bêbavan* ***deng di serî de naçe*** *ku karê wî jî hinekî pêş ve here.*

Deng dihere wî tehtî, naçe wî.

Pir qafqalind bûn. Fêm nekirin. **Mirov dibêje û nabêje* ***deng dihere wî textî, naçe wî.***

Deng jê derneketin

1. Agahî jê negirtin. **2.** Bersiva xwe nedan. **Ev çar sal in çûye, lê hê* ***dengek jê derneketiye.*** **Ya Xwedatî! Min jê re çi got, li hemberî min* ***deng jê derneket.***

Deng jê nehatin (Deng û beng jê nehatin)

Bersiv nedan. **Em gelekî li benda wî man ku ew jî bê, lê mixabin tu* ***deng ji wî mêrxasê delal derneket.***

Deng ji kêvir derketin ji wî/wê derneketin (nehatin)

Qet hisa xwe nekirin. Tu helwest nîşan nedan. ** "**Deng ji kevir ji yadê derneket.** Bû weke pîreke sed salî, belkî jî pîrtir bû."* Hêvîdar Zana

Deng kirin

1. Li hember derketin, li ber xwe dan. **2.** Axaftin. **Axê jê re çi got jî wî carekê jî* ***deng nekir.*** **Keçê ka tu jî hinekî* ***deng bike*** *qurban.*

Deng li ber guh ketin

1. Deng bi awayekî zelal nebihîstin. **2.** Wekî ku bi rastî jî bibihîze, bi xwe tişt li hev anîn. **Çawa* ***dengekî sivik li ber guhê min ket*** *ez hişyar bûm. *Meta Çarê wisa pîr bûye ku êdî, li cihê tune* ***deng li ber guh dikevin.***

Deng bi ser (yekî) ketin

Jê dengek bihîstin. **Di xewê de hema dengekî sivik* ***bi ser min bikeve*** *hişyar dibim.*

Deng nekir im, zêrê zer im

Yê ku zêde xeber nadin, ew meqbûl in. **Min qewêtiya diya xwe ya: "Deng nekir im, zêrê zer im." Ji guhê xwe re xiste guhar.*

Dengê (yekî) qibe bûn

Sewt gur û bibandor bûn. **Maşelah* ***dengê wê wisa qibe ye*** *ku mîkrofon navê.*

Deng û hisa xwe birîn

Sêkit bûn, ker bûn. **Heya ku me gotinên wî nepejirandin, wî* ***deng û hisa xwe nebirî.***

Deng vedan

Bûyer an jî nûçeyek li hawîrdor belav bûn. ** "Dengê pêşmergeyan è ji hemû layan ve* ***deng veda."*** Kovan

Dengê defê nas dike, mala dawetê nas nake.

Ji bo kesên ku bi tenê berjewendiyên xwe girîng digirin tê bikaranîn. **Şîndo tenê zikê xwe difikire,* ***dengê defê nas dike, lê mala dawetê nas nake.***

Dengê dîkê te ka heta ku çûye?!

Ka nav û dengê te çiqasî belav bûye? **Lawo tu ew qas pesnê xwe didî, lê her kes dizane bê ka* ***dengê dîkê te heta ku çûye****.*

Dengê ezmanan, nîşana baranan

Her tevger û xuyang nîşana tiştekî ye**.** **Heke mirov sîran newe, bêhn ji dêv nayê.* ***Dengê ezmanan, nîşana baranan.***

Dengê kezebê, da ser siwarê neqebê.

Ewled ji birayan jî pêşdetir in. **Ez çawa bikim, gazinan ji min nekin, îro* ***dengê kezebê daye ser siwarê neqebê****.*

Dengê meqesê bi ser neketin

Perwerde nebûn, xişîm, hov û nezan bûn. **Malavayî, wisa welhş e ku qet* ***dengê meqesê bi ser neketiye****.*

Dengê te xweş tê lê heke xwendina te Quran be.

Di bin wan tiştên xweşik de gelo çi heye? **Ez tiştekî jê fêm nakim.* ***Dengê te xweş tê lê heke xwendina te Quran be.***

Dengê xwe berdan

Dengê xwe zêde kirin, qîrîn. **Ji ber ku di geliyên kûr de zîz dibû, Gevezê* ***dengê xwe berdabû****, kilam digotin.*

Dengê xwe bilind kirin

Daxwaza xwe bi awayekî tund diyar kirin. **"Miletê me li her hêla dinyayê* ***dengê xwe bilind dikirin*** *û ji bo jiyaneke azadiyane bi miletên din re, daxwazên xwe diqîriyan."* Yaqûb Tilermenî

Dengê xwe birîn

1. Bê helwest man, pejirandin. **2.** Melisîn. **Xesûya wê agir li ser serê wê dada, wê dîsa jî* ***dengê xwe birî*** *û li hêviya mêrê xwe yê li eskeriyê ma. *Bi qêrîniya Lalişê Belek re Nîgarê* ***dengê xwe birî****.*

Dengê xwe derxistin

Li hember tîştekî yan jî kesekî helwest nîşan dan. **Heke cara pêşîn te* ***dengê xwe derne-xista****, ew ê hê zêdetir bi ser me de bihata.*

Dengê xwe hildan

Dengê xwe bilind kirin. **"Bi şîn xortan de* ***dengê xwe hilda*** *û xwest ku yên li wir hemû dengê wî bibihîzin."* Jîr Dilovan

Dengê (yekî) birandin

Bandor û erka yekî tune kirin. **"Mirovekî zana bû,* ***dengê wan tevan da birandin****."* Zana Farqînî

Dengî bûn

Her kes pê hesîn. **Heke ew qas* ***dengî nebûya****, me dê çareyek bidîta.*

Dengî kirin

Her kes bi pirsgirêka xwe hesandin. **Bahoz bi taybetî tiştên di nav malbatê de li her derê* ***dengî dike****, ev ne helwesteke baş e.*

Deq bi deq bûn

Eynî wekî hev du bûn. Pir şibandin hev. **Her du jî tu dibêjî* ***deq bi deq in****.*

Deq li deqê xistin

Kar tam pêk anîn. Tam li nîşanê xistin. **Aha vê carê Delîl tam* ***deq li deqê xist****.*

Deqmirî bûn

Sist, teral û ne zingirî bûn. **Ew yekî* ***deqmirî ye****, kuro, tu çi ji wî hêvî dikî?*

Deqa (yekî) şikandin

Rezîl kirin, şek şikênandin. **Dara, di nav ew qas mirovan de* ***deqa Şêxmûs şikand****.*

Deqa deq

Ancax ku wekî hev bûn. **Pereyên Cemo hema* ***deqa deq*** *têra deynê wî kir.*

Der (dev) û daw lê qetandin

Gelekî lavayî kirin. **Xècê* ***der û daw li rêveberê qetandin****, lê nikaribû bide pejirandin.*

Derb avêtin

bnr. Derba xwe gihandin

Der û dor fireh bûn

Nas û dostên yekî zêde bûn. Li hawirdor birûmet bûn. ** "****Der û dora wî fireh bû****, jê re rûmet dihat girtin."* Süleyman Demir

Derb ku hat serî, Xwedê wê çawa xelas bike?!

Hin tiştên girîng û bêfesal hene ku tu kes nikare li ber bisekine. *****Derb ku hat serî, Xwedê wê çawa xelas bike?!*** *Carinan çareya hin tiştan ne mimkun e.*

Derb lê xistin

bnr. Derba xwe gihandin

Derb xwarin

Li rastî zerp û şekxwarinê hatin. **Nûman ji Kamil* ***derbeke wer xwar*** *ku bawer nakim tu caran ji bîr bike.*

Derba xwe gihandin

Zerp û şek lê xistin. *****Cevdet derba xwe gihandiye min****, heya min daxînin qebrê, ji bîr nakim.*

Derbasî kirin

Bi kesekî re têkiliyên asahî danîn. **Ez dikarim bi tiralan re* ***derbasî bikim****, lê bi rezîl û lafekan re nikarim.*

Derd berî nava xwe dan

Ketin nav wesweseyan. Xem xwarin. **Ew jî cira wî ye, ku* ***derdek berî nav xwe da****, êdî bi şev xewa wî nayê.*

Derd hatin ji der de, kul hatin bi ser de.

Kul û derd hê zêdetir bûn. *****Derd hatin ji der de, kul hatin bi ser de****, kul û keserên min hindik bûn, a vê keçikê jî hate ser.*

Derd û kul avêtin pişt guhên xwe

Bêxem bûn. **Tu tiştek ji bo wî ne girîng e, ew* ***derd û kulan diavêje pişt guhên xwe****.*

Derdest kirin

Kirin bin bandora xwe. Bidestxistin. **Wan gundiyan ew qaçax* ***derdest kirin*** *û birin bal leşkerên bajêr.*

Derdê ano, nano ye.

Tenê li berjewendiyên xwe fikirîn. **Erê bavo ez tèdigihîjim,* ***derdê ano, nano ye****.*

Derdê (yekî) bera nava xwe dan

Ji bo çareseriya pirsgirêka kesekî bi dil û can xebitîn. **Xwedê jê razî be, Farqîn* ***derdê min bera nava dilê xwe da*** *û bi şev û roj ji bo çareseriyekê ji min bêhtir xebitî.*

Derdê cîgerê nedîtin

Zarok telef nebûn (nemirin). **İnşelah tu* ***derdê cîgerê nebînî****.*

Derdê çarçiqil bûn

Pirsgirêkeke piralî û mezin bûn. **Ezbenî, derdê min ne derdekî wisa hêsan e,* ***derdê çarçiqil e****.*

Derdê (yekî) der nebûn

Ji pirsgirêkê re çareserî nedîtin. **Belkî* ***derdê te qet der nebe****.*

Derdê (yekî) dereve kirin

Derd û kulên yekî anîn bîrê. **Min ji te re got, dîsa* ***derdê min dereve neke****.*

Derdê dilê xwe derman kirin

Çareya serê xwe dîtin. **Min xwe gihande wî hekîmê navdar û min* ***derdê dilê xwe derman kir****.*

Derdê giran bûn

bnr. Derdê çarçiqil bûn

Derdê giran nedîtin

Li rastî astengî û kulên mezin nehatin. **Wî hê* ***derdê giran nedîtiye****, hew dizane ji yê wî mezintir derd tune ne.*

Derdê hevalan, tîra kendalan

Kes ji derd û êşên mirov wekî mırov bi xwe baş fêm nake. **Derd xwediyê xwe diêşîne. Ma ji bo çi gotine:* ***"Derdê hevalan, tîra endalan."***

Derdê kezebê, da ser neqebê.
Derdê ewledan ji yê birayan zortir e. **Digotin, lê min bawer nedikir, bi rastî jî* ***derdê kezebê da ser neqebê***.

Derdê kezebê dîtin
Ewled mirin. **Înşelah tu kes* ***derdê kezebê nebîne***.

Derdê (yekî) kişandin
Ji ber hinek sedeman, ji astengiyên kesekî re deng nekirin. **Ya Xwedatî* ***derdê Cemîl jî qet nayê kişandin***.

Derdê li ser derdan bûn
Derdê herî mezin bûn. **Yê din berde, ev* ***derdê li ser derdan e***.

Derdê (yekî) pê dan windakirin
Li ber dilê yekî hatin û çûh, ji kesekî re alîkar bûn. **Bi rastî jî wan dostan hema bigire* ***derdê Zelalê pê dane winda kirin***.

Derdê pîrê pilor e, derdê hebo gebol e.
bnr: Derdê qeraş, av here ser aş

Derdê (yekî) teze kirin
bnr: Derd **dereve** kirin

Derdê qeraş, av here ser aş
Her kes di haya pêdiviyên xwe de ye. *****Derdê qeraş av here ser aş****, derdê te jî ka û gîhayê, pez û dêwêr e.*

Derdê wî jî girara sibê ye.
Ji bo yên ku tiştên pir piçûk ji xwe re dikin pirsgirêk tê gotin. **Her kes bi pirsgirêkên mezin re mijûl dibe,* ***derdê Îdris jî girara sibê ye***. (qerf)

Derdê xwe bi xwe derman kirin
Bi xwe çareya serê xwe dîtin. **Di dawiyê de min lê mêze kir ku zêde xema kesî nîn e, min* ***derdê xwe bi xwe derman kir***.

Derdê xwe derman kirin
Ji pirsgirêka xwe re çare dîtin. **Mineta wê bi kesî tune, ew bi xwe* ***derdê xwe derman dike***.

Derdê xwe di zikê xwe de temirandin
bnr: Bi xwe hundirê xwe xwarin

Derdê xwe ji nav dilê xwe derxistin
Xwe ji xemgînî û wesweseyan rizgar kirin. **Êdî bes e keça min,* ***derdê xwe ji nav dilê xwe derxe****, naxwe tu yê ziyanê bibînî.*

Derdê xwe ji paşayê ker re gotin

Ji bo helwesta bêkêr û bêencam tê gotin. **Rebeno, bi vê azîneyê ve tu **derdê xwe ji paşayê ker re dibêjî**, jixwe ew jî hewldaneke pûç e.*

Derdê xwe ji (yekî) vekirin

Pirsgirêka xwe ji kesekî re vegotin. **Bihar, bêgav ma ku **derdê xwe ji diya xwe re veke**.*

Derdikevim dîwarê Qurqurikê, deng tê dengê tûtikê; ax li min derdê zûtikê.

Ji bo yên bi nefsa xwe nikarin û dozîna zayendî gelekî li pêş digirin tê gotin. *****Derdikevim dîwarê Qurqurikê, deng tê dengê tûtikê; ax li min derdê zûtikê.*** *Erê gelek naynin ser barê xwe lê derdê wan zêdetir ê zayendî ye.* (bnr. çîrok)

Dereceya (yekî) tune bûn

Bêhempa bûn. Pir baş û sipehî bûn. **Ez ji yên din jî hez dikim, lê li ber çavên min **dereceya xwarziyê min ê piçûk tune**.*

Dereng bû lê çeleng bû

Hinekî bi derengî ket, lê baş çêbû. **Erê, hoste erebeya min hinekî dereng çêkir lê ya rastî **dereng bû lê çeleng bû**.*

Dereweke wan ji deh rastên me çêtir e.

Ji bo kesên dekbaz tê bikaranîn ku dikarin tiştên neyînî wekî erênî bidin pejirandin. **Ew malbateke wisa kone ye ku **dereweke wan ji deh rastên me çêtir e**.*

Derewên bêxwê kirin

Derewên mezin kirin. **"Heke bibêjin jina wî ew cilet nîşan daye, ew yek jixwe ji binî ve **dereweke bêxwê ye**."* Musa Vazgali

Derê dîzê vekirin

Raza xwe gotin. **Min ji te re got hêrsa min meyîne û **derê dîzê bi min nede vekirin**.*

Derê rehmê lê vebûn

Şîfa û derman dîtin. **Şikir ji Xwedê re, bi destê wî hekîmî **derê rehmê li Feyzê vebû**.*

Derê xêrê vebûn

Rewş ber bi erêniyê ve çûn. **Bi vê bûyerê re jî tê xuyan ku êdî **derê xêrê vebû**, înşelah êdi wê hê baştir bibe.*

"Derdikevim dîwarê Qurqurikê, deng tê dengê tûtikê; ax li min derdê zûtikê."

Li hêla Dêrsimê li gundekî elewiyan dawet çêdibe. Pîrê wan li jor, li cihê taybet rûdine. Pîr çiqasî li bûkê dinihêre, pêl bi pêl bi agirekî zayendî dişewite. Bûk qet ji bîrê dernakeve. (Jixwe berê dawet çend rojan didomîn.) Di vê pêvajoyê de pîr ji bilî bûkê li tu tiştî nafikire. Di dawiya şeva sisêyan de dema ku gundî hemû bi heyecaneke mezin direqisin, pîr dinêre ku wa ye her kes ketiye heyra xwe û bûk tenê maye, pîr hema bûkê hildide û ji holê winda dibe. Gundî piştî demekê bi şûn de mêze dikin ku bûk nîn e. Hevraz, berjêr dinêrin, bûk li tu derê tune ye. Piştî demekê yek dikeve derkê ku wa ye pîr jî tune ye. Bang dike û dibêje:

"Wa ye pîr jî tune ye!" Gundî hemû fêm dikin ku pîr bûk biriye. Difikirin û dibêjin:

"Em li axur û kadînan binihêrin!" Dema ku dikevin axurekê lê mêze dikin ku pîr karê xwe qedandiye, derpiyê xwe hildik-işîne jor. Li hember vê ecêba giran, gundiyek diqire û dibêje:

"Derdikevim dîwarê Qurqurikê, deng tê dengê tûtikê; ax li min derdê zûtikê."

Derê xwe ji kesî re venekirin
bnr. Kesek nehebandin

Dergê şêx û ziyaretan vekirî bûn
Di demeke xêr û erênî de bûn. **Înşelah ji wan duayên te re,* ***dergê şêx û ziyaretan vekirî be.***

Dergûşa kurîn nedîtin
Zarokên kurîn jê re nebûn. **Di dawiya jiyana xwe de jî* ***dergûşeke kurîn nedît.***

Deriyek jê re vebûn (Derî lê vebûn)
Ji derdê yekî re çare peyde bûn. **Simko ji bo çareyekê gelekî xebitî, di dawiyê de li derveyî welêt* ***deriyek jê re vebû.***

Deriyê dilê xwe vekirin
Ya ku di dil de derbas dibe, ji kesekî re gotin. **"Xewa şevan jê re heram bûbû. Lê wî nikaribû* ***deriyê dilê xwe vekira*** *û derdê xwe ji kesekî re bigota."* Mehmed Uzun

Deriyê mala xwe jê re vekirin
Ezimandin. Bi yekî re stamî kirin. **"Ket pêşiya wî û got, neke. Kesê ku em nizanin çi ne, çi kes in, ji ku hatine, em ê çima* ***deriyê xwe ji wan re vekin."*** Abidin Parıltı

Deriyê xwe jê re vekirin
Ezimandin, lê xwedî derketin. **Di wan rojên teng de bi tenê lawê xaltiya wî* ***ji Mehemed re deriyê xwe vekir.***

Deriyê (yekî) li ser piştê bûn
Her dem ji mêvan ezimandinê re amade bûn. **Ew mirovinên eşîr in,* ***deriyê wan tim li ser piştê ye.***

Deriyê (yekî) mor bûn
Zuriyet û nesil bi dawî bûn. *****Deriyê rebenê Faris, piştî çar jinan jî dîsa mor bû.***

Deriyê (yekî) vekirin
Bûn mêvan, çûn mala kesekî. Serî lê dan. **Wê ku piştî ew qas gotinan* ***deriyê min vekir,*** *êdî min nikaribû tiştek bigota.*

Deriyo ji te re dibêjim, piştderiyo tu guh bidiyê.
Gotina xwe ne rasterast, lê bi peyaman (mesaj) gihandin muhatabên rasteqîn. **Xwezî însanan gotinên xwe ne bi peyaman, lê rasterast ji muxatabên xwe re bigotana.* ***Deriyo ji te re dibêjim, piştderiyo tu guh bidiyê.***

Derî bi ser de girtin
1. Têkildar nebûn, di halê xwe de hiştin. **2.** Yek hepis kirin. **Min mêze kir ku tênagihîje, min* ***derî bi ser de girt*** *û ez derketim. *Bavê wê lê nihêrî ku nayê rê,* ***derî bi ser de girt*** *û heya êvarê nan jî nedayê.*

Derî bi ser xwe de hişke hişk girtin

1. Têkiliya xwe ji der û dora xwe re birîn. **2.** Mêvan xwedî nekirin. **Jixwe ew **derî wisa bi ser xwe de hişkehişk digire** ku ne ew rûyê kesî, ne jî kes rûyê wî bibîne. *Ka kê here mala wan? Heya êvarê **derî bi ser xwe de hişkehişk digirin**.*

Derî derî gerîn

1. Pars kirin. **2.** Ji bo karekî yan jî pêdiviyekê di nav hewldanê de bûn. **Her tiştê wê heye, lê dîsa jî ji bo pariyek nan **derî derî digere**. *Mafê kesî tune ji wî re tiştekî bibêje; ew ji bo wê partiyê **derî derî gerî**.*

Derî her dem vekirî bûn

Ji bo debar û lê xwedî derketinê amade bûn. **"Kengî ku derdekî te yan daxweziyeke te hiqewime, **deriyê me her dem ji te re vekirî ye**."* Dost Çiyayî

Derî jê re vekirî bûn

Rûmet dayîn. **Divê tu vê baş bizanibî ku **deriyê min tim ji te re vekiriye**.*

Derî ji her kesî re vekirî bûn

Cudatî nekirin. **Em mirovan li gorî ol , netewe yan jî rengê wan nasinifînin, **deriyê me ji her kesî re vekiriye**.*

Derî lê girtin

Ji bo ziyan gihandinê bi ser kesekî de çûn. **"Piştî xwendineke heşt mehan, dibistana me jî **deriyê xwe li me digirt**."* Qedrî Can

Derî lê vebûn

Ji tengasiyê derketin. **"Qet nebe qasekî hesîne bike, ka çi **derî lê vedibe**."* Feqî Huseyn Sağnıç

Derî lê vekirin

Ji yekî re alîkarî kirin. Rewşa yekî pirsîn. **"Mamê Gur Heso, dîsa birçî û dîsa belengaz kete alema xwe ya zanyarî. Dîsa çend roj di ser re borîn kesekî **derî lê venekir** û di av û donê xwe de qijilî." Feqî Huseyn Sağnıç*

Derî lê xitimîn

Ketin nav astengiyê. ****Derî lê xitimiye**, nizane ku çawa bike.*

Derî li ber girtin

1. Tenê hiştin. **2.** Derfet nedan. **3.** Red kirin, nepejirandin. **Wan **derî li ber wê negirta**, ew nedihehecî. *Zerdê wê gelek tişt bikirana, lê wan **derî li ber girt**. *Canpola çi ji wan dixwest, wan **derî li ber digirt**.*

Derî li ber vebûn

bnr: Derî lê vebûn

Derî li ser piştê danîn

Raz û pirsgirêk eşkere kirin û li ber çavan raxistin. **Lawo mirov ew qas **derî li ser piştê danayne**, hin tişt hene ku divê kes pê nehese.*

Derketin çiyê
bnr. Çûyîn çolê

Derketin erş û elayê
Zehf zêde belav bûn, bilind bûn, gelekî deng vedan. **Nav û dengên wan* ***derket erş û elayê****, vî sefêkî hê hay ji dinyayê nîn e.*

Derketin firaqetiyê
Ji rojên xirab û teng xelas bûn. **Me ji dest feqîrî û bindestiyê gelek kişand, lê şikir ji Xwedê re ku îro em* ***derketine firaqetiyê****.*

Derketin meydanê (Derketin mexderê)
1. Tiştekî bidizî eyan bûn. **2.** Ji bo tekoşîn û dozê derketin qadê. **Çi kiribû û çi nekiribû yek bi yek* ***derkete mexderê****. *Têkoşerên rizgariya gel,* ***derketin meydanê*** *û gotin: "Êdî bes e!.."*

Derketin rastê
Eşkere bûn. A rastî xuya bûn. **Gelekî li ber xwe dan ku veşêrin, lê va ye her tişt* ***derkete rastê****.*

Derketin ser riya (yekî)
1. Ji kesekî re astengî derxistin. Pêşî lê birîn. **2.** Di nav hewldana lêdan an jî ziyangihandinê de bi ser yekî de çûn. **Ez çi karî dikim, ev seghavê bedoxir* ***derdikeve ser riya min****. *Zaxoyê Mecîd* ***derketiye ser riya Riza*** *û heya ku tu bibêjî lê daye.*

Derketin ser serê (yekî)
Hedê xwe nezanîn. **Min rûmet dayê, lê ew* ***derkete ser serê min****.*

Derman ... tune bûn
Bêçare bûn. **Heyran* ***dermanê bêaqiliyê tune****, hûn çawa bikin, ra jê nabe.*

Dermanê çavan bûn
Zêde bi dest neketin. **Keçika min, ew çi toraq bû te şandibû?* ***Ma dermanê çavan bû?***

Dermanê êşê bûn
Ji pirsgirêkê re çareser bûn. **"Madem ku rewş wilo diyar e, bi zimanê xwe axaftin, bi zimanê xwe xwendin û bi zimanê xwe nivîsandin,* ***dermanê êşa me ye****."* Adar Jiyan

Dermanê her tiştî xwê ye, lê xwê xerab bibe dermanê wê çi ye?!
Yên bingehîn ku xerab bibin, rewşa yên mayî dê xerabtir be. *****Dermanê her tiştî xwê ye, lê xwê xerab bibe dermanê wê çi ye?!*** *Ezbenî heke hûn wiha bikin, ka halê me dê çawa bibe?*

Dermanê (yekî) neman
Taqet û hêz tune bûn. **Heke* ***dermanê wê hebûya*** *wê hê ji berdewam bikira.*

Derpê ji xwe kirin
Bêarî, bêşermî kirin. **Xwe nexe hevalê wê rezîlê, jixwe wê* ***derpiyê xwe ji xwe kiriye****.*

Derpiyê jinan li xwe kirin
Bêxîret bûn, ji mêrxwasiyê dûr ketin. **Di vê dawiyê de jî Ehmed tam* ***derpiyê jina li xwe kiriye*** *û bûye parêzerê jina xwe.*

Derpiyê jinê sor e, mêrî kor e.
bnr. Dêre sor e, çavî kor e.

Derpiyê min li xwe ke, lê tê de tir û fisan neke.
Li hincetan gerîn. **Ya ku ew dike dibêje:* ***"Derpiyê min li xwe ke, lê tê de tir û fisan neke."***

Derpiyê qûnê jê standin
Şêlandin. Çi hebe jê girtin. **Sitar tê de nehiştine, qumarbazan heya* ***derpiyê qûnê ji Temo stendine.***

Derpiyê sor li bin balgiyê xwe nedîtin
Nezewicîn. Bi mirazê xwe şad nebûn. **Ji xwe temenê wê jî derbas bûye, înşelah ew* ***derpiyê sor li bin balgiyê xwe nebîne.*** (nifir)

Dersa xwe girtin
Ji bûyerek an jî nisûbetekê encamek derxistin. Tecrube girtin. **Na ezbenî, piştî wê bûyera taxa jorîn min* ***dersa xwe girt.***

Dersa (yekî) xistin dêst (Dersa yekî dayîn dêst)
Li hemberî hin helwest û axaftinên nebaş bersiveke çak dan. **Wê wisa* ***dersa wî xiste dêst*** *ku hema patika stûyê xwe xurand û çû.*

Dersê digire ji jinê, ji dê re dibe dijminê.
Ji bo mêrê ku di bin bandora jina xwe de ne tê bikaranîn. ****Dersê digire ji jinê, ji dê re dibe dijminê.*** *Na dayê, lawê min wisa xirab nebû, çi dike jina wî dike.*

Derzî di ber guhê (yekî) re kirin
Ji bo mijarekê bi awayekî nerasterast peyam dan. Şiyar kirin. **Bawer dikim Fayzê* ***derzî di ber guhê Egîd re kir*** *ku helwesta wî ew qasî guherî.*

Derziya Xwedê li ber çavên (yekî) çûn û hatin
Bela xwe dîtin. **Heta ku* ***derziya Xwedê li ber çavên wî neçe û neyê****, ew tobeya xwe nagire.*

Dest avêtin barê (yekî)
Alîkarî kirin. **Exrebeyên Silo di navbera xwe de dirav (pere) dane hev,* ***dest avêtin barê wî*** *û ew ji wê tengasiyê derxistin.*

Dest avêtin boçikê
Rakirin, alîkarî kirin. **Lawo, madem te dît di wê rewşa xerab de ye, te* ***dest biavêta boçikê.*** (argo)

Dest avêtin darê zorê
Bi azîna zorê pêk anîn. **Lê mêze kirin ku ew nayê ser rê,* ***dest avêtin darê zorê.***

Dest avêtin doxîna xwe
Hewcedariya destavê (tuwalet) dîtin. **Hûn hêdî hêdî herin ez ê **dest biavêjim doxîna xwe** û bêm.*

Dest avêtin erzê xelkê
Bênamûsî kirin. Der barê zayendî de ketin nav hewldanên neyînî. **Ew mirovê ku **dest biavêje erzê xelkê**, xêra wî nîn e.*

Dest avêtin guhê xwe
Strandin. Kilam gotin. **Dema ku Dengbêj Reso **dest diavête guhê xwe**, cimaet, ker dibû û bi dil û can li wî guhdarî dikir.*

Dest avêtin hev
1. Ji bo lihevxistinê ango lêdanê hewl dan. **2.** Di gulaşê de hev birin û anîn. **Di dawiyê de **dest avêtin hev**, lê cîran ketine navberê, nehiştin. *Kamil û Sebrî **dest avêtin hev**, Sebrî pişta wî danî erdê.*

Dest avêtin namûsê
bnr. Dest avêtina erzê xelkê

Dest avêtin pêsîra hev
Doza xwe kirin. Bi hev û din re şer kirin. **Li ser tiştekî tune, Reso û Kotan **dest avêtin pêsîra hev** û xwe rezîl kirin.*

Dest avêtin pêsîra (yekî)
Yek tawanbar kirin. **Hema li cihê sekinî wê jinikê **dest avête pêsîra min**.*

Dest avêtin qarçikê
bnr. Bi qarçikê girtin

Dest avêtin qulpê (Bi qulpê girtin)
bnr. Di qarçikê de girtin

Dest avêtin (yekê)
Bi destê zorê bi jinekê re têkiliya zayendî pêk anîn. ** "Eger tu tiştekî nekî ez ê ji mêrê xwe re bibêjim ku te **dest avêtiye min**. " Helîm Yûsiv

Dest belaş bûn
Perçyên xwe bê hesab xerc kirin. **Mêrê min yekî pir **destbelaş e**. Çend quriş pere ketibûn destên wî, rast û çep belav kirin û dawî li wan anîn.*

Dest berdan
Bisexbêr bûn. **Çiqas malê te zêde be jî heke tu **dest bernedî** dawî pûç e.*

Dest bisekine, pê nasekine.
Ji bo kesên pir çalak û nehs tê gotin. **Ez wî baş nas dikim, **destê wî bisekine, piyên wî nasekine**.*

Dest danîn ser ...

1. Ji xwe re hildan. Hildan bin bandora xwe. **2.** Ji bo nirxandinê, demekê li ser, lêkolîn û lêgerîn kirin. **3.** Xwedî kirin, parastin. **Wî bêbavî **dest da ser keda min** a ew qas salan.* **Ez dê **dest bidim ser vê bûyerê**.*" Amed Tîgrîs **Xwedê jê razî be dîsa Hecî Eyîb **destê xwe da ser qîza wî**, heya ku mêrê wê ji eskriyê hat.*

Dest danîn ber

1. Lê miqate bûn, parastin. **2.** Asteng kirin. **3.** Bi sexbêr tevgerîn. **4.** Desteg kirin. **Heke xalê wê **dest nedaye ber**, kî dizane dê çi bihata serî. *Em ê bistînin, lê wî bêbavî **dest daye ber**. *Diya min ku **dest neda ber** mayîşa bavê min, me nikaribû kirêya xwe jî bida. *"Ez bi xwe **dest didim ber** ku bikaribe vî karê pîroz bi cih bîne."* Amed Tîgrîs

Dest dan hev

1. Ji hev û din re alîkarî kirin. **2.** Li ser peyman an jî sozekê li hev kirin, li hev hatin. **Divê em **dest bidin hev** ku em ji vî halê xirab û ji vê bindestiyê xelas bibin. *Piştî wê peymana ku wan **dest dane hev**, ew yek bû fermana çarenûsa me, ya reş.*

Dest dayîn

Guncan bûn, lê hatin. **"Şertan **dest dan** ku ez te berdim."* Amed Tîgrîs

Dest di kulav de man

Dest girêdayî man. **Heke Ferzende berê ew gû nexwara, ez wisa **dest di kulav de nedimam**.*

Dest di nav rûn û hingiv de bûn

bnr. Destek di nav rûn de, yek di hingiv de bûn

Dest di ser destan re bûn

Yên hê baştir jî hebûn. *****Dest di ser destan re ye.*** *Divê mirov zêde bilind nefîre hevalo!*

Dest diz e, dil dilerize. (Destê min diz e, dilê min dilerize.)

Tiştên heram du hestan didin mirov, yek tirs e, yek jî helecana xwedîbûna tiştên nû ye. **Ev çito kar e, çito dil e, ez tê negihîştim.* ***Destê min diz e, dilê min dilerize.***

Dest jê berdan

Tekildar nebûn. **"Ev tiştekî bi serê xwe ye; em **dest jê berdin** û biçin cem Mehmed Karataş."* Şahînê Bekirê Soreklî

Dest jê kişandin (vekişandin)

bnr. Dest jê berdan

Dest jê sar bûn

Hêvî jê qut bûn, germahî û daxwaz winda bûn. **Piştî qezaya wê otobosê, **destê min ji ajogeriyê sar bû**.*

Dest jê şûştin

Gumana xwe jê birîn. **Kî çi dibêje bila bibêje, min ji wê televîzyona teqeze **destê xwe şûşt**.*

Dest jê neqetîn
bnr. Dest jê nebûn

Dest ji cotê reş berdaye bi zirneya zer girtiye.
Dev ji kar û tevgera erênî berdan, a neyînî kirin. **Lawo, ma ew dê zikê te têr bike ku te **dest ji cotê reş berdaye û bi zirna zer girtiye**?*

Dest ji emelan sar bûn
Ji ber kêşeyek an jî nûçeyeke pir xeter mat man, xemgîn bûn. **Çawa ku ew xeber dane Zerdeşt, **destê wî ji emelê wî sar bû**.*

Dest ji hev berdan
bnr. Dev ji hev berdan

Dest ji hev du bûn
Bi awayekî bêdilî û ji bêgavî ji hev û din qetîn. **"Got em du bira ne. Ev şêst sal in, **destê me ji hev du bûye.**"* Keremê Seyad

Dest kut e, dev hût e.
Di hêla pêkanînê de na, lê di axaftin û lafektiyê de jêhatî bûn. ****Dest kut e, dev lût e**. Ji bilî zimanê wî yê xurt tu merîfeteke wî nîn e.*

Dest lê negerîn
1. Timayî, qesîsî kirin. **2.** Ji ber xem, nexweşî yan jî tiştekî din, daxwaza xebat û tevgerê nekirin. **Segbavî, **dest lê nagere** ku rojekê çend qurişan bide feqîrekî. *Dilşayê **dest lê nedigerî** ku karê xwe berdewam bike.*

Dest lê sar bûn
bnr. Dest ji emelan sar bûn

Dest lê sist bûn
bnr. Dest ji emelan sar bûn

Dest li ber halê xwe hildan
Hêza xwe û vîna xwe winda kirin, sist bûn. **"Mîna mirovekî **dest li ber halê xwe hildabe**, pirçiyekî tal li rûyê wî ketibû."* Musa Vazgali

Dest li ber ranebûn
1. Jê re rûmet nîşan dan. **2.** Pir nexweş û bedhal bûn. **Ez dîsa jî dibêjim, Xalê kerem çi bike **destê min li ber ranabe**. *Xaltiya Seyran wisa ketibû ku **dest li ber ranedibû**.*

Dest li ber rû man
bnr. Dest li ber dêv man

Dest li ber xwe rakirin
Li hember derketin. Li ber xwe dan. **Mixabin li hemberî ew qas heqeretê, Delîl newêribû **dest li ber xwe rake**.*

Dest li ser destan, heya esmanê heftan

Cure cure mirov hene ji hev hê baştir an jî xerabtir. **Tu tişt û tu kes ne wekî hev in. Yên baş, pir baş û baştirîn, yên xerab û pir xerabtirîn hene.* ***Dest li ser destan, heya esmanê heftan.***

Dest neavêtin tu tiştekî

Tu karek nekirin. **Ew qas sal em hemî xebitîn, lê wî* ***dest neavête tu tiştekî****.*

Dest neavêtin ê di ro de çûyî

Ji bo yên alîkariyê nakin tê gotin. **Ez wî baş nas dikim. Ew wisan e, mirov* ***di ro de here, ew dest navêje*** *mirov.*

Dest nedan

Bi kêr nehatin. **Tu dizanî heval, heke ji te re* ***dest nade****, dev jê berde.*

Dest pê kirin

Ji bo karekî dest bi hewldanê kirin. **"Kî ku bixwaze dest biavêje xebata kulturê (kîjan beş dibe bila bibe) pêwîst e ji edebiyata devkî* ***dest pê bike****."* Sebahattin Korkmaz

Dest pê neketin

Xam, bakir û teze bûn, bi awayekî surişt bûn. **Heke tu bibînî, tu yê jî ecêb bimînî, zozaneke wisa ye ku* ***dest pê neketiye****.*

Dest pê nesekinî bûn (Dest lê nesekinîn)

1. Pir nehs, çalak û beleban bûn. **2.** Carinan dizî kirin. **3.** Di hêla zayendî de jî pir daxwazkar bûn. **Ew zarokeke* ***dest pê nesekinî ye****, lûn lê miqate nebin wê tiştinan bişikêne. *Çavê we li Zerê be,* ***dest lê nasekine ha!****.. *Cindo di hêla jinan de pir heşerî ye,* ***dest lê nasekinî ye****.*

Dest ser danîn

bnr. Dest danîn ber

Dest û lingê (yekî) jê ketin

1. Pir betilîn, westîn. **2.** Gelekî serma girtin. **Mala Osê gelek bû, heya me li kamyonê bar kir,* ***dest û lingên me jê ketin****. *Ji ber serma Zaxrosê* ***dest û lingên şervanan jê ketin****.*

Dest û ling li hev gerîn

bnr. Li hev piçikîn

Dest û pê lê hurşîn

1. Bêzereng û pêknehatî bûn. **2.** Gelekî betilîn, westîn. **Keçê* ***dest û pê lê hurdişin****, ew çi dikare wî karî bike? *Keçikan heya ew xalîçe û bataniye şuştin,* ***dest û pê li wan hurşîn****.*

Dest û pê lê sar bûn

1. Şoq bûn. **2.** Nexweş ketin. **Bi dîtina wî dîmenî re* ***dest û pê li Cudayê sar bûn****. *Ji nişkê ve Rengîn li erdê dirêj bû û* ***dest û pê lê sar bûn****.*

Dest û pê li hev piçikîn
bnr. Dest û piyên (yekî) li hev alîn

Dest û pêçiyên (yekî) ter bûn
Zindî û zingirî bûn. Bi tenduristî jiyîn. **Dest û pêçiyên Melîkcanê ter bin, ew nebûya karê me dê zehf zor bûya.* (dia)

Dest û piyên (yekî) bi erdê ve zelîqîn
Mat man. **Li ber wî dîmenî, **dest û piyên wî bi erdê ve zeliqîn**.*

Dest û piyên (yekî) çûn
Gelekî betilîn, westîn. **Heta ku min ew fayans paqij kirin, **dest û piyên min çûn**.*

Dest û piyên (yekî) girtin
Zerengiya karkirin û jîrbûnê winda nekirin. **Hûn çi dibêjin lawo, şikir ji Xwedê re hê **dest û piyên min digirin**, hê hewcedarî kesî nîn im.*

Dest û pê girê dan
1. Ji gotin û tevgerê re tu rê nehiştin. **2.** Asteng kirin. Zor û zext lê kirin. **Heqî her tişt ew qas zelal û rast anî ziman ku **dest û piyên min jî hatin girê dan**. *Wan **dest û piyên Xembar girê dan**, ku nikaribû bilibite.*

Dest û piyên (yekî) hatin girê dan
Bê bandor man. **"Ew rewş min navê bibêjim qeder, ji bo tespîta kesayeta helbesta Kurdî destûr nade mirov. Lewma gava din **dest û piyên min hatin girê dan**, min tu nav neda."* Remezan Alan

Dest û piyên (yekî) li hev alîn
Ji heyecan an jî ji pêknehatinê li xwe heyirîn. **"Çûyînê ez diçim, lê dîsa jî ji şerman teşikên min li hev dikevin û **dest û piyên min li hev dialin**."* Musa Vazgali

Dest û piyên (yekî) maç kirin
1. Lavayî kirin. **2.** Ji bo ketina çavên hinekan şelafî û şalûsî kirin. **Zeynoya Sedo **dest û piyên wî maç jî kirin**, lê nehate rê. *Baho **dest û piyên Nisret maç dikirin** lê nikaribû têketa çavan.*

Dest û piyên (yekî) birîn
Derfeteke giran birandin. **Hingî ew şagirtê min ê zîrek çû, **dest û piyên min hatin birîn**.*

Dest û piyên xwe jê vekişandin
Têkiliya xwe birîn. **Ji we tewaqe dikim, êdî **dest û piyên xwe ji wan karan vekişînin**.*

Destbelaşî kirin
bnr. Çep û rast bela kirin

Destbelav bûn
Ji bo kesên ku rûmeta malê xwe nizanin û rast û çep xerc dikin tê gotin. **Heke Dotmam wer **destbelav nebûya**, niha ji zû de bibû mal û hal.*

Destbihene bûn
Ciwan û ber miraz bûn. **Sed car heyf, ê ku nexweş e, lawikekî **dest bi hene ye**.*

Destbikevir bûn
Li ser rê amade bûn. **Evîn jineke qoçax û **dest bi kevir e**.*

Devbiken, dilbikul bûn
A rastî nîşan nedan. **Tu wisa li xuyangê mêze neke, ew **devbiken e, dilbikul e**.*

Destfireh bûn
Merd û çavtêr bûn. **"Bager xortekî **destfireh e**."* Amed Tîgrîs

Destgiran bûn
1. Teral û sist bûn. **2.** Derba dest bihêz û bibandor bûn. **Tu li lafekiya wî menêre di karê xwe de wilo **destgiran e** ku nayê gotin. *Rodîcan pir **destgiran e** ku derbekî li mirov dixe wekî hesin li mirov bandor dike.*

Destgirêdayî man
Bê çare û bê gav man. **Li pêş çavên wî li hevalê wî xistin, lê ew **destgirêdayî ma** û bi tenê li wan mêze kir.*

Destnizim bûn
Bindest û nuxs bûn. **"Ez çi bikim, ez **destnizm im**, nikarim tiştekî bêjim."* Amed Tîgrîs

Destpak bûn
Ji bo kesên diziyê nakin û bi karên durist re mijûl dibin tê gotin. **Sehrî mirovekî **destpak e**, hûn dikarin bi wî bawer bin.*

Destpelîn meşîn (Bi destpelîn meşîn)
Bi awayekî dest sehkirin û sistî kar kirin. **Mixabin karên van saziyên me, bi awayekî **destpelîn tên meşandin**.*

Destpelixî bûn
Bêzereng, şanpaz û bêhuner bûn. **Dilnaz keçeke **destpelixî ye**, tiştek ji dêst nayê.*

Destqerimî bûn
bnr. Destpelixî bûn

Destqirêj bûn
Bi diziyê re mijûl bûn. **Ew dibe çi bila bibe, ew yekî **destqirêj e**.*

Destsivik bûn
Lezgîn û pêkhatî bûn **Tu qet mereqan meke, Heyderê zava mirovekî **dest sivik e**, heya bêhna cixareyekê dê wî karî biqedîne.*

Destşikestî bûn
1. Pêknehatî û nuxs bûn. **2.** Bêderfet û bêîmkan bûn. **Evdile yekî **destşikestî ye**, bawer nakim ku tiştekî pêk bîne. *Ew reben jî **destşikestî ye**, dixwaze lê nikare pêk bîne.*

Destşûştî, pêşûştî bûn

1. Jiyaneke rehet ajotin. Karê hêsan kirin. **2.** Ser û guh paqij bûn. **Bextewar li serê wê he, ji xwe re malbatek zengîn dîtiye,* ***destşûştî û pêşûştî ye.*** **"...kurên pîrê têne hundir, dêna xwe danê ku du heb mêvanê destşûştî,* ***pêşûştî rûnîştî ne.***" Sinem İşler

Destvekirî bûn

Merd û destbelaş bûn. **"Xwedêyo ez her evdê te me, te kurekî baş, kurekî bihuş û bîr, kurekî* ***destvekirî*** *da min."* Kamiran Bedirxan

Destav lê teng bûn

Ketin tengasiya hewcedariya tuwaletê. *****Destav ku li mirov teng bû,*** *divê zêde neyê sekinîn.*

Destek dayîn

Alîkarî kirin. **Ku mala Seydo* ***dest nedana me,*** *me nedikarî ev kar bibira serî.*

Destek di nav rûn de, yek di hingiv de bûn

1. Di nav rewşeke xweş û rehet de bûn. **2.** Xwediyê karê girîng bûn. *****Destekî keçika wê di nav rûn de û di hingiv de ye,*** *êdî çi ji Xwedê dixwaze? *Maşelah Rûşen xwediyê karekî wisa ye ku* ***destek di nav rûn de û di hingiv de ye.***

Destek kirin

Ji bo bihêzkirinê tiştek hê zêdetir qewîn kirin. **Heke ew kolon bi hinek hesin an jî bi kolonên din ve* ***neyên destekkirin,*** *dibe ku ew avahî tep bibe.*

Destekî dizî ye, destê din li xwedî gazî ye.

Ji bo helwesta berevajî tê bikaranîn. **Ji rewşa Bedran min jî tiştek fêm nekir.* ***Destekî dizî ye, destê din li xwedî gazî ye.***

Destteng ketin

Xizan bûn. **Îsal mala Reşoyê Keremê Devsor gelekî* ***destteng ket,*** *kesî jî jê re alîkarî nekir.*

Destepêçkî hev bûn

bnr. Dest avêtin hev

Destepostî kirin

Parastin, veşartin. **"Hinek çûne, bûne peyayê dewletê, hinek jî ji wan re* ***destepostiyê dikin."*** Amed Tîgrîs

Destevala (bûn)

1. Bêçek bûn. **2.** Bêalet û bêalav bûn. **3.** Bêxelat û bêdiyarî bûn. **Hay ji armanca wan a xerab tune bû, loma* ***destevala*** *derket ber dêrî. *Heyran, min ji te re got* ***destevala*** *ew derî nayê çêkirin. *"Dê û bavê me bi me şad dibûn, çimku em qet vala nedisekinîn û* ***destevala*** *ji çolê bi ser malê de nedihatin."* Erebê Şemo

Destborîn kirin

1. Efû xwestin. Lê borandin. **2.** Sax û silamet bûn. **Her çi kiribe, min ew* ***destborîn kir*** *û çû.*

Destdirêjî (lê) kirin

1. Dizî kirin. **2.** Bênamûsî kirin. **Heyfa wî xortî ku hinekî* ***destdirêjiyê dike****. *Hê di wî temenî de* ***destdirêjî jina kurapê xwe kiriye****.*

Destek goşt bûn

Pir piçûk û lawaz bûn. **Ew belengaz* ***destek goşt e****, tu çi ji wî re ketiyî dewê?*

Destê ber derî ye, bikêşî wê bimerite, nekêşî wê biherişe.

Tu çawa bikî ziyanek dê çêbibe. *****Destê ber derî ye, bikêşî wê bimerite, nekêşî wê biherişe.*** *Bi çi awayî be çare nîn e.*

Destê (yekî) bibereket bûn

Ji bo kesên bi şans û pêkhatî tê gotin. **Destê Hecî* ***bi bereket e****, bila ew bikişîne.*

Destê (yekî) di bin kevir de bûn

1. Di bin binbariyekê de bûn. **2.** Bêçare û bêgav bûn. **Ew çi dibêje bila bibêje, nikare qûna xwe xelas bike, destê wî jî di bin kêvir de ye. *"Rast e, destê mêrê min û kurê min, ji qewlê gotiyan ve* ***ne bin kevir de ne*** *..."* Wezîrê Eşo

Destê (yekî) di dil de bûn

Gelekî bitatêl bûn. **Ji ber ku lawê wê pîlot e,* ***destê Meta Rûşen tim di dil de ye****.*

Destê (yekî) di nav ... de bûn

Bi awayekî neyînî be jî pê re têkildar bûn. **Ez wekî navê xwe dizanim ku* ***destê wî kûçikî di nav vî karî de ye****.*

Destê (yekî) di nav xwînê de bûn

1. Bi bûyereke kuştin an jî birîndarbûnê re têkildar bûn. **Mixabin îro* ***destê wî di nav xwînê de ye****, divê em bi her awayî jê re bibin alîkar.*

Destê (yekî) di rûn de bûn

Di nav rewşeke pir zor û xeter de bûn. **"Hema tu bes gazî min bike,* ***destê min di rûn de be*** *jî ez dê bêm."* Zana Farqînî

Destê (yekî) di xwînê de be jî hatin

Ji bo karên ku mîsoger divê bên kirin tê bikaranîn. **Çi dibe bila bibe,* ***destê min di xwînê de be jî, ez ê bêm****.*

Destê (yekî) di xwînê de bûn

Di nav rewşeke pir xeternak de bûn. **Xwedê biparêze, lê* ***destê min di xwînê de be*** *jî ez wî tu car wisa nahêlim.*

Destê (yekî) dirêj bûn

Xwedî bandor û bierk bûn. *****Destê Cindî Axayê Kor dirêj e****, here ku dê wî bibîne û ji we re bîne.*

Destê (yekî) gihîştin

Derfetên pêkanînê di dest de bûn. **Lawo ji te tika dikim! Dizanim ku **destê te digihîje**, ji lawê min re çareyekê bibîne!*

Destê (yekî) gihîştin dev

Debara xwe kirin. **Şikir ji Xwedê re, êdî **destê wî digihîje devê wî**, barê min jî sivik bû.*

Destê (yekî) jê nebûn

1. Jê gelekî hez kirin. **2.** Daxwaznekirina rabûna ji nik yekî. *Erê kêmasiyên wê gelek in lê çi bikim ku destê min jê nabe. **Min jî dizanibû ku ez gelekî bi derengî ketim, lê çawa bikim ku **destê min ji wê yara kubar nedibû**.*

Destê (yekî) ji erd û esman qetîn

Bêçare û bêderfet bûn. Tenê û bi serê xwe man. ** *"Çarekê ji min re bike, **destê min ji erd û esman qetiyaye**, ax li min!"* Rizaliyê Reşît

Destê (yekî) ketin piçengê

Bêçare û bêderfet man. ***Ji wê radeyê bi şûn de **destê min kete piçenga min**.*

Destê (yekî) ketin kulav

Li hev piçikîn. *****Destê wî ketiye kulav**, tu çi ji wî hêvî dikî?*

Destê merdan ketin nav ...

Bêsexbêr bûn, belawela bûn. ***Nizanim çawa bû, lê hema **destekî merdan ket nava mal û milkê** lawê min û belawela bû.*

Destê (yekî) li ber dêv man

Matmayî û ecêb man. ***Li hemberî wan kirinên Evdilcebar, **destê Gulê li ber dêv ma**.*

Destê (yekî) li bin çengê ketin

Di rewşa tengiyê de bûn. ***Tu rê ji bo çareseriyê nehate dîtin, di encamê de **destê Tahar li bin çengê ket**.*

Destê (yekî) li her dinya jî bûn

Bi her awayî di nav rewşeke neyînî de bûn. *****Destê wî li her dinya jî bûye**, êdî xêra wî ji tu kesî re nîn e.*

Destê (yekî) li ser serê (yekî) bûn

1. Debara xwe kirin. **2.** Têkildarî kesî nebûn. **3.** *Yek parastin û lê xwedî derketin. **Karê Keleş bi kesî re nabe, bi tenê **destê wî li ser serê wî ye**. ***Ji mirovên wer tu ziyan nayê, bi tenê **destê wî li ser serê wî ye**. ** "Çimkî hela **destê mêrê wê li ser serê wan bû**, lê wextê êdî ew ji ortê here, halê wan gelo wê çawa be?"* Xelîl Mûradov

Destê (yekî) li xwînê gerîn

Bi bûyereke kuştin an jî birîndarkirinê re têkildar bûn. *****Destê Şikak li xwînê geriya**, êdî jiyana wî hate guherandin.*

Destê min li ser serê te

Xuy, xislet û şansê te, bila wekî yê min be. **Destê min li ser serê te, înşelah tu jî wekî min ji qeza û belayan bifilitî.*

Destê (yekî) neçûn

1. Heyf pê hatin, qêmîş nekirin. **2.** Çikûs û timakar bûn. **Divê ez vî hespê xwe bifroşim, lê dikim nakim, **destê min naçiyê**. *Malik neşewitî, **destê wî nediçû** çar qurişan ku bide lawê xwe jî.*

Destê (yekî) neçûn bêrîkê

Qesîs bûn, tima bûn. **Hema bigire hemû mesref min kirin, yek carê jî **destê wî neçû bêrîka wî**.*

Destê (yekî) nehatin ber dêv

Rehetî û aramî nedîtin. **Ji dest van qeyranên aboriyê ev çendek e ku **destê me nayê ber devê me**.*

Destê (yekî) negihîştin ...

1. Ji quwetê der bûn. **2.** Xwe pê re negihandin, derfet nedîtin. **Bibore, lê **destê min nagihîje wê radeyê**. *Ez çiqasî lê geriyam jî **destê min negihîşte wê**.*

Destê (yekî) rast neketin bêrîkê

Ji bo kesên sextekar tê gotin. **Kê ji wî kêrek dîtiye ku ez jî jê bibînim? **Destê wî, rast nakeve bêrîka wî**.*

Destê (yekî) rast neketin bêrîka dê

bnr. Destê (yekî) rast neketin bêrîkê

Destê te bi devê te bikeve!

Tu cezayê xwe bi destê xwe bibînî. **Ez çi bibêjim, înşelah **destê te bi devê te bikeve**.* (nifir)

Destê te ne destê mangedoşan in.

bnr. Devê te ne devê zirna zer e.

Destê (yekî) teng bûn

Di hêla aborî de di nav tengasiyê de bûn. **Lawo îsal **destê me teng e**, înşelah em ê saleke din daweta te bikin.*

Destê (yekî) tijî garis be, libek jê nakeve.

Pir timahkar û çikûs bûn. **Tu bi ya min bikî, qet jê nexwaze û xwe erzan meke, **destê wî tijî garis be, libek jê nakeve**.*

Destê (yekî) tiştek negirtin

Ji ber xemgînî û moral xerabbûnê, karek nekirin. **"Qeymez pir-poşman paş de vegeriya. **Destê wî tu tişt nedigirt**, nikaribû tu kar bikira..."* Eskerê Boyîk

Destê vala û bi rûyê reş (Bi destê vala û bi rûyê reş)

Bêhilberîn, bêencam, neheq û fedîkar. **Di dawiya dawî de ez **bi destê vala û bi rûyê reş**, mam li hemberî keçika xwe.*

Destê xwe bi tihêla (tehêla) xwe venan

1. Xwe qure kirin. **2.** Karek nekirin, teralî kirin. **Em xebitîn, wî jî **destê xwe bi tihêla xwe venan** û li ser me çû û hat.*

Destê xwe birin xwe

Li ber xwe dan, dest hildan. **Ku Hesen **dest xwe nebira xwe**, niha di nexweşxaneyê de di nav rewşeke pir xerab de bû.*

Destê xwe bêhn kirin

Rewş fêm kirin. **Ma te **destê xwe bêhn kiribû** ku em ê jî bên?* (qerf)

Destê xwe danîn ser serê xwe

1. Xwe parastin. **2.** Bi xwe kar û barê xwe kirin an jî çareya serê xwe dîtin. **Kurdan di dîrokê de tim tenê **destê xwe dane ser serê xwe**, ji ber wê nebûne dewlet jî. ****Destê xwe dide ser serê xwe**, tu ziyaneke wê nagihîje kesekî.*

Destê xwe dax kirin

Tobe kirin. Tu car ji bîr nekirin. **Li ser wê bûyerê min **destê xwe dax kir**, êdî ez careke din têkildarî wan rezîlan nabim.*

Destê xwe dayîn, milê xwe xelas nekirin

bnr. Destê xwe dayîn, hûçikê xwe xelas nekirin

Destê xwe dayîn, hûçikê xwe xelas nekirin

Bi têkilî û karekî piçûk tê gerîn lê xwe zor jê xelas kirin. **Kuro me **destê xwe dayê, em hûçikê xwe xelas nakin** heyran.*

Destê xwe dayîn hev

Alîkarî bi hev û din re kirin. **Her sê birayan **destê xwe dane hev**, di demeke kurt de mala xwe çêkirin.*

Destê xwe dayîn pişt qûna xwe

1. Mineta xwe negirtin. **2.** Quretî kirin. **3.** Di nav rehetiyê de bûn. **4.** Teralî kirin. **Qet ji kesî jî natirse, di nav wan de **destê xwe dide pişt qûna xwe**, diçe û tê. *Çima ku çend meh an li Firansayê maye, di nav çarşiyê de **destê xwe dide pişt qûna xwe**, digere. *Maşelah karê wî rehet e, heta êvarê **destê xwe dide pişt qûna xwe**. *Birayên wî dixebitîn, ew jî hema **destê xwe dide pişt qûna xwe** û digere.*

Destê xwe li destê (yekî) xistin

Pevçûyîn, xeyîdîn. **Hema ew bû ku min mêze kir Tefo **destê xwe li destê min xist**, pozê xwe hilda û çû.*

Destê xwe dayîn li ser wîjdana xwe

A rast û heqî fikirîn. **Ez tiştekî nabêjim, tu rewşê dizanî, **destê xwe bide ser wîjdana xwe** û biryara xwe bide.*

Destê xwe di ava sar û germ de nekirin

Tu karek nekirin. **Xwedê dizane, Rojhilat rojekê **destê xwe di ava sar û germ de nedikir**.*

Destê xwe di xwînê dan
Ji ber kuştin an jî birîndarkirinê xwe xistin belayê. **Sed car heyf ku wî **destê xwe di xwînê da**, êdî jiyana wî heram bû, çû.*

Destê xwe dirêjî nenasan kirin
Hewcedarî kesên xerîb bûn. **"Di axiriyê de para her kesî piçûk dima û her kes dibû ketî, xizan, hewcedar û **destê xwe dirêjî nenasan dikir**."* Ahmet Pelda

Destê xwe dirêjî (yekî) kirin
1. Alîkarî kirin. **2.** Yek tawanbar kirin. **Bedir bimire jî **destê xwe dirêjî yekî feqîr nake**. *Kuro hêbav, ma min çi xerabî bi te kiribû, te di nav wan de **destê xwe dirêjî min kir**.*

Destê xwe giran girtin
Xwe bi derengî xistin. Kar hêdî kirin. **Heke tu **destê xwe giran negirî**, tu yê di navîna du rojan de wî karî xelas bikî.*

Destê xwe hene kirin
Kêfxweş bûn. **Dibêjin, nexweşiya kansêrê bi Kewê girtiye, de bila bûka wê **destê xwe hene bike**.*

Destê xwe hildan
Ecele kirin. **Êdî divê hûn **destê xwe hildin** û xwe bigihînin wan.*

Destê xwe jê berdan
bnr. Dest jê kişandin

Destê xwe jê hilgirtin
bnr. Dest jê kişandin

Destê xwe jê kişandin
Dev jê berdan. Têkiliya xwe jê birîn. **Erê, berê bi tiştên wisa heram re mijûl dibû, lê êdî îro **destê xwe ji wan karan kişandiye**.*

Destê xwe jê re danîn ser hev
Serî tewandin, ji bêgavî (mecbûrî) pejirandin. **Xembar mêze kir ku jê re serederî nake, **destê xwe jê re danîn ser hev**.*

Destê xwe jê şûştin (Dest jê şûştin)
Hêviya xwe jê birîn. **"Carinan **destê xwe jê dişûşt** lê (ji) dilê wî nedihat şûştin."* Helîm Yûsiv

Destê xwe ji ber kişandin
Dev ji alîkarî û parastinê berdan. **Xwedê dizane hema ez îro **destê xwe ji ber wî karî bikişînim**, ew dê perîşan bibin.*

Destê xwe ji dawa Xwedê neqetandin
Ji riya Xwedê derneketin. **Lawo, tu çi dikî bike, lê tu carî **destê xwe ji dawa Xwedê neqetîne**.*

Destê xwe ji pêsîrê nekişandin
Doza tiştekî lê kirin. **Şakir kir û nekir, Zerdayê **destê xwe ji pêsîrê nekişand**.*

Destê xwe kirin (xistin) qebza hebrîngê
Firsend bi dest xwe xistin. **Hay lo lo! Ew çi çavê diya xwe ye, wî ancax ku **destê xwe kiriye qebza hebrîngê**.*

Destê xwe lê gerandin
Seh kirin, tesele kirin. **Min **destê xwe lê gerand** tiştekî xirab nayê xuyan.*

Destê xwe lê nexistin
1. Tu alîkarî nekirin. **2.** Têkildar nebûn. **Weydo, tek carekê jî **destê xwe li wî karê me nexist**. *Tu bi ya min bikî qet **destê xwe li vî karî nexe**, hema tu çiqasî jê dûr bî, ew qasî baş e.*

Destê xwe li barê (yekî) xistin
bnr: Li barê (yekî) nihêrîn

Destê xwe li ber (yekî) girê dan
Rûmet û rêz nîşan dan. **Hemû mirîdên wî **destê xwe li ber wî girê didin** û yeka wî nakin dudu.*

Destê xwe li ber hildan
Li hember li ber xwe dan. **Ji xwe min ku **destê xwe li ber hilneda**, wê bêhtir bi ser min de bihata.*

Destê xwe li ber (yekî) ranekirin
Ji ber rêz û hurmetê, li hember kesekî şîdet nîşan nedan. **Ez bawer im ku ez çend sîleyan jî lêxim, Egîd **destê xwe li ber min ranake**.*

Destê xwe li ber xelkê vekirin
Hewcedarî hinekên din bûn. **Mirov ku bi hesabê xwe nizanibe, wê di dawiyê de wisa **destê xwe li ber xelkê veke**.*

Destê xwe li ber Xwedê vegirtin
Dia kirin. **Tiştek ji dest nedihat, hema **destê xwe li ber Xwedê vegirt** û dest bi diayên ku dizanibû dikir.*

Destê xwe li destê (yekî) nexistin
Hempa nebûn. **Helbet ez jî dizanim, ew nikare **destê xwe li destê Bengînê bixe**, lê min ji bo tiştekî din got.*

Destê xwe li hev sûtin
Bê çare man. Di tengasiyê de bûn. **Belengazî nizanibû çawa bikira, hema diçû dihat û **destê xwe li hev disût**.*

Destê xwe li pişta (yekî) xistin
1. Hadandin. Kişkiş kirin. **2.** Ecibandin. Eferim gotin. **Nijadperestan **destê xwe li pişta***

hinek ciwanên Kurd dixistin *û ew li hember welatparêzan dikirin şer.* **Ji ber jîrbûna wî,** *mamosteyê wî bi şanazî* ***destê xwe li pişta Celadet xist.***

Destê xwe li herfa Quranê xistin
bnr. Destê xwe li Quranê xistin

Destê xwe li orta Quranê xistin
bnr. Destê xwe li Quranê xistin

Dest xwe li Quranê xistin
Sond xwarin. *Piştî ku wê destê xwe li Quranê xist, êdî tiştekî min bigota nema.

Destê xwe li ser serê xwe sî kirin
bnr. Destê xwe danîn ser serê xwe

Destê xwe li sîngê xwe xistin
Pesnê xwe dan. Xwe qure kirin. *Weydoyê Xelef di nav wan de* ***destê xwe li sîngê xwe dixist****, lê kesî guh nedidayê.*

Destê xwe li xwînê dan
Xwe li belayê dan. Bela li serê xwe vekirin.*Tiştek jî li holê tune bû, lê çû* ***destê xwe li xwînê da*** *û jiyana xwe herimand.*

Destê xwe nedan ser zikê têr
Têr nexwarin, teralî kirin. *Înşelah tu qet* ***destê xwe nedî ser zikê têr.*** (nifir)

Destê xwe neavêtin bêrîka xwe
Çikûsî kirin, ji mesrefê revîn. *Me hemûyan ji bo wan ciwanan alîkarî kir, tenê Xalid Beg* ***destê xwe naevête bêrîka xwe.***

Destê xwe pê nekirin (Destê xwe nedan tiştekî)
1. Teralî kirin, tu karek nekirin. **2.** Tu tiştek neguherandin. *Jinika teze hema wekî mêvanan rûdine, qet* ***destê xwe nade tu tiştî.*** *Qet meraqan meke, wê* ***destê xwe pê nekiriye****, te çawa hiştiye, hema wisa ye.*

Destê xwe sivik girtin
Lezandin. *Heke em* ***destê xwe sivik bigirin****, dibe ku em îro jî vî karî biqedînin.*

Destê xwe tê dan
Ketin nav karekî. *Êdî me* ***destê xwe tê daye****, divê em bi serfîrazî vî karî bibin serî.*

Destê xwe vekirin
bnr. Destê xwe li ber xelkê vekirin

Destê xwe xistina qula mozan
bnr. Tiliya xwe xistin qula mêşan

Destê xwe zû girtin
bnr. Destê xwe sivik girtin

Destê (yekî) germ bûn
Pere ketin dest. **Van rojan, kêfa Serhing xweş e,* ***destê wî germ in.***

Destê (yekî) pere dîtin
bnr. Destê (yekî) germ bûn

Destê yekî şiv (dar) girtin
1. Gihîştin, mezin bûn, hatin radeya karpêkanîn û pere qezenckirinê. (Zêdetir tê wateya pêkanîna şivanî, gavaniyê.) **2.** Hatin radeya di nav şeran de cihgirtin û alîkarîkirinê. **Êdî şikir ji Xwedê re Memoyê me mezin bûye û* ***destê wî şivê digire.*** **Mala Şemê wisa piçûk nebûnin herî kêm bîst mêrê wan ên ku* ***destê wan şivê digire*** *hene.*

Destê (yekî) zêr birîn
Pêkhatî û hunerwer bûn. **Hosteyekî wisan e ku maşelah* ***destê wî zêr dibire.***

Destên (yekî) di paşilê de man
Bê çare û xemgîn man. **Li hemberî wan kirinên wî hema* ***destên min di paşila min de man*** *û min nizanibû ku ez çi bikim.*

Destên (yekî) di rex de hatin
Ji ber xebereke reş an jî qewîmîneke xirab li ber xwe ketin. Moral xirab bûn. **Bi dîtina cenaze re* ***destên dîlanê di rex de hatin.***

Destgirtî bûn
Çikûs û temahkar bûn. **Gebar miroveki* ***destgirtî ye,*** *ji wî tiştekî hêvî mekin.*

Destkuja (yekî) helal nebûn
Ji bo kesên pir gunehkar an jî ne misliman tê gotin. *****Destkuja wî ne helal e,*** *heyfa we ye xwe neherimînin.*

Destkuja (yekî) sivik bûn
Ji yên ku dema pez an jî dewêr şerjê dikin, karê xwe zû diqedînin re tê gotin. **Maşelah* ***destkuja Apê Fetalı pir sivik e.***

Destmala jina (yekî) li serî bûn
Ji bo mêrên bêxîret tê bikaranîn. *****Destmala jina te li serê te be.*** *Ma tu jî mêr î?*

Destmala sor şandin pey (yekî)
Bi awayekî rêzdar vexwendin. **Em gelekî bi hesreta wan bûn. Me* ***destmala sor şandiye pey wan.***

Destmala sorik, daye ber çavê korik.
Ji bo derfetên ne layiq tê bikaranîn. **Ew jî qedera Xwedê ye,* ***destmala sorik, daye ber çavê korik.*** (qerf)

Destmêja xwe şikandin

Hewcedariya xwe ya avdestxaneyê dîtin. **Heya ew li dor xwe zivirîn min* ***destmêja xwe şikand*** *jî.*

Desto bi xwe gesto, ha diwesto, ha diwesto

Xetaya ku mirov bi destê xwe bike, çareya wê pir zor e. **Jixwe ez nikarim tu kesî tawanbar bikim.* ***Desto bi xwe gesto, ha diwesto, ha diwesto.***

Desto bike, devo bixwe.

Divê mirov bixebite da ku berê wê jî hilgire. **Ma wisa li cihê sekinî tiştek pêk tê? Çi gotine:* ***"Desto bike, devo bixwe."***

Destok bûn

Ji bo ajalên ji mirov narevin tê gotin. **"Pisîka me* ***destok e****, ji mirov nareve."* Amed Tîgrîs

Dev avêtin hev

Li hember hev tiştên nebaş gotin. **Jixwe edeta wan e, heya* ***dev neavêjine hev*** *rehet nabin.*

Dev avêtin (yekî)

Paşgotiniya yekî kirin. **"Dê ne hedê kesî bûya* ***dev biavêje*** *bedewî û çelengiya wê..."* Adnan Alp

Dev bêxwedî bûn

bnr. Devbelaş bûn

Dev bigû bûn

bnr. Devgemar bûn

Dev çûn paş kerikan

bnr. Dev gihîştin pelika guh

Dev dayîn ber hev

1. Şer kirin. Devejenî hatin hev. **2.** Sohbeteke ji dil û kûr kirin. **Her du keçikan* ***dev dane ber hev****, tiştek nema ku ji hev du re negotin. *Dewrêşê Sînemê û wê jinekê saetekê* ***dev dan ber hev****, te digot wê bikevin hundirê devê hev.*

Dev dibêje, dil nabêje.

Armanc û gotin wekî hev nebûn. **Tu wisa li gotina wê menêre, belê rast e* ***dev dibêje, lê dil nabêje****.*

Dev heye, ziman nîn e.

Ji bo yên zêde napeyîvin û astengiyan dernaxin tê bikaranîn. *****Dev heye, ziman nîn e.*** *Tu çi ji wî belengazî hêvî dikî?*

Dev jê berdan

Rehet berdan. Têkilî birîn. **"Şervan, axaftina jiyana Kurdan e, îşareta namûsa Kurdan e û heya roja azadbûnê* ***dev jê nayê berdan****."* Hüseyin Kaytan

Dev jê.gerîn
bnr. Dev jê berdan

Dev jê qerîn
bnr. Dev jê berdan

Dev jev (ji hev) man
bnr. Dev bihostek ji hev çûn

Dev ji gotina xwe bernedan
Bi biryar gotina xwe parastin. Bieks û inyad bûn. **Ew wisan e, gava ku tiştek got, dinya xera bibe,* ***dev ji gotina xwe bernade****.*

Dev ji hev çûn
Şaşwazî man. **Hema bi dîtina Serhat re* ***devê wê ji hev çû****.*

Dev ji hev berdan
Têkilî ji hev û din birîn. **Van rojan qet dengê wan nayê, wer tê xuyan ku van her du cîranên me, êdî* ***dev ji hev berdane****.*

Dev ji şîr şewitiye, pifî dêw dike.
bnr. Devê (yekî) ji girarê şewitiye, pif dike kevçî.

Dev ji xwe berdan
1. Çi hatin dêv gotin. **2.** Xwe winda kirin ; hay ji xwe tune bûn. **Selahedîn* ***dev ji xwe berdabû****, hema çi dihate dêv bi devekî kef digot. *Ezbenî, ka tu ketibûyî rewşeke wer ku te* ***dev ji xwe berdabû****.*

Dev ji zirneya zer berdaye, bi qula ebcetê girtiye.
Karê girîng û xweş (!) berdaye, bi tiştên pûç re mijûl dibe. **Xwedê aqil bide vî biraziyê min,* ***dev ji zirneya zer berdaye, bi qula ebcetê girtiye****.* (qerf)

Dev lê ketin
Tam jê girtin. *****Dev lê ketiye.*** *Êdî ew nikare bisekine.*

Dev lê nesekinîn
1. Pirbêj, lafek û geveze bûn. **2.** Raz gotin. **Heya êvarê* ***dev li Zeyno nasekine****. *Divê te ji Bedran re negota* ***dev lê nasekine****, wê li hin cihan bihêje, em ê rezîl bibin.*

Dev li ber (yekî) xwar kirin
Hewcedarî hinekan bûn. **Her çi qas hin caran ji bêgavî be jî, lê dîsa jî ez bawer im ku* ***dev li ber hinekan xwarkirin*** *helwesteke pir zor e.*

Dev li dilê xwe kirin
Ji bêgavî pejirandin. **Keçika porkur çawa bike,* ***dev li dilê xwe kir*** *û ew pejirand.*

Dev mizemiz kirin
bnr. Devsist bûn

Dev pê nekirin

Nexistin devê xwe, tehm nekirin. **Ew qas xwarinên xweş hebûn, lê Xanê ji zotikê xwe carekê jî* ***dev pê nekir****.*

Dev tiştek, dil tiştekî din gotin

Niyet û gotin wekî hev nebûn. **Ka ez çawa bi wê bawer bim,* ***dev tiştek, dil tiştekî din dibêje****.*

Dev û diranên (yekî) ketin hev

Ji ber nexweşiyek an jî tiştekî din tenduristî xerab bûn. **Di nav du saetan de* ***dev û diranên Axînazê ketin hev****.*

Dev û dînê xwe yek kirin

Çi di dil de hebe eşkere anîn ziman. Wekî bawerî û dîtina xwe peyivîn. **Rizgo mirovekî durist e, heta ku* ***dev û dînê xwe yek neke****, tu car rehet nabe.*

Dev û lêvên (yekî) bûn girar

Dev bi temamî birîn bûn. **Nizanim çawa bû,* ***dev û lêvên keçikê bûne girar****.*

Dev û qûna (yekî) bûn yek

Eziyet û zoreke pir dijwar kişandin. **Şerefedînê reben, heya ew zarokên xwe bi firê xistin,* ***dev û qûna wî bûn yek****.*

Dev û qûna xwe ji hev dernexistin

Bêfêm, bêferaset û gêj bûn. **Ew rebenê Xwedê nikare* ***dev û qûna xwe ji hev derxe****.*

Dev xweş kirin

1. Lafekî kirin. **2.** Şalûşî (yağcılık) kirin. **Şikak gelekî* ***dev xweş dike****, lê bi bawer nakuye. *Erê, ew ji bo min* ***dev xweş dike****, lê tu bawer be li min jî xweş nayê.*

Devarav bûn

bnr. Devgemar bûn

Devbelaş bûn

Gotina xwe neteqilandin, li gotina xwe hakim nebûn. **Tu bi Xwedê bikî guh nede Roder, tu jî dizanî ku ew xortekî* ***devbelaş e****.*

Devbeş bûn (Devê xwe beş kirin)

Beşeve hatin, bişirîn. **"****Devê wê beş bû****, neşiya bêhna xwe hilkêşe."* İbrahim Selman

Devdost, dilxayîn bûn

Durûtî kirin. Armanca xwe ya xerab nîşan nedan. **Tiştên xweş dibêje, lê ez baş dizanim ku ew yeke* ***dev dost, dil xayîn e****.*

Deve dikeve nav pembû, çavên xwe digire û dibêje: "Kes min nabîne."

Tenê bi niyet an jî bi daxwazan tu tişt pêk nayên. *****Deve dikeve nav pembû, çavên xwe digire û dibêje: "Kes min nabîne."*** *Em nikarin bi van xeyalan xwe bixapînin.*

Deve hate pol, pol tune bû. (Deve hat bi pûlekê, pûl nabî.)
Rewşa gelemperî çiqasî lêhatî be jî heke derfet tune bin pêk nayê. **Deve hat bi pûlekê, pûl nabî.* *Bi pênc qurşan jî bidin, ku di dest de tune be, em dê çawa bistînin?*

Deve nal kirin, rovî got: "Piyê min jî."
Hinek zerengî û rastiya xwe nabînin. **Deve nal kirin, rovî got: "Piyê min jî."* *Lawo tu nikarî wî barî wekî wî hilgirî.*

Deve nedît li rêzê, pişkul dît li pirêzê (fêzê).
Ji bo nêzîkbûna berevajî û ecêb tê bikaranîn. **Ew mirovekî famkor e.* ***Deve nedît li rêzê, pişkul dît li pirêzê.***

Deve û gêre?!
Her tişt û her kes divê wekî hempa û hêza xwe be. **Deve û gêre?!* *Ev mirovê nezan û ev karê teknîk dê çawa pêk bê?*

Devejenî hatin hev
bnr. Bi qirika hev girtin

Dever lê ketin
bnr. Gen lê ketin

Deverû bûn
1. Rewş xeter bûn, berevajî bûn. **2.** Rijîn, wergerîn. **Mixabin, rewşa wî niha ne wekî berê ye, rozgara wî* ***deverû bûye.*** **Ew xwarin hemû* ***deverû bû*** *û zarok man bê firavîn.*

Deverû hiştin
Alikarî nekirin, yek di nîvê rê de hiştin. **Kesî ji Xembar ew yek hêvî nedikir, wî ew nîvekarê xwe yê kal* ***deverû hişt.***

Deveyê bi çêrm ve dixwe, dilê xwe bi mêşê diêşîne.
Ji bo helwest û xisletên ne di cih de û bi nakokî tê bikaranîn. *****Deveyê bi çêrm dixwe, dilê xwe bi mêşê diêşîne.*** *Wî bi xwe gunehê dinyayê kiriye, ji şansê min re di vê meseleya piçûk de sofîtiya wî pê girtiye.*

Devê (yekî) bi erdê ve gihîştin
Gelek betilîn. Ji bo karekî gelek eziyet û tadeyê dîtin. **Bi rastî jî heya Evîndarê ew kar kuta kir,* ***devê wê bi erdê ve gihîşt.***

Devê (yekî) bi xwê miz dan
Eziyet lê kirin. *****Fato devê Silho wisa bi xwê miz dabû*** *ku gunehê gawiran pê dihat.*

Devê (yekî) bihostek ji hev çûn (man)
Matmayî man. **Hemdiya ji çavên xwe bawer nedikir,* ***devê wê bihostek ji hev çûbû.***

Devê (yekî) çûn pişta guh
Kêfxweş û dilgeş bûn. **Ji her hatina lawê wî,* ***devê Setîf çû pişta guh.***

Devê (yekî) gihîştin erdê

1. Ketin rewşeke pir dijwar. **2.** Pîr bûn. **Heta Mehmûd ew zarokên xwe dane xwendin, **devê wî gilûşte erdê**. *Êdî temenê kalikê min gilûştiye heştê û şeşan, **devê wî gihîştiye erdê**.*

Devê (yekî) gihîştin pelika guh

Gelekî şad bûn. **Gava ku ew xebera xweş gihîşt Siltanê **devê wê gihûşte pelika guhê wê**.*

Devê (yekî) girê dan

Bi cure cure riyan, yek di bin bandora xwe de hiştin. **Diya keçikê bi fêl fîstik û bi niviştan **devê zavayê xwe girê daye**, kiriye segê xwe.*

Devê deriyê (yekî) girtin

Bi niyeteke nebaş bi ser malê de girtin. **Celîşan nîvê şevê **devê deriyê Haco girtin** û mala wî şewitandin.*

Devê dîzê vekirin

Tiştên veşartî ku kes pê nizane eşkere kirin. Raz gotin. **Binêre ez ji te re dibêjim zêde bi ser min de neyê, ez ê **devê dîzê vekim** ha.*

Devê hirçê negihîşt sêvê, got: "Çawa tirş e!".

bnr: Devê rovî negihîşte tirî, got: "tirş e."

Devê hîz berdan, bi qûna hîz girtin

Karê çiloçepî kirin. **Wa ye **devê hîz berdaye, bi qûna hîz girtiye**. Ka ev dê çawa vî karî heya dawiyê bimeşîne?*

Devê (yekî) kilît bûn

1. Ji ber neheqbûn an jî xiroşê tiştek negotin. **2.** Ji ber nexweşiyê dev negerîn. **Filît wisa neheq bû ku Rênas jê re çi got, **devê wî li ber kilît bû**, nikaribû tiştekî bibêje. *Kalikê min wisa nexweş e ku ev şeş roj in **devê wî kilît bûye** nikare yek peyvê xeber bide.*

Devê (yekî) kirê xwestin

Ji bo kesên zêde napeyivin tê gotin. **Malavawo, ma **devê te kirê ji te dixwaze**? Ca tu jî çend gotinan bibêje ha.*

Devê kîs vekirin

Pere xerc kirin, mesref kirin. **Kesî ji Perîşanê ew qas hêvî nedikir, lê bi rastî jî wê rojê wê **devê kîs vekir**.*

Devê (yekî) li hev piçikîn

Ji ber tevlihevbûnê zelal xeber nedan. **Ji kerba keçikê, **devê Hesen li hev piçikî**.*

Devê (yekî) li kevirê reş ketin

Li rastî xirabiyekê hatin. (Zêdetir ji bo tiştên neyînî dibêjin tê bikaranîn.) **Keçê **devê te li kevirê reş bikeve**, tu çawa wan gotinên xerab ji bo qîzapa min dibêjî?* (nifir)

Devê lîçê asê kirin

Di hêla aborî de ji mesrefan revîn. **Divê em çendekî **devê lîçê asê bikin**. Çimkî van rojan rewşa dikana me ne baş e.*

Devê meseleyê vekirin

Qala mijarekê kirin. **Tam di dawiyê de wî **devê meseleyê vekir**.*

Devê (yekî) ne li cem bûn (Dev ne pê re bûn)

Di bin bandora hinekên din de bûn. **Gotin û ramanekê ji Koço hêvî nekin. Ji ber ku **devê wî rehenî ne li cem wî ye**.*

Devê (yekî) nesekinîn

Gilî gerandin, bêsebir bûn zêde peyivîn. **"Lê min lûn diyarê civînan nedîtiye. Çiku hemû dizanin **devê min nasekine**."* Osman Sebrî

Devê pisîkê nagî (nagihê) çortan, dibêje: "şor e !"

bnr. Devê rovî negihîşte tiriyan got: "tirş e."

Devê pisîkê negihîşt goşt, got : "Min xêra dê û bavê hişt."

bnr. Devê rovî negihîşte tiriyan got: "tirş e."

Devê rovî negihîşte tirî got: "Tirş e."

Yê ku nikare pêk bîne yan jî bi dest bixe, wê yekê wekî xerab dide nîşandan. **Got: **"Devê rovî negihîşte tirî got: Tirş e."** Heke ku te bikaribûya, te bi destê tu kesî ve bernedida, lê niha jî xerab didî xuyandin.*

Devê sandoqê vekirin

Tiştên veşartî eşkere kirin. **Min got ez **devê sandoqê venekim**, naxwe ji bo min ne xem e.*

Devê (yekî) şewitîn

Ji ber bûyereke neyînî, (ku ziyan jê hatiye dîtin), di pêkhatina careke din de vekişîn. **Carekê jî na, lê tam du caran **devê wê şewitiye**, ji ber vê yekê wisa vedikişe.*

Devê te ne devê zirneya zer e.

Her kes nikare her tiştî bike. Ew yek ne layiqî te ye. **Tu wî karî berde Heyder, ezbenî, **devê te ne devê zirneya zer e**.* (bnr. çîrok)

Devê te tijî xwîn be, bidî (yekî) nerêje.

Ji bo kesên ku gelekî giliyan digerînin tê gotin. **Eman ha eman, bila ji te re tembîha min be, heke **devê te tijî xwîn be, bidî Axînarê nerêje**.*

Devê wan li gebola wan

Hema ew in û xwarin û vexwarina wan e. **Dev ji yên boşboxaz berdin heyran, hema **devê wan li gebola wan**.*

"Devê te ne devê zirna zer e."

Di dawetê de dema ku govend digere, ê kurd zimeya di destê yê roman (mirtib) de jê digire û dixwaze lê bixe. lê çiqas hewl dide xwe nikare baş deng jê derxe û qaydeyekî lê bixe.
Yê roman diqehire û dibêje: "Ka zimeya min heyran. *"Devê te ne devê zirneya zer e."*

Devê (yekî) wekî aş bûn

Pir xwarin xwarin. **Devê Barzan weke aşekî ye, maşelah hema ji aliyekî ve dihêre, ji aliyekî ve jî dixwaze.*

Devê xelkê ne doxîna diya min e ku girê bidim.

Xelkê xerîb dikare her tiştî bibêje, mirov nikare li pêşiyê bisekine. **Ez çawa bikim heyran? **Devê xelkê ne doxîna diya min e ez ku girê bidim.***

Devê xwe bi xêr vekirin (Devê xwe ji xêrê re vekirin)

Tiştên baş gotin. Erênî axaftin. **Dev ji wan gotinan berde, hinekî jî **devê xwe ji xêrê re veke lo**!*

Devê xwe dayîn ber bayê geliyan

Bêderfet bûn, feqîr û xizan bûn. **Celadet herê bi qedrê mal û milkê xwe nizanibû, heya ku di dawiyê de **devê xwe da ber bayê geliyan**.*

Devê xwe dayîn ber devê (yekî)

Yek wekî hempayê xwe dîtin. **Lawo ew ne hempayê te ye, te çima wisa **devê xwe dabû ber devê wî beredayî**?*

Devê xwe girê dan

1. Tiştek nexwarin. **2.** Tiştek nepeyivîn. **Ji ber wê xemginiyê, Aycanê heya êvarê **devê xwe girê da**, tiştek nexwar. *Ji zotik û eksan Gulbiharê wê rojê **devê xwe girê da**, yek peyv neda ser zimanê xwe.*

Devê xwe girtin, qûna xwe vekirin

Çêr kirin. Sixêf kirin. **Nizanim Dedo çi bi Gewrê kiribû, diya Gewrê **devê xwe girt û qûna xwe vekir**.*

Devê xwe guherandin

Dev ji gotina xwe ya pêşîn berdan. Dest bi gotineke din kirin. **Ji ber ku dijminên wan di vê danişîna dadgehê de **devê xwe guherandin**, cezayê Bedirxan gelekî kêm bû.*

Devê xwe kirin (xistin) canê (yekî)

Eziyet û tadeyî bi yekî kirin. **Lawo te **devê xwe kiriye canê min**, tu çi ji min dixwazî?*

Devê xwe lê xwar kirin

Qerf û tinazên xwe bi yekî kirin. **Ji ber ku wî hinekî xwe şaş kiriye, zarok **devê xwe lê xwar dikin**.*

Devê xwe li ber xelkê xwar kirin

Hewcedarî hinekên biyan bûn. **Min ji bo wê ew qasî **devê xwe li ber xelkê xwar kir** lê wê tu tiştek nehesiband.*

Devê xwe li ber vekirin

bnr. Devê xwe li ber xelkê xwar kirin

Devê xwe li ber (yekî) xwar kirin
Ji bo pêdivî yan jî hewcedariyekê lavayî kirin. **Xwedê kesî hewcedarî kesî neke, min* ***devê li ber wî xwar kir*** *lê tu xwîn ji xwe berneda.*

Devê xwe mezin kirin
Pesnên xwe dan. **Wî di nava cimaeta mezin de dîsa* ***devê xwe mezin dikir****.*

Devê xwe miçiqandin
Bi awayekî qure xeber dan. **Horiyê* ***devê xwe miçiqand*** *û çavên xwe bi ser hev de qirpandin û ji Fatima cînar re got.*

Devê xwe mor kirin
Bi zanetî xeber nedan; an jî biryara xebernedanê dan. **Malavabûyî, tu dibêjî te* ***devê xwe mor kiriye****, ji êvar de te yek peyv negot.*

Devê xwe pê nekirin
Tiştek jê nexwarin. **Zal'wisa nexweş e ku tu çi didî her qet* ***devê xwe pê nake****.*

Devê xwe qul nekirin
Bêdeng man. Xeber nedan **Ew qas saet em li bal hev man, Şakir yek carê* ***devê xwe qul nekir*** *û du peyv negotin.*

Devê xwe tal kirin
Aramî û hizûr revandin. **Xwezî min ew sebav nedaya xeberdanê û* ***devê xwe jî tal nekira****.*

Devê xwe temîz kirin
Wekî ku qet tiştên xerab negotiye, xwe bêsûc û bêgunah nîşan dan. **Ew wisa* ***devê xwe temîz dike****, lê min bi guhên xwe bihîstin ku wê demê wê çi digot.*

Devê xwe tijî kirin
Ji bo hinek gotinan xwe amade kirin. **"Berçemê* ***devê xwe tijî kir*** *ku bipeyive, nola ku heft heb destê xwe danîbin ser devê wê, nikaribû bipeyive."* Fevzi Bilge

Devê xwe vala nehiştin
Tenê ji bo axaftinê axivîn.. **"... li ser kaniyan weke mijareke ku pê* ***devê xwe vala nehêlin*** *qal kirin, di pey re ev gilî geriyan û her geriyan."* Musa Vazgali

Devê xwe vekirin
Zêdetir ji bo tiştên neyînî dest bi axaftinê kirin. **Di dawiya civînê de Faris* ***devê xwe vekir*** *û heya ku dilê wî rehet bû axivî.*

Devê xwe xistin birîna xwe
Bi xwe bi derdê xwe ve mijûl bûn. **Wî rojekê ji kesî alîkariyek nexwest,* ***devê xwe xiste birîna xwe*** *û sekinî.*

Devê xwe xistin guh
Ji hev û din re tiştên dizî (taybet) gotin. **Dema ku di civînê de du caran Ruhan û Belgînê* ***devê xwe xistin guhên hev****, rêveberê civînê ew şiyar kirin.*

Devê xwe xweş kirin

Bi awayekî ne xwezayî û ne ji dil xwe şîrîn nîşan dan. **Zerê gelekî hewl dide û* ***devê xwe xweş dike****, lê xwediyê goşt jî dizane goşt heram e, xwediyê pereyan jî dizane ku pere qelp in.*

Devê xwe kirin yek

Heman tişt gotin. Tifaq kirin. **Ya ku ez dizanim ew cuda difikirîn, lê ji bo berjewendiyên xwe* ***devê xwe kirin yek****.*

Devê (yekî) girê dan

1. Axaftin û gotinên kesekî asteng kirin. **2.** Ji ber mafdarbûnê bi awayekî xwezahî rê li ber xeberdana kesekî girtin. **Xaltiya Şuretê* ***devê Mîrşan bi efsûnan daye girêdan****. *Misto wisa* ***devê wî girê da*** *ku rêyek tê re nedît ku tiştekî bibêje.*

Devê (yekî) girtin

Bi çewisandin an jî bi riyeke din peyivandina kesekî asteng kirin. **Keçikê dixwest ku ya rastî bibêje, lê malbata Şemo* ***devê wê girt****.*

Devgemar bûn

Nezan, xişîm, bêtaqî û bêmeymenet bûn. **Ew ciwanekî* ***devgemar e****, tu çima herê xwe didî wî?*

Devgenî bûn

bnr. Devgemar bûn

Devgerm (bûn)

Wêrek bûn, gotina xwe bi paş ve nedan. **Yekî din bûya ji tirsan nedipeyivî, lê Hikmet mirovekî* ***devgerm e****, ya rastî çi bû, yek bi yek got.*

Devgirtî bûn

bnr. Dev heye, ziman nîn e.

Devî devî (yekî) kirin

Zehf nêzîk bûn. **Siwaran xwe* ***devî devî Silho kirin****, lê wî qamçiyek bi qalça hespê boz re kişand û dîsa navbera xwe û wan vekir.*

Devî paç e, zikî xaç e.

Gotin û niyet ne wekî hev bûn. ****Devî paç e, zikî xaç e.*** *Di hêla xuyangê de baş tê xuyan, lê di hundir de çi xirabî disêwirin, ez dizanim.*

Deviyê tu dar bî, li ser serê min star bî. (Deriyo, tu dar bî, li ser serê min star bî.)

Ked û zehmetên piçûk jî ji bo pêşeroja mirovan dibin sedema kêrê. ****Deviyê tu dar bî, li ser serê min star bî.*** *Deh sal herê min dendikek çand, mêze bike îro bûye dareke çend.*

Devnerm bûn

bnr. Devsist bûn.

Devnerm, pişthişk bûn

Zarxweş, lê qesîs û timakar bûn. **Jixwe Adar mirovekî* ***devnerm û pişthişk e****, ma te çi jê hêvî dikir?*

Devqerimî bûn
bnr. Devsist bûn

Devsist bûn
Ne zelal û bê biryar peyivîn. **Şelrîban jixwe* ***devsist e****. Heta kire mizemiz, telefon hate birîn jî.*

Devşikestî bûn
bnr. Devsist bûn

Devşorbe bûn
bnr. Devgemar bûn

Devvekirî man
bnr. Dev bihostek ji hev çûn

Devxerabe bûn
Tiştên neyînî axivîn. **Eman ew* ***devxerabe ye****, wî nedin xeberdanê.*

Devxweş, pişthişk bûn
bnr. Devnerm, pişthişk bûn

Dew tune fir bike, li hespê siwar dibe, çerx dike.
Rewşa aborî xerab e, lê ew wekî ku her tişt baş e, kêfê dike. **Ez nizanim ev Berces li ser çi karî ye.* ***Dew tune fir bike, li hespê siwar dibe, çerx dike.***

Dew tune, rûn difiroşe
Ji bo karên berevajî tê bikaranîn. **Min tu tiştek ji vî zilamî fêm nekir.* ***Dew tune, rûn difroşe.***

Dew xwestin û kodik veşartin (Dew dixwaze, kodikê jî vedişêre)
Divê ya pêwîst çi be bê pêkanîn. Hem fedî kirin hem jî xwestin nabe. **Ew qas lîstik û vekişandin ne hewce ye.* ***Dewxwestin û kodikveşartin*** *nabe.*

Daweta dînan e, her kes xwe lê hil dike.
Tevî teşqele û xilaportê, her kes dixwaze, ji bo xeyal û daxwazên xwe, qirdê xwe bice-birîne. **Rewş ne wisa ye. Nola* ***daweta dînan e, her kes xwe lê hil dike****.*

Dewleta pelegewr, qîz avis, bûk stewr
bnr. Dewleta bikiltûz e, bûk stewr e qîz avis e

Dewê şilavê, li ber avê
Bi tiştên ne siruşt û ne asahî, behremên ne xweş dertên. **Ma we çi ji wî tiştê sexte û erzan hêvî dikir?* ***Dewê şilavê, li ber avê.***

Dewlet e, bel e, gewr e, bi şev sayî ye, bi roj ewr e.

Tam jî rewşa dewletên çetewarî ku bûne mafya û bi karên dizî û heram re mijûl dibin tîne ziman. **Bi rastî jî dewleta me* ***dewleteke bel e, gewr e, bi şev sayî ye, bi roj ewr e.***

Dewlet serê axê, tevka hîvê

Axa û beg, hêz û quweta xwe ji dewletê digirin. Bi gotineke din, heke dewlet nebe tilsim, hêza axa û began jî namîne. **Axa û dewlet, hêz û rengê hev û din temam dikin. Loma jî gotine:* ***"Dewlet serê axê, tevka hîvê."***

Dewleta bikiltûz e, bûk stewr e qîz avis e.

Ji bo rewşa berevajî tê gotin. **Ji her ku di xîmê wê de zilm û neheqî heye, ev dewlet zû bi zû rast nabe,* ***dewleteke bikiltûz e, bûk stewr e qîz avis e.***

Dewletiyo bimbarek be, xizano te ji ku anî?

Pêşveçûn an jî destkeftiyeke xizanan jî bi awayekî neyînî tê dîtin. ** "**Dewletiyo bimbarek be, xizano te ji ku anî…** Ma ji her kesî re edet e, ji pêşmergeyan tenê re qebhet e, lawo?.." Yaqûb Tilermenî*

Dewsa şêran, maye kundê dêran.

Şûna xurt û başan xeraban girtin. **Ew jî dewrana dinê ye, ez çawa bikim heyran? Îro* ***dewsa şêran, maye kundê dêran.***

Dexesî li canê xwe kirin

Gelekî dexes bûn. **Ew mirovekî nexweş e,* ***dexesiyê li canê xwe dike.***

Deyl nekir, mêrekî xwe kir.

Heke keçik biaqil û bêdeng bisekine wê di dawiyê de jixwe re mêrekî baş bibîne. ****Deyl nekir, mêrekî xwe kir.*** *Keçikên biaqil û baş di encamê de xwe didin diyar kirin û cihekî baş jî bi dest xwe dixin.*

Deyn hatin ber qirikê

bnr. Deynan bi ser serî re avêtin

Deyn li te kir, (min) caw li xwe kir.

1. Ji bo kesên sextekar tê gotin. **2.** Yekê dide (dike) yekê jî dixwe. **Dewran dîsa tu encamî nagire, ji ber ku* ***deyn li te kir, caw li xwe kir.***

Deynan bi ser serî re avêtin

Zehf deyndar bûn. **Rebenê Simko* ***deynan bi ser serî re avêt*** *û Xwedê dizane bi wê kulê jî mir.*

Deyndaran xwe avêtin pişt xwîndaran.

Rewşa mirovên deyndar ji ya xwîndaran jî xerabtir e. **Helbet zor e, ma li cihê sekinî gotine:* ***"Deyndaran xwe avêtin pişt xwîndaran."*** *Bi dîtina min jî xerabtir e.*

Deynê stûyê (yekî) bûn

Kar û vatiniya vebirî û erhede bûn. **Ev daxwazên te bila* ***deynê stûyê min bin****. Heke Xwedê min nekuje ez ê bînim cih.*

Deynê kûsî birin (birîn)

Deynê xwe zû bi zû nedan. **Ez jî dizanim **deynê kûsî ye, me biriye**, lê mixabin tiştek ji dest min nayê.*

Deynê filehekî li ser bûn

Zehf zengîn bûn. **Tu baş wî nas nakî herhal, kuro **deynê filehekî li ser e** lawo!..*

Dezgeh rast kirin

Karê xwe têkûz kirin. **Maşelah Delavê **dezgehê xwe di navbera du mehan de rast kir**.*

Dê ewledê xwe avêtin

Ji bo teşqele, helecan û qelebalixa zehf zêde tê gotin. **" ...bi xezebek û tofaneke ku **dê ewledê xwe diavêje**..."* Veysel Çamlıbel

Dê hejandiye, dê mijandiye.

Ji ber ku zêdetir dê pê re mijûl dibe, mirov herî zêde di bin bandora dê de dimîne û li dê diçe. **Helbet dê girîng e, ji ber ku **dê hejandiye, dê mêjandiye**.*

Dê li qîzê şîret kir, qîzê got: "Dayê hela tu li kîrê kerê binêre çend e."

Ji bo kesên ku bala wan li tiştekî din e û guh nadin gotin û şîretan tê gotin. ****Dê li qîzê şîret kir, qîzê got: "Dayê hela tu li kîrê kerê binêre çend e."** Ez jê re çi dibêjim, ew çi bersiva min dide?* (argo)

Dê û bav ji serî kêm bûn

Bê serî û bê rêveber man. **Xwedê **dê û bav ji serê kesî kêm neke**.*

Dê û dotê, gayê cot firotê, ji kesî re negotê

Dê û qîz dikarin gelek karên ecêb û mezin bikin ku tu kes qet pê nehese. **Bibore, lê tu kes nikare ya dê û dotê fêm bike. **Dê û dotê, gayê cot firotê, ji kesî re negotê.***

Dê û dotê şer dikir, kêmaqilan jê bawer dikir.

Dê û keç çi qasî bi hev û din re şer bikin jî tu caran nikarin ji hev û din biqetin. ****Dê û dotê şer kir, kêmaqilan jê bawer kir."** Ew dê û ewled in, tu çi dikevî navbera wan, hey bêaqil?*

Dêhna xwe dayîn

Lê mêze kirin, bala xwe dayîn. **Tu **dêhna xwe baş nadiyê**, loma fêm nakî.*

Dêla (yekî) di ber de birîn

Pêşî li hember ên bitrî û neheq birîn. **Axayê wî lê mêze kir ku Sedo zêde bi pêş de diçe, ji kar avêt û **dêla wî di ber de birî**.* (argo)

Dêla xwe li ba kirin

1. Ji bo jinên ku bi dilbazî û nazdariyê mêran ji rê derdixin tê gotin. **2.** Ji bo kesên şêlafî dikin tê gotin. **Xemlê **dêla xwe li ba dike**, hemû xortan li ser serê xwe kom dike. *Piştî wê pevçûnê, Çeto gelekî **dêla xwe li ber min li ba dike**, lê ez guh nadimê.* (argo)

Dêla xwe daxistin

Melisîn, tirsîn, li ber xwe nedan. *Berê wî jî hinekî kir hurtehurt, lê mêze kir ku viziniya meşkê vala ye, **dêla xwe daxist** û dengê xwe birî.* (argo)

Dêla xwe dayîn ser milê xwe

bnr: Dêla xwe dayîn ser pişta xwe

Dêla xwe dayîn ser pişta xwe

Bi cesaret li hemberî neyar û dilnexwazan sekinîn. *"*Kuriyekî kumeyt ketibû Deşta Cengizê, serê xwe mîna çiyayê Agiriyê bilind kiribû, **dêla xwe dabû ser pişta xwe**, bi çargavî dibeziya."* (argo) Harbi Soylu

Dêla xwe li devê (yekî) nexistin

Bi tiştekî nehesibandin. *A rastî keçik qet **dêla xwe li devê wî naxe**, hema ew ji bêarî wekî henîşt bi keçikê ve dizeliqe.* (argo)

Dêla xwe pîj kirin

bnr: Boçik kirin gustîl

Dêla xwe rakirin

Bitrî bûn. *Çima ku rewşa wî ya aborî jî xweş bûye, Hesen **dêla xwe rakiriye**, êdî nayê li bal me jî rûnane.* (argo)

Dêla xwe rep kirin (Poçika xwe rep kirin)

bnr: Boçik kirin gustîl

Dêla xwe tîk girtin

bnr: Boçika xwe dayîn ser milê xwe

Dêr çêkirin, ka poplîska wê

Jixwe hema tenê ew kêm bû. Ma ew jî nebe nabe? *Erê hema her tişt temam bû, ma qiravata Seydoyê Cunî. Qiravatê jî pê ve mekin qet dibe? **Dêr çêkirin, ka poplîska wê.*** (qerf)

Dêre sor e, çavî kor e.

Jin ku xwe dixemilînin, denga mêran şaş dibe û çavên wan tiştekî nabîne. *Ji wî re normal bibînin, ew hê tor e. **Dêre sor e, çavî kor e.***

Dêresorê xwe li ba kir, dilê xortan tev kul kir.

Jinên ku naz û cilweyan dikin, mêran zû dixin bin bandora xwe. ***Dêresorê xwe li ba kir, dilê xortan tev kul kir.** Zozanê wisa kir ku Xelîl xwe şaş kir.*

Dêrek ava kir, mizgeftek xera kir.

Li hêlekê erênî, li hêlekî neyînîtî pêk anîn. *Te **dêrek ava kir, mizgeftek jî xera kir**, min çi ji vê helwesta te fêm kir?*

Dêrik qedand ma dêrûn

Ji bo rewşa eletewş tê gotin. *Wekî yê ku nalek dîtibû û gotibû: "Ma sê nal û hespek", wî jî **dêrik qedand, ma dêrûn**.*

Di aqil de neçûn

bnr: Di hiş de rûneniştin

Di agirê (yekî) de şewitîn

Ji ber kirin an jî gotina yekî din ketin tengasiyê. **Her tişt Cemîl kiribû, lê kete stûyê belengazê Apo û ew* ***di ber agirê Cemîl de şewitî***.

Di agirê xwe de şewitîn

1. Bi xwe çareya serê xwe dîtin. **2.** Bi xwe di nav derd û kula xwe de debirîn. **Em ne zengîn in, lê hema em* ***di agirê xwe de dişewitin***. **Kes derdê kesî nizane, em bi xwe* ***di agirê xwe de dişewitin***.

Di aqilê xwe de girtin

Ji bîra xwe nebirin. **Çend hefte di ser re derbas bûn lê wê ew yek tim* ***di aqilê xwe de girtibû***.

Di aqilê xwe re derbas kirin

1. Bi bîr anîn. **2.** Nirxandin. **Êvarê min ew rojên me yên destpêkê* ***di aqilê xwe re derbas kirin***. **Dîsa min ew yek* ***di aqilê xwe re derbas kir*** *lê bi rastî zêde hêvî nade.*

Di asla safî de çûn

bnr: Gor cehenem bûn

Di ava sekan (behran) de şêlû bûn

Gelekî tehemulteng û bihêrs bûn. **Eman zêde ji Ronîdarê xeber nedin, wa ye îro dîsa* ***di ava sekan de şêlû dibe***.

Di ava (yekî) de çûn

Wekî gotina yekî kirin. **Ev çend sal in ku tim ez* ***di ava wê de çûm***, *lê çima min carekê got, "na" dinya xera kir.*

Di avê de berdan (Bi avê de berdan)

Gelekî erzan firotin **Omer erebeya xwe* ***di avê de berda***, *niha jî dixwaze yeke wisa bikire, pereyên wî têrê nakin.*

Diaciyê/a canê (yekî) bûn

Ji kesekî zêde razî bûn. **Ew xortekî pir hêja ye, tim ez* ***diaciyê canê wî me***.

Di ber barê xwe de ketin

Hêz û zerengî, wekî binbariyê nebûn, qels man. **Jixwe pir jar bû, bar jî ku giran bû, xwe ranegirt û* ***di ber barê xwe de ket***.

Di ber çavan re derbas kirin

Rewş, bûyer an jî kesek ji nû ve nirxandin. **"Wê demê Partiya Dad û Pêşxistinê neçar e ku dîsa paketa bername û planên xwe* ***di ber çavan re derbas bike*** *..."* Dilnas Berazî

Di ber de goştê xinzîr bûn

bnr: Di ber de jehra meran bûn

Di ber ... de serê xwe şikandin
Ji bo kesekî (tiştekî) din xwe dayîn pêş, xwe êşandin. *"*Ne ji bo xwe, lê belê* ***di ber kevokên xwe de dikaribû serê xwe bida şikandin****."* Felat Dilgeş

Di ber (yekî) de sond xwarin
Bêşik kefîl bûn. **Heyran, ji bo Bahadînê Dilse nikarim tiştekî bibêjim, lê dikarim* ***di ber Heqî de sond bixwim****.*

Di ber ... de îşiqa (ronî) çavên xwe rêtin
Gelek ked û zehmet dan. **Wî* ***di ber wê xebatê de îşiqa çavên xwe rêt****, lê saziyê navê wî jî di rûpelên hundir de tenê bi nivîseke hûrik nivisî.*

Di ber (yekî) de kirin jehr
Ji xwarin an jî pêkanînê re asteng derxistin. **Xeydokê îî lawên wê wisa kirin ew yek* ***di ber mêrik de kirin jehr****.*

Di ber (yekî) de jehra meran bûn
Lê heram bûn. **Wan dest dane ser keda min a ew qas salan. Înşelah wê* ***di ber wan de jehra maran be****.* (nifir)

Di ber (yekî) de kefaret dîtin
Di ber yekî de ked û zehmet kişandin. ****Di ber wê keçikê de kefereta ku min dît****, yek ez dizanim, yek jî Xwedê.*

Di ber (yekî) de man
bnr. Di ber (yekî) de neçûn

Di ber (yekî) de neçûn
Ji ber hin sedeman nexwarin an jî venexwarin. **Ji dema ku min ew jinik di wî halî de dîtiye we xwarin* ***di ber min de naçe****.*

Di ber (yekî) de xwarin
1. Bi saya yekî îdareya xwe kirin. **2.** Li hember hêrs û zexta kesekî dengê xwe nekirin. **Ew jî* ***di ber Remezan de nexwe*** *nikare îdareya xwe bike.*

Di ber (yekî) de xwîna xinzîr bûn
bnr. Di ber (yekî) de jehra maran bûn

Di ber kerê re derbas dibe, celşikê jê didize.
Ji bo kesên di diziyê de bihuner in tê gotin. **Malxirab yekî wisa ye ku* ***di ber kerê re derbas dibe, celşikê jê didize****.*

Di ber hukmê ruh de bûn
Bi mirinê re şer bûn. **Divê em jî herin ser, dibêjin Xalê Tefîq* ***di ber hukmê ruh de ye****.*

Di ber meşheda Xwedê de bûn
bnr. Di ber hukmê ruh de bûn

Di ber pişika xwe re çûn
Xwe zêde hesibandin, xwe nepixandin. **Camêrî hema karê wî jî* ***di ber pişika xwe re çûyîn*** *bû.*

Di ber qirqala ruh de bûn
bnr. Di ber hukmê ruh de bûn

Di ber (yekî) re avêtin
Ne rasterast, lê bi awayekî sergirtî û bi peyam ragihandin. **"Gava wê ew qîzên xwe dabûn jî çend caran* ***di ber birayê xwe re avêtibû****, lê birayê wê xwe li wan deran nekiribû xwedî ..."* Enver Karahan

Di ber xwe de berdan
bnr. Di ber xwe de li hev anîn

Di ber xwe de gotin
Bi dengekî nizim û bi awayekî dizî gotin. **"Jinapa min a ku dikeve pêşiya me, mîna ku bixwaze çelengbûna xwe nîşanî me de... Diya min* ***di ber xwe de dibêje****: "Qîza dinênediyan!"* Suzan Samancı

Di ber xwe de kuşirandin
bnr. Di ber xwe de li hev anîn

Di ber xwe de li hev anîn
Derew kirin. Tiştên nebûyî bi xwe li hev anîn. **Hay lo lo!.. Ka kî dikare wekî wî* ***di ber xwe de ew qasî li hev bîne****?* (argo)

Di bêvila (yekî) de dayîn
Ji kirina tiştekî vegerandin, asteng kirin. **Heke Hecî Cemîl* ***di bêvila wî de nedayê*** *wî zû bi zû dev ji we bernedida.*

Di bêvila (yekî) re anîn
Yek zêde aciz kirin. **Erê wî carekê riya xwe şaş kir, lê Fatoşê* ***di bêvila wî re anî****.*

Di bêjingê de dotin, di seradê de meyandin
Ji bo karên pûç û vala tê gotin. **Hay tu nizanî ew çi jineke eletewş e, ew* ***di bêjingê de didoşe, di seradê de dimeyîne****.*

Di bin barê (yekî) de man
Di bin minetan de man. Binbariya xwe neanîn cih. **Ev çend sal in ku* ***di bin barê mala Seydo de mabûn****, lê bi vê tevgerê wan ew minet ji stûyê xwe derxist.*

Di bin çavên (yekî) de bûn
Tim di bin tesele û kontrolê de bûn. Dûçarî binçavan bûn. **Meraqan neke, ew* ***di bin çavên bavê xwe de ye****. Nikare xwe bilebitîne.*

Di bin çavan de girtin

Di bin bandora tesela çavan de bûn. **Kelanteran ew çar rojan* ***di bin çavan de girtin*** *û ji ho ku têkiliyên wî hîn bibin, ew herdan.*

Di bin çavan re nihêrîn

1. Bi dizî şopandin. **2.** Bi hêrs lê nihêrîn. **Mehemed* ***di bin çavan re nihêrî****, bi rewşê hesiya û vekişiya. *Keçikê wisa* ***di bin çavan re li Mîrza nihêrî*** *ku ji tirsa nizanibû xwe têxe kîjan qulê.*

Di bin dawa xwe de fîs kirin

Bi dizî hin karên nebaş kirin. **Wa ye kifş e ku wê* ***di bin dawa xwe de fîs kiriye****, lê dê çend rojan bi şûn de derkeve holê.*

Di bin de man

Têk çûn. **Berê wî şer da destpêkirin, lê di dawiyê de ew* ***di bin de ma****.*

Di bin ... de man

Di bin minet û qenciya yekî de man. **Besê jî* ***di bin diyarî, xelat û qenciya Guharê de nema****.*

Di bin ... de rabûn

Pêk anîn. Ji heq derketin. **Kesî ji wî bawer nedikir, lê ew bêminet* ***di bin wî barî de rabû****.*

Di bin destan de bûn

Di bin bandor û erka hinekên din de bûn. **Gelên bindest heya neyên bal hev û saziyên xwe çênekin, nikarin xwe ji bindestiyê rizgar bikin.*

Di bin destan re derbas kirin

Yek bi yek seh kirin. kontrol kirin. **Wê ew vebijark hemû* ***di bin destan re derbas kirin****.*

Di bin destê xwe de girtin

Di bin bandor û kelîja xwe de girtin. **Tu yê niha bibînî, ew wan dosyayan* ***di bin destê xwe de digire****, heya ku dema wê neyê jî dernaxe der.*

Di bin destê (yekî) de bûn

Di bin bandor û erka kesekî de bûn. **Bi her awayî* ***di bin destê yekî de bûn*** *zor e û bi dîtina min ne rast e jî.*

Di bin deynan de man

bnr. Deynan bi ser serî re avêtin

Di bin deynan de xeniqîn

bnr. Deynan bi ser serî re avêtin

Di bin gê de li golikan gerîn

Li hincetan gerîn. Ji xwe re mehne dîtin. **Tu li ya wan mêze neke, ew ji xwe re* ***di bin gê de, li golikan digerin****.*

Di bin gotinê de man

Bersiva gotina yekî nedan. *"*Bi vî awayî jinên cîran* ***di bin gotina diya min de mabûn.***" Felat Dilgeş

Di bin kirina (yekî) de man

Ji bin bandora qenciya yekî derneketin. **A rastî wê demê ez* ***di bin kirina Zelalê de mam****, ew yek qet ji bîra min naçe.*

Di bin kumê (yekî) de bûn

Di bin bandora yekî de bûn. **Her kes dikare hipeyîve, lê tu na, ji ber ku tu hê jî* ***di bin kumê Mendo de yî****.*

Di bin lêvan de gotin

Bi awayekî qure û vebirî gotin. **"Şofêrê me jî simbêlên xwe ba dan û* ***di bin lêvan de, wekî mirovekî ji xwe razî digot****: 'Ez ne evroduhî bûme şofêr.' "* Enver Mehemed Tahir

Di bin lingan de çûn

bnr. Di bin lingan de man

Di bin lingan de exmc bûn

bnr. Di bin lingan de man

Di bin lingan de man

Eziyet dîtin. **Kurdistan di cografyayeke wisa de cih digire ku tim di* ***bin lingên dagirkerên mezin de maye*** *û perîşan bûye.*

Di bin milê (yekî) re derbas bûn

1. Di bin erka yekî de bûn. **2.** Di hêla fîzîkî ji yekî piçûktir bûn. **Raya wî tune wê biryarê bide, ew* ***di bin milê biraziyê min re derbas dibe****. *Weyla mala felekê şewitiyê. Lawê te* ***di bin milê Eşrefê min re derbas dibe****.*

Di bin qenciya (yekî) de neman

Li hember qenciyekê bersiveke layîq dan. **Rast e, Şîlanê gelek qencî li malbata Serhêşînan kir, lê ya rastî ew jî* ***di bin qenciya wê de neman****.*

Di bin simbêlan re kenîn

Bi dizî, ango di hundirê xwe de şad bûn. **"Kesekî newêribû bigota, "na" yan "çima?" Ajovan* ***di bin simbêlan re dikeniya****, dema didît ku her yek li ser guhê xwe yan pozê xwe ditirse..."* Helîm Yûsiv

Di bin siya xelkê de gerîn (jiyîn)

Bi bin bandor û parastina hinekên din de jiyîn. **Ma ew jî mêr e? Ew ancax* ***di bin siya xelkê de bigere****.*

Di bin siyê de velezîn

Teralî kirin. **Yên ku bihar û havînê* ***di bin siyê de velezin****, wê zivistanê jî wiha bêguman û perîşan bimînin.*

Di bin xwe de rêx kirin
Zêdetir ji bo nexweşên ku demeke dirêj di nav ciyan de dimînin tê gotin. **Ew qas zalim û xedar bû, loma wisa demeke dirêj* ***di bin xwe de rêx kir****.* (argo)

Di bin xwe de rîtin
Pir tirsîn. **Ew tirs hesî wî ye, ji tirsan Emerê Qaçax,* ***di bin xwe de dirî****.* (argo)

Di bin xwe re dîtin
Yek ji xwe kêmtir nirxandin. **Ew ne mirovê hevaltiyê ye, çimkî mirovan* ***di bin xwe re dibîne****.*

Di binê her kevirî de derketin
Bi gelek mijaran re têkildar bûn. **Ev çi mirovekî ecêb e, em destê xwe diavêjin kîjan* ***kevirî ew di binî de derdikeve****.*

Di binê xwe de berdan
Tirsîn, xofek mezin girtin. Rîtin. **Piştî îşkenceya ku dîtibû, kengî polês û jenderme dîtin* ***di binê xwe de berdida****.*

Di binlingê de rûniştin
Jê kêmtir bûn. **Rebeno, ew ancax dikare* ***di binlingê lawê min de rûne****.*

Di cih de şelîn
bnr: Di cihê xwe de şemirîn

Di cihê xwe de babil bûn
bnr: Di cihê xwe de rehet rûniştin

Di cihê xwe de rehet rûniştin
1. Têkildarî şer û belayan nebûn. **2.** Tu karek nekirin, xwe nexistin nav binbariyekê. **Wan bi giştî serê xwe xistin belayê, lê tenê Evdile* ***di cihê xwe de rehet rûnişt****. *Ûsiv dest naavêje tu karekî, hema heya êvarê* ***di cihê xwe de rehet rûdine****.*

Di cihê xwe de sar bûn
Şaşwazî û metel bûn, sok bûn. **"Memcan rabû ser xwe û rahişt telefonê. Hîn negotibû "elo" dengekî biêş gòt: Hevalê Dijwar şehîd ket, haya we jê hebe... Û telefon girt. Memcan* ***di ciyê xwe de sar bû****, bû wek qeşayê."* Ridwan Dodo

Di cihê xwe de şemirîn
Şaşwazî man. **Dîlan çawa li çav bi wî halê Zozanê ket, hema di cihê xwe de şemirî.*

Di cihê xwe de teng zivirîn
Di nav rewşeke zor de bûn. **Azad yeke wisa anîbû serî ku Jiyan di* ***cihê xwe de teng dizivirî****.*

Di cih de zer û zuha bûn
Ji ber tirs an jî xiroşa bûyereke pir girîng kelijîn. ** "Gava Atîla li kuçeyê Mizgîn dît, hema* ***di cih de zer û zuha bû*** *û ji tirsan canê wî lerizî."* Lokman Polat

Di çavê xwe de eyişandin

Bi karîna xwe bawer bûn. Çav jê birîn. **Kifş e ku Candil Bengînê* ***di çavê xwe dieyîşîne****, tim hincetan lê digere.*

Di darê dinê de yek bûn

Yek tenê bûn. Bijare bûn. **Ev lawê min* ***di darê dinê de yek e****.*

Di daweta cinan de reqisîn

Ketin nav rewşeke xeter û xerab. **Ya rastî min jî wer nedixwest, lê min hew mêze kir ku ez* ***di daweta cinan û direqisim****.*

Di dema Bêrdo de man

Di dema pir kevin de man. **Kuro lawo tu yê çawa bikî wê tivinga* ***di dema Bêrdo de mayî****?*

Di dema qal û belayê[*] de man (Ji qal û belayê man)

Gelekî kevin bûn. **Ya ku tu dibêjî* ***di dema qal û belayê de maye****, hersûcê wê girtin, darizandin û ev deh sal in jî di hepsê de ye.*

Di derî re berdidî, di kulekê re dikeve hundir.

Ji bo yên bêar û ji xwe şermnekirî tê bikaranîn.**Jê re çi dibêjim û çawa dikim fedî nake,* ***di derî re berdidimê, di kulekê re dikeve hundir****.*

Di dest de man

Neserifandin. **Di cejna Qurbanê de Baro ji bo firotinê gelek pez biribû Stenbolê lê ji nîvî zêdetir* ***di dest de ma****.*

Di destê (yekî) de çûn û hatin

Wekî gotin û daxwaza yekî tevgerîn. **Heke bi salan ez* ***di destê wê de neçûm û nehatama****, nivekariya me rojekê jî berdewam nedikir.*

Di destê (yekî) de debar nebûn

Pir aciz kirin. **Ji ber eziyet û çewisandinê* ***di dest Xelef Axa de debar nabe****.*

Di destê xwe de girtin

1. Di bin bandora xwe de zeft kirin. **2.** Ne di daxwaza firotin û dayînê de bûn. **Ew Simkoyê ku ez dizanim, wan çavkaniyên ku* ***di destê xwe de digire*** *nade kesî. *Heke Dewrêş wî keriyê pêz, di vê axlêvê de jî* ***di destê xwe de bigire****, wê gelekî ziyanê bibîne.*

Di destê xwe de hêkerûnê çêkî û bidiyê ew ê bêje: "Devê min şewitî, destê te neşewitî."

Neşikirandî bûn. Ji bo yên ku ji qencî û başiyê fêm nakin û memnûn nabin tê gotin. **Rast e, Qafo û jina wî wisan in. Tu* ***di destê xwe de hêkerûnê çêkî û bidêyî, ew ê bêje: "Devê min şewitî, destê te neşewitî."***

Di destê (yekî) de bûn

Di bin erk û kelîja yekî de bûn. **Her tişt* ***di destê Şakir de ye****, herin bal wî.*

---

[*] **Qal û bela:** Dema herî kevin

Di destengiyê de bûn

Di hêla aborî de tengasî kişandin. **Ew qas sal in,* ***di destengiyê de bûn****, ji bo wê jî gelekî li wan zor tê.*

Di devê deriyê (yekî) de bûn

Pir nêzîk bûn. **Lawo wa ye belıra Egeyê* ***di devê deriyê we de ye****, hê hûn rojekê neketinê.*

Di dev re ketin, di qûnê re derketin

Ji bo kesên bêar ku zêde şêlaîyê dikin tê gotin. *****Ew tolaz di dev re ketê, di qûnê re derket****, lê nikaribû xezûrê min bixapîne.*

Di devê rê de bûn

Cihê pir vekirî û nêzîk bûn. Li ber çavan bûn. **Mala wan hema* ***di devê rê de ye****.*

Di devê xwe de kirin benîşt

1. Eynî tişt tim dubare kirin. **2.** Paşgotinî û xeyb kirin. **Çi ye te hema ew gotin* ***di devê xwe de kiriye benîşt*** *û dicûyî? *Wan bi şev û roj malbata me û mal û milkê me* ***di devê xwe de kirine benîşt*** *û dicûn.*

Di devê xwe de cûtin

bm: Di devê xwe de xistin benîşt

Di devê xwe de birin û anîn

Gotina xwe bi awayekî zelal negotin. **Keçika min çi ye tu* ***di devê xwe de dibî û tînî****? Tu yê çi bibêjî, bibêje.*

Di devê xwe de mizmizandin

Gotina xwe zelal û bi biryar negotin. **Çawa wî gotin* ***di devê xwe de mizmizand****, min fêm kir ku tiştekî ne bi xêrê heye.*

Di destê (yekî) de hebûn

Zengîn bûn, xwedî mal bûn. **Xwedê kiriye ku* ***di destê wî de hebû****, naxwe di vê roja teng de wê çawa ji bin wan emeliyat û dermanan de derketa?*

Di destê (yekî) de tiştek tune bûn

1. Bêderfet û bêraye bûn. **2.** Feqîr û xizan bûn. **Welehî* ***di destê min de tiştek tune ye****, rayedarê wî karî yekî din e, naxwe min ê ewraqên we çêbikirana. *Ka* ***di destê wî de tiştek tune ye*** *ku pê dikanê veke.*

Di destê (yekî) de xwîn girîn

Zilm û çewisandin dîtin. **Ya rastî di van her du salên dawîn de Zozan* ***di destê mêrê xwe de xwîn giriya****.*

Di devê (yekî) de rîtin

1. Rezîl û riswa kirin. **2.** Zilm û eziyet kirin. **Li pêşberî wê kuçeyê Çîlê wisa kir ku* ***di devê Hecî Nisret de rît****. *Na lo! Ka mêrikê reben dikare bibêje viq, jinik* ***di dêv de dirî****.*

Di dilê (yekî) de man

Ji bo tiştên ku pir tê xwestin lê pêk nayên tên gotin. *"*Hêviya wî şikestibû û kula firotina şîraniyan* ***di dilê wî de ma bû.*** " Felat Dilgeş

Di dilê (yekî) de buhirtî bûn

Li bal yekî pir birûmet bûn. **Yên din nizanim, lê qîza wî ya piçûk* ***di dilê Azad de pir buhirtî ye.***

Di dilê (yekî) de cihekî mezin girtin

bnr. Di dilê (yekî) de buhirtî bûn

Di dilê (yekî) de kudikên berazan hebûn

Di dilê yekî de neyînî, xayînî û xerabî sêwirîn. *"*Hukûmatê ew kiriye qeymeqam û şandiye Bismilê, lê hikumata reben dê ji ku derê bizanibe ku* ***di dilê wî de kudikên berazan hene.***" Rojen Barnas

Di dilê (yekî) de tiştek tune bûn

Bi niyet û armanceke baş nêzîk bûn. **Tu wisa li bejî bejî xeberdana wê menêre* ***di dilê wê de tiştek tune ye.***

Di dilê (yekî) de xayînî derbas bûn

bnr. Di zikê (yekî) de gû kelîn

Di dilê (yekî) de xwîn çûn

Qehirîn, li ber xwe ketin. **Tu rewşa wê ya tê xuyan menêre, ya rastî* ***di dilê wê de xwîn diçe.***

Di dilê xwe de ... derbas kirin

Ji bo pêkanîna tiştekî, di dilê xwe de sêwirîn. **Her kesek* ***di dilê xwe de xeyalên baş derbas dike****, lê ka çend mirov dikarin wê pêk bînin?*

Di dilê xwe de gerandin

Eşkere nekirin, di dilê xwe de sêwirandin. **Wê* ***di dilê xwe de gerand****, gerand, îro dema wê bû û îro jî got.*

Di dilê xwe de girtin

Pê şikestin. Xeyidîn. **Dengê xwe ji silava wî re bilind nekirin. Yên din mîna ku silav qet seh nekiribin xeberdana xwe domandin. Lê Yaser bi dizî* ***di dilê xwe de girt.***" Kerem Soylu

Di dilê xwe de gotin

Xwe bi xwe niyet kirin. **"Min* ***di dilê xwe de got****: "Ev malik di Mem û Zînê de tune. Gelo mamoste vê lê zêde dike, yan di van çapên dawîn de hatiye jibîrkirin."* Zeynelabîdîn Zinar

Di dilê xwe de sêwirandin

bnr. Di dilê xwe de xwedî kirin

Di dilê xwe de xwedî kirin

Ji bo armancekê tim di nav hewldan û firsend bidestxistinê de bûn. **Wê ew yek tim **di dilê xwe de xwedî kir** heya ku ev firsend bi destê xwe xist û derba xwe lê da.*

Di dinyayê de tayê tenê bûn

bnr. Di darê dinê de yek bûn

Di donê xwe de qijirîn (helîn)

1. Bi xwe li çareya serê xwe nihêrîn. **2.** Ji ber derdekî xemgîn bûn. **Erê zelîf ne zengîn e, lê bi xwe **di donê xwe de dihele**. *"Marbengî **di donê xwe de diqijiriya**, haya kesî jê tune bû."* Feqî Huseyn Sağnıç

Di dubendiyê de man

bnr. Di nav du riyan de man

Di nav erênayê de man

bnr. Di navbera Xelîl û Celîl de man

Di bin erdê re çûn (Di erdê de çûn)

Gelekî şerm kirin. **"Belê ziravê min dikir biqetiya, ji şerman jî ez **di bin erdê de diçûm**."* Felat Dilgeş

Di etra canê xwe de bûn

Ketin heyra derd û kulên xwe. **Ez **di etra canê xwe de me**, tu li gotinên wê binêre.*

Di eyarê xwe de xişxişîn

Ji dexesiyê behecîn. **Ên ku ew qasî çavên xwe ji min re diqelişandin, piştî vê mizgîniyê, bila di eyarê xwe de bixişxişin.*

Di eyarê (yekî) de dew keyandin

Lelîk kirin. Yek gelekî aciz kirin. **Di van her du salên dawî de wê mamosteyê **di eyarê min de dew kêya**.*

Di eynê xwe re dernexistin

Di derkê de nebûn, rewş fêm nekirin. **"Seyfo **di eynê xwe re dernaxe**. Bi zorê li palehiya genimê sor germ bûye. Xwarin ji ku tê bîra wî..."* Adar Jiyan

Di êqil de rûniştin

Fêr bûn, têgihîştin. **Berê ew jî qet tênedigihîşt, lê Mîro wisa xweş da fêr kirin ku di dawiyê de **di aqilê wî de jî rûnişt**.*

Di fesala xwe de dîtin

Di hempa xwe de yan jî hê piçûktir dîtin. **Ew **min gelekî di fesala xwe de dibîne**, lê niha wê bibîne, bê ka dinya çend parçe ye.*

Di firnikan re anîn

bnr. Di eyarê (yekî) de dew keyandin

Di firnikekê de riyîn, di yekê de mîstin
bnr: Di eyarê (yekî) de dew keyandin

Di gewriya (yekî) de neçûn xwarê
Ji ber hinek sedemên neyînî di daxwaza xwarinê de nebûn. *"*Min sêv anî, lê min nikaribû bixwara, **di gewriya min de neçî**."* Felat Dilgeş

Di gewriya (yekî) de bûn gilê
bnr: Di ber (yekî) de neçûn

Di gewriya (yekî) de hiştin
bnr: Di ber (yekî) de jehr kirin

Di gora xwe de nesekinîn
bnr: Di gora xwe de qûn rûniştin

Di gora xwe de nesitirîn
bnr: Di gora xwe de qûn rûniştin

Di gora xwe de qûn rûniştin
Di wê dinya din de jî eziyet û îşkence dîtin. **Piştî ew qas mafxwarinê, înşelah ew ê **di gora xwe de qûn rûne**. (argo)

Di gotina xwe de şikestin
Gotina xwe neanîn cih. **Min wisa jê hêvî nedikir, mixabin ew **di gotina xwe de şikiya**.

Di guhekî re ketin, di yê din re derketin
Baldar nebûn, guh nedan, cidî negirtin. **Ez çi ji vî lawê xwe re dibêjim, **di guhekî re dikeve di yê din re derdikeve**.

Di guhê gê de bûn
Hay ji dinyayê û bûyeran tune bûn. **Mala we neket, ma hûn **di guhê gê de ne**? Hemû dinyayê bilûst, hema bi tenê haya we pê nebûye.

Di guhê rastê re ketin, di yê çepê re derketin
bnr: Di guhekî re ketin, di yê din re derketin

Di guhên hev de gotin
Bi dizî gotin. ***Di guhên hev de gotin**, ji ber wê me tiştek jêm nekir.

Di gura (gotin) yekî de bûn
Ji gotina yekî derneketin. **Lawê wî **di gura wî de ye**.

Di gurimtiyê de çûn
Kê lê xistiye kifş nebûn. **Ew ciwan jî hema **di wê gurimtiyê de çû**.

Di halê xwe de bûn

Bi kesî re têkildar nebûn. Tenê bi karê xwe re mijûl bûn. *_Na lo! Ez bawer nakim ku ew têkilî kesî bibin, ew tenê **di halê xwe de ne**._

Di halê xwe de gotin

Li ser rewşa xwe ya neyînî bi xwe re axaftin û xwe aciz kirin. *_"Xêleke xurt her wisa **di halê xwe de got** û beriya ku deriyê malê bi ser xwe de bigire ..."_ Musa Vazgali

Di halê xwe de mirin

bnr. Bi halê xwe ketin

Di halê xwe de şewitîn

bnr. Di tintêl û hewalê xwe de şewitîn

Di hembêzan de nebûn

Memnûn nebûn. *_Bi dîtina min, zêdetir mirovên zengîn û pozbilind **di hembêzan de nabin**._

Di her newalê de hêhê kirin

Her dem û li her derê li hêviya rasthatinan bûn. *_Mixabin **di her newalê de bi hêhê kirinê** ew yek pêk nayê._ (bnr. çîrok)

Di hesira xwe de rîtin

bnr. Bi dîwarê xwe de mîstin

Di hev de hurşîn

1. Pejmûrde û sist bûn. **2.** Jar û lawaz bûn. *_Ka kîjan keçik dê bi Şanaz re bizewice, wa ye **di hev de hurdişe**._ *_Nexweşiyê wer kir ku di nava mehekê de Reşît **di hev de hurişî**._

Di hewê de dimir, di sewê de konê xwe datanî.

Ji bo hinekên din ziyan dayîn xwe. Ji bo xelkê xem xwarin, xwe aciz kirin. ***Di hewê de dimir, di sewê de konê xwe datanî.** Ew helengaza Rûşenê ji bi wî awayî jiya û çû._

Di heyra malê dinê de bûn

Tenê mal û milk fikirîn. *_Xwedê jê razî be, nimêj û taet nayê bîrê, tenê **di heyra malê dinê ye**._

Di hişê xwe de bi cih kirin

Xistin serê xwe. Bibiryar bûn. *_Ez wî nas dikim, wî ew yek **di hişê xwe de bi cih kiriye**, wê îleh bike._

Di hişê xwe de girtin

Di bîrê de man. *_Çawa pêk aniye nizanim, lê ew qas sal in ew tekst hemû **di hişê xwe de girtiye**._

"Di her newalê de hêhê kirin"

Mirovekî carekê di newalekê de bi rasthatin ji xwe re çend caran *"hêhê hêhê"* dibêje. Bi hêhêya wî re bizinek derdikeve pêş. Mêrik li hawîrdor, li rast û çep mêze dike ku tu kes tune û ew bizin bêxwedî ye. Ew jî bizinê tîne mala xwe û lê dibe xwedî. Piştî wê bûyerê mêrik her roj diçe wê newalê û *"hêhê hêhê"* dike ku bizineke din jî bibîne.

Di hundir de gû kelîn

Bi xinisî di nava xwe de xirabî sêwirandin. **Di xuyangê de wekî dostan xwe dide xuyandin, lê* ***di hundirê wî de gû dikele****.*

Di hundirê (yekî) de man

1. Bi mirazê şad nebûn. **2.** Tiştê ku di hundir de derbas dibe, negotin. **Derdê dilê min, li welat li ser kaniyeke zozanan razanek bû, lê ji ber xerîbiyê ew yek* ***di hundirê min de ma****.* **Ya ku her ez dizanim, ew dê yek* ***di hundirê min de bimîne****.*

Di hundirê (yekî) de bûn girêk

Di dil de bûn derd û kul. **"Ev bû bîst, bîst û çend sal... ev çîrok li serê min qewimiye. Hêj ji bîra min neçûye. Ji min re bûye derdek,* ***di hundirê min de bûye girêkek*** *..."* Qedrî Can

Di hundirê (yekî) de dew keyan

Gelekî aciz kirin, êlet kirin. **Heta min ew bire gund,* ***di hundirê min de dew keya****.*

Di hundirê hev de kişkişîn

Zêde di nav hev de man. **Çi ye ew qas sal in hûn* ***di hundirê hev de kişkişîn*** *lo!*

Di hundirê xwe de hilxistin û daxistin

Xwe bi derd û kulan gelekî qehirandin. **Ev diya min, tiştên pir piçûk jî* ***di hundirê xwe de hildixe û dadixe****.*

Di hundirê xwe de birin û anîn

bnr. Di hundirê xwe de hilxistin û daxistin

Di hundirê xwe de helîn

Bi awayekî bêdeng xemgîn bûn, li ber xwe ketin. **Zêde xwe nade der, lê ez dizanim ku ew bi xwe* ***di hundirê xwe de dihele****.*

Di hundirê xwe de qicqicîn

bnr. Di hundirê xwe de hilxistin û daxistin

Di hundirê xwe de şewitîn

bnr. Di hundirê xwe de hilxistin û daxistin

Di husna dinê de bedew bûn

Xweşik û spehî bûn. **Erê, hûn xisletên Yargulê ne baş in, lê* ***di husna dinê pir bedew e****.*

Di kefa destê xwe de girtin

bnr. Dizgîn di destên (yekî) de bûn

Di kirasê berê de bûn

Dîsa wekî berê bûn. **Erê, wê dibistan qedand, lê mixabin dîsa* ***di kirasê berê de ye****.*

Di kodê de av dan

Ji bo kesên bi awayekî xweşik xwedîkirî tê bikaranîn. **Qîza Apê Salih wisa bedew û xweşik e ku tu dibêjî* ***di kodê de av dane****.*

Di kodika xwe de rîtin
bnr. Bi dîwarê xwe de mîstin

Di ku re zer bû, di ku re der bû?!
Ji bo rewşa binakokî û bêmantiq tê bikaranîn. **Heyran ev çi ecêb e?* ***Di ku re zer bû, di ku re der bû?***

Di ku re zirav be, bila di wir re biqete.
Minet nekirina xwe daxuyandin. **"...gurg ne di xema baranê ye, ne bûne rojek û du, hema* ***di ku re zirav dibe bila di wir re biqete****."* Nîzar Mehemed Seîd

Di kulekê de ketin
Bêrûmet bûn. **Ez çûm mêvaniya wan lê te digot ez* ***di kulekê de ketime****, wekî merî û însanan li rûyê min nenihêrîn.*

Di kuna derziyê de lê gerîn
Li ser kitkiteyan sekinîn. **Ev dewleteke wisan e ku carinan* ***di kuna derziyê de li tiştan digere****, carinan jî meydana hespan nabîne.*

Di kuncikan de man
1. Bêrûmet û bêderfet bûn. **2.** Li ber çavan neketin. **Em* ***di kuncikan in de mane*** *bavo, kî tenezul dike ku li rûyê me binihêre? *Ew reben* ***di kuncikan de man****, kes bi wan nehesî.*

Di mal de man
Ji bo keç û xortên nezewicî tê gotin. (Zêdetir ji bo jinan tê gotin.) **Berê wê kesek neeciband, dû re jî kesî serê wê negirt û di dawiyê de* ***di mal de ma****.*

Di mal de tenê ding û aş nagere.
Di mal de pevçûn û teşqele zêde bûn. **Maşelah mala çi ye, tewla ker û hespan e,* ***di malê de tenê ding û aş nagere****.*

Di mal de tune ervanok, navê jinê dîndarok.
Xuyang û naverok wekî hev nebûn. **Erê dayê, ew jî dibêjin em jin in?* ***Di mal de tune ervanok, navê jinê dîndarok.***

Di malê de tune ar e, navê jinê dînar e.
bnr. Di mal de tune ervanok, navê jinê dîndarok.

Di malê de tune arvan e, navê jinikê gulgînan e.
bnr. Di mal de tune ervanok, navê jinê dîndarok

Di milê hev re gihîştin
Ji hev û din re alîkarî kirin. **Maşelah zarokên Sîncar gişk* ***di milê hev re gihîştine****, çi hebe, wekî şêran pêk tînin.*

Di mirov de darda bûn
Ji bo xwestekekê yek gelekî aciz kirin. **Min çi xeta kir ku ez çûm mala wan, Bihar* ***di min de darda bû*** *ku bê gundê me.*

Di mizginiya (yekî) de derneketin

Li gorî kesekî yan jî tiştekî qels û kêmnirx bûn. *"*Eyşê, de Xwedê jê razî be, keçikeke wisa delal û xweşikok e ku winda bibe, temamê keç û bûkên wê ebra me di mizginiya wê de dernakevin."* Rojen Barnas

Di nav agir de bûn

Di nav rewşeke xeter û zor de bûn. **Hûn wisa li xuyanga wan menêrin, ew **di nav agir de ne**, rewşa xwe nadin der.*

Di nav çavan de lê xistin

Zilm û eziyet lê kirin. **Mirdêsiyê çend quriş ji xwe re dabûn hev, lê mêrê wê ew dît, **di nav çavan de lê xist** û jê stendin.*

Di nav de gut bûn

Tu rê û çareserî nedîtin. Bi hev û din piçikîn. **Ji wê meseleyê min jî tu tiştek fêm nekir û ez jî **di nav de gut bûm**.*

Di nav ... de rîtin

Lewitandin. Xera kirin. **Me got hosta ye, dizane û wê xweşik çêbike, lê wî **di nav wan sehpayên me de rît**.*

Di nav ... de soberî kirin

Di nav gelekbûna tiştinan de bûn. **Geveza Xalîl hê di piçûkatiya xwe de **di nav wan kompîtûrên xweşik de ji xwe re soberî dikir**.*

Di nav de xeriqîn

bnr. Di nav ... de soberî kirin

Di nav dest û piyan de çûn

Eziyet dîtin. Pelixîn. **Di vê dawetê de, zarokên me **di nav dest û piyan de çûn**.*

Di nav destên (yekî) de bûn

Di bin bandor û erkê de bûn. **Tu ji bo wê nekeve tatêlê, ew **di nav destên min de ye**.*

Di nav destên (yekî) de man

1. Di bin minet û zilmê de man. **2.** Ji ber bêhêziyê ketin rewşeke qels. **Em hatin lê kal û pîrên me û dê û bavên me **di nav destên wan de man**. **Lawo here, bela ye ji min veke, jixwe Xwedê li te xistiye, kulmekê bidim te, tu yê **di nav min de bimînî**.*

Di nav devan de bûn benîşt

bnr. Benîştê devê xelkê bûn

Di nav devê xwe de cûtin

1. Gelekî qal kirin. **2.** Jê dexesî û çavnebarî kirin. **Heyran hemû welat wan **di nav devê xwe de dicû**. **Van der û cîranan ew qas keça min **di nav devê xwe cûtin**, van rojan der-sên wê ne baş in.*

Di nav devê gur re derbas bûn
Pêvajoyeke dijwar jiyîn. **Ka ew pêvajoya Romayê? Çi pêvajo bû, bi rastî jî hema Kurd* ***di nav devê gur re derbas bûn****.*

Di nav diranan de bûn benîşt
bnr. Benîştê devê xelkê bûn

Di nav du deriyan de man
bnr. Di navbera du riyan de man

Di nav du dîwaran de man
Di nav rewşeke asteng de man. **Ez li wir* ***di nav du dîwaran de mabûm****, min nikaribû tu tiştek jî bikira.*

Di nav gerînekê de çûn û hatin
1. Çareseriyek nedîtin. **2.** Serî gêj bûn. **Van bûyerên dawîn wisa li min kirine ku* ***di nav gerînekekê de diçim û têm****, nizanim ku çawa bikim. *Ji nişkê ve wekî ku* ***di nav gerînekekê de herim û werim*** *aciz bûm.*

Di nav gotin û kirinên (yekî) de çiya hebûn
Gotin û kirinê li hev nekirin. *****Di nav gotin û kirinên wî de çiya hebûn****, helbet dawî wê ew qas eletewş be.*

Di nav gûyê xwe de nîsk dîtin
Bitrî bûn. **Na lo! Van rojan Jandil gelekî ji çîzê jî derxistiye, tu dibêjî* ***di nav gûyê xwe de nîskek dîtiye****.*

Di nav hebûnê de bûn
Dewlemend bûn. **Heke em* ***di nav hebûnê de nebûna****, wan wer nedigotin.*

Di nav hev re kirin
Bi tevayî pêk anîn. **Wan* ***di nav hev re kirin*** *û ew birin.*

Di nav lingan de man
bnr. Di nav dest û piyan de çûn

Di nav nal û bizmar de man
1. Di nav rewşeke pir dijwar de bûn. **2.** Di navbera nakokiyeke dijwar de man. **Xwedê kesî neke wê rewşê, ez di wê çaxê* ***di nav nal û bizmar de mabûm****. *Qafûr* ***di nav nal û bizmar mabû****, nikaribû tu tiştî bibêje.*

Di nav nanekî germ de veşartin
bnr. Diya (yekî) ji bo Xwedê nanekî germ dan. *(*bnr. çîrok)*

Di nav qal û qirê de man
Ketin nav teşqele û xilaportê. **Rebena Perîşan Xanê mêze kir ku* ***di nav wê qal û qirê de maye*** *û çi bibêje jî nayê bilûstin, dev ji peyvandinê berda.*

Di nav salan re çûn
Dinya dîtin, gelek sal derbas kirin. Xwedî taqî (tecrube) bûn. **Helbet ew ê bizanibe, ew **di nav salan re çûye**.*

Di nav şermê de hiştin
Yek bi şermiyê xistin. **Bi wan gotinan wê ez **di nav şermê de hiştim**.*

Di nav xêr û xweşiyê de bûn
Jiyaneke xweş jiyîn. **Jixwe her kes dixwaze ku wekî wê **di nav xêr û xweşiyê de be**.*

Di nav xwîn û xirarê de man
Pir betilîn, ketin rewşeke zor. **Heya ku Dilawer ji nav wan ên har û hov derket, **di nav xwîn û xirarê de ma**.*

Di nav xwînê de hiştin
Gelekî li yekî xistin. **Lawên Hesnîkê Çimxwar, wilo li Tahirê Topal xistin ku **di nav xwînê de hiştin**.*

Di nav xwînê de man
Gelekî xwîn jê çûn. **Dema ez çûm, min dît ku Ehmed **di nav xwînê de maye**.*

Di nav zar û zimanan de man
bnr: Benîştê devê xelkê bûn

Di nav zerp û zorê de man
Di nav rewşeke dijwar de man. **Qijikê Dilo **di nav zor û zerpeke wisa de mabû** ku her Xwedê bibêje bes.*

Di nava niq û fîqê de bûn
Di nav tatêl û xişoşiyê de bûn. **Heyran **di nava wê niq û fîqê de** ew mijar qet tê nirxandin?*

Di nava hev de kutkutî bûn
Bi awayekî tund û zêde aciz bûn. Tije bûn. **"Awirên heta wê kêlikê jî, bi evînî **di nava hev de kutkutî bûn**, êdî di bin nîr û kulebiyan re qîl derbasî canên hev yên lexrikî kiribûn."* Serkan Birûsk

Di nava rûnê xwe de helîn
bnr: Bi xwe têra xwe kirin

Di nava xwe de qicqicîn
Ji xwe re weswese çêkirin. **Diya min **di nava xwe de diqicqicî**. Bi xwe emrê xwe pûç kir.*

Di nava xwînê de fetisandin
Kuştin, qetil kirin. **"Li pey damezrandina komara Tirkiyeyê, berê Kurdistan dagirt û hemû der û dorên berxwedan û piçek jî be hestê neteweyîtî lê hebû, **di nava xwînê de fetisand**."* Fêrgîn Melîk Aykoç

Di navbera du avan de man
bnr. Di navbera du riyan de man

Di navbera du riyan de man
Dudilî bûn. Di nav nakokiyê de man. **Qirika Zahîdeyê* ***di navbera du riyan de mabû*** *ku nikaribû biryarekê jî bide.*

Di navbera du çeman de tî man
Xwediyê gelek derfetan bûn, lê ji yekî jî sûdwer nebûn. **Ew jî qedera Xwedê ye, ew qas derfet di bin destê min de ne lê mixabin* ***di navbera du çeman de tî mame****.*

Di navbera nal û bizmar de xwe gihandin hev
Di nav rewşeke pir teng û dijwar de tiştek pêk anîn. **Digel ew qas astengiyên bavê wê, dîsa jî keçikê û gede* ***di navbera nal û bizmar de xwe digihandine hev****.*

Di navbera Xelîl û Celîl de man
Di navbera du vejibarkan (alternatîfan) de man. **Sofiyê rebên* ***di navbera Xelîl û Celîl de mabû****. Nizanibû çi bike.*

Di navbera (yekî) û Xwedê de bihostek man
Pir kêfxweş bûn. **Girêdayî gelê xwe û malbata xwe bûna wî jî ku lûn bûm,* ***di navbera min û Xwedê de bihostek ma****.*

Di navbera wan de çûn û hatin
Di nav her du seriyan (hêlan) de li têkildariyekê yan jî çareseriyekê gerîn. **Ji bo aştiyê Zayîm Begê Xosrof* ***di navbera her du eşîran de diçe û tê****, înşelah dê wan li hev bîne.*

Di navbera wan re av derbas nebûn
Ji bo xweşbûna têkiliyan tê bikaranîn. **Maşelah* ***di navbera wan re av derbas nabe****.*

Di navberê de çiya hebûn
Di navberê de cudatiyeke mezin hebûn. **Erê, her du jî kurê bavekî ne lê Xwedê dizane* ***di navbera wan de çiya hene****.*

Di navberê de man
bnr. Di navbera Xelîl û Celîl de man

Di navberê de nan û xwê hebûn
Di pêvajoya derbasbûyî de xatir û bîranînên baş hebûn. **Ez nikarim her tiştî bi carekê re xera bikim. Çimkî* ***di navbera me de nan û xwê heye****.*

Di nerma xwe de şixulîn
Di hundirê xwe de bi derdê xwe ve mijûl bûn. **Ew tenê* ***di nerma xwe de dişixule****, derdê xwe jî ji kesî re eyan nake.*

Di nîvê rê de hiştin
Heya dawiya peymanê bi hevkarê xwe re nedomandin. **Min bi niyeteke dûvdirêj destê xwe dabû destê wî, lê mixabin wî ez* ***di nîvê rê de hiştim****.*

Di nîvê rê de man

Karê xwe heta dawiyê nebirin. **Bawer nakim ku zêde girîngî dabûyê, naxwe wisa* ***di nîvê rê de nedihişt****.*

Di ortê de dirî, li kêlekê jî rûdine.

Karê berevajî kirin. **Malxirab* ***di ortê de dirî li kêlekê jî rûdine****.*

Di paşila xwe de kenîn

Bi eşkere diyar nekirin, lê ji rewşê memnûn bûn. **Tu li wisa sar sekinandina wê menêre, ew* ***di paşila xwe de dikene****.*

Di paşila xwe da mar xwedî kirin

Yê ku qencî û pakî lê kirî neyar derketin. **Bi dilekî saf, min ew qas qencî lê kirin, lê min nizanibû ku min* ***di paşila xwe de marek xwedî kiriye****.*

Di paşila (yekî) de xaç derketin

Yê pê bawerbûyî, wekî baweriyê derneketin. **Herî zêde ez bi wî bawer bûm, lê sed car heyf ku* ***di paşila wî de jî xaçek derket****.*

Di pêsîrtengiyê de bûn

Di nav tengasî û zorê de bûn. **Îro ew* ***di nav pêsîrtengiyê de ye****, sibe jî em ê têkevinê, divê em tev jê re alîkariyê bikin.*

Di pêşa min de rûniştiye, li rûyê min darda bûye.

Ez sitamiyê lê dikim, lê ew xirabiyê li min dike. **Tu li min û vê rewşê mêze bike.* ***Di pêşa min de rûniştiye, li rûyê min darda bûye.***

Di pişt de xeber dan

Paşgotiniya yekî kirin. **Li rûyê Heqî xwe şirîn dikir, lê* ***di pişt de jî xeber dide****.*

Di postê xwe de dewixîn

Bi xwe çareya serê xwe dîtin. **Ew bi xwe* ***di postê xwe de dewixiye****, êdî mineta wî ji kesî tune.*

Di qaqa Xwedê de birin

Yek zehf aciz kirin. **Wî lawikê wê yê piçûk jinik* ***di qaqa Xwedê de bir****.*

Di qula derziyê re çûn

Zirav û jar bûn. **Ne tiştê salixdayînê ye, ketibû rewşeke wisa ku* ***di qûla derziyê re diçû****.*

Di qula hundirê xwe de bûn

Bi xwe re an jî di hundirê xwe de mijûl bûn, ji tu kesî re têkilî daynenîn. **Ew wekî nexweşan hema wisa* ***di qula hundirê xwe de ye,*** *bi xwe re mijûl e.*

Di qûna derziyê re derxistin

Xesîsî, temahkarî kirin. **Maşelah ka ew jî mirovekî wisan e ku her tiştî* ***di qûna derziyê re derdixe****.*

Di reşê (yekî) de gotin
Dema ku ew ne li wir be, der barê wî de wekî ku ew li wir be peyivîn. **Min ku ew mesele bihîst, hema min* ***di reşê te de gelek tişt gotin****.*

Di rex (yekî) de xirexir kirin
Tim aciz kirin. **Arya ew qas* ***di rex kurê xwe de ew qas xiste xirexir****, di dawiyê de ew xerabtir kir.*

Di rêza însanan de bûn
Li gorî civakê di rewşeke asahî de bûn. **Berê ew jî* ***ne di rêza însanan de bû****, lê wa ye wî jî bi tiştekî dihesibînin.*

Di riya rast de neçûn
bnr. Di riya xerab de bûn

Di riya xerab de çûn
Bi karên nedurist re mijûl bûn. (Bi taybetî ji bo jinên ku qawikiyê dikin tê gotin.) **Mirov ku* ***di riya xerab de çû****, veger ne hêsan e.*

Di riya xwe de bûn
Li ser doz û azîneya xwe berdewam kirin. **Ew hê jî eynî* ***di wê riya xwe de ye****.*

Di riya xwe de çûn
bnr. Kar bi kesî neketin

Di riya (yekî) de meşîn
Wekî raman û daxwazên yekî kirin. **"Niha min divê ez jî mîna kalê xwe bim. Heger negihîjime wan jî, qet nebe ez ê* ***di riya wan de bimeşim****."* Feqî Huseyn Sağnıç

Di ro de berdan
Pir erzan dan. **Erê, navê wê fîrotan bû, lê Xwedê dizane, lawê min ew pez* ***di ro de berda****.*

Di ro de çûn
bnr. Di ro de berdan

Di ruhê xwe bihurîn
1. Mirina xwe dan ber çavên xwe. **2.** Ji ber derd û kulan gelekî aciz bûn. **"Ez* ***di ruhê xwe bihurîm****, wisa hatim van rojan."* Zana Farqînî **Ji dest wan zarokên xwe yên bêxêr, zelîxan* ***di ruhê xwe bihurî****.*

Di rûyê (yekî) de çêbûn
Ji sedema yekî de pêk hatin. **Ev qîra kuçeyan* ***di rûyê keyayê me yê nû de çêbû****.*

Di savêra segan de nan xwarin
Ketin rewşeke zor û perîşan. Bêrûmet bûn. **Êdî dê ji wê zêdetir çi bike, mêrik îro* ***di savêra segan de nan dixwe****.*

Di ser (yekî) de rûniştin(*)

Ji bo jinên ku bi mêrekî re dikevin têkiliya zayendî û dû re bi zorê xwe diavêjin mala wan tê bikaranîn. **Dibêjin Fatim* ***di ser Rizgo de rûniştiye****; ku tiştek nebûya wisa nedibû.*

Di ser guhê xwe re avêtin

Girîng negirtin, guh nedan. **"Di romanê de xusûsiyeteke din heye ku gelek romannivîs wê* ***di ser guhê xwe re diavêjin****."* İbrahim Seydo Aydoğan

Di ser hev de bikutî, nabe sîr û pîvazek

Ji bo tiştên pir hindik tê bikaranîn. **Ma çiqas daye? Ku tu* ***di ser hev de bikutî, nabe sîr û pîvazek.***

Di ser pozê (yekî) re mêr tune bûn

Pir xurt û mêrxas bûn. **Bi rastî jî* ***di ser pozê Xetîp re mêr tune ne.***

Di ser re avêtin

Derew kirin, têfirandin. **Tu guh nede wî, edeta wî ye ew tim wisa* ***di ser re diavêje****.*

Di ser re baz dan

bnr. Di ser (yekî) re gav kirin

Di ser re bûn

Ji hêla êqil ve qels bûn. **Tu çima ji wî dixeyîdî? Ma tu nizanî ew yekî* ***di ser re ye****?*

Di ser re, di ber re kirin

Bi awayekî têkûz nekirin. **Wî karekî wisa* ***di ser re, di ber re*** *kiribû ku min ji nû ve da çêkirin.*

Di ser re, di ber re xeber dan

Ne li cih peyivîn. **Wisa* ***di ser re, di ber re xeber dida*** *ku min tiştek jê fêm nekir.*

Di ser (yekî) re gav kirin

Tiştek nehesibandin. **Ma em jî fêm nakin ku wî* ***di ser me re gav kiriye****?* (argo)

Di ser re gongil kirin

Kar bi pêşk û têkûz nekirin. **Hezarê hema karekî* ***di ser re gongil kir****.*

Di ser re kes tune bûn

*Bêhempa bûn. *A rastî ev xinamiyê min mirovekî wisan e ku* ***di ser re kes tune ye****.*

Di ser re kirin

bnr. Di ser re avêtin

(*) **Di ser (yekî) de rûniştin:** Li Kurdistanê carinan dema mêrek bi jinekê re têkeve têkiliya zayendî û nexwaze wê wekî hêwî bibe ser jina xwe; carinan jinik diçe bi zorê li mala mêrik rûdine. Çiqas lêdin jî, çi bînin serî jî ji mal dernakeve. Di dawiyê de jî mezin û rûspî dikevin navberê û mehra wê dibirin. Ew jî dibe jina wê malê.

Di ser re xwendin
Cidî negirtin. **Her kes dizane ku Ararat Quranê hema* ***di ser re dixwîne***.

Di ser serê xwe re avêtin (Bi ser serê xwe re avêtin)
1. Girîng negirtin. **2.** Bi cihekî de vivirandin. **Min çi digot wî* ***di ser serê xwe re diavêt***. **Gunehê wî bi wê zaroka bêzar a bêziman jî nehat û ew jî* ***di ser serê xwe re avêt***.

Di ser xwe re tu kes nedîtin
Xwe zêde hesibandin. **Maşelah, ku tu ji wî bipirsî,* ***di ser xwe re tu kesî nabîne***.

Di ser xwe û bin xwe re kirin
Ji bo tiştên zêde ku bê sexbêr û hovane tên bikaranîn tê gotin. **"Pereyên jinika reben* ***di ser xwe û bin xwe re dike****, bi keçikan dide xwarin û digere."* Musa Vazgali

Di serê xwe de mezin kirin
Bi xwe re weswese kirin. **Ka Zal ew mesele çi qasî* ***di serê xwe de mezin kir****?*

Di serê zerê de ketin
Ketin rewşek xeter. **Silo dixwest dekan li serê wê çêbike, lê bi xwe* ***di serê zerê de ket***.

Di serî de çûn
bnr. Ketin serê (yekî)

Di serê (yekî) de cih girtin
Di serî de rûniştin. Têgihîştin. **"Fesîh zanibû her ku dûrî wê dikeve, hew qasî gotinên xelkê* ***di serê wê de cih digirin****."* Helîm Yûsiv

Di serî de niçilîn
bnr. Ketin serê (yekî)

Di serê (yekî) de rûneniştin
Neecibandin. Di têgihîştinê de astengî kişandin. **Me çiqas got jî ew mesele* ***di serê wî de rûnenişt***.

Di sîtila dew de li mûyê spî gerîn
Li hincetan gerîn. **Kerê kor jî dizane ku niyeta wan ne baş e, ew tenê* ***di sîtila dew de li mûyê spî digerin***.

Di sola (yekî) de av tê vexwarin
Ji bo mirovên hêja û baş tê gotin. **Ew mirovekî wisa ye ku* ***di sola wî de av tê vexwarin***.

Di stû de man
Bar û berpirsyarî ketin ser milê yekî. **Ji bilî min wan hemûyan xwe dan aliyekî, ew bar tenê* ***di stûyê min de ma***.

Di stûyê (yekî) de hiştin
Bêyî daxwaza yekî karek xistin stû. **Hew min dît ku ew kar jî* ***di stûyê min de hiştiye*** *û çûye.*

Di şeyê hev de bûn

Di eynî cir û xisletê de bûn. **Wan herduyan baş hev du dîtine, hema tam* ***di şeyê hev de ne****.*

Di şûna stêrkan de xwîn hatin

Gelekî girîn, li ber xwe ketin. **Gozel wilo giriya ku* ***di şûna stêrkan de xwîn hat****.*

Di tariyê de man

Veşartî man. **Piştî şoreşê gelek tiştên dizî û tevkujiyên kirêt ên dewletê derketin, lê mixabin hinek jî* ***di tariyê de man****.*

Di tehmê de hiştin

Ji ya zêdetirîn xwe parastin, tam di dema xweş de hiştin. **Eferim jî wî re ew têkiliya xwe tam jî* ***di tehmê de hişt****.*

Di tendûrê re xistin, di kulfikê re derxistin

Dike rewşeke pir zor. Eziyetê lê dike. **Tu wisa li milayîm sekinandina wê menêre, ew xesûya xwe* ***dike tendûrê, di kulfikê re derdixe****.*

Di tenekeyan de rîtin

1. Zêdetir ji bo kesên dikevin hepsê tê gotin. **Wî ew qas salan* ***di tenekeyan de rî****, dîsa jî aqilê wî nehate serî.*

Di tengasiyê de hiştin

Di nav zor û dijwariyê de hiştin. **Ew tevgera ku ew di nav de bû, ez* ***di nav tengasiyê de hiştim****.*

Di tintêl û hewalê xwe de şewitîn

Bi xwe bi derdê xwe de şewitîn. **"Lewra ew jî* ***di tintêl û hewalê xwe de dişewite*** *û carinan qêrînek jê diçê."* Feqî Huseyn Sağnıç

Di tu olkan de bi dest neketin (tunc bûn)

Pir cuda û bêhempa bûn. **Xwedê dizane ev her sê neviyên min jî wer cuda û xweşik in ku* ***di tu olkan de bi dest nakevin****.*

Di vê mehreşkê de gewr dikevin dewsa esmeran, esmer dikevin dewsa keran.

Carinan hinek pêvajoyên dijwar li ser mirov bandorek wer diafirînin ku rewş bi awayekî din tê guherandin. **Ka ev çi rewşeke ecêb e tu dizanî?* ***Di vê mehreşkê de gewr dikevin dewsa esmeran, esmer dikevin dewsa keran****.*

Di vî esmanî de hilnayê

Xwe zêde dîtin, xwe qure kirin. **Ji her şêlafiyê serokê xwe wisa nepixandine ku* ***di vî esmanî de hilnayê****.*

Di xela xinê de bûn

Di nav hebûnê de tunebûn kişandin. **Ya ku ew dijîn jî* ***di xela xinê de bûn e****.*

Di xelaya mêran de navê dîkan danîn Evdirehman.

Cihê ku yên resen lê tune bin, mirov bi tiştên sexte xwe dixapînin. **Ew çawa bikin? Qijikan ji bêgavî,* ***di xelaya mêran de navê dîkan danîne Evdirehman.***

Di xewna xwe de bidîta bawer nedikir.
Tiştên qet hêvînekirî hatin serî. **Welehî min* ***di xewna xwe de bidîta, bawer nedikir*** *lê di dawiyê de hate serê min.*

Di xewnên şevan de man
Derbas bûn, di pêvajoya borî de man. **Belangazo* ***tu xewnên şevan de mayî****, ji zû de hesil ji Mûsilê debas bûye.*

Di xewa giran de man (bûn)
1. Dereng man. **2.** Ji dinyayê bê xeber man. **Kuro lawo xelk çû fezayê, hê hûn* ***di xewa giran de mane****. *"Ez dibêm ev bûyer nîşan dide ku gelê kurd hê jî* ***di xewa giran de ye****."* M. Rauf Çiçek

Di xewa mirinê de man
bnr. Di xewa giran de man

Di xewa teraliyê de bûn
Ji bo kesên bêxîret tê bikaranîn. **"Lewra dibe ku gel* ***di xewa teraliyê de be*** *yan jî razayî be. Çiqas li wan tadeyî bibe jî pê nahesin, dijminê xwe nas nakin."* M. Rauf Çiçek

Di xewê de man
Ji xewê dereng rabûn. **Ez îro* ***di xewê de mam****, min xwe negihande servîsa fabrîqeyê.*

Di xewnên şevan de jî hev û din nedîtin
Qet hev û din nas nekirin. **"Besna û Zelalê* ***di xewnên şevan de jî hev û din nedîtibûn*** *lê niha bûna dişên hev.*

Di xewê de lext dîtin
Di xeyalan de bi pêdiviyên xwe mijûl re bûn. **Çawa bike, ew jî tenê* ***di xewê de lext dibîne****.*

Di xwe de dibîne, nasedqîne.
Her çiqas bi xwe dijî, dîsa jî naşikirîne. **Ji yê wisa re ez çi bibêjim,* ***di xwe de dibîne, dîsa jî nasedqîne****.*

Di xwe de bihartin
bnr. Di xwe de derbas kirin

Di xwe de derbas kirin
Dehandin. Ne bi dil be jî îdare kirin. **Rebeno çawa bike, ne bi dilê wî ye, lê ji bêgavî* ***di xwe de derbas dike****.*

Di xwe de qusikîn
bnr. Di xwe de şeqizîn

Di xwe de şeqizîn
Şermî ketin. **Wan qala zewaca wê dikir, Siltan **di xwe de dişeqizî**.*

Di xwe de quraftin
bnr. Di hundirê xwe de hilxistin û daxistin

Di xwe de sor bûn
Bi şermî ketin. **Ji ber ku dergistiyê wê bi destê wê girt, Sînemcan **di xwe de sor bû**.*

Di xwêdanê de av bûn
bnr. Di xwêdanê de reş bûn

Di xwêdanê de reş bûn
Gelekî westîn, betilîn. **"Şêr **di xwêdanê de reş bûbû**. Te digot ku bedena wî hemû bûye av."* Feqî Huseyn Sağnıç

Di xwîna sor de hiştin (gevizandin)
Zêde li yekî xistin. **Her du lawên Şemso wisa li Kazo dan ku ew **di nav xwîna sor de hiştin**.*

Di xwînê de hesikîn (Di xwînê de man)
bnr. Di xwîna sor de hiştin

Di xwînê de piçikîn
bnr. Di xwîna sor de hiştin

Di zik de (yekî) gû kelîn
Ramanên xerab di dilê xwe de sêwirandin. **Jixwe her kes dizane ku **di zikê wî gû de dikele**, loma kes baş selamekê jî nadiyê.*

Di zikê diya xwe de neh mehan nesekinîn
Ji bo kesên pir çalak û lezgîn tê gotin. **Kuro ez metel im, tu **di zikê diya xwe de çawa neh mehan sekinî**?*

Di zikê hev de bûn
Bi hev û din re têkildar bûn. **Zêde derka wan kirin ne rast e, jixwe **di zikê hev û din de ne**.*

Di zikê xwe de şixulê xwe meşandin
Bi dizî û xayînî tevgerîn. **Tu bi ya min bikî, bi wî re nekeve nav karan ew **di zikê xwe de şixulê xwe dimeşîne**.*

Di zikê xwe de xeber dan
bnr. Di zikê xwe de şixulê xwe meşandin

Di zirtikê de dayîn
bnr. Zirt lê xistin

Di zûtika sibê de
bnr. Hê zûtika sibê derneketî

Dibê, mêr be jî jin be jî bila bizê.

Tiştên bê gengaz daxwaz kirin. **Her tiştek rewşeke wê ya bêgavî heye, lê hema Evîn* ***dibê, mê be jî nêr be jî bila bizê.***

Dibê: "Darê das hate te." Dibê: "Wekî destî ji min nebe, bi min nikare."

Yên ku nêzîkî hev in, an jî eynî cins in, ji ber ku bi her awayî hev û din baş dinasin, bêhtir ziyanê didin hev. ****Dibê: "darê das hate te." Dibê: "Wekî destî ji min nebe, bi min nikare."*** *Ji bo wê jî şerê me zêdetir bi me bi xwe re ye.*

Dibêje, direqise; nabêje difetise. (Mirov dibêje, direqise, mirov nabêje, difetise.)

Ji bo ketina nav nakokiya hinek helwestan tê bikaranîn. **Ew jî nizane çawa bike.* ***Dibêje, direqise; nabêje difetise.***

Dibêje ez û ne kes.

Ji bilî xwe û berjewendiyên xwe tu kesek nefikirîn. **Ew mirovekî ne baş e,* ***dibêje ez û ne kes****, xêr ji wî û nîvekariya wî nayê.*

Dibêje lê napêje.

Bê ponijandin xeber dan. **Heyfa wê hejn û bala ú wî sifetî, mixabin* ***dibêje lê napêje****.*

Dibêjî qey min nanek xwariye, keriyek dayê.

Ji bo kesên ku lêv û lopixên wan rast nabin û tim pozpirçî ne tê gotin. **Hela tu li lêv û lopixên Zezê mêze bike.* ***Dibêjî qey min nanek xwariye, keriyek jî daye wê****.*

Diçe cihê nenas, pesnê xwe dide xas û xas.

Ji ber ku kes nas nake, têfirandin, derew kirin. **Ew jî xisletê wî ye,* ***diçe cihê nenas, pesnê xwe dide xas û xas****.*

Diçim aş, aş xira dibe, têm kaniyê kanî zuha dibe; ga dikirim dibe golik, genim diavêjim dibe şolik.

Bêşans û bêrozgarî bûn. **Ev çi qeder e ya rebê alemê?* ***Diçim aş aş xira dibe, têm kaniyê kanî zuha dibe; ga dikirim dibe golik, genim diavêjim dibe şolik.***

Diçirîne, nizane bidirû.

Derewan dike, lê nikare xweşik li hev bîne. **Ew jî wekî bavê xwe dikuşirîne, lê hê xam e,* ***diçirîne, lê nizane bidirû****.*

Dijmin behecandin

bnr. Dijmin teqandin

Dijmin di nav rû (yekî) de bûn

Dijminê herî mezin, ê ku herî nêzîkî mirov û hay ji rewşa mirov heye ye. **Lawo, li cihê dûr negerin,* ***dijminê me di nav rûyê me de ye****.*

Dijmin teqandin

Ji bo kesên ku tenê ji bo xuyangê û ji bo cks û zikdirînê tevdigerin tê gotin. **Jixwe armanca Keremê Silo ne karpêşdebirin bû, wî tenê dixwest bi wî dîmenî* ***dijminên xwe biteqîne****.*

Dijminê canê xwe bûn
Bi xwe zirar dayîn xwe. **Ji wî hundirxwar re dijmin ne hewce ye, jixwe ew bi xwe **dijminê canê xwe ye**.*

Dijminê heft bavan bûn
bnr. Dijminê qanî qanî bûn

Dijminê qanî qanî bûn
Dijminê pir kevn, mezin û dijwar bûn. **Malbata Yesariyan ne niha, lê ji dema kalikê kalikê min de **dijminê me yê qanî qanî ne**.*

Dikale lê şîr nade.
Bi xuyanga xwe erênî nîşan dan, lê di karvaniyê tu tişt nekirin. **Ew jî ne yekî ji dil e, **dikale, lê şîr nade**.*

Dikana Bekiro du qalib sabûn û çar kîs xwê
Nav heye lê naverok tune. **Nav ne xem e, ya girîng naverok e. **Dikana Bekiro du qalib sabûn û çar kîs xwê.***

Dikare ... bade.
Dikare pêk bîne. Dikare ji heq derkeve. **Tu qet mereqan meke, ew **dikare wî karî bade**.*

Dîk bang dan
Wa ye dem hat. **Qûna xwe qet nefîsîne, wa ye tu jî dizanî ku **dîk bang da**.*

Dil berdan (ykî)
Ji yekî hez kirin, ecibandin. **Lawikê me **dil berdaye keçika Amed**, divê em wê bixwazin.*

Dil bi hev û din re rast bûn
Ji hev û din re durist û sadiq bûn. **Ku **dilê kesan bi hev û din re rast be**, Xwedê jî ji wan re dibe alîkar.*

Dil bijandin
bnr. Dil kişandin

Dil bijî, çav rijî.
Dilbijandina tiştekî zor e. **Xaltiya min digot lawo dilê wî dibijiyê, bidinê, bila newerime, jixwe çi gotine: **"Dil bijî, çav rijî."***

Dil buhirîn
bnr. Dil jê çûn

Dil bûne ayê şevî, xof, rem ji dinê revî.
Dil ku rehet be, derd û kul namînin. *****Dil bûne ayê şevî, xof, rem ji dinê revî.*** *Gelek pirs-girêk girêdayî psîkolojî û giyana mirovan in.*

Dil dax kirin
bnr. Dil şewitandin

Dil dibijiya goştê kerê, digot "Guhên wê wekî yên kêrguhan in."
Dema pêdiviyeke mirov a girîng hebe, ji bo çareseriyê, tiştên herî ne di cih de jî wek tiştên asahî dibîne yan jî dide nîşan dan. **Pêdiviyên hingehîn, psîkolojiya mirovan jî diguherînîn.* ***Dil dibijiya goştê kerê, digot guhên wê wekî yên kêrguhan in.***

Dil dixwaze, lê bi dest ve nayê.
bnr. Dil dixwaze lê dest nagihîjiyê

Dil dixwaze, lê dest nagihîjiyê.
Tiştek daxwaz kirin lê ji bo pêkanînê tiştek ji dest nehatin. ****Dil dixwaze lê dest nagihîjiyê.*** *Mixabin tenê bi niyetê jî tiştek pêk nayê.*

Dil e, ne bilxur e!
Ev tiştekî girîng û cuda ye, ne wisa hêsa ye. **Heyran ra jê nabe, ev* ***dil e, ne bilxur e****.*

Dil êşandin
bnr. Dilê (yekî) şikandin

Dil gemarî, dev temîz bûn
bnr. Dev dost, dil xayîn bûn

Dil heye, taqet tune
bnr. Dil dixwaze lê dest nagihîjiyê

Dil hiştin
bnr. Dilê (yekî) şikandin

Dil jê çûn
Di hêla tenduristî de aciz bûn, xewirîn. **Du roj bûn ku min pariyek nan nexwaribû, ji ber wê* ***dil ji min diçû****.*

Dil jê nebuhirîn
bnr. Dil jê derbas nebûn.

Dil jê nebûn
bnr. Dil jê derbas nebûn.

Dil ketin hev
Ji yekî/ê hez kirin. Evîndar bûn. **Keçeke Mele Ûsiv heye. Ev heft sal in ku em* ***dil ketine hev****.*

Dil kirin
Tiştek daxwaz kirin. Ecibandin. **"Eger hûn hev û din divên, here bi malbata xwe jî bişêwire. Eger* ***dil kirin****, bira werin bixwazin."* Mûhemmed Garsî

Dil kirîn
bnr. Dilê (yekî) hildan

Dil kutan
bnr: Dil perpitîn

Dil kutekut kirin
bnr: Dil perpitîn

Dil lê nebuhurîn
bnr. Dil jê nebûn.

Dil li ser dil e, jê re tune tu derd û kul e.
Heke du mirov bi rastî jî ji hev du hez bikin, kul û derdên wan gelekî sivik dibin. **Hema bila em ji hev û din re rast bin, ji wê pê ve ne xem e. Çi gotine: **"Dil li ser dil e, jê re tune tu derd û kul e."***

Dil ne sifre ye ku mirov li ber hemî kesî veke.
Kes nizane di dilê kesî de çi heye. **Kî dizane di dilê kê de çi heye? **Dil ne sifre ye ku mirov li ber hemû kesî veke.***

Dil nerm kirin
Razî kirin. Îkna kirin. **"Ma em pê **dilnermkirina** hev digerin?"** Kamîran Bedirxan

Dil nekirin
bnr: Dil tune bûn

Dil pê nekirin
Neecibandin. **Lawik zehf ew dixwest, lê keçikê **dil pê nekir**.*

Dil pê ve bûn
bnr: Dilê (yekî) pê ve girêdayî bûn

Dil qebûl nekirin
bnr: Dil qirar nedan

Dil rabûn
bnr: Dil li hev ketin

Dil razî nebûn
bnr: Dil tune bûn

Dil stendin
bnr: Dil vekirîn

Dil şikestin (şikîn)
Ji ber bûyerekê yan jî bi gotinekê êşîn, xemgîn bûn. **"Gelê cinyaze nedihatine naskirinê. Bi her cinyazekî teze derxistî re çend **dil dişkestin**."** Şemsî

Dil şewitîn
bnr: Çizînî ji dilê (yekî) çûn

Dil û cigerên (yekî) bi piştê ve girtin
Gelekî li ber xwe ketin. **Sê salan bi şûn de dema ku min ew dît, ji derd û kulan **dil û cigerên wê bi piştê ve girtibûn**.*

Dil û dînê xwe yek kirin
Bi duristî wekî bawerî û ramana xwe tevgerîn ango bi duristî hewl dan. **Ew mirovekî wer e, **dil û dînê wî yek dike**, çawa bawer dike, wisa pêk tîne.*

Dil û gurçik hatin xwarê
bnr. Dil û hinav zer bûn

Dil û gurçik helisîn
bnr. Dil û hinav zer bûn

Dil û gurçik pola bûn
bnr. Çargurçikî bûn

Dil û hinav hatin xwarê
bnr. Dil û hinav zer bûn

Dil û hinav xwarin
bnr. Di nava xwe de qicqicîn

Dil û hinavên (yekî) zer bûn
Gelek cefa û eziyet dîtin. **Hem ji ber hesreta welat, hem jî ji derdê zarokan **dil û hinavên Fazîle Xanimê zer bûn**.*

Dil û hinavên (yekî) zer kirin
Yek gelekî aciz kirin. **Ma îşê acizkirinê bû, kuro wê **dil û hinavê min zer kirin** lo!*

Dil xewirîn
bnr. Dil jê çûn

Dila' pirsî, qûna hesilî (hasilî)
Yên ku qenciyê dikin, carinan di ser de jî wekî xeraban tên nîşandan. ****Dila pirsî, qûna hesilî.** Lawo min ji te re nedigot, ev ji qenciyan fêm nakin?*

Dilbibirîn bûn (Dil birîndar bûn)
bnr. Dilbikul bûn

Dilbikul bûn
Bi keder û bi xem bûn. ** "*Pisîka sorbelek! Tu îro **dilbikul î**. ...te feleka xwe şaş kiriye... dinya li ser te digere; çavên te tu deran nabîne."* Dr. Cuwan Batû

Dilbixwîn bûn
bnr. Dilbibirîn bûn

Dildimî li ber dilê (yekî) bûn

Tiştekî ku pê guman û teskîn hebûn. *"*Lê **dildimiya li her dilê wî ew e**, ku ew cihê mezelê diya xwe zane û her sal dixwaze here ser mezelê dayîka xwe."* Firat Cewerî

Dilevdal (bûn)

Saf, mazlûm û dilsoz bûn. *"*Li welatê xeybê her mirin dibû kilamek, her kuştin bi hezar sewtên **dilevdal** dixemilî û li pey wan çûyiyan dibû destan û senfoniyeke diltenik."* M. Zahir Kayan

Dilekî na bi heft dilan

Ji dil, bi daxwazeke bêhempa. **Dilê min, **dilekî na bi heft dilan** ji vê keçikê girt.*

Dilekî rehet nedîtin

Tim bi derd û kulan re hêşir bûn. *Wê belengazê jî tu **dilekî rehet nedit**.

Dilê (yekî) avêtin ...

1. Tiştek daxwaz kirin. ***Dilê min avête wî wêneyî**, lê pereyên min tune bûn ku bistînim.*

Dilê (yekî) azirandin

Yek êşandin, aciz kirin. **Birayê Hemo **dilê wî azirand**.*

Dilê (yekî) bi ... hilavêtin

Tiştek zehf zêde daxwaz kirin. *"*Her wekî bav û kalên xwe, **dilê wan jî bi miletperwerî û welatevîniya kurdî hildave**."* Mehmed Uzun

Dilê (yekî) bi ku de bixwaze, bi wir de ajotin

Wekî daxwaza xwe bi kar anîn. **Ji wê re çi, **dilê wê bi ku de bixwaze, mêrê wê bi wir de diajo**.*

Dilê (yekî) bi ser ve çûn

Dil xewirîn, ji hêla tenduristiyê ve aciz bûn. **Vê êvarê ji birçîna **dilê min bi ser ve çû**.*

Dilê (yekî) bi ... şad bûn

Bi sedema tiştên erênî û xweş şad bûn. ***Dilê min bi zewaca wan pir şad bû.***

Dilê (yekî) çargopalî lê xistin

Pir bicoş bûn. Dil xweş bûn. **Ji her ku qîza wê dê îro ji girtîgehê derkeve, **dilê Xaltiya Gozel çargopalî lê dixe**.*

Dilê (yekî) dax dan

Hundir şewitîn, xemgîn bûn. *"*Lê digel vê, eger hebe ji tengezarî û mitaleyeke ku ji nişka ve **dilê wê dax dabû**, bi temamî hate ser hişê xwe û giraniya xwe ji ser xwe avêt û heta demekê ji qehran xwe xwar."* Osman Mehmed

Dilê (yekî) di dest de bûn

Di nav helecan û bêtebatiyekê de bûn. **Çima ku du heb lawên wê tevlî gerîlayên tevgera azadiyê ne, **dilê xaltiya Sitî tim di destê wê de ye**.*

Dilê dilxwaz, nan û pîvaz

Dilê mirov ku bixwaze, bi tiştên herî piçûk jî dikare serfiraz bibe. **Dilê dilxwaz, nan û pîvaz.* *Tenê bila mirov ji dil bixwaze.*

Dilê (yekî) êşîn

Li ber xwe ketin, xemgîn bûn. **"Dû re ji nişka ve destê xwe kişand. Destê zilêm di valahiyê de ma.* ***Dilê wî êşiya.*** " İbrahim Seydo Aydoğan

Dilê (yekî) germ kirin

1. Hêvî dan. Îkna kirin. **2.** Xapandin. Arxayîn kirin. **Ez wê çaxê dibehecîm, lê Mendo bi wan gotinên xwe yên xweş* ***dilê min germ kir****. *Berê jê re xwarin çêkirin, ezet û hurmet kirin,* ***dilê wî germ kirin****, dû re derman danê û ew radestî leşkerên Romê kirin.*

Dilê (yekî) geş bûn

Şad bûn. Kêfxweş bûn. **"Bi bihîstina wê mizgîniyê re ez* ***dilê min geş bû****.*

Dilê (yekî) gotin, devê (yekî) negotin

Ya ku di dil de derbas dibe diyar nekirin. **Ez Evdal baş dinasim, wa ye kifş e vê carê jî* ***dilê wî dibêje, devê wî nabêje****.*

Dilê (yekî) gupegup kirin

Bitatêl, heyecan û xiroş bûn. **Beriya ku ez dest bi axaftinê bikim,* ***dilê min gupegup dikir****.*

Dilê (yekî) hatin ber dêv

Dil li hev ketin. Bîz jê çûn. **Gava min deriyê avdêstxaneya wan vekir,* ***dilê min hate ber devê min****.*

Dilê (yekî) hatin guvaştin

Ketin bin bandora xiroş û heyecanê. **"Diviya bikete girî heçku tiştekî* ***dilê wê diguvaşt****. Gihîşte nêzîkî gundî û rawesta."* * İbrahim Selman

Dilê (yekî) hil bûn

Ji birçîbûnê yan jî nexweşiyekê aciz bûn, xewirîn. **"Ev bû mehek ku jiyan, bêyî min derbas dibe.* ***Dilê min hil dibe****, lê dike nake fîrsenda herikandinê nabîne.* Suat Kılıç

Dilê (yekî) hildan

1. Dil vekirîn, yek teskîn kirin. **2.** Dilê yekî çûn tiştekî. **Lê mêze kir ku bavê wê dilê xwe xera dike, wê bigirî, Bêrîvanê* ***dilê bavê xwe hilda****. *Erê, hîzê kesî neçûyê lê tenê* ***dilê Selîm hilda*** *û bê xem ew goşt xwar.*

Dilê (yekî) hilnedan

1. Li hember dîmenekî xeter xemgîn bûn. **2.** Bîz (made) neçûn xwarin an jî tiştekî. ****Dilê min hilneda*** *ku li birîna Keleş binihêrim.* ****Dilê min tu car hilnade*** *ku ez li mala Perwer xwarinekê bixwim.*

Dilê (yekî) jê birin

Xistin bin bandora xwe. Kirin aşiqê xwe. **Ew jî Don Jûanê Kurdan e, hema di navîna demeke kurt de* ***dilê jinan jê dibe****.*

Dilê (yekî) jê buhirîn
bnr. Dil jê çûn

Dilê (yekî) jê derbas nebûn
Dev jê bernedan. Jê hez kirin. **Belê gelek kêmasiyên wî hene, lê çi bikim ku dîsa jî **dilê min jê derbas nabe**.*

Dilê (yekî) jê man
Jê xeyidîn, dil jê şikestin. **Ji ber wê helwesta wê ya di dawetê de **dilê min ji Gulanê man**.*

Dilê (yekî) jê mayîn
Dil şikestin. Ji ber neyîniyekê moral xera bûn. **"Tu bi xwe jî dizanî, bêhna min jî teng e û xwe nagirim. Dawî **dilê hemû hevalan ji min dimîne** ji ber wê yekê heft sal in ku carekê tenê çûme civîna mezin."* Osman Sebrî

Dilê (yekî) jê sar bûn
Li hemberî kesekî yan jî tiştekî hestên germ û bawerî, winda kirin. Têkilî û pêwendî sist bûn. **Vê nexweşiya giran **dilê min ji jiyanê sar kir**.*

Dilê (yekî) ji ... reş bûn
Ji ber gelek bûyerên neyînî, dîtin û ramana erênî winda kirin. **Piştî ku li çiyê ew yek anîne serê keça wî, **dilê Mûsayê Çelo ji mîlîsan reş bû**.*

Dilê (yekî) ketin cih
Dil hênik bûn. **Ew gihîşte cihê cih, dû re dilê min kete cih.*

Dilê (yekî) kişandin (cv biwêj ne bi tirkî ye. "Canı çekmek")
Dilê yekî xwarin an jî tiştekî din xwestin. ****Dilê min pir dikişîne** ku ez qehwê vexwim lê pê mîdeyê min diêşe.*

Dilê (yekî) kizirandin
Dil şewitandin. Li ser kesekî hestyariyeke tund pêk anîn. **"Gulê jî wekî bilbileke xurt û nazdar, bi dengê xwe erîşa wî dişikand û bi gotinên xwe **dilê wî dikizirand**."* Mehmed Uzun

Dilê (yekî) lê îşiq nedan
1. Jê şikestin. **2.** Pê bawer nebûn. **Piştî wê gotina Gevezê, dikim nakim **dilê min lê îşiq nade**. *Min jî dixwest pê re kar bikim, lê mixabin **dilê min lê îşiq nade**.*

Dilê (yekî) lê qusîn
1. Dil ji kesekî şikestin. **2.** Xwîn bi ser yekî de kelîn. **Bi rastî jî vê carê **dilê min li Zagros qusî**. *Çawa ku wî ew keçik dît **dilê wî lê qusî**.*

Dilê (yekî) lê rûneniştin
Baş nehecibandin. **Ev çend sal in hûye zavayê min, lê nizanim çima hê jî **dilê min lê rûneniştiye**.*

Dilê (yekî) lê sar bûn

Li hember kesekî yan jî tiştekî hestên neyînî sêwirandin. **Berê min jî dixwest, lê di roja îroyîn de* ***dilê min lê sar bûye****.*

Dilê (yekî) lê spî bûn

Ji kesekî bawer kirin. **Tu qet nekeve tatêlê,* ***dilê her kesî li Baran spî ye****.*

Dilê (yekî) li ber nehatin

Li ber ketin, dil pê şewitîn, heyfa xwe lê anîn. **Belê fiyetekî baş dan erebeya min, lê* ***dilê min li ber nayê*** *ku ez bidim.*

Dilê (yekî) li hev du ketin

1. Ji ber nexweşiyê dil xera bûn. **2.** Bîz lê rûneniştin. **"****Dilê wê li hev du ket.*** *Rabû ser xwe dîsa ket."* Firat Cewerî **Kingê ku wan xwarinên Gulnazê dibînim,* ***dilê min li hev du dikeve****.*

Dilê (yekî) li ser (yekî) riciîn

Gelekî hez kirin. zêde girîng girtin. **Ev neh sal in ku keça wê di girtîgehê de bû, ji ber wê* ***dilê Hemdiya li ser keça wê gelekî diricife****.*

Dilê (yekî) li ser şewitîn (Dil pê şewitîn)

Guneh pê hatin. **Heke* ***dilê wê li ser neşewitiya****, qet wer lê dibû xwedî?*

Dilê mêrik ji jinê ne xweş bû, digot: "Tu ard cleg dikî qûna xwe ba dikî."

Li hincetan gerîn. **Ma dil ku bixwaze mehne û hincet tune ne?* ***Dilê mêrik ji jinê ne xweş bû, digot: "Tu ard eleg dikî qûna xwe ba dikî.****"*

Dilê min ji wê (ne) xweş e, erd di bin berfê de reş e.

1. Xuyang çawa dibe bila bibe, naverok û bingeh zû bi zû nayê guherandin. **2.** Tu bikî û nekî ya rasteqînî çi be, ew e. **Bi daxwaz û niyetan nabe,* ***dilê min ji wê xweş e, erd di bin berfê de reş e****.*

Dilê (yekî) neçûn ...

Bîz neçûn tiştekî. **"Bi Xwedê tu xêr û berxêr di te de nemaye. Ya qenc ew e ku te daqurînim. Bes, bi rastî jî* ***dilê min niha naçe te****; zikê min têr e..."* Dr. Cuwan Batû

Dilê (yekî) perpitandin

Bixiroş û heyecan bûn. **"Min cara ewil ew çavên xweşik li ber îskeleya vapûrê dîtibûn ... Weke nizgîniyeke xêrê,* ***dilê min perpitandibûn*** *"* Evdile Koçer

Dilê (yekî) pê êşîn

Dil man, ji tiştekî aciz bûn. **"... da ku nebî nebî goşeyek ji wê bikeve ber meqesê û goşa* ***dilê min pê biêşe****."* Perwîz Cîhanî

Dilê (yekî) pê germ bûn

Pê bawer bûn. **Ya rastî* ***dilê min pê germ bû*** *û min ew kar dayê. Ka em ê bibînin dawî çawa dibe?*

Dilê (yekî) pê şewitîn

Guneh pê hatin. *"*Xezalê bêlınek kişand kezeba xwe. Bi çavên kelogirî li min dinêrî. Êdî **dilê wê bi min şewitî**."* Ridvan Karaaslan

Dilê (yekî) pê ve girêdayî bûn

Ji dil û can yek hez kirin, sadiq bûn. **Heya îro jî **dilê min bi jina min ve girêdayî ye**.

Dilê (yekî) pê xweş nebûn

Jê razî nebûn. ***Dilê min qet bi wî xweş nîn e**, Înşelah ê Xwedê jî pê ne xweş e.*

Dilê (yekî) pirtepirt kirin (Dil pitpitîn)

1. Tirsîn. **2.** Pir bihelecan û tatêl bûn. **Di rê de **dilê min pirtepirt dikir**. Ez ditirsiyam ku derkevin pêşiya min. **Berî ku pûanên me bixwînin, **dilê min pirtepirt dikir**.*

Dilê (yekî) qilqilîn

Di nav helecan û tatêla tiştekî de bûn. **Kîfş e ku **dilê Zînê wa ye diqilqile**, ka wê çi bibêje.*

Dilê (yekî) qirar (qerar) nedan

Li hember dîmenekî xeter an jî bûyerekê li ber xwe nedan, dilê xwe ranegirtin, xemgîn bûn. Dil pê eşîn. ***Dilê min qirar neda** ku ez wê xebera reş ji dayîka Hogir a pîr re bi wî awayî bibêjim.*

Dilê (yekî) rehet bûn

Bê pirsgirêk bûn, serfiraz û biaram bûn. **Piştî ku min vegera lawê xwe jî dît îcar **dilê min rehet bû**.*

Dilê (yekî) reş kirin

Reşbînî û bêhêvîtî pêk anîn. **Bi wan kirinên xwe xesûya Siltanê **dilê wê reş kir**, niha jî kesek li rûyê wê nanihêre.*

Dilê se(gan) bi savarê xweş kirin

Bi bedeleke piçûk be jî, dil vekirîn (xweş kirin). **Ji xwe ew jî tiştekî wer zêde naxwaze, lê mirov **dilê sa bi savarê xweş dike**.*

Dilê (yekî) seh kirin

Li pey hînbûna rewşa niyeta yekî ketin. **Heke tu bikaribî **dilê wê seh bikî**, tu yê bibînî ku ka çawa kîndar e.*

Dilê (yekî) sivik bûn

Dilferah bûn. **Bi wan gotinên wê **dilê min hinekî sivik bû**.*

Dilê (yekî) şewitandin

Xemgîn kirin. **Herî zêdetir stranên ku digel erbaneyê tên gotin **dilê min dişewitînin**.*

Dilê (yekî) şikandin

Bi gotin an jî kirinên neyînî yek xemgîn kirin. Moral xerab kirin. **Wî cara dawiyê wisa **dilê min şikênand**, min biryar da ku careke din rûçikê wî nebînim.*

Dilê şivan kete pişkulê (kermekî), hûr kir şîr û xwar.
Daxwaza dilan li gorî xwediyan cure cure ye û ya her kesî li gorî wî birûmetir e. **Dilê mirov ku xwest jê re sînor tune.* ***Dilê şivan kete pişkulê, luîr kir şîr û xwar.***

Dilê (yekî) tepîn
Di hêla psîkolojiyê de deprasyon derbas kirin. **Çima ku mêrê wê ji xwe re keçek anî,* ***dilê Sorgulê tepî****, ew rakirin nexweşxwaneyê.*

Dilê (yekî) tê de bûn
Ecibandin. Jê hez kirin. *****Dilê min di wê keçikê de bû****, lê dê û bavê min nexwestin.*

Dilê (yekî) têr bûn
Ji kesekî yan jî ji tiştekî hewesa xwe hildan. **Berê têkiliya wan xweş bû, lê kingê ku* ***dilê mêrik têr bû****, ew avête ber dêrî.*

Dilê (yekî) tijî bûn
1. Kelogirî bûn. **2.** Di dil de gelek derd û kul hebûn. *****Dilê Henîfeyê tijî bû****, serê lawê xwe danî ser çoka xwe û giriya, giriya. *Ji kul û derdan* ***dilê Besnayê tijî bûbû****.*

Dilê (yekî) tijî kul bûn
Biderd û keser bûn. **"Gunehê min çi bû. Ax, ax sed fikr û sawir di serê min de diçûn û dihatin.* ***Dilê min tijî kul û keser bûn.****"* Diljan

Dilê (yekî) ... tirsîn
Ji bo îhtimala tiştên neyînî fikar kirin. *****Dilê min ji vê rêwitiya te ditirse****, çimkî ew rê gelekî pîs e.*

Dilê (yekî) tune bûn
Nepejirandin. Qayîl nebûn. **Ji ber ku* ***dilê keça wî tune bû****, Zeydan jî keça xwe neda wî.*

Dilê (yekî) vala bûn
Ji tu kesî hez nekirin. **Çima ku Delîl carekê gotiye* ***dilê min vala ye****. Sûsan ji pey qûna wî naqete.*

Dilê (yekî) vebûn
1. Bêhnfireh bûn. **2.** Îkna bûn. Qanih bûn. **Bi wan gotinên te yên xweş hinekî* ***dilê min vebû****. ****Dilê Mistekorê venebû****, heya ku keçika xwe bi çavê xwe nedît.*

Dilê (yekî) vekirîn
Dilê yê ku xeyîdî ye yan jî dilşikestî ye teskîn kirin. **"Di wê xirecirê de Heyder jî* ***dilê jinikê vekirî****."* Feqî Huseyn Sağnıç

Dilê (yekî) xera bûn
1. Kelogirî bûn. **2.** Ji duristiyê dûr ketin. **3.** Dil li ser çûn. Dil xeriqîn. **Bi wî dîmenê kalê Dîgorê* ***dilê min xera bû****. *Me ji Zerê ew yek hêvî nedikir, lê xuya ye ku dilê wê jî xera bûye. *Ji ber hemlebûnê bû çi bû nizanim lê hema* ***dilê wê xera dibû*** *û direviya destşoyê.*

Dilê (yekî) xof girtin

Tirsîn. **Carekê **dilê wê xof girtibû**, heya em ji wir derketin, dilê wê di destê wê de bû.*

Dilê xwe bi xwe şewitandin

Gunehê xwe bi xwe anîn. **"Qet **dilê xwe bi xwe neşewitîne**. Kîjan rojê be tu yê wê lambeya xwe bidî çêkirin."* Torî

Dilê xwe gerandin

Li gorî daxwaza dilê xwe tevgerîn. **Tu jî zêde nebîne, bi salan e ku tiştek bi dilê xwe nekiriye, ew jî dixwaze hinekî **dilê xwe bigerîne**.*

Dilê xwe ji dinyayê sar kirin

Ji pêşerojê, ji erêniyên dinyayê tiştek baş hêvî nekirin. **Cemîla bêaqil dest ji emelê xwe berdaye, **dilê xwe ji dinyayê sar kiriye**.*

Dilê xwe kirin

Xeyîdîn, dil şikestin. **Bi rastî min dilê xwe jê kiribû, lê ew bi xwe hate mala min û dilê min vekirî.*

Dilê xwe mor kirin

Dilînî û têkiliyên germ nexwestin. **Min ji te re negot wî **dilê xwe mor kiriye**. Ne ji kesî hez dike, ne jî dixwaze kes ji wî hez bike.*

Dilê xwe pê êşandin

1. Pê xemgîn bûn. Aciz bûn. **2.** Guneh bi yekî hatin. **Îdris **dilê xwe bi wê dîmenê êşand**. *Em çiqas bibêjin jî bavê wî ye, bivê nevê ew ê **dilê xwe pê biêşîne**.*

Dilê xwe pê germ kirin

Pê bawer bûn. **Ku te **dilê xwe ew qas pê germ nekira**, dibe ku tu îro neketibûyayî vê rewşê.*

Dilê xwe ronî kirin

Moral baş bûn, biaram bûn. **Tu heta **dilê xwe ronî nekî** silamet nabî.*

Dilê xwe safî kirin

Rehet û biaram bûn. ** Piştî rizgarbûna ji wê nexwaşiyê. Kazo, **dilê xwe safi kir** û gihişt aramiyê.*

Dilê xwe pê şad kirin

bnr. Hewesa xwe pê derbas kirin

Dilê xwe rehet kirin

Ji ber pêkanîna armanc û niyetekê rehet û serfiraz bûn. **"Bi qasî du saetan di nava govendê de **min dilê xwe rihet kir**."* R. Karakaya

Dilê xwe teng kirin

Ji tiştekî aciz bûn. **Mêrik, **dilê xwe teng neke**, zarok hemû wisa bikêşe ne.*

Dilê xwe vala kirin
bnr: Dilê xwe rehet kirin

Dilê xwe vekirin
Derdê dilê xwe ji yekî re gotin. **Ez dîsa ji te re dibêjim, heta tu **dilê xwe venekî** ez jî nikarim ji te re alîkariyê bikim.*

Dilê xwe xapandin
Bi rasteqînî hewl nedan xwe. **Erê ew bi xwe **dilê xwe dixapîne**, lê tu yê ji rastiyê re çi bibêjî?*

Dilê xwe xera kirin
1. Ji bo pêkanîna karekî niyet kirin. **2.** Xemgîn bûn. **3.** Bi niyeteke nebaş tevgerîn. **Wî **dilê xwe xera kiriye**, dixwaze bi karekî din re mijûl bibe. *Wexta ku nameya keça wê dixwendin, Cemîleyê **dilê xwe xera dikir**. *Wî **dilê xwe xera kiribû** ku dest biavêje keçikê, lê keçikê berî wî xwe avêtibû derve.*

Dilê xwe xweş kirin
Ji xwe re hêvî çêkirin, erênî û xweşbînî fikirîn. Xwe xapandin. **"Va ye ez vê riyê rast dizanim û rast dibînim. Şêr van karan hêç hêç nizane weselam" got û **dilê xwe xweş kir**."*
Feqî Huseyn Sağnıç

Dilê (yekî) xwendin
Rewşa yekî fêm kirin. **"Carinan awirên min û Rêzanê diçin ser hev, em nav **dilê hev dixwînin**."* Suzan Samancı

Dilê (yekî) xwestin
Daxwaz kirin. **Ez jî dizanim ew yek di nav gel de baş nayê dîtin, lê çawa bikim, **dilê min dixwaze**.*

Dilê (yekî) xweş kirin
Bi gotin an jî bi kirinên xweş û erênî morelê yekî geş kirin. **" ... tu bi Xwedê bikî Nizar, bes a dilê xwe veşêre û bes **dilê min xweş bike** ..."* Kerîm Cemîl

Dilê yekî kete kevirekî heft salan bi xwe re gerand.
bnr: Dilê şivan kete pişkulê (kermekî), hûr kir şîr û xwar

Dilferah bûn
Biaram û dilgeş bûn. **Mirov ku **dilferah be**, pirsgirêkan baştir çareser dike.*

Dilgemar bûn
bnr: Dilxayîn bûn

Dilgenî bûn
bnr: Dilxayîn bûn

Dilgiran bûn

Hêrs bûn, xeyîdîn, xemgîn bûn. *"*Nesîmeyê di ser dayîna her du qîzên xwe û zewaca kurên birayê xwe re, ji wan **dilgiran bibû**, lê di netîceyê de dîsa jî hêviya xwe bi wan ve girê dabû."* Enver Karahan

Dilgiranî kirin
bnr. Dilgermî kirin

Dilhênik bûn
Ji ber pêşveçûnên erênî, ji rewşa berê ya neyînî rizgar bûn. *"*Bavê wî jî her du çavên kurê xwe maç dikirin, **dilhênik dibû**."* Fûad Temo

Dilikî bûn
Evîndar bûn. **Úso li ser keça Silokundo **dilikî bûye**, şev û roj ji wan kuçeyan naqete.*

Dilînî bûn
Ji dil pê ve girêdayî bûn. Aşiq bûn. **Bi rastî jî heke ku tu **dilîni bûyî** çi pêwîst e wê pêk bîne.*

Dilkevir bûn
Pir qecer û xwînsar bûn. **Ma tu nizanî ew yekî **dilkevir e**, tu ji çi re çûyî ber derê wî?*

Dilkurmî bûn
Xayîn, tirsonek û sextekar bûn. *"*Sadûn Beg beşişî. – Mirovê delal, ez dilqewîn im, lê kesên xwe dikine rêzan û serkêş ji me re **dilkurmî ne**."* Medenî Ferho

Dilminî dayîn ber dilê (yekî)
Dilê yekî hênik kirin. *"*Têr digiriya paşê dihat kêleka mêrê xwe rûdinişt, **dilminî didane ber dilê wî**."* Xelîl Mûradov

Dilmînî pê dan
bnr. Dilminî dayîn ber dilê (yekî)

Dilnermî kirin
Xaşokî kirin. **Ku jina min **dilnermî nekirana**, min ew hilnedida mala xwe.*

Dilnexwaz bûn
Ji bo kesên niyet nebaş tê gotin. **Ma tu nizanî ku ew çiqas **dilnexwaz in**? Ma divê te li hal wan her tişt bigota?*

Dilnizim bûn
Nefspiçûk bûn. Xwe zêde nehesibandin. **Ez wî baş nas dikim, mirovekî **dilnizm e** û tu caran peyvên wer nabêje.*

Dilnizmî kirin
Zêdehî û merîfetên xwe nexuyandin. Bi xwe gerah bûn. **Mirovên wekî Merdan ku **dilnizmiyê dikin**, zor tên dîtin.*

Dilo bixwaze te, boq (toq) te pîvaz

Zêde vebijark (alternatîf) tune bûn. **Ma çi yê wan zêde û cuda hebû? Loma jî ji lawê xwe yê nexweş re got:* ***"Dilo bixwaze te, boq (toq) te pîvaz?"***

Dilopek xwîn jê neçûn

Qet xem nexwarin. **Ew qas tişt hatin serê wan, lê Seracedîn qet talaş nekir, mêrikî* ***dilopek xwîn jî jê neçû****.*

Dilpaqij bûn

Di dil de tiştekî xerab tunebûn. **Felemez xortekî pir* ***dilpaqij e****.*

Dilpola bûn

Pir bicesaret û wêrek bûn. **"Lê cengawerê me yên din? Bi sedan, bi hezaran egîtên* ***dilpola ne*** *..."* Veysel Çamlıbel

Dilqewîn bûn

Xwînsar, dilbihêz bûn. **"Sadûn Beg beşişî. – Mirovê delal, ez* ***dilqewîn im****, lê kesên ku xwe dikine rêzan û serkêş ji me re dilkurmî ne."* Medenî Ferho

Dilqûnek bûn

Rojê yek hez kirin. **Ew lawikekî* ***dilqûnek e*** *ku bi vî awayî here, wê bi hemû keçikan re hilkeve, dakeve, lê zewacê jî Xwedê dizane.*

Dilreşî kirin

Bi niyetek neyînî hewl dan. **Ji her wan* ***dilreşî kirin****, em li wir bi ser neketin.*

Dilsaf bûn

bnr. Dilpaqij bûn

Dilsarî ketin navberê

Ji hev û din şikestin, xeyidîn, tingijîn. **Ev çend sal in ku* ***dilsarî ketiye navbera wan****, tu kesî jî dest neavêtiyê ku çareser bike.*

Dilseg bûn

bnr. Dilqûnek bûn

Dilsirtî kirin

bnr. Sirtixî kirin

Dilsivikî kirin

1. Giran û cidî nebûn. **2.** Bêar û bêheya bûn. **Wî jî wisa* ***dilsivikî dikir*** *ku tu kes jê venedikişiya. *Wê hingî* ***dilsivikî dikirin*** *em hemû aciz dibûn.*

Dilşewitiya (yekî) bûn

Omida yekî bûn. Zêdetir ji bo jinên ku bi rastî jî ji bo mirov li ber xwe dikevin û ji dil girêdayî ne tê gotin. **Di vê dinyayê de* ***dilşewitiya min her keça min e****.*

Dilşikestî bûn

Ji kesekî xeyidîn, dil mayîn. *"-*Ez perîşan bûm, xizan bûm, bêçare bûm, min* ***dilê xwe yê şikestî*** *li kolanan digerand..."* Jan Dost

Dilşûşeyî bûn

Nazik, nazenîn bûn. **Ew miroveki pir* ***dilşûşeyî ye****. Bi wî re debarkirin zor e.*

Diltenik bûn

bnr: Dilzîz bûn

Diltenikî kirin

bnr: Dilnermî kirin

Dilteng bûn

Aciz bûn, dil tengijîn. **Piştî ku Zînê ew gotinên ne xweş ji Hozan bihûstin pir* ***dilteng bû****.*

Diltengî kirin

Ji kesekî yan jî tiştekî aciz bûn. **"Hey malxerab, ma mirov qet ji wî zarokî jî* ***diltengîyê dike?***

Dilwurya bûn (Dilê (yekî) wurya bûn)

1. Çav bel bûn. Bitedbîr bûn. **2.** Niyet nebaş bûn. **Ew keçikeke wisa* ***dilwurya ye*** *ku şeytên kiras dike.* **Êdî* ***dilê wî wurya ye****, ez zêde jê bawer nakim.*

Dilxavî kirin

Îhmal kirin. Guh nedan. **Heke partiyê di serê serî de ji bo kêşeya ziman* ***dilxavî nekira****, bawer im ku îro rewşa me li hemberî hemû dinyayê dê cuda bûya.*

Dilxayîn bûn

Di hundir de niyetên xerab sêwirîn. **Ew kesên dilgemar di heman demê de* ***dilxayîn bûn****.*

Dilxweşî dayîn (yekî)

Li ber dilê yekî gerîn. Bi gotinên xweş dil hênik kirin. **"... silava wan jî gihande wan û ênnayî û* ***dilxweşî jî dan wan*** *..."* Mele Mehmûdê Beyazîdî

Dilzîz bûn

Pir zirav û pejinkar bûn. **"Berçem li aliyekî kêfxweş û dilşad bû, li aliyekî jî xemgîn û* ***dilzîz bû****."* Adnan Alp

Dimilî, bi darê ve şindilî, ji bo nanê gilgilî.

Dimilî (Zaza) ji nanê gilgilî gelekî hez dikin. **Ma min gotiye:* ***"Dimilî, bi darê ve şindilî, ji bo nanê gilgilî."***

Dimirim, dibiecim, ceh dibê ez birinc im.

Divê her kes hedê xwe bizanibe. **Kuro tu li wî binêre, ew jî dibêje ez zimanzan im.* ***Dimirim, dibiecim, ceh dibê ez birinc im.***

Dimisê yekî rijiya, got: "Bila xêra bav û diya min be."

Ji bo kesên ku dixwazin xêr an jî qenciyê bi malê kêrnehatî bikin tê bikaranîn. **Tu ji*

dizanî ji tiştekî re kêr nayê loma wer dibêjî. Wekî meseleya ku dibêjin; ***dimisê yekî rijiya, got: "Bila xêra bav û diya min be."***

Dimso pariyê min jî tê de.

Ji bo xwe xapandina tiştên bi destneketî û dijwar tê bikaranîn. **Çawa bike, ew jî dibêje:* ***"Dimso pariyê min jî tê de."***

Dinê ava, em tev nava

Heke dinya bi tevayî di nav rewşeke baş de nebe, tu kes nikare tê de bi rehetî bijî. Bi gotinek din, jiyana kesan girêdayî ya civakê ye. **Mirov, jîndarekî/ê civakî ye. Loma jî gotine:* ***"Dinê ava, em tev nava."***

Dinê bi dinê re, Mendo bi qûna dinê ve

Ji bo tiştên berevajî û bi nakokî tê gotin. **Min ji vê rewşa te ya ecêb û sosret fêm nekir.* ***Dinê bi dinê re, Mendo bi qûna dinê ve.***

Dinê bibe tûtik, keriyek para te nakeve.

Ji bo kesên bêşans û bênesîb tê gotin. **Rebeno, tu qet xwe tev nede,* ***dinê bibe tûtik, keriyek para te nakeve****.*

Dinê di dinê de, Mendo di jinê de (Dinê li dinê, mendo li jinê)

bnr. Dinê bi dinê re, Mendo bi qûna dinê ve

Dinê di ser serê (yekî) de tep bûn

Pir xemgîn bûn, moral xera bûn. **Hema min çawa ku ew nûçe bihîst, te digot* ***dinê di ser serê min de tep bû****.*

Dinê di ser sêrî de tep kirin

Xistin rewşeke pir xerab û perîşan. **Çima ku Ehmed Kaya got: "Ez dixwazim bi kurdî bistirêm û klîban çêbikim,* ***dinê di ser serê wî de tep kir****.*

Dinê dixe hêkekê, hêkê jî li dîwêr dixe.

Ji bo kesên merd û destvekirî tê gotin. **Welehî Mehmûd mêrekî bi sed mêrî ye;* ***dinê dixe hêkekê, hêkê jî li dîwêr dixe****.*

Dinê ka be, devê kerê min pê nabe.

Ji bo bêşansî û bênesîbiyê tê gotin. **Ez çi mirovekî bêrozgar im ya Rebî?* ***Dinê ka be, devê kerê min pê nabe.***

Dinê kirin fisildûman

Teşqele û xilaport derxistin. **Jixwe edeta wî ye, dema ku mirov xetayeke wî bibêje,* ***dinê dike fisildûman*** *ku kes zêde bi ser de neçe.*

Dinê li dinê, çavê gur li bizinê

Her kes û her tişt wekî pêwendiyên xwe tevdigere. ***Dinê li dinê, çavê gur li bizinê.*** *Hêvî guman û çalakiya her kesî bi xwezayî li gorî rewş û hewcedariyên wan e.*

Dinê li dor serî çûn û hatin (Dinê li ser serî çûn û hatin)
Serî gêj bûn. **Ji nişkê ve **dinê li dor serê min çû û hat** û çavên min reşe ve hatin.*

Dinê xera kirin
1. Gelekî hêrs bûn. **2.** Inyad kirin. **Cemûl ku bilûst Duran wisa kiriye, **dinê xera kir**. *Nizanim sedem çi ye, lê Xeyrî **dinê xera kir** û ew zevî neda Cimoyê Bedekeçelê.*

Dinê xistin gola gû
Hawir bi xerabî û xeraban tijî bûn. **Bi rastî jî van televîzyonan lap **dinê xistine gola gû**.*

Dinênediyan dinê dît, rabûn savar çêkirin gotin: "Cejn e!"
Kesên ku haya wan ji rê û rêbazên civakê nîn bin, carinan dikevin nav rewşeke eletewş. **Ew jî dibe. **Dinênediyan dinê dît, rabûn savar çêkirin gotin: "Cejn e."***

Dinya alem derketin sêra (yekî)
Karekî neyînî û balkêş kirin. Rezîl bûn an jî rezîltayî derxistin. **Sed car heyf ku me ev bûk anî. Serê carekê **dinya alem derdikeve sêra me**.*

Dinya ava be, em jî di nav de.
Ji ber ku mirov jîndarên civakî ne, têkûzbûn an jî nebûna civakê asta wan nîşan dide. **"Go, hêrsa te radibe, nebê (tu) divêyî "dinya xirav be." Bê: **"Binya ava be, em jî nav de.."*** Celîlê Celîl

Dinya berdan, bi axretê girtin.
Kar û barên xwe berdan, tenê bi nimêj taet û dabaşên olî re mijûl bûn. **Temam tu mislîman î, lê belê **dinya berdan û bi axretê girtin** jî ne tu aqil e.*

Dinya bi ser (yekî) de hatin
Ketina nav rewşeke xerab. ****"Dinya bûbû gilokeke agir û bi ser wê de dihat**. Xwe li ku veşartibûya ji agir xelas nedibû. Bi şûn de zivirî û bi aliyê gund ve reviya."* Abidin Parıltı

Dinya bi ser guhekî xwe re avêtin
bnr. Dinya li ser alîkî qûnê gerîn

Dinya bûn yek
Tev de heman tişt gotin. Eynî helwest nîşan dan. **Dinya bû yek, dîsa jî Fazîleyê ji gotina xwe vagêr nebû.*

Dinya dewran e, pişîk pelewan e, navê dîkan danîne Evdirehman e.
Li gorî dem û derfetan rewş û nirx tên guherandin. **Ez çawa bikim? **Dinya dewran e, pişîk pelewan e, navê dîkan danîne Evdirehman e.***

Dinya din nehatin bîrê
Ji bo egerên olî (dinya din) tu tişt nekirin. Tenê ji bo berjewendiyên xwe tevgerîn. **Belê tenê ji bo dinya din xebitîn ne baş e, lê **dinya din qet nehatin bîrê jî ne baş e**.*

Dinyadîtî bûn
Zana û bitaqî bûn. **"Apê min, mirovekî **dinyadîtî ye**."* Zana Farqînî

Dinya heram kirin
Bi nêzîkbûneke tund hawirdor zêde aciz kirin. **Vî kurê hêbavan jî* ***dinya heram kir****.*

Dinya ker bûn
Bêdengî û hizûr pêk hatin. **"Ez, piştî ku* ***dinya ker dibe****, hîna bi pirtûkan re bi tenê dimînim."* Zana Farqînî

Dinya kirin dara dojê
Bi karên xerab re têkildar bûn. **Divê jiyan ew qas ne zor be, lê mixabin vî bavê min* ***dinya kiriye dara dojê****.*

Dinya lê tarî bûn
Ketin rewşeke pir zor. **Bi wî dîmenî re* ***dinya li min tarî bû****.*

Dinya lê teng bûn
Di nav rewşeke xerab û bixeter de bûn. **"****Dinya li min teng bû****, ode li dora serê min geriya, dengê Sabiro bilind dibû."* Helîm Yûsiv

Dinya lewitandin
bnr. Dinya heram kirin

Dinya li ber çavên (yekî) reş bûn
1. Ji jiyanê sar bûn. **2.** Di hêla tenduristiyê de ji nişka ve serî gêj bûn. **Piştî bûyera wê jinikê* ***dinya li ber çavên min reş bû****. *"****Dinya li ber çavên Çeto reş bû*** *û li ser serê wî hilweşiya."* Mehmed Uzun

Dinya li ber çavên (yekî) tarî bûn
Serî gêj bûn. **Hew min dît ku* ***dinya li ber çavên min tarî bû*** *û ez ketim.*

Dinya li ser alîkî (aliyekî) qûna (yekî) gerîn
Ji bo kesên xemsar ku tu tiştî ji xwe re naxin derd tê gotin. **Maşelalı ka ew mirovekî çawan e; tu dibêjî* ***dinya li ser alîkî qûna wî digere****.*

Dinya li ser guhekî bûn
bnr. Dinya li ser alîkî qûna (yekî) gerîn

Dinya li ser pelikeka guh bûn
bnr. Dinya li ser alîkî qûna (yekî) gerîn

Dinya li ser serî bûn tara bêjingê
Xwedî kul, derd û kovan bûn. **Ew belengazê lawê min jî* ***dinya li ser serî bûye, tara bêjingê****.*

Dinya li dor serê (yekî) gerîn
Serî gêj bûn. **Hema di nava nexweşxaneyê de* ***dinya li dor serê min geriya****.*

Dinya li ser serê (yekî) gerîn

Xwe şaş kirin. Ketina rewşeke dijwar. *"*Tu îro dilbikul î ...te feleka xwe şaş kiriye... **Dinya li ser serê te digere;** çavên te tu deran nabîne."* Dr. Cuwan Batû

Dinya ma ji du pîran re, wan jî li hev par nekir.
Ji bo çikusî, xerabî û kesên bi teşqele tê bikaranîn. **Jixwe gelek caran pîr dibin asteng. Çawa dibêjin, **dinya ma ji du pîran re, wan jî li hev par nekir**.*

Dinyanedîtî bûn
Ji bo kesên şerd û şirûdê dinyayê dizanin û bitecrube ne tê bikaranîn. **Qet tu meraqan neke Fazil mirovekî **dinyadîtî ye**, zû bi zû nakeve nav helwesteke xirab.*

Dinya nedîto, gava dîto, bi xwe de rîto
Kesên nedîtek, dema ku hebûnê dibînin, dikevin nav helwestên eletewş. ***Dinya nedîto, gava dîto, bi xwe de rîto.** Yên wisa nedîtek ku dibînin jî tiştên wer ecêb dikin.*

Dinya tep bûn
Tiştekî pir balkêş û girîng pêk hatin. *Keçê *çima tu rabûsanekê bidî min, dê **dinya tep bibe**?*

Dinya tep kirin
bnr. Erd û ezman hejandin

Dinya tev bişewite, gurzek gîhayê wî naşewite.
bnr. Agir bi erdê keve, gurzek pûşê wî naşewite

Dinya xwe qedandin
Mirin. ***Pişti wî emrî **dinya xwe qedandin** jî bi dest nakeve.*

Diqedîne, loma diqewirîne.
Erk di destê kê de be ew gotina dawî dibêje. ***Diqedîne, loma diqewirîne.** Hêz di destê wî de ye, dilê wî çawa bixwaze wisa dike.*

Diranbeş, hundirreş bûn
Ji bo kesên durû tê gotin. **Tu nizanî ew çi xinzîrek e, ew mirovekî **diranbeş, hundirreş e**.*

Diran di dêv de neman
Gelekî kal an jî pîr bûn. **Na lo! Ji kalbûnê jî derbas bûye, **diran di dêv de nemane**.*

Diran di gewriyê de bûn
Ji bo kesên kîndar û xinis tê bikaranîn. **A rastî ez qet bi wî hawer nabim, çimkî bi dîtina min ew mirovekî **diran di gewriyê de ye**.*

Diran di serî de çûn
bnr. Zor gihîştin

Diran jê re cix kirin
bnr. Diran jê re sûtin

Diran jê re sûtin

Li hember kesekî hestên neyarî sêwirandin. **Eyşanê **diranên xwe ji Nalînê re disû**, ka hela em ê bibînin dê çawa bibe.*

Diran li hev ketin

bnr. Diranan şeqeşeq kirin

Diran li (yekî) qirqiçandin

Gef xwarin. Niyeteke ne baş di dilê xwe de sêwirandin. **"Di demên wiha de, di bin çavan de **diran li min diqirçandin**, lê belê zêde feyde nedikir..."* Felat Dilgeş

Diran nîlandan

bnr. Diran qirqiçandin

Diran pê de çûn

bnr. Zor gihîştin

Diransêreg û porjûjî bûn

Ji bo kesên pirzana û ecêb tê gotin. **Zavayê Hacê yekî **diransêreg û porjûjî ye**, ka emê bibînin dawî çawa dibe?*

Diranşikestî bûn

1. Debara xwe nekirin. **2.** Xwarin zêde nexwarin. **Rebena Zozanê bûkeke **diranşikestî ye**, ka wê di dest dê xesûya xwe ya cezû de çawa debara xwe bike. *Rebenê Dilo jixwe yekî **diranşikestî ye**, niha li wir jî lap birçî dimîne.*

Diran tê de çikîn

bnr. Zor gihîştin

Dirantûj bûn

Jîr, jêhatî û pêkhatî bûn. **Guhara Leylo jineke **dirantûj e**, ku neyê hesabê wê, kes nikare bi zorê tiştekî bi wê bide kirin.*

Diranên (yekî) di enîşkê de bûn

Armanc û mebesta xwe bi zelalî nexuyandin. *****Diranên Xusrev di enîşkê de ne**, mirov gelek caran tênagihîje ku gelo li pey çi armancê ye.*

Diranên (yekî) di pelûrê de şikestin

Bêşans û bêrozgar bûn. **Ev şansê ku li para min ketiye, ez pelûrê bixwim dê **diranên min di pelûrê de bişikin**.*

Diranên (yekî) hev xwarin

Pir bitatêl bûn. **Berî ku bûkê bibîne **diranê wî hev dixwarin**.*

Diranên (yekî) şeqeşeq kirin

Serma kirin. **Di riya wan gundan de **diranên wî şeqeşeq dikirin**.*

Diranên xwe çirikandin

Ji bo xirabî gihandin kesekî, di nav hewldaneke bikîn û buxz de bûn. *"*Wan **diranên xwe diçirikandin**, lê gef li kê dixwarin, bi xwe jî nizanibûn ..."* Eliyê Ebdilrehman

Diranê xwe guvaştin

Li ber xwe dan. **Ez bikaribim sê salan jî wekî îro **diranên xwe biguvêşim**, înşelah ez ê derkevim firaqetiyê.*

Diranên xwe nîşan dan

Dijmintiya xwe nîşan dan. **Berê rasteqîniya xwe nîşan neda, lê ku lingê xwe baş ediland, **diranê xwe nîşan dan**.*

Diranên xwe şikandin

1. Ji bo tiştên piçûk helwestên tund nîşan dan. **2.** Çikûs û temahkarî kirin. **Haylo lo! Ew jinek wisan e ku ji bo parastina mêrê xwe **diranên xwe dişikîne**. **Cewzo ji bo çar qurişan **diranên xwe dişikîne**.*

Diranên xwe ji (yekî) tûj kirin

Ji bo heyf û tolê li firsendê gerîn. **Zilfo gelekî **diranên xwe ji Wardekê re tûj dike**, Xwedê axiriyê xêr bike.*

Diranê xwe veşêre, se li hestiyan digere.

Xeterî zef zêde bûne, li ser xwe serwaxt be. **Weleh em ketine serdemeke wisa ku, **diranê xwe veşêrin, se li hestiyan digerin.***

Diranên (yekî) kişandin

Nerm kirin. Bandor qels kirin. **Berê kesî nikaribû ji Kazo xeber bida, lê jinikê **diranên wî kişandine** û ew ji nû ve kedî kiriye.*

Dirêjê dar peritand, kinikê xwe xeniqand.

Yên bejndirêj xwe digihînin tiştên bilind, ên kin jî ji wan dexesiyan dikin. ***Dirêjê dar peritand, kinikê xwe xeniqand.** Çi bikim, ma ew jî sûcê min e?*

Dirêjiya malê deh gav, çi bikim mala bênan û bêav.

Xuyang û teşe zêde ne girîng e, ya girîng naverok e. ***Dirêjiya malê deh gav, çi bikim mala bênan û bêav.** Mirovên nezan û hindest tim xuyangê girîng digirin, lê ya rast girîngî ya naverokê ye.*

Dirêse lê nikare hember hev yek bike. (Dirêse lê nikare bide hemberî hev.)

Hê tam kamil nebûn. Baş pêk neanîn. **Erê, Xwedê bihêle, lawê Maçan jî dirêse, **dirêse lê nikare bide hemberî hev**.*

Dirik ji bo virik

Gotin û axaftinên vala ji bo tiştên vala ne. **Wê çi bibêjin, hema **dirik ji bo virik**.*

Dirika xwe bi destê (yekî) din derxistin

Karê xwe yên zor û qilêr bi hinekên din dan kirin. **Wî bi xwe ew gû xwariye, îcar dixwaze **dirika xwe jî bi destê me derxe?***

Dirûv bi hev ketin

Şibandin hev. **Dirûvê wan wisa bi hev dikeve, ku çawa bibînî, dibêjî ew xwîşkên hev in.*

Dirûv lê ketin

Şibandin. **"Qet **dirûvê dizan lê nakeve**."* Zana Farqînî

Dirûvê xwe lê xistin

Wekî xwe yan jî daxwaza xwe teşe dan, guherandin. **Serokê wan ê nû, di demeke kurt de **dirûvê xwe li wê rêxistinê xist**.*

Diryayî bûn

Ji bo kesên bitecrube, bêşerm, pêkhatî û çalak tê gotin. **Tu qet nekeve tatêla wî ew mirovek **diryayî ye**, tiştek nayê serê wî.*

Divê ez bibêjim, kew e û nikil jî sor e?

Ma divê her tişt yek bi yek bê gotin? **Lawo, ma ew tiştên ku min gotin hindik in? **Divê ez bibêjim, kew e û nikil jî sor e?***

Dixe tendûrê, di kulfikê re îfad(ey)ê digire.

Ji bo zilm û tadeyê tê bikaranîn. **Xesûya wê zilmkarek e, wê bûka belengaz **dixe tendûrê, di kulfikê re îfadê digire**.*

Dixwaze kil bike, lê kor dike.

Ji bo tiştek baş hewl dan, lê hê xerabtir kirin. **Xeyalên wê pir xweş bûn; **dixwest kil bike, lê kor kir**.*

Dixwazin tu tiran bikî, ew jî pê bi te bikenin.

Divê tu nebî pêşkeniyê xelkê. **Ma tu gêj î, tênagihêjî? Ew **dixwazin tu tiran bikî, ew jî pê bi te bikenin**.*

Dixwe gebola zerî, diçe devê derî.

Yên ku zêde têr dixwin, carinan bitrî dibin. **Her kes bi xwe nikare, Hêlîn **dixwe gebola zerî, diçe devê derî**.*

Dixwe nanê me, li ber derê xelkê direye.

bnr. Nanê Îso dixwe, selawetê li Mûso tîne.

Dixwim nan û avê, min mineta kesî navê.

Di nav rewşeke xweş de nebim jî, qet nebe nakevim bin mineta tu kesî jî. **A girîng ew e ku bila mirov nekeve bin mineta tu kesî. Çawa gotine? **Dixwim nan û avê, min mineta kesî navê.***

Dixwim nan û avê nakişînim mineta dê û bavê.

bnr. Dixwim nan û avê, min mineta kesî navê.

Diya kuran, ket axuran

Ji ber ku di mal de bandora jinan zêde ye, rûmeta lêzimên mêran kêm e. **Diya kuran, ket axuran. **Di mal de jî jin bibandor e.***

Diya (yekî) lawo lawo kirin

Ji ber lêdanê, kesek birîndar kirin an jî kuştin. *"*Kî bi çavekî ne xweş lê binêre, ez dê bikim ku **diya wî lawo lawo bike**."* Zana Farqînî

Diya min jî dikare, li Mek(cy)ê sofîtiyê bike.

Ew kar karekî pir hêsan e. **Tu wê berde ezbenî, **diya min jî dikare li Mekê sofitiyê bike**, tu qala karê taxê bike.*

Diya qîzan, pirûda dîzan, dîz çêkirin, xelkê birin.

Dê û bav çiqas zehmetên wan bikişînin jî qîz malê xelkê ne. **Ne dê û bav pirûd in, ne jî keç cêr in lê wer dibêjin: **"Diya qîzan, pirûda dîzan, dîz çêkirin, xelkê birin."***

Diya sêwiyan kulê bixwe.

Dayîkên bi zarok tim eziyetê dikişînin. **Te bi çavên xwe jî dîtin ne wisa? **Diya sêwiyan kulê bixwe.***

Diya (yekî) ji bo Xwedê nanekî germ dan

Ji bo xêrdayîna hewcedaran, ji belayekê rizgarbûnê re tê gotin. **Keça min, herhal **diya te ji bo Xwedê nanekî germ dabî**, naxwe niha tu di nav rewşeke xeter de bûyî.* (bnr. çîrok)

"Diya (yekî) ji bo Xwedê nanekî germ dan"

Ji malbatekê tenê keçek û lawek dimînin. Keçik ji birayê xwe mezintir bûye. Keçik çiqasî gihîştî, giran û biaqil bûye, lawik jî ew qas neh, beredayî û dînik bûye. Li nêzîkî wê derê çûkek ji xwe re her sal hêlînekê çêdike. Lê kengê ku çêlikên wê ji hêkan dertên û hindik dimîne ku bi firê bikevin, ew lawik diçe serê wan çêlikên çûkê diqetîne. Salek wisa du sal wisa, wê salê dîsa hindik dem maye ku çêlikên wê ji hêkê derkevin, tatêl di dilê dayîka çûk digire ku ew lawik wê dîsa bê û cûcikên wê bikuje. Di dawiyê de çûka dayîk tewat nade û bi wê kerbê diçe xwe digîhîne şahê maran. Ji şahê maran re ya ku her sal tê serê wê yeko yeko dibêje û jê alîkariyê dixwaze. Şahê maran bi wan gotinên çûka bêhêz pir xemgîn dibe. Ferman dide du heb tîremaran û dibêje:

"Herin wisa bi wî lawikî vedin ku bila jehra we ji serî heya binê lingên wî de here!"

Dayîka çûk, tevî tîremaran tê nik hêlîna xwe. Tîremar dikevin kemînê ku bi lawik vedin. Mar dipên dipên, di dawiyê de mêze dikin ku wa ye lawik hat. Lawik nêzîkî hêlînê dibe destê xwe dirêj dike ku çêlikan derxe, mar jî hewl didin xwe ku pê vedin, lê her du tîremar jî hema di wê demê de ji holê winda dibin û lawik jî wekî her car serê çûkan diqetîne û diçe.

Çûka dayîk bi girîn, bi qîrîn û lorîn, bi lez û bez bi rêwiwitiyeke dijwar û çetin dîsa xwe digihîne şahê maran û ya ku bi serî de hatiye jê re dibêje. Şahê maran ji hêrsan dîn dibe û diqîre:

"Ev yek ne mimkun e, tiştekî pir balkêş di vî karî de heye, naxwe, ji jehra wan her du tîremarên min, ew lawik divê niha di bin axê de bûya!"

Şahê maran vê carê ferman dide ku di dinyayê de çiqas mar hene bên hizûra wî. Hemû marên dinyayê tên hizûra şah, lê tenê ew her du tîremarên ku vatiniya pêvedana lawik hilgirtine, li holê xuya nabin. Di demekê bi şûn de ew her du tîremar jî di nav xwîn û xwedanê de xwe digihînin hizûra şah. Şah bi hêrs ji wan dipirse û dibêje:

"Min çi vatinî dabû we? Ev çi halê we ye?" Tîremar dibêjin:

"Ya şahê me! Çawa ku we ferman da em çûn ketin kemînê û dema ku lawik hat me hewl da ku em pê vedin, lê ji nişkê ve her yek ji me xistin nav nanekî germ, em lê pêçandin û avêtine pist Çiyayê Qaf. Ev çiqas dem e ku em dicedînin, lê me ancax xwe gihande we." Şah ecêbmayî dimîne û ferman dide ku herin rewşa wî lawikî lêbikolin ku ka bê ew kî ye, kiyê wî heye û ev ecêba giran çawa qewimiye. Piştî lêkolînê têdigihîjin ku ew xweha lawik her roj dema ku nanê xwe bi sêlê dipêje, hema kî di wir re derbas bibe, bi taybetî jî xerîb, rêwî û yên biyan, keçik wan bernade û nanek an jî çend nanên germ dide wan û dibêje:

"Bila sedeqa ser serê birayê min î êtîm be." Di dawiyê her kes fêm dike ku ew xêr û sedeqa ku xwîşka lawik daye, bûye sedema rizgarbûna birayê wê. Loma jî ku yek ji qeza yan jî belayekê xelas dibe, dibêjin:

"Helbet diya te ji bo Xwedê nanekî germ dabû."

Ji ber wê jî di nav gelê Kurd de bûye edet ku nanê germ sedeqedayîn pir xêr e. Balkêşiyeke din jî, nan tenê nadin mirovan, her wisa zêdetir jî didin kûçikên der û dor jî.

*Ev biwêj bi awayê *"Di nav nanekî germ de veşartin."* jî tê gotin.

Diya (yekî) lawo lawo kirin

Ketin nav rewşeke pir neyînî. *"*Kî bi çavekî ne xweş lê binêre, ez dê hikim ku **diya wî lawo lawo bike**.*" Zana Farqînî

Diya (yekî) li ser nimêjê bûn

Xêr û dia li hewarê çûn. ****Diya Rêzan li ser nimêjê bû** ku di wê demê de ew di nav wê civakê de nîn bû.*

Diya min ez li ser xênî anîme.

Her tiştê yekî eşkere bûn. ****Diya min ez li ser xênî anîme**, çi hebe eşkere dibêjim.*

Diya zavê lotik davê, diya bûkê kûkekûkê.

Ji ber ku serdest mêr e û mêr na, lê keçik mala xwe terk dike, rewşa diya keçikê jî xemgîntir e. **Divê diya keçikê jî wekî yê lawik serfiraz be, lê mixabin çawa dibêjin:* ***"Diya zavê lotik davê, diya bûkê kûkekûkê."***

Diz got, min xwediyê malê girtiye. (Diz dibêje, min xwediyê malê girtiye.)

Carinan ên neheq, xwe ji yên mafdar zêdetir mafdar nîşan didin. ****Diz got, min xwediyê malê girtiye.** Mixabin ew jî gelek caran tê serê mirov.*

Diz û malxwey bûne yek, ga di bin xêliyê de derxistin.

Ku xerabiyê ji hundir ve dest pê kir, êdî çareserî zor e. ****Diz û malxwey bûne yek, ga di bin xêliyê de derxistin.** Ji ber ku yê di hundir de baştir dinase û loma jî dikare bi hêsantir xera bike.*

Diz û malxwey şirîk bûn

bnr. Diz û malxwey bûne yek, ga di bin xêliyê de derxistin.

Diz(î) xwediyê malê girt, du tir jî jê berdan.

Carinan ên neheq zêdetir bi ser dikevin. ****Diz xwediyê malê girt, du tir jî jê berdan.** Li serê Wehabê belengaz jî eynî wer bûye.*

Dizan ji dizan dizî, erd û esman tev lerizî.

Ji xeraban xerabtir jî hene. **Kuro lawo ew qas jî nabe. Ya we bû gotina;* ***dizan ji dizan dizî, erd û esman tev lerizî**.*

Dizan ji dizan dizî, erd û esman lê pirsî.

bnr. Dizan ji dizan dizî, erd û esman tev lerizî.

Dizane dawet e, lê nizane (li) mala kê ye.

Ji bo wî tenê def û dawet girîng e. **Jixwe ew xwediyê dawetê nas nake,* ***dizane dawet e, lê nizane li mala kê ye**.*

Dizanim kevir ji ku alî ve li min ket.

Dijminê xwe nas dikim. **Hûn qet meraq nekin ez baş* ***dizanim ev kevir ji ku alî ve li min ket**.*

Dizê da, qawê da, çilmezinê ji çila xwe kêm nekir (neda).
Çavçilî xerabiyeke girîng e. **Dizê da, qawê da, çilmezinê ji çila xwe kêm nekir.* *Di tiştên din de nebe jî lê di hêla nefsê de mirov zelaltir xwe dide dest.*

Dizgîn kutan
Berdewam kirin. **Wan got tû negot, wî her* ***dizgîn kuta****.*

Dizgîn zeft kirin
bm: Dizgînên (yekî) di destên (yekî) de bûn

Dizgînên (yekî) berdan
Serbest hiştin. **Heke bavê Yargulê* ***dizgînên wê berde****, ez dizanim wê çi bike.*

Dizgînên (yekî) di destên (yekî) de bûn
Di bin bandorê de girtin. **Tu qet fikaran meke,* ***dizgînên wî di destên min de ne****.*

Dîkê berbangê bûn
Zû şiyar bûn. **Malavayî tu dibêjî tu* ***dîkê berbangê yî****, hê zûtika sibê qul nabe, ew li ser lingan e.*

Dîlan herikî berbû hetikî.
bm: Dawet firikî berbû hetikî.

Dîn bûn û bi çolan ketin
Pir hêrs bûn. **Dema ku me qala wê meseleyê ji Evdal re kir,* ***dîn bû û bi çolan ket****.*

Dînitiya xelkê hat û bat, a te bi şahad û îspat.
Bêgûman tu dîn î. **Ez êdî çi bibêjim?* ***Dînitiya xelkê hat û bat, ya te bi şahad û îspat.***

Dîreg dayîn ber dilê xwe
Ji bo sakînbûn û sebrê moralê xwe xurt kirin. **Ew cira min xweş e ku di demên xeter de ez bi xwe* ***dîreg didim ber dilê xwe****.*

Dîrega dilê (yekî) şikestin
Ji ber derdekî giran pir xemgîn û pozîde bûn. **Çi hatiye serê wê nizanim, lê mirov çawa ku lê dinêre, fêm dike ku* ***dîrega dilê wê şikestiye****.*

Dîrega (yekî) hebûn
Ji bo berxwedanê hêz hebûn. **Li min bibore, ez nikarim ji te re alîkariyê bikim. Heke* ***dîrega te heye****, tu berdewam bike.*

Dîsa ew tas e, ew hemam e.
Dîsa eynî tişt e. **Gelek pesnê pêşveçûna rewşa Hako dan, lê bi rastî ji bilî çend tiştên piçûk hema* ***dîsa eynî tas û eynî hemam e.***

Dîsa girara me, ji "qet" a wan çêtir e.
Yek tişt tenê hebe, ew jî ji qet tunebûnê baştir e. **Piçûk be jî me tiştek pêk anî ye.* ***Dîsa girara me ji "qet" a wan çêtir e.***

Dît, xwedî me, nedît rêwî me.
bnr: Dît ez im, nedît diz im.

Dît ez im, nedît diz im.
Li gorî rewşê xwe amade kirin. **Kifş e ku li me kiriye mesele,* ***dît ez im, nedît diz im.***

Dîtiya dît, nedîtiya (bi) xwe de rît.
bnr: **Dinya nedîto, gava dîto, bi xwe de rîto**

Dîwar hilweşiya, toz hilkişiya.
bnr: Dîwar tep bû, xubar rabû.

Dîwar tep bû, xubar rabû.
Ji ber hincetekê teşqele û xirecir derxistin. **Hema bi wê bûyerê re* ***dîwar tep bû, xubar rabû*** *û her tişt tevlihev bû.*

Dîwaro ji te re dibêjim, bûkê tu fêm bike.
bnr: Deriyo ji te re dibêjim, piştderiyo tu guh bidiyê.

Dîwaro ji te re dibêjim, bûkê li te eyan be.
bnr: Deriyo ji te re dibêjim, piştderiyo tu guh bidiyê.

Dîwaro min ji te re got, piştdiwaro tu guhê xwe bidiyê.
bnr: Deriyo ji te re dibêjim, piştderiyo tu guh bidiyê.

Dîwaro, eyb û qusûr staro
Dîwarek an jî perdeyek gelek eyb û qusûran vedişêre. *****Dîwaro, eyb û qusûr staro.*** *Bi dîtina min mala bêperde wekî mirovekî başewal e.*

Dîz ji beroşê re dibêje: "Bi wê de here rûteniyê!"
Ji bo kesên eslê xwe înkar dikin tê bikaranîn. **Ma tu ji min çêtir î, tu ji min re wer dibêjî?* ***Dîz ji beroşê re dibêje: "Bi wê de here rûteniyê!"***

Dîzê got: "Binê min zêr e." Hesikê got: "Lê ez ji ku têm?"
bnr: Dîzikê got: "Zikê min spî ye." Heskê got: "Ez hê jê derketim."

Dîzê got: "Ez zêrîn im." Hesikê got: "Ez va me li nav te."
bnr: Dîzikê got: "Zikê min spî ye."; Heskê got: "Ez hê jê derketim."

Dîzik avêtin nav lingên (yekî)
Jê re astengî derxistin. **Ew jî dizane rewş çawa ye, loma* ***dîzikê diavêje nav lingên wî.***

Dîzik li ber lingan şikandin
bnr: Dîzik avêtin nav lingên (yekî)

Dîzika binqul bûn
Ji bo kesên bêtedbîr û destbelaş tê gotin. **Malavayo! Tu wekî* ***dîzika binqul î****, hema çi dikeve destê te di nava du rojan de tune dibe.*

Dîzika denya bûn

Xwedî derd û kul bûn. **Tu mîna **dîzika denya yî**, ji bo şikestinê hatiyî vê dinyayê.*

Dîzika kelijî(n) bûn

Derd û kul li pêş çavan bûn. **Hûn jî dibînin ku va ye wekî **dîzika kelijî ye**, tim li pêş min wekî siyê digere.*

Dîzikê got: "Ez tijî zêr im." Heskê got: "Min tu hemû seh kirî."

bnr. Dîzikê got: "Zikê min spî ye."; Heskê got: "Ez hê jê derketim."

Dîzikê got: "Zikê min spî ye."; Heskê got: "Ez hê jê derketim."

Dawiya derewan pûç e. **Însaf însaf ! Tu çi dibêjî kuro? **"Dîzikê got: "Zikê min spî ye."; Heskê got: "Ez hê jê derketim"***

Dizo dizo, dizekî bi însafo

Ji bo xerabî û neyîniyan jî dadek, ûsil û radeyek heye yan jî divê hebe. **Got, **dizo dizo, dizekî bi însafo.** Tu yê ji sextekariya ku ji bo çêkirina diranê diya min kiriye re çi bibêjî?*

Do ji hêkê derketiye, îro bi mirîşkê qayîl nabe.

Ji bo kesên eslê xwe winda dikin tê gotin. **Ew jî girêdayî perwerde û ferasetê ye. **Do ji hêkê derketiye, îro bi mirîşkê qayîl nabe.***

Doçika (boçika) deşê ye, ne kin dibe, ne dirêj dibe.

Ji bo tiştên pêşve naçin û di cihê xwe de dimînin tê gotin. **Rewşa dikana vî kurxalê min bûye **boçika deşê, ne kin dibe, ne dirêj dibe**.*

Dolaba (yekî) rast gerîn

Şans û bextê yekî baş lê hatin. **Şikir vê gavê **dolaba lawê min rast digere**.*

Dolaba xwe rast gerandin

Debara xwe baş kirin.**Bila hema **dolaba xwe rast bigerîne**, bes e.*

Domayî lê anîn

Bi encam kirin. **Piştî şazdeh salan bi şûn de **domayî li doza min a ramyarî hat**.*

Don li çirê ke û lê sêr ke.

Bila ronahî bibe ku tu bibînî ka çi dibe. **Ez çi bibêjim? **Don li çirê ke û lê sêr ke.***

Donê di eyarê segan de bûn

Ji bo tiştên bi xwe baş û xweş in lê di nav hawireke ne layiqî xwe de ne tê bikaranîn. **Heyfa wê keçikê, **donê di eyarê segan de ye**.*

Donê dilê (yekî) helîn

Dil rehet bûn, armanc miyaser bûn. **Bi wê dîplomeyê **donê dilê Zelêxê heliya**.*

Donê gur bi qûna gur dan

bnr. Donê (yekî) li sêrî dan

Donê (yekî) li serî dan

Bi derfetên yekî qencî lê kirin. **Min got dibe ku ew ji min re tiştekî baş bike, lê mixabin wî jî tenê* ***donê min li serê min da****.*

Dono don dixwe, sondo di ber de sond dixwe.

Hinek dikin, hinek jî dikevin belaya wan. **Serê wî qijikê Xwedê serê xêrnediyan e,* ***dono don dixwe, sondo di ber de sond dixwe****.*

Dor bi dor e, ne bi zor e.

Her karek azîne û ûsuleke wê heye. **Hûn lûn bûne bi zorê pêk bînin, lê hin caran jî* ***dor bi dor e, ne bi zor e****.*

Dor jê stendin

1. Firsend ji dêst girtin. Bi pêş ketin. **Ev çend sal in ku ew dibû keya, lê îsal Simko* ***dor ji wî stend****. *Berê gerîla serdest bûn, lê di vê dawiyê de leşkeran* ***dor ji wan stendiye****.*

Dor lê birîn

bnr. Dor lê girtin

Dor lê girtin

Di rewşeke dijwar de hiştin. **Dijminan* ***dor li şervanên azadiyê girtibûn****.*

Dor û berê xwe nas kirin

Di derka rewşa dinê de bûn. **"Sal hatin û derbas bûn. Evdo êdî heft salî bû, dor* ***û berê xwe nas dikirin****, pakî û xirahî ji hev cuda dikirin."* Tîtal Mûradov

Dora deriyê xwe paqij kir, ma yê xelkê.

Tu li çareya serê xwe binihêre, em ne hewceyî alîkariya te ne. *****Dora deriyê xwe paqij kir, ma yê xelkê.*** *Bi xwe nikare karê xwe yê bingehîn bike, qala alîkariya hinekên din dike.*

Dora devê xwe paqij kirin

Xwe bi awayekî bêsûc û paqij nîşan dan. **Dilgeş wisa* ***dora devê xwe paqij dike****, lê ez dizanim bê ew çi quzilqurt e.*

Dora devê xwe alastin

Tameke zêde hilgirtin. **Dema ku Rizgo ji hundir derket,* ***dora devê xwe hê jî dialast****.*

Dora qûna xwe paqij nekirin

Pir pejmûrde, qilêr û bêsîstem bûn. **Mala te xera nebe, hema qet nebe ma mirov* ***dora qûna xwe jî paqij nake*** *kuro?*

Doralî lê pêçandin

1. Bi hêla leşkerî ve dor lê hatin birîn. **2.** Tiştek li dora tiştekî gerandin. **Bi fermana serleşker leşker* ***doralî li gundiyan hatin pêçandin****. *Keçikê* ***doralî li destmalê bi moriyan pêçand****.*

Dorpêç kirin

bnr. Dor lê girtin

Dor sênc kirin
bnr. Dor lê girtin

Dost nade, djmin jî nayê.
Rewşa xeter e. Ji bo têkiliyên bazirganî û alîkariyê tê bikaranîn. **Dost nade, dijmin jî nayê.* *Jixwe dijmin têkildar nabe, lê heke dost û lêzim jî tiştekî nekin wê çawa be halê me?*

Dost û dijmin nas kirin
Rasteqînî dîtin. **Êdî keça min jî mezin bû û* ***dost û dijminê xwe nas dike****.*

Dostê bav û kalan bûn
Dostê kevin û qewîm bûn. **Em her dem bi wê malbatê bawer bûn, çimkî ew* ***dostên me yên bav û kalan in****.*

Dostê min, dijminê postê min
Ji bo wan kesan tê gotin ku weke dost tên binavkirin, lê xayîn û qeleş in. **Hay lo lo! Haylo lo! Çi dost, çi dost?* ***Dostê min, dijminê postê min!***

Dostê qûnê dijminê serî bûn
Tenê li hewcedariya xwe ya zayendî (cinsî) fikirîn. **Erê vê gavê li wê xwedî derdikeve lê Xwedê dizane ne dost e, tenê* ***dostê qûnê, dijminê serî ye****.*

Dostê roja reş bûn
Ji bo dostên rasteqîn û sadiq tê gotin. **Ya Xwedatî, Zîrek* ***dostê me yê roja teng e****.*

Dostê roja teng bûn
bnr. Dostê roja reş bûn

Dostê rojên giran bûn
bnr. Dostê roja reş bûn

Dostê rojên xirab bûn
bnr. Dostê roja reş bûn

Dostê te dost be, dijminê te kor be.
**Lawo înşelah dostê te dost be, dijminê te kor be.* (dia)

Dotmamê ji pismaman fedî kir, dunda[*] li pey xwe nedît.
Fedîkariya zêde û tund di dawiyê de ziyanê dide mirov. **Ji xwe re biaqil be keçika min, ji bîr neke,* ***dotmamê ji pismaman fedî kir, dunda li pey xwe nedît****.*

Doxînsist bûn
Di hêla zayendî de bi xwe nikaribûn. **Mehemed mêrekî baş e. Bê heyf! Di hêla jinan de hinekî* ***doxînsist e****.*

---

[*] **Dunda:** Zarok (piskurî)

Doxîna xwe vekirin
Têkiliya zayendî pêk anîn. **Ez bawer im, heya roja dawetê ew keçik* ***doxîna xwe venake****.*

Doxînqewîm bûn
Di hêla namûsê de pir bibawer bûn. **Bi gelek gilî û êtxiyan li pey ketine, lê ez baş nas dikim, Zahîde keçeke* ***doxînqewîm e****.*

Doz ajotin
Ji bo kesên di derbara maf û ramanên xwe de têdikoşin tê bikaranîn. **Li gorî temen û radeya rewşê raman û* ***doz ajotin*** *jî tê guherandin.*

Doza kevçiyê arizî kirin
Ji bo derna ku bûk û zavayên teze, dixwazin ji malê cihê bibin tê gotin. **Jixwe bav û diya wî jî dizanibû ku ew* ***doza kevçiyê arizî dike****.*

Doza sala hingê kirin
Doza tiştekî pir kevn û bêwate kirin. **Evdileyê Gêjik jî teze rabûye* ***doza sala hingê dike****.*

Du ava wan di cawekê de neçûn
bnr. Av di coyekê de neçûn

Du bav li cihekî çal nebûn
Tim bi jiyana koçberî jiyîn. **Bi taybetî Kurdên Sovyeta berê tim ev gotin digotin:* ***"Du bavên me li cihekî çal nebûn."*** *Mixabin, ew hem li ser axa welat najîn, hem jî gelek koçber bûne.*

Ducanî bûn
Hemîle bûn. Avis bûn. **Bûka mala Eliyê Betê* ***ducanî bûye****.*

Dudilî bûn
Di navbera du vebijarkan de bê biryar man. **Mistê* ***dudilî bûbû.*** *Ne dikarî bi paş de vegere û ne jî bi ser riya xwe de bimeşe.*

Dudevkî xeber dan
Durûtî kirin. **Tu wisa li giliyên wê yên xweş menêre, ew jinik* ***dudevkî xeber dide****.*

Du gotinên (yekî) hev û din negirtin
Ji bo kesên derewîn tê bikaranîn. **Ka kî ji wî bawer dike? Her kes dizane ku* ***du gotinên wî hev û din nagirin****.*

Du kevir ku li hev kevin, ew li wir namîne.
Ji bo kesên tirsonek tê bikaranîn. **Tu wisa li guregura wî menêre,* ***du kevir ku li hev kevin, ew li wir namîne****.*

Du kevir li ser hev danîn (Du kevir danîn ser hev)
Ji xwe re mal an jî sitarek çêkirin. Tam nebe jî bingehek ava kirin. **Lawo hema te ji xwe re* ***du kevir bidana ser hev*** *û serê zarokên xwe bikira binî, ji wê bi şûn de Xwedê kerîm bû.*

Du lingên (yekî) kirin fereke solê

Ji ber ecelekirinê yek asteng kirin. **Keçika min çi ye te* ***du lingên min kirin fereke solê****, welehî ez dê ji te re bistînim, cana min.*

Du mişk ji qulekê derketin, yekî ji yê din re got: "Tu ji ku derê (tê)yî?"

Ji bo yê ku esil û esasê xwe winda dikin tê gotin. **Got,* ***du mişk ji qulekê derketin, yekî ji yê din re got: "Tu ji ku derê (tê)yî?"*** *Lawo ne em tev ji zikekî derketine, tu çi xwe dinepixînî?*

Du tevirên (yekî) li cihekî neketin

Ji bo kesên derewîn û sextekar tê bikaranîn. **Ma min dê çawa pê bawer bikira? Tu jî dizanî ku* ***du tevirên wî li cihekî nakevin****.*

Dubare li ser çêkirin

bnr. Dubêrî kirin

Dubendîtî derxistin (kirin)

Fesadî kirin. Di navberê de cudatî danîn. **Heta wî li gund* ***dubendîtî dernexist****, dilê wî rehet nebû.*

Dubêrî kirin

Bi azîneyeke teknîkî, stratejiyeke xapînok pêk anîn. (Xwe ji hêlekê nîşan ve dan, lê ji hêla din ve kar qedandin.) **Wî wekî guran wisa li serê me* ***dubêrî kir*** *ku em bêguman li holê man.*

Duh ji hêkê derketiye, îro bi mirîşkê qayîl nabe.

Ji bo yên esil û esasê xwe winda dikin tê gotin. **Kuro ew çi zû bû kundir û çi zû şax veda?* ***Duh ji hêkê derketiye, îro li mirîşkê qayîl nabe.***

Duh li ku, îro li ku?

Di demeke kurt de guherînên mezin bûn. **De şikiriya xwe bînin,* ***ka duh li ku, îro li ku****?*

Duh yek îro dudu

Di hêla demê de gelek zeman derbas nebûn. **Ma bû çi tu aciz bûyî jî hê* ***duh yek îro dudu****.*

Durû bûn (Durûtî kirin)

Li cem her kesî wekî rewşa wan helwest nîşan dan. **Ji ber ku lawê apê min* ***durûtiyan dike****, em gelek caran dikevin tengasiyê.*

Durû û duziman bûn

bnr. Durû bûn

Duserîtî çêbûn

Dubendî û nakokî çêbûn. **Heke* ***duserîtî çênebûya*** *em jî niha derketibûn radeya gelên dinyayê.*

Dû di kulekê de bilind nebûn (hilnekişîn)

bnr. Dûyê (yekî) bilind nebûn

Dû ji serî quloz bûn

bnr. Dûman ji nava serî çûn

Dû ji rojinê bihurîn
bnr: Hasil ji Mûsil derbas bûn

Dû bi ser kuleka mala (yekî) ketin
Ji xewê rabûn. Hişyar bûn **Mala bavê bûkê neşewite, ro tê nîvro, dû re* ***dû bi ser kuleka mala wê dikeve.***

Dûman jê rakirin
bnr: Dûman lê xistin

Dûman ji nava serî çûn (Dû bi ser serî ketin)
bnr: Dûman ji nava serî hilkişîn

Dûman ji serî çûn
bnr: Dûman ji nava serî hilkişîn

Dûman ji (nav) serê (yekî) hilkişîn
Pir hêrs bûn. **"Ez xortekî sivik ê hê çardeh salî bûm. Ji efendiyê xwe re bêjim, min hê nû dil girtiye. Bengî me,* ***dûman ji nav serê min hildikişe.***" Rojen Barnas

Dûman pê xistin
Têk birin. Perîşan kirin. **Jixwe mafdar bû, lê dîsa jî wisa kir ku* ***dûman bi wan xist.***

Dûman pê ketin
Di nav rewşeke zor de bûn. **Bi gotinên Zelîxanê* ***dûman bi wî lawikî ket.***

Dûmayî (dûmahîk) lê anîn
Bi dawî kirin, encimandin. **Wan di dawiyê de* ***dûmahîk li dewlemendiyê jî anîn.***

Dûmega (yekî) kin bûn
Temen kin bûn, dawî zû hatin. **Karê wan baş dest pê kir û her roj pêş ve diçû, lê çawa kirin nizanim,* ***dûmega wan kin bû.***

Dûpişk tu zivistanê ne diyarî? Got: "Pa ne, havînê min gelek rû li ba hewe heye?"
Ji bo gazin ü xeydê tê gotin. *Qerfên xwe bi mekin lo, ka çı rûmeta min li ba we heye?* ***Dûpişk tu zivistanê ne diyarî? Got: "Pa ne, havînê min gelek rû li ba (he) we heye?"***

Dûr e, kûr e û nayê gotin.
Pirsgirêk zehf mezin û giring e. **Na lo! Wî zêde nedin xeberdanê, meseleya wî* ***dûr e, kûr e û nayê gotin.*** (qerf)

Dûr gerîn nêzîk dîtin
Ji ya hêvîkirî bi hêsantir pêk hatin. **Baş e, ez* ***dûr digerîm, min nêzîk dît.***

Dûr û dirêj bûn
Ji bo karên demdirêj û girîng tê gotin. **Ew karekî* ***dûr û dirêj e****. Lewma jê re sebr û pisporî divê.*

Dûrdest bûn
Bêderfet bûn. **Bavê wê* ***ne dûrdest bûya****, ew wisa nedihate perçiqandin.*

Dûrî aqilan bûn
Bêmantiq û bêîmkan bûn. **Ya ku Seydo dibêje,* ***dûrî aqilan e****.*

Dûrî aqilan, nêzîkî rehma Xwedê bûn
Ji bo tiştên bêderfet û bêîmkan tê bikaranîn. **Ya ku tu dibêjî* ***dûrî aqilan e, lê nêzîkî rehma Xwedê ye****.*

Dûrî çavan, dûrî dilan
Yên ku dûr in, zêde nakevin bîra mirov. ****Dûrî çavan, dûrî dilan.*** *Ku ez jî hinekî nêzîk bûma, wer nedibû.*

Dûro bi nûro
bnr. Dûro bigul û nûro

Dûro, bigul û nûro
Dema ku yek dûr be, şirîntir dibe. ****Dûro, bigul û nûro.*** *Hela zêdetir jî exrebeyên nêzîk, ku çiqasî dûrî hev bin, ew qas çêtir e.*

Dûvê (yekî) di destê (yekî) de bûn
Di bin bandora yekî de bûn. **Ew nikare tiştekî bibêje, ji ber ku* ***dûvê wî di destê Robar de ye****.*

Dûvê xwe kirin qemçî
Revîn, baz dan. **Her du dizan dema ku dengê xwediyê malê bihîstin* ***dûvê xwe kirin qemçî****.* (argo)

Dûvê kûçik heft salan kirine qalibê zêr, derxistine dîsa dûvê kûçik.
Esil û esasê mirov çi be, ew e. ****Dûvê kûçik heft salan kirine qalibê zêr, derxistine dîsa dûvê kûçik.*** *Ew xwe têxe dilqê çi dîsa ew e.*

Dûvê mişk biarvan nebûn
Ji bo mala feqîran ku bêeşya, rût û repal e tê gotin. **Malwêranî, çawa ku wêran bûye, di mala wî de* ***dûvê mişk biarvan nabe****.*

Dûvê xwe di pir tepikan de qurçandin
Gelek bûyer di serî re derbas bûn. **Wî di wê jiyana xwe ya têr û tijî de* ***dûvê xwe di pir tepikan de qurçand****.*

Dûvê xwe gerandin
Qelew bûn. Kok bûn. **Maşelah Nigarê* ***dûvê xwe gerandiye****, lê nizane ku wê sibê di hêla tenduristiyê de bibe belaya serê wê.*

Dûyê (yekî) bilind nebûn
1. Bêzuriyet bûn. **2.** Xizan bûn. **3.** Bi ser neketin, encam negirtin. **Çû ser gelek doxtoran, sê heb jî jin anîn, lê mixabin,* ***dûyê wî bilind nebû****. *Ka çiyê wan heye ku li* ***dûyê wan bilind bibe****? *"...û* ***dûyê wî jî zêde bilind nebû.*** *Wê jî binê guliyên xwe xwerand û xwe xiste qilinc û di ciyê xwe de sekinî."* Musa Vazgali

E

Ebasan dibêjin, Xwedê me bê par bike ji îmanê, lê bê par neke ji qapanê.
Hin kes quretî û forsê ji xwe re wekî feraset, hêjahî û meziyet dibînin. **Ebasan dibêjin, Xwedê me bê par bike ji îmanê, lê bê par neke ji qapanê.* *Zahirê me jî di riya wan de dimeşe.*

Ebûra xwe kirin
Ji kisê hin kesên din xwarin. **"Mêrik pere nade, titûnê nakire, li ser qutiyên her kesî **ebûra xwe dike**."* Zana Farqînî

Ecêba giran bi çavê xwe dîtin
Bûn şahidê tiştên pir balkêş. **"Diçî tînî, here bîne, heke tu neçî neyînî, tê **ecêba giran bi çavê xwe bibînî**."* Celîlê Celîl, Ordîxanê Celîl

Ecêba giran bûn (Ecêba reş a giran bûn)
Ji bûyer an jî rewşa pir baldar û awarte re tê gotin. **Ez çûm li dewsa bûyerê çi bibînim, **ecêheke reş a giran bû**.*

Ecêba li ser ecêban bûn
Xerabtira xeraban, xerabtirîn. **Ya ku Xelo kir jî **ecêba li ser ecêban e**.*

Ecêva (ecêba) min ser ecêvê, keç dibin, dê lingê xwe dike rikêfê.
Dayîkên keçan di dema zewaca wan de gelekî dikevin xiroşê. **Ew jî tiştekî balkêş e, **ecêva min ser ecêvê, keç dibin, dê lingê xwe dike rikêfê**.*

Eferim kero
Ji bo kesên di nav helwest û gotinên neyînî de tê gotin. ****Eferim kero!** *Jixwe ji wî divê gotinên wer şelişî bên hêvîkirin.* (argo)

Efsûn (afsûn) kirin
1. Bi niviştan parastin û li hemberî xirabiyan bi hêz kirin. **2.** Xapandin. **Digotin Evdile **efsûnkirî ye**, gule lê nakevin, lê bû xwerê guleyeke Mîrzeyê Gelxwar.* **Xesûya Mahacir ew wisa **efsûn kiribû** ku ji dê û bavê xwe re bûbû dijmin.*

Efterê Xwedê bûn

bnr. Belengazê Xwedê bûn

Egela ji te re

Maşelah (eferim) ji te re. Tu çawa wisa dikî? Eyb e ji te re! *"***Egela ji te re** *Îbo, ma Serwêr mêrê şermxistinê bû, te ew pirsên çors jê re gotin?"* Adar Jiyan

Eger (ku) ez bûm keç, ez dizanim ka ezê çend gilêya biavêjim doxîna xwe.

Ez ê namûsa xwe baş biparêzim. **Yên ku di wî temenê piçûk de dibêjin:* ***"Eger ku ez bûm keç, ez dizanim ka ez ê çend gilêyan biavêjim doxîna xwe."*** *Ya rastî ez zêdetir ji wan ditirsim.*

Eger bi te xweş e, ji min re bîst û şeş e.

Heke ji te re ne girîng be, ji min re qet ne girîng e. **Min got, em destê xwe bidin hev, naxwe* ***eger bi te xweş e, ji min re bîst û şeş e****.*

Eger hewes e (be), ew jî bes e.

Heke tenê ji bo demborînekê be, ev qas jî bes e. **Bibore, lê bi vê kedê nabe. Naxwe,* ***eger hewes e, ew jî bes e****.*

Eger ji te re xweş e, ji min re ji erdê re dikişe.

bnr. Eger bi te xweş e, ji min re bîst û şeş e.

Eger ne fend e, ev çi (dar û) bend e.

Palpişt (delîl) û nîşan di holê de bûn lê rasteqîn mandele (înkar) kirin. ***Eger ne fend e, ev çi bend e?** Ma tu ji van halpiştan re çi dibêjî?*

Ehed kirin

bnr. Ad û aşît di xwe de anîn

Ehlê taet û îbadetê bûn

Ji kesên ku zêde nimêj û îbadetê dikin re tê gotin. **"Di kitêbên tebeqatan de dibêjin ku zehf* ***ehlê taet û îbadetê bûye****."* Müfit Yüksel

Ehmedo tûyan dixwe, Mehmedo çoyan dixwe.

Hinek mirov jiyaneke xweş, hinek jî jiyaneke xerab dijîn. **Ezbenî, ji karê vê dinê fêhmkirin ne hêsan e.* ***Ehmedo tûyan dixwe, Mehmedo çoyan dixwe.***

Ekla[1] (yekî) buhirîn

bnr. Ekla (yekî) derbas bûn

Ekla (yekî) derbas bûn

Gotinê bandor kirin. Rûmet girtin. **Ji bo wî karî hûn Apê Şewqî bişînin;* ***ekla wî li wê malbatê derbas dibe****. Yeka wî nakin dudu.*

---

[1] **Ekl:** Bandor, erk

El û ep dane hev

Ji bo kesên bêkêr tê bikaranîn. *Maşelah Huso ***el û ep dane hev***, dest bi wî karî kiriye.*

Elb û eyar şîr

Ji bo têkûzbûnê tê bikaranîn. *"***Elb û eyar şîrê** *xwe hilgirt û çû."*

Eleqeya xwe jê qut kirin

Têkiliya xwe bi dawî kirin. **Ev sê sal in ku lawê min* ***eleqeya xwe ji wê keçikê qut kiriye.***

Elewat kirin

bnr. Yek rêx kirin

Elhodan, elhodan, van şêx û mela(yan), mala me dan.

Ji bo çavçiliya şêx û melayan tê bikaranîn. ***Elhodan, elhodan, van şêx û mela, mala me dan**, çokê me xwe ser ve koçê reş li hev. Dewlemendê gundê me yê herî mezin melayê me ye, lê maşelah çavên wî qet têr nabin.*

Elk ketin nav dilê (yekî)

İnşelah* ***elk têkeve dilê wê* *ku ew bizanibe derdê kezebê çi ye.* (nifir)

Elo dibirin sêdarê, xatûnê jê kil û kildan dixwest.

Ji bo kesên ku girîngiya rewşê fêm nakin tê gotin. **Ji bêfemiyê re derman tune.* ***Elo dibirin sêdarê, xatûnê jê kil û kildan dixwest.***

Elo ji Belo re dibê(je): "Min çavê te yê kor haha kiro."

Yên ku rewşa wan nêzîkî hev in, zêdetir ji hev du re pirsgirêkan derdixin. **Ma zehf ji wî pêşdetir e?* ***Elo ji Belo re dibê: "Min çavê te yê kor haha kiro."***

Em çûn Avamesya[1], dêlika belek bi me hesiya, kula me yek bû, bû sisiya (sisê).

Me karê xwe hê xerabtir kir. ***Em çûn Avamesya, dêlika belek bi me hesiya, kula me yek bû, bû sisiya.** Me got em ji xwe re karekî bikin, me negot em derdekî li serê xwe vekin.*

Em çûn mala Fatê, Fatê çû civatê.

Em li pey wê ne, ew jî li pey hinekên din e. ***Em çûn mala Fatê, Fatê çû civatê.** Em rûmetê didin wê, lê ew tênagihîje.*

Em dixwin nanê sêlekê, ew dixwe yê êlekê.

1. Pir çilek bûn. **2.** Ji bo kesên pir gerok tê gotin. **Mala wî neşewitiyo ew naşibe mirovan,* ***em dixwin nanê sêlekê, ew dixwe yê êlekê***. **Deverên ku wî dîtine nayên hejmar,* ***em dixwin nanê sêlekê, ew dixwe yê êlekê***.

Em dizanin tu lawê kê yî.

Em te baş nas dikin. **Ne pêwîst e, tu tiştekî bibêjî,* ***em dizanin tu lawê kê yî***.

Em lawê îro

A girîng îro ye. **Ya ku borî ye berdin,* ***em lawê îro***.

---

[1] **Avamesya**: Gundekî girêdayî Agiriyê ye.

Em ne ji malekê ne, lê bi halekî ne.
Ji halê hev fehm kirin. **Helbet ez têdigihîjim. Belê,* ***em ne ji malekê ne, lê li halekî ne.***

Em negihîştin we, ma ku hûn bigihîjin me.
Em wekî we nabin, dibe ku hûn wekî me bibin. **Welehî ezbenî, em ne wekî we ne,* ***em negihîştin we, ma ku hûn bigihîjin me.***

Em û Xwedayê xwe, ew û şîrê xwe
Em bêdadiyê nakin, lê ew jî bext û wîjdana wî çawa be, dê wisa be. **Her tişt maye pêvajoya demê,* ***em û Xwedayê xwe, ew û şîrê xwe.***

Eman gotin
Lavayî kirin. Alîkarî xwestin. **Wan ji dest dagirkeran* ***eman gotin****, lê dîsa jî feyde nekir.*

Eman nedan (yekî)
Firsend nedan. Di zor û zerpê de hiştin. **Wan jî dixwestin tiştinan bikin, lê Huso û hevalên xwe* ***eman nedan wan.***

Emana (yekî) birin
Pir aciz kirin. **Ji bo ku em bi gotina wî bikin, wî lawê min* ***emana me bir.***

Emana (yekî) çûn
Ji ber pirsgirêkekê zivêr bûn. **Ji dest wî neviyê min î tolaz* ***emana me çû.***

Emana (yekî) di destê (yekî) de nebûn
Ji dest kesekî aciz bûn. **Ez ê çawa bikim,* ***emana min di dest vî xwarziyê min de nabe.***

Emana mirov birin
bnr. Eman nedan

Emanet, tarî qiyamet (Emanet, heya qiyamet)
Emanet nirxekî pir birûmet û pîroz e. **Keça min, emanet barekî giran e. Mezinan çi gotine:* ***"Emanet, tarî qiyamet."***

Emegê (yekî) hîç kirin
Ked û zehmeta ku hatiye dayîn, bi tiştekî nehesibandin. **Wê keçika şîrheram ew* ***emegê min tev hêç kir.***

Emegê (yekî) li çavên (yekî) girtin
Kedxenîm bûn. **Heke hûn wan kirinên me neşikirînin,* ***emegê me dê çavên we bigire.***

Emegsîkan[*] bûn
Ked û zehmet bi tiştekî nehesibandin, rûmeta nirxan nezanîn û bêminet bûn. *****Emegsîkan bûn****, taybetiyek pir xerab e.* (argo)

---

[*] **Emegsîkan:** Nankor

Emegdaro, li ber dîwaro

Yên ku ked û avê didin, gelek caran dikevin rewşeke xerabtir. **Emegdaro, li ber dîwaro.* *Ev sazûmana qapîtalîzmê were ye, ne rûmeta kedê lê ya sermayeyê giranbiha ye.*

Emelê serê (yekî) bûn

Ji bo kesekî bûn sedema astengiyê. **We ev bêhavê Remo ji ku anî û kir* ***emelê serê min****?*

Emelên pîrê nayên bîrê.

Mirov naxwazin kirinên xwe yên berê yên neyînî bi bîr bîne. **Tu wisa niha sofîtî û terîqetparêziya pîrê menêre,* ***emelên pîrê nayên bîrê****.*

Emenî[1] birî, ta firî.

Berjewendî qediyan, soz û rûmet jî nema. **Êdî heya vir,* ***emenî birî, ta firî****.*

Em ê bikin, heya ro bisekine.

Gelekî xebitîn, heya dawiyê çûn. **Kî çi dibêje bila bibêje,* ***em ê bikin heya ku ro bisekine****.*

Em ê hû (bi)kin, mû (bi)kin, serê siman bi gû (bi)kin.

Ew ê bi van paşgotiniyan di dawiyê de bibin sedemê xirabiyên mezin. **Hûn bi ya min bikin em dev ji van gotinan berdin.* ***Em ê hû kin, mû kin, serê siman bi gû kin.***

Emrê (yekî) di ber de qurçimîn

Ji bo mirina ciwanan tê gotin. *****Emrê wê belengazê di ber de qurçimî****.*

Emrê (yekî) emrê sîmir bûn

Temen, ango emir dirêj bûn. **Ez ji Xwedê daxwaz dikim ku* ***emrê wê keçikê emrê sîmir be****.*

Emrê (yekî) qut bûn

Daxwaza mirina yekî kirin. **Lawo!* ***Emrê te qut bibe*** *da ku ez ji te xelas bibim.* (nifir)

Emrê bedenên Amedê kirin

Demeke pir dirêj jiyîn. **Kuro, kê got ew zehf ne pîr e? Wê* ***emrê bedenên Amedê kiriye****, lawo.*

Emrê leglegê çû bi leqleqê.

Her kes bi awayekî jiyana xwe derbas dike. **Çawa ku dibêjin,* ***emrê leglegê çû bi leqleqê****, yê Yaqûbê kurxalê min jî çû bi kutekutê.*

Emrê pira Malabadê kirin

bnr. Emrê bedenên Amedê kirin

Emrê (yekî) xwarin

Yek pir aciz kirin. **Vê jinikê* ***emrê min xwar*** *û ez dabarandim.*

Emrê xwe pûç kirin

bnr. Di nava xwe de qicqicîn

[1] **Emenî:** Yemeni

Emrê (yekî) qurçimandin
bnr: Emrê (yekî) xwarin

Emrê xwe qusandin
bnr: Di nava xwe de qicqicîn

Emrê Xwedê bi cih anîn
Mirin. Çûyîn ber rehma Xwedê. *"... *gelek bi ser re derbas nabe, li ber eziyet û îşkenceya zîndanê nade, salek di bendîtiyê de derbas dike û piştre* ***emrê Xwedê bi cih tîne.***" Îbrahim Ehmed

Encam jê derxistin
Di dawiyê de kêrek hildan. **Ez gelekî bi wî karî ketim, lê di dawiyê de min* ***encamek jê derxist.***

Encamek jê girtin
bnr: Encam jê derxistin

Encamek jê hildan
bnr: Encam jê derxistin

Eniya (yekî) qelişîn
Di nav zor û zerpekê de bûn. **Heta min ew azmûn da* ***eniya min qelişî.***

Eniya (yekî) xwê nedan
1. Fedî nekirin. **2.** Newestiyan, ked û zehmet nekişandin. **Çima qet li hemberî wî dîmenî* ***eniya te xwê neda****? *Heke di wî karî de hinekî* ***eniya wî jî xwê bidaya****, wê rûmeta wî bizaniya.*

Enîcot kirin
Mirûzê xwe kirin, pozpirçî bûn. **Xwe wisa* ***enîcot neke****! Bi vê yekê tenê tu yê xisarê bibînî.*

Eniya wê li mêran venebûn
Ji bo keçikên ku bi mêran re tu têkiliyeke wan çênebûye tê gotin. **Ew keçeke wisa hatiye perwerde kirin ku ez bawer im hê* ***eniya wê li mêran venebûye.***

Enî reş e, parî xweş e.
Ji bo kesên bêar tê gotin. **Ji Fazil re çi? Ew mirovekî* ***enî reş e, parî xweş e.***

Enîşka xwe pê nîşan dan
Bi tiştekî nehesibandin. Bêminetî kirin. **Dilo, ew qas sal ked dayê, ew mezin kir û da xwendinê lê wî* ***enîşka xwe pê nîşan da.***

Erd di binî de hejîn
bnr: Erd ji ber piyan hejîn

Erd hişk e, ezman dûr e, xwîn jê nayê.
bnr: Erd hişk e, ezman sayî ye.

Erd hişk e, ezman sayî ye. (Erd hişk, ezman sayî bûn)
Guman, hêvî û derfet hatine birîn. *"-*Hey wax, ava reş bi ser me de hat!* ***Erd hişk e, asîman sayî ye****, hindê bi pêlên ava reş ket."* Mehmet Sanrı

Erd ji ber piyan hejîn
Bihêz û giran bûn. **Maşelah! Dema ku Riza ji wê ve dihat,* ***erd ji ber peyan dihejî****.*

Erd lê teng bûn
Ketin rewşek xerab. **"Ka bêje min, gava* ***erd li min teng bû*** *û dilê min di desterê hêviyan de dibû ardekî vêketî, te çi ji bo min kir?"* Jan Dost

Erd paç (maç) kirin
Şikir kirin. Gihîştin daxwazeke pir girîng. **Merdan sond xwaribû dema ku gihîşt sînorê welatê xwe,* ***erd maç kir****.*

Erd qelişîn û tê de çûn xwarê.
1. Pir fedî kirin. **2.** Ji nişkê ve ji holê winda bûn. *Çaxa ku bi çav wê ketim, min wisa hîs kir ku erd qelişî, ez tê de çûm xwarê. **"Belê çi feyde, em pisîkê nabînin. Tu (bi)bêjî* ***erd qelişiye û pisîka reş tê de çûye xwarê****."* Felat Dilgeş

Erd û ezman anîn xwarê
bnr: Erd û ezman hejandin

Erd û ezman hejandin
1. Her der di bin hêz û zerpa xwe de hiştin. **2.** Pir hêrs bûn. **Dijminan bi top tivingan, bi teyare û bimbeyan* ***erd û ezman hejandin****. *Min ku wekî gotina wî nekira,* ***erd û ezman dihejand****.*

Erd û ezman di ser (yekî) de anîn hev
Xistin rewşeke pir zor. Lê zext û tadeyî kirin. **"Êdî nahêlim tilîka we bi min bibe.* ***Erd û ezman di ser we de tînim hev!****"* Sedat Yurtdaş

Erd û ezman lê hatin hev
Şert û şurid gelekî dijwar bûn. **Di bextê min belengaza Xwedê de* ***erd û esman li min hatin hev****.*

Erd û ezman lê sond xwarin
Li holê winda bûn. Qet lê xuya nekirin. **Mêrikî çawa kir, nizanim lê* ***erd û ezman lê sond xwarin*** *ku qet nehatiye wî welatî.*

Erd û ezman lê bûn yek
bnr: Erd û ezman lê hatin hev

Erd û ezman li ber çavên (yekî) bûn yek
Pir hêrs bûn. **Dema ku rehmetiyê kalikê min hêrs dibû,* ***erd û ezman li ber çavên wî dibûn yek****.*

Erd û ezman bi jor de anîn
bnr: Erd û ezman hejandin

Erd û ezman qelişîn
bnr: Erd û ezman tev hejîn

Erd û ezman qetîn
bnr: Erd û ezman tev hejîn

Erd û ezman tev hejîn
Rewşeke pir dijwar û xeter bûn. **Bi wê zilma wan* ***erd û esman tev hejîn***.

Erd û ezman hejandin
Pir hêrs bûn, bi hêza xwe bandor li hawir kirin. **Qadir ji bo keçika xwe* ***erd û ezman hejandin***.

Erd û ezman bûn yek
1. Her der xera bûn, hurişîn. **2.** Ji ber hêrsê çavên yekî tiştek nedîtin. ** "Ji ber ha û tofanê* ***erd û esman bûn yek***." ** "Hingî hêrs bû, erd û ezman* ***li ber çavên wê bûn yek***." Zana Farqînî

Erdekî hişk û ezmanekî bilind
bnr: Erd hişk e, ezman sayî ye

Erdê jê re çav û birû şikandin
Ji bo kesên nêzîkî mirinê ne, ango zehf nexweş, an jî zehf kal û pîr in tê gotin. **Zerîcan ketiye rewşeke wer ku* ***erd jê re çav û birûyan dişkîne***.

Erdê jî qebûl nekirin
Ji bo kesên gunehkar tê gotin. **Xwedê dizane,* ***erd jî wî qebûl nake****, ew çawa qebûl bike?*

Erdê sitar lê kirin
Ancax bi mirinê xelas bûn. **Li vê dinê debara wî nedibû, hema baş bû ku* ***erdê sitar lê kir***.

Erebeya xwe derxistin (dagerandina) gerê
Ji astengî û dijwariyan rizgar bûn. **Helbet bi wî re nayê xeber dan, çimkî êdî wî* ***erebeya xwe derxistiye gerê***.

Ereban li talan xist, bi xeberan tişt tê nehişt.
Li hemberî neheqiyên mezin, tenê peyivîn. *****Ereban li talan xist, bi xeberan tişt tê nehişt.*** *Mixabin tenê bi axaftinê nabe.*

Erebe çûye daran, hatiye kar e, nehatiye erebe bi xwe dar e.
Pêk bê baş e, lê heke neyê jî ne xem e. Di wê vebijarkê de jî kêrek heye. **Me got bila karê me hê baştir be, naxwe* ***erebe çûye daran, hatiye kar e, nehatiye erebe bi xwe dar e***.

Erebe ku hatiye ber partê, bila bar (bi)ke.
Hê ku firsend heye bila pêk bê û ji dest neçe. **Heyran, yekê bi xwe nekin dudu,* ***erebe ku hatiye ber partê, bila bar ke***.

Erê erê ne, giştjî kurê kerê ne.

bnr. Giştbirêbirêne, giştjî kurêMistefêne.

Erê erê, ez xwîşka heft bira(ya)n bûm, ez şandim ber kerê.

Ji bo bêrûmetbûnê tê gotin. **Qet kifş nabe wê çi bibe.* ***Erê erê, ez xwîşka heft biran bûm, ez şandim ber kerê.***

Erê Gulê, ez ne mele bûm, te ez kirim mele.

Di dawiyê de te wekî gotina xwe kir. **Kê bawer dikir ji vê rojê, lê ya Xwedatî divê ez heqiyê qebûl bikim.* ***Erê Gulê, ez ne mele bûm, te ez kirim mele!*** (bnr. çîrok)

Erê Gulê, ez ne mele bûm, te ez kirim mele

Zemanekî li gundekî mirovek hebû: nikaribû serê xwe û zarokên xwe xwedî bikira. Rojekê jina wî jê re got:
"Mêrik heke tu bi gotina min biki, were em mala xwe bar bikin welateki xerib. Ez mêze dikim ku qezenca meleyan gelek e. Li wir ez û bibejim mêrê min mela ye. Tu ji niviştan çêbike û li tasê binihêre. Em bi wi şikli serê kozi kulfetê xwe xwedî bikin."
Navê jina mêrik Gulê bû. Mêrik got:
"Gulê qet tiştên wisa dibe? Ez çi dizanim ji Quranê, ji niviştan? Ez nikarim wi kari biqedinim." Jinikê bi awayekî vebirî ferman da û got:
"Qet nabe, tu yê bi gotina min biki!..." Mêrik kir û nekir. xwe ji Gulê xelas nekir. Rabûn mala xwe bar kirin û çûne welatekî dûr. Li wir ji xwe re malek kirê kirin û tê de edilîn. Gulê kete nava taxan û ji jinan re got:
"Mêrê min melayekî pir meşhûr e." Li nava bajêr de belav bû ku melayekî pir meşhûr hatiye filan taxê. Di demek kin de wisa navê mela belav bû ku her roj li mala mele ji çûn hatinê cih nema. Piştî demekê bi şûn de halê mele xweş bû, kêfa jina wî geş bû. Dest pê kirin pere ji xwe re dane hev. Di vê navberê de şevekê diz ketin xezineya paşayê wî şehrî û xezineya wî dereve kirin. Paşê gazî wezirê xwe kir û jê re got:
"Heke tu van dizan dernexî ez ê serê te lêxim."
Wezîr por û poşman bi wir de revî, bi wê de revî tu rê neditin. Di nav wê bêçaretiyê de jina wezir fikirî û ji mêrê xwe re got:
"Mêrik dibêjin di taxa han de melayek heye. Her tiştî dizane. Tu bi ya min biki, gazi mele bike, ew ê haleki ji te re bibîne."
Wezîr leşkerê xwe şandin, mele anîn. Wezir jê re got:
"Mele heke te ev diz dervixistin, ez ê deh kîsên zêran bidim te, yan na, ez ê serê te lexim." Mele ji tirsan lerzî û got:
"Wezirê xweş be, de tu çar rojan moletê bide min. Xwedê mezine, helbet ezê tiştekî bikim." Dû re por û poşman vegerî mala xwe. Mele, meseleya xwe û wezîr yek bi yek ji Gulê re got û dû re jî ji tirsan giriya û gotina xwe wiha bi dawî kir:
"Gulê te çi ani serê min? Çar roj man ku wezîr serê min lêxe. Te ev yek ani serê min de îcar were ka tu dikarî min xelas biki?"
Gulê got:
"Xwedê kerim e mêrik, helbet wê li me derîyekî xêrê veke." Mele got:
"Gulê, xelasbûna min tune, ez ê çar rojan bi şûn de bimirim. Ew çar mirîşkên me yên ku hene ji me re rojê yekî şerjêke em bivwin." Ew dizên ku xezineya paşayî dereve kiribûn ji çar kes bûn. Bihîstin ku wezîr ji wî melayê meşhûr re gotiye, dizan bibîne. Diz jî vê yekê zehf tirsiyan. Her çar li hev civîn, ji hevalekî xwe re gotin:
"Kuro îşev here li ser kuleka mele xwe biteline, ka binêre mele çi dike, çi dicirîne." Dizê ku hevalên wî ew şandin, hat ser kuleka mele û guhê xwe da axaftinên wan. Hema di wê hingê de jina mele ji goştê mirîşka yekemîn dabû ser sifrê. Mele li goştê mirîşkê nêrî û got:
"Jinik ji çaran yek çû man sisê." Diz li ser kulekê hema bi tirs darê kir û xwe zor gihande bal hevalên xwe û got:
"Lawo mele bi me hesiyaye. Em nikarin ji destê wî xelas bibin!... Dizane em çar heb in û yê yekemîn çû wir ji ez im." Şeva duduyan dizê duyemîn xwe li ser kulekê teland. Mala mele ji mirîşka duyemîn dixwar. Mele vê carê got:
"Jinik dudu çin man dudu." Dizê duyemîn ji revî çû ji hevalên xwe re got:
"Hevalno, weleh ez ji nas kirim." Diz fikirîn, di dawiyê de biryara xwe dan û gotin:
"Xelasbûna me ji dest vî melayî nine. Her a baş ew e ku em herin teslimî mele bibin. Li ber lavayî bikin ku ji me re ji çareyekê bibîne." Hatin teslîmî mele bûn. Mele jî ew birin teslîmî wezir kirin. Patîşah û wezîr gelek mal, zêr û zeber dan mele. Dû re paşa ji mele re got:
"Meleye delal, êdî tu yê di diwana min de ji min re melatiyê biki." Mele revî hate mal, mizgînî da jina xwe û got:
"Gulê, ez ne mele bûm, te ez kirim mele!.."

*Di guhertoyeke din de jî bi kurtasî wiha tê gotin:

"Erê, Gulê ez ne mele bûm, te ez kirim mele."

Mirovekî xizan hebûye, navê jina wî Gulê bûye. Ji ber ku rewşa wan a aborî ne xweş bûye. Gulê mala xwe bar dike û diçe welatekî din. Bi zorê bi mêrê xwe melatiyê dide pejirandin. Li wî welatî mêrê xwe wekî melayekî meşhûr dide xuyandin.
Piştî demeke dirêj ku mêrê wê ji ber niviştê û diayan jinan dişêline; hinek jê aciz dibin û ji melatiya wî guman dikin. Dixwazin fêl û sextekariya wî derxin. Carekê ku dibihizin mela wê bê malekê, berê diçin gulekê dikin bin kulavê ku mela li ser rûnê. Dema ku mela li ser kulav rûdine, ji helwest û rewşa wan ên li wir aciz dibe. Ji wan dikeve şik û gumanan. Ji ber ku Gula jina wî ew kiriye nava wê tirholkê ji wê hêrs dibe. Diqehire û bi dengekî bilind dibêje:
"Erê, Gulê ez ne mele bûm, te ez kirim mele!"
Yên wir nizanin ku navê jina wî Gulê ye, lewma wer dibêje. Hew dizanin ku wî bi kerameta xwe fêm kiriye ku gul di binê kulav de heye, ji dilnizmiya xwe dibêje:
"Erê, Gulê ez ne mele bûm, te ez kirim mele!" Bi vê gotinê re yên ku gul kirine bin kulavê mele, ecêb dimînin. Xwe diavêjin lingê wî û lêborîna xwe dixwazin da ku li wan nefiran neke. Ji wê rojê bi şûn de mêrê Gulê bi reheti melatiya xwe didomîne...

Erê mal şewitî, lê ji mişkan re jî nema.

Erê min jî ziyan dît, lê di dawiyê de wan ziyana hê mezintir dît. **Rast e, min jî ziyan dît.* ***Erê mal şewitî, lê ji mişkan re jî nema.*** (bnr. çîrok)

Erk di destê (yekî) de bûn

Xwedî bandor bûn. **Tu wê bibînî temam e, ji ber ku* ***erk di destê wê de ye.***

Erûl, bû kefîlê Zerzûl.

Kefîlê wî jî wekî wî ye. **Maşelalı çi bazareke ha! Wa ye* ***Erûl, bûye kefîlê Zerzûl.***

Eslî hû, neslî hû

Esil çi be, mirov wekî wê tevdigere. **Helbet* ***eslî hû, neslî hû****, çimkî di perwerde û gihandina kesayetiyê de malbat pir girîng e.* (bnr. çîrok)

"Erê mal şewitî, lê ji mişkan ra jî nema."

Di malekê de gelek mişk hebûne. Jina malê êdî nikaere ji dest mişkan îdare bike, di dawiyê de serê xwe hildide û ji mêrê xwe re dibêje:
"Ka tu çito mêr î? Va ye mişkan çavên me derxistin. Ji dest mişkan em çîn ahîzarê. Ma tu nikarî ji heqê mişkan jî derkevî?" Mêrik hêrs dibe û ji jna xwe re dibêje:
"Jinik, de tu bisekine ez ê vê carê eseh çareyekê ji wan re bibînim. Ez ê tiştekî wisa bînim serê wan mişkan ku ecêba wisa kesî nediye." Jinik û mêrik bi pey mişkan dikevin. Vir de berdidinê, wê de berdidinê, di dawiyê de mişkekî digirin.
Mêrik pineyekî li mişkê ku girtine mehkem diwalîne, niltê bi ser de dike û agir ber didiyê. Agir bi mişk dikeve. Mişk wekî gogeke êgir di hundirê malê de direve. Ji kerban û ji ber jana êgir xwe li vî alî li wî alî dixe. Çiqasî agir pê dikeve, ew qasî xwe li eşyayên malê dide. Hêdî hêdî eşyayên malê jî agir digirin. Bi vî awayî agir bi malê dikeve. Berê berê agir li her derê zêde dibe. Der û cînar heya tên û heya avê tînin, agir bi her dera malê dikeve û mal dibe xwelî. Jinik destê xwe li çoka xwe dixe û ji mêrê xwe re dibêje:
"Mêrik te çi anî serê me? Di rûyê wan mişkên heram de te mal jî şewitand." Mêrik dibêje:
"Jinik, rast e, mala me şewitî jî lê ji mişkan re jî nema!.."

"Eslî hû, neslî hû"

Rojekê padîşahek ji wezîr û wekîlên xwe re dibêje:
"Kî ku ji min re Hezretî Xizir bîne ez têkilî axreta wî nabim lê ez ê li vê dinê di nav zêr û zîvan de bixeriqînim." Demek derbas bûye, lê kesî newêribûye derkeve pêş. Piştî demekê yekî kal û xizan vê fermanê dibihîze. Difikire ku wa ye dawiya emrê wî hatiye, lê tu rojeke xweş neditiye. Vê bûyerê ji xwe re wekî şansekî dinirxîne û ji jina xwe re dibêje:
"Jinik, wa ye dawiya emrê me hat, lê me rojeke xweş nedît. Ez dibêjim ev yek ji me re firsendek e. Ez ê derkevim hizûra padîşah û ez ê jê re bibêjim, paşayî xweş be tu demekê bide min, ez ê Xizir Elêhiselam ji te re bînim. Çawa hebe padîşah wê demekê bide me, em ê jî di navbera wê demê de bi dilê xwe bijîn. Kengê ku dawiya dema me hat em bikaribin em ê ji holê winda bibin, na ku em nikaribin jî ne xem e, jixwe dawiya emrê me hatiye, hema qet nebe, em jî ji xwe re demeke xweş biborînin." Jinik jî qanix bûye. Kal riya koşka padîşah digire û diçe derdikeve hizûra padîşah. Jê re soza girtina Hezretî Xizir Elêyhîselam dide. Padîşah jî çil rojan dem didiyê û dibêje:
"Heke ku tu di navîna çil rojan de ji min re Hezretî Xizir neyînî, ez ê serê te jê bikim." Kalo qebûl dike û tevî jina xwe çil roj û çil şevî wekî dilê xwe kêf û zewqê dike, di nav dewlemendiyê de dixeriqe. Di roja çilî de jî nikarin birevin. Leşkerên padîşah tên bi çepilên kalo digirin û dibin hizûra padîşah. Lê di wê navberê de yekî bejnbihost jî hema bi dû wan dikeve. Dema ku kalo çav bi padîşah dikeve, xwe diavêje lingên wî û dibêje:
"Padîşahî xweş be, li min bibore, min ji we re derew kir. Ez geleki feqîr bûm min got hema ez di dawiya emrê xwe de çend rojan bas bijîm, li min biborin." Padîşah, zehf hêrs dibe û ji wezîrê xwe yê mezin dipirse:
"Wezîrê min î mezin ka bibêje, em çi cezayî bidin wî?" Wezîrê mezin dibêje:
"Padîşahî xweş be, em wî bi dûvê çil kantiran ve girê bidin, bila bi erdê re bixişiqitînin û wî parçe parçe bikin." Wî bejnbihostê ku bi pey kalo ketibû, dibêje:
"Eslî hû, neslî hû." Padîşah ji wezîrê navîn re dibêje:
"Em çi cezayî bidin vî kalî?" Wezîrê navîn jî dibêje:
"Padîşahî xweş be, em wî wekî keşkekê (helîsê) bikutin û biavêjine ber kûçikan." Yê bejnbihost dîsa dibêje:
"Eslî hû, neslî hû." Padîşah di dawiyê de ji wezîrê xwe yê piçûk dipirse, wezîrê piçûk dibêje:
"Patişahî xweş be, ev kalê reben ji xwe hatiye dawiya emrê xwe; ji ber feqîriyê derewek kiriye, hûn mezin û bi rehm in, azad bikin bila here." Yê bejnbihost dîsa dibêje:
"Esl hû, neslî hû." Ev gotin vê carê bala padîşah dikişîne. Padîşah ji kalo re dibêje:

Eşqa (yekî) jê re hatin

Pê re şad bûn. Kêfxweş bûn. **Bi rastî jî **eşqa min gelekî ji ciwanan re tê**.*

Etcheyato, çawa lê hato

Wekî berjewendiyên xwe hewl dan. **Bi vî awayî nabe, tu dibêjî hema **eteheyato, çawa lê hato**.*

Ev aş e, ev jî çirika aş (êş).

bnr. Aha aş, aha çirçirik

Ev bar e, ev jî serbar e.

1. Ev a bingehîn e, ev jî belaya piçûk e. **2.** Her tişt eşkere ye. Rewş tenê ev e. **Hûn rezîliya wê werin ji min bipirsin. **Ev bar e, ev jî serbar.** *Ji gotegotan re pêwîstî nîn e, **ev bar e, ev jî serbar e**.* (qerf)

Ev car nebe, careke din.

Îleh wê bibe. **Min ji te re got, ez ê wê azmûnê qezenc bikim, **ev car nebe, careke din**.*

Ev çi gotin û ev çi kirin?!

Gotin û kirinê li hev nekirin. **Te berê şîretên aştiyê kirin, lê dû re jî ciwan hadandine şerê eşîrtayê. Musa Axa, **ev çi gotin, ev çi kirin**?!*

Ev dar e, ev jî zirar e.

bnr. Aha aş, aha çirçirik

Ev dil e, ne bilxur e.

Ev ne tiştekî wisa piçûk û hêsan e. **Tu çi dibêjî dayê? Ev evîn û giyan e. Tu fêm nakî, **ev dil e, ne bilxur e**.*

Ev elifbê ye, hê pir li pey e.

Ev pirsgirêk wê gelekî bidome. **Min ji te re got. Hema nebêje ez rizgar bûm, lê **ev elif-bê ye, hê pir li pey e**.*

Ev ev e, te divê li ber be, te divê ji ber be.

Hez dikî qebûl bike, hez dikî qebûl neke. Hez dikî bike, hez dikî neke. **Rewşa me di vê radeyê de ye. **Ev ev e, te divê li ber be, te divê ji ber be.***

"Ev ê di dilqê zarokan de neviyê te ye çiyê te ye?" Kalo dibêje :

"Ez wî nas nakim. Ne tu tiştekî min e. Dema ku em di pêlekanên qesrê re derdiketin, bi pey me ket û hat." Padîşah bi hêrs jê dixwaze ku xwe bide nasîn. Yê bejnbihost selam daye padîşah û gotiye:

"Padîşahê birêz, bavê wezîrê te yê mezin qantirekî bû. Loma cezayek wer xwest. Ji ber ku mirov ku bibe wezîr jî, di ruhê wî de çi hebe ew e. Bavê wezîrê navîn keşkeşvan bû, loma wî jî da pey şopa bavê xwe. Lê ev wezîrê te yê piçûk, bavê wî jî wezîr bû. Loma ji te azadkirina vî kalê reben xwest. Loma wisa biwiedan û adil e. Paşayê delal, loma min tim got, 'Eslî hû, nesli hû'. Esle mirov çi be, mirov bi wê dikişîne." Meraqa padîşah bêhtir zêde bûye, jê pirs kiriye:

"Baş e, lê tu kî yî û van tiştan ji ku dizanî?" Benjbihost pirsa padîşah lê vedigerîne:

"Ma tu li kê digeriyayî?" Dû re jî destê xwe dirêjî wezîrê piçûk dike û dibêje:

"Wa ye wezîr!" Û xwe îşaret dike dibêje:

"Wa ye Xizir!" Û ji ber çavan winda dibe...

Ev ez, ev jî kefenê min
bnr. Kefenê xwe dayîn piçenga xwe

Ev hevîr hê wê gelek avê hilîne. (Wê ev hevîr hîn gelek avê hilgire.)
Ev pirsgirêk wê hê gelekî bidome. **Gafûr hew dizane ev mesela qediya, lê* ***ev hevîr hê wê gelek avê hilîne.***

Ev bîn nîna ye, tirnîna hîn maye.
Ya xerabtir hê li paş e. **Ka te çi dîtiye, ev* ***hîn nîna ye, tirnîna hîn maye.***

Ev hindik e, ez têr naxwim; ev jî zêde ye ez naqedînim.
Her du vebijark jî lê nehatin. *****Ev hindik e, ez têr naxwim; ev jî zêde ye ez naqedînîm.*** *Mixabin ji her du çakêtan yek piçûk e, li min nabe, yek jî mezin e li min nayê.* (bnr. çîrok)

Ev lêlê ye, hê lolo jî li dû ye. (Ev lêlê ye, hê lolo jî maye.)
Hê dûmahîk gelek heye. **Tu hê li ku yî xorto!* ***Ev lêlê ye, lê lolo jî maye.*** (bnr. çîrok)

Ev naçe mizgîniya wî/wê.
Ev li ber wê gelekî kêm û qels e. **Tu çi dibêjî malxirabo?* ***Ev qet naçe mizgîniya wê.***

Ev ne karê kera şîn e, ev îşê bûlka paşîn e.
bnr. Sim sima kerê ye, fêl fêlê Perê ye. *(*bnr. çîrok)*

Ev ne şûna dewara yeksim e.
Ev ne wekî gotina we ye. **Kuro lawo hûn kê dixapînin?* ***Ev ne şûna dewara yeksim e.***

Ev nîn e, ev nîn e, ev jî ji gundê me nîn e.
Ji bo rewşa yên der barê tiştên neyînî de hay ji her tiştî hene tê bikaranîn. **Kuro maşelah, meseleya wê jinikê jî bûye meseleya,* ***ev nîn e, ev nîn e, ev jî ji gundê me nîn e.*** (bnr. çîrok)

"Ev hindik e, ez têr naxwim; ev jî zêde ye ez naqedînim."

Du tas xwarin didin ber mirovekî û dibêjin:
"Divê tu ji van her du xwarinan yekî hilbijêrî û bixwî." Mirov mêze dike ku di tasekê de zehf hindik xwarin heye ku qet bnê hûre wî nagire, yek jî wer tijî ye ku nikare bixwe û xelas bike. Dizivire ser wan û dibêje: "Ev hindik e, ez têr naxwim; ev (jî) zêde ye ez naqedînim."

"Ev lêlê ye, hê lolo jî li dû ye."

Du heval di rêyekê de diçin. Rê dûr e, hevalek ji yê din konetir û zexeltir bûye. Ew ê kone ji yê din re dibêje:
"Hevalo ev re wiha naqede. Ka hineki ez li pişta te siwar bibim, hineki ji tu li pişta min siwar bibe ku bila em hineki rehet bibin." Yê din jî vê pêşniyarê dipejirîne. Dibêjin, ka kîjan ji me pêşî li kê pişta kê siwar bibe? Yê kone dibêje:
"Berê tu li pişta min siwar bibe. Dû re ji ezê li pişta te siwar bibim." Yê din dipejirîne û li pişta yê kone siwar dibe. Dest bi kilamekê dike. Heya ku kilama wî xelas dibe, li pişta hevalê xwe dimîne. Dema ku kilam xelas dibe, ji pişta wî dadikeve jêr û yê kone dide pişta xwe û riya xwe berdewam dike. Yê kone dest bi kilama xwe dike. lê tenê dibêje:
"Were lêlê... Were lêlê... Were lêlê..." Bilî wê tu tiştî nabêje. Ev were lêlê bi kandî du-sê kilaman berdewam dike. Yê di bnî de gelekî diweste û aciz dibe û dibêje:
"Hevalo ev çi kilamek dirêj e, ev saeteke hema tu tenê dibêjî, 'Were lêlê, were lêlê, were lêlê.' De bes e, niha jî dora mjn e."
Yê li ser pişta hevalê xwe dibêje:
"Hevalo ev lêlê ye, hela lolo li dû ye..."

"Ev nîn e, ev nîn e, ev jî ji gundê me nîn e."

Li hêla Dêrsimê keçikeke kor hebûye. Keçik pir forq (qehpik) bûye. Piştî ku bi hemû mêrên gund re ketiye têkiliya zayendî

Ev pîvaza mezin, ev nanê genimî, ev jî ava cemidî; dîsa jî dibêjin Eliyê Sino(*) malê xwe naxwe.

Ji bo kesên temahkar û nezan tê bikaranîn. **Ka êdî ez ji bilî wê çi dikarim bikim?* ***Ev pîvaza mezin, ev nanê genimî, ev jî ava cemidî; dîsa jî dibêjin Eliyê Sino malê xwe naxwe.***

Ev pîvaza wî ya hêşîn, ev jî şekirê wî yê spî di nav destmalê de; dîsa jî dibêjin: "Bavê te ji nêz de mir."

Ma ji pîvaz û şekir girîngtir çi heye? *****Ev pîvaza wî ya hêşîn, ev jî şekirê wî yê spî di nav destmalê de; dîsa jî dibêjin: "Bavê te ji nêz de mir."*** *Êdî min ji bilî wê çi bidayê?*

Ev riya kin, ev bertîla giran, gelo piştî min kî yê (wê) bixwe.

Di vî karî de lîstikek an jî xapînokek heye lê gelo çi ye? *****Ev riya kin, ev bertîla giran, gelo piştî min kê ye bixwe?*** *Di vî hesabî de nakokiyek heye lê gelo çi ye?*

Ev rûyê min, ev rûyê te

bnr: Ev rûyê te yê spî, ev rûyê min ê reş

Ev rûyê te yê spî, ev rûyê min ê reş

Bila yê xerab ez bim, lê ya rastî çi ye wê bibêje. **Heyran* ***ev rûyê te yê spî, ev jî rûyê min ê reş*** *a rast bibêje, ka bila her kes lûn bibe.*

Ev stûyê min û kêra we

bnr: Ev ez, ev jî kefenê min

Ev zimanê te nebûya, qijikan wê çavê te derxistana.

Ji bo mirovên pir lafek û zimandirêj tê gotin. **Zilfînaz, welehî ez vê û wê nizanim, lê dizanim ku* ***ev zimanê te nebûya, qijikan wê çavê te derxistana****.*

Evdalê çeqilmast, binê legenê alast.

Yên dawî mayî tim di ziyanê de ne. *****Evdalê çeqilmast, binê legenê alast.*** *Min ji te re negot, ew jî ji te re namîne?*

Evdilxebûr(**) e, ji rehma Xwedê dûr e, koda wî piçûk e, çirnika wî kûr e.

Ji bo mirovên sextekar, heqnedayî û çavçil tê bikaranîn. **Hema ev Hecî Şakir jî eynî* ***Evdilxebûr e, ji rehma Xwedê dûr e, koda wî piçûk, çirnika wî kûr e****.*

---

bi hemle maye. Ji ber ku bi melayê gund re jî razaye; mela sozê jê distîne ku navê wî nebêje, ew è xwedêgiravî şertê şerîetê pêk bîne. Mela mêrên gund giştî li hev dicivîne û tîne bal keçikê ku yê kiri tespît bike. Vêca ji ber ku çavên keçikê nabînin, nizanin bê çawa bikin. Lê keçik bi awayekî ji xwe gerah dibêje:

"Bila derpiyê xwe berjêr daxin ez ê destê xwe bidim wan û tê derxim bê kî ye." Her zilam tê odeya ku keçik tê de ye, derpiyê xwe berjêr dadixe, keçik destê xwe li wan digerîne û dibêje:

"Ev nîn e.", "Ev nîn e.", "Ev nîn e." Di wê navberê de yeki ji gundekî din hatiye wir ew jî di dorê de bûye, Dema ku dor tê wî, keçik dibêje:

"Ev jî ji gundê me nîn e!"

(*) **Eliyê Sino:** Axayê gundê Qereqoyînê ku gundekî girêdayî Sêweregê ye.

(**) **Evdilxebûr:** Aşvanek e û li hêla Tendûrekê jiyaye.

Ew ceneta ku ez ne tê de bim, bila ker tê de vegevizin.

Tenê li berjewendiyên xwe ponîjîn. **Min kesekî wekî wî jixwehezkirî di nav ezîtiyê de nedît. Hema dibêje:* ***Ew ceneta ku ez ne tê de bim, bila ker tê de vegevizin.***

Ew çi şîr e te da, ew çi pehîn e te lê da?!

Ew çi qenciya te lê kir, ew çi xirabiya te gihandiyê? *****Ev çi şîr e te da, ev çi pehîn e te lê da?!*** *Spas ji xwedîbûna te ya berê, lê ev xirabiya ku te di dawiyê de te kir ne rast bû.*

Ew ewr baranê nabarînc.

bnr. Ew ezmanê ku min dîtiye, baran jê nayê

Ew ewrê ku min dîtiye, ne yê baranê ye.

bnr. Ew ezmanê ku min dîtiye, baran jê nayê.

Ew ezmanê ku min dîtiye, baran jê nayê.

Wekî xuyangê nebûn. **Ez ji we re careke din dibêjim,* ***ew ezmanê ku min dîtiye, baran jê nayê.***

Ew girara ku para min tev tunc be, bila seriyekî sa (segan) di nav de be.

bnr. Ew ceneta ku ez ne tê de bim, bila ker tê de vegevizin.

Ew gurê ku min naxwe, bila hezar carî bijî.

bnr. Gurê ku ne dijmijê min e, bila hezar salî bijî.

Ew hewş e lê (belê) ne ew rewş e.

Cih eynî cih e, lê hal ne wekî halê berê ye. **Camêr hew dizane her tişt wekî berê ye, lê nizane ku erê* ***ew hewş e lê belê ne ew rewş e.***

Ew jî çilka ji behrê zêdebûyî ye.

Ji bo tiştên bi xwe ne girîng in, lê mirov hê zêdetir aciz dikin tê gotin. Ango, ew jî ya xerabtirîn e. **Ez çi bibêjim heyran?* ***Ew jî çilka ji behrê zêdebûyî ye.***

Ew jî donê li ser helîsê ye.

bnr. Ew jî çilka ji behrê zêdebûyî ye.

Ew jî ew hinde xurt e.

Ji destê wî/wê jî ew qas tê. Hêz û zerengiya wî/wê jî ew qas e. **Hûn çi jê dixwazin lawo?* ***Ew jî ew hinde xurt e.***

Ew jî eyba li tev eyba veşartî ye.

bnr. Ew jî çilka ji behrê zêde bûyî ye.

Ew jî pariyê şermê ye.

Karê xwe heya dawî nebirin. (Ji bo yê ku di dawiya xwarinê de pariyek du pariyan di binê tasa xwe de dihêlin tê gotin.) **Lawo, ew çi ye te hişt?* ***Ew jî pariyê şermê ye?***

Ew jî serbarê ser e.

Ji bo tiştên piçûk lê ji ya asahî bêhtir mirov aciz dikin tê bikaranîn. **Jixwe derdên me zelîf kêm (!) bûn, va ye* ***ew jî bû serbarê ser.*** (qerf)

Ew jî şewaşa şevereşan e.

Ji bo qencî yan jî xelata ku her kes pê nizane yan ku vala çûyî tê bikaranîn. **Lawo, min ji te re got, wan tiştan ji niha ve mekire, ji ber ku* ***ew jî dibin şewaşa şevereşan.***

Ew jî tûtika rûcrebê ye.

bnr: Ew jî serbarê ser e.

Ew ker, ne kerê wî barî ye.

Wekî zerengî û hempa karekî nebûn. **Rast e, tu dixwazî bişînî wê dibistanê, lê mixabin ku* ***ew ker ne kerê wî barî ye.***

Ew kiras lê nehatin

Di wê zerengiyê de nebûn. Ew kapasîte wekî wê/wî nebûn. **"Ew kirasê nivîskariyê jî li min dikin. Ez dizanim,* ***ew kiras dê li min neyê*** *û ez dê pir çewtiyan bikim û peyv û gotin dê mîna stranê, neherikin."* Mehmed Uzun

Ew mirî nakeve ber wî girî.

Ew mirov ne hêjayî xemgîniyê ye. **Badilhewa xwe neqehirîne.* ***Ew mirî nakeve ber wî girî.***

Ew ne li vir e, Xwedayê wî li vir e.

A rastî çi ye, em wê bibêjin. **Niha* ***ew ne li vir e, Xwedayê wî li vir e****, a rastî çi ye, ez dê wê bibêjim. Ez nikarim xwe ji Xwedê bikim.*

Ew riya ku te berê xwe dayê, ez jê hatime.

bnr: Ew riya ku tu dê heriyê, ez jê têm.

Ew riya ku tu dê heriyê, ez jê têm.

Ez ji te pêşdetir, pêkhatîtir û zanetir im. **Lawo hê Bêhna şîr ji devê te tê.* ***Ew riya ku tu dê heriyê, ez jê têm.***

Ew roj ev roj e.

Roja ku lê dihate gerîn, roja lêhatî ev e. ****Ew roj ev roj e.*** *De îro ez te bibînim.*

Ew ruh dê di wî qalikî re bikişe (derkeve).

Ew kar dê bê kirin. Ew yek bêgav wê pêk bê. **Diya min hûn çawa bikin çare nîn e,* ***ew ruh dê di wî qalikî re bikişe.***

Ew sal e, lê ne ew bihar e.

bnr: Ew hewş e lê (belê) ne ew rewş e.

Ew serî ye, ew oxir e.

Ji bo kesên ku bi biryar li pey karekî yan jî dozekê dimeşin tê gotin. **Kî çi dibêje, bila bibêje, min biryara xwe daye,* ***ew serî ye, ew oxir e.***

Ew tehtê ku te bi ser de rî, baranê hat, şûşt.

Rewş hatiye guherîn, ne rewşa berê ye. **Tu hê di xewna şevan de mayî.* ***Ew tehtê ku te bi ser de rî, baranê hat, şûşt.***

Ew tiştê di nav nigên te de heye, di nav nigên kerê min de jî heye.

Mêranî ne girêdayî xuyang û tiştên din e. **Tu xwe çi dihesibînî?* ***Ew tiştê di nav nigên te de heye, di nav nigên kerê min de jî heye.***

Ew war e, lê belê ne ew bihar e.

Belê ew der e, lê rewş ne wekî rewşa berê ye. **"**Ew war e, lê belê ne ew bihar e.** Her xanî, dar ber pê li pêş çavan dizivirin, wek serleşkerekî şikestî li cihê piyên xwe dizivirî."*

Enver Mehemed Tahir

Ew xem bila ji bo wê demê be.

Divê her helwest li gorî pêvajoya xwe be. **Ji nişka ve te çi kûkekûk e?* ***Ew xem bila ji bo wê demê be.***

Ewrên reş bi ser de hatin

Ketin rewşa xeternak. **"Hûn çima devên xwe vedikin û guh didin gotinên vala? Ma hûn nabînin va ye **ewrên reş bi ser me de tên**?"* Bavê Nazê

Eyarê (yekî) nerm kirin

Zêde li yekî xistin, lêdan. **Çima ku li her keçika wî digeriya, Nûman **eyarê Şiyar nerm kiriye**.*

Eyba giran bûn

Ji bo kêmasî û çewtiyên mezin tê gotin. **Bi rastî jî ya ku wê kir, **eyba giran bû**.*

Eyba xelkê tepisiye, ya min belengazê Xwedê reqisiye.

Ez bêşans im. **Jixwe ez bêrozgar im, **eyba xelkê tepisiye, ya min belengazê Xwedê reqisiye**.*

Eyba xwe bincil kirin

Çewtî û kêmasiyên xwe veşartin. **Hema ew her car bi vî awayî **eyba xwe bincil dike**. Lewma zêde nikare pêşiya xwe bibîne.*

Eyd e, bêqeyd e.

Di hin rojên taybet de mirov hin kêmasiyan jî nabîne û azad berdide. **Îro roj roja Hemîdeyê ye, ango **îro eyd e, bêqeyd e**.*

Eynî berf e, eynî çiftexas e.

Tu derka wan tune bûn, wekî berê bûn. **Tu tişt neguheriye, jixwe **eynî berf e, eynî çiftexas e**.*

Eynî jin, weynî jin, dîsa jin

Jin zêde tiştan mezin dikin, lewma neyarî û ziyana wan jî zehf tund e. **Ax eman ji destê jinan. **Eynî jin, weynî jin, dîsa jin.***

Eyşikê ji xwe şikê

Ji bo kesên zû dixeyîdin û dil weswese ne tê gotin. **Eyşikê ji xwe şikê.* *Tu bawer bike tu tiştekî xerab tune, hema tiştan wer mezin dike.*

Ez axa tu axa, kî golikan bibe nav baxan.

Divê her kesek binbariyekê pêk bîne. **Tenê avêtin stûyê hev û din nabe.* ***Ez axa tu axa, kî golikan bibe nav baxan.***

Ez bi dia nebûme ku bi nifiran bimirim.

Li hemberî yên ku nifiran dikin tê gotin. **Çi dibêje bila bêje. Ma ez* ***bi dia bûme ku bi nifiran bimirim.***

Ez bi te tu bi min, ew tev bi Xwedê

Mirov ku bi hev û din re baş û sax be, Xwedê jî dibe alîkarê mirov. **Min ji te re got,* ***ez bi te tu bi min, ew tev bi Xwedê.***

Ez bûm gur min malê dinê xwar, min çiyê te xwar.

Ma min çi ziyan gihande te? **Hema bigire ku ez xerab,* ***ez bûm gur min malê dinê xwar, min çiyê te xwar?***

Ez çi bikim, kurkê min ne sor e.

Heke rewşa min ya aborî baştir bûya, rûmeta min jî wê zêde bûya. *****Ez çi bikim, kurkê min ne sor e,*** *naxwe niha li ber derê min jî rêz bûbûn.*

Ez çiqasî ji belayê direvim, bela tê li lingê min diale (digere).

Ez bêşans im, ji bela û qotikan xelas nabim. **Ez jî metel im,* ***ez çiqasî ji belayê direvim, bela tê li lingê min diale.***

Ez dibêjim aş ê min e, ew dibêje: "Dora min e."

Ji ya rasteqînî fêm nake. **Ev çi mirovekî bêfêm e,* ***ez dibêjim aş ê min e, ew dibêje: "Dora min e."***

Ez dibêjim bibim qaymeqamê Gîhadînê, ku ew nebe, gavaniya Cûcanê[*] destê min paç dike.

Ya herî baş nebe, jixwe ya piçûk di destê min de ye. **Tu tênagihîjî,* ***ez dibêjim bibim qaymeqamê Gîhadînê, ku ew nebe, gavaniya Cûcanê destê min paç dike.***

Ez dibêjim bila ez dewlemend bim, ku ew nebe, feqîrî destê min maç dike.

bnr: Ez dibêjim bibim qaymeqamê Gîhadînê, ku ew nebe, gavaniya Cûcanê destê min paç dike.

Ez dibêjim bira, ew ji min re dibêje: "kirîv"

Ez çiqasî bi niyeteke erênî nêzîk dibim jî, ew sar nêzîkî min dibe. **Tu li min û vî binihêre,* ***ez dibêjim bira, ew ji min re dibêje: "kirîv".***

---

[*] **Cûcan:** Gundekî Gîhadîna navçeya bajarê Agiriyê ye.

Ez dibêjim ewr tune, tu dibêjî: "Wê baran bê."
Ji rewş û rasteqîniyê fêm nekirin. **Ev hêfêm, ji min tiştekî fêm nake.* ***Ez dibêjim ewr tune, tu dibêjî : "Wê baran bê."***

Ez dibêjim, ezman sayî ye, tu dibêjî: "Şilî dê bibare."
bnr. Ez dibêjim ewr tune, tu dibêjî : "Wê baran bê."

Ez dibêjim hirç va ye, tu dibêjî: "Rêç wa ye."
bnr. Ez dibêjim ewr tune, tu dibêjî: "Wê baran bê."

Ez dibêjim stewr e, tu dibêjî: "Bidoşe."
bnr. Ez dibêjim ewr tune, tu dibêjî: "Wê baran bê."

Ez dibêjim xudim im, ew dibêje: "Çend zaroyên te hene?"
bnr. Ez dibêjim ewr tune, tu dibêjî: "Wê baran bê."

Ez diçînim, ew difirîne.
Ez dikim, ew dixwe. **Tu li vê bêdadiyê mêze bike,* ***ez diçînim ew difirîne.***

Ez didimê gula geş, ew dibê: "Bide min kelemê reş."
Ji qencî û xweşikahiyê fêm nekirin. **Bi mirovê tênegihîştî re debar zor e,* ***ez didimê gula geş, ew dibê: "Bide min kelemê reş."***

Ez dikim li te dibare.
Ez kedê didim, berhemê tu hildigirî. **Min tiştek ji vî karî fêm nekir,* ***ez dikim li te dibare.***

Ez dixwim li te digivire.
bnr. Ez dikim li te dibare.

Ez diz berdidim, diz min bernade.
Di ser neheqiya xwe de zorbetî jî kirin. **Yê ser berdide, yê binî bernade. Kuro* ***ez diz berdidim, diz min bernade.***

Ez dizanim av li ser çi re diçe, lê belê nabêjim.
Ji bo dostên rasteqîn ku sira mirov nabêjin tê bikaranîn. **Erê,·ew jî dost e, lê ji wî dostê ku gotiye:* ***"Ez dizanim av li ser çi re diçe, lê belê nabêjim."*** *Yekî wekî wî dostî ye.* (bnr. çîrok)

"Ez dizanim av li ser çi re diçe, lê belê nabêjim."

Mirovekî dewlemend hebûye. Lawê wî di nav hebûnê de pereyan direşîne û tevî hevalên xwe kêf û zewqê dike. Bavê wî mêze dike lawê wî çiqas temen derbas dike jî lê ji jiyanê tu dersekê nagire û nakemile. Rojekê bav ji lawê xwe re dibêje: *"Lawo çend dostên te hene?"* Lawik dibêje:
"Bavo ew qas dostên min hene ku ez hesabê wan jî nizanim." Bav gotina xwe berdewam dike û dibêje:
"Lawo wer tê xuyan ku dosteki te yê rasteqîn tune û ew ên ku tu dibêjî hemû dostên min in jî dostên pereyên te an jî dostên bêrika te ne. Heke sibe rewşa te ya aborî xera bibe, ew hemû jî dê ji holê winda bibin. Mêze bike di navîna ew qas emrê min i dirêj de min tenê ji xwe re dosteki nivdost bi dest xistiye. Te çawa di demeke ew qas kurt de ew qas dost bi dest xistin? Heke ku tu wan re dibêjî dost, de ka em îro wan biceribînin, ka gelo bi rasti jî dostên sadiq û ji dil in an ê bêrikê ne." Lawik hêrs dibe û dibêje:
"Bavo, ji dostên min re wer nebêje, ew hemû jî dostê min ên pîroz û ji dil in, min gelek qencî ji bi wan kirine, ew dikarin canê xwe ji di riya min de bidin. Lê madem ku tu wer dibêjî, kerem bike, em wan biceribînin." Bav dibêje:

Ez dizanim çend pînc bi qûna wî ve hene.
bnr: Ez dizanim çend rêvî di hûrê te de hene.

Ez dizanim çend rêvî (rovî) di hûrê te de hene.
Ez te baş nas dikim. **Qet hewce nake tu xwe bînî ziman.* ***Ez dizanim çend rêvî di hûrê te de hene.***

Ez ez im, tu tu yî.
Her kes wekî xwe û taybetiyên xwe ye. **Belê em çiqas nêzîkî hev bin jî,* ***ez ez im, tu tu yî****.*

Ez garisê şeng im, mêrê roja ceng im.
Ez mirovê rojên zor im. **Rast e, zû bi zû dengê xwe nakim, lê* ***ez garisê şeng im, mêrê roja ceng im****.*

Ez geriyam li Şam û dinê, xelas nebûm ji mirinê.
Ji mirinê xelasbûn ne gengaz e. *****Ez geriyam li Şam û dinê, xelas nebûm ji mirinê.*** *Mirin li pêş hemû kesî ye, zû yan jî dereng, her kes dê bimire.*

Ez golikê beş im, herim ku, kifş im.
Ez mirovekî cuda û taybet im û bêşans im. **Hûn li min nenihêrin* ***ez golikê beş im, herim ku, kifş im****.*

Ez goşt naxwim lê belê nanê xwe yê tisî pê dixwim.
bnr: Ez goştê heram naxwim, lê nanê xwe di avdanokê de hûr dikim.

"Lawo, tu rabe îşev here deriyê wan dostên xwe yên ku tu zelf ji wan bawer î lê bixe û bibêje; padîşah li min hatiye xezebê, heke ku min bigire wê min darda bike. Hûn dikarin îşev stamiyê bi min bikin? Ka mêze bike helwesta wan dê çawa dibe." Lawik deriyên ku ji xwe re dost dizane yek bi yek lê dixe. lê kes cesaret nake jê re alîkariyê bike. Lawik bi rûyekî reş tê bal bavê xwe û dibêje:
"Bavo, gotinên te rast derketin, ew hevalên min qet yek ji ne dostê min bûne." Bav dibêje:
"Lawo te dît dostê menfaetê çawa ne. De tu niha dostiya min û dostê minî nîvdost mêze bike, ka gelo dostiya rasteqînî çawa ye em tev bicaribînin û bibînin." Wekî gotina bavê xwe, lawik diçe beranekî tîne, bav û law tev de beran digurînin, paqij dikin, diqelînîn. Bav cilinan diavêje ser cendekê berên, girê dide û dike torbeyekî. Dû re ji kurê xwe re dibêje:
"De here bang bike nîvdostê min û bibêje bavê min bangî dike te." Lawik nîvê şevê diçe deriyê dostê bavê xwe lê dixe. Dibêje:
"Apo, bavê min ez şandim, hewcedariya wî bi te heye, dibêje bila zû were malê." Dostê bavê wî tiştekî ji lawik napirse, kincên xwe li xwe dike û tê mala dostê xwe. Bavê lawik jê re dibêje:
"Vî lawê min kurê padîşah kuştiye, (cila ku cendekê beran pê pêçaye nîşan dide) me ew bi vê cilê pêça ye. Lê ez ketime tengasiyeke wisa ku nizanim vî meytê lawê padîşah çawa bikim." Nîvdostê wî demekê difikire û dû re dibêje:
"Tu bi ya min biki, aşvan bi şev avê dibire, em binê ava çem bikolin û bikin wir. Sibe av bi ser de here, kes bûr nabe ku li wir binihêre û jixwe ji ber ku av di ser re diçe ne mimkun e ku lê binêrin." Wekî gotina wî dikin. Roja dîtir bavê lawik jê re dibêje:
"Rabe îro disa here bal nîvdostê min û jê re bibêje, bavê min digot bila topek qumaşê pir bulu û xweşik bişîne." Lawik diçe gotinên bavê xwe eynî ji dostê bavê xwe re dibêje. Topek qumaş tîne. Bav topa qumaş ji hev derdixe, dide ber kêran hewlgewloyî dike, li hev dixe û dixe nav torbeyekî û dide kurê xwe ku biavêje ber deriyê dikana dostê wî. Lawik eynî wekî gotina bavê xwe dike. Dostê bavê wî li hember vê xirabiya bav û kur tenê ji lawik re dibêje:
"Ez dizanim av di ser çi re diçe, lê belê ez nabêjim." Dema ku lawik tê mal bav jê dipise:
"Lawo, dema ku te ew torbe avête ber derê dikana wî ji te re çi got?" Lawik dibêje:
"Bavo tenê got, 'Ez dizanim av di ser çi re diçe, lê belê nabêjim!' " Bavê lawik pir dilşad dibe, bi şanazî xwe dinepixîne û ji kurê xwe re dibêje:
"Lawê min, me bi vî awayî girêdayîbûn û bextê dostê nîvdostê min jî ceriband. Mêze bike, dostiya rastî wiha ye; ne wekî kirina wan hevalên te ye. Niha here bang bike dostê min bila bê mal." Dostê wî tê, bavê lawik wî hildide dibe ser ava aş, cihê ku beran lê çal kirine. Cendek derdixin, bavê lawik ji torbe goştê beran derdixe. Dostê wî ecêb dimîne û dipirse:
"We ji min re got ev cendekê lawê padîşah e, ev çi ye?" Bavê lawik di sêrî de çi bûye heya dawî jê re dibêje û di encamê de dersek baş dide kurê xwe.

Ez goştê heram naxwim, lê nanê xwe di avdanokê de hûr dikim.
Bi awayekî ne durist nêzîk bûn. Sextekarî kirin. **Ew jî jixwe re li hincetan digere û dibêje:* ***"Ez goştê heram naxwim, lê nanê xwe di avdanokê de hûr dikim."***

Ez halhalî te de tu halhalî min
Em her du jî di heman rewşê de ne. **Ez baş te fêm dikim. Ji ber ku* ***ez halhalî te, tu halhalî mîn de yî.***

Ez hatim daweta te, tu hatî diziya min.
Ez ji bo xêra te, dixebitim, tu jî ji bo xirabî û ziyana min hewl didî xwe. **Ez gelekî saf im.* ***Ez hatim daweta te, tu hatî diziya min.***

Ez heme, yan jî tune me negotin
bnr. Ne gawir im (kafir) im, ne misliman im gotin

Ez hêdî diçim bela digihe min, zû diçim ez digihim belayê.
Çawa dikim çare nabe. **Ez nizanim ez ê çawa bikim?* ***Ez hêdî diçim bela digihe min, zû diçim ez digihim belayê.***

Ez hevrîşka bidon im, zû ji min têr dibin.
Ez bêşans im. **Ez nizanim çawa bikim.* ***Ez hevrîşka bidon im, zû ji min têr dibin.***

Ez hurmet, tu hurmet, riya min û te bi hev ket, ez bi xêr û tu silamet.
Belê têkiliyeke me çêbû lê tu ziyaneke me çênebû. **Her kes di daxwaza xwe de azad e.* ***Ez hurmet, tu hurmet, riya min û te bi hev ket, ez bi xêr û tu silamet.***

Ez ji gur bitirsiyama, min pez xwedî nedikir.
Heke mirov ji bo her tiştî bike weswese û bitirse, nikare tu karî bike. **Min ji te re got, heke* ***ez ji gur bitirsiyama, min pez xwedî nedikir.***

Ez ji maran revîm hatim, ketim tendûra maran.
Tiştê ku naxwazim bi xwe tê li ber lingên min disekine. **Ev çi ecêb e kuro?* ***Ez ji maran revîm hatim, ketim tendûra maran.***

Ez ji te re bixwazim tu ji min re bixwaze, wekî Xwedê ji me herduyan re bixwaze.
bnr. Ez bi te, tu bi min, em tev bi Xwedê

Ez ji te re, tu ji kê re
Her tiştê min ji bo te ye, êdî tu çi dixwazî ? **Lawo, te hela hê rewş fêm nekiriye?* ***Ez ji te re, tu ji kê re?***

Ez ji te xelas bûm, tu ji emelên xwe xelas nebî!
Mêriko,* ***ez ji te xelas bûm, tu ji emelên xwe xelas nebî!* (nifir)

Ez kavira beş im, herime ku, kifş im.
bnr. Ez golikê beş im, herim ku, kifş im.

Ez kêr, tu penêr

Ez çawa bixwazim dê wer bibe. **Xinamîtiya wisa dibe? Ji niha ve dibêjî* ***ez kêr û tu penêr****.*

Ez kevir, tu tevir

Em her du jî ji hev du hişktir û xerabtir in. **Azîna wan,* ***ez kevir, û tu tevir*** *e. Bawer nakim ku ew bi hev du re baş debarê bikin.*

Ez kewê ribat im.

bnr. Ez kewê zinaran im.

Ez kewê zinaran im.

Ez êdî û mezin û bihêz im. **Maşelah pir dilnizm e, lo hema dibêje:* ***"Ez kewa zinaran im."***

Ez kor, tu kor, îcar wê kî here jor. (Ez kor, tu kor, kî (dê) mehîrê bibe jor.)

bnr. Ez axa tu axa, kî golikan bibe nav baxan?

Ez ku bizanibim ez ê kingê bimirim, ez ê ava xwe germ bikim û kefenê xwe jî bibirim.

Mirov heke her tişt bizanibe, wê li gorî wê tevdîra xwe bike. **Kî dikare her tiştî bizanibe.* ***Ez ku bizanibim ez ê kingê bimirim, ez ê ava xwe germ bikim û kefenê xwe jî bibirim.***

Ez li ber te, Xwedê li ser te.

Maye însaf û wîjdana te, çawa dikî tu dizanî. **Ez jî sûcê xwe dizanim. Ez* ***li ber te, Xwedê li ser te.***

Ez li daweta diz im, diz li goma pezê min e (diz li diziya pezê min e).

Li hemberî niyeta baş, bi xerabiyê bersiv dan. **Nizanim ez zelîf saf im an ew zelîf sextekar û durû ne?* ***Ez li daweta diz im, diz li goma pezê min e.***

Ez li ku dixim, deng ji ku tê?!

. Ji bo rewşa berevajî tê gotin. **Min tiştek ji vî karî fêm nekir.* ***Ez li ku dixim, deng ji ku tê.***

Ez li vir, xelîfe li Bexdayê

Ji bo tiştên bêtêkilî û bêîmkan tê gotin. **Ka çi ji destê min tê,* ***ez li vir, xelîfe li Bexdayê****.*

Ez li zik dixim, ew dibêje: "Wey pişta min!"

bnr. Got: "Ez li zikê te dixim, tu dibêjî, wey pişta min!" Got: "Wekî kesek li pişta min hebûya, te nikaribû li zikê min bixista.".

Ez malê xwe nas dikim.

Pê zanîn. Pê beled bûn. **Ev tiştên ku wî pêk anîn, jixwe min hêvî dikirin, çimkî* ***ez malê xwe nas dikim****.*

Ez mêr, tu mêr, kî ye ji me şêr?!

bnr. Ez axa tu axa, kî golikan bibe nav baxan.

Ez mîr tu mîr, kê soqil hemîr

bnr. Ez axa tu axa, kî golikan bibe nav baxan.

Ez nakim mêran, kundan nakim dewsa şêran.

Di ser mêrê xwe yê hêja re tu mêran nakim, ji ber ku tu kes şûna wî nagire. **Rast e, gelek mêr min dixwazin, lê* ***ez nakim mêran, kundan nakim dewsa şêran.***

Ez namirim bi vê derbê, ez ê bimirim bi vê kerbê.

Ez ji dest birînê na lê ji dest vê pirsgirêkê zêdetir aciz dibim. **Wekî di meseleyê de şêr gotiye:* ***"Ez namirim bi vê derbê, ez ê bimirim bi vê kerbê."*** *Hema ez jî eynî wisa me.* (bnr. çîrok)

Ez ne diz im, ne dilerizim.

Ez ne sûckar im ku ez bitirsim. **Ez çima têkevim fikaran?* ***Ez ne dizim, ne dilerizim.***

Ez ne kewê dafika te me.

Ez ne lîstoka te me ku tu bi min bilîzî. **Tu dixwazî li serê min teleyan çêbikî lê* ***ez ne kewê dafika te me****.*

Ez ne yê van salan im.

Ez ne zaro yan jî bêtecrube me. **Çavê xwe veke û li min binêre,* ***ez ne yê van salan im****.*

Ez penêr, tu kêr

Ez li ber te me, çawa dikî tu dizanî. **Heyran, venekişe.* ***Ez penêr, tu kêr****, çi dixwazî tu dizanî.*

Ez pîvaz naxwim, ew dibêje were şekir bixwe.

Pîvaz ji şekir jî şirîntir û girîngtir e. **Tu li min û wî binêre,* ***ez pîvaz naxwim, ew dibêje were şekir bixwe****.*

Ez rim im, naçim têrê.

1. Ez ne pariyekî piçûk im. Kes wisa zû bi zû bi min nikare. **2.** Ez bêrozgar im, tiştên min ên dizî jî derdikevin eşkeretiyê. **Ew min nas nakin her hal,* ***ez rim im, naçim têrê****. *Bawer nakim ku ya min dernekeve holê, çimkî* ***ez rim im, naçim têrê****.*

Ez sax, tu silamet

Kar bi serkeftî heya dawî birin. **Aha bavo vîdeoya te, min anî û teslîmî te dikim,* ***ez sax tu silamet****.*

Ez singekî dikutim, ew tûrekî pê de dike.

Ez çi dibêjim tu jê re sedemekê yan jî hincetekê dibînî. **Maşelah ez dikim nakim pê re nagîhînim, ji bo pêşiya min bigire,* ***ez singekî dikutim, ew tûrekî pê de dike****.*

"Ez namirim bi vê derbê, ez ê bimirim bi vê kerbê."

Şêrê şahê daristanan, rojekê dikeve dafika roviyan. Şêr bi birîndarî ji dafikê xelas dibe û bi zorê xwe digihîne şikefta xwe. Wisa birîndar e ku nikare zêde bilebite. Heywanên ku nesaxiya wî dibihîzin, hemû têne serdana wî û xemgîniya xwe jê re diyar dikin. Di vê navberê de rovî jî tê serdanê. Mêze dike ku wa ye şêr nikare ji cihê xwe rabe:
"Wax şêrê min wax! Derbazî be. Min bihîst ez zehf li ber xwe ketim." Bi awayekî qure xwe dinepixîne û berdewam dike. *"Duh zarokên me derketibûn nêçîrê, wan bêmerîfetan ev vek nekiribin gelo?"* Ji ber van gotinên rovî, şêr ji hêrsan dîn dibe, çav lê sor dibin, hêzê dide xwe ku rabe, nikare rabe, lê heya ku jê tê diqîre û dibêje:
"Ez namirim bi vê derbê, ez ê bimirim bi vê kerbê."

Ez singekî dikutim, tu hebinekî diavêjiyê.
bnr: Ez singekî dikutim, ew tûrekî pê de dike

Ez sirkekê dikutim, tu hespekî lê girê didî.
bnr: Ez singekî dikutim, ew tûrekî pê de dike.

Ez şekala haziran im.
Di wateya dilnizmiyê de tê bikaranîn. **Ezbenî, **ez şekala haziran im**, lê heke hûn bi ya min bikin, dev ji vî karî berdin.*

Ez taştê me tu jî navroj (şîv) î.
Niha dora min e, demekê şûn de dora te jî wê bê. **Dema ku Rahîberê xayîn birayê xwe da dest, birayê wî jê re got: Birawo, te ez dame dest dijmin, lê **ez taştê me tu dê jî bibî navroj**.*

Ez têm kuştin lê nayêm çimandin.
Mirin an jî têkçûn dibe ku bibe, lê ez nakevim rewşeke bêşanaz. **Rast e, bi ser neketim, lê **dibe ku bêm kuştin jî, lê nayêm çimandin**.*

Ez tenê têm (diçim) destê bavê xwe.
Ez stûyê xwe ji kesî re xwar nakim. **Bila kes qisûrê mêze nelke, **ez tenê diçim destê bavê xwe**.*

Ez Tirmînî ji te re dibêjim, tu Yarhezokî li min vedigerînî.
Ya ku ez dikim û dixwazim na, tu tiştekî din dikî. Ji hev û din fêm nekirin. **Bi vê meşê em nikarin ava xwe di coyekê de biherikînin. **Ez Tirmînî ji te re dibêjim, tu Yarhezokî li min vedigerînî.***

Ez xwe bi tehtan digirim, ew jî hatiye xwe bi min digire.
Jixwe rewşa min ne baş e ew jî dibe serbarê ser. *****Ez xwe bi tehtan digirim, ew jî hatiye xwe bi min digire.*** *Min barê xwe hilgirtiye ku ez yê wî jî hilgirim?*

Ez yekî dibêjim, tembûra min yekî dibêje.
Karê min baş nameşe, rewş wekî daxwaza min nabe. **Ez jî nikarim, **ez yekî dibêjim, tembûra min yekî dibêje**.*

Ez zehf bi stranan dizanim lê dengê min tune.
Ji bo kesên ku ji xwe re li hincetan digerin tê bikaranîn. **Na lo, **ez zehf bi stranan dizanim lê dengê min tune**.* (qerf)

Ez, zikê min û xirê min
Ji bo kesên ku tenê li xwe û berjewendiyên xwe difikirin tê gotin. **Ji wî re çi, hema ew dibêje, **ez, zikê min û xirê min**.*

Ez a mêr mirê, min çû mêrekî din kirê, xelkê tehl (tal) li hev şirîn kirê.
Ji bo hewldan û rewşa vala tê gotin. Ne ji bo xwe, lê ji bo hinekên din sûdewar bûn. **Ev çi yek bû hate serê min? **Ez a mêr mirê, min çû mêrekî din kirê, xelkê tehl li hev şirîn kirê.***

Ezabê cehenemê kişandin
bnr. Ezabê qebrê (gorê) kişandin

Ezabê qebrê (gorê) kişandin
Gelekî eziyet kişandin. **Ji destê wê jinika rezîl, min bi rastî jî hema bigire ku* ***ezabê qebrê kişand.***

Ez ê bixwim wî xwerdî, tu yê bimirî bi wî derdî.
Ez ê wî karî bikim, tu yê jî bibehecî. **Tu bimirî jî ez ê bikim. Hema* ***ez ê bixwim wî xwerdî, tu yê bimirî bi wî derdî.***

Ez ê goştê canê xwe bixwim, nanê bi minet naxwim.
Ez tu car nakevim bin minetan. **Ketina bin minetan ne li gorî min e.* ***Ez ê goştê canê xwe bixwim, nanê bi minet naxwim.***

Ez bêbistan (bostan) im, lê bişeqlor im.
Ji bo acizbûna karên eletewş an jî ne pêwîst tê gotin. **Ez nizanim ew jî ji ku derketin qurban.* ***Ez bêbistan im, lê bişeqlor im.*** (argo)

Ez ne bi pirî text im.
Ez wer baş û biaqil nîn im. **Bi rastî jî gelekî bi ser min de neyên,* ***ez ne pirî text im.***

Ezîzê li ber dil bûn
Pir birûmet û binirx bûn. **"Rêncber bû, karkerê mala xwe; lê belê* ***ezîzê li ber dilê xelkê bû."*** Adar Jiyan

Ezman hilweşîn
Rewş pir tund bûn. **Ev bû sê roj û sê şev, ji lundir derkeve.* ***Ezman hildiweşe.*** *Ev cara pêşî ye ku berf bi vê harbûnê tê xwar."* Pîr Rustem

Ezman qul bûn
Gelekî baran barîn. **Heyran ne baran bû, ecêbeke giran bû, ji hemdê Xwedê* ***ezman qul bû.***

Ezmanê hêşîn bi ser de girtin
*****Ezmanê hêşîn bi ser de girto!*** *Ka carekê jî ya rastî bibêje!* (Nifir)

Ezo ne ezo, destmala gulgevezo
Bi xwe ji xweşikî û erêniya xwe bawer nekirin. *****Ezo ne ezo, destmala gulgevezo.*** *Piştî ku zarokên wê li Evrûpayê pere jê re şandin. Cemîle bi boçika xwe dilîze.* (qerf)

Ezraîl lê bûn mêvan
Mirin. Çûn ber rehma Xwedê. **Navbera me nû xweş bûbû; ew bû ku me ji hev û din fêm dikir; lê mixabin* ***Ezraîl lê bû mêvan*** *û ji me qetand.*

Ezûmeta reş bûn
bnr. Ecêba reş û giran bûn

Ê

Ê ku bulxur çand jî mir.
Her kes dê bimire. **Cudatî û rev ne gengaz e,* ***ê ku bulxur çand jî mir****.*

Êdî Qulî ne ew qulî ye.
Êdî rewş hatiye guherandin. **Kifş e ku tu nizanî, lê mixabin* ***êdî Qulî ne ew qulî ye****.*

Êl yeman, beg yeman, êl rabû beg winda bû.
Dema ku gel rabe ser piyan, axa û beg nikarin li ber bisekinin. *****Êl yeman, beg yeman, êl rabû beg winda bû.*** *Hêza gel hêza herî mezin e.*

Êlê xwe bi pîrê girt, pîrê xwe bi êlê girt.
Hêz dayîn hev û din. Ji hev du re alîkarî kirin. Rewş li hev hatin. **Her du seriyan jî hev û din îdare kirin.* ***Êlê xwe bi pîrê girt, pîrê xwe bi êlê girt.***

Êlma xwe dan ser (yekî)
Hînî kesekî yan jî tiştekî bûn. Xwe zêde nêzîkî tiştekî kirin, jê hez kirin. **Lawê min gelekî* ***êlma xwe daye ser wê keçikê****, bawer im ku ji bilî wê nikare bi keseke din re bizewice.*

Êş li dilê (yekî) ketin
*****Êş belkî li dilê Gogerçînê nekeve****, heke ew nebûya em ê bi ser biketana.*

Êşê dayîn ser dil
bnr. Janê dayîn ser dil

Êşeg, doşeg
Ji bo tiştên ku ne layiqî hev in tê gotin. **Heyran qet ew li hev dikin?* ***Êşeg, doşeg?***

Êtxî tê de kirin
Îîtira kirin. Tiştên nebûyî wekî bûyî nîşan dan û ew tawan avêtin stûyê yekî. **Pişttî ku ew* ***êtxî di wê jinika belengaz de kir****, bû sedema lêdana wê.*

Êvar bi ser (yekî) de hatin
Dereng man. **De bes e! Heyran rabin êdî* ***êvar bi ser me de hat****.*

Êvarê şêr, sibehê rovî bûn
Helwesteke berevajî nîşan dan. **Kesî ji Bager tiştek fêm nekir.* ***Êvarê şêr e, sibehê rovî ye.***

Êzing rahiştin
Ji bo tiştekî yan jî kesekî xemgîn bûn. **Derdekî Remziyê heye lê nizanim çi ye. Îro rûyê wê nedikenî û tim* ***êzing radihiştin****.*

F

Fahşo mahşo, li ber aşo
1. Her çi hebe, dîsa jî kêrî hin tiştan tê. **2.** Mirovên bêkêr û bêfem, bêrûmet e jî. **Em çawa bikin,* ***fahşo mahşo, li ber aşo.*** **Ma dawî ne xuya ye?* ***Fahşo mahşo, li ber aşo.***

Fatê were dawetê.
bnr. Gulê were ser tûyan.

Fatromê, agir berda zomê, çû rûnişt li ser komê.
Fesadî û şeytanî kirin, lê wekî ku ne têkildar e jî xwe dan aliyekî. ****Fatromê, agir berda zomê, çû rûnişt li ser komê.*** *Nêrgizê di dawiya dawî de gund hemû berda hev, dû re çû.*

Fecir lê daketin
Şil bûn, felç bûn. **Heke* ***fecr lê daneketa*** *te dê bidîta niha xortekî çawa dê jê derketa.*

Fela qereçiyan, şansê sêwiyan
Ji bo kar û barên pûç tê bikaranîn. **Lawo, tu çi ji wan hêvî dikî? Ma tu nizanî,* ***fela qereçiyan, şansê sêwiyan.***

Felek jê re bûn yar
Rewş xweş û serkeftî bûn. **Şikir îsal* ***felek ji Memê re bûye yar*** *û hemû karên wî baş dimeşin.*

Felek bavê bûn (yekî)
bnr. Felek jê re bûn yar

Felek lê çep gerîn
Rewş baş nebûn. **Ez çi bikim ku va ye* ***felek li lawê min çep geriyaye.***

Felek lê bûn mêvan
bnr. Ezraîl lê bûn mêvan

Felek lê şaş kirin

Yek kirin bin zerp û zoreke dijwar. *Wê rojê çima ku Kerem giliyekî nebaş der barê lawê wî de got, Mehmûd **felek li wî şaş kir**.*

Feleka find û finaz, firindê piçûk û baz, geh da me şahê gerdan, ew jî bi minet û naz.
Hey felekê, te tiştekî baş neda, çaxa ku da jî mineta dinyayekê kire stûyê me. *Got, ***feleka find û finaz, firindê piçûk û baz, geh da me şahê gerdan, ew jî bi minet û naz**. Çima hinekî qenciya wan li me çêbû, sîran li ser serê me heftserî difroşin.*

Feleka (yekî) li serî reş gerîn
Ketin rewşeke xerab. *Ev du sal in ku **feleka Rojen li serî reş geriyaye**.*

Feleka min di mala xwe de nemire.
Min ev yek heq nekiriye. *Ev rewş ne layiqî min e. Ez tê de me, lê çi bikim **feleka min di mala xwe de nemire**.*

Feleka xwe şaş kirin
Dengeya xwe winda kirin, ketin rewşeke zor. *"Tu îro dilbikul î ...te **feleka xwe şaş kiriye**... Dinya li ser te digere; çavên te tu deran nabîne."* Dr. Cuwan Batû

Felekê berê xwe jê guhastin
bnr: Felekê pê re nedomandin

Felekê çerxek xwe lê xistin
Rewş neyînî bûn. *"Gava **felekê çerxek li me xist** û em ji hev dûr ketin, ev bûyera nexweş hate serê me."* Feqî Huseyn Sağnıç

Felekê kapa xwe wisa avêtin
Rewş wisa guherîn. *Em çawa bikin, **felekê kapa xwe wisa avêt**, çarenûsa me jî bi vî rengî hate guherîn.*

Felekê kumê xwe lê xwar kirin
bnr: Felek lê çep gerîn

Felekê pê re nedomandin
Kar û barê yekî baş neçûn. *Ez çawa bikim ku **felekê bi keça min re nedomand** û di wî temenî de kete nava wê belayê.*

Fend û fût kirin (Fen û fît kirin)
bnr: Dek lê gerandin

Fen û fût bû peyda, pê re bi tirkî xeber da.
Jixwe yên ku dest bi sextekarî û komployan dikin, ji kok û çanda xwe jî dûr dikevin û biyan dibin. *Bawer im ji ber ku ji xwe dûrketinê gotine: **"Fen û fût bû peyda, pê re bi tirkî xeber da."***

Feq danîn
Li serî tele çêkirin. *"Em ji hev du re **feqan datînin**, em hev du pîs dikin, yek ku hinekî pêş de here rê li ber wî digirin."* Süleyman Çevik

Feqîr çûn diziyê heyv di êvar de derket.
bnr. Feqîr çûne sergînan, manga çûne di behrê de rêx kirine.

Feqîr çûn xwe darde bikin, lê nihêrîn ku lingên dewlemendan li hewa li ba dibin.
Mirovên dewlemend, ji xizanan zêdetir qala tengasiyên aboriyê dikin. *****Feqîr çûn xwe darde bikin, lê nihêrîn ku lingên dewlemendan li hewa li ba dibin.*** *Ji ber girî û gazincên van dewlemendan, newêrim qala feqîriya xwe bikim.*

Feqîr çûne sergînan, manga çûne di behrê de rêx kirine.
Ji bo feqîran jiyan bi her awayî zor e. **Jixwe şansê feqîran hebûya, di feqîriyê de nedi-man.* ***Feqîr çûne sergînan, manga çûne di behrê de rêx kirine.***

Feqîr li şovê çû, darê titûnê di qûnê de çû.
bnr. Feqîr çûne sergînan, manga çûne di behrê de rêx kirine.

Fera qeysê me, bûye reysê (reîs) me.
Yên ji me kêmtir, hatine radeyên mezin û bûne belaya serê me. **De were, dîn mebe.* ***Fera qeysê me, bûye reysê me.***

Fereca xêrê lê vebûn
Kar ber bi başbûnê ve çûn. **Înşelah vê carê* ***fereca xêrê li keçika min vebe*** *û muhtacî kesî nebe.*

Ferek çizmeya Rojkan(*), berdaye pênc hezar siwarên Silîvan.
Rojkan, ji Silîvaniyan xurtir in. *****Ferek çizmeya Rojkan, berdaye pênc hezar siwarên Silîvan.*** *Ma hûn jî bûne siwarê Rojkan?*

Feremoş bûn
Jê aciz bûn. **Di dawiyê de Xanê jî ji wî karî* ***feremoş bû****.*

Feremoş kirin
Dev jê berdan. **Xunavê jî îlelah got û ew kar* ***feremoş kir****.*

Fermana (yekî) dan
bnr. Kindirê (yekî) darvekirin

Fermana dêwê derket rovî xwe veşart.
Yên ku tiliya wan di nav dek û dolaban de bin, bi xwe dizanin û xwe vedizin. *****Fermana dêwê derket, rovî xwe veşart.*** *Her kes bi xwe baş dizane bê ka çi nener (fêl) li serê kê kirine.*

Fermana (yekî) rakirin
Ji bo kesekî biryara kuştin an jî cezayekî xerab dan. **Axayê êlê* ***fermana Nado Begê rakir****, lê giregirên êlê ketin navberê û ew dane baxişandinê.*

(*) **Rojkan:** Li herêma Silwanê (Farqîn) navê eşirekê ye.

Fermana (yekî) xwendin
bnr: Fermana (yekî) rakirin

Feryad û fîgan kirin
Ji ber derd û kulan zarîn kirin. **Ji bo ku bi wî xortî re nezewice keçikê gelekî **feryad û fîgan kir**, lê kesî guh nedayê.*

Fesal lê anîn
Li hember kesekî derfet û serdestî bi dest xistin. **Tam jî di wê dema zor de Ezîzeyê **fesal li Zerdeşt anî**.*

Fesal lê hatin
bnr: Ba (bal) lê anîn

Feş û heş bi ser de hatin
Ketin rewşeke xerab. **İnşelah **feş û heş bi ser wê de bên** ku ew belaya xwe bibîne.*

Fetla xwe derbas kirin
Ji radeya xeternak û girîng derbas kirin. **Nûbiharê, dengê xwe nekir, heta ku **fetla xwe derbas kir**, dû re dest bi daxwazên xwe yên din kir.*

Fêl fistik kirin
Di nav hewldanên xinis û sextekariyê de bûn. **Emana min ji jina min diçe. Ji ber ku pir **fêl û fistikan dike**.*

Fêlbazî kirin
bnr: Fêl fistik kirin

Fêmkor bûn
Di fêrbûnê de astengî kişandin. **Qet ji Delalê tiştekî hêvî meke, ew miroveke **fêmkor e**.*

Fêmber bûn
Têgihîştin, ji dinyayê hin tişt fêm kirin. **Tiştek pê nayê, ew qas jî nekeve tatêlê, ma tu nabînî şikir êdî ew jî **fêmber bûye**, ji rewşê fêm dike.*

Fikar kirin
1. Şik û şupe kirin. **2.** Ponijîn, ketin nav ramanên kûr. **Tu qet **fikaran meke**, ez ê eseh wê pirsgirêkê çareser bikim. **Xembar dîsa **fikaran dike**, gelo vê carê bi çi tiştên pûç re mijûl e.*

Filch li dû ketin
bnr: Siwaran dayîn ser (yekî)

Filch e, li mala xwe ye, çi bi te ye?!
Çi karê te bi yê bêtêkilî ketiye? **Lawo, derdê te çi ye? **Filch li mala xwe ye, çi bi te ye?!***

Filch û pez, kurmanc û gamêş?!
bnr: Hirç û govend, şivan û dîwan?!

Filehê wî aliyê Erez bûn
Xerîb û biyan bûn. **Ma **filehê wî aliyê Erez e** ku tu bi destê wî nagirî?*

Fir û feş bûn
bnr. Ker û gêj bûn

Fira mirîşkê heya enîkê (enîşkê)
Her kesek dikare heya derekê xwe biparêze. **Her kesek dikare heya derekê bireve.* ***Fira mirîşkê jî heta enîşkê.***

Firaqên (yekî) arizî bûn
Ji bo kesên bêtedbîr û bêpergal tê bikaranîn. **Ew mirovekî wisan e,* ***firaqên wî arizî ne.***

Firîna ezmanan
1. Gelekî şad bûn. **2.** Gelekî hêrs bûn. **Bi wê nûçeyê biserketina azmûnê Nîlay **firî ezmanan**. *Dema ku bavê min buhayê wê bihîst, **firiya ezmanan**.*

Firsend bi dest xistin
bnr. Bal lê anîn

Firsend di dest de bûn
Bandor di dest de bûn. **Wê çaxê her **firsend di destê min de bûn**, lê min tiştek pê nekir.*

Firsend jê standin
bnr. Ba (bal) lê anîn

Firsend ji dest çûn
bnr. Firsed ji dest revîn

Firsend ji dest derketin
bnr. Firsend ji dest revîn

Firsend ji dest revîn
Dema lêhatî û pêwîst revandin. **Divê me tam jî di wê demê de bikira, lê sed car heyf ku ew **firsend ji destê me revî.***

Firsend ketin destê (yekî)
Derfet û şans bi destê yekî ketin. **"Ev tarîx di serê sedsala 16'an, li dora salên 1520'an de ye. **Firsendek ketiye destê kurdan** lê wan di navbera hev du de yekîtiyek çênekirine û ji vê firsendê îstifade nekirine."* Süleyman Çevik

Firsend lê anîn
Li hemberî kesekî yan jî tiştekî derfetên serketinê bi dest xistin. **Vê carê jî jinikê **firsend li mêrê xwe aniye**, qet disekine?*

Firsend lê gerandin
Li benda demeke lêhatî bûn. **Agir, **firsend lê gerand** û di dawiyê de dest xiste qirika wî.*

Firsend nedan
Rê û derfet nedan kesekî yan jî tiştekî. **Heke me **firsend bidaya** wî niha îro rewşa te jî xeter bû.*

Firsend winda kirin
bnr. Firsend ji dest revîn

Firşik di devê (yekî) re derxistin
Eziyet pê kirin, aciz kirin. **Wan zarokan wisa kirin ku **firşik di devê Gafûr re derxistin**.*

Firşikê (yekî) pê teng bûn
Bêsebir bûn, hêrs bûn. **"Tu kesî ev yek pêşkêşî wî nekiriye, tenê ev bênamûsiya han, a di gund de ev tirêteke diqewime, **firşikê gundiyan pê teng bûye**, qehûl nekiriye..."* Musa Vazgali

Firtefirt kirin
Ji ber arsim an jî nexweşiyekê pozê xwe kişandin. **Rihan dîsa **firtefirt dike**. Kî dizane li ku sermayê lê xistiye.*

Fisildûman lê xistin
Zor li yekî xistin. **Jinikê wisa **fisildûman li mêrê xwe xist** ku her kes jê metel ma.*

Fişefiş kirin
Ji bo kesên qelew an jî kal û pîr tê gotin. **Wî hingî **fişefiş kir**, min nedihîst ku keçik çi dibêje.*

Fitrê (yekî) xweş kirin
Kuştin. **"...ketibû nava xalîşeyên ku çawa wê ew mêrikê bi wê re bi hev re li ser mîzê bigire û **fitrê wan li wê derê xweş bike**."* Musa Vazgali

Fîkefîk jê çûn
bnr. Fîkefîk kirin

Fîkefîk kirin
Kêfxweş bûn. **Osmên ji xwe re dikanek daniye, **fîkefîk dike**.*

Fîkînî jê çûn
bnr. Fîkefîk kirin

Fît bûn
Wekî hev du bûn. Deyn xelas bûn. **Tu baş têgilûştî ne, deynê me **fît bû**.*

Fîtandina aqilê (yekî)
bnr. Aqilê (yekî) tijî kirin

Fîtefît kirin
bnr. Fîkefîk kirin

Fîtik pê xistin

1. Bi awayekî lezgîn û bi bandor û di demeke pir kin de qedandin. **2.** Di demek kurt de têk birin. **Maşelalı ew qas xortan carekê xwe lê qerase kir, di navîna saetekê de **fîtik bi zeviyê xistin**.* **Her du jî di eynî kîloyê de bûn, lê Cindo **fîtik bi Seyîd xist**.*

Fîtozî bûn

Ji bo kesên gelekî guh didin rindbûna xwe, ser û guhê xwe tê gotin. **Ew birayê min gelekî **fîtozî ye**. Ku vî paltoyî bibîne, dê hema wê gavê bistîne.*

Fîzar fîzar kirin

Ji destê zor û tengasiyê qelsiya xwe diyar kirin. **"Eskerê wî kafirî tenik li xwe dike, lê di her re jî araqê vedixwe, pê germ dibe. h... ewê eskerê me çawa bi wî kafirî re şer bike? **Fîzar – fîzara wan e**, meazelalı!"* Rojen Barnas

Fors avêtin

bnr. Fort avêtin

Fors bi erdê re kişîn

bnr. Fort avêtin

Fors firotin

bnr. Fort avêtin

Fors kirin

bnr. Fort avêtin

Fors şikestin

bnr. Kumê (yekî) kirin çavan

Fors xera bûn

bnr. Kumê (yekî) kirin çavan

Forsa (yekî) kirin qûnê

Yê ku xwe qure dike yan jî lafekiyê dike şikandin. **Qafûrê Sedo ji ber erebeya xwe zelıf fors dikir, lê Baran **forsa wî kire qûnê**.*

Forsa (yekî) lê derbas bûn

Gotin û daxwazê, rûmet dîtin. **Dibe ku **forsa te li wî welatî derbas bibe**, lê li vir tiştekî wer qet hêvî meke.*

Forsa qûna xwe avêtin

Hem di nav rewşeke neyînî de bûn, hem jî xwe qure kirin. **Yaho ev bi çi aqilî xwe qure dike? Kuro ev **forsa qûna xwe diavêje**?*

Fort avêtin

Ji ber hin derfet an jî destxistin û zêdehiyên erênî, xwe qure kirin. **"... Demên din jî mercedesa Hecî Yaşar di bin wî de bû, **fort diavêtin**."* Felat Dilgeş

Fûrefûr kirin

bnr. Fûrîniya hespê boz bûn

Fûrîniya hespê boz bûn

Bibandor bûn. **Maşelalı **fûrîniya hespê boz e**. Kî dikare li pêşiyê bisekine?*

G

Ga bike, ga bixwe, lê tane (golik) û tolik wê çi bixwin?
Her çiqas ên bihêz mafê wan zêde be jî, ji bo yên virnî û bêhêz jî derfet û dadmendiyek divê. **Her tişt li gorî xwesteka mezinan nabe.* ***Ga bike, ga bixwe, lê tane û tolik wê çi bixwin?***

Ga birin li cem kerê girê dan
Karên çiloçepî kirin. **Ew jixwe wisa bêfêm e,* ***ga dibe li cem kerê girê dide.***

Ga dikirim dibe golik, genim diçînim dibe şolik.
Bêşans bûn. **Ez mirovekî bêyom û bêrozgar im.* ***Ga dikirim dibe golik, genim diçînim dibe şolik.***

Ga guhirande bizinê, bizin jî guhirande mirîşkê.
Ji bo yên bi hesabên xwe nizanin tê gotin. **Ew çi zane ji bazirganiyê?* ***Ga guhirande bizinê, bizin jî guhirande mirîşkê.***

Ga ket, boçik li xwedî.
Ji bêgavî karê herî zor xwediyê skûrê dike. **Lê kî wê bi boçika birêx bigire? Helbet xwedî;* ***ga ket, boçik li xwedî.***

Ga nanale, barê ga dinale.
bnr. Yê li bin deng nake, yê li ser qareqar dike

Ga rakirin, golik li pey xistin
Komplo û îftira kirin. **Lawo hê tu wan baş nas nakî. Ew* ***ga radikin û golikê jî li pey dixin.***

Ga û gîsn li hev asê bûn
Ji bo rewşa berevajî û biinyad tê bikaranîn. **Kuro derdê wan çi ye, ma* ***ga û gîsnê wan li hev asê bûne?***

Ga û golik li bal (yekî) yek bûn
Merd û destvekirî bûn. **Tu nikarî di wê derbarê de çavê wî bitirsînî, Xwedê dizane* ***ga û golik li bal wî yek in.***

Ga û golik tev derdan

Ziyaneke mezin dîtin. **Heçî Soro ye, qet li halê wî nepirsin wî* ***ga û golik tev derdan e****.*

Gagîrî bûn

Ji bo kesên helwest ne zelal û teptepî tê bikaranîn. **Ciwangul miroveke* ***gagîrî ye****, wê çi bike ne kifş e, tu bi wê zêde bawer nebe qurban.*

Galegal kirin

1. Li ser xwe bûn, bibandor bûn. (Zêdetir ji bo kalên pir jîr tê gotin.) **2.** Ji bo dengbêjên ku serkeftî ne jî tê bikaranîn. **Maşelah Apê Osê heftê û çar salî ye, lê wa ye* ***galegal dike****, qet xort jî ne wekî wî ne. *Dema di nav civatan de Xalê Evdilrezaq destê xwe dibe guhê xwe tu lê mêze bike, çawa* ***galegal dike****.*

Galfal lê xistin

bnr. Tehn û niç lê xistin

Galgalên êvarê kirin, sibe ji bîr kirin.

1. Ji bo kesên ne li ser xwe û zêna wan qels bûye tê bikaranîn. **2.** Ji bo kesên sextekar û derewîn jî tê bikaranîn. **Dev ji wî berde lo. Ew êdî kal bûye,* ***galgalên ku êvarê dike, sibe ji bîr dike****. *Guh nede wî tolazî, ew* ***galegalên ku êvarê dike, sibe ji bîr dike****.*

Galteyên xwe pê kirin

Pê henekên xwe kirin. **Tu li wî menêre, ew tim wisa* ***galteyên xwe bi Xebatê xwarziyê xwe dike****.*

Gamêşê mêran bûn

Xurt û bihêz bûn. **Evdal* ***gamêşê mêran e****, rebenê Ûsiv çawa bi wî bikare?*

Gan li Gewro, cirm li Îso

bnr. Gayîn li Mûso, cirm li Îso

Gavan ber bi mal bû, jina gavan şixulkar bû.

bnr. Garan hatc zeviyê, jina gavan nû rahişte teşiyê, gavan got: "Ez xulama wê paşiyê."

Garan hatc zeviyê, jina gavan nû rahişte teşiyê, gavan got: "Ez xulama wê paşiyê."

Hinek tenê ji bo xuyangê karan dikin. **Gavano, rebeno!..* ***Garan hate zeviyê, jina gavan nû rahişte teşiyê, gavan got: "Ez xulama wê paşiyê."***

Garisê hûr ji kefa destê (yekî) nerijîn

Pir temahkar û xesîs bûn. **Kes nikare bi wî re karekî bike,* ***garisê hûr ji kefa destê wî narije****.*

Garisê xwe li ser werisê (yekî) raxistin

Bi yekî re hevkariyek nerast kirin. **Lawo min ji te re got ew ne mirovekî baş e,* ***garisê xwe li ser werîsê wî ranexe****.*

Garisê xwe nedan ser werîsê (yekî)

bnr. Garisê xwe li ser werîsê (yekî) raxistin

Gas û werîs di destê (yekî) de bûn

Derfetên wekî dilê xwe di dest de bûn. **Gas û werîs di destê Sûdenazê de ne, çawa dixwaze, dikare wisa bike.*

Gav avêtin

1. Dest bi karekî kirin. Dest pê kirin. **2.** Di karekî de pêşve çûn. **A girîng ew e ku tu **gav biavêjî**, ji wê bi şûn de ew qas jî ne zor e. *Min ji we hemûyan re negot? Heta em **gav neavêjin**, kes ji bo pêşerojê bi me bawer nabe.*

Gav bi gav li pey bûn (ketin)

bnr. Pê bi pê li pey çûn

Gava (yekî) bi gavê negirtin

Bêîstikrar bûn. **Tu bi wan gotinên wê ewle nebe, çimkî **gava wê bi gavê nagire**.*

Gava ez ciwan bûm, bitîr û kevan bûm; gava ez kal bûm, notirvanê şikefta keviran bûm.

Pir kalbûn, bêrûmetiyê jî tîne ber derê mirov. **Gava ez ciwan bûm, bi tîr û kevan bûm; gava ez kal bûm, notirvanê şikefta keviran bûm. Belê ezbenî kalbûn û pîrbûn, mirov bêrûmet jî dike.*

Gava xwe bi paş ve avêtin

Ji gotin û kirinên xwe vagêr bûn. **Dilê wê jî nedixwest, lê ji bêgaviyê **gava xwe bi paş de avêt**.*

Gavan hat zeviyê, jina gavan nû bezî teşiyê.

bnr. Garan hate zeviyê, jina gavan nû rahişte teşiyê, gavan got: "Ez xulama wê paşiyê."

Gavan xeyidî nanê xwe berhev nekir, hew dizanibû gundî dê hev du qir bikin.

bnr. Gavan xeyidî neçû ber garanê, hew dazinibû dewar dê li bestê bimîne.

Gavan xeyidî neçû ber garanê, hew dazinibû dewar dê li bestê bimîne.

Hin kes hew dizanin ew ku nebin, tu tişt nameşe û wê tevlihev bibe. **Gavan xeyidî neçû ber garanê, hew dazinibû dewar dê li bestê bimîne. Ev belengaz jî xwe bi tiştekî zêde dihesibîne.*

Gavek berî gavekê

Demek pêşdetir. **Çi dibe bila bibe, divê **gavek berî gavekê** diyalogek di navbera her du seriyan de dest pê bike.*

Gavek zûtirîn

bnr. Gavek berî gavekê

Gaveke bi dê û bav avêtin

Karekî bi rêk û pêk û têkûz kirin. **Heke tu dixwazî bi ser bikevî, divê tu di zûtirîn demê de **gaveke bi dê û bav biavêjî**.*

Gayekî Xwedê bûn

Ji bo kesên ji tiştekî fêm nakin û bêlebat in tê bikaranîn. **Ew **gayekî Xwedê ye**, ji tiştekî jî fêm nake, hûn çi ji wî hêvî dikin?*

Gayê bin gêrê bûn

Ji kesên kêrnehatî û teral re tê gotin. **"**Bûye gayê bin gêrê**, nikare ji cihê xwe rabe."* Qahir Bateyî

Gayê cot e, lê belê cot nake.

Binbariya xwe bi cih neanîn. **Erê rast e, **gayê cot e, lê belê cot nake**.*

Gayê dîz kulozan bûn[*]

Milayîm û sernerm bûn. **Ji ber ku sernerm e, jê re dibêjin, **gayê dîz kulozan e**.*

Gayê min e, ez bi xuysetê (xislet) wî dizanim.

Malê min e, ez baş dinasim. **Bila kes wî bi min nede nasîn, **gayê min e, ez bi xuysetê wî dizanim**.*

Gayê min e, ne ji cot re, lê ji gûjgûjê re camêr e.

Ji karê zor re na lê ji kêf û zewqê re û ji karên sivik re pir xurt e. **Dibêjin: **"Gayê min e, ne ji cot re, lê ji gûjgûjê re camêr e."** Rewşa Baroyê hevalê min jî tam wisa ye.*

Gayê min ne li garanê ye, galgala nanê gavan dikim.

Ji bo kar û gotina vala û bêbingeh tê bikaranîn. **Xwedê aqil û sewda ji min sitandiye. **Gayê min ne li garanê ye, galgala nanê gavan dikim.***

Gayê qol ê reş tiştek neaniye û tiştekî jî nabe.

Mirov çi bike dê wekî wê jî bersivê bibîne. **Qet xwe neêşîne bira. Wekî wê meseleya ku dibêjin: **"Gayê qol ê reş tiştek neaniye û tiştekî jî nabe."** Ew jî were ye.* (bnr. çîrok)

---

[*] **Gayê dîz kulozan:** Di dema koçbarkirina zozanvan û koçeran de ji bo firaq û alavên wekî dîz, şûşe û îskanan ku zû dişikên, ango ji bo dîz û kulozan, gayên pir sernerm û pêgiran tên hildibijartin. Ji van gayan re gayên dîz kulozan tê gotin

"Gayê qol ê reş tiştek neaniye û tiştekî jî nabe."

Du heb mirov ji hev du re dibin destbira. Mala yekî li çiyê bûye, xwediyê pez û dewar û sewalan bûye. Yê din jî mala wî li deştê bûye, rez û baxên wî hebûne, rewşa wan a aborî jî baş bûye. Rojekê yê ku mala wî li çiyê ye, sibehê zû radibe û ji jina xwe re dibêje:

"Jinik, ez dixwazim îro herim mala destbirayê xwe yê li deştê. Ji zarokan re hinek sêv, hurmî, tirî, zebeş, bacan, xeyar û her wekî din bînim. Bila zarok bixwin û kêf bikin." Jinik dibêje:

"Mêrik de ku wisan e, bisekine ez jî hinek rûn, penêr, toraq, mast û her wekî din têxim barê gayê te, eyb e, qet nebe destevala û bi rûyê reş neçe mala birakê xwe." Mêrik mirovekî pir temalıkar bûye, dibêje:

"Na jinik tiştekî wer ne hewce ye. Çima em rabin malê xwe bidin wan?" Ji qesîsî gotina jina xwe nake. Têreke vala diavêje ser pişta gayê xwe yê qol û reş, dide pêşiya xwe û dikeve rê. Pir dajo, hindik dajo, xwe digihîne deştê û diçe mala destbirayê xwe. Destbirayê wî ne li mal bûye. Jina birakê wî gayê wî dibe tewlê, êm dike afirê gê. Tê malê ji destbirakê mêrê xwe re xwarinê çêdike dide ber, dû re çaya wî amade dike. Welhasil di ezet û hurmeta xwe de tu kêmasiyekê nake. Demek dirêj derbas dibe, êdî berî êvarê divê ku vegere mala xwe, lê mêrik mêze dike ku jina destbirakê wî qet xwînê ji xwe bernade. Ji bo rez û êmîş (fêkî) û her wekî din tu hewldanek an jî amadekariyekê nake. Demekê dîsa li bendê dimîne ku jinik rez û mêwe dagire, lê dîsa tu hewldan nîne. Dî dawiyê de gumana xwe tam dibire û ji jinikê re dibêje:

"De tu ji xêra xwe, gayê min ji tewlê derxe, riya min dûr e, ez hêdî hêdî bi rê kevim." Jinik gayê wî ji tewlê derdixe, cila wî û têra vik û vala diavêje ser. Mêrik mêze dike ku wa ye bi rastî jî jinikê têra vala avête ser pişta gê. Mêrik hema şiva xwe hildide, xwe digihîne gê û li ser hev bi şivê li gê dixe. Jinik hêrs dibe û dibêje:

Gayê reşo ku dera te diêşe.
bnr: Gayê reşo te çi xwariye? Tirşo!

Gayê reşo te çi xwariye? Tirşo!
Ji bo kesên ku pir lêdan xwarine tê gotin. **Nadir û her du kurên wî pêşî li Sedo girtine û **gayê reşo te çi xwariye? Tirşo!** De lê dane, de lêdane...*

Gayîn li Mûso, cirm li Îso
Hinek dikin hinek jî dikevin belaya wan. **Ev çi bêdadiyeke ecêb e. **Gayîn li Mûso, cirm li Îso.***

Gaz jî di dest te de ye, top jî, çawa dipîvî, bipîve.
Derfet di destê te de ye, çawa dixwazî wisa bike. **Kê ji te re çi gotiye? **Gaz jî di dest te de ye, top jî, çawa dipîvî, bipîve.***

Gazî miriyan kirin
Ji bo kesên tenduristî û siheta wan nebaş tê gotin. **Xalê Xelef êdî **gazî miriyan dike**.*

Gebûl e, xwedî qebûl e.
bnr: Arpelûr e, xûy qebûl e

Gede gûde
Hê zarok bûn, nezan bûn. Hempa nebûn. **Ji te tika dikim, ew hê **gede gûde ne**. Tu çawa min bi wan re dikî tayê tereziyê dayê?*

Geh dibire, geh dikire.
Serê carê bi awayekî dike. **Kî dizane Rustem dê çawa bike, **geh dibire, geh dikire**.*

Geh digirî, geh dikene.
Ji rewşa bêîstikrar û neasahî re tê gotin. **Ew **geh digirî, geh dikene**. Tu weke wî bikî tu çûyî.*

Geh kêfxweş e, geh vedireşe.
bnr: Geh digirî, geh dikene.

Geh tîr dike, geh rehn dike.
Çawa dixwaze, berjewendî û hestên wî çawa bin, wer kirin. **Tu bi ya wî mêze bikî nabe, çimkî ew **geh tîr dike, geh rehn dike**.*

Gem li devê (yekî) xistin
Di bin bandora xwe de girtin. **Jinikê wisa **gem li devê Mihacir xistiye** ku wekî hespekî destkêş bi ku de dikişîne, bi wir de diçe.*

"Birawo, tu qet ji Xwedê natirsî? Tu çi ji wî heywanê bêzar û bêziman dixwazî?" Mêrik dibêje:
"Xweha min, hey tu nizanî, vî mîratê mirat, min rûn lê bar kir, nehanî, min penêr û toraq lê bar kir, nehanî; min kir û nekir wi da tîzan û tu bar neanî vir." Jinika zana û kone bi awayekî nerm û bi aram jê re dibêje:
"Birako min jî zanibû dê bide tîzan, loma min jî ji we re tirî, sêv hirmî, zebeş, hinar, bacan û her wekî din danegirt. Tu qet li wî heywanî nexe. 'Gayê qol ê reş tiştek neaniye û tiştekî jî nabe.'"

Gema (yekî) kişandin (kaş kirin)

Pêşiya yekî girtin, şiyar kirin, îqaz kirin. **Evdilê Silho lê nêrî ku lawê wî gelekî bi pêş ve diçe,* ***gema wî kaş kir****.*

Gen lê ketin

Ko bûn. **Berê ji tûjbûnê kesî nikaribû pê re bipeyîve, lê niha* ***gen lê ketiye****.*

Genefisî kirin

Xayînî, fesadî û sextekarî kirin. **Malbata meta min* ***genefisiyan dike****. Li cem xelkê ez fedîkar dibim.*

Genim avêtin,´ceh çinîn

Ketin xisarê. **Xwedê ku li merivan dibire,* ***genim diavêje, li şûnê ceh diçîne****.*

Genim tune, ceh kêm e.

Rewş xerab e. **"Halê wan? De ka ew ê halê wan çawa be?* ***Genim tune ceh kêm e.*** *Hêsîr dar dihêrin, arê daran li nav arvan dixin, dikin peksîmat û dixwin."* Rojen Barnas

Gepek nan bi dest xistin

Bi dijwarî debara xwe kirin. **"Nedihişt kes bi rehetî* ***gepek nan bi dest bixe*** *û nedihişt kes di qiraxa çavên xwe re li hêla pisîkên me binihêre."* Yaqûb Tilermenî

Ger agir be wê xwe bişewitîne.

Ew nikare ziyanekê bide. **Çi ye, hûn wisa gûyê wî li ser serê wî dixin?* ***Ger ew agir be, wê tenê xwe bişewitîne.***

Ger bi min e, ji bo min e.

Heke min kiribe, baş e, rast e. **Her ez vê dizanim;* ***ger bi min e, ji bo min e****.*

Gergermok gerandin

Ji bo tiştekî aciz bûn, di tatêlê de bûn. **Wexta birayê wî li ser maseya emeliyatê li ber xwe dida, Dewrêş jî li ber derî* ***gergermok digerandin****.*

Geriya li ser avan, hilanî ji çiravan.

1. Di nav hebûnên mezin de, tenê li tiştinên piçûk xwedî derketin. **2.** Ji yên, mezin û zêde na, lê ji yê piçûk sûd wergirtin. **Ew jî nesîb e,* ***geriyam li ser avan, min hilanî ji çiravan****. *Wî jî wer hêvî nedikir, lê* ***geriya li ser avan, hilanî ji çiravan****.*

Geriyam li dora dinê, xelas nebûm ji mirinê.

bnr: Ez geriyam li Şam û dinê, xelas nebûm ji mirinê.

Germê qijilandin (Germê qijeqij kirin)

Zehf zêde germ bûn. **"Havîn bû,* ***germê diqijiland****. Heyata komîsarîta nehiyê ya ekseriyê tijî meriv bûn."* Emerîkê Serdar

Geşe pê dan

Girîng girtin, rûmet dan. **Me* ***geşe pê dan****, lê ew ne layiqî wê rûmetê bû.*

Gevezeyan avêtin dojehê, gotin: "Çiqas sar e."
Ji bo kesên bêar tê bikaranîn. *Xwedê kesî meke rewşa wan, ***Gevezeyan avêtin dojehê, gotin: "Çiqas sar e."***

Gewriya xwe qelişandin
Gotinek gelekî dubre kirin. Zêde axaftin. *Yaho min ew qas ji we re got, ***gewriya min qelişî***, hûn hê jî tênagihîjin.

Gewriya (yekî) qul bûn
Zehf xwarin xwarin. *Maşelah ***gewriya Salo qul e***, hema tu çiqasî bidiyê, nabêje na.

Gewrî ji gustîlê derketin
Zêdetir ji bo jinên bedew û stû spehî tê bikaranîn. *Maşelah mirov ku li Xasê dinêre, tu dibêjî ***gewrî ji gustîlê derketiye***.

Gewz bûn
Şad bûn, serfiraz bûn. *Bi derketina lawê xwe yê girtîgelhê xaltiya Asiya ***gewz bû***.

Gêj û efter bûn
Ji êqil kêm bûn. *Ew yekî ***gêj û efter e***. Digel vê yekê jî xwe li şûna mirovan dihesibîne.

Gêjo mêjo bûn
Hay ji xwe tune bûn, di nav nezanî û sergêjiyekê de bûn. *Ji ber handora wê bûyerê ez ***gêjo mêjo bûbûm***.

Gêsinê (gîsinê) di çavê xwe de nabîne, derziya di çavê hevalê xwe de dibîne.
Kêmasiya xwe na, lê ya xelkê zû dîtin. *Ew jî wekî gelek mirovan ***gêsinê di çavê xwe de nabîne, derziya di çavê hevalê xwe de dibîne***.

Gidiyo, merzelê li pêş malan bi çavên xwe diyo.
Kirinên wî min bi çavên xwe dîtine. *Hûn çi dibêjin, bibêjin, got: ***"Gidiyo, merzelê li pêş malan bi çavên xwe diyo."***

Gihîştime kê "merheba", ji xwe re tîne heft heba(n).
Her kes li berjewendiyên xwe difikire. *Her kes li rewşa xwe mêze dike. Gihîştime kê "merheba", ji xwe re tîne heft heban.

Gihîştin mirazê xwe
Gihîştin armanc û daxwaza xwe. *"Heta ku gelê me şiyar nebe û li ser pirsgirêkên welatê xwe nexebite, em ***nagihîjin mirazê xwe***." Süleyman Çevik

Gilêya bigû ye, ne bi destan ne bi devan tê vekirin.
Ji bo kêşeya bêçare yan jî binakokî tê bikaranîn. ****Gilêya bigû ye, ne bi destan ne bi devan tê vekirin.*** *Ez rebenê Xwedê çawa bikim, nizanim.*

Gilêz (girêz) bi dêv ketin
Pejmûrde û sist bûn. *Ez wî baş nas dikim, ***gilêz bi devê wî dikeve***.

Giliyê xwe zanebûn
Hay ji axaftina xwe hebûn. **Em hemû bi wî bawer in, em dizanin ku ew **giliyê xwe dizane**.*

Giliyekî wisa bibêje, bila sêl nanê te bipêje.'
Tiştekî bimantiq û dadyane bibêje, ango bêdadiyê meke ku karê te bila baş bimeşe. **Ji te tewaqe dikim, **giliyekî wisa bibêje, bila sêl nanê te bipêje**.*

Giliyên ku porê mirov pê spîbûyî gotin
Ji bo axaftinên pir balkêş, yên mustehcen û hwd. tê gotin. **Belê zarok e, lê **giliyên ku porê mirov pê spî dibe, dibêje**.*

Giliyên (yekî) li rûyê wî xistin
Gotinên yekî yên nebaş, li rûyê wî xistin. **Erê, Kemal hêrêtî kir, lê divê te dîsa jî ew **giliyên wî li rûyê wî nexistana**.*

Gilî avêtin devê (yekî)
Ji yê di tengasiya bersivê de mayî re alîkarî kirin. **Eslanê Miçê lê nihêrî ku vilevila devê Muxlis e nikare tiştekî li hev bike, **gilî avête devê wî** û ew ji wê tengasiyê rizgar kir.*

Gilî avêtin (yekî)
bnr. Pilindar avêtin (yekî)

Gilî bi şekir birîn
Dema ku yek dipeyîve, ji bo ketina navbera axaftina kesekî bi nazikî tê gotin. **Kekê, min **giliyê te bi şekir birî**, lê divê em jî lûn tiştan bibin.*

Gilî di ber (yekî) re avêtin
Di nav axaftinê de peyam (mesaj) dan. **Ez jî têgihîştim ku **giliyan di ber min re diavêje**.*

Gilî di bin de kişandin
bnr. Gilî jê kişandin

Gilî di qirikê de man
Di axaftinê de astengî kişandin. *****Gilî di qirikê de man.** Nikaribû biaxive û derdê xwe bibêje.*

Gilî gerandin
Gilî û gotinên ku bihîstine li vir û wir gotin. **Keçikeke baş e, **lê giliyan digerîne**.*

Gilî jê derxistin
bnr. Gilî jê kişandin

Gilî jê kişandin
Bi konevanî sir û agahî ji yekî girtin. **Ew pîrepisk ketin bin bûka min û **gilî jê kişandin**, heya ku konê min danîn.*

Gilî mezin kirin

Gotinên ne girîng, gelekî girîng girtin. **Xwedê jê razî,* ***giliyan gelekî mezin dike****.*

Gilî neanîn ser xwe

Ji bo rexne û tawanbariyê, fîrsend nehiştin. **Ew jineke wisa qoçax e ku zû bi zû* ***giliyan nayîne ser xwe****.*

Gilî neketin qawa sipîşkê

1. Wekî hev nefikirîn. **2.** Bi hev û din re debar nekirin. **Kuro lawo,* ***giliya min û te çima qet rojekê nakeve qawa sipîşkê****? *Erê, mêr û jinê hev in, lê tu car* ***giliyên wan nakeve qawa sipîşkê****.*

Gilî tê de neçûn

Zû xeyidîn, tingijîn, xolî bûn. **Heyran, ma mirov dikare bi Narînê re bipeyîve?* ***Giliyek tê de naçe.***

Gilî û gazinên xwe li hev kirin

Rexne û daxwazên xwe ji hev û din re gotin. ****Gilî û gazin li hev û din kirin*** *ne xerab e, lê mixabin gelek caran dibe sedema pevçûnên nû.*

Gilogapanî bûn

Ji bo kar û bar an jî tiştên hewlo gewloyî û ne xweşik tê gotin. **Jixwe karên Teyroyê Silo hema tim wer* ***gilogapanî ne****.*

Gilpgilpî xweş bû, gilpgilpî ne xweş bû.

Hinek xweş bû hinek jî ne xweş bû. ****Gilpgilpî xweş bû, gilpgilpî ne xweş bû.*** *We jî wekî wî mêvanî aniye serê min.* (bnr. çîrok)

Ginegin kirin

Bi awayekî nezelal û di pozê xwe de axaftin. **Weleh hema* ***ginegin kir****, lê min qet tiştek jê fêm nekir.* (qerf)

Gir jê girtin

Jê aciz bûn, lê xweş nehatin. **Ji te tika dikim, qala wî meke, ez* ***gir ji wî digirim****.*

Gira xwe tê dan

Belaya xwe pê venîn. **Hevraz kirin, berjêr kirin, lê di dawiyê de* ***gira xwe tê dan****.*

Giramî pê dan

Rûmet û hêjahî nîşan dan. **Heke wan ew qas* ***giramî pê nedana****, wî jî nikaribû ew qasî li wir bisekine.*

"Gilpgilpî xweş bû, gilpgilpî ne xweş bû."

Zebeş û petîx tev hûr kirine û dane ber mêvan û di dawiyê xwarinê de jî jê pirsîne:
"Xwarina te çawa bû?" Mêvan dibêje:
"Gilpgilpî xweş bû, gilpgilpî ne xweş bû."

Giran bûn

1. Hemîle bûn. Avis bûn. **2.** Ji bo kesên zêde napeyîvin û biaqil tevdigerin tê bikaranîn. **3.** Di tevger û hewldana xwe de sist bûn. **Divê ji vir û bi şûn de bûka me karên giran meke, çimkî ew* ***giran e****. *Tu nekeve tatêlê, Mistefa mirovekî* ***giran e****, bi tiştên wisa re mijûl nabe. *Rizgar gelekî* ***giran e****, divê we yekî din bişanda ku zû bihata.*

Giran xeber dan

Giliyên xerab gotin. **Bi rastî jî Faris wisa* ***giran xeber da*** *ku min li şûna wî fedî kir.*

Giranbuha bûn

Birûmet û binirx bûn. **Tiştên wer bimerîfet jî, bi xwezayî ew qasî* ***giranbuha ne*** *kekê min.*

Giraniya xwe dayîn ser ...

Dêhn û bala xwe zêdetir li ser kûr kirin. **Ev çendek e ku parlemena Tirkiyeyê* ***giraniya xwe daye ser cezayê dardekirinê****.*

Giraniyekê bi ser (yekî) de girtin

Di hêla tenduristî yan jî moral de ketin nav rewşeke ne xweş. **Vê êvarê piştî xwarinê ji nişka ve* ***giraniyekê di ser min de girt****.*

Girar xweş e, geh li mala we, geh li mala me.

bnr. Got: "Apo, şorbeya we pir xweş e." Got: "Lawo rojekê li mala me, rojekê li mala we."

Girara ku para min ne tê de be, bila jehr tê de be.

bnr. Ew ceneta ku ez ne tê de bim, bila ker tê de vegevizin.

Girara Leylo (a) lepeyî, em di êvar de li peyî

Ji bo tiştekî ne hêja, ked xerc kirin û hêvîdar bûn. **Qet nebe bila ew yek li ber wî zehmetî keta ew jî tiştek bû.* ***Girara Leylo lepeyî, em di êvar de li peyî.***

Girara serbidew e, dixwî, nexwî ew e.

Ya heyî ev e, tu divê biecibîne, tu nevê neecibîne. *****Girara serbidew e, dixwî, nexwî ew e.*** *Tu çawa dixwazî, wilo bike.*

Girara xwe di devê xwe de çêkirin

Bi xwe çareya serê xwe dîtin. **Lorîcan jineke wisa bi merîfet e ku* ***girara xwe di devê xwe de çêdike****.*

Girê û beriyên (yekî) ji xelkê re man

Wekî tirane di wateya "Ma mal û milkê wî/wê tune bû" de tê gotin. **Erê eman ha, bila* ***girê û beriyên Gulnazê ji xelkê re nemîne****.* (qerf)

Girê li pişt ketin

bnr. Girêk li pişt heçikê ketin

Girê te netemire.

Ji Xwedê dixwazim* ***girê te netemire**.* (nifir)

Girê xwe avêtin hundir
Kîna xwe nîşan nedan. **Erê, ew xwe kifş nake, lê **girê xwe diavêje hundir**.*

Girê xwe bi destê xwe vemirandin
Bi xwe çareseriya xwe dîtin. **Heta ku mirov **girê xwe bi destê xwe venemirîne**, dilê mirov rehet nabe.*

Girê xwe bi destên min derman neke.
Min ji bo kar û berjewendiyên xwe neke sedem. **Ez ne destiyê dasê me. **Girê xwe bi destên min derman neke**.*

Girê xwe pê xurandin
Belaya xwe yekî gerandin. **Ev hêbav dixwaze **girê xwe bi min bide xurandin**, vêca serê min dê têkeve belayê.*

Girê xwe tê dan
bnr. Girê xwe pê xurandin

Girêdayî hev du bûn
Bi hev du re sax û durist bûn. Ji hev û din hez kirin. **Kes nikare têkeve navbera wan, ew **girêdayî hev du ne**.*

Girêk ketin qirika (yekî)
Ji ber pirsgirêkekê gelekî aciz bûn. (Ji ber wê jî di axaftinê de astengî kişandin.) **"Dema min ew mesele seh kir û nekir, ew mêrikê ku serberjêrî herdabûn bîrê, hate ber çavên min û **girêkek kete qirika min**."* Evdile Koçer

Girêk li pişt heçikê ketin
Ji pirsgirêk û kêşeyan xelas bûn. Karê xwe qedandin. **Divê heta ku **girêk li pişt heçikê keve** tu li ber xwe bidî.*

Girêka xwe bi destê xwe vekirin
Pirsgirêka xwe bi xwe çareser kirin. **"Ma ji destê Bengîn û Meyro çi dihat? Wan ê bi alîkariya Evdal **girêka xwe bi destê xwe vekirana**."* Mehmed Uzun

Girêş der bûn
Xerabiyek bi serî de hatin. **Bila **girêşa wî der be**, ev bela di rûyê wî de hat serê min.*

Girî di gewriya (yekî) de bûn gilok
Li ber xwe ketin, xemgîn bûn. **"Belê Firda nehat, neçar em çûn nav nivînên xwe. Ji hêçaretî **girî di gewriya me de bûbû gilok**."* Felat Dilgeş

Girî di qirikê de man
bnr. Girî di gewriya (yekî) de bûn gilok

Girmegirm kirin
bnr. Girmînî jê anîn

Girmînî jê anîn

Bi bandor pêk anîn. **Belê pêk anî? Welehî hem jî **girmînî jê anî**.*

Girmîniya defê bûn

Ji xwe re kêf kirin. **Me tiştinên din hêvî dikirin, lê em çûn ku çi bibînin, wa ye **girmîniya defê ye**.*

Girtin (hildan) ser xwe

1. Berpirsyarî yan jî gunehek pejirandin. **2.** Gotin û kirinên qet ne têkildar jî xolî bûn, bi weswese û xemxwar bûn. **"Min debara wan **girtiye ser xwe**."* Zana Farqînî **Min ew gotin ji bo Serkar got, Zeydan **girte ser xwe**.*

Girtiyo, kuştiyo, di ber xelkê de

Ji bo hinekên din xwe feda kirin. ****Girtiyo, kuştiyo di ber xelkê de.** Malxirabûyî, ne ji bo xwe, lê ji bo berjewendiyên kesên biyanî xwe tengezar dike.*

Gişk di gûna hev de bûn

Hemû wekî hev bûn. **Welehî kesekî zêde baş an jî zêde xirab di nav de tune. **Gişk di gûna hev de ne.***

Gişk ji qûnekê ketin

Hemû jî lêzimê hev bûn. **Çi derka wan heye? **Gişk jî ji qûnekê ketine.***

Gişt birê birê ne, gişt kurê Mistefê ne.

Hema bigire hemû jî wekî hev in. **Ma tu ferqekê tê de dibînî? **Gişt birê birê ne, gişt kurê Mistefê ne.***

Givir û goşt bûn

Pir qelew bûn. **Keçik wisa **givir û goşt bû** ku dema ku bi rê ve diçû, erd dihejiya.*

Givrik jimartin

Ji bo mêrên ku alîkariya jinan dikin, ango karên jinan dikin tê bikaranîn. **Kuro ma ew jî mêr e, hema heya êvarê tenê **givrikan dihejmêre**.*

Gîha li ber gur e, goşt li ber mîhê (berxê) ye.

Ji bo karên çiloçepî û berevajî tê gotin. **Ma çawa rewş xweş be? **Gîha li ber gur e, goşt li ber mîhê ye.***

Gîsikên par hevrû bûn

Yên piçûk mezin bûn. **Maşelalı **gîsikên par hevrû bûn**.*

Gîsk dibêje: "Çirt û çirt sibatokê, ez gihame adarokê, bezê kevnê di kuwarokê."

bnr. Gîsk dibêje: "Tirt û tirt sibatokê, ez gihame xwehka xwe adarokê, va min xwar serê gingilekê."

Gîsk dibêje: "Tirt û tirt sibatokê, ez gihame xwehka xwe adarokê, va min xwar serê gingilekê."

Li herêma Tor û Botan ji bo xedariya meha sibatê û xweşbûna (nermbûna) meha adarê tê gotin. **Ma we nebilûstiye, gîsk dibêje:* ***"Tirt û tirt sibatokê, ez gihame xwehka xwe adarokê, va min xwar serê gingilekê***

Gîsnê xwe lê xistin

Tesele kirin, rewş kontrol kirin. **Bawer im ku beriya çûyînê, wî* ***gîsnê xwe li wir xistibû***.

Golik e, diçe li cem gayê mezin rêx dike.

Xwe zêde hesibandin. Bi hedê xwe nezanîn. **Heyran ka Qadir çawa xwe gir dikuje?* ***Bi xwe golik e, diçe li cem gayê mezin rêx dike.***

Golik tune bimije, xesû tune bikuje.

Ji bo azadbûna bûkan an jî kesan tê gotin. **Wê ji çi talaş bike?* ***Golik tune bimije, xesû tune bikuje.***

Golika li ber benê me ye.

Di bin bandora me de ye. **Tu ji bo Azad fikaran neke, ew* ***golika li ber benê me ye***.

Golikê beş, ma li (ber) devê deriyê reş.

Malwêran û wêrtaz bûn. **Ka di wî de çi ma?* ***Di dawiya dawî de golikê beş, ma li ber devê deriyê reş.***

Golikê soro, te çi xwariye?

bnr. Gayê reşo, te çi xwariye? Tirşo!

Golikên ber çêlekan, rabûne, dibêjin em ga ne.

Ji bo yên xwe ji asta xwe zêdetir dihesibînin û mezin nîşan didin tê bikaranîn. **Tu li min û van binêre kuro.* ***Golikên ber çêlekan, rabûne dibêjin em ga ne.***

Golikên me serê xwe li dîwaran dixin, dibêjin: "Em jî ga ne."

bnr. Golikên ber çêlekan, rabûne, dibêjin em ga ne.

Gor bi gor herin ser ava şor.

Bila bicehimin. **Ew* ***gor bi gor herin ser ava şor****, wan em hetikandin.*

Gor cehenem bûn

Bila biqeşite. **Tu çi li pey wê ketiyî? Nayê, bila* ***gor cehenem be***.

Gor lê teng bûn

Ezab kişandin. **Mirov ku baş be,* ***gor lê teng nabe***.

Gora xwe bi destê xwe kolan

Di nav hewldana ziyana xwe de bûn. **Me got jî lê fêm nekir ku* ***gora xwe bi xwe dikole***.

Gora hev kolan

Di nav hewldana ziyana li hemberî hev du de bûn. **Her du jî li rûyê hev dikenin, lê li piştê hev du de jî* ***gora hev dikolin***.

Gora (yekî) kolan
Di pişt kesekî de amadekariya ziyanê kirin. **Mehemed hay pê nîn e ku Kamer di pişt de **gora wî dikole**.*

Gorî makê, golik pakê
Ewled dîsa ji dê çêtir e. **Heke em li benda dê bisekiniyana, Delîl li halê me bû. Dîsa li **gorî makê, golik pakê**.*

Gornapişkî bûn
İnşelah tu **gornapişkî bibî.* (nifir)

Gornebaşê goristanan bûn
Xwe veşartin. Xwe ta kirin. **Piştî ku keçika wî revî û pê de, ew **gornebaşê goristanan e**.*

Goşt girtin
Qelew bûn. Kok bûn. **Me got, ji wê jarbûnê xelas bibe, lê me negot ew qas jî **goşt bigire**.*

Goşt hiştiye, (bi) pey serpiyan ketiye.
bnr. Aş berdaye, pey çeqçeqê ketiye.

Goşt li ser postê (yekî) hûr kirin
Eziyet û zilm lê kirin. **Wan leşkeran du salan **goşt li ser postê min hûr kirin**.*

Goştê berxan e, li ber çavan e.
Her tişt, vekirî û eşkere li holê ye. ****Goştê berxan e, li ber çavan e.** *Ne hewce ye ez pesnê malê xwe bidim.*

Goştê (yekî) cûtin
bnr. Goştê canê (yekî) xwe xwarin

Goştê (yekî) çûn, hestî man
Gelekî jar bûn. **Hema rastî jî **goştê Xecê çûye, hestî mane**.*

Goştê ga ye, li pêş çava(n) ye.
bnr. Goştê berxan e, li ber çavan e.

Goştê berxan naxwe, lê pariyê xwe di nav avşorê datîne.
bnr. Ez goştê heram naxwim, lê nanê xwe di avdanokê de hûr dikim.

Goştê canê (yekî) xwarin
Gelekî aciz kirin. Ji bo kesên pir hov û kutkuto tê gotin. **Eman wan zarokan û wî mêrikî **goştê canê wê rebenê xwarin**.*

Goştê ciwanan dixwî tu zanî, goştê pîran dixwî tu zanî; na dilê te dişewite, tirşikan jî dixwî tu zanî.
Tu bi qîma xwe yî, dilê te çawa dixwaze wer bike. **Ha ji te re ji her cureyî.* ***Goştê ciwanan dixwî tu zanî, goştê pîran dixwî tu zanî; na dilê te dişewite, tirşikan jî dixwî tu zanî.*** (bnr. çîrok)

Goştê diziyê naxwe lê pariyê xwe di avşorê de dike.

bnr: Ez goştê heram naxwim, lê nanê xwe di avdanokê de hûr dikim.

Goştê genî di zikê xweyî de

Divê qisûr û êşên malbat an jî komê ji kesên xerîb re neyên eşkerekirin. **Helbet derd û kulên me yên taybet hene, lê tu dê çawa bikî;* ***goştê genî di zikê xweyî de.***

Goştê hev cûtin

Paşgotiniya hev û din kirin. **Cîranên hev in lê dîsa jî heta êvarê goştê hev du dicûn.*

Goştê (serê) hev xwarin

Bi hev du re debar nekirin, hev du zêde aciz kirin. **Wan di navîna du salan de* ***goştê hev xwarin.***

Goştê min şor e, li xelkê xweş nayê.

Ez bêrozgar im. **Nizanim çima, lê* ***goştê min şor e, li xelkê xweş nayê.***

Goştê (yekî) şor bûn

bnr: Goştê min şor e, çi dikim li xelkê xweş nayê

Goştê (yekî) xwarin, hestî man

Zilm û çewisandin kirin. **Xwedê di heqê wan de bê, wan* ***goştê keça min xwarin, hestiyên wê man.***

Goştik dixwe, donik naxwe.

Ji bo kesên kone û berjewendiyên xwe baş dizanin tê bikaranîn. **Hey ew çi zane ye. Xwe nazî dixe, lê tama devê xwe jî baş dizane.* ***Goştik dixwe, lê donik naxwe.***

Got: "Apo jina te kevn e. (kevir e)" Got: "Ji minetan çêtir e."

Ez îdareya xwe pê dikim. *****Got: "Apo jina te kevn e." Got: "Ji minetan çêtir e."*** *Em jî wer îdare dikin lawo.*

"Goştê ciwanan dixwî tu zanî, goştê pîran dixwî tu zanî; na dilê te dişewite, tirşikan jî dixwî tu zanî."

Gurekî pir pîr hebûye. Wisa birçî, perîşan û pejmûrde bûye ku êdî nikaribûye ji xwe re tiştekî peyda bike û zikê xwe têr bike. Rojekê li ber zinarekî vedileze ji bêtaqetî nikare bilebite. Gurekî ciwan rastî wî tê û jê dipirse:
"Tu çi dikî apo? Ev çi halê te ye?" Gurê pîr dibêje:
"Lawo weleh ez êdî pîr bûme. Halê min î ku li pey kerî û suriyan bigerim û tiştekî bigirim û bixwim nîn e. Zehf birçî me, ev çend roj in ku min tiştek nexwariye, loma jî nikarim ji dewsa xwe rabim." Gurê ciwan jê re dibêje:
"Apo hela tu hebekî sebir bike, ez ê ji te re tiştekî bikim." Cihê ku lê ne li bintarê rê derbas dibe. Gurê ciwan lê mêze dike ku wa ye mirovek di rê de diçe. Li pêşiya wî kereke barkirî. Li pey wî jî deşa kerê jixwe re hêdî hêdî dimeşin. Bala xwe didiyê ku deşika kerê gelekî par re maye. Gurê ciwan di hundirê xwe de dibêje:
"Hema firsend ev firsend e." Li gorî rewşa nêçîra xwe pêşnûma xwe di serê xwe de çêdike û dest bi karê xwe dike. Wekî plana xwe berê êriş dike deşa kerê, wê diavêje erdê û zikê wê didirîne. Xwediyê deşê ber bi deşê ve direve, lê gur vê carê ji xwe digihîne kerê zikê kerê jî diqelişîne. Bi ketina kerê re barê wê yê ku bi tirşikê dagirtî ye dirije erdê. Xwediyê kerê perîşan dibe. Hinekî dike hewar û dide xeberan, lê di dawiyê de têra xwe dadişîne. diavêje ser milê xwe û por poşman berê xwe dide mala xwe. Gurê ciwan vê carê vedigere tê cem gurê pîr û jê re dibêje:
"Apo de tu were binihêre kurê te çi lê kiriye!..." Alîkarî dike û gurê pîr tîne bal cendekê kerê, deşê û tirşika li erdê rijiyayî û bi serbilindî xwe kuşeve dike û dibêje:
Di guhertoyek din de jî di barê kerê de sêv hebûne û ji ber wê jî wer ev biwêj wer tê gotin: "Apo te divê goştê pîran bixwe, te divê yê ciwanan û te divê lih û lih sêvan jî ser de bixwe."

Got: "Apo sa (segan) tu girtî!" Go: "Lawo apo çi se (seg) ye?"

Ez jî wisa ne hindik im, ew ku bi ser min de bê, wê bersiva xwe jî bibîne. **Hela çavê xwe veke li min binêre!* ***Got: "Apo sa tu girtî!" Go: "Lawo apo çi se ye?"***

Got: "Apo, şorbeya we pir xweş e," Got: "Lawo rojekê li mala me, rojekê li mala we."

Divê hevaltî jî îkram jî ne yekalî be. **Hema tim aliyek tenê bike dibe?* ***Got: "Apo, şorbeya we pir xweş e," Got: "Lawo rojekê li mala me, rojekê li mala we."*** (bnr. çîrok)

Got: "Bavo dema ku deve bi zêrekê bûn te çima nestand?" Got: "Wê çaxê yeka me tune bû lê niha pêncên me hene."

Divê mirov wekî hêz û derfetên xwe tev bigere. ****Got: "Bavo dema ku deve bi zêrekê bûn te çima nestand?" Got: "Wê çaxê yeka me tune bû lê niha pêncên me hene."*** *Wê demê me ew jî nedidît, lê îro ji wê zêdetir jî hene.* (bnr. çîrok)

Got: "Bavo ez ê te bifroşim." Got: "Lawo mirov qet bavê xwe difroşe?" Got: "Bavo ez ê buhayekî wisa bibêjim ku tu kes nikaribe te bistîne"

Di gotina xwe de rast û durist nebûn. Gotin û armanc ne wekî hev bûn. **Armanca wî tiştekî din e lo!* ***Got: "Bavo ez ê te bifiroşim." Got: "Lawo mirov qet bavê xwe difiroşe?" Got: "Bavo ez ê buhayekî wisa bibêjim ku tu kes nikaribe te bistîne"***

Got: "Bavo heke li hêviya Xwedê bimaya, mela wê hê gelekî bi diya min re bûya."

Divê mirov hin karan bi destê xwe bike, naxwe li hêviya hinekên din ku bimîne çareser nabe. **Ya me jî bûye wekî meseleya ku lawik ji bavê xwe re gotiye:* ***"Bavo heke ku li hêviya Xwedê bimaya mele wê hê gelekî bi diya min re bûya."*** (bnr. çîrok)

"Got: 'Apo, şorbeya we pir xweş e,' Got: 'Lawo rojekê li mala me, rojekê li mala we.' "

Xortek bi sedemekê li mala cînarekî şorbeyê dixwe. Şorbe pir lê xweş tê. Ji ber wê hayê hema serê carê ji xwe re hincetekê dibîne û diçe mala cînar şorbeyê dixwe û her car jî dibêje:

"Apo, şorbeya we pir xweş e." Carek, du car, sê car wisa... Rojekê dîsa xort şorbeyê dixwe û dîsa dibêje:

"Apo şorbeya we pir xweş e." Lê êdî mêrik hêrs dibe, xwe nagire û dibêje:

"Ere lawo, pir xweş e lê rojekê li mala me, rojekê li mala we."

"Got: 'Bavo dema ku deve bi zêrekê bûn te çima nestand?' Got: 'Wê çaxê yeka me tune bû lê niha pêncên me hene.'"

Lawik ji bazara deveyan bi reverev tê û ji bavê xwe re dibêje:

"Bavo deve hatine bi zêrekî. Em bistînin?" Bav dibêje:

"Na lawo, nestîne." Di demeke dirêj bi şûn de tê û dibêje:

"Bavo deve bûn bi du zêran." Bav dibêje:

"Na!" Dîsa piştî çend mehan bi şûn de law tê û dibêje:

"Bavo deve bûne bi sê zêran!..." Bav dîsa dibêje:

"Na!" Çend meh diborin dîsa law bavê agahdar dike:

"Bavo deve bûne bi pênc zêran." Bav dibêje:

"Lawo here bikire!.." Lawik bi matmayî ji bavê xwe dipirse:

"Bavo çima deve bi yek zêrî bûn te nekirîn, lê derketine pênc zêran tu dibêjî here bikire?"

Bavê dibêje: *"Wê çaxê yeka me tune bû lê niha pêncên me hene."*

"Got: 'Bavo heke li hêviya Xwedê bimaya, mela wê hê gelekî bi diya min re bûya.'"

Melayek bi jinekê re bûye. Her kes jî ji haj vê têkiliya wan hebûye. Lawê jinikê ji bavê xwe re tim dibêje:

"Bavo, her kes dibêje ü va ye eşkere jî tê xuyan ku mele bi diya min re ye. Were em mele bikujin." Bavê wî mirovekî bêxîret û pir bêhnfireh bûye. Tim ji lawê xwe re dibêje:

"Lawo bisekine Xwedê kerîm e, Xwedê bi xwe wê helaya wî bidiyê." Demek dirêj dîsa derbas dibe, lê têkiliya mele û jinikê berdewam dike. Di dawiyê de lawik li ber xwe nade û dema ku mele derdikeve serê minareyê azanê dixwîne, ew diçe de-

Got: "Bavo hirçê hêk kir." Got: "Lawo hirç heywanek no ye, hêk kir, hêk kir."
Ji kesên hov û bêserî, çi bibêjî der tê. **Welehî heyran çi bibêjî ji wan tê hêvî kirin.* ***Got: "Bavo hirçê hêk kir." Got: "Lawo hirç heywanek no ye, hêk kir, hêk kir."***

Got: "Bavo min dizek girtiye!" Got: "Lawo berde." Got: "Bavo ez wî berdidim, ew min bernade."
Carinan yê neheq ji yê mafdar zêdetir dike ku xwe bi ser bixe. ****Got: "Bavo min dizek girtiye!" Got: "Lawo berde." Got: "Bavo ez wî berdidim, ew min bernade."*** *Heyran ez sekinîme, ew nasekine.*

Got: "Bira duh ji îro çêtiro!"
Rewş xerabtir bûye. ****Got: "Bira duh ji îro çêtiro!"*** *Ma tu jî di derkê de nîn î?*

Got: "Bira weleh min navê tu bimirî, lê belê min divê, her daîm kodik li dest te be."
Heke tu bimirî, tu yê zû xelas bibî, daxwaz dikim ku tu tim feqîr bî û hewceyî kesan bî. **Ez ji te re çi bibêjim?* ***Bira weleh min navê tu bimirî, lê belê min divê, her daîm kodik li dest te be."***

Got: "Çima rihê (rûyê) xwe kur nakî?" Got: "Dilê min bi qûnê ne xweş e."
Ji xwe re li hincetan gerîn. **Jixwe ew qulpekê dixwaze ku tiliya xwe têxê.* ***Got: "Çima rihê xwe kur nakî?" Got: "Dilê min bi qûnê ne xweş e."***

Got: "Dayê tu çima min dihejînî?" Got: "Lawo yekê jî dayê dihejand."
Her tişt wekî sazûmaniyekê û bi dorê dimeşe. **Lawo te bihistiye ew biwêja ku dibêje:* ***Got: "Dayê tu çima min dihejînî?" Got: "Lawo yekê jî dayê dihejand."*** *Ya min û te jî eynî wekî wê ye.*

Got: "Erebo qûna te reş e." Got: "Malê min ev e." (Got "Erebo rûyê te reş e, got: "Malê min ev e.")
Merc û derfetên min ev qas in. ****Got: "Erebo qûna te reş e." Got: "Malê min ev e."*** *Ezbenî ez çi bikim, derfetên min ew qas in.*

Got: "Ew çi ye tu diçînî?" Got: "Kengê hêşîn bû tê bibînî."
Her tişt demeke wê heye. **Çi bibêjim ez?* ***Got: "Ew çi ye tu diçînî?" Got: "Kengê hêşîn bû tê bibînî."***

Got: "Ez ji kûçikê xwe hinî mêraniyê bûm."
Mirov ji bûyer û mînakên xerab dersan digire. ****Got: "Ez ji kûçikê xwe hinî mêraniyê bûm."*** *Divê mirov ji bûyeran û ji neyîniyan dersê bigire.*

Got: "Ez te bikim mîr." Got: "Na min bike kizîr."
Her kes wekî radeya çand û dîtina xwe tiştan dixwaze. **Malmîratî wî ji rayedaran tenê kizîr dîtiye.* ***Got: "Ez te bikim mîr." Got: "Na min bike kizîr."***

---

renceya ku mela wê dakeve baş, sabûn dike û diçe. Dema ku mele dixwaze dakeve jêr, lingê wî dişimite, dikeve û dimire. Bavê lawik ku mirina mele dibihîze, ji lawê xwe re dibêje:
"Lawo min ji te re negot, dev jê berde Xwedê wê belaya xwe bidiyê?" Lawik bavê xwe dibersivîne û dibêje:
"Bavo heke li hêviya Xwedê bimaya, mela wê hê gelekî bi diya min re bûya."

Got: "Ez li zikê te dixim, tu dibêjî, wey pişta min!" Got: "Wekî kesek li pişta min hebûya te nikaribû li zikê min bixista."

Mirovên bêhêz û bêlêzim zêdetir tadeyî û zorê dikişînin. **Çiqas rast gotine.* ***Got: "Ez li zikê te dixim, tu dibêjî, wey pişta min!" Got: "Wekî kesek li pişta min hebûya te nikaribû li zikê min bixista."***

Got: "Ez ê sîrkeyê çêbikim." Bû ereq.

Kirin û gotinê hev û din negirtin. Pêknehatî bûn. **Ew jî ew qasî dike.* ***Got: "Ez ê sîrkeyê çêbikim." Bû ereq.***

Got ha got; got: "Çi got?" Got: "Kerê kundir kot."

Ji bo galgala vala tê bikaranîn. **Keçê êdî bes e,* ***got ha got; got: "Çi got?" Got: "Kerê kundir kot."*** *Heyran ji vê peyvandina pûç hûn qet aciz nabin?*

Got: "Hirçê tu ji ku têyî?" Got: "Ji kayê." Got: "Kudikê tu ji ku têyî?" Got: "Ji şûna dayê."

Ewled jî riya dê û bavan dişopînin. **Helbet mirov ji dê û bav û ji lêziman zelîf zêde jî cudatir nabe.* ***Got : "Hirçê tu ji ku têyî?" Got: "Ji kayê." Got: "Kudikê tu ji ku têyî?" Got: "Ji şûna dayê."***

Got: "Kanê gilîvan?" Got: "Qurbana te û wî zimanî, te ev kurmanciya delal ji ku anî?"

Wekî tirane ji bo kesên ku baş nikarin bipeyivin tê gotin. **Hema tenê ez dikarim bibêjim,* ***Got: "Kanê gilîvan?" Got: "Qurbana te û wî zimanî, te ev kurmanciya delal ji ku anî?"***

Got: "Kî çavê te derxist?" Got: "Merivê min." Got: "Lewma wisa kûr derxist."

Neyariya di nav exrebeyan de pir dijwar e. **Bêguman dixuye.* ***Got: "Kî çavê te derxist?" Got: "Merivê min." Got: "Lewma wisa kûr derxist."***

Got: "Keçelo te serê xwe şûşt?" Got: "Min vegirt (hûna) jî."

Neyînî û kêmasiyên xwe wekî ku wer nîn e xuyandan. *****Got: "Keçelo te serê xwe şûşt?" Got: "Min hûna jî."***

Got: "Kewo, ku der xweş e?" Got: "Erdê ku ez lê bûm ferxe."

bnr: Kewê, rêl li ku xweş e? Got: "Cihê ku ez lê bûme ferx."

Got: "Kê dinya dot?" Got: "Yê ku kirî û firot."

Bazirganî ango kirîn û firotan, karekî pir bikêr e. **Lawê min ji xwe re bazirganiyê bike. Çi gotine?* ***Got: "Kê dinya dot?" Got: "Yê ku kirî û firot."***

Got: "Kê mirî vegerandin?" Got: "Yên ku çûn serxweşiyê."

bnr: Got: "Kê mirî zivirandin?" Got: "Yên ku dil azirandin."

Got: "Kê mirî zivirandin?" Got: "Yên ku dil azirandin."

Ji bo sivikbûna êş û kederan jî dîsa dilxweşkirin û alîkarî divê. *****Got: "Kê mirî zivirandin?" Got: "Yên ku dil azirandin."*** *Destavêtin û alîkarî dilê mirov sivik dike.*

Got: "Kê rakirin mirî?" Got: "Dilanpirsî."

bnr: Got: "Kê mirî zivirandin?" Got: "Yên ku dil azirandin."

Got: "Kîjan millet baş e?" Got: "Mirovê baş, baş e."

Ji her miletî yan jî ji her malbatê yê baş jî yên xerîb jî dertên. **Pênc tiliyên destekî jî nabin yek.* ***Got: "Kîjan milet baş e?" Got: "Mirovê baş, baş e."***

Got: "Kûçik çêtir e yan beraz?" Got: "Nelet li herduyan jî bê."

Herdu jî ji hev du xerabtir bûn. **Qet ji yekî re jî nikarim bibêjim baş e.* ***Got: "Kûçik çêtir e, yan beraz?" Got: "Nelet li herduyan jî bê."***

Got kûçiko te çi kir, bi xwe kir; te simek bir, lê lingê xwe jî ji vir kir.

Carinan mirov ji bo kar û derfeta carekê tenê, derfetên piçûk lê demdirêj bidefîne dikeve xisareke mezin. *****Got kûçiko te çi kir, bi xwe kir; te simek bir, lê lingê xwe jî ji vir kir.*** *A girîng, derfet û firsendên demdirêj in, naxwe bi carekê re tiştekî zêde pêk nayê.* (bnr. çîrok)

Got: "Lawo apê te gelek gêdûkên giran dîne (dîtine)."

Gelek tişt bi serê min de hatine. *****Got: "Lawo apê te gelek gêdûkên giran dîne."*** *Hela hê tu min nas nakî, keçika min.*

Got: "Lawo, min ji te re negot, li hêviya Xwedê bihêle." Got: "Bavo, heke bi hêviya Xwedê bimaya, mele wê hê gelekî bi diya min re bûya."

bnr. Got: "Bavo heke bi hêviya Xwedê bimaya, mele wê hê gelekî bi diya min re bûya."

Got: "Malbigûyo!" Got: "Çi bikim kebanî ji mala te ye."

Bi te ve jî têkildar e. **Qet zêde nepeyîve.* ***Got: "Malbigûyo!" Got: "Çi bikim kebanî ji mala te ye."***

Got: "Malo Xwedê bi te re." Got: "Xwediyê min jî."

Beriya Xwedê divê mirov bi xwe tedbîra xwe bigire. **Tenê bi hêviya Xwedê hiştinê ve nabe.* ***Got: "Malo Xwedê bi te re." Got: "Xwediyê min jî."***

Got: "Mêro, top li tekeve." Got: Ma heke ji ber tifikê rabe."

Yên ku xwe di quncikan de veşêrin û xwe baş biparêzin, zû bi zû ziyanê nabînin. *****Got: "Mêro, top li tekeve." Got: Ma heke ji ber tifikê rabe."*** *Welehî bi vê meşê hinekî zor, lê ka çawa dibe.*

Got: "Mêvano, tu bi riya xwe ya sibê." Got: "Xwîşka Guharê, arê kewarê, em ê tev bixwin heta biharê."

Ji bo mazûbanên temahkar tê gotin . **Qet destê xwe neşo û tev apê xwe nên nexwe. Wekî ku mêvan gotiye:* ***"Xwîşka Guharê, arê kewarê, em ê tev bixwin heta biharê."*** (bnr. çîrok)

"Got, kûçiko te çi kir, bi xwe kir. Te simek bir, lê lingê xwe jî ji vir kir."

Kûçikek tim li ber derê qesabekî vedikeve. Qesab jî tim goştên ji ber hestiyan mayî û hestiyan diavêje ber, bi vî awayî kûçik zikê xwe têr dike. Rojekê dîsa wekî her car eynî ew kûçik li ber derê qesab veketiye. Lê çawa dibe wê rojê çavçiliyeke mezin dike. Ç'awa ku firsendê dibîne, simeke dêwêr dixe nav diranên xwe û ji wir direve. Dema ku qesab vê helwesta kûçik dibîne, pir hêrs dibe, diqîre û ji kûçik re dibêje:
"*Kûçiko te çi kir, bi xwe kir. Te simek bir, lê lingê xwe jî ji vir kir.*"

"Got: 'Mêvano, tu bi riya xwe ya sibê.' Got: 'Xwîşka Guharê, arê kewarê, em ê tev bixwin heta biharê.'"

Mêrikek zivistanê li malekê dibe mêvan. Xwediyê malê jê re ezet û hurmet dikin, nan û av didin. Lê mêvan ne rojek, ne du roj ne deh roj jî mal naçe. Xwediyê malê wekî çanda eşîrtayî nikarin jê re bibêjin ji mala me here, lê êdî zehf jî jê aciz dibin.

Got: "Mirtivo, bistirê!" Got: "Tiliya min kul e."

Ji bo mehne û hincetên pûç tê bikaranîn. **Lawo, tiştekî wer bibêje bila ew qas jî dûrî aqilan nebe.* ***Got: "Mirtivo bistirê!" Got: "Tiliya min kul e."***

Got: "Ne ji ber wî rabûm, ji ber pora wî ya spî rabûm."

A girîng, rûmet û hurmeta kalbûn û pîrbûnê ye. **Tu tênegilûştî.* ***Got: "Ne ji ber wî rabûm, ji ber pora wî ya spî rabûm."***

Got: "Of, of birê min, zoq ne tişt e, lê kevirê hemû[*] li pişt e."

Kirina hin tiştan pir hêsan e, lê piştî kirinê gelek astengiyan derdixin pêşiya mirov û mirov hezar carî poşman dikin. **Lê divê tu wê jî bizanibî ku;* ***got: Of, of birê min, zoq ne tişt e, lê kevirê hemû li pişt e.***

Got: "Pîrê tu ji carekê re çawa yî?" Got: "Çi zanim, li pêş malan e."

Ji bo yên dil dikin, lê ligel hemû astengiyan xwe nazî dixin tê gotin. **Ya wî jî bûye wekî ya pîrê.* ***Got: "Pîrê tu ji carekê re çawa yî?" Got: "Çizanim, li pêş malan e!.."*** (bnr. çîrok)

Got: "Te dinya çawa dît?" Got: "Wekî dilê xwe."

Her kes bi xwe çawa be, çawa bifikire û çawa jiyan bike, bi wî awayî li dinyayê mêze dike. **Her kes çawa nêzîkî jiyanê dibe, her kesî jî wer dizane.* ***Got: "Te dinya çawa dît?" Got: "Wekî dilê xwe."***

Got: "Tu camêriyê ji kê hîn bûyî?" Got: "Ji ne camêran"

Mirov ji neyîniyan, rûmeta erêniyê fêr dibe. *Bi rastî jî bûyer û helwestên neyînî zêdetir dersê didin mirov. Got: "Tu camêriyê ji kê hîn bûyî?" Got: "Ji ne camêran"

Got: "Tu ji çi ew qas camêr î?" Got: "Ji ber necamêran."

bnr. Got: "Tu camêriyê ji kê hîn bûyî?" Got: "Ji necamêran."

Got: "Tu çawa bûyî hekîm?" Got: "Ez birîndar bûm, (loma) bûm hekîm."

Mirov ku bi xwe bi pirsgirêkekê re zêde mijûl bibe yan jî bi wê pirsgirêkê re rû bi rû bimîne, di wê derbarê de gelek tiştan hîn dibe. **Xwedê neyîne serê tu kesî,* ***got: "Tu çawa bûyî hekîm?" Got: "Ez birîndar bûm, loma bûm hekîm."***

Di dawiyê de jinik û mêrik bi hev dişêwirin û li cem mêrik bi qestî gengeşiyekê derdixin. Şer berê berê gur dibe. Jinik wekî sondekê ji mêrik dipirse:
"Mêvano tu bi riya xwe ya sibê bikî, ka bibêje gotina me kijanî rast e?" Mêrik jixwe mirovekî pir zana û kone bûye, niyeta wan fêm dike navê jinikê hildide û wê dibersivîne:
"Xwişka Guharê, arê kewarê, em ê tev bixwin heta biharê."

[*]**Kevirê hemû:** Ev her du peyv dibe ku wekî "Kevirê Hemo" navekî taybet an "kevirê hemûyan" be lê me tu agahiyên berfirehtir bi dest nexistin.

"Got: 'Pîrê tu ji carekê re çawa yî?' Got: 'Çi zanim, li pêş malan e.'"

Li zozanan, li hemberî konan, mêrekî navsere ji jineke pîr re teklîfa serîyekkirinê (têkiliya zayendî) dike. Armanca mêrik ew e ku kengê ketin nav cihekî xalî, newal an jî ber kendalekî karê xwe bike. Lê dilê pîrê ew qas heye û bêsebr e ku ji kerbana hew dizane ku mêrik hema li wir dixwaze. Pîrê li hember pirsa mêrik xwe nazî dixe lê vedigerîne û dibêje:
"Çi zanim, li pêş malan e."

Got: "Xweş xeber e, lê min jê ne bawer e."
Xwezî rast bûya, lê ez bawer nakim ku ew yek gengaz be. **Xweziya xwe pê anî û got:* ***"Xweş xeber e, lê min jê ne bawer e."***

Got: "Ziyaretê, min gelek caran bi te derew sond xwar, te tiştek bi min nekir." Got: "Min jî gelek caran mala te xera kir, haya te pê tune."
Tu ku xirabiyê bikî, tu dê bersiva wê jî bibînî. **Qet meraq neke tu nizanî lê niha belkî te jî bersiva xwe girtiye.* ***Got: "Ziyaretê, min gelek caran bi te derew sond xwar, te tiştek bi min nekir." Got: "Min jî gelek caran mala te xera kir, haya te pê tune?"***

Gotin anîn ser ...
Ji bo axaftin û nirxandina mijarekê hewl dan. **Wî çi kir, kir, axirî* ***gotin anî ser koçberiyê.***

Gotin anîn rûyê (yekî)
Ji ber kêmasî yan jî çewtiyan, yek bi rexneyan re rû bi rû hiştin. Di rûyê yekî de bi gotinên neyînî re rû bi rû man. **Di rûyê wî dizekî de* ***gotin hatin rûyê min.***

Gotin: "Avê çima deng ji te tê?" Got: "Hevalê min kevir e."
Mirov li gorî der û dor û nêzîkên xwe reng dide. **Hawirdor û derfet bandorê didin ser jiyana mirov.* ***Gotin: "Avê çima deng ji te tê?" Got: "Hevalê min kevir e."***

Gotin badilhewa çûn
bm: Gotin di bêjinga qul de çûn

Gotin baş e, baş e, çû di curnê gund de rî.
Ji bo bitrîbûnê tê bikaranîn. **Zêde mezinkirin jî carinan encameke bêş nade.* ***Gotin baş e, baş e, çû di curnê gund de rî.***

Gotin baş e, baş e, çû bi serê darê de rî.
bm: Gotin baş e, baş e, çû di curnê gund de rî.

Gotin: "Bavê te ji birçînan mir." Got: "We jê re şorbeya birinc çêbikira."
Heya hûn dibêjin, we bikira. **Gotin hêsan e. Gotin: "Bavê te ji birçînan mir."* ***Got: "We jê re şorbeya birinc çêbikira.***

Gotin: "Bavê te ji nêzda (yan jî **nêzan) mir." Got: "Ka hebû ku min nedayê?"**
Her kes li gorî derfetên xwe tevdigere. **Xwezî hebûya.* ***Gotin: "Bavê te ji nêzda mir." Got: "Ka hebû ku min nedayê?"***

Gotin: "Bavê te siyaran kuşt an peyan?" Got: "Ew ku kuştin, ha siyaran ha peyan."
A girîng encam e. *****Gotin: "Bavê te siyaran kuşt an peyan?" Got: "Ew ku kuştin, ha siyaran ha peyan."*** *A girîng encam e.*

Gotin: "Betalî mêrkuj e, ha mêrkuj e" Heta ku betal mêrek kuşt.
Gelek bûyer bi hadandinê çêdibin. ****Gotin: "Betalî mêrkuj e, ha mêrkuj e," heta ku betal mêrek kuşt.*** *Wekî wan ew kişkiş nekira, belkî jî wisa nedibû.*

Gotin bêje, negot. Dû re bi xwe got û dengê xwe nebirî .
bnr: Gotin bêje negot, pey de çû li ser kulîk got.

Gotin bêje negot, pey de çû li ser kulîk got.
Divê mirov dema gotinê bizanibe. ***Gotin bêje negot, pey de çû li ser kulîk got**. Divê mirov gelekî jî xwe nazî nexe, naxwe mirov carinan dikeve rewşeke sosret.*

Gotin: "Birayê te bû axa." Got: "Ji min re çi, jina wî bû xatûn."
Jin ji birayan nêzîktir e. *Di jiyanê de jin berî birayan tê. ***Gotin: "Birayê te bû axa." Got: "Ji min re çi, jina wî bû xatûn."***

Gotin: "Birayê te mirovekî çawa ye?" Got: "Min pê re hevaltî nekiriye."
Bi yekî re hevaltî kirin pir girîng e, rastiya kesayetiyê di hevaltiyê de xwe dide der. *Min pê re hevaltî nekiriye, loma jî nikarim ji bo kesayetiya wê biryarê bidim. ***Gotin: "Birayê te mirovekî çawa ye?" Got: "Min pê re hevaltî nekiriye."***

Gotin çirpandin guhên (yekî)
Pê hesandin. *"*Jina xwe da aliyek, çend* ***gotin çirpande guhên wê*** *û ber bi odeya mêvanan ve çû."* İbrahîm Ehmed

Gotin (gilî) dan destê (yekî)
Bersiveke çak dayîn. *"*-Pî neçe, ji duh ve em dikin nakin,* ***tu gilîkî nadin dest me****."* Tosinê Reşît

Gotin, delalî delalî, çû di serê kaniyê de rî.
bnr: Gotin baş e, baş e, çû di curnê gund de rî.

Gotin di dêv de hiştin
bnr: Ketin nav gotinên (giliyên) yekî

Gotin di devê (yekî) de nesekinîn
Raz negirtin. *Eman ji wê re tiştekî nebêje,* ***gotin di devê wê de nasekinin****.*

Gotina (yekî) di paşilê de bûn
Bersiva pirsan di heman demê de dan. Pesqelyar (nuktedan) bûn. *Zêde bi ser Yargulê de neçin,* ***gotina wê di paşilê de ye****, dê we poşman bike.*

Gotin di serê (yekî) de neçûn
Tênegihîştin. *Dibêjim, nabêjim,* ***gotin di serê hevalê min de naçe****.*

Gotin di xwe de nebihartin
Bêbersiv neman. *Bûkên niha ne wekî yên berê ne,* ***gotinan qet di xwe de nabihêrin****.*

Gotin: "Dijmin hat." Kor got: "Min qeraltiyek dît." Topal got: "Em birevin." Ker got: "Min dengek bihîst."
Mirov wekî psîkolojiya bûyeran xwe amade dikin û hin caran wekî wê jî tiştan li hev tînin. *Mêze dikim ku, her kes wekî rewşa îro dipeyîve.* ***Gotin: "Dijmin hat." Kor got: "Min qeraltiyek dît." Topal got: "Em birevin." Ker got: "Min dengek bihîst."***

Gotin dirêj kirin

Li cihê tune zêde axaftin, gotin zêde dubare kirin. **Min ji te re negot, **gotinê zêde dirêj neke**, dê bandorê xerabtir bike.*

Gotin: "Em te têxin cinetê." Got: "Roj ne xweş e."

bnr. Gotin gur: "Here berxan." Got lingê min diêşe."

Gotin: "Gayê te dizîn!" Got: "Wey dîkê min." Gotin: "Çima wisa dibêjî?" Got: "Wekî min li dîkê xwe bipirsiya, gayê min nediçû."

Mirov ku di demê de tedbîra xwe negire, dû re nikare pêşiyê lê bigire. **Her tedbîr di dema xwe de divê. **Gotin: "Gayê te dizîn!" Got: "Wey dîkê min." Gotin: "Çima wisa dibêjî?" Got: "Wekî min li dîkê xwe bipirsiya, gayê min nediçû."***

Gotin gerandin

Paşgotinî, kurtepistî kirin, gotinên tên gotin li nav kesan birin û anîn. **Tu dizanî ku Gulçîn **gotinan digerîne**, tu çima gotina xwe li bal wê dibêjî?*

Gotin: "Gongelîsk (kelkelo) cihê te ku dere?" Got: "Ba dizane."

bnr. Gotin: "Kelkele, tu li ku dimînî?" Got: "Ba dizane."

Gotin: "Gurî çima porê te tune?" Got: "Porê xaltîka min gur e."

Mirov naxwazin kêmasiyên xwe bipejirînin an jî bidin nîşandan. **Helbet kes naxwaze neyîniyên xwe derxe pêş. **Gotin: "Gurî çima porê te tune?" Got: "Porê xaltîka min gur e."***

Gotin: "Guriyo te şûşt?" Got "Min hunand jî."

bnr. Got: "Keçelo te serê xwe şûşt?" Got: "Min vegirt jî."

Gotin: "Guro em ê te bikin şivanê berxan." Got: "Ez ji siûda xwe ne bawer im."

bnr. Ji rovî re gotin: "Tu bûyî padîşahê mirîşkan." Rovî, girî û got: "Ez ji şansê xwe ne bawer im."

Gotin hatin rûyê (yekî)

Belasebeb gotinên nebaş gotin. **Ez çi bibêjim ji te re? Tu dikî, lê **gotin tên rûyê min**.*

Gotin, here aş, çû aşvan kuşt.

Ji bo helwesta berevajî û mirovên bêdenge tê gotin. ***Gotin here aş, çû aşvan kuşt.** Kî dizane ev dînik dê çi bike?*

Gotin gur: "Here ber berxan." Got: "Lingê min diêşe."

Carinan ji hinekan re derfetên pir xweş dertên, lê xwe bi nazî dixin. **Ew jî tiştekî ecêb e. **Gotin gur: "Here ber berxan." Got: "Lingê min diêşe."***

Gotin: "Hêştirê navê bavê te çi ye?" Got: "Navê diya min mehîn e."

bnr. Gotin: "Gurî çima porê te tune?" Got: "Porê xaltîka min gur e."

Gotin: "Horê rebenê, te çi dît?" Got: "Herçi dît, min dît."

Ez dizanim bê çi bû. ***Gotin: "Horê rebenê, te çi dît?" Got: "Herçî dît, min dît."** Qinyas jî hema digot: "Ya ku min dît, qet nepirse."*

Gotin jê re tune bûn

Têkûz û mikemel bûn. Tu kêmasî tune bûn. **Ya Xwedatî tu **gotin ji mala te re tune ne** lê mixabin, bihayê wê bi min zêde tê.*

Gotin ji dêv derketin

Kar ji karan derbas bûn. Firsend ji dest derketin. **Êdî her tişt qewimîbû, mixabin ku ew **gotin ji dêv derketibû** jî.*

Gotin ji dêv girtin

bnr: Bi qirmika zimanê (yekî) girtin

Gotin ji mirdaran, spî ji qerpalan

Ji kesên an jî tiştên xerab tiştên xerab û pîs dertên. **Pir xweş gotine. **Gotin ji mirdaran, spî ji qerpalan.***

Gotin: "Jina te zehf digere." Got: "Çira nexwe ez rojekê di mala xwe de nabînim?"

bnr: Gotin: "Jina te zehf digere." Got: "Derewan mekin, heke wisa bûya wê rojekê jî bihata mala min."

Gotin: "Jina te zehf digere." Got: "Derewan mekin, heke wisa bûya wê rojekê jî bihata mala min."

Ji bo kesên pir gerok tê gotin. ***Gotin: "Jina te zehf digere." Got: "Çira nexwe ez rojekê di mala xwe de nabînim."** Hema ez qijikê, bi Xwedê jî ketime rewşa wî camêrî.*

Gotin jûjî: "Were ser xalîçeyê." Got: "Zivir e û gij e."

Ligel rewşa xwe ya xerabtir jî xwe zêde hesibandin. **Herhal ew jî taybetiyeke awarte ye ku ev qas eletewşî çêdibe. **Gotin jûjî: "Were ser xalîçeyê." Got: "Zivir e û gij e."***

Gotin: "Kelkele tu li ku dimînî?" Got: "Ba dizane."

Kî di nav çi hawirî de be gelek tişt wekî wî reng digirin û pêk tên. **Hawirê min jî wisa ye. **Gotin: "Kelkele cihê te ku dere?" Got: "Ba dizane."***

Gotin: "Kero dehşek ji te re çê bû." Got: "Barê min, li min e."

bnr: Gotin: "Kero ji te re dehşek bû." Got: "Êmê min kêm bû, barê min zêde bû."

Gotin: "Kero ji te re dehşek bû." Got: "Êmê min kêm bû, barê min zêde bû."

Ewled barê dê û bavan hê girantir dikin. **Helbet ewled zehf şirîn in, lê barê wan jî barekî giran e. **Gotin: "Kero ji te re dehşek bû." Got: "Êmê min kêm bû, barê min zêde bû."***

Gotin: "Kero rêza te çi ye?" Kerê boça xwe hilda û ziriya.

Ji bo bersiva neyînî tê bikaranîn. **Di navbera me de tiştek nemaye. **Gotin: "Kero rêza te çi ye?" Kerê boça xwe hilda û ziriya.***

Gotin: "Kero, were em te bibin cinetê." Got: "Ma givzonek li wir heye?"

Daxwaz û armanca her kesî wekî rewş û asta wan e. **Her kesek li gorî xwe tiştan dixwaze. **Gotin: "Kero, were em te bibin cinetê." Got: "Ma givzonek li wir heye?"***

Gotin ketin nav dest û piyan

bnr. Gotinê pere nekirin

Gotin: "Kê mal ava kir? Got: "Mêvanan."

Mêvan bêhn û bereketê tînin malan, mêvan sedema derfetan nin. ***Gotin: "Kê mal ava kir? Got: "Mêvan."** Divê mirov tu car ji mêvanan aciz nebe.*

Gotin: "Kê mirî rakir?" gotin: "Mazûvan."

bnr. Got: "Kê mirî zivirandin?" Got: "Yên ku dil azirandin."

Gotin kirin xwarê

Ji bo kesên ku dikin tiştekî bibêjin, peyv tê ber devê wan, lê di dawiyê de dadiqurtin û nabêjin tê bikaranîn. **Seyîdxan dema ku bi çav evîndara xwe dikeve, **gotinên ku divê bibêje, hemûyan dike xwarê**.*

Gotin kirin guhar û kirin guhê xwe

Gotin pir girîng girtin. **Hingî gotinên min ên berê rast derketine, êdî **gotinên min dike guhar û dike guhê xwe**.*

Gotin koro çi dixwazî? Got: "Çavek ronî, girarek têr rûn."

Ji bilî hewcedariyên bingehîn tiştek nexwastin. **Heyran ez tiştekî zêde naxwazim. **Gotin koro çi dixwazî? Got: "Çavek ronî, girarek têr rûn."***

Gotin kund: "Tu çima nayê gund?" Got: "Ji destê gavanê ço bilind û ji destê qîz û bûkên rind."

Yên herî ne xweşik jî di barê dilê xwe de xwe zehf zêde dihesibînin. **Her kes di barê dilê xwe de şêrek e. **Gotin kund: "Tu çima nayê gund?" Got: "Ji destê gavanê ço bilind û ji destê qîz û bûkên rind."***

Gotin: "Koro te çi divê?" Got: "Çavek jîr, parîkî don."

bnr. Gotin koro çi dixwazî? Got: "Çavek ronî, girarek têr rûn."

Gotin: "Koro te çi divê?" Got: "Du çavên ronî."

bnr. Gotin koro çi dixwazî? Got: "Çavek ronî, girarek têr rûn."

Gotin: "Kul hatiye gund wê ji her malê du kesan bibe." Hemû kesî li çavên xulam nihêrî. Xulam got: "Belê yek ez lê ka yê din?"

Erê ez jixwe amade me, lê ka hûn ê çawa bikin? Ji bêgavî divê ji we jî hebin. **Helbet her dem wer nabe. **Gotin: "Kul hatiye gund wê ji her malê du kesan bibe." Hemû kesî li çavên xulam nihêrî. Xulam got: "Belê yek ez lê ka yê din?"***

Gotin: "Kûsî tu çima wisa pîs î?" Got: "Xwedê qedera min wisa nivîsî."

bnr. Gotin: "Pîso tu çima pîs î?" Got: "Xwedê li eniya min nivîsî."

Gotin lê giran hatin

Ji ber gotinên zêde neyînî gelekî şikestin. **Wî zû bi zû wer nedikir, lê xuya ye ku ew **gotin gelekî li wî giran hatine**.*

Gotin li erdê neman

Gotin pêk anîn. **Miho ku tiştek got, heya dawî li pey diçe û* ***gotina wî li erdê namîne****.*

Gotin li ber gotinê xistin

Zêde axaftin. **Eman zimanê wî jî nayê kişandin, hema* ***gotin li ber gotinê dixe****.*

Gotin mirîşkê: "Tu keliyî yan kovî?" Got: "Ez hevalê xwe di serê bistê de dibînim."

Qet derka wê nîn e, di encamê de ez ziyanê dibînim. **Çi dibe bila bibe, qedera min xuya ye.* ***Gotin mirîşkê: "Tu keliyî an kovî?" Got: "Ez hevalê xwe di serê bistê de dibînim."***

Gotin nehanîn ser xwe

1. Tu rexne û kêmasî nepejirandin. **2.** Rê li ber rexne û giliyên xerab girtin. Karê xwe bi têkûzî kirin. **Evîn çiqas xetayan bike jî tu car* ***gotinê nayîne ser xwe****. *Maşelah Ezîze tu* ***gotinekê nayne ser xwe****, bi xwe karê xwe dizane û dike.*

Gotin (pirs) pê de neçûn

Pir biinyat bûn, zû bi zû îkna nebûn. **"Herdu melekan li hev nihêrîn û gotin: 'Bi rastî serê vî hişk e,* ***pirs pê de naçin*** *divê ruhistîn bi xwe were' û çûn."* Osman Sebrî

Gotin pê neman

Heqê gotinê tune bûn. **Dibe ku wisa be, lê ew* ***gotin bi te nemaye****.*

Gotin pê re çûn gorê

Raz (sir) tu car negotin. **Ew mêrekî wisan e ku* ***gotin pê re diçin gorê****.*

Gotin pisîkê gûyê te derman e, rî û veşart.

bnr. Gotin: "Pisîkê gûyê te derman e." Pisîkê rî xist xerman e.

Gotin: "Pisîka xalo hate te, ha pisîka xalo hate te!" Got: "Ca berdin bila pisîka xalo bê min lo!"

Bes e êdî hûn min bi wê ditirsînin, ka çi dibe bila bibe lo! ****Gotin: "Pisîka xalo hat te, ha pisîka xalo hat te!" Got: "Ca berdin bila pisîka xalo bê min lo!"*** *Çiye yaho êdî bes e we ez hetikandim.*

Gotin: "Pisîkê gûyê te derman e." Pisîkê rî xist xerman e.

Dema kesek zehf tê têfirandin, xwe winda dike. **Gelek caran pesindan encamên nebaş jî dertîne.* ***Gotin: "Pisîkê gûyê te derman e." Pisîkê rî xist xerman e.***

Gotin: "Pîso tu çima pîs î?" Got: "Xwedê li eniya min nivîsî."

Ez çawa bikim ne di destê min de ye. **Ma ew jî sûcê min e?* ***Gotin: "Pîso tu çima pîs î?" Got: "Xwedê li eniya min nivîsî."***

Gotin: "Pişo gûyê te derman e." Firiya çû ezman e.

bnr. Gotin: "Pisîkê gûyê te derman e." Pisîkê rî xist xerman e.

Gotin: "Pişo, diya te yan bavê te?" Got: "Miyaw miyaw!"

Hema her du jî wekî hev in. **Welehî ez nizanim çi bibêjim.* ***Gotin: "Pişo, diya te yan bavê te?" Got: "Miyaw miyaw!"***

Gotin: "Pişo gûyê te derman e." Got: "Na hebirman e."
bnr: Gotin: "Pisîkê gûyê te derman e." Pisîkê rî xist xerman e.

Gotin: "Piyala mîr ketiye, şikest yan kupiya?" Got: "Hey deng jê hat."
Tiştek bû, ema çi bû Xwedê dizane. **Ez jî baş nizanim çi qewimî.* ***Gotin: "Piyala mîr ketiye, şikest yan kupiya?" Got: "Hey deng jê hat."***

Gotin: "Qehpikê, tu çima ber nagirî?" Got: "Heta yek çêdike yê din xera dike."
Ji ber ku bi sazûmanî nabe, encam jî nagire. **Jixwe ew karên bêberî û bêserî encam nadin.* ***Gotin: "Qehpikê, tu çima ber nagirî?" Got: "Heta yek çêdike yê din xera dike."***

Gotin qelaptin
bnr: Berê gotinê guhartin

Gotin: "Qijikê zîrça te derman e." Firiya çû ezman e.
bnr: Gotin: "Pisîkê gûyê te derman e." Pisîkê rî xist xerman e.

Gotin rovî: "Me tu kirî mîrê mirîşkan." Got: "Ez ji siûda xwe ne bawer im."
Ji eşqan xwe bi naziyê xistin. Ji guhê xwe bawer nekirin. *****Gotin rovî: "Me tu kirî mîrê mirîşkan." Got: "Ez ji siûda xwe ne bawer im."*** *Tu wer dibêjî, lê ez dizanim tu çiqasî dixwazî.*

Gotin vala çûn
bnr: Gotin di bêjinga qul de çûn

Gotin: "Rûto, malan bar kir." Got: "Teyşta min li piçenga min e."
Tiştekî min î wisa zêde tune ku ez pê biheyirim. **Hûn nekevin tatêlê, kes ji bo min dereng nakeve.* ***Gotin: "Rûto, malan bar kir." Got: "Teyşta min li piçenga min e."***

Gotin: "Seyo, tu çima direyî?" Got "Ez ji gur ditirsim."
Gelek caran zêde axaftin ne nîşana wêrekiyê, lê zêdetir nîşana tirsê ye. **Bila ew qasî bike barebar.* ***Gotin: "Seyo, tu çima direyî?" Got "Ez ji gur ditirsim."***

Gotin: "Singo çima tu xweş bi dîwêr de diçî?" Got: "Ji zora pişta xwe."
Zora zêde gelek tiştan dide kirin. **Zor gizêrê radike.* ***Gotin: "Singo çima tu xweş bi dîwêr de diçî?" Got: "Ji zora pişta xwe."***

Gotin: "Siwaro dizgîna hespê te dirêj e." Got: "Kin û dirêjiya dizgînê di destê min de ye."
Erk û bandor di dest de bûn. *****Gotin: "Siwaro dizgîna hespê te dirêj e." Got: "Kin û dirêjiya dizgînê di destê min de ye."*** *Hûn têkildar nebin ez dizanim, çi dikim.*

Gotin: "Te çiqasî emir kir?" Got: "Bi qasî vê demê."
A girîng dema ku em tê de dijîn e. **Dema ku em îro dijîn, berhema duh e, sibe jî girêdayî îro ye.* ***Gotin: "Te çiqasî emir kir?" Got: "Bi qasî vê demê."***

Gotin: "Terziyo (cilfe) malan bar kir." Got: "Derziya min bi serê min ve ye."
bnr: Gotin: "Rûto malan bar kir." Got: "Teyşta min li piçenga min e."

Gotin: "Tu ji ku yî?" Got: "Hela hê nezewicîme."
Ji ber bandora jinê ya li ser mêran, mêr ji ku dizewicin zêdetir bi wir ve tên girêdan. **Ma we nebihîstiye?* ***Gotin: "Tu ji ku yî?" Got: "Hela hê nezewicîme."***

Gotin xwarin
Li ber kesekî dengê xwe nekirin. **Ez bêgav bûm, ji bo xatirê zarokên xwe, wê çi* ***gotin got, min xwarin***.

Gotina (yekî) belav bûn
Her kes bi gotinê hesîn. **Min tiştek ji te re got, sibetirê min dît ku* ***gotina min li her derê belav bûye*** *jî.*

Gotina (yekî) bihurîn
Gotin bibandor bûn. **Tu qet meraqan meke,* ***gotina wê li wan deran dibuhure***.

Gotina (yekî) birîn
Ketin navbera gotina kesekî. **Ew xortekî bêmeymenet e, tim* ***gotina diya xwe dibire***.

Gotina (yekî) di dêv de bûn
Her gotin bi bersiveke di cih de pêşwazî kirin. **Maşelah ev biraziyê min jî wekî Behlûlê zana (dana) hema* ***gotina wî di dêv de ye***.

Gotina gêziyê derbas bûn, ya (yekî) derbas nebûn
Bêrûmet bûn, gotin bi tiştekî hesab nebûn. **Li wir* ***gotina gêziyê derbas dibe, ya rebenê Şemsedîn derbas nabe***.

Gotina (yekî) kêrta kêvir bûn
Gotin gelekî girîng bûn. **Kuro lawo, tu çi dixwazî, çima* ***gotina jina te kêrta kêvir e?*** (qerf)

Gotina (yekî) kirin dêst
Bersiva yekî ya ku pêwîst e, dan. **Erê wê got, lê min jî* ***gotina wê kire dêst*** *û çû.*

Gotina ku nayê xwarin, gotin
Gotina xerab serfkirin. **Helbet mezinê min e, lê belê ji min re* ***gotinek wisa got ku nayê xwarin***.

Gotina (yekî) li erdê xistin
Rûmet nedan û gotina yekî bi cih neanîn. **Bi rastî min ji wê ew qas jî hêvî nedikir. Keçikê bêminet* ***gotina min li erdê xist***.

Gotina (yekî) li ser ziman bûn
Amadeyî gotina xwe bûn. *****Gotina wê li ser ziman bû****, lê Sehoyê Keçel nehişt bibêje.*

Gotina (yekî) li telê (yekî) ketin
Ji ber gotinên yekî yên neyînî, êşîn. **Ew* ***gotina Nûdemê li telê Asmînê ket****, loma wer xeyîdî û çû mala xwe.*

Gotina me li mala me
Divê eyb û qisûrên malbatê neyên aşkerekirin. Divê ev gotin li vir bimîne. **Erê rast e, lê ji bîr mekin, min çi got?* ***Gotina me li mala me.***

Gotina (yekî) pêpes kirin
bnr. Gotina (yekî) li erdê xistin

Gotina (yekî) qut kirin
Ketin navbera axaftina yekî. *Biborîne min gotina te qut kir, lê ez gelekî tijî me.

Gotina xwe bi cih anîn
Wekî gotina xwe kirin. Li soza xwe xwedî derketin. **Berê me jî zêde jê bawer nekir, lê di dawiyê de* ***gotina xwe bi cih anî.***

Gotina xwe derbas nekirin
Li ser bandor nekirin. **A rastî min kir û nekir,* ***gotina xwe lê derbas nekir.***

Gotina xwe gotin
Daxwaza xwe ya girîng û dawîn bi cih anîn. **Wê* ***gotina xwe got,*** *êdî encam girêdayî gotina te ye.*

Gotina xwe kirin
bnr. Gotina xwe bi cih anîn

Gotina xwe li rûyê (yekî) gotin
Armanc û daxwaza xwe veneşartin, rasterast gotin. **Ew ne jineke wer xeybbêj e,* ***gotina xwe hema li rûyê mirov dibêje.***

Gotina xwe ne hildan, ne danîn
Vê gotina xwe carek din dubare neke û carek din qala vê mijarê meke. **Te vê carê ji min re got, lê carek din vê* ***gotina xwe ne hilde, ne jî dayne.***

Gotina xwe nedan paş
Dev ji gotina xwe bernedan. **Ew mirovekî wisa ye,* ***gotina xwe nade paş.***

Gotina (yekî) pere nekirin
Gotinê tu bavdor nekirin. **Ez dizanim* ***gotina te jî pere nake,*** *qet xwe neêşîne.*

Gotina xwe teqilandin
bnr. Berî ku bibêje, dipêje

Gotina xwe texsîr nekirin
Tiştê ku di dil re derbas dibe bêminet gotin. **Welat mirovekî dirust e, çi difikire, dibêje,* ***gotina xwe texsîr nake.***

Gotina xwe xwarin
Li gotina xwe xwedî derneketin. **Ez ji wî ne bawer im, çimkî wî gelek caran* ***gotina xwe xwariye.***

Gotina xwe kirin yek

Biryara heman gotinê dayîn. *\"Rojekê min û sê-çar hevalan me **gotina xwe kire yek**, emê biçûna şikefta Bilxêrrê, nêçîra çêlkewan... Şikeft sê-çar saetan ji gundê me dûr bû.\" Qedrî Can

Gotinek tê de neçûn

Gelekî bêhnteng û hêrs bûn. **Heyran ka lawik çawa ye, **gotinek tê de naçe**.*

Gotinên (yekî) bi heft bar hingiv nehatin xwarin

Gotinên pir xerab gotin. **Bi rastî jî **gotinên wê bi heft bar hingiv nayê xwarin**, lê mixabin ku di navberê de Fatme heye.*

Gotinên (yekî) cihê xwe girtin

1. Gotin layiqî rewşê bûn. **2.** Gotin rast derketin. **Ew **gotinên Almastê yên teqil di wê sohbetê de li hemberî Zerîfeyê tam jî cihê xwe girtin**. **Me berê guh nedayê, lê **gotinên diya min giştî jî cihê xwe girtin**.*

Gotinên (yekî) daqurtandin

Ji ber hin sedemên bêgavî li hember gotinên yekî yên xerab dengê xwe nekirin. **Ji neçarî min stûyê xwe li ber xwar kir û ew **gotinên wî daqurtandin**.*

Gotinên (yekî) di bêjinga qul de çûn

Gotinê bandor û feyde nekirin. **Mixabin, min çi got, hemû **gotinên min di bêjinga qul de çûn**.*

Gotinên (yekî) hev du negirtin

Di navbera gotinan de nakokî hebûn. Derew kirin. **Baweriya min pê çênebû. Çimkî **gotinên wî hev du nedigirtin**.*

Gotinên fişarde kirin

Bê rê û bê denge peyîvîn. **Wî **gotinên fişarde kirin**, ez gelekî aciz bûm.*

Gotinên giran gotin

Gotinên tehl û ne xweş gotin. ***\"Gotinên giran mebêje.\"** Zana Farqînî

Gotinên (yekî) li hev nenihêrîn

Gotinan li hev negirtin ango derew axivîn. **Ew zelîf zêde dipeyîve, belkî jî loma wisa **gotinên wî li hev nanihêrin**.*

Gotinên nedîtî û nebînayî kirin

Gotinên pir balkêş û ecêb kirin. **\"Yanî jinek dikere hevqasî ji xelkê cihê be; tevgerên cuda, kar bi rêkûpêk, girêdaneke kevnare û rengîn, **gotinên nedîtî û nebînayî**, safbûneke zarokan û baweriyek xerîb.\"** Selman Dilovan

Gotinên (yekî) pîne kirin

Bi armanca parastin û alîgiriyê gotinên yekî yên ne xweş, wekî xweş nîşan dan. **Qet **gotinên qîza xwe pîne neke**, min fêm kir, ku ew dixwaze çi bibêje.*

Gotinên sar kirin
Di xeberdana xwe de qala tiştên ne li cih, neyînî û pozîdebûnê kirin. *\"Ev **gotinên te yên sar** min diêşînin.\" Zana Farqînî

Gotinên (yekî) serê xwe girtin (negirtin)
Gotin rast derneketin. *Mixabin ku **gotinên ku wî gotin, serê xwe negirtin**.

Gotinên tehl gotin
bnr: Gotinên sar kirin

Gotinên tewş kirin
Gotinên ne di cih de gotin. *Ez ji wir qetiyam, ji ber ku te **gotinên tewş kirin** û min nexwest ez li wan gotinên te gulıdarî bikim.

Govend gerîn
Dem derbas bûn. Firsend ji dest çûn. *Êdî **govend gerî**, tu çi bikî bêkêr e.

Govend gerandin
Bi dęk û dolaban û karên sexte re mijûl bûn. *\"Rast e, nekarîne te bitewînin **û bigihîne** mebestên xwe. Lê divê ji wan re bipeyivî, yan jî wê **govenda ku digerînûn** bibînî.\" Xelîl Duhokî

Guh beliqandin
Bi baldarî guhdarî kirin. *\"Ji berê sibehê, gundiyan li ber dîwaran **guh beliqandin**, bê ka wê keçikê kengê biherin.\" Talip Kalın

Guh çûn
Ji ber dengê bilind û qelebalixê aciz bûn. *Bi def û zirneya van mirtivan **guhê me çû**.

Guh dan gotinan
bnr: Guh dayîn

Guh dan nava dilê xwe
Tenê li ya dilê xwe guhdarî kirin. *Kê çi got nekete serê wê, wê tenê **guh da nava dilê xwe**.

Guh dapêlî kirin
Li çewtiyên xwe mikur hatin an jî pejirandin û guh dayîn pend û şîretan. *Piştî wê çewtiya mezin Rihanê **guh dapêlî kir**.

Guh dayîn (Guhê xwe dayîn)
1. Guhdarî kirin. **2.** Wekî gotin û daxwazê kirin. **3.** Girîng girtin, rûmet dan. *Kesî **guh neda** wê koma muzîkê. *Ji min zêdetir ew **guh dide** gotina birayê xwe. *\"Çavdêr dibêjin, roket ji alaya leşkeriyê hatiye, lê dozger **guhê xwe nade** wan, polês diçin gefan li malbatê dixwin da ku berpirsiya hêzên dewletê neyne rojevê.\" Samî Berbang

Guh dayîn xwe
1. Li ser bejn û bal û ser û guhê xwe zêde sekinîn. **2.** Di hêla derûnî (psîkolojiyê) de zêde

li ser xwe serwext bûn, li xwe zêde fikirîn. **Erê heftê salî ye, lê hê jî baş **guh dide xwe** û tu car bêqiravat û bêtiraş dernakeve der. *Meta min ew qas **guh dide xwe**, ku her roj qala nexweşiyeke xwe ya nû dike.*

Guh dêrandin
Guh lê bel kirin, guhdarî kirin. **Heya lingê wê neşimitî wê jî **guh nedidêrand**.*

Guh ker kirin
bnr. Guh çûyîn

Guh lê birin
Bi axaftinê yek aciz kirin. **Wî tirtiro heya êvarê **guh li min bir**.*

Guh lê genandin
bnr. Guh çûyîn

Guh lê mezin bûn
Bi baldarî guhdarî kirin. **Dema bûyereke bi dizî biqewime, di heman demê de **guh li Fîrdevsê mezin dibin**.*

Guh lê nekirin
Girîng negirtin, rûmet nedan. **"Ji kesekî fêm nedikir û kesî jî **guh lê nedikir**. Bi vî awayî bûbû wek mirovên gêj."* Talip Kalın

Guh lê sist kirin
Gelekî betilîn. Ji hêz ketin. **"Û piştî çend mehan hate gotin: "Binêrin, Eyşokê çawa **guh li Şêxmûsko sist kiriye**."* Bavê Nazê

Guh lê xewt bûn
Bi baldariyeke zêde guhdarî kirin. **Dema ku qala wê mijarê dibû, tim **guh li Fazil xewt dibûn**.*

Guh pê nekirin
Neecibandin, girîng negirtin. **Gedeyê belengaz çiqas xwe pê ve dizeliqand jî wê keçikê **guh pê nedikir**.*

Guh qirîn
bnr. Guh seqirîn

Guh qul bûn
Zû agahdar bûn. **Ka Gulîzer yeka çawa **guh qul e**. Tiştê ku pê agahdar nebe nîn e.*

Guhdarî kirin
bnr. Guhê xwe dan

Guhdirêj ji bo ziyandayîna xwediyê xwe geverbûna xwe dixwaze.
Bindest ji ber zilm û zora serdestan, pir aciz in. **Kîneke wisa di wan karkeran de ye ku*

wê fabrîqeyê bişewitînin, dilê wan rehet nabe. ***Guhdirêj ji bo ziyandayîna xwediyê xwe geverbûna xwe dixwaze.***

Guhek kirin serad, yek kirin bêjing

Guh nedan, girîng negirtin. **Lawê min,* ***guhek kiriye serad, yek kiriye bêjing****, ez çi dibêjim qet telaş nake.*

Guhê (yekî) ba dan

Der barê tiştekî de yan jî kesekî de yek hişyar kirin, îqaz kirin. **Erê, min* ***guhê wî bada*** *lê tu dîsa jî li ser wî serwext be.*

Guhê guran nîşanî hev du dan

Hev û din tehdît kirin. **Tu menêre, her du alî jî* ***guhê guran nîşanî hev du didin****, lê her du jî ji hev du vedikişin.*

Guhê (yekî) gêj kirin

Bi deng û axaftin yek aciz kirin. **"-Te bi telefonan* ***guhê min gêj kir****. Mitsek ax û mistek ax, ma ji te pê ve tu kes nehatiye xerîbiyê? Tûrikê mişt ax ji binê çente derxist û da destê wî."* Jan Dost

Guhê (yekî) jê zingînî nekirin

Bawerî pê neanîn. **Erê ew gelek tiştan dibêje, lê* ***guhê min jê zingînî nake****.*

Guhê ker dayîna ber

Daxwaza guhdariyê nekirin. **Min wisa zen kir ku wê ji zû de biryara xwe dabû, ji ber wê jî* ***guhê ker da ber min****.*

Guhê (yekî) kişandin

bnr. Guhê yekî ba dan

Guhê (yekî) li ser ... bûn

Guhdarî kirin. **"Li min biborin. Hûn axaftina xwe bidomînin,* ***guhê min li ser we ye."*** Hesen Zinar

Guhê (yekî) li ser çingîniya şûjinê bûn

Li hincetan gerîn. **Eman karê we bi wê neketiye, jixwe hema* ***guhê wê li ser çingîniya şûjinê ye****.*

Guhê (yekî) seqirîn

Aramî bi dest xistin. Rehet bûn. **"Zaro zû germ bûn, êdî nedigiriyan. Zehf nekişand, zaro ketin xewa şirîn. Dilê min hebekî rehet bû.* ***Guhê min jî seqirî*** *ji dest zêwe-zêwa zara."* Erebê Şemo

Guhê xwe dan

Bi dil û can guhdarî kirin. **"..ka te çend kiçkeka biçwîk diviya, vêca* ***guhê xwe bide*** *deyka xo, belkê rojekê tu û ew kiçka biçwîk bigêhne êk."* Kerîm Cemîl Biyanî

Guhê xwe dan hinekên din
Bi ya hinekên din kirin. **Wekî di serî de wê* ***guhê xwe neda hinekên din****, niha rewş bi awayekî din bû.*

Guhê xwe dayîn ser
Guhdarî kirin. **Min ku* ***guhê xwe da ser****, min fêm kir ku ev mijar dûr û kûr e.*

Guhê xwe dayîn pişt xwe
Bal dayîn kesên li hawîrdor. **Cawîdan tim* ***guhê xwe dide pişt xwe****, lê dû re jî poşman dibe.*

Guhên (yekî) dirêj bûn
Li hember tiştên pir ecêb û balkêş mat û şaşwazî man. **A rastî dema ku min ew ecêb bihîst,* ***guhên min dirêj bûn****.*

Guhên (yekî) giran bûn
Giran ango hindik bihîstin. **Êdî* ***guhê diya min giran bûne****, ez têdigihîjim ku diya min pîr bûye.*

Guhên (yekî) livîn
Pir jîr û serwext bûn. **Na lo!* ***Guhên wî zelîf dilivin****, ew ne yekî wisa ye ku di bin kirinên wî de bimîne.*

Guhên şeytan ker bûn
Înşelah şeytan pê nehese. *****Guhên şeytên ker bibin.*** *Şikir rewşa dikana me van rojan baş e.*

Guhên xwe bel kirin
Bala xwe zêde dan. **"Bi demekê şûn de gujeguka kamyonê hat. Kalo* ***guhên xwe bel kirin*** *ka ew kamyona xwarinê ye an na."* Gülay Ersoy

Guhên xwe dagirtin
bnr: Guhên xwe bel kirin

Guhên xwe fît kirin
bnr: Guhên xwe tûj kirin

Guhên xwe miç kirin
Bi awayekî zêde bala xwe dan. **"Gava ku goşeyên secadeya xwe ji hev vedikirin cara pêşî bû ku hawîşkên dirêj dirêj hatinê, navberkê li xwe varqilî* ***guhên xwe miç kirin****."* Mem

Guhên xwe miçiqandin
bnr: Guhên xwe bel kirin

Guhên xwe tûj kirin
Bi baldarî guhdarî kirin. **"Û dema ku* ***guhên xwe tûj dike****, nalîna kesekî di taya mirinê de tê wî."* Pîr Rustem

Guhên xwe jê re girtin

Bi zaneyî guh nedan, girîng negirtin, wekî ku tune yan jî bêdaxwaz e, hereket kirin. *"*Lê dinyayê **guhên xwe ji wan re girtibûn** û bi dek û dolaban li benda wan diketin."* Yaqûb Tilermenî

Guhên xwe vekirin

Bala xwe baş dayîn, bi dil û can guhdarî kirin. *"*- Gelî gundiyan! Mizgîniya min li we be. **Guhên xwe vekin** û qenc li min guhdarî bikin."* Dost Çiyayî

Gujeguja (yekî) bûn

1. Çapik û çeleng bûn. **2.** Dengekî zêde jê derketin. **Maşelah qîzeke Mûsa heye, **gujeguja wê ye**. Bi serê xwe karê sê jinan dike. *Di êvar de **gujeguja vî bayî ye**, nehişt em razên.*

Gujînî bi guhên (yekî) ketin

Serî lê gêj bûn. **Hema ji nişka ve **gujiniyek li guhê min ket** û ji wê bi şûn de min xwe nedît.*

Gujînî jê anîn

Zor û zerp lê xistin. **Zinar sîleyek da hingulhê Zelalê, **gujînî jê anî**.*

Gula (yekî) çilmisîn

1. Sênc şikestin, moral xera bûn. **2.** Ji ber nexweşî yan jî tiştekî din jar bûn. ***Gula wê çilmisî ye**, min jê fêm kir, ku di navbera wan de tiştek derbas bûye. *Di nexweşxaneyê de **gula wî xortê geş wisa çilmisîbû**, ku gunehê gawiran pê dihat.*

Gul ji rûyê (yekî) barîn

Geş û bedew bûn. **"Hîn 22 salî bû. Por û çavên wê reş û esmereke şêrîn bû. Ku dikeniya, **gul ji rûyê wê dibariyan**."* A. Rahman Çelik

Gul peqîn

Gul vebûn, geş bûn. **"Ez dizanim bela ye û neyarek e, lê bêlına min qet nahêt, demê ez vê **gula nepeqî** hosa çikandî li ber derê malê dibînim..."* Hesen Silêvanî

Gula eniya (yekî) çilmisîn

Li ber xwe ketin, rengiz û moral xera bûn. **Zara (zarokan) dinêrim, xwîn dirêje nav dilê min. Ro bi ro **gula eniya wan diçilmise**."* Rizaliyê Reşît

Gula geş bî, neçilmisî

Diya min hema digot: "Lawo tu **gula geş bî neçilmisî."* (dia)

Gula geş, dane ber pozê kera reş.

Ji bo karên çiloçepî yên nelayîq tê gotin. ***Gula geş, dane ber pozê kera reş.** Heyran ew nexeritandî ji wê nazikbûnê û ji wê fem û feresatê çi fem dike?*

Guleya Şemis lê ketin

Rastî belayeke mezin be. **Weyla **gula Şems li wî ketî**, her tişt di ruyê wî de bû.* (nifir)

Gulan e, şingîniya dasan e.

Di gulanê de gelek cihên Kurdistanê destpêka çinîna çandiniyê ye. **Niha li welatê me **gulan e, şinginiya dasan e**.*

Gule berî hev dan

Ji hev nefret kirin. Paşgotiniya hev û din kirin. **Nizanim çi di navbera wan de derbas bûye? **Gula berî hev didin.***

Gule li ser kevçika dil ketin

Wî keçika min zehf êşandiye, belkî **guleyek li ser kevçika dilê wî bikeve.* (nifir)

Gulebaran kirin

bnr: Bombebaran kirin

Gulê memir, bihar tê.

bnr: Pîrê nemir bihar tê, kero nemir qiwar (pincar) tê.

Gulê were ser tûyan

Her tişt xelas bû, hema ew ma. **Pehe! Kar xelas bû, **Gulê were ser tûyan.*** (qerf)

Gulê wisa dibêje, ka Evdal çi dibêje?!

Aliyek wer dibêje, ka aliyê din çi dibêje? **Tenê bi guhdariya hêlekê nabe. **Gulê wisa dibêje, ka gelo Evdal çi dibêje.***

Gulên sor avêtin rûçikê (yekî)

1. Fedî kirin. **2.** Ji ber givr û goştbûn û xwînê sor bûn. **Dema ku qala zewaca Nûbiharê tê kirin, **gulên sor diavêjin rûyê wê**. *Maşelah **gulên sor xwe avêtine rûçikê Gulnazê**.*

Guliya xwe di ser bira de jêkirin

Bira mirin. **Tu **guliya xwe di ser birayê xwe de jê bikî**.* (nifir)

Guliyên (yekê) bi heft kêran û heft dûzanan (gûzanan) jêkirin.

Li rastî cezayekî giran hatin. (Ji bo jinan tê bikaranîn.) **Divê **guliyên Biharê bi heft kêr û dûzanan bên jê kirin**.*

Gulî dirêj, aqil qirêj

1. Ji bo kêmaqiliya jinan tê gotin. **2.** Ji der ve xweşik, lê naverok pûç bûn. **Ez wer nabînim, lê kal û bavan gotine, **gulî dirêj, aqil qirêj**. *Tu li xuyanga wê menêre, **gulî dirêj e, lê aqil qirêj e**.*

Gulî li qirika (yekê) gerîn

Înşelah **gulî li qirika wê bigere.* (nifir)

Guliya jinê, rewşa dinê

Por, ji bo jinan xeml û rêgeza bedewiyê ye. **Ka bifikire, jina bêpor ji çi re ye? **Guliya jinê, rewşa dinê.***

Guliyên xwe kur kirin

bnr: Porê xwe li ser bav û birayê xwe de kur kirin

Guman pê nebûn
Tu hêviyeke alîkariyê jê nekirin. **Weysî wisa rûreş e, tu **gumana mirov pê nabe**.*

Guman tê de çûn
Jê ketin şikê. **Bi rastî ji bo dizîna wan pereyan **gumana min di Kazim de çû**, lê dû re diz yekî din derket.*

Gumana (yekî) çûyîn (yekî)
Jê şik û şuphe kirin. **Ji bo wan pezê me yê ku hate dizîn **gumana me diçe Mistèdizekê**.*

Gumana îmanê tê de tune bûn
Ji bo kesên pîs, zilm, zexel, û sextekar tê gotin. **Erê, mela ye lê Xwedê dizane ku tu **gumana îmanê tê de tune ye**.*

Gumana xwe jê birîn
bnr: Hêvî li ber bê çûn

Gund û bajar li bin guhê hev xistin
Gelekî gerîn. **Di wê navberê de li wê herêmê çi **gund û bajar hebûn min giştî bin guhê hev xistin**.*

Gundek e, gindorek e. (Gundekî îı gundorekî)
bnr: Gundek e, rindek e

Gundek e, qilorekek e.
bnr: Gundek e, rindek e.

Gundek e, rindek e. (Rindek e, gundek e.)
Em in û ew e, divê em îdare bikin, ji bilî wê vebijarkeke me nîn e. **Em in û ew e, ma ji bilî wê vebijarkek me heye? **Gundek e, rindek e.***

Guneh ji stû derketin
Tu sûc û tawanek jê re neman. Binbariya xwe bi cih anîn. **Îro **guneh ji stûyê min derketiye**, min vatiniya xwe tev aniye cih.*

Guneh li stûyê gotiyan bûn
Tu sûcekî min tê de nîn e, wisa gotin. ****Guneh li stûyê gotiyan be**, lê dibêjin, qîza Ûsivê Bedo ji lawê Zahar zikê xwe tijî kiriye.*

Guneh pê hatin
Dil pê êşîn. Pê xemgîn bûn. ****Gunehê min pê hat**, ez lê xwedî derketim, lê wê jî pereyên min dizîn û revî çû.*

Guneh standin
bnr: Gunehê (yekî) hildan

Gunehê gawiran pê hatin

Di nav rewşeke xeter de bûn. *"***Gunehê kafiran pê dihat**, *meriv digot, wê niha li ser aliyekî bikeve."* Xelîlê Çaçan

Gunehê (yekî) hildan

Bi neheqî yek tawanbar kirin. *"*Lê dema dijmin / Pêsîrên welat / Dimijin û tu / Bi dilekî xweş radizê / Tu Xweda nikare / **Gunehê te hilîne.**"* Rizoyê Xerzî

Gunehê (yekî) kişandin

Ji ber xeta û tawana yekî din bedel dan. *"*Min bi gelê xwe re xayîniyeke mezin kiriye. Ez vî **gunehî heya demeke dirêj nikarim bikişînim**."* Bêmal Serhedî

Gunehê xwe bi xwe anîn

Rewşa xwe ji ya heyî xerabtir nîşan dan. **Ew xalê min ku wisa **gunehê xwe bi xwe tîne**, *ez pê aciz dibim.*

Gunehê xwe jî bi deyn nedan (Gunehê xwe nedan)

Ji bo mirovên pir temahkar tê gotin. **Hay lo lo! Kuro lawo, ew qet **gunehê xwe bi deynî nade** *mirov, dev ji wî berdin heyran.*

Gunehê xwe pê anîn

Ji ber rewşa yekî dilzîz û xemgîn bûn. **Zozanê **gunehê xwe pê anî** *û bir dibistanê qeyd kir; lê ew dîsa revî.*

Gunehê Xwedê pê hatin

Ji tengasiyê xelas bûn. **Rewşa wê zelif xeter bû, lê **gunehê Xwedê pê hat** *ku va ye hinekî bi ser xwe de hat.*

Gunehê (yekî) xistin stûyê xwe

bnr. Gunehê (yekî) hildan

Gur bixwin ew pê re heval e.

Li hemberî yekî hestên dijminatî sêwirandin. **Ez wî bêbavî baş nas dikim. **Gur min bixwin, ew pê re heval e.***

Gur bûne ser, ma qiyamet e?!

Ji bo rewşa xirecir û îzdihamê tê bikaranîn. **Me got, em xêrekê belav bikin hûn **gur bûne ser, ma qiyamet e**?!*

Gur di malê ketin

Mal û milk tune bûn. Feqîr bûn. **Jixwe **gur di malê ketiye** *û tiştek jî nemaye.*

Gur di ser re baz dan

1. Gelekî tirsîn. **2.** Pir jar bûn. **Di wê newala xalî de, ketibû rewşeke wer, ku te digot **gur di ser re baz daye**. **Wê nexweşiyê wisa kir ku tu dibêjî **gur di ser Gernas re baz daye**.*

Gur dibêje: "Heta kuştina heft pezan wesiyeta bavê min e, ji wir bi şûn de mêraniya min e."

Ji bo bêînsafî û ziyankariya guran û mirovên wekî guran tê gotin. **Jixwe gur bi xwe rewşa xwe aniye ziman û gotiye:* ***"Heta kuştina heft pezan wesiyeta bavê min e, ji wir bi şûn ve mêraniya min e."***

Gur dibêje: "Şeva reş, şûva reş, mîha qer, berx li ber, ji hev dikim der."

Ev biwêj zelal û zêde dîtina gur tîne ziman. ****Gur dibêje: "Şeva reş, şûva reş, mîha qer, berx li ber, ji hev dikim der."*** *Çavên wî jî wekî yên gur tûj in.*

Gur girtin û şîret kirin, got: "Zû bibêjin, paşiya kerî ji destê min çû."

Ji bo şîret û helwesta bêkêr tê gotin. **Erê, hema te got wî jî fêm kir û biaqil bû ha(!).* ***Gur girtin û şîret kirin, got: "Zû bibêjin, paşiya kerî ji destê min çû."***

Gur got: "Hevalo, germ ne ev germ e, dema ku xwediyê golikan da ser me, hevraz û berjêr da ber me, ya wê çaxê germ e."

Her tiştek demeke wê heye, heke mirov wekî wê neke, wê ziyanê bibîne. ****Gur got: "Hevalo, germ ne ev germ e, dema ku xwediyê golikan da ser me, hevraz û berjêr da ber me, ya wê çaxê germ e."*** *Ez jî ji te re dibêjim, lê tu tênagihîjî.* (bnr. çîrok)

Gur got: "Te li pîreka xwe xista, wê jî li qîza xwe xista, hinek mû (bend) birista, lingê kerê reş xista, min jî li van sirta ew nekuşta."

Tu ku tedbîra xwe negirî û li malê xwe xwedî dernekevî, helbet tu dê ziyanê bibînî. **Tawanbarkirin hêsan e, hinekî jî li tedbîra xwe binêrin.* ***Gur got: "Te li pîreka xwe xista, wê jî li qîza xwe xista, hinek mû birista, lingê kerê reş xista, min jî li van sirta ew nekuşta."*** (bnr. çîrok)

Gur gote sê: "Bêhna xwe bide min." Sê gotê: "Ku bidime te, tu yê dinyayê talan bikî."

Ev biwêj erjengî û ziyandayîna gur û yên ku wekî guran zirarê didin mirovan tîne zimên. **Bi rastî jî gur ajaleke xurt û ziyankar e. Dibêjin,* ***gur gote sê: "Bêhna xwe bide min." Sê gotê: "Ku bidime te, tu yê dinyayê talan bikî."***

Gur gotiye: "Ha jin, ha hêlikên min, lê gava mêr ku dikin fîtînî, paşiya min dike çirtînî."

Sehma mêran giran e. **Helbet sehma mêran giran e. Ma gur li cihê sekinî gotiye:* ***"Ha jin, ha hêlikên min, lê gava mêr ku dikin fîtînî, paşiya min dike çirtînî."***

"Gur got: 'Hevalo, germ ne ev germ e, dema ku xwediyê golikan da ser me, hevraz û berjêr da ber me, ya wê çaxê germ e.'"

Di genna havînê de du gurên birçî, ji xwe re li risqekî digerin ku zikê xwe têr bikin. Diçin nêzikî zomekê dibin, bala xwe didinê ku wa ye du golik di newalekê de ji xwe re diçêrin. Vir de wê de bala xwe didinê ku tu kes li wan deran nayê xuyan, xwe diavêjin golikan, li erdê, belav dikin û dest pê dikin goştê wan dixwin. Dema ku hinekî zikê wan têr dibe, yek dibêje: *"Hevalo de hema zû bike em ji vir herin!"* Gurê din tevziya dide xwe û dibêje: *"Hevalo havin e, germ e, me zikê xwe jî têr kiriye, em di ber siya vî kendalî de hinekî velezin û ji xwe re razin, em ê dû re herin."* Yê din lê vedigerîne û dibêje: *"Gur got: 'Hevalo, germ ne ev germ e, dema ku xwediyê golikan da ser me, hevraz û berjêr da ber me, ya wê çaxê germ e.'"*

"Gur got: 'Te li pîreka xwe xista, wê jî li qîza xwe xista, hinek mû (bend) birista, lingê kerê reş xista, min jî li van sirta ew nekuşta.'"

Li gorî cefenê, gur kera mêrik dixwe, ji ber ku xwediyê kerê hêrs dibe û xeberan dibêje. Li gur zor diçe û ji xwediyê kerê re dibêje: *"Te li pîreka xwe xista, wê jî li qîza xwe xista, hinek mû birista, li lingê kerê reş xista, min jî li van sirtan ew nekuşta."* Vê carê jî çima ku gur jina mêrik tawanbar dike ku mû neristiye, werîs çênekiriye û ker girê nedaye. Jinik mêze dike ku di hêlekê de gotinên gur rast in, dikeve tengasiyê, pir hêrs dibe, dide xeberan, nifîran dike, zikdirîna dide gur û jê re dibêje: *"Guro ez xwediyê merivê pir im, ez ê quriş di ber çerxî de bibirim, ez ê ji xwe re kerekî ji yê reş çêtir bikirim."*

Gur hatc diyaran, delîl halê jaran.
bnr: Gur hate nav malan, wey li halê feqîr û jaran

Gur hate diyaran, hewar kete hezaran.
Kesên ziyankar tirs û xofê diafirînin. ***Gur hate diyaran, hewar kete hezaran.*** *Rewşa wan leşkeran wekî ya guran e.*

Gur ji birçîbûnan nikaribû bi rêv here, digotin: "Mîratî wisa xwariye ku nikare di bin zikê xwe de bi rêv here."
Ji dûr ve nirxandin, ne azîneke rast e. **Dibe ku ji dûr ve rewş bi awayekî din bê xuyan, lê ya girîng, rasteqînî bi xwe ye.* ***Gur ji birçîbûnan nikaribû bi rêv here, digotin: "Mîratî wisa xwariye ku nikare di bin zikê xwe de bi rêv here."***

Gur ket (nav) pêz, gûyê şivên hat.
bnr: Wexta nêçîra min tê gûyê tajiya min tê.

Gur kete nav pêz, seg li keleşan digeriyan.
Ji bo helwesta hincetgerînê tê bikaranîn. ***Gur kete nav pêz, seg li keleşan digeriyan.*** *Jixwe yên ku naxwazin têbikoşin, ji xwe re wer sedeman dibînin.*

Gur kirin şivanê pêz.
bnr: Çîpa gur girtine avêtine nav koza berxan.

Gur mir, rovî li meydanê govend kişand.
Yên xurt û hêja ku ji holê diçin, meydan ji yên din re dimîne. **Helbet wê şad be.* ***Gur mir, rovî li meydanê govend kişand.***

Gur û hirç bûn destbira, dinya bû mehdîzeman.
Yên zana û bihêz ku bibin yek, rewş dijwar dibe. **Bi rastî jî vê carê rewşa te zor e.* ***Gur û hirç bûn destbira, dinya bû mehdîzeman.***

Guran aqil xwarin
Ji bo kesên di nav helwesteke ne rast de ne tê gotin. ***Ma guran aqilê te xwariye** ku tu bi wan re hevkariyê bikî?*

Guran meydan xwarin
Tu derfet û guman neman. *"Min xwe gunehkar dikir, paşê diliminî dida ber dilê xwe: Xwe meydanê guran nexwariye, wekî ez mêrekî zor im, ez ê sibê bêjimê, min di dilê xwe de got." Xelîlê Çaçan

Guran kera bavê xwarin
Ji bo yên zêde ne feqîr in, lê ser û guhê wan pir xerab û pînekirî ne tê gotin **Lawo ev çi halê te ye? Çima **ma guran kera bavê te xwariye**?*

Guran kerê Hesen xwariye, ne gazî ye ne hewar e.
Ji bo kesên ku pirsgirêka xwe gelekî mezin dikin tê gotin. **Wey li minê! Ev çi welatekî bêxem e lo!* ***Guran kerê Hesen xwariye, ne gazî ye ne hewar e.*** (qerf)

Gurayî pê dan
Girîng girtin. *"*Divê ku **gurayî bi van çalakiyan bê dan**."* Zana Farqînî

Guregur kirin
Lafekî kirin. **Ew pir **guregur dike** lê bawer bike, ji wan gotinên xwe qet yekî jî nayîne cih.*

Gurê kerê girêdayî bûn
Tenê mirovê tiştên, bêzehmet, hêsan û belaş bûn. **"Hew, tu nizanî ev kî ne? Ev **gurên kerê girêdayî ne**."* Çiya Mazî

Gurê heft çiyayan bûn
Ji bo kesên xurt û pêkhatî tê gotin. **Hay lo lo! Kurê Zeynika Qûntepik jî **bûye gurê heft çiyayan**.*

Gurê ku ne dijminê min e, bila hezar salî bijî.
Bila tiştek bi berjewendiyên min nebe, çi dibe bila bibe. **Ji çiyê min re! **Gurê ku ne dijmijê min e, bila hezar salî bijî.***

Gurê reş, seyê sor li vir e. (Gurê soro, seyê reş li vir e.)
Sixurî kirin, hadandin. **Armanca wî hemû ew bû ku digot: **Gurê soro, seyê reş li vir e.***

Gurê serê çiya mirin (Gelo gurê serê kîjan çiyayî mirî ye?)
Ji bo bûyerên ku qet hêvî jê nayên kirin tê bikaranîn. ***Gelo gurê serê kîjan çiyayî mirî ye?** Wa ye îro Yaqûb kincinên pir xweş li xwe kirine.*

Gurî bûye xwe tehtan dide.
Ji derd û kulan û ji mecbûrî ketin nav rewşeke neyînî. **Ew reben çawa bike **gurî bûye, xwe li tehtan dide**.*

Gurmînî jê anîn
Bandoreke mezin lê kirin. **Xelo **gurmîniyek wisa ji wî gayî anî** ku nayê gotin.*

Gurmînî jê hatin
Bihêz û bandor bûn. Zingirî û xurt bûn. **Maşelah di wî temenê zêde de jî **gurmîniyeke wisa ji Xalê Reşo tê** ku mirov heweskar dimîne.*

Guro, bila tu gur bûyayî bila te berê kera min bixwara.
bnr: Guro bila tu gur bûyayî, bila te pêşî golika min bixwara.

Guro bila tu gur bûyayî, bila te pêşî golika min bixwara.
Tu ne hunkufê wî karî yî. **Bila mirovekî wisa bûya ne xem bû. Welehî dilê min nedişewitî. Got: "**Guro bila tu gur bûyayî, bila te pêşî golika min bixwara."***

Guro hijaro!
Bi tirane di wateya, "Heyf lo!" "Weyla li minê." de tê bikaranîn. **Dibêjin keça Sîncar ji ber ku ew pêşbaziya rezîl a televîzyonê qezenc nekiriye li ber xwe dikeve. **Guro hijaro!*** (qerf)

Guro nemire bihar hat.
bnr: Pîrê nemir bihar tê, kero nemir qiwar tê.

Guro vexwe, qijikê bixwe.
Avêtina li ber lepên dijminan. Tûr û tewas kirin. **Bi ya wan be ew hema dibêjin,* ***guro vexwe, qijikê bixwe****.*

Gurzê serê lodê bûn
Ew jî xala dawiya dawîn e. **Jixwe ew gotina wî ya dawîn jî tam* ***gurzê serê lodê bû****.*

Gû bi rêxê kirin
Kar tevlihev kirin, teşqele û rezîlî derxistin. **Em ê di vê civînê de* ***gû bi rêxê kin****, qûna reş û spî li hev bidin xuyandin.*

Gû di dil de kelîn
bnr: Di zik de gû kelîn

Gû di nav de kirin
Kar xera kirin. **Me got em rast bikin, wî bêbavî hê jî* ***gû di nav de kir****.*

Gû di xwe dan
1. Pir hêrs bûn. **2.** Bi karekî pîs re mijûl bûn. **Ji xwe hema ji bo tiştekî piçûk jî Seîd* ***gû di xwe dide****. *Heyfa wî û wî navê wî yê paqij ku wî çû ji bo wê jinikê* ***gû di xwe da****.*

Gû di xwe de xistin qawût
Xwarin nexwarin. Temahkar û çikusî kirin. **Wî teresî* ***gû di xwe de xiste qawût****.* (argo)

Gû ji rêxê re dibêje: "Delalê li ber dilê min."
Yên rewş û naveroka wan nêzîkî hev du ne, bi hev du re têkildar dibin. **Ma zelîf ji hev û din cudatir in?* ***Gû ji rêxê re dibêje: "Delalê li ber dilê min."*** (argo)

Gû ji miriyan deyn kirin
Pir çikûs bûn. **Teresî tu dibêjî* ***gû ji miriyan deyn kiriye****.*

Gû ketiye nav kar.
bnr: Gû di nav de kirin

Gû kirin nav kaxan
bnr: Gû di nav de kirin

Gû li rûyan barîn
Ji bo mirovên rûtal u xirab tê bikaranîn. **Heçiya ew Ferzoyê Bedir nîn e, Xwedê wekîl e, hema* ***gû ji rûyan dibare****.*

Gû li rûyê mirov didin, neynikê jî didin ber.
Mirov rezîl dikin. **Qet qala wan meke, ew* ***gû li rûyê mirov didin, neynikê jî didin ber****.* (argo)

Gû tê ser gûyê, dibêje: "Merheba qelender."
bnr. Gû ji rêxê re dibêje: "Delalê ber dilê min."

Gû tevî aqil (yekî) bûn
Xwe şaş kirin. Çewtiyeke mezin kirin. **Kuro ma **gû tevî aqilê te bûbû** ku te çû ev çewtiya hanê kir?*

Gûxwarin li parê ketin
Dema kesek bi awayekî neheq û bêsedem, dikeve nav têkilî û pirsgirêka du kesan tê gotin. **Heyran tu çima dikevî nav meseleya wan, ma tu nizanî **gûxwarin li para yê wisa dikeve**?*

Gû xwarin
Çewtiyek an jî qebehetek kirin. **Heke te ew **gû nexwara**, niha zimanê me jî ew qasî kin nedibû.*

Gû xwarin, tevî heft bavê xwe
1. Tiştekî wisa nikarin bikin. **2.** Xeta û çewtiyeke zehf mezin kirin. **Ew qasî jî nikarin bikin. **Gû xwarine tevî heft bavê xwe.** *Wan **gûyekî wisa xwarine tevî heft bavê xwe**, welehî em heta hetayê nikarin ji bin wî barî derkevin.*

Gûn lê zer bûn
Rengiz xera bûn. Wech lê çilmisîn. **Bi dîtina qewasan re **gûnê Xelîl lê zer bû**.*

Gûn xweş bûn
bnr. Beşer xweş bûn

Gûyê gewro, li rûyê gewro
Berde, bila bi xwe cezayê xwe bikişîne. Çawa dike bila bike. **Me ew qas got, gotina me bi tiştekî hesab nekirin. Êdî tiştekî ku em bikin nîn e, **gûyê gewro, li rûyê gewro**.* (argo)

Gûyê gûxwaran xwarin
Xwe gelekî kêm kirin. **Kuro ew qas jî nabe, ew diçe bi ser de **gûyê gûxwaran jî dixwe**.* (argo)

Gûyê hev du xwarin
Ji hev du re gelekî nêzîk bûn. **Na lo! Vê gavê her du jî **gûyê hev du dixwin**, lê ji bo demeke dinê dibe ku rewş bê guherandin.* (argo)

Gûyê hişk dicûn dicûn, li eniya mirov didin.
Tam tawanbar kirin. **Eman lawo bidin û birevin ji van. **Ev gûyê hişk dicûn dicûn, li eniya mirov didin.*** (argo)

Gûyê serê sibehê bûn
Ji bela û qotika ku serê sibehê diqewime re tê gotin. **Ez çi zanim ew jî **gûyê serê sibehê bû** û li me geriya.*

Gûyê (yekî) xwarin
Ji yekî re qûl û kole bûn. **Li her destê wê naxebite, hema bi eşkere **gûyê wê dixwe**.*

Gûyê xwe bêhn kirin
Zehf eziyet û îşkence dîtin. **Erê, herê wî gelek zilm li wan dikir, lê îro jî ketiye roja segan û di hundir de **gûyê xwe bêhn dike**.*

Gûyê xwe hişk dike, ser sêlê dipêje û dixwe.
bnr. Gûyê xwe hişk kirin û xwarin

Gûyê xwe hişk kirin û xwarin
Pir temahkar bûn. **Jixwe ew **gûyê xwe hişk dike û dixwe**, we jî çû ji wî xwest.*

Gûyê xwe xwarin
1. Çikûs bûn. **2.** Xeta û çewtî kirin. **Ew **gûyê xwe dixwe**, qurişek jê dernakeve. *Ma **gûyê xwe xwariye** ku rabe diya xwe têxe wî halî?*

Gûz li hev parve kirin
Plan, pêşnûma û bernameyên wekî berjewendiyên xwe bi hevkarî çêkirin. **Ez dizanim ew **gûz li hev parve kirine**, lê ez jî vala nasekinim.*

Gûza hindê xwarin
Ji bo kesên deng xweş tê bikaranîn. **Mêrikî tu dibêjî **gûza hindê xwariye**, wer xweş dibêje.*

Gûzan lê neketin
bnr. Nexeritandî bûn

Gûzên xwe hesab dike, sevên xelkê hesab nake.
Tenê li rewşa xwe û li berjewendiyên xwe fikirîn. **Xêr ji rûyê kesên wisa nayê, mêrikî **gûzên xwe hesab dike, lê sêvên xelkê hesab nake**.*

Gûzên pûç li ser serî şikênandin
Karên xwe yên zor û qilêr bi yekî din dan kirin. **Di dema fireh de kesek li rûyê min nanihêre, lê di demên zor de jî **gûzên pûç li ser serê min dişikênin**.*

Gûzên xwe bi mirov dan jimartin
Zext û zor kirin, olamê xwe dan kirin. **Ew mirovinên bêferaset in, **gûzên xwe bi mirov didin jimartin**.*

H

Ha dikim dê dimire, ha dikim bav dimire.
Çawa dikim çareser nabe. **Dikim nakim, nikarim pêk bînim.* ***Ha dikim dê dimire, ha dikim bav dimir e.***

Ha Elo, ha Welo xwar.
Derk tune, ha ew ha ew. **A girîng encam e, ji xwarinê bi şûn de* ***ha Elo xwar, ha Welo xwar.***

Ha Hesen keçel, ha keçel Hesen!
Derk nîn e, wiha jî dibe, wiha jî dibe. **Ma çi derka wê heye qurban?* ***Ha Hesen keçel, ha keçel Hesen!***

Ha li êş, ha li kêş!
Cih ne girîng e. **Çi derka wê heye?* ***Ha li êş, ha li kêş!***

Ha li Mûşê, ha li pişta dergûşê!
Xerîbî xerîbî ye, ha dûr ha jî nêzîk. **Mirov ku rûyê hev û din nedît çi derk heye?* ***Ha li Mûşê, ha li pişta dergûşê!***

Hacana(*), gû dikin fincanan, ne dixwin ne didin cîranan. (Hacana, ne dixwin, ne didin cîranan.)
Qesîs bûn, tenê li berjewendiyên xwe fikirîn. ****Hacana, ne dixwin, ne didin cîranan.*** *Ji mirovên wisa ziyan tê.*

Haj ji serî û qûnê tune bûn
Haj ji xwe tune bûn. **Karê we bi Keleş neketiye, ew çav li wê keçika bedew ketiye wî* ***haj ji serî û ji qûnê tune ye.***

Hakim kete ber mirinê, zor nema li dinê.
Yên serdest ku ji holê diçin xizan û bindest rehet û azad dibin. **Yên hakim, belaya serê xizanan in,* ***hakim kete ber mirinê, zor nema li dinê.***

(*) **Hacana:** Gundekî Pasûra girêdayî Amedê ye.

Hakimî nefsa xwe nebûn
Bi vîna xwe nekarîn. **Heke ku mirov bikaribe* ***hakimî nefsa xwe bibe****, serê wî dê rehet be.*

Hal bûna halê qolo
bnr. Ketina gûna Qolo. *(*bnr. çîrok)*

Hal û xatirê (yekî) pirsîn
Bi kesekî re eleqeder bûn. Kêfxweşî û xêrhatin dan. **Hozan her tim li* ***hal û xatirê Zîlanê dipirse****.*

Hal û wext di cih de bûn
bnr. Hal û wext xweş bûn

Hal û wext xweş bûn
Rewşa aborî baş bûn. **"****Hal û wextê me xweş bû****, havê min, ez dabûm ber xwendinê."* Mûhemed Garsî

Halê me ne (tu) hal e, kirina te jî serbar e.
Ya ku tu dikî jî qet nayê kişandin. **Jixwe tenê tu kêm bûyî,* ***halê me ne hal e, kirina te jî serbar e****.*

Halê (yekî) ne tu hal bûn
Rewş ne baş bûn. **Ev çend roj in ku* ***halê Farqîn ne tu hal e****.*

Halî hazir, Hezretî Xizir
Bi ya ku amadeyî re razî û memnûn bûn. **Heyran, em tiştekî zêde ji we naxwazin, hema* ***halî hazir, Hezretî Xizir****.*

Halxweş bûn
Zengîn bûn. **Şikir ji Xwedê re malbata min piştî ew qas kasibiyê êdî halxweş e.*

Har bûn
1. Bitrî bûn. Ji ber hin derfetan an jî nexweşiyan hawirdor aciz kirin. **2.** Pir hêrs ketin. **Heyran êdî ev lawên Eşo* ***har bûne****, dev diavêjin her kesî. *Ji ber wê bûyerê Gebar* ***har bûbû****, heke ew bi dest xista wê pirtî pirtî bikira.*

Har û dîn bûn
Pir hêrs bûn. **Min çawa ku ew di wî halî de dîtin ez* ***har û dîn bûm****.*

Hasil çû Mûsil. (Hasil ji Mûsil derket.)
bnr. Hasil, giha Mûsil.

Hasil, giha Mûsil.
Dereng man, firsend revandin. **Tu mî bi xwe hesiyayî lê* ***Hasil giha Musil****.*

Hasil ji Mûsil derbas bûn
bnr. Hasil, giha Mûsil.

Hasil li Mûsilê nesikinîn

bnr: Hasil, giha Mûsil.

Hat Hemoyê Takî, rêxa wî ya gayekî, di mala wî de nîn e arvanê xewarekî, her roj xwe diguhere bi awayekî.

Ji bo kesên ku pariyek nan di mal de nîn e, lê li derve bi awayê dewlemendan kincên xweşik li xwe dikin û bi fors digerin tê gotin. **Hûn lê nenihêrin.* ***Hat Hemoyê Takî, rêxa wî ya gayekî, di mala wî de nîn e arvanê xewarekî, her roj xwe diguhere bi awayekî.***

Hat ji der de, topiz di ber de (bi min re bi tirkî xeber da).

Ji bo kesên serdest, zorbe û çavsor tê gotin. **Wekî ku dibêjin:* ***"Hat ji der de, topiz di ber de, bi min re bi tirkî xeber da."*** *Ka mirov dikare ji wan segbavan re bibêje, pozika sola we xwar e?*

Hat ji karê, nehat ji malê.

bnr: Bê malê, malxweyê malê, neyê malê qeda salê.

Hat ji newalê, bû xwediyê malê.

Bêked û bêzehmet dest dayîn ser. **Tu dibêjî ew qas sal in wî ew ked û xwîn daye.* ***Hat ji newalê, bû xwediyê malê.***

Hat ji palê bû malxweyê malê.

bnr: Hat ji newalê, bû xwediyê malê.

Hat ku mirî rake, yê hat tazî ye.

Yê ku ji bo çareseriyê hatî, hê xerabtir e. **Maşelah, ê hatiye hewarê xerabtir e.* ***Hat ku mirî rake, yê hat tazî ye.***

Hat kurê malê, nehat ziyana salê.

bnr: Bê malê, malxweyê malê, neyê malê qeda salê.

Hat li min keremût[*], ez mam û kerê gewr î rût.

Di hêla aborî de di nav rewşcke xerab de bûn. **Çi bibêjim, ji bo rewşa xwe ya îroyîn? Hema* ***hat li min keremût, ez mam û kerê gewr î rût.*** (qerf)

Hat malê, xwediyê malê, nehat, ziyana salê.

bnr: Bê malê, malxweyê malê, neyê malê qeda salê.

Hat nav mala tirî, Zeyno da bêjingê li dor bênderê zivirî.

Ji bo kesên nefsek tê gotin. **Ka çawa çilek e?* ***Hat nav mala tirî, Zeyno da bêjingê li dor bênderê zivirî.***

Hat, ji malê, nehat qeda salê.

bnr: Bê malê, malxwê malê, neyê malê qeda salê.

---

[*] **Keremût:** Meha dawiya zivistanê.

Hate cihê min, rabû rûyê min.
Ji bo kesên ku li hemberî qenciyê helwesteke xerab nîşan didin tê gotin. **Ew jî bersiva qenciya min e.* ***Hate cihê min, rabû rûyê min.***

Hate ji der de, ji ref û tedbîra me xeber da.
bnr. Hat ji palê bû xûyê (xwediyê) malê.

Hate serê min, bila neyê serê dijminê min.
Ew xirabiya ku min dît bila neyê serê tu kesî. **Qet mepirse,* ***hate serê min, bila neyê serê dijminê min.***

Hate wî, kete vî.
Bi niyeta yekî din kirin, lê li serê yekî din qewimîn. **Ji bo wî hat lê wisa nebû.* ***Hate wî, kete vî.***

Hatin nav me biyanî, ji me standin rez û xanî.
Ji bo yên zordar tê bikaranîn. **Ev çi halê me ye?* ***Hatin nav me biyanî, ji me standin rez û xanî.***

Hatin agir
Ji bo karên lezgîn tê gotin. **Keçê lawo ew çi ecele ye, ma tu* ***hatiyî agir****?*

Hatin ber çavên (yekî)
1. Bi bîr anîn, xeyal kirin. **2.** Zêde dîtin, heyf pê hatin. **"Daristanên ku şewitîn* ***tên ber çavên min****, hişê min ji serê min diçe."* R. Karakaya **Dê ew qoltixên kevin bidana min, ew jî* ***ber çavan hatin****, qêmîş nekir ku bide.*

Hatin ber derê (yekî)
1. Ji kesekî re bêked amade bûn. **2.** Bi awayekî ne erênî derî li kesekî yan jî kesan birîn. **3.** Ji bo hewcedariyekê çûna bal kesekî. **Wan tu tişt nekir, hema ji Xwedê re ew derfet* ***hat ber derê wan****. *Reşo û lawên xwe îşev* ***hatin ber derê Xalê min****, lê cîranan ew dan sekinandin. *Wa ye hatine* ***ber derê me****, em çawa wan vala vegerînin?*

Hatin cem hev
1. Tifaq kirin. **2.** Li hev hatin. **Ew eşîr hemû* ***bihatana cem hev****, dîsa jî bi wan nikaribûn. *Baş bû ku di dawiyê de her du serî jî* ***hatin cem hev****, em jî rehet bûn.*

Hatin holê
Pêk hatin, çêbûn. **Heta ew yek* ***hate holê*** *Xwedê dizane me çi kişand.*

Hatin îmanê
Îkna bûn. Daxwaz pejirandin. **Min dizanibû, di dawiyê de ew ê* ***bê îmanê****.*

Hatin meydanê
bnr. Hatina holê

Hatin qulpa paşîn
bnr. Heya ber qirikê hatin

Hatin rayê
bnr: Hatina ser rê

Hatin ser afira gayê Kilo
Nerm bûn, di dawiyê de wekî rêz û rêçikan kirin. **Wî jî berê gelekî qûna xwe ba dikir, lê ew jî **hate ser afirê gayê Kilo**.* (argo)

Hatin ser agosê
bnr: Ji Kirê Gewro daketin jêr

Hatin ser gotina (yekî)
Gotina yekî pejirandin. **Berê wî jî qebûl nekir, lê di dawiyê de **hat ser gotina min**.*

Hatin ser hemdê xwe
Aqil hatin serî. **"Bi qasî çil rojan di nexweşxaneyê de ma. **Paşê hêdî hêdî hate ser hemdê xwe**."* Feqî Huseyn Sağnıç

Hatin ser navika meseleyê
Beş an jî xala mijarê ya herî girîng destnîşan kirin. **"Em niha **werin ser navika meseleyê**. Ez dibêjim ku mirov nikare rewşenbîrên welat çê, yên derve tirsonek bihesibîne."* Mistefa Reşît

Hatin ser rê
Wekî xwe kirin, daxwaz pejirandin. **"Di dilê xwe de got: -Baş e tu jî **hatî ser rê**."* Ronî War

Hatin ser riya rast
bnr: Hatin ser riya heq

Hatin ser riya heq (heqiyê)
A rastî û duristî dîtin û pejirandin. **"Hecî Yaşarê ku salek du salan tobe kiribû, bi salan tu tolazî jinfiroşî û xerabî nemabû ku kiribû, belê niha li gorî gotina wî êdî **hatibû ser riya heq**."* Felat Dilgeş

Hatin ser text
Erk xistin destê xwe. **Heya ew **neyên ser text**. Çareserî ne guncan e.*

Hatin zimên
Vegotin, qal kirin. **"Şivanê kaînatê Mazda **hate zimên**: Ey Zerdeşt, ey koçekê Spîtama! Ji deşta Heranê hinek ax, ji Feratê hinek av, ji Atargeda xwe pêtek agir û ji Baxên Îrem jî milsek ba hilde û derkeve Çiyayê Hûkaîrê."* Talip Kalın

Haveyn (haveng) girtin
Çêbûn, serî girtin, ava bûn. **Berê aqilê min jî nedibirî, lê dû re min dît ku wa ye, **haveyn girt** jî.*

Havînê to xwar, zivistanê gû xwar.
Yên ku havînê nexebitin zivistanê perîşan dibin. *****Havînê to xwar, zivistanê gû xwar.*** *Heke ku mirov di dema xebatê de wer veleze, dawî jî wê wiha xeternak be.*

Hawar û gazin kirin

Alîkarî xwestin. Qêrînî kirin. Banga xeteriyê kirin *"*Ew her du jî zar û zeîf bûyî, şev û rojan* ***hawar û gazin dikirin*** *û halêd wan perîşan bû."* Mele Mehmûdê Beyazîdî

Hay ho! Hay ho! Kanê xwediyê xêra do?!

Di nav hewldana tiştên xweş ku berê hatiye jiyandin de bûn. ****Hay ho! hay ho! Kanê xwediyê xêra do?*** *Tamê daye dêv, ew jî wekî wî korî li xwediyê xêrê digere.* (bnr. çîrok)

Hay jê çêbûn (bûn)

Agahdar bûn. **Beriya ku here ez* ***hay jê bûm****, lê min nikaribû ku xwe bigihînimê.*

Hay ji bayê felekê tune bûn

Ji bûyerên ku qewimîne û yên ku wê biqewimin agahdar nebûn. **Beriya wê bûyerê wan* ***hay ji bayê felekê tune bû.***

Hay ji devê xwe tune bûn

Li ser axaftina xwe baldar nebûn. **Selo dîsa bi ser xwe ve çûye,* ***hay ji devê xwe tune ye,*** *bejî bejî xeber dide.*

Hay ji dinê tune bûn

bnr. Hay ji bayê felekê tune bûn

Hay ji gotina xwe hebûn

Gilî û gotinên xwe bi zaneyî gotin. **Tu qet nekeve tatêlê, Rizgar* ***hay ji gotina xwe heye****.*

Hay ji qûnê (qûna xwe) tune bûn

Rewşa xwe ya rasteqîn nenirxandin. Ji xwe ve çûn, xewirîn. **Wî xwe bi derewan girtibû diçû, lê* ***hay ji qûna xwe nîn bû****.*

Hay ji xwe tune bûn

bnr. Hay ji qûnê tune bûn

Hay pê xistin

Agahdar kirin. **Berî ku here, hemû exrebeyên xwe* ***hay pê xistibûn****, loma zû gihîştinê.*

Haya kesî ji kesî tune bûn

Ji bo rewşa tevlihev û ne zelal tê bikaranîn. **Di wê xirecirê de* ***haya kesî ji kesî tune bû*** *ku, li min bipirsin.*

"Hay ho! Hay ho! Kanê xwediyê xêra do?!"

Jina axaykî zarokên wê çênabin. Jinik sond dixwe û dibêje:
"Heke zarokek min çêbe, ez ê carekê li tev mêrekî biyanî û kor razêm." Di demekê bi şûn de zarokek ji jinikê re çêdibe. Jinik difikire ku ji bo sonda xwe ka çawa bike. Di dawiyê de biryar dide:
"Divê miroveki wisa bibînim ku tu ziyan jê neyê û navê min jî dernekeve." Rojekê lê dinêre yekî kor ji bo parsê digere, wa ye di rex malê re dibore. Jinik dibêje:
"Hema ev firsend e, ev kor ne dibîne, ne jî me nas dike, ku carek din bê vir jî nas nake, ziyan ji vî nayê, ez ê carekê pê re razêm, ji xwe ew jî nizane li ku çi biîye." Xulamê xwe dişîne pey kor, kor tîne malê û pê re radizê. Serê sibeha din jinik bi dengê kor şiyar dibe. Lê mêze dike ku kor hatiye tenişta malê qêrîn dike û dibêje:
"Hay ho! Hay ho! Kanê xwediyê xêra do?!"

Hayê li min hayê, hevirmiş hatiye bi livayê, çavê xwiyê livayê birije, dil bernayê.
bnr: Hayê li min hayê, hevirmiş hatiye bi livayê, xwediyê livayê kor e, dil bernayê.

Hayê li min hayê, hevirmiş hatiye bi livayê, xwediyê livayê kor e, dil bernayê.
Carinan yên girîng û bi rûmet datên, lê yên erzan danayên. **Ez çi bêjim, ew jî qedera Xwedê ye.* ***Hayê li min hayê, hevirmiş hatiye bi livayê, xwediyê livayê kor e, dil bernayê.***

Hayê li min hayê, hevirmiş hatiye bi livayê, xwediyê livayê nayê rayê.
bnr: Hayê li min hayê, hevirmiş hatiye bi livayê, xwediyê livayê kor e, dil bernayê

Hebanika xwe weşandin
bnr: Kevirên di pêşa xwe de hurşandin

Hebe, kurê kerê be.
Hebûna mirov ku hebe, çi dibe bila bibe, rûmet jê re tê girtin. ***Hebe, kurê kerê be.** *Lawik çiqasî bedcure bû lê çima ku dewlemend bû, ew keçika xweşik danê.*

Hebek kuncî ji dest nerijîn
bnr: Garisê hûr ji kefa dest nerijîn

Hebeşo, mehdnexweşo
Kesên ku ne baş bin xuyanga wan jî ne baş e. **Xêr ji wî nayê. Ma tu li rengizê wî nanihêrî;* ***hebeşo, mehdnexweşo****.*

Hebîbê Necar, rakev fena her car, Xwedê yek e, derge hezar.
bnr: Hoste Necar, rabe rûnê weke her car, Xwedê yek e derge hezar.

Hebrîng li ser neketin
Xam bûn. Pir nezan û bêperwerde bûn. **Belengazî nû ji gund hatiye û li gorî metropolê, qet* ***hebrîng li ser neketiye****.*

Hebû xerman, tune bû derman.
Dema hebe bê sexbêr û bê tedbîr belav kirin, dû re ji bo dermanan be jî, bi dest nexistin. ***Hebû xerman, tune bû derman.** *Mirov ku bê sexbêr be, dawî jî wisa dibe.*

Hebûn sê bizinên mala mîr, yek pîr, yek kor û di ya din de tune bû çira şîr.
Ji bo rewşa neyînî tê gotin. ***Hebûn sê bizinên mala mîr, yek pîr, yek kor û di ya din de tune bû çira şîr.** *Malavawo, hemû neyîniyan hema tu dîtine?*

Hecheckê li silav hecêk
Her kes têkildarî hempayê xwe ye. ***Hecheckê li silav hecêk.** *Helbet mirov nikare ji derî çand, hawir û hempayê xwe zêde dûr bikeve.*

Heciyê me çû leterê, me got mêrek ê jê derê hat dîsa ew kerê berê.
Dîsa rewş eynî rewşa bere ye. **Bi Xwedê, em ev yek jê hêvî nedikir.* ***Heciyê me çûn leterê, me got mêrek ê jê derê hat dîsa ew kerê berê.***

Heçiyê dizane jixwe dizane, yê nizane, bayê nîsikan e.
bnr. Yê ku dizane dizane, yê ku nizane dibê qey baqê nîsikan e. *(*bnr. çîrok)*

Hed û hesabê ... tune bûn
Gelekî zêde bûn. **Gel wisa hatibû cejna Newrozê ku* ***hed û hesabê hejmara wê tune bû****.*

Hedad e, nikare jixwe re mifteyekê çêke pê derê xwe dade.
Xwediyê pîşeyan, ji xelkê re ew qas tiştên baş pêk tînin, lê gelek caran yê mala xwe baş çênakin. **Sola soldurî qetiyayiye. Ew jî* ***hedad e, nikare ji xwe re mifteyekê çêke pê derê xwe dade.***

Hedadan ruhê (yekî) çêkirin
Bi awayekî zêde wêrek bûn. **Qey* ***hedadan ruhê wî çêkiriye*** *ku ew ji min re wer bibêje?*

Hedan hatin ruh
Rehet û biaram bûn. **"Dema ku min bihûst wê çawa* ***hedan bê rihê min****. Pêwanê ez vê yekê nakim."* Torî

Hedê xwe girtin
1. Gihîştin, kamil bûn. **2.** Bersiva xwe girtin. Pêwistiya xwe hildan. *Êdî Serfiraz zêde nayê guherandin, çimkî, wî hedê xwe girtiye. **Erê wê gelek zilm li bûkan kir, lê dû re ji hêla bûka xwe ve jî* ***hedê xwe girt****.*

Hedê xwe zanibûn
Hay ji gotin û hereketên xwe bûn. **Tu qet mereqan neke ez* ***hedê xwe dizanim****.*

Hediya birûkan jî qanok in.
Ji bo wan jî ew hêja û mexbûl e. **Her kes wekî rewş û radeya xwe.* ***Hediya birûkan jî qanok in.***

Hedûra (yekî) nehatin
Sebr nehatin. Bêaram bûn. **Piştî wê nûçeya reş,* ***hedûra diya min nehat****.*

Hedûra (yekî) pê hatin
Pê sebr kirin, aramî dîtin. **"...gelo ez jê êşiyame yan jî qehirîme, keniyame yan jî xemgîn bûme, gelo wê ez aş kirime û* ***hedûra min pê hatiye****..."* Dilawer Zeraq

Hefadê mêran bûn
bnr. Serekê mêran bûn

Hefado, di ber xelkê de
Ji bo kesên xerîb û bê sedem ziyandayîna xwe. **Ji ya ku wî kir re tenê dibêjin:* ***"Hefado, di ber xelkê de."***

Hefsal teng bûn
bnr. Firşing teng bûn

Hefsar ji serî derxistin
bnr. Hefsarê (yekî) di serî de şiqitandin

Hefsar kirin
1. Kirin bin bandora xwe. **2.** Amade kirin **Jinikê lawê xwe wisa* ***hefsar kiriye****, ku ji gotina wê dernakeve. *Min ew* ***hefsar kiriye****, hema em li hêviya te ne.*

Hefsarê (yekî) kişandin
1. Yek zept kirin. **2.** Şiyar (îkaz) kirin. **Jixwe heke Hesikê Bawa* ***hefsarê wî nekişanda*** *tu car û tu kes nikaribû li pêş wî bisekiniya. *Xezalê* ***hefsarê wê nekişanda****, wê zû bi zû dev ji min bernedida.*

Hefsarê (yekî) di dest hinekên din de bûn
Di bin bandora hinekên din de bûn. **Gotinên wî ne girîng in, ji ber ku* ***hefsarê wî ne di destê wî de ne****.*

Hefsarê (yekî) di serî de şiqitandin
Serbest berdan. **Bi sê telaqê bêfîtû, min* ***hefsarê wê di serî de şiqitandiye****, di ku de diçe bi qîma xwe ye.*

Hefsarê (yekî) di destê (yekî) de bûn
Kontrol di dest de bûn. **Tu nekeve tatêla wê,* ***hefsarê wê di destê min de ye****.*

Hefsarê xwe dayîn dest
Xwe xistin bin erk û bandora hinekên din. **Ku wê di wê demê de* ***hefsarê xwe nedaye dest****, niha nedikete vê rewşê.*

Hefsarê xwe di serê xwe de şiqitandin
1. Ji bin bandorê derketin. **2.** Ji bo berdana jinan jî tê bikaranîn. **Wan ew* ***hefsarê qirêj di serê xwe de şiqitandin*** *û ji wê koletiyê rizgar bûn. *Min mêze kir ku jiyana min herimiye, min* ***hefsarê xwe di serê xwe de şiqitand*** *û ji rezîliya rojane xelas bûm.*

Heft bar xwê bixwe, hiş nayê serî.
Ji ceribandinê sûd wernegirtin. **A rastî zêde xêra wê tune ye.* ***Ew heft bar xwê bixwe hiş nayê serî.***

Heft bav hebin jî xelas nebûn
bnr. Heft serî hebin jî xelas nebûn

Heft bav ji hev û din der kirin
bnr. Heft bavê xwe jimartin

Heft bavan jê dûr bûn
Tu têkilî tune bûn. **Na heval na, ez û wî* ***heft bavan ji hev û din dûr in****.*

Heft bavê xwe jimartin
Hay ji esil û esasê xwe hebûn. Esil û esas kifş bûn. **Her kes min nas dike, ez dikarim* ***heft bavê xwe bihejmêrim****, lê ew?*

Heft bûk li malê rûniştine, lê qurta avê nîn e.

Ji bo bêsazûmanî û teraliyê tê gotin. **Çi mal e, çi mal e!* ***Heft bûk li malê rûniştine, lê qurta avê nîn e.***

Heft caran gîsinê xwe lê dan

Karê xwe qewîn kirin. **Koçero heta* ***heft caran gîsnê xwe lê nede****, dilê wî rehet nabe.*

Heft hevling ro de çûn, yekî dest neavête yekî.

Hevling (bacanax) ji hev û din hez nakin. **Ya ku ez dizanim hevling ji hev û din hez dikin lê nizanim çima dibêjin:* ***"Heft hevling ro da çûn, yekî dest neavête yekî."***

Heft hevling xistine bin nekebê gotin: "Hê cih heye."

bnr. Heft hevling ro de çûn, yekî dest neavête yekî.

Heft jin civiyan cilekê, gotin: "Haho li me bêkesan!"

Jin bêhêz in. **Li cihê sekinî negotine:* ***"Heft jin civiyan cilekê, gotin: "Haho li me bêkesan!"***

Heft jinên eşîrê civiyane (rajanc) barekî hiriyê, gotin: "Wey li me bêkesan!"

bnr. Heft jin civiyan cilekê, gotin: "Haho li me bêkesan !"

Heft kiras qetandin

Di pêvajoyeke pir zor û dijwar de derbas bûn. **Heya me Îdris ji zîndana Çanakkeleyê dexist, me* ***heft kiras qetandin****.*

Heft lawê yekî hebûn, ê başê wan, xelk li ser dibû.

Hemû jî ji hev du xerabtir bûn. **Ka ez kîjanê bibêjim? Got,* ***heft lawê yekî hebûn, ê başê wan, xelkê li ser dibû****.*

Heft mêrên Girî, ranekir barek tirî.

Mêrên Girî bêhêz, û bêhuner in. **Got,* ***heft mêrên Girî, ranekir barek tirî****. Ya wan jî ew qas e.*

Heft nebû heşt

Hinekî kêm an jî zêde ne xem e. **Ne xem e* ***heft nebû heşt****.*

Heft pihîn lê xistin

bnr. Heft pihîn li gorê xistin

Heft pihîn li gora (yekî) xistin

Hê xerabtir kirin. Ji yê din xerabtir bûn. **Me ji yê din re digot "pîs", lê vî heft pihîn li gora wî xistiye.*

Heft qatan di erdê de çûn

Pir fedî kirin. **Ez kengî li çav wê dikevim,* ***heft qatan di erdê de diçim****.*

Heft serî hebin jî xelas nebûn

Di nav rewşeke zor de bûn. **Welehî zanîna ku ez dizanim,* ***heft seriyê wî hebin jî ew ji wê belayê xelas nabe.***

Heft tenûr nan xwarin

li bo kesên xam û tênegihîştî tê gotin. **Lawo ji bo ku tu bêyî wê radeyê, divê hê* ***heft tenûr nan bixwî.***

Heft lengerî xwarin

Pir çilek û nefsek bûn. **Kuro qet ew têr dixwe, ew di erdekî* ***heft lengeriyan bixwe*** *jî têr naxwe.*

Heft teşt nan û heft bar xwê xwarin

bnr. Heft tenûr nan xwarin

Heftirka dilê (yekî) dan

Gelekî lê xistin, lê dan. **Rebenî wisa kirine,* ***heftirka dilê Gogerçînê danê.***

Heftyaro, li ber çavan diyaro

bnr. Goştê bexan e, li ber çavan e

Heger hatî çengê min, bifikire li rengê min.

Heke tu bikevî destê min tu jî dizanî tu dê têkevî rewşeke çawa. **Ez çi bibêjim?* ***Heger hatî çengê min, bifikire li rengê min.***

Heger hebe şilik û pilik, heger tune be, keder (keser) û kulik.

Heke ku hebe, zêde û tiştên xweş dixwin, ku tune be jî stûyê xwe xwar dikin û rûdinin. **Ji wan re çi, ew mirovinên ecêb in,* ***heger hebe şilik û pilik, heger tune be, keder û kulik.***

Heger yekê got: "Ez koleyê te me." Tu dê misasê bidî destan.

Ji her tiştî re pîvan, ûsil û însafek divê. **Hinekî bi însaf lawo.* ***Heger yekê got: "Ez koleyê te me." Tu dê misasê bidî destan.***

Heger yekî got: "Mala min a te ye." Ma tê agir berdêyî?

Heke yek rûmetê bide te, divê tu jî li hemberî wê tiştên nebaş nekî. **Ew çi kêmfîrsendî ye?* ***Heger yekî got mala min a te ye, ma tu dê agir berdêyî?***

Hej lê ketin

Ji hêz ketin. Pir lawaz û jar bûn. **Ji ber wê nexweşiya giran hê jî* ***hej li Bedran dikevin.***

Hej pê xistin

Ji hal xistin. Ji ber lêdan, nexweşî yan jî zorê yek di rewşeke dijwar de hiştin. **Hadî wisa dabû Kamilê Seyîd,* ***hej pê xistibû.***

Hej û pej bûn

Sist û bêpergal bûn. **Bi wî halê* ***hej û pej*** *ew nikare tu tiştekî jî bike.*

Heja li binê xwe birîn

bnr: Dara binê xwe birîn

Heke beranê bisko ba, wê li nav pezê bavo ba.

Heke ya me bûya, me yê kêrek jê bidîta. **Tu çi avê li ber hêlikên xwe didî,* ***heke beranê bisko ba, wê li nav pezê bavo ba****.*

Heke hewes e, ew jî bes e.

Heke tenê ji bo demboriyekê û dilpêxapandin be, carekê jî bes e. **Tu çi ew qasî diêşînî,* ***heke hewes e, ew jî bes e****.*

Heke ji te re dirêj be, ji min re bi erdê re dikişe.

bnr: Eger bi te xweş e, ji min re bîst û şeş e.

Heke li ber segan hestiyê kewan bimîne.

Lê heke di wê rewşê de ku ew vebijark pêk bê. Heke ew derfet bi dest bikeve. **Tu baş dibêjî, lê* ***heke li ber segan hestiyê kewan bimîne*** *da.*

Heke mele ev be, gelo yê ku li pey mele dihere (wê) çawa be?!

Yên li pey rêberên xerab herin, hê xerabtir in. **Xwedê me ji van biparêze.* ***Heke mele ev be, gelo yê ku li pey mele dihere, wê çawa be?***

Heke min bikuje wê min veşêre jî.

Zêdetir ji bo exrebeyan tê gotin. Heke xirabiyekê bigihîne min yê ku li min xwedî derkeve jî dîsa ew e. **Çiqas hebe exrebeyê min e,* ***heke min bikuje wê min veşêre jî****.*

Heke ne fend e, ev çi dar û bend e?!

Tu napejirinî, lê va ye her tişt li holê ye. **Kuro tu çawa înkar dikî?* ***Ger ne fend e, ev çi dar û bend e?***

Heke neynûkên wî/wê hene bila berê serê xwe bixurîne.

Ku derfet û hêza wî/wê heye bila berê li çareya serê xwe binihêre. **Spas ji wî re.* ***Heke neynûkên wî hene bila berê serê xwe bixurîne.***

Heke peke nezanîn (tune bûn)

Ji rewşê fêm nekirin. **Ma lûn Osê nas nakin? Ew* ***hekê pekê nizane****, wê her tiştî tevlihev bike.*

Heke qûn bi qûnê be, bila qûn li cihê xwe be.

Heke wê seranser derkeve û lêreke wê çênebe, çi hewceya wê pêkanînê ye? *****Heke qûn bi qûnê be, bila qûn li cihê xwe be.*** *Wê çaxê ne pêwîst e.*

Heke şer e, bang bike Mûsa û keran, heke hêkrûn e, Memo û Harûn e.

Divê her kes li gorî kar û zerengiya xwe bê bikaranîn. **Tu çi wisa difikirî?* ***Heke şer e, bang bike Mûsa û keran, heke hêkrûn e, Memo û Harûn e.***

Heke Xwedê got qûlê min yerî, ez dizanim pêz ji kê re didim bêrî.

Heke firsend bikeve destê min, ez dizanim bê ka ez ê çi bikim. **Ez vê gavê çi bibêjim pûç e.* ***Heke Xwedê got qûlê min yerî, ez dizanim pêz ji kê re didim bêrî.***

Hela bibêje, tu ji çendan kêm nakî?!

Ma tu dixwazî çi bibêjî? **Kuro çi tiretira te ye?* ***Hela bibêje, tu ji çendan kêm nakî*** *lawo?*

Hela çê

Baş e ku wusa ye. Bi wê yekê ez dilşad bûm. *****Hela çê.*** *Baş e, baş e, pir baş e ku wilo hûye.* Adar Jiyan

Hela devê (yekî) kirin

Ji bo tiştek hînbûnê, bi konevanî ji kesekî re peyivîn. Gilî ji yekî kişandin. **Gozel* ***hela ji devê Leylê*** *dike.*

Helal û heram tevlihev kirin

Xêr û guneh nezanîn. *****Helal û heraman tevlihev dike.*** *Ew çi zane ji xêr û gunehan?*

Helal û xweş bûn

Bi awayekî mafdar noşîcan bûn. **Erê, wî du miyên min ji gerîlayan re şerjê kirine, lê* ***helal û xweş be****, ku wer nebûya ez ê şermî biketama.*

Helaliya xwe jê xwestin

Ji kesekî baxişandina sûc û gunehên xwe daxwaz kirin. **Ez negihîştime ser diya xwe ku* ***helaliya xwe jê bixwazim****.*

Helan dayîn

Hadandin, kişkiş kirin. **Xwedê dizane ew şerê di vê dawiyê de gişk bi* ***helandayîna*** *Emir Begê hate serê me.*

Helaw erzan bûn

Rewş rehet û hêsan bûn. **Zora mezin me derbas kir. Niha* ***helaw erzan e****.*

Helaw şirîn e, kurmanc dîn e.

Kurmanc ji helewê hez dikin. **Çawa bike, ancax ku bi dest xistiye.* ***Helaw şirîn e, kurmanc dîn e.***

Heleb teze bûye Heleb. ("Lawo, gûz keştandin ne karê min e, lê teze ez dizanim ku gor warê min e!..")

Bi awayekî baş guherîn, pêşve çûn. **Wekî gotina pîrê, karê me nû xweş bû ha. Ango,* ***Heleb teze bû Heleb ha****...* (bnr. çîrok)

"Heleb, teze bû Heleb." ("Lawo, gûz keştandin ne karê min e, lê teze ez dizanim ku gor warê min e!..")

Li gundekî jinikeke pîrebî û kurekî wê hebûn. Kurê pîrê jê re zehf baş bû û ji gotina wê zû bi zû dernediket. Kurê pîrê ji ber ku bazirganî dikir, tim diçû Helebê û dihat. Her dema ku ji Helebê dihat diya wî jê dipirsî:

"Lawo, qet li Helebê çi heye çi tune ye?" Kurik jî bersiv dida û digot:

"Dayê tiştek tune ye, hema wekî we çi bihîstiye ew e." Lê diya wî ew pirs ew qasî jê pirs dikir ku kurik aciz dibû. Rojekê lawik bi hevalekî xwe şêwirî û got:

"Ev çi hal û hewalê diya min e? Hema wisa wê pirsê ji min dike."

Hevalê wî rewş fam kir û jê re got:

Helkehelk kirin

Pir betilîn. *"*Fekirîn hev du û ji zarokên din ên arihayî veqetîn, ta xwe gihandin serê girik, ziman di dêv de hatibû xwarê û her **helkahelka wan bû**."* Ehmed Mehemed Îsmaîl

Hem bibext, hem bitext bûn

Bi her awayî rewş pir xweş bûn. **Bextewarê, **hem bibext, hem jî bitext e**.

Hem bihar e, hem zivistan e.

Du nakokî di nav hev du de bûn. ***Hem bihar e, hem zivistan e.** *Mirin û jiyîn, şîn û şahî, şev û roj, nexweşî û saxî tev di nav hev de ne.*

Hem bûk e, hem berbûk e.

Xwe dixe nav her karî. Bi xwe lê dixe, bi xwe dilîze. **Ji wê dînê re çi rê û tore? Ew **him bûk e, him berbûk e**.

Hem dar e, hem debar e.

Bi her awayî mirov dikare kêrê jê bibîne. **Tiştekî wer bêhempa zor bi dest bikeve. **Hem dar e, hem debar e.**

Hem digirî, hem dikenc.

Ji bêgavî kirin. Di nav nakokiyê de bûn. *Rewşeke pir dijwar û eletewş e. Belengaza keçikê çawa bike? Hem digirî, hem jî dike.

Hem di kêfê de, hem di kefaretê de bûn

Her du nakokî jî di hundirê hev du de jiyîn. **Gelek caran mirov di heman demê de **hem di kêfê de, hem jî di keferatê de ye**.

Hem dikuje, hem vedişêre.

Her çiqas dijminatiyê bike jî di roja pir teng de diparêze jî. **Ez bawer im ku ew **hem dikuje, hem jî vedişêre**.

"Careke din ku diya te ew pirs ji te kir, tu bibêje: 'Dayê, padîşahê Helebê ferman daye ku qîzan bidin kalan, pîrê wekî te jî bidin xortan. Ka diya te wê çawa bike û çi bibêje?'" Cara din ku lawik ji Helebê tê bi pirçî li mal rûdine û diya wî dîsa jê dipirse:
"Lawo qet li Helebê çi heye, çi tune ye?" Lawik dibêje:
"Dayê Xwedê Helebê tep bike! Paşeyê wê ferman daye, qîzan didin kalan, pîrê nola te jî didin xortan." Hema di wê gavê de reng û rûyê pîrê diguhere. Fîtika diavêje û dibêje:
"Heleb teze bû Heleb!"

**Di hinek guhertokan de jî eynî çîrok weha berdewam dike:*

Lawik ji şadbûn û eşqa pîrê mat dimîne. Ji kêfa wê aciz dibe. Ji bêrîka xwe sê gûzan derdixe û xebera reş bi ser pîrê de tîne: *"Dayê lê serteki padîşah heye!.. Pîra ku bixwaze xortan bike, divê van her sê gûzan bikaribe bi diran an jî bi piriyên xwe bişkîne."* Weke ku tasek ava sar bi ser de wer be, pîrê sar dibe. Ji ber ku yek diran di dêv de tune ye. Lê dîsa jî her sê libên gûzan hildide û hema wê gavê yekê diavêje devê xwe. Pîrê heya sibehê di devê xwe de wê gûzê dibe û tîne. Lê nikare bi piriyên xwe wê bişkîne. Lawik sibehê radibe, lê dinihêre ku lepelepa devê diya wî ye. Hê bi gûzê re mijûl e. Dora devê wê di xwînê de maye. Lawik dibêje:
"Dayê ka te çawa kir?" Dê dibêje:
"Lawo diya te yek hema hema bi ser hev de aniye." Hefteyek derbas dibe, dev û lêvên pîrê hemû dibin birîn lê nikare gûzekê jî bi piriyên xwe bişkîne.Di dawiyê de bang dike kurê xwe û dibêje:
"Lawo gûz keştandin ne karê min e, lê teze ez dizanim ku gor warê min e!.."

Hem dinale, hem vedimale.
Hem dibêje ez nexweş im, hem jî zêde zêde dixwe û vedixwe. **Ev çawa nexweş e,* ***hem dinale, him vedimale****.*

Hem diz e, hem dizgîn (dizgir) e.
bnr: Hem diz e, hem topiz e.

Hem diz e, hem duriz e.
bnr: Hem diz e, hem topiz e.

Hem diz e, hem topiz e.
Hem neheq e, hem jî dike ku zordariyê bike. **Ev jinika şerûd* ***hem diz e, hem topiz e****.*

Hema dibêje barê êzingên min.
Bi israr tenê qala tiştekî kirin û dev jê bernedan. **Kî çi dibêje, qet ne xema wî ye, ew* ***hema tenê dibêje, barê êzingên min****.*

Hem eçî dike, hem maçî dike.
Di nav helwesteke dubendî de bûn. **Kesî ji Emînê Gogê tiştek fêm nekir.* ***Him eçî dike, him maçî dike.***

Hem ji çilikê, hem şilikê bûn (Him çilikê, him şilikê)
Her du vebijark jî ji dêst çûn. **Dewleta Tirkiyeyê got, em li Iraqê ji yekê dehan bistînin, lê* ***hem ji çilikê, hem ji şilikê****.*

Hem ji dêrê, hem ji mizgeftê bûn
Ji her du vebijarkan jî kêrek nedîtin. **Armanca wî hê zêde qezenckirin bû, lê* ***hem ji dêrê, hem jî ji mizgeftê bû****.*

Hem ji karê, hem ji yarê bûn
bnr: Hem ji dêrê, hem ji mizgeftê bûn

Hem ji kerê bû, hem ji Perê bûn
bnr: Hem ji dêrê, hem ji mizgeftê bûn

Hem ji kirikê, hem ji belikê bûn
bnr: Hem ji dêrê, hem jî ji mizgeftê bûn

Hem keçel e, hem jî qure ye.
Hem kêmasiya wî/wê heye, hem jî xwe qure dike. ****Hem keçel e, hem jî qure ye.*** *Di ser wê qisura xwe re hê jî xwe dinepixîne.*

Hem ker e, hem seg e.
Hem nezan e, hem jî ji bin ve kone ye. **Tu wisa li wî menêre. Ew* ***hem ker e, hem jî seg e****.*

Hem lê dide, hem miz dide.
bnr: Hem eçî dike, hem maçî dike.

Hem li defê dixe, hem li zirnê.
bnr. Hem li nal dixe, hem li bizmarê.

Hem li nal dixe, hem li bizmarê.
Bi awayckî berevajî hereket kirin. **Mirov bi wî bawer nabe. Çimkî ew **hem li nal dixe, hem li bizmarê**.*

Hem riya Xwedê, hem a însanetiyê jê stendin
Bi her awayî mafdar bûn. **Kes nikare ji Wedat re dengê xwe bike. Çimkî wî **hem riya Xwedê, hem ya însanetiyê ji wan stendî ye**.*

Hem serê xwe dişkêne, hem jî bêşa xwe dide.
Ji bo helwesta bêwate û berevajî tê gotin. **Ev çi hewldaneke bêwate ye? **Hem serê xwe dişkêne, hem jî bêşa xwe dide.***

Hem şil e, hem kul e.
Hem bêzereng e, hem jî bieks e. **Evdirelman mirovekî **hem şil e, hem kul e**. Bi mirovên wisa re debar zor dibe.*

Hem tîr dike, hem rehn dike.
bnr. Hem li nal dixe, hem li bizmarê.

Hem zexel e, hem mexel e.
Hem hîlekar û xayîn e, hem jî teral e. **"Yê din jî ne wekî yê xurt e, lê ne pir xerab e. Lê yê sisiyan **hem zexel e û hem mexel e**."* Zinar Soran

Hem ziyaret, hem ticaret
Bi her awayî karekî baş pêk anîn. **Jixwe ez jî wê dixwazim, **hem ziyaret, hem jî ticaret**.*

Hembêz kirin
Girtin nava xwe, hildan bin kelîja xwe. **"Folklor, çîrok û stran û edetên gelekî **hembêz dike**."* Gabar Çiyan

Hembêza xwe vekirin (Hembêz kirin)
Rûmet dayîn, lê xwedî derketin. **"Di gera Partiya Demokrasiya Gel de Serhedê ew **hembêz kirin**."* Samî Berbang

Hemû dinya bûn ya (yekî)
Gelekî şad bûn. **Bi wê pirtûkê wisa şad bû ku, te digot **hemû dinya bû ya wê**.*

Hemû fileh ne Îso ne.
Tenê nav û xuyang derka kesan an jî tiştan nîn e. **Divê tu baş bizanibî ku, **hemû fileh ne Îso ne**.*

Hemû rê lê birîn
Bi her awayî bêgav hiştin. **Min **hemû rê lê birîne**, ne bi dilê wî be jî wê bipejirîne.*

Hemû riyan dizanî, riya bajêr nizanî.
Ji bo helwesta ne durist û rast tê gotin. **Ya te bi hev û din nagire,* ***hemû riyan dizanî, riya bajêr nizanî****.*

Hemla xwe danîn
Ji bo zarokanîna jinan tê gotin. **Heya ku Berfîn* ***hemla xwe daynene****, em nikarin mala xwe koç bikin û bên wî bajarî.*

Hemzeko, piştê girê de veneko
Pir qesîs û temahkar bûn. **Tu xwe bikujî dîsa jî ew tiştekî nade.* ***Hemzeko, piştê girê de veneko.***

Hemtirka (yekî) dan
Bi awayekî xeter li yekî xistin. **Wan bêbavan wisa kiribûn ku* ***hemtirka Robar dabûn****.*

Henekê xwe bi şeytên kirin
Ji bo mirovên pir zana û konevan tê gotin. **Cimoyê Barî bela ye, mêrik* ***henekê xwe bi şeytên dike****.*

Henekên hirçan kirin
bnr. Henekên rijî kirin

Henekên rijî kirin
Henekên ne di cih de kirin. **Erê, her mirov henekan dike, lê henekên Eşref* ***henekên rijî dike****.*

Heq hebûya Emer, Bendê mehr nedikir.
Di vê dinyayê de dad û denge tune ye. **Heke di vê cîhanê de* ***heq hebûya Emer, Bendê mehr nedikir****.*

Heq pê de çûn
Maf derbasî aliyê yekî din bûn. **A rastî di wî hesabî de* ***heqê me pê de çû****, ne yê wî.*

Heq û hiqûq pirsîn
bnr. Mêzîna xêr û gunehan danîn

Heqê Elî dixwaze ji Welî.
Bêdadî kirin. **Ev çi dad e, ezbenî? Ew bêbavê* ***heqê Elî dixwaze ji Welî****.*

Heqê nan û xwê hebûn
Rûmeta têkilî û xizmetê girtin. **Heke* ***heqê wê nan û xwê nebûya****, min dizanibû min ê jê re çi bigota.*

Heqê (yekî) xwarin
Mafê yekî binpê kirin. **Heke wan* ***heqê min nexwara****, niha ez li cihekî din bûm.*

Heqê xwe li (yekî) helal kirin
Gunehên xwe dan baxişandin. **Dema ku li ber zekeratê de bû,* ***heqê xwe li zarokên xwe helal kir.***

Heqê xwe jî dide, serê xwe jî dişkêne (dide şikênandin).
Ji bo helwesta bêwate û çewt tê gotin. **Min tiştek ji Gulîzerê fêm nekir,* ***heqê xwe jî dide, serê xwe jî dişkêne.***

Heqiyê di destê neheqiyê de barebar (zarezar) e.
Neheqiyê bandor li heqiyê kirin. **Ez çawa bikim ezbenî,* ***heqiyê di destê neheqiyê de zarezar e.***

Her bendek, xwedî derdek
Her kesek bivê nevê derdekî wî heye. **Ma kî li vê dinyayê bêderd e?* ***Her bendek, xwedî derdek.***

Her çi jê tê, lê tê.
Kî çi dike, ew helwest li gorî kesayetî û radeya wan e. ****Her çi jê tê, lê tê.*** *Bi rastî jî ew bersiva Sedefê jî hema wekî wê bû.*

Her diranekî (yekî) salekê hatin
Pir zana û kone bûn. **Lawo tu bi wî nikarî,* ***her diranekî wî salekê hatine.***

Her du dest di xwînê de bûn
Di nav rewşeke xeter de bûn. **Qet tu nekeve tatêla wê,* ***her du destên min di xwîne de bin*** *jî ez ê xwe bigîhînim te.*

Her du lingên (yekî) kirin soleke teng
Ji bo daxwaza tiştekî yek zêde asteng kirin. **Wê* ***her du lingên min kirine soleke teng,*** *axir soxir ew guharan bi min dane kirîn.*

Her du rê çûn gundekî
Her du jî wekî hev du bûn. **Derka wê nemaye,* ***her du rê jî diçin gundekî.***

Her ez dizanim û Xwedê dizane.
Kes derdê min nizane û fêm nake. **"****Her ez zanim û Xwedê dizane*** *ku bê me çawa debara xwe dikir."* Zana Farqînî

Her gotinek li derekê xistin
Derew kirin, gotinan li hev û din negirtin. **Dema ku dipeyivî* ***her gotinek li derekê dixist,*** *min fêm kir ku xêra wî nîn e.*

Her kes bi şivekê ajotin
Ji bo cure cure pirsgirêkan eynî azîne bikaranîn. **Ev ne tu azîne ye, ev teres dixwaze* ***her kesî bi şivekê biajo,*** *lê ne mimkûn e.*

Her kes li rêçekê ajotin
bnr: Her kes bi şivekê ajotin

Her kes di tanga xwe de
Her kes çi ji dest hatiye, wekî rewşa xwe. **Ev mesele tenê bi Ferzende naqede, divê* ***her***

kes di tanga xwe de *mil bide ber vî barî.*

Her kes li mala xwe bûn

Her kes li ser kar û barê xwe bûn. Têkiliya kesî bi kesî re nebûn. **Em dibêjin bila navbera me xewş û xurt be, naxwe **her kes li mala xwe ye**.*

Her kes wek wîcdana xwe

bnr. Her kes wek Xwedayê xwe

Her kes wek Xwedayê xwe

Her kes li gorî duristî perwerde û namûsa xwe. ***Her kes wek Xwedayê xwe**, min bi xwe ew qas pêk anî.*

Her ku tev bidî, wê bêhna genî jê bê. (Tu çiqasî tev bidî, ew qasî bêhna genî wê jê bê.)

Ya rast ew e ku zêde venekirin û pê re mijûl nebûn. **Min ji te re got ku **tu çi qasî tev dî, ew qasî bêhna genî wê jê bê**.*

Her nan e, her derman e.

Ji ber ku pêdiviya herî bingehîn dibîne, nan ji bo mirovan pir girîng û pîroz e. **Tu ji kîjan aliyî ve lê binihêrî, **her nan e, her derman e**.*

Her sal zikê te tije be û dawa te vala be.

Tu hemîle bimînî, lê zarok ji te re nemînin. **Bûkê, ez ji Xwedê dixwazim, **her sal zikê te tije be û dawa te vala be**.* (nifîr)

Her seriyek dengek jê çûn

Her yekî tiştek gotin. **Bi vî awayî em ê çawa aştiyê di navbera wan de pêk bînin? Maşelah **her seriyek dengek jê diçe**.*

Her tiliyek xwedî merîfet bûn

Bihuner bûn. **Maşelah **her tiliyek wê xwedî merîfetek e**.*

Her tim kurê pîrê ew e.

Her tim bi eynî azîneyê eynî encam derxistin. **Ji wî re çi? Ew **her tim kurê pîrê ye**.*

Her tim roj jê re în bûn

1. Jê re zêde derk nekirin. **2.** Jê re her roj xweş û kêrhatî bûn. Bisiûd bûn. **Çi tayhetiya înê heye? **Ji wê re her roj în e.** **Maşelah **ji wî lawikî re her roj în e**, tu qet nekeve tatêla wê.*

Her warek biharek bûn

Her deverek an jî cihekî nû, dibe sedema destpêkên xweş û şirîn. **Divê mirov carinan jî cihê xwe biguhere, **her warek biharek e**.*

Her Xwedê bibêje, bes.

Zehf zêde bûn. **Di wê hucreya di bin erdê de îşkenceyeke wisa li Şêxmûs kirin ku **her Xwedê bibêje bes**.*

Her yek çengek xwelî avêtin çavên (yekî)

Ricm kirin, bi tevayî bi ser yekî de çûn. *Jixwe ***her yek çengek xwelî biavêje çavên Çeto** *hesî wî ye.*

Her yek nîvê sêvekê bûn

Gelekî şibandina hev. *Wisa dişibînin hev ku tu dibêjî ***her yek nîvê sêvekê ye.***

Her yekî defek lê xistin

Her yekî tiştek gotin. *Em çûn ku meseleyê çareser bikin, lê ***her yekî defek lê xist*** û me tiştek bi ser nexist.*

Her yekî seriyek kişandin

bnr. Kesî li kesî guharî nekirin

Heramonî kirin (heramoyî kirin)

bnr. Çîroz kirin

Here cihê ku av û gû lê disekine.

Bicehime. *Diçe bila ***here cihê ku av û gû lê disekine***.

Herê kirin

Soz dan. (Bi taybetî ji bo dayîna qîzê soz dan.) *Îro ji bo kekê min çûne ***herêkirina*** Zerîfê.*

Hereket kor e, ziman zor e. (Hereket kor e, ziman sor e.)

Ziman çors û dirêj e, lê pêkhatin jî nîn e. *A rastî jî Berzanê biraziyê min wisan e, ***ziman zor e, hereket kor e***.*

Herfa Quranê bûn

bnr. Kêrta kêvir bûn

Herine kurê[1], li min mikurê.

Li cihê xalî û sapa mirov li xwe mikur tên. ****Herine kurê, li min mikurê.*** *Heke li wir nebûya, wî kirinên xwe nedigotin.*

Hesab ji tizbiyê re derbas kirin

Bi awayekî dorfireh rewş nirxandin û di karvaniyê de pêk anîn. *"*Heyf, ku min wê çaxê **hesabê wî ji tizbiyê re derbas nekir**."* Eliyê Ebdilrehman

Hesab ketin nav hesaban

Rûmet dîtin. *"*Êdî ez ê li pêşiya xelkê bûm.* ***Hesab ketin nav hesaban.*** *Mêrxasên min çêbûn."* Medenî Ferho

Hesab pê re dîtin (girtin)

1. Rewşa bûyî an jî heyî nirxandin. **2.** Heyf û tola xwe hildan. *Divê ez ***hesabê xwe bi Zohat re bigirim***. *Xwedê ji min û wî re kerîm e, ez ê niha ***hesabê xwe bi wî re bibînim***.*

---

[1] **Kur:** Girê di nava çiyayan de

Hesab pirsîn
Ji bo heyfê yan jî egra dozckê hewl dan. *_Îro roja **hesabpirsînê ye**, xelasbûna te nîn e._

Hesabê paşî û pêşiya xwe nekirin (Hesabê qûna xwe nekirin)
Li dawiya xwe nefikirîn. *_Çi dibe bila bibe, divê mirov **hesabê paşî û pêşiya xwe bike**._

Hesabê xwe nekirin (kirin)
bnr: Hesabê paşî û pêşiya xwe nekirin

Hesabê xwe nezanîn
bnr: Bêhesab û bêkitêb bûn

Hesabê xwe rast kirin
Pirsgirêka xwe çareser kirin. *_"Xwedê me qurbana te ke, tu here oxira xwe nemîne, em ê xwe bi xwe **hesabê xwe rast kin**."_ Celîlê Celîl

Hesikê ji negrê re got: "Nava te tenî ye" Negrê got: "Tu di nava min de diçî û têyî."
Ew tiştê ku tu naecibînî tu bi xwe jî di nav de yî. *_Ez çi bim, tu jî ew î. **Hesikê ji negrê re got: "Nava te tenî ye" Negrê got: "Tu di nava min de diçî û têyî?"**_

Hesin avêtin ber lingên (yekî)
Ji bo kesên ku demeke dirêj neçûne cihekî, dema ku diçin tê gotin. *_Keçê te xêr e ? Ca **hesinekî biavêjin ber lingên wê lê**._

Hesin bi sarî cûtin
Pir hêrs bûn. *_Dema ku hêrsa Reşat tê, tu bawer bike **hesin bi sarî dicû**._

Hesinê sar kutan
Bi karê pûç û bêderfet re re mijûl bûn. *_Divê mirov bi tiştekî berhemdar re mijûl be, Yaqûb tenê **hesinê sar dikute**._

Hesinê xwe kutan
Tenê ya xwe gotin. Dev ji gotina xwe bernedan. *_Ka bi Remezan re nayê xeberdan, hema **hesinê xwe dikute**._

Hesko ji bajêr xeyîdî.
Bi xwe, xwe xapandin. *_Wey mala minê! **Hesko ji bajar xeyîdî.**_ (qerf)

Hesp heye afîr tune, afîr heye hesp tune.
Ji bo rewşa bêderfet û berevajî tê gotin. *_Çawa dikim nabe hesp heye afîr tune, afîr heye hesp tune._

Hesp ji dest çûye, bi pey hefsar ketiye.
bnr: Aş berdaye, bi pey çeqçeqê ketiye.

Hesp tune hefsar dikire.
bnr: Hê hesp tune afîr çêdike.

Hesp tune zîn dikire.
bnr. Hê hesp tune afir çêdike.

Hesp û kesp li nik (yekî) yek bûn
Pir merd û destvekirî bûn. **Hesp û kesp li nik Serdar yek in.*

Hesp a min e, ez xisletê wê dizanim.
bnr. Gayê min e, ez xisletê wî dizanim.

Hespê (yekî) bezîn
Kar lê hatin. Rewş baş bûn. **Hela vê gavê **hespê wî dibeze**, ka dawî çawa tê?*

Hespê revandin
Xwe şaş kirin, xwe winda kirin. **Qet tiştekî wisa dibe? Ma **hespê tu revandiyî**?*

Hespê te ker e, gotin
Ji bo tiştekî girîng negotinê tê gotin. **Heyran ma min jê re **gotiye hespê te ker e**?*

Hespê xwe tê de av dan
Wekî daxwaz û kêfa xwe tevgerîn. **Wî **hespê xwe wekî dilê xwe tê de av da**, kî çi dibêje bila bibêje.* (argo)

Hespyar (siwar) xwe li ba kir, peya xwe winda kir.
Yên ku karên xwe cidî negirin û forsê bikin, di dawiyê de têk diçin. ****Hespyar xwe li ba kir, peya xwe winda kir.** Te meseleya kûsî û kîvroşkê jî bihîstiye?*

Hesret kişandin
Bêriya nasên xwe yan jî tiştekî kirin. **"Digel vî halê xwe, dîsa jî hesreta wî warî dikişîne."* Gulcan Şirnexî

Hesret ... pê re çûn gorê
Beyî ku daxwaz û armanc pêk bên, mirin. **"Kalikê wî tim li ser çiyayên welat diaxivî û **hesreta vegera serê wan çiyayan pê re çû gorê.**"* Kamîran Haco

Hesreta ... dj dilê (yekî) de man
Bi daxwaza zêde dilkirinê şad nebûn. **Ew **hesreta gera Japonya û Çînê di dilê Apê Mamoste de ma**.*

Hesreta dilê (yekî) daketin
Hesret kêm bûn. Dil rehet bûn. **"Bi tenê şevekê em li cem hev mane, me hê baş hev du nedîtiye. **Hesreta dilê me hê daneketiye.**"* Mehmed Uzun

Hestiyên (yekî) di nav cinetê de bûn
Di wê dinyaya din jî di nav rewşeke baş de bûn. **Ji Xwedê dixwazim ku di wê dinyaya din jî **hestiyên te di nav cinetê de bin**.*

Hestiyên xwe helal kirin

Ji bo kesên ku piştî xirabiyan dest bi karên qenc dikin ku xwe bidin baxişandin tê gotin. *Baş e, bila bike, ancax dikare **hestiyên xwe wisa helal bike**.*

Hestiyên xwe şikandin

Ji bo kesan an jî tiştan gelekî ked û zehmet dan. *Xwedê bike, ew jî serfîraziya wan zaroyên xwe bibîne. Wê ji bo wan **hestiyên xwe şikand**.*

Hestiyên (yekî) zer kirin

Kesek zehf zêde aciz kirin. *Di navîna wan sê salan de wê jinikê **hestiyên min zer kirin**.*

Hestî avêtin ber

Bi tiştekî piçûk xapandin. *Ew qas jî dixebitî, lê tenê **hestiyek diavêtin ber** û bi wê dixapandin.*

Hestî kêr hilnegirtin

Êdî xwe ranegirtin. *Heya îro min kişand, lê ji îro pê ve **hestî kêrê hilnagire**.*

Hestî kotin

Bi bermayiyan îdare kirin. *Ma ew jî jiyan e? Bi **hestîkotinê** dehar wê heta ku derê bimeşe?*

Hestî tê de şikandin (Hestî helandin)

Gelek ked dan, zehmet û eziyet kişandin. *Wê jinikê **hestî di wê malê de şikand**, tu li axiriya wê binêre?*

Heşerî bûn

Ji bo mêrên ku li pey jinan digerin û di hêla zayendî de dest li wan nasekinin tê gotin. *Osê mirovekî wisa **heşerî bû** ku heke jineke bedew bidîta heya xwe lê hilnekira, nedisekînî.*

Heşir neşir bûn

Tevlihev bûn. Têkilî xurt bûn. *Ev demeke xurt e ku bi hev û din re **heşîr neşîr bûne**, lê dawî baş nayê xuyan.*

Heta malê me hebû alem dostê me bû, malê me xelas Mendo çirtek da xwe, ji me derbas bû.

Mirov ku bêmal û bêmilk be, rûmeta wî jî kêm dibe. ***Heta malê me hebû alem dostê me bû, malê me xelas Mendo çirtek da xwe, ji me derbas bû.** Mixabin malê dinê rewşa mirov diguherîne.*

Heta aqil nas kir, temen xelas kir.

bnr. Heta min xwe nas kir, mal jî li xwe xelas kir.

Heta berdestî sibê

Heya serê sibê. *"Her du alî jî ji xwe razî bûn û **heta berdestî sibê**, bê westan hev û din birin anîn." Mehmed Uzun

Heta ber dêv tijî bûn (kirin)

1. Êdî tehemûl nekirin. **2.** Heya dawî dagirtin. **Ya ku di vê dawiyê de jî kirin, qet nayê kişandin. Êdî* ***heta ber dev tijî bûm****. *Min ji te re got,* ***heta ber dêv tijî neke****, dirije.*

Heta bi çavên xwe nedîtî, bawer nekirin
Tenê bi biryarên xwe bawer kirin. **Ez wê baş nas dikim, ew* ***heta bi çavên xwe nebîne, tu car bawer nake****.*

Heta bûk fetilî, dawet betilî.
bnr. Heta bûk xemilî, govend betilî.

Heta bûk xemilî, govend betilî.
Gelekî dereng man. **Maşelah ev çi ecêb e.* ***Heta bûk xemilî, govend betilî.***

Heta çavan nas kir, werdekê gol xelas kir.
bnr. Heta min xwe nas kir, mal jî li xwe xelas kir.

Heta çavek derman kir, yek jî kor kir.
Kar baş pêk neanîn. **Vî bêhunerî,* ***heta çavek derman kir, yek jî kor kir****.*

Heta dinya xweş be tu tê de xweş bî.
Heta dinya hebe, tu tê de serfiraz bî. **Înşelah,* ***heta dinya xweş be, tu tê de xweş bî****.*

Heta diya min dibêje: "Lawo!" Bila diya te bibêje.
bnr. Heta diya min li çoka xwe dixe, bila diya wî li çoka xwe bixe.

Heta diya min digirî, bila diya wî bigirî.
bnr. Heta diya min li çoka xwe dixe, bila diya wî li çoka xwe bixe.

Heta diya min li çoka xwe dixe, bila diya wî li çoka xwe bixe.
Heta ez têm kuştin an jî ziyanê dîbinîm, bila ew bîbine. **Ez çawa bikim, ez jî bêgav im.* ***Heta diya min li çoka xwe dixe, bila diya wî li çoka xwe bixe.***

Heta em bûn çavnas, dinya bû xelas.
Heta min rewş fêm kir, her tişt ji dest çû. **Jixwe em wekî gel li paş mane.* ***Heta em bûn çavnas, dinya bû xelas.***

Heta ev qûn bi te re be, tu herî ku eynî tişt e.
Cir û taybetiyên mirov, yên bingehîn zû bi zû nayên guhertin. **Bawer im ku tu herî kîjan welatî derk nîn e.* ***Heta ev qûn bi te re be, tu herî ku eynî tişt e.***

Heta ev serî serê min be, qûna min wê gelek emelan bibîne.
Heya ku ez bi vî aqilî herim, karê min zor e. **Bi rastî ez jî bi xwe nikarim, lê vê baş dizanim ku* ***heya ev serî serê min be, wê qûna min gelek emelan bibîne****.*

Heta êvarê hev û din xwarin
Bi hev du re debar nekirin, tim pev çûn. **Zinar û Sozdar* ***heta êvarê hev û din dixwin****. Dê û bavên wan jî ji vê yekê aciz dibin.*

Heta êvarê li ser serî darde bûn

Gelekî xebitîn. Zehf eziyet dîtin. **Rebenê Nihat* ***heya êvarê li ser serî darde dibe****, êvarê jî rehetî di dest jinikê de nabe.*

Heta ew aş e, ew qeraş e.

Bi hev du re têkildar in. **Ew nebe, ew ê din jî nabe.* ***Heta ew aş e, ew qeraş e.***

Heta ew kûçik li devê deriyê we be, dê gûyê zarokên we wer be.

Heya ev rewş wiha berdewam bike, wê wiha be. **Min ji te re di serê serî de got.* ***Heta ew kûçik li devê deriyê we be, dê gûyê zarokên we wer be.***

Heta Gulê xemilî, govend fetilî.

bnr: Heta bûk xemilî, govend betilî.

Heta hat, ker gurand, çû boçikê.

bnr: Heta bûk xemilî, govend betilî.

Heta hebû dims, ez mam û tu pis; gava nema mot, ez Şervî û tu Botî (ez Motî û tu Botî).

bnr: Heta qeliya me hebû, Mamik bûka me bû; roja qeliya me xelas bû, Mamik çirtek da xwe ji me derbas bû.

Heta hebû şilik milik, dema nema keder (keser) kulik.

bnr: Heta qeliya me hebû, Mamik bûka me bû; roja qeliya me xelas bû, Mamik çirtek da xwe ji me derbas bû.

Heta hetayê bûn

bnr: Heta roja qeyametê bûn

Heta hîn bûm, pîr bûm.

Ji bo dereng mayîn û ziyanê tê gotin. **Mixabin lowo,* ***heta hîn bûm, pîr bûm****.*

Heta kirasê wî/wê bişewite, canê min wê bişewite.

Nêzîktirbûnê tîne ziman. **Ew xelk e, ji wê re çi?* ***Heta kirasê wê bişewite, canê min wê bişewite.***

Heta ku dinya ava be

Heta demeke pir dirêj, bê dawî. *****Heta dinya ava be*** *ez minetdarê wê jinikê me.*

Heta ku dîk mîr û tajî kizîr be, tu mêvanan li derê malê nabînî. (Heta mîr û tajî kizîr be, tu mêvanan li ber derê xwe nabînî.)

bnr: Heta ew kûçik li devê deriyê we be, dê gûyê zarokên we wer be.

Heta ku guman hebe, rastî xeber nedan

Ji bo mirovên derewîn û sextekar tê gotin. **Kifş e ku tu Resûl nas nakî,* ***heta ku gumana wî hebe, ew a rastî xeber nade****.*

Heta ku serê min li vê dinyayê bijî, gelo qûna min wê çi ecêban bibîne.

Jiyan wê çi derxe pêşiya mirov Xwedê dizane. **Divê mirov zehf mezin xeber nede. Kî dizane* ***heta ku serê me li vê dinyayê bijî, gelo qûna me wê çi ecêban bibîne.***

Heta lê pirsî, kefen (di) stû de rizî.
bnr. Heta rovî çû edaletê, postê wî çû dewaxê.

Heta malek ava kir, şehrek (bajarek) wêran kir.
bnr. Heta çavek derman kir, yek jî kor kir.

Heta malê me hebû, alem dostê me bû, malê me xelas bû, alem ji me derbas bû.
bnr. Heta qeliya me hebû, Mamik bûka me bû; roja qeliya me xelas bû, Mamik çirtek da xwe, ji me derbas bû.

Heta malxo (malxwe) dizî girt, diz malxo girt.
Carinan neheq zorê li mafdaran dikin. **Ev çito ecêb e, kuro?* ***Heta malxo dizî girt, diz malxo girt.***

Heta me hilatî kir, wan şikevayî pê ve danîn.
bnr. Heta te hevîr kir, xelkê kire şikeva.

Heta me xwe nas kir, emir xelas kir. (Hetanî min xwe nas kir, emrê xwe jî xelas kir.)
bnr. Heta min xwe nas kir, mal jî li xwe xelas kir.

Heta neçe diyarê gorê, mirin nakeve bîrê.
bnr. Heta nekeve gorê, mirin nakeve qorê.

Heta neçe gorê naxwe çorê.
bnr. Heta nekeve gorê, mirin nakeve qorê.

Heta negire dehan, nade nehan.
Ji bo kesên çikûs, timahkar û egoîst tê gotin. **Hay ew çi şeytan e.* ***Heta negire dehan, nade nehan.***

Heta nekeve gorê, mirin nakeve qorê.
Dinya din qet nehatin bîrê. **Nabêje rojekê ez ê jî bimirim.* ***Heta nekeve gorê, mirin nakeve qorê.***

Heta paşguh zer bûn
1. Pir tirsîn. **2.** Fedî kirin. **Seydo di şevereşa wê newalê de* ***heta paşguh zer bû.*** **Sercan hema kingê ku li çav Simbilê diket,* ***heta paşguh zer dibû.***

Heta poz pak kir, çav derxist.
bnr. Heta çavek derman kir, yek jî kor kir.

Heta qantirê (hêstirê) zayîn
bnr. Boçika deveyê gihîştin erdê

Heta qeliya me hebû, Mamik bûka me bû; roja qeliya me xelas bû, Mamik çirtek da xwe, ji me derbas bû.

Tenê ji bo berjewendiyên xwe hevaltî yan jî hevkarî berdewam kirin. ***Heta qeliya me hebû, Mamik bûka me bû; roja qeliya me xelas bû, Mamik çirtek da xwe, ji me derbas bû.*** *Hevaltiya wî jî eynî ya Mamik bû.*

Heta qirikê deyndar bûn

Zêde deyndar bûn. **Emîn **heta qirikê deydar bûye**, êdî nikare ji mal jî derkeve.*

Heta roja qeyametê (axîretê)

Bêdawî bûn. **Ma dinya rojek e? **Heta roja qiyametê**, ez van kirinên we ji bîr nakim.*

Heta strûyên ker neyên, ma her ker caşik e?!

Tenê bi xuyangê nabe. **Ya ku tu dibêjî tiştekî çewt e. **Heta strûyên ker neyên, ma her ker caşik e?!***

Heta te hevîr kir, xelkê şikeva kir. (kire şikeva)

Dereng man. Bi derengî ketin. **Bi vê qûnê tu naçî şûnê. **Heta te hevîr kir, xelkê şikeva kir.***

Heta te hilatî kir, Pokê şikeva çêkir.

bnr: Heta te hevîr kir, xelkê şikeva kir.

Heta tu aş bî, ez qeraş im.

Tu hewcedarî min î. **Bibore, lê **heta tu aş bî, ez qeraş im**.*

Heta tu bêjî gur û rovî, dê cyar bê nêvî.

bnr: Heta rovî çû edaletê, postê wî çû dewaxê.

Heta tu bikî kar, wê kûsî herin ser dar.

Ji bo kesên pêgiran û teral tê gotin. **Heyran bibore, lê **heta ku tu bikî kar, wê kûsî herin ser dar**.*

Heta wê demê, nekişîne xemê.

Her tişt di dema xwe de divê. **Ya ku te pê girtiye, tu dê xwe mehf bikî, **heta wê demê, nekişîne xemê**.*

Heta xanim xemilî, def û dawet kemilî.

bnr: Heta bûk xemilî, govend betilî.

Heta xanim xemilî, govend fetilî.

bnr: Heta bûk xemilî, govend betilî.

Heta Xwedê li me pirsî, kefenê me rizî.

bnr: Heta rovî çû edaletê, postê wî çû dewaxê.

Hetanî kêlika dawî

Heya radeya paşîn. **Divê mirov **heya kêlika dawî** bide ser derewînan.*

Hetanî min xwe nas kir, mal jî li xwe xelas kir.
Yên ku dereng dimînin, gelek tiştan winda dikin. **Ew jî nîşanên derengmayînê ne,* ***heta min xwe nas kir, mal jî li xwe xelas kir***.

Hetika (yekî) birin (Hetika (yekî) çûn)
Aciz kirin. Zêde bi ser de çûn. **Ez bêgav mam, çimkî wê* ***hetika min biribû***.

Hev û din nîze kirin
Ji hev û din re tim teşqele derxistin, debar nekirin. **Ew herdu tim wisa* ***hev û din nîze dikin***.

Hev û din qelaptin
Serobino kirin, tevlihev kirin. **Wan bêbavan* ***hev û din qelaptin***.

Hev û din berdan
1. Ji hev du re alîkarî nekirin. **2.** Têkilî birîn. **3.** Ji bo hev û din terkkirin û qetandina jin û mêrên zewicî jî tê bikaranîn. **Barî û Kemal berê ji hev û din re wekî bira bûn, lê dû re* ***hev û din berdan***. **Cînar jî ji şerê wan zivêr bûn, jixwe di dawiyê de di dadgehê de jî* ***hev û din berdan***.

Hev û din birin û anîn
Bi hev û din re mineqeşe kirin, destopiçkî hev û din bûn. **Wexta ku wan* ***hev û din dibir û dianî****, ku kalikê min derneketa, dibe ku tiştek bianîna serên hev.*

Hev û din dabarandin
bnr. Heta êvarê hev û din xwarin

Hev û din girtin
Ji hev du re alîkarî kirin. Tifaq kirin. **Maşelah wan wisa* ***hev û din girtine*** *ku kes nikare wan ji hev û din biqetîne.*

Hev û din gêj kirin
1. Hev û din serwext nekirin. **2.** Hev û din aciz kirin. **Rojîn û Xezalê* ***hev û din gêj kirin,*** *lê tiştek jî nekirin serê hev. *Weysî û Cemîleyê bi wan xeberdanan hema tenê* ***hev û din gêj kirin***.

Hev û din hilxistin, daxistin
bnr. Hev û din birin û anîn.

Hev û din serwext kirin
Hev û din dan fêrkirin, îkna kirin. **Hinekî zêde kişand, lê di dawiyê de* ***hev û din serwext kirin***.

Hev û din şewitandin
Ziyan dan hev. **Kê kêrek dît? Herduyan jî* ***hev û din şewitandin***.

Hev û din zêlzêlî kirin
Bi awayekî tund li hev û din xistin. **Hê te nebihîstiye? Dibêjin, lawê Gemşo û Cimşît* ***hev û din zêlzêlî kirine***.

Hev û din vegevizandin

Bi hev du re debar nekirin. **Jixwe ew her roj **hev û din vedigevizînin**, ez nikarim rojê carekê herim silha yên rezîl.*

Hevalê axretê bûn

Hevalê sadiq û mayînde bûn. **Erez ne hevalê min ê demborî ye, **hevalê axretê ye**.*

Hevalê rastiyê bûn

Alîkarê rastiyê bûn. **Ew tim **hevalê rastiyê bû**, lê ji ber wê jî jiyana wî di hepsan de derbas bû.*

Hevalê sîsyareka gurî bûn

Zehf zêde emir kirin. **Hay lo lo! Ew **hevalê sîsyareka gurî ye**, derdê wî nayê kişandin.*

Hevalo, ev ne kevirên koran in.

Ev rewş naşibîne wekî gotina te. **Ez têgilûştim, **hevalo, ev ne kevirên koran in**.* (bnr. çîrok)

Hev du xwarin

Bi hev du re debar nekirin. **Malbata Xalit ji cîranan re baş in lê heya êvarê **hev du dixwin**.*

"Hevalo, ev ne kevirên koran in."

Du heb gundî çûne Qerekilîseyê (Agiriyê) hewcedariyên xwe dîtine, hinek kel melên xwe xistine torbeyan, dane pişta xwe û vedigerin gund. Li nêzîkî Qerekilîseyê di rê de mêze dikin ku wa ye yekî kor şiva xwe li pêş xwe li ba dike û hêdî hêdî ber bi bajêr ve diçe. Hê ji dûr ve yek dibêje:
"Ew belengazê hamê kor e, bi wî halî wê çawa here bajêr?" Hevalê din dibêje:
"Xwedê korê xwe nas dike. Kî dizane gelo ew çi sextekar e. Ji ber wê jî Xwedê ew kor kiriye." Yê din hêrs dibe û dibêje:
"Kuro lawo, tu çi mirovekî bêinsaf û qewr î? Ji korê Xwedê çi dixwazî." Hevalê wî berdewam dike:
"De madem ku wisa ye, tu wekî ku qet ne li wir e, dengê xwe meke. Ez ê wî biceribînim. Ka tu li min û wî mêze bike." Hevalê wî gotina wî dipejirîne û weke ku qet ne li wir e, dengê xwe nake û ji dûr ve wan temaşe dike. Hevalê wî diçe sermila xwe li kor dixe. Kor dike qîrîn û bi hêrs dibêje:
"Ma tu kor î, tu çima xwe li min dixî?" Gundî dibêje:
"Bibexşîne, belê ez kor im." Kor dibêje:
"Ez ji kor im." Û dipirse:
"Tu ji ku derê têyî?" Yê gundî dibêje:
"Ji Qerekilîseyê têm." Kor dibêje:
"Ca hinekî rûne, em xeber bidin. Qet rewşa bajêr çawa ye? Milet alîkariyê ji yê wekî me re dike yan na?" Yê gundî dibêje:
"Belê, Xwedê ji wan razî be û kêmasiya wan nede, baş alîkariya min kirin. Min serguh û kel mel ji zarokên xwe re kirîn." Kor dibêje:
"Hela ka te qet ji zarokên xwe re çi kirîne?" Yê rêwî kincên ku ji jin û zarokên xwe re kirîne yek bi yek dide destê wî û ew ji desté xwe lê dide û bi kêf û eşq dide aliyê xwe yê din. Ji aliyekî ve jî dibêje:
"Baş e, xweş e!.." Yek bi yek jê digire û dibêje:
"Hema ev in?" Yê din dibêje:
"Belê, hema ev in." Yê kor hema wê demê xwe xûz dike û wan pirtî û kincan dide milê xwe û hêdî hêdî ji wir dûr dikeve. Yê gundî bi rastî jî wekî ku kor e û hay ji rewşê nîn e bi awayekî saf dibêje:
"Hevalo te seh kir çi ne, de ka eşyayê min bide, ez hêdî hêdî herim." Kor dengê xwe nake, xwe ditelîne û hêdî hêdî ji wir dûr dikeve. Ji xwe re dibêje:
"Çawa hebe çavên wî nabînin, ez ê van tiştan ji xwe re bibim." Gundî dîsa bang dike kor, lê vê carê lavayî dike:
"Hevalo de ka ji xêra xwe eşyayê min bide, niha çavê zarokên min li rê ne. De ka qurban, ka heyrana çavên te!" Lê yê kor tu bersivê nade, dike ku gavekê pêşde ji wir dûr bikeve. Yê gundî ji der û dora xwe çend keviran hildide, berê xwe ber bi jor ve dike û berzûrî Xwedê dibe:
"Xwedêyo! Ez mirovekî kor im. Ev korê bêbav dixwaze van kel melên min ji xwe re bibe. Ya rebî, tu alîkariya min bike û van kevirê min li wî wer ke!" Çawa ku kevir diavêje, li pişta korê xwexûzkirî dixe. Girmînî ji pişta kor tê. Yê kor cihê xwe vediguhêze. Kevirekî dîsa diavêjê, dibe intîna kor û dîsa şûna xwe diguhere. Gundî dîsa berzûrî Xwedê dibe û yekî dîsa bi kor ve dizeliqîne û dîsa girmînî jê tê. Kor dike qîrîn û dibêje:
"Hevalo, ev ne kevirê koran in."

Hevraz dan ber (yekî)

Jê re asteng derxistin. **Ji bo ku ez jî bibim nîvekarê wan, min çiqas daxwaz kir jî lê wan tim* ***hevraz dan ber min****.*

Hevraz û berjêr kirin

1. Ji bo kesên ku ji ber rastiyê direvin û hincetan ji xwe re diafirînin tê gotin. **2.** Ji bo hewl dan û mijûlbûna ji bo çareseriyê ji tê bikaranîn. **Ev çend roj in ew* ***hevraz û berjêr dike****, lê ez ê heya dawiyê bidim ser wî. *Rostem gelekî* ***hevraz û berjêr kir****, lê tu rê tê de nedît.*

Hevraz tû dikim simbêl e, berjêr tû dikim rih e.

Di nav du vebijarkên berevajî de man. Çareseriyek peyde nekirin. **Min çareseriyek nedît.* ***Hevraz tû dikim simbêl e, berjêr tû dikim rû ye****.*

Hevsal negirtin

Di hiş û bîrê de neman. **Wer tê xuyan ku ez kal bûme, êdî hevsala min nagire.*

Hevsar xistin (avêtin) serê (yekî).

1. Zewicandin. Serî girê dan. **2.** Yek kirin bin bandor û kelîja xwe. **"'Qîzê baş dibe zewaca vî zalimî.* ***Hevsarekî neavêjî serê Seyad****, ew ê gelek belayên din jî bîne pêşiya me."* Veysel Çamlıbel **Xezalê* ***hevsarekî wisa xistiye serê mêrê xwe*** *ku çawa dixwaze wisa dike.*

Hevşiyê berê sibê

Bêhnvedana serê sibê. **Kuro çi ye te* ***di hevşiyê berê sibê*** *de derî li me girtiye?*

Hevtayê (yekî) nebûn

Ne di ast û zerengiya yekî de bûn. **"Awirek da min û got: 'Kuro, here ser riya xwe, ez* ***ne hevtayê te me****.'"* Eladdîn Secadî

Hewaleyî Xwedê kirin

Bi hêviya Xwedê ve hiştin. **Ez çi bibêjim û çi bikim? Hema ez* ***hewaleyî Xwedê dikim****.*

Hewan vala bûn

Tu merîfet û tiştek lê tune bûn. **Tu tiştê ku nîşan bidaya tune bû. Jixwe* ***hewana wî vala bû****.*

Hewana xwe dayîn cem hevalan, nanê xwe bi minet xwarin

Ji ber niyeta baş ketin rewşeke xeter. **Ew jî cezayê saftiya xwe dikişîne. Çima* ***hewana xwe bidim cem hevalê xwe, çima nanê xwe bi minet bixwim****?*

Hewana xwe vala kirin

Gotin û merîfetên xwe hemû nîşan dan. **Bawer im ku Miraz çi di* ***hewana wî de hebû, tev vala kir****.*

Hewar daxistin

bnr. Hewarî kirin

Hewarî kirin

Alîkarî xwestin. Banga xeteriyê kirin. ****Min hewarî kir****, lê ji bilî xalê Eyvaz kes tune bû.*

Hewesa xwe pê derbas kirin
Ji bo serfirazî û kêfa demeke kin bi kar anîn, an jî pê dem derbas kirin. **Mihyedîn ew keçika piçûk anî ser jina xwe..demekê pê şa bû,* ***hewesa xwe pê derbas kir*** *û dû re jî berda.*

Hewcskar man
bnr: Bi heyr û hejmekar man

Hewccyî pariyek nan bûn
bnr: Muhtacî kerî nan bûn

Hewceyî neyaran bûn
Ketin rewşeke pir xerab. **"Serma û seqema adarê, wekî ku diya min digot bêbav bû û mirov* ***hewceyî neyaran dikir****."* Evdile Koçer

Hewccdarî şîva miriyan(*) bûn
Di hêla aborî de di nav rewşeke pir xeter de bûn. **Dibêjin berê pir dewlemend bûye, lê tu dibînî ku îro* ***hewcedarî şîva miriyan e****.*

Hewlo gewloyî bûn (çêkirin)
Ji bo kar an jî tiştên ne xweşik û gilogapanî tê bikaranîn. **Heke min jî wer* ***hewlo gewloyî çêbikira****, min dê zû de biqedanda.*

Hewtiya (yekî) anîn
bnr: Dilminî dayîn ber dil

Hey deşta Mûşê û hey darê dergûşê.
bnr: Ha li Mûşê, ha li pişta dergûşê.

Hey li dilê (yekî) xistin
Bandorek mezin lê kirin. **"Lêvikên wî yên sorik û şîrinokî, dest bi tîrêjan kiribû û* ***hey li dilê wê dixist****."* Çiya Mazî

Heya ber dêv hatin
bnr: Heya ber qirikê hatin

Heya ber qirika (yekî) hatin (Lê hatina qirikê)
Êdî li ber xwe nedan û sebir qedîn. **Êdî ez nikarim li ber xwe bidim. Heya* ***ber qirika min hat****.*

Heya boçika devê (yekî) bigihîje erdê
Ji bo tiştên bêîmkan û bêdawî tê bikaranîn **Heya ew bibe meriv û însan* ***heya boçika devê jî wê bigihîje erdê****.*

(*)**Şîva miriyan:** Piştî mirina mirovekî, ji bo xêra wî bi taybetî êvara înê di mal de çi xwarin hebe, li xizanan tê belavkirin. Ji vê xêrê re şîva miriyan tê gotin.

Heya boçikê anîn

Heya dawiyê anîn. **Tahar* ***heya boçikê anîbû****, lê kutakirin nebû nesîb.*

Heya çavên xwe girtin û vekirinê

Gelekî zû pêk hatin. **Tu qet meraqan neke,* ***heya ku tu çavên xwe bigirî û vekî*** *ez ê biqedînim û bêm jî.*

Heya daxistina qebrê, ji bîr nekirin

Tu car ji bîr nekirin. **Ew derbeya ku kurê Hesenê Cimşo avêtiye min,* ***heya daxistina qebrê jî ez ji bîr nakim****.*

Heya ez li dûvê xwe yê qut binihêrim û tu jî li kêla spî, em nikarin bibin dost. (Teriya qut û quba spî?)

Ji bo kesên ku têkiliya wan tê rewşeke xeter û bêîmkan tê gotin. **Piştî vê hûyerê, dostîtî û destbiratî di navbera me de nemaye.* ***Heya ez li dûvê xwe yê qot binihêrim û tu jî li kêla spî, êdî em nikarin bibin dost.*** (bnr. çîrok)

Heya ji dest (yekî) hatin

Heya dawî li ber xwe dan. **De* ***heya ji dest min bê****, ez ê bixebitim ku ya herî baştir be.*

"Heya ez li dûvê xwe yê qut binihêrim û tu jî li kêla spî, em nikarin bibin dost. (Teriya qut û quba spî?)"

Mirovek pir ji maran hez dike û dixwaze bi zimanê maran jî fêm bike. Ji ber ku ew mirov gelekî ji maran hez dike, navê wî datînin Marbengî. Lê wekî ku tê zanîn, di navbera mar û mirovan de dijminatiyeke dîrokî heye û ev helwesta wî ji hêla mirovan ve wekî tiştek pir xeter tê dîtin. Marbengî, sibe heya êvarê bi hesret û evîna maran radibe û rûdine. Li ser vê hesret û daxwaza xwe bi şev û roj wisa difîkire ku rojekê kalekî rûspî dikeve xewna wî û jê re dibêje:

"Ji ber ku te ew qas ji dil û can xwest zimanê maran hîn bibî, me ev daxwaza te pejirand, êdî tu dikarî bi maran re bipeyîvî."

Marbengî, sibe zû bi eşq diçe ber qula marê ku her dem dibîne. (Jixwe berê jî gelek caran ew mar didît, lê nikaribû pê re têkiliyekê dayîne.) Li ber qula mar bang dike. Mar tê. Bi hev û din re dipeyîvin. Marbengî, daxwaza hevalî û dostiyê ji mar dike. Lê mar bi awayekî vebirî bi bîra Marbengî dixe ku di navbera mirov û maran de hê ji dema Adem û Hewayê ve dijminahî heye û tu car ew nikarin bibin dost. (Çimkî di baweriya mirovan de mar, şeytan xistiye bin zimanê xwe û ji bona xapandina Adem pêxember -ku genim bixwe- biriye bihuştê.) Mar çiqasî dibêje û dubare dike jî Marbengî tênagihîje û di daxwaza xwe ya dostiyê de tim heter (israr) dike. Di dawiya dawî de mar jî nerm dibe û di gel civaka mar û mirovan her du dibin dost. Him civaka mirovan, him jî ya maran ji vê têkiliyê acizbûna xwe eşkere didin xuyandin, lê mar û Marbengî ji biryara xwe venagerin. Demekê dostiya wan bi awayekî baş derbas dibe. Rojekê karekî Marbengî li bajarekî dûr dertê, tê xatirê xwe ji hevalê xwe yê mar dixwaze û diçe. Piştî çûyîna Marbengî, lawê Marbengî ji zarokên cînaran re cihê mar dibêje. Kurê Marbengî tevî zarokên cînaran, bi tasek şîr û bi soz û bext marê dostê bavê xwe dixapîne. Bi saya dostiya Marbengî bi qeleşî mar birîndar dikin. Mar bi qutbûna dûvê (boçika) xwe difilite. Êdî wekî *"Marê Qol"* tê binavkirin. Marê qol demeke direj bi dermankirina dûvê xwe ve mijûl dibe. Mar, di vê demê de tim li dafîka kurê destbirayê xwe û zarokên din difîkire. Baş dizane ku heke lawê destbirayê wî nebûya nediket wê dafîkê. Li hêla ji ber ku bi mirovan re dostî danîbû, marên din lê nabin xwedî. Tu marek nayê serdana wî. Marê qol, êdî nikare derkeve hember dîwana maran û derdê xwe jî bîne ziman. Ji ber van hemû sedeman, marê qol biryar dide ku jehra xwe di lawê destbirayê xwe de birijîne. Dema rojekê lawê Marbengî tevî zarokên hevalê xwe derdikevin geştê. Mar li wê derê bi wî vedide. Tam di wê demê de Marbengî jî ji xeribîbiyê tê. Di heman demê de bi kurê xwe yê birîndar re mijûl dibe, dibe ser hekîm û doxtoran lê tu çareyê nabîne û piştî demekê bi şûn de kurê wî yê yekane di nav destê wî de dimire. Marbengî, ji bo lawê xwe gelekî li ber xwe dikeve. Dike axîn û zarîn. Di demeke kurt de ji kurê xwe re bi mermerên spî li pêş mala xwe merzelekî pir mezin û spehî çêdike. Marbengî piştî şîn û girinê, demeke dirêj difîkire û di dawiyê de li hemberî ew qas mirovan ji bo bi maran re dostîdanîna xwe poşman dibe. Ji hemû maran nefret dike. Ji bo wan bûyeran û wê helwesta xwe jî xwe tawanbar dike. Dû re biryar dide ku çi dike bike, divê marê destbirayê xwe bikuje û tola kurê xwe yê tenê bistîne. Jixwe heke wî marî nekuje nikare derkeve dîwana mirovan û di nav wan de serê xwe rake. Piştî demekê, Marbengî jî wekî lawê xwe, taseke şîr hildide û diçe ber qula marê pol, ango dostê xwe yê berê. Bangî mar dike, jê re dîsa bi dostanî dipeyîve. Lê armanca wî ya rasteqîn ew e ku mar ji qula xwe derkeve ku ew wî bikuje. Lê marê qol her tiştî fêm dike û dibêje:

"Destbira, jixwe ez jî benda te bûm. Min jî ji bo dostiya te hemû qewm û lêzimên xwe ji xwe re xiste dijmin. Ez ê vî welatî terk bikim. Heke bi ya min be tu jî wisa bike." Ji ber ku Marbengî li benda kuştina wî ye, jê re lavayî dike. Daxwaza xwe ya berdewamkirina dostî û biratiyê gelekî tîne ziman, lê mar di dawiyê de ji Marbengî re wiha dibêje:

"Heya ez li dûvê xwe yê qut binihêrim û tu jî li kêla spî, em nikarin bibin dost. (Teriya qut û quba spî?)"

Heya ku bêhn li ber hebûn
bnr. Heya ku daxînin qebrê.

Heya ku (yekî) daxînin qebrê
Heya dawî, heya mirinê. **Heya ku min daxînin qebrê, ew kirinên wê keçikê ji bîra min naçin.*

Heya ku ji kerê re çoş dayê gotin
Heya ku tovbe kirin. **Ez ê wî bibînim û **heya ku ji kerê re bibêje çoş dayê**, ez ê lê bidim.*

Heya ku tu bibêjî bes
Heya ku tu bixwazî. **Li wê dersxaneyê **heya ku tu bibêjî bes** dibin alîkar.*

Heya ku tu ya tehl nexwî, ya şêrîn bi ser de nayê.
Heya mirov rojên zor û xirab nebîne rûmeta rojên hêsan û xweş jî nizane. **Tu tişt heya dawî ne hêsan e. **Heya tu ya tehl nexwî, ya şêrîn bi ser de nayê.*** (bnr. çîrok)

Heya ku xwelî têkeve çavên (yekî)
Heya mirinê. **Ji îro bi şûn de ew serrast nabe, **heya xwelî têkeve çavên wî**, ew ê wisa be.*

Heya qirika (yekî) hatin
Hatin radeya dawîn **Kes bila ji min gazinan neke. Welehî êdî **heya qirika min hatiye**.*

Heya serî birin
Bi sazûmanî karê xwe kuta kirin. **Baweriya kesî zêde pê tune bû, lê Ciwangulê karê xwe **heya serî bir**.*

Heye piranî ye, tune ye mirtivî ye.
bnr. Hebe erebî ye, tune be mirtivî ye.

Heyf jê derxistin
Bedela xeta û gunehên kirî dan. **Wê demê wî wisa kir, lê felekê jî **heyf jê derxist**.*

Heyf gerandin
Ji bo heyf û tolgirtinê li firsendê gerîn. **Ev çend sal in ku Xalidê Cindî **heyfê digerîne**, lê hê tiştek bi dest nexistiye.*

"Heya ku tu ya tehl nexwî, ya şêrîn bi ser de nayê."

Li hêla Omeriya axayê bi navê Sadûnê Sor hemû maqûl û zanayên gundên hawîrdor li hev dicivîne. Sadûnê Sor ecûrekî tehl dide wan û dibêje:
"Kerem bikin, bixwin." Yên di civînê de kesek ji ber tehlbûna acûr nikarin bixwin. Di nav civatê de tenê kesek wî acûrê tehl dixwe. Sadûnê Sor berê ji yên ku nikarin bixwin re dibêje:
"We çima ew acûr nexwar?" Cimaet tev de bersiv didin û dibêjin:
"Axayê min ecûr pir tehl e." Axa vê carê jî dizvire ser wî mirovê ku ew acûrê tehl xwariye û xelas kiriye û jê dipirse:
"Baş e, camêrê delal, kerem bike tu bibêje, ew acûr ew qas tehl bû ku tu kesî nikaribû bixwara, te çima xwar?" Mirov bi awayekî jixwe gerah û zana axê dibersivîne:
"Heya ku tu ya tehl nexwî, ya şêrîn bi ser de nayê. Ango heya mirov rojên zor û xerab nebîne rûmeta rojên hêsan û xweş jî fêm nake."

Heyf girtin
bnr. Heyf hilanîn

Heyf hilanîn
Li hemberî ziyan an jî jiyana kesekî xwe, ji yê neyar bedel girtin. **Ew heya* ***heyfê nehilîne****, tu car nasekine.*

Heyf li canê çûyî
Çi bû, li yê mirî bû. **Her kes bi karê xwe re mijûl e,* ***heyf li canê çûyî****.*

Heyf pê hatin
Dil pê şewitîn. Guneh pê hatin. **Wî ceza heq kiribû, lê dîsa jî* ***heyfa min bi ciwaniya wî hat****.*

Heyf stendin (Heyf û serheyf stendin)
bnr. Heyf hilanîn

Heyfa dêreyê te ye dayê, neqelişîne, çirînî û pirînî (tirînî) ji hev û din kifş e.
Li cihê sekinî xwe aciz neke, ez dizanim a rastî çi ye yan jî çi nîn e. **Qet xwe aciz meke ezbenî,* ***heyfa dêreyê te ye dayê, neqelişîne, çirînî û pirînî ji hev û din kifş e****.* (bnr. çîrok)

Heyfa (yekî) li erdê man
Tola yê mirî negirtin. **Kerem ev çar sal in ku hatiye kuştin, hê jî* ***heyfa wî li erdê maye****.*

Heyfa xwe bi canê xwe neanîn
Zêde xebitîn. Guh nedan tenduristiya xwe. **Mûsayê Gozê* ***heyfa xwe bi canê xwe nayîne****, heqê kar didiyê.*

Heyfa xwe jê derxistin
bnr. Heyf hilanîn

Heyfa xwe ji bavê xwe re nehiştin
Neheqî nepejirandin. **Ji niha ve kifş e, ew lawik* ***heyfa xwe ji bavê xwe re jî nahêle****.*

Heyran û hejmekar man
Pir ecibandin. **Çawa wî ew keçik dît, lê* ***heyran û hejmekar ma****.*

Heyrana kûçikê gurêx, li beriyê diewte, li zozanê gur miyê berdide.
Ji bo sehm, hêz û bandorê tê gotin. **Xwedê kesî bêxwedî neke. Ji tirsa xalê Zubêd nîn bûya ew wisa zû bi zû nedimelisî.* ***Heyrana kûçikê gurêx, li beriyê diewte, li zozanê gur miyê berdide.***

"Heyfa dêreyê te ye dayê, neqelişîne, çirînî û pirînî (tirînî) ji hev û din kifş e."

Mirovek bi mêvanî li malekê rûniştiye. Bûka malê jî nêzîkî mêrik kincan didirû. Çawa dibe, ji nişkan ve ba ji ber bûkê diçe. Bûk zehf şerm dike. Ji bo ku bişibîne dengê tira xwe, bi her du destê xwe bi zexm kaş dike û dest pê dike dêreyê xwe yê ku di dêst de didirû diqelişîne. Dixwaze bi mêvan bide zanîn ku ne dengê tirê ye, lê ya dirûna dêre ye. Mêrik mêze dike ku wa ye jinik dêreyê xwe tîştîşî dike. Hêrs dibe û ji bûkê re dibêje:
"Heyfa dêreyê te ye dayê, neqelişîne, çirînî û pirînî (tirînî) ji hev û din kifş e."

Heyv heyv e, eybek lê ye.
bnr: Hîv hîv e, qisûr li wê jî heye.

Heywax kirin
Poşman bûn. Li ber xwe ketin. **Wê jî dû ve* ***heywax kir*** *lê bi derengî ket.*

Hezar carî hezar
Gelek zêde, gelek caran. *****Hezar carî hezar,*** *xwe bi ava zemzemê bişo jî xêr nîn e.*

Hezîran, hezra teyran
Zêde bûn û gurbûna her tiştî, di dema wan a lêhatî de pêk tê. *****Hezîran, hezra teyran.*** *Ma wê kengê wer bibûya? Helbet dema wê jî ew çax e.*

Hezretî Mûsa gur şîret dikir, gur got: "Zû bike tu dê çi bibêjî bibêje, wa ye keriyê pêz qulibî.
Ji bo helwest û gotinên bêbandor tê gotin. **Lawo tu belasebeb şîretan li wî dikî. Gotine,* ***Hezretî Mûsa gur şîret dikir, gur got: "Zû bike tu dê çi bibêjî bibêje, wa ye keriyê pêz qulibî****."*

Hê birîn germ bûn
Hê bi xwe nehesîn. *****Hê birîna wî germ e****, dê dû re bi xwe bihese.*

Hê cot çarga ye.
Hê rewş xweş e. Hê zengînî dewam dike. **Vê gavê jî hê* ***cot wan çarga ye****.*

Hê (yekî) di kaniya xortan da av venexwarin
Hê kamil nebûye. Hê tam negihîştiye û xwîngermiya ciwaniyê tahm nekiriye. **Hela* ***hê Ferat di kaniya xortan da av venexwariye****. Tu du salan bi şûn de li wî mêze bike.*

Hê ga tunc, afir çêdike.
bnr: Hê hesp tune, afir çêdike.

Hê gunikreş nedîtin
bnr: Hê rastî hêlikreşan nehatin. *(*bnr: çîrok)*

Hê hesp tune, afir çêdike.
Xwe bi xwe xapandin. **Malxirabê Zahar* ***hê hesp tune, afir çêdike****.*

Hê mastê serbisîr nexwarin
Hê neketin rewşeke xerab. **Bila wer bimeşe, wî* ***hê mastê serbisîr nexwariye****.*

Hê nepîvayî, tu dibêjî sê çap e.
Ji bo kesên bêsebr ku bi lezgîn û ji ber xwe de diaxivin tê gotin. **Malavawo, di destê te de metro tune,* ***hê nepîvayî, tu dibêjî sê çap e****.*

Hê nikare qûna xwe bişo.
Hê piçûk, xam û nezan e. **Tu li min û li vî binêre,* ***hê nikare qûna xwe bişo****, hatiye bi min re kapan diavêje.*

Hê nabêjin bismila, didine mila(n).

Karê wan zû û hêsan dimeşe, bisiûd in. **Bextewar li serê wan be, ji wan re* ***hê nabêjin bismila, didine mila****.*

Hê rastî hêlikreşan nehatin

Rastî mirovên zor nehatin. **Ew gelekî pesnê xwe dide û xwe zêde dihesibîne, lê* ***hê rastî hêlikreşan nehatiye****.* (bnr. çîrok)

Hê zûtika sibê derneketî

Berî sehera sibehê. Gelekî zû. **Hê zûtika sibê derneketî diçe û nîvê şevê tê, çi dike, kes pê nizane.*

Hêca (îca) tu ne nimêjker î, pêxwas bîne.

Madem tu ne mirovên wan karan î, here yên wisa bîne. *****Hêca tu ne nimêjker î, pêxwas bîne.*** *Madem ku tu ji mizgeftê hatiyî, yekî li gorî wî karî bibîne.*

Hêç kirin

1. Tune kirin, wekî ku qet tune yan jî nebûye hesibandin. **2.** Bi tiştekî nehesibandin. Têkilî birîn. **Wan heke wisa Ciwangula keçika xwe* ***hêç nekirina****, ev yek jî nedihate serê wan. *Jinikê hema bavê xwe, her sê birayên xwe û hemû xwediyên xwe* ***hêç kirin*** *û da pey wî arodeyî.*

Hêç û pûç bûn

Di encamê de tiştek neman. Vala çûn. **Ew keda me ya ku me ji bo wê qehpikê da, hemû* ***hêç û pûç bû*** *û çû.*

Hêçika xwe bi hev xistin

Bimal û hal bûn. **Di dawiyê de Rewşena di mal de mayî jî* ***hêçika xwe bi hev xist****.*

Hêdî diçim bela digihîje min, zû diçim ez digihîjim belayê.

Di nav nakokiyê de man. **Nizanim çawa bikim.* ***Hêdî diçim bela digihîje min, zû diçim ez digihîjim belayê.***

Hêdî diçim, dibêjin gêj e, zû diçim, dibêjin bîj e.

Bi çi awayî dikim,napejirînin. **Ez jî nizanim çawa bikim.* ***Hêdî diçim, dibêjin gêj e, zû diçim, dibêjin bîj e.***

"Hê rastî hêlikreşan nehatin"

Dibêjin bi navê Qehremanê Qatil kurekî pehlewan û lehengê mezin Rostemî Zal hebûye. Qehremanê Qatil jî wekî bavê xwe pehlewan û lehengekî pir xurt û hêja bûye. Ji ber wê ji xwe gelekî mezin dibîne. Xwe zehf zêde dihe- sibîne. Qehremanê Qatil xwe wisa zêde dibîne ku diçe riyan digire, li mirovan dixe, zorbetiyê dike û li her derê serdestiyê li ser gel dimeşîne. Bavê wî ango Rostemê Zal ji vê helwesta lawê xwe aciz dibe, çend caran jî wî pê dihesîne, şiyar dike, lê mixabin lawik dev ji vê bitribûn û zordariyê bernade. Rojekê dema ku lawik dîsa pêşiya bazirganan digire û li wan tahdeyê dike, Rostemê Zal bi dilqekî ku lawê wî, wî nas neke derdikeve pêş wî, bi çepilê wî digire diavêje erdê. Qûna xwe rût dike û hêlikên xwe yên reş di lêvên wî dide û wî berdide. Piştî wê bûyerê sênca Qehremanê Qatil pir dişike û nema pêşiya xelkê digire û zordariyê dike. Rojekê dîsa li dîwana cimaeta wan ji xwe re sohbet dikin, ciwanekî pehlewan, wekî Qehremanê Qatilê berê, dikir ku pesnên xwe bide û mezin mezin dipeyive. Lawê Rostemê Zal ango Qehremanê Qatil serê xwe hêdî hêdî bilind dike û bi awayekî ku gunehê wî bi wî lawikî bê û wekî zanayekî kûr ji yê xeşîm û bitrî re dibêje:

"Tu hê rastî hêlikreşan nehatî"

Hêk çemil kirin

1. Li hincetên ecêb gerîn. **2.** Pir bimerîfet û hunerwer bûn. **Ew jî dizane ku rewş pir dijwar e, ji xwe re* ***hêkan çemil dike****. *Ew jî cezûyeke wisan e ku* ***hêkan çemil dike****.*

Hêk di bin lingan de bûn

Pir sist tevgerîn. **Malwêranî wisa dilive ku tu dibêjî* ***hêk di bin lingan de ne****.*

Hêk qelandin

Hay ji rewşê tune bûn. **"Yabo mesele mezin e, kûr e, dijminên partiyê ne razayî ne û ne jî* ***hêkan diqelînin****, kanî exlaqê proleterî kanî?"* Helîm Yûsiv

Hêk şêlandin

Bi hev du re di hêla zayendî de têkilî pêk anîn. **Na lo! Wan ji zû de* ***hêkên xwe şêlandine****, bêgav mane ku bi hev du re bizewicin.*

Hêk û hêkerûn Ehmed Axa, qure û qotik Mihemed Axa

Hinek dicedinîn û kedê didin, hinek jî bi wan derfetan xwe qure dikin. **Ev çi dinyayeke bêdad e?* ***Hêk û hêkerûn Ehmed Axa, qure û qotik Mihemed Axa.***

Hêka (yekî) li diranê xwe xistin

Rewşa yekî baş fêm kirin. **Ez dizanim di barê wî de bê çi heye. Min* ***hêka wî li diranê xwe xistiye****.*

Hêlehêl kirin

Xilaport û teşqele rakirin. **Wa ye dîsa Smayil* ***hêlehêl dike*** *gelo vê carê, dixwaze çi bike?*

Hêkên hesinî kirin

Gelekî serma kirin. **Bawer bike wê şevê ji serma me* ***hêkên hesinî kirin****.*

Hêkên (yekî) sar bûn

1. Rewş xera bûn. **2.** Ji bo kesên teral û sist tê gotin. **Kuro ka qûna xwe ji erdê rake ha, ma tu rabî, qey* ***hêkên te wê sar bibin****?*

Hêlik (helik) û helwend dîtin

Zor û zerp dîtin. **Piştî îşkence, lêdan û çewisandinê, Cindo* ***hêlik û helwend dîtin****.*

Hêlîna xwe birin pazdeh hêkên xerabûyî

Xwe bi nazî xistin. **Ew jî zelfpêşde diçe heyran,* ***hêlîna xwe dibe pazdeh hêkên xerabûyî****.*

Hêlîna xwe çêkirin

Xwedî mal û hal bûn. **Wan alîkarî nekirana, Siltanê nikaribû* ***hêlîna xwe çêke****.*

Hêlîna xwe danîn

bnr: Hêlîna (yekî) xera kirin

Hêlîna xwe li ser perê esmanan çêkirin

Xwe li cihekî qewîm parastin. **"Jixwe yên heya niha ji hespê sofî re ker gotine, yeqîn*

bibin, wan ***hêlîna xwe li perê esmên çêkiribe*** *jî şetele û şiwûka Sofî nefitilîne."* Musu Vazgalî

Hêlîna xwe li ser qula mar çêkirin
Bi karê xeter re têkildar bûn. **Ya ku ez dizanim, Xunavê* ***hêlîna xwe li ser qula mar çêkiriye****.*

Hêlîna (yekî) belav kirin (xera kirin)
Xerabiyek gihandin malbata yekî. **Wî çi zanibû di wî şerî de* ***hêlîna wî jî dê belav bibe****?*

Hêrsa (yekî) danîn
Vepesirîn, biaram bûn. **Heta* ***hêrsa wî daynene****, neçin balê.*

Hêrsa mezin hatin
Zêde hêrs bûn. **Hê ku* ***hêrsa wê ya mezin nehatiye****, em derkevin.*

Hêrsa (yekî) rakirin
Yek hêrs kirin. **Sitiyê bi wan cilên xwe yên ecêb tim* ***hêrsa bavê min radikir****.*

Hêrsa xwe jê derxistin
Bi dijminayî nêzîk bûn. **Almast sekinî sekinî, di axiriyê de* ***hêrsa xwe ji Gulê de derxist****.*

Hêsir barandin
Girîn. **Bes e, êdî* ***hêsiran nebarîne****, te em dabarandin.*

Hêsir rêtin
bnr. Hêsir barandin

Hêstir û hemam, meymûn û eba?!
bnr. Hirç û govend, şivan û dîwan?!

Hêviya xwe pê ve girê dan
Gumanên erênî jê hêvî kirin. **"... ji wan dilgiran bûbû, lê di netîceyê de dîsa jî* ***hêviya xwe bi wan ve girêda bû****."* Enver Karahan

Hêvî dan (yekî)
Ji bo karekî, tiştekî yan jî kesekî gumanên erênî dan. **"Bo nimûne, têkoşîna gelên Amerîkaya Latîn, reşikên Afrîkaya başûr û lûn gelên din ên dûrî me* ***hêvî da me****."* Samî Tan

Hêvî jê birîn
bnr. Hêvî li ber bê çûn

Hêvî li ber bê çûn
Ji kesekî yan jî ji tiştekî hêviya ku hatiye kirin vala derketin. **"Û tênegihîşt, bê ez çi dibêjim. Ji roja yekemîn de min dizanibû* ***hêvî li ber ba çûn****."* Helîm Yûsiv

Hêvî pûç bûn
bnr. Hêvî li ber bê çûn

Hêvî şikestin
bnr: Hêvî li ber bê çûn

Hêvî vala derketin
bnr: Hêvî li ber bê çûn

Hêvî vemirîn
bnr: Hêvî li ber bê çûn

Hêvî winda kirin
bnr: Hêvî li ber bê çûn

Hêwirze derxistin
bnr: Qere pere kirin

Hêza xwe winda kirin
Ji taqet ketin. **Ji ber serneketina te, te roj bi roj **hêza xwe winda dikir**." Feqî Huseyn Sağnıç*

Hiçik û piçikên (yekî) derxistin
Yek kirin rewşeke neyînî. **Gulîzerê jî wisa hêvî nedikir, lê Tahar **hiçik û piçikên wê derxistin**.*

Hik mik kirin
Zelal xeber nedan. Xwedî biryareke vebirî nebûn. **Ka mirovekî çawa ye? **Hik û mik kir**, kesî jî jê bawer nekir.*

Hikmê (yekî) derbas nebûn
Bandor lê nekirin. **A rastî êdî ji vir bi şûn de **hikmê min derbas nabe**.*

Hikim kirin
bnr: Hikmê xwe ajotin

Hikim tê bihartin
Soz û bandor tê de çûn. **Her çi hebe jî mirov **hikmê mirov di wê dibuhure**.*

Hikmê xwe li ser (yekî) ajotin
Erka xwe domandin. **Jinik hê jî **hikmê xwe li ser mêrê xwe diajo**.*

Hil jê çûn
Jê nefret kirin. ***Hil jê diçe**, qet guncan e ku bi wê re hevkariyê bike?*

Hildan stûyê xwe
bnr: Hildan ser xwe

Hildan destê xwe
Li ser sekinîn, kirin rojeva xwe. **Ji vê melhê bi şûn de em ê wê pirsgirêkê **hildine destê xwe**.*

Hildan ser xwe

1. Karek, berpirsyariyek an jî binbariyek qebûl kirin. **2.** Ji tiştekî aciz bûn, xolî bûn. **3.** Tawanek hildan ser xwe an jî li xwe mikur hatin. **Apê wê bi dilekî gerah, hemû binbariya wê* ***hilda ser xwe.*** **Bi xwe ne bawer bû, me çi digot,* ***hildida ser xwe*** *û dixeyîdî. *Bi rastî jî ew tiving ne ya min bû, lê ji bo ku îşkence li wî nebe, min* ***hilda ser xwe.***

Hilmeyî (yekî) kirin

Li hemberî yekî helwesteke bieks û çors nîşan dan. **Zozanê wisa* ***hilmeyî wî kir,*** *mêrikê reben hema sar bû, di cihê xwe de ma.*

Hilnedan ser barê xwe

Xwe wekî ku têkildar nîn e nîşan dan. **Tu dibêjî yê ku ew bûyer kiriye ew nîn e. Qet* ***hilnade ser barê xwe.***

Hilpaskî ser serê (yekî) bûn

1. Di hêla zayendî de gelekî dilxwaz bûn. **2.** Yek aciz kirin. **Ka keçik wisa* ***hilpaskî ser serê Rosto dibû*** *ku me pêş wê ve şerm dikir. *Rehetiya çi, zarokên wan heta êvarê* ***hilpaskî ser serê min dibûn.***

Hin bi mirinê, hin jî bi têvekirinê (Hinek li ber mirinê, hinek jî li pey têvekirinê)

Hinek di rewşa zor de, hinek jî li pey kêf û zewqê û di heyra têkiliya zayendî de bûn. **Kuro hela li min û vî heywanî binêrin,* ***hinek li ber mirinê, hinek jî têvekirinê.***

Hin hingiv dixwin bi hinekan jî mêş vedidin

Di vê dinyayê de, hinek bêşans in, hinek jî xwedî derfetan in û bişans in. **Bawer nakim ev jî qeder be, di vê dinyayê de* ***hin hingiv dixwin bi hinekan jî mêş vedidin.***

Hincika (yekî) derxistin

Gelekî eciqandin, lê xistin. **Wan wisa kirine ku* ***hincika Rojhilat derxistine.***

Hindik dîtin

bm: Kêm dîtin

Hindik, rindik

Bila hindik be lê bila xweş û spehî be. **Ezbenî, ez hewlo gewloyî naxwazim.* ***Hindik, rindik.***

Hindurê (yekî) hatin ber dêv

Ketin rewşeke xeter. **Heta ew rê xelas bû,* ***hundirê min jî hate ber devê min.***

Hinek kêm, hinek zêde

bm: Çar kêm çar zêde

Hinek bêhn kirin, hinek pîn kirin

Ji hinekan re baş, hinekan re xerab bûn. **Ew jî wekî xwe dike.* ***Hinekan bêhn dike, hinekan pîn dike.***

Hinekan hingiv xwar û mêşan bi hinekên din veda.

bnr: Hin hingiv dixwin bi hinekan jî mêş vedidin.

Hingî gund xera bû, mala Tirço ava bû.
Carinan xera bûn û felişandina hin tiştan an jî kesan, ji bo hinekên din dibe sedema pêşveçûn û erêniyan. **Ew jî dayîneke Xwedê ye.* ***Hingî gund xera bû, mala Tirço ava bû.***

Hingî min kir û got, çermê seyan ma (me) firot, Osman û Qemrî min nekir cot.
Ji bo kesên pir biînat tê gotin. *****Hingî min kir û got, çermê seyan ma firot, Osman û Qemrî min nekir cot.*** *Li ser têkiliya wan me çi got, kelîj nekir.*

Hingî rez qenc bû, teyrokê jî lê xist.
bnr: Bi xwe pir gul bû, baranê lê kir şil bû.

Hingiv dixwe, mêşan diqerîne me.
Tenê berjewendiyên xwe lipêşxistin têrê nake, bi ser de ziyanê jî digihîne. **Ew qas jî nabe lo!* ***Hingiv dixwe, mêşan diqerîne me.***

Hingivê debêyî, di eyarê kuçik de ye.
bnr: Şîrê şêr e, di eyarê donxiz de ye.

Hirç gevizî, erd tevizî.
Her der û her kes ji bandora yên bihêz têkildar dibin. **Ma îşê giranbûnê ye kuro? Tam jî* ***hirç gevizî, erd tevizî.***

Hirç hat, va rez; diz hat, va pez.
Xwe nexistin bin bar. **Ji min re çi?* ***Hirç hat, va rez; diz hat, va pez.***

Hirç û govend, rovî û sûk, kevrojk û dewlok?!
bnr: Hirç û govend, şivan û dîwan?!

Hirç û govend, şivan û dîwan?!
Ji bo tiştên lihevnehatî, ne layîq û berevajî tê gotin. **Heyran tiştekî wisa bibêje ku bila nêzikî aqilan be,* ***hirç û govend, şivan û dîwan?***

Hirçê heta di xwe de nedît, bawer nekir.
Bi xwe, bi destê xwe seh kirin, baş pê ewle bûn. *****Hirçê heta di xwe de nedît, bawer nekir.*** *Ew wisan e, bi kesî bawer nabe.*

Hirçek li rezekî bi sû hat[1], wê salê çil kêl mewûj zêde bûn.
bnr: Hirçek ji rezekî xeyîdiye, ritlek dims lê zêde bûye.

His û pis jê nehatin (negirtin)
1. Tu tevgerek nîşan nedan. Nepeyîvîn. **2.** Tu agahiyek jê negirtin. **Em çiqasî li hendê jî man, lê tu* ***his û pis ji wan nehat.*** **Piştî çûna Evrûpayê bi şûn de, me tu* ***his û pis ji wê negirt.***

---

[1] **Sû hatin:** Kêm bûn

Hiş av bûn
bnr. Aqil çeliqîn

Hiş çûn
bnr. Aqil çeliqîn

Hiş girnijîn
Serî gêj bûn. **"Laşê Şemamê req bû, **hiş girnijîn**..." Serferaz Elî Neqşendî

Hiş ji serî çûn
Hay ji xwe tune bûn. **"Li wir **hiş ji serî çû**. Ew bi rastî bû Evdal." Mehmed Uzun

Hiş li hev qelibîn
bnr. Hiş li (yekî) li hev ketin

Hiş li (yekî) li hev ketin
Ji bo kesên ku nizanin çawa bikin, heyirî dimînin tê bikaranîn. **Li hember wê bûyerê **hiş li min li hev ket**, min nizanibû ez çawa bikim.*

Hiş negihîştin
Tênegihîştin, fêr nebûn, di hêla êqil de qels bûn. **"Serê kolana mala wê girt xwe raxirand, **hiş negihîştiye** ku here ber derazînkê." Enver Mehemed Tahir

Hiş şêlî bûn
Aqil tevlihev bûn. Bi awayekî zelal û aqilane nefikirîn. **"Tenê dûrketin û biyanîbûna erdnîgarî jî ne pêwîst e. Tengasiya pêwîst **şêlîbûna hiş e**." Ehmed Pelda

Hiş tevlihev bûn
bnr. Aqil çeliqîn

Hiş û aqil ji serî çûn
bnr. Hiş ji serî çûn

Hiş û dirav kirin pez, wî got ez, wî got ez.
Aqil û dirav (pere) her du jî hêzên mezin in lê carinan dikevin nav nakokiyê. ***Hiş û dirav kirin pez, wî got ez, wî got ez.** Mantiq rêgezeke bingehîn e, lê gelek caran dirav, mantiq jî tevlihev dike û mirov li ser serî li erdê dixe.*

Hiş û sewda li serî neman
Hay ji xwe tune bûn. **"Zilfo yekcar jixwe ve çûbû. **Hiş û sewda li serî nemabûn.**" Adnan Alp

Hiş zelal bûn
Aqil hatin serî. Di derkê de bûn. **"Min lîçik û hêsirên xwe paqij kirin... **hişê min hêdî hêdî zelal dibû**." Rıdvan Karaarslan

Hişê (yekî) birin
Yek xistin bin bandora xwe. **"Lê yekê tenê **hişê wî biribû**; nizanibû wekî ew her du*

keçikên ciwan û bedew ên ku ji mala Hecî Hemîdo derdikevin, kîjan ji wan keça wî ye û kîjan jina wî ya piçûk e!" Ridwanê Elî

Hişê (yekî) hilnedan

1. Di serî de rûneniştin. **2.** Pir piçûk bûn, nehatin radeya têgihîştinê. **Mamoste çiqasî dûbare kir jî **hişê Dawud hilneda**. *Tu çi ji wê zarokê dixeyîdî? **Hê hişê wê, wan meseleyan hilnade**.*

Hişê (yekî) ji kîsê xelkê bûn

Li gorî gotinên hinekên din hereket kirin. **Ez ê çi ji wî re bibêjim? **Hişê wî ji kîsê xelkê ye.***

Hişê (yekî) ji serî çûn

1. Hay ji xwe tune bûn. Hişê xwe winda kirin. **2.** Kêfxweş bûn. Serxweş bûn. ***Hişê wî ji serî çûbû**, dema em gilîştin ser, li erdê dirêj kiribûn. *"Dengê bilûrê **hişê min ji serê min dibe**..."* R. Karakaya

Hişê (yekî) li cihekî din bûn

Li ser mijareke din ponijîn. Bal li cihekî din bûn. **Ez ji te re tiştekî girîng dibêjim, lê wa ye **hişê te li cihekî din e**.*

Hişê (yekî) li serî bûn

Hay ji xwe hebûn. **Ez ê hê çendik çend caran ji we re bibêjim ku tu tiştekî min tune ye? Ez baş im. **Hişê min li serê min e.**"* Sedat Yurtdaş

Hişê (yekî) ne li cih bûn

Hay ji xwe tune bûn. ***Hişê wî ne li cih e**, tu çi jê re dipeyivî?*

Hişê (yekî) nebirîn

1. Di serî de rûneniştin. **2.** Nepejirandin. **Min kir û nekir **hişê wî nebirî** ku wê dersê bibe serî. *Xwediyê maxazayê taybetiyên wê makîneyê rêz kirin, lê **hişê bavê min nebirî** û ew nekirî.*

Hişê (yekî) pê ve man

Zên tenê bi mijarekê ve daliqî man. **Erê, ew keçik çû lê **hişê min pê ve ma**.*

Hişê xwe anîna serê xwe

bnr: Hişê xwe topî serê xwe kirin

Hişê xwe civandin serê xwe

bnr: Hişê xwe topî serê xwe kirin

Hişê xwe topî serê xwe kirin

A rastî dîtin. Rast fikirîn. **Berê ji hêrsan nizanibû çi dibêje. Lê dû re **hişê xwe topî serê xwe kir**.*

Hişê xwe winda kirin

bnr: Hiş û sewda li serî neman

Hizûr revîn

Ne rehet û ne biaram bûn. **Di têkiliya jin û mêran de gelek caran, herê giramî winda dibe, dû re jî* ***hizûr direve*** *û dû re jî abûr û rû mala xwe bar dike.*

Hîmê ... hilweşîn

Ji bin ve tûrtewas bûn. *****Hîmê wê ramanê jî hilweşiya****, rewşa îro û wê ya demê li hev nagire.*

Hîmê (yekî) hîmê Gurdemîr bûn

Ketin rewşa xcrab. *****Hîmê wî ketiye rewşa hîmê Gurdemîr****, edî ew zor xwe rast bike.*

Hîn axlêve[*] ye, neketiye havînê.

Hê ew dem nehatiye. **Ev dem ne ew dem e.* ***Hîn axlêve ye, neketiye havînê.***

Hîn çavên zerzoq di nav kayê de nedîtin

bnr. Hê li rastî hêlikreşan nehatin

Hîn devê te germ e, deng bike.

Wa ye te dest pê kiriye, çi hebe bibêje. **Qet venekişe,* ***hîn devê te germ e, deng bike****.*

Hîn li ser zîn tiran dişeqîne.

Hê di destpêkê de pirsgirêkan dertîne. *****Hîn li ser zîn tiran dişeqîne****, heke ev ji niha ve wiha bike, dawî dê çawa be?* (argo)

Hîn mirîşk lîs nebûn

Gelekî zû bûn. **Kuro eyb e, tu dê bi ku de herî,* ***hîn mirîşk lîs nebûne*** *lo!*

Hîn nebûye conge li dewsa ga rêx dike.

Radeya ku xwe hê negihandî wekî gihîştî nîşan dan. **Divê mirov hedê xwe bizanibe. Heydo* ***hîn nebûye conge li dewsa ga rêx dike****.*

Hîn nebûye varik hêkên hesinî dike.

bnr. Hîn nebûye conge li dewsa ga rêx dike.

Hîn nebûye varik li dewsa mirîşkê hêk dike.

bnr. Hîn nebûye conge li dewsa ga rêx dike.

Hîn negihaye ber çem xwe dişemirîne.

bnr. Hê hesp tune afîr çêdike.

Hîn tûka (yekî) zuha nebûn

Gelekî zû bûn. **Sêvo* ***hîn tûka wî zuha nebûye*** *soz û peymana xwe ji bîr kir jî.*

Hîva gulanê, gamêşa qiranê, ne li vir û ne li derya Wanê.

Di meha gulanê de rewşa hîvê jî gelekî guherbar e. **Di meha gulanê de jî wisan e. Ma ji bo çi gotine:* ***"Hîva gulanê, gamêşa qiranê, ne li vir û ne li derya Wanê."***

[*] **Axlêve:** Destpêka demsala biharê

Ho lê venedan

Hal û xatir pirs nekirin. **Tu çi dibêjî heyran? Wa ye camêrî hûye dewlemend, êdî* ***ho li me venade****.*

Ho Sêvo în e, ez zanim ne în e, lê qewet nîn e.

Belê, ez jî dizanim wer nîn e, lê çi bikim ku tiştek ji dest min nayê. **Got,* ***ho Sêvo în e, got, ez dizanim ne în e, lê qewet nîn e****. Mixabin a rastî carinan pere nake.*

Hok e, rok e.

Divê li ber xwe bidî, ji xwe demeke hindik e. **Ew qas mezin meke lo,* ***hok e, rok e****.*

Holika xwe li golikê kirin (Holik dayîn ser golikê)

Îflas kirin, pir feqîr ketin. **Ji xwe di serî de jî kifş bû, di dawiyê de Riza* ***holik da ser golikê****.*

Horehor kirin

Bi awayekî hov girîn. **Meta Sîncar hingî* ***horehor kir****, hemû cimaet aciz bû.*

Hoste Necar tu binive wekî her car, Xwedê yek e, delîl hezar.

bnr. Hoste Necar, rabe rûnê weke her car, Xwedê yek e, derge hezar.

Hoste necar, rabe rûnê wekî her car, Xwedê yek e, derge hezar.

Divê mirov tu caran hêviya xwe ji Xwedê nebire. **"Xem neke xezal. Dibêjin,* ***"Hoste necar, razê wekî her car, Xwedê yek e, derge hezar."*** *Bibêje, te hew nihêrî, Xwedê hat hewara te."* (bnr. çîrok) Harbî Soylu

Huba dil firîn ser

Lê xweş hatin. **Hema min çawa ew xort dît,* ***huba min firî ser****.*

Hundir di dêv re hatin

bnr. Hindur hatin ber dêv

Hundir lê qetandin

Pir tirsandin. **Hema ew bi carekê re derket hemberî Zergulê û* ***hundir lê qetand****.*

Hundir qurbana derve be.

Di malê de tu tişt tune bûn. **Ew qas sal in, dixebitin jî lê hê dîsa jî* ***hundirê mala wan qurbana derve be****.*

"Hoste necar, rabe rûnê wekî her car, Xwedê yek e, derge hezar."

Ji ber ku dilê padişah ketiye jina necar, jê heft bar arê xizarê dixwaze û dibêje:

"Heke işev heya sibe şefeqê ji min re heft bar arê vizarê neynî ez ê serê te lêxim." Hoste wê şevê sênçikestî tê mala xwe û ji jina xwe re dibêje:

"Padişah wê sibehê serê min lêxe! Ka werê ez wasiyêta xwe ji te re bibêjim." Ew û jinik heya sibehê dipeyîvin. Jê jinik jê re dibêje:

"Hoste necar, rabe rûnê wekî her car, Xwedê yek e, derge hezar." Sibehê şefeqê derê wan tê kutan. Mêrik dibêje jinik:

"De ka were heqê xwe helal bike ya ye li dêrî dixin wê min bibin kuştinê." Jinik dêrî vedike ku du heb mirovên padişah jê re dibêjin:

"Padişahê me işev wefat kiriye. Ka bang bike necar bila bê, jê re tabûtekê çêbike." Jinik ji mêrê xwe re dibêje:

"Hoste necar, rabe rûnê wekî her car, Xwedê yek e, derge hezar."

Hundir şewitîn
bnr: Hundir qelîn

Hundirê hev xwarin
bnr: Goştê hev cûtin

Hundirê (yekî) qelandin
Ji ber derdekî pir dilxem bûn. **Wê helwesta wê* ***hundirê min qeland***.

Hundirê (yekî) qetîn
Pir tirsîn. **Bi rastî jî ji komployên wê jinikê* ***hundirê min qetandiya***.

Hundirê (yekî) qilqilîn
1. Di cihê xwe de nesekinîn. Daxwaz û tatêla tiştekî kirin. **2.** Dil li hev ketin. **Mîr Serbilindê neviyê min, dîsa* ***hundir diqilqile****, gelo wê çi bike? ****Hundirê min qilqilî****, heta ku venereşîm nesekinî.*

Hundirê (yekî) reş bûn
1. Reşbînî bûn. **2.** Bêînsaf, bikîn û buxz bûn. *****Hundirê Mûsa wer reş bûye*** *ku êdî tu hêviya wî ji dinyayê nemaye. *Kuro* ***hundirê Zeydan wisa reş bûye*** *ku çi tiştên nemayî bike jî li min ecêb nayê.*

Hundirê (yekî) vala bûn
Naverok bênirx bûn. **Tu wisa li xuyanga wî menêre,* ***hundirê wî vala ye***.

Hundirê (yekî) xera bûn
1. Di dil de xerabî sêwirîn. **2.** Dil li hev ketin. **Êdî* ***hundirê Tahar xera bûye****, çi xerabiyê bibêjî dikare bike. *Di erebeyê de* ***hundirê Cudayê xera bû*** *û vereşiya.*

Hundirê xwe xwarin
bnr: Di nava xwe de qicqicîn

Hundirqetyayî bûn
bnr: Ziravqetyayî bûn

Hungiv dane destê hirçê.
bnr: Çîpa gur girtine, avêtine nav koza berxan.

Hunkufê xwe dîtin
Layiqê xwe dîtin. **Evdoyê ker, tam jineke* ***di hunkufê xwe de dîtiye****, Xwedê wan li hev û din bimbarek bike.*

Hupedewarî bûn
Bêfem, sitûr û girse bûn. **Bila li Xwedê zor neçe, lê sed qîzê min hebin, ez yekî nadim wî* ***hupedewarî***. (argo)

Hûrheram bûn
Ji bo kesên nebaş û xirab tê gotin. **Kuro çima tu devê xwe li ber wî* ***hûrheramî*** *vedikî?*

Hurê (hurmê) tendûr dada, qehpê pê veda.
Ji bo yên ku hempayê hev in û di nav tifaqê de ne tê bikaranîn. **Wa ye baş hev û din dîtine,* ***hûrê tenûr dada, qehpê pê veda.***

Hurmeta (yekî) girtin
Nirx dayîn, rûmet girtin. **Kurdên her çar parçeyan jî bi gelemperî gelekî* ***hurmeta serokê xwe digirtin.***

Hurtehurt kirin
Bi ser kesekî de hêrs bûn. **Hema her roj Memê bi ser jina xwe de* ***hurtehurt dike.***

Hû Zelxê, Zelxê, Zelxê, cilikê biavêje ser berxê, sima berxê xuyan e, ji Xwedê ve eyan e.
Ji bo sextekarî û xapandinê tê bikaranîn. **Meseleya min jî wekî wî dizê ku gotiye:* ***"Hû Zelxê, Zelxê, Zelxê, cilikê biavêje ser berxê, sima berxê xuyan e, ji Xwedê ve eyan e."*** (bnr. çîrok)

Hûfekûf kirin
Bêhnteng bûn, aciz bûn. **Heta ew ji lundir derket, Misto wisa* ***hûfekûf kir*** *ku guhê min bir.*

Hûfî xwe kirin
1. Gelek xwarin xwarin. **2.** Pir bihêz bûn. Bi hêsanî yek têk birin. **Maşelah, wî ew xwarina ew qas zêde di du deqeyan de* ***hûfî xwe kir****. *Di wê gulaşê de Zinar ew* ***hûfî xwe kir*** *û li erdê dirêj kir.*

Hûkê dike mûkê.
Tişt zehf zêde kirin. *****Hûkê dike mûkê.*** *Bi yên wisa re debarkirin pir zor e.*

Hûr biajo kûr biajo, li ser tatê biajo.
bnr. Hûr biajo, kûr biajo, zû biajo, lê ga meêşîne.

Hûr biajo, kûr biajo lê gayê pîr neêşîne.
bnr. Hûr biajo, kûr biajo, zû biajo, lê ga meêşîne.

Hûr biajo, kûr biajo, bila ga jî newestin.
bnr. Hûr biajo, kûr biajo, zû biajo, lê ga meêşîne.

"Hû Zelxê, Zelxê, Zelxê, cilikê biavêje ser berxê, sima berxê xuyan e, ji Xwedê ve eyan e."

Mirovekî diz, berxek diziye, aniye mala xwe şerjê kiriye. Ji ber ku bi dizekiyê navdar bûye, xwediyê berxê jê dikevin gumanê. tên mala wî ku doza berxa xwe jê bikin. Diz lê mêze dike ku xwediyê berxê tên mala wî. Hê wan derî venekirine hema bê destmêj radibe qamet digire ku xwe wekî ku nimêj dike bide xuyandin. Dema ku wê bibêje elahu ekber, dibîne ku wa ye lingê berxê di bin çîta kulînê de tê xuyan. Jixwe malbata diz jî tev de ji bo serpêhatiyên wisa pijêyayî bûne. Mêrikê diz, li çavên qîza xwe dinêre û bi dengekî ku wekî ayetên Quranê bixwîne dibêje:
"Hû Zelxê, Zelxê, Zelxê, cilikê biavêje ser berxê, sima berxê xuyan e, ji Xwedê ve eyan e." Xwediyê berxê ji axaftina wî fêm nakin, hew dizanin ku li ser nimêjê sond dixwe û dibêje:
"Ji Xwedê ve eyane ku ez haj ji berxa we nîn im." Li ser wê sonda li ser nimêjê xwediyên berxê bi awayekî pozîde û por û poşman dibêjin:
"Wa ye mêrikî ketiye riya Xwedê û sond dixwe ku wî nebiriye." dizivirin diçin mala xwe.

Hûr biajo, kûr biajo, zû biajo, lê ga meêşîne.

Karekî bimerîfet, hunerwer û bipêşk bike. **Merîfet ew e ku wekî ku dibêjin:* ***"Hûr biajo, kûr biajo, zû biajo, lê ga meêşîne."*** *Bikaribî pêk bînî.*

Hûr e, lê nîvê şûr e.

Ji bo kesên piçûk lê bi bandor tê bikaranîn. **Tu wisa li piçûkbûna wî menêre, ew* ***hûr e, lê nîvê şûr e****.*

Hûrê (yekî) bez girtin

1. Bêxîret û wareste tevgerîn. **2.** Kok û qelew bûn. **Na kuro!* ***Hûrê wî bez girtiye****, wî têgiha namûsê jî ji hîr kiriye. ****Hûrê wî wisa bez girtiye*** *ku derka wî û berazan ji hev nemaye.*

Hûrê (yekî) filitîn

Gelek xwarin xwarin. **Eman ha eman!* ***Hûrê Eyûb filitiye****, di mal de nan û xwarin kuta kir.*

Hûrgul bûn

Xwarinek xweş û têra xwe xwarin. **Xosrofê Zikqelişî di daweta Ezîz Begê de* ***hûr gul bû****.*

Hûr hûr ristin

1. Karê xwe ji bin ve û bi koneyî meşandin. **2.** Hêdî livîn, pîgiran bûn. **Ew mirovekî zana bû, karê* ***hûr hûr rist****. *Ew ne mirovekî çalak e,* ***hûr hûr dirêse****.*

Hûrtirş bûn

bnr. Hûrê (yekî) bez girtin

Hûr û kûr bûn

Li ser mijarekî bi dorfirehî sekinîn. ** "Dema mirov li ser dîroka Kurdistanê* ***hûr û kûr dibe****, dibîne ku ji hezar salan heta niha, hinek mîr, eşîr, tarîqat, axa û hinek kesan xwe ji bo nav û dengên xwe, ji bo mal û pereyan an xwe fîrotine an jî spartine dijmin."* Amed Tîgrîs

Hûr û gir, tirşikxwir

Çilek û boşboxaz bûn. **Ezbenî, ew hemû wisan in.* ***Hûr û gir tev de tirşikxwir in.***

Hûr xweş kirin

bnr. Hûrgul bûn

Hûrî ser hev û din kirin

Gelekî li yekî dan. **Xaço li cihê sekinî Qafur* ***hûrî ser hev û din kiriye****.*

Hûrik hûrik, dagirt tûrik.

Hindik hindik tê ser hev, kom dibe û di pêvajoya demê de zêde dibe. **Jixwe wisa tê komkirin, wî jî* ***hûrik hûrik, dagirt tûrik****.*

Hûrik, zik dike tûrik.

bnr. Hûrik hûrik, dagirt tûrik.

I

Ilmdar e, dîn û har e.

Mirovên zana gelek caran bi awayekî cuda li jiyanê û civakê mêze dikin, ji ber wê jî gelek caran li derî nirxên civakê hereket dikin. **Ilmdar e, dîn û har e.* *Divê hûn balê bidin ser berhemên ilmdaran.*

Ilmdar e, nûr jê dibare.

Mirovên ilmdar, zêdetir bi karên erênî û ji bo xêra civakê mijûl dibin. **"Ilmdar e, nûr jê dibare."* *dibêjin. Lê gelek caran ne wisa ye.*

Ilmdar ilmdar e, lê belê ev çi dost û yar e?!

Baş e, ji ilmdariya wî me fêm kir, lê ev neyînî çi ye? **Ji ilmdaran re hurmeta me heye, **ilmdar ilmdar e, lê belê ev çi dost û yar e?***

Irna (yekî) wekî ya gamêşan bûn

Gelekî biinyad bûn. **Irna Faris wekî ya gamêşan e.*

Î

Îdare di destê (yekî) de nebûn
Ji dest kesekî aciz bûn. Serbest û azad nebûn. **Ew jî wê yekê naxwaze, lê mixabin **îradeya wê ne di dest wê de ye**.*

Îdareya xwe roj bi roj kirin
Debara xwe bi awayekî zor kirin. **Hema ew e ku **îdareya xwe roj bi roj dike**.*

Îlch û bîlch gotin
Inyat kirin. Israr kirin. **Min kir û nekir, wî **îleh û bîleh got** û ew xeber ji wan re got.*

Îlelah gotin
Ji dest kesekî yan jî tiştekî zivêr bûn. **Mirovên li taxa me ji dest wan zabitayên şaredariyê **îlelah gotin**.*

Îlet (yekî) jê çûn (Hêlet jê çûn)
Ji kesekî nefret kirin. ****Hêleta min ji Refîqeyê diçe**, hez nakim rengizê wê bibînim.*

Îlet kirin
Aciz kirin. **Vê keçikê em **îlet kirin**, berdin bila here lo!*

Îman ji serî derketin
1. Pir hêrs bûn. **2.** Bêînsaf û bêdad bûn. **Çawa ku Rêzdarê ew rewşa keça xwe dît, **îman ji serî derket**. *Ji birçînan **îman ji serê wan derket** lê dîsa jî dev ji doza xwe bernedidan.*

Îman lê birin
bnr: Îman lê çikandin

Îman pê anîn
Pê bawer kirin. **Belê kes zêde jê bawer nake, lê jina wî heya dawî **îmanê pê tîne**.*

Îmana (yekî) çikandin
Di rewşeke zor de hiştin. **"Ji heftê salî zêdetir e, sazûmana resmî ya Tirkiyeyê, **îmana muxalifên xwê çikandiye**."* Süleyman Çevik

Îmana (yekî) fireh bûn

Bêxîret bûn. **Îmana wî fireh e, ew dikare jina xwe jî bi xelkê re parve bike.*

Îman (yekî) hatin serê bêvilê

Bêhnteng bûn. **"Axa ez xulam, jixwe **îmana min hatiye serê bêvila min**. Çêleka te ez gund bi gund gerandime."* Zinar Soran

Îmana (yekî) jê çûn

Jê nefret kirin. **"Dev ji van bêjeyên pîroz berdin, **îmana min ji van gotinan diçû** û min xwe yek ji endamên sadiq a bîrdoza fermî ya tirk didît."* Salihê Kevirbirî

Îmana xwe dayîn ser

Gelekî biha firotin. Di hêla bazirganiyê de bêînsaf û bêdad bûn. **Erê Hecî Huso jî difiroşe, lê **îmana xwe jî dide ser** û wisa difroşe.*

Îmana xwe frotin

bnr. Îmana xwe dayîn ser

Îmana xwe şewitandin

Ketin gunehan. Bê îmanî kirin. **Wî **îmana xwe şewitand**, bi derewan sond xwar, lê tu çawa bûyî nîvekarê derewa wî?*

Înç kirin

Jê ketin şikê, zen (texmîn) kirin. **Min jî **înç dikir** ku tiştek heye, lê min tam nizanibû çi ye.*

Îro dinya ye, sibe axret e.

Sibehê roja axîretê, dema hesabê xêr û gunehan e. **A rast çi ye ew e. **Îro dinya ye, sibe axret e.** Divê mirov a rast çi be wê bibêje?*

Îro dora te ye sibê dora min e.

Her kes û her tişt dorek wê heye. **Çi ye te ji kerban xwe kuşt. **Îro dora te ye sibê dora min e.***

Îro heye, sibê tune.

Ji bo tiştên demborî û nekifş tê gotin. **Tu bi wî bawer nebe, ew **îro heye, sibê tune**.*

Îro în e, mele dîn e.

Roja înê erk û bandor di destê mele de ye, civak hemû li wan guhdarî dike. **Îro în e, mele dîn e, serkele sîrebendan di ser xwe re diavêjin.*

Îro jî qatix sibê jî qatix

bnr. Mêr im kurê mêran im, îro jî qatix, sibê jî qatix.

Îro kuştina min heye, zêrandina min tune ye.

Çi dibe bila bibe, ez îro dengê xwe nakim. **Hûn çi dibêjin bibêjin, **îro kuştina min heye, zêrandina min tune ye**.*

Îro li vir, sibê li wir bûn
bnr: Îro heye, sibê tune.

Îro mij e, gur gij e.
Di rojên teng û xirab de kesên kêm firsend hewl didin xwe. **Di van rojên zor de hûn li ser xwe baldar bin.* ***Îro mij e, gur gij e.***

Îro roja te ye, sibê roja min e.
bnr: Îro dora te ye sibê dora min e.

Îro sar û serma ye, sibe def û zirne ye, du sibe daweta te ye.
Wa ye dem hat. Hindik ma. **Çi ye tu bêsebriyê dikî?* ***Îro sar û serma ye, sibe def û zirne ye, du sibe daweta te ye.***

Îro yar e, sibê neyar e.
1. Divê mirov karê xwe gavek bi pêş de bibe. **2.** Tiştên îro di dest mirov de bin, ji yên pêşerojê saxlemtir û bi kêrtir in. **Tu çima wisa xwe diheyirînî?* ***Îro yar e, sibê neyar e.*** **Gavekê di pêş de pêkanîn divê, ma tu nizanî* ***îro yar e, sibê neyar e****?*

Îş (kar) ketin tanga (yekî)
Ji bo pêdiviyekê hewcedarî yekî bûn. **Binêre, ji bîr neke, carekê tenê* ***karê min kete tanga te****, tu jî nebûyî alîkar.*

Îşê henekan nebûn
Ji bo karên girîng û cîdî tê gotin. **Kuro desté xwe zû bigire, ev ne* ***îşê henekan e****.*

Îşê xwe jê neanîn
Jê re mijûl nebûn, têkildar nebûn. **Ezbenî, min ji te re negot,* ***îşê xwe jê neyîne****?*

Îşiq li ber çavan ketin
1. Hêvî li dil ketin. Gumana alîkariyekê dîtin. **2.** Hêz û qewet tê de hatin. **Di wê dema ku em di hucreyê de bûn, dengê Serok bû* ***îşîq, li ber çavê min ket****. *Min ew xwarin xwar, dû re hinek* ***îşiq li ber çavê min ket****.*

Îşlig çûye, bi dû qilçik û dûçikan ketiye.
Yê bi xwedî derfet, hêvî li yên xwedî bêderfet kirin. **Ew çi gêj e?* ***Îşlig çûye bi dû qilçik û dûçikan ketiye.***

J

Janê dayîn ser dilê (yekî)
Ji ber sedemekê gelekî êşîn. Xemgîn bûn. **Keça wî reviye,* ***janê daye ser dilê wî****.*

Jehr barandin
Pir hêrs bûn. **Dema ku Resîmê ew mûçe bihîst, bi ser Gemşo de* ***jehr barand****.*

Jehr ji rûyê (yekî) barîn
Rûtehl bûn. **Nizanim çi hatiye serê Zilkuf, tu dibêjî* ***jehr ji rûyê wî dibare****.*

Jehr ketin nav ...
Xerabe bûn. Heram û ziqûm bûn. **Îsal* ***jehr kete nav mişmişên me****, me tu xêr ji wan nedît.*

Jehra Silêmanî vexwarin
Ketin nav rewşeke xeter. **Mala wê xerab bûye, wê* ***jehra Silêmanî vexwariye****.*

Jehrdadayî kirin
Jehr dan yekî. **Li hinek cihan gundiyan gerîlayên ku ji bo wan şer dikirin,* ***jehrdadayî kirin****.*

Jenga dilê xwe rêtin
Xwe rehet kirin. **Piştî ew qas demê Enûneyê bi wan gotinan* ***jenga dilê xwe rêt****.*

Jev (ji hev) direvin, roja revê tev direvin.
Bi hev û din re baş debar nakin, lê di rojên tengasiyê de xwe dikutine hev. **Di civaka feodal de wisa ye, exrebe û lêzim* ***jev direvin, lê roja revê tev direvin****.*

Jê aqil girtin
Ji rêberiya yekî sûdewar bûn. **Bila wisa bibêje, ez dizanim wê* ***ji ku aqil girtiye****.*

Jê bihecîn
Jê dexesî û çavnebarî kirin. **Heke ew* ***ji wê nebiheciya****, wer nedigot.*

Jê bêpar man

Ji tiştekî heqê xwe hilnedan. **Heke ez **ji wê bêpar nemama**, niha halê min jî xweş bû.*

Jê bihêvî bûn
bnr: Jê guman kirin

Jê çopandin
Bi awayekî ne durist, ji kesekî ji bo berjewendiyên xwe sûdewar bûn. **Hemû kes dizane ku Îbo **ji wê diçopîne**, naxwe qet li rûyê wê nedinêrî.*

Jê danexistin
Ji gotina xwe vagêr nebûn. **Ew gişt bûn yek kirin û nekirin wê îleleh **jê danexist**.*

Jê derbas nebûn
Dev jê bernedan. Qêmîşî nekirin. **Ew çi bi Şerefedîn bike, dîsa **jê derbas nabe**.*

Jê derbe xwarin
Jê xirabî dîtin. **Ew **derbeya ku min ji wî xwar**, tu car ji bîr nakim.*

Jê direvim, lê digerim
Çiqasî dixwazim xwe jê biparêzim, zêdetir têkildar dibim. **Wê çawa be axiriya min û wê? **Jê direvim, pê digerim.***

Jê dûr çûn
Di nav daxwaza têkiliyê de nebûn. **Ew Besrayê baş nas dike, ji bo wê **jê dûr diçe**.*

Jê dûr ketin
Ji ber hinek sedeman têkilî qut bûn. **Piştî wê bûyerê em ji **ji hev dûr ketin**.*

Jê dûr sekinîn
Zêde têkildar nebûn. **Xuya ye ku xêr ji rûyê wê nayê, eman **ji wê dûr bisekine**.*

Jê êrî û bêrî bûn
Tu têkiliyek pê re tune bûn. **Heyran, ew reben **jê êrî û bêrî ye**, destê xwe neavêjin pêsîra wî.*

Jê filitîn
Jê xelas bûn. Jê rizgar bûn. **Heke di demê de ez şiyar nebûma, me nikaribû xwe **ji wê belayê bifilitanda**.*

Jê hêvî kirin
Çav lê bûn. Ji kesekî gumana hinek tiştan kirin. **Jixwe ez jî li benda wê bûm, min **ji wê hêvî dikir** ku dê wisa bibe.*

Jê gilî kişandin
Ji bo hînbûna niyet an jî bûyeran, bi awayekî pînî agahî ji kesekî girtin. **Misto bi awayekî kone dixwest **ji min giliyan bikişîne**, lê min tiştek jê re kifş nekir.*

Jê girtin

Pê şikestin, jê xeyidîn, pê aciz bûn. *"Lê Yaser bi dizî di dilê xwe de girt. Pozbilindiya Benî Mexsûmiyan pir **jê girt** û rabû çû nav Qureyşiyan ..." Kerem Soylu

Jê guman kirin
1. Jê hêvîdar bûn. **2.** Şik û şuphe lê kirin. *Çi dibe bila bibe, ez **ji wî hevalê xwe hê jî tiştên baş guman dikim**. *Guneh giran e, lê ji bo wan pereyên min yên ku hatin dizîn **gumanan ji Cerdoyê topal dikim**.

Jê hatin
Zerengiya karek birin serî tê de hebûn. *Tu meraqan meke, **ji wî tê**, ew dikare wê çêbike.

Jê hêz girtin
1. Pê moral girtin. *Min di wê rêwîtiyê de tim **ji Almastê hêz girt**.

Jê îbret girtin
Jê ders girtin. *"Lê belê em dikarin **ji wan îbretê bigirin**, cardin tiştên nexweş nekin..." Süleyman Çevik

Jê intîn
Jê dexesî kirin. *Xunav zelîf **ji Siltanê diinte**, bawer im ku wê rojekê bersiva xwe bigire.

Jê ket, pê ket. (Jê keto, pê keto.)
Ji bo kesên ji mezin û rêberên xwe re bêrêtiyê dikin tê gotin. *Ma bersiva wê kedê ew bû? Loma gotine: **"Jê keto, pê keto."**

Jê ketin şikê
Guman çûn ser yekî. *Ji bo gotina wê razê ez **ji Zerîcanê ketim şikê**.

Jê kişandin
Ji bo avisbûna heywanan têkiliya zayendî pêk anîn. *Ji bo ceniya me xurt be, bavê min, mehîna me **ji hespekî ereb kişandiye**.

Jê nayê xeberdan
1. Ji bo kesên bihêrs û bêhnteng tê bikaranîn. **2.** Ji bo kesên bêqusûr ku pêdiviya rexneyê nahêle jî tê gotin. *Bûye jehr, **jê nayê xeberdan**. *"Gava vekir, dîna (dêhna) xwe dayê tu qusûr tune, **jê nayê xeberdan**." Celîlê Celîl

Jê pak bûn
bnr: Jê filitîn

Jê pelikandin
Jê tirsîn. *Têkoşer **ji Xebûr dipelikîne**, nikare dengê xwe li ber derxe.

Jê peyde bûn
Jê zêde bûn, jê derketin. *Ma ew jî **ji wî bavî peyde nebûye**, bibe zêr çi xêr heye?

Jê qeda û bela barîn
Jê xêr nehatin. ***Jê qeda û bela dibare.** Ji bilî xirabiyê tiştekî baş jê nayê.

Jê qirandin
Jê re têkildar nebûn. **Piştî wan kirinên wê min* ***jê qirand***.

Jê qurdêşan bûn
Lê xweş nehatin. **Ew zavayê Ferzende yê nû nîn e, ez* ***jê qurdeşan bûm***.

Jê qut bûn
Jê têkilî birîn. **Ne teze, lê ev çar sal in ku ez* ***ji wê qut bûme***.

Jê re darinde bûn
Jê re alîkar bûn. **Ji te tika dikim, lawê min, hinekî* ***ji wê jinikê re darinde be***.

Jê re mirin
Gelekî jê hez kirin, ecibandin. Hewes û hejmekar man. **Ew neviya min wer xweşik e ku der cinar jî* ***jê re dimirin***.

Jê re rê xuya bûn
Ji bo çûna derekê pêdivî çêbûn. **Heke wisa be,* ***ji te re rê xuya dike***.

Jê re tiştek nayê gotin
Bihêrs û firşing teng bûn. **Ketiye rewşeke wer ku* ***jê re tiştek nayê xeberdan***.

Jê re bûn derman
Jê re bûn çareserî. **Ew jinik* ***ji wî karê min re bû derman***.

Jê re çaw banedan
Pê re serederî nekirin. Pê nikaribûn. **Qet guncan e ku Rewşen* ***ji Zilfînazê re çaw bade?***

Jê re deriyek vebûn
Ji pirsgirêkê re çareyek peyda bûn. **Perîxanê gelekî li ber xwe da, lê di dawiyê de* ***jê re deriyek vebû*** *û çû ji vê cehenemê xelas bû.*

Jê re dest nedan
Jê re bi kêr nehatin. **Ew xebata bi wî formî* ***ji wî re dest nade***.

Jê re hesab nayê dîtin
Ji bo kesên wareste û bêhesab tê gotin. **Heçiya Ekrem e, yekî beredayî ye,* ***jê re hesab nayê dîtin***.

Jê re hespê te ker e, gotin
Jê re tu tiştekî xerab negotin. **Çima min* ***jê re gotiye, hespê te ker e?***

Jê re lê hatin
Şans lê xistin, kar bi rasthatineke baş meşîn. **Bextewar li serê wî be,* ***jê re lê hatiye****, kêf kêfa wî ye.*

Jê re na nekirin
bnr. Jê re na negotin

Jê re na negotin

Li hember qet ranebûn, îtiraz nekirin. Her gotin kirin. **Xwedê emrê wî dirêj bike, heya îro* ***ji wê re na negotiye***.

Jê re qûn diviyabûn

Li hember kesekî yan jî tiştekî xwe bi zorê ragirtin. **Tu nizanî ew kar çawa pêk tê. Bi rastî jî* ***jê re qûn divê***.

Jê re secde birin

Giramiyek zêde jê re nîşan dan. **Wisa ji axayê xwe hez dikin ku ji Xwedê netirsiyana wê* ***jê re secdê bibirana***.

Jê re serederî nekirin

bnr. Pê re kiras neqetandin

Jê re serî danîn

1. Jê re serî tewandin. **2.** Pê re têkiliya zayendî pêk anîn. **Wê eşîrê lê mêze kir ku, koka wan dê biqele,* ***ji wan re serî danîn***. **Jinikê mêze kir ku mêrik dewlemend e,* ***jê re serê xwe danî***.

Jê re serî tewandin

Têk çûn. Bandora yekî pejirandin. **Gelekî li ber xwe da, lê di dawiyê de* ***jê re serî tewand***.

Jê re serî xwar kirin

bnr. Jê re serî tewandin

Jê re sonde sond bûn

Gef li yekî xwarin. **Ez ji te re dibêjim, qet li ber çavê wî nekeve,* ***ji te re sonde sond e***.

Jê re şikestek bûn

Jê re kêmasî û qisur bûn. **Bi dîtina min ew yek jî* ***ji wê re ne tu şikestek e***.

Jê re şîr qelandî bûn

Layiq û minasib bûn. Tam lê hatin. **Ew erebe* ***jê re şîr qelandî ye***, *hê çi dixwaze?*

Jê re tu rê nedîtin

Ji pirsgirêkê re çareseriyek nedîtin. **Ez gelekî xebitîm, lê min* ***jê re tu rêyek nedît***.

Jê revîm, pê gerîm.

bnr. Jê direvim pê digerim.

Jê revîn

Têkilî nexwestin. **Min ji te re çend caran got,* ***jê bireve***, *ew ne mirovekî baş e?*

Jê sar bûn

Li hember kesekî hestên erênî û germ winda kirin **Ji ber wan gotinên wê yên wê rojê, ez gelekî* ***ji Bêrîvanê sar bûm***.

Jê şer barîn
bnr: Jê qeda û bela barîn

Jê tehm kirin
Rewş fêm kirin. **Min **ji wê tehm kiriye**, ez dizanim di barê wê de bê çi heye.*

Jê têr bûn
Ji têkilî û pêdiviya kesekî aciz bûn. **Di ciwaniya wê de xwîna wê mêt, lê îro jî êdî **jê têr bûye**.*

Jê tiştek beşer nekirin
Jê tiştek fêm nekirin. **Min **jê tiştek beşer bikira** min dê dest biavêtayê.*

Jê vekişîn
1. Jê tirsîn. **2.** Jê re rûmet nîşan dan. **Di wê taxê de kes nikare bi ser de here, her kes **ji Gurzo vedikişe**. *Ew li ba kekê xwe wer nakin, a Xwedatî **jê vedikişin**.*

Jê vereşîn
bnr: Jê xwîn vereşîn

Jê viz bûn
Jê aciz bûn. **Edeta bavê min e, **ji her karî zû viz dibe**.*

Jê xeber dan
Şik û guman birin ser kesekî **Yên wê taxê, hemûyan **ji wê xeber didan**.*

Jê xeber nedan
Têkildar nebûn. **Divê hûn demekê qet **jê xeber nedin**.*

Jê xêr nedîtin
Jê kêrek nedîtin. **Me ew qas pere dan, lê tu **xêrek jî jê nedît**.*

Jê xeta û bela barîn
bnr: Jê qeda û bela barîn

Jê xwîn vereşîn
Jê nefret kirin. **Ezîzê Rizgo **ji wî mêrikê çerçî xwîn vedireşe**.*

Jê zêde bûn
1. Ji radeya yekî zehftir bûn. **2.** Jê derketin, jê peyde bûn. **Xwedê jî dizane ku ew keçik **ji wî zêde ye**. *Maşelah îsal pezê te baş **jê zêde bûye**.*

Jêr erd e, jor esman e.
Rewş zor û bêderfet e. **Ez jî di nav de gut bûme û mame, **jêr erd e, jor esman e**.*

Ji dest zimanê xwe kişandin
Ji dest axaftinên ne di cih de ketin astengiyê. **Wê di vê dinyayê de çi kişand, **ji dest zimanê xwe kişand**.*

Ji dola bavê xwe bûn

Şibandina bavê xwe. Ji tovê (toximê) bavê xwe bûn. *"*Di dilê xwe de got: Heger em vê yekê ji te re bihêlin, bila em ne **ji dola bavê xwe bin**."* Zinar Soran

Ji agirê hesteyan ketin

bnr: Ji kevirê hesteyan ketin

Ji aş û baş axaftin

Qala tiştên vala kirin. **Ma tu nizanî Fayze tenê **ji aş û baş diaxêve**.*

Ji av û aqarên xwe dûr ketin

Derbeder bûn, ji welatê xwe dûr ketin. **Dilovan ew qasî ji welatê xwe hez dikir, lê ew jî **ji av û aqarên xwe dûr ket**.*

Ji avê derbas bûn

Astengî derbas kirin. **Vê carê jî **ji avê derbas bû**, ka careke din wê çawa bike?*

Ji avê re gotin: "Çima guşeguş dikî?" Got: "Hevalê min kevir e."

bnr: "Gotin: "Avê deng ji te tê?" Got: "Hevalê min kevir e."

Ji avê, tavê xeber dan

bnr: Ji aş û baş axaftin

Ji averû derketin

bnr: Ji rê û dirba derketin

Ji axê pirtir tune ye, mar bi qinyat dixwe.

Çi qas zêde be jî tedbîr divê. **Lawo, bi tedbîr, bi tedbîr! **Ji axê pirtir tune ye, mar bi qinyat dixwe.***

Ji baranê revîm, li teyrokê qelibîm.

bnr: Ji ber baranê çû ber zîpikê.

Ji bavê xwe bêminet bûn

Ji tu kesî venekişîn. Mineta xwe ji tu kesî negirtin. **Jixwe ew mirovek wisa balkêş e, **ji bavê xwe jî bêminet e**.*

Ji belırê xelas bûn, di çem de xeniqîn.

Astengiyên mezin borîn, lê di yên piçûk de xitimîn. **Ya wan jî karekî karesat bû? **Ji belırê xelas bûn, di çem de xeniqîn.***

Ji bejna xwe birîn

Ji bo tedbîr û pêdiviyekê cil û kincên pêwîst nekirîn. **Dizanim ku bav û diyên min, ji bo xwendina min ji zikê xwe û **ji bejna xwe birîn**.*

Ji bend (ben) xelas bûn

Ji darvekirinê (êxdamê) filitîn. **Ev cara yekem e ku wê serokekî wan **ji bend xelas bibe**.*

i ber agir revîm, ketim alavê.
bnr: Ji ber baranê çû ber zîpikê.

i ber baranê çû ber zîpikê.
Li rastî ya hê xerabtir hatin. **Rebenî got, şikir ez ji vê belaya mezin filitim, lê nizanibû ku **ji ber baranê çû ber zîpikê**.*

i ber baranê revî, li rastî tofanê hat.
bnr: Ji ber baranê çû ber zîpikê.

i ber baranê revîn, çûn ber tiriyê.
bnr: Ji ber baranê çû ber zîpikê.

i ber baranê revî, li zîpikê qelibî.
bnr: Ji ber baranê revîm, li ber çortanê ketim.

i ber baranê revîm, li ber çortanê ketim.
bnr: Ji ber baranê çû ber zîpikê.

i ber barê xwe revîn.
Binbariya xwe bi cih neanîn. **Ew nika ciwan e, tor e, xişîm e, **ji ber barê xwe direve**, lê wê di demekê bi şûn de têbigihîje.*

i ber bayê çû ber barovê.
bnr: Ji ber baranê revîm, li ber çortanê ketim.

i ber çavan çûyîn
Xuya nebûn. **Ez têgihîştim ku ew min naxwaze, loma ez **ji ber çavan çûm**.*

i ber çavan winda bûn
Nişkê ve tena bûn, xuya nebûn. **"Û şivanê kaînatê Mazda **ji ber çavan winda bû**."* Talip Kalın

i ber çavên (yekî) ketin
Rûmet kêm bûn. **Piştî wê bûyera jina wî ya mû, Cimo **ji ber çavên apê xwe ket**.*

i ber çavên (yekî) neçûn
Ji bîr nekirin. **"Rahişte defter û xama xwe, ku li ser van tiştan binivîse, lê belê şerê ku do ketibûnê **ji ber çavên wî nediçû** ..."* Kamîran Haco

i ber çavên (yekî) revîn
1. Ji balê revîn. Di dema teselekirinê de nedîtin. **2.** Dîtina yekî nexwestin. **Min hemû ji ber çavan derbas kirin, lê dibe ku ew rûpel ji ber çavên min revî be. **Loma keçik **ji ber çavê bavê xwe direvî**?*

i ber çavên xwe neqetandin
Tim di bin çavdêriya xwe de girtin. **Nizanim çi tê de dîtiye, tu car wê **ji ber çavên xwe naqetîne**.*

Ji ber çirikê çû ber gurikê.
bnr: Ji ber baranê çû ber zîpikê.

Ji ber bestan ve deyn kirin
Ji ber nexweşî yan jî tiştekî din, bê hemdî xwe peyivîn. **Ji ber ku agirê Aras derketibû 39'an* ***ji ber bestan ve deyn dikir***.

Ji ber ecela xwe revîn
Ji kerba êşê, xwe bi vî alî wî alî de avêtin. **Rast e, ez nîvê şevê digerim, lê ji Xwedê hawer be,* ***ji ber ecela xwe direvim***.

Ji ber dilopê çû ber merzibê.
bnr: Ji ber baranê çû ber zîpikê.

Ji ber dilopê çû ber şirînekê.
bnr: Ji ber baranê çû ber zîpikê.

Ji ber ... girtin
1. Ji bo avisbûnê heywan ga dan. **2.** Jê qetandin. **Ew cenî jî* ***ji ber wî hespê ereb girtine***. **Ew berx* ***ji ber diya wê girtine***, *loma wisa çilmisiye.*

Ji ber kirin
Ezbere kirin, di ber xwe de xwendin. **Wî hê di şeşsaliya xwe de Quran* ***ji ber kiribû***.

Ji ber (yekî) neçûn
Hewldanan ji bo çareseriyê têr nekirin. Di hêza kêşe çareserkirinê de nebûn. **Bi rastî jî min gelekî li ber xwe da, lê min kir û nekir,* ***ji ber min neçû***.

Ji ber kopa tendûrê neqetîn
Ji cihê xweş û rehet dûr neketin. **Me ji bo wê pirsgirêkê şev û roja xwe kiribû yek, lê ew* ***ji ber kopa tendûrê nediqetî***.

Ji ber serê (yekî) neçûn
Yek di xewnê de tim dîtin. **Xwedê xêr bike. Îşev heya sibehê Xalid* ***ji ber serê min neçû***.

Ji ber serê (yekî) ranebûn
Ji bo sedema nexweşî yan jî tiştekî din terka yekî nekirin. **Di wê odeya nexweşxaneyê de Zeyneb bi şev û roj* ***ji ber serê Seydo ranebû***.

Ji ber sifikê naçe ber tifikê. (Ji ber tifikê naçe ber sifikê.)
Ji bo kesên teral tê bikaranîn. **Tu dibêjî, qey qîza Kor Huseyîn Paşa ye,* ***ji ber sifikê naçe ber tifikê***.

Ji ber şirikê çû ber mezîlê.
bnr: Ji ber baranê çû ber zîpikê.

Ji ber xelayê filitîn

Ji bo kesên zêde birçî bûne yan jî zêde xwarinê dixwin tê gotin. **Bawer wer dixwar ku te digot **ji ber xelayê filitiye**.*

Ji ber xwe de derxistin (Ji ber xwe de gotin)
Bi derewî tiştên nebûyî gotin. **Bawer bike tu tiştekî wer tune, hema Selîm wan **ji ber xwe de derdixe**.*

Ji ber xwe de li hev anîn
bnr. Ji ber xwe de derxistin

Ji ber xwe ve şerm nekirin
Bêar û bêheya bûn. **"Xwedê we di erdê ke; hûn **ji ber xwe ve şerm nakin!**"* Şahînê Bekirê Soreklî

Ji beriya emrê xwe xeber dan
Ji bo zarok an jî ciwanên ku tiştên pir ecêb û kone dibêjin tê gotin. **Erê, heyran hê parçeyek zarok e, lê **ji beriya emrê xwe xeber dide**.*

Ji betalî bi serê kîrê xwe re lîstin
bnr. Ji betalî kera bavê xwe da ber dasan.

Ji betalî kera bavê xwe da ber dasan.
Ji bo kesên teral û bêkar ku tiştên balkêş dikin tê gotin. **Ma karê wî çi ye? **Ji betalî kera bavê xwe dide ber dasan**.*

Ji bêhavî goştê mirîşkan xwarin
Carinan mirov ji bêgavî rastî hin tiştên xweşiktir jî tê. **Ew jî nesîb e. Em îro **ji bêhavî goştê mirîşkan dixwin**.*

Ji bêriyê tê ji min şîr dixwaze.
Ji bo helwestên berevajî tê bikaranîn. **De vêca were, têbigihîje, ew bi xwe **ji bêriyê tê ji min şîr dixwaze**.*

Ji bin piyan heta nava serî
Tev de, her der. **Ew **ji bin piyan heta nava serî** bibe agir, wê çi bike?*

Ji bin serê (yekî) derketin
Pirsgirêk û plan ji hêla kesekî ve hatin amadekirin. **Jixwe kifş e ku ew plan hemû **ji bin serê wî tolazî derketine**:*

Ji bin şefaeta pêxember derketin
Ji ber gunehkarî ji riya rast dûr ketin. **Heke tu van gotinên min ji wê re nebêjî tu **ji bin şefaeta pêxember derkevî**.* (nifir)

Ji binê sola xwe re gotin (Ji binê lingê xwe re gotin)
Ji tu kesî re negotin. **Ma min şîrê keran mêtiye? Tu wê yekê **ji binê sola xwe re bibêje**.*

Ji binî derketin

1. Berpirsyariya xwe bi cih anîn. **2.** Ji binbariyê revîn. **Hinekî zehmet kişand, lê **ji binî jî derket**. *Me ew qas peyman û soz dabûn hev, lê wî înkar kir û **ji binî derket**.*

Ji binî ve bûn

Ji bo kesên ku karên xwe ne eşkere û bi xayînî dimeşînin tê gotin. **Kazim mirovekî **ji binî ve ye**. Mirov nikare pê bawer be.*

Ji binî ve rêç kirin

Hemû xelas kirin. **Heya em hatin, Dilbirîn hemû xwarin **ji binî ve rêç kiribû** jî.*

Ji bitrî hatin beran

Ji ber hinek derfet an jî xisletên nebaş ziyan dîtin. **Wê ji ber wan derfetên xweşik xwe winda kir û **ji bitrî hate beran**.*

Ji bîra xwe têr av venexwarin

Bi xwe ji keda xwe sûdewar nebûn. **"Bîra ramana me encax bihostekê bi kûr de çû, yanî me **ji bîra xwe têr av venewxar**."* Rênas Jiyan

Ji bo axaftinê axaftin

bnr. Arvanê xwe li êş kirin

Ji bo çavekî, dihebînim çiyayekî.

Carinan ji bo rûmet û xatirê kesekî yan jî pêdiviyekê, bedelên mezin jî tên dayîn. **Ez çawa bikin, **ji bo çavekî, dihebînim çiyayekî**. Keçikeke min tenê ye, ji bo xatirê wê çi pêwîst be, dikim.*

Ji bo çilê dixwe kulê.

bnr. Ji bo çilê xwe dike gilê.

Ji bo çilê xwe dike gilê.

Ji bo kesên ku bi nefsa xwe nikarin tê bikaranîn. **Xwedê tu kesekî nexe rewşa wî. **Ji bo çilê xwe dike gilê.***

Ji bo derdek, merdek.

Ji bo çaresêriya pirsgirêkê kesên alîkar û fedekar divên. *****Ji bo derdek, merdek.** Xwedê îdare kiriye, Egît nebûya ew yek pêknedihat.*

Ji bo golikan, diçe şolikan.

Bi hincetan hinek tiştan armanca xwe ya rasteqîn bi cih anîn. **Armanc ne ew e, lê **ji bo golikan, diçe şolikan**.*

Ji bo gurzek gîha, lodek şewitandin

bnr. Ji bo mirovekî, wêran dike gundekî.

Ji bo hebek tirî mehserek xera kirin

bnr. Ji bo mirovekî, wêran dike gundekî.

Ji bo kêçekê lihêfek şewitandin
bnr: Ji bo mirovekî, wêran dike gundekî.

Ji bo (yekî) qar dîtin
Jê re kêmasî û ecêb dîtin. **Ji bo yên din na, lê tenê **ji bo min qar dibînin**.*

Ji bo miriyên xelkê me porê xwe verû, miriyên me mirin me dest avêtê ku têlek pirç di serê me ve nemaye.
bnr: Miriyê xelkê mirin me porê xwe verû, dema miriyê me mirin, me dest avêtê por bi me va nemabû.

Ji bo mirovekî, wêran dike gundekî.
Pir bihêrs û eks bûn. **Emîn yekî dînik e, **ji bo mirovekî, wêran dike gundekî**.*

Ji bo nanekî, xera dike arvanekî.
bnr: Ji bo mirovekî, wêran dike gundekî.

Ji bo nefsê, xwe diavêje hepsê.
bnr: Ji bo çilê xwe dike gilê.

Ji bo nexweşan çûn zebeşan
bnr: Mirî mirin, Egît bişînin kefen.

Ji bo paniya lingê xwe erdek hişk dîtin.
Ji xwe re mal û milkek bi dest xistin. **Şikir ji Xwedê re wî jî di dawiya dinê de **ji bo paniya lingê xwe erdek hişk dît**.*

Ji bo xatiran, mirov dixwe goştê qantiran.
bnr: Ji bo xatirê xatiran çû ser dînê gawiran.

Ji bo xatirê xatiran çû ser dînê gawiran.
Ji bo xatirê hinek kesên hêja mirov dikare gelek bedelan bide. **Heke xatirê Nîgarê nebûya ew yek nedibû, çawa bikim, mirov **ji bo ser xatirê xatiran, diçe ser dînê gawiran**.*

Ji bo xatirê xatiran, da barê qantiran.
bnr: Ji bo xatirê xatiran çû ser dînê gawiran.

Ji bo xatirê xweyî, mirov kevir naavêje seyî
bnr: Ji bo xatirê xatiran çû ser dînê gawiran.

Ji bo xweveşartinê li qulekê gerîn
Pir tirsîn. **Dema kekê min Eşref bê, **ji bo xwe veşêre, ew ê li qulekê bigere**.*

Ji bo Xwedê gotin
A rastî çi ye, ew gotin. **Heyran, teref negire. Hema te çi dîtiye, **ji bo Xwedê bibêje**.*

Ji bo zebeşekî xeŕa dike bistanekî.
bnr: Ji bo mirovekî, wêran dike gundekî.

Ji canê xwe aciz bûn
bnr: Ji canê xwe bêzar bûn

Ji canê xwe bêzar bûn
Gelekî aciz û zivêr bûn. **Vê erebeyê wisa kir ku ez **ji canê xwe bêzar bûm**.*

Ji canê xwe bûn
Mirin. **Wî jî wisa hêvî nedikir, lê ji ber agirê nefsa xwe, **ji canê xwe jî bû**.*

Ji canê xwe hez kirin
Berjewendiyên xwe yên ezîtî derxistin pêş. **Hewê wisa **ji canê xwe hez dike** ku diçe ku derê mîndera xwe jî bi xwe re dibe.*

Ji canê xwe zivêr bûn
bnr: Ji canê xwe bêzar bûn

Ji cihê rijî nebûn
bnr: Ji cihekî xalî nebûn

Ji cihekî xalî nebûn
Ji mirovên biesil û esas re tê gotin. **Bi saloxên saloxdaran ew **ne ji cihekî xalî ye**; sulaleya wî digihîje heya Bedirxan Begê.*

Ji cot re na weleh, ji mazê re êwelah
bnr: Tevn û teşî dilê min diêşî, diçe avê çirtik diavê.

Ji çav derbas kirin
Bi gelemperî lê nêrîn. **Min helbestên wî **ji çav derbas kirin**, ne xirab in.*

Ji çav derxistin
Ji nav hesaban derxistin. Dev jê berdan. ****Piştî wê bûyerê, wî jinik ji çav derxist**.*

Ji çavan dûr ketin
Ji bo demekê li hawir xuya nebûn. **Lawo divê tu demekî **ji çavan dûr bikevî**, ku ew vê yekê ji bîr bikin.*

Ji çavan xew barîn
Xewa yekî gelekî hatin. **Hema çawa xwe gihande malê, min mêze kir ku, **ji çavan xew dibare**.*

Ji çavên xwe bawer nekirin
bnr: Ji guhê xwe bawer nekirin.

Ji çavên xwe bawer nekirin
Ji bo matmayîna ji tiştên awarte û ecêb tê bikaranîn. **Dema ku min ew di wî halî de dît, min **ji çavên xwe bawer nekir**.*

Ji çêleka ku heft sal in stewr e, dikare elbek şîr bidoşe.
Ji bo kesên pêkhatî û kone tê gotin. **Hay lo lo! Ew dikare **ji çêleka ku heft sal in stewr e, elbek şîr bidoşe**.*

Ji çiçik kirin
bnr. Ji şîr birîn

Ji çîka çavan parastin
Pir rûmet dayîn. Zehf jê hez kirin. **Tu qet nekeve tatêlê, ez bawer im ku ew ê wî **ji çîka çavan biparêze**.*

Ji çiyayê Girîdaxê berf baxişandin
Tiştekî metah nekirin. **Wî çi qencî bi min kiriye? Ma **ji çiyayêyê Girîdaxê berf baxişandiye** min?* (qerf)

Ji çîzê derxistin (Ji çîzê derbas kirin)
bnr. Ji şorê derxistin

Ji deftera xwe derxistin
Têkilî birîn. **Wî dawiya dawî navê wê keçikê **ji deftera xwe derxist**.*

Ji delavan ketin çiravan
Ji rewşa baş daketin rewşa xirab. **Tu li çarenûsê binihêre; ew reben **ji delavan ketin çiravan**.*

Ji dengê mele bawer nake, ji zirîna kerê bawer dike.
Ji bo helwestên berevajî tê gotin. **Kuro ev li ku mezin bûye ? **Ji dengê mele bawer nake, ji zirîna kerê bawer dike.***

Ji der ve mele ye, ji dil ve file ye.
Ji bo kesên durû tê bikaranîn. **Bawer dikim ku tu jî têgilûştî. Erê, ew mirovekî **ji der ve mele ye, ji dil ve file ye**.*

Ji derdan rû berdan (Ji kul û derdan, rû berdan)
Ji dest kul û derdan pejmûrde û perîşan bûn. **Mixabin, mêrik **ji derdan rû berda**.*

Ji derdan têr bûn
Zêde derd kişandin. **Ma wê çi bibe, êdî em **ji derdan têr bûn.***

Ji derdê (yekî) kevir helîn
Xwedî derdê giran bûn. ****Ji derdê wê dayikê kevir heliyan**.*

Ji derge û dîwanan derketin (Ji derge û dîwana Xwedê derketin)
Ji rewşa asahî dûr ketin. **Xwedê kesî nexe rewşa wan, ew **ji derge û dîwana Xwedê derketine**.*

Ji dermanê çavan re peyda nebûn

Zû bi zû peyda nebûn. **Malavawo, welehî **ji dermanê çavan re peyda nabe**.*

Ji derziyê heta deziyê
Ji tiştên piçûk heya mezin, her tişt. ****Ji derziyê bigire heta deziyê**, çi pêdivî hebû, me kir.*

Ji dest derbas kirin
1. Yek bi yek seh kirin. Tesele kirin. **2.** Kêmasî temam kirin. **Tu meraqan meke, min ew **ji dest derbas kiriye**. *Min ew avîzeya kevin **ji dest derbas kir**, parçeyên xirabûyî jî çêkirin.*

Ji dest derketin
bnr: Ji dest revîn

Ji dest derxistin
Malek an jî eşyayek firotin. **Zeyno gelekî hewl da xwe, di axiriyê de ew **ji destê xwe derxist**.*

Ji dest (yekî) ew qas hatin
Zerengî ew qas bûn. **Ez çi bikim ezbenî, **ji dest min jî ew qas tê**.*

Ji dest (yekî) filitîn
Ji bin bandor û xezebê rizgar bûn. **"Got erê weleh Mihemed Efendî, ez poşman bûm, lê êdî **ji destê min filitî**."* Rojen Barnas

Ji dest (yekî) hayê kirin
Ji dest yekî eman gotin, zivêr bûn. **Hemû cîran **ji dest vê jinikê hayê dikin**.*

Ji dest hev revandin
Pir ecibandin. Zêde rûmet dan. **Me bawer nedikir ku em bikaribin bifroşin, lê me çawa ku bir bazarê, gel **ji dest hev revand**.*

Ji desthilanîn (desthilatî) ketin
Erk winda kirin. Ji hêz ketin. **"Ku bêlına Têlo diçe leşkerên sînor; leşker di cih de **ji destlilanîn dikevin**, dilê wan diêşe."* Helîm Yûsiv

Ji dest ketin
Ji hal ketin. Bê hêz ketin. **Welehı hema Sertîfê Dersimî jî weke çêleka me ya beş **ji dest ketiye**.*

Ji dest revîn
Zept nekirin. Ji erk û kontrolê derketin. **Heya ez zivirîm hêla rastê, **ji dest min revî**.*

Ji dest û pê bûn
1. Ji ber nexweşî lan jî seqetbûnekê, dest û pê nexebitîn. **2.** Gelekî betilîn, westîn. **Di wê fabrîqeyê de Kerem **ji dest û piyan bû**. *Ji ber çêkirina wî dîwarî, ez **ji dest û piyan bûm**.*

Ji dest û piyan ketin
Gelekî betilîn, westîn. **Heya me ew kuleşa li patosê xist, em **ji dest û piyan ketin**.*

Ji dest xelas bûn
bnr: Ji dest filitîn

Ji dest xwe berdan
bnr: Ji dest xwe revandin

Ji dest xwe revandin
Firsend wenda kirin. **Heya me telefon kir û pere peyde kirin, me ew erebe **ji dest xwe revand**.*

Ji dest (yekî) girîn
Gelek eziyet û zor dîtin. **Belengazê Fazil **ji dest birayê xwe yê mezin digirî**.*

Ji destê te (bi) vir de
Heya ku dixwazî. **Zeviyên me wisa girtine ku **ji destê te vir d**e genim heye îsal.*

Ji desthilanînê ketin
Erk û bandora xwe winda kirin. ***Piştî afatê Apê Bawer **ji desthilanînê ket**.*

Ji dev gerandin (gerîn) ketin
Li ber mirinê bûn. Ji dest nexweşiyeke giran di axaftinê de astengî kişandin. **Wexta kurê wî xwe gihande ser, **ji dev gerandin ketibû** jî.*

Ji dev û diranên xwe birîn (qut kirin)
Ji mesrefên xwarin û vexwarinê kêm kirin. **Ji bo ku erseyekî bikire, Ûsiv **ji dev û diranên xwe birî**, lê dîsa jî nebû.*

Ji deveyê guh filitîn
Parçeyek pir piçûk man. **Na keçê, parçe parçeyî bibû, hema **ji deveyê guh filitî bû**.*

Ji deveyê re dibêjin: "Çokên te xwar in." Dibêje: "Qedera min rast e."
A girîng ne şikil û şemal e, şans û bext e. **Tu li şikil û şemala wê menêre. **Ji deveyê re dibêjin: "Çokên te xwar in." Dibêje: "Qedera min rast e."***

Ji deveyê ketiye, hop hop jê tê.
Ji bo kesên li gel rewşa xwe ya xerab dîsa jî xwe qure dikin û tiştekî nayînin ser barê xwe tê gotin. *Camêrî qet îstifa xwe xera nake. ***Ji devê ketiye, hop hop jê tê.***

Ji deveyê re gotin: "Çima tu bêmede yî?" Got: "Hefsarê min di destê kerê de ye."
Ji bo rewşa nelayîq tê bikaranîn. **Bi rastî jî heqê wê ne ew e. **Ji deveyê re gotin: "Çima tu bêmede yî?" Got: "Hefsarê min di destê kerê de ye."***

Ji deveyê re gotin: "Wê te bişînin dawetê." Deveyê got: "Ev stûyê min ê xwar ne layiqî dawetê ye; yan wê min bibin mêşe daran an ji bişînin Rewanê birinc."
Her tiştek rewşeke wê ya xwezayî heye. **Ez dizanim ku ew yek ne layîqî wê ye. **Ji deveyê re gotin: "Wê te bişînin dawetê." Deveyê got: "Ev stûyê min ê xwar ne layîqî dawetê ye; yan wê min bibin mêşe daran an ji bişînin Rewanê birinc."***

Ji deveyê re gotin: "Xet"; got: "Ez nikarim (nakim) qet."
Ji xebat û kedê revîn. ***Ji deveyê re gotin "Xet", got: "Ez nikarim qet."*** *Ev lawê min jî hema dibêje bidin min, ez bixwim, vexwim, bigerim, lê ji min re qala tu karekî mekin.*

Ji deveyê re sol çêkirin, jûjî piyên xwe rakirin.
Hinek kes hedê xwe û zerengiya xwe nizanin. ***Ji deveyê re sol çêkirin, jûjî piyên xwe rakirin.*** *Evdilcebar xwe winda kiriye, ji bîr kiriye bê barê wî çiqas e.*

Ji deveyê re sol dikirin, jûjî got: "Pepê min jî."
bnr. Ji devê re sol çêkirin, jûjî piyên xwe rakirin.

Ji devê gur derketin (Ji devê gur filitîn)
Gelekî hincirîn. **Ketibû rewşeke wisa ku te digot nû **ji devê gur derketiye**.*

Ji devê xwe revandin (Ji dêv revîn)
Gotinek bêhemd û bêdaxwaz û ne li cih gotin. **Wî jî nedixwest wilo bibêje, lê **ji devê xwe revand**.*

Ji devê xwe şihitîn
Gotinên ne di ch de ji dêv revîn. **Ew bi lingê xwe biketa ew qas mezin nedibû, ew **ji devê xwe şihitiye**.*

Ji devê (yekî) girtin
1. Berî yekî eynî tişt gotin. **2.** Gotina yekî bi navê wî ji kesekî din re gotin. **"Zîwerê Xendûkî gotin **ji devê zilamê gundî girt**."* Hesen Zinar **Ew wan tiştan ew qas nizane, wî **ji devê hinekan girtiye**.*

Ji devgerkê ketin
Ji ber nexweşî yan jî sedemeke din di peyvandinê de astengî kişandin. **Dema ku bi şev di wê newala kûr û xalî de derbas bûm, **ji devgerkê ketim**.*

Ji dêst çûn
1. Keys û derfet ji dêst derketin. **2.** Telef bûn, mirin. **Wê demê pêk bianiya wê baş bûya, lê êdî **ji dêst çû**. **"... heger jinik bikeve, kesî wan nîn e ku wê rake nexweşxaneyê, ew ê **ji dest here**."* Ronî War

Ji dêst el eman gotin
bnr. Îlelah gotin

Ji dêst hatin
Pêkhatî bûn. Xwedî merîfet û huner bûn. **"Belê gava ku Bavo li otêlê bû, hemû karên temîrê, yên otêlê Nayîl dikirin. Karê ji nû ve bisazkirina kaniyên şikestî û ceryanê jî baş **ji destan dihat**."* Felat Dilgeş

Ji dêst (yekî) kişandin
Ji kirinên kesekî gelek eziyet û xirabî dîtin. **Xwedê dizane Xatiya Sedefê gelek **ji dest wî kurê xwe kişand**.*

Ji dêst, pêsîra xwe daşandin
bnr. Îlelah gotin

Ji dêst stendin (girtin)
Ne bi riza û daxwaza kesekî, hin derfet an jî tişt jê girtin. **Qijikî ew bû û ew erebe bû, ew jî **ji dêst girtin***.

Ji dêst (yekî) tiştek nehatin
1. Bêzereng û kêrnehatî bûn. **2.** Di dêst de derfetek tune bûn. **Qet bi wê hêvî nebe, ew yeke tune ye, tiştek **ji destê wê nayê**. *Ez jî dizanim ew dixwaze, lê **tiştek ji dest wê rebenê jî nayê***.

Ji dêv derketin
Bêhemd û bêdaxwaz tiştek gotin. **Armanca wê jî ne ew bû, lê hew mêze kir **ji dêv derket***.

Ji dil birîndar bûn
bnr. Stûna dil şikestin

Ji dil bûn
Dilsoz û samîmî bûn. **Belkî baweriya te bi wî lawikî nayê, lê bi min ew **ji dil e***.

Ji dil gotin (Ji dil xeber dan)
Bi dilê sax peyivîn. **Ji ber ku wî rexneyên xwe **ji dil digotin** dilê min jê nema, hê bi ser de ez pê dilşad jî bûm.*

Ji dil nalîn
bnr. Ji kezebê nalîn

Ji dil ve çûn
bnr. Ji xwe ve çûn

Ji dil xwîn dilop kirin
bnr. Ji dil xwîn çûn

Ji dilê (yekî) girtin
Xeyidîn, dil şikestin. **Bi rastî jî wan gotinên wê **ji dilê min girtin***.

Ji dilê xwe avêtin
Dev ji hezkirinê berdan. **Berê ji evîna wê sexweş bûbû, lê zû ew **ji dilê xwe avêt***.

Ji dilê xwe derxistin
bnr. Ji dilê xwe avêtin

Ji dilê xwe têr bûn
Bi xwe bawer bûn. Bêkompleks û bi xwe re lihevhatî bûn. **Ew mirovekî **ji dilê xwe têr e**, tiştên wisa piçûk mezin nake.*

Ji dilê (yekî) xwîn çûn

Gelekî xemgîn bûn. **Erê tiştek nedigot, lê min dizanibû ku **ji dilê wî xwîn diçe**.*

Ji dinê bêxeber bûn

bnr. Hay ji bayê felekê tune bûn

Ji dinyayê re bûn sitûn

Ma tenê bi te maye alîkarî û pêkanîna karan? **Kuro tu dê çawa wî barî hilgirî, ma **ji dinyayê re tu dê bibî sitûn**?* (qerf)

Ji dinyayê sar bûn

Moral xera bûn. **Vê keçika min wisa kir ku ez **ji dinyayê sar bûm**.*

Ji dinyayê tiştek fem nekirin

Jîr û serwext nebûn. **Evdirehmanê reben **ji dinyayê tiştekî fêm nake** ku ji te re jî alîkariyê bike.*

Ji diya min re her der teşt e.

Ji bo rewşa xwe winda kirin an jî hay ji xwe tunebûnê û serxweşiyê tê bikaranîn. **Qet qala Kerem neke, ketiye rewşeke wisa ku **her der ji bo wî teşt e**.* (bnr. çîrok)

Ji dîn û îman derketin

Bêhnteng bûn. Pir hêrs bûn. **Piştî wan gotinan, Fexo **ji dîn û îman derket**.*

Ji dostê xwe re dost, ji dijminê xwe re dijmin bûn

Li gorî rewşê helwesta rast girtin. **"**Ew ji dostên xwe re dost, ji dijminên xwe re dijmin in.** Ew bi şifra xwe dewlemend, bi dilê xwe nerm, bi qewlê xwe zexim, bi mêraniya xwe navdar, bi dînê xwe bawer, bi şerê xwe asê ne..."* Mehmed Uzun

Ji doxîna xwe re durist bûn

Di hêla namûsê de qewîn û durist bûn. **Tu li gotinên vî wî menêre, ew mirovekî **ji doxîna xwe re dirust e**.*

Ji du deriyan deriyek vebûn

Çareseriyek dîtin. **Xwelha min, tu qet mereqan meke, helbet Xwedê wê **ji du deriyan deriyekî ji me re veke**.*

"Ji diya min re her der teşt e."

Pêxwasekî Amedê araq bi dizî aniye ku li mal vexwe. Hinekî vedixwe, lê mêze dike ku zêde germ e. Ji ber ku araqa germ zêde kelijê dide ser mirov, zû serxweş dike û tehmê jî nade, ji bo ku sar bibe dixe sarincê. Lê bi şûşeyê nikare bixe sarincê, çimkî dizane ku dê fêm bikin araq e, teşqele wê di mal de derkeve. Araqê dixe tasekê û dixe sarincê. Ew xwe dirêj dike û li benda sarbûna araqê dimîne.

Di wê navberê de diya wî ji nav rez tê. Gelekî betiliye û ji german şewitiye. Hema çawa ku xwe digihîne sarincê wê ava sar a di tasê de bi ser xwe dike. Heya ku têdigihîje tama wê tirş û tal e, têra xwe vedixwe. Tu wateyekê nadiyê, hinekî dike kutekut lê dû re serê wê xweş dibe, sivik dibe. Piştî demekê bi şûn de radibe ji bo hevîr bike ku nan bipêje. Teştê tîne datîne û ard tîne li moxilê dike. Lê ji ber ku êdî zêde serxweş bûye, xwe şaş dike, ard li her dera malê belawela dike. Serad di dest de, li çar kuncikên malê doç dibe. Zarokên jinikê bi tirs û şaşwazî li diya xwe temaşe dikin û dibêjin:

"Dayê teşt wa ye, tu çima ard di ser teştê de moxil nakî?" Lawikê ku araq xistiye dolabê têdigihîje ku diya wî araqa wî vexwariye. Ji xwîşk birayên xwe yên matmayî re bi ken dibêje:

"Ji diya min re her der teşt e!"

Ji dû qûna (yekî) neqetîn

Ji tiştek an jî kesekî dûr neketin, zêde daxwaz kirin. **Çima ku Gebar soza karmendiyê dabûyê, Zohat bi şev û roj* ***ji dû qûna Gebar nediqetî****.*

Ji dûr ve, di keça mîr de.

bnr: Ya ji min wê de, yê min tê de. *(*bnr: çîrok)*

Ji edetê der bûn

Tiştekî awarte bûn. **Ya ku Aram dike* ***ji edetê der e****.*

Ji Elo dibire, dide Welo (Belo).

Ji bo kesên ku neheqî û cudatiyê dikin tê gotin. **Mixabin karê wî jî ew e ku* ***ji Elo dibire dide Welo****.*

Ji emrê xwe zêdetir xeber dan

Ji bo kesên pir zana, cezû û kone tê gotin. **Heyran ew keçika mamoste Mistefa jî* ***ji emrê xwe zêdetir xeber dide****.*

Ji erdê heta esmên neheq bûn

Bi awayekî vebirî neheq bûn. **Ew çi dibêje bila bibêje, lê li hemberî wê jinikê,* ***ji erdê heya esmên neheq e****.*

Ji esmanan hatin xwarê?

Ma zehf birûmet e, an pir taybet e? **Çi ye, we pîpikek xistiye qûna wî, ma ew* ***ji esmanan hatiye xwarê****?* (qerf)

Ji esmanan hatin xwarê

Ji bo kesên xwe gelekî zêde dihesibînin an jî ji hêla hinekan ve gelekî zêde tên hesibandin tê gotin. **Maşelah wisa li dora wê diçin û tên ku tu dibêjî Xwedêyo, ew* ***ji esmanan hatiye xwarê****.*

Ji erş û kurş xeber dan

Ji bo kesên ku gotinên mezin dikin tê bikaranîn. **Erê, parçeyek zarok e, lê maşaelah wisa şatirşûmanî ye ku,* ***ji erş û kurş xeber dide****.* (qerf)

Ji erş û kurş zanibûn

Zehf zêde zane bûn. **Na lo! Wî dibistana servekirî xwendiye, loma wisa* ***ji erş û kurş dizane****.* (qerf)

Ji eşîran eşîra me, ji gundan gundê me, ji malan mala me, ji mala me jî ez û birayên xwe, lê zedê zêde jî ez.

Ji bo kesên zêde ketine nav behra ezîtiyê tê gotin. **Aryan jî wekî wî yê ku gotiye:* ***"Ji eşîran eşîra me, ji gundan gundê me, ji malan mala me, ji mala me jî ez û birayên xwe, lê zedê zêde jî ez."*** *dibêje.*

Ji evdan re dost û yar e, ji min re gurê har e.

Tenê ji min re xerab e. **Her hal ew jî ji encama helwesta min e.* ***Ji evdan re dost û yar e, ji min re gurê har e.***

Ji eyarê xwe derketin
Pir hêrs bûn. **Wî yê bêar wisa kir ku ez **ji eyarê xwe derketim**.*

Ji êqil der bûn
Ji mantiq dûr bûn. **"Gava em daketin jêr, li çi binihêrim ew der jî alemek e, lê alemeke ava. Rê, avalî, tevger tiştekî **ji eqil der bû**."* Osman Sebrî

Ji êqil kêm bûn
Di hêla têgihîştin, fêm û ferasetê de qels bûn. **Jixwe ew reben **ji êqil kêm e**, ma tu çi jê hêvî dikî?*

Ji êş bê, serî ar be, kes jê bawer nake.
Ji bo kesên derewîn û sextekar tê gotin. **Ma tu jî nizanî, ku ew **ji êş bê, serî ar be, kes jê bawer nake**.*

Ji gewriya xwe birîn
bnr: Ji dev û diranê xwe birîn

Ji giran girê Xerezê, kulê avêt li ser merezê, ez dev jê bernadim, heta xwê şîn nebe û qantir nezê.
Ez tu car dev jê bernadim. **Wî sond xwariye ku dev jê bernede; ji bo wê jî tim dibêje: **"Ji giran girê Xerezê, kulê avêt li ser merezê, ez dev jê bernadim, heta xwê şîn nebe û qantir nezê."***

Ji girêza devê (yekî), seyekî têr xwarin
Ji bo kesên qilêr, sist û pêknehatî tê gotin. *****Ji girêza devê wî seyek têr dixwe**, ew jî hatiye qala rêveberiyê dike.*

Ji golikê re gotin: "Em ê boçika te jê bikin ji kesî re nebêje." Golikê got: "Ma ez nebêjim, lê wê nebêjin ka boçika te?"
Tiştê ku li holê û eşkere be, nayê veşartin. **Qebûl, lê ka çawa veşêrim? Dibêjin, **ji golikê re gotin: "Em ê boçika te jê bikin ji kesî re nebêje." Golikê got: "Ma ez nebêjim, lê wê nebêjin ka boçika te?"***

Ji gorepanê polos kirin
Ji qadê rakirin. **Wan bêbavan ew **ji gorepanê polos kirin**.* (argo)

Ji gorê rabûn
Ji bo tiştên ne guncan tê gotin. **"Heta miriyên sedsalan jî serê xwe ji tirbê hildin û **ji gorê rabin**, çavên bavê temo û Tavbanûyê, ku ne bi hukmê rehm, dilovanî û însaniyê be, bi hekîm û tixtoran qet sax nabe."* Mehmed Uzun

Ji gotina xwe daketin
Dev ji gotina xwe berdan.. **"Hev û din didan ber boçan, heta her du berx sist dibûn. Ne qolçiya **ji gotina xwe dadiket** ne Fesîh."* Helîm Yûsiv

Ji gotina xwe derbas bûn
bnr: Ji gotina xwe daketin

Ji gotina xwe vagêr bûn (Ji gotina xwe vegerîn)
bnr: Ji gotina xwe daketin

Ji gotina (yekî) derneketin
Wekî gotin û daxwaza yekî kirin. **Çawa zarokên xwe perwerde kirine nizanim, lê tu car **ji gotina wan dernakevin**.*

Ji guh kirin
bnr: Guh çûn

Ji guhan ketin
Ji ber dengên pir bilind û xirecirê, gelekî aciz bûn. **Heyran ji destê def û zirneya wan mirtivan, em **ji guhan ketin**.*

Ji guhê xwe bawer nekirin
Ecêb man. Pir balkêş dîtin. **Dema ku min ew gilî ji wî bihîstin, **min ji guhê xwe bawer nekir**.*

Ji gulê xerabtir (zêdetir) tiştek negotin
Tu tiştekî xerab negotin. **Hema ji Fêris bipirse, heke min **ji gulê xerabtir tiştek jê re gotibe, bila bibêje**.*

Ji gur birçîtir, ji mar tazîtir bûn
Ji bo kesên pir xizan tê gotin. **Bi xwe **ji gur birçîtir, ji mar tazîtir e**. Hatiye qîza Fesîh Begê jî dixwaze.*

Ji gur re gotin: "Çima stûyê te stûr e?" Got: "Ez bi destê xwe dikim, bi devê xwe dixwim."
Kesên azad, dikarin serfiraz û rehet bin. **Azadî û serxwebûn rûmet û pêwîstiya herî mezin e. **Ji gur re gotin: "Çima stûyê te stûr e?" Got: "Ez bi destê xwe dikim, bi devê xwe dixwim."***

Ji gur û dêlegurê re tu rê neman.
Hemû derfet û maf zept kirin. **Belê, tu rast dibêjî, lê **ji gur û dêlegurê re tu rê neman**.*

Ji guranxwariyan pûrt jî bimîne baş e
Li gorî wê rewşa xirab, tiştekî piçûk jî rizgar bibe, baş e. ***Ji guranxwariyan pûrt ji bimîne baş e**. Ya ku ew ketibû nav, wa ye dîsa ji devê gur fîlitiye.*

Ji gurê[1] derneketin
bnr: Ji gotina (yekî) derketin

Ji hal de xistin
Pir hincirandin, dakutan. **Wî lawikê te yê nehs, neviyê min **ji hal de xistiye**.*

[1] **Gur:** Gotin

Ji hal de ketin

Pir betilîn. *"*Bi gotinek din ez kerixî bûm.* ***Ji hal de ketibûm*** *û bêtaqet bûbûm."* Firat Cewerî

Ji halê (yekî) re halek dîtin

Ji derd û pirsgirêka yekî re çareyek dîtin. **Min di serê xwe de girt û ez ketim odeya wî û min got:* ***ji vî halê min re halekî bibîne****.*

Ji halê Xwedê de ketin

bnr: Ji mirovatiyê derketin

Ji hebek tirî mehserek çêkirin (Ji hebûbek tirî, misare çêkirin)

Pir bimerîfet bûn. **Ew çi jinek e?* ***Ji hebek tirî mehserekê çêdike.***

Ji hebûn û tunebûnê fêm nekirin

Ji bo kesên ji rewşê fem nakin tê gotin. **Ew ê bêfêm nan bi gulhê xwe xwariye, ew* ***ji hebûn û tunebûnê çi fêm dike****?*

Ji heçiyê derbas kirin

bnr: Girêk li pişt heçikê ketin

Ji hedê xwe derbas kirin

Ji rewş û pileya asahî derbas kirin. **Me got pêşî li ber wê helwesta wî bigire, lê Bêrîvanê jî ew yek* ***ji hedê xwe derbas kir****.*

Ji hedê xwe borandin

bnr: Ji hedê xwe derbas kirin

Ji heft canan canek di (yekî) de neman

Gelekî nêzîkî mirinê bûn. **"****Ji heft canan canek di mele de nema.*** *Ew tirsiyan ku mele êdî mir û wê bi kuştina mele bên bersûckirin."* Cankurd

Ji heft gulan gulek neqetandin

1. Bi mirazê xwe şad nebûn. Bêşans bûn. **2.** Pir ciwan bûn. **Wê qirikê* ***ji heft gulan gulek neqetand****, kî li şûna wê bûya dê wer bikira.* **Heyfê hê* ***ji heft gulan gûlek neqetandibû****.*

Ji heft bîran av kişandin

Ji xwe re hincet afirandin. **Min jê teyîb xwest, ji bo ku nede, wî* ***ji heft bîran av kişand****.*

Ji heft kaşan av anîn

bnr: Ji heft bîran av kişandin

Ji hej xistin

Bi lêdan an jî tiştekî din ji quwetê xistin. **Wisa dabûn Kazim ku* ***ji hej xistibûn****.*

Ji hekê pekê fêm nekirin

Ji rewşê fêmnekirin. **Firat hê xişîm e,* ***ji hekê pekê fêm nake****.*

Ji hekîman re divê du fincan, yek kasê xeraban, yek kasê qencan.
Çareserî bi du aliyên berevajî ve pêk tê. **Bi dîtina min **ji hekîman re divê du fincan, yek kasê xiraban, yek kasê qencan**.*

Ji heq (yekî) nehatin der
Pêk neanîn, pê nikaribûn. **Em bi Guharê bawer bûn, lê ew jî **ji heq wî nehate der**.*

Ji heqê (yekî) derketin
Pêdivî bi cih anîn. **"Paşî bê kê diziya min kiriye, ez ê **ji heqê xwe û wan derkevim**."* Dost Çiyayî

Ji heqê xwe hatin der
Karê xwe birin sêrî, li ser karê xwe hakim bûn. **Tu nekeve tatêlê, ew dikare **ji heqê xwe bê der**.*

Ji her du lingan filitandî bûn
Ji bo kesên hay ji helwest û axaftina xwe de nîn in tê gotin. **Ya sitar! Kuro, ew ê **ji her du lingan filitandî** we ji ku hanî?*

Ji her seriyekî dengek derketin
Ji bo tevlihevî û teşqeleyê tê gotin. **Bi wan re peymanek nayê kirin, çimkî di wê malbatê de **ji her seriyekî dengek derdikeve**.*

Ji her zeviyekê kersekek anîn
Ji her derekê mehneyek anîn. **Gerçî ew ji her zeviyekê kersekekî tîne, lê bawer im ku ez ê di dawiyê de wî bînim ser rê.*

Ji hesabê (yekî) kuştin (Ji hesab xistin / Ji hesab girtin)
Ji hesab an jî ya heyî daxistin, jê kêm kirin. **Ew ê mesrefa min jî **ji wî hesabê min bixe**.*

Ji hespa (yekî) re gotin ker
Tiştekî xerab negotin. **Heyran tu çi ji min dixwazî, ma min **ji hespa te re gotiye ker e**?*

Ji hespê peya bûn, li kerê siwar bûn
Ketin rewşek hê xerabtirîn. **Rewşa Şêxmûs hê xerabtir e, ew **ji hespê peya bû, li kerê siwar bû**.*

Ji hespê xwe peya bûn
Fikir û ramana xwe guherandin. Dev ji ramana xwe ya berê berdan. **Belê wê jî berê wisa digot, lê dû re nizanim çi bû, **ji hespê xwe peya bû**.*

Ji hev belav kirin
Belawela kirin, tar û mar kirin. Xera kirin. **Maşelalı Rindoyê Xelîl çawa kete nav ew gişt **ji hev belav kirin**.*

Ji hev bûn (Ji hev û din bûn)
1. Ji hev dûr ketin. Têkilî birîn. **2.** Ji hev û din qetîn. **Kesî bawer nedikir ku ew ji hev bibin, lê wa ye bi awayekî fermî, ew jî **ji hev bûn**. *Ew her du rûpel jî **ji hev bûn**.*

Ji hev cihê kirin
Di derkê de bûn, fêm kirin. **Êdî neviya min mezin bûye, dikare erênî û neyînîyan **ji hev cihê bike**.*

Ji hev çixîn
Rê ji hev qetîn. **Di serî de baş debar dikirin, lê dû re **ji hev çixîn**.*

Ji hev de hilhilîn
Pir xerabe û jihevdeketî bûn. **Makîneya wan a cilşo, hema **ji hev de hilhiliye**.*

Ji hev de ketin (jihevdeketî)
1. Pir betilîn, ji hal ketin. **2.** Xerabe bûn. Şikestin, hûr xaş bûn. **Heya min ew beton avêt, ez **ji hev de ketim**. *Mêrik erebeyek **jihevdeketî** aniye dixwaze wê bi ser min ve bike.*

Ji hev de şehitîn
Şil bûn, felç bûn, rewş xera bûn. **Rostem rojekê heya êvarê xebitî, **ji hev de şehitî**.*

Ji hev derbas bûn
Dev ji hev berdan. Têkilî birîn. **Kes nizane di navbera wan de çi derbas bûye, lê êdî xuya ye ku **ji hev derbas bûne**.*

Ji hev derxistin
1. Naverok û taybetî nas kirin, rewş fêm kirin. **2.** Pêk anîn, bi ser ketin. **Wê çawa ku bi wî re axivî, ew **ji hev derxist**. *Maşelalı keçika me çawa ku çû ser wî karî, di navîna du rojan de ew kar **ji hev derxist**.*

Ji hev dirêj kirin
Piştî axaftineke normal, mezinbûna devjeniyê. **"Gotinek ji wê yek ji wî, wisa **ji hev dirêj kirin**."* Zana Farqînî

Ji hev filitîn (xelas) bûn
Têkilî hatin birîn. **"Radibe kêrika xwe derdixe û dest pê dike, hebo - hebo karikan serjê dike, heya tevan diqedîne, dibêje: "Ox! Ez û we em **ji hev filitîn**."* Muhemmed Garsî

Ji hev gerandin
Ferq kirin. Di derka tiştekî de bûn. **Di dawiyê de wê jî **ji hev gerand** ku ne wisan e.*

Ji hev hestî şikandin
Bi hev û din re dijminatî kirin. **Wan **ji hev hestî şikandine**, ew tu car nayên ba hev.*

Ji hev kirin
1. Ji hev dûr xistin. Têkilî bi dawî kirin. **2.** Tiştek ji hev qetandin. **Xwedê dizane wan her du ciwanan ji hev hez dikirin, lê dê û bavên wan ew **ji hev kirin**. *Wî ew her du texteyên dolabê **ji hev kirin**.*

Ji hev nas kirin
Derka di navberê de fêm kirin. **Jixwe ew bi hêsanî rewşa wan a rojane **ji hev nas dikin**.*

Ji hev ne xweş bûn

Ji hev razî nebûn. **Nizanim çi di navbera wan de derbas bûye, lê her du jî* ***ji hev ne xweş in****.*

Ji hev nebirîn

Li dû hev rêz kirin, navber nedan. **Ew bi xwe hebên cixareyan* ***ji hev nabire*** *û bi xwe jî ji wê helwesta xwe serbilind dibe.*

Ji hev nebûn

1. Ji hev neqetîn. **2.** Ji hev pir hez kirin. **Ew her du parçe* ***ji hev nabin****, naxwe kar nameşe. *Ew her du heval* ***ji hev nabin****, naxwe, wê bibihecin.*

Ji hev nexweş bûn

Ji hev aciz bûn, navber xweş nebûn. **Gotina Zerdeşt derbas nabe, çimkî vê gavê ew* ***ji hev ne xweş in****.*

Ji hev safî bûn

1. Ji hev xelas bûn. Ji hev veqetîn. **2.** Deyn an jî pirsgirêka di navbera hev de çareser kirin. **Piştî zewaca sih û du salan ew* ***ji hev safî bûn****. *Şikir min ew beşa deynê xwe ya dawiyê jî da û em* ***ji hev safî bûn****.*

Ji hev sar bûn

Têkilî sist bûn. **Piştî wê geşta gund Heqî û Xeyrî* ***ji hev û din sar bûn****.*

Ji hev sû ketin

Ji hev xeyidîn. **Bi rastî jî ew ji bo tiştekî tune* ***ji hev sû ketin****.*

Ji hev têr bûn

1. Piştî têkiliyeke dirêj ji hev û din aciz bûn. **2.** Bi hesreta demeke dirêj bi hev û din re hesret deranîn. **Jixwe piştî sê-çar salan bi şûn de jin û mêr* ***ji hev têr dibin****. *Heta ku ew* ***ji hev û din têr nebûn****, destê hev û din bernedan.*

Ji hev tingijîn

Ji hev xeyidîn. **Her du jî* ***ji hev tingijîne****, hema li melıneyan digerin ku teşqeleyekê der-xin.*

Ji hev û din re hevrîşkên avê çêkirin

Dek û dolab li serê hev çêkirin. **Buxza wan kuta nebû, hêjî* ***ji hev û din re hevrîşkên avê çêdikin****.*

Ji hev û din re mêr in, ji xelkê re bêr in.

Tenê goştê canê hev xwarin, lê ji kesên dereke re baş in. **Ancax zora wan digilûje hev;* ***ji hev û din re mêr in, ji xelkê re bêr in****.*

Ji hev xav bûn

Sist bûn, teraliyê bi ser de girtin. **Nizanim çi di wê xwarinê de hebû, hema Emiralî li wir* ***ji hev xav bû*** *û raza.*

Ji hev xelas bûn

1. Têkilî qut kirin. **2.** Ji bo jinên ku dikevin ber tengasiya zarokanînê ango ji zayînê re tê gotin. **Êdî **ji hev xelas bûn**, dikan mikan nema.* ***"Jinik berdestî sibehê **ji hev xelas bî**."* Zana Farqînî

Ji hezar derdî re derman bûn
Pir xêrxwaz û alîkar bûn. **Xwedê emrê wê dirêj ke, Xasêya Zurbe Begê, **ji hezar derdî re derman e**.*

Ji hêkekê çêdike qeyxanekê.
bnr: Ji hebek tirî meserek çêkirin

Ji hêlînê çû kulînê. (Ji hêlînê diçe kulînê)
1. Ji bo kesên teral û caneza tê gotin. **2.** Ji bo karê pir sivik û hêsan tê bikaranîn. *****Ji hêlînê diçe kulînê**, wê jî dike meseleyekê.* **Karê çi, halê çi, hema **ji hêlînê diçe kulînê**.*

Ji hêrana ritlek genim re çi şîş, çi tevere?
Ji bo ew qas tiştên piçûk ketin kitekiteyan ne pêwîst e. **Min ji te re got, **ji hêrana ritlek genim re çi şîş çi tevere**?* (qerf)

Ji hêz ketin
bnr: Ji hal ketin

Ji hêz xistin
Ji taqet xistin, xistin rewşek zor. **Kesî bi wî hovî nikaribû, her Gulîzerê ew **ji hêz xist**.*

Ji hinekan re bêşbirlik e, ji hinekan re seferberlig e.
bnr: Ji hinekan re deyşt e, ji hinekan re teyşt e.

Ji hinekan re deyşt e, ji hinekan re teyşt e.
Ji hinekan re baş pêk tê, ji hinekan re jî xerab. **Ev dinya dinyayek wisa ye, **ji hinekan re deyşt e, ji hinekan re teyşt e**.*

Ji hinekan re hok e, ji hinekan re kok e.
bnr: Ji hinekan re deyşt e, ji hinekan re teyşt e.

Ji hindik re jî ji gelekî re jî şikir negotin
Çav têr nebûn. **Malxirabo, ka mirovek çawa ye?* ***Ne ji hindik re, ne jî ji gelekî re şikur dibêje.***

Ji hiş ketin
bnr: Ji xwe ve çûn

Ji hiş ve çûn
bnr: Ji xwe ve çûn

Ji hişê (yekî) derneketin
Ji ber girîng girtin an jî hezkirinê tim fikirîn. **Min dikir û nedikir ew keçik **ji hişê min dernediket**.*

Ji hişê xwe derxistin

Li ser wê yekê fikirîn, xwe jê dûr negirtin. **Yek çareya min hebû, ew jî ew keçik **ji hişê xwe derxistin bû**.*

Ji hişê xwe ve çûn

bnr. Ji xwe ve çûn

Ji hîva çardehşevî re "Tu dernekeve ez derkevim" gotin

Ji bo kesên pir bedew tê gotin. **Qîza Seyîdê Xalepîrekan keçikek wisa bû ku **ji hîva çardehşevî re digot: "Tu dernekeve, ez derkevim."***

Ji holê (ortê) rakirin

Tune kirin. Tarûmar kirin. **Wan çawa kirin nizanim, lê me hew mêze kir ku ew qas mal û milk **ji holê rakirine** jî.*

Ji hû heta mû

Ji piçûk heta mezinan an jî ji hûran heya giran. ****Ji hû heta mû** ew mal hemû di destê hiraziyê min re derbas dibe.*

Ji inyazan ketin

Ji ber birçînan ji hal ketin. **Wan heta ew rojî girtin, **ji inyazan ketin**.*

Ji îmana xwe derketin

Li cihê tune ango ji ber sedemeke nerast derew sond xwarin. **Xwedê jî dizane, pêxember jî dizane ku Mehmûd **ji îmana xwe derket**.*

Ji înê heya înê, çêkir cila mehînê, ew jî kin e, nagihîje ser qûnê.

Ji bo kesên pêknehatî û bêzereng tê bikaranîn. **Ji dest wê tiştek nayê. **Ji înê heya înê, çêkir cila mehînê, ew jî kin e, nagilûje ser qûnê.***

Ji îşê Xwedê xeber dan

Qala tiştên pir mezin û nediyar kirin. **Hîvê êdî dev ji îşê qûlan berdaye, **jî îşê Xwedê xeber dide**.*

Ji jana dil xeber dan

bnr. Ji dil gotin

Ji jinan dotmam, ji şûran şûrê Şam

Jina ku exrebe be, hê nêzîktir û germtir e. **Jina mirov ji xwexutiya mirov be hê baş û bi bawer dibe. Çi gotine: **"Ji jinan dotmam, ji şûran şûrê Şam."*** (bnr. çîrok)

"Ji jinan dotmam, ji şûran şûrê Şam"

Mirovekî bi navê Enter, bazirgan bûye. Ji bo malê xwe bibe welatên dûr û bazirganiyê bike, li hêviya biharê bûye. Mirovê bazirgan, ji bo ku bazirganê wî zehf di serma de nemîne, dixwaze di destpêka biharê de ango di Newrozê de here karê xwe. Li ser şîreta bavê xwe, tam di destpêka çileyan de çil mewûjan dike bêrîka xwe û rojê mewûjekî dixwe ku çil mewûj kengê kuta bûn ew jî bazirganê xwe bi rê bike. Mirovê bazirgan rojê mewûjekî dixwe, lê du mewûj bi hev du ve dizeliqin û wan herduyan wekî mewûjekî dixwe. Ji ber wê jî rojekê zû bazirganê xwe bar dike. Ji ber ku rojek pêş de derketiye, kerwanê xwe bar kiriye, di rê de ba û bahozeke pir mezin çêdibe. Zilamên wî yên ku bazirgan diajon li ber sir û sermayê yeko yeko

Ji jiyanê sar bûn

bnr. Ji dinyayê sar bûn

Ji jiyanê sar kirin

Xirabî an jî neyîniyeke mezin bi yekî kirin. **"Çend kesan zebûnê neqişand dilê wê û çend kesan ew **ji jiyanê sar kir**..."* Gülay Ersoy

Ji kaniya xortan av vexwarin

Gihîştin, kamil bûn. **Şikir êdî Perwer jî **ji kaniya xortan av vexwar**.*

Ji kaniyekê bûn

Ji heman kokê bûn. **Ma te çi jê hêvî dikir? Ma tu nizanî ew her du jî **ji kaniyekê ne**.*

Ji kaniyekê av vexwarin

Ji jêderkekê sûd wergirtin, têkildar bûn. **"Ji Mînorskî bigirin heta Nîkîtîn, ji M. Emîn Zekî bigirin heta Kemal Burkay di pirtûkên xwe yên li ser dîroka kurdan nivîsandine de hemûyan **ji kaniya Şerefnamê av vexwarine**."* Xelîl Dost

Ji kar ketin

Kar û bar pê nebûn. **Piştî wê nexweşiyê, Xelîl **ji kar ket**.*

Ji karê jî, ji yarê jî bûn

Ji her du hêlan jî kêrek nedîtin. **Rewşa Emîneyê hê zor e, ew **ji karê jî ji yarê jî bû**.*

Ji keçanî xistin

Bakirbûna qîzekê bi dawî kirin. **Lawik Sûsan revand û şeva pêşîn ew **ji keçanî xist**.*

Ji keda xwe têr nexwarin

Bêşans bûn. Encameke erênî ji keda xwe negirtin. **Zarçînê ew qas kedeke mezin da, lê sed car heyf ku **ji keda xwe têr nexwar**.*

Ji kenan bêhecîn

bnr. Ji kenan ziko pişto bûn

---

diqelîlin û dimirin. Di dawiyê de tenê xwediyê bazirgan dimîne. Ew jî zikê deveyekê xwe diqelişîne. hûrê wê vala dike û dikeve nav ku bi wî awayî xwe ji sermayê biparêze. Di nav hûrê deveyê de xwe kom dike û mêze dike, gava ku dibe bager, qefesa deveyê tê şidandin, dibe sayî, (ango jî bager disekine) qefesa deveyê sist dibe. Wê şevê heft caran dibe sayî û heft caran dibe bahoz. Ji ber ku nîvê wê şevê dikeve ber bandora Newrozê, sibetirê hewa dibe sayî, roj germ dibe û bager datîne. Xwediyê bazirgan paşde vedigere û bi zor û zehmet di dawiyê de xwe digihîne mala xwe. Her du jinên wî diçin pêşiya wî. Jina biyan hema xwe diavêje hembêza mêrê xwe û dibêje:

"Ez îşev gelekî ketim tatêla te û xew qet nekete çavên min." Jina wî ya ku di heman demê de dotmama wî ye jî zêde tiştekî nabêje. Mêrik dibêje:

"Kî ku di etirê (meraq) min de be wê bizanibe, ka îşev çend caran bûye sayî û çend caran bûye bager?" Jina wî ya biyan dibêje:

"Min dît ku du caran bû sayî, du caran bû bager." Jina wî ya dotmam ku rastî jî ji bo mêrê xwe wê şevê heya sibehê li ber pencerê maye û ranezaye dibêje:

"Ez naxwazim têkevim çavê kesekî, tê min dît heft caran bû sayî, heft caran bû bager tî bahoz." Piştî van gotinan, mêrik dest di stûyê dotmama xwe re dibe û dibêje:

"Ji jinan jin dotmam, ji şûran şûrê Şam."

Ji kenan hişk bûn
bnr: Ji kenan ziko pişto bûn

Ji kenan rovî di zik de neman
bnr: Ji kenan ziko pişto bûn

Ji kenan teqîn
bnr: Ji kenan ziko pişto bûn

Ji kenan zik dirîn
bnr: Ji kenan ziko pişto bûn

Ji kenan ziko pişto bûn
Gelekî kenîn. **Di wê lîstikê de em wisa bi halê Çavmoriyê keniyan, em* ***ji kenan ziko pişto bûn***.

Ji kera xwe peya nebûn
Îleh ji bo ya xwe israr kirin. **"Dilê Egîd Begê ne dil, lê kevir bû. Ew* ***ji kera xwe peya nedibû*** *û..."* Mehmed Uzun

Ji kerban barek xwê xwarin
Dil şewitîn. **Wa ye tê xuyan ku Meyremê* ***ji kerban barek xwê xwariye***.

Ji kerban behecîn
bnr: Ji kerban barek xwê xwarin

Ji kerbên nezanan, Xwedê çû ezmanan.
Nezanî tiştekî wer xerab e ku Xwedê jî pê aciz dibe. **Ma ji nezaniyê xirabtir çi heye?* ***Ji kerbên nezanan, Xwedê çû ezmanan.***

Ji kerê de ketin
Pozîde bûn, moral xirab bûn. **"Xatûn, mîna ku* ***ji kerê (de) bikeve***, *li hemberî tevgera min sik û sar bû û enirî.* Musa Vazgali

Ji kerê ket, ya stûkur; ji hespê ket ya Elah. (Ji kerê ketiyan re ya stûkur; ji hespê ketiyan re ya Elah)
Yên ji hespê bikevin zêde tiştek pê nayên, lê yên ji kerê bikevin, dikevin rewşeke xerab. **Tu li gevdeyê wan menêre,* ***ji kerê ket, ya stûkur; ji hespê ket ya Elah***.

Ji kerê re gotin dayê
Ketin rewşek pir zor. **Welehî ew ku bikeve destê min, ez ê wisa bikim ku ew* ***ji kerê re bibêje dayê***.

Ji kerê re gotin bilîze, çirtik avêtin.
Her kes a ku dikare pêk tîne. **Ma we tiştekî çawa jê hêvî dikir?* ***Ji kerê re gotin bilîze, çirtik avêtin.***

Ji kerê şeytên peya bûn
Dev ji inyada xwe berdan. **Baş bû ku piştî hatina kekê xwe **ji kerê şeytên peya bû**.*

Ji kerî (tî) por kir hirî
Ji dinyayê tiştek fêm nekirin. **Rast e, kal bûye, lê **ji kerîtî, por kir hirî**.*

Ji kesî venekişîn
bnr. Serê xwe li ber tu kesî netewandin

Ji kcva gazî kirin
Ji ber ziyana kesekî dilşad bûn. **Tiştên wisa bi min xweş nayên, lê Xwedê ya rastî hez kiriye, bi wê ketina wê min **ji keva gazî kir**.*

Ji kevir nermtir çi hebe xwarin
1. Di xwarinê de cudatî nekirin. **2.** Zehf çilek bûn. **Maşelah Sinbil **ji kevir nermtir çi hebe dixwe**. *Mele Casim wekî hirçekî, **ji kêvir nermtir çi hebe dixwe** û xelas dike.*

Ji kcvirê hesteyan ketin (Kevirê hesteyan jê ketin)
1. Gelek zehmet û eziyet kişandin. **2.** Zehf feqîr bûn. **Heya me xwe ji wê belayê rizgar kir, **kevirê hesta ji me ketin**. *Rewşa malbata Rizgoyê Fesîh wer xera bûye, ku **kevirê hesta jê dikevin**.*

Ji kcvjalê re gotin: "Tu çima xwar bi rê ve diçî?" Got: "Keysa min hew jê tê."
Ew qas ji destê min tê. **Heyran hûn çi ji min dixwazin? **Ji kevjalê re gotin: "Tu çima xwar bi rê ve diçî?" Got: "Keysa min hew jê tê."***

Ji kevjalê pirsîn: "Çima tu li yan li yan bi rê ve diçî?" Got: "Pêşî bireşî ye."
Yên ku hûn nizanin hene, tiştên xerab li pêşiya min in. **Heyran her kes bi xwe hesabê xwe dizane. **Ji kevjalê pirsîn: "Çima tu li yan li yan bi rê ve diçî?" Got: "Pêşî bireşî ye."***

Ji kewna xwe ketin
Bandor kêm bûn, hikim derbas nebûn. **Piştî teqawîtbûnê Qadir **ji kewna xwe ket**.*

Ji kezebê gotin (Ji kezebê axaftin)
Ji dil û can axivîn. Bi dilsozî anîn ziman. **"Ji ber ku helbesvan **ji kezebê diaxive** û kezeba xwe radixe. Îcar helbestkez jî wekî pisîka birçî ya dilkezeb, bê serî li helbestê digere."*
Adar Jiyan

Ji kezebê nalîn
Gelekî êşîn. **Ji dest jina xwe Emerê Seyrê **ji kezebê dinale**.*

Ji kê re dibêjim birawo, ji min re dibêje biraxwaro.
Li hemberî niyeta erênî ya neyînî dîtin. **Çima gelo, **ji kê re dibêjim birawo, ji min re dibêje biraxwaro**.*

Ji kêfa mewîjan, dil çû guhîjan
bnr. Dil dibijiya goştê kerê, digot "Guhên wê wekî yên kêrgûhan in."

Ji kêfan firîn

Pir şad bûn. **Dema ku min bihîst neviyê min bû, ez **ji kêfan firîm**.*

Ji kirasê mirovatiyê derxistin

Xistin rewşeke ji asahiyê dûr. Gelekî lê dan an jî guherandin. **Her çar lawên Simko ew **ji kirasê mirovatiyê derxistibûn**.*

Ji Kirê Gewro[*] daketin jêr

1. Îkna bûn, qebûl kirin. **2.** Ji hovbûn û bêtêşetiyê hinekî dûr ketin. **Berê li esmanan digeriya, lê baş e, wa ye ji **Kirê Gewro daketiye jêr**. *We çawa kiriye? Wa ye ew nexeritandî hinekî ji **Kirê Gewro daketiye jêr**.*

Ji Kirê Gewro hatin

Ji bo kesên nezan û hov dibêjin. **Kuro ew hureme, nikare bipeyîve jî tu dibêjî **ji kirê Gewro hatiye**.*

Ji kit û nîva xwe nehatin xwarê

Ji inyada xwe venegerîn. **Dinya bû yek, ew **ji kit û nîva xwe nehat xwarê**.*

Bi kîjan pêxemberî bawer dike belî nebûn

Ji bo kesên ne bibawer tê bikaranîn. **Qet garisê xwe nedin ser warîsê Tahar, ew **bi kîjan pêxemberî bawer dike ne belî ye**.*

Ji kîr û quzekî ketin

Exrebeyê hev û din ê pir nêzîk bûn. **Ma tu kesekî xerîb di nav me de heye? Em gişk **ji kîr û quzekî ketine**.*

Ji kîsê bavê xwe çûn

Bê sedem û ji bo tiştên ne hêja mirin, telef bûn. **Ew belengaz hema li cihekî tune **ji kîsê bavê xwe çû**.*

Ji kîsê kirim, xweş dibirim.

Ji bo kesên bi malê hinekên din qencî û xêrê dikin tê gotin. **Bi malê xelkê qencî kirin pir hêsan e, çi gotine, **ji kîsê kirim, xweş dibirim**.*

Ji kîsê xelkê xwarin

Bê zehmet û beleş pêk anîn. **Weleh kêf kêfa wî ye, **ji kîsê xelkê dixwe**.*

Ji kîsê xwe dixwim, ji xelkê re şîretan dikim.

bnr. Nanê xwe dixwim, şîretan li xelkê dikim.

Ji kîsê xwe xwarin

Ziyana xwe bi xwe kişandin. **Wî çi kir, bi xwe kir. Di dawiyê de **ji kîsê xwe xwar**.*

---

[*] **Kirê Gewro:** Li hêla Serhedê di navbera parêzgeha Îdirê navçeya Bazîdê de çiyayek asê. xalî ye. Ev çiya wekî nîşana hov bûn, nezanîn û asêbûnê li herêmê tê binavkirin.

Ji koka xwe qetîn (Ji kok û binyada xwe qetîn)
Ji qewın, lêzim an jî ji welatê xwe dûr ketin. **Ma hindik bû? Ew **ji koka xwe qetî** û bûn ûcûheyekî nedîtî.*

Ji kokê ve birîn
Bi awayekî radîkal nêzîk bûn. **Belê min got, got lê min negot hema **ji kokê ve bibire**.*

Ji komê Sarkîs nas kirin
Yê ku herî lê nayê û berevajî ye hilbijartin. **Ez çawa bikim heyran? Lawê min çû **ji komê Sarkîs nas kir**.*

Ji kul û derdan, rû berdan
Rewşên xerab, encamên xerab dertînin. **Wî rebenî jî zelîf rojên xerab derbas kirin. **Ji kul û derdan rû berdan.***

Ji kûçikan minekartir bûn
1. Ji bo pêwîstiyekê yan jî hewcedariyekê amade bûn. **2.** Ji bo kesên şareza ku zanebûna xwe di heman demê de pêşkêş dikin jî tê gotin. **Ew zarokên Baro **ji kûçikan minekartir in**. *Tu hela devê xwe veke, mêze bike bê çawa **ji kûçikan minekartir in**.*

Ji lingan heya sêrî
bnr: Ji sêrî heta binî

Ji mala heqiyê neqetîn
bnr: Hevalê rastiyê bûn

Ji mala xwe têrnan e, ji mêrê xwe têrgan e.
Her daxwaz û pêdivî miyaser bûn. **Ma êdî wê çi bixwaze, **ji mala xwe têrnan e, ji mêrê xwe têrgan e**.*

Ji malê, yekî qalê
Ji her malekê yek karê zibaretiyê pêk bîne, bes e. ****Ji malê, yekî qalê.** Ku pev re kar bê kirin, dê zûtir biqede.*

Ji mehûjekî (mewijekê) mesherek girêdan
bnr: Ji mewijekî kergeyek kelandin

Ji mela bang dan
Her kes ancax dikare kar û pîşeyê xwe pêk bîne. **Ma te çi jê hêvî dikir? **Ji mela bang dan.***

Ji merivan hesibandin
Rûmet dan. **Ma çima min Seyîdxan **ji merivan hesiband**, xerabiyek kir?*

Ji meriyetê rabûn
Ji zagon û yasayên heyî derketin. **Ew zagon **ji meriyetî rabûye**, êdî tu bandora wê tune.*

Ji mesrefê nerevîn

Pêdivî çi be, kirin. *Ya Xwedatî ew ne mirovekî wisan e ku **ji mesrefê bireve**.

Ji mewijekî kergeyek kelandin
bnr. Ji hebek tirî mehserek çêkirin

Ji meydanê ketin
Têk çûn. Kêm bûn. *Êdî dema wî derbas bû, êdî ew **ji meydanê ket**.

Ji mêran mêr, ji jinan jin bûn
Bi her du awayan jî pêk anîn. *Ji wî re çi? Ew **ji mêran mêr, ji jinan jin e**.

Ji mêranî ketin
1. Ji mêrên ku di hêla zayendî de qels dibin re tê gotin. **2.** Zêde tirsîn. *Dibêjin Xoşeng **ji mêranî ketiye** û jina wî jî li cem nasekine. *"Gava min pişta wî cendekê birîndar quliband, tevzînokên sawnak ketin nava min. Qirika min zuha bû, bêhn li min çikiya. Ku gotin rast be, hinekî **ji mêraniya xwe jî ketibûm**." Evdile Koçer

Ji min e, lê ne li min e.
Belê dola min e lê ne wekî min e. *Rast e, min gihand, lê mixabin **ji min e, lê ne li min e**.

Ji min ketiye, li pêşiya min dihere.
bnr. Ji mino, li mino.

Ji mino, li mino.
Belê min mezin kiriye, lê zilm û neheqiyê li min dike. *Ev çi bela ye min bi xwe aniye serê xwe? ***Ji mino, li mino!***

Ji mirinê filitîn
Ji mirinê xelas bûn. *Vê carê bi rastî jî **ji mirinê zor filitîm**.

Ji mirinê vegerîn
bnr. Ji mirinê filitîn

Ji mirinê wê de çi heye?
Ya herî mezin û xeter mirin e, ez ji wê re jî amade me. *Heyran ez li hember wan amade me, ma **ji mirinê wê de çi heye**?

Ji mirovatiya xwe şerm kirin
Ji ber bûyereke pir şermî aciz bûn. *"Mirov **ji mirovatiya xwe şerm dike** ku van rojan bi bîr bîne." M. Rauf Çiçek

Ji mirovatiyê derketin
Ketin rewşek perîşan û xerab. *Ji dest wan zarokên xwe yên rezîl Nûro **ji mirovahiyê derket**.

Ji mista xwe derxistin
1. Firsend revandin. **2.** Malê xwe serf kirin, ji destê xwe derxistin. *Ew jî poşman bûn,

lê ***ji mista wan derket***. **Lê mêze kir ku ziyana wî dê çêbibe, ew pez hemû* ***ji mista xwe derxist***.

Ji mîratê re gotin: "Tu diçî ku derê?" Got: "Cihê ku bikaribim bixim mîrate."
Xerabî li xerabiyê digere. Mîrate gelek caran rewşê lap mîrate dike. **Xwedê kesî li hêviya mîrata mehêle.* ***Ji mîratê re gotin: "Tu diçî ku derê?" got: "Cihê ku bikaribim bixim mîrate."***

Ji mûyekî werîsek çêkirin
1. Tiştên pir piçûk, pir mezin kirin. **2.** Destberdayî û bitedbîr bûn. **Heyran bes e êdî. Te* ***ji mûyekî werîsek çêkir***. **Maşelah jina wî yeke wisan e ku* ***ji mûyekî werîsekî çêdike***.

Ji nan û avê bûn
bnr. Ji nan û avê qut bûn

Ji nan û avê qut bûn
Tiştek nexwarin û venexwarin. **Ev çawa nexweşî ye nizanim, di navîna du rojan de keçika min* ***ji nan û avê qut bû***.

Ji nanê xwe bûn
Ji kar derketin. Kar ji dêst çûn. **Ma ew kirinên wî ji çi re bû derman? Tenê ya ku bû ew bû ku,* ***ji nanê xwe bû***.

Ji nav ... derketin
Xwe jê veqetandin. Têkiliya xwe jê birîn. **Tu bi ya min bikî, tu yê* ***ji nav wî karî derkevî,*** *xêra ku ji wan tê, bila ji Xwedê bê.*

Ji nav hesaban derxistin
1. Bi tiştekî nehesibandin. **2.** Ji rewşa asahî borandin. **Madem ku wî ez* ***ji hesaban der-xistim,*** *divê ez jî wekî wê bersivekê bidim. *Me got, lê me negot ew qasî* ***ji hesaban jî derxîne***.

Ji nava xwe têr bûn
Bi xwe ewle bûn. **"Di pirsa tecrûbe û zanîna xwe ya li ser otêlan de, tu car dor nedida kesî, çimkî di vê yekê de* ***ji nava xwe têr bû***." Felat Dilgeş

Ji navê xwîn çûn
Gelekî li ber xwe ketin, xemgîn bûn. **Ez baş dizanim ku* ***ji navê xwîn diçe,*** *lê li hemberî dost û dijminan li xwe nade der.*

Ji nexweşan re çûn berfê
Ji bo karên lezgîn tê bikaranîn. (Lewre berf zû dihele.) **Maşelah Resoyê Xunavê wer çeleng e ku dikare* ***ji nexweşan re biçe berfê***.

Ji nêz de bêhn ji devê (yekî) hatin
Gelekî birçî bûn. **Di wê rêwîtiyê de* ***ji nêz de bêhn ji devê me dihat***.

Ji nêz de ketin

bnr: Ji nêz de bêhn ji devê (yekî) hatin

Ji nêz de mirin
bnr: Ji nêz de bêhn ji devê (yekî) hatin

Ji nigê nig ve vegerîn
Ji cihê çûyî pir zû vegerîn. **Jixwe em zêde nesekinîn, hema em **ji nigê nig ve vegerîn**.*

Ji nîva xwe nehatin xwarê
bnr: Ji kit û nîva xwe nehatin xwarê

Ji nû ve bismillah
Dîsa di serî de dest pê kirin. **Heke ku nebû em ê bêjin **ji nû ve bismilah** û çêkin.*

Ji nû ve ji diya xwe bûn
Zêde serfiraz û rehet bûn. **Dema ku lawê min ew dibistan qezenc kir, te digot, ez **ji nû ve ji diya xwe bûm**.*

Ji nû ve hatin dinyayê (Ev biwêj bi tirkî ye. "Yeniden doğmak")
bnr: Ji nû ve ji diya xwe bûn.

Ji Nûh û Nebî de man
bnr: Di dema qal û belayê de man

Ji orta Quran'ê xeber dan
A rast gotin. **Qet nexeyîde, mêrik hema **ji orta Quran'ê xeber dide**.*

Ji paniyê xwîn nehatin (Ji paniyê xwîn nehatiye ku dil bişewite)
Ne exrebeyê nêzîk e ku dil pê biêşe. **Ji wî re çi, ew dikare her tiştî jî bibêje. **Ji paniyê xwîn nehatiye ku dil bişewite.***

Ji par re hanêmanê, ji pêr re korpoşmanê.
Ji dûr ve xweşik xuyandin, lê ji nêzîk ve sosret û bedcure bûn. ****Ji par re hanêmanê, ji pêr re korpoşmanê.** Ew jî şansê belengazê wî kurapê min ê piçûk bû.*

Ji parxanên (yekî) girtin
Xeyîdîn, şikestin. **Wan gotinên xwîşka Zerê wisa **ji parxanên Çeto girtin** ku rengê wî hate guherandin.*

Ji paş ve xwezî ya minê, ji pêş ve xwelî li serê minê
Xuyang û rastî ne wekî hev bûn. **Gava ku Bedran piştî ew keçik ji nêzîk ve dît, hema ji xwe re got: **"Ji paş ve xwezî ya minê, ji pêş ve xwelî li serê minê."***

Ji paşiya êlê girtin
Ji bo kesên ne bedew, qemer û bêqedir tê gotin. **Tu dibêjî ku ew **ji paşiya êlê girtine**.* (qerf)

Ji perê esmanan hatin

Pir cuda û taybet bûn. **Helbet Mihyedîn jî wê têkeve dorê, ma ew* ***ji perê esmanan hatiye?*** (qerf)

Ji pertav ketin

Ji hêz û taqetê ketin. **Êdî kal bûye,* ***ji pertav ketiye.***

Ji pey qûna (yekî) neqetîn

Gelekî bi kesekî ve zeliqîn. Di radeya acizkirinê de bi kesekî re têkildar bûn. **Erez êdî bi şev û roj* ***ji pey qûna wê matoşqê naqete.***

Ji pezê pir, ma kavira kur.

Ji bo kesên ku berê zengîn bûne lê dû re ketine rewşa xizanî tê gotin. **Ez rewşa wî dizanim.* ***Ji pezê pir, ma kavira kur.***

Ji pêla xwe nehatin xwarê

Dev ji gotina xwe bernedan. **Kî kete navberê jî, ew* ***ji pêla xwe nehate xwarê.***

Ji pêsîrê kirin

bnr: Ji şîr birîn

Ji pêş çavan neçûn

Tim xeyal kirin, tim li ser fikirîn. **Ez çi dikim bikim, ew* ***li pêş çavên min naçe.***

Ji pêş çavên xwe avêtin

Ji ber sedemekê êdî girîngî nedan yekî, dev jê berdan. **Piştî wê bûyerê, Ferzende ew* ***ji pêş çavên xwe avêt.***

Ji pêş (yekî) şerm kirin

Ji bo kesên di nav helwestên fedîkar de tê gotin. **Welat tiştinên wer eyb digotin ku min* ***ji pêş wî ve fedî kir.***

Ji pêz re gotin: "Derdê te deşt û çiyan e?" Got: "Na derdê min şivan e."

Ji bo hemû kesî ya girîng, têkiliyên nêzîk û kûr in. **Zêde bi kê re têkildar bim, ew ji bo min girîng e.* ***Ji pêz re gotin: "Derdê te deşt û çiyan e?" Got: "Na derdê min şivan e."***

Ji pira rastiyê qetîn

Ji heqî û duristiyê dûr ketin. **Heyfa Fexredîn ku ji wî temenî bi şûn de* ***ji pira heqiyê dûr ket.***

Ji pira rastiyê re derbas bûn

Rastî û mafdarî ispat bûn. **Ji Koço re tu gotin nemaye, ew* ***ji pira rastiyê derbas bûye.***

Ji piran pir, ji hindikan hindik

Her kes û her tişt li gorî çendahî û tibaba xwe encam dide. **Her kes wekî quweta xwe lawo,* ***ji piran pir, ji hindikan hindik*** *diçe.*

Ji pirça însên însan nas kirin

Ji bo kesên pisporê însanan in tê bikaranîn. **Ew mirovekî wisan e ku* ***ji pirça însên însan nas dike***.

Ji pisîkê re gotine gûyê te derman e, wê jî gotiye elba wê bizêran e.
Hinek ji ber pesnan xwe winda dikin. **Ya wê jî bûya ya pisîkê.* ***Ji pisîkê re gotine gûyê te derman e, wê jî gotiye elba wê bizêran e.***

Ji pişta bavê xwe nebûn
Wekî bavê xwe nebûn. **Tu dibêjî qet* ***ji pişta bavê xwe nîn e***.

Ji piştê ve qelişîn
Gelekî dexesî kirin. **Xwe zelîf nade xuyan lê ez dizanim, çima ku min ev xelat girt, ew* ***ji piştê ve qelişî***.

Ji piştstû ve serjê kirin
Li hemberî kesekî gelekî bikîn û buxz bûn. **Hêrsa Xanimê wisa ji Gogê re tê ku dixwaze wê* ***ji pişt stû ve serjê bike***.

Ji piştstû ve şerjê bike dil rehet nabe.
bnr: Xwînê fir bike, dil rehet nabe.

Ji piyên xwe re sivik bûn
Çapik û çeleng bûn, bi lezgînî meşîn. **Kes nikare bi wî re bimeşe, ew* ***ji piyên xwe re pir sivik e***.

Ji pîrî, hatiye nêrî.
Ji bo helwesta kal û pîran a ku serê pîran di hêla zayendî de dixe rewşeke eletewş tê bikaranîn. **Qet qala wê meke, jinik* ***ji pîrî, hatiye nêrî***.

Ji pozê şêr ketin
1. Ji bo mirovên qure û xwe zêde diecibînin tê gotin. **2.** Ji bo kesên xurt û çak tê gotin. **Tu li forsa vî kûçikî binêre, tu dibêjî* ***ji pozê şêr ketiye***. **Du lawên wê hene, maşelah tu dibêjî her du jî* ***ji pozê şêr ketine***.

Ji pozê şeytên ketin
Pir zana û çavbel bûn. **Faysal wisa kone ye, ku tu dibêjî* ***ji pozê şeytên ketiye***.

Ji qalikê xwe derneketin
1. Ji şerman an jî ji dest tirs û tadeyê deng dernexistin. **2.** Ji mala xwe derneketin. **Keçik ji sehma bavê xwe nikare* ***ji qalikê xwe derkeve***. **Jixwe ew wisan e, heya tiştekî girîng nebe,* ***ji qalikê xwe tu car dernakeve***.

Ji qal û belayê xeber dan
1. Ji dema berê xeber dan **2.** Ji tiştên mezin xeber dan. **Kî wekî wî jiyaye, ew* ***ji qal û belayê xeber dide***. **Eman dev ji wî mêrikî berdin lo! Wa ye,* ***ji qal û belayê xeber dide***.

Ji qantirê re gotin: "Bavê te kî ye?" Got: "Hesp xalê min e."
bnr: Gotin: "Gurî çima porê te tune?" Got: "Porê xaltîka min gur e."

Ji qapaniya xwe daneketin
Ji fors û rûmeta xwe derbas nebûn. **Eferim ji wî re, çiqas tişt di serî re derbas bûn, dîsa jî **ji qapaniya xwe daneket**.*

Ji qatûtya (xela) mêran, navê dîkan danîn Evdirehman.
Mirov ji bêgavî bi tiştên ne resen û kêm jî îdare dikin. **Em jî bêgav man. Çawa dibêjin? **"Ji qatûtya mêran, navê dîkan danîn Evdirehman."***

Ji qedera xwe razî bûn
Bi dilxweşî nebe jî rewş pejirandin. **Dilê Mexpûlê tune bû, lê di rûyê bavê xwe de **ji qedera xwe razî bû** û ew nîşanî pejirand.*

Ji qedir û qîmet ketin
Bêrûmet bûn. **Çima ku keça wî wisa kir, ew **ji qedir û qîmet ket**.*

Ji qehran xwe diavêje behran.
Ji ber derd û kulan, tiştên nemayî û ecêb kirin. **Aso dest bi eraqê kiriye; çawa bike rebenî **ji qehran xwe diavêje behran**.*

Ji qewet birîn
Ji hêz xistin, bê taqet kirin. **Jinikê ew di nava mehekê de **ji qewetê birî**.*

Ji qewetê der bûn (zêde bûn)
Ji zerengî û hêzê zêdetir bûn. **Helbet min jî dixwest ez tenê wî karî bikim, lê Xwedê jî dizane ku **ji qeweta min der e**.*

Ji qewet ketin
Bêhêz û bêtaqet bûn. **Piştî wê nexweşiyê ez **ji qewet ketim**.*

Ji qewet xistin
bnr: Ji qewet birîn

Ji qewm û lêzimên xwe man
Ji kok û binyada xwe qetîn. **Mirov ku **ji qewm û lêzimên xwe bimîne**, pir zor e.*

Ji qeyd û bendan xelas bûn
Serbest û azad bûn. **Andok ancax **ji wan qeyd û bendan xelas bûye**, qet disekine?*

Ji qêf seqet bûn
Dîn, kêmaqil û gêj bûn. **Ev lawik **ji qêf seqet e**, xwe jê biparêze.*

Ji qirêjê mar vereşîn
Pir pîs û qilêr bûn. **Malxerabo wisa pîs e, ku **ji qirêjê mar vedireşin**.*

Ji qirika xwe birîn
bnr: Ji dev û diranê xwe birîn

Ji qirika xwe girtin
bnr: Ji dev û diranê xwe birîn

Ji qirikê jî ji belikê jî bûn
bnr: Hem ji dêrê, hem ji mizgeftê bûn

Ji qudûm ketin
Ji hêz ketin, bê taqet man. **Wê xebatê wisa kir ku ez **ji qudûm ketim***.

Ji Quran'ê kirasek li xwe kir, dîsa jî kesî jê bawer nekir.
Ji bo kesên derewîn û sextekar tê gotin. **Sertif **ji Quran'ê kirasekî li xwe bike, dîsa jî kes jê bawer nake***.

Ji qûlan (cvd) şerm nekirin
Bêar bûn. **Tu dê ji mirovên **ji qûlan şerm nekirî** re çi bibêjî?*

Ji qûna xwe xolî bûn
Ji kesên zû dixeyîdin re tê gotin. **Eman tiştekî jê re nebêjin. Jixwe **ji qûna xwe xolî dibe***.

Ji qûnê fihêt dikir, tir nedikir.
Ji bo kar û ramana çiloçepî tê bikaranîn. **Ew jî mirovekî wisa ye, **ji qûnê fihêt dikir, tir nedikir***. (qerf)

Ji qûnê ketin
Şibandin. Ji dolê bûn. **Ew jî **ji qûna wê ketiye**, ma nabînî eynî wekî wê dibêje.*

Ji rastiyê neqetîn
Durist û dadwer bûn. **Ew ne mirovekî wisan e ku **ji rastiyê biqete***.

Ji refê xwe qetîn
Ji qewmê xwe, ji êl û eşîra xwe, ji malbat û hevalên xwe dûr ketin. ** *"Ez **ji refê xwe qetiyame**, ketime rêyeke hatenehatê.."* Veysel Çamlıbel

Ji rehetiya can pê ve rehma Xwedê
A girîng rehetiya can e. **Êdî ji wê zêdetîr tu çi dixwazî? **Ji rehetiya can pê ve rehma Xwedê.***

Ji rex re derbas nebûn (Di rex re derbas nebûn)
Ji bo kesên bêhnteng û bieks tê gotin. **Qurban, ka Felemez çi jehr e, mirov newêre **ji rex re derbas bibe***.

Ji rê der bûn
Ne asahî bûn. Ne ji yên ji rêzê bûn. **Ya ku Mistoyê Bedir dibêje jî **ji rê der e***.

Ji rê derketin
bnr: Ji rê û dirban derketin

Ji rê derxistin
Yek xistin nav kar û barên nerast. **Wê Eyşana Cemîleyê keçika Zezê jî **ji rê derxist***.

Ji rê man
Bi derengî ketin. **Heke ew ne bindest bûna, ew qas* ***ji rê nediman****.*

Ji rê û dirban derketin
Ji ya asahî dûr ketin. Wekî zagon û rêçikên civakê hereket nekirin. **Îsal jî Yargul tam* ***ji rê û dirban derketiye****.*

Ji rê xalifîn
bnr: Ji rê derketin

Ji rêzê der bûn
Wekî asahî û surişt nebûn. **Ew kirinên wî ji rêzê der bûn, ji bo wê jî gelekî bal dikişandin.*

Ji riya heq derketin (Ji riya rast derketin)
bnr: Ji riya Xwedê ketin

Ji riya Xwedê ketin
Ketin nav helwestên neheq û nebaş. **"... ma tu* ***ji riya Xwedê ketiyî*** *ku welê dikî gazî?"* Osman Sebrî

Ji riya (yekî) derketin
Ji bo berdana jinekê yan jî mêrekî astengî dernexistin. **Jinikê lê mêze kir nabe, lewma* ***ji riya mêrê xwe derket****.*

Ji rovî re gotin: "Tu bûyî padîşahê mirîşkan." Rovî tilinc da, girî û got: "Ez ji şansê xwe ne bawer im."
Carinan ji hinekan re derfetên baş dertên, lê ew xwe bi naziyê dixin. **Ew jî xwe wisa nîşan didin.* ***Ji rovî re gotin: "Tu bûyî padîşahê mirîşkan." Rovî tilinc da, girî û got: "Ez ji şansê xwe ne bawer im."***

Ji ruhê xwe aciz bûn
Zivêr bûn. **Vê jinikê wisa kir, ku ez* ***ji ruhê aciz bûm****.*

Ji ruhê xwe bihurîn (derbas bûn)
1. Aciz bûn. **2.** Ji bo xwefedakirinê amade bûn. **Zozanê wisa kir, ku Xalid* ***ji ruhê xwe bihurî****. *Ji bo azadiya welatê xwe, ew xort û keçên ciwan* ***ji ruhê xwe bihurîn****.*

Ji rû xwe kirin
Ji ser serê xwe avêtin. Girîng negirtin. **Wê gelek tişt digotin, lê di wê dema teng de* ***ji rû xwe kir*** *û pişta xwe dayê û çû.*

Ji rûmet ketin
Bêrûmet û bêqedir bûn. **Wî jî wisa nekira,* ***ji rûmet nediket****.*

Ji rûmet xistin
Bê rûmet kirin. **Wê dêla bêheya, havê xwe yê wekî teyrekî spî* ***ji rûmet xist.***

Ji rûyê (yekî) jehr barîn

1. Pir hêrs bûn. **2.** Rengiz û cirnexweş bûn. **Di wê têkiliyê de **ji rûyê Zeynel jehr dibariya**. *Ji rûyê Aydilê jehr dibare, dê çawa bê hez kirin?*

Ji rûyê (yekî) nûr barîn

Ji wech xuyang û hestekî erênî weşîn. **Bi xuyangê jî kifş e ku ew mirovekî baş e, ma tu lê nanihêrî **ji rûyê wî nûr dibare**?*

Ji rûyê (yekî) re nedîtin

Ji ber rûmet an jî ji sedemeke din ji kesî daxwaza karekî nekirin. **Tenê meta Besna li ba min bû, dilê min li ser min diçû, lê min **ji rûyê wê re nedît** ku ez bibêjim ji min re şerbetekê çêbike.*

Ji rûyê me dike, li simbêlê me dixe.

Bi derfetên yekî qencî bi yekî kirin. **Erê, ew jî xwe wekî xwedîqencî nîşan dide, lê **ji rûyê me dike, li simbêlê me dixe**.*

Ji rûyê (yekî) xêr nehatin

Bêkêr û bedoxir bûn. **Xêr **ji rûyê wî nayê**, tu bi ya min bikî qet pê re nekeve têkiliyê.*

Ji seba nefsê, kete hepsê.

Ji bo kesên bi nefsa xwe nikarin tê gotin. **Bi rastî astenga li ber mirovan a herî mezin nefs e. Wa ye Evdilrehîm jî **ji seba nefsê kete hepsê**.*

Ji sed cihî birîndar im, êdî nikarim bêjim sax im.

Ji bo rewşa pir xeter tê gotin. **Van ez xwarim. **Ji sed cihî birîndar im, êdî nikarim bêjim sax im.***

Ji ser a xwe nehatin xwarê

Inyad kirin. Dev ji gotina xwe bernedan. **Ew gund hemû bû yek, lê dîsa jî ew **ji ser a xwe nehat xwarê**.*

Ji ser a xwe neketin

Ji bilî gotina xwe ya tu kesî nepejirandin. **Min jê re yeko yeko îspat jî kir, lê dîsa jî ew **ji ser a xwe neket**.*

Ji ser hişê xwe ve çûn

bnr. Ji xwe ve çûn.

Ji ser kerê de ketin

Ketin rewşek nebaş. Bi şermî ketin. **Rewşa ku Keleş ketiyê bi rastî jî zor e, belengazî **ji ser kerê de ketiye**.*

Ji ser kewna xwe ketin

bnr. Ji kewna xwe ketin

Ji ser pişta xwe avêtin

Xwe ji astengiyekê rizgar kirin. **Di dawiyê de Peldayê got, bes e û ew mêrik **ji ser pişta xwe avêt**.*

Ji ser riya xwe derneketin
Ji doz û ramana xwe neqetîn. **Di navberê de ew qas dem û ew qas bûyer derbas bûn, lê dîsa jî ew **ji ser riya xwe derneket**.*

Ji ser serê (yekî) neçûn
Aciz kirin. **Kuro ew çi bela ye, derketiye riya min, dikim nakim, **ji ser serê min naçe** yaho.*

Ji ser serê xwe def kirin
Qewirandin. **Ji ber wan kirinên wî, dê rojek li wir jî wî **ji ser serê xwe def bikin**.*

Ji ser ve Elah Elah, ji bin ve Neûzibilah
bnr. Ji ser ve tûtik û şûtik, ji bin ve rişk û nûtik

Ji ser ve tûtik û şûtik, ji bin ve rişk û nûtik
Ji bo tiştên xuyangxweş, lê bingeh xerab tê bikaranîn. **Tu wisa li xuyanga wê mêze neke, Xwedê dizane, **ji ser ve tûtik û şûtik, ji bin ve rişk û nûtik**.*

Ji ser şûrê tazî venegerîn
Xwe li bela û qotikan dan. **Jixwe ew wisa ye, tim **ji ser şûrê tazî venagere**, ka Xwedê dawiya dê wî çawa bike.*

Ji ser xwe avêtin
Binbarî hilnedan, ji ser serê xwe def kirin. **Belê mijareke girîng bû jî lê wê **ji ser serê xwe avêt**.*

Ji ser xwe re tu kes nedîtin
bnr. Di ser xwe re tu kes nedîtin

Ji ser zirtê xwe de ketin
Li ber xwe dan. Têkçûn nepejirandin. **Wan kir û nekir, ew dîsa jî **ji ser zirtê xwe de ket**.*

Ji serê heft (heftê û heft) bavê (yekî) zêdetir bûn
bnr. Ji serê (yekî) zêde bûn

Ji serê xwe derbas bûn
Mirin dan pêş çavên xwe. **Ji xwe ew di wê oxirê de **ji serê xwe derbas bû**.*

Ji serê xwe derketin
Bitrî bûn, xwe winda kirin. **Hingî ku bûye serokê Kooperatîfê, Cemşît **ji serê xwe derketiye**.*

Ji serê xwe têr bûn
Hakimî kar û barê xwe bûn. Bi serkeftî pêk anîn. **Tu nekeve tatêla wê, ew **ji serê xwe têr e**.*

Ji serê xwe zêdetir xeber dan
bnr. Ji xwe mezintir xeber dan

Ji serê (yekî) zêde bûn

Ji yê li hember piçûktir û bêhêztir bûn. *"Çi xem! Çi derd, çi dinya! Seriyek pîvaz, nan û dew, ***ji serê me zêde bû***, ew bû her ew."* Felat Dilgeş

Ji serî heta binî
bnr. Ji serî heya piyan

Ji serî heya piyan
Tev de, hemû, giştî. **Ne yek an jî dudu, di vê hewldanê de azîneya wan **ji serî heya piyan** çewt e.*

Ji serî kelek goşt derketin
Ji bo kesên kêmaqil tê bikaranîn. **Malavawo, tu çi ji wî hêvî dikî? Tu bawer bike, di şûna mêjî de wê **ji serê wî kelek goşt derkeve**.*

Ji serî kirin
Ji ber teşqele û axaftinê aciz kirin. **Wan zarokên wê malê **em ji serî kirin**.*

Ji serî zêde bûn
Ji ya heyî razî bûn. **"Ango wê hingê ku em xwe pê de berdin, divê em dev ji tiraliya xwe berdin. Ew jî **ji serê me zêde ye**, wisa nîn e?"* Kawa Nemir

Ji simêla xwe fedî nekirin
Ji mêraniya xwe fedî nekirin. **Tu ji wê zarokê fedî nakî, **ji simbêla xwe fedî bike**.*

Ji siya (yekî) tirsîn
Ji yekî gelekî tirsîn. **Tu wisa li lafekiya wî menêre, ew **ji siya Felemez ditirse**.*

Ji siya xwe sil bûn
Ji bo kesên gelekî newêrek tê gotin. **Bi zimên kes bi wî nikare, lê **ji siya xwe sil dibe**.*

Ji siya xwe tirsîn
bnr. Ji siya xwe sil bûn

Ji siya xwe xeyidîn
Bi xwe ji xwe xeyîdîn, pir xeydok û mizmiz bûn. **Mala Seyranê neşewite, hema **ji siya xwe jî dixeyîde**.*

Ji sola xwe re gotin
Raz ji tu kesî re negotin. **Te eyb kir, tu ji min bawer be, **ji sola xwe re bibêje** wê yekê.*

Ji star ketin (xistin)
1. Pir hincirîn, belawela bûn, teqaze bûn. **2.** Ji hêla aborî de ketin rewşeke xeter. **Wê qundaxê wisa kiriye ku bûka reben **ji star ketiye**. *Heya Xelef ew bûk anî, bavê keçikê ew **ji star xist**, debara wî ya rojane jî nema.*

Ji şekir taltir gotinek negotin
Ji bilî tiştekî xweş tu tiştên xerab negotin. **"Heta wî çaxî **gotineke ji şekir taltir ji hev re negotibûn**."* Süleyman Demir

Ji şeyê hîro ketin
Ketin rewşeke xirab. Pir eziyet kişandin û betilîn. **Belengazê Tahar di wê meseleyê de wisa bû ku **ji şeyê hîro ket**.*

Ji şêniya mezin bûn
Ji malbateke girîng û maqûl bûn, biesil û esas bûn, zadegan bûn. ****Heke ew jî li şêniya mezin nebûya**, ew dilnizmî nîşan nedida.*

Ji şîr birîn
Ji bo zarokên ku diya wan êdî wan namêjîne tê bikaranîn. **Şikir, êdî zaroka te mezin bûye, divê tu **ji şîr bibirî**.*

Ji şîr qetandin
bnr: Ji şîr birîn

Ji şîr ve kirin (Şîre ve kirin)
bnr: Ji şîr birîn

Ji şîrî heta pîrî
Ji piçûk heta mezinan. **Ew silaleyek derewîn e, **ji şîrî heya pîrî** hemû derewan dikin.*

Ji şorê derketin
Ji hed derbas kirin. Ji qeysa asahî derxistin. **"Wî heta niha ji Cemo re dabû hev û îşev êdî her tişt **ji şorê derketiye**."* Musa Vazgali

Ji ta heta derziyê
bnr: Ji derziyê heta deziyê

Ji tama ... têr nebûn
Pir lê xweş hatin. Di nav daxwaza careke din de bûn. **Ew **ji tama wê jinikê têr nebûye**. Bawer im ku wê careke din here wir.*

Ji taqet ketin
Gelekî betilîn. **Pêmerkirina wî baxçeyê Zerîfe Xanimê wisa zor bû ku ez **ji taqet ketim**.*

Ji taqet xistin
Bê hêz kirin. Ji hal xistin. **Bi wan dek û dolaban wan dixwest ku min **ji taqet bixin**, lê min ji zû de hergira xwe girtibû.*

Ji tarîtiyê derketin
Ji nepeniyê rizgar bûn. **"Bi xêra 'Jînê' ev bûyer **ji tarîtiyê derket** û gihîşt ronayiyê."* M. Emin Borzarslan

Ji te re dirêj be ji min re bi erdê re dikişe.
Heke ji te re ne xem be, ji min re qet nîn e. **Min got, em wî barî hilnegirin, lê heke **ji te re dirêj be, ji min re bi erdê re dikişe**.*

Ji te viço, ji min jî viço.

Tu çawa, ez jî wisa. **Xebûr ji Zeynel re got,* ***ji te viço, ji min jî viço.***

Ji teêla (yekî) girtin

Ji gotinekê yan jî kirinekê aciz bûn û tengijîn. **Wan gotinên Rewşenê* ***ji teêla (tehêla) Wardekê girtin****, loma wisa teşiya xwe hilda û çû.*

Ji tehmê derxistin

Ji hedê asahî û xwezahî derbas kirin. **Berê helwesta Tahar baş bû lê dîr re* ***ji tehmê derxist.***

Ji tengasiyê derxistin

Ji rewşa asteng û neyînî rizgar kirin. **A rastî heke Mistefê dest neavêtayê, Rosto zor* ***ji wê tengahiyê derketa****.*

Ji teraqiyê ketin

bm: Ji kewna xwe ketin

Ji teresbûna kûçikê me, rovî qula xwe li ber dîwarê me çêkiriye.

Yê ku berpirsyar e, heke vatiniya xwe bi cih neyîne, ji kesên dilnexwaz re rê vedibe. ****Ji teresbûna kûçikê me, rovî qula xwe li ber dîwarê me çêkiriye.*** *Divê valahî pêk neyên, ku pêk hat dê bê tijîkirin.*

Ji tesîra zana, Xweda bir ezmanan

Ji zanebûn û şarezahiyê Xwedê jî serfiraz dibe. ****Ji tesîra zana Xweda bir ezmanan.*** *Ji zanebûnê Xwedê û pêxember jî memnûn dibin.*

Ji tewşan xeber dan

Ne bi aqil û feraset, vala xeber dan. **Tu guh nede wî jixwe hema ew* ***ji tewşan xeber dide****.*

Ji text ketin

Erk winda kirin. **Êdî şeyê wî naxebite, ew jî* ***ji text ketiye****.*

Ji text xistin

Bandor û erk ji dest derketin. **Wan di vê dawiyê de Xembar jî* ***ji text xistin****.*

Ji tevn û teşiyan re na weleh, ji qulopanî re eywalah.

bm: Tevn û teşî dilê min diêşî, diçe avê çirtik diavê.

Ji teyran, ew ne tu teyr e.

Li gorî rewş û radeya ku ew tê de ye ew ne tiştekî metah e. **Min wer nizanibû, lê wisa tê xuyan ku* ***ji teyran ew ne tu teyr e****. Me bi diyarî û xelatên mîna heyat, ruh, hiş, mirovatî û mumîniyê xemiland."* Mucteba Baravî

Ji tiliya xwe bibêhn bûn

Hay pê hebûn. **Tu wisa li wî menêre, ew* ***ji tiliya xwe bibêhn e****.*

Ji tirikan derketin

Pir lêdan xwarin. **Lawê Simko wisa li Zerdeşt dabû,* ***ji tirikan derketibû****.*

Ji tirsa kûçikan newêre here gund dibê: "Şev reş e."
Gelek caran mirov a rast nabêjin, lê li şûna wê ji xwe re hincetan diafirînin. **A rastî ne ew e.* ***Ji tirsa kûçikan newêre here gund dibê: "Şev reş e."***

Ji tirsan li qula mişkan gerîn
Pir tirsîn. **Dema ku leşker diketin gund Emrah* ***ji tirsan li qula mişkan digerî.***

Ji tiştekî re bûn derman
Ji tiştekî re bi kêr hatin, bûn çareserî. **Şikir ji Xwedê re, wa ye Sefkan jî* ***ji tiştekî re bû derman.***

Ji tu gûyî re bi kêr nehatin
Bi kêrî tiştekî nehatin. **Heçiya Rosto ye* ***ji tu gûyî re bi kêr nayê.*** (argo)

Ji tunebûna şêran, rovî xwe nîşan dikin wekî mêran.
Ji bêgavî, bi ya heyî îdare kirin. **Em çawa bikin ji bilî wê tu riya me tune bû.* ***Ji tunebûna şêran, rovî xwe nîşan dikin wekî mêran.***

Ji vê dinyayê nebûn
Hay ji der û dora xwe û ji bûyeran nebûn. **Malxirabî, wisa bêxem e ku tu dibêjî tu* ***ne ji vê dinyayê yî.***

Ji vê pê ve xeberoşk in.
A rast tenê ev e. Yên ji vê pê ve tev de pûç in. **Min ji te re ya rast got. Bawer bike* ***ji vê pê ve xeberoşk in.***

Ji vir heta mala Xwedê
Bi awayekî vebirî, sedî sed. **Heyran, min bi çavên xwe ew bûyer dît, Zerîfe* ***ji vir heta mala Xwedê neheq e.***

Ji viran kî miriye
Derew kirin ne karekî pir zor e. *****Ji viran kî miriye****, mêze kir ku rewş hinekî tevlihev e, wisa ji xwe re li hev anî.*

Ji xamê derxistin (Nû ji xamê derxistin)
1. Nû ji rewşa awarte ya xweş derxistin. **2.** Baş gihandin. Ji dozê re amade bûn. **Kifş e ku wî ew* ***nû ji xamê derxistine****, ma nanihêrî çawa dibiriqe? *Wî hespa xwe* ***nû ji xamê derxistiye****, loma wisa pê bawer e.*

Ji xelaya Nebî filitîn
Pir birçî bûn. **Hêdî bixwe kuro, qey tu* ***ji xelaya Nebî filîtî****?*

Ji xelayê derketin
Gelekî çavçil bûn. **Kuro tu dibêjî ji* ***xelayê derketiye****, ne zik têr dibe, ne jî çav têr dibin.*

Ji xelkê re cih û war e, ji min re erdê sar e.
bnr: Ji xelkê re edet e, ji min re qebhet e.

Ji xelkê re dengbêj e, ji min re (ker û) gêj e.
Ji bo xwe na, lê tenê ji min re kêrhatî nîn e. **Ez jî nizanim çima wisa ye, **ji xelkê re dengbêj e, lê ji min re gêj e**.*

Ji xelkê re edet e, ji me re erbet e.
bnr: Ji xelkê re edet e, ji min re qebhet e.

Ji xelkê re edet e, ji min re qebhet e.
Ez bêşans im. **Ew jî şans e, ezbenî. **Ji xelkê re edet e, ji min re qebhet e.***

Ji xelkê re gul e, ji xwe re derd û kul e.
bnr: Ji xelkê re xerat e, ji xwe re malmîrat e.

Ji xelkê re filc ye, ji xwe re gule ye.
bnr: Ji xelkê re xerat e, ji xwe re malmîrat e.

Ji xelkê re hêkan dike, ji xwe re zilqan dike.
bnr: Ji xelkê re xerat e, ji xwe re malmîrat e.

Ji xelkê re hût e, ji xwe re kût e, ji hevalê tucarê rût e.
bnr: Ji xelkê re xerat e, ji xwe re malmîrat e.

Ji xelkê re jîr e, ji xwe re kor e.
bnr: Ji xelkê re xerat e, ji xwe re malmîrat e.

Ji xelkê re masîgiro, ji xwe re kûsîgiro.
bnr: Ji xelkê re xerat e, ji xwe re malmîrat e.

Ji xelkê re pir e, ji xwe re gir e.
bnr: Ji xelkê re xerat e, ji xwe re malmîrat e.

Ji xelkê re pirbêjo, ji xwe re ker û gêjo.
bnr: Ji xelkê re xerat e, ji xwe re malmîrat e.

Ji xelkê re pispor e, ji xwe re kor e.
bnr: Ji xelkê re xerat e, ji xwe re malmîrat e.

Ji xelkê re purşûnga şîr e, ji xwe re mişkê kor e.
bnr: Ji xelkê re xerat e, ji xwe re malmîrat e.

Ji xelkê re xerat e, ji xwe re malmîrat e.
Kêra (sûd) wî digihîje xelkê, lê ji xwe re xêra wî nîn e. ***Ji xelkê re xerat e, ji xwe re malmîrat e.** Belê, kêra wî digihîje her kesî, lê tenê xêra wî ji wî xwe re tune.*

Ji xewnê hişyar bûn
Ji rewşeke xweş an jî ji xeyaleke rengîn derbasî rewşa rasteqîn bûn. Ji bo berevajî wê jî dibe. *"Te çi kir! Mîna ku her çar li benda wê gotinê bin û **ji xewneke reş şiyar bibin**, ji cih hatin avêtin."* Pîr Rustem

Ji xwarinê bûn
Xwarin nexwarin. **Ji eşqa keçika Gurcî, Mûsa **ji xwarinê bû**.*

Ji xwe beran qezî kirin
Vala û pûç peyivîn. **Wê çi bibêje, hema **ji xwe beranan qezî dike**.*

Ji xwe dernexistin
Di derka bûyîn an jî hebûna tiştekî de nebûn. **Bi nexweşiyeke xeter ketibû, lê wê heya vê dawiyê jî **ji xwe dernexistibû**.*

Ji xwe dûr xistin
Têkilî birîn an jî sar kirin. **Nizanim çi difikirî, lê hêdî hêdî ew **ji xwe dûr xist**.*

Ji xwe fihêt bûn
Ji bo mirovên, bi şanaz û giran tê bikaranîn. **Xezal keçeke wisa **ji xwe fihêt e**, ku mirov jê re heweskar dimîne.*

Ji xwe mezintir xeber dan
Gotinên ne di radeya xwe de gotin. Ji hedê xwe raborandin. **Qet qala wî nekin. Ew **ji xwe mezintir xeber dide**.*

Ji xwe razî bûn
Bi xwe re lihevhatî bûn. **Jinik **ji xwe razî ye**, wisa zû bi zû nakeve bin bandora hinekên din.*

Ji xwe re bargiranî kirin
Ji ber nezanî û çewtiyan karê xwe zêde û giran kirin. **Ya ku tê xuyan her ew e, ku tu bi vî awayî tenê **ji xwe re bargiranî dikî**.*

Ji xwe re deriyekî din (dîtir) dîtin
Çareseriyeke din, vebijarkek din dîtin. **"Lewre keçikên gundên me Heramiya, hin gihîştin hembêzên germ û yên mayî jî **ji xwe re deriyekî dîtir dîtin**."* H. Kovan Baqî

Ji xwe re bûn
Jîr û pêkhatî bûn. **Heke Delîl hinekî **ji xwe re bûya**, niha dewlemend bû.*

Ji xwe re cih vekirin (Ji xwe re cih kirîn)
Ji bo armancên pêşerojê, amadehî kirin. **Ew çi şeytan e, bi wan kirinan ew tenê **ji xwe re cih vedike**.*

Ji xwe re dirî, ji xelkê re çavên xwe didirîne.
Ji bo helwesta ne di cih de û çavnebar tê gotin. **Ev çi mirovekî ecêb e, **ji xwe re dirî ji xelkê re çavên xwe didirîne**.*

Ji xwe re kirin bar
bnr: Ji xwe re bargiranî kirin

Ji xwe re kirin derd û kul

Zêde girîng girtin. **Meta min jî hema çi hebe **ji xwe re dike derd û kul** û dû re jî nexweş dikeve.*

Ji xwe re kirin kurm

Wekî cir an jî xislet pejirandin an jî bi kar anîn. **Berê me jî guh nedayê, lê me hew nihêrî ku ew yek **ji xwe re kiriye kurm jî**.*

Ji xwe re kirin micir

Wekî bawerî û raman pejirandin. **Perîşanê piştî lêkolîneke dorfîreh ew yek **ji xwe re kire micir**.*

Ji xwe re rêyek vejibartin

Ji bo çareseriya pirsgirêka xwe, der barê rêbazê de biryar dan. **Êdî divê ji vê saetê bi şûn de ez jî **ji xwe re rêyekê vejibêrim**.*

Ji xwe re rêyek vekirin

Ji bo pirsgirêka xwe çareseriyek dîtin. **Çawa bike qirikê? Wê jî **ji xwe re rêyek vekir** û tê de hêdî hêdî dimeşe.*

Ji xwe şerm nekirin

Ji bo kesên bêar û bêrê tê bikaranîn. **Kes wekî wî tune. Mirovê ku **ji xwe şerm neke**, tu dê çi jê re bibêjî?*

Ji xwe ve çûn

Ji ser hişê xwe ve çûn. Xewirîn, xeriqîn. **Ji dest birçî bûnê lawikê xwendekar ji nişka ve **ji xwe ve çû**.*

Ji xwe zêdetir bûn

Ji xuyanga xwe bêhtir bûn. **Yên ku Xelîl nas dikin, dizanin ku ew **ji xwe zêdetir e**.*

Ji Xwedê netirsîn, ji qûlan şerm nekirin

Bêînsaf û bêdad bûn. **Bi Adar re qet hevaltî dibe? Ew mirovekî **ji Xwedê netirs û ji qûlan şerm nekirî** ye.*

Ji Xwedê pê ve kesî nedîtin

Kesî rûmet nedan. Kesî guh nedan. **Di wê rewşa min a xerab de, **ji Xwedê pê ve kesî ez nedîtim**.*

Ji Xwedê taqet kirin

Ji gunehan netirsîn, ji Xwedê şerm nekirin. **Te çawa **ji Xwedê taqet kir** ku tiliya xwe dirêjî wî am û tamî kir?*

Ji Xwedî ye, ne ji doxê ye.

Her çi hebe ji Xwedê ye. **Tu çi dibêjî kuro, **ji Xwedê ye, ne ji doxê ye**.*

Ji xweliyan pelî, ji peliyan xwelî

bnr. Ji weliyan xwelî, ji xweliyan welî

Ji ya şeytên hatin xwarê

Hatin ser riya rast. Dev ji xerabiyê berdan. *"*Semsam gotê: 'Memo, bo xatirê Xwedê, nebe sedema xwîndariyê di navbera me de,* ***ji ya şeytên were xwarê.***" Eladdîn Secadî

Ji ya xwe daneketin

bnr. Ji yek û nîva xwe daneketin

Ji ya xwe nehatin xwarê

Dev ji gotin û armanca xwe bernedan. **"Tu caran* ***ji ya xwe nedihate xwar****, tawîz ji ya xwe nedida..."* Selman Dilovan

Ji yek û nîva xwe daneketin

bnr. Ji kit û nîva xwe nehatin xwarê

Ji yekî lê xistin, ji yekî lîstin

Divê her yek pêdiviyekê bike ku hev û din temam bikin. **Ma bi tenê ji hêlekê ve dibe?* ***Ji yekî lê xistin, ji yekî lîstin.***

Ji yekî pirsîn: "Te çima karê xwe pêk neanî?" Got: "Bi lawijan, ji dergûşan û bi tirê gamêşan."

Bi tiştên pûç û vala kar pêk nayên. ***Ji yekî pirsîn: "Te çima karê xwe pêk neanî?" Got: "Bi lawijan, ji dergûşan û bi tirê gamêşan."*** *Ka çawa kar pêk bê?*

Ji (yekî) re bavtî kirin

Ji kesekî re alîkarî kirin. **"Çav li serê wan fireh bûn. Tu dê* ***ji me re bavtiyê bikî****! Lê ew bi metanet û bi hêvî devbiken bû."* Talip Kalın

Ji yekî re jî ho, ji hezarî re jî ho.

Ku min ev kar kir, kêm an jî zêde derk nake. **Şivanê gund dixwest ku zêde pez biçêrîne, digot:* ***"Ji yekî re jî ho, ji hezarî re jî ho."***

Ji yekî re gotin: "Tu bext dixwazî yan text?" got: "Bext ku hebe, textê bi xwe (dê) bê."

A girîng, a bingehîn şans û bext e. **Ku bext hebe wê dûmahîk bê.* ***Ji yekî re gotin: "Tu bext dixwazî yan text?" got: "Bext ku hebe, textê bi xwe bê."***

Ji zar û ziman ketin

Zêde gotin, zêde axaftin. **Min wisa jê re got,* ***ji zar û ziman ketim****, lê tu tesîr lê nekir.*

Ji zarokan bûn (ji zarokan hişk bûn)

Ji bo jinên ku nikarin zarokan bînin tê gotin. **Piştî wê nexweşiyê, Kawê di wî temenê ciwan de* ***ji zarokan bû****.*

Ji zikê xwe birîn

Di hêla xwarin û vexwarinê de mesref kêm kirin. **Me lê mêze kir ku bi vî awayî nabe, me berê* ***ji zikê xwe birî****.*

Ji zikê xwe girtin

bnr. Ji zikê xwe birîn

Ji zikê xwe hez kirin
Çilek û nefsek bûn. **Ev jinik piştî ew qas qelewbûnê, hê jî **ji zikê xwe zêde hez dike**.*

Ji zikê xwe kêm kirin
bnr: Ji dev û dranê xwe birîn

Ji zikê xwe têr bûn
Bi xwe, xwe û rewşa xwe razî bûn. Bi xwe re lihevhatî bûn. **Bextewarî li serê wî be, digel ew qas tiştan dîsa ew **ji zikê xwe têr e**.*

Ji ziman ketin
Zêde axaftin. **Wê wisa xeber da ku **ji ziman ket**.*

Ji zimanê xwe ve saxlem bûn
Raz negotin, di tiştên veşartî de pê bawer bûn. **Berzencî **ji zimanê xwe ve saxlem e**, tu dikarî pê bawer bî.*

Ji zirtan ketin
Ji ber têkçûn an jî rewşa neyînî moral xera bûn. Mafê pesn û axaftinê di xwe de nedîtin. **Ji ber ku serokê wan hate girtin, ew **ji zirtan ketin.***

Jin biriye, hê qelen nebiriye.
Ji bo kesên deynê xwe nadin tê gotin. **Qet qala wî heqvermezî neke lo! Wî **jin biriye, hê qelen nebiriye**.*

Jin çav li der e, mêr xwelî li ser e.
Jin ku bi mêrê xwe re sadiq nebe, rewş xeter e. **Berevajiyê wê jî eynî ye, **jin çav li der e, mêr xwelî li ser e**.*

Jin çûn hewaran, mêr ketin kewaran.
Navê mêran derketiye, lê jin ji wan xurtir in. **Tu li xuyangê menêre, **jin çûn hewaran, mêr ketin kewaran**.*

Jin derkete ser serî, dê avête ber dêrî.
Gelek caran jin ku zêde rû hildidin, ji xwesû û xezûrên xwe re jî bêrûmetiyan dikin. ****Jin derkete ser serî, dê avête ber dêrî.** Rewşa Şabedîn jî ji wê zêde ne cuda ye.*

Jin dibêje: "Hevrişim e kirasê min, jehr e xwarina min.
bnr: Jin dibêje: "Cil ji zêr e, xwarin jehra mêr e."

Jin e, lê kirasê mêran qetandiye.
Mîna mêran e. **Çi jin e, çi jin e? Hema **jin e, lê kirasê mêran qetandiye**.*

Jin û mêr şer kir, kêmaqilan jê bawer kir.
Divê mirov bi şerê jin û mêran nexape, ew şer jî dikin, ji hev û din hez jî dikin. **Şerê mêr û jinan wekî pêdiviyeke jiyana hevbeş e. **Jin û mêr şer kir, kêmaqilan jê bawer kir.***

Jina bi kofî û kitan bûn

Jina bi taqî û gihîştî bûn. **Xanê **jineke bi kofî û kitan e**, lê bi vê hewldana xwe dibe pêşkeniya xelkê.*

Jina (yekî) bî hîştin

Mêrê jinekê kuştin. **"Ez ku hêrs bibim, sê mêran dikujim, paşê taştê dixwim. Ez **jina mirov bî dilhêlim**."* Harbi Soylu

Jina bî ye, dest li ber rû ye.

Ji ber paşgotiniyan, jinên bî zêdetir li ser xwe serwext dibin. **Çawa bike rebenê? **Jina bî ye, dest li ber rû ye.***

Jina mala bûn

bnr. Jina malkir bûn

Jina malkir bûn

Ji bo jinên pêkhatî tê gotin. **Ya Xwedatî, Eyşana Faris **jineke malkir e**.*

Jina mêrê çê ye, dinê jê re dê ye.

Mêr ku baş be, rewşa jinê jî baş dibe, li der û dor rûmeta wê zêde dibe. *****Jina mêrê çê ye, dinê jê re dê ye.*** *Têkiliya mêr û jinê pir girîng e.*

Jina mêrê çê, derî li ser piştê

Jinên ku mêrên wan xurt in, her kes jê vedikişin. *****Jina mêrê çê ye, derî li ser piştê,*** *dijmin jî her tiştî hesab dike.*

Jina mêrê xerab e, hem diz e, hem qaw e.

Mêr ku xirab be, rûmet û qedrê jinê jî kêm dibe. *****Jina mêrê xerab e, hem diz e, hem qaw e.*** *Helwesta mêr a li hemberî jinê, bandorê dide ser xuyanga derve jî.*

Jina qul û bexşeyan bûn

Ji bo jinên di riya xerab de tê gotin. **Ew **jina qul û bexşeyan e**.*

Jina tiyê min, destê min hişt, hat rûyê min.

Ji bo hewldanên çiloçepî tê bikaranîn. **Jixwe ew kesên ecêb jî rastî min tên. **Jina tiyê min, destê min hişt, hat rûyê min.***

Jinbavê jina bavê, birçî me li ber dolabê.

Ji bo zilm û eziyeta jinbavan û zorbûna karê dolabê tê bikaranîn. **Sêwîtî û derdê jinbavan bi rastî jî zor e. Loma gotine: **"Jinbavê jina bavê, birçî me li ber dolabê."***

Jinê ruhikê, dayê huhukê (buxukê)

Ji bo mêran, jin ji dê girîngtir e. *****Jinê ruhikê, dayê buxukê.*** *Erê lawo, ez têdigihîjim ew jî tiştekî asahî ye.*

Jinê were kokila minê, ez ê te bigerînim li dora dinê.

Ji bo kesên ji jina xwe zehf hez dikin tê bikaranîn. **Maşelah, hema Balıadîn tim dibêje:*

"Jinê were kokila minê, ez ê te bigerînim li dora dinê."

Jineke min heye, li mala bavê xwe ye.
Ji bo tiştên kêrnehatî û pûç tê gotin. **Got, **jineke min heye li mala bavê xwe ye**. Hevalo, em qala ya di dest de dikin.*

Jinik dibê mêro top li tekeve, mêrik eger ez ji ber tifikê derkevim.
Heta ku mirov firsend û derfetan ji neyaran re pêk neyîne, neyar nikarin tiştekî pêk bînin. *****Jinik dibê mêro top li tekeve, mêrik eger ez ji ber tifikê derkevim.*** *Heke ku ew neyê wê derê, ew yek jixwe pêk nayê.*

Jinikê got mela: "Mela, mehra min mehkem nebire, ez yeke dest û pê nesekinî me."
Bi min zehf bawer meke, ez yeke pir bi ewle nîn im. **Wisa tê xuyan ku ew jî dibêje: **"Mela, mehra min mehkem nebire, ez yeke dest û pê nesekinî me."*** (bnr. çîrok)

Jiyan lê heram bûn
Ji ber pirsgirêkekê, jiyan dijwar bûn. **Ji ber wê keçika wê ya bêar **jiyana li Gogê heram bû**.*

Jiyan lê reş bûn
bnr: Jiyan lê heram bûn

Jiyana xwe herimandin (Jiyan li xwe herimandin)
Ji ber çewtiyên xwe jiyana xwe dijwar kirin. **Zerdayê bi destê xwe **jiyana xwe heram kir**.*

Jor xemiland, jêr qefiland.
Ji bo helwestên berevajî tê gotin. ****Jor xemiland, jêr qefiland.*** *Mirov nizane Bedir li ser çi ye, li ber çi ye.*

Jûjî destê xwe li çêlikên xwe dide û dibêje: "Porê wan çi nerm e."
bnr: Jûjî çêlikên xwe miz dan û got: "Ez goriya pûrta we ya hevrîşîm bim."

Jûjî çêlikên xwe miz dan û got: "Ez goriya pûrta we ya hevrîşîm bim."
Ewledê her kesî bi wan şirîn û bedew e. **Her kes bi ya xwe razî ye. **Jûjî çêlikên xwe miz dan û got: "Ez goriya pûrta we ya hevrîşîm bim."***

Jûnî lê firîn
Ji taqet ketin. **Wê nexweşiyê wisa kir ku **jûnî li Ferat firî**.*

"Jinikê got mela: 'Mela, mehra min mehkem nebire, ez yeke dest û pê nesekinî me.'"

Jinikeke ku gelek mêr kirine û bêar hebûye. Ew jinik careke din ji bo birîna mehreke nû tê pêş mele. Ji ber ku mêrguherandin di jiyana wê de bûye karekî hêsan û ji rêzê. hê berî mehrê dema mele dike ku ji bo mehrê bixwîne. bi awayekî rehet û bêxem hêdîka di guhê mele de dibêje:
"Mela, mehra min mehkem nebire, ez yeke dest û pê nesekinî me."

K

Ka çû, ma dan.
Yên girîng dimînin, yên din diçin. **Va ye* ***ka çû, ma dan****. Em man bi serê xwe.*

Ka ne ya te ye, ma kadîn jî ne ya te ye?
Dibe lê ew qas jî nabe lo! Gotin ji binî ve rast derneketin. **Kuro lawo, ew qas jî nabe!* ***Ka ne ya te ye, ma kadîn jî ne ya te ye?***

Ka û dan tevlihev kirin
Pirsgirêkên cuda cuda li nav hev xistin. *****Tu kayê û dan tevlihev dikî.*** *Bi azîna te, em nikarin xwe bigihînin cihekî.*

Kabok li bin guhê hev û din ketin
Tevlihev bûn. Perîşan û bêpergal bûn. **Roja ku min ew nas kir jî hema dîsa* ***kabokên wî wisa li bin guhê hev û din diketin****.*

Kaf û yekûn bûn
Tar û mar kirin. Belawela bûn. **Piştî qezayê ew malbat* ***kaf û yekûn bû****.*

Kafir an jî misliman im, negotin
Dengê xwe nekirin. Tu helwest nîşan nedan. **Ya Xwedatî min çi got, wî li ber min* ***kafir an jî misliman im negot****.*

Kafirkeratî bûn
Serobinî hev bûn. Lê jehr bûn. **Di rûyê vî dînikî de dîsa şeva me* ***bû kafirkeratî****.*

Kafirkanî kirin (Kafristanî kirin)
Bêînsafî û bêdadî kirin. **Ya ku wan anî serê me,* ***kafirstanî bû****.*

Kafir kirin
Pere zêde xerc kirin. **Maşelah Sercan pereyên wî gêj baş* ***kafir kirin****.* (argo)

Kal (zebeş) dayîn piçengê
Ji bo armancekê yek nepixandin. Ne ji dil pesin dan. **Îbo ji bo ku Eyşanê têxe nav wî*

karê xwe yê qirêj, ***kal didane piçengê.***

Kal e, lê galegal e.
Belê temenê wî zêde ye, lê li ser xwe ye. **Tu baş lê mêze bike. Erê* ***kal e, lê galegal e.***

Kalbûnê li min kar kir, xortaniyê mala xwe li cem min bar kir, qîzan rûyê xwe ji min guherî, bûkan dilê xwe ji min sar kir.
Dema ku mirov kal an jî pîr dibe, hemû şanîder (gösterge) rewşeke neyînî didin xuyandin. **Kal bûn zor e lawo! Çawa xweş gotiye hozanê nemir* ***Evdalê Zeynikê:*** ***"Kalbûnê li min kar kir, xortaniyê mala xwe li cem min bar kir, qîzan rûyê xwe ji min guherî, bûkan dilê xwe ji min sar kir."***

Kalekal kirin
Pir xweş û zelûlî klam û stran gotin. **Fazîle li wir bi wî dengê xwe yê wekî zengil wisa* ***dikire kalekal****, her kes lê hewes û hejmekar ma.*

Kalê ji bênefsî, pîrê ji bêkesî, herduyan li hev pirsî.
Ji ber pêdiviyan têkilî pêş de birin. **Çawa bikin belengazan.* ***Kalê ji bênefsî, pîrê ji bêkesî, herduyan li hev pirsî.***

Kalê malê, rûmet li balê
Rûmet zêdetir a mezinan e. ***Kalê malê, rûmet li balê.*** *Ev jixwe zagona civaka me ye.*

Kalê tazî, tembûrê dixwazî.
bnr: Qûna tazî, tembûrê dixwazî.

Kalîna pêz li ber derî nehatin
**İnşelah, kalîna pêz li ber derê te neyê.* (nifir)

Kalo ji min dûr here, fişkîniya pozê te tê.
Kesên ciwan, ji rewşa kal û pîran fêm nakin û carinan wan kêm dibînin. **Erê bavo êdî kal bûme, ji min re dibêjin:* ***"Kalo ji min dûr here, fişkîniya pozê te tê."***

Kalo nemir bihar tê, pîrê nemir qîvar tê.
bnr: Pîrê nemir bihar tê, kero nemir qîvar tê.

Kamil bûn
1. Di hêla zayendî de hatina radeya asahî. **2.** Mezin bûn, gihîştin, li ser lingê xwe sekinîn. **Dev jê berdin, ew* ***kamil bûye****, helbet wê li pey qîzan bigere.* **Şikir neviyê min* ***kamil bûye****, ji kar û barê bavê xwe re dibe alîkar.*

Kana êqil bûn
Pir biaqil bûn. **Maşelah Hêlîna neviya min* ***kana êqil e****.*

Kanî miçiqîn
Dawî li hebûnê hatin. Xelas bûn, qedîn. **Gelekî li ber çavên we dihat, lê mizgînî ji we re, wa ye êdî* ***kanî miçiqî****.*

Kaniya çavên (yekî) der bûn

Gelekî girîn. **Bi wê xebera reş re **kaniya çavên Biharê der bûn** û bi wê re hemû kes giriya.*

Kaniya kilan bûn

Jêderka berheman bûn. **Ma ev **kaniya kilan e**, qurban?*

Kaniya rûpê xetimîn

Êdî ji vir bi şûn de ew berhem nîn e. **Bibore, lê êdî **kaniya rûpê xetimî**.*

Kap avêtin (Kap ji hev re avêtin)

Li hember hev ketin pêşwaziyê. **"Qey hûn ker û kor in... niha dinya giş li ser Kurdistana Iraqê **kaban diavêjin**."* Yaqûb Tilermenî

Kap[*] cot hatin

bnr. Kap mîr hatin

Kap çik hatin

bnr. Kap mîr hatin

Kapek xwarin

Bêhêz û bêtaqet bûn. **Çima te **kapek xwariye**, ku tu bi wî zarokî jî nikarî?*

Kapê goliktiyê di stûyê (yekî) de bûn

Hê piçûk û nezan e. **Ma ew hempayê min e? Hela hê **kapê goliktiyê di stûyê wî de ye**.*

Kapê gotiye: "Diya min yek e, bavê min yeke, heft rojan li ser min bar neke, paşê min di geliyan re wer ke."

Her tiştek demek gihandina wê heye. **Divê ecele mekî. **Kapê gotiye: "Diya min yek e, bavê min yeke, heft rojan li ser min bar neke, paşê min di geliyan re wer ke."***

Kapê (yekî) mîr hatin

Kar baş meşîn. Şans lê xistin. **Hela vê gavê **kapê wî mîr hatiye**, ka dawî çawa dibe?*

Kapê[**] (yekî) şidandin

Ji bo xeniqandinê hêz û hewldan nîşan dan. ** "Ez ê bêfîta Seyad û hevalê wî yê din bişînim Erzurimê, lê ez ê **kapê Şewket û Îbrahîm jî bişidînim**."* Veysel Çamlıbel

Kapmirûzî bûn (Kaprûzî bûn)

Mehdetehl bûn. Cirnexweş bûn. **Bi rastî ez ji destê vê jinika **kapmirûzî** çûm alûzarê.*

Kar dayîn ser gîsikê

bnr. Kar dayîn ser pisîkê

---

[*] **Kap:** Hestiyekî piçûk e ku ji çîpa pêz der tê. Zarok pê leyîzin.

[**] **Kap:** Bi tîpa "k" ya zirav tê bilêvkirin. Di wateya benê stûr an jî kindir de ye.

Kar pê nebûn

Bêzereng bûn. Ji destê yekî tiştek nehatin. *Zîvgîn keçeke ***karpênebû ye***.

Kar pê qedîn

Kar pê bûn. bizereng û hunerwer bûn. *Ew ne mirovekî wer piçûk e, ***kar pê diqedin***.

Kar sist girtin

Li ser karê xwe zêde bi girîngî nesekinîn. *Heke me di roja roj de ew ***kar ew qasî sist negirta***, bawer im ku îro ev astengî dernediketin pêşiya me.

Kar û barê xwe kirin

Ji bo debarê, di halê xwe de mijûl bûn. *Têkiliya te bi kesî neketiye. Tu tenê ***kar û barê xwe bike*** û hew...

Kara (kasa) te ji min re, kerema Xwedê ji te re.

Tenê bi rûmet û baweriyê tiştek nakeve bêrîka mirov. *Heyran dev ji felsefe, wêje û zanînê berde. ***Kara te ji min re, kerema Xwedê ji te re.***

Kara neçar, qoşilê daran

Kara kesên bêçare hindik dibe. *Mixabin kara kesên kêm derfet jî ancax ew qas e. ***Kara neçar, qoşilê daran.***

Kara xwe dayîn ser pisîkê

Ziyan kirin, îflas kirin. *Evdoyê reben ew qas salan ked da, lê piştî vê qeyrana Çilerê ya 5'ê Nîsanê, wî jî ***kara xwe da ser pisîkê***.

Karê (yekî) baş meşîn

Rewş baş bûn. *Xwedê hê jî zêde bike, ji ber ku ***karê wê baş dimeşe***, van rojan rûyê Fadîmeyê dikene.

Karê bêkaran çi ye?

Ji bo kesên bêkar û seserîtiyê dikin tê gotin. ****Ma karê bêkaran çi ye?*** *Ji xwe re heya êvarê arode arode digere.*

Karê (yekî) bi kesî neketin

Têkildarî kesî nebûn. *Ew di riya xwe de diçe, ***karê wî bi tu kesî nakeve***.

Karê li erdê dîtî bûn

Ji bo kar û barên pir hêsan tê gotin. *Ma ev jî kar e? Ev ***karê li erdê dîtî ye***.

Karê (yekî) ji ber neçûn

Kar baş pêk nehatin. *Bedir dikir nedikir, ***karê wî ji ber nediçû***.

Karê kerxesan kirin

Bê kar bê emel li holê gerîn. *Wê çi bike, ***karê kerxesan dike***.

Karê min bi xelkano, canê min bi Heseno, malê min bi talano.

Ji bo kesên dewlemend ku bi her awayî beleş dijîn tê gotin. ***Karê min bi xelkano, canê min bi Heseno, malê min bi talano.*** *Bi rastî jî karên axa û began gundî dikin, aqilmendiya wan hez dikin û mal û milkê wan jî jixwe yê talan û zilmê ye.*

Karê ne ji min re, bayê wî di serê min re

Ew karê ku ne yê min be û kêra wê negihîje min, ez çima serê xwe jê re biêşînim? **Ez çima serê xwe têxim demanê?* ***Karê ne ji min re, bayê wî di serê min re.***

Karê (yekî) pê neketin

Têkilî birîn. Jê dûr sekinîn. **Min çend caran got* ***karê te bi vê keçikê neketiye****, lê li min guhdarî nekir.*

Karê pir kirê, keziya xwe kur kirê

Ji ked û hewldana valaçûyî re tê gotin. **Min rebenê,* ***karê pir kirê, keziya xwe kur kirê****.*

Karê xwe, ji dûr ve meşandin

Ji bo kesên kone û zexel tê gotin. **Hay lo lo! Ew çi zana ye, ew* ***karê xwe ji dûr ve dimeşîne****.*

Karê xwe bi kesî neanîn

Bi kesî re têkildar nebûn. **Evdal mirovekî di halê xwe de ye,* ***karê xwe bi kesî nayîne****.*

Karê xwe bi xelkê kir, bi navê xwe kir.

Li ser keda hinekên din rûniştin. **Ew çi sextekar e.* ***Karê xwe bi xelkê dike, bi navê xwe dike.***

Karê xwe birin serî

Karê xwe bi serkeftî pêk anîn. **Kesî jê bawer nedikir, lê wê* ***karê xwe bire serî****.*

Karê xwe hêsan kirin

bnr: Barê xwe sivik kirin

Karê xwe meşandin

Cila xwe ji avê derxistin, çareya serê xwe dîtin. **Heke zelîf baş nebe jî, Delal* ***karê xwe dimeşîne****.*

Karê xwe pê qedandin

Kar û pêdiviyên xwe bi kesekî dan kirin, dû re jî pişta xwe pê de kirin. **Mêrikî* ***karê xwe bi me qedand****, ew hemû gotinên xwe ji bîr kirin û nîvê şevê revî û çû.*

Karê xwe pê neanîn

Têkildar nebûn. **Min çend caran ji te re got,* ***karê xwe pê neyîne****? Ew ne hempayê te ye.*

Karê xwe safî kirin

Karê xwe qedandin. **Heta ku tu wî* ***karê xwe safî nekî****, tu nikarî bêyî mala min.*

Karê xwe saz kirin

Karê xwe sererast kirin. **Welat pir zehmet dît, lê di dawiyê de* ***karê xwe saz kir****.*

Karê zarokan nebûn
Karên cidî û girîng bûn. **Divê hûn baş li ser bisekinin, ev* ***ne karê zarokan e****.*

Karkeran kar kir, xeraban benîşt cût.
Mirovên pêkhatî û xebatkar dixebitin, yên teral jî radizên. **Mixabin, li her dera cihanê were ye. Çawa dibêjin?* ***"Karkeran kar kir, xeraban benîşt cûtin."***

Karkero, kedkiro ji xelkê re
Ji bo kesên kêra xebata wan ne ji wan re lê ji xelkê re ye tê gotin. ****Karkero, kedkiro ji xelkê re.*** *Maşelah ji bo karê xelkê baş dixebite.*

Karkirê xweyo, hezkiriyê xelkêyo
bnr. Xebatkarê xweyo, şirînê li ber dilê xelkêyo

Karoz karoz, dîsa kerê boz
bnr. Eynî berf e, eynî çiftexas e.

Kasib ketin
Feqîr û xizan bûn. **Ew berê pir dewlemend bû, dû re* ***kasib ket****.*

Kasik û kafik bi ser de barîn

Kastekast kirin
bnr. Ewteewt kirin

Kaş û berkaş kirin
Kesek bi xwe re bi gerandinê re aciz kirin. **Wê jinikê bi cilve û nazan ew mêrikê reben bi xwe re* ***kaş û ber kaş kir****, welat bi welat gerand.*

Kaşan xwe kaşan dikişînim, ji mamanan (hevalan) namînim.
Ji bo xwegihandin radeya cîran û şirîkan, ketin nav hewldanên dijwar. ****Kaşan xwe kaşa ndikişînim, ji mamanan namînim.*** *Belê, xwe wer didim xuyandin, lê çi dikişînim, tu werê ji min bipirse.*

Kaşberkaş bûn
Li pey tiştekî yan jî kesekî perîşan bûn. **Ew jinik li pey wê keçika xwe, bi salan* ***kaşberkaş bû****.*

Kaşî xwe kirin
Têkiliyên zehf germ danîn. Birin hêla xwe. **Jinikê ew çiqasî* ***kaşî xwe kir*** *jî, wî xwe bi dêst ve herneda.*

Kavirên (yekî) belav bûn
Ji qêf seqet bûn. **Xwe nexe hevalê wê keça min, jixwe* ***kavirên wê belav bûne****.*

Kawa hebrîngê bi destê xwe xistin
Firsend bi destê xwe xistin. Bi ser ketin. **Ancax ku* ***kawa hebrîngê xistiye destê xwe****, êdî qet berdide?*

Kaxez jî ya te ye, qelem jî ya te ye.
Çawa dixwazî wer bike. ***Kaxez jî ya te ye, qelem jî ya te ye.** Dilê te çawa dixwaze wisa bike.*

Kaxeza gur e, ne kes dixwîne, ne kes guhê xwe didiyê.
Ji bo rewşa aloz tê bikaranîn. *Mixabin, ***kaxeza gur e, ne kes dixwîne, ne kes guhê xwe didiyê**.*

Kaxeza spî xwendin
Pir zane û şareza bûn. *Kî dikare bi wê re serederiyê bike? Ew ***kaxeza spî dixwîne**.*

Kaxiz li tîr pêçayî bûn
Bi dizî kar kirin . *Hay lo lo! Çi fesad e, ***kaxiz li tîra wî pêçayî ye**.*

Kaya kevn û teze dayîn bê
Meseleyên kevn û nû anîn holê. *Keçika min tu dixwazî teze ***kaya kevn û teze didî bê**, lê dema wê derbas bû.*

Keça gan, nîşan dayê didan.
Keçika ku têkiliya wê ya zayendî pêk bê, xwe dide xuyan dan. An jî jina ku têkiliya wê bi qehpiķiyê hebe, xwe dide nîşan dan. *Tu bisekine em ê niha bibînin; ***keça gan, nîşan dayê didan**.*

Keçelo mû bi serê te ve nîn e. Got: "Keziyên xaltiya min li qûnê dikevin."
bnr: Gotin: "Gurî çima porê te tune?" Got: "Porê xaltîka min gur e."

Keçelo navê min li navê te, kumê min li serê te
Ji bo şibandina ne di cih de û neheq tê gotin. *Ez çawa bikim, got ***keçelo navê min li navê te, kumê min li serê te**.*

Keçelo navê min li navê te, guriyo kumê min li serê te
bnr: Keçelo navê min li navê te, kumê min li serê te

Keçê ha keçê, çi di keçê de ma?
We wisa kir, keçik jî perîşan bû. ***Keçê ha keçê, çi di keçê de ma?** We ew qas keçik wekî henîşt cût, li encamê mêze bikin.*

Keçê ha keçê, kîrê min di keçê de ma.
bnr: Keçê ha keçê, çi di keçê de ma?

Keçik çûne halhala[1], zik tijî, tûrik vala
Ji bo karê bêkêr an jî xisirî tê gotin. ***Keçik çûne halhala zik tijî, tûrik vala**. Karê ciwanan jî ancax ew qas bibe.*

Keçik e, bipaşgotin û dûçik e.

---

[1] Halhal: Pincareke xwarinê ye li zonanan.

Di piştkeçikan de gelek tişt tên gotin. **Keçikên reben, wekî malê fîrotinê ne, ji bo wê jî dibêjin:* ***"Keçik e, bipaşgotin û dûçik e."***

Keçika li ser kerê, berî xwe tûyî min kir.
Bi xwe sûcdar bûn, di ser de bêarî û zordarî kirin. *****Keçika li ser kerê berî xwe tûyî min kir.*** *Ew jî azîna wê malbatê ye.*

Keçika pîr û xama, zik tijî û tûr vala
bnr: Keçik çûne halhala zik tijî, tûrik vala

Keçika rind, dane kund.
Kesên an jî tiştên xweşik li para ne xweşikan dikevin. **Ew jî qedera Xwedê ye,* ***keçika rind, dane kund****.*

Ked di avê de çûn
bnr: Keda (yekî) badilhewa çûn

Ked kiro, hed kiro, ji mala Qasê re
bnr: Kedkiro, keda xwe nexwaro

Ked tê de dan
bnr: Ked û ava (yekî) tê de çûn

Ked tê de derbas bûn
bnr: Ked û ava (yekî) tê de çûn

Ked û ava (yekî) tê de çûn
Ji bo tiştekî yan jî kesekî zehmetî kişandin. **Helbet ez ê bişewitim, çimkî* ***ked û ava min tê de çûye****.*

Ked vala çûn
bnr: Keda (yekî) badilhewa çûn

Kednexweş bûn
Cirnexweş an jî xwînsar bûn. Antîpatîk bûn. **Erê bedew e, lê* ***kednexweş e****.*

Keda (yekî) badilhewa çûn (Ked bade çûn)
Li hemberî keda xwe encamek negirtin. **Înşelah ew* ***keda min û zarokên min badilhewa naçe****.*

Keda (yekî) hêç kirin
Zehmet û ked bi tiştekî nehesibandin. Ked vala çûn. **Min ew qas salan xwîna xwe pê re xwar, wê ew* ***keda min gişt hêç kir****.*

Keda me keda şoşbîn e.
Ked û zehmeta me tim vala diçe, em bêşans in. **Jixwe* ***keda me keda şoşbîn e****, loma me tiştekî wer xweşik hêvî nedikir.*

Keda (yekî) winda kirin
Ked û zehmetê yekî înkar kirin an jî bi tiştekî nehesibandin. **Kazimê reben xwe jê re kire erd û xwelî, lê wê ew* ***keda wî bi carekê re winda kir****.*

Keda (yekî) xwarin
Dest dayîn ser ked û berhema yekî. **Hûn bi Xwedê, qala wî mekin. Wî* ***keda min xwar****.*

Kedkiro, keda xwe nexwaro
Ji bo kesên ku bedelê keda xwe nabînin tê gotin. **Weyla çavê diya te kor bûyê!* ***Kedkiro, keda xwe nexwaro!***

Kef bi devê (yekî) ketin
Pir hêrs bûn. **Piştî wan sixêfên Nado, ji hêrsan* ***kef bi devê Celîl ket*** *û firiya esmanan.*

Kefa dest xurîn
Ji bo zêdebûna pere û nesîb tê bikaranîn. **Weleh îro* ***kefa destê min dixure****, her hal pere dê têkevin destê min.*

Kefa destên xwe li hev dan
Bêçare man, ji dêst tiştek nehatin. **Mihyedîn mat mabû, nizanibû çi bike, hema* ***kefa destên xwe li hev dida*** *û li dor hev dizivirî.*

Kefa destê xwe bêhn kirin
Hay jê hebûn. **Tu ji ku dizanî, ma te* ***kefa destê xwe bêhn kiriye****.* (argo)

Kefa li ser kelkê bûn
Kar û hewldan bêkêr bûn. **Ew keda wan tenê* ***kefa li ser kelkê ye****.*

Kefen çirandin (dirandin)
Ji pirsgirêkeke pir mezin xelas bûn. **"Apê Reşo* ***kefen çirandibû****, lê hê jî ditirsiya. Mirov ne li ser axa xwe be tim ditirse. Li wî jî weha hatibû."* Selahattin Bulut

Kefenê min zerdin, çi ye serê min dikî şildim mildim?
Ji ber xuyang an jî kêmasiyekê, zêde bi ser yekî de çûn. ****Kefenê min zerdin, çi ye serê min dikî şildim mildim?*** *Ezbenî zêde bi ser min de neyê, tu dê ziyanê bibînî.*

Kefenê xwe dayîn piçenga xwe[*]
Mirin dayîn ber çavên xwe. **Di oxira serokê xwe de Îdo jî* ***kefenê xwe dabû piçenga xwe****.*

Kefenê xwe li ber serê xwe danîn
Ji mirinê re amade bûn. **Ji wî re ne xem e, jixwe wî* ***kefenê xwe li ber serê xwe daniye****.*

---

[*] **Kefenê xwe dayîn piçenga xwe:** Ji bo yên ku sûcdar in, lê piştî demekê ji bo lêborînê diçin xwe diavêjin mala dijminê xwe tê bikaranîn. Di çanda kurdan de ku yekî çend mêr kuştibin jî, dema ku xwe biavêje mala dijminê xwe, çi dibe bila bibe, di wê malê de kes ziyanekî nade wî û ji ber ku berê xwe daye mala dijminê xwe bi îhtimalek mezin tê baxişandin. Di dema lêborînxwestinê de bi rastî jî yê ku kefenê xwe dibin jî hene. Ev tê wê wateyê ku, va ye min kefenê xwe jî aniye, hûn dixwazin min bikujin, dixwazin bibexşînin.

Keftar (keftor) bûn
Kal an jî pîr bûn. **Hela tu li vî binêre,* ***keftar bûye****, lê hê jî li pey qîzan digere.*

Keftaro, li ber çavan diyaro
Va ye rewş li ber çavan e. **Pêdiviya gotinê ne hewce ye.* ***Keftaro, li ber çavan diyaro.***

Keko te jî qûn li pîrê dît?
Ew tişt, ew bûyer hat serê te jî? **Min hew dizanibû ku ez tenê me.* ***Keko te jî qûn li pîrê dît?***

Kela (yekî) rabûn
1. Coşîn, ji ber tiştekî erênî dilşad bûn, kêf kirin. **2.** Hêrs bûn. *****Piştî ku bihîst azmûn qezenc kiriye,*** ***kela Zeynel rabû****, dikir ku bifire. * "Sazbend ji nişka ve ker bûn, her kes behitî mabû, lê kesî sedemê* ***rabûna kela padîşa*** *nizanibû."* Zana Farqînî

Kela hesinî ye, li pişt mirov sekiniye.
Ji bo kesên bawer û bi hêz tê gotin. **Çi mineta wî heye, bavê wî* ***kela hesinî ye, li pişt wî sekiniye****.*

Kela dilê (yekî) danîn
Vepesirîn, hedûr hatin, amoş danîn. **Heya ku diya xwe nedît,* ***kela dilê lawik daneynî****.*

Kela dil rabûn
bnr. Kela dilê xwe verêstin

Kela dil vemirîn
bnr. Kela dil danîn

Kela dilê xwe berdan
bnr. Kela dilê xwe verêstin

Kela dilê xwe verêstin (Kerba dilê xwe verêstin)
Dilê xwe hênik kirin. Girîn. **Hesretê piştî delı salan ew hembêz kir û* ***kela dilê xwe verêst****.*

Kela (yekî) germ bûn
Bihêrs bûn. **Vê gavê* ***kela wî germ bûye****, zêde bi ser de neçin.*

Kela girarê çûn
bnr. Kela şîr çûn

Kela înkarê bûn
Tim rasteqînî înkar kirin. **Serhatê çi ye, kela înkarê ye, mirov çi jê re bike, hema hêç dike.*

Kela li ber çavê dijminan bûn
bnr. Kelemê li ber çavê dijminan bûn

Kela mêraniyê lê ketin
Wekî mêran tevgerîn. *"Îna rabû ser xwe, **kela mêraniyê lê da**." Nizar Mehemed Seîd

Kela (yekî) rabûn
bnr: Kela (yekî) tijî bûn

Kela şîr çûn
Dem û radeya kar derbas bûn. **Mixabin heta wî xwe li ba kir, **kela şîr çû**.*

Kela (yekî) tijî bûn
Kelogirî bûn. **Dema ku qala lawê xwe kir, **kela wî tijî bû**, xwe ranegirt û giriya, giriya...*

Kcda xwe bi ser de vala kirin
Hêrs û buxza xwe ji kesekî derxistin. **Kesî bi Mîrê Zirav nikaribû, heta ku **kela xwe bi ser Lezgîn de vala kir**, dû re sêkit bû.*

Kela xwe li serê (yckî) rijandin (rêtin)
Dilê xwe rehet kirin. **"Ma wê bi çîpa şervanan bigirin. Bi xwedê wê **kela xwe li serê me birijînin**." Çiya Mazî*

Keleseqafî bûn
Dînik û qafsar bûn. **Faris yekî **keleseqafî ye**, ji wî re çi şerd û şirûdên eşîrê?*

Kelek lê anîn
Jê parçeyek birin. **"Min **kelek li xwarinê anî**." Zana Farqînî*

Kcleka xwe di ser avê re derbas kirin
bnr: Cila xwe ji avê derxistin

Kelem ji destê (yekî) derxistin
Hinek kesên din ji bo kar û berjewendiyên xwe bi kar anîn. **Lawo tu çi dikî bike, çima **keleman ji destê min derdixî**?*

Kelemê li ber çavan bûn
Ji ber pêkhatî û hinek zerengiyên balkêş li ber çavên dilnexwazan zêde û mezin bûn. **Xwedê biparêze, keçika min bi vê zerengiya xwe, **bûye kelemê li ber çavan**.*

Kelemê li bcr çavê dijminan bûn
Li hemberî dilnexwaz û neyaran binirx û bibehremendî bûn. **Di nav wê malbatê de her yê ku **kelemê li ber çavê dijminan e**, tenê Balıoz e.*

Kelhî ne, bes tiştek li mala wan nîn e.
Qure û pozbilind in, lê xizan û birçî ne. **Ew jî, ew curemirov in. **Kelhî ne, bes tiştek li mala wan nîn e.***

Kelk li ser kurkê xistin
Zêde tiştek pêk neanîn. **Me ew şand ku wê meseleyê çareser bike, lê maşelah çû **kelk li ser kurkê xist**.* (qerf)

Kelka bi ro da bûn
Ji bo karên vala tê gotin. **Ew karê wê, hema* ***kelka bi ro de ye****.*

Kelkelo cihê te li ku ye? Got: "Ba dizane."
bnr. Gotin: "Kelkele tu li ku dimînî?" Got: "Ba dizane."

Kelogirî bûn
Çav tijî bûn, ji bo girînê çav şil bûn. **"Jina keşîş her du zarok hembêz kirin, ramûsandin, giriya, cariya wê jî* ***kelogirî bû****..."* Tîtal Mûradov

Kemala xwe ji bêkemalan stendin
bnr. Min ferasata xwe ji bêferasetan girt.

Kember daye piştê, li nav malan digere li teştê. (Kember li piştê, digere li teştê.)
Xuyang û naverok wekî hev û din nebûn. **Ev jî zêdetir ji nezaniyê ye, her hal.* ***Kember daye piştê, li nav malan digere li teştê.***

Kembera (yekî) tije bûn
Dewlemend bûn. **Kifş e* ***ku kembera wî tije ye****.*

Ken dike, fen dike.
Xwe xweşik dan xuyandin, lê ji bin ve jî karê xwe bi awayekî xinisî meşandin. **Bi wî bawer nebin, ew* ***ken dike, fen dike****.*

Kenê bêariyê pê girtin
Bê hemdî xwe û li cihê sekinî kenîn. **Hema di wê demê de* ***kenekî bêariyê bi Zubeyt girt û berneda****.*

Kenê bêxwê kirin
Ne ji dil kenîn, bi viran re bişirîn. **Zelalê* ***kenekî wisa bêxwê dikir*** *ku her kes jê aciz bû.*

Kenê guran pê hatin
Ji bo tiştên pir komîk tê gotin. **Zelîxan ketibû rewşeke wisa ku* ***kenê guran pê dihat****.*

Kenê miriyan pê hatin
bnr. Kenê guran pê hatin

Kenê xwe pê kirin
Tirane û henekên xwe pê kirin. **Berê heya êvarê xelkê* ***kenê xwe pê dikir*** *lê wî xwend, bû doxtor û ew dane şermê.*

Kengê bû mişk, di ku re (kingê) tûr qul kir?
Çi zû mezin bû û kar jî pêk anî? **Na lo! Ew qas zû jî nabe.* ***Kengê bû mişk, di ku re tûr qul kir.***

Keno, bêaro
Ken tiştekî wisan e, ku carinan li cihê qet ne pêwîst be jî tê mirov. *****Keno bêaro!*** *Hela tu bi Xwedê di vî halê xwe yê xerab de jî dikenim.*

Keno, bi xwediyê xwe xweşo

Xweşikayî wekî dîtina her kesî tê guherandin. **Di çavê te de wisa ye.* ***Keno, bi xwediyê xwe xweşo.***

Ker bi guh kirin

Yên ku divê pê nehesin, pê hesandin. **Min ji te re got,* ***keran bi guh neke****, lê hê tu her tiştî vekirî dibêjî.*

Ker bi xiyalekî, karwan bi xiyalekî

Her kesek wekî rewş û berjewendiyên xwe difikire. **Yê ser jî yê binî jî wekî xwe xeyalan dike.* ***Ker bi xiyalekî, karwan bi xiyalekî.***

Ker bikeve, diran dişkê.

Ji bo mala xizan ku vala ye û tu tiştek tê de nîn e tê gotin. **Ka maşelah, Berfo maleke wisa çêkiriye ku* ***ker bikeve diran dişkê****.*

Ker çi dizane zeferan çi ye?

Yên bêfêm ne jî xirabiyê, ne jî ji xweşikiyê fêm dikin. **Tu dixwazî rewşê bi wî bidî zanîn, lê* ***ker çi dizane zeferan çi ye****?*

Ker dikeve, dibêje: "Hela Xwedê!"

Her kes dema ku dikeve tengasiyê, xwe dispêre kesekî mezin. ****Ker dikeve, dibêje: "Hela Xwedê!"*** *Ew taybetiyek mirov e, dema dikeve tengasiyê Xwedê dikeve bîrê.*

Ker e, lê binger e.

Ji bo mirovên xinis û ji bin ve karan dimeşînin tê bikaranîn. **Tu wisa li xuyanga wî menêre ha, ew* ***ker e, lê binger e****.*

Ker ji şîretan çi fêm dike?

bnr: Ker çi dizane zeferan çi ye?

Ker kirî, ma kurtan.

Ma her tişt xelas bû, hema tenê ew ma? ****Ker kirî, ma kurtan.*** *Maşelah di malê de tasek ava sar nîn e, çûye fîrina lazerê kiriye.* (qerf)

Ker revî kurtan ket. (Kerê baz da kurtan ket.)

Ancax ku hincetek, sedemek ji xwe re dîtin. ****Ker revî kurtan ket.*** *Ji Selîm re jî qulpek derket ku destê xwe biavêjiyê.*

Ker û gêj bûn

Pir aciz bûn. Hay ji xwe tune bûn. **Ji dest wî dengê wê, ez* ***ker û gêj bûm****.*

Ker û gêj kirin

Bi axaftin an jî teşqeleyê aciz kirin. **Van jinan ez* ***ker û gêj kirim****.*

Ker û kurî li hev zirî.

Ji bo têkildarên di hempa hev de ne tê gotin. **Baş e, hema ancax ku wan hev û din dîtine,* ***ker û kurî, li hev zirî****.*

Ker û lal bûn (Ker bûn)
Bêdeng man. Helwestek nîşan nedan. **"Heta kengî em ê **ker û lal** bin?"Ferîd Îzol*

Ker û mekteb?
bnr. Hirç û govend, şivan û dîwan?

Ker û nefel.
Ji bo tiştên lihevhatî û layîq tê gotin. **Xwedê li hev aniye.* ***Ker û nefel.***

Ker û palas, ji hev xelas
Êdî pirsgirêk bi dawî bû. **Heyran min malên we ji hev cihê kirin,* ***ker û palas, ji hev xelas****, ji bilî wê daxwazeke we ma?*

Ker û qantir li hev li ba ketin, golik di nav lingan de çûn.
Yên mezin ku şer dikin, di navberê de yên piçûk ziyanê dibînin. **Rewşa van dewletên mezin û yên piçûk jî eynî wisa ye.* ***Ker û qantir li hev li ba ketin, golik di nav lingan de çûn.***

Ker xesandin
Vala gerîn. Ji bo kesên teral û miskîn tê bikaranîn. **Ma karê Sertîf çi ye? Qey* ***keran dixesîne****.

Ker zirî, dîwan zivirî.
Ji bo kar û rêxistinên bêbingeh tê bikaranîn. **Maşelah çi civîn e, çi civîn e,* ***ker zirî, dîwan zivirî****.

Kera ku barê min ne lê be, ez nabêjim, "Çoş!"
Heta berjewendiya min tê de nîn be, ez nalepitim. **Ev biwêja ku dibêjin:* ***"Kera ku barê min ne lêbe ez nabêjim, "Çoş!"*** *qet li min xweş nayê.*

Kera min dimire boçika wî dixure.
Çi dibe, bi min dibe, ma ji te re çi? ***Kera min dimire boçika wî dixure.*** *Ji wî re çi qurban?*

Kera min li garan e, pirsa min li şivan e.
Madem ku ew berpirs e, ew ê barê xwe ragire. **Ma ez ê ji kê hesab bipirsim?* ***Kera min li garan e, pirsa min li şivan e.***

Keran serê pirbêjan jêkiriye.
Yên ku zêde napeyîvin û bêdeng in, ji yê pirbêj bandortir in. **Tu wisa li bêdengbûna wî menêre,* ***keran serê pirbêjan jêkiriye****.

Kerba xwe jê derkirin (derxistin)
Hêrs û buxza xwe di yekî de rijandin. **Jixwe bi jina xwe re kiribû şer,* ***kerba xwe ji qîza xwe derxist****.

Kereke bi kurtan, di nav de derbas nebûn
Navber pir xweş bûn. **Maşelah, navbera wan wisan e ku* ***kereke bi kurtan di nav wan de derbas nabe****. (qerf)

Kerekî cendek nekişandin

Gelek lêdan xwarin. **Wisa li lawê Kazim dane ku* ***kerek nikare cendekê wî bikişîne****.*

Kerekî pîr bûn

Di hêla temen an jî fizîkî de mezin û gir bûn. **Kuro tu* ***bûyî kerekî pîr*** *hê jî bêyî dê û bavên xwe tu nikarî biryarekê bidî.*

Kerê berdayî bûn

bnr. Bêser û bêber bûn

Kerê bûtê, yek salî du kêl hilgirtin, bû du salî kêlek hilgirt.

Ji bo karên berevajî û eletewş tê bikaranîn. **Karê me karên berevajî ne.* ***Kerê bûtê, yek salî du kêl hilgirtin, bû du salî kêlek hilgirt.***

Kerê dehş anî neanî, bar ji ser pişta xwe hilneanî.

Ewled ji bo dê û bavan tim barê giran in. **Ma barê ewledan tênê heya mezinbûnê ye? Çawa dibêjin:* ***"Kerê dehş anî neanî, bar ji ser pişta xwe hilneanî."***

Kerê di kurtan de rî.

Kar xera bû. **Dibêjin keçika Mûsa bi kurê Aycanê re reviye, ew her duyên rezîl rastî hev hatine, teze* ***kerê di kurtan de rî****.*

Kerê digot: "Dengek tê." Caşikê digot: "Hinek tazî ne, dê me jî tazî bikin."

Yên ku tiştekî wan tune ye jî xwe bi tiştekî dihesibînin. **Ew jî ecêbek e,* ***kerê digot: "Dengek tê." Caşikê digot: "Hinek tazî ne, dê me jî tazî bikin."***

Kerê got: "Bar min nakuje, serbar min dikuje."

Tiştên mezin û girîng na lê yê piçûk û ne girîng zêdetir mirov aciz dikin. **Ji xwe ew tiştên wisa nayên kişandin.* ***Kerê got: "Bar min nakuje, serbar min dikuje."***

Kerê guhê berxê girt, (dîsa) kerê kir zirîn.

Hinek hem neheq in, hem jî ji mafdaran zêdetir barînî dikin. *****Kerê guhê berxê girt, dîsa kerê kir zirîn.*** *Jixwe ji dest zarîniya yên neheq, dinya dibe fîsildûman.*

Kerê kor jî fêm kirin

Her kes dikare têbigihîje. **Ew çi ye ku mirov pê nizanibe?* ***Kerê kor jî jê fêm dike*** *ku ew xercê kê ye.*

Kerê lawê kerê, av li berê, bikeve (bixe) serê, heb ji hebê bike derê.

bnr. Kuro kero ker ker e, ne min got cew li hember e, tu cewê berde sere, ew ê bi xwe xwe bide dere.

Kerê li nav garanê bûn

bnr. Gayê Xwedê bûn

Kerê me çû leterê, me got tişteke lê derê, hat dîsa eynî ew kerê berê.

bnr. Heciyên me çûn leterê, me got mêrekê jê derê, hat dîsa ew kerê berê.

Kerê me di axûra xelkê de dizire.
bnr: Dîkê min e, li ser kulîkê xelkê bang dide.

Kerê me ye, li ber derê xelkê dizire.
bnr: Dîkê min e, li ser kulîkê xelkê bang dide.

Kerê mirî bi mirov re kişandin (Bi mirov re mirarê kerê kişandin)
Bi dil û can ji kesekî re alîkarî kirin. **Ezîze jineke wisa baş û sadiq e, ku* ***kerê mirar bi mirov re dikişîne****.*

Kerê pê li gunikê kirin
Baz dan, revîn. **Kuro, tu dibêjî* ***keran pêl li gunikê kiriye*** *direve.* (argo)

Kerê pirbez, bû xwarê guran.
bnr: Ji rovî fenaktir tune, ji postê wî zêdetir tune.

Kerê pîr û ûnce (onca) teze
bnr: Ker û nefel

Kerê pîr, hevsarê sor (Kerê pîr, hevsarê rengîn)
Ji bo tiştên berevajî û ne layiqî hev tê bikaranîn. **Kuro lawo ev jî heqê Xwedê ye?* ***Kerê pîr, hevsarê sor****.*

Kerê reş, li ber danîn qaşilên zebeş, got: "Min divê welatê xweş."
Welat ji hemû tiştî şirîntir e. **Ma çi wekî welat şirîn heye?* ***Kerê reş, li ber danîn qaşilên zebeş, got: "Min divê welatê xweş."***

Kerê/a vî barî nebûn
Li gorî wî karî û wê zerengiyê nebûn. **"Lê na!.. Hekîmo nehiştibû ew here, gotibû: 'Tu* ***ne kera vî barê yî!****'.."* Dilawer Zeraq

Kerê xwe mehkem girê nedan
Karê xwe baş pêk neanîn. **Bi rastî kêmasiyên Baro jî gelek hene, divê mirov berê* ***kera xwe mehkem girê bide****.*

Kerê xwe sist girê dan
bnr: Kerê xwe mehkem girê nedan

Kergoşk û sûk?
bnr: Hirç û govend, şivan û dîwan?

Kergoşk dibeze û tajî dibeze, her du jî dibêjin: "Ya Xwedê!"
Her kes dicedîne ku ya xwe pêk bîne. **Helbet her alî jî serkeftinê dixwazin.* ***Kergoşk dibeze û tajî dibeze, her du jî dibêjin: "Ya Xwedê!"***

Kergoşk ji çiyê xeyidiye, çiya haj pê tune.
Hinek rewşê baş nanirxînin, hesabên çewt dikin û xwe dixapînin. **Belengazî ew jî xwe bi tiştekî zêde dihesibîne.* ***Kergoşk ji çiyê xeyidiye, çiya haj pê tune.***

Kergoşka beş bûn

1. Tim bal li ser bûn, pir kifş û xuyayî bûn. **2.** Bêşans bûn. **Ev malbata mala mele **kergoşka beş in**, herin ku derê kifş in.* ****Ez kergoşka beş im**, li wir jî ew karê herî zor hat ez ditim.*

Kergoşka xaman e, dev diçêre, çav li bazdan e.

Ji bo kesên ciwan û xeşîm tê gotin. **Ez çi bibêjim?* ***Kergoşka xaman e, dev diçêre, çav li bazdan e.***

Kergoşkê got: "Min da hevrazan, tira min bidin cambazan; min da berjêran, goştê min bidin ber kêran."

Ji bo teşeya kergoşkan tê gotin. **Wekî ku kergoşkê gotiye: **"Min da hevrazan, tira min bidin cambazan; min da berjêran, goştê min bidin ber kêran."** Di hevrazan de kes bi min nikare.*

Kerî berdaye, bi pey qerûş ketiye.

Ya mezin hiştiye, bi pey a piçûk ketiye. **Min ji te tiştek fêm nekir. Te **kerî berdaye, bi pey qerûş ketiyî**.*

Kerî bi kerîtî daye, di pey de qerûş qerûş e (qerûş qerûş dike).

bnr: Kerî berdaye bi pey qerûş ketiye.

Kermêjî bûn

Bêfem, gêj û efter bûn. **Van rojan Salo lap **kermêjî bûye**.*

Kero ji te re me, mêvano guhdar be.

bnr: Deriyo ji te re dibêjim, pişt deriyo tu guh bidiyê.

Kero kero, weke hero

Berê çawa bû bila wisa bimeşe. Dengê xwe meke. ****Kero kero, weke hero.** Ma ya rastî gotin tenê bi te maye?*

Kero, mêvanê hero

bnr: Kero kero, weke hero

Kerê û lalê, kela (wê) giha newalê.

Yên ku nikarin derdê xwe bînin ziman, derdê xwe diavêjin hundirê xwe, ji ber wê jî dikevin rewşeke hê xerabtir. **Rewşa wê bi rastî jî zor e.* ***Kerê û lalê, kela wê giha newalê.***

Kes di ser re tune bûn

Ji her kesî zêdetir û bizerengtir bûn. **Maşelah Heyder lawekî wisa ye, li Xwedê zor neçe lê* ***kes di ser re tune ye**.*

Kes di ser xwe re meriv hesab nekirin

bnr: Kes di ser xwe re nedîtin

Kes di ser xwe re nedîtin

Xwe zehf zêde dîtin. **"Xortek nûgîhayî bûm, nûpişkivî bûm, min **kes di ser xwe re nedidît**." Eladdîn Secadî*

Kes li bavê min napirse, her kes li diya min dipirse.
Her kes li pey berjewendiyên xwe ye. **Erê keko,* ***kes li bavê min napirse, her kes li diya min dipirse.***

Kes li ber çavên xwe nedîtin
1. Pir hêrs bûn. **2.** Xwe zêde hesibandin. **Kekê, min ku ew gotin ji wî bihîstin, êdî min* ***kes li ber çavên xwe nedît.*** **Ew bedcureyê xilîxar jî* ***kesî li ber çavên xwe nabîne.***

Kes li hemberî xwe nedîtin
Xwe ji her kesî zêdetir hesibandin. **Ka ew çi mirov e, tu* ***kesî li hemberî xwe nabîne.***

Kes nabêje Mendo, ker bi çendo.
Kes têkildar nabe, kes naxwaze yan jî bala kesî nakişîne. **Erê min jî xwest wisa bikim, lê* ***kes nabêje Mendo, ker bi çendo.*** (qerf)

Kes nekirî, kes nebirî, bi hev sitirî
Ji ber şerd û şirudên lihevhatî û ji bêgavî li hev û din xwedî derketin, têkildar bûn. **Em çawa bikin?* ***Kes nekirî, kes nebirî, bi hev sitirî.***

Kes nikare bibêje pozika sola te xwar e.
Bêhnteng bûn. Rexne nepejirandin. **Heval jineke wisan e ku* ***kes nikare bibêje pozika sola te xwar e.***

Kes nikare bibêje siya wî xwar e.
bnr: Kes nikare bibêje pozika sola te xwar e.

Kesekî giber bibe tune bûn
Kesekî alîkarî bike tune bûn. **Ev welatê gawiran e,* ***kesekî ji me re giber bibe tune.***

Keser di dilê (yekî) de çûn axa gorê
Keser di dil de man. **Mixabin ew* ***keser di dilê wê de çû axa gorê.***

Kesera dilê xwe birîn
bnr: Dilê xwe rehet kirin

Kesê ji min re bibêje çavên te kor in, qet nebe bila çavên wî sax bin (bûna).
Yên ji min xerabtir in, min rexne dikin. **Tu li vê rewşê binihêre?* ***Kesê ku ji min re dibêje çavên te kor in, qet nebe bila çavên wî sax bûna.***

Kesê mino, destê mino
Exrebe û lêzimên mirov dibin alîkarê mirov. **Çi dibe bila bibe, dîsa jî* ***kesê mino, destê mino.***

Kesibê asan e, rojên şiliyan dest û piyên wan zuha ne.
1. Kesib bênesîb û bêşans in. **2.** Ji bo kesên teral tê gotin. **Ew jî wisan e,* ***kesibê asan e, rojên şiliyan dest û piyên wan zuha ne.*** **Kesên dewlemend ne wisan e, tenê ew* ***kesibên asan e, rojên şiliyan dest û piyên wan zuha ne.***

Kesî bi destê (yekî) negirtin

1. Kes pê re nezewicîn. **2.** Kes di radeyê de nebûn. **3.** Alîkarî nekirin. **Belengazê temenê wê gihîşt sih û çar salan, lê hê **tu kesî bi destê wê negirtiye**.* **Wardek keçeke pir cuda ye, **tu kes bi destê wê nagire**.* **Di wê rewşa zor de **kesî bi destê Zekî negirt**.*

Kesî destê xwe li destê (yekî) nexistin

Kes di rade û dereceya wî/wê de nebûn. **Erê Sorgul jî baş e, lê ew jî nikare **destê xwe li destê Berçemê bixe**.*

Kesî dûyê êr (agir) tê, negotin

Kesekî tiştekî xirab negotin. Ji bo kesên ku zû dixeyîdin û li hincetan digerin tê gotin. **Heyran tu tiştekî xerab tune ye. **Tu kesî negotiye, dûyê êr tê.***

Kesî ji bo (yekî) yalah negotin

Kesî ji bo wê/wî tiştekî erênî negotin. **Nizanim wê çi kiriye, tu **kes ji bo wê yalah nabêje**.*

Kesî kevirê (yekî) yê xêrelah ranakirin

Kesî ji bo wî tiştekî erênî negotin. **Ka madem ew qas ked daye, çima **kes kevirê wî yê xêrelah ranake**?*

Kesî li kesî guhdarî nekirin

Tevlihevî, bêserîtî hakim bûn. **Ka malbateke çawan e? Tu **kes li kesî guhdarî nake**.*

Kesî li rûyan nenihêrîn

1. Bêrûmet bûn. **2.** Zef zêde hebûn. **Dema nû hatibû, her kesî jê re rûmet nîşan da, lê ku rewşê hîn bûn, **kesî li rûyan neniherî**.* **Li wî welatî hirmî wisa zêde ne ku **kes li rûyan nanihêre**.*

Kesî pişta (yekî) daneynîn erdê

Kesî têk nebirin. **Ew mêrekî wisa bû ku tu **kesî di jiyana wî de pişta wî daneynî erdê**.*

Kesî serê (yekî) negirtin

Kes pê re nezewicîn. **Ji her wê rezîltiya wê, **kesî serê wê negirt**.*

Keslanê bin dara xurmiyê bûn

Teral bûn. **Seyda **keslanê bin dara xurmiyê ye**. Heta êvarê radize.*

Kesmûk dêrandin

Bi karên vala re mijûl bûn. **Xwezî karekî wî jî hebûya. Rebenê Xwedê hema heya êvarê **kesmûkê didêre**.*

Keso keso carek beso

bnr. Heke hewes e, ew jî bes e.

Kespa helal, ji karkeran re ava zelal

Mirovên xebatkar ku baş û durist bixebitin, wê kêrekê ji keda xwe bibîne. **Her çiqas, bedela xwe tam negirin jî, ez bi vê bawer im; **kespa helal, ji karkeran re ava zelal**.*

Keşîş her roj kadeyan naxwe.
Her dem tiştên baş pêk nayên. **Rast e, carekê du caran pêk hat lê ji bîr neke ku* ***keşîş her roj kadeyan naxwe****.*

Keşîş hînî kadeyan bûye.
Ji bo kesên ku hin caran li rastî tiştên xweş hatine û her dem wê dixwazin tê gotin. *****Keşîş hînî kadeyan bûye****, lê nizane ku ew her dem ne guncan e.*

Keşk e, rûyê kebaniyê xweş ke (reş ke).
Kebanî ku xwarina xwe xweş çêbike, rûmet û morala wê jî zêde dibe. **Ev yek hinekî jî girêdayî derfetan e,* ***keşk e, rûyê kebaniyê xweş ke****.*

Ket xeberan ma li deran.
bnr: Ket xeberan (xeber dan) ker da guran.

Ket xeberan ker da guran.
Ji bo kesên sist û lafek tê bikaranîn. **Mala wî neşewite, ka ew çilo mirov e?* ***Ket xeberan ker da guran.***

Ketim avê, avê da navê, pir nema bi ser min re biavê.
Êdî ber bi dawî ve hatin, qedîn. **Rewşa min qet nepirse.* ***Ketim avê, avê da navê, pir nema bi ser min re biavê.***

Ketin darî çavên xwe
Xwe gelekî begem kirin, ecibandin. Kuşpenetî û pozbilindî kirin. **Ew bi xwe* ***ketiye darî çavên xwe****, em çi bibêjin?*

Ketin agirê hev û din
Çav dan hev, wekî hev û din kirin û di dawiyê de ziyan dîtin. **Ew bi xwe* ***ketine agirê hev û din****, loma nikarin ji kesî re tiştekî bibêjin.*

Ketin agirê (yekî)
Di rûyê yekî de ziyan dîtin. **Na dayê na, kurê min ji tiştên wisa fêm nake, ew* ***kete agirê wî seghavê Xelîl****.*

Ketin ahûzarê
Gelekî eziyet dîtin. **Ji dest vî lawê xwe ez* ***ketime ahûzarê****.*

Ketin aqilê (yekî)
1. Yek xistin bin bandora xwe. **2.** Tê gihîştin. **3.** Ji rê derxistin. Xapandin. **4.** Bi bîr anîn, bêriya yekî an jî tiştekî kirin. **Ew giliyên min wisa* ***ketin aqilê Şefîqeyê*** *ku hema wê demê dest bi amadekariyê kir. *Ez carekê dersê jê re dibêjim,* ***dikeve aqilê wî****. *Ew Fatim matoşqe* ***kete aqilê keçika*** *min û heta ew da revê. *Van rojan Welat zelf* ***ketiye aqilê min****, ez ê herim seriyekî bidimê û bêm.*

Ketin belaya (yekî)
Ji ber yekî din eziyet kişandin, aciz bûn. **"Bavê min î bihêrs û zehmetkêş dîsa* ***ketibû belaya min****."* Veysel Çamlıbel

Ketin belaya zimanê xwe
bnr: Bela zimanê xwe kişandin

Ketin bênimêjiyan
bnr: Ketin kincan

Ketin ber destên (yekî) (Ketin ber dest û lepan)
Ketin bin erk û bandorê. **Înşelah kes* ***nekeve ber destên Banû Xanimê****, karê wê zor e.*

Ketin ber dilên hev
Tev di cihekî de razan. **Ez baş dizanim ku wê şevê ew* ***ketin ber dilên hev****.*

Ketin ber gunehê (yekî)
Bi neheqî yek tawanbar kirin. **Çîlê hema li cihê sekinî,* ***kete ber gunehê Tewrata belengaz*** *û ew wekî dizê werîsê mala Hemîd nîşan da.*

Ketin ber riya (yekî)
Ji yekî re astengî derxistin. **Ev mêrik* ***ketiye ber riya min****, welehî qezayek dê ji destê min derkeve.*

Ketin ber sihratan
bnr: Ketin ber zekeratê

Ketin ber siya quzê (kîrê) xwe
Bi saya zayendiya xwe karê xwe meşandin. **Rebenê çawa bike, mêr miribû, ew jî* ***kete ber siya quzê xwe****.*

Ketin ber taldê (yekî)
bnr: Ketin bin siya (yekî)

Ketin ber zekeratê
Nexweşê li ber mirinê bûn. **Wexta ku ew ji otobusê peya bû, diya wî jî* ***ketibû ber zekeratê.***

Ketin bin bar
Berpirsyarî pejirandin. **Ez* ***ketime bin wî barî****, tu çi dixwazî?*

Ketin bin baskên (yekî)
Ketin bin bandor û parastina kesekî. **Heke Fatoş* ***neketa bin baskên wî mamosteyî****, bawer im ku karê wê dê hê zortir bûya.*

Ketin bin çengê (yekî)
bnr: Ketin bin çoka (yekî)

Ketin bin çoka (yekî)
Ketin bin bandora kesekî. **Min jî hew dizanibû ku ew mêrekî serbixwe ye, lê di navîna du mehan de* ***kete bin çoka Weysel Begê****.*

Ketin bin destan

bnr. Ketin bin nîr

Ketin bin erdê

1. Mirin. **2.** Gelekî fedî kirin. **Li qisurê mêze nekin, heya ku ez* ***nekevim bin erdê****, hûn nikarin mal û milkê min ji xwe re par ve bikin.* **Ji ber wî sûcî kengî ku çavên min li çavên wê ketin ez* ***ketim bin erdê****.*

Ketin bin heyva ewr

Ji holê winda bûn. **Ji nişkê ve Qedircan* ***kete bin heyva ewr****.*

Ketin bin mineta (yekî)

Ketin bin bandor û siya kesekî yan jî tiştekî. **"Mirov cixareyeke ku zerarê dide bedena însan, bide mirov, mirov ji wî re spas dike û* ***dikeve binê mineta wî****."* Mucteba Baravî

Ketin bin nîr

Ketin bin bandora kesekî yan jî hêzekê, kole û bindest bûn. **Kesek an jî gelek dema ku* ***kete bin nîr****, êdî namûs, dad û mêjiyê wî şaş dibe.*

Ketin bin perên (yekî)

bnr. Ketin bin baskên (yekî)

Ketin bin rê

Ketin rewşeke neyînî. **Ew ne di rewşa berê de ye, îro* ***ketiye bin rê****.*

Ketin bin siya (yekî)

Ketin bin bandora kesekî. Hewcedarî yekî bûn. **Ew ne ew mêr bû ku* ***têkeve bin siya lunekên din****, lê çawa bikim çavê felekê bila kor be.*

Ketin bin taldê (yekî)

Ketin bin bandor, minet û sitamiya kesekî. **Fîrdevsê jî xwe* ***kete bin taldê Toreman*** *û bi wî awayî karê xwe bir sêrî.*

Ketin binê (yekî)

1. Bi zanebûn û bi konevanî sir û agahî ji yekî girtin. **2.** Bi mêrekî re têkiliya zayendî danîn. **3.** Têk çûn, an jî ji kesekî kêmtir bûn. **Aso* ***ket bin Hesretê****, çi hebû çi tune bû her tiştî hîn bû.* **Jinik bî bû û bê xwedî mabû, ji mecbûrî* ***kete binê Zeydan****.* **Bi rastî me hemûyan digot wê ji Rostem zêdetir pûanan bigire, lê mixabin ew* ***kete binê Rostem****.*

Ketin bin qûna xelkê

Di bin bandora hinekên din de man. *****Ketin bin qûna xelkê*** *jixwe ne tiştekî baş e.*

Ketin bîreke bêbinî

Di nav teşqele û derd û kulan de man. Riya xwe serast nekirin. **"...lê ji aliyekî ve jî difikirim, ez ê çi bibêjime bavo? Ez* ***ketime bîreke bêbinî****, dikim nakim jê dernakevim."* Veysel Çamlıbel

Ketin çavê (yekî)
Ji aliyê kesekî ve hatin ecibandin. *"*Min hem bi ders xwendina xwe hem jî bi miqatebûna li camiyê, dilê seyda bi dest xistibû û ez* ***ketibûm çavê wî***. Muhemed Garsî

Ketin defteran
Ji hêla fermî de wekî heyî hatin pejirandin. *"*Ji bo ku navê mirov* ***têketa defterên wan****, bes bû ku mirov hew endamekî komelayeke wilo bûya."* Süleyman Demir

Ketin demanê
Ketin nav pirsgirêk û belayê. **Ne ji bo kirinên xwe, lê ji bo yên lawê xwe* ***ketime demanê***.

Ketin destê (yekî)
bnr. Ketin kefa destê (yekî)

Ketin devê (yekî)
1. Ji yekî zêde qal kirin. **2.** Bi kesekî re zehf zêde têkildar bûn. **Xwedê kesî* ***nexe devê Gogê****, naxwe, rewş zehf zor dibe.* **Malxirabo jinika bedew dîtibû, hema* ***diket devê wê***.

Ketin nav daweta cinan
Ketin nav karekî biteşqele. **Ew* ***ketiye daweta cinan****, lê hê haj pê tune ye.*

Ketin nav dest û piyên (yekî) (Ketin nav dest û piyan)
1. Di bin zilm û zorê de man. **2.** Ji ber nexwaşî yan jî pîrbûnê hewcedarî kesan bûn. **3.** Bi dest û piyan alîn, ji hinekan re asteng bûn. **4.** Ji hal ketin, bêtaqet bûn, ji hêz ketin. **Rosto îsal* ***ketiye nav dest û piyên Merîf Begê****, wey li halê wî.* **Xaltiya Rewşen ev du sal in ku* ***ketiye di nav dest û piyên bûka xwe****.* **Ew zaroka wê tim* ***diket di nav dest û piyên me****, me nikaribû karek bikira.* **Rêzan wisa xebitîbû, hema* ***ketibû nav dest û piyan***.

Ketin nav dev û diranên (yekî)
Bûn mijara qalkirina her kesî. **Rewşen û Miraz* ***ketin nav dev û diranên taxê***.

Ketin nav rêxê
Çewtî û şaşiyeke mezin kirin. Di nav helwesteke fedîkar de bûn. **Heyfa Zerîcanê, bi wê kirin xwe,* ***kete nav rêxê***.

Ketin dilê (yekî)
Ji hêla yekî ve hatin hezkirin. **Îpo wisa* ***ketiye dilê Zana****, kes zû bi zû nikare wê ji wir derxe.*

Ketin ctra serê xwe
Ji bo çareseriya xwe ketin di nav hewldanan. **Çi bike ew reben jî* ***ketiye etra serê xwe***.

Ketin êqil
bnr. Di êqil de rûniştin

Ketin govendê
Ketin nav kar û lebatê. Zêdetir ji bo karên tevlihev û neyînî tê bikaranîn. **Êdî tu jî* ***ketî govendê*** *lawo, divê tu jî xwe bihejînî.*

Ketin guhê kerê

Xwe mezin hesibandin. **Bi wan watrê ew **ketine guhê kerê**, xwe zelıf zêde dihesibînin.*

Ketin halê Qolo

Ketin nav rewşeke xerab. **Qet destê xwe nediyê, ew segbav ancax **ketiye halê Qolo**.* (bnr. çîrok)

Ketin halê xwe

Ancax bi derd û kulên xwe re mijûl bûn. **Dev ji wî berdin, ew qijik ancax **ketiye halê xwe**.*

Ketin haya (heyra) canê xwe

Tenê di heyra rizgarkirina jiyana xwe de bûn. **Rewşa Şehrîbanê ne baş e, hema **ketiye heyra canê xwe**.*

Ketin heft û heştan

1. Jê re ketin hesabên kûr. **2.** Ji hev du re doza tiştekî kirin. Gengeşî kirin. **Di dawiyê de ji min re jî **ket heft û heştan**. *Bi hev û din re **ketine heft û heştan**, ka Xwedê dide kê?*

Ketin her boyaxê

Bi her cure kar û têkiliyê re mijûl bûn. Bêîstikrar bûn. **Maşelah ka Zelîxan jî **dikeve her boyaxê**, mirov pê bawer nabe ku tam çi ye.*

Ketin heyra serê xwe

bnr. Ketin etra serê xwe

Ketin hişê (yekî)

1. Têgihîştin, rewş fêm kirin. **2.** Yek îkna kirin an jî xapandin. ****Ketiye hişê wî**, tu çi bikî bêfeyde ye. *Ew ê lafek **kete hişê lawê min ê saf**, ew bir li çol û çiyayan xist.*

Ketin ininê

Bi kûranî mijarek lêkolîn kirin. **Çawa ku min ew mesele bihîst, ez **ketim ininê** û çi kitkiteyên wê hene ez yek bi yek hîn bûm.*

Ketin jêr

Ketin asteke neyînî. Têk çûn, bin ketin. **Perîxan pîr bûye, wekî berê xwe naxemilîne, kifş e ku êdî **ketiye jêr**.*

"Ketin halê Qolo"

Li hêla Serhedê du heb şivanên mixelîd li ber keriyek pez bûne. Segekî wan yê qol hebûye. Ji ber ku teriya wî tune bûye, navê wî qolo bûye. Qolo segekî teral û sist bûye. Ji bilî kût, lak û şirxwarinê bi kêrî tu tiştekî nehatiye. Her du şivan di dawiyê de aciz dibin û dibêjin:

"Ka ware em ji vî segê selexane aciz bikin." Çend rojan tu tiştekî nadinê û Qolo birçî dihêlin. Di dawiyê de pezê xwe berdidne gereke mezin; her şivanek li seriyekî gerê yê herî dûr disekine. Her yek nanekî dide destê xwe û bang dikin:

"Qolooo, Qolooo, ha Qolooo!.." Qolo direve bal yekî ew piçikek nan didiyê, vê carê yê din bang dike:

"Qolooo, Qolooo, Qolooo!.." Qolo, ew qas erd direve tê cem yê din; vê carê yê din bang dikê. Bi vî awayî bi zikê birçî û bi reva wî alî vî alî bi şûn de hej bi Qolo dikeve. Ji ber çûn û hatina ew qas erd, bêhn lê diçike û hema di nîvê wê gera dirêj de di navbera her du şivanan de li ser piştê dirêj dibe…

Ketin kefa destê (yekî)
Ketin bin bandor û erka kesekî. *_Gulê wisa **ketiye kefa destê Zerîfeyê** ku nikare bibêje viq._

Ketin kevçiyê (yekî)
Pê re têkildar bûn. Ketin jiyana kesekî. *_"Jinik bisuhûd bû, **ketibû kevçiyê mêrekî baş**."_ Zana Farqînî

Ketin kincan
Ji bo kamilbûna keçikan a radeya zarokanînê tê gotin. *_Çima, ma Canan piçûk e? Wa ye ew jî **ketiye kincan**._

Ketin kira (yekî
Ji kesekî hêrs bûn, lê xweş nehatin. *_Ew ê beredayî **dikeve kira min**._

Ketin kirasên hev
Wekî hev bûn, bi ser xûy û xisletê hev de bûn. *_Ew qas sal li hal hev man, hema her du jî **ketine kirasên hev**._

Ketin kirê yekî
1. Yek bi bîr anîn. Li ser kesekî zehf fikirîn. **2.** Dil bijîna tiştekî. *_Van rojan Wesîle wisa **ketiye kirê min** ku dixwazim bi otobusê herim balê. *Xwedê xêr bike di nîvê vê zivistanê de zebeş **ketiye kirê min**._

Ketin kurmê (yekî)
Zehf bêriya yekî kirin. Bi hesreta kesekî bûn. *_Ev çend roj in ku Zelîxana hevala min **ketiye kurmê min**._

Ketin mala îletê
Inyad kirin. *_Kerem **kete mala îletê**, heya ku di ser de pereyên xwe jî dane der, lê ew eşyayên xwe ji dest wê jinikê girtin._

Ketin nav gilî û şêwran
Ketin nav axaftineke şîrîn û dirêj. *_Gulê û Şelrîban **ketin nav gilî û şêwran**, xwarin li ser êgir şewitî._

Ketin nav gotina (yekî)
Navber dayîn xeberdana kesekî. Axaftina yekî asteng kirin. *_Ka Sefkan **kete nav gotina min**, nehişt ku ez daxwaza xwe bînim ziman._

Ketina nav pozberiyê
Ketin nav doz û tekoşînê. *_Ew ji bo tiştên piçûk **ketin nav pozberiyê**, yên girîng ji dest wan revîn._

Ketin nav teqereqê
Ketin nav teşqele û tevliheviyê. *_Dev ji wî berde, **jixwe ew ketiye nav teqereqê**, nikare bi te re jî mijûl bibe._

Ketin nav xisarê
Zerar û ziyan dîtin. **Di wê dan û stendinê de em **ketin nav xisarê**.*

Ketin nav zar û zimanan
bnr. Ketina di nav dev û diranan.

Ketin nava gêjgerînekê
Xwe şaş kirin. Hay ji xwe tune bûn, gêj bûn. **"Temo ji wê rewşê **ketibû nava gêjgerîneke buhiştî**."* Temûrê Xelîl

Ketin navbera gotinê
bnr. Gotin birîn

Ketin navbera (...)
1. Di navbera kesan de fesadî kirin. **2.** Ji bo çareseriya pirsgirêkekê têkilî di navbera du seriyan de danîn. **Heke ew jinika fesad **neketa navbera wan**, niha rewşa wan baştir bû. *Delîl **ketiye navbera wan**, dîsa her ew dikare wan li hev bîne.*

Ketin newala weylo
Ketin rewşeke bêçare. **Ew teze **ketiye newala weylo**, ew ê hê gelekî barebar bike.*

Ketin paşila hev
Zêdetir ji bo têkiliya zayendî tê gotin. Bi yekî re razan. **Berî ku daweta wan bibe, ew gelek caran **ketine paşila hev**.*

Ketin pêsîra hev
Ji hev û din hesab pirsîn, pevçûn. **Zelal û Pêrûza îro dîsa **ketibûn pêsîra hev**.*

Ketin pêsîra (yekî)
1. Ji yekî hesab pirsîn. **2.** Bûn belaya serê yekî, belaya xwe jê venekirin. **Lawik **kete pêsîra wî**, heya heqê xwe jê nestand, dev jê berneda. *"Meta Kewê bi ser awazên gotina Xezê ve bû, lê nexwest zikêşiya wê eyan bike, vê sibê **bikeve pêsîra wê** û ..."* Wezîrê Eşo

Ketin pêsîrtengiyê
Ketin tengasiyê. **Di wê rêwîtiyê de ez wisa **ketim pêsîrtengiyê**, qet nebêje.*

Ketin pêşiya (yekî)
1. Jê re astengî derxistin. **2.** Rê nîşan dan, rêvebirî kirin. **Heke ew keçik **neketa pêşiya lawê me**, niha ji zû de zewicîbû. *Me mal nas nedikir, Xwedê jê razî be ew **kete pêşiya me** em heta mala we anî.*

Ketin qalikê xwe
bnr. Di halê xwe de bûn

Ketin qilqalê
Ketin meraq û tatêlê. **Vêca ew çi kar û barê xwe, ez **ketim qilqala wî**.*

Ketin qirika hev û din

Bi hev û din re minaqaşe kirin. Devejenî kirin. **Berzan û Fesîh* ***ketin qirika hev û din****, me bi zorê ew ji hev û din qetandin.*

Ketin qirika (yekî)

Bi kesekî re ketin gengeşî û devejeniyê. **Zubêtê Xosrof* ***ketibû qirika Seyadê Dedo****, li cihê sekinî mêrik gelekî aciz kir.*

Ketin qirtan

bnr. Bi qirtan ketin

Ketina qûna (yekî)

Bi awayekî zêde ketin bin bandora kesekî. **Piştî wan pereyan, Evdilwehab tam* ***kete qûna Hecî Cindî****.*

Ketin rewşa kerê nêr

Ketin rewşa xcrab. **Welehî Şamil* ***ketiye rewşa kerê nêr****.*

Ketin rex (yekî)

Yek xolî kirin. Henekên xwe bi yekî kirin. **Her êvar Hesen* ***dikeve rex Dilo*** *em jî bi wan dikenin.*

Ketin rê

Dest bi çûn derekê kirin. **Sînemê serê xwe lulda* ***kete rê****, çû ku wê jî nizanibû dê here ku.*

Ketin riya xerab

Bi karên qilêr û xeter re mijûl bûn. **Berê rewşa wî baş bû, lê hingî* ***ketiye riya xerab****, jehr ji rûyan dibare.*

Ketin riya (yekî)

Ji bo ziyandayînê derketin pêş kesekî. **Hesen û lawên wî* ***ketibûn riya Silêman****.*

Ketin rîpa ...

Ketina pirsgirêk û teşqeleyê. **"Ji wê rojê û vir ve jixwe tu dizanî û va ye, çawa tu* ***ketî rîpa zirîna xwe****, ez jî welê* ***ketime rîp û teşqela lota xwe****."* Feqî Huseyn Sağnıç

Ketin roja bavîbaviyê

Her kes ketiye heyra xwe. **Dinya wisa ye heyran, ku* ***kete roja bavîbaviyê*** *kes li kesî nabe xwedî.*

Ketin roja reş (Ketin rewşa reş)

Ketin halê xerab. **Welat jî dixwest karê xwe pêşve bibe, lê mixabin di dawiya wî karî de* ***kete roja reş****.*

Ketin ser dilê (yekî)

1. Li yekî dan. **2.** Di nav têkiliya zayendî de bûn. **Her du bira* ***ketine ser dilê Xembar*** *îja danê. *Dibêjin, Heydo* ***ketiye ser dilê Gulçînê*** *û heya sibehê neluştiye ku razê.* (argo)

Ketin ser dilên hev

1. Ketin nav têkiliya zayendî. **2.** Li hev xistin. **Wê şevê mêrik neçûbû mala xwe heta sibehê ew û jinik* ***ketibûn ser dilên hev****. *Kerîm û Şefîq* ***ketibûn ser dilên hev*** *û heta tu bibêjî bes, li hev dabûn.*

Ketin ser lingan

1. Lavayî kirin, bi awayekî zêde li ber gerîn. **2.** Di nav rewşeke bêhêz û bêtaqet de bûn. ***_**Kete ser lingan**_*, derî bi derî geriya, di dawiyê de keça xwe da xwendinê. *Şabedîn ji ber nexweşiyê* ***kete ser lingan*** *û bi mehan ji nav ciyan derneket.*

Ketin serê (yekî)

Têgihîştin, fêm kirin. **"Ne pirsên olî dizanî, ne dengê wî ji azanê re baş bû, ne jî rabûn û rûniştina wî* ***diket serê gundiyan****."* Cankurd

Ketin silûkê

Li derekê bi serê xwe ıman. Li ser dozekê yan jî karekî kûr bûn. **Dev ji wî berdin, ew* ***ketiye silûkê****, înşelah wê xwe baş bikemilîne.*

Ketin stûyê (yekî)

bnr. Li ser stûyê (yekî) bar bûn

Ketin şeq û deqên giran

Ketin nav kêşeyên mezin. **"Ji mal derket û li rê kar bû. Berî* ***û berîstan, çol û çolistan, havîn çû, ma zivistan; serê Mîr Melumûdê Cindî hêja wek têkeve şeq û deqê giran****."* Celîlê Celîl, Ordîxanê Celîl

Ketin tanga (yekî)

Hewcedarî kesekî bûn. **Carekê* ***ketim tanga wî****, vê carê jî wî ya pêwîst nekir.*

Ketin tatola zikê xwe

Ketina heyra derdê xwe. **Ez* ***ketime tatola zikê xwe*** *tu kêfa wê binêre.*

Ketin tepûşa (yekî)

Ketin ber însaf û mineta yekî. **Heke rojekê ew jî* ***bikeve tepûşa min****, ez dizanim ez ê ji wî re çawa bikim.*

Ketin tevziya zivistanê

Ketin nav rewşeke sist û bêkêr. **Hûn li wî biborin, mixabin ew* ***ketiye tevziya zivistanê****.*

Ketin tilqê (dilqê) şeytên

Fesadî û xirabî kirin. **Qet qala Zekî neke, ew* ***ketiye dilqê şeytên****, xirabiya ku bi me nekir nema li dinê.*

Ketin tora (yekî)

Ketin tele û dafika yekî. **Yaqûb* ***ketiye tora Emîn,*** *welehî dê zor xwe jê xelas bike.*

Ketina tûşa (yekî)

bnr. Ketin tepûşa (yekî)

Ketin xewa giran
bnr. Ketin xewa mirinê

Ketin xewa mirinê
Di nav bêagahî yan jî bêxemiyeke kûr de bûn. *"*Ev qewmê ku çarsed hinde sal in xwe ji bîr kiribû, xwe winda kiribû, bê nav û bê zanîn mabû,* ***ketibû xewa mirinê*** *..."* Osman Sebrî

Ketin xewa Rostemî
bnr. Ketin xewa mirinê

Ketin xewa zivistanê
bnr. Ketin tevziya zivistanê

Ketin xiloqa canê xwe
Ketin derdê canê xwe. **Ma çavê wî tiştekî dibîne? Ew tenê* ***ketiye xiloqa canê xwe****.*

Ketin xwîna (yekî)
Yek kuştin. **Lezgîn li cihekî sekinî* ***kete xwîna wî belengazê Qaso****.*

Ketin zikê diya xwe
1. Di nav hawir û rewşeke xweş û rehet de bûn. **2.** Di cihekî qewîn û bawer de bûn. **Ya Xwedatî, te keçika xwe daye cihekî wisa ku* ***ketiye zikê diya xwe****. **Ew* ***têkeve zikê diya xwe*** *jî ji destê min xelas nabe.*

Kevanî ne li mal e, holhola mişkê delal e.
Xwedî ku tune be, rewş xera dibe û dibe xwarê xelkê. ***Kevanî ne li mal e, hollıola mişkê delal e.*** *Çawa hebe mala bêxwedî dîtine, ketine ser û dixwin.*

Kevaniyê çêlek dot. Çêlekê şîrê xwe rêt. Got: "Dilê padîşê ji me xera bûye."
Xwe xapandin, xwe zêde hesab kirin. **Belengazê hew dizanè gelek talaşa wê dikişînin.* ***Kevaniyê çêlek dot. Çêlekê şîrê xwe rêt. Got: "Dilê padîşê ji me xera bûye."***

Kevçiya hesinî, bi xwe pir pesinî.
Yên ku qewîn û bi xwe bawer bin, xwe zêde dikin. **Ew jî ne neheq e,* ***kevçiyê hesinî, bi xwe pir pesinî****.*

Kevçiyê çilan (çilî), nû got: "Bismila!"
Ji bo kesên gelimxwer û çilek tê gotin. **Maşelalı, zikê Feysal jî zor têr dibe, wa ye* ***kevçiyê çilan, nû got: "Bismila!"***

Kevçî gurz nekirin
Ji bo yên li hember an ji neyaran tifaqek pêk neanîn. **Ji te tika dikim, bi wê re jî nekeve dozê û* ***kevçiyan neke gurz****.*

Kevçiyê xwe rêx kirin û xistin qula dîwêr
Bêsexbêr feqîr û birçî bûn. **Mixabin lawên Evdilê Kerem* ***kevçiyê xwe rêx kirine û xistine qula dîwêr****.*

Kevir anîn bîra dizan

Ya ku yê hember nafikire, anîn bîrê, şiyar kirin. **Ez dixwazim meseleyê bitepisînim, ew jî **kevira tîne bîra dizan**.*

Kevir avête mêşê, ziyan gihand gamêşê.

Bi niyet an jî derbeyeke piçûk encameke mezin derketin. **Wî jî wer hêvî nedikir; lê **kevir avête mêşê, ziyan gihande gamêşê**.*

Kevir avêtin hev

Di pişt hev û din de paşgotiniya hev kirin. **Nizanim sedem çi ye, lê van rojan Seydo û Faris yeman **keviran diavêjin hev**.*

Kevir avêtin (yekî)

Paşgotiniya yekî kirin. **Hesenê Hesikê dîsa **keviran diavêje Rosto**.*

Kevir barandin (Kevir û kuçik barandin)

1. Bê însafî, bê gumanî kirin. Alîkarî nekirin. **2.** Di derbarê kesekî de tiştên xerab gotin, tawanbar kirin. **3.** Çikusî kirin. **Kuro te **kevir barandin**, tu neçûyî alîkariya wan. *Eman bila Kenan neçe bal wî, welehî Serdar **keviran dibarîne wî**. *Destên wî bûn qurom, **kevir barandin**, çar quriş nedan wî feqîrî.*

Kevir barîn

Tiştekî bêîmkan, zor û ecêb bûn. **"-Keçê, ma hema naxwazin bila neçin zivistanê. Ma te negot, wê **kevir bibare**!..Sêwî ne, gune ne!"* Felat Dilgeş

Kevir bi ser de gêr kirin

bnr. Kevir bi ser de wer kirin

Kevir bi ser de wer kirin

Ne bi awayekî rasterast lê bi peyaman, bi ten û niçan ve û bi gazincan yek rexne kirin. **Ez têdigihîjim ku ew wan **keviran bi ser min de wer dike**, lê ez xwe naxime hevalê wî.*

Kevir biguh bûn

Ji bo li her derê guman û şikbirina neyaran tê bikaranîn. **Bi rastî carinan ew qas zêde **kevir biguh bûn** jî ziyanê dide mirov.*

Kevir dihilime, ew nahilime (nakilime)

Ji bo kesên ku napeyivin tê bikaranîn. **Gêlo mirovekî wisa ye ku **kevir dihilime, ew nahilime**.*

Kevir hêran

1. Gelekî bihêrs bûn. **2.** Gelekî bihêz bûn. **Ji ber ku keçika wî revandine, Resûl **keviran dihêre**. *Maşelah wisa ne, ku rahêjiyê wê **kevir bihêre**.*

Kevir li ber piyên (yekî) bûn penêr

Kar baş meşîn. **Înşelah **kevir li ber piyên wê bibin penêr**, wê jiyana me xelas kir.* (dia)

Kevir li cêr ket an cêr li kevir ket?

Gelo heq kir an bi rasthatinekê pêk hat? **Bi rastî jî ez gumanan dikim, gelo* ***kevir lê cêr ket an cêr li kevir ket?***

Kevir li cêr ket, wey li halê cêr, cêr li kevir ket wey li halê cêr, wisa yan jî wisa wey li halê cêr.

Ha bi wî awayî ha bi vî awayî, her ziyan tê dîtin. ****Kevir li cêr ket, wey li halê cêr, cêr li kevir ket, wey li halê cêr, wisa an jî wisa wey li halê cêr.*** *Di dawiyê de ew ê ziyanê bibîne.*

Kevir li kêw neket, kew li kêvir ket.

Ne bi pêkhatinê lê bi rasthatinê bi ser ketin. **Ew jî îşê Xwedê ye, me tiştekî wisa hêvî nedikir, lê Xwedê dizane,* ***kevir li kêw neket, kew li kêvir ket.***

Kevir li ser keviran nehiştin

Tar û mar kirin. Ji bin ve xera kirin. **Leşker û celşan gundê me wisa kirin ku* ***kevir li ser keviran nehiştin.***

Kevir pê de gêr kirin

bnr. Kevir bi ser de wer kirin

Kevir û kuçik bi ser (yekî) de barîn

Li rastî zilm û zorê hatin. Ketin rewşeke xerab. *"***-*Kevir û kuçikê Xwedê ser me de bibarin****,*** *wekî barîne, ka çi ji destê me merûmê Xwedê tê ..."* Tosinê Reşît

Kevir û kuçik bi halê (yekî) girîn

Di nav rewşeke pir bi xeter de bûn. **Sêvo di rewşeke wisa de bû ku* ***kevir û kuçik bi halê wê digiriyan.***

Kevir û kuçik li min barîn, xêr û xweşî li te barî.

Bila tu di nav xweşiyê de bî, lê xerabî û xeterî hat serê min. Rewşa min pir xeter bû. **Min ku dît a li erdê dirêjbûyî keçika min e,* ***kevir û kuçik li min barî, xêr û xweşî li te barî.***

Kevir xistin ber dilê xwe

Li ber xwe dan. Xwe ragirtin. **Ne karê berxwedanê bû, lê wê* ***kevir xiste ber dilê xwe*** *û di cihê xwe de sekinî.*

Kevirek dan ber dilê xwe

bnr. Kevir xistin ber dilê xwe

Kevirek di dêst de, barê xwar rast kirin

bnr. Wekî kevirê takêşê bûn, kîjan cemê bar xwar bibe xwe dayîn wî alî

Kevirekî hil ke, (wê) pirsa xwe li bin ke.

Careke din qala wê mijarê meke. ****Kevirekî hil ke, wê pirsa xwe li bin ke.*** *Te çi got min nehihîst.*

Kevirê giran bûn

Ji bo kesên zana û birûmet tê bikaranîn. *Di wê malbatê de **kevirê giran Resûl e**, hûn wî bînin, karê we temam e.*

Kevirê korsê (koşe, goşe) bûn

Girîng û bi qiymet bûn. *Helbet wê li dora Mehdî herin û werin, ew jî dizanin ku ew **kevirê korsê ye**.*

Kevirê ku ew dayne, kes nikare hilîne.

Ya ku ew pêk bîne kes nikare. *Ezbenî, tu çi dibêjî? Ka **kevirê ku ew dayne, kî dikare lilde**?*

Kevirê seriyan bûn

bnr. Kevirê giran bûn

Kevirê qorzî bûn

bnr. Kevirê kozî bûn

Kevirê xwe bi rûberî xwe berdan

Dev ji armanc û niyeta xwe berdan. *Berê niyeta wî pir xerab bû, lê piştî xeberdana bavo, **kevirê xwe bi rûberî xwe berda**.*

Kevirê (yekî) li ciyê rast nesekinîn

Kar baş nemeşîn. *Halê wî ne baş e, **kevirê wî li cihekî rast nasekine**.*

Kevirê (yekî) qulibîn

Rewşa yekî xera bûn. *Qet qala wî meke, jixwe **kevirê wî qulibiye**.*

Kevirên di destê xwe de berdan (danîn)

bnr. Kevirê di pêşa xwe de hurşandin

Kevirên di pêşa xwe de hurşandin

Dev ji şer an jî inyatê berdan. Nerm bûn. *Berê wê jî xwe lingê xwe da erdê, lê baş bû ku dû re **kevirên di pêşa xwe de hurşandin**.*

Kevirên xwe xistin cêba xwe

1. Tedbîra xwe girtin. **2.** Bi xinisî tevgerîn. *Ew çi ne wisa bêhesab e, **kevirên xwe xistiye cêba xwe** û hatiye. *Tu bi wî nizanî ew çi kûçik e, ew tim **kevirên xwe dixe cêba xwe**.*

Kevjalê, çima tu weha xwar diçî? Got: "Ez ew qas dikarim."

bnr. Ji kevjalê re gotin: "Tu çima xwar bi rê ve diçî?" Got: "Keysa min hew jê tê."

Kew firî, qismet birî.

bnr. Emenî birî, ta firî.

Kew ketin sibê

Berbangê avêtin, ro ber bi ronahiyê ve bûn. *"Evdî tiving avêt milên xwe, ez anîm ji gund derbas kirim. **Kew êdî ketibû sibê.**"* Babayê Keleş

Kew li dar ketin
bnr: Kew li pelenderê ketin

Kew li dar ketiye, dar li kewê neketiye.
Kar bi rasthatin pêk hatiye, ne bi pêkhatin. **Wer tê xuyan ku ew karê ku pêk aniye jî ne merîfeta wê ye.* ***Kevir li kewê neketiye, kew li kêvir ketiye.***

Kew li kundir ket, ne kundir li kew ket.
bnr: Kevir li kêw neket, kew li kêvir ket.

Kew li pelenderê ketin
Şans û siûda yekî baş meşîn. **Xwedê daye wê, kew li pelenderê ketiye.*

Kewa dafikê bûn
Ji bo kesên ku tên lîstikan û li serê wan dafikan çêdikin tê gotin. **Heçiya Ûsiv e jî tam* ***kewa dafikê ye****. Her tim di rûyê wî de serê me jî dikeve belayê.*

Keweke hêşîn ji xwe re girtin
Belayek anîn serê xwe. **Gelekî bi wan mirovên xirab re mijûl bû, di dawiyê de jî* ***ji xwe re keweke hêşîn girt****.*

Kewê li rûyê kewê xwendin
Çi hebe bi eşkere li rûyê yekî gotin. ****Kewê li rûyê kewê xwendiye.*** *Zezê ne jineke wisa ye ku veşêre, yên bûyî hemû jî gotine.*

Kewê rêl li ku xweş e? Got: "Cihê ku ez lê bûme ferx."
Her kes di dilê xwe de welatê xwe xweşiktir dibîne. **Ma ji ser welatê mirov re welat hene?* ***Kewê rêl li ku xweş e? Got: "Cihê ku ez lê bûme ferx."***

Kewên lisandinî, wekî kelandinî
Yên ku tirsonek in zû têk diçin û tune dibin. **Jixwe wer e,* ***kewên lisandinî, wekî kelandinî****.*

Kewên wan ji hev re xwendin
Li hev û din xweş hatin. **Na jinik, wa ye dixuye ku* ***kewên lawê me û wê keçikê ji hev re xwendine****.*

Kewtekewt kirin
Gevezetî kirin. Vala û zêde peyivîn. **Wî mêrikê lafek hingî* ***kewtekewt kir****, ji êvarê de guhê min bir.*

Keys bû keys, dê Gago bibe reîs.
Bi firsend û sebrê mirov dikare gelek karan pêk bîne. **Ecele neke keçika min,* ***keys bi keys, dê Gago bibe reîs****.*

Keys lê anîn (Keysa xwe lê anîn)
Li hemberî yekî ji bo serkeftinê derfet bi dest xistin. **"Kanûna paşîn* ***keys li gîskê aniye****..."* M. Emin Bozarslan

Keys pêk anîn
bnr. Bal lê anîn

Kezeb lê helîn
Pir xemgîn bûn, li ber xwe ketin. *"***Kezeb lê heliya**, *nefret kir. Yekser kir qêrîn: -Me ji berbangan bipirsin!.."* Xalit Temlî

Kezeb lê reş kirin
Gelekî aciz kirin. **Vî segbavê rêveberê me **kezeb li me reş kir**.

Kezeb lê reş bûn
Bi nexweşiyeke xeter ketin. *"*Belkî **kezeba te reş be**."* Çiya Mazî (nifir)

Kezeb lê zuha bûn
Ji ber derd kul an jî eşqekê di nav hestên pir tund de bûn. Hundir şewitîn. *"*Tiştekî agirî di nav ling û memik û lêv û por û pişta wê de ew dişewitand. **Kezeb lê zuha bûbû.**"* Helîm Yûsiv

Kezeb peritîn
bnr. Kezeb şewitîn

Kezeb pola bûn
bnr. Çargurçikî bûn

Kezeb teslîmî pisîkê kirin
bnr. Lingê gur girtin û avêtin nav koza berxan.

Kezeba (yekî) dax bûn
Pir xemgîn bûn. **Wan birînên keça wî **kezeba Mîrza dax kir**.

Kezeba (yekî) parçe parçe di dêv re hatin
Min jê re got: "Lawo heke tu dev ji vê eraqê bernedî, ji Xwedê dixwazim **kezeba te parçe parçe di devê te re bê."* (nifir)

Kezeba (yekî) şewitîn
Xemgîn bûn. Li ber xwe ketin. *"*Niha mala min xera bû, niha **kezeba min şewitî**..."* Abidin Parıltı

Kezeba xwe reş kirin
Eciqandin, aciz kirin. **Ev keça xaltîka min, ji ber tiştên pûç û vala **kezeba xwe reş dike**.

Keziya xwe kur kirin
Karekî xerab kirin. **Sebriyê **keziya xwe kur kir**, bi wî lawikê birçî re revî, ka gelo dawiya wê dê çawa be?*

Kê bilîstiye ku maldar kuştiye?
Mirovên dewlemend, zû bi zû xwe naavêje nav xeteriyan. **Yên cibil ji her tiştî re amade ne. Ka **kê bilîstiye ku maldar kuştiye**?*

Kê çavê te derxist? "Xwexwetiya min." "Lewma wisa kûr derxist?"
bnr: Got : "Kî çavê te derxist?" Got: "Merivê min." Got: "Lewma wisa kûr derxist."

Kê dinya xwar, ê bazirganê xwedî kar.
bnr: Got: "Kê dinya dot?" Got: "Yê ku kirî û firot."

Kê dinya xwar, ê bêfedî.
Kesên bêar û bêfedî di hêla aborî de gelek caran zêdetir pêşve diçin. **Ev sîstema dinyayê sîstemeke bêdad e, lewma dibêjin:* ***"Kê dinya xwar? Yê bêfedî."***

Kê dinya xwar, ê di ber ehmaqan de xwar.
Yên ku gêj û ehmeqan bixapînin, gelek caran di hêla aborî de pêşve diçin. ****Kê dinya xwar? Yê di ber ehmaqan de xwar.*** *Her çiqas yên ku vê dikin gelek bin jî, karekî pir qilêr û bêdad e.*

Kê dîtiyê, kalê biguhar, pîra lingxirxal (xirzal), zivistana dû bihar.
Ji bo tiştên ecêb û bêîmkan tê gotin. **Erê ew dibêje, lê bila xwe bixapîne.* ***Kê dîtiyê kalê biguhar, pîra lingxirxal, zivistana dû bihar.***

Kê gotiye: "Dewê min tirş e."
Kes xetaya xwe napejirîne. **Helbet xwe bi xwe tawanbar nake.* ***Kê gotiye dewê min tirş e?***

Kê gotiye: "Dizo malî ava."
Helbet tu kes ji xeraban re tiştekî baş nabêje. **Ya rastî, gotin tiştekî din e, kirin jî tiştekî din e.* ***Kê gotiye dizo malî ava?***

Kê ketî rakir, xwediyan.
Dîsa di dawiya dawî de, xwediyên mirov bi mirov dibin xwedî. ****Kê ketî rakir, xwediyan.*** *Xwedê kesekî bêxwedî neke. ,*

Kê kir û kê xwar!
Qet kifş nake, kî dê bike û kî dê bixwe. **Divê mirov zêde mezin xeber nede. Kî dizane gelo* ***kê kir û kê xwar****?*

Kê kir xatûn, mêr kir xatûn; kê kir darqûn, mêr kir darqûn.
Helwesta mêran a li hemberî jina wan pir girîng e. ****Kê kir xatûn, mêr kir xatûn; kê kir darqûn, mêr kir darqûn.*** *Mêr ku rûmeta jina xwe negire zor e.*

Kê kir, kê nekir, sêwiyê bêar kir.
Mirovên sêwî bi hêsantir tên tawanbarkirin.**Ma wê tiliya xwe dirêjî kê bikin?* ***Kê tir kir, kê nekir, sêwiyê bêar kir.***

Kê kire kê!
Kê zora kê bir. **Li vî welatî dad nîn e. Heke tu dikarî derkeve ser. Çimkî zagona vir,* ***kê kire kê ye****.*

Kê kîrê min kire bizinê?

Ji bo kesên ku rastiyê înkar dikin tê gotin. **Tu dibêjî ew kar wî nekiriye, xwe nebeledî diavêje û wekî melayê gund dibêje:* ***"Kê kîrê min kire bizinê?"*** (bnr. çîrok)

Kê nanê min xwar, tirba (gora) min kola.

Yên ku tu qenciyê pê dikî, gelek caran bi te xirabiyê dike. **Ev jî dinyayeke wisa ye.* ***Kê nanê min xwar, wî tirba min kola.***

Kê nexweş rakir, ê ku (dil) pirs kir.

Serdan û dilkirin ji bo nexweşan wekî dermanan bi kêr tê. ****Kê nexweş rakir, ê ku dil pirs kir.*** *Serdan ji bo nexweşan moral e.*

Kê seh kiriye, kê xwendiye?

Hinek nedîtî bi gotin û texmînan tiştan dibêjin. **Hûn hema di ber xwe de didarizînin, lê* ***kê seh kiriye, kê xwendiye****?*

Kê tiliya xwe xistiye çavê xwe?

Kes bi xwe xerabiya xwe naxwaze. **Yaho çima ez gêj im, ma ez xêra xwe naxwazim? Ma* ***kê tiliya xwe xistiye çavê xwe****?*

Kê tir kir, pîra gund tir kir.

bnr. Kê tir kir, xerîbê gund kir.

Kê tir kir, xerîbê gund kir.

Çi tawan û tiştên xerab hebin, dixin stûyê yên bêkes û bêxwedî. **Ku kesekî min jî hebûya, kesî nikaribû ez tawanbar bikirama. Loma gotine:* ***"Kê tir kir, xerîbê gund kir."***

Kê zora kê bir!

bnr. Kê kire kê!

Kêç gincî kirin

Temahkar û xesîs bûn. **Hesen ketiye rewşeke wer, ku* ***kêçan gincî dike****.*

Kêç xesandin

Vala gerîn, tu kar nekirin. Teralî kirin. **Neheqiyê li Cimşît nekin lawo, (!) Cimşît heya êvarê* ***kêçan dixesîne****.* (argo)

Kêf lê şeriqîn

bnr. Kêfa (yekî) di gewriyê de man

"Kê kîrê min kire bizinê?"

Li gundekî melayek di newalekê de bizinekê digire û pê re dikeve têkiliya zayendî. Dema ku mela li ser kar e, yekî gundî lê derdikeve. Mela dibîne ku wa ye gundî bi ser de tê her du çavên xwe digire. Dema ku gundî jê dipirse û dibêje: *"Mela tu çi dikî?"*

Mela çavên xwe vedike û bi awayekî şaşwazî û nebeled dibêje:

"Kê kirê min kire bizinê?"

Kêf şikestin
bnr. Kêfa (yekî) di gewriyê de man

Kêfa (yekî) di cih de bûn (Kêfa (yekî) li cihê xwe bûn.)
Kêfxweş bûn. *"... *wê rojê ziyafeta goştê mirîşkan hebû.* ***Kêfa min jî li cihê xwe bû.*** *" R. Karaya

Kêfa (yekî) di gewriyê de man
Di rewşa xweş de astengî derketin. **Salan mehan carekê dê kêfxweş bûya, lê* ***kêfa wê di gewriyê de ma****.*

Kêfa dil xwestin
Li gorî daxwaza xwe kirin. **"Çend hefteyan li ser hev îşkenceyê dikin. Heta* ***kêfa dilê wan dixwaze*** *dikin Saracan."* Süleyman Demir

Kêfa gurê pîr kirin
Rewş xweş û geş bûn. **"Gava tintêla mirovekî xweş û xwarin û vexwarina wî di cih de be, dibêjin:* ***'Ew kêfa gurê pîr dike.'*** *"* Feqî Huseyn Sağnıç

Kêfa (yekî) hatin cih
Piştî hinek tiştên neyînî rewş baş bûn. **Dû re rewş baş bû û* ***kêfa Dewran hate cih****.*

Kêfa (yekî) jê re hatin
Ji kesekî yan jî ji tiştekî hez kirin. **Ji ber ku Sîdar biçûkê hemû birayan bû,* ***kêfa dapîra wî pir jê re dihat****.*

Kêfa me bi Xunafê xweş bû, wê jî kurekî mirî anî.
Hêvî pêk nehatin. **Em bi wê bawer bûn,* ***kêfa me bi Xunafê xweş bû, wê jî kurekî mirî anî****.*

Kêfa min nîn e, îro nakim fîtînî, sibe dikim fîtînî.
Dilê min çawa bixwaze, wisa dikim. **Kes nikare têkildarî min be. Kêfa min nîn e, îro nakim fîtînî, sibe dikim fîtînî.*

Kêfa mîran kirin
Kêfeke pir xweş kirin. **Rewşa Salih wisa xweş e ku* ***kêfa mîran dike****.*

Kêfa (yekî) xera kirin
Ji rewşa yekî ya xweş re astengî derxistin. **Heke wî* ***kêfa min xera nekira****, bawer bike, wê hibûya cara min a herî xweş.*

Kêfa xwe pê anîn
1. Tiranê xwe bi yekî kirin. **3.** Bi kesekî re di nav têkiliya zayendî de bûn. **Çima ku Cevdet mirovekî saf û bêdeng bû, wan lotiyan* ***kêfa xwe pê dianîn****. *Wî seghavî* ***kêfa xwe bi keçika wan anî****, dû re pişta xwe dayê û çû.*

Kêfa xwe pê revandin
Ji bo dem derbaskirin û dilxweşkirinê bi tiştekî re yan jî bi kesekî re bi awayekî demborî

mijûl bûn. **Wî hênamîsî keça Reşît, a pazdehsalî xapand,* ***kêfa xwe pê revand*** *û di dawiyê de pihînek da qûnê û avêt ser mala bavê.*

Kêfa xwe xera nekirin

Ji bo bûyer an jî pirsgirêkekê dev ji rehetiya xwe bernedan. **Ew qas tişt hatin serê me, mêrikî qet* ***kêfa xwe xera nekir****.*

Kêfsaz bûn

bnr. Kêfxweş bûn

Kêfxweşî dan (yekî)

Bi kesekî re eleqeder bûn, hal û hewal pirsîn, xêrhatin dan. **Nizanim min pê çi kiribû? Wî li wir li çavên min jî nihêrî, lê qet* ***kêfxweşî neda min****.*

Kêl lê pişkivîn

Kêmasî lê çêbûn. **Xwedê dizane hema ku* ***kêlek li min bipişkive****, wê min bikin destan û bi şev û roj li her derê bibêjin.*

Kêleka xwe ya birêx nîşanî hevalên xwe nedan

Sir û kêmasiyên xwe ji kesî re negotin. **Ew ne mirovekî wisan e ku* ***kêleka xwe ya bi rêx, nîşanî hevalên xwe bide****.*

Kêmaqil bûn

Di hêla têgihînê de qels bûn. **Kuro, ew yekî* ***kêmaqil e****. Te çawa dikana xwe teslîmî wî kir?*

Kêmhiş bûn

bnr. Kêmaqil bûn

Kêm dîtin

Piçûk dîtin. Rûmet nedan. **Heke wê demê wî Cemîle* ***kêm nedîta****, belkî jî niha rewş bi awayekî din bûya.*

Kêmaniya (yekî) danîn ber bêvilê

Kêmasiyek an jî çewtiyeke yekî jê re gotin, bi bîrê xistin. ** "Nesîmeyê jî ji wê rojê pê ve, her gav li pêş bavê wê, li pêş nas û nenasan, ev* ***kêmaniya wê dida ber bêvilê****."* Enver Karahan

Kêmasiya (yekî) li rûyê wî/wê xistin

Çewtî û xetaya kesekî jê re eşkere gotin. **Bahadîn jî di nav wan dilnexwazan de* ***kêmasiya Felemez li rûyê wî xist****.*

Kêmfirsendî kirin

Ji bo berjewendiyên xwe kêmasî yan jî qelsiya kesan wekî firsend bi kar anîn. **Ez Zeynebê tu caran nabexşînim, ji ber ku wê* ***kêmfirsendî kir****.*

Kêr bi hestî ketin

Xeterî û zor hatin pileya dawîn. **De tu çi dikî bike, êdî* ***kêr bi hestî ketiye****.*

Kêr gihîştin hestî
bnr: Kêr bi hestî ketin.

Kêr kişandin (yekî)
Ji bo dijminatiyê hewl dan. **Heyder* ***kêr kişande Celîl****.*

Kêr lê bikeve xwîn jê nayê.
Şaşwazî bûn, dest ji emelan sar bûn. Pir xemgîn bûn. **"Dema ku nexweşnêrê ji wan re got: -Bila serê we sax be, hevalê we jiyana xwe winda kir,* ***kêr li karkeran biketa xwîn ji wan nedihat****." Hesen Zinar*

Kêr li sifra nan lê dixwe xistin
Îxanet kirin. Li hemberî yê qencîkirî xayînî û bêbextî kirin. **Piştî ew qas qenciyê, Zoro çû,* ***kêr li sifra nan lê dixwe xist****.*

Kêra xwe di bêrikê de dîtin
Di derka dijminahî û dilnexwaziya yekî de bûn. **Kî çi dibêje bila bibêje, min* ***kêra xwe di bêrîka wî de dîtiye****.*

Kêra xwe tûj kirin
Xwe ji bo niyetêke ne erênî amade kirin. **Wî ji bo Heyder* ***kêra xwe tûj kiriye****, Xwedê axiriyê xêr bike.*

Kêranê ber çavên xwe nedîtin, zilikê ber çavên xelkê dîtin
Kêmasî û çewtiyên xwe yên mezin na, lê yên xelkê yên pir piçûk dîtin. **Ew qas jî nabe lo! Bager* ***kêranê ber çavê xwe nabîne, lê zilikê ber çavê xelkê dibîne****.*

Kêrê nabe ber gê, gê tîne ber kêrê.
Ji bo karên çiloçepî tê gotin. **Jixwe ew tim wisa karan çiloçepî dike.* ***Kêrê nabe ber gê, gê tîne ber kêrê.***

Kêsvês kirin
Ji hev belav kirin. Pirsgirêk bi dawî kirin. **Heta me xwe gihande Marûf Axa meseleya wan* ***kêsvês kiribû*** *û çûbû gundê xwe.*

Kêzika kulfê ketin nav dilê (yekî)
Înşelah* ***kêzika kulfê têkeve nav dilê wê**.* (nifir)

Kil bûn
bnr: Kilikî kirin

Kil pê ketin
bnr. Hej pê ketin

Kilam avêtin ser ...
Ji bo miriyan an jî evîndaran stran gotin. **Li navçeya me, ezîzê her dilê kîjan malbatê dimir, bang dikirine Almasta Siyaro û wê* ***kilam bi zelûlî diavêtin ser miriyên wan*** *û her kes dida giriyandinê.*

Kilek rûn[*] **li ser dilê xwe dan**
Dilê xwe rehet kirin. **Çima ku Bawer jina xwe berda, hezkiriya wî ya berê* ***kilek rûn li ser dilê xwe da****.*

Kilê çavên mirovan dizîn (Kil ji çavan dizîn)
Ji bo diz û diziya bi huner tê gotin. **Ka çi malbat e, çi malbat e, welehî* ***kilê çavê mirov jî didizin****.*

Kilê sibhanî kirin
Xwe zehf xemilandin. **Ma tu nabînî, jinikê* ***kilê sibhanî kiriye****.*

Kilikî kirin
Aciz kirin. **Eman di destê vê jinikê de, bi Xwedê ez* ***kilikî kirim****.*

Kilîta dil vekirin
Wekî daxwaz û hestan nêzîk bûn. Xwe gihandia kûrahiya giyana kesekî. **Celîlê Ûso bi awayekî wisa germ nêzîkî Sedefê bû, ku di dawiyê de* ***kilîta dilê wê vekir****.*

Kilîta heft pûtê li dêrî ketin
bnr. Kilîta reş li dêrî ketin

Kilîta reş li dêrî ketin
Mal belav bûn, mîrate bûn. **Wî rebenî gelo çi kiribû ku wisa* ***kilîta reş li dêrî ket****?*

Kilîta ziman vekirin
Yek dan axaftinê. **Piştî sê mehan min* ***kilîta zimanê wê vekir****.*

Kin birîn
bnr. Kin lê xistin

Kin lê xistin
Zêde dirêj nekirin. **Xwedê kir ku wî jî* ***kin lê xist****, naxwe ez nedigihîştim civînê.* (argo)

Kinc hatin
bnr. Ketin kincan

Kincê xwe dîtin
bnr. Ketin kincan

Kindirbazî kirin
bnr. Canbazî kirin

Kindirê (ykî) darve kirin (darde kirin)
Biryara mirinê dan. **Wan ji zû de biryar dane û* ***kindirê wî darde kirine****, lê rewş destûrê nade wan.*

---

[*] **Kilek rûn:** Ji bo rûnê ku carekê di kêyana meşk an jî nehêrê de derdikeve tê gotin. Ew jî nêzîkî giraniya kîloyekê ye.

Kindirê (yekî) qut kirin
Ji jiyanê qut bûn. **Lawo lawo, Xwedê **kindirê te qut bike**.* (nifir)

Kinik e, binerdik e
bnr. Çiqasî li ser erdê ye ew qasî jî di bin erdê de ye.

Kinik im ji malê re, dirêj im ji şalê re.
Her karî pêk tînim. **Ji bêgavî divê ez bibêjim, **kinik im ji malê re, dirêj im ji şalê re**.*

Kir jê hatin
bnr. Gir jê girtin

Kir kirin, pir kirin
Bi viran xwe pêkhatî û nîşan dan. Lafekî kirin. **Nazim **kir kir, pir kir**, lê di dawiyê de gotina xwe bi cih anî.*

Kir û bira xwe kirin
Biryara peymana xwe dan. Pirsgirêk kuta kirin. **Jixwe wan kir bira xwe berê kirine, hema ewê fatihayekê bixwînin û temam.*

Kiras guherandin
Guherîn, ketin rewş û teşeyeke din. **Berê Osman ne wisa bû lê dû re wî jî **kiras guherand**.*

Kirasê bêpasûk xistin stûyê (yekî)
bnr. Kirasê bêpêsîr bi stûyê (yekî) de danîn

Kirasê bêpêsîr lê kirin
bnr. Kirasê bêpêsîr bi stûyê (yekî) de danîn

Kirasê bêpêsîr bi stûyê (yekî) de danîn
Îftira kirin. Bêbextî li yekî kirin. **Min tiştekî wisa ji wan hêvî nedikir, hema li cihê se-kinî **kirasekî bêpêsîr di stûyê min de danîn**.*

Kirasê min şahr e, xwarina min jehr e.
bnr. Serê min bizêr e, bejna min bişehr e, dilê min bijehr e.

Kirasê mirinê çirandin
Xeteriya girîng raborandin. **Di wê demê de Simko **kirasê mirinê çirand**.*

Kirasê nedirûtî li mirov kirin
bnr. Kirasê bêpêsîr bi stûyê (yekî) de danîn

Kirasê qetlê li xwe kirin
Bi karên xeter re mijûl bûn. **A rastî Úso hema **kirasê qetlê li xwe kiriye** û ketiye pêşiya mêrikan.*

Kirasê wî spî ye, sabûna wî bideyn e.
Ji bo rewş û karên çiloçepî tê gotin. **Ez çi bibêjim? **Kirasê wî spî ye, sabûna wî bideyn e.***

Kirasê xwînê li xwe kirin
Îftira avêtin kesekî. **Ew ên bênamûs bi qeleşî* ***kirasê xwînê li xwe kirin*** *û jiyana Heyder heram kirin.*

Kirasekî ji êgir li xwe kirin
Ketin nav karekî xeter. **Bi vê helwestê te* ***kirasekî ji êgir li xwe kir****, Xwedê axiriya te bi xêr bigerîne.*

Kirin agir û berî canê xwe dan
1. Qencî lê kirin, lê li hemberî qenciyê xirabî dîtin. **2.** Ji ber azîneke çewt nêzîkbûnê yek azirandin û xerabtir kirin. **Wî qencî lê kir, lê çi zanibû ku wê* ***bike agir û berî canê xwe bide****? *Bavê wî tim lê da, lê da, heta ku* ***kire agir û berî canê xwe da****.*

Kirin aqilê xwe
Biryareke vebirî girtin. Bibiryar bûn. **Wê* ***kiriye aqilê xwe****, tu bibêjî jî nebêjî jî wê bike.*

Kirin bin hêvşiya xwe
Xistin bin kelîja xwe. **Wan ew keçik jî* ***kirine bin hêvşiya xwe****.*

Kirin çavên (yekî) (Di çavê (yekî) re kirin)
Kirin an jî gotina xwe wekî minet li sêrî xistin. **Ku Qahir qenciyeke piçûk bi kesekî bike, sed carî jî* ***dike çavên wî****.*

Kirin dewsa (şûna) merî û însanan
bnr: Danîn dewsa meriv û însanan

Kirin nava kêşekî gû û agir berdanê
Yek rezîl kirin. **Ma rezîl û ruswakirin jî tiştek e? Pelşîna Zohatê Dîno* ***kirin nava kêşekî, gû û agir berdanê****.*

Kirin qûna segan û derxistin
Rezîl kirin. **Yasîn çima ku li hemberî apê xwe dengê xwe zêde bilind kir, bavê wî ew* ***kire qûna segan û derxist****.*

Kirin tava bêjingê
Ji bo karên pûç tê gotin. **Ya ku ew dike,* ***kirin tava bêjingê ye****.*

Kirin tayê tereziyekê
Wekî hev û din girtin. **Ew her du gelekî ji hev û din cuda ne, lê Zelîxanê ew her du jî* ***kirine tayê tereziyekê****.*

Kirin zirtexaneya pîrhevokan
Bêrûmet û bênirx kirin. **"Ji lewra ji bona vê yekê te ez avêtim pişt guhê xwe, te ez ji çav û dil dûr xistim, te ez kirim* ***zirtexaneya pîrhevokan****..."* Celadet Alî Bedirxan

Kirinên xwe li serî xistin
Kirinên xwe wekî minet dayîn ber hinekan. **Ya ku ew dike tu ne kar e,* ***kirinên xwe li serê me dixe****.*

Kirîn û firotin, dinya sotin.
Yên ku bi bazirganiyê re mijûl dibin, dinyayê dişêlînin. ***Kirîn û frotin, dinya sotin.** *Eşedibilah gelekî rast gotine.*

Kirkirkê filehan li ser serê (yekî) qelandin
Lê zilm û zor kirin. **Welehî malbata jina wî **kirkirkê filehan li ser serê Kemal qelandin**.*

Kirt birîn
Bi awayekî zû û vebirî kirin. **Wî gelek tişt digotin, lê dema ku min ew yek got, dengê xwe **kirt birî**.*

Kişî ser hev kirin
Ji bo têkiliya heywanan a zayendî tê gotin. **Wî hesp û melîn **kişî ser hev kirin**.*

Kişkişî kirin
Hadandin. Rakirina helanan. **Xelo ji wî rûyê xwe yê spî şerm nedikir û tim zarokên xwe **kişkişî vir û wir dikirin**.*

Kişîna qalikê xwe
Bê helwest man. Dev ji tevgerê berdan. **Berê Ûsivê Eliyê Devav hinekî xwe gijeve kir, lê dû re ew jî **kişiya qalikê xwe**.*

Kişnîş şirîn e, lê dûv li gewriyê dimîne.
Hinek tişt kirina wan xweş e, lê carinan bedelan dixwazin. ***Kişnîş şirîn e, lê dûv li gewriyê dimîne.** *Divê mirov ji bo temah û berjewendiyan zêde xwe neêşîne.*

Kitana (destmala) jinê li serî bûn
Ji bo mêrên tirsek û serjinikî tê gotin. **Heke tu neyê, **kitana jina te li serê te be**.*

Kitik ne li mal e, navê mişk Evdirehman e.
bnr: Di xelaya mêran de navê dîkan danîn Evdirehman.

Kizîn ji dilê (yekî) hatin
Dil şewitîn, xemgîn bûn. *"**Wî car caran di bin çavan re li jina xwe dinihêrî û **kizîn ji dilê wî dihat**."* Tosinê Reşît

Kizinî ji kezebê hatin
bnr: Kizîn ji dilê (yekî) hatin

Kitana te li qirika te bigere
*Înşelah kitana wê li qirika wê bigere. (nifir)

Kizinî bi dil xistin
Dil şewitandin. Di hêla hestyarî de bandoreke tund li ser kesekî kirin. **Wê zaroka seqet **kizinî bi dilê min xist**.*

Kizinî ji dilê (yekî) çûn
Dil şewitîn, li ber xwe ketin. **Wexta keça wê defn dikirin, **kizinî ji dilê diya wê çû**.*

Kizînî ji kezebê hatin
bnr. Kizinî ji dilê (yekî) çûn

Kî babê subahê ye?
Kî dizane sibehê wê çi bibe? **Karê dinyayê qet kifş nabe,* ***kî babê subahê ye?***

Kî bi kê, kî kire kê?
bnr. Kî kire kê?

Kî bi kê re ye kifş nebûn
1. Kî alîgir û hevalê kê ye ne kifş bûn. **2.** Kîjan jin û mêr bi hev û din re di nav têkildariya zayendî de ne kifş nebûn. **Di hilbijartina vê carê de* ***kî bi kê re ye hê ne kifş e.*** **Di nav wan de rûmeta namûsê jî nema ye,* ***kî bi kê re ye ne kifş e.***

Kî bûk e ew pê re berbû ye.
Ji bo kesên ku dikevin nava hemû tiştî tê gotin. **Jixwe Şadiya nebûya nedibû, ma tu nizanî ku* ***kî bûk e, ew pê re berbû ye?***

Kî çav bi serê min dikeve, serê xwe bi heft rengan girê dide.
Ez kesekî bêşans im. **Wê çawa be ev şansê min?* ***Kî çav serê min dikeve, serê xwe bi heft rengan girê dide.***

Kî çi dibêje, diavêje tûrê xwe.
Ji bo kesên xemsar û tehmûlfireh tê gotin. **Ji Gevezê re çi,* ***kê çi dibêje, ew diavêje tûrê xwe.***

Kî dibêje: "Were kar." Li dilê min dibe azar. Kî dibêje: "Were taştê." Li dilê min gelek xweş tê.
Ji bo kesên teral û ji rehetiya xwe hez dikin tê gotin. ****Kî dibêje: "Were kar." Li dilê min dibe azar. Kî dibêje: "Were taştê." Li dilê min gelek xweş tê.*** *Rêzan jî dibêje hema bidin ez bixwim û velezim.*

Kî dike, kî dixwe!
Hinek kedê didin, hinek jî li ser wê kedê rûdinin. **Tu yê çawa bikî ew jî sîstema dinyayê ye,* ***kî dike, kî dixwe!***

Kî diwêre bibêje şêr: "Bêhn ji devê te tê."
Yên ku bihêz û bibandor bin, ji tirsan kes nikare kêmasiyeke wan jî bibêje. ****Kî diwêre bibêje şêr: "Bêhn ji devê te tê.?"*** *Carinan ji bo wê jî hêz û zanîn pêwîst e.*

Kî dixwe, kî li xwe dixe!
bnr. Kî dixwe û kî serê xwe dixe!

Kî dixwe savarê, ew ê here hewarê.
Mirov ku têkeve bin minetan, wê di dawiyê de li hemberî wê bedelan jî bide. **Ji min re çi?* ***Kî dixwe savarê, ew ê here hewarê.***

Kî dixwe û kî serê li xwe dixe!
Hinek karê xwe pêk tînin, hinek jî ziyanê didin xwe. **Ev dinya dinyayek ecêb e.* ***Kî dixwe kî li serê xwe dixe!***

Kî ji wê dinyaya din hatiye?
bnr. Kî serbixwîn ji wê dinyayê hatiye?

Kî diya min mehr bike, ew bavê min e.
Ji bo kesên ku tenê li berjewendiyên xwe difikirin tê bikaranîn. **Kî çi dibêje ne xema min e.* ***Kî diya min mehr bike, ew bavê min e.***

Kî serbixwîn ji wê dinyayê hatiye?
Kî dinyaya din dîtiye? Dinyayek din tune ye. **Ew gotinên meleyan nakevin serê min. Ka nîşanî min bidin,* ***kî serbixwîn ji wê dinyayê hatiye?***

Kî şemitî, ew şewitî!
Kî çewtiyê bike wê ziyanê bide xwe. *****Kî şemitî, ew şewitî.*** *Lê bi dîtina min tenê ew neşewitî, hawîrdora wî jî şewitî.*

Ku der tav be, kurkê xwe li wir raxistin
Berjewendiyên xwe li pêş girtin. **Ew çi zexel e,* ***ku der tav be, ew kurkê xwe li wir radixe.***

Ku der xwar e, jê re war e. (Ku der xwar e, ew der ji min re yar e.)
Ji bo wî ne xem e, derk nîn e. **Ew jî wilo ye, ji wî re çi?* ***Ku der xwar e, ji wî re war e.***

Ku der zirav e, bila di wir de bişikê (biqete)!
Êdî çawa dibe, çi ziyan dibe, bila bibe, qet ne xem e. **Êdî sebra min nema hema* ***ku der zirav e, bila di wir de biqete.***

Kîjan cemê bar xwar bibe, xwe dayîna wî alî
Alîgiriya yên hewcedar kirin. **Di wê jiyana wî ya dirêj de, tu kes ji wî neêşiya.* ***Kîjan cemê bar xwar bibûya, xwe dida wî alî.***

Kîn ajotin
Li hemberî kesekî hestên dijminahî ajotin. **Ew pir* ***kîn diajo.*** *Xwedê kesekî neke dijminê wî.*

Kîna filehan (gawiran) ajotin
Kînek pir tund ajotin. **Xwedê mirov ji Almastê biparêze, ew* ***kîna filehan diajo.***

Kîna xwe jê derxistin
Ji ber hêrs û buxza tiştekî yan jî bi dijminayî nêzîkî kesekî bûn. **Xezalê ji hewiya xwe hêrs bûbû lê* ***kîna xwe tev ji wê keçika reben derxist.***

Kîna xwe kirin (yekî)
Li hember kesekî hestên dijminayê ajotin. **Hemîdeyê* ***kîna xwe kiriye wî,*** *ew çi bike, nikare xwe pê şirîn bike.*

Kîna xwe kutan (yekî)
bnr. Kîna xwe kirin (yekî)

Kîr bi keran ve jî heye!
Mêrbûn tenê bi têkilî û bandora zayendê nabe. *****Kîr bi keran ve jî heye,*** *ez dixwazim mêrê min, bi taybetiyên xwe yên din derkeve pêş.*

Kîr di mistê de man
Armanc nîvce man. Negihîştin hedef û armancê. **Xecê gelekî li dû wê erebeyê ket, lê mirazê wê pê nebû û ma* ***kîr di mistê de.***

Kîr di dest de bûn

Der barê mijara zayendî de di nav helwest û karvaniyên neyînî de bûn. **Emer çi doxîn-sistek e, her tim* ***kîr di dest de ye****.*

Kîrê deveyê li qûna pisîkê rast kirin

Karê çiloçepî û nelihev kirin. **Ew dîn e, çi ye? Karê ku dike hema ew e ku,* ***kîrê deveyê li qûna pisîkê rast dike****.* (argo)

Kîrê (yekî) di dêv de bûn

Ji kesên pir didin xeberan, çêran dikin û gotinên mistehcen dibêjin re tê gotin. **Malxiṛabê Weysî hema çi bibe,* ***kîrê wî di dêv de ye*** *û dest bi sixêfan dike.* (argo)

Kîrê (yekî) li diriyê neketin

Hêj li rastî zor û çetinayê nehatin. **Bila ew niha wisa lafekiyê bike, hela hê* ***kîrê wî li diriyê neketiye****.*

Kîrê li nav dest û piyan bûn

Ji bo tişt an jî kesên bêxwedî û bêserî tê bikaranîn. **Kuro, hema ew jî bûye* ***kîrê li nav dest û piyan****.* (argo)

Kîrê min rabû, bû mîrê min.

Ew kesên ji min kêmtir bûn, li ser serê min bûne hikimdar. **Ev çi dinyayeke bêbext e?* ***Kîrê min rabû, bû mîrê min.*** (argo)

Kîrê wan wekî yê segan e, ku kete mirov dernakeve.

Ji bo kesên bêar û rezîl tê gotin. **Min ji we re got, ev mirovinên wekî benîşt in, bi wan re têkilîdanîn xeter e.* ***Kîrê wan wekî yê segan e, ku kete mirov dernakeve.*** (argo)

Koç li benda pîrê ma, pîrê hat û guh neda koçê.

Ji bo ked û helwesta bêbergîdan û vala tê bikaranîn. **Kesî wer hêvî nedikir,* ***koç li benda pîrê ma, pîrê hat û guh neda koçê****.*

Koça dawîn kirin (bar kirin)

bnr: Koça xwe ji vê dinyayê bar kirin

Koça xwe bi rêxistin (bi rê kirin)

Karê xwe pêk anîn. **Wî ji zû de* ***koça xwe bi rê xistiye****, hûn li xwe bifikirin.*

Koça xwe ji vê dinyayê bar kirin

Mirin. **Di dawiyê de Apê Kerem jî* ***koça xwe ji vê dinyayê bar kir****.*

Koçer û pîvaztirşk?

bnr: Hirç û govend, şivan û dîwan?

Koda zêrîn, çûye bi dû kevçiyên darîn ketiye.

Ji bo kesên ku hay ji nirx û zerengiya xwe nîn in, xwe bi kesên an jî tiştên ne layiqî xwe re diwestînin tê gotin. **Ew bêmêjî bi xwe* ***koda zêrîn e, lê mixabin çûye bi dû kevçiyê darîn ketiye****.*

Kodik welgerîn

bnr: Risq qut bûn

Kodika (yekî) tijî dew bûn
Rewşa aborî şên bûn. **Lawo lawo,* ***kodika te tim tijî dew be****.*

Kofîya xwe xwar kirin
bnr: Kumê xwe tel danîn

Kok dayîn tavê
bnr: Kok lê qelandin

Kok lê anîn
bnr: Kok lê qelandin

Kok lê birandin
bnr: Kok lê qelandin

Kok lê danîn
bnr: Kok lê qelandin

Kok lê qelandin
Tune kirin. Komkujî kirin. **Wan got: "Em ê* ***kok lê biqelînin****." Lê dû re fêm kirin ku gelê kurd xelas nabe.*

Kok li ser rûyê erdê qelandin
bnr: Kok lê qelandin

Koka hev anîn
Bi hev du re şerekî mezin danîn, hev û din kuştin, tune kirin. **Di wî şerê dawîn de wan her du eşîran* ***koka hev anîn****.*

Kokana berxan li ber devê qula gur girê dan
bnr: Çîpa gur girtine, avêtine nav koza berxan.

Kolozê xwe xwar kirin
bnr: Kumê xwe tel danîn

Komek hestî man
Gelekî jar bûn. **Piştî hatina hewiyê, Qutê* ***komek hestî ma****.*

Komek xizan, seriyek çortan
Rûmeta feqîran tune. **Di berê de jî min digot,* ***komek xizan, seriyek çortan****, Xwedê kesî feqîr meke.*

Kone bûn
bnr: Ji pozê şeytên ketin

Konê (yekî) danîn
Mala yekî xera kirin. **Min got, lawo bi van kûçikên bêserî re hevaltiyê meke, lê guh neda min, heya ku wan* ***konê wî danîn****.*

Konê (yekî) di serî de reş gerîn

Bela û şeteleyek hatin ber derê yekî. Malwêran bûn. **Piştî şerê beberiya wan, du kurên Sêvdîn Axa hatin kuştin û **konê wî di serî de reş geriya**.*

Konê reş, warê xweş

Konên reş pir xweş e. **Ew ji konên reş pir hez dikin. Hema dibêjin; "konê reş, warê xweş."*

Konê reş î devjev e, ne nan e, ne av e.

Naverok û xuyang ji hev cuda bûn. ****Konê reş î devjev e, ne nan e, ne av e.** Tu li malê dinêrî xemilandiye, lê kozî û kulfet jî di hundir de birçî ye.*

Konê xwe bar kirin

1. Ji derekê veqetîn, mala xwe bar kirin. **2.** Mirin. **"Êdî gelek zelal xuya dikir ku Hurmuzê pîroz **konê xwe bar kirî** ..."* Fêrgîn Melîk Aykoç **Piştî mirina jinê, ew jî zêde nema, wî jî **konê xwe bar kir û çî.***

Konê xwe bêdeng vegirtin

Karê xwe bi dizî meşandin. **Hadî, wisa **konê xwe bêdeng vegirt** ku me hew mêze kir wa ye jina duyemîn haniye.*

Konê xwe li ser derewan ava kirin (danîn)

Gelekî derew kirin. **Mala Edoyê Ferzende neşewitiyo, hema **konê xwe li ser derewan daniye**.*

Konê xwe vegirtin

Li cihekî bicih û war bûn. **Mirinê li mala Wahab **konê xwe vegirt** û du zarok û jina wî bir.*

Kor be jî, kul be jî cixarekêşekî têjmaqûl e.

Çi dibe bila bibe, hema ew merîfet jî besî her tiştî ye. ****Kor be jî, kul be jî cixarekêşekî têjmaqûl e;** ne xem e, hêjayî her tiştî ye.* (bnr. çîrok)

Kor feleqî

Ev çi bedoxirî û şetele ye. Ev çi bela û rewşeke ecêb e. ****Kor feleqî!** Ev bênamûs wa ye dîsa derket ser riya min.*

Kor gote kor: "Min di çavê te yê kor gawo!" (Koreyî gote koreyî: "Min di çavê te ve.")

Hinek rewşa xwe ya xerab nabînin. **Bila ew bi xwe ne wisa bû ya ne kul bû, loma gotine: **"Kor gote kor: "Min di çavê te yê kor gawo!"***

"Kor be jî, kul be jî cixarekêşekî têjmaqûl e."

Jinikek mêrê wê cixarekêş bûye. Lê di çavê jinikê de hêjahî, meziyet û mezinaya mêrê wê ya herî mezin jî cixarekêşiya mêrê wê bûye. Rojekê dîsa jinik pesnê mêrê xwe dide. Yên li wir jê pirs dikin û dibêjin:

"Ma mêrê te ne topal e ?" Jinik dibêje:

"Belê." Dîsa jê dipirsin:

"Ma çavekî wî jî ne kor e ?"

"Belê çavekî wî jî hemangî kor e." Her kes bi meraq dibêje:

"Ka çi ma? Çi meziyet û merfeta mêrê te heye?" Jinik wan dibersivîne :

"Ew cixarekêşekî têjmaqûl e."

***Têjmaqûl:** Maqûlê mezin

Kor qeda
bnr: Kor feleqî

Koro li vir be, ez ê bigerim; heke min ji korê xwe çêtir dît baş e, hey ne, ez ê li korê xwe vegerim.
Ez ê li ya hê baştir bigerim, ku nebe, jixwe ev ya min e. **Ew bêguman nîn e, loma jî dibêje:* ***"Koro li vir be ez ê bigerim, heke min ji korê xwe çêtir dît baş e, hey ne, ez ê li korê xwe vegerim."***

Koro tu li min binêre bi çavekî, ez li te binêrim bi her du çavan.
Tu ji min re baş bî, ez ê ji te re zêdetir baş bim. *****Koro tu li min binêre bi çavekî, ez li te binêrim bi her du çavan.*** *Êdî ez zêde tiştekî nabêjim.*

Kortika qûna xwe dîtin
Ji bo tiştên ne guncav tê bikaranîn. **Piştî wan kirinên wî, ew* ***kortika qûna xwe bibîne****, nikare qîza min bibîne.*

Kose çû ku rih berde, simbêl jî bi ser de da.
bnr: Çû heyfa bavê, qûna dê jî da ser.

Kosî (kûsî) naxwe avriya masî.
Hinek caran yên bed û bedcure, xwe di ser ê bedew û spehî re dibînin. **Ew jî karên Xwedê ne,* ***kûsî naxwe avriya masî****.*

Kotek dizane qonax kanê.
Carinan zor hinek karan çareser dike. **Hinek caran* ***kotek dizane qonax kanê****.*

Kotek xwarin
Lêdan xwarin. **Te jî ew qas* ***kotek bixwarana****, tu dê jî ew qas tişt bigotana.*

Koza karan, daye ber devê guran.
Karê pir xeter û xerab kirin. **Qet qala Serdar nekin; wî* ***koza karan daye ber devê guran****.*

Kozek agir ketin dilê (yekî)
Pir li ber xwe ketin, xemgîn bûn. **Mirina lawê wê bû* ***kozek agir û kete dilê Gulîzerê****.*

Ku bê çengê min, tê bibînî rengê min.
Heke firsend bikeve destê min, tu dê wê çaxê bibînî bê ez kî me û çawa me. **Ez niha tu tiştî nabêjim,* ***ku bê çengê min, tê bibînî rengê min****.*

Ku çira vemire, kor çi jê ye.
Yê ku bandor lê nebe, jê re ne xem e. **Her tişt li gorî bandorê ye.* ***Ku çira vemire, kor çi jê ye.***

Ku dibe sar, tîtî dibêje: "Ez ê ji xwe re xaniyekî bigirim."
Ji bo kesên ku bêxem bêsazûman in, kar û tedbîrê di demê de pêk naynin tê gotin. **Ya te jî hûye ya tîtî, ew jî li pey tiştên demborî ye.* ***Ku dibe sar, tîtî dibêje: "Ez ê ji xwe re xaniyekî bigirim."***

Ku got reş e, tu bibêje spî ye.
Tu car bi gotina wî bawer nebe. Ji bo kesên derewîn tê gotin. **Eman ew çi bibêje, tu berevajiyî wî fêm bike, wî* ***ku got reş e, tu bibêje spî ye****.*

Ku got sibeh e, tu bibêje êvar e.
bnr: Ku got reş e, tu bibêje spî ye.

Ku hebe, dixwe, tune be, dua dike.
Ji bo mirovên teral tê bikaranîn. **Ew yekî ecêb e, heke* ***ku hebe dixwe, tune be, dua dike****.*

Ku heq hebûya, Emer Bedê mehr nedikir.
Heq û hiqûq li vê dinya yê çi digere? **Jixwe dad û mirovahî nîn e.* ***Ku heq hebûya, Emer Bedê mehr nedikir.***

Ku here ser kaniyê, kaniyê lê zuha dibe.
Bêşans bûn. **Bawer mirovekî wisa qederreş e, ku* ***here ser kaniyê, kanî lê zuha dibe****.*

Ku neynûk hebe, wê pê xwe bixurîne.
Rewşa aborî ku baş be, wê berê ji bo kêra xwe bi kar bîne. **Bi çi aqilî tu jê dixwazi?* ***Ku neynûk hebe, wê pê xwe bixurîne.***

Ku taca pêxember li serê (yekî) be, kes jê bawer nake.
Ji bo kesên sextekar û derewîn tê gotin. **Çima tu jî nizanî* ***ku taca pêxember li serê wî be jî kes ji wî bawer nake****.*

Ku Xwedê bibêje: "Erê" Em dê hev bibînin li ser bênderê.
Heke em nemirin, em ê wê demê bibînin ka kê çi kiriye. **Bila qet kes xeber nede.* ***Ku Xwedê bibêje: "Erê" Em dê hev bibînin li ser bênderê.***

Ku Xwedê li hev anî, Nûrê dikim kevanî.
Heke pêk bê, ez ê bi ya xwe bikim. **Ez nikarim zêde xeber bidim lê* ***ku Xwedê li hev anî, Nûrê dikim kevanî****.*

Ku xwediyê aşî dev ji aşî berda, ma qeraş wê çi bike?
Heke ku xwediyê sikurê meke, kes nikare tiştekî bike. **Bi hewldana te nabe ezbenî.* ***Ku xwediyê aşî dev ji aşî berda, ma qeraş wê çi bike?***

Kufarê kevn bûn
Pir temendirêj bûn. **Kuro ji wî mezintir kes tune ku temenê wî bizanibe bê ka ew çend salî ye?* ***Ew kufarê kevn e.***

Kufekuf kirin
bnr: Ofînî pofînî kirin

Kul hat malê, hemûyan li çavê xulam nihêrîn.
bnr: Gotin: "Kul hatiye gund wê ji her malê du kesan bibe." Hemû kesî çavên xulam nihêrî. Xulam got: "Belê yek ez lê ka yê din?"

Kul hate malê ku sê mirovan bibe, hemûyan li çavên xulam nihêrîn. Xulam got: "Yek ez, lê herduyên mayî kî ne?"
bnr: Gotin: "Kul hatiye gund wê ji her malê du kesan bibe." Hemû kesî li çavên xulam nihêrî. Xulam got: "Belê yek ez lê ka yê din?"

Kul hatin dîwarê malê
Xeterî zehf zêde bûn. **Divê êdî ji îro pê ve hûn zêdetir li ser xwe serwext bin, çimkî **kul hatiye, diwarê malê**.*

Kul heye, kulreş heye.
Derdê xerabtir jî hene. **Ew qasî jî xemgîn nebe lo! **Kul heye, kulreş heye.***

Kul ketin dilê (yekî)
Ji ber gelşeyekê dexesî kirin, êşîn. **Ew nabêje, lê ez dizanim ku ji ber wê gotinê **kul kete dilê wî**.*

Kul ketin zik
bnr. Kul ketin dilê (yekî)

Kul li dilan e, xeftanî li milan e.
Belê rewş ji der ve xweş tê xuyan, lê dil tijî derd û kul in. *****Kul li dilan e, xeftanî li milan e.*** *Tu li rewşa wî ya derve menêre, li ya hundirê dilê wî mêze bike, bê çi tê de heye.*

Kul li konê (yekî) ketin
Mal wêran bûn. **Di dawiyê de **kul li konê wî jî ket**, mala wî tûr û tewas bû.*

Kul li malê ketin
bnr. Kul li konê (yekî) ketin

Kul û derd avêtin hundirê xwe
bnr. Bi xwe hundirê xwe xwarin

Kul û kor li hev civiyan (vehewiyan), li dikana Evdilor.
Yên ku layiqî hev in hev û din dîtine. **Maşelah, çawa rind hev û din dîtine. **Kul û kor li hev civiyan, li dikana Evdilor.***

Kula (yekî) di zikê (yekî) de bûn
Di hundirê xwe de li hemberî kesekî niyeteke nebaş sêwirandin. **Ez baş dizanim, piştî ew qas salan hê jî **kula min di zikê wê de ye**.*

Kula dilan e, xeftanê milan e.
bnr. Kul li dilan e, xeftanî li milan e.

Kula dû mirinê bûn
Ya xerabtirîn bûn. **Ew jî derdê li ser derdan re ye heyran, ew jî **kula dû mirinê ye**, hatiye serê me.*

Kula kor li qapiyê (yekî) ketin
Rastî bela û şeteleyê hatin. *****Kula kor li qapiyê (derî) wî xistiye**, êdî çi di wî de maye?*

Kula kûr, çav li riya dûr.
Hesretkişandin zor e. *****Kula kûr, çav li riya dûr.*** *Ev çend sal in ji dest hesreta lawê xwe ez çi dikişînim, tu ji min pirs bike.*

Kula Mendo, kulor in.
Ew jî ketiye heyra tiştên vala. *****Kula Mendo jî kulor in.*** *Tu bi Xwedê em bi çi re îşiqa çavê xwe dirijînin, ew bi çi re mijûl e.*

Kula min kirî, kêfa te kirî.

Tu li derdê min binêre, tu li kêfa wî binêre. *"De Xezal, de bibêje! ***Kula min kirî, kêfa te kirî.*** Xezal de bibêje lê..."* Harbi Soylu

Kula xwe der kirin

Derdê xwe anîn ziman. *"Lê çîroka her kesî di nav dilkê wî de veşartiye. Bêje ya her kesî bi wan re diçe gorê. Bi tenê hozan û dengbêj ***kula xwe der dikin***."* Hesen Zinar

Kula xwe rêtin

Ji kesekî re qala pirsgirêk û derdê xwe kirin. *"... Lê wî dixwest ***kula xwe li ber hevala birêta***."* Eliyê Ebdilrehman

Kulavê xwe ji avê derxistin

Bi xwe çareya serê xwe dîtin. **Tu dev jê berde, êdî ew bi xwe dikare* ***kulavê xwe ji avê derxe***.

Kulavgûyo malî ava!

Ji bo kesên ku qencî lê tên kirin lê ew wê qenciyê bi tiştekî nahesibînin tê gotin. **Min jê re ew qas alîkarî kir, lê wê di dawiyê de got:* ***"Kulavgûyo malî ava!"*** *Û çû.* (bnr. çîrok)

Kulê jî dcriyê (yekî) venekirin

Ji bo kesên ku mêvan naçinê û di hêla civakî de sar in û bêtêkilî ne tê gotin. **Mala Koçoyê Qert wisa ye ku qet* ***kul jî derê wan venake***, *loma zarokên wan jî wer hov û newan in.*

Kulê lê xistin

Li rastî bela û qotikekê hatin. **Belengazê Sedoyê Kêçxwir, hema di nûvê rê de dirêj bû; te digot ji nişka ve* ***kulê lê xist***.

Kulê li dil girtin

bnr. Kulê lê xistin

Kulê li gewriyê (qirikê) girtin.

Zêdetir ji bo zarokan tê bikaranîn. ***Kulê li gewriyê girtî**, wekî bizotê ye.* (nifir)

"Kulavgûyo malî ava!"

Mêrikek hebû, jina wî pir gemarok û pîs bû. Ji ber wê mala wî jî pir qilêr bû. Ji ber qilêrokiya wan, ji wan re digotin, *"kulavgû"* Mêrik rojekê ji jina xwe re got:

"Jinik ez ê çawa bikîm? Navê min di nav gel de bûye kulavgû. Her kes hema li rûyê min jî, li piştmin de dibêje, kulavgû. Ez pir şerm dikim. Wê çawa be ev halê me?" Jinikê got:

"Mêrik ez tiştekî difikirim, ka tu çi dibêjî?" Mêrik got:

"Hela bibêje, ka tu çi difikirî?" Got:

"Mêrik ka ez mala me rind paqij bikim. Kulavan jî baş bişom. (Çimkî ew nav ji qilêrbûna kulavan li wan hatibû danîn.) Tu jî wê çêleka me (jixwe çêlekek wan tenê hebûye) şerjê bike. Em ê xwarineke xweş çêbikin. Firaqên xwe û hemû tiştên xwe rind bişom. Tu jî bibêje ez ê xêra diya xwe bidim. Em ê hemû der û cînaran vexwînin malê. Milet ku bê xwarinê bixwe, mala me jî paqij bibîne, wê demê bi şûn de êdî tu kes ji te re nabêje, kulavgû." Mêrik got:

"Tu baş difikirî evda Xwedê, hema em ê wekî gotina te bikin." Jinik rabû mala xwe şûşt, veşûşt, her der paqij kirin; mêrik jî çêleka xwe ya heyî şerjê kir. Xwarinên cure cure çêkirin. Mêrik kete nav gund yeko yeko her kes vexwende mala xwe û got: *"Kerem bikin werin mala min, ez xêra diya xwe didim."* Hemû gundî çûn mala mêrik, nanê xwe û ava xwe xwarin, vexwarin. Dema ku wê herin, mêrik li ber dêrî sekinî ku wan verê bike. Her kesî di dema çûyîne de destê xwe da destê mêrik û gotin:

"Kulavgûyo malî ava!"

Kulê tu li min bikevî!
Ma ez ew qasî jî nikarim? **Ro hatibû nîvro, Miho hêzek da xwe, ji nava cî rabû û got: "**Kulê tu li min bikevî,** ma ez mêrê vê rewşê me?"*

Kulên xelkê tên ji çol û çiyan, yên min tên li ber piyan.
Ez mirovekî bêşans im. **Ez çi bibêjim bêkêr e.* ***Kulên xelkê tên ji çol û çiyan, ên min tên li ber piyan.***

Kuleka (yekî) dû negirtin
1. Rewşa aborî xirab bûn. **2.** Bêewled û bêtewled bûn. **Rebenê Yezdan **kuleka wî tu car dû negirt**, gelî têr e, gelî birçî ye. *Mixabin **kuleka wî xalê min, dû negirt** û bi hesreta ewledekî çû qebrê.*

Kulingê xwe serê carê li cihekî xistin
Vir û derew kirin. Serê carê tiştek gotin. **Xêr ji wî sextekarî nayê lo!* ***Serê carê kulingê xwe li cihekî dixe.***

Kuliyan piyên (yekî) xwarin
Ji bo kesên ku zehf hêdî dimeşin tê gotin. **Kuro, ma **kuliyan piyên te xwarine**? Ka hinekî zû bimeşe lo!*

Kulî zimanê (yekî) xwarin
Ji kesên ji ber heyecan û xiroşê yan jî ji şaşwaziyê nikarin bipeyivin re tê gotin. **Te digot **kulî zimanê Gebaro xwariye**, du hevok neanîn bal hev.*

Kulmek tenî bûn
Bela û xeta bûn. **"Bi vî awayî gund **bûbû kulmek tenî**."* Helîm Yûsiv

Kulomekên (yekî) qul bûn
Ji nexweşî yan jî ji şilbûnê (felç) li erdê rizîn. **Tu ku ranebî hinekî negerî, **kulomekê te dê qul bibin** û qet tu bi silametî nabî.*

Kum avêtin, şer xwestin
Daxwaza doz û tekoşînê kirin. **Rewş ne rewşa berê ye, wan jî **kum avêtin û şer xwestin**.*

Kumê Belo li serê Celo, yê Celo li serê Belo
Ji bo kesên sextekar ku bi fend û fûtan karan dikin tê gotin. **Karê wî jî ew e.* ***Kumê Belo li serê Celo, yê Celo li serê Belo.***

Kumê bênamûsiyê dayîn serê xwe
Bêbext bûn. Bênamûsî kirin. **Siyaro **kumê bênamûsiyê daye serê xwe**.*

Kumê bêxîretiyê dayîn serê xwe
bnr. Kumê bênamûsiyê dayîn serê xwe

Kumê (yekî) kirin çavan
Rewş xera bûn, bi şermiyê ketin. **Reva qîza wî,* ***kumê Zana kire çavê wî.***

Kumê keçel, eyba veşartî
Hinek tişt hene ku eşkere nebin xweştir dibe. **Dev ji min berde dayê, devê min veneke.* ***Kumê keçel, eyba veşartî.***

Kumê kulfet e, niga hespê kumêt e.
bnr: Sim sima kerê ye, fêl fêlê Perê ye.

Kumê min ji rastiyê qetiyaye.
Ji ber ku ya rast dibêjim her kes derbeyekê li min dixe. **Li vî welatî rastî pere nakin. Ji ber wê **kumê wî ji rastiyê qetiyaye**.*

Kûmê rezîltiyê danîn serê xwe
Rezîltî kirin. Bêar bûn. **"Ji bo menfeet û rehetiya wan xera nebe, **kumê rezîltiyê kişandine serê xwe**."* M. Rauf Çiçek

Kumê (yekî) sor bûn
Bitorpîl û awarte bûn. **Di wir de ji ber ku **kumê me ne sor bû**, kesî li rûyê me nenihêrî.*

Kumê Tûto, li serê Nûto
bnr: Kumê Belo li serê Celo, yê Celo li serê Belo

Kumê Xelo li serê Celo, yê Celo li serê Xelo
bnr: Kumê Belo li serê Celo, yê Celo li serê Belo

Kumê Xiço li serê Piço, heçî hat û heçî çû
bnr: Kumê Belo li serê Celo, yê Celo li serê Belo

Kumê Xiço li serê Piço, ne hat ne diço.
bnr: Kumê Belo li serê Celo, yê Celo li serê Belo

Kumê xwe tel danîn
Kêf di cih de bûn. Kar baş meşîn. **"...û gelek tiştên mêrxasiyê û gelek hindirên xîretê li xwe mikur bike û **kumê xwe bide tel**."* Musa Vazgali

Kumê xwe avêtin hewa
Gelekî şad bûn. **Heke Smaîl di wî karî de bi ser bikeve, wê **kumê xwe biavêje hewa**.*

Kumê xwe bi xweliyê ve danîn serê xwe
Her tişt, her derd û kul pejirandin û kişandin. **Erê lawo, min **kumê xwe bi xweliyê ve daye serê xwe,** çi derdê we hebe, li min bar bikin.*

Kumê xwe danîn ber xwe
Nirxandin. Bi wîcdana xwe re lêhûrandin, hesab dîtin. **"Romannivîs divê di vir de **kumê xwe dayne ber xwe** û ji xwe re bifikire."* İbrahim Seydo Aydoğan

Kumê xwe li serê xwe girtin
Tenê li çareya serê xwe nihêrîn. **Qet nebe camêrî **kumê xwe li serê xwe digire**.*

Kumê xwe xwar kirin
bnr: Kumê xwe tel danîn

Kumo tu li vir bisek!
Ji bo karekî awarte navbereke demborî dayîn bawerî yan jî statuya xwe. ***Kumo tu li vir**

bisek! *Ev karê han ne layiqî te ye. Ez ê karê xwe yê hanê biqedînim dû re dîsa bêm û te hildim.* (bnr. çîrok)

Kumreşî kirin

Ji bo kesên ku dexesî dikin tê gotin. **Ji ber mêrê wê **kumreşiyan dike**, *Xezala reben nikare ji mal jî derkeve.*

Kund dibêje, ez ew qas im, lê aqilê min jî ew qas e.

Her kes xwe zêde dizane. **Her kes di barê dilê xwe de şêr e. **Kund dibêje, ez ew qas im, lê aqilê min jî ew qas e.***

Kundirê bejî bûn

bnr. Kundirê vala bûn

Kundirê mîranî, xweştir e ji şekir û sîranî, kesek tehma kundir hilneanî, xênî Arşiya Romanî.

Her kes ji her xweşikayî û bedewiyê fêm nake. **Ew ne hempayê devê te ye lawo. **Kundirê mîranî, xweştir e ji şekir û sîranî, kesek tehma kundir hilneanî, xênî Arşiya Romanî.*** (qerf)

Kundirê vala bûn

Ji bo kesên bêbandor û bêhiş tê bikaranîn. **Tu çi devê xwe didî ber devê wî **kundirê vala**?*

Kundiro jî gotina xwe got.

Vala axivîn, devê xwe vala nehiştin. ***Kundiro jî gotina xwe got.** *Mexseda wî ew bû ku bila nebêjin tiştek negot.*

Kur ji hinavê, bira ji bavê

Kur ji bira jî nêzîktir e. **Helbet bira jî pir girîng in, lê **kur ji hinavê, bira ji bavê**.*

Kur mezin bû, xem mezin bû.

Lawik ku mezin dibin, derd û kulên wan jî zêde dibin. **Erê, keçik jî carinan pirsgirêkan derdixin, lê **kur mezin bû, xem mezin bû**.*

Ku re zer bû, ku re der bû? (Di ku re zer bû, di ku re der bû?)

Di ew qas dema kurt de çawa gihîşt wê raseyê? **Bi rastî qet aqilê min hilneda vê meseleyê. Kuro, ev yek **ku re zer bû, ku re der bû**?*

Kurdî, halê xwe werdî

Kurd di halê xwe de ne, bi halê xwe dizanin. ***Kurdî, halê xwe werdî.** *Ma ew jî ne kurd e? Halê xwe dizane.*

"Kumo tu li vir bisek!"

Mirovekî misliman û oldar hebûye. Ji ber ku pir oldar bûye, tim kumekî nimêjê yê bi dantêlkî li serê wî bûye. Lê belkî ji oldariyê bêhtir jî der barê jinan de pir çavşor, heşerî û bîj bûye. Dema ku jineke bedew dibîne, li ber xwe nade, hema kumê xwe yê nimêjê ji serê xwe derdixe dide aliyekî û dibêje:

"Kumo tu li vir bisek." Ango, mislimaniya min, tu hinekî ji min dûr bikeve heya ez vî karê xwe yê ne layîqî te bikim dû re ez ê bêm bal te.

Kurê bavê (yekî) bûn
Xizm û lêzimên hev û din bûn. **Çi ye, tu ji ho wî serê xwe dişkênî, ma* ***kurê bavê te ye****?*

Kurên bavê hev bûn
Em gişk exrebeyê hev ên nêzîk in. **Kî çi dibêje bila bibêje, em gişk* ***kurên bavê hev in*** *û em nikarin ji hev bibin.*

Kurê bêdewlet, ji bal bavê xwe derket, paşî çû bû şivanê berazan.
Ewledên bêxêr, di dawiyê de xwe jî dixin rewşeke neyînî. **Ewledê bêxêr xwe jî û malbata xwe jî diêşînin.* ***Kurê bêdewlet, ji bal bavê xwe derket, paşî çû bû şivanê berazan.***

Kurê bêwar, çav li der
Heke ku mal milk û tiştekî ku pê re mijûl bibe tune be, çavê law dê bi xwezayî li der be. **Ma te çi hêvî dikir? Çi gotine:* ***"Kurê bêwar, çav li der."***

Kurê (keça) meriv û însanan bûn
Mirovekî baş bûn. **Heke Ezîzê Cindo* ***kurê meriv û însanan be****, vê yekê napejirîne.*

Kurê Kor Hiseyn Paşa bûn
Zehf zêde û awarte bûn. **Çima, ma* ***kurê te kurê Kor Huseyn Paşa ye*** *ku destê xwe naavêje karekî?* (qerf)

Kurê mino, ne ji mino, roja koçê barê mino
Kêra ewledan zû bi zû nagihîje dê û bavan, lê gelek caran li ser stûyê wan dibin bar. *****Kurê mino, ne ji mino, roja koçê barê mino.*** *Ev jî zagoneke xwezahî ye.*

Kurê şahqurdî miriye, pira heqiyê şikestiye.
Heq û hiqûq nemaye. **Ez çi bibêjim? Zeman xera bûye.* ***Kurê şahqurdî miriye, pira heqiyê şikestiye.***

Kurê Xwedê bûn
Xwedî biîmtiyaz bûn. **Wan wisa dor lê girtibûn, ku ew* ***bibûya kurê Xwedê*** *jî nikaribû ji dest wan xelas bibûya.*

Kurk sor bûn
bnr. Kumê (yekî) sor bûn

Kurkê Memê qebe ye, tiştek di bin de heye.
Di bin wî karî de tiştek heye. **Ez jî baş nizanim çi ye, lê* ***kurkê Memê qebe ye, tiştek di bin de heye****.*

Kurm di serê (yekî) de livîn (Kurm di zikê (yekî) de livîn)
Zexel, xayîn û nedurist bûn. **Ji te re dibêjim ji wê keçikê dûr bikeve.* ***Kurm di serê wê de dilivin.***

Kurm ketin dilê (yekî)
bnr. Kurm di serê (yekî) de livîn

Kurm ketin mêjiyê (yekî)
bnr. Kurm di serê (yekî) de livîn

Kurm tê de gerîn

1. Weswese ketin dil. **2.** Di dil de xayînî sêwirîn. **3.** Ji bo pêkanîna tiştekî dil daxwaz kirin. **Ji ber têkiliya zava û qîza xwe* ***kurm di Remo de digere****. *Dîsa* ***kurm tê de digere****. Wa ye wer tê xuyan ku Serwet ji bo nîvekarê xwe li hin lîstikan difikire.* ****Kurmê eraqê dîsa tê de digere****, înşelah vê carê dîsa dest pê nake.*

Kurm û kêzikên newalan, bûne kevaniyên malan.

Ne hêjayî cih û radeyê bûn. **Xwedê dizane ku* ***kurm û kêzikên newalan, bûne kevaniyên malan****.*

Kurmancê nezan got: "Bila bibe erzan, heta ku dev û deling lê bûne pizdan."

Ji bo kesên ku bi hesabê xwe nizanin tê gotin. ****Kurmancê nezan got: "Bila bibe erzan, heta ku dev û deling lê bûne pizdan."*** *Ew jî azînek çewt e.*

Kurmancî têr e, xew jê re çi ye?

Kurmanc zêde tiştekî naxwazin. **Nizanim çiqasî rast e, lê dibêjin:* ***"Kurmancî têr e, xew jê re çi ye?***

Kurmê bêariyê dev ji pêsîra (yekî) bernedan

Ji xuy û xisletê xwe xelas nebûn. **Bibore, lê ez bawer nakim ku ew keçik zêde bê guherandin. Ew* ***kurmê bêariyê zû bi zû dev ji pêsîra wê bernade****.*

Kurn bi te re me, şerbik tu guhdar be.

bnr. Deriyo ji te re dibêjim, piştderiyo tu guh bidê.

Kurt birîn

bnr. Kin lê xistin

Kurte kurmancî kirin

Bi awayekî ne têkûz û ne sazûmanî kirin. **Simko hema* ***kurte kurmancî kir*** *û xwe avête nav.*

Kurtekurt kirin

Giran û bêxem hereket kirin. **Heta Jiyanê Hesen* ***kurtekurt bike*** *û bi rê bikeve Surmliyê Evdilrezaq dê rê bi nîvî bike jî.*

Kurtikî çuxe, dew tune bixwe.

bnr. Dew tune fir bike, li hespê siwar dibe, çerx dike.

Kuşpenetî kirin

Xwe qûre kirin. Xwe nepixandin. **Rebenê Celîlê Faysal jî wisa* ***kuşpenetiyê dike*** *ku nayê gotin.*

Kuştin bi destê guran e, xwarin li firinda ye.

Ku yek di hêla hinekên bihêz ve têk çû, dibe herî qels jî. **A girîng bingeh e, ew ku xwer bû, êdî zor e.* ***Kuştin bi destê guran e, xwarin li firinda ye.***

Kuştina xwe dayîn ber çavên xwe.

Xwe ji mirinê re amade kirin. **Bi rastî jî wê* ***kuştina xwe dabû ber çavên xwe****, lê bereket yê din erebe dagerande gerê.*

Kuştiyo di ber xelkê de
Ji bo kesên belasebeb xwe ji bo hinekên din feda dikin û dikevin astengiyan tê gotin. **Ew gêj û sefêk jî bûye* ***kuştiyê di ber xelkê de****.*

Kutekut kirin
Zehf zêde û tim bi awayekî neyînî axaftin. **A rastî ev jina pir* ***kutekut dike****, vê rewşa wê ez ji jiyanê sar kirim.*

Kutilka min jî ji berfo (berfê ye) ye.
Ji bo vala û pûçbûna tiştan an jî karan tê gotin. **Ez çi bikim, çi biceribînim xêr nîn e,* ***kutilka min jî ji berfo ye****.*

Kûçik hestiyan dixwe haj qûna xwe dike.
Dema ku mirov karekî dike, divê dawiya wê jî bifikire. ****Kûçik hestiyan dixwe haj qûna xwe dike.*** *Tu jî qet li dawiya van kirinên xwe yên ecêb difikirî gelo an na?*

Kûçik li ber siya dîwêr ketibû, digot: "Siya min çiqasî mezin e."
Hinek kes tênagihîjin ku bi saya hinekên din debara xwe dikin. **Hê bi serê wî neketiye.* ***Kûçik li ber siya dîwêr ketibû, digot: "Siya min çiqasî mezin e."***

Kûçik, ha sor ha spî!
Reng û teşe ne girîng e, a girîng bingeh e. **Tu çi dipeyivî?* ***Kûçik, ha sor ha spî!***

Kûçikê li ser komê bûn
bnr. Kûçikê li ser beratan bûn

Kûçikê li ser beratan bûn
Ji kesên xerab û kêmfirsend re tê gotin. **Ez dîsa jî dibêjim, ew* ***kûçikên li ser beratan in****, hema ku lingê te şimitî, tu çûyî.*

Kûçikê me ye, li ber derê xelkê direyê.
bnr. Dîkê min e, li ser kulîkê xelkê bang dide.

Kûçikê Mîrxan e, bênan û bêav e.
Nav heye, lê hundir de tiştek tune. **Ji der ve wisa tê xuyan, lê* ***kûçikê Mîrxan e, bênan û bêav e****.*

Kûçikê xelkê ji xelkê re hîzan tîne, yê min ji min re dew û dozan tîne.
Di wateya bêşansiyê de tê bikaranîn. **Ew jî rozgara min e.* ***Kûçikê xelkê ji xelkê re hîzan tîne, yê min ji min re dew û dozan tîne.***

Kûçiksanî kirin
Dema ku firsend ket dêst, nebaşî kirin. **Ku erk û bandora wê hebe, wê* ***kûçiksaniyên wisa bike*** *ku tu kesî nekirine.*

Kûkekûk kirin
Tim girîn. Kîzekîz û mizemiz kirin. **Wey eman ji destê* ***kûkekûkkirina*** *vê Mexpûleyê!*

Kûpê aqilan bûn
Bi qerf ji bo yên ku zêde ne jîr in tê gotin. **Maşelah lawê Heyder* ***kûpê aqil e****.* (qerf)

Kûpê derewan bûn
Zehf zêde vir û derew kirin. **Keça min ew **kûpê derewan e**, tu xapandiyî lawo.*

Kûpê bênamûsiyê bûn
Gelekî bênamûs bûn. **Emerê çi ye, **kûpê bênamûsiyê ye**.*

Kûpê xwe tijî kirin
Bi awayekî ne durist û ne normal zengîn bûn. **Tu kesî ji wî hêvî nedikir, lê me hew dît ku mêrikî **kûpê xwe tijî kiriye** û ji holê winda bûye jî.* (bnr. çîrok)

Kûr nexweş bûn
bnr. Tal nexweş bûn

Kûr û dûr bûn
Ji bo karên demdirêj û girîng tê gotin. **Wisa bi hêsanî nêzîk nebe, ev kar karekî pir **kûr û dûr e**.*

Kûr û dûr fikirîn
Li ser mijarekê bi dorfirehî ponijîn. ** "Efsûnbaz **kûr û dûr fikirî**, li tasa zingarî ya nîvtije ya li ber xwe nêrî."* Fevzi Bilge

Kûr û dûr hizirîn
bnr. Kûr û dûr fikirîn

Kûrekûr kirin (Kûrînî kirin)
bnr. Kûkekûk kirin

Kûrk li ser kelkê xistin
Tiştek pêk nehanîn. **Me digot Zerê jinek xûrt e, lê maşelah wê **kûrk li ser kelkê xist** û tu karekî baş ji me re pêk neanî.* (qerf)

Kûsiyan ji delava xezalê (xezalan) av venexwarin
Hinek caran yên ne hêja, xwe ji yê hêja û spehî zêdetir dihesibînin. **Qedera Xwedê ye. Hinekên pîsik jî xwe bi tiştekî dihesibînin. **Kûsiyan ji delava xezalê av venexwarin.***

Kûsiyên kendalan, xwe dikin hember xezalan.
bnr. Kûsiyan ji delava xezalê (xezalan) av venexwarin

"Kûpê xwe tijî kirin"

Li bajarekî qaziyekî pir bertîlxwir hebûye. Ji bo wî heqî û neheqiyê na lê pere girîng bûye. Vî qaziyî wer kiriye ku gel ji canê xwe aciz bûye. Di dawiyê de diçin qazî gilî dikin. Ji ber bertîlxwarinê ew qas zêde gilî û gazin çêdibin ku qazî ji qazîtiyê tê avêtin. Berî ku ji bajêr biqete, qazî bang dike hemû giregirên bajêr ku hema bigire hemûyan giliyê wî kirine. Xwarinekê dide wan. Piştî ku xwarin tên xwarin, çayê û qehwe tên vexwarin; qazî bi dengekî bilind bang dike xulam û xizmetçiyên xwe û dibêje:
"Ka wan kûpan bînin!" Xulam û xizmetkar sê heb kûpên mezin bi zorê di nav hev re dikin û tînin nîvê salonê. Di nav awirên balkêş û ecêbmayî de qazî bi dest peyvandinê dike:
"Gelî mêvanên ezîz, hûn jî dizanin ku we giliyê mn kir û ez ji karê xwe dame dûrxistin. Mêze bikin min ev kûp bi pereyên we tijî kirine. Ev her du kûp tam tijî bûne, lê ji bo tijîbûna vî kûpê sêyemîn tenê çartiliyek maye. Heke min ev jî tijî bikira, êdî min neheqî nedikir û pere jî ji we nedistand. Lê we hinekî din jî sebir nekir. Mixabin qaziyê ku nû bê wê bi kûpên vala dest bi kar bike. Dîsa bi pereyên we dê ew kûpên bên dagirtin. Êdî bimînin di halê xwe de, hema bi xatirê we..."

Kûsî çû tovê garis, heta hat li şimêlan leqitî.
bnr: Çû dermanê mîzê, gû lê esirî.

Kûsî çûn ser darê
Ji bo tiştên bêguncan û dereng tê bikaranîn. **Qet nekeve tatêlê, heta ew bê, dê* ***kûsî here ser darê****.*

Kûsî hêkên xwe dixe bin axê û dibêje: "Heke ji Xwedê re divê dê çêlikan derxe."
Li ser tiştekî bi girîngî nesekinîn. Bi tevekelî tevgerîn. **Ya wî jî hûye meseleya kûsî. Got* ***kûsî hêkên xwe dixe bin axê û dibêje: "Heke ji Xwedê re divê dê çêlika derxe."***

Kûsî ji qalikê xwe dertê û tû dike qalikê xwe.
Ji bo kesên heramzade ku eslê xwe winda dikin tê gotin. **Ma tu lê mêze nakî; êdî me begem nake.* ***Kûsî ji qalikê xwe dertê û tû dike qalikê xwe.***

Kûsî ji xezalê re got: "Hey bê nêçîrvano destê te bikişe, çi dixwaze ji te xezalê, ji min xezalê?"
Ji bo kesên ku xwe dixin hempayê yên ser xwe tê gotin. **Ew gêjê heram jî xwe dixe hevalê lawê min î delal.* ***Kûsî ji xezalê re got: "Hey bê nêçîrvano destê te bikişe, çi dixwaze ji te xezalê, ji min xezalê?"*** (bnr. çîrok)

Kûsî li ber qûna (yekî) bazar kirin
Gelekî bi derengî ketin. **Maşelah wisa xurt e ku wa ye* ***kûsî li ber qûna wî bazar dike****.* (argo)

Kûtek avêtin ber
Ji bo berjewendiyê, hin tişt wekî bertîl dan. **Ew bi zanetî wisa pirsgirêkan derdixe, hela tu* ***kûtekî biavêje ber****, lê binihêre dê çawa bibe segê te.*

Kûtekî birûn avêtin ber
Bertîleke girîng dan. **Erê, ew qûna xwe bi naziyê dixe, lê tu* ***kûtekî birûn biavêje ber****.*

"Kûsî ji xezalê re got: 'Hey bê nêçîrvano destê te bikişe, çi dixwaze ji te xezalê, ji min xezalê?'"

Nêçîrvanek berî ser xezalekê dide. Xezal direve xwe diavêje ber kendalekî. Li ber kendal kûsiyek jî li wir ji xwe re sekiniye. Kûsî ji xezala bêhnçikiyayî û perîşan dipirse:
"Tu çima direvî?" Xezal dibêje:
"Ji ber nêçîrvan direvim." Kûsê dibêje:
"Hey bê nêçîrvano destê te bikişe, çi dixwaze ji te xezalê, ji min xezalê?"

L

Laçika jinan danîn serê xwe

1. Ji bo mêrên ku serjinik in û karên jinan dikin tê gotin. **2.** Ji bo mêrên bêxîret jî tê bikaranîn. **Wî hema rasterast **laçika jinan daniye serê xwe** û her karên jinan dike. *Ji bo welat, em derketin serê çiyayan, lê wan **laçika jinan dan serê xwe** û li mal rûniştin.*

Lafên wan qûna meriyan diqelişînin

Ji kesên lafek re tê gotin. ****Lafên wan qûna meriyan diqelişînin**, lê cîgera wan jî bi pênc qurişan nake.*

Laîlehe îlelah, Mehemed Resûlûllah

1. Hemû ew qas e, şikir ku qediya. **2.** Ji bo rewşa ecêb û ecêbmayînê tê gotin. ****La îlehe îlelah, Mehemed Resûlûllah!** Te gelekî xwe aciz dikir, te dît çawa qediya? ***La îlehe îlelah, Mehemed Resûlûlah!** Kuro ev çi ecêba giran e lawo?*

Lalome di ziman de hatin

Înşelah **lalome di zimanê te de bê ku em ji te rizgar bibin.* (nifir)

Lanet lê barandin

Şermezar kirin. **"Xelk li ber bûyeran diket û **lanet li Egîd dibarand**. Lê ji destê kesekî tu tiştek nedihat."* Mehmed Uzun

Laq e, tolaq e.

Ji bo rewşa hempayê hev û din tê bikaranîn. **Hema baş hev û din dîtine. **Laq e, tolaq e.***

Laş li ber xwînê çûn

Şerekî giran bûn. **Di şerê wan her du eşîran de **laş li ber xwînê çûn**.*

Laşê (yekî) sivik bûn

Moralxweş bûn, bêhn vebûn. **"Xwe ji hev vezeland, wek barekî giran ji ser milê xwe dabe alî, wiha **laşê wî sivik bû**."* Mem

Lat ajotin

Sohbet û mijûliya vala kirin. **Ya star ji dest van nezanan! Ji êvar de ji ber* ***latajotina*** *wan, serê me hemûyan gêj bû.*

Lawê Mencê çû qezencê.

Ji bo bûyerên berevajî û ecêb tê gotin. **Maşelah maşelah,* ***lawê Mencê, çû qezencê.*** (qerf)

Lawikê Bîngolî, nabe Stenbolî.

Her tiştek an jî kesek taybetiyeke wê ya bingehîn û xwerû heye ku guherîna wê ne guncav e. **Ji bîr nekin, careke din ez ji we re bibêjim* ***lawikê Bîngolî, nabe Stenbolî.***

Lawikê Engorî, nabe memûrê Stenbolî

bnr. Lawikê Bîngolî, nabe Stenbolî.

Lawikê Qureyşî, kes nîn e pişt neêşî, belê xîret namûsê dikêşî.

Mirovên bi xîret, der barê namûs û şanaziyê de jî pejinkar in. **Helbet wê wer be.* ***Lawikê Qureyşî, kes nîn e pişt neêşî, belê xîret namûsê dikêşî.***

Lawo gûz keştandin ne karê min e, lê teze ez dizanim ku, gor warê min e!

Êdî ez dizanim ku ez pîr bûme. **Wekî meseleya ku pîrê ji kurê xwe re dibêje:* ***"Lawo gûzkeştandin ne karê min e, lê teze ez dizanim ku gor warê min e!.."*** *Ez jî dizanim ku êdî ez kal bûm e.* (*bnr. çîrok: Heleb teze bû Heleb.)

Lawo li her derê ji xwe re malekê çêke.

Bila li her derê dost û hevalên te hebin. **Pêşiyên me dibêjin, dostekî te ku zêde be, deh dijminên te kêm dibin.* ***Lawo tu jî li her derê ji xwe re malekê çêke.*** (bnr. çîrok)

Leke neanîna ser xwe

Tiştên neyînî nekirin. **Ew jineke wer bimerîfet e ku, heya îro tu* ***leke neaniye ser xwe.***

Leke zû lê çêrîn

1. Kêmasî û çewtiya yekî zehf zêde hatin dîtin. Bêşans bûn. **2.** Leke zû lê belav bûn. **Keça min a porkur hema wisa ye,* ***leke zû lê diçêrin.*** **Ew qumaşekî wisa ye, hela* ***lekeya rûn zû le diçêre.***

"Lawo li her derê ji xwe re malekê çêke."

Li welatekî mirovekî pir dewlemend rojekê bang dike lawê xwe û jê re dibêje:

"Lawo ji Xwedê re şikir em zengîn in. Rewşa me baş e. Tu jî êdî mezin bûyî, lê ez nemirîme here li welatê me, ji xwe re bigere û li her derê ji xwe re malekê çê bike." Lawik radibe, gelek zêr û pere hildide bal xwe û diçe. Bajar bi bajar digere, li her bajarekî qatek an jî du qat avahî û qesran ava dike û tê. Bavê jê re dibêje:

"Lawê min tu bi xêr hatî. Ka bêje ev du sal bûn ku tu çûyî te qet çi kir, çi nekir?" Kurik dibêje:

"Bavo, min li filan bajarî qatek, li filan bajarî du qat, li filan bajarî malek ew qas xweşik, li filan derê ew qas malek bedew û saxlem çêkir." Bav serê xwe di wateya neyîniyê de li ba dike û jê dipirse:

"Lawo ew malên ku te danê çêkirin, heke tu nîha herî wir, gelo dikarin ji te re nan û avê çêkin û xizmeta te bikin?" Lawik got:

"Na bavo." Bavê got:

"Lawê min, min ji te re negot here li her devereke xaniyekî an jî avahiyekê çêbike. Min ji te re got here li her derê ji xwe re dostekî bibîne ku dema pêdiviya te pê çêbû û tu çûyî wê malê, hila wekî mala te be, xwediyê malê bila wekî birayekî li pişta te be. Lê mixabin, te armanca min fêm nekiriye."

Lelîkî kirin
bnr. Îlet kirin

Lelîxan e, xwediyê kirêd' giran e.
Wê gelek bûyerên girîng pêk anîne. **Tu wisa bi çavekî li wê mêze neke, ew **Lelîxan e, xwediyê kirêd giran e**.*

Lemelem kirin
Bi awayekî gur û xurt tevgerîn. Zingirî û qoçax bûn. **Maşelah keçika Şikak lingî **lemelem dike**, kê wê têxe bûka xwe, dê mala xwe ava bike.*

Lep hilanîn
Dest pê kirin, hewl dan. **Em gelekî bi derengî ketin. Hevalno, êdî **lepan hilînîn**.*

Lepê te, çavê rojê nagire.
1. Tu nikarî wê rastiyê veşêrî. **2.** Hêza te nagihîjiyê ku tu wê yekê pêk bînî. **Ezbenî, tu çi dikî bike, bêkêr e. **Lepê te, çavê rojê nagire.** *Heyran xwe têxe hempayê xwe, **lepê te çavê rojê nagire**.*

Lepek rêx li dêv dan
Heqeret lê kirin. Bi gotinên pir tal yek rezîl kirin. **Hema Wardekê kengê tiştek bigota xesûya wê **lepek rêx li dêv dida** û dixwest ku di nav her kesî de wê bihetikîne.* (argo)

Lepek rûn li ser dil dan
Dil rehet kirin. **Şengulê bi wan gotinên xwe yên xweşik **lepek rûn li ser dilê Hogir da**.*

Leşkerê Romê ye, nan li ser çokê ye.
Bi leşkerên Osmanî nayê bawer kirin. **Tu çawa ji wan bawer dikî, ew wekî **leşkerê Romê ye, nan li ser çokê ye**.*

Lez bi rê ve diçim, dibêjin dîn e, nerm bi rê ve diçim, dibêjin ehmeq e.
Çawa dikim naecibînin. **Ez rebenê Xwedê nizanim çawa bikim? **Lez bi rê ve diçim, dibêjin dîn e, nerm bi rê ve diçim, dibêjin ehmeq e.***

Lezê, dereng ketê
Yên ku zêde dilezînin, gelek caran jî derengtir dikevin. ****Lezê, dereng ketê**; min ji we re negot, zehf lez nekin?*

Lê aliqîn
Zêde heşir neşir bûn. Tê de gut bûn. **Hema ew jî **lê aliqî ye**, nizane wê çawa xwe ji wan xelas bike.*

Lê alîn
Jê re astengî derxistin. Bergir bûn. **Heke ew **li me nealiya** me dê ew kar hê zûtir pêk bianiya.*

Lê ba ketin
Ketin nav. Erîş kirin an jî lê dan. Bê serî û bê çav ketin nav. **Vê carê jî dewleta Amerîkayê **li Iraqê ba ket**, ka hela dawî dê çawa bibe.*

Lê ba dan

Bi awayekî ne durist yek têk birin an jî xapandin. **Cibran Begê wer jê hêvî nedikir, lê Yaqûb wisa **lê ba da** ku devê wî ji hev ma.*

Lê balete bûn

Li tiştekî qelibîn, lê areste bûn. **Heke ew **lê balete nebûna**, bawer nakim ku wan qala wî karî bikira.*

Lê banîn

bnr. Di ser (yekî) de gul vedan

Lê bar kirin

1. Li stûyê yekî heq kirin. Karek li ser pişta yekî bar kirin. **2.** Ji ber gunehekî ku nekirî tawanbar kirin. **Ew kar jî Xasê **li me bar kir**. *Qet ez haj tu tiştî nîn bûm, lê ew sûc **li min bar kirin**.*

Lê balimçe bûn

Bi eşkere xuya kirin. **Wê hewl da ku veşêre, lê di demeke kin de her tişt **lê balimçe bû**.*

Lê bi ar û dan bûn

Pê re debar nekirin, li hev nekirin. **Salekê li balê ma, **lê bi ar û dan bû**, dû re berda.*

Lê bi gir bûn

Kîn û buxz lê girê dan. **Jixwe kifş bû ku Remezan **lê bi gir bibû**.*

Lê bi keys kirin

Li gorî rewşê têkildarî û teşe nîşan dan, li hev kirin. **Bi rastî jî ew dîmen **li wî diyarî bi keys hat**.*

Lê bi kir bûn

Hêrs ji kesekî hatin. **Ez jî nizanim çima, lê ez **li vê jinikê bi kir dibim**.*

Lê bûn goştê berazan

bnr. Lê bûn xwîna donxizan

Lê bûn mesela masiyên şovê

Mêr bi fêl fistik û fendê jinan re nikarin serî derxînin. **Welehî jina Fexrî wisa kiriye ku **lê bûye meseleya masiyên şovê**.* (bnr. çîrok)

"Lê bûn mesela masiyên şovê"

Jinikek tim ji mêrê xwe re dibêje:

"Xwedê mêran ji şerê jinan biparêze." Mêrik jî ji vê gotina jinikê pir diqehire û tim dibêje:

"Jinik, ez bi serê te û bavê te kim, şerê jinan nikare qet tiştekî jî bi mêran bike." Mêrik dîsa wekî her roj gayên xwe hildide diçe cot. Jinik li mal difikire, difikire di serê xwe de hin tiştan dibe, tîne û lîstika xwe amade dike. Ji xwe re dibêje:

"Mêrik de tu here, ez ê niha ji te re gotina xwe bidim fêmkirin." Jinik radibe ji bo navrojê xwarinê amade dike. Dû re diçe kiloyek masî jî dikire, tîne. Tevî xwarinê wan masiyan jî hildide û diçe zeviyê bal mêrê xwe. Dema ku mêrê wê bi cot re mijûl dibe, ew wan masiyan nêzîkî xeta cot, di nav şovê de vedişêre, dû re xwarina mêrê xwe didiyê û tê mal. Mêrik piştî çûyîna jinikê xwarina xwe diqedîne, hinekî bêhna xwe distîne û dîsa dest bi cotê xwe dike. Hinekî bi şûn de lê dinêre ku wa ye masî di ber xeta cot re derketin. Bi kêf û eşq wan masiyan dide ber hev û ji xwe re dibêje:

Lê bûn xwîna donxizan (beraz)

Lê heram bûn. **Belkî **lê bibe xwîna donxizan**, ma ew ên ku min didayê hindik bûn?*

Lê col bûn

Li ser hatin hev. Li dorê civîn. **Segên gundê me **li ser wî segê xerîb col bûn**.*

Lê cor kirin

Lê bandor kirin, ketin bin kelîja tiştekî. **Berê tê dernedixist, lê dû re nexweşiyê **lê cor kir**.*

Lê çerx bûn

Dev jê berdan. **Berê zelîf ji keçikê hez dikir, lê nizanim çawa bû, ji nişka ve **lê çerx bû**.*

Lê devê xwe xwar kirin

Bi yekî tiranê (tinazê) xwe kirin. **Çima kal û feqîr e, ew hemû **devê xwe li wî xwar dikin**.*

Lê dibêje.

Pir xweş, bi serketî, spêhî û bijare bûn. Ango, jixwe xwe diyar dike, ne hewceyî pesindanê ye. **Çi hewceyî pesin û gotinê ye? Jixwe wa ye **lê dibêje**.*

Lê eyan bûn

Rewş fêm kirin, hîs kirin. Niqutîn dilê yekî. *****Li Nîgarê eyan bûbû**; got, ez ê bimirim û heftekê bi şûn de jî mir.*

"Ez ê êvarê van masiyan bibim malê, bila jina min ji me re biqelîne." Mêrik êvarê masiyan tîne mal, dibêje:
"Jinik va ye min masî di şova zeviya me de ditin; wan sibê êvarê ji me re biqelîne em bixwin." Jinik dibêje:
"Bila be mêrik." Êvarê mêrik ji cot tê. Jinik jê re sifreyê tîne, lê mêrik lê dinêre ku masî li ser sifreyê tune ne. Bi hêrs ji jina xwe re dibêje:
"Jinik kanê ew masiyên ku min anîn te çima çênekirine?" Jinik bi awayekî ecêbmayî wî dibersivîne:
"Masiyên çi mêrik?" Mêrik hê hêrs dibe û dibêje:
"Ew masiyên ku min duh anîbûn." Jinik dipirse:
"Mêrik ne tu duh çûbûyî cot?"
"Belê, lê min ji te re negot, min ji şovê ev masî berhev kirin, van ji me re sibehê biqelîne?" Jinik dibêje:
"Mêrik tu dîn bûyî? Ma kê dîtiye ku di şovê de masî hebin?" Mêrik pir hêrs dibe. Radibe dide darekî û li jinikê dixe. Jinik dike hewar û gazîn û dibêje:
"Hewar! Hewar! Gelno, cînarno! Werin hela, mêrê min dîn bûye!" Der û cîran li ser serê wan kom dibin. Bi mêrik digirin û dibêjin:
"Heyran ev çi halê we ye? Meseleya we çi ye, hela ji me re bibêjin." Mêrik ji cîranan re jî dibêje:
"Min duh ji şovê masî dan her hev û anîn. Lê jina min, min virek derdixe, wan masiyan înkar dike û ji me re çênake." Jinik dîsa dilorîne, rûyê xwe vedirû û dibêje:
"Min ji we re negot mêrê min dîn bûye? Masî û şov qet tiştekî wer çêdibe?" Cîran dibêjin:
"Welehî ev camêr dîn bûye!" Dest û piyên mêrik hişkehişk girê didin û vedigerin diçin mala xwe. Bi dest û piyên girêdayî û di nav rewşeke ecêbmayî de mêrik ji xwe re difikire û dibêje:
"Bi weleh hema rasti jî ez dîn bûme. Çi karê masiyan di nav şovê de heye? Qet tiştekî wisa dibe? Her kes dizane ku masî di avê de dijîn... Qey xewnek bû ku min dît û min dest avête pêsîra jinika reben..." Mêrik li ber jina xwe digere û dibêje:
"Jinik tu rast dibêjî. Min aqilê xwe winda kiribû. Ma qet masî di şovê de dibin? Lê va ye aqilê min hate serê min. Ji te tika (tirca) dikim, dest û piyên min veke, min berde, tu mafdar î, min aqilê xwe winda kiribû." Jinik dest û piyên mêrik vedike. Mêrik sibetirê dîsa diçe cot. Jinik jî radibe ji bo şîvê savarê çêdike. Ew masiyên ku berê veşartibûn jî sor dike. Lê masiyan nade ser savar, an jî naxe tasekê, di bin savar de vedişêre. Mêrê wê êvarê ji cot tê malê. Li ser sifreyê rûdinin. Mêrik çend kevçiyan ji savarê dixwe, serê masiyekî di bin savarê de tê xuyan. Mêrik çawa ku bi çav masî dikeve, dest û piyên wî lê dilerizin. Bi tirs ji jina xwe re dibêje:
"Jinik zû bike, dest û piyên min girê bide, va ye ez dîsa dîn dibim her hal. Dîsa masî hatin ber çavên min." Jinik dibêje:
"Mêrik, tu nanê xwe bixwe. Qet meraqan meke, tu ne dîn î. Ew masî min danîbûn nava şovê. Belê min ev yek anî serê te. Çimkî min tim ji te re digot, Xwedê mêran ji şerê jinan biparêze. Te digot, jin nikarin bi mêran tiştekî bikin. Ma te her tişt bi çavê serê xwe dît ? Min rast gotiye an na ?" Mêrik got:
"Jinik eşedibîlah te rast gotiye. Ez baş têgihîştim ku şerê jinan zor e. Bi rastî jî Xwedê mêran ji şerê jinan biparêze."

Lê fetilîn
Lê poşman bûn, lê vegerîn. **Wî berê ew berda, lê dû re dîsa **lê fetilî**.*

Lê gerın bûn
Hînî kesekî yan jî tiştekî bûn. Pê ve zeliqîn, têkildarî zêde bûn. **"Seyfo di eynê xwe re dernaxwe. Bi zorê **li palehiya gênim sor germ bûye**."* Adar Jiyan

Lê giran hatin
1. Lê zor çûn, xeyidîn, dil şikestin. **2.** Ji zerengiyê (kapasîte) zêdetir bûn. **Ew gotina wê **li Fazîlê giran hat**. *"Ma gelo baweriya me bi axîretê tune ye ku ji bîst û çar saetan, dayîn saetekê **li me giran tê**?"* Mucteba Baravî

Lê guhavî kirin
Lê şahidî kirin. **Wî tirsonekî her tişt bi çavên xwe dît, lê **lê guhavî nekir**.*

Lê hat baş hat, lê nehat jê nehat.
bnr: Lê tê, dibêjin: "Jê tê" Lê nayê, dibêjin: "Jê nayê."

Lê hat bazirgan e, lê nehat xwediyê gayê wêran e.
Ku pêk bê rewş wê gelekî baş be, naxwe, wê xopan be. **Ya Tajdîn jî hema hatiye wê radeyê ku, **lê hat bazirgan e, lê nehat xwediyê gayê wêran e**.*

Lê hatin
Layîq û minasîb bûn. **Ew boyaxa ku te vê carê li salona xwe xistiye, bi rastî, **li mobîlyaya te jî hatiye**.*

Lê hatin rehmê
Li kesekî însaf kirin. Gunehê yekî bi kesekî hatin. **Berê me got wê Fêrgîn pêpez bike, lê şikir ku dû re **lê hate rehmê**.*

Lê hefto heşto kirin
1. Tele li serî çêkirin. Xapandin. **2.** Lê zilm û eziyet kirin. ****Li serê rebenê Kemal wisa hefto heşto kirin** ku hema tirî tirî ji dest wan filitî. *Sîracê Axayê Celalî **li ser malbata Weydo hefto heyşto kiribû**.*

Lê heram kirin
bnr: Di ber de jehr kirin

Lê hûr bûn (Li ser hûr bûn)
Bi awayekî kûr û zirav li ser mijarekê sekinîn. **Rêzdar wisa **lê hûr bû** ku di mijara muzîkê de tu çi jê pirs bikî, dikare bersiveke pir fireh bide te.*

Lê jehr bûn
bnr: Di ber de jehra maran bûn

Lê jehr kirin
bnr: Di firnikan re anîn

Lê kafiristanî kirin (Li ser kafristanî kirin)
Bêînsafî û kêmfirsendî kirin. **Wan bênamûsên bêbav* ***li wê keçikê kafirstanî kirin****.*

Lê kir hatin
Ne li rê bûn, lê nehatin. **Her tişt baş bû, lê ew helwesta wî ya dawî hinekî* ***lê kir hat****.*

Lê kirin kewa qefesê
Zilm û tadeyî lê kirin. **Wê xesûya wê ya cezû,* ***lê kiriye kewa qefesê****.*

Lê kirin meseleya gê, kerê û hespê.
Divê mirov tifaqa dijminên xwe biqetîne û wan yek bi yek têk bibe. **Wî jî* ***lê kiriye meseleya gê, kerê û hespê*** *û dijminên xwe yek bi yek hel kirine.* (bnr. çîrok)

Lê kul bûn (Lê azara kulê bûn)
bnr: Di ber de jehra maran bûn

Lê kûr bûn
bnr: Lê hûr bûn

Lê qelibîn (qelibandin)
bnr: Lê rast kirin

Lê rast kirin
1. Bi awayekî hovane têkildar bûn, xwe lê qelibandin, lê asê kirin. **2.** Têkiliya cinsî danîn. **Wî hat hema ew tiştên xwe* ***lê rast kirin*** *û lê ket çû. *Dibêjin wê şevê Salih heya sibehê* ***li Zerîfê rast kiriye****.* (argo)

Lê rast anîn
Deng anîn. Aresteyî ser tiştekî yan jî kesekî kirin. **Di serî de her yek bi awayekî cuda bûn, lê Mûsa ew hemû wisa* ***lê rast anîn*** *ku nayê gotin.*

Lê reşandin
Gule barandin. **Heke di wê demê de me ew qas gule* ***lê nereşanda****, em çûbûn.*

"Lê kirin meseleya gê, kerê û hespê."

Xwediyê zeviyê mêze dike ku sê mirovan kerek, gayek û hespek berî zeviya wî dane û xwe jî li ber rûniştine. Bi wî awayî çêrandina zeviya wî, xwînê ji dilê wî diherikîne. Difikire, heke bike ku li wan bixe, ew sê kes in, bi wan nikare. Berî ku here difikire bê çawa ceza bide wan û ji ser serê xwe biavêje. Azîna xwe di serê xwe de kifş dike. Him ber bi wan ve dimeşe, him jî ji bo wan fenda xwe baş difikire. Çawa ku tê cem wan pêşî silavê dide wan û dipirse:
"Selamuleykum, birakno Xwediyê vê kera han kî ye?" Ji wan kesan yek dibêje:
"Ez im." Xwediyê zeviyê bi hêrs dibêje:
"Kuro seghav! Mirov li hespan siwar dibe, diçe çiya û baniyan, deşt û bajaran, karê xwe yê lezgîn pêk tîne. Pêşiyan jî gotine ku hesp miraz in. Ga dîsa ji cot re, ji baran re ji hemû karî re bi kêr tên. Van her du camêran hesp û gayê xwe berdane zeviya min tiştekî nake. Lê te çima ev kera xwe ya heram berî zeviya min daye?" Bi şiva destê xwe li xwediyê kerê dixe, cirma xwe jê distîne û berî didiyê. Vê carê dimînin du kes. Îcar jî dizivire ser xwediyê gê û jê re dibêje:
"Weke ku min berê jî got, hesp miraz e û mirov lê siwar dibe, lê te çima ev gayê xwe yê teral ku wekî gamêşekî ye berî zeviya min daye?" Li wî jî dixe, cirma xwe jê distîne û berî didiyê. Vedigere ser xwediyê hêsp. Wî jî eynî wekî herduyên din dike. Bi vî awayî wan ji hev vediqetîne û ziyana xwe jî vedigerîne.

Lê sêwirîn
Li cihekî man. **Em demekê* ***li tirba Xanî Baba (Ehmedê Xanî) sêwirîn****, dû re dîsa em ketin rê.*

Lê stamî kirin
Li kesekî xwedî derketin, parastin. **Heke Apê Resûl jî* ***li min stamî nekira****, karê min zor bû.*

Lê star bûn
bnr: Pê sekinîn

Lê siwar bûn
Yekî sêfîl xistin bin bandora xwe. **Tahar Axa* ***li Cindiyê reben siwar dibe*** *û bi ku de dixwaze bi wir de diajo.*

Lê şek û pêk kirin
Dekbazî û sextekarî kirin. **Ew* ***şek û pekên ku Guroyê Çeto li min kirin****, ez tu caran ji bîr nakim.*

Lê şidandin
Der barê mijarekê de zêde bi ser yekî de çûn. **Heke me ew qasî* ***li wî neşidanda****, ew ji wê dozê venedigerî.*

Lê tê, dibêjin: "Jê tê". Lê nayê, dibêjin: "Jê nayê."
Carinan karên ku bi rasthatinan pêk tên jî ji dûr ve wekî merîfet û hunerweriya kesan tên xuyan. **Kes nizane çawa bûye,* ***lê tê, dibêjin: "Jê tê." Lê nayê, dibêjin: "Jê nayê."***

Lê te digot, mirî tiran nakin?
Rewş ne wekî gotina te ye. **Ma ev çi ye ?* ***Lê te digot, mirî tiran nakin?***

Lê vedan
Derba xwe lê xistin. Ziyanek gihandin yekî. **Şikak gelekî li dû gerî, lê di dawiyê de* ***lê vena****.*

Lê vegerîn
bnr: Lê fetilîn

Lê werqilîn
Di derkê de bûn, ferq kirin. **Heta ew* ***lê werqilî****, keçikê ji zû de buxçeyê xwe hildabû û çûbû jî.*

Lê xwedî bûn
1. Bi kesekî re stamî kirin. **2.** Dest danîn ser tiştekî, ji xwe re zeft kirin. **Heke ew jî* ***lê xwedî nebûya****, gelo niha rewşa Sedayê çawa bû? *Hema mêrikî li texteyên ber derê me* ***lê xwedî bû*** *û neda.*

Lê zêde kirin
1. Tê firandin. Tiştê heyî ji rasteqînî zêdetir nîşan dan.. **2.** Sexbêrî (tasarûf) kirin. **3.** Buhayê tiştekî zêde kirin. **Tu ku ew qas* ***lê zêde bikî****, kerê kor jî wê fêm bike ku ne rast*

*e. *Dilovan ew qas **li mayîşa (miz) xwe zêde kir** ku ji xwe re erebeyeke erzan kirî. *Fiyetê benzînê dîsa **lê zêde kirin**.*

Lê ziq bûn (Ziq man)
bnr. Lê zûr man

Lê ziqûm bûn
Ziyan û xisar dan. **Wî çawa ked dabû nizanim, lê ew pere hemû **li wî ziqûm bû**.*

Lê zivirîn
Dor an jî dest bi beşek, kesek an jî tiştekî kirin. **Piştî ku karê derve xelas kir, Kemal Paşa **li kurdan zivirî**.*

Lê zor çûn
bnr. Lê giran hatin

Lê zûr man
Mat man, bi metelî li çavan nêrîn. **Piştî ku min ew serpêhatiya xwe ji bavê xwe re got, **li min zûr ma** û li nav çavên min nihêrî.*

Lê ketî bûn
bnr. Bêhesab bûn

Lêlê kir lolo hat.
Hesaban hev û din negirtin. Ji ya hêvî dikir cudatir pêk hatin. **Bi rastî min jî wer hêvî nedikir. Min **lêlê kir, lolo hat**.*

Lêpê ez birim, çima (hema) lêpa gû jî ez birim?
Belê rewş xerab e, lê ew qas jî ne xeter e ha. **Ev hesabê xwe çewt dikin. Belê **lêpê ez birim, ma lêpa gû jî ez birim**?*

Lêv bi erdê re kişîn
bnr. Lêvek li erdê, yek li esmên bûn

Lêv lopixê xwe daxistin
bnr. Lêvek li erdê, yek li esmên bûn

Lêva (yekî) ya jêrê li ya jorê neketin
Xeber nedan. **Ev çi robotek e kuro, îro mîroya Xwedê **lêva wê ya jêrê li ya jorê neket**.*

Lêva xwe daliqandin
bnr. Lêvek li erdê, yek li esmên bûn

Lêva xwe daxistin
bnr. Lêvek li erdê, yek li esmên bûn

Lêva xwe geztin

1. Ecêb man. **2.** Fedî kirin. **Tu kesî tiştekî wisa ji Keleş hêvî nedikir, loma jî dema ku bihîstin,* ***lêvên xwe gestin***. **Bûkê li ser wan gotinan* ***lêva xwe gest***.

Lêva xwe lê hil kirin

bnr. Lêva xwe lê xwar kirin

Lêva xwe lê xwar kirin

Nehecibandin. Henek û tiranê xwe pê kirin. **Wê berê* ***lêva xwe lê xwar dikir****, lê niha jî heya êvarê li dor qûna wî dizivire.*

Lêvan erd paqiş kirin

bnr. Lêvek li erdê, yek li esmên bûn

Lêvek li erdê, yek li esmên bûn

Moral xera bûn. Ji tiştekî xeyîdîn. Tengijîn. **Kê ji vî teresî re tiştek gotiye gelo, wa ye dîsa* ***lêvek li erdê, yek li esmên e***.

Lêvên (yekî) gihîştin piştê

Pir şad bûn. **Mêrê wê ji eskeriyê hatiye,* ***lêvên Xecê digihîjin piştê***.

Lêvên (yekî) giran bûn (Lêv kişîn)

1. Pir hêrs bûn. **2.** Tirsîn, xof girtin. **Ji bêrêtiya Zohat,* ***lêvên keçikê giran bûn***. **Li hember Zal* ***lêvên Bager giran bûn****, nizanibû xwe bixe ku derê.*

Lêxin lawo maro ye!

Ji bo lêdana mirovê balkêş an jî dijminê mezin tê gotin. Ango ew ê lêdanê ye, ew ê cuda ye. **"Ev peyva wî lûn jî dijî. Lê îcar xwînxwaran, qontrayan û bêbextan bi hev re gotibûn:* ***"Lêxin lawo maro ye!"*** Çiya Mazî

Li aliyekî şîn, li aliyekî şahî bûn

Di heman demê de gelek bûyerên berevajî pêk hatin. **Bingeha dinyayê bi nakokiyan ava bûye;* ***li aliyekî şîn e, li aliyekî şahî ye***.

Li aliyekî berf, li aliyekî baran e.

Rewş tevlihev e. **Rewş balkêş e,* ***li aliyekî berf, li aliyekî baran e***.

Li asîman nîsk ajotin

Bi karên vala re mijûl bûn. **Bi wî awayî tiştekî bi dest naxe, ew tenê* ***li asîman nîskan diajo***.

Li aziya Xwedê man

Di nav rewşeke xeter de bûn. **Karê Şikak zor e, tenê* ***li aziya Xwedê maye***.

Li barê hev du nihêrîn

Rewş û naveroka kesekî tesele kirin. **Pehlewan berî ku dest bi gulaşê bikin, berê dest diavêjin hev du û* ***li barê hev du dinihêrin***.

Li barê xwe xwedî derketin

Binbariya xwe zanîn û bi cih anîn. *Çeto çawa ji derveyî welêt hat, malbata xwe hilda bin baskên xwe û **li barê xwe xwedî derket**.

Li bejnê nihêrî, bi zêran kirî, laçik rakir, kertikê (serê) gurî.
Ji ser ve xweşik xuyandin, ji bin ve xerabe bûn. *Rebenê Bedran jî nizanibû. **Li bejnê nihêrî bi zêran kirî, laçik vekir kertikê gurî.**

Li belaya xwe gerîn
Bi karên xeter re mijûl bûn. *Kemal **li belaya xwe digere**, ka axiriya wî çawa dibe.

Li benda yarê, bêdost mam.
Yên ku her tiştê xwe tenê li hêviya vebijarkekê bihêlin, gelek caran poşman dibin. *Ew jî kertiya min bû. **Li benda yarê, bêdost mam**.

Li ber avê bûn
Gelekî erzan bûn. *Li wî welatî fêkî **li ber avê ne**.

Li ber barê xwe sekinîn
Binbariya xwe bi cih anîn. *Jixwe Selîm **li ber barê xwe sekiniye**, ya rastî yê ku peymanê xera dike Eşref e.

Li ber barê xwe nesekinîn
bnr. Ji ber barê xwe revîn

Li ber (yekî) bejna xwe tewandin
Rêz û rûmet nîşan dan. *Em **li ber şehîdên welatê xwe û yên cîhanê ku ji bo mirovahiyê tekoşîn dane bejna xwe ditewînin**.

Li ber bêlna (yekî) sekinîn
bnr. Li ber pozê (yekî) sekinîn

Li ber çavan girtin
Bal dayîn ser, di nav hesab de bûn, girîng girtin. *Jixwe min qet ew ji hesaban dernexist, wê îhtîmalê tim **li ber çavan digirim**.

Li ber çavan hatin
Ji nirx û hêjahiya rasteqînî zêdetir hesab kirin. Zêde dîtin, girîng girtin. *Ew bi xwe ne milkiyetekî zêde bû. Lê gelekî **li ber çavan wan hat**.

Li ber çavan bûn
1. Spehî, delal û bijare bûn. (Ji bo berevajiya wê jî tê gotin.) **2.** Li cihekî xuya û kifş bûn. *Gotin ne pêwîst e, wa ye **li ber çavan e**. *"Di vê çarçoveyê de dîsa **li ber çavan e** ku divê em pêşî cih bidin lehengên dîroka xwe." Haydar Zagros

Li ber çavan bûn marê reş
bnr. Li ber çavên (yekî) reş bûn

Li ber çavan danîn
Li cihekî pir xuya û nêzîk danîn. **Keçika min wê makîneyê bîne,* ***li ber çavan dayne****.*

Li ber çavan miş bûn
Ji ber şaşbûn û xwe windakirinê, çavan tiştek nedîtin. ****Li ber çavan miş bûbû****, digerî nedigerî nedidît.*

Li ber (pêş) çavan raxistin
Çi hebe eşkere nîşan dan an jî yek bi yek gotin. **Bêrîvanê hemû kirinên wan* ***li ber çavan raxistin*** *û rewşa wan da zanîn.*

Li ber çavan xuya bûn
bnr. Li ber çavên xwe mezin kirin

Li ber çavê (yekî) ketin
Bi rasthatin dîtin. **"Di jimara 71'ê Nûbiliar'a hêja de nivîsareke balkêş bi îmzeya M. Murşîd Tekîn* ***li ber çavê min****."* M. Emin Bozarslan

Li ber çavên (yekî) bûn kerkonekî reş
Li ber çavên yekî xerab bûn. **"... ez hew guhê xwe didim dibistanê.* ***Li ber çavên min bûye kerkonekî marekî reş."*** Hesen Zinar

Li ber çavên (yekî) bûn polê sor
Li ber çavan reş bûn. **Wê rebenê çi kiriye nizanim, lê* ***li ber çavên xesûya xwe bûye polekî sor****.*

Li ber çavên (yekî) nehatin
1. Girîng negirtin. **2.** Merd û destvekirî bûn. **Min ji bo wê çi fedekarî kir, lê mixabin qet* ***li ber çavê wê nehat****. *Evdirehman wisan e, malê dinê zêde* ***li ber çavên wî nayê****.*

Li ber çavên (yekî) reş bûn
Lê xweş nehatin, jê aciz bûn. **Nizanim ji bo çi ye, lê ez çi dikim, dîsa jî* ***li ber çavên xesûya xwe reş im****.*

Li ber çavên xwe mezin kirin
Ji nirx û hêjahiya rasteqînî zêdetir nirxandin. **Heyran bibore, lê bi dîtina min tu vê meseleyê gelekî* ***li ber çavên xwe mezin dikî****.*

Li ber çi ye, li ser çi ye nezanîn
Hay ji rewşa xwe nebûn. **Ezbenî, ya rastî ew bi xwe jî* ***nizane li ber çi ye, li ser çi ye****.*

Li ber dan
Xwe ragirtin, li ber xwe dan. **Reşît heya dawiyê* ***li ber da*** *lê gotina wî derbas nebû.*

Li ber defa bêdeng lîstin (Li ber defa bêdeng dilîze, ma dora ku ya bideng)
Ji bo kirina karekî ji xwe re li hincetan gerîn. **Malavo, Egît jixwe* ***li ber defa bêdeng dilîze, ma dora ku ya bideng****.*

Li ber defa bêdeng reqisîn
bnr. Li ber defa bêdeng lîstin

Li ber defa cinan reqisîn
bnr: Di daweta cinan de reqisîn

Li ber defa (yekî) lîstin
Li gorî daxwaza yekî hereket kirin. **Van rojan Habil hema **li ber defa Sebrî dilîze**.*

Li ber defê tûtetût e, lê mal ji ber mişkan rût e.
Di mal de tu tişt nîn e, lê tu xema wî jî nîn e. **Tajdîn yekî kêfçî ye. **Li ber defê tûtetût e, lê mal ji ber mişkan rût e.***

Li ber derê min dan dixwe, ji xelkê re hêkan dike.
bnr: Li ber derê min nan dixwe, li ber derê xelkê diewte.

Li ber derê min nan dixwe, li ber derê xelkê diewte.
Ji bo kesên nankor û ji koka xwe dûrketî tê gotin. ***Li ber derê min nan dixwe, li ber derê xelkê diewte.** Stranên kurdî didize, xwe pê wekî hunermendekî Tirk jî nîşan dide.*

Li ber deriyan gerîn
Parsekî kirin. Perîşan bûn. **Xatûna Emerê Virek ketibû rewşeke wisa xerab ku hema heya êvarê **li ber deriyan digerî**.*

Li ber deriyan ketin
bnr: Li ber deriyan gerîn

Li ber deriyan kilijîn
bnr: Li ser dirûngeyên xelkê kilijîn

Li ber deriyan man
bnr: Li ber dîwaran man

Li ber deriyan mezin bûn
Bi belengazî û bi êtîmî (sêwîtî) mezin bûn. **Qedera wî jî reş bû, jixwe **li ber deriyan mezin bû**.*

Li ber deriyê min qût dixwe, li ber derê xelkê hêkan dike.
bnr: Li ber derê min nan dixwe, li ber derê xelkê diewte.

Li ber destan çûn û hatin
Ji bo karên piçûk xebitîn. **Şikir gedeyê me mezin bûye, êdî **li ber destan diçe û tê**.*

Li ber destan man
Di bin bandora zilmkar û xeraban de bûn. **Bavê wê nemira, ew wisa **li ber destan nedima**.*

Li ber destê Xwedê ehd kirin

Sond xwarin an jî soz dan. *Bila **li ber destê Xwedê elıd be**, careke din ez wî nahêlim hewşa xwe.*

Li ber destên (yekî) mezin bûn
Piçûkayî bi têkilî û alîkariya hinekên din derbas bûn. *Newroza ku niha bûye parlemen li gundê me **li ber destê min mezin bû**.*

Li ber dêrî danîn
Qewirandin. *Min ew qas salan jê re xizmet kir, lê wî pilûnek da min û ez **li ber dêrî danîm**.*

Li ber devê (yekî) sekinîn
Ji bo axaftinê firsend nedan. *Ka Welat **li ber devê min sekinî**, neluşt ku ez tiştekî bibêjim.*

Li ber dêv danîn
Jê re amade kirin. ***Li ber dêv daniye**, lê wa ye dîsa jî ji halê xwe ne memnûn e.*

Li ber dil ezîz bûn
bnr. Di dil de buhirtî bûn

Li ber dil reş bûn
Dil jê sar bûn. *"... *xwarina hinara tirş di dil de ma keser, îna hinar **li ber dil reş bûn**.* Mehemed Selîm Siwarî

Li ber dil zêde bûn
bnr. Di dil de buhirtî bûn

Li ber dilê (yekî) dan
Ji bo sakînbûn û aramiya yekî di nav hewldanê de bûn. *"... *min hinekî **li ber dilê wî yê birîndar da** û gera me ya rojane li kolanan berdewam kir."* Helîm Yûsiv

Li ber dilê (yekî) şîrîn bûn
Li bal gelekî birûmet bûn. *Kî çi dibêje bila bibêje, Meryem **li ber dilê min şîrîn e**.*

Li ber ... dîl bûn
1. Tim li ber tiştekî sekinîn; wekî televîzyon, radyo, kompîtur û hwd. **2.** Gelekî girêdayî yekî yan jî tiştekî bûn. *Ev keçika min **li ber televizyonê bûye dîl**, ranabe. *Ew xort **li ber jinikê bûye dîl**, em dikin nakin ji pey qûna wê naqete.*

Li ber diranên (yekî) neketin
Ji xwarina gelekî hindik re tê gotin. *Dayê ew çi xwarin bû, te ji bo navroja min xistibûyê? Welehî qet **li ber diranên min neket**.*

Li ber dîwaran man
Bê cih, bê war û bê xwedî man. *Ez wê salê hema **li ber dîwaran mabûm**, Xwedê jê razî be dîsa Xalê Rodîcan li min bû xwedî.*

Li ber (yekî) gerîn

Lavayî kirin. *Di wê demê de ez çiqasî **li ber wan zabitayên şarederiyê gerîm** jî, dezgehên min nedan min.*

Li ber goştê çûyî neketin, li ber serpiyan ketin
Ya mezin berdan, bi pey a piçûk ketin. *Ez ji vê keçika xwe tiştekî fêm nakim, **li ber goştê çûyî nakeve, li ber serpiyan dikeve**.*

Li ber govendê li neyê xistin
Karê ne li rê kirin. *Ya ku Meryem dike jî hema **li ber govendê li neyê dixe**.*

Li ber guh li defê bixî, hişyar nabe.
Ji bo kesên xewar tê gotin. *Omerê çi ye, bîra xewê ye. Tu **li ber guh li defê bixî hişyar nabe**.*

Li ber guhên (yekî) xistin
Bi awayekî ne rasterast pê hesandin, agahdar kirin. *Emer Begê biryar dabû ku keça xwe bide Silêman, lê Sosinê bi awayekî **li ber guhê wî xist** ku ew mirovekî qumarbaz e.*

Li ber halê xwe dan
Bi derdê xwe re mijûl bûn. *"Ew sê roj bûn **li ber halê xwe dida**, di nava sanciyan de digevizî, jana xwe di nava wê de hil dikir..."* Rukiye Özmen

Li ber hev dan
Li hemberî hev tekoşîn kirin. Bi hev re doz ajotin. *Hev birin û anîn. Gelekî **li ber hev dan** heya dawî, lê tu encam hilnedan.*

Li ber hev sekinîn
Li benda hev bûn. Ji bo şer û pevçûnê li hincetan gerîn. *Ev çendek e, her du malbat **li ber hev sekinîne**, Xwedê dawiyê xêr bike.*

Li ber kapê xwe sekinîn
1. Binbariya xwe bi cih anîn. **2.** Sûcê xwe pejirandin. *Divê ew jî **li ber kapê xwe bisekine** û bi şev û roj bixebite. *Zerdeşt mêze kir ku riya revê tune ye, ji bêgavî çû **li ber kapê xwe sekinî**.*

Li ber keran bûn
Bêrûmet û bêrêz bûn. *Hûn wisa dibêjin, lê belê hûn qet min nakin nav hesaban? Ma ez li vir **li ber keran im**?*

Li ber keysa xwe sekinîn
Ji bo firsendê li rê gerîn. *Serdar jî **li ber keysa xwe sekiniye** ku lê vede.*

Li ber kûtê xwe sekinîn
Tenê li benda debara xwe bûn. *Heyran, hûn çi ji wî rebenî dixwazin? Ew tenê **li ber kûtê xwe sekiniye**.*

Li ber lingan (piyan) çûn
Çewisîn, perîşan û pejmûrde bûn. *Piştî ku jineke din jî anî, mala wî **li ber lingan çû**.*

Li ber mirinê bûn
Gelekî nexweş bûn. **Divê em jî herin serekî bidinê, dibêjin Hecî Xalid* ***li ber mirinê ye****.*

Li ber navê xwe ketin
Ji bo rûmet, pirestîj û kesayetiya xwe fikar kirin. **Mal û milk berde, ew zêdetir* ***li ber navê xwe dikeve****.*

Li ber (yekî) neçûn
Ji bo rewşa ku yek dike nake nikare pirsgirêkekê çareser bike tê gotin. **Belê ezbenî, ji bo vê keça xwe ez gelekî xebitîm lê Xwedê dizane min kir û nekir* ***li ber min neçû****.*

Li ber nefsa xwe dan
Bi vîna xwe re şer kirin. **Helbet dilê wî jî zehf dixwest, lê wî baş* ***li ber nefsa xwe da****.*

Li ber neqedandin
Pê re serederî nekirin. **Welehî min kir û nekir, min* ***li ber wî neqedand****.*

Li ber nexwarin
Jê venekişîn, netirsîn. **Wedat çi qasî xwe tiroviroyî kir, dîsa jî wî* ***li ber nexwar****.*

Li ber pozê hev û din sekinîn
Ji bo şerkirinê li hincetan gerîn. **Her kes dizane ku ew her du* ***li ber pozê hev û din sekinîne****, tu carî hev û din nabexşînin.*

Li ber pozê (yekî) sekinîn
Firsend nedan. **Li wir Rewşen tim* ***li ber pozê min sekinîbû****.*

Li ber (yekî) rabûn
1. Li hember derketin, serî rakirin. **2.** Rêz û giramî nîşan dan. **Heke ez wê rojê jî* ***li ber wî zalimî ranebûma****, careke din nedibû. *Ew mirovekî pir hêja ye, ez tim* ***li ber wî radibim****.*

Li ber rez nakeve, li ber gûşiya tirî dikeve.
bnr: Li ber goştê çûyî neketin, li ber serpiyan ketin

Li ber roja xwe bûn
bnr: Li ber roja xwe sekinîn

Li ber roja xwe sekinîn
Li benda mirinê bûn. **Xalê min î Bahadîn pir kal bûye, kûr jî nexweş e, hema* ***li ber roja xwe sekiniye****.*

Li ber rûyê (yekî) bûn perde
Ji yekî re alîkar bûn. **Ew keçik jî* ***li ber rûyê wî nebûya perde****, gelo halê Emir dê çawa bûya?*

Li ber serî tewandin (Li ber (yekî) serê xwe tewandin)
1. Li hemberî yekî têk çûn. **2**. Rêz û rûmet nîşan dan. **Kazo bi Rizgo re serederî nekir, loma* ***li ber serî tewand****. *Wan hemûyan* ***li ber hunera Helîm Yûsiv serê xwe tewandin****.*

Li ber tayê tolikê reqisîn
Ji bo hewldanan, li benda hincetan bûn. *Maşelalı ev zarokên min jî ji bo şer, hema ***li ber tayê tolikê direqisin***.

Li ber tira deşikan çûn
Bêrûmet bûn. *Mixabin di navîna salekê de ew jî ***li ber tira deşikan çû***. (argo)

Li ber tira (yekî) lîstin
Her gotina yekî kirin. *Bahadîn hema ***li ber tira jina xwe dilîze***.

Li ber veparîn
Israr kirin, zêde li ser sekinîn an jî daxwaz kirin. *Zerîyê çiqasî ***li ber veparî*** jî nikaribû gotina xwe bide pejirandin.

Li ber waran man
bnr: Li ber dîwaran man

Li ber xwe nihêrîn
Fedî kirin. *Min li hemberî wê xirabiya wî jê re ew qas qencî kir, lê dîsa jî ***li ber xwe nenihêrî***.

Li ber (yekî) xistin
1. Di nav hewldana ecibandina kesekî de bûn. (Zêdetir ji bo zewacê) **2.** Ji bo fêrbûna kesekî hewl dan. *Xaltiya Zînê ew qîza xwe ya taqurî zelıf ***li ber Xelîl xist***, lê nikaribû wî bixapîne. *"Tiştê ku bavê min li ser apê min î şervan û hevalên wî fêm nedikir; Mehemedê Stî ew ***li ber dixist***." Helîm Yûsiv

Li ber xwe ketin (Li ber ketin)
1. Ji bo yekî xemgîn bûn. Dil êşîn. **2.** Dest neçûn, qêmîş nekirin. *"Ji wê rojê ve ez dîsa vegeriyame lemba xwe ya kevin. Bi rastî jî ez ***li ber xwe ketim***." Torî *Kuro bêbext destê te çawa çû vî zilamê delal? Ma tu ***li ber neketî***?

Li ber xwe nedan
1. Li hember tiştekî sebr nekirin. **2.** Şer û têkoşîn nekirin. *Malxirabo, ka hinekî ***li ber xwe bide,*** ka dawiya wê çawa dibe ha! *Serdestên Îranê rêveberên Mehabadê wisa xapandin ku leşkerên wan ***li ber xwe nedan***.

Li ber xwe neketin
Bêar û şermnekirî bûn. *Ew qet ***li ber xwe nakeve***, çi carek û çi du car ji wî re ne xem e.

Li ber xwendinê bûn
Perwerde dîtin, li dibistanê xwendin. *Heft zarokên wî hene, her heft jî ***li ber xwendinê ne***.

Li ber zefta xwe dan
Ji bo nekirina tiştekî xwe asteng kirin. Li ber xwe dan. *Heke wê rojê wisa min ***li ber zefta xwe nedaya***, niha ez ketibûm rewşeke reş.

Li ber zekerata mirinê de bûn
bnr. Di ber hikmê ruh de bûn

Li ber (yekî) zimanê segan derxistin
Lavayî kirin. **Keçikê **li ber wî zimanê segan derxist**, lê tu peyveke erênî jê nebihîst.*

Li ber (yekî) çûn û hatin
1. Jê re ezet û hurmet kirin. **2.** Di nav hewldana xweecibandinê de bûn. **Wisa **li ber min diçûn û dihatin** ku min fedî dikir. *Keçik gelekî **li ber Îdoyê min diçe û tê**, lê ne layîqî wî ye.*

Li besta(n) xeber dan
Ji ber nexweşî yan jî ji bandoreke din bêhemdî xwe axaftin. **Ev girîpa îsal pir giran e, ji dest şewatê Gulanê **li besta xeber dida**.*

Li bestê ketin
Xeyîdîn. **Nizanim bavê wî jê re çi gotibû, Jiyan **bi bestê ket**, lê cînaran ew zivirandin.*

Li bestê man
bnr. Li ber dîwaran man

Li Bexdayê jî xurme zef in, (lê) ji me re çi ye!
Tiştên ku destên min nagihîjiyê û kêra wê nagihîje min, çi karê min pê ketiye? *****Li Bexdayê xurme zef in, ji me re çi ye!*** *Çawa be, devê min nagihîjiyê.*

Li Bexdayê xurme zehf in, ji min re çi ye?!
Tiştê ku têkiliya wê bi min re tune be, çi karê min pê ketiye? *****Li Bexdayê xurme zelıf in lê ji min re çi ye?!*** *Hebûn û tunebûna malê wan bi te maye heyran?*

Li bin axa sar ketin
Mirin. **Di dawiyê de Rehmanî jî **li bin axa sar ket**.*

Li binguhê hev û din ketin
Tevlihev bûn. **Di daweta Rêzan û Rihanê zarok, jin û mêr hemû **li binguhê hev û din ketin**.*

Li binê kundir xistin
Tiştekî veşartî eşkere kirin. **Zeynebê nikaribû ziyaneke din bide wî, rebenê wê jî çi dizanibû **li binê kundir xist**.*

Li bin guhê erdê xistin
Tiştek an jî kesek li erdê xistin. **"... lê ji ber neheqiya xwe, telefona xwe ya destan bilind kir û heya ku Xwedê qewet dabû min, min ew **li bin guhê erdê xist**."* Sedat Yurtdaş

Li bin guhê hev xistin
Tevlihev kirin. Hewlo gewloyî kirin. **"Dîsa ramanên wî **li bin guhê hev ketin**. Şer... çiya... kalo... dijmin... leşker..."* Kamîran Haco

Bi bintûtî çûn

Bi awayekî demdirêj an jî neveger çûn. **Ji ber wê pevçûna gund, Bahrî mala xwe **bi bintûtî bir û çû** bajarekî metropolê.*

Li boraqê xistin
Dest bi çêkirina kulav kirin. **Ev sê saet in ku wan **li boraqê xistine**.*

Li canê xwe helandin
Heq kirin, bi ked û çalakiya xwe bi dest xistin. **Erê, wê zêde hilda lê ya rastî jî wê keçikê ew dirav **li canê xwe heland**.*

Li cehenemê sîran dikutin, tu kilaman dibêjî.
Tu hay ji bayê felekê nîn î. **Kuro tu radizêyî lawo, **li cehenemê sîran dikutin, tu kilaman dibêjî**.*

Li cehenemê sîran dikutin, tu kuloran dipêjî.
bnr. Li cehenemê sîran dikutin, tu kilaman dibêjî.

Li cem miyê çavê berxê derxistin
Li cem lêzim û nêzîkê kesekî jê re tiştên xerab gotin. **Erez Beg hay ji xwe hebe ha! Tu **li cem miyê çavê berxê derdixî**.*

Li cihekî qûn nekirin
Li cihê ku dixebite an jî lê disêwire karê xwe heya dawî nebirin, an jî ji ber kêmasiyên xwe li cihekî debar nekirin. **Ez Dawud baş dizanim, ew mirovekî cirnexweş e, zêde **li cihekî qûn nake**.*

Li cihekî teqînîn
Li derekê xitimîn. ****Li cihekî teqîniye** her hal, naxwe wer nedibû.*

Li cihê bêdef direqise, ma dora ciyê bidef!
bnr. Li ber defa bêdeng lîstin

Li cihê merivan danîn
bnr. Danîn dewsa meriv û însanan

Li cihê xwe nesekinîn
Bi tiştên xeter re mijûl bûn. **Dîsa Smayîl **li cihê xwe nasekine**, ka gelo dê serê xwe li kîjan zinarî bixe?*

Li cihê (yekî) şonik kutan
Li hember kesekî pir hêrs bûn. **Cindî **li cihê Lezgîn şonik dikutan**, lê bi destê wî neket.*

Li cihê bilind gerîn
Xwe zêde hesibandin. **Bekir **li cihê bilind digere**, lê bi vê meşê înşelah zêde nizm nakeve.*

Li cihê sekinî
bnr. Li cihê tune

Li cihê tune

Bêsebeb û bêhincet. **Hema **li cihê tune** keçikê çi hate dêv ji min re got.*

Li cihê şêran, rovî dikin gêran.

Li şûna mêranî û pakiyê, bicihbûna xirabî û dekbaziyê. **Mala felekê xera bibe, îro **li cihê şêran, rovî dikin gêran**.*

Li cihê xwe rûniştin

Têkildarî tiştekî nebûn. **Mîrşan tenê **li cihê xwe rûnişt**, destê xwe neda tiştekî.*

Li çareya serê xwe gerîn

Ji bo çaresériya pirsgirêka xwe di nav hewldanê de bûn. **Helbet hinek caran mirov ji hev û din re jî alîkariyê dike, lê zêdetir her kes **li çareya serê xwe digere**.*

Li çavên (yekî) girtin

Xenîm bûn. Li hemberî xirabiyên ku kirine ceza dîtin. **Mêriko, ew ked û ava ku min bi van neynûkên xwe ve kir, **li çavên te bigire** înşelah.*

Li çavên (yekî) nihêrîn (Li çavên hev nihêrîn)

1. Jê hêvî û guman kirin. **2.** Di bin bandora yekî de bûn. Hewcedar bûn. **3.** Têkilî û dostî berdewam kirin.**Wê zaroka piçûk çiqasî **li çavên wê nihêrî** jî, wê deremek ji xwarina xwe nedayê. *Rebenî tim **li çavên wî dinêre**, ew çawa dibêje, wisa dike. *Ez nikarim wê yekê bikim, çimkî em û ew cînar in û tim **li çavên hev û din dinêrin**.*

Li çavê min î kor nenihêre, li bextê min bininêre.

Ya giring bext e, şans e. **Bedcure ye, lê mêrê wê gûyê wê dixwe. Çi gotine? **"Li çavê min î kor nenihêre, li bextê min bininêre."***

Li çil (çol) û çiya xistin

1. Gelek ciyên dûr û sapa gerandin. **2.** Parçeparçeyî kirin. **Wî segbavî keçika wî bir **li çil û çiyayan xist**. *Guran ew berxa min **li çil û çiya xistin**.*

Li çiya û baniyan ketin

bnr. Li çil (çol) û çiya xistin

Li çiyayê qaf û kaf nihêrtin

Xwe zehf qure kirin, kuşpenetî kirin. **Tu ku li rabûn û rûniştina keçikê mêze dikî, tu dibêjî, ew **li çiyayê qaf û kaf dinihêre**.*

Li çoka xwe xistin

Poşman bûn. Li ber kirina xwe ketin. **Heke te berê guh bidaya gotina malbata xwe, te îro wisa **li çoka xwe nedixist**.*

Li çol û beyaran (beseran) ketin

Ji kerba derdan bê serî û bê berî gerîn. **Ji ber derdê dê û bavên xwe Sîrac serê xwe hilda û **li çol û beyaran ket**.*

Li çol û çiyayan ketin
bnr: Li çol û beyaran ketin

Li çolan pûş dan hev
Bi karên vala re mijûl bûn. *"Û ez ê bêm Sobarto çi bikim ha? Ez ê ***pûş li çolan bidim hev****?" Helîm Yûsiv

Li daholê (defê) xistin
bnr: Li defa hewarê xistin

Li darî çavan bûn
Eşkere û şênber li pêş çavan bûn. **Ma ez ê çi bibêjim, jixwe wa ye her tişt* ***li darî çavan e****.

Li darî (yekî) ketin
Hewcedarî yekî bûn. Ketin ber bextê yekî. **Ji salan û mehan ez carekê* ***li darî wî ketim****, di wê de jî wî ez destevala vegerandim.*

Li dawa min rûdine, bi rûyê min dilîze.
Li hemberî qenciyê xirabî kirin. **Ew jî qedera Xwedê ye. Ev biraziyê min,* ***li dawa min rûdine, bi rûyê min dilîze****.

Li defa hewarê xistin
1. Hêwirze rakirin. Teşqele derxistin. **2.** Agahiyek li her derê belav kirin. **Gernas ji bo wê meseleyê* ***li defa hewarê xist****. *Me got tenê ji diya xwe re bibêje, wê* ***li defa hewarê xist****.

Li defê xistin
Gotin an jî agahiyek li her derê belav kirin. **Maşelah, min bi dizî ji Rûşenê re got, wê jî* ***li defê xist****.

Li deqê xistin
Tam li nîşanê xistin. Armanc bi cih anîn. **Wî jî ew qas hêvî nedikir, lê hew nihêrî ku* ***li deqê xistiye****.

Li derdora xwe nihêrîn
1. Baldar bûn. Hawirdora xwe tesele kirin. **2.** Ji bûyer û ji rewşa dinyayê taqî (tecrube) û ders girtin. **Keça min, heke te hinekî* ***li derdora xwe binêriya****, nikaribûn têlefona te bidizin. *Ezbenî, heke ku tiştekî nizanibî,* ***li derdora xwe binêre****.

Li deryayan gemî, li deştan zêrzemî, derdê min, mirovê demdemî.
Mirovên bêîstikrar derdên mezin in, nayên kişandin. ***Li deryayan gemî, li deştan zêrzemî, derdê min, mirovê demdemî.*** *Gelek tişt tên kişandin, lê derdê mirovên demdemî pir zor e.*

Li destê hinekê din nihêrîn
Hewcedarî hinekên din bûn. **Ew jî ne bi serê xwe ye,* ***li destê hinekên din dinihêre****.

Li devê (yekî) gerîn

Ji bo hînbûna tiştekî bi awayekî ne rasterast, ji kesekî gilî kişandin. **Ez têgilîştim ku ew **li devê min digere** ji bo ku der barê wê bûyerê de tiştekî hîn bibe, lê min tu tiştek jê re negot.*

Li devê xwe xwedî derketin

Bi zaneyî axaftin. Bi endaze peyivîn. **Di wê demê de heke Nûbar jî **li devê xwe xwedî derneketa**, gelo rewşa me dê çawa bûya?*

Li dewsa merivê mezin danîn

Wekî mezin hesibandin. Rûmet dayîn. **"Min serê xwe kire ber xwe, di pişika xwe de hebekî werimîm. Cara ewilîn bû ku bavê min ez **li dewsa merivê mezin datanîm**."* Emerîkê Serdar

Li dewsa şêran, kund dikin sêran.

bnr: Li dewsa şêran, maye kundê dêran.

Li deriyê (yekî) xistin

Daxwaza tiştekî kirin. **Wê çaxê min **li deriyê wan jî xist**, lê mixabin ew jî nebûn alîkar.*

Li devê (yekî) nihêrîn

1. Di bin bandora kesekî de bûn. **2.** Hewes û hejmakarê yekî bûn. **Zerî **li devê Şemdîn dinêre**, ew çi bibêje, wisa dibe. *Rojen hema wisa disekinî, tenê zûr mabû, bi heyranî **li devê Zarçînê dinêrî**.*

Li dû ... kulîn

1. Gelekî girîng girtin. **2.** Lê xwedî derketin, li pey çûn. **Ew çi dike dîsa jî bavê wî yê belengaz **li dû dikule**. *Edo şivanekî pir hêja ye. Heya roja îroyîn tim **li pey keriyên pezê axayan kuliyaye**.*

Li dilê (yekî) girtin

Xeyidîn, tingijîn. **Wan gotinên xesûyê **li dilê Gevezê girt**, loma qet rûyê wê nekenî.*

Li dinyaya din dewakarê îmana (yekî) bûn

Ji ber neheqî kirina yekî dad û ceza daxwaz kirin. **Ew nikare ji destê min xelas bibe. Ez **li dinyaya din dewakarê îmana Zerdeşt im**.*

Li dîk danîn

Ji bo tiştekî zêde daxwaz kirin. Israr kirin. **Wî wisa got, dirêj kir û **li dîk danî**, ku min ji bêgavî got, erê.*

Li dîwar mişk hene, li mişk guh hene.

Divê mirov li ser gotinên xwe baldar be. **Hay ji xwe hebe kuro, **li dîwar mişk hene, li mişk guh hene**.*

Li dor hev û din zivirîn

bnr: Wekî peza gêj li dor hev zivirîn

Li dor qûnê zivirîn

bnr: Ji pey qûnê neqetîn

Li dor serê (yekî) gerîn

1. Ji ber hezkirinê dest jê nebûn, jê re pûte (îtimaın) nîşan dan. **2.** Qurban bûn. **Sîdar heya êvarê **li dor serê Reşo Begê digere**, neynûkek wî biêşe, ew pê diêşe. **Ez ê **li dor serê wî bigerim**, ew xwediyê min e.*

Li dor serî zivirîn

bnr. Li dor serê (yekî) gerîn

Li dora (yekî) çûn û hatin

1. Ji ber hezkirinê parastin, lê miqate bûn. **2.** Ji bo heyf an jî xirabiyekê li firsendê gerîn. **3.** Ji bo berjewendiyekê şêlafî kirin û jê re xizmet kirin. **Mistê Topal jî heya êvarê li dora Şermînê diçe û tê. **Ew gelekî **li dora Xelîl çûn û hatin**, lê nikaribûn tiştekî bînin serî. **Ji bo ku têkeve wî karî Zerê **li dora Seydo diçû û dihat**.*

Li dora (yekî) dayîn çelqebaskan

Jê re şalûşî kirin. **Zozanê ji bo xwe şirîn nîşan bide, **li dora lawikê mêvan dida çelqebaskan**. (argo)*

Li dora (yekî) ewr hebûn

Di wateya "li hawirdor kesên ku divê wan gotin û axaftinan nebihên û nezanin hene" de tê bikaranîn. **Ez ê ji te re wan kirinên wê hemûyan bibêjim, lê vê gavê **li dora me ewr hene**, bila bimîne paşê.*

Li dora gûyê xwe sênc kirin

Pir temahkar û çikûs bûn. **Perîzade jineke wisa ye ku **li dora gûyê xwe sênc dike**.*

Li dora (yekî) gerîn

Qurbana yekî bûn. Gorî bûn. **"-Karika min, ez **li dora te bigerim**. De tu ji dayîka xwe re bibêje, ka pisîkê çi kiriye?"* Berhîm Paşa

Li dû hev çûn

1. Eynî şop berdewam kirin. **2.** Bi hev du re destek û tifaq kirin. **Tu ji wan rayan hêvî meke, ew tenê **li dû hev diçin**. **Kes nikare wan ji hev û din biqetîne, tim ew **li dû hev diçin**.*

Li dû xwe hiştin

Derbas bûn, di dema borî de man. ***"Ka ew mal û milkên axa û mîrên din, ên hevkarên Roma Reş? Çi bi wan hat? Tiştên ku ji wan man an jî **li dû xwe hiştin**?"* Amed Tîgrîs

Li dûr gerîn, li nêzik dîtin

Xwe ji bo zoreke mezin amade kirin, lê bi hêsanî çareser kirin. **Ew jî dayîneke Xwedê ye, ez **li dûr digerîm, lê min nêzîk dît**.*

Li ecelê (ecela) xwe gerîn

Di nav tevgera karên xeter de bûn. **Fazilê Çîprût, bi wan hewldanên xwe yên xeternak hema **li ecelê xwe digere**.*

Li eleg û bêjingan xistin

Heya kitkiteyan nirxandin. Baş ji çav re derbas kirin. **Min ew pêşniyaza wan* ***li eleg û bêjingê xist****, bi dîtina min ji me re fîrsendek baş e.*

Li erdê dîtin

Bêzehmet xwedî tiştekî bûn. **Ma min ev malê xwe* ***li erdê dîtiye****?! Heya dawiyê ez ê biparêzim.*

Li esmanan lê gerîn, li erdê dîtin

Ji hêvîkirina xwe hêsantir bi dest xistin. **Ez* ***li esmanan lê digerîm, lê min li erdê dît****.*

Li esmanan ketin

Pirs hêrs bûn. **Perîşan keçeke sakîn e, lê piştî wan gotinên Bêrîvanê, ew jî* ***li esmanan ket****.*

Li esmanan nîsk tov kirin

Xwe ragitin, xwe qure kirin. **"Tu dibêjî qey* ***li esmanan nîskan tov dike****."* Zana Farqînî

Li esmanan xistin

Bi henek û tinazan yek zêde xolî kirin. Bi hêrsê xistin. **Xanimê bi wan henek û tiranên xwe Faro* ***li esmanan dixist****.*

Li eynî xwe neanîn

Tiştek dîtin an jî zanîn, lê wekî ku qet nedîtiye û nizane tevgerîn. **Bavê wî dît ku ew li cem keçikê rûniştiye cixarê dikişîne, lê qet* ***li eynî xwe neanî*** *û ji wan derbas bû.*

Li ezmanê heftan gerîn, li erdê bi dest ketin

bnr: Li esmanan lê gerîn, li erdê dîtin

Li êk ketin (Li hev ketin)

Bi hev û din re şer kirin, doz meşandin. **Berê navbera wan baş bû, dû re wer* ***li êk ketin****.*

Li êk kirin (Li hev kirin)

Bi hev û din re hevkarî kirin. Bi hev û din re aştî yan jî peyman pêk anîn. **Wan* ***li êk kirine****, tu çima navberê xera dikî?*

Li êk zivartin

Li serê yekî dek û dolap çêkirin. **Jixwe ji zû de ye ku wan li serê Samî wisa* ***li êk zivartine****.*

Li fetlonekê zivirîn

Bi ser ketin, karê xwe qedandin. **Bi vê bûyerê re jî ew* ***li fetlonekê zivirî****, êdî roj roja wî ye.*

Li fîqê xistin

Kar xera bûn û bi awayekî neyînî qedandin, daxuyandin. **Êdî me jî* ***li fîqê xist****, tiştek ji destê me nayê.*

Li garanê digere, dîsa diçe dora kera xwe.

Xerabiya xwe dîsa gihandina yên nêzîkî xwe. **Qet nebe ji yên xerîb re bikira, zêde ne xem bû, lê* ***li garanê digere, dîsa diçe dora kera xwe****."*

Li gorî dilê xwe kirin
Wekî daxwaza dilê xwe kirin. **Ji îro pê ve tu **li gor dilê xwe bike**.*

Li gorî makê, golik pakê
Qîz ji dê baştir e. **Li gorî tiştên ku qewimîn, dîsa **li gorî makê, golik pakê**.*

Li gotina xwe xwedî derketin
bnr. Xwediyê gotina xwe bûn

Li guharê mayîn
Li holê man. Bê alî, bê xwedî û bê xwedan man. **Hew min mêze kir ku her kes çûye, hema ez tenê **li guharê mame**.*

Li gura (yekî) kirin
bnr. Bi gotina (yekî) kirin

Li gur û gîfa berê çûn
Wekî edet û çanda berê tevgerîn. **Dinya çûye wî hay pê tune, çavên xwe girtine û **li gur û gîfa berê diçe**.*

Li heft çeman avêtin
Li hincetan gerîn. **Erê bavo me fêm kir, ne pêwîst e tu **li heft çeman biavêjî**.*

Li hember hev bûn
Li dijî hev bûn. **Heya ku tê bîra min ew her du **li hemberî hev in**.*

Li hember (yekî) avis bûn
Ji ber hinek qencî yan jî kêrhatinan li hember kesekî deyndar bûn. **Heke **li hember wî avis nebûya**, gotina wî nedikir, lê bêgav maye.*

Li hesabê (yekî) nehatin
Wekî berjewendiyên yekî nebûn. **Na, ne ku tênagihîje. Ew baş têdigihîje, ez çi dibêjim, lê **li hesabê wî nayê**.*

Li hespa min siwar be, lê piştê neêşîne.
bnr. Li hespa min siwar be, lê qûna xwe tê de danegire.

Li hespa min siwar be, lê qûna xwe tê de danegire.
Li hicetan gerîn. **Dibêje, **li hespa min siwar be, lê qûna xwe tê de danegire**. Dilê wî naxwaze, lê nizane bê çi mehneyê peyde bike.*

Li hespê şeytên siwar bûn
Di nav helwest û hewldaneke xeternak de bûn. **Şikak **li hespê şeytên siwar bûye**, ka hela dawiya wî çawa dibe.*

Li hepsê eksê siwar bûn
Inyad kirin. **Xeyrî **li hepsê eksê siwar bûye**, kes nikare wî bîne rê.*

Li hev aliqîn

1. Bi hev din re têkildar bûn an jî di nav têkildariyeke ku di radeya astengî û bergirî de bûn. **2.** Ji hev û din re doz ajotin, gengeşî kirin. **Ew **li hev dialiqin**, hew dibînin ku êvar bûye jî. **Ew her du wisa ne, ku **li hev aliqîn**, kes nikare wan ji hev veqetîne.*

Li hev anîn

1. Bi awayekî xweş, bedew û bi aheng tişt an jî kar pêk anîn. **2.** Tiştên nebûyî bi awayekî bûyî gotin. Derew kirin. **Wî wênesazê başûr, di wê tabloyê de reng xweş **li hev anîbûn**. **Dedo wisa **li hev anî** ku hindik mabû ku ez jî jê bawer bikim.*

Li hev asê bûn

1. Li hev qelibîn. **2.** Têkilî ji hev birîn. **3.** Ya heyî înkar kirin. **4.** Di derekê de xitimîn, bûn girêk. **Me hew dît ku her du bend **li hev asê bûne**. **Jinik û mêrik **li hev asê bûne**, nayên bal hev. **Her du nîvekar jî **li hev asê bûne**, peymana xwe nas nakin. **Pirsgirêka wan wisa **li hev asê bûye**, ku serok jî nikare wê çareser bike.*

Li hev banîn

Li hev û din xwedî derketin. Ji hev û din hez kirin. **Şengê û Zerdê ev çendeke wa ye yeman **li hev banîne**.*

Li hev çûn û hatin

Li xwe heyirîn. Dest û pê li hev piçikîn. **Em saetekê li wir man, ew **li hev çûn û hatin**, nikaribûn çayekê jî bidin ber me.*

Li hev gerandin

Tevlihev kirin. **Qasoyê Oso ew mesele wisa **li hev gerandiye** ku kes nikare çareser bike.*

Li hev gerîn

bnr. Li hev piçikîn

Li hev hatin

1. Aştî pêk anîn. **2.** Bi hev û din re di nav aheng û dengeyê de bûn. **"Ez heta ji wan yekî nekujim, ez bi wan re **li hev nayêm**." Lokman Polat **A rastî jî ew her sê dîmenên rengîn ku te li jor wê maseyê xistine pir **li hev hatine**.*

Li hev herbilîn

bnr. Li hev asê bûn

Li hev hêwirîn

Li hev kom bûn. Li hev û din xwedî derketin **Wê şevê ew li wir **li hev hêwirîn**.*

Li hev keys kirin

Navbera du hêlan xweş kirin. **Xalid Axa ew her du alî **li hev keys kirin**.*

Li hev kir bûn

Bi hev û din re dijminahî kirin, kîn û buxz ajotin. **Bi salan e ku ew her du malbat **li hev kir bûne**, kîn û buxza wan naqede.*

Li hev kirin agir
Navber xera kirin. **Jixwe wan baş bi hev du re debar nedikirin, diya jinikê jî hat lap ew **li hev du kirin agir**.*

Li hev piçikîn (Bi hev û din piçikîn)
Dest û pê li hev alîn. Ji nav de derneketin. **Di dewata lawê xwe de Refîq û Xanê wisa **li hev piçikîbûn** ku nayê gotin.*

Li hev qelibandin
bnr: Li stûyên hev siwar kirin

Li hev qelibîn
Bi awayekî gur an jî qelebalix li nav hev ketin. **Malbat tev wisa **li hev qelibîn** ku alem hate sêra wan.*

Li hev qerase kirin
bnr: Li stûyê hev siwar kirin

Li hev rêz kirin
Derew kirin. **Wa ye Sercan dîsa li bal mêvanan **li hev rêz dike**.* (argo)

Li hev rûniştin
1. Li hev hatin, aştî pêk anîn. **2.** Bi hev û din re sohbet kirin. **Gelekî bi hev û din re dijminatî meşandin, lê wa ye ew jî **li hev rûniştin**. *Wisa xweş **li hev rûniştine**, qet rehetiya wan nerevîne.*

Li hev sor bûn
Ji hev hêrs bûn, şer kirin, qehirîn. ** "Wekî dijminan **li hev sor bûne** û bi şer û doz hebûnên xwe wedar kirine."* Ehmed Pelda

Li hev sitamî kirin
bnr: Serên xwe danîn ser hev

Li hev siwar bûn
1. Bi hev du de ketin. Bi hev du re debar nekirin. **2.** Ketina nav têkiliya zayendî. **Her du bira jî heya êvarê **li hev siwar dibin**. *Ew her du di salonê de **li hev siwar bûbûn**.*

Li hev û din beled bûn
Hev û din nas kirin. **Tu nekeve tatêlê, ew **li hev û din beled in**.*

Li hev û din nekirin
1. Bi hev du re debar nekirin. **2.** Di nav aheng û li hevkirinê de nebûn. **Qet hewl nede, ew her du **li hev û din nakin**. *Wan perdeyan, wan qoltix û xalîçeyan **li hev û din nekirine**.*

Li hev û din xwedî derketin
Bi hev û din re stamî kirin. **Jixwe ew her du tenê mane, divê ew jî **li hev û din xwedî derkevin**.*

Li heyna (yekî) çûn
Di nav hewldana alîkariya kesekî de bûn. **Ew* ***li heyna Zînê neçûya,*** *niha ji zû de hatibû.*

Li hêviya Xwedê hiştin
Dev ji xebat ked û têkildariyê berdan. **Na lo! Ew li zeviyê mêze nakin, hema* ***li hêviya Xwedê hiştine.***

Li hêviyê pîr bûn
Gelekî li benda kesekî man. **Mala te neşewitiyo, ez* ***li hêviya te pîr bûm.***

Li intê siwar bûn
bnr: Li kerê şeytên siwar bûn

Li jor dinêrim simbêl, li jêr dinêrim rî ye.
Ji pirsgirêkê re tu çareserî nedîtin. **Bi rastî ez jî nizanim çawa bikim.* ***Li jor dinêrim simbêl, li jêr dinêrim rî ye.***

Li jor rûniştin
Xwe zêde kirin. Xwe zêde dîtin. **Belê dibe ku asta pîşeyê wî ne zehf bilind be, lê ew di barê dilê xwe de* ***li jor rûniştiye.***

Li îşê (karê) xwe nihêrîn
Têkildarî tiştekî nebûn. Li riya xwe berdewam kirin. **"...gotibû, lê me car din guh nedabû pîra xwe û* ***li karê xwe nihêrtibû.***" Felat Dilgeş

Li kerê mirî digere ku nalan jê bike.
Li yekî gêj û bêfêm digere ku wî bixapîne û birûçikîne. **Ew* ***li kerê mirî digere ku nalan jê bike,*** *lê ew hê min baş nas nake.*

Li kerê mirî gerîn
bnr: Li kerê mirî digere ku nalan jê bike.

Li kerê siwar bûye, li kerê digere.
Ji bo helwesta şaşo faşoyî û berevajî tê bikaranîn. **Qet qala Silo nekin, ew* ***li kerê siwar bûye, li kerê digere.***

Li kerê şeytên siwar bûn
Inyat kirin. Di nav eksê de bûn. **Em dikin û nakin Gebar* ***li kerê şeytên siwar bûye,*** *nayê rê.*

Li keysa xwe gerîn
Li firsend û derfeta xwe gerîn. **Ew jî* ***li keysa xwe digere*** *ku ba lê bîne, lê ka kengê?*

Li kêfa xwe mêze kirin
Tenê li rehetî û aramiya xwe fikirîn. **Ew ne yekî wisa ye, dinya xera bibe jî ew ê dîsa* ***li kêfa xwe mêze bike.***

Li kêf û zewqa xwe nêrîn
Wekî dilê xwe jiyîn. **Qet talaşa wê jî nîn e, hema ew* ***li kêf û zewqa xwe dinihêre.***

Li kêleka (yekî) girtin
Ji bo rewşa aciz û xeyîdînê tê gotin. **Kifş e ku wan gotinan **li kêleka wî girtin**, lewma ji vir çû.*

Li kotezîn siwar bûn
Di nav têkiliya zayendî de bûn. **Apê Ezo mirovekî pir ecêb e, bi şev ji lawên xwe re digot, lawo rabin bila her kes **li kotezînê xwe siwar be**.* (argo)

Li ku derê tav be, li wê derê kurkê xwe raxistin
Li gorî berjewendiyên xwe tevgerîn. **Ew çi şeytanek e, **li ku derê tav be, li wê derê kurkê xwe radixe**.*

Li ku zer bû, li ku der bû?!
bnr: Di ku re zer bû, di ku re der bû?!

Li ling alîn
Jê re asteng bûn. **Ev çend sal in ku ev keçika **li lingê min aliye**, nahêle ez pêş de herim.*

Li lingê (yekî) xistin
Ji bo xirabiya yekî di nav hewldanan de bûn. **"Me ew anî xist vê derê, ew jî hatiye **li lingê me dixe**."* Zana Farqînî

Li loqa mezin gerîn
Doza tiştekî mezin kirin. **Ew cuda ye, ew **li loqa mezin digere**.*

Li mala bavê nexş û tevnan çêdike, li mala mêr tevan ji bîr dike.
Ji bo bûkên xayîn û kone tê bikaranîn. ****Li mala bavê nexş û tevnan çêdike, li mala mêr tevan ji bîr dike.** Ew ji şansê me ye, bûka me li mala me tu dibêjî fîr û feş bûye.*

Li mala bavê bû mal, li mala xezûr bû teral.
bnr: Li mala bavê nexş û tevnan çêdike, li mala mêr tevan ji bîr dike.

Li mala Xwedê hêlîna xwe çêkirin
Xwe di cihekî pir qewîn de parastin. **Min ji te re got, ew **li mala Xwedê hêlîna xwe çêke** jî ji dest min xelas nabe.*

Li malê şêr, li der pisîk bûn
bnr: Li nav malê şêr e, li nav êlê kitika bêkêr e.

Li me bibe bihar, em dê tehta ber malê bikin xeyar.
Ji bo hêvî û xeyalan tê bikaranîn. **Her tişt demeke wê heye bavo, hela bila **li me bibe bihar, em dê tehta ber malê bikin xeyar**.*

Li mchneyan gerîn
bnr: Li hincetan gerîn

Li menzera (yekî) hatin

Wekî rewşa yekî bûn. *"*Gotineke mezinan bi bîrê ket: 'Tiştê çû, mede dû.' Belê ev gotin rast e û tam jî **li menzera me tê**."* Feqî Huseyn Sağnıç

Li mexel pişkul tune, li pirêzê deve tune.

Ji bo tiştên derew û bêbingeh tê gotin. ***Li mexel pişkul tune, li pirêze deve tune,** tu li teşqeleya ku derdixe binêre.*

Li minê, li minê, çi bikim dernakeve ji ber hikmê jinê!

Ji bo mêrên ku pir di bin bandora jina xwe de ne tê bikaranîn. **Diya min ji bo têkiliya min û jina min tim digot: "**Li minê, li minê, çi bikim dernakeve ji ber hikmê jinê!** Wê çawa be rewşa vî lawê min?"*

Li minê, li minê, rovî naçe kunê!

Ji bo karên neyînî tê bikaranîn. **Tu li min û vî teresî binêre, loma gotine: **"Li minê, li minê, rovî naçe kunê."***

Li mirin xwe gerîn

bnr. Li ecelê xwe gerîn

Li nanê xwe gerîn

Ji bo debara xwe mijûl bûn. **Heyran karê me bi wan tiştan neketiye, em **li nanê xwe digerin**.*

Li morîka diya xwe gerîn

Ji bo hewldana ne di cih de tê gotin. **Ma çi karê wê li wir hebû, **li wir morîka diya xwe digeriya**?*

Li nav çavên (yekî) nihêrîn

1. Li benda ferman an jî daxwaza xwe diyarkirina yekî bûn. **2.** Benda dayîna tiştekî ji kesekî kirin. **Welelhî Xidir hema **li nav çavên min dinihêre**, ez tiliya xwe dirêjî kê bikim, ew çû. **Wisa **li nav çavên min dinihêrî**, min şerm kir û ya mayî da wî.*

Li nav çavan xistin

Zilm û neheqî lê kirin. **Ez tenê li nanê xwe digerîm, lê wan **li nav çavên min xistin** û ez ji hevalan hiştim.*

Li nav hev ketin

1. Li hev û din qelibîn. Bi hev û din re şer kirin. **2.** Li hev û din gerîn, belawela bûn. **Hew me dît ku her du eşîr **li nav hev ketin**. **Ew nivîsarên wê wisa **li nav hev ketibûn** ku heya min rast kirin, ez betilîm.*

Li nav leman qelibîn

bnr. Xwe lê qerase kirin

Li nav malê şêr e, li nav êlê kitika bêkêr e.

Ji bo kesên ku bi tenê zora wî digihîje zarok û malbata wî tê gotin. **Em dizanin ew li der ve çawan e. **Li nav malê şêr e, li nav êlê kitika bêkêr e.***

Li nefsa xwe hakim nebûn

Vîn qels bûn, bi taybetî jî vîna zayendî. **Apê min î Niso **li nefsa xwe hakim nebû**, çû bi wê jinika ecem re serê xwe xiste yek.*

Li nefsa xwe xwedî nebûn

bnr. Li nefsa xwe hakim nebûn

Li nîvê rê hiştin

Bi duristayî hevaltiya xwe yan jî hevkariya xwe heya dawî nedomandin. **Em pê bawer bûn, me lawikê xwe sparte wî, lê wî jî lawikê me **li nîvê rê hişt**.*

Li ortê man (Di ortê de man)

1. Di navberê de bê biryar man. **2.** Bê xwedî man. **Hema ez **di ortê de mam**, min nizanibû ku ez çawa bikim. *Her kesî got: "Heval êvarbaş" û ji komeleyê derketin, çûn mala xwe, di dawiyê de ez tenê **li ortê mam**.*

Li parxanên (yekî) girtin

Ji gotin an jî kirinekê aciz bûn, şikestin. **Bê şêwr û bê bêwr firotina erebeyê û ew gotinên Xelef **li parxanên Berzencî girtin**.*

Li paş ketin

Li dû hempayên xwe man. Li gorî astê qels ketin. **Berê ew ji hemûyan zêdetir bû, lê piştî wê bûyerê **li paş ket**.*

Li paş mar, li pêş ar bûn

Di nav rewşeke pir zor û xeternak de bûn. **"Ji hêzên olîgarşîk re riya vegerê nîn e, **li paş wan mar, li pêş wan ar e**."* Samî Berbang

Li paş xistin

Ji hempayan qelstir û derengtir xistin. **Sûsanê bi zanetî ew wer **li paş hevalên wê xist**.*

Li perên esmanan gerîn

bnr: Li ser perên esmanan ketin

Li pey erzê xelkê gerîn

Di hêla zayendî de di nav hewldaneke ne durist de bûn. **Celîl heya êvarê **li pey erzê xelkê digere**.*

Li pey (yekî) bûn

1. Li piştekinîn, desteg û alîkarî kirin. **2.** Ji bo armanceke erênî yan jî neyînî li yekî çavdêrî kirin. **3.** Li pey şopa yekî bûn, şopandin, di riya yekî de çûn. Wekî wî fikirîn û kirin. **Apê wî ne **li pey bûya**, te bidîta halê wî. *Serhat tim **li pey e**, dê di dawiyê de wî bigire. *Tahar tim **li pey wê ye**, kes nikare wî ji riya wê vegerîne.*

Li pey (yekî) bûn tirikî (tirik)

Zêde li pey kesekî yan jî tiştekî ketin. **Ez naxwazim wer bibe, lê çi bikim, lawê min **li pey keçikê bûye tirik**.* (argo)

Li pey (yekî) gerîn (Li dû gerîn)
1. Ji bo heyf girtinê yek şopadin. **2.** Ji bo parastin û xwedî lê derketinê ji pey yekî neqetîn. 3. Ji bo agahî û bersivekê li pey yekî bûn. **Mêrên wê malbatê bi şev û roj **li pey wî digirin**, karê wî zor e. *Nazenîn wisa jê hez dike ku tim **li pey digere**. ***Li pey digere** ku bersivekê bigire, lê ew jî qûna xwe gelekî metah digire.*

Li pey gotinan ketin (Li pey giliyan ketin)
bnr: Gilî mezin kirin

Li pey heqê xwe gerîn
Ji bo mafê xwe di nav hewldanê de bûn. **"Bi sedema ku di nav wan de, bi têrayî fikra nijadperwerî tune bû, **li pey heqê xwe negeriyan**, yekitiya xwe çênekirin."* Süleyman Çevik

Li pey hisehisan (hese hesan) ketin
Di derbarekê de hindik hindik agahî girtin. **Xelef dû re **li pey hisehisan ket**, ku yê ku keçika wî xapandiye kî ye.*

Li pey miriyan kesî xwe nekuştiye, wey li canê çûyî.
Kes nabe canê kesî, divê mirov baş li xwe miqate be. **Baş li xwe miqate be keçika min. **Li pey miriyan kesî xwe nekuştiye, wey li canê çûyî.***

Li pey namûsa (yekî) gerîn
Ji bo têkiliya cinsî li pey jin an jî nêzîka yekî bûn. **Karê wî segbavî jî heya êvarê **li pey namûsa xelkê gerîn** e.*

Li pey pirsan ketin
Zêde meraq kirin û ji bo hînbûna bûyeran gelekî hewl dan. **"Ger mirov **li pey pirsan bikeve**, dê mirov bigihîje encamekê.*

Li pey qûnê çûn
bnr: Ji pey qûna (yekî) neqetîn

Li pey qûnê gerîn
bnr. Ji pey qûna (yekî) neqetîn

Li pey qûnê ketin
bnr. Ji pey qûna (yekî) neqetîn

Li pey riya (yekî) çûn
Ramana yekî ecibandin. **Ew qas ciwan **li pey riya wî diçûn** ku nayê gotin.*

Li pey rizqê xwe bûn
Ji bo debara xwe ya aborî hewl dan. **Camêrî tenê **li pey rizqê xwe ye**.*

Li pey rizqê xwe gerîn
bnr: Li pey rizqê xwe bûn

Li pey şeytên çûn
Di nav helwesteke xirab de bûn. **Gozel îsal hema **li pey şeytên diçe**.*

Li pey şopê çûn
bnr. Li pey riya (yekî) çûn

Li pey ketin
bnr. Li pey gerîn

Li pêş çavan qewimîn
Eşkere pêk hatin. Her tişt xuya bûn. **Ka ez çi bibêjim, vala ye, rewş **li pêş çavan qewimiye**.*

Li pêş çavên xwe tu kes nedîtin
1. Pir hêrs bûn. **2.** Xwe zehf zêde hesibandin, nepixîn. **Reşîtê Çîto wisa bûbû ku **li pêş çavên xwe tu kes nedidît**. *Mêrikî xwe winda kiriye, **li pêş çavên xwe tu kesî nabîne**.*

Li pêş çavên xwe tu tişt nedîtin
bnr. Li pêş çavên xwe tu kes nedîtin

Li pêş diçim, dibêjin: "Bîj e." Li paş diçim, dibêjin: "gêj e."
bnr. Zû diçim dibêjin bîj e, hêdî diçim dibêjin gêj e.

Li pişt heft deriyê hesinî bûn
Li cihekî pir qewîn bûn. Têkilî danîn pir zor bûn. **"Ne tenê ji bo xelasbûnê, ew li nifteya jiyanê digerin. **Li pey heft deriyên hesin be** jî, divê nifte were dîtin û derî lazim e were vekirin."* Hüseyin Kaytan

Li pişt (yekî) sekinîn
Alîkarî kirin, jê re desteg bûn. **Heke xalê wî **li pişt wî nesekiniya**, wer zû xelas nedibû.*

Li pişt xwe hiştin
Jê derbas bûn. **Berê ew di wê derbarê de yekemîn bû, lê Resûl ew **li pişt xwe hişt**.*

Li pişta (yekî) siwar bûn
1. Bi saya yekî beleş jiyîn. **2.** Serdestî kirin. **3.** Firsend jê stendin. **Ji Heqî re ne pirsgirêk e, ew **li pişta Aram siwar bûye** û karê xwe dimeşîne. *Vahab **li pişta Cemîl siwar bû**, jiyan li wî herimand. *Heya Berces bi xwe hesiya, Kerîm li **pişta wî siwar bû** jî.*

Li qapanê xistin
Ji bo hînbûna rewş û naverok fêmkirinê ceribandin. **Tu qet meraqan meke, me ji zû de ew **li qapanê xistiye** û em kîloya wê hîn bûne jî.*

Li qirtan gerîn
Li tiştên belaş û bêmiz gerîn. **Jixwe ew yek xuya wan e, ew tim **li qirtan digerin**.*

Li qismetê (nesîbê) xwe gerîn
Ji bo debara xwe di nav hewldanê de bûn. **Gazinan jê nekin. Di vê dinyayê de her kes **li qismetê xwe digere**.*

Li qîtê vegerîn
Zû vegerîn. **Maşelah Şoreş hema* ***li qîtê vegerî****.*

Li qonca germ, dide (dike) xeberdanên germ.
Di nav rewşa xweş de bi hêsanî nêzîkî pirsgirêkan bûn, lafekî kirin. ****Li qonca germ, dike xeberdanên germ.*** *Li ser maseyê û di wê qesra rengîn de peyivîn hêsan e.*

Li qotikan gerîn
bnr: Li belaya xwe gerîn

Li qula mişkan gerîn
Pir tirsîn. **Tu li gotinên wî mêze meke, ketibû rewşek wisa ku* ***li qula mişkan digeriya****.*

Li rasta Xwedê hiştîn
Li bestê ango li ortê hiştin. **Wî necamêrî ew jinepîr* ***li besta Xwedê hiştiye****.*

Li rastî tofanê hatin
Li rastî qeza, bela yan jî xeteriyekê hatin. **Keçikê bê* ***tofanek li rastî te bê****, bê te çima qet fedî nedikir*: (nifir)

Li rehetiya xwe gerîn
Ji bo berjewendî û serfiraziya xwe hewl dan. **Ew çi canhez e, tim* ***li rehetiya xwe digere****.*

Li rex (yekî) ketin
1. Bi yekî henek û tiranê xwe kirin. **2.** Li nik yekî meşîn. **Bedran heya êvarê* ***li rex Xerzan diket*** *û ew li esmanan dixist. *Me got, em tenê Rosto bişînin, me mêze kir ku wa ye Wardek jî* ***li rex wî ket****.*

Li riyekê gerîn
Ji bo çareyekê di nav hewldanê de bûn. **Em jî* ***li riyekê digerin****, lê ka em çawa bikin?*

Li rûyan kenin, li pişt gor kolan
Ji bo kesên durû tê bikaranîn. **Ez wê baş nas dikim,* ***li rûyê mirov dikene, lê di pişt jî gorê dikole****.*

Li rûyan xistin
Çewtî û tawana kesekî jê re gotin. **Her çi hebe jî divê te ew kirina wî* ***li rûyan nexista****.*

Li rûyê (yekî) berf barîn
Ji bo kesên rûtirş û pozpirçî tê gotin. **Mala wî bişewite, wisa kiriye ku tu dibêjî* ***li rûyê wî berf bariye****.*

Li rûyê (yekî) kenîn
1. Ji yekî re nêzîkahî nîşan dan. **2.** Ne bi dostî lê bi xinisî ji der ve xwe wekî dostan nîşan dan. **Çima ku ez çend caran* ***li rûyê wî kenîm****, bitrî bû. *Erê,* ***li rûyê min dikene****, lê ez dizanim çi di hundirê wî de dikele.*

Li rûyê (yekî) nenihêrîn
1. Rûmet û nirx nedan. **2.** Ji yekî xeyidîn. **Me ji bo wî ew qas fedakarî jî kiribû, lê dema ku em lê bûn mêvan, mêrikî qet **li rûyê me jî nenihêrî**. *Min lêborîna xwe xwest, lê wê **li rûyê min nenihêrî**.*

Li rûyên hev nenihêrîn
Ji hev û din xeyîdîn. **Ev bê çend sal in ku ew her du **li rûyên hev nanihêrin**.*

Li rûyên hev sekinîn
Ji bo selmandina (îspat kirina) tiştekî li hember kesekî gotina xwe dubare kirin. **Heke di dema cûntayê de heval ew qas **li rûyên hev nesekinîna**, ziyan wisa zehf zêde nedibû.*

Li ser agir sekinîn (Li ser agir rûniştin)
Bi karên xeter re mijûl bûn. **Cevdet **li ser agir sekiniye**, lê hay ji xwe tune.*

Li ser avdestekê nesekinîn
Li ser biryar û hedekî nesekinîn. **Heyran ka ez çawa bi Serfîrazê Eşref bawer bibim? Camêrî **li ser avdestekê nasekine**.*

Li ser avê nivisîn
Ji bo soz û karên pûç tê gotin. **Malxirabo, tu jê bawer meke. Bi Xwedê, ez baş dizanim ku, ew gotina xwe tenê **li ser avê dinivîse**.*

Li ser ... axaftin
Wekî mijar nirxandin û pê mijûl bûn. **"Em li qehweyê tên cem hev û **li ser helbest û wêjeyê diaxivin**."* Zana Farqînî

Li ser benga xwe bûn
Li ser hemd û hêla xwe bûn. Bi her awayî di nav serdema xwe ya herî baş de bûn. **Dikarim bibêjim ku Delîl tam **li ser benga xwe ye**.*

Li ser (yekî) birîn
Lezgînî daxwaz kirin. Tiştek di heman demê de xwestin. **Kuro ev çi bela ye? **Li ser min biriye**, dibêje înk bilah hema ya niha dixwazim.*

Li ser boçikê hêşîn bûn
Ji bo kesên ku kal an jî pîr in, lê ciwan tên xuyan tê bianîn. **Maşelah Xaltîka Fazîle û mêrê wê ji nû ve **li ser boçika xwe hêşîn bûne**.*

Li ser bûn
Li gorî yê hember serkeftî bûn. **Ehmed hê jî **li ser e**, înşelah nakeve binî.*

Li ser çengek av, soberî kirin
Ji bo tiştekî piçûk qiyamet rakirin. **Di serê serî de ez ji we re bibêjim, Sercan **li ser çengek av, soberî dike**.*

Li ser çi dînî ye kifş nebûn
bnr. Kîjan pêxemberî bawer dike belî nebûn.

Li ser çi mezhebiye kifş nebûn
bnr: Ji kîjan pêxemberî bawer dike belî nebûn.

Li ser çi ye, li ber çi ye nezanîn
Hay ji xwe tunebûn. Di nav sergêjiyekê de bûn. **Heyran welehî piştî wê bûyerê, ez jî qet nizanim ez* ***li ser çi me û li ber çi me***.

Li ser dawa (yekî) nimêj tê kirin
Ji bo kesên zêde durist û paqij tê gotin. **"Hewqasî qaîl bû ji Şêxmûs... Heta gelek caran jî digot:* ***'Ez ê li ser dawa Şêxmûs nimêj bikim.' "*** Selman Dilovan

Li ser dêla xwe ketin
Têkçûn. Şek şikestin. **Piştî wan gotinan, Delîl dengê xwe birî û* ***li ser dêla xwe ket***.

Li ser dest û piyên xwe bûn
bnr: Li ser hemd û hêla xwe bûn

Li ser destan girtin
Zehf zêde rûmet dayîn. **Nizanim çi di wî de dîtine, hema gişt wî qibraxî* ***li ser destan digirin***.

Li ser dilê (yekî) kelîn
Ji kesekî yan jî tiştekî hez kirin, girîng girtin. **Ez jî nizanim lê, hê jî ew* ***li ser dilê min dikele***.

Li ser dilê (yekî) man
Bi xwarinê aciz bûn. **Nizanim çi di wê xwarinê de hebû, hema* ***li ser dilê min ma***.

Li ser dil sekinîn
bnr: Li ser dilê (yekî) man

Li ser diranekî çêrîn
Gelekî jar bûn. **Leyla ketiye rewşeke wisa ku, tu dibêjî* ***li ser diranekî çêriyaya***.

Li ser dirûngeyên xelkê kilijîn
Feqîr bûn. **Karê wî jî ew e ku* ***li ser durîngê xelkê bikilije***.

Li ser dîwarê alebilê sekinîn
Di nav rewş û pêvajoyeke xeter de bûn. **Sedulah* ***li ser dîwarê alebilê sekiniye****, yek fîtkekê lêxe, wê here.*

Li ser doşega pêxember bi diya xwe re zinê kirin
Heke ez careke din Qîza Mahacir hildim vê malê, bila ez* ***li ser doşega pêxember bi diya xwe re zinê bikim*. (sond)

Li ser dû gerîn (Li ser dûyê xelkê gerîn)
Ji bo yên ku ji bo xwarinê li malan dilikijin tê bikaranîn. **Ji wî re çi, ew hema* ***li ser dû digere***.

Li ser dûvê xwe rûniştin

1. Ji ber bêhêvîtî yan jî têkçûnê pozîde bûn û dev ji tekoşînê berdan. **2.** Zewicîn. **Rihan gelekî xebitî, lê mêze kir ku pêk nayîne, çû **li ser dûvê xwe rûnişt**. *Di ciwaniyê de gelekî ser û guhê xwe li ba dikir, lê piştî ku zewicî, çû **li ser dûvê xwe rûniştt**.*

Li ser eniya xwe bûn

Di gotinên xwe de zêde biinyad bûn. **Ew yekî **li ser eniya xwe ye**, bawer nakim ku dev ji gotina xwe berde.*

Li ser eyarê yekî agir dadan

Zilm û zordarî li yekî kirin. **Tu ku ew qasî **li ser eyarê yekî agir dadî**, di dawiyê de tu dê bedela wê jî bidî.*

Li ser (yekî) ferz bûn

Ji bo karê bêfita û vebirî ku çi dibe bila bibe divê bê pêkanîn tê gotin. **Ev gotinên wê keçikê **li ser min ferz bûn**. Pêwîst e ku ez bi cih bînim.*

Li ser ... fikirîn

Der barê mijarekê de kûr bûn. **"Li dinyayê pir kêm xelk bi qasî me di jiyaneke kambax, rewşeke xerab de jiyane û dijîn. Divê em **li ser sedemên vê yekê jî bifikirin**."* Süleyman Çevik

Li ser gotina xwe sekinîn

bnr. Xwediyê gotina xwe bûn

Li ser ... guhdar bûn

Bal li ser bûn. Bi baldarî çav li tiştekî yan jî kesekî bûn. **Ez ne li vir im, heya ku bêm, ji te tika dikim, **li ser erebeya min guhdar be**.*

Li ser guhê xwe razan (Li ser guhekî razan)

Hay ji dinyayê û ji bûyeran tune bûn. (An jî bi zanetî xwe ker kirin.) **"Çimkî li Sobartoyê xelk **li ser guhê xwe bi mehan radizên** ..."* Helîm Yûsiv

Li ser guhê xwe (re) avêtin

bnr. Di ser guhê xwe re avêtin

Li ser hatin kuştin

Ji bo doz û daweyekê canê xwe dan. **Ji bo wê dozê tekoşîn kir, heta ku li **ser hate kuştin**.*

Li ser heft kaniyan av venexwarin

1. Bêşans û bênesîb bûn. **2.** Zêde nazik û tirtîzî bûn. **Nesîb ku tune be, mirov **li ser heft kaniyan nikare avê vexwe**. *Ka Berîn jineke çiqas kubar e, **li ser heft kaniyan av venaxwe**.*

Li ser hemd û hêla xwe bûn

Di hêla tenduristiyê de rewş baş bûn. **Erê, temenê Apê Hecî Şakir ji heftêyî jî derbas bû, lê maşelah hê jî **li ser hemd û hêla xwe ye**.*

Li ser hemdê xwe man

Li ser xwe bûn, wekî berê man. **Bûkên wî welatî xwe winda kirine, lê bûka Hacerê* ***li ser hemdê xwe maye****.*

Li ser hencekî man

bnr. Li ser rehekî man

Li ser herqeke zuha bi hev ketin

Li cihekî tune û bê sedem pev çûn. **Ne ji bo tiştekî ye heyran, hema* ***li ser herqeke zuha bi hev ketine****.*

Bi ser hisehisan ketin (Bi ser hisehisan ve bûn)

Ji rewşê agahdar bûn. **Piştî çar mehan ew jî* ***bi ser hisehisan ketin*** *ku pezê wan kê diziye.*

Li ser hev kirin lod

Pirsgirêk zêde kirin. Mezin kirin. **Zana vatiniyên dersan çênekirine,* ***li ser hev kirine lod****. Niha jî nikare ji hinî derkeve.*

Li ser hev man

Ji du malbatên ku bi tevayî di malekê de dimînin re tê gotin. **Ew ji salekê zêdetir* ***li ser hev man****, lê dû re bi rûyekî spî ji hev û din veqetîn.*

Li ser hêkan meşîn

Ji bo kesên sist û hêdî hereket dikin û dimeşin tê gotin. **Teresî tu dibêjî* ***li ser hêkan dimeşe****, wisa xwe hêdî dimilmilîne.*

Li ser hişê xwe bûn

Aqil li serî bûn, hay ji xwe hebûn. **Dema ku helaliya xwe jê xwest, hê* ***li ser hişê xwe bû****.*

Li ser hurmeta xwe sekinîn

Rûmeta xwe kêm nekirin. **Min gelekî hurmeta wî digirt, lê mixabin ew bi xwe* ***li ser hurmeta xwe nesekinî****.*

Li ser keda (yekî) rûniştin

Bê ked û bê zehmet, berhemê keda yekî din ji bo berjewendiyên xwe bikaranîn. **Min ew qas sal xwîna xwe ji bo wê meseleyê xwar; lê Evdirehman hat,* ***li ser keda min rûnişt****.*

Li ser ... ketin hev

Lê ecêb man, li hember tiştekî balkêş şaşwazî man. *****Li ser daweta Mala Cîndiyê Serdar hemû bajar kete hev****.*

Li ser (yekî) kûçelanî kirin

Li ser kesekî gelek mirov kom bûn û bi ser de çûn. **Ma ev çi kafiristanî ye?* ***Li ser yekî xerîb ew qas kuçelanî tê kirin?***

Li ser kulavê aştiyê rûniştin

Doza sulh û aştiyê kirin. **Em hatine* ***li ser kulavê aştiyê rûniştine****, hûn qala çi dikin?*

Li ser kulavê (yekî) rûniştin
Ji kesekî tiştek rica kirin. (Bi taybetî ji malekî qîz xwestin.) **Ew ku hatin,* ***li ser kulavê mala Hecî Xalid rûniştin****, zû bi zû destvala nazivirin.*

Li ser ... kûr û dûr sekinîn
Der barê de nirxandinên kûr pêk anîn. Dahûrandin. **Ez çiqasî li* ***ser vê mijarê kûr û dûr sekînîm*** *jî, lê mixabin min tam bersiva wê ya zanyarî nedît.*

Li ser lingê xwe sekinîn
Çareya serê xwe dîtin. Li ber xwe dan. **Ew qas tiştên xerab hatin serê Şêxmûs, helal be wa ye dîsa jî* ***li ser lingê xwe sekiniye****.*

Li ser lingekî lîstin
1. Pir çalak bûn. **2.** Di nav dijwarî û xeternakiyê de bûn. **Maşelah lawê Kemal* ***li ser lingekî dilîze****. *Îro Zerda Xalis Begê* ***li ser lingekî dilîze****, ka dawî çawa be.*

Li ser mala heqiyê bûn
bnr: Hevalê rastiyê bûn

Li ser ... man
1. Demeke dirêj li benda kesekî man. **2.** Li kesekî yan jî li tiştekî miqate bûn, xwedî derketin. **Ya Xwedatî ew lawik gelek salan* ***li ser wê keçikê ma****. *Heke wê şevê bijîşk* ***li ser lawikê min nemaya****, dibû ku derneketa sibehê.*

Li ser ... mêr hatin kuştin
Ji bo pirsgirêkên gelekî mezin û giran tê bikaranîn. **Ne tiştekî wisa piçûk e,* ***li ser wê meseleyê mêr têne kuştin****.*

Li ser nenûka xwe dan reqisandin
Wekî daxwaza xwe araste kirin. ** Hay lolo hay lolo! Ew çi şeytan e, welehî ewê wî xalê te li ser nenûka xwe bireqisîne.

Li ser perên esmanan gerîn
Xwe zehf zêde hesibandin. **Camêrî li vê dinyayê jî, li ser* ***perên esmanan digere****.*

Li ser pêşa pêxember zinê kirin
bnr: Li ser doşega pêxember bi diya xwe re zinê kirin

Li ser pişta hespê sor û zer nekirin
Ji bo keçên berzewac tê gotin. **"Înşelah Binevş, tu* ***li ser pişta hespê sor û zer nekî****!.."*
Qahir Bateyî

Li ser pişta hev siwar bûn (Li ser hev siwar bûn)
Gelekî qelebalix bûn. **Di newroza par de li Farqînê gel* ***li ser pişta hev swar bûbû****.*

Li ser pişta xwe gerandin
1. Rûmet dayîn. **2.** Derd û zehmeta yekî kişandin. **Laleş wî* ***li ser pişta xwe bigerîne****,*

*dilê wî rehet nabe. *Mûsa bi salan ew jina xwe weke mirarekî **li ser pişta xwe gerand**.*

Li ser piştê li erdê xistin
Têk birin. Xistin rewşek xerab. **Emîneyê derdê wî gelek kişand, lê nihêrî ku nebû, wê jî ew **li ser piştê li erdê xist**.*

Li ser piştê ketin
Têk çûn. **Wê gelekî li ber xwe da, lê di dawiyê de **li ser piştê ket**.*

Li ser piştê razan
Teralî kirin. **Heya êvarê **li ser piştê radizê**, dû re jî dibêje min azmûn qezenc nekir.*

Li ser piyan man
Li ber xwe dan. Ligel gelek neyîniyan jiyana xwe berdewam kirin. **Her kesî digot, êdî xêra wî nema, lê mêrikî dîsa jî **li ser piyan ma**.*

Li ser piyan razan
Sist û qels bûn. **Birazî tu dê çawa qîza xwe bidî wî? Tu nizanî ew **li ser piyan radizê**.*

Li ser qeys û qiyasekê neman
Di gotin û kirinên xwe de îstikrar û hevkêşiyeke baş pêk neanîn. **Tu bi wî bawer nebe, ew **li ser qeys û qiyasekê nasekine**.*

Li ser qula kurmoriyan bûn
Pir çalak bûn, di cihê xwe de nesekinîn. **Tu dibêjî, tu **li ser qula kurmoriyan rûniştiyî**; tu di cihê xwe de deqeyekê nasekinî.*

Li ser qûna xwe rûniştin
1. Karek nekirin. **2.** Ketin rewşek pozîde bê çare û têkçûyî. **Nado heya êvarê **li ser qûna xwe rûdinê** û dû re jî tê ji bavê xwe pereyan dixwaze. **Zelîxanê bersivek tûj girt, dû re çû **li ser qûna xwe rûnişt**.* (argo)

Li ser ... rawestîn
Bi kesekî yan jî tiştekî re mijûl bûn. Girîng girtin. **"Kovareke wiha ne cihê tiştên rojane ye, mîna rojnameyan; her wiha ne pirtûkek e jî ku ji serî heya binî **li ser mijarekê raweste**."* Selman Dilovan

Li ser re tu gul neçilpandin
Ji bilî wê tu kesên din hez nekirin. ** Nermîna min a xweşik tu bawer bike, tu gulan li ser te re naçilpînim.

Li ser rehekî man
Gelekî jar bûn. **Belengaza Rojbînê ketiye rewşeke wisa ku **li ser rehekî maye**.*

Li ser rê bûn
Ji çûyînê re amade bûn. **Em **li ser rê ne**, ji we tewaqe dikim, zêde me bi derengî nexin.*

Li ser riya Helebê li nalê deveyan pirsîn
Daxwaz û gotinên ne guncan kirin. **Xwarzî tu jî hema vê gavê,* ***li ser riya Helebê, li nalên deveyan dipirsî****.*

Li ser rûniştin
Dest danîn ser tiştekî. Bi awayekî bêyî dilê xwedî tiştek ji xwe re hildan. **Ji bo carekê wî ew xortima baxçeyê me bir, lê* ***li ser rûniştû*** *carek din neda.* (argo)

Li ser serê (yekî) hatin hev
Li ser civîn, li dorê kom bûn. **Ew hemû jin* ***li ser serê wî mêrikê tolaz hatin hev*** *û dan ber pehînan.*

Li ser serê xwe lîstin
Ji ber êşê gelekî aciz bûn. **Bedran ji dest êşa diran,* ***li ser serê xwe dilîst****.*

Li ser serê (yekî) sekinîn
Yek kontrol kirin. **Ew bedcure di fabrîqeyê de heya êvarê* ***li ser serê min disekine****.*

Li ser serê xwe qebûl kirin
Ji dil ecibandin. **Ez wê keçikê, ez* ***li ser serê xwe qebûl dikim****.*

Li ser serê xwe û heftê û heft bavê xwe qebûl kirin
Ji dil û can pejirandin. **Em kirîvatiya we* ***li ser serê xwe û heftê û heft bavê xwe qebûl dikin****.*

Li ser serê xwe top kirin
Li nik xwe civandin. **Min ji te re got, lawo van zarokan* ***li ser serê xwe top neke****.*

Li ser sergoyan kilijîn (gerîn)
bnr: Li ser dirûngeyên xelkê kilijîn

Li ser sêla sor rûniştin
Di nav rewşeke zor de bûn. **Qet qala rewşa Yezdan nekin, Xwedê alîkariya wî bike; ew îro* ***li ser sêla sor rûniştiye****.*

Li ser serî darda bûn
1. Gelekî eziyet dîtin. **2.** Gelekî lavayî kirin. **Belengazê Sedo li ber wî derî ew qas sal* ***li ser serî darda bû****, lê di dawiyê de hate qewirandin. *Gulan* ***li ser serî darda bû****, dîsa jî min bi ya wê nekir.*

Li ser serî li erdê xistin
Xistin rewşeke xerab. **Ew tim li pey eraqê çû, wê jî ew* ***li ser serî li erdê xist****.*

Li ser serê (yekî) kafristanî kirin
Zilm û eziyet li kesekî kirin. **Çima em carekê hewcedarî wan bûn, Xwedê dizane wan* ***li ser serê me kafristanî kirin****.*

Li ser serê (yekî) teperep kirin

Aciz kirin. *Ew ên ku li ser me rûdinên, heya nîvê şevê **li ser serê me teperep dikin**.

Li ser serê xwe qebûl kirin
bnr: Li ser serê xwe û heftê û heft bavê xwe qebûl kirin

Li ser serî ketin
Rewş pir xeter bûn. **Kê hêvî dikir ku Zubêyt wê wisa **li ser serî bikeve**?*

Li ser ... serwext bûn
Çav li ser bûn. **Ez çiqasî **li ser mala wan serwext bûm**, lê dîsa jî nîvê şevê diz ketinê.*

Li ser siya piştê raketin
bnr: Xwe avêtin ser siya piştê

Li ser soza xwe sekinîn
bnr: Li soza xwe xwedî derketin

Li ser sûretê xêrê
Dawî bi awayekî erênî bûn. **"Vedigerime dewsa nalên hespên wan, tenê toz û dûman dimîne ji min re...'**Li ser sûretê xêrê kekê** Seyîd çi bi we bû?' dibêjê tifala sekreter."*
Musa Vazgali

Li ser teriya xwe rûniştin
bnr: Li ser dûvê xwe rûniştin

Li ser teşt û beroşan gerîn
bnr: Li ser sergoyan kilijîn

Li ser tiliya xwe zîzikandin
bnr: Li ser tiliya xwe dan reqisandin.

Li ser tiliyan bi rê ve çûn
Xwe qure kirin. Xwe zêde hesibandin. **Mêrikî nizanim xwe çi hesab dike, lê hema **li ser tiliyan bi rê ve diçe**.*

Li ser (yekî) tirixî bûn
Ji bo kesekî ketin nav helwestên eletewş. **Azad **li ser keçikê tirikî bûye**, nizane çawa bike.* (argo)

Li ser tu dînî nebûn
Bawerî nedan, rewş zelal nebûn. **Selîm **li ser tu dînî nîn e** ku mirov pê bizanibe çi ye an jî çi nîn e.*

Li ser û guhên xwe nêrîn
bnr: Ser û sîçên xwe rast kirin

Li ser û sîçên xwe nihêrîn
bnr: Ser û sîçên xwe rast kirin

Li ser xwe bûn
Jîr bûn. Bihêz, qoçax, çak û desthilatdar bûn. **Na na, ev ne wekî wî gêj e, ev tam mirovekî serwext û* ***li ser xwe ye****.*

Li ser xwe sax kirin
Ji ber ziyandayîneke piçûk, mesrefeke giran an jî ne durist ji yekî derxistin. **Wan jî ew erebeya teqeze* ***li ser min sax kirin****.*

Li ser xwe sekinîn
bnr: Li ser xwe bûn

Li ser xwe serwext bûn
Li ser xwe baldar bûn. **Pîrika min ji meta min re digot: "Tu jinebî yî, divê tu gelekî* ***li ser xwe serwext bî****."*

Li ser zar û zimanan bûn
Her kesî qal kirin. Tim mijara gotgotan bûn. **Piştî wê bûyerê li her derê ew* ***li ser zar û zimanan in****.*

Li ser zarokên xwe rûniştin
Ji bo jinên ku bî dimînin û naçin mêr tê gotin. **Piştî ku mêrê wê di şerê azadiyê de şehîd ket, ew* ***li ser zarokên xwe rûnişt****, neçû mêr.*

Li ser zêran razan
Pir dewlemend bûn. **Malavawo ew wisan e ku* ***li ser zêran radizê****, lê nikare bixwe.*

Li serê çiyayan mezin bûn
Nezan û cahil bûn. **Wisa hereketinên hov dike ku, tu dibêjî* ***li serê çiyayan mezin bûye****.*

Li serê neêşandî bend alandin (girê dan)
Li cihê tune û bê sedem karê xwe zêde û giran kirin. **Bêje, kero çi pêdiviya te hebû, te çû* ***li serê xwe yê neêşandî bendek girê da****?*

Li serê (yekî) ketin
Piştî hinek ziyan û ceribandinan, rewş fêm kirin. Taqî (tecrube) girtin. **Bi gotinan nedibû. Heya ew derbe nexwara, zû bi zû* ***li serê wî nediket****.*

Li siya (yekî) nenihêrîn
Rûmet û hêjahî nedan kesekî. **"Lê qîza kerê rû nade min. Tew* ***li siya min jî nanêre****."*
Rojen Barnas

Li soza xwe xwedî derketin
Soza xwe ya ku dayî pêk anîn. **Her kes ji wî bawer dike, ji ber ku ew tim* ***li soza xwe xwedî derdikeve****.*

Li stûyê (yekî) bar kirin
1. Bêyî dilê kesekî vatinî û karek pê dan pejirandin. **2.** Sûcekî ku nekirî, xistin stûyê yekî.

*Hema bi hev re ew vatinî jî **li stûyê min bar kirin**. *Xwedayê min heq şahad e, min ew pere dahûn, lê hema bi zorê dîsa wî bêbavî **li stûyê min bar kir**.*

Li stûyê hev siwar kirin (Li hev siwar kirin)
Bê serî û bê ber ketin nav tiştekî * *"Kulik kete navê, lê xist, gişk **li stûyê hev siwar kirin**."* Ahmet Aras

Li stûyê (yekî) heq kirin
bnr: Li stû (yekî) bar kirin

Li stûyê (yekî) siwar bûn
1. Yek xistin bin bandora xwe. **2.** Bi saya kesekî bê ked û beleş jiyîn. *Ev ji kingê ve ye Rehmanî **li stûyê wî siwar bûye** û wî wekî daxwaza xwe diajo. *Ma wê heta hetayê **li stûyê bavê xwe siwar be**.*

Li şekir hat, li şebê hesilî.
bnr: Li xatûnan hat li qewraşan hesilî.

Li şîrê xwe man
Bi hêviya bext û wîjdana yekî man. *Êdî tiştekî ku ez bikim nîn e, ew **maye li şîrê xwe**.*

Li şûna (dewsa) meriv û însanan danîn
bnr. Danîn dewsa meriv û însanan

Li şûna mirî, her kes li xwe girî.
Her kes bi derdê xwe gazin bûn. Her kes ketin heyra xwe. *Ew jî ji wan re bû hincet. ***Li şûna mirî, her kes li xwe girî.***

Li şûna şêran, dixwînin kundên dêran (şikêran)
Kesên xerab şûna baş, xurt û qencan girtin. *Vî şerî li me mêrên hêja nehiştin. ***Li şûna şêran, dixwînin kundên dêran.***

Li şûna şêran, rovî dikin gêran.
bnr: Li şûna şêran, dixwînin kundên dêran.

Li şûna (yekî) şerm kirin
Ji bo helwesta yekî ya şermî aciz bûn. *Min ew kirinên wî dîtin, ***li şûna wî min şermı kir**.*

Li taxa koran, mirek firotin
Karê berevajî û ne di cih de kirin. *Ya ku ew dike **li taxa koran mirek firotin** e.*

Li te rik, li min rik, nanê binê agir bû qirik.
Heke ku her du serî jî bikevin rikê, di dawiyê de ziyanek der tê. *Mêr û jin ku bikevin rikê dê wisa be. ***Li te rik, li min rik, nanê binê agir bû qirik.***

Li te xweş tê, li min beş tê.
Li te xweş tê, lê li min na. *Divê mirov bi dualî bifikire. ***Li te xweş tê, lê li min beş tê.***

Li te xweş tê, li min xweş tê, ev çi ard e li teştê?!
Her tişt baş tê xuyan, lê ev çi pirsgirêk e? **Dîsa jî min tiştek ji vê rewşê fêm nekir.* ***Li te xweş tê, li min xweş tê, ev çi ard e li teştê?!***

Li tehêlê (teêlê) girtin
bnr: Li parxanan girtin

Li telê (yekî) ketin
Li zora yekî çûn, bi gotin an jî kirinekê moral xerab bû, dil mayîn. ** "Êdî peyvên wî* ***li telê min ketibû****. Min nema xwe girt û bi dengekî hêrsbûyî ez bi ser wî de peyivîm."* Yaqûb Tilermenî

Li tenekeyê xistin
Li dawî man. Di pêşbaziyê de bûn ê herî paşîn. **Maşelah, Şêxmûs di vê pêşbaziyê de* ***li tenekeyê xist****.*

Li têla (yekî) xistin
Wekî daxwaz û armanca yekî tevgerîn. Piştgiriya yekî kirin. **Heke Rizgo* ***li têla Serdar nexe****, ew nikare ew qasî bi pêş de here.*

Li urzê (yekî) ketin
Bi awayekî çors bi yekî re peyivîn, an jî bersivandin. **Xanim* ***li urzê Cemîlê ket*** *û ew da şermê.*

Li vê dinyayê cih û war lê teng bûn
Ketin rewşeke xeter û dijwar. **Xwedê neyîne serê tu kesî, Andok ketiye rewşeke wer ku* ***li vê dinyayê cih û war lê teng bûne****.*

Li vê dinyayê nejîn
bnr: Ji vê dinyayê nebûn

Li vir, li wir kilijîn
Li ber deriyan, li bermahiyan gerîn. **Ew bi wê qûnê nikare karekî wisa pêk bîne. Ya ku ew bi rehetî dike, tenê heya êvarê* ***li vir, li wir dikilije****.*

Li vir teq, li wir teq, heta çûne dinyaya heq.
Jiyan bi xebat û mijûlayê derbas dibe. **Em çawa bikin heyran?* ***Li vir teq, li wir teq, heta çûne dinyaya heq.***

Li vî alî behr e, li wî alî çal e.
bnr: Hevraz tû dikim simbêl e, berjêr tû dikim rih e.

Li vî welatî keviran girê didin û kûçikan ji berdidin.
Ji bo rewşa berevajî tê gotin. **Kuro ew qas jî nakokî nabe, bi rastî jî* ***li welatî keviran girê didin û kûçikan ji berdidin****.*

Li waran man

Bê xweyî û bê xwedan man. Ji heval û hogiran paşdetir ketin. **Ji ber ku mêr li mala me tune bûn, em* ***li waran man***.

Li wê dinyayê deyndarê îmanê bûn

Gunehkar bûn. **Bi xwe mela ye, lê Xwedê dizane, berî her kesî ew bi xwe* ***li wê dinyayê deyndarê îmanê ye***.

Li wê dinyayê em dê bibêjin îman, tu dê bibêjî eman.

bnr: Li wê dinyayê deyndarê îmanê bûn

Li wî çiyayî berf nabare.

Ji bo pêkhatinê hêvî tune bûn. **Erê, ew ji bo wî karî wisa dibêje, lê ya rastî ez qet bawer nakim ku* ***li wî çiyayî berf bibare***.

Li xatûnan hat, li qewraşah hesilî.

Bi hêviya tiştekî baş çûn, lê li rastî tiştekî nebaş hatin. **"Ya Memo, ew ê ku li şekir hat, li şebê hesilî ew tu yî, ew ê ku* ***li xatûnan hat, li qewraşan hesilî dîsa tu yî***." Celîlê Celîl-Ordîxanê Celîl

Li xwe bar kirin

Xistin stûyê xwe. Binbarî pejirandin. **Çiqas kirinên wan hebûn, Asmînê* ***li xwe bar kirin***.

Li xwe bihartin

Karek di demê de nekirin, dereng man. **Îro min nimêja nîvro* ***li xwe biharт***.

Li xwe danîn

Mikur hatin, kirin û gotinên xwe eşkere kirin. **Ji îşkenceyê bi şûn de Heso kirinên xwe* ***li xwe danîn***.

Li xwe dîtin

Heman tişt bi xwe jî jiyîn, di serî re derbas bûn. **Ew jî êdî wer nake, çimkî wî jî berê ew yek* ***li xwe dît***.

Li xwe fikirîn

Rewşa xwe di ber çav re derbas kirin. Wekî hatî serî nirxandin. **"Ca* ***li xwe bifikire***, *ku yek tiştek wiha bi me bike, em dê bibêjin Xwedê ji te razî be?"* Zana Farqînî

Li xwe girtin

Hildan ser xwe, binbarî pejirandin. **Weysî ew mesref hemû* ***li xwe girt***.

Li xwe heyirîn

Xwe şaş kirin, dest û pê li hev alîn. **Zana wisa* ***li xwe heyirîbû*** *ku nizanibû çawa bike.*

Li xwe kirin

Bi xwe anîn serê xwe. **Wê çi kiriye,* ***bi xwe kiriye***, *lûn çi jê dixwazin?*

Li xwe mehr kirin

Pê re zewicîn. **Bedir ew keçik mezin kir; dû re jî* ***li xwe mehr kir***.

Li xwe mukir hatin
Ya rastî îtiraf kirin. **Wî jî dizanibû ku tiştên xerab wê bên serê wî, loma **li xwe mukir hat**.*

Li xwe nenêrîn
1. Rewşa xwe ji çav derbas nekirin, a rasteqînî nedîtin. **2.** Ser û guhê xwe, bejn û bala xwe zêde girîng negirtin. **Hesen hema xelkê rexne dike, lê qet **li xwe jî nanêre**. *Keçik **li xwe nanêre**, naxwe bedew e.*

Li xwe qar girtin
Ji xwe re tiştekî wisa layîq nedîtin, wekî eyb nirxandin, nepejirandin. **Jixwe ew ê ku te wisa got wî **li xwe qar girt** û careke din nekir.*

Li xwe werqilîn
Hay ji hebûn, ketin derkê, ji xwe derxistin. **Çawa serma bi min digire, ez wê gavê **li xwe werdiqilim**.*

Li xwe xistin
Poşman bûn. **Dû re wî jî **li xwe xist**, lê mixabin gelekî dereng mabû.*

Li xwe zivirîn
Hişyar bûn, aqil hatin serî. **Heya ez **li xwe zivirîm**, min hew dît ku zarokên min ji dest min çûn jî.*

Li Xwedê dinêrin, hespan nal dikin.
Divê dad û însaf neyê avêtin. ****Li Xwedê dinêrin, hespan nal dikin.** Heyran ez qet tiştekî nabêjim, hema lûn bi wîjdana xwe.*

Li Xwedê xweş nehatin
Karên nebaş kirin. **Ya ku tu dikî, gere **li Xwedê jî xweş here**.*

Li xwînê gerîn
Li bela û şeteleyan gerîn. **"Kuro tu **li xwînê digerî** malkembax! Ez talûke me, çima beriya min bernadî?"* Eladdîn Secadî

Li zik xist, got: "Ax, pişta min !"
bnr: Got:"Ez zikê li te dixim, tu dibêjî, wey pişta min!" Got: "Wekî kesek li pişta min hebûya te nikaribû li zikê min bixista.".

Li zikê xwe nêrîn
Tenê li xwarin û vexwarina xwe fikirîn. **Ma tu nizanî Dilgeş tenê **li zikê xwe dinêre**?*

Li zimanê xwe pêçandin (alandin)
Tim qal kirin. **"Tirsa min ew e ku milet me **li zimanê xwe bipêçe** û em bibin serê qise û gotinan."* Adnan Alp

Li zora (yekî) çûn
Ji ber tiştekî xemgîn bûn, moral xera bûn. **Wisa kirina hezkiriya min **li zora min diçe**.*

Li zorê qirase kirin
Astengî derxistin. **Bi azîneya wî nabe, çimkî ew tim* ***li zorê qirase dike****.*

Li zozanan berf dibare, li beriyê dest û pê diqerisin.
Her tişt têkildarî hev e. **Tu kes ne bi serê xwe ye.* ***Li zozanan berf dibare, li beriyê dest û pê diqerisin.***

Liba garis di gewriyê de man
Bêqird û bêşans bûn. **Tu karekî wê baş naçe. Hema* ***liba garis jî di gewriyê de dimîne****.*

Lihêfa bênamûsiyê kişandin serê xwe
Bêxîret bûn. **Wî jixwe* ***lihêfa bênamûsiyê kişandiye serê xwe****, ji wî tiştekî mêranî hêvî meke.*

Lihêfa li ser çavê (yekî) birevînî, deng nake.
Ji bo kesên ımilayîm û sist tê bikaranîn. **Qet qala wî meke, tu* ***lihêfa li ser çavê wî birevînî deng nake****.*

Limlût bûn
1. Pir feqîr bûn. **Kuro ew yekî* ***limlût e****, tu dê çawa qîza xwe bidî wî?*

Ling avêtin ber tûman
Li hincetan gerîn. Bersiveke zelal nedan. **Kifş bû ku ligel hemû tiştî, wî* ***ling diavêt ber tûman****.*

Ling, bavê min ling!
Ji bo rêveçûn an jî revê, pêdivî û girîngiya lingan tîne zimên. **Tenê yek çareya wan mabû, Memê li lingê xwe nihêrî û got:* ***"Ling, bavê min ling!"*** *û baz da.*

Ling bi ling, çûn ber sing
Hêdî hêdî ber bi armanca xwe ve meşîn. **Wê her tişt hûr hûr hesab kiribû,* ***ling bi ling, diçû ber sing****.*

Ling cot kirin
bnr: Ling pîj kirin

Ling çûn, lê ew bi xwe neçûn
Ji bo karên ku bê dil tê kirin tê bikaranîn. **Erê ji bêgavî pejirand, lê Xwedê dizane* ***ling diçin lê ew bixwe naçe.***

Ling dayîn ser (yekî)
Ji bo tiştekî israr kirin, bi lezgînî xwestin. **Lawikê min ji bo wê solê* ***ling dabû ser min.***

Ling dayîn
Bi lez çûn derekê. **Wan nihêrî ku bi wî awayî nabe, hema* ***ling danê*** *û di navîna du rojan de xwe gihandine wê derê.*

Ling dayîn erdê

Inyat kirin. Serhişkî kirin. **Me kir û nekir, Fayzê û qîza wê* ***ling dane erdê*** *û li cihê xwe qet neleqîn.*

Ling di zenguyê de man
**Înşelah lingê wî di zenguyê de bimîne.* (nifir)

Ling jê de ketin
bnr. Ling jê de weşîn

Ling jê weşîn
Pir betilîn (zêdetir ji ber rêveçûnê). **Ew wisa li te geriya,* ***ling jê weşîn****.*

Ling ji binî çûn
bnr. Lingê (yekî) çerixîn

Ling ji bin şiqitîn
bnr. Lingê (yekî) çerixîn

Ling kutan ser (yekî) (Ling lê kutan)
Ecele kirin, ji bo pêkanîna tiştekî zor dayîn. **Mûsa ji bo kirîna gîtarekê* ***ling kutaye ser bavê xwe****.*

Ling lê hatin
bnr. Pêpar lê hatin

Ling lê hildan
Li hemberî kesekî serî hildan. **Hêwiya piçûk çendekî dengê xwe nekir, lê dû re* ***ling li ya mezin hilda*** *û berdayê.*

Ling li ba kirin
bnr. Lingê xwe pîj kirin

Ling li hewa li ba bûn
bnr. Lingên (yekî) ji erdê qetîn

Ling nehatin ber
1. Zêde gerîn. **2.** Zêde xebitîn. **Mêrikî jineke wî heye, heya êvarê* ***ling nayê ber****, ew bi xwe jî rûyê jina xwe nabîne. *Rebenê Smayîl heya êvarê* ***ling nayê ber****.*

Ling qulozî hewa bûn
bnr. Lingên (yekî) ji erdê qetîn

Lingek zû
Demek hê zûtir pêk hatin. **"Ez jî dixwazim ku lûn min* ***lingek zû*** *bikujin û ez ji vê ezebê xelas bibim."* Lokman Polat

Lingekî (yekî) li vê dinê, yek li wê dinê bûn

Pir temen dirêj bûn an jî kûr nexweş bûn. ***Lingekî Hesenê Nêrgizê li vê dinê, yek li wê dinê ye**, çawa ya rast nebêje?*

Lingê (yekî) cih girtin
Di derekê de edilîn. Karê xwe derxistin radeya qewîniyê. ***"Lingê Roma Reş dîsa cihê xwe girt."** Rizaliyê Reşît

Lingê (yekî) çerixîn
Rewş xera bûn. Kar baş neçûn. *Karê Hesen pir baş dimeşî, lê dû re **lingê wî çerixî** û li ser serî ket.*

Lingê (yekî) di gelek feqan de kotin
Gelek bûyer di serî re derbas bûn. Kone bûn. *Qermîçokên wê ne yê van salan in. **Lingê wê di gelek feqan de hatiye kotin**.*

Lingê dîk di nav tasê de tîtin
Niyeta nebaş bi çavên xwe dîtin. *Hûn çi dibêjin heyran, ez jî ji we re dibêjim, min **lingê dîk di tasê de dîtiye**.*

Lingê (yekî) erd girtin
Karê xwe qewîn kirin. *Helbet wê wisa bibêje, teze **lingê wî erd girtiye**.*

Lingê (yêkî) likumîn
bnr. Lingê (yekî) çerixîn

Lingê qijikê şikandin
Karê ku nekirî bi zor be jî pêk anîn. *Oro, çawa bû, te **lingê qijikê şikand** û tu hatî van deran?*

Lingê (yekî) şemitandin
Li serê yekî fend û fûnd kirin. *Zerîfeyê rast kir, çep kir, di dawiyê de **lingê Cemîlê şemitand**.*

Lingê şeytên şikandin
Dı derbarekê de cara yekem a ku daxwaz kirî pêk anîn. *Wa ye şikir Melîkcanê jî **lingê şeytên şikand**, çû ser kuafêr û porê xwe kin da birîn.*

Lingê xwe bi hindaze avêtin
Bi tedbîr tevgerîn. *Ew mirovekî wisan e, her dem **lingê xwe bi hindaze diavêje**.*

Lingê xwe bi lingê (yekî) xistin
Bi yekî re ketin pêşbaziyê. Bi yekî re xwe hilxistin û daxistin. *Hem zora wî nagihîjiyê, hem jî tim **lingê xwe bi lingê wî dixe**.*

Lingê xwe danîn dewsa lingê (yekî)
Zehf şibandin yekî. *Hema eynî ew e, ev lingê xwe hildaye, ev **lingê xwe daniye dewsa lingê wê**.*

Lingê xwe dayîn ber zikê xwe
Li ber birçîbûnê li ber xwe dan. **Jinikê û zarokan heya êvarê* ***lingê xwe didane ber zikê xwe****, heya mêrik dihate mal.*

Lingê xwe di defikan de xwarin
Di serî de gelek dek û dolab derbas bûn. **Tu wisa bi çavekî piçûk li wî mêze neke. Wî* ***lingê xwe di gelek defikan de xwariye****.*

Lingê xwe edilandin
Ji bo mayînê li derekê cihekî qewîm bi dest xistin. **Wê ancax ku* ***lingê xwe edilandiye****, êdî kes nikare wê ji cihê wê bileqîne.*

Lingê xwe lê xistin
Zêdetir ji bo nepejirandina derfetên qenc tê bikaranîn. **Ew qas nesîbên baş jî derketin, lê wê keçikê* ***lingê xwe li giştî xist****.*

Lingê xwe li erdê xistin
Astengî derxistin. Inyad kirin. Hêrs bûn. **Dîsa Osê* ***lingê xwe li erdê xist****, welehî kurê Xwedê jî bê, ew ji gotina xwe venagere.*

Lingê xwe li guhê xwe xistin
bnr. Pê li guhên xwe kirin

Lingê xwe li kodika xwe xistin
Bi xwe nesîbê xwe birîn. Bi xwe karê xwe xera kirin. **Mixabin, wî bi xwe* ***lingê xwe li kodika xwe xist****.*

Lingê xwe li nanê xwe xistin
bnr. Lingê xwe li kodika xwe xistin

Lingê xwe zêde ranedan
Lingê xwe zêde dirêj nekirin. Hedê xwe zanîn. **Wê jî dizanibû, bê ka rewş çawa ye, loma* ***lingê xwe zêde raneda****.*

Lingên (yekî) di zik de bûn
Xayîn, xinis û pînî bûn. **Tu car bi wî bawer nebe.* ***Lingên wî di zik de ne****.*

Lingên (yekî) erd negirtin
Pir şad bûn. **"Van rojên dawî ez pir kêfxweş im û naxwazim tu karî bikim.* ***Lingên min erdê nagirin.***" Samî Berbang

Lingên (yekî) ji erdê qetîn
Ji rasteqîniyê dûr ketin. **Ciwan wisan in ezbenî, di vê demê de* ***lingên wan ji erdê diqetin****. Divê em hisebir û baldar bin.*

Lingên (yekî) kirê xwestin
Xwe zehf li naziyê xistin. **Ma* ***lingên te kirê dixwazin****, tu rojekê jî deriyê me vekî?*

Lingên (yekî) kirin qeydê
Ji kesekî re asteng bûn. **Wê sêwiyê **lingên Xemgîn kiribûn qeydê**, nikaribû di cihekî de biçûya.*

Lingên (yekî) li hewa ketin
Ji rasteqîniyê dûr ketin. **Piştî têkiliya wî û Hizbilahê **lingên Yargulê li hewa ketin** û ji her ku em nimêj nakin, bi me re têkiliya xwe birî.*

Lingên (yekî) li keviran neketin
Li rastî qeza û belayê nehatin. **Lawo, ji Xwedê dixwazim, **lingên te li keviran nekevin**.* (dia)

Lingên (yekî) paç kirin
Lavayî kirin. **Wî **lingên jinikê paç kirin**, lê dîsa jî nerm nebû.*

Lingên (yekî) pê re neçûn
Bêyî dilê xwe çûn derekê. **Erê, ew diçû lê **lingên wî pê re nediçûn**.*

Lingên xwe avêtin ser hev
Pir rehet û bêxem bûn. **Ji wî re çi ? Ew hema **lingên xwe diavêje ser hev** û ferman dide.*

Lingên xwe bin xwe ve nekirin
Ji yê ku pir digerin an jî gelekî diwestin re tê gotin. **Bawer bike min îro heya êvarê **lingên xwe bin xwe ve nekirine**.*

Lingên xwe hene kirin
Dev jê berdan. Têkiliya xwe jê birîn. **Keçê te çi ji me bihîstiye ku te **lingên xwe hene kiriye** û tu qet nayê mala me?*

Lingên xwe hildan
Baz dan, revîn. **Mazlûm mêze kir ku rewş xeter e, **lingên xwe hildan** û ji holê winda bû.*

Lingên xwe jê birîn
Dev ji cihekî yan jî ji karekî berdan. **Qet meraqan neke, ev demeke dirêj e, ku min **lingên xwe ji wir biriye**.*

Lingên xwe jê qut kirin
bnr. Lingên xwe jê birîn

Lingên xwe ji berika xwe zêdetir dirêj kirin
Hesabê xwe nezanîn. **Heke ew mirovekî bêaqil nebûya, **lingên xwe ji berika xwe zêdetir dirêj nedikirin**.*

Lingên xwe li ser hev û din re avêtin
bnr. Lingên xwe avêtin ser hev

Lingên xwe pîj kirin
Mirin. **Wî gelek keda belengazan xwar, lê di dawiyê de wî jî **lingên xwe pîj kirin**.* (argo)

Lingên xwe şil kirin

Bedel dan, fedakarî kirin. **Heya **lingê xwe şil nekî**, pêk nayê.*

Lingên xwe top kirin

Ji ber rêz hurmetê yan jî ji bandoreke din vekişîn, xwe dan hev. **Dema ku kalikê wî ket hundir, Xelîl **lingên xwe top kirin**.*

Lingên xwe zêde dirêj kirin

Ji hêz û mafê xwe zêdetir re mijûl bûn. **Her tişt ûsilek û radeyeke wê heye, ji te tika dikim, **lingên xwe zêde dirêj neke**.*

Lipat pê neketin

Gelekî betilîn. **Xêredîn wisa bûye ku, êdî **lipat pê nakeve**.*

Lîstina pisîkê ye, mirina mişkê ye.

Erêniya ji neyaran yekî ji bo yên hember neyînî ye. **Lê divê tu li yê din jî bifikirî. **Lîstina pisîkê ye, mirina mişkê ye.***

Lolo çûye, lêlê maye.

Hê gelek li pey heye. **Ka tu li ku yî? **Lolo çûye, hê lêlê maye.***

Lolo lolo, ji min re jî lolo.

Jixwe yê ku di bingehê de ye ez im, ji her kesî re erê, ma ji min re jî? **Erê, min fêm kir, **lolo lolo, lê ji min re jî lolo**?* (bnr. çîrok)

Lomekaro, gunehkaro

1. Divê mirov zû bi zû loma bi kesî neke, dibe ku heman tişt bê serê me jî. **2.** Yên ku loma

---

"Lolo lolo, ji min re jî lolo."

Yekî serserî û tolaz, tim tî û birçî li kuçeyan digere. Mirovekî kone û mixelît gunehê wî lê tê, bang dikê û jê re dibêje:
"Bi vî awayî nabe, tu heya êvaran tî û birçî li van deran digerî. Ka ez ê ji te re azîneyekê bibêjim, tu ku pêk hînî, bawer bike hema qet nebe zikê te wê têr bibe." Yê tolaz, dibêje:
"Tu gencîyeke wisa hînî min bikî wê pir baş be, ez ê tim minetdarê te bim." Yê kone dibêje:
"Tu bi ya min bikî, hinekî jî xwe li dînîtiyê dayne, şivekê jî bide destê xwe, hema kî rastî te hat, şiva xwe rake û bi ser wan de bihejîne, xwe biçirikîne û bibêje, 'lolo, lolo, lolo!..' û ji wan pereyan bixwaze. Ji tirsan an jî ji rezîliya te, sê qurişan nedin jî dê yekê bidin. Tu dê jî bi vî awayî debara xwe bikî." Yê tolaz, bi wê azîneyê, bi taybetî ji bi şev pêşiya mirovan digire, *"lolo lolo!"* dibêje û pereyan ji wan dixwaze. Êdî bi wî awayî debara xwe baş dike. Lê piştî demeke dirêj mirovê kone, yê ku ew azîne hînî wî kiriye, bi şev di rê de diçe, ji nişkan ve yê tolaz derdikeve pêşiya wî, şiva xwe bi ser de dihejîne û dibêje:
"Lolo lolo!.. Ka pereyê cixareyekê, lolo! Lolo! Lolo!" Yê kone mêze dike, ew tolazê ku wî ew azîne hîn kiriye xwe di ser wî de diçirikîne. Him dikene, him jî hêrs dibe û bi ser de diqîre:
"Lolo lolo, ji min re jî lolo, lolo?"

*Di guhertokek din de jî wer tê gotin:

Deynê mirovekî ji selefxurekî (tefecî) re hebûye. Ji ber ku faîz jî zêdebûye nikare di demê de deynê xwe bide. Selefxur wî dide dadgehê. Xwediyê deyn diçe ji parêzerekî re derdê xwe dibêje. Ew jî dibêje ez ê te biparêzim, lê divê tu qet nepeyîvî. Ez ê bibêjim ew lal e, bêziman e û çi hebe ez ê bibêjim. Dadger ji te re çi bibêje tenê tu bibêje, *"lolo lolo!"* tu ku yek peyvê bibêjî, her tişt dê xera bibe. Roja dadgehê dadger çi ji deyndar dipirse, ew tenê dibêje, *"lolo lolo!"* û hew. Parêzer jî parêznameya xwe baş amade dike û wî ji deyn rizgar dike. Sibetirê parêzer heqê parêzîna xwe jê dixwaze, lê mêrik hîn bûye; ji wî re jî dibêje:

"Lolo lolo!" Parêzer vê carê ji eyarê xwe derdikeve û dibêje:
"Lolo lolo, ji min re jî lolo, lolo?"

dikin bi xwe jî parçeyekî pirsgirêkê ne. ***Lomekaro, gunehkaro!** Eman loma li wan meke, dibe ku bê serê me jî porkurê. ***Lomekaro, gumehkaro!** Tu wisa lomeyên wî menêre, tu zanî wî çi tiştên ecêb pêk anîne?*

Loqo û doqo

Ji bo jin û mêrên ku tenê bi serê xwe mane tê bikaranîn. **Em mane bi serê xwe, hema **loqo û doqo**!*

Lorelor kirin

1. Li ser zarokan kilam gotin. **2.** Xwe bi xwe re porteport kirin, bi xemgînî birebir kirin. **Heta wê bi xwe bi ser qundaxa xwe de **lorelor nekira** ranediza. **Hingî lawê wê bûbû gerîla, dayîka Leylo tim ji xwe re **lorelor dikir**.*

Lorikê dikim ji te re, koma kulan tînim ji xwe re.

Ji bo te xêrê, ji bo xwe xirabiyê dikim. **Ez jixwe gêj im. **Lorikê dikim ji te re, koma kulan tînim ji xwe re.***

Lorikê dixwe, virikê dide hevalan.

Ji bo kesên ku tenê berjewendiyên xwe derdixin pêş tê bikaranîn. **Ew ne mirovekî wisa paqij e. **Lorikê dixwe, virikê dide hevalan.***

Lotik avêtin

bnr. Çirtik avêtin

Lotîtî kirin

Serserîtî û tolazî kirin. **Ku Îbo **lotîtiyan dike**, mirov carinan pê rehet jî dibe.*

Lûpelûp kirin

Bi awayekî ne asahî, lê delîdûmanî hereket kirin. **Ev bûka min hema **lûpelûp dike**, lê ez tiştekî ji karên wê fêm nakim.*

M

Ma bavê te bilûrvan e, yan kalikê te?!
Tiştên ku tu nizanî û ne beled î, çima têkildar dibî? **Ew tiştê ku tu jê serederî nakî, çi karê te pê ketiye?* ***Ma bavê te bilûrvan e yan kalikê te?!*** (bnr. çîrok)

Ma çemê Çeqçeqê ye?!
Ma ew qas zêde ye. **Tu hema dixwazî,* ***ma ev çemê Çeqçeqê ye? !***

Ma dar tehl e, berê darê şîrîn e?!
Hemû jî wekî hev in û ji eynî kokê ne. (Zêdetir ji bo ewled an jî exrebeyên nêzîk tê gotin.) ****Ma dar tehl e, berê darê şîrîn e?!*** *Tu ji min re tiştên xweş lê ji xwarziya min re nifiran dikî, ez vê qebûl nakim.*

Ma di nav çiyayan de derziya diya min winda bûye?!
Ma karekî pir zor e? **Ew qasî mezin nekin lê,* ***ma di nav çiyan de derziya diya min winda bûye****?!*

Ma dîn bi çolan ketine?!
Rewş ew qas jî ne xerab e. **We jî dinya xera kir.* ***Ma dîn bi çolan ketine?!***

Ma ev gûyê henekan e?!
Hûn dibînin ku rewş zehf cidî ye. **Tu dixwazî înkar bikî, lê* ***ma ev gûyê henekan e****?!*

Ma ez keziyên xwe şeh dikim?!
Ma ez vala sekinîme? **Te çi bi ser min de girtiye?* ***Ma ez keziyên xwe şeh dikim?!***

Ma ga dike, ga dixwe?!
Ev dinyayeke bêdenge û bêdad e, her tişt bi dadiyane pêk nayê. **Tu çawa hesab dikî hevalo?* ***Ma ga dike, ga dixwe?!***

"Ma bavê te bilûrvan e, yan kalikê te?!"
Rovî dîsa ji bo dek û dolaban ji bizinê re li bilûrê dixe, lê di vê navberê de gelek bela û qotik têne sêrê wî. Di dawiyê de xwe zor rizgar dike û dibêje:
"Ma bavê te bilûrvan bû yan kalikê te?" Ango çi karê te bi van pîşeyên ku tu nizanî ketiye?

Ma gundê Elo Celo ye?!
Ma ev der bêxwedî û beredayî ye? **Ew me çi dihesibînin lo?* ***Ma ev der gundê Elo Celo ye?!***

Ma hespê te li bajêr ji xanê reviyaye?
Çima wiha kûr kûr difikirî? **Ezbenî, çi bi te qewimiye?* ***Ma hespê te li bajêr ji xanê reviyaye?***

Ma kaniya Memlaskê ye?!
bnr. Ma çemê Çeqçeqê ye?!

Ma mala hêhê ye ku her roj bê?!
Her dem erênî wer pêk nayên. *****Ma mala hêhê ye ku her roj bê?!*** *Carekê wisa çêbû, lê her dem nabe.*

Ma me seyê xwe şandiye pey?!
bnr. Ma me destmala sor şandibû pey?!

Ma morîkên diya (yekî) li wir qetiyane?!
Ma çi têkiliya wê heye? *****Çi karê wî li wir heye?*** ***Ma morîkên diya wî li wir qetiyane?!***

Ma ne xwîn e, ha ji dest, ha ji zend?!
Mirov ku kete nava pirsgirêk û belayê, bi çi rengî dibe, bila bibe zêde ferq nake. **Êdî em ketine nava vê rêxê.* ***Ma ne xwîn e, ha ji dest, ha ji zend?!***

Ma paniya diya min pê xwîn bûye?!
Ma exrebeyê me ye? **Ji min ew qas!* ***Ma paniya diya min pê xwîn bûye?!***

Ma pezê me yê tev hev, nayê veqetandin?!
Pirsgirêkeke wer mezin nîn e. **Keko, we jî zelîf mezin kir.* ***Ma pezê me yê tev hev, nayê veqetandin?!***

Ma qey tu ji xatûnê, ez ji cêriyê me?!
Ma çi cudatiya me heye? **"Remo bi rûyekî tirş got: 'Ma qey tu xatûnê yî û em ji cêriyê ne law?!'"* Helîm Yûsiv

Ma te cot û kotan kirine?!
Ma te karekî zehf zêde kiriye? **Çi ye ûfeûfa te,* ***ma te cot û kotan kirine****?!*

Ma tu hatiyî agir bi deyn bibî?
Ji bo hevdîtinên ku zû diqedin tê gotin. Ji cihekî zû rabûn an jî zêde nesekinîn. **Keçê ev çi lezgînî ye,* ***ma tu hatiyî agir bi deyn bibî****?* (bnr. çirok)

"Ma tu hatiyî agir bi deyn bibî?"

Wekî ku tê zanîn, berê wekî niha heste, derbik ango sipîşke û tiştên wekî wê tune bûn. Agir divê nehata temirandin. Bi kevirên hesteyan jî agir vêxistin wer ne hêsan bû. Ji bo wê jî dema ku agir hewce bûya diçûn der cîranan û bi lez koziyên agir dihanîn û pê agirê xwe vêdixistin. Ji bo ku agir venemire, divê zêde dem derbas nebûya û ya/ê ku hatibû êgir jî zû vedigeriya. Loma jî ji bo kesên ku zêde li derekê nesekinin û bixwazin zû rabin. Dibêjin:
"Ma tu hatiyî agir bi deyn bibî?"

Madem heme ez, divê hebim ez.
Madem ku navê min tev e, divê bi rastî jî ez bi xwe jî tevlî bim. **Madem heme ez, divê hebim ez.* *Jixwe navê min derketiye, qet nebe bila vala neçe.*

Mafê xwe bi dest xistin
Tiştên ku heq û pêwîst e, pêk anîn. **Ev doza me ji bo mafê me yê xwezahî ye, heta ku em* ***mafê xwe bi dest bixin*** *wê berdewam bike.*

Mala (yekî) bê sitûn man
Bê mêr û bê serwêr man. **Bi mirina Cindî re* ***mala wî bê sitûn ma****.*

Mal birçî ye, kebanî li ber çi ye?!
Bepirsyariya debara malê zêdetir di destê kebaniyê de ye. **Huner esas a jinan e, loma gotine:* ***"Mal birçî ye, kebanî li ber çi ye?!"***

Mal birçî ye, kebanî qereçî ye.
Rewşa malê ya aborî ku ne xweş be, kebanî jî pê rûreş dibe û ev yek zêdetir wek kêmasiya kebaniyê tê dîtin. ****Mal birçî ye, kebanî qereçî ye.*** *Rewşa malê bi rastî jî, gelekî girêdayî merîfeta kebaniyê ye.*

Mal bû bi dû, dew ma li sêpiyan.
Mal û malxwe ku zêde dibin, rewşa malê xera dibe. **Hilberîn bi xwediyekî baştir dibe.* ***Mal bû bi dû, dew ma li sêpiyan.***

Mal çûne zozanan, xwelî li serê qûnpehnan.
Jiyana zozanan ji bo mirovên qelew û teral re pir zor e. ****Mal çûne zozanan, xwelî li serê qûnpehnan.*** *Zozanvanî zor e, zêdetir jî ji yên qelew re.* (argo)

Mala (yekî) bi serî de tep bûn
Li rastî bela û tofanê hatin. ****Mala wî bi serî de tep bibe****, ew jê xelas nebe.* (nifir)

Mala (yekî) ji mişkan rûreş bûn
Pir feqîr û xizan bûn. **Li der ve forsê diavêje, lê* ***mala wî jî ji mişkan rûreş e****.*

Mal ji xelkê re man
bnr: Mala (yekî) bi serî de tep bûn

Mal ji zik re, zik ji gur re
Îsrafa zehf zêde ya tenê ji bo xwarinê jî, mala mirovan xera dike. **Ma li cihê sekînî gotine,* ***mal ji zik re, zik ji gur re****?!*

Mala (yekî) ketin
Mal xera bûn. ****Mala wî nekeve*** *ka ew mirovekî çawa çikûs bû?*

Mal lê xerab bûn
bnr: Mala (yekî) bi serî de tep bûn

Mal li ber lingan çûn
bnr: Mala (yekî) bi serî de tep bûn

Mala (yekî) li ber tofanê çûn
Ketin rewşeke pir xeter. **Qet qala wî rebenê qijik meke,* ***mala wî ji rûyê wan ewledên xerab li ber tofanê çû.***

Mal li ser malan belav bûn
bnr: Mala (yekî) bi serî de tep bûn

Mal li ser pişta dîk e, dîk di bin de fîkefîk e.
Pir xizan bûn. **Maşelah, çi xwedî mal e, çi xwedî mal e.(!)* ***Mal li ser pişta dîk e, dîk di bin de fikefik e.*** (qerf)

Mala (yekî) li ser piştê bûn
1. Her dem amade bûn. **2.** Pir feqîr bûn, tiştek di malê de tune bûn. **Ji Kemal re çi, jixwe* ***mala wî li ser piştê ye.*** **Ka çi di malê de heye?* ***Mala wî li ser piştê ye.***

Mal mala te ye, lê ber bi firaqan ve neçe.
Ji bo niyeta neyînî û helwesta berevajî tê gotin. **Armanca xwe bi zelalî ji min re bibêje;* ***mal mala te ye, lê ber bi firaqan ve neçe****, çi ye?*

Malmîrat man (bûn)
bnr: Mala (yekî) bi serî de tep bûn

Mal şewitîn
bnr: Mala (yekî) bi serî de tep bûn

Mal têr e, kebanî şêr e.
Xwediyê malê ku dewlemend be, kebaniya malê jî serbilind û geş e. **Helbet Kewo wê xwe li ortê li ba bike.* ***Mal têr e, kebanî şêr e.***

Mal ne tu mal bû, terezê jî lê da.
bnr: Bi xwe pir gul bû, baranê lê kir şil bû.

Mal û mevdan, nebû qutik û fîstan.
Mal û milk bi kêrî tiştekî nehatin. **Ew qasî cedand û ew qas ked da, lê* ***mal û mevdan, nebû qutik û fistan.***

Mal wêran bûn
bnr: Mala (yekî) bi serî de tep bûn

Mala (yekî) xana Xwedê bûn
Dewlemend bûn. **Tu dibêjî* ***mala wî xana Xwedê ye****, mirov hez nake jê biqete.*

Mal xera bûn
bnr: Mala (yekî) bi serî de tep bûn

Mal xizan e, kebanî nezan e.
Ku di mal de alavên pêxwarinê tune bin, ev yek ji bo kebaniyê jî dibe sedema neyîniyan. **Mal xizan e, kebanî nezan e.* *Heke hebûya û min dê jî zêde zêde çêbikira, ji bo min wer nedigotin.*

Mal a min e, lê hêla firaxan ne ya min e.
Binbarî nepejirandin. Di helwest û soza xwe de durist nebûn. ****Mal a min e, lê hêla firaxan ne ya min e.*** *Ew ê rûreş tim ji ber kar direve.* (qerf)

Mala apo ber kelê, apo ketiye telê.
Ji bo rewşa xeter tê gotin. **Weleh nûçe ji bo wî qet tiştên xweş nabêjin.* ***Mala apo ber kelê, apo ketiye telê.*** (qerf)

Mala (yekî) barê dîkekî bûn
Pir xizan û feqîr bûn. **Mala min, ha mala min dibêje, lê* ***mala wê jî barê dîkekî ye.***

Mala bavê bûkê gavan e, qelendê bûkê giran e.
Yên xizan ji ber ku xwe kêm dibînin, hê zêdetir xwe li naziyê datînin û pirsgirêkan dertînin. **Bi rastî min ew qas jê hêvî nedikir. Loma gotine:* ***"Mala bavê bûkê gavan e, qelendê bûkê giran e."***

Mala bavê tûrê xwê ye, destê min tê de ye.
Malbata dê û bavan, tim ji ewledên xwe re dibin alîkar. ****Mala bavê tûrê xwê ye, destê min tê de ye.*** *Heke mala bavê min nebûya, gelo min dê çawa bikira?*

Mala Bekê, dido dan bi yekê, ew jî ne wekî xelkê.
Hesabê xwe nezanîn. Ziyan kirin. **Kesê ku hesabê xwe nizanibe, zor e.* ***Mala Bekê, dido dan bi yekê, ew jî ne wekî xelkê.***

Mala Bekir e, yek ji yekê segtir e.
Hemû jî ji hev û du xerabtir in. **Ma ez bi kîjanê dest pê bikim?* ***Mala Bekir e, yek ji yekê segtir e.***

Mala biran, mala guran
Malbatên birayan jî ji hev û din dexesiyan dikin. **Bi gelemperî jinbir dexesiyê dikin navbera birayan.* ***Mala biran, mala guran.***

Mala bûkê def û zirne, mala zavê haj tu tiştî (hay jê) tune.
Malbava keçikan pirsgirêka zewacê zêdetir girîng digirin. ****Mala bûkê def û zirne, mala zavê hay jê tune.*** *Ew xwe bi xwe dixapînin.*

Mala dîn û dêwan bûn
Ji bo malbatên bêsazûman, bêserî û bêberî tê bikaranîn. **Kuro mala wan* ***mala dîn û dêwan e,*** *kes hay ji kesî nîn e lo.*

Mala Eliyê Xişo, ba dibe, baran dişo, serî qûç e, binî pûç e.
Ji bo malbatên bêhesab û nezan tê gotin. ****Mala Eliyê Xişo, ba dibe, baran dişo, serî qûç e, binî pûç e.*** *Hema em jî ketine rewşa mala Eliyê Xişo.*

Mala felekê şewitîn

Ji bo rewşa ku wekî xuyangê nîn e û di bin de tiştên balkêştir hene tê bikaranîn. **Mala felekê bişewite, ma tu mêrê vê rewşê bûyî?*

Mala gavan e, nazê (dilika) zeriyê giran e.

bnr: Mala bavê bûkê gavan e, qelendê bûkê giran e.

Mala gur e, ne av e, ne bilxur e.

1. Pir xizan bûn. **2.** Nezan û bêsîstem û bi xwe mal û milkê xwe xelas kirin. **Maşelah, mala gur e, ne av e, ne bilxur e.*

Mala Mamê Şekir e, derve ji hundir çêtir e.

Ji bo kesên feqîr tê bikaranîn. **Maşelah çi mal e, çi mal e.* ***Mala Mamê Şekir e, derve ji hundir çêtir e.***

Mala me çoyê me ye, çoyê me li ser milê me ye.

1. Jixwe mal û milkê me nîn e, em ê ji çi bitirsin, em in û zompeyê me ye. **2.** Em xizan in, ji bo wê jî seyar in. **Bila lingê xwe zehf zêde dirêj mekin.* ***Mala me çoyê me ye, çoyê me li ser milê me ye.*** **Em dikarin zehf zû xwe bigihînin wan,* ***mala me çoyê me ye, çoyê me li ser milê me ye.***

Mala me ya li nav riyan, kor û kut li me civiyan, xizmetkar ji me reviyan.

Ji bo rewşa neyînî tê gotin . **Heyran qet li halê me nepirse.* ***Mala me ya li nav riyan, kor û kut li me civiyan, xizmetkar ji me reviyan.***

Mala mêran, kaniya zêran

Mirovên merd û durist tim serketî ne. **Mirovên xayîn ji kîsên xwe dixwin. Lê* ***mala mêran, kaniya zêran.***

Mala min a rûtikî, serê min ê tûtikî

Ne mal û milk e, ne jî bedewî ye. **Aqilê min jî ji min nabire.* ***Mala min a rûtikî, serê min ê tûtikî.***

Mala min ji min re, xemên dinê ji kê re?!

Ez ku li mala xwe rehet bim û halxweş bim, tiştên ji wê pê de, ne xem in. **Kî çi dibêje bila bibêje.* ***Mala min ji min re, xemên dinê ji kê re?***

Mala min tewla hespê te ye.

Ji bo rûmetdayînê tê gotin. **Te eyb kir, gotinên wisa neke,* ***mala min tewla hespê te ye.***

Mala li nav gund bûn

Ji bo mala ku her kes bi kar tîne û çûn û hatin zêde lê dibe tê gotin. **Erebeya Ronîdar* ***bûye mala li nav gund****, hema hewcedariya kê pê hebe, ji xwe re dibe.*

Mala pîrê, gora pîrê

Mirov di mala xwe de rehet e. **Mal şêniya mirov a heya mirinê ye. Loma gotine,* ***mala pîrê, gora pîrê.***

Mala pirjin, xera bû ji bin.
Di malekê de ku hêwî hebin, ew mal wê wêrtaz bibe. ***Mala pirjin, xera bû ji bin.** Cindo bi vê jina nû di du meh an de holik li golikê kir.*

Mala pirmezin, xera bû ji bin.
Di malekê de ku gelek serwêr û mezin hebin, xêra wê malê nîn e. **Bi wî awayî ew nikarin bidomînin. Rast gotine: **"Mala pirmezin, xera bû ji bin."***

Mala Şeref bi xwe hindik bûn, ew jî hin koro, hin şilo, hin seqet bûn.
Yên heyî jî xerab in. **Ew qas jî nabe lo! **Mala Şeref bi xwe hindik bûn, ew jî hin koro, hin şilo, hin seqet bûn.***

Mala şeytên li ku ye zanebûn
Pir kone û zana bûn. **Hay lo lo! Ne wan tenê dizane, ew dizane **mala şeytên jî li ku ye**.*

Mala te ava, kurê te zava!
Xwedê ji te razî be. **Mala te ava, kurê te zava.* (dia)

Mala (yekî) tûrtewas bûn
Hêlîna yekî belav bûn. **Wî ew kuşt, lê **mala wî jî tûrtewas bû**.*

Mala virekan şewitî, kesî jê bawer nekir.
bnr: Mala virekan xera bûye, kesî jê bawer nekiriye.

Mala virekan xera bûye, kesî jê bawer nekiriye.
Virek çi bibêjin ji wan nayê bawer kirin. **Vê carê ya rastî digot, lê dîsa jî me jê bawer nekir. Loma dibêjin: **"Mala virekan xera bûye, kesî jê bawer nekiriye."***

Mala xelkê dişewitî, wî jî li ber fîrikê xwe diqeland.
bnr: Agir bi serê min ketiye, tu jî li ber rûnê xwe diqijirînî.

Mala xwe ava kirin
Kar û barekî baş û xweş pêk anîn. **Helal be! Camêrî serê xwe şixuland, bi kirîna wê makîneyê re xwe jî û em jî xelas kirin. **Mala xwe ava kir.***

Mala xwe bi destê xwe şewitandin
bnr: Mala xwe bi destê xwe xera kirin

Mala xwe bi destê xwe xera kirin
Xeta, çewtî yan jî tawaneke pir girîng kirin. **Tu tawana kesî nîn e, wî bi xwe, bi destê xwe **mala xwe xera kir**.*

Mala xwe bi xwe xera kirin
bnr: Mala xwe bi destê xwe xera kirin

Mala xwe cihê kirin
Ji bo law û bûka ku ji mala bavê xwe dertên maleke din tê gotin. **Li Kurdistanê dema ku law **mala xwe cihê dikin** bi teşqele derdikevin.*

Mala xwe danîn
bnr. Mala xwe xera kirin

Mala xwe ji (yekî) qetandin
Mala xwe ji malekê veqetandin, cihê kirin. **Piling **mala xwe ji wan qetand**, serê wî rehet bû.*

Mala xwe ji vê dinyayê bar kirin
Mirin. **Hê ciwan bû, **mala xwe ji vê dinyayê bar kir**.*

Mala xwe kir zêr, pişta xwe da stêr
Bi serkeftinî karê xwe pêk anîn. **Helal be ji Rahşanê re, **mala xwe kir zêr, pişta xwe da stêr**.*

Mala xwe li pisîkê bar kirin (Mala xwe dayîn ser pişta pisîkê)
Ji bo kesên ku bazirganiyeke xerab kirine yan jî îflas kirine tê gotin. **Cebraîl got, ez kar bikim, di dawiyê de **mala xwe da ser pişta pisîkê**.*

Mala xwe xera kirin
Çewtiyeke pir mezin kirin. **Dema ku wî ew jinik anî, wê çaxê **mala xwe xera kir**.*

Mala (yekî) wêrtaz bûn
bnr. Mala (yekî) bi serî de tep bûn

Malek e, dozdeh rispiyên wan hene.
Ji bo malbatên bêserî û bêmezin tê bikaranîn. **Xêr ji wan nayê ezbenî, **malek e, dozdeh rûspiyên wan hene**.*

Malê axê diçe, canê xulam diçe.
Ji ber xwe xweş nîşandinê, xulam ji axayê xwe zêdetir li ber malê wî dikeve. **Min tiştek ji wê rewşê fêm nekir. **Malê axê diçe, canê xulam diçe.***

Malê bavan, li hember çavan
Çavên ewledan tim li mala bavan e. ***Malê bavan, li hember çavan.** Ewled çiqasî dewlemend û xwedî derfet bin jî çavên wan li mala bavan in.*

Malê dinê li ber çavên (yekî) nehatin
Merd û destvekirî bûn. **Ya xwedatî Celal ne mirovekî wisa pîs û temahkar e, **malê dinê li ber çavên wî nayê**.*

Malê li malxwê dipê.
Ji bo helwesta ecêb û ne li cih tê bikaranîn. ***Malê li malxwê dipê.** Maşelah tu dibêjî ew ji malxweyê malê zêdetir difikire.*

Malê malyêmezan, xwarê tarîxbilmezan
Yên ku malê xwe naxwin, malê wan dibe xwarê xerab û nelayîqan. **Jixwe wisan e, **malê malyêmezan, dibe xwarê tarîxbilmezan**.*

Malê mirî bûn

Pir erzan bûn. **Cejn derbas bû, yên ku qurban di dêst de man, malê wan **bû malê mirî**.*

Malê pir, gerdana stûr

Ji malê zehf zêde û ji qelewbûnê mirov gelek caran ziyanê jî dibîne. ****Malê pir û gerdana stûr**, ez bawer im ku bingeh jî, dawî jî zor e.*

Malê wî heye, dinya gişk jê re birak e; malê wî tune, dinya gişk jê re kirak e.

Ji bo kesên dewlemend, jiyan hêsantir û birûmetir e. **Pir zelal e ku **malê wî heye, dinya gişk jê re birak e; malê wî tune, dinya gişk jê re kirak e**.*

Malê xwe bi avê de berdan

Tiştên xwe pir erzan firotin. **Wî bêaqilî, **malê xwe bi avê de berda**.*

Malê xwe ji mista xwe derxistin

Malê xwe firotin an jî bi awayekî tune kirin. **Dema ku li pey wê jinikê çû, hêdî hêdî **malê xwe jî ji mista xwe derxist**.*

Malhindiko, çargurçiko, gotina te bi xelkê kîn û riko!

Yên ku tiştekî wan ê windakirinê tune be, zêdetir bi cesaret tevdigerin, lê ev rewşa wan jî dibe sedema hinek ziyan û neyîniyan. ****Malhindiko, çargurçiko, gotina te bi xelkê kîn û riko.** Çi xema wî ye, çi tê ber dêv dibêje.*

Malika min e, holika min e.

bnr. Malika min, tirika min *(*bnr. çîrok)*

Malika minê, tirika minê (Malika min, tirika min)

Çi dibe bila bibe, ji ber ku ya mirov bi xwe ye, mirov di mala xwe de rehetir e. **Welehî pîrê rast gotiye, **malika min, tirika min**. Rastî jî tu der wekî mala mirov rehet nîn e.* (bnr. çîrok)

Malkanî lîstin

Bi karên vala û pûç re mijûl bûn. **Evdal ne mirovekî wer hunerwer e, karê wî naşibe tu tiştekî, teresî wekî zarokan hema ji xwe re **malkanî dilîze**.*

Malkir bûn

Zêdetir ji bo jinên xurt û pêkhatî tê gotin. **Bêrîvan bi rastî jî jineke **malkir e**.*

"Malika minê, tirika minê"

Pîrek li mala lêzim û exrebeyên xwe çend rojan dimîne. Lê piştî demekê bi şûn de pîrê li wan deran qet rehet nake¿Hema tim dibêje:

"Ez ê herim mala xwe." Hemû exrebe jê re dibêjin:

"Çend rojan dîsa bimîne, tu dê herî wir, tik tenê çawa bikî?" Lê dikin nakin nikarin pîrê bînin rê. Di dawiyê de pîrê hildidin dibin mala wê. Lê gelekî meraq dikin ku gelo çi di mala wê de heye ku ew qas mala xwe dixwaze yan jî hez dike. Yê ku pîrê dibe mala wê, xwe li pîrê diteline ku hîn bibe, ka sira pîrê û mala wê çi ye. Gava ku pîrê bawer dike ku tenê maye, bi kêf û eşq li nav mala xwe diçe û tê, dest pê dike kar û barê xwe dike. lê di wê navberê de ba bi ber dikeve û tireke bideng dike. Berê bi tirs û şerm li dora xwe mêze dike, lê dibîne ku kes tune û tê bîrê ku di mala xwe de bi serê xwe ye; kêfa wê bêhtir tê û him tiran dike û çirtikan diavêje, him jî li ser hev dibêje:

"Malika minê, tirika minê. Malika minê, tirika minê..." Exrebeyên pîrê jî têdigihîjin ku bi rastî jî pîrê di mala xwe de rehettir e.

Malmasî bûn

Nesaxlem û bêbinecih bûn. **Na lo! Ew mirovekî **malmasî ye**, tu dê çawa bi wî bawer bî, îro li vir e, sibe li cihekî din e.*

Malmezin bûn

Ji bo malbat û kesên birûmet, rêzdar û temendirêj tê gotin. **Mixabin **malmezinê** wê eşiretê jî Hecî Zeydanê Topal e.*

Malxwe ku Elo be, dê xwarina me şor be.

bnr. Malxweyê me ku Xelo be dê xwarina me çilo be.

Malxweyê me ku Xelo (Silo) be, dê xwarina me çilo be.

Ḥeta ku mezinê me ev bin, halê me jî dê ev qas xerab be. **Ev jî qedera me ye. **Malxweyê me ku Xelo be dê xwarina me çilo be?***

Malxwetî ket destê jinê; karik birî, berxik hişt di bin livayê de.

Ji ber sedemên serdema asta civaka îroyîn, jin wekî mêran nikarin malxwetiyê pêk bînin. **Li gorî serdemê her tişt lêhatineke wê heye. **Malxwetî ket destê jinê; karik birî, berxik hişt di bin livayê de.***

Malxwetî ket destê jinê; karik birî, berxik mirî.

bnr. Malxwetî ket destê jinê; karik birî, berxik hişt di bin livayê de.

Malxwediyê kulê ye, lê mêvanê xwe ye.

Erê, xerabiya wî heye lê bi xwe ziyanê digihîne xwe. **Ji kesî re xisara wî nîn e; **malxwediyê kule ye, lê mêvanê xwe ye**.*

Mam Hemdan, me çêl û gul li der dan, mane em û xeberdan.

bnr. Merdan, kerî surî gişk derdan, di dêst de maye xeberdan.

Mamê maman, aqilê faman

Kal û pir zêdetir bitecrube û têgihîştî ne. **Ma ewqas dema dirêj vala jiyîne? **Mamê maman e, aqilê faman e.***

Mamê Remezan, ga û golik tev berdan, di dest de ma ev xeberdan.

bnr. Merdan, kerî surî gişk derdan, di dest de maye xeberdan.

Manga me mir, şîrê me zuha bû.

Jêderka (çavkaniya) me hate birîn. **Êdî ji îro şûn de karê me zortir e. **Manga me mir, şîrê me zuha bû.***

Mange doşîn û qezwan firoştin

Du kar bi hev û din re nayên kirin. ***Mange doşîn û qezwan firoştin?** Her tişt ûsileke wê heye, du zebeş bi destekî nayên girtin.*

Mankerê, mizgînî li te, ji te re cehşek bû, got: "Barê mi her li min e."

bnr. Gotin: "Kero ji te re dehşek bû." Got: "Êmê min kêm bû, barê min zêde bû."

Mar dibêje: "Min dikujî bi dijminatî, min çal bike bi dostî."
Tu çi dikî bike, lê mirovahî û însafê ji destê xwe bernede. **Her tişt zagoneke wê heye.* ***Mar dibêje: "Min dikujî bi dijminatî, min çal bike bi dostî."***

Mar jê vereşîn
Gelekî qilêr û pîs bûn. **Wesîle wisa qilêr bû ku bi rastî jî* ***mar jê vedireşî.***

Mar ji pûngê xolî dibû, pûng li ber devê qula mar hêşîn bû.
Carinan tiştê ku mirov jê hez nake, zêdetir derdikevin pêş mirov. **Carinan jî bi rasthatin wer dibe.* ***Mar ji pûngê xolî dibû, pûng li ber devê qula mar hêşîn bû.***

Mar ji qula xwe derneketin
Pir serma û seqem bûn. **Di vê zivistana reş de* ***mar ji qula xwe dernakeve,*** *lê ji bo zarokên xwe ew li ser riyan e.*

Mar û dûpişk, bûne xwîşk.
Yên ku dişibînin hev an jî hinek taybetiyên wan nêzîkî hev in, hev û din dibînin û bi hev û din re têkildar in. **Pehe pehe! Tam jî hev û din dîtine;* ***mar û dûpişk, bûne xwîşk.***

Mar û mişk bûne xwîşk
bnr. Mar û dûpişk, bûne xwîşk.

Maran (yek) mêtin
Pir birçî bûn. **Kuro ev çi xwarin xwarin e, ma* ***maran tu mêtiyî?***

Marê (yekî) hatin
Nefsa yekî di tiştekî de man. Gunehê nefsa yekî di stûyê xwe de hiştin. **Min fêm kir ku wexta min ew kibab xwarin û nedan wî,* ***marê wî hat*** *û gunehê nefsa wî kete stûyê min.*

Marê kor pê vedan
Înşelah* ***marê kor Cemîl vede* *ku em jî jê xelas bin.* (nifir)

Marê qol û tirba spî
bnr. Heya ez li dûvê xwe yê qut binêrim û tu jî li kêla spî, em nikarin bibin dost. *(*bnr. çîrok)*

Marê reş li ziman gerîn
Ji tirsan ziman negerîn. **Dema ku çav li wî ket,* ***marê reş li ziman gerî*** *û bû waqewaqa wî.*

Mayîn bi Xwedê
Êdî tenê Xwedê dikare alîkariya me bike. **"-heyla li minê, tevdîra ku we ji bo rovî girtiye... Êdî ya rovî* ***ma bi Xwedê****..!"* Mela Mihemed Çuxreşî

Mast, sed carî mast
bnr. Mêr im, kurê mêran im, îro jî mast, sibê jî mast.

Me baxçe danî bi nezanî, ji der de hat got: "Ez xweyî, xweyî tu cenan î."
Ji bo kesên ku bê ked dest didin ser malê hinekan tê gotin. **Edaleta wisa dibe?* ***Me baxçe danî bi nezanî, ji der de hat got: "Ez xweyî, xweyî tu cenan î."***

Me bûk anî bi lez û bez, me lêda (dayê) rez û pez; sivika malê dîsa ez.
bnr. Bûkek anî ji Hezro, tê da ga û pezo, dîsa sivika malê ezo.

Me Cizir ava kir, Heso ser de zava kir.
Ji bo karên ne li rê û neyînî tê bikaranîn. ***Me Cizîr ava kir, Heso jî ser de zava kir.*** *Mixabin ji destê me tiştekî baş nehat.* (qerf)

Me çi se girt, tajî derket?!
Ji bo helwesta bêkêr tê gotin. **Nizanim ji kêmasiya me ye yan ji bêşansiya me ye,* ***me çi se girt, tajî derketin***.

Me ço xeritand, ji bo serê xwe.
1. Xwe gijevekirina me ji bo parastina me ye, da ku ziyanek negihîje me. **2.** Kar û qenciya ku me kir, ziyana wê gihîşte me. ***Me ço xeritand, ji bo serê xwe.** *Armanca me ew e ku em tenê destê xwe bidin ser serê xwe.* *Qenciya me bû gincî.* ***Me ço xeritand, ji bo serê xwe.***

Me daye navê ha li saqê, ha li çokê!
bnr. Me daye navê, ha li çokê, ha li qirikê!

Me daye navê, ha li çokê, ha li qirikê!
Êdî em ketine navê, hinekî kêm an jî hinekî zêde derk nake. **Kêra gotin û gazinan nîne,* ***me daye navê, ha li çokê, ha li qirikê***.

Me gayê xwe gura, ma dêla wî.
Ji bo rewşa neyînî û derengmayî tê gotin. ***Me gayê xwe gura, ma dêla wî.** *Erê lê, maşelalı hema her tişt xelas bûye, tenê ew maye.* (qerf)

Me got em herin mala apê xwe, firo fir kin; me negot em ê herin guliyan kur kin.
Xeyalên xweş hêvî kirin, lê rastî rewşeke berevajî hatin. **Ew jî şansê me ye.* ***Me got em herin mala apê xwe, firo fir kin; me negot em ê herin guliyan kur kin.***

Me got, erebo merheba, tevî solan hat ser cilan.
Ji bo kesên hedê xwe nizanin û niyeta erênî jî bedkarî (sûîstimal) dikin tê gotin. ***Me got, erebo merheba, tevî solan hat ser cilan.** *Mirov ku hinekî rû didiyê, ew lap xwe winda dike.*

Me ker guraye, maye terî.
bnr. Me gayê xwe gura, ma dêla wî.

Me kerê xwe bi ker da, barê mewûj jî bi ser da.
Ji bo rewşa ziyandîtinê tê gotin. **Ew jî kertiya me bû.* ***Me kerê xwe bi ker da, barê mewûj jî bi ser da.***

Me kir, tu meke.
Lavayî kirin. **Eman heyran, sûc sûcê me ye,* ***me kir tu meke***.

Me rû dayê, serûkê dixwaze.

Ji bo kesên ku bi hedê xwe nizanin û zêde pêşde diçin tê gotin. **Divê mirov mêzîna xwe bizanibe. **Me rû dayê, vêca ew serûkê dixwaze.***

Me şem kirîne, mane şembelûk.
Hema her tişt qediya, ma ew. **Erê ezbenî, jixwe **me şem kirîne, tenê mane şembelûk**.* (qerf)

Mecala (yekî) birîn
Firsend û derfet nedan. **"Qulçekî merekê gîha tê de hebû. wextê tarî kete erdê, zaro hê digiriyan, ker nedibûn. **Mecala min hate birînê**."* Erebê Şemo

Mefera xwe nedîtin
Firsend nedîtin. **"Memo êdî **mefera xwe nabîne**, pişta xwe dide dîwar."* Celîlê Celîl, Ordîxanê Celîl

Meha adarê, av firî serê darê, hat bêhna biharê.
bnr. Meha adarê av firî serê darê, bizin kalî ser karê, nîşanên biharê.

Meha nîsanê, meşka baranê
Di meha nîsanê de baran zehf dibare. **Çi gotine: **"Meha nîsanê, meşka baranê."** Divê hûn wekî wê tedbîra xwe bikin.*

Mehd û mirûz ketin hev du
bnr. Mehd û mirûzê xwe kirin

Mehd û mirûzê xwe kirin
Mirûzê xwe kirin, pozpirçî bûn. **Wisa **mehd û mirûzê xwe neke**. Bi wî mehd û mirûzî kî dê li rûyê tê binêre?*

Mehd xerab bûn
bnr. Mehd revîn

Mehde ye, ma ne cade ye. (Mehde ye, yan cade ye?)
Ji bo xwarinê jî sînorek heye. **Erê me fêm kir, lê dîsa jî ev **mehde ye lawo, ne cade ye**.* (argo)

Mehdê (yekî) hatin girtin
Ji bo xwarin û vexwarinê daxwaz tune bûn. **Van rojan **mehdê keçika min hatiye girtin**.*

Mehdê (yekî) ... kişandin
Dil bijandin. ****Mehdê min zehf ew xwarin kişand**, lê min fedî kir ku ez bixwazim.*

Mehdê (yekî) ne mehdê xêrê bûn
Li gorî xuyangê rewş wekî erênî nexuyandin. **Wa ye Reşo tê, lê Xwedê dizane, **mehdê wî ne mehdê xêrê ye**.*

Mehdê (yekî) revîn (revandin)
1. Îştah neman. **2.** Moral xerab bûn. **Çawa ku ew pozxîtik jî li ser sifrê rûniştê, **mehdê min revî**. *Wê nûçeyê **mehdê Evdilselam revand**.*

Mehdê xwe kirin
bnr. Mehdê xwe tirş kirin

Mehdê xwe tal kirin
bnr. Mehdê xwe tirş kirin

Mehdê xwe tirş kirin
Ji tiştekî aciz bûn. Moral xerab bûn. *"*Ûsib **mehdê xwe tirş kir** û serê xwe xiste ber xwe."* Talip Kalın

Mehdê (yekî) xweş bûn
Rûgeş bûn. Moral baş bûn. **Nizanim çi di wê jinikê de heye, kingê wê dibîne, **mehdê havê min xweş dibe**.*

Mehîna pîr, hefsarê rengîn?!
Ji bo tiştên ku li hev nayên, ne layîq in tê gotin. **Ne heqê Xwedê ye qurban, **mehîna pîr, hefsarê rengîn?**!*

Mehne dîtin
bnr. Li mehneyan gerîn

Mehne girtin
bnr. Li mehneyan gerîn

Mehneyên (yekî) birîn
Pêşî li hincetên yekî girtin. **Ew li gelek mehneyan gerî, lê Serok bi her awayî **mehneyên wî birîn**.*

Mehra xwe birîn
Nikah birîn. **Êdî ez wê partiyê naxwazim heyran, ma min pê re **mehra xwe biriye**?*

Mela nivişt çêkir ji bo qîzê, gû hat li tev mîzê. (Niviştek çêkir ji qîzê re, gû hat bi mîzê re.)
Hê xerabtir kirin. **Me got, em herin ji xwe re çareyekê bibînin. Lê **mela nivişt çêkir ji bo qîzê, gû hat li tev mîzê**.*

Mela xwarin dît, Quran ji bîr kir.
Ev biwêj zêdetir ji bo çavçiliya melayan tê gotin. ***Mela xwarin dît, Quran ji bîr kir.** Melayê me çiqas ji me digire, çiqas ji cihên din berhev dike, lê dîsa jî çavên wî têr nabin.*

Melayê nexwendî, digere li nav gundî.
Ji kesên sextekar ku xelkê dixapînin re tê gotin. **Dîsa Reşo birçî maye, **melayê nexwendî, digere li nav gundî**.*

Mele ev be, yê li pê mele dihere wê çawa be?!
Ku rêber xirab be, yên di bandorê de dê xerabtir bin. **Xwedê hefza me bike, ku mele ev be, yê li pê mele dihere wê çawa be?*

Mele her dibêje: "Elif û bê."

Mele tim qala berjewendiya xwe dikin. Ango dibêjin bila her ji min re "bê." **Edeta wan e,* ***hema mele her dibêje: "Elif û bêêêê".*** *Hema tenê "bê", lê qala dayînê zêde nakin.*

Mele mele, ber kendal! (Elhemdullih, dîsa ji nû ve bismillah)

Di wateya gefxwarinê de tê xebitandin. **Ya ku te pê girtiye, bûye meseleya:* ***"Mele, mele ber kendal!.."*** (bnr. çîrok)

Malevan xeniqî.

Yên pir zana jî gelek caran çewtiyên mezin dikin. **Divê mirov zêde bilind nefire.* ***Malevan xeniqî.***

Melezade, melezade, me têr xwar zed û zewad e, îcar her yek me di aliyekî de ba de.

Ji bo kesên ku tenê ji bo berjewendiyên xwe kar dikin, karê wan ku diqede, ji holê winda dibin tê bi kar anîn. ****Melezade, melezade, me têr xwar zed û zewad e, îcar her yek me di aliyekî de ba de.*** *Wan bêbavan jî barê xwe girtin û ji holê winda bûn.*

Mendehûş bûn

Kêfxweş bûn. Rewş geş bûn. **"...ne min divêt ez wisa bikenim ku xelk ji keniya min re* ***mendehûş bin****."* Xalid Salih

Mendê tir kiriye, Mend a naz e.

Yê ku çewtî kiriye ew e, yê ku di ser de pirsgirêkan derdixe û dixeyîde jî ew e. **Tiştê wiha çawa bê pejirandin?* ***Mendê tir kiriye, Mend a naz e.***

Mera bavê tê de şikestin

Gelek ked û zehmet dan. **Bê lawo ji te re çi? Ma* ***mera bavê te tê de şikestiye*** *ku tu wê dozê dikî?*

Merdan, kerî surî gişk derdan, di dêst de maye xeberdan.

bnr. Apê Merdan, kerî surî tev berdan, di dêst de maye xeberdan.

"Mele mele, ber kendal! (Elhemdullih, dîsa ji nû ve bismillah)"

Li devereke Kurdistanê meleyek û şagirtên wî, wekî ku bûye edet ji aliyê gundiyan ve ji bo xwarinê tim tên vexwendin. Mele ne wekî melayên din mirovekî zêde gelimxwer bûye. Mele û feqiyên wî kengê ku diçin malan û li ser sifreyê rûdinin; hê feqiyên wî xwarinê têr naxwin, mela hema destê xwe bilind dike û dibêje:

"Elhemdulilah!.. Ya rebî tu zêde biki!.." Ji ber ku seydayê wan ji ser sifreyê vedikişe. Feqiyên belengaz jî fedî dikin û ji bêgavî dev ji xwarinê berdidin. Bi vî awayî feqî tim têrnexwarî ji ser sivreyê radibin û birçî didin ser rê û vedigerin medreseyê. Rojek wisa dudu wisa, di dawiyê de feqî li ber xwe nadin û di navbera xwe de biryarekê didin ku tiştekî bînin serê seydayê xwe. Rojekê dîsa ji vexwendikê dizivirin. dîsa ji ber ku mela ji sifreyê zû vekişiye, zikê feqiyan têr nebûye û bi wê hêrsê di rê de dema ku di ber kendalekî mezin re derbas dibin, feqî dest û piyên mela digirin, dibin ber kendal û ji mela re dibêjin:

"Seyda, te îmana me bir. Jixwe ne mala me heye, ne halê me. Heçî cara ku gundî me dawet dikin, em her car birçî vedigerin. Tu çi ji me dixwazî? Hê em du pariyan naxwin tu dibêjî, elhemdulîlah. Em jî ji şerman û ji ber hurmeta te dev ji xwarinê berdidin û birçî dizivirin medreseyê. Qesem bi navê Xwedê, careke din heya ku em têr nexwin tu bibêjî, elhemdulilah em ê te di ber vî kendalî de çal bikin." Mele ditirse. Soz dide wan ku careke din tiştekî wer neke. Piştî wê bûyera li ber kendêl, rojekê dîsa gundî wan vedixwînin xwarinê. Lê hê du parî nexwarine ku mela dîsa destên xwe bilind dike û dibêje:

"Elhemdulilah." Hema di wê demê de feqiyek çepeçep li çavê mela dinêre û dibêje:

"Mele mele, ber kendal!.." Bi vê gotinê re ew bûyera di rê de û ber kendal dikeve bîra mele û hema pê re vedigerîne, ji bo xwarinê kevçî ji nû ve hildide û dibêje:

"Dîsa ji nû ve bismillah..." Mele bi vî awayî dîsa dest bi xwarinê dike. Feqî jî ji birçîbûnê rizgar dibin.

Merdê ji kîsmalê xelkê bûn
Ji bo kesên ku ne bi pereyên xwe, lê bi yên xelkê qenciyê dikin tê bikaranîn. **Tu li merd xuyabûna wî menêre lo! Tiştek ji bêrîka wî neçûye, ew* ***merdê kîsmalê xelkê ye****.*

Merdê ne bi malê xwe bûn
bnr. Merdê ji kîsmalê xelkê bûn

Merezî kirin
Aciz kirin, nexweş xistin. **Eman ji dest vî lawê min î piçûk, wî ez* ***merezî kirim****.*

Meriv û însan bûn
bnr. Kurê meriv û însanan bûn

Meriv û însan hesibandin (Meriv hesibandin)
bnr. Xistin şûna meriv û însanan

Merivê bêguman, bêdîn û bêîman
Yên ku alîkarî û hêviyê nadin mirovan ne mirovên baş in. **Ez ji vê bi rastî jî bawer im ku* ***mirovên bêguman, bêdîn û bêîman*** *in.*

Merivê malê mirî bûn
Ji bo tiştên erzan û belaş gelekî di nav hewldanê de bûn. **Wan kelepûran ji bo Faysal bihêlin, jixwe ew* ***merivê malê mirî ye****.*

Merivê xwe dîtin
Layîqê xwe dîtin. **Qet destê xwe nedinê, wê tam* ***merivê xwe dîtiye****.*

Merşika xwe ji avê derxistin
bnr. Cila xwe ji avê derxistin

Mertala Şems li ser milê (yekî) bûn
Bihêz û qewet bûn. **Wisa bihêz e ku tu dibêjî* ***mertala Şems li ser milê wî ye****.*

Mertalê (yekî) rûyê (yekî) bûn
Ji bo kesên bêar û bêfedî tê gotin. **Ji wî re çi?* ***Mertalê wî rûyê wî ye.***

Merzel gazî (yekî) kirin
Ji bo kesên gelekî pîr in, an jî bi nexweşiyek giran ketine tê gotin. **Welehî êdî* ***merzel gazî apê Kerîm dikin****.*

Merzelê ji nêzdan miriyan li ku ye?!
Ka kî ji birçînan miriye? **Her kes kêm an jî zêde dikare debara xwe dike. Ma her tişt tenê têrkirina zik e? Ka* ***merzelê ji nêzdan miriyan li ku ye****?!*

Metê du gun (hêlik) pê ve hebûna, wê bigotana mamo.
Ji bo jinên ku gelekî bipirç in û dişibin mêran tê gotin. **Maşelah,* ***meta Zînê du gun jî pê ve hebûna, wê bigotana mamo****.*

Mewlûda xêr û beşer, heçiyê dewlemend e bikişînin ber, diya feqîran nin (bigên), derxin der.

Di her hêlê de feqîr bêpar û bêrûmet in. ***Mewlûda xêr û beşer, heçiyê dewlemend e bikişînin ber, diya feqîran nin, derxin der.** *Ma ev biwêj jî min afirandiye?*

Meydan dayîn hespê xwe

Pesin dayîn xwe. Lafezanî kirin. **Dîsa Ehmoyê Cimşo di nav cimaetê de **meydanan dide hespê xwe**.*

Meydan vala dîtin

1. Ji ber derfetên zêde û firsendan, xwe ji hed derbas kirin. **2.** Li cihê ku yê hempa û bihêz tune be, gef xwarin. **Kêmasiya me bû, keko! Mêrikî **meydan vala dît** û heya ji dest hat malê me xwar. **Gemşo dîsa **meydan vala dîtiye**, bera dide hespê xwe.*

Meydan xwestin

Di nav hewldana tekoşînê de bûn. **Rast e, Egît **meydanê dixwaze**, lê Serdar direve.*

Meyla (yekî) kirin

Aliyê yekî girtin. **Tu bav î, divê tu **meyla ewledên xwe nekî**.*

Meymenet li rûyê (yekî) tune bûn

Di xuyangê de wekî mirovek kapmirûz, cirnexweş û bêkêr xuyandin. **Jixwe xuya ye ku tu **meymenet li rûyê wî tune ye**, ka ez çawa pê bawer bim?*

Meyt nedan ser milê (yekî)

Bi tiştekî nehesibandin, girîng negirtin. **Malavo, mirov **meyt nade ser milê wê**, tu çawa wê dikî hevalê Nûjînê.*

Mezhebê (yekî) fireh bûn

Ji bo kesên pir bisebr û xîretkêm tê gotin. ***Mezhebê Îzedîn fireh e**, jina wî çi li xwe bike, dengê xwe nake.*

Mezin kir bi nanê xwe, har kir, berda canê xwe.

bnr: Mezin kir bi nanê xwe, kir agir, berda canê xwe.

Mezin kir bi nanê xwe, kir agir, berda canê xwe.

Carinan qencî ku tên kirin, dibin sedemê xirabiya qencî kiriyan. **Loma dibêjin, qencî dibin gincî. Rebenê Baran **mezin kir bi nanê xwe, kir agir, berda canê xwe**.*

Mezin melisîn, biçûk reqisîn.

Mezin ku dengê xwe nekin, piçûk wê zêdetir bi ser ve bên. ***Mezin melisîn, biçûk reqisîn.** Tu qet dengê xwe nakî loma wisa dibe.*

Mezin reqisîn, piçûk hewisîn.

Mezin çi dikin, piçûk jî çav didin wan û ji wan hîn dibin. **Tu gunehê wan ciwanan nîn e ezbenî, **mezin reqisîn, piçûk hewisîn**.*

Mezinahiya xwe nîşan dan
Zêdebûn û merîfeta xwe nîşan dan. **Bi rastî jî Mamoste Mehmed Elî, bi wê kirina xwe tenê **mezinahiya xwe nîşan da**.*

Mezinatî kirin
Stamî kirin, rê nîşandan, an jî bi taqiya xwe rêvebirî kirin. **Ya ku wî kir ne tu kar bû, lê dîsa Memê **mezinatî kir** û ew bexişand.*

Mêjiyê (yekî) belav bûn
1. Serî zêde êşîn. **Êşeke wisa ketiye serê min ku **mêjiyê min belav dibe**.*

Mêjiyê (yekî) belav kirin
Serî şikandin. **Dibêjin Îbo û Serwêr li hev xistine û Serwêr **mêjiyê Îbo belav kiriye**.*

Mêjiyê (yekî) çelq bûn
Mêjî tevlihev bûn. Aqilê xwe şaş kirin **"Çend salên dirêj di zindanê de qedandin. Digotin ji lêxistinê **mêjiyê wî çelq bûye**."* Helîm Yûsiv

Mêjiyê (yekî) hilnedan
Di serî de rûneniştin. **Tu çi dikî bike, bawer nakim ku **mêjiyê wî hilde**.*

Mêjiyê (yekî) şûştin
Bandoreke mezin li ramana yekî kirin. **"Di jiyê heftan de zimanê zarokên me neguhêrin û **mêjiyê wan neşon**. Bes e! Ev zilm e! Ev hovîtî ye!"* Dr. Alan Merwanî

Mêjiyê (yekî) tevlihev kirin
Fikir û ramana yekî serobino kirin. **Berê hin baweriyên min hebûn, lê vî lawikê min di wê derbarê de jî **mêjiyê min tevlihev kir**.*

Mêjiyê xwe bi kayê xwarin
Hişê xwe winda kirin. **"Di rewşeke weha de ka kîjan ê **mêjiyê xwe bi kadînek kayê bixwe** û xwe li Sofî dayne?"* Musa Vazgali

Mêjiyê xwe guherandin
Ramana xwe guherandin. **Piştî bûyera 11 Îlonê ku bi serê Emerîkayê de hat, gelekan **mêjiyê xwe guherandin**.*

Mêjiyê xwe xebitandin
Biaqilî tevgerîn. **Heke ku tu **mêjiyê xwe bixebitînî**, dibe ku ev keys ji bo te bibe destpêka pêvajo û jiyaneke nû.*

Mêjî çeliqîn
bnr. Mêjiyê (yekî) çelq bûn

Mêjî genî bûn
bnr. Mêjiyê (yekî) çelq bûn

Mêjîhişk bûn
Pir serhişk û tund bûn. **Tu bêjî bengîn bit? Mirovek pirbêj e û çi xwe serradawî nagirt. Ne ku simaîl bit. Ooooh ez êk car **mêjîhişk im**."* Fazil Umer

Mêjî hişk kirin
bnr: Mêjiyê (yekî) çelq bûn

Mêjî rizîn
bnr: Mêjiyê (yekî) çelq bûn

Mêjî sivik bûn
bnr: Aqil sivik bûn

Mêjî teviżîn
bnr: Mêjiyê (yekî) çelq bûn

Mêr bi mûyê xwe, jin bi rûyê xwe...
Mêrê bipirç, jinên rûxweşik meqbûltir in. **Welatên din nizanim, lê li welatê me, **mêr bi mûyê xwe, jin bi rûyê xwe meqbûl in**.*

Mêr çavlider e, jinik xwelî li ser e.
Heke ku mêrê wê li pey jinên din be, xêra wê jinê tune. ****Mêr çavlider e, jinik xwelî li ser e.** Ez jî dizanim ku dawiya min û wî xerab e.*

Mêrkuştin nermenerm, qîzxwestin germegerm
Her tişt demek û taybetiyek wê heye. **Bavê min tim digot: **"Mêrkuştin nermenerm, qîzxwestin germegerm."***

Mêr ne li mal e, navê dîk Evdirehman e.
Ciyê ku yên xwerû tune bin, şûna wan, bi hinek tiştên sexte debar dibe. **Ez çawa bikin? **Mêr ne li mal e, navê dîk Evdirehman e.***

Mêran bikuje, xwe biavêje ber bextê wî/wê.
Ji bo kesên pir bi bawer û dirust tê bikaranîn. **Ji bo Xelo qet fikaran meke, **mêran bikuje, xwe biavêje ber bextê wî**.*

Mêran mêr dikuşt, Cibo ûr (hûr) dişûşt.
bnr: Elo dibirin sêdarê, xatûnê jê kil û kildan dixwest.

Mêran mêr dikuşt, Fata korê (ber dêrî) hûr û pizûr dişûşt.
bnr: Elo dibirin sêdarê, xatûnê jê kil û kildan dixwest.

Mêran mêr nas kir, qûşê quzê kerê nas kir.
Her kes bi çi re têkildar be, dibe hempayê wê. ****Mêran mêr nas kir, qûşê quzê kerê nas kir.** Têkiliya Remo jî ancax bi wan re be.*

Mêran xwe avêtin kewaran, jin çûne (şandin) hewaran.
bnr: Jin çûn hewaran, mêr ketin kewaran.

Mêrê devê (yekî) nebûn
Ne layîq û hempayê yekî bûn. **Here lawo ez xwe naxim hevalê te. Tu **ne mêrê devê min î**.*

Mêrê heyfan bûn
bnr. Mêrê rojên teng bûn

Mêrê kurê jinikê bûn
Ji bo mêrên ji gotin û bandora jina xwe dernakevin tê bikaranîn. **Her kes dizane ku Xelef **mêrê kurê jinikê ye**.*

Mêrê malê bicizme ye, teşta malê teneke ye.
bnr. Bejn tît e, mal mecît e.

Mêrê rojên teng bûn
Ji bo mêrên xurt, hêja û çeleng ku di rojên zor de bi kêr tên tê gotin. **Heyfa Faris, bi rastî jî ew **mêrê roja teng bû**.*

Mêrê rojên xerab bûn
bnr. Mêrê rojên teng bûn

Mêrê tenê, xenê
Yên ku tenê ne, rihet û serfiraz in. **Kî çi dibêje bila bibêje, lê bi dîtina min, **mêrê tenê, xenê**.*

Mêrê xweyê gotina xwe bûn
Ji bo mêrên ku ji sozên rast in tê bi kar anîn. ***Ew mêrê xweyê gotina xwe ye**, ne tenê ez, her kes bi wî bawer dibe.*

Mêrên oxirmên giran bûn
bnr. Mêrê rojên teng bûn

Mêrik got: "Ez mêraniyê ji kûçikê xwe hîn bûm."
Çi dibe, kî dibe bila bibe, divê mirov ji kesên an jî mînakên erênî dersê bigire. ***Mêrik got: "Ez mêraniyê ji kûçikê xwe hîn bûm".** Bi rastî, hema ez jî di ramana wî de me.*

Mêrik li jinê hincet bû, digot tu xwe li ber hevîr dihejînî.
bnr. Dilê mêrik ji jinê ne xweş bû, digot: "Tu ard eleg dikî, qûna xwe li ba dikî."

Mêrik ket bin siya axê, axa ket bin siya doxîna xwe.
Ji bo kesên ku bawerî û prestîja xwe ji bo daxwaza zayendî binpê dikin tê gotin. **Mirovên wisa jî hene. **Mêrik ket bin siya axê, axa ket bin siya doxîna xwe.***

Mêrik na pîrê, pey re guneh hat bîrê.
Piştî bûyer pêkanîn û xwe rehetkirinê bi xwe hesîn. **Jixwe Engels jî gotiye: "Şeytan, dozîn tî tamaha mirovan e." **Mêrik na pîrê, pey re guneh hat bîrê.***

Mêrikê misliman bi çengan hildaye gotiye: "Bismillah, bismillah"; mêrikê fileh gotiye: "Kewarê tijî ke, bi ser de tirekê jî bike!"

Berî niyet û gumanê, tedbîr û ked divê. **Bi bismilah û înşelahê nabe.* ***Mêrikê misliman bi çengan hildaye gotiye: "Bismillah, bismillah"; mêrikê fileh gotiye: "Kewarê tijî ke, bi ser de tirekê jî bike!"***

Mêr im, kurê mêran im, îro jî qatix, sibê jî qatix.

Ji bo mêrên ku li hemberî jinan li ber xwe didin tê bikaranîn. **Ma ez jî wekî wî koleyê qafdaxkirî me?* ***Mêr im kurê mêran im, îro jî qatix, sibê jî qatix.*** (qerf)

Mêro bi sedî, sedo ne bi yekî

Mêrek dibe ku hêjayî sed mêrî be, lê dibe ku sed mêr ne hêjayî mêrekî çê bin. **Ev yek ne bi hejmaran e.* ***Mêro bi sedî, sedo ne bi yekî.***

Mêro, bi xwe kêro.

Bi zerengî û kedê tiştên xweş û şanaz pêk tên. ****Mêro bi xwe kêro**, ew yek bi lopixan naçe sêrî, ji bo wê bingeheke xurt û paqij divê.*

Mêş jê neêşîn

Pir baş û rast bûn. **Berzan mêrekî wisan e ku* ***mêş jê naêşin.***

Mêş ji serê pozê (yekî) bikeve, dibe deh parçe.

Mirûzê yekî zehf xerab bûn. **Wê bûyerê wisa kiribû ku* ***mêş ji serê pozê Xatûnê biketa wê bibûya deh parçe.***

Mêş leqî, gurî peqî.

Yên ku zêdetir dikelijin, helwesteke zêde nîşan didin. ****Mêş leqî, gurî peqî.** Kê çiqasî dikeve bin bandorê ew zêde deng derdixe.*

Mêşê dimêje, dû re diavêje.

Ji bo kesên pir çikûs tê gotin. **Ew berê* ***mêşê dimêje, dû re davêje.***

Mêvan got: "Hewa çawa ye?" Xwediyê malê got: "Riya rêwiyan vekirî ye."

Ji bo kesên ku naxwazin mêvan li malê zêde bisekinin tê gotin. **Ez têgihîştim armanca te çi ye.* ***Mêvan got: "Hewa çawa ye?" Xwediyê malê got: "Riya rêwiyan vekirî ye."***

Mêvanê nanê petî bûn

Ji bo kesên bê ked û belaş dijîn tê gotin. **Teresî bêhna tiştên belaş xweş hildide, hema* ***mêvanê nanê petî ye.***

Mêvanê sehîdan, mehrûmı bû ji du îdan.

"Mêr im, kurê mêran im, îro jî qatix, sibê jî qatix."

Mêrikekî ku zehf ji jina xwe ditirse hebûye. Jina wî wisa çavê wî tirsandiye ku çi bibêje ew jî heman tiştî dubare dike û ji gotina wê qet dernakeve. Rojekê jinik hinek qatix dide mêrik û dibêje hanê ji te re dew. Mêrik dinêre ku jina wî qatix daye pêşiyê û dibêje dew. Mêrik bi awayekî tirsek ji jina xwe re dibêje:

"Jinik ma ev ne qatix e?" Jinik bi ser de diqîre û dibêje:

"Min ji te re got ev dew e, dew e, zêde xeber nede." Ji ber tirsa jinikê mêrik nikare zêde li ber xwe bide, hema ji nişkan ve direve derve û dike gazîn:

"Mêr im, kurê mêran im, îro jî qatix, sibê jî qatix."

Ji bo rewşa bi nakokî tê gotin. ***Mêvanê sehîdan, mehrûm bû ji du îdan.** Meseleya Xelîl jî hema wisa bû.*

Mêvanên mal di gund de bûn

Ji bo kesên li mala cîranan her roj dibin mêvan tê gotin. **Pêşiyan ji bo **mêvanên mal di gund de** çawa xweş gotine: "Mêvan, mêvanên Xwedê ne, mêvanên mal di gund de, mereza kulê ne."*

Mêvano, tu yê nan (xwarinê) bixwî?

Ji bo kesên ku ji mêvanan hez nakin û temahkariyê dikin tê gotin. **Kuro tu çima ne eşîr î, tu qet fedî nakî? Tu çawa dibêjî **mêvano tu yê xwarinê bixwî**?*

Mêvano, tu têr î yan birçî yî?

bnr. Mêvano, tê xwarinê bixwî?

Mêzera dê, li ber qîzê

Şans û derfetên dê çi bin ên qîzê jî dê nêzîkî wê bin. ***Mêzera dê li ber qîzê.** Rebena qîza Seyranê jî wekî diya xwe tu rojeke xweş nedît.*

Mêzîna xêr û gunehan danîn

Xêr û guneh pîvandin. **Gelo roja ku **mêzîna xêr û gunehan danîn** ew ê çawa bike?*

Mêzîna (yekî) xera bûn

Di hêla aqil û hwd. de di nav hekwesteke neyînî de bûn. Xwe şaş kirin. ***Mêzîna Gulistanê xera bûye**, êdî hay ji xwe tune ye.*

Miha kol, li struyan gerî, ji guhên xwe bû.

bnr. Mirîşkê çav da qazê, ket hêta xwe şikand.

Miha (miya) xwe bi bizinê guherandin

Ji bo kesên ku hesabê xwe nizanin tê bikaranîn. **Di dîwanan de xwe zana nîşan dide, lê **miha xwe jî bi bizinê diguhere**.*

Mij û dûman e, dema gur û roviyan e.

Dilnexwaz û zexelên xayîn, zêdetir di demên tevlihev û xeter de ziyanê didin. **Divê em di van rojên zor de xwe baş biparêzin, çimkî **mij û dûman e, dema gur û roviyan e**.*

Mij û morana li ser ... belav bûn

Rewş hêdî hêdî baş û kifş bûn. ***"Hê hefteya çûyî sê gundî li gundê Melazgirê Nûrdîn, ji hêla cerdevanan ve hatin kuştin. Dîsa du zarok li Geverê hatin kuştin. **Mij û morana li ser vê bûyerê belav dibe**, helwesta dewletê jî zelal dibe."** Samî Tan

Mil dayîn hev

bnr. Mil kutan hev

Mil dayîn ber ...

Binbarî pejirandin, alîkarî kirin. ***"Mixabin îro prêzeya jinên tirk ên kedkar li dijî vê ye.*

Berevajî vê jina kedkar li dijî aştiyê diraweste. ***Mil dide mîlîtarîzmê****, ..."* Fatma Savcı

Mil di ber de hatin

bnr. Milên (yekî) di rex de hatin

Mil di mil de, mil di hev de

Qusûr û kêmasiyên di nav xwe de eşkere nekirin. **Ne hewce ye, xelk li kêmasiyên me bihese.* ***Mil di mil de, mil di hev de.***

Mil kutan hev

Bi hev û din re alîkarî kirin. Desteg bûn. **Heke em* ***mil nekutine hev****, em dê zor di vê pêvajoyê bi serkeftî derbas bin.*

Mil û bask lê şikestin

bnr. Milên (yekî) di rex de hatin

Milê xwe ji bin bar kişandin

Ji berpirsyariyê vekişîn. Bar hilnegirtin. **"Lê belê wiha xuya ye ku niyeteke wisa bi hevalan re nîn e. Nexwe divê êdî ez* ***milê xwe ji bin vî barî bikşînim****."* Sabah Kara

Milên (yekî) di rex de hatin

Ji ber bûyerek an jî nûçeyeke xeter xemgîn bûn, moral xera bûn. **Birayê wî ku ew qeza bihîst,* ***milên wî di rex de hatin****.*

Milên (yekî) lê ranebûn

Zêde betilîn. **Wê siwaxê wisa zor li min kir ku* ***milên min li min ranabin****.*

Milên xwe bi milên hev dan

Piştgirî û alîkarî kirin. **Heke wan herduyan* ***milên xwe bi milên hev nedana****, navbera her du malbatan jî ew qas xera nedibû.*

Milfîs bûn

Bêhêz, bêguman û xizan bûn. **Heçî ku hebû diz jî ketin mala wan, lap ew* ***milfîs bûn****.*

Milyaketên wan ji hev re kenîn

bnr. Kewên wan ji hev re xwendin

Min ard da te, min tu şêrezerên xwe jî dane te?!

Her tişt tenê bi alavan çênabe, ya girîng hostetî, huner û pisporî ye. **Ez çi bikim ku tenê bi terîfkirinê nabe.* ***Min ar da te, min tu şêrezerên xwe jî dane te?!*** (bnr. çîrok)

"Min ard da te, min tu şêrezerên xwe jî dane te?!"

Berê ango di dema ku ermen û kurd li bal hev dijiyan: yekî kurd û ermen dostê hev bûne. Gava yê kurd diçe mala yê ermen hewas û hejmekarê nanê mala ermen dimîne. Çimkî, nanê wan ne wek nanê asahî bûye, wek kate û kiloran xweş û bitahm bûye. Yê kurd li be xwe nade û ji dostê xwe yê ermen pirs dike:

"Heyran ez kengê têm mala we hûn kateyan çêdikin, di vê tunebûn û xelayê de hûn ew qas rûn û tiştên her wekî din ji ku tînin?" Dostê wî yê ermen wî dibersivîne:

Min bizanibûya (ku) bavê min wê bimire, min ê guhê wî tijî genim bida.

Mirov ku di berê de hay ji tiştan bibe, dê wekî wê tedbîra xwe bike. **Tu rast dibejî, lê heke ku mirov bizanibe... **Min jî ku bizanibiya bavê min wê bimire, min ê guhê wî tijî genim bida.***

Min cihê xwe jê re kir war, ew ji min re bû neyar.

Li hemberî qenciyê xirabî kirin. **Ew jî bersiva qenciya min e. **Min cihê xwe jê re kir war, ew ji min re bû neyar.***

Min çi lezet (ji) te dît, tu wê lezetê ji Xwedê bibînî.

Tu çi dikî, ew bê pêşiya te. **Ez çi bibêjim? **Min çi lezet ji çi te dît, tu wê lezetê ji Xwedê bibînî.***

Min çi xêr dît ji bênderê, çi bibînim ji kozerê?!

Min çi xêr ji ya zêde dît ku ji ya hindik jî bibînim? **Qet aqilê min nabire. **Min çi xêr dît ji bênderê, çi bibînim ji kozerê.***

Min çi kir ji pezê pir, ez ê çi bikim ji kavira kur?!

bnr: Min çi xêr dît ji bênderê, çi bibînim ji kozerê?!

Min dayê bi tetikan, pey digerim bi pepikan.

bnr: Bi tetikan dayîn, bi pepikan li pey gerîn

Min dinya tev hilanî û danî, pîrî hat û çû ciwanî, paşî min tiştek jê negirt û min neanî.

Min ji dinyayê tiştek fêm nekir. **Ez têgihîştim. **Min dinya tev hilanî û danî, pîrî hat û çû ciwanî, paşî min tiştek jê negirt û min neanî.***

Min dît tu nebînî.

Ji bo rewşa xerab tê gotin. **Hema ez ew qasî bibêjim, **min dît, tu nebînî**.*

Min feraseta xwe ji bêferasetan girt.

Mînakên neyînî, ji bo dîtin û fêmkirina helwestên rast, gelekî balê dikişînîn û dibin alîkarê mînakên baş. **Bi rastî jî kirinên wan ên rezîl, gelekî ez xistim bin bandora xwe û **min feraseta xwe ji wan bêferasetan girt**.*

Min got kew e, bibêjim nikul jî sor e?!

Ma ewqas agahî ne bes e? **Tu çi dibêjî? **Min got kew e, bibêjim nikul jî sor e?***

Min got rêç e, wî got kêç e.

Ji hev û din fêm nekirin. **Ez çi dibêjim, ew çi dibêje. **Min got rêç e, wî got kêç e.***

"Hevalê hêja, ev ne kate û kilor e, ev nanê ji genimê ne bi xwe ye. Em dipêjin û nanekî wiha dertê." Yê kurd jê bawer nake. Lê yê ermen barek ard bar dike û diyarî hevalê xwe yê kurd dike. Yê kurd bi eşq û hewas, barê ard dibe mala xwe. Jin û kebaniyên wî ji wî ardî nan dipêjin, lê mêze dikin ku zêde cudatiya wî nanî û nanê wan ê berê tune ye. Yê Kurd diçe ji dostê xwe yê ermen re dibêje:

"Ka te ji min re got ev ardê genimê min taybet e? Maliya me ji vî ardî nan pelut, lê tu cudatiya wî tune bû." Yê ermen dibêje: *"Min ard da te, min tu şêrezerên xwe jî dane te?!"*

Min ji kê re got: "Bira", ji min re gotin: "Birakuj"
bnr: Min cihê xwe jê re kir war, ew ji min re bû neyar.

Min kir, te kir, Şêzerê (bi) navê xwe kir.
Hinek kesên bêked, ked û kirinên hinekên din wekî yên xwe didin xuyandin. **Çi bibêjî ji mirovan dertên. **Min kir, te kir, Şêzerê navê xwe kir.***

Min nan ne bi guhê xwe, bi devê xwe xwariye.
Ez ne bêfêm im, têdigihîjim bê rewş çi ye. **Ma tu çi dihesibînî? **Me ne bi guhê xwe, bi devê xwe nan xwariye.***

Min ne dît ne bihîst, te bi xwe de mîst.
Hê tiştek li holê nebûyî kelijîn. **Mala te neketo, **min ne dît ne bihîst, te bi xwe de mîst.***

Min ne jê ye, min ne pê ye.
Tu têkiliyeke min pê re nîn e. **Ji min re çi ? **Min ne jê ye, min ne pê ye.***

Min rocî (rojî) girt, te îd (cejn) kir.
Ji bo kesên bê ked û bê zehmet li tiştên heyî xwedî derdikevin tê gotin. **Ez çi bibêjim ev dinya dinyayeke bêdad e. **Min rojî girt, te îd kir.***

Min xelk hîn kir lîstikê, dû re kesî bi destê min negirt.
Ji bo kesên neşikirandî û keda valaçûyî tê gotin. **Gelek mirov jî wisa bêbext in. **Min xelk hîn kir lîstikê, dû re kesî bi destê min negirt.***

Min xwedî kir bi bistanên xwe, jinê ji min stend bi navrana xwe.
Dayîk ji bo lawên xwe yên ku zêde dikevin bin bandora jina dibêjin. **Erê lawo, tu di şîrê min de birî, **min xwedî kir bi bistanên xwe, jinê ji min stend bi navrana xwe.***

Mineta (yekî) kişandin
Li hemberî kesekî deyndar û kêm man. **Ji bo xêra keça xwe, min şeş salan **mineta wan kişand.***

Mineta xwe jê negirtin
bnr: Talaşa xwe negirtin.

Mineta xwe ji bavê xwe jî negirtin
Jê venekişîn, şerm nekirin, ji tu kesî netirsîn. **Ew jineke bêminet e, welehî qet **mineta xwe ji bavê xwe jî nagire.***

Mir kerê qazî, her kes çû tazî, qazî bi xwe mir, kesî lê pirs nekir.
Têkilî û nêzîkahiya ku girêdayî berjewendiyan e, dawî pûç e. **Têkiliya ku girêdayî berjewendiyê be, heya hebûna berjewendiyê ye. **Mir kerê qazî, her kes çû tazî, qazî bi xwe mir, kesî lê pirs nekir.***

Mirada (yekî) hasil bûn (hasilîn)
Daxwaz hatin cih. Gotin qebûl bûn. **"**Mirada min hasilî!** Nêrgizê xwe li ber perên esmanan hesand. -Belê daxwaza me bi cih hat."* Husein Muhammed

Mirarê (yekî) bi devê xwe girtin
Gelek qencî û fedekarî kirin. **Bi rastî jî Mikaîl ji wan re wisa baş e ku **mirarê wan bi devê xwe digire**.*

Miraz bi xweliyê şad bûn
Mirin. ***Miraz bi xweliyê şad bûyê**, di vî temenî de wisa jî fêlbaziyê dizane.* (nifir)

Miraz (mirad) di ber de man
bnr: Bi mirazê xwe şad nebûn

Miraz di ber de qurçimîn
bnr: Bi mirazê xwe şad nebûn

Miraz di çavan de man
bnr: Bi mirazê xwe şad nebûn

Mirazê (yekî) di dil de man
Tiştê pir daxwazkirî pêk nehatin. **Ew **mirazê Kejê di dilê wê de ma**.*

Miraz di qirikê de man
bnr: Bi mirazê xwe şad nebûn

Miraz di zik de man
bnr: Mirazê (yekî) di dil de man

Miraz pê nekirin
bnr: Bi mirazê xwe şad nebûn

Mirazê (yekî) qurçimandin
Daxwaz û armanca yekî asteng kirin. **Wê jinika cezû di dawiyê de **mirazê wê keçika xweşik jî qurçimand**.*

Miremir kirin
Nerazîbûna xwe bi awayekî nezelal nîşan dan. **Ji ber meseleya dikanê, Nado hinekî **kire miremir**, lê bavê wî li ber gerî û ew ker kir.*

Mirin danîn pêş çavên xwe
Mirin jî di nav de, xwe ji her encamê re amade kirin. **Ji bo vê dozê wan ciwanan **mirin dane ber çavên xwe**.*

Mirin heq, gor ferz
Çi dibe bila bibe, em hemû dê bimirin. **Ma tu xelasbûna me heye? **Mirin heq, gor ferz.***

Mirin heye, mayîn heye
Çi dibe çi nabe, divê her tedbîr bê hildan. **Divê em hesabê xwe bi hev û din re bibînin. Dinya ye, **mirin heye, mayîn heye**.*

Mirin jê re zêrê zer bûn
Hewcedarî mirinê bûn, ancax bi mirinê xelas bûn. **Ew qas zeman e bi cih ve hatiye girêdan, êdî* ***mirin jê re bûye zêrê zer****.*

Mirin lê mêvan bûn
Mirin. ****Mirin dê kengî li mirov bibe mêvan*** *hîç kifş nabe.*

Mirin li ber çavê xwe dîtin
Ketin rewşeke pir xeter û dijwar. **Bi rastî jî di wê demê de min* ***mirin li ber çavê xwe dît****.*

Mirin mirin e, lê ev çi kirin e?!
Her helwest divê wekî egera xwe bê pêkanîn. **Ji xwe re berk bisekine lawê min, ew helwesta han ne rast e,* ***mirin mirin e, lê ev çi kirin e****?*

Mirin mirin e, lê xirexir çi kîrê min e?!
bm: Mirin mirin e, lê ev çi kirin e?

Mirina kurmûrî were, diçe li ser riyan digere.
Hin hewldan hene ku pir bixeter in. ****Mirina kurmûrî were, diçe li ser riyan digere.*** *Ya ku Evdirehîm dike jî, bi mirinê re lîstin e.*

Mirina xwe xistin destê xwe
bm: Mirin danîn pêş çavê xwe

Mirina xwe xwestin
Di nav rewşeke pir xerab de bûn. **Xaltiya Siltan ji dest wê nexweşiya bêmefer,* ***mirina xwe dixwaze****.*

Mirinê dibîne, bi tayê qayîl dibe.
Ji bêgavî ya hindiktir xerab pejirandin. **Lomeyan li wî nekin, mirov* ***mirinê dibîne, bi tayê qayîl dibe****.*

Mirinê ... paqij kirin
Tenê mirin di heq de derketin. **Ji bilî* ***mirinê tu tiştek wî xwînxwarî paqij nake****.*

Miriyê canê xwe bûn
Gelekî ji xwe hez kirin. **Jinik* ***miriyê canê xwe ye****, kelem di tiliyê de here hefteyekê ranabe.*

Miriyê cil û bergan bûn
Cil û berg li xwe kirin gelekî bi hendaze girtin. Wergirtin û xemilandin girîng girtin. **Ew* ***miriyê cil û bergan e****, ji bo qatek qumaş wê canê xwe bide.*

Miriyê gewriyê bûn
bm . Miriyê zikê xwe bûn

Miriyê goran bûn
1. Bêkêr û bêemel bûn. **2.** Gelekî jar û nexweş bûn. **Heyran, gumana xwe ji Serhat*

bibirin, ew ***miriyê goran e****. *Wê nexweşiyê Sitî wisa kiriye ku* ***bûye miriya goran****.*

Miriyê jinan bûn

Ji bo mêrên ku zehf ji jinan û têkiliya cinsî hez dikin tê gotin. **Porkurê li ser wî baldar be, ew* ***miriyê jinan e*** *ha.*

Miriyê par havînê, teze hatiye şînê.

Ji bo kar û vatiniyên derengmayî tê gotin. **Weyla mala minê!* ***Miriyê par havînê, teze hatiye şînê.***

Miriyê pereyan bûn

Pere gelekî girîng girtin, çikus bûn. **Ew* ***miriyê pereyan e****, qala pereyan bikin temam e.*

Miriyê xelkê mirin, me porê xwe verû, dema miriyê me mirin, me dest avêtê, por bi me ve nemabû

Divê mirov berî xelkê, li xwe û berjewendiyên xwe bifikire. **Ew jî safî û kêmaqiliya me bû.* ***Miriyê xelkê mirin me porê xwe verû, dema miriyê me mirin, me dest avêtê, por bi me ve nemabû.***

Miriyê zikê xwe bûn

Pir çilek bûn. **Zeydanê çi ye, hema* ***miriyê zikê xwe ye****.*

Miriyên xelkê dimirin, çavên wan diqelişin.

bnr: Miriyê xelkê mirin me porê xwe verû, dema miriyê me mirin, me dest avêtê, por bi me ve nemabû.

Miriyê kêrsimê bûn

Zêde ji xemilandinê hez kirin. **Porkurê, ew jî* ***miriyê kêrsimê ye****.*

Miriyo ma tu mirî, çima tu nikarî xwe li ser çardarê jî bigirî?!

Ma tu nikarî ew qas jî li ber xwe bidî? **Kuro got:* ***"Miriyo ma tu mirî mirî, çima tu nikarî xwe li ser çardarê jî bigirî?"*** *Mala te neşewitiyo, tu nikarî tasê jî li ber xwe bigirî?*

Miriyo tu careḳê çûyê, rehme li te, du caran çûyî dîsa rehme li te, lê cara sisêyan gû li gora te.

Mirov carekê yan jî du caran xetayan bike normal e, lê ku eynî xeta zêde bibin, ew bêkêrî ye. **Ma ev cara çendan e? Got:* ***"Miriyo tu carekê çûyê, rehme li te, du caran çûyî dîsa rehme li te, lê cara sisêyan gû li gora te."***

Mirî ber bi qebrê ve dibirin, termê mirî ber bi malê ve bû. (Mirî ber bi gorê ve dibe, çavên wî li malê ye.)

Mirov heya roja mirinê jî dixwazin tiştinan bikin û bi mal û halê dinyalikê re mijûl bibin. ****Mirî ber bi qebrê ve dibirin, termê mirî ber bi malê ve bû.*** *Ew jî taybetiya însanan a jiyanê ye.*

Mirî ji gorê rakirin

bnr: Mirî û zindî di qulekê de nehiştin

Mirî kenandin
Gelekî komîk bûn. *_Ev biraziyê min î ecêb, **miriyan dide kenandin**._

Mirî mirin, Egît bişînin kefen.
Ji bo kesên pîgiran ku karê lezgînî dereng dikin tê gotin. *_Wey li minê! **Mirî mirin, Egît bişînin kefen.**_ (qerf)

Mirî rakirin pê
bnr. Mirî sax kirin

Mirî sax kirin
Ji bo bijîşk (doxtor) an jî melayên pêkhatî tê gotin. *_Melayê gundê Gongime, **miriyan sax dike**. Tu bi ya min bikî, keçika xwe bibe ser wî._

Mirî şiyar kirin
Gelekî deng derxistin, qerebalixî kirin. *_"Bavê Emşa kirasê wê hilda û çiçikên wê dan derlêkirinê. Ahîna Hemîda dihat ku **miriyan şiyar bike**."_ Helîm Yûsiv

Mirî û zindiyên (yekî) di qulekê de nehiştin
Sixêf kirin, çêr kirin, xeber gotin. *_"**Tu mirî û zindiyên wê di qulekê de nehiştin** û her yek anî bi pênc qurişên qul asê kirin."_ Musa Vazgali

Mirîşk nikulê xwe di avê de dike berê xwe ber bi Xwedê ve dike.
Divê mirov Xwedê û heqiyê ji bîr neke. *_Kuro lawo însaf, ew qas jî nabe. **Mirîşk nikulê xwe di avê de dike berê xwe ber bi Xwedê ve dike.**_

Mirîşka me ye, diçe di kadîna xelkê de hêk dike.
bnr. Dîkê min e, li ser kulîkê xelkê bang dide.

Mirîşka reş e, her roj nexweş e.
Ji bo yên heman tiştî tim ji xwe re dikin hincet û kar tê gotin. *_Nêrgizê êdî em zivêr kirin. **Mirîşka reş e, her roj nexweş e.**_

Mirîşkê çav da betê, bihostek ji qûnê kişiya.
bnr. Mirîşkê çav da qazê, ket hêta xwe şikand.

Mirîşkê çav da qazê, ket hêta xwe şikand.
Heke mirov li gorî hêz û zerengiya xwe tevnegerin, wê rastî encamên xeter bên. *_Ezbenî, divê her kes hêz û hempayê xwe bizanibe. **Mirîşkê çav da qazê, ket hêta xwe şikand.**_

Mirîşkê got: "Qey min çê kir", çû ser dîwarê Hesen axa hêk kir; ew bû sedem ser jê kir.
Carinan bi pakî û niyeteke baş nêzîkbûn jî dibe sedema ziyan dîtinê. *_Carinan qencî dibin gincî. **Mirîşkê got: "Qey min çê kir", çû ser dîwarê Hesen axa hêk kir; ew bû sedem ser jê kir.**_

Mirîşkê hêk kir, heval ji xwe re çêkir.
Her kes bi yên wekî xwe re têkildar e. *_**Mirîşkê hêk kir, heval ji xwe re çêkir.** Xelk wê tawanbar dike, ew jî dest diavêje min û min jî wekî xwe nîşan dide._ (qerf)

Mirîşkên min tune ne, dora mala min zîrç e.
Li cihê sekinî, ez derd û kulên der û cînaran dikişînim. **Ev çi ye ez dikişînim ya rebî? **Mirîşkên min tune ne, dora mala min zîrç e.***

Mirov bixwe bixwe, wê qatiyê xaniyan jî bixwe.
Tiştên amadeyî zû diqedin. ***Mirov bixwe bixwe, wê qatiyê xaniyan jî bixwe.** Malê mirov ku bûn pere û amade bûn zor e.*

Mirov nikare ji (yekî) re bibêje, siya te xwar e.
Pir hasas bûn, tu kêmasiyên xwe qebûl nekirin. ***Ji camêrî re mirov **nikare bibêje siya te xwar e**. Hema li hemberî mirov helwestan digire.0*

Mirov ji Momî re nebêje merheba.
Ji bo kesên ku rû dibînin, bitrî dibin tê gotin. ***Eman mirov ji Momî re nebêje merheba,** ku got, êdî zor xwe xelas bike.*

Mirov ku da navê, ha li çokê ha li qirikê.
bnr: Me daye navê, ha li çokê, ha li qirikê.

Mirov ku da navê, ha li saqê, ha li çokê.
bnr: Mirov ku da navê, ha li çokê ha li qirikê.

Mirov xwarin
1. Kesek gelekî aciz kirin. **2.** Mirov çavînokî kirin. ***Ez ji ku rastî wê hatim, ev jinik **mirovan dixwe**, kuro! *Eman lawo bila Hezîme qundaxa te nebîne, tu dizanî ew **mirovan dixwe**.*

Mirovekî piçûk nebûn
Ji bo kesên zana û birûmet tê gotin. ***Hûn wî nas nakin, lê ew ne **mirovekî wisa piçûk e**.*

Mirovê (yekî) bûn
Alîgirê yekî bûn an jî di bin erka kesekî de bûn. ***"Ew **mirovê min e**, li gotina min guhdarî dike."** Zana Farqînî

Mirovê malê mirî bûn
Ji bo kesên kêmfirsend tê gotin. ***Hemûdê Guro hema **merivê malê mirî ye**, li ku tiştekî bêpere bibîne, xwe diavêje ser.*

Mirovên ne xalî bûn
Ji mirovên ku keramet û feraseta wan tê bawer kirin re tê gotin. ***Gelekî têkildarî Xeyrî nebin, ew ne **mirovekî xalî ye**.*

Mirtemirt kirin
bnr: Kutekut kirin

Mirtibê zir e, ne li defê ye, ne li zirnê ye.
Ji bo kesên bêhesab û bêmêzîn tê bikaranîn. ***Ma ji wî re çi? **Mirtibê zir e, ne li defê ye, ne li zirnê ye.***

Mirûzê xwe kirin
Pirçiyê xwe kirin. Ji ber hinek pirsgirêkan moral xerab bûn. **Îsmaîl axayê rehmetî got: "Çi bû, çi qewimî, te çima **mirûzê xwe kiriye**?* Veysel Çamlıbel

Mirûzê xwe tirş kirin
bnr: Pozbirçî bûn

Misqalek namûs di bêvilê de tune bûn
Ji bo kesên bêxîret tê bikaranîn. **Mixabin min ew wisa nizanibû, lê hîn bûm ku **misqalek namûs di bêvila wî de tune ye**.*

Mişk bigire, ez ê xweliyê berî çavan dim.
Li hincetan gerîn. Tiştên nebûyî xwestin. **Ya ku wî pê girtiye, ew e ku dibêje: **"Mişk bigire, ez ê xweliyê berî çavan dim."***

Mişk çû seferê, pisîk ket kewna berê.
Serdest ku nebin, bindest wê rehet bin. **Ev jî tiştekî siruşt e, **mişk çû seferê, pisîk ket kewna berê**.*

Mişk digote kêçê: "Kêça devzer, te xwar sîng û ber, te malê ji war kire der." Kêçê lê vegerand: "Mişko diranhûro, te xwar têr û tûro, te mal ji war kir dûro."
Ji bo xerabtirbûna her hêlan tê bikaranîn. *****Mişk digote kêçê: "Kêça devzer, te xwar sîng û ber, te malê ji war kire der." Kêçê lê vegerand: "Mişko diranhûro, te xwar têr û tûro, te mal ji war kir dûro."*** *Hema ew her du jî ji hev xerabtir in, lê kirina wan bi xwe, nayê ber çavên wan.*

Mişk gincî kirin
bnr: Kêç gincî kirin

Mişk li dikana wî bigere, boçik wê lê bê xuyan.
bnr: Boçika mişkan di malê de arvan nebûn

Mişkan di malê de govend girtin
bnr: Boçika mişkan di malê de arvan nebûn

Mişkê kor hingî axê dikole, bi ser serê xwe de dike.
Mirov çi dike bi xwe dike. **Ew hew dizane ku tiştekî pak dike, lê nizane ku wekî **mişkê kor hingî axê dikole, bi ser serê xwe de dike.***

Mištaxe bûn
Zehf zêde bûn; li her derê belawela bûn. **Îsal dara me ya sincan wilo girtiye ku sincên me **bûne mištaxe**.*

Mit û mat man
bnr: Mit man

Mitê xwe li dinyayê neman

Temenê xwe qedandin. Nêzîkî mirinê bûn. **Jixwe rewşa wî berê jî nebaş bû, lê niha tam **mitê xwe li dinyayê nemaye**.*

Mizemiz kirin

Helwestek an jî gotineke vebirî û zelal nîşan nedan. **Heke wê çaxê te wisa **mizemiz nekira**, me dê ew îhale eseh bi dest bixista.*

Mizdan, badan

Lêdan xwarin. Çewisandin û zor dîtin. **Erê ne rast e, lê heke **mizdan, badan** jî nebûya ew tu carî nedihat ser rê.*

Mî bi piyê xwe, bizin bi piyê xwe, her kes diçe ser emelê xwe.

Kes ne wekîlê kesî ye, kê çi qencî yan jî xerabiyê bike tenê wê ji bo wê hesabê xwe di hizûra Xwedê bide. **Wê ew teyama kiriye, tu çima ditirsî? **Mî bi piyê xwe, bizin bi piyê xwe, her kes diçe ser emelê xwe.*** (bnr. çîrok)

Mî bûn kavir, kavir jî bûn vir.

Ji bo sozdayîna derewîn tê gotin. *****Mî bûn kavir, kavir jî bûn vir.*** *Wekî em ne gêjbûna, divê me soza vî derewînî bawer nekira.*

Mî dikale, berx li mal e.

Ji bo dilovanî û girêdana dayîkan tê bikaranîn. **Wa ye eşkere tê xuyan. **Mî dikale, berx li mal e.***

Mî mirî, şîr fîrî (Mî birî, şîr fîrî)

Ji ber sedema karê neyînî encameke neyînî girtin. *****Mî mirî, şîr fîrî.*** *Heke ku tu wisa bikî, helbet tu yê wê encamê bigirî.*

Mî û mehîn jê man

Ji bo kesên xizan wekî qerf tê bikaranîn. **Lawo hûn çi dikin şer? Çima **ji min mî û mehîn mane** ku hûn nikarin hesabê xwe çêbikin?* (qerf)

Mîna agirê bi pûş ketî

Ji bo rewşa lêhatî tê gotin. **"Di vê demê de şerê birakujiyê mîna **agirê ku bi pûş bikeve** gur dibû. Û di ser halan re, geh ji vir, geh ji wir ba lê radibû."* Bavê Nazê

Mîna agir û barûdê bûn

Pir hêrs bûn. **Hema di wê demê de Osê **mîna agir û barûdê bû**.*

"Mî bi piyê xwe, bizin bi piyê xwe, her kes diçe ser emelê xwe."

Xelîfeyê ebasiyan Harûn Reşît, ji ber bêdengî û xemgîniya birayê xwe Behlûl Dana li ber xwe dikeve. Di dawiyê de fermanê dide ku kî kenandina birayê wî bibîne û wê mizginiyê jê re bîne, ew ê xelatan bide wan. Rojekê dibînin ku Behlûl Dana li ber vîtrîna qesabekî sekiniye, li cendekên mî û bizinên gurandî dinêre û bi awayekî geş û serfiraz dikene. Yê ku vê dimenê dibîne hema wê demê diçe mizginiyê dide xelîfe. Xelîfe bang dike birayê xwe Behlûl Dana û jê dipirse ku çima wer kêfxweş bûye û keniyaye. Behlûl dane birayê xwe wer dibersivîne:

"Ji ber ku ez birayê mirovekî weki te bêedalet im, ez li ber xwe diketim. Min digot, dê li wê dinê hesabê te jî dibe ku ji min ji bipirsin. Lê min di vîtrîna qesab de dît ku mî bi piyê xwe, bizin bi piyê xwe ve hatibûn dardekirin.. Wê çaxê ez têgihîştim ku mî bi piyê xwe, bizin bi piyê xwe, her kes diçe ser emelê xwe Ji bo wê ez dilşad bûm û kêfa min hat. Loma ez keniyam."

Mîna aş hêran
Ji bo kesên ku xwarinê zêde û zû dixwin tê gotin. **Malneşewitiyê Elî hema* ***mîna aş dihêre****.*

Mîna ava pîvazê bûn
Hêsan û bêrûmet bûn. **Di wê malê de ez* ***mîna ava pîvazê bûme****.*

Mîna bayê bezê
Pir bilez û bez bûn. **"Piştî ku hal û meseleya xwe got,* ***mîna bayê bezê*** *ji min qetiya."* Evdile Koçer

Mîna bayê ku li keviran bixe
Talaş nekirin. Tu bandorek lê nekirin. **Hemû gotinên min,* ***mîna bayê ku li keviran bixe****, lê kelîj nakin.*

Mîna bazara mişk û pisîkê
Ji bo hewldanên vala tê gotin. **Belengazo, bazara te, bûye* ***mîna bazara mişk û pisîkê****.*

Mîna benîşt cûtin
Gelekî qal kirin. **Ew qezenciyên min li ber çavên van exrebeyên min nayên, lê hema tenê dewlemendiya min* ***mîna benîşt dicûn****.*

Mîna beranê çargurçikî
Pir bicesaret û xurt bûn. **Maşelah Azad* ***mîna beranekî çargurçikî*** *kete nav wan û ew ji hev belav kirin.*

Mîna berê (kevirê) li nav heriyê ketî
Bi gotin an jî bi bûyerekê her tişt tevlihev kirin. Her der lewitandin. **Eman ji we tika dikim, Şîlanê nedin xeberdan, wê dîsa* ***mîna kevirê li nav heriyê ketî*** *her derî bilewitîne.*

Mîna berfa belekiyan
1. Ji bo kesên pir bedew û spehî tê gotin. **2.** Pir paqij bûn. **Zelal wisa bedew e ku* ***mîna berfa belekiyan*** *diçûrise. *Tu li kinc û timtêla wê, mal û firaqên wê û nivînê wê dinêrî,* ***mîna berfa belekiyan e****, diçirûs e.*

Mîna berxê mîjo
Dayîk kifş nebûn. Li her derê kilijîn. **"Bila êdî* ***mîna berxê mîjo*** *serî carê li ber hingilekî navkutkî nebim."* Musa Vazgali

Mîna cihêzê bûkê veşartin
Girîng girtin. **"Encama ku di destpêka çîrokê de ye,* ***mîna cihêzê bûkê tê veşartin****; û ew encam bi hezaran dîmenên nihênî di serê xwîneran de diafirîne."* Dilawer Zeraq

Mîna cêwrikê li şûna waran mayî
Ji bo kesên ku ketine rewşeke xerab tê gotin. **Xwezî te ew halê Nesîm bidîta,* ***mîna cêwrikê li şûna waran mayî*** *bû.*

Mîna çavekî seriyan bûn

Baş, pêkhatî, rûmetkar û rûnerm bûn. **Bi rastî jî min gelekî ew eciband, camêrî* ***mîna çavekî seriyan bû****.*

Mîna çavê xwe lê nêrîn

Baş lê miqate bûn. **Tu qet nekeve tatêlê ez Xelef baş nas dikim, ew ê* ***mîna çavê xwe li hespa te binêre****.*

Mîna çirayê şemal dan

Pir bedew bûn. **Maşelah Zozanê di wê dawetê de* ***mîna çirayê şemal dida****.*

Mîna çivîka ji qefesê azadbûyî

Dilgeş û şad bûn. Bi dilê xwe bûn. **"Gava mamosteyê me mizgîniya belavkirina dibistanê ya havînê da me, ne tenê ez, hemû suxteyên dibistanê* ***mîna çivîkên ji qefesê azad bibin****, çirevîtik didan xwe ..."* Qedrî Can

Mîna çîka agir bûn

Pir çalak û pêkhatî bûn. **Maşelah Fexredîn* ***mîna çîka agir e****.*

Mîna devcya ku ji hamidê (barê) xwe bixwe

Hilberînek nekirin, tenê ji serınayeya xwe xwarin. **Bi vê meşê* ***mîna deveya ji hamidê xwe xwarî****, tiştekî nahêle.*

Mîna devê meşka misêwa

Gelekî gur û bibandor. **"Çend sal berê baraneke gur bariya. Du-sê hefte bi şev û roj, bê çavvekirin,* ***mîna devê meşka misêwa*** *ev binbarek dibariya."* Rojen Barnas

Mîna dêla ba

Pir daxwazkarê têkiliya zayendî bûn. **Cawîdan dîsa* ***mîna dêla ba*** *li kuçeyan digere.*

Mîna dêla li ser tûla

Pir hêrs û bitatêl bûn. **Xunav wekî* ***dêla li ser tûla*** *dev diavêje her kesî.*

Mîna dêla teliqî bûn

bnr. Mîna dêla li ser tûla

Mîna dîk û mirîşkên li hemberî hev sekinîn

Ji bo têkiliyeke zêde li benda hev bûn. **Maşelah Delîl û Sûsan jî* ***mîna dîk û mirîşkên li hemberî hev sekinî****, dev ji hev bernadin.*

Mîna dîkekî spî

Pir cuda, awarte û spehî bûn. **Zûrî* ***mîna dîkekî spî*** *di nav wan de kifş e.*

Mîna dîkê şil bûn

Di rewşeke perîşan de bûn. **Hêvî hema bûbû* ***mîna dîkê şil****.*

Mîna donxizan bûn

Pir qelew û kok bûn. **Maşelah Derman* ***mîna donxizan bûye****, êdî nikare qûna xwe bi xwe re bikişîne.*

Mîna dûpişkan, boçika xwe dayîn ser milê xwe
Mineta xwe ji tu kesî negirtin. **Îsal tiştek bi Zana bûye,* ***mîna dûpişkan, boçika xwe daye ser milê xwe*** *û guh nade tu kesî.*

Mîna dûpişkê pê vedan
Bi dizî û bi bandor ziyan dan yekî. **Eman ji wê birevin, ew* ***mîna dûpişkê bi merivan vedide.***

Mîna eciniyan bûn
Jar û bedcure bûn. **Piştî zewacê, Zerîfe* ***mîna eciniyan bû.***

Mîna fira kewê bûn
Ji nişkê ve bûn û winda bûn. **Hatina wî ji bo min* ***mîna fira kewê bû,*** *hatin û çûna wî yek bû, min qet tiştek jê fêm nekir.*

Mîna gamêşekî reş bûn
Pir stûr û mezin bûn. **Keçê te çawa jê hez kir, ma tu nabînî,* ***mîna gamêşekî reş e.***

Mîna garana keran bûn
Ji bo kesên nezan ku bê serî û bê armanc li hev digerin tê gotin. **Tu li wan menêre, ew ê* ***mîna garana keran li hev bigerin,*** *lê dîsa jî bê çare bimînin û bêne bal min.*

Mîna gawiran xebitîn
Ji bo kesên ku zêde dixebitin tê bikaranîn. **Zal* ***mîna gawiran dixebite.***

Mîna gayê li nav golikan bûn
Ji bo kesên temen zêde ne, lê ji xwe piçûktiran re têkildar dibin tê gotin. **Bekir* ***bûye gayê li nav golikan,*** *ji nav zarokan dernakeve.*

Mîna gizikê zivirîn
bnr: Mîna vizikê zivirîn

Mîna goşt û neynûkê bûn
bnr: Nola goşt û hestî bûn

Mîna guleya devê tivingê çûn
Zû çûn, bi lezgînî meşîn. **Çawa ku ew nûçe bihîst,* ***mîna guleya devê tivingê çû.***

Mîna guran goşt xwarin, mîna melekan xof kişandin.
Ji bo kesên durû û sextekar tê gotin. **Wisa li rûyê wî yê geş menêre. Ew* ***mîna guran goşt dixwe, mîna melekan xofê dikişîne.***

Mîna gurê çile pîrepîreyî
Belawela bûn. **"Halê meriyê bêwelat jî awa ye. Tu dibêjî welat şîrin e! Lê ku welatê me serbest bûya, cîranên bêbext em di nav hev de* ***mîna gurê çile pîrepîreyî*** *nekirana, gelê me wê çima ev zelûlî bidîta."* Rizaliyê Reşît

Mîna gurê sibatê
Zehf birçî bûn. Di rewşeke xeter de bûn. **Kuro çi ye, tu* ***mîna gurê sibatê*** *bi ser hev de ditewî?*

Mîna gurê yekane bûn
Zane û kone bûn. **Tu meraqan meke, ew **mîna gurê yekane ye** zû bi zû nakeve dafikan.*

Mîna hespê êxrî bûn
Ji bo kesên xişîm, bêserî û bêberî tê gotin. **Ev lawên Serdar dema ku digihîjin hev, **mîna hespên êxrî ne**, kes nikare li pêş wan bisekine.*

Mîna hespê şeytên bûn
Bi tiştên xeter re mijûl bûn. **Lawo te kursiyekî wer çêkiriye ku **mîna hespê şeytên e**, mirov nikare nêzîk bibe.*

Mîna hêka dilmeyî bûn
Gelekî sist û bêhêz bûn. **Cevriye **mîna hêka dilmeyî ye**, eman destê xwe nedinê.*

Mîna hêka qeşartî bûn
Bedew û spehî bûn. **"...te digot ana ji cih derkevin, nemaze dema ku wê (robê) xwe ji xwe avêt û laşê bedew ku **mîna hêkeke qeşartî bû** diyar kir."* Ebdulbaqî Huseynî

Mîna hêsîrên Girîdaxê bûn
bnr. Mîna hêsîrê Hemedanê bûn

Mîna hêsîrên Hemedanê bûn
Perîşan û pejmûrde bûn. **Xeyrî û zarokên xwe ketine rewşeke wisa ku **mîna hêsîrên Hemedanê ne**.*

Mîna hirça dehlê
Ji bo kesên hov û nezan tê gotin. **Ehmed **mîna hirça dehlê** ket nav wan zarokan.*

Mîna hîva çardehşevî
Ji bo keçik an jî jinên pir bedew tê gotin. **Pelîna qîza Zana, wisa xweşik e ku **mîna hîva çardehşevî** diçirûse.*

Mîna îmana xwe zanîn
Baş û bê şik zanîn. Pê emîn bûn. **Ez **mîna îmana xwe dizanim** ku ew ne mirovê wî xercî ye.*

Mîna îşiqa (roniya) çavên xwe lê mêze kirin
Pir rûmet dan. Girîng girtin. **Riza **mîna roniya çavên xwe li wê sazê mêze dikir**.*

Mîna kersekê di halê kevir de giriyayî
Ji bo kesên ku ne ji bo xwe, lê ji bo yên ji halê xwe baştir xemgîn dibin tê gotin. **Kuro tu jî hûyî **mîna kersekê di halê kevir de giriyayî**. Malxirabo, tu berê li halê xwe bigirî.*

Mîna kevirê goristanê bûn
Bêdeng, bêhes û bêtevger bûn. **"Nêrekerekî mîna vî Egîd Begê nehatiye serê dinê. Qise nakevine serî, ew **bûye mîna kevirê goristanê**."* Mehmed Uzun

Mîna kewa di qefesê de (Kewa qefesê)
1. Ji bo kesên di nav rewşa zilm û eziyetê de ne tê gotin. **2.** Ji bo kesên dernakevin derve

tê gotin. **Belengaza wê bûkê **mîna kewa di qefesê de** perîşan e. *Kuro lawo, ma tu bûyî **kewa qefesê** ji mal dernakevî?*

Mîna kewê mij pê de hatî

Wekî kewê di mijê de mayî ji rewşa perîşan û pejmûrde re tê bikaranîn. **"Wisa melûl û dama ye, **mîna kewê mij pê de hatî**."* Nizar Mehemed Seîd

Mîna kewê teqle

Xurt û qoçax bûn. **Maşelalı lawê Hesen **mîna kewê teqle**, çapik û çeleng e.*

Mîna kêranê şikestî

Bawerî pê nebûn. **Karê wî **mîna kêranê şikestî** ye, mirov pê ewle nabe.*

Mîna kihêlan bûn

Xurt û qoçax bûn. **Maşelalı jina Sedo **mîna kihêlan e**.*

Mîna koça bêserî bûn

bnr: Wekî mala bêsermiyan

Mîna koça cahilan

Ji bo kar û barên ne bi rêk û pêk tê gotin. **Ya rastî kar û barê mala vê meta min, hema **mîna koça cahilan** tevlihev e.*

Mîna malê mîrate

Ji bo tiştên ku bê serî û bê xwedî her kes ji xwe re bibe tê gotin. **Wê salê ew eşyayên ku min ji bo firotanê anîbûn, **mîna malê mîrate**, xelkê ji xwe re birin.*

Mîna marê kor

Xayîn û zexel bûn. **Baro **mîna marê kor** bi mirov vedide.*

Mîna marê nig di zik de (bûn)

Zikreş û xayîn bûn. **Şêxmûs wisa bê deng disekine, lê **mîna marê nig di zik de**, çi hebe ji bin ve dike.*

Mîna masiyan bûn

Qelew û kok bûn. **Wisa zêde dixwe, loma **mîna masiyan bûye**.*

Mîna masiyê ku av li ser bê birîn

Bê çare û bê derfet man. **Kurê wî ku alîkarî jê re nekir, Apê Cembelî **mîna masiyê ku av li ser bê birîn**, bê guman ma.*

Mîna meşka ku tu ba jê berdî

Ji bo rewşa têkçûn û moralxerabûnê tê bikaranîn. **Çawa ku min derewa wî derxist, **mîna meşka ku tu ba jê berdî**, hêdîka li cihê xwe rûniştı.*

Mîna meşka tu bikêyî, rûn pê nekeve

Ji bo karên bêencam tê gotin. ****Mîna meşka tu bikêyî, rûn pê nekeve**, min tu encam jê negirt.*

Mîna Mihoyê neşûştî[1]

Ji bo kesên qilêr û bêmerîfet tê gotin. **Çi ye, tu **mîna Mihoyê neşûştî** bêhnê difûrînî û bejî bejî diaxivî?*

Mîna milyaketên li perên esmanan bûn

Ji bo kesên baş tê gotin. **Bawer xortekî pir baş e, **mîna milyaketên perê esmanan e**.*

Mîna mirîşka kor

Ji bo mirovên xêv û sist tê bikaranîn. **Dev ji wî berde lo, bila hema ew wisa **mîna mirîşka kor** biponije.*

Mîna mişkê kor (bûn)

Ji bo kesên pînî û ku binî ve karan dimeşînin tê gotin. **Delîl bi zelalî helwesta xwe nîşan nade, **mîna mişkê kor e,** hemû karên xwe di bin erdê re dimeşîne.*

Mîna miriyê ku serî li kevirê selîmê ketî (heywax gotin)

Ji bo kesên dereng ji rewşê haydarbûyî û poşman tê gotin. ****Mîna miriyê ku serî li kevirê selîmê ketî**, Selehedîn jî hişyar bû, lê zehf bi derengiyê ketibû.*

Mîna mişkê xwe li pişo biqelibîne

Xwe şaş kirin. Ketin nav hewldana canê xwe rizgar kirinê. **Azadê reben **mîna mişkê xwe li pişo biqelibîne**, ketiye nav hûtnên wisa ku ancax Xwedê wî biparêze.*

Mîna nalên keran

Pir stûr û loperî bûn. **Ew çi zincîra wisa qalind e, te **mîna nalekî keran** xistiye stûyê xwe.*

Mîna nanê sêlê

1. Durû û nedurist bûn. **2.** Bêsebir û lezgîn bûn. **Hesen mirovekî **mîna nanê sêlê** durû ye, bi wî bawer nebin. *Ka Zana **mîna nanê sêlê** ye sebr nake ku hema ew gav dipeqe.*

Mîna peza gêj bûn

bnr. Mîna mirîşka kor bûn

Mîna peza kulek, li pey (yekî) kulîn

Ji bo kesekî bi dilovani alîkarî kirin, xwedî derketin. **Ev çend sal in ku ew jinik **li pey wê qîza xwe mîna peza kulek dikule**.*

Mîna pira selawatê bûn

Ji bo rewşa pir xeter û nazik tê gotin. **Ew pirsgirêk **mîna pira selewatê ye**, sextekariyê ranagire, dê serê gelekan biêşîne.*

Mîna pisîk û mişk li ber hev û din veketî bûn

Ji bo kesên ku tim hev û din aciz dikin û şer dikin tê gotin. **"Yek carê ava wan û dewletê di yek cokê de neherikî. Dewlet û ew **mîna pisîk û mişk li ber hev û din veketibûn**."* Medenî Ferho

---

[1] **Mihoyê neşûştî:** Mirovekî ji Farqînê ye. Ji ber ku bi mehan xwe neşûştiye. Ji ber wê rewşa wî ya kirêt, ji bo kesên ne paqij bûye mînaka qilêrbûnê.

Mîna pîra li pey koça mayî
Ji bo rewşa bêhêzî û perîşaniyê tê gotin. **Qijikê Evdirehman* ***mîna pîra li pey koça mayî*** *zimanê wî di dêv de reş bûbû.*

Mîna roja mehşerê bûn
Gelekî qelebalix û tevlihev bûn. **Mîhricana îsal* ***mîna roja mehşerê bû****, bi dehan zarok winda bûn.*

Mîna segan hev û du vegevizandin
Tim bi hev û din re pevçûn. **Halê wan tim wilo ye. Ew* ***mîna segan hev û din vedigevizînin****.*

Mîna seg û pisîkan hev û din xwarin
Bi hev û din re debar nekirin. **Bêrî û Kejê heya êvarê* ***mîna seg û pisîkan hev û din dixwin****.*

Mîna segê birçî xwe avêtin kulînan
Ji bo kesên ku ji ber bêderfetbûnê, ji bêgavî dikevin nav hewldana pêkanîna pêdiviyên xwe tê gotin. **Îboyê Xanemirê Fateqûnekê mîna* ***segê birçî li her derê dikilije û serî carê xwe diavêje kulînekê****.*

Mîna segê mol
Newêrek û tirsonek bûn. **Ew qas neheqî lê kirin, lê Hesen* ***mîna segê mol*** *boçika xwe xiste qûna xwe û bê deng ma.*

Mîna stêrkan biriqîn
Pir bedew an jî girîng bûn. **Maşelah, Janya di wê şevê de* ***mîna stêrkan dibiriqî****.*

Mîna şekir şîrîn bûn
Ji bo kesên cirxweş, zarşirîn û durist tê bikaranîn. **Heçî ew keçika Besnayê ya piçûk e* ***mîna şekir şîrîn e****.*

Mîna şîrê diya mirov helal (bûn)
Helal û xweş bûn. **"Ez dê qirêja xwe bi ava kaniyên Araratê bişom. Ew ava* ***mîna şîrê diya mirov helal****. Bila qirêja min ji barê dinê rake."* Bêmal Serhedî

Mîna şîrê miha qer bûn
Pir baş awarte û meqbûl bûn. **Xwedê jê re bihêle, du lawê wî hene, her du jî* ***mîna şîrê miha qer in****.*

Mîna taviya biharê
Ji bo tiştên demborî tê gotin. **Tu guh nede wan gotinên wê, hêrsa Arsenya hema* ***mîna taviya biharê*** *tê û diçe.*

Mîna teyrê eylo çengşikestî bûn
Di nav rewşek neyînî de bûn. **"Ew sal,* ***mîna teyrê Eylo çengşikestî****, mîna teyrê Sîmûrê pirtikandî, bi heza şeglaviyeke qeremşikandî derbas bûn, çûn.* Medenî Ferho

Mîna teyrê sîmûrê pirtikandî bûn
bnr: Mîna teyrê eylo çengşikestî bûn

Mîna tîra kulê
Pir bibandor bûn. **Apê Hecî **mîna tîra kulê** bi ser min de hat.*

Mîna vizikê li dor ... zivirîn
Çapik, çeleng û jêhatî bûn. **Bi rastî jî Xosrov xortekî xurt e, maşelalı **mîna vizikê li dor mêvanan dizivirî**.*

Mîna werîsê birêx bûn
bnr: Wekî şiva her du serî bigû

Mîna xatûna pişt çîtê
Ji bo jinên giran û nazenîn tê gotin. **Dîlan **mîna Xatûna pişt çîtê** xwe nazenîn dike lê di rastiya xwe de ne wisa ye.*

Mîna xwîn û berfa tev rêtî
Pir spehî û bedew bûn. **Maşelalı Zîn û Mem **mîna xwîn û berfa tev rêtî** li hev û din dikin.*

Mîna zebaniyên cehenemê
Xerab, bêînsaf û bedcure bûn. **Besê **mîna zebaniyên cehenemê**, li dor min diçe û tê.*

Mîna zêrê zer bûn
bnr: Mîna milyaketên perê esmanan bûn

Mîr bi êl, êl bi mîr
Civak bêyî serok, serok bêyî civak nabe. ****Mîr bi êl, êl bi mîr**, ma ji bilî wê qet guncan e?*

Mîr gote diya xwe: "Xwezî tiştê mê nebûna li dinê." Dê lê vegerand: "Ku çêlek nebûya, dê gayê cot nebûya, ku bizin nebûya dê konê reş nebûya, ku ez nebûma dê mîrê wek te nebûya."
Her tişt bingeh û jêderkek wê heye. Jin jî bingeha jiyana însanan in. **Jin bi rastî jî bingeha jiyanê ne. **Mîr gote diya xwe: "Xwezî tiştê mê nebûna li dinê." Dê lê vegerand: "Ku çêlek nebûya, dê gayê cot nebûya, ku bizin nebûya dê konê reş nebûya, ku ez nebûma dê mîrê wek te nebûya."***

Mîr terka baz û şahîn kir, sîsyang û tilûr kirin şêwirdarê xwe.
Ji bo helwesta neyînî ku rûmeta nirxên hêja nizanin tê bikaranîn. **Xwedê mirov şaş meke, **mîr terka baz û şahîn kir, sîsyang û tilûr kirin şêwirdarê xwe**.*

Mîr xulam, xulam olam, olam belav kir li malan.
bnr: Axa ji xulamê xwe re got, xulam ji kûçikê xwe re got, kûçik jî ji boçika xwe re got.

Mîrê min, heliz bûrî (borî)
bnr: Mîro borî

Mîrê mişkan, bûye axayê gişkan.
Ji bo kesên ne layîqî radeya ku lê ne tê gotin. **Tu li min û vî yê bêperwerde binêre. **Mîrê mişkan, bûye axayê gişkan.***

Mîro borî

Êdî dem derbas bû, êdî pêk nayê. **Qet xwe tev nede,* ***mîro borî...***

Mîxo çû, Rîxo hat.

Hemû wekî hev in. Ha ew, ha ev, qet derk tune. **Ma çi hate guherîn?* ***Mîxo çû, Rîxo hat.***

Mîza (yekî) ne zelal bûn

Ji bo kesên xinis, xayîn û sûckar tê gotin. Xwedî sûc û guneh bûn. **"Êdî min fêm kir ku* ***mîza xatûna min ne zelal e.***" Musa Vazgali

Moçik li serê (yekî) çêkirin

Dek û dolap li serî çêkirin. **Arîmed, qurban, em baş hev û din nas dikin, ji te tika dikim,* ***moçikan li serê min çêneke.***

Monik di dest û piyan de tune bûn

Ji bo kirina karan rûyê xwe tehl nekirin. **Maşelah, lawê Zagros* ***monik di dest û piyan de tune ye,*** *tu bişînî ku derê nabêje, na.*

Mor kirin

Pejirandin. **Rebenî hema morek di dêst de ye, gotinên jina xwe* ***mor dike.***

Mora xwe lê xistin

Bandor lê kirin. **Di wê pêvajoya xeter de dîsa jî Serok,* ***mora xwe li rojevê xist.***

Morî pê ve kirin

1. Li hincetan gerîn. **2.** Di ber xwe de li hev anîn. **Ez dizanim derdê wî çi ye, ew ji xwe re* ***moriyan pê ve dike.*** **Bawer im ku tu tiştekî wisa tune ye, hema Meqbûle* ***moriyan pê ve dike.***

Moriya xewê li guh ketin

Ji bo kesên zêde radizên tê bikaranîn. **Malxirabî, tu dibêjî* ***moriya xewê li guh ketiye,*** *sibe heya êvarê radizê.*

Mozan pê girtin

Xolî bûn. Xeyidîn, hêrs bûn. **Di gotina min de tiştek tune bû, lê nizanim çima ji nişkê ve* ***mozan bi Sêvê girtin.***

Muhtacî keriyek nan bûn

Di hêla aborî de di nav rewşeke pir xeter de bûn. **Rebenê Faysal piştî wê qeyranê* ***muhtacî keriyek nan bû.***

Mû bi mû qusandin

Pir timahkar bûn. **Ez wê baş dinasim, ew* ***mû bi mû diqusîne.***

Mû bi ziman ve hatin

Gelekî peyivîn, ji bo fêrkirin an jî îknakirinê bi yekî re zehf mijûl bûn. **Min wisa jê re got ku* ***mû bi zimanê min ve hatin*** *lê tobe, wî tu xwîn ji xwe berneda.*

Mû jê berdan

Tu ziyanek nedan. Zirarek negihandin. **Ew qas li wir ma, lê tu **mû jê berneda**.*

Mû ji mar qusandin

Ji bo kesên di diziyê de pir biserkeftî ne tê gotin. **Çavê wî derketo, ew pîşeyê bavê xwe berdewam dike, loma wisa **mû ji mar diqusîne**.*

Mû ji zimên hebilîn

1. Pir bi zanayî peyivîn. **2.** Pir peyivîn. **Ew wisa ne hindik e, **mû ji zimanê wê dihebile**. *Perîxan wisa peyivî ku **mû ji zimanê wê hebilî**.*

Mû ji xwe şaş nekirin

Tu guherînek çênebûn. **Maşelah pênc sal berê jî min dît Rihan hema eynî ye, qet **mû ji xwe şaş nekiriye**.*

Mû li ziman fetilîn

Zehf zêde peyivîn. **Maşelah, wisa got ku **mû li zimanê wê fetilî**.*

Mû neçûn qûna (yekî)

1. Rexne nepejirandin. **2.** Ji tiştên herî piçûk jî xeyidîn, xolî bûn. **Eman dest nedin kêmasiyên Cevdet, lûn jî dizanin ku **mû naçe qûna wî**. *Tu çima dikevî rex, ma tu nizanî **mû naçe qûna wê**?*

Mûra (yekî) şikestin

Moral xera bûn, pirçiyê xwe kirin. **Îro **mûra Candilê şikestiye**, qet napeyîve.*

Mûş xweş Mûş e, piştê Alquş e.

Her tiştên xweş, hinek bedel û zehmet li pey in. **Hemû ne ew qas e, **Mûş xweş Mûş e, lê piştê Alquş e**.*

Mûyê spî ketiye sîtila dew.

Ji bo helwesta li hincetgerînê tê bikaranîn. **Tu li wê menêre, ya wê ew e ku dibêje, **mûyê spî ketiye sîtila dew**.*

Mûyê xwe bi ciwanan re qusandin

Ji bo kal û pîrên ku wek ciwanan tevdigerin tê gotin. **Mamoste Canyar **mûyê xwe bi ciwanan re qusandiye**.*

Mûyên canê (yekî) gij bûn

Pir bixiroş bûn an jî di bin bandora tirs an jî şahiyê de man. **Dema ku min ew lawik di nav wan alavên îşkenceyê de dîtin, **mûyên canê min gij bûn**.*

N

Na negotin
Ji bo kesên rûnerm tê gotin. **Bêrîvan keçikeke baş e, tu bişînî ku derê zû bi zû **na nabêje**.*

Nabêje kê kir, dibêje kê got.
Bûyer bi xwe na, lê gotegot girîng girtin. **Ma ju bilî gotegotê çi karê Kevokê heye? **Nabêje kê kir, dibêje kê got?***

Naçim cineta biminet.
Minet nepejirandin. **Serê min tim bilind bû, înşelah wê tim jî bilind bibe. Ez tu car **naçim cineta biminet**.*

Naçim hewarê, naxwim savarê.
Ne wî karî dikim, ne jî dikevim bin wê minetê. ***Naçim hewarê, naxwim savarê.** *Bibexşînin, lê ez tu car nakevim bin mineta wî.*

Nagihîjime te, xwe ji te dibuhirînim.
Ji bo kesên dexes tê bikaranîn. ***Nagihîjime te, xwe ji te dibuhirînim.** *Ew reben jî xwe wisa tatmîn dikin.*

Nalbendan kihêl nal dikirin, kevjalê got: "Ev e lingê min jî."
Ji bo kesên ku hedê xwe nizanin tê gotin. **Her kes di dilê xwe de xwe zêde dizane. **Nalbendan kihêl nal dikirin, kevjalê got: "Ev e lingê min jî."***

Nalên (yekî) biriqîn
1. Surgûn bûn, derberder bûn. **2.** Mirin. ***Nalên malbata Almast Xanê wisa biriqîn** ku heya xwe rast bikin a felek. **Dibêjin **nalên rebenê Evdileyê Çavsût jî biriqîne**.*

Nalenal kirin
Ji ber êşê zarezar kirin. **Nûranê hingî **nalenal kir,** bi şev ez şiyar bûm.*

Namirim bi tîra pê re, dimirim bi xebera wê re.
Ji bo gotinên pir giran tê bikaranîn. **Ya rastî ez **namirim bi tîra pê re, dimirim bi xebera wê re**.*

Namûs bûye bexdenûs

Namûs, mamûs nemaye. **Kuro namûsa çi?* ***Namûs bûye bexdenûs.***

Namûs di bin lingan de çûn (Namûs di bin lingan de peymal bûn)

Di hêla şanaziyê de rezîl û kepaze bûn. **Di wî şerê her du eşîran de* ***namûsa her du aliyan jî, di bin lingên leşkeran de peymal bû****.*

Namûs e, ne bexdenûs e.

Ma ew qas hêsan e? Ev tiştekî zehf girîng e. **Tu hay ji xwe nîn î, ev tê çi wateyê? Ev* ***namûs e, ne bexdenûs e****.*

Namûs ji mêr re, jehr ji mar re

Ji her kesî re ya layîq çi ye, ew divê. **Gerçî bi dîtina min zêde derka jin û mêran nîn e, lê mezinan gotine:* ***Namûs ji mêr re, jehr ji mar re.***

Namûs li dinyayê belav bûn, misqalek parê neketin

Di her hêla jiyanê de bêbawer û nebaş bûn. *****Namûs li dinyayê belav bûye, lê misqalek nesîbê vî belengazê Nedîm neketiye.***

Namûsa xwe firotin

Qebraxî, qewatî kirin. Jina xwe jî firotin. **Tu çawa bi wî bawer dibî? Ew mirovekî wisan e ku* ***namûsa xwe difroşe****.*

Namûsa xwe paqij kirin

1. Li hemberî gotegot an jî bûyereke xerab çareserî pêk anîn. **2.** Jin an jî mêrê ku têkiliya zayendî pêk aniye, kuştin. **Min ji te re got, were her tiştî derxe holê û* ***namûsa xwe paqij bike****. *Malbatê ji bo* ***paqijkirina namûsê*** *biryar da ku Bawa xwîşka xwe û yarê wê bikuje.*

Nan bi devê (yekî) ve kirin

Ji bo kesên sist û bêzereng tê bikaranîn. **Ez çawa dikim nikare debara xwe bike, ma ez* ***nan bi devê wî ve bikim****?*

Nan bi guhên xwe xwarin

Ji dinyayê tiştek fêm nekirin. Bêtaqî (tecrube) û nezan bûn. **Heyder, ma tu min nas nakî? Ma min* ***nan bi guhên xwe xwariye*** *ku ez wisa bibêjim?*

Nan bi xwê, xwê bi tam

Her tişt ûsil û azîneyeke wê heye. *****Nan bi xwê, xwê bi tam.*** *Helbet ev îşê xêrê wê pêk bê, lê ji wê re jî dem û ked pêwîst e.*

Nan bi xwê, xwê bi tore

bnr. Nan bi xwê, xwê bi tam

Nan da ber me, ço da ser me.

bnr. Nan da ber me, tajiya xwe berda ser me.

Nan da ber me, tajiya xwe berda ser me.

Hem tiştekî pak kirin, hem jî li hemberî wê di nav helwesteke xirab de bûn. **Me tiştek ji ya te fêm nekir kuro! Te* ***nan da ber me, tajiya xwe jî berda ser me****.*

Nan di eniya hirçê de bûn

Debara aborî zor bûn. **Ma debara malekê kirin wisa hêsan e, îro nan* ***di eniya hirçê de ye****.*

Nan di gewriyê de neçûn

Ji ber kêşe yan jî derdekî li ber xwe ketin. **Ji ber wê rewşa bûka min a rezîl, îşev* ***nan di gewriya min de neçû****.*

Nanê (yekî) di tûr de, aqil di kîsên hevalan de bûn

Ji bo kesên hesabê xwe nizanin tê gotin. **Evdilkerîm belengazek e.* ***Nanê wî di tûr de, aqilê wî di kîsên hevalan de ye.***

Nan ji baniyê, av ji kaniyê

Ji bo jiyana bêked, bêzehmet û belaş tê bikaranîn. **Bextewar bi serê wî be,* ***nan ji baniyê, av ji kaniyê****, êdî çi ji Xwedê dixwaze?*

Nan ji malan, av ji malan, taştêya palan

bnr: Nan ji baniyê av ji kaniyê

Nanê (yekî) ketin kevir

Di hêla aborî de debar zehf zor bûn. ****Nanê me ketiye kêvir****, Xwedê dawiya me xêr bike.*

Nanê (yekî) li ser çokê bûn

Bêbext, qeleş û bêbawer bûn. **Keça min, min ji te re negot,* ***nanê wî li ser çokê ye****, mirov qet garisê xwe dide ser werisê wî?*

Nan li ser çokê ye, çav li destê xelkê ye.

Di nav derfet û hebûnê de bûn, lê çav têr nebûn. **Hemû dinya ya wî be çi feyde ye?* ***Nan li ser çokê ye, çav li destê xelkê ye.***

Nan li tenûrê xistin

Kar qedandin. **Heya ew li dor xwe zivirîn, Sûsanê* ***nan li tenûrê xist*** *jî.*

Nan pir, pîvaz pir, gelo ev çima mir?!

Qelsbûna rewşa kurdan a aborî tîne ziman. ****Nan pir, pîvaz pir, gelo ev çima mir?*** *Heke nan û pîvaz hebin mirin bi mirov nikare?* (bnr. çîrok)

Nan li xwe helal kirin

Xwarin heq kirin. **Dikarim bibêjim ku di vê malê de Seyran tenê* ***nan li xwe helal dike****.*

"Nan pir, pîvaz pir, gelo ev çima mir?!"

Rojekê yekî kurd di rê de diçe. Li cihekî dibîne ku wa ye li ser rê mirovekî xwe dirêj kiriye. Tê cem lê mêze dike ku mirov miriye. Li dorê dizivire, diçe û tê. Dixawaze fêm bike ku gelo ev mirov çima miriye. Di dawiyê de li hebana wî mêze dike, dibîne ku hebana wî tijî nan û pîvaz e. Bi vê xuyangê zehf matmayî dimîne. Bi dîtina wî mirovek ku nan û pîvaza wî ew qas hebe divê nemire. Tu wateyê nade mirina wî û ji xwe re dibêje:

"Nan pir, pîvaz pir, gelo ev çima mir!"

Nan û ava (yekî) li dinyayê qedîn

Mirin. **Nan û ava mirov ku li dinyayê qedî, êdî tiştekî ku bê kirin namîne.*

Nan û dew e, taqet ev e.

Heke ev qasî bidî, tu yê bedelê jî wekî wê bigirî. **Qet zêde tiştekî hêvî neke,* ***nan û dew e, taqet ev e.*** (bnr. çîrok)

Nan û xwêya (yekî) li ser çokê bûn

Bêbawer bûn. *****Nan û xwêya wan li ser çoka wan e****, bi soza wan bawer nebe.*

Nanek di mal de tune, tirên gamêşan dike.

Rewşa aborî pir xerab e, lê fors û lafekî jî zehf zêde ye. **Maşelalı, Tahar jî* ***nanek di mal de tune, tirên gamêşan dike****.*

Nanek û gayek li bal yek bûn

bnr. Sêvek û gayek li cem yek bûn

Nanek xwarin, keriyek dan (yekî)

Bêdadî û neheqiyek li yekî kirin. **Wisa li min dinêre ku tu dibêjî min* ***nanek xwariye, keriyek daye wî****.*

Nanê bêxwê xwarin

Bêhêz, feqîr û bêderfet bûn. **Nadir* ***nanê bêxwê dixwe****. Disa jî wekî Hogir gazinê xwe nake.*

Nanê bêxwê dixwe, tirên şor dike.

Rewşa aborî xerab e, lê lafekiyên qet ne layiqî xwe dike. **Maşelah Selo* ***nanê bêxwê dixwe, tirên şor dike****.*

Nanê cehîn dixwe, tirên polayî dike.

bnr. Nanê bêxwê dixwe, tirên şor dike.

Nanê destê (yekî) jê stendin

Heqeret li yekî kirin. **Nûman mirovekî zalim e,* ***nanê destê wê keçikê jî jê stend****.*

Nanê (yekî) di paşilê de bûn

Xwedî pîşe yan jî hunerekî bûn. **Şikir ji Xwedê re mineta lawê min ji tu kesî nîn e,* ***nanê wî di paşilê de ye****.*

"Nan û dew e, taqet ev e."

Li hêla Serhedê ji ber ku li ber tava havînê xebat zor e û bi taybetî jî ji bo kişandina tirpanê hêzeke zêde pêwîst e, xwediyê zeviyan ji paleyên xwe re xwarinên xweş çêdikin. Li hêla bajarê Îdirê mirovekî pir temahkar, ji bo çinîna zevî û mêrgan paleyan digire. Lê ji bo paleyan tenê nan û avdewê (çeqilmast) tîne ji mal. Li hemberî vê helwesta xwediyê zeviyê, tirpankêş gelekî hêrs dibin, lê fedî dikin ku tiştekî jî bibûjin. Piştî xwarinê dema ku dîsa dest bi çinîna gênim dikin, vê carê hema devê tirpana xwe hindikî û bi jor de diavêjin serê simbilên genim. Bi vî awayî tenê simbilên genim jêdikin, lê simil (sap) dimîne. Ku genim bi jor de bê çinîn, wê demê kaya ku ji bo ajalan pir girîng e û baş buha dike dimîne û tu kêr jê nayê. Ev yek ji bo xwediyê zeviyê dibe sedema ziyaneke mezin. Tirpankêş bi zanetî hinekî bi vî awayî zeviyê diçînin. Xwediyê zeviyê mêze dike ku tirpankêş bi awayekî hewlogewloyî genimê wî mehf dikin. Agir pê dikeve û diqîre:

"Hûn çi dikin lolo? Hûn mala min xera dikin." Pale tev de him hêdîka tirpanê dikişînin, him jî bi tevayî peyama xwe didin û dibêjin:

"Nan û dew e, taqet ev e!.."

Nanê ewran birin
bnr: Taştêya ewran birin

Nanê garis ne tu nan e, bila kes nebêje, ev mal bêervan e.
Rewş nebaş e, lê li hemberî xelkê em xwe xerab nîşan nadin. **Em çawa bikin lawo?* ***Nanê garis ne tu nan e, lê bila kes nebêje, ev mal bêervan e.***

Nanê gilgil û zîlika pîvazê!
Xwarinên baş û hêja êdî ew qas dibe. *****Nanê gilgil û zîlika pîvazê!****.. Tu hê çi dixwazî?*

Nanê Îso dixwe, selawetê li Mûso tîne (dike).
Ji yekî qencî dîtin, lê ji yekî din re xizmet kirin. **Ez çi bibêjim?* ***Nanê Îso dixwe, selawetê li Mûso tîne.***

Nanê me bêxwê ye.
Em bêqird û bêşans in. **Ji ber ku* ***nanê me bêxwê ye****, jixwe me tiştekî wer baş hêvî nedikir.*

Nanê min dixwe, paletiya xelkê dike.
bnr: Nanê Îso dixwe, selawetê li Mûso tîne.

Nanê min, qesasê serê min
Qenciya min dibe belaya serê min. **Ew jî xirabiya min e,* ***nanê min, qesasê serê min****.*

Nanê nerm e, zikê çerm e, Siltokê bê şerm e.
Ji bo bêfedîtî, xemsarî û çavçiliyê tê bikaranîn. **Ka wê çawa wekî mirovan bê hesibandin?* ***Nanê nerm e, zikê çerm e, Siltokê bêşerm e.***

Nanê pehtî, siltanê ser textî
Karên serkeftî, dibin sedema hêz û şanaziyê. **Tiştên serkeftî tim sedema serfiraziyê ne.* ***Nanê pehtî, siltanê ser textî.***

Nanê pehtî bûn
Ji bo rewşa erênî tê gotin. **Heyran, êdî tu çi dixwazî, wa ye ji te re* ***bûye nanê petî****.*

Nanê şêst û heft elegan xwarin
1. Gelekî gerîn. **2.** Rûvekirî bûn. **Lawo, tu dikarî bi wî re kapa biavêjî? Wî* ***nanê şêst û heft elegan xwariye****. *Ya ku ew dizane kes nizane, mêrikî* ***nanê şêst û heft elegan xwariye****.*

Nanê xwe deranîn
bnr: Nanê xwe ji mîza xuriyê derxistin.

Nanê xwe dixwim, şîretan li xelkê dikim.
Kêra (sûd) min digihîje xelkê, lê nagihîje min. **Ez mirovekî ecêb im,* ***nanê xwe dixwim, şîretan li xelkê dikim****.*

Nanê xwe jê derxistin
Debara xwe pê kirin. **Hûn çi jê dixwazin? Ew jî* ***nanê xwe ji wir derdixe****.*

Nanê xwe ji keviran derxistin
bnr: Nanê xwe ji mîza xuriyê derxistin

Nanê xwe ji mîza xuriyê derxistin
Debara xwe ya aborî li ku hebe pêk anîn. **Kemal mirovekî wisa pêkhatî ye ku li ku dibe bila bibe, dikare* ***nanê xwe ji mîza xuriyê derxîne***.

Nanê xwe kiriye tûr, li pey xelkê digerîne.
Ji bo kesên ku saf in, hesabê xwe nizanin û malê xwe belawela dikin tê gotin. **Serhingê Ûsoyê Pozberan jî yekî sefêk e,* ***nanê xwe kiriye tûr, li pey xelkê digerîne***.

Nanê xwe pê xwarin
Debara xwe pê kirin. **Ez nikarim xerabiyekê bi wan bikim, çimkî ez* ***nanê xwe pê dixwim***.

Nanê xwe qezenc kirin
Debara xwe ya aborî pêk anîn. **Helal be, hê ciwan e, lê* ***nanê xwe baş qezenc dike***.

Nanê (yekî) li ser (yekî) bûn
Qencî û mineta yekî li ser yekî bûn. **Çi dibe bila bibe,* ***nanê wî li ser min e****, ez zû bi zû nikarim di bin de derkevim.*

Nanê (yekî) xwarin
Bi saya qencî û alîkariya kesekî debara xwe ya aborî kirin. **Xwedê jî dizane ku ev çend sal in, ez* ***nanê Felemez dixwim***.

Nanê zuha, dewê tirş
Ji rewşa pir xizan re tê gotin. *****Nanê zuha, dewê tirş****, ma ev jî jiyan e?*

Nangenimî kirin
Ji bo hin berjewendiyan xwe li ber hinekan xwe şirîn kirin. Şelafî kirin. **Tu zerengiyeke Şêxmûsê Jarik tune, hema bi* ***genimiyan*** *debara xwe dike.*

Nankor bûn
Bêbext û bêwefa bûn. Qenciya ku jê re hatiye kirin neşikirandin. **Gebar mirovekî* ***nankor e****, wî qenciyên Xebûr hemû ji bîr kirin.*

Nanoziko xebitîn
Bi bedeleke pir erzan xebitîn. **"Şêxmûsko mîna bavê xwe, li mala axê mezin bû. Çawa bavê di heyamê xwe de, bi* ***nanoziko şivantî dikir****, weha jî wî da ser wê şopê."* Bavê Nazê

Nanxwer û cawdir bûn
Ji bo kesên ked û zehmetê nadin lê zêde ziyanê didin tê gotin. **Zeynoya qûnpehn ji tiştekî re kêr nayê, hema yeke* ***nanxwer û cawdir e***.

Napeyîve, dema dipeyîve, dibêje: "Deve!"
Mezin axaftin. **Xwedê mirov şaş neke.* ***Ûsiv napeyîve, dema ku dipeyîve, dibêje: "Deve!"***

Nas nekirin
Bi tiştekî nehesibandin. **Mêrikî qet ez **nas nekirim**.*

Navê (yekî) bi dû (yekî) xistin
Zêdetir ji bo paşgotiniya têkiliya mêrekî ya bi jinekê re tê bikaranîn. ****Navê Cimşît bi dû porkura Zeynebê xistin**, lê Xwedê dizane tu tiştekî wisa jî tune bû.*

Nav bi ser xistin
bnr: Navê (yekî) bi dû (yekî) xistin

Nav bi (yekî) re derxistin
bnr: Navê (yekî) bi dû (yekî) xistin

Navê bi hev re derketin
Ji ber têkiliya evînê paşgotiniya du kesan kirin. ****Navê Şikak û Şîlanê bi hev re derket**, ew jî bêgav man ku bizewicin.*

Nav danîn
bnr: Nav lê kirin

Nav derbas bûn (Nav tê de derbas bûn)
Qal kirin. **Ji bo berendamên Partiya Gel a Lîberal, gelek **nav derbas dibin**, lê ka yê xalê min jî heye gelo?*

Navê (yekî) di deftera mişkan de jî tune bûn
Girîng negirtin, rûmet nedîtin. **Tu li wan gotinên wê yên mezin menêre. **Navê wê di deftera mişkan de jî tune ye.*** (argo)

Nav di defteran de derbas nebûn
bnr: Navê (yekî) di deftera mişkan de jî tune bûn

Nav î giran e, bajar î wêran e. (Nav giran, mezel wêran)
Navdar bûn, lê naverok vala bûn. **Tu wisa li xuyanga wê menêre. **Nav î giran e, bajar î wêran e.***

Navê (yekî) heram kirin
Ji ber hêrs, xeyîdandin an jî nefretê ji yekî qal nekirin. **Nado **navê Bihara qîza xwe heram kiriye**, tu car qala wê nake.*

Nav heye, lê deng tune.
Ji bo kesên navdar in, lê di karvaniyê de tiştekî nakin tê gotin. **Hûn çi meraqan dikin, Erê **navê wî heye, lê dengê wî tune**.*

Nav hilnedan
1. Nav derbas nebûn. Nav nezikirandin. **2.** Ji kesekî hêrs bûn, an jî xeyidîn; ji ber wê jî qala navê wî kesî nekirin. *Ez li balê rûniştibûm, qet navê Sîdarê hilneda. *Berde têkiliyek piçûk, camêrî qet **navê wî hilnade**.*

Nav î giran e, war î wêran e.
bnr: Nav î giran e, bajar î wêran e.

Nav î mêr e, kundê kor e.
Her çiqas wekî zilaman û pêkhatî bê xuyan jî tê de taybetî û zerengiyeke wisa tune ye. **Erê, **nav î mêr e, lê kundê kor e**.*

Navê (yekî) ji defteran derketin
Rûmet kêm bûn. **Wan jî wer hêvî nedikirin, lê di dawiyê de **navê wan ji defteran derket**.*

Nav lê kirin
1. Rewşa pirsgirêkekê zelal kirin. **2.** Ji bilî navê yekî navekî din (gelek caran yên nebaş û wekî qerf) lê danîn. **Bes e, êdî **navekî li vê kirêya dikana xwe bike** ku em jî bizanibin em ê çiqasî bidin. *Ew jinik wisa ye, heta **navan li mirovan neke**, nikare bisekine.*

Nav li pey (yekî) xistin
Di derbarê kesekî de gotegotên nebaş kirin. **"Rojên bixem û fikar li paş mabûn. Mistoyê ku destgirtiyê wê bû, bêguman baş gotibû. Xelkê dikaribû **navekî li pey wê û Mistoyê wê bixistaya**."* Adnan Alp

Navê (yekî) neanîn ser zimanê xwe
Qal nekirin. **Ew gotin ne rast in, çimkî min **navê wê qet neanî ser zimanê xwe**.*

Nav û nûçik lê kirin
Bi armanca tirane û tinazan navên nebaş li yekî kirin. **Wê **nav û nûçikên wisa li Reso kirin** ku em tev şaş û metel man.*

Nav qetîn
bnr: Nava derpiyê xwe tijî kirin

Nava ... tal man
Naverok pûç bûn. **Vê carê wer tê xuyan ku **nava vî karê te tal maye**.*

Nav tê dan
Hadandin, helan dayîn. **Heke Sevîmê **nav tê neda**, Bahoz wisa bi ser min de nedihat.*

Nav û dengê (yekî) belav bûn
Xwedî şan û şohret bûn, navdar bûn. *****Nav û dengê wî li seranserê welêt belav bûye**.*

Nav û dengê (yekî) man
Piştî mirin an jî çûna derekê, nav û deng berdewam kirin. **Mêrikî bi rastî jî hunermend bû. Erê mir, lê **nav û dengê wî ma**.*

Navê (yekî) winda bûn
Qal nekirin. Rûmet nedan. *****Navê wî winda bû**, li tu cihekî lê rast nehatim.*

Navê (yekî) winda kirin

Qenciya yekî bi tiştekî nehesibandin. Xerabî bi yekî kirin. ***Navê Bedirê belengaz, winda kirin.*** *Qet te digot, ê ku ew yek pêk aniye, ew qas ked daye ne ew e.*

Nav xerab bûn
bnr. Nav xerab derketin

Navê (yekî) xera kirin
Bi helwest û gotinên xirab prestîja kesekî kêm kirin. **Bi wan kirinên xwe, Zozanê **navê Zinar jî xera kir**.*

Navê (yekî) xerab derketin
Îmajeke nebaş dan. ***Navê Gulnazê xerab derketiye**, her kes bi çavekî din lê mêze dike.*

Nav xerab derxistin
bnr. Navê (yekî) reş kirin

Nava derpiyê xwe tijî kirin
1. Tirsîn. **2.** Ji bo rîtina zarokan jî tê gotin. **Tu wisa li xeberdana wê menêre, dema ku dengê mêrê xwe dibihîze, **nava derpiyê xwe tijî dike**. **Qundaxa me zû zû **nava derpiyê xwe tije dike**.*

Nava xwe rêtin
bnr. Dilê xwe rehet kirin

Nava xwe vala kirin
bnr. Dilê xwe rehet kirin

Nava xwe xwarin
bnr. Di nava xwe de qicqicîn

Nava (yekî) qetandin
Yek tirsandin. **Huso bi wê xeberê **nava Xezalê qetand**.*

Nava (yekî) çûn
Emel bûn. Îshal bûn. ***Ji ber **nava qundaxa me diçû**, me ew bire nexweşxaneyê.*

Navber çêkirin
Têkiliya du aliyan baş kirin. **Têkiliya wan gelekî xerab bûbû, lê Darayê zavayê wan **navbera wan çêkir**.*

Navber dîtîn
1. Di navbera du aliyan an jî du kesan de aştî yan jî têkiliyên baş pêk anîn, **2.** Di bazariyekê de her du alî li ser buhayekê hemfikir bûn. **Her du bira jî bûbûn barûd, lê bavê wan **navbera wan dît**. **Li ser fiyetê erebeyê li hev nedikirin, lê Apê Selîm **navbera wan dît**.*

Navber sar bûn
Têkilî xera bûn. **Piştî wê meseleya pereyan, **navbera wan sar bû**.*

Navber xweş bûn

Têkilî erênî û geş bûn. **"Ji wê rojê û pê de **navbera wî û kebaniyê xweş bû**. Diçû bir ehtî li ber çongên wê radiket û tew xwarin jî jê dixwest."* Yaqûb Tilermenî

Navbera jin û mêrî, bîra nihêrî(*)

Yên ku dikevin navbera jin û mêran an jî di navbera wan de fesadiyê dikin, dê bi cezayê herî girîng bên ceza kirin. ***Navbera jin û mêrî, bîra nihêrî.** Bi taybetî yên ku navbera jin û mêran xera dikin, wê têkevin nav agirê herî gur.*

Navbera min û kîjan cinarên min xera bibe, jina min diçe li ber derê wan teşiya xwe dirêse.

Ji bo têkiliya bikîn û buxz tê gotin. **Ev şansê min e yan jî xetaya min e, ez nizanim lê **navbera min û kîjan cinarên min xera bibe, jina min diçe li ber derê wan teşiya xwe dirêse**.*

Navbera xwe xweş kirin

Têkiliyên xwe pêş ve birin. **Berê wekî seg û pisîkan hev û din dixwarin, lê dû re **navbera xwe xweş kirin**.*

Navdar bûn

bnr. Nav û deng belav bûn

Navek na, hezar nav ji dêv derketin

Ji bo hezkirina zêde tê bikaranîn. **Reso dema navê Eyşanê hildide, **navek na, hezar nav ji dêv derdikevin**.*

Navê bira Tacdîn e, hem dîn e, hem derewîn e.

Ji bo kesên bêdenge tê gotin. **Tiştekî ji wî hêvî neke. **Navê bira Tacdîn e, hem dîn e, hem derewîn e.***

Navê diya xwe ji bîr kirin

Ketin rewşeke xerab. Hay ji xwe nebûn. **Leşkeran wisa kiribûn ku rebenî **navê diya xwe ji bîr kiribû**.*

Navê mêr li ser min e, lê azara stûyê min e.

Mêrê min, ji bo min tenê bar û derd e. **Ew jî qedera min e. Rast e, **navê mêr li ser min e, lê azara stûyê min e.***

Navê min li te, qotik li serê te.

bnr. Navê min navê te, kumê min li serê te.

Navê min navê te, kumê min li serê te

Xeta û gunehê xwe xistin stûyê hinekên din. **Got: **"Navê min navê te, kumê min li serê te."** Xalid jî eynî wilo tîne serê min.*

(*)**Bîra nihêrî:** Di cehenemê de ji tebeqa yan jî beşa ku agirê herî gur tê de vêdikeve re tê gotin; yên ku gunehên herî giran kirine di vir de tên ceza kirin.

Navê min ne kurê kerê ye, navê min Emîn e; ew ahê min ji te re nemîne!

Ji ber xirabiya te min wer kir, înşelah ew xerabiya te bê ceza nemîne. **Ez çi bibêjim, meseleya min jî bû meseleya:* ***Navê min ne kurê kerê ye, navê min Emîn e; ew ahê min ji te re nemîne!*** (bnr. çîrok)

Navê (yekî) reş kirin

Ji bo kesekî tiştên nebaş gotin. Paşgotiniya yekî kirin. **Cananê* ***navê Pelînê wisa reş kir*** *ku heya ya rast hate fêmkirin, gelek dem derbas bû.*

Navê xwe xera kirin

Bi helwesteke neyînî îmaja xwe qels kirin. **Heyfa wê keçikê, bi wê hewldana çûna wê derê* ***navê xwe xera kir***.

Navik ketin

bnr: Navika (yekî) qetîn

Navika (yekî) avêtin nav malan(*)

Ji bo kesên zêde li nav malan digerin tê gotin. **Bawer im* ***diya wê navika wê avêtiye nav malan****; heya êvarê di nav gund de doç dibe.*

Navika (...) bi hev û din ve girêdayî bûn

Tim bi hev û din re bûn. Bi hev û din re girêdayî bûn. **Zelîxan û Fatim ji hev û din naqetin. Tu dibêjî* ***navika wan bi hev û din ve girêdayî ye***.

Navika (yekî) birîn (jêkirin)

Jê mezintir bûn. **Keçika min, ew di temenê diya te de ye, ma te* ***navika wê biriye*** *ku jê re nabêjî, xaltî yan jî metê?*

Navika (yekî) qetîn

Zêde xebitîn. Di bin zor û zerpê de man. **Lawê xwe yê piçûk wisa dide xebatê, ditirsim ku* ***navika wî biqete***.

Nav î mêr e, kundê kor e.

Ne layiqî navê xwe ye. **Erê rast e,* ***nav î mêr e lê kundê kor e***.

Navkutkî bûn

Nexweş bûn, lelikî bûn. Aciz bûn. **"Bila êdî mîna berxê mîjo serê carê li ber hingilekî* ***navkutkî nebim***." Musa Vazgali

---

"Navê min ne kurê kerê ye, navê min Emîn e; ew ahê min ji te re nemîne!"

Mirovekî xizan diçe bal axayekî dibe şivan. Axa jê re şert û mercên xwe dibêje û di dawiyê de dibêje:
"Navê te çi ye?" Ji ber ku axayên berê zêde zilm lê kirine û tim jê re gotine: *"Kurê kerê, te çima wer mekir? Kurê kerê de zû bike. Kurê kerê here vir. Kurê kerê here wir."* Ji bo ku zêde lê zor meçe, şivan dibêje:
"Navê min kurê kerê ye." Piştî ku şivantiya şivan diqede, heqê xwe hildide, ji axê re dibêje:
"Navê min ne kurê kerê ye, navê min Emîn e; ew ahê min ji te re nemîne!"

(*) **Navika (yekî) avêtin nav malan:** Di çanda kurdan de bawerî ew e ku navika zarokan biavêjin ku derê, zarok dema ku mezin bibe, bi wî karî re mijûl dibe. Ji bo wê dema ku zarok nû ji dayik dibin, navika wan li gorî asta zanebûn û çanda wê malbatê diavêjin nav pez, dibistan, şûna pîşeyen binirx û hwd.

Navno kirin

Navê yekî reş kirin. **Hema wan cîranan ew Sûsana qijik li cihê sekinî* ***navno kirin****.*

Naziyên xwe kirin

Xwe şirîn kirin û bi hêsanî nehatin rê. **Dilê wê jî dixwaze lê ew jî hinekî* ***naziyên xwe dike****.*

Ne ya xwe ye, ne ya hevala ye, kebaniya bîst û pênc sala ye. (Ne bi xwe ye, ne bi hevalan, kebaniya dozdeh malan)

Kêra wê ji wê re jî tune. **Ew jî wisa ye;* ***ne ya xwe ye, ne ya hevala ye, kebaniya bîst û pênc sala ye****.*

Ne aş e, ne çeqçeq e.

Tu tiştek li holê nemaye. **Tu doza çi dikî ezbenî? Ma tu nabînî,* ***ne aş e, ne çeqçeq e****?*

Ne ba ye, ne dûman e (boran).

bnr: Ne mij e, ne moran e.

Ne bela conga ye, çêlek biga ye.

Tawana herî zêde ya jinan e. **Ku jin nebin, mêr nikarin di hêla zayendî de tiştekî zêde bikin. Ango,* ***ne bela conga ye, çêlek biga ye****.*

Ne bi berxtî têr şîr vexwarin, ne bi kavirtî têr gîha xwarin

Di tu radeyê de rojeke xweş nedîtin. **Ew jî bêşansiya wê ye.* ***Ne bi berxtî têr şîr vexwar, ne bi kavirtî têr gîha xwar.***

Ne ji azana mele, ne jî ji zirîna kerê bawer kirin

Ji bo kesên bi pirsgirêk tê gotin. **Ezbenî, ez çawa bikim? Ev korocax* ***ne ji azana mele, ne jî ji zirîna kerê bawer dike****.*

Ne bi destê xwe bûn

Di bin kelîja hinekên din de bûn. Ne bi serê xwe û serbixwe bûn. **Bi wê bûya dê bê şik bikira, lê ew* ***ne bi destê xwe ye****.*

Ne bi dîtin, ne bi gotin

bnr: Ne bi kuştin, ne bi hiştin

Ne bi goliktî têr gîha xwar, ne bi gayîtî têr kizin xwarin

bnr: Ne berxtî têr şîr vexwarin, ne kavirtî têr gîha xwarin

Ne bi halekî, ne bi malekî, tu çi zanî ewhalekî?!

Yên ku di nav de nejîn, ji rewşê fêm nakin. **Ew ji dûr ve dinêre, zewac çi ye, nizan e.* ***Ne bi halekî, ne bi malekî, tu çi zanî ewhalekî?!***

Ne bi hêlîna mar, ne bi qebra sar

bnr: Ne radizêm newalên kûr, ne dibînim xewnên dûr.

Ne bi kêrî defê, ne bi kêrî zirneyê hatin

Bi kêrî tu tiştekî nehatin. *Ez çawa bikim heyran? Lawê te **ne bi kêrî defê tê, ne bi kêrî zirneyê tê**.

Ne bi kêrî şevê, ne bi kêrî şivê hatin

bnr: Ne bi kêrî defê, ne bi kêrî zirneyê hatin

Ne bi kuştin, ne bi hiştin

Bi tu awayî çênebûn. *Ez jî nizanim çawa bikim. ***Ne bi kuştin, ne bi hiştin**, bi tu awayî nikarim bînim rê.*

Ne bi lopixa bûn

Ne hêsan bûn. **Lawo **ma bi lopixan e**, ji bo wê jî gelek ked û dirav pêwîst e.*

Ne bi malê hela hela, ne bi zarokên şêx û mela

Ne zengîniya zêde, ne jî minet û alîkariya nexwezayî ji kesekî dixwazim. **Tiştên zehf zêde naxwazim. **Ne bi malê hela hela, ne bi zarokên şêx û mela.***

Ne bi serê xwe bûn

Di bin bandora hinekên din de bûn. **Ezbenî, ew bi xwe jî **ne bi serê ye**, divê bi nîvekarê xwe bişêwire, dû re biryar bide.*

Ne bi vî karî, ne bi wê zerarê

bnr: Ne bi wê hêkê, ne jî bi wê qidqidikê

Ne bi wê hêkê, ne jî bi wê qidqidikê

Ne wê xêrê ne jî wê helwesta zivêr dixwazim. **Heyran ez napejirînim. **Ne bi wê hêkê, ne jî bi wê qidqidikê.***

Ne bi xewnên şevan, ne bi nihtê dînan

bnr: Ne bi wê hêkê, ne jî bi wê qidqidikê

Ne bi xêr û silamet

Xwezî nebûya. ***Ne bi xêr û silamet**, wê demê me bala xwe bar kir Îzmirê.* Dilawer Zeraq

Ne bi xêra te, ne bi şerê te

Eman çiqasî ji te dûr bim, ew qasî baş e. **Heyran **ne bi xêra te, ne bi şerê te**, hema çi qasî dûr bî, ew qasî baş e.*

Ne bide min û ne jî bide rûyê min.

Heke ku tu qenciyekê dikî jî qala wê neke. **Qencî ne ji bo pesn û gotinê ye. **Ne bide min û ne jî bide rûyê min.***

Ne bide min û ne jî tiliya xwe têxe çavê min.

bnr: Ne bide min û ne jî bide rûyê min.

Ne bide ne bistîne, şev û roj lê temaşe bike. (Ne bixwe ne vexwe, bi şev û roj lê temaşe bike.)

Ji bo tiştên pir spehî û bedew tê gotin. **"Wan tilingiyan hişê mirov dibirin; mirov digotine **ne bixwe ne vexwe, hema tenê ji xwe re li wan temaşe bike.**" Şahînê Bekirê Soreklî

Ne çarix, ne jî bendçarix jê çêbûn
bnr: Ne bi kêrî defê, ne bi kêrî zirneyê hatin

Ne çira ji koran re, ne dahol ji keran re
Ji tu kesî yan jî tiştekî re bi kêr nehatin. ***Ne çira ji koran re, ne dahol ji keran re.** *Xwedê dizane ew hewldana wî jî tev vala ye.*

Ne dar e, bikî destî, ne jî qoç e, bixeritînî.
bnr: Ne dengbêj e bi zirneyê re, ne peya ye bi siwaran re.

Ne dar e, ne bizmar e.
Bi tiştekî re bi kêr nehatin. **Min jî ji wî fêm nekir.* ***Ne dar e, ne bizmar e.***

Ne dengbêj e bi zirneyê re, ne peya ye bi siwaran re.
Ji tiştekî re bi kêr nehatin. **Mixabin tu xêra wê tune ye.* ***Ne dengbêj e bi zirneyê re, ne peya ye bi siwaran re.***

Ne deng e, ne beng e.
Tu hes û hewldan jê demeketin. **Tu belasebeb li bendê yî. Ma tu nabînî,* ***ne deng e, ne beng e****?*

Ne dev e, ne ziman e.
Ji bo kesên ku zêde napeyîvin tê gotin. **Mêrikê belengaz,* ***ne dev e ne ziman e****, hema her tiştî jina wî dibêje û bi rê ve dibe.*

Ne devê doxîna diya min e ku ez girê bidim.
Ne di destê min de ye. **Tu çi hesab dikî? Ew* ***ne devê doxîna diya min e ku ez girê bidim****.*

Ne di dest de bûn
bnr: Tiştek ji destê (yekî) nehatin

Ne dibê him, ne dibê gim.
bnr: Ne dixurice, ne dibare.

Ne dide, ne distîne.
bnr: Ne dixurice, ne dibare.

Ne digirî, tu pê re bigirî, ne dikene tu pê re bikenî.
bnr: Ne dixurice, ne dibare.

Ne digirî, ne digirije.
bnr: Ne dixurice, ne dibare.

Ne distrîne, ne ditewîne.
bnr: Ne dixurice, ne dibare.

Ne dixurice, ne dibare.
Ji bo kesên bêhelwest û bêbiryar tê gotin. **Ez belengazê Xwedê nizanim çawa bikim? Kendalê Meco wekî robotan e,* ***ne dixurice, ne dibare.***

Ne dixwe ne dide hevalan, genî dike diavêje newalan.
Çikûs bûn. Li kêra kesekî nefikirîn. **Mixabin Bender* ***ne dixwe ne dide hevalan, genî dike diavêje newalan.***

Ne dixwim gêlazan, ne didim hevrazan.
bnr: Ne dixwim savarê, ne diçim hewarê.

Ne dixwim nanê te, ne diajom horika te.
bnr: Ne dixwim savarê, ne diçim hewarê.

Ne dixwim nanê te, ne diajom kera te.
bnr: Ne dixwim savarê, ne diçim hewarê.

Ne dixwim savarê, ne diçim hewarê.
Ne dikevim bin mineta te, ne jî bedelan didim ji bo te. **Ez encama wê minetê baş dizanim.* ***Ne dixwim savarê, ne diçim hewarê.***

Ne dixwim virikan, ne diajom horikan.
bnr: Ne dixwim savarê, ne diçim hewarê.

Ne diz im, ne kuz im.
Hema wekî xwe me. **Bila li min biborin,* ***ne diz im, ne kuz im.***

Ne dîn e, ne îman e.
Ji bo kesên bêînsaf tê gotin. **Jixwe heçî Yekbûn e,* ***ne dîn e, ne îman e****, agir li ser pişta mêrê xwe diqelîne.*

Ne dostê fileh, ne hespê qule.
Ew her du jî bi kêr nayên. **Ji filehan kesek nemabû, lê dîsa jî kalikê min digot:* ***"Ne dostê file, ne hespê qule."***

Ne elenî, ne selenî bûn
Ne li dij, ne jî dost û heval bûn. **Heyran ez di riya xwe de diçim;* ***ne elenî, ne jî selenî me.***

Ne erê, ne na gotin
Bê biryar û bê helwest man. **Ez jî li ortê mame,* ***ne erê, ne jî na dibêje.***

Ne ew e, ne ev e, keşk birayê dew e.
Ev hemû jî nêzîkî hev in û di asta hev û din de ne. **Zêde jî derka wan nîn e.* ***Ne ew e, ne ev e, keşk birayê dew e.***

Ne Fat e, ne Xat e.
Hema her du jî wekî hev û din ne, derka wan nîn e. **Tu gumana xwe ji vê malbatê bibire,* ***ne Fat e, ne Xat e.***

Ne gawir im, ne misliman im (ne)gotin
Bê deng û bê helwest man. **Çiqasî bi ser de çûn jî wî negot;* ***ne kafir im, ne jî ne misliman im.***

Ne gîr e, ne bîr e.
bnr: Ne ew e, ne ev e, keşk birayê dew e.

Ne gotinên xweş, ne jî paşê tirên reş (Ne giliyên xweş, ne jî tirên reş)
Ne wê kêrê dixwazim, ne jî bi wê bedelê. **Heyran ji yên wer re têkiliya zêde ne pêwîst e. Ez naxwazim,* ***ne gotinên xweş, ne jî paşê tirên reş.***

Ne gur dibînim, ne jî qulhuwelahê dixwînim. (Ne gur bibînim, ne qulhuwelahê bixwînim.)
bnr: Ne radizêm newalên kûr, ne dibînim xewnên dûr.

Ne guregura ewran e, ne hirehira hespan e.
Tu hewldanek nayê xuyan. **Weleh çi bibêjim,* ***ne guregura ewran e, ne hirehira hespan e.***

Ne guregura ezmanan, ne xirexira mêran
bnr: Ne guregura ewran e, ne hirehira hespan e.

Ne hêjayî neynoka (yekî) bûn
Negihîştina radeya yekî. **Kuro malxerab, tu çawa wan dixî tayê hev? Ne Zerîcan,* ***ne hêjayî neynoka Simbilê ye.***

Ne hilanîn, ne danîn
Di derbarekê de bê helwest û bê hewldan man. **Min ji te re got, madem ku tu jî naxwazî, wê yekê* ***ne hilde, ne jî dayne.***

Ne hilimîn, ne kilimîn
Tu deng dernexistin, têkildar nebûn, nepeyivîn. **Erê, demeke dirêj li wir man, lê camêran* ***ne hilimîn, ne jî kilimîn.***

Ne hemînî, ne gimînî jê hatin
Tu helwestek nîşan nedan. **Ez çi hêviyê pê bikim?* ***Ne hemînî, ne gimînî jê tê.***

Ne Îsa li me dibe xwedî, ne Mûsa li me dibe xwedî.
Li holê bê xwedî man. Kesî guh pê nekirin. **Em wer mane,* ***ne Îsa li me dibe xwedî, ne Mûsa li me dibe xwedî.***

Ne ji bilikê, ne ji holikê bûn
bnr: Ne ji dêrê, ne ji vangê bûn

Ne ji cilikê (çilikê) ne ji silikê bûn
bnr: Ne ji dêrê, ne ji vangê bûn

Ne ji dil, ne ji gurçikê bûn
Ji ber ku herduyan jî dixwaze, nikare ji herduyan yekî hilbijêre. **Ya wî jî qet nabe ezbenî, camêrî* ***ne ji dil, ne ji gurçikê dibe.***

Ne ji dêrê, ne ji mizgeftê bûn
bnr. Ne ji dêrê, ne ji vangê bûn

Ne ji dêrê ne ji vangê bûn
Di navbera du vebijarkan de man. **Ew jî nizane çawa bike.* ***Ne ji dêrê dibe ne ji vangê dibe.***

Ne ji Hemzan e, ne ji Meman[*] e zirzopê (li) van ort(ey)an e.
bnr. Ne ji Hêtan e, ne ji Botan e, zirzopê li van ort(ey)an e.

Ne ji Hêtan e, ne ji Botan e, zirzopê li van ort(ey)an e.
Ji bo kesên serserî tê gotin. **Ma tu wî nas nakî?* ***Ne ji Hêtan e, ne ji Botan e, zirzopê li van ort(ey)an e.***

Ne ji malekê, ne ji rewşekê
Yên ku ne di heman hawirî de bin, rewşa wan wekî hev nabe. **Heyran çi têkiliya Cawîdan û Asmînê heye?* ***Ew ne ji malekê, ne ji rewşekê ne.***

Ne ji me jar dibe, ne ji me bar dibe.
Bandoreke me lê nabe yan jî ew li me nakelije. **Hûn qet nekevin tatêlê, ew* ***ne ji me jar dibe, ne jî ji me bar dibe****.*

Ne ji mezinan, ne jî ji piçûkan vekişîn
Ji kesî şerm nekirin. **Ev keçik* ***ne ji mezinan, ne jî ji piçûkan vedikişe****.*

Ne ji te his, ne ji me pis
Vê mijarê em qet venekin. **Êdî bes e qurban, êdî* ***ne ji te his, ne jî ji min pis****.*

Ne ji xwe re ne jî ji kesî re xêr hebûn
Kêrhatî nebûn. **Tu çi ji wî hêvî dikî?* ***Xêra wî ne ji xwe re ne jî ji kesî re heye****.*

Ne kar, ne zirar gîhiştin mirov
Di nav rewşeke nêtar (notr) de bûn. **Fatim jî wisa ye,* ***ne kar, ne jî zirara wê digihîje mirov****.*

Ne karê zarokan bûn
Rewş cidî bûn, ne wisa hêsan bûn. **Kuro tu çi dibêjî,* ***ev ne karê zarokan e****, baş li ser bixebite.*

Ne ker ket, ne hîz dirî.
Wekî ku qet tu tiştek nebûye hesibandin. **Tu çima xwe ew qas diêşînî? Tu jî bihesibîne ku* ***ne ker ket, ne hîz dirî****.*

Ne ker li garanê, ne pirsiyar li gavanê
Tu têkiliyek û berjewendiyeke min tune ku pirs û kêşeyek min jî hebe. **Tu karekî min bi wan tune.* ***Ne ker li garanê, ne pirsiyar li gavanê.***

---

[*] **Hemzan û Meman:** Gundên Tekmanê ne.

Ne ker tê ber bar, ne bar tê ber ker.
Ji bo rewşa berevajî tê gotin. **Ev kar wê çawa here sêrî, ez nizanim.* ***Ne ker tê ber bar, ne bar tê ber ker.***

Ne kerekî, ne perekî di mal de hebûn
Rewşa aborî pir xerabe bûn. **Kuro tu nikarî ji wî bistînî,* ***ne kerekî ne perekî wî di mal de heye.***

Ne kerê min e, ne gayê te ye.
Her du jî ji hev û din xerabtir bûn. **Tu jî qet neke mesele,* ***ne kerê min e, ne gayê te ye.***

Ne ketiye ber gazê, ne ketiye ber meqesê.
1. Perwerde nebûye, pir xeşîm, nezan û xam e. **2.** Dest pê neketin, topteze û nuh bûn. **Keçika qîzapa min dema ku ji gund hatibû,* ***ne ketibû ber gazê, ne jî ber meqesê.*** **"Gava vekir, dîna xwe dayê, tu qusûr tune, jê nayê xeberdan.* ***Ne ketiye ber gazê, ne ketiye ber meqesê."*** Celîlê Celîl

Ne kêm, ne zêde bûn
1. Di cihê xwe de sekinîn. Bi pêş ve neçûn. **2.** Bitam bûn, wekî daxwazê bûn. **Ev çend sal in dixebite, lê ne kêm, ne zêde bûye. *Qet meraqan meke, dolaba ku wî çêkiriye* ***ne kêm ne jî zêde ye,*** *wê valahiyê tam hiltê.*

Ne kêr e, ne bêr e, tev diçe ji xelkê re.
Ji bo kar û helwesta vala tê gotin. ****Ne kêr e, ne bêr e, tev diçe ji xelkê re. Ew*** *qas jî nabe lo, ew keda wan tev de vala çû.*

Ne kifkifa nefsî (nefî), ne çipçipa dolabê.
Qet yekê jî naxwazim. **Min navê,* ***ne kifkifa nefsî, ne çipçipa dolabê.***

Ne kûçik bibînim, ne riya xwe biguherînim.
bnr: Ne li newala kûr radizêm, ne xewnên xirab dibînim.

Ne lê ye bikene, ne lê ye bigirî.
Rewş eletewş e. Nizane ku çawa bike. **Ew qijik jî nizane çawa bike.* ***Ne lê ye bikene, ne lê ye bigirî.***

Ne li jêr, ne li jor bûn
Bêbiryar û bêhewldan bûn. **Xêr ji rûyê wî nayê.* ***Ne li jêr, ne li jor bûn.***

Ne li gorî qalibê (an jî qilafetê) xwe bûn
Wekî ku ji xuyangê hêvî tê kirin derneketin. **Min jî wisa hêvî nedikir, lê bi rastî jî* ***ne li gorî qalibê xwe bû.***

Ne li minê, ne li teyê
Ji destê me her du aliyan jî tiştek nayê. **Em çawa bikin Ezbenî?* ***Ne li minê, ne li teyê.*** *Destê ma li ber devê me.*

Ne li pîrê ne li bazê

Her du serî berevajî hev in. Bi herduyan jî nabe. ***Ne li pîrê ne li bazê.** *Ma kesekî asahî nîn e? Ew her du serî jî nabin.*

Ne li ber mino, ne li ber kûçê mino.

Tu kêreka wî ji min re nîn e. *****Ez ê çawa bikim ên wisa?* ***Ne li ber mino, ne li ber kûçê mino.***

Ne li şînan, ne li şahiyan (Ne yê şînan, ne jî yê şahiyan bûn)

1. Ne çûna şînan, ne çûna şahiyan. Di nav têkiliyên civakê yên erênî de nebûn. **2. Di** rojên teng an jî fireh de tu alîkarî nekirin. *****Tajdîn* ***ne li şînan, ne jî li şahiyan tê xuyan***. *****Ji Xelef tiştekî hêvî nekin, ew* ***ne yê şînan, ne jî yê şahiyan e***.

Ne ji dil bûn

Ne bi awayekî dilovan, saf û durist bûn. *****"Keçika li kêleka wê rûniştî carinan dev diavêtiyê, lê peyvên wê* ***ne ji dil bûn***." Yaqûb Tilermenî

Ne ji vê dinê bûn

Ji bo kesên zêde têkildarî tiştekî yan jî kesekî nabin tê gotin. *****Hûn çi ji Arîmed hêvî dikin? Ew* ***ne ji vê dinê ye***.

Ne li wê dinê, ne li vê dinê qebûl nekirin

Ji bo karên ku bi tu awayî nayên pejirandin ango bi erênî nayên dîtin tê gotin. *****Ya ku Elmedê Ûso kiriye,* ***ne li wê dinê, ne li vê dinê tê qebûl kirin***.

Ne li Xwedê, ne jî li qûlan xweş hatin

Karên ne rast kirin. *****Ya ku wî kir, ne li Xwedê, ne jî li qûlan xweş hat.*

Ne malê min, ne canê min

Ez tu bedelê nadim. *****Hema tu dibêjî,* ***ne malê min, ne canê min****, wisa jî nabe ku qurban.*

Ne malê qalibê xwe bûn

bnr. Ne li gorî qalibê xwe bûn

Ne me jê ye, ne me pê ye.

bnr. Min ne jê ye, min ne pê ye.

Ne mewijan pêş min bike, ne tinazan bi min bike.

Ne wê xêra te, ne jî wî şerê te dixwazim. *****Min ji te re çi got?* ***Ne mewijan pêş min bike, ne tinazan bi min bike.***

Ne mêşan ji xwe difirîne, ne hevalan.

Ji bo kesên ku kêra wan nagihîje wan û hawirdora wan tê gotin. *****Dixuye ku xêra wî ji wî re tune ye.* ***Ne mêşan ji xwe difirîne, ne hevalan.***

Ne mij e, ne moran e.

Rewş bêdeng û biaram e. ****Ne mij e, ne moran e****, ev çi lîstikên Osmaniyan e.*

Ne min jê ye, ne min pê ye.
bnr: Min ne jê ye, min ne pê ye.

Ne mir, ne jî
Ne jiyîn, ne jî mirin. Di hêla aborî de di nav rewşeke gelekî xeter de bûn. **Wardekê li hemberî wê jiyana **ne mir, ne jî** zêde li ber xwe neda.*

Ne pîrê baş kir li ser gûnî rûniştt, ne jî gûnî baş kir di pîrê re çû.
Divê her du jî nebûna. ***Ne pîrê baş kir li ser gûnî rûniştt, ne jî gûnî baş kir di pîrê re çû.** *Divê wisa nebûya lê her tişt kelîjê didin hev û din.*

Ne pîvaz xwar, ne dev şewitî.
bnr: Ne ker ket, ne hîz dirî.

Ne rêx e, ne gû ye, kul li herduyan bûye. (Ne gû ye, ne rêx e, kul li herduyan bixe.)
Her du jî ji hev û din xerabtir in. **Nelet li herduyan jî bê, **ne rêx e, ne gû ye, kul li herduyan bûye**.*

Ne sar lê tê, ne germ lê tê.
Zû bi zû memnûn nebûn. **Ez belengazê Xwedê nizanim çawa bikim. Tu çi dikî bi tiştekî nahesibîne. **Ne sar lê tê, ne germ lê tê.***

Ne serî, ne binî hebûn
Zehf mezin bûn. **Dewletê tunêleke wisa dirêj çêkiriye ku **ne serî, ne jî binî heye**.*

Ne serî ye, ne qûn e. (Çi serî ye, çi qûn e.)
Neşibandina tiştekî, bedcure û bêteşe bûn. **Jinika çi ye, **ne serî ye, ne qûn e**, te ku dera wê eciband kuro?*

Ne şeb e, ne jî şekir e.
bnr: Ne dengbêj e bi zirneyê re, ne peya ye bi siwaran re.

Ne şeytên bibînim, ne neletê lê werînim. (Ne şeytên dibînim, ne neletê lê wertînim.)
bnr: Ne li newala kûr radizêm, ne xewnên xerab dibînim.

Ne şên dike, ne xera dike.
Karek an jî tiştekî sererast pêk neanîn. **Malxirabî tu tiştek ji dêst nayê. **Ne şên dike, ne xera dike.***

Ne şûşt, ne jî avêt ber tavê.
Tu tiştek pêk neanîn. **Me çi ji wê hêvî dikir, lê wê **ne şûşt, ne jî avêt ber tavê**.*

Ne tahir e, ne zahir e, her yek gurekî har e.
Her yek ji hev û din xerabtir bûn. **Ka wê çawa be? **Ne tahir e, ne zahir e, her yek gurekî har e.***

Ne tê hiştin, ne tê kuştin.

Çawa dikî nikarî xwe jê xelas bikî. **Em ê çawa bikin kuro? Ev ê bêbav* ***ne tê liştin, ne jî tê kuştin***.

Ne tê, ne diçe.
bnr: Ne şên dike, ne xera dike.

Ne tir kir, ne bêhn da.
Ji bo kesên kone tê gotin. **Mêrikî* ***ne tir kir, ne jî bêhn da***.

Ne tirş e, ne tehl e.
Rewş û reng kifş nebûn. **Min tiştek ji Cananê fêm nekir.* ***Ne tirş e, ne tehl e.***

Ne tu dunda bûn
Ewledek, zuriyetek nebaş bûn. **Lawê Cemîlê* ***ne tu dunda ye****, li wê diya xwe ya pîr jî nabe xwedî.*

Ne tu rê bûn
Ji bo rewş û rêbaza nebaş tê gotin. **Ew riya ku tu tê re diçî,* ***ne tu rê ye***.

Ne tu tişt bûn
Nebaş bûn. Bi kêrî tiştekî nehatin. **Na lo! Ev zavayê kurapê min mirovekî* ***ne tu tişt e***.

Ne tu yî, ne navê te ye.
Ne tu, ne jî bandor û prestîja te tune ye. **Bi vê meşê dawiya vî karê te baş nayê xuyan, çimkî,* ***ne tu yî, ne jî navê te ye***.

Ne xan dike, ne xera dike.
bnr: Ne şên dike, ne xera dike.

Ne xema min e, ne dema min e, qirçeqirça benîştê min e.
bnr: Ne xema wê ye, ne dema wê ye, qirçeqirça benîştê wê ye, çêleka sor qelendê wê ye.

Ne xema wê ye, ne dema wê ye, qirçeqirça benîştê wê ye, çêleka sor qelendê wê ye.
Ji bo kesên bêxem tê gotin. **Ji wê re çi,* ***ne xema wê ye, ne dema wê ye, qirçeqirça benîştê wê ye, çêleka sor qelendê wê ye***.

Ne xêr li mişarê, ne bereket li xiyarê.
Xêr ji wan herduyan jî nayê. *****Ne xêr li mişarê, ne bereket li xiyarê.*** *Mixabin baş dizanim ku ev hewldan pûç e.*

Ne xirecir e, ev çi vir e.
Tiştek heye, lê hûn a rast nabêjin. **Hûn çima vedişêrin.* ***Ne xirecir e, ev çi vir e?***

Ne xwarê devê (yekî) bûn
Ne layiqî wî kesî bûn. **Erê, keçeke baş e lê* ***ne xwarê devê lawê min e***.

Ne yeka (yekî) dibe dudu, ne duduyên (yekî) dibin yek

Rewş eynî bûn, neguherîn. (Bi taybetî ji bo malê dinê tê gotin.) **Te çawa dîtiye wisan e,* ***ne yeka wê dibe dudu, ne duduyên wê dibin yek.***

Ne zivistana bêberf û ne jî havîna bêtav

Her tişt wekî taybetiya xwe divê. **Ku surişt nebe, xêr çi ye?* ***Ne zivistana bêberf û ne jî havîna bêtav.***

Neanîn ser barê xwe

bnr. Neanîna ser eynê xwe

Neanîn ser eynê xwe

Nepejirandin, wekî ku qet haj pê tune be hereket kirin. **Yê ku her tişt tevlihev kiriye ew e, lê camêrî qet* ***nayîne ser eynê xwe.***

Nebî lê kirin

Îftira û êtxî di kesekî de anîn. **Xwedê dizane, tu sûc û gunehekî wê nîn bû, hema* ***nebî lê kirin.***

Nebî pê de hatin

Rastî îftira û êtxiyan hatin. **Ji ber ku* ***nebî pê de hat,*** *wê jî berê xwe da welatekî din û ji vir çû.*

Nebînim behra bêgemî, nebînim însanê demdemî.

Mirovên ku her demekê helwestekê nîşan didin, nebaş in. **Xwezî ez* ***nebînim behra bêgemî, nebînim însanê demdemî.***

Nebînim dilê xem tê de, nebînim mala şer tê de.

Xem û şer ne tiştên baş in. **Divê mirov di nav aramiyê de bijî.* ***Nebînim dilê xem tê de, nebînim mala şer tê de.***

Nebînim hespa loqloqo, nebînim qîza lîqlîqo, nebînim kulfeta tîrqtîrqo.

Keçên ku zêde dipeyivin û jinên ku zêde dikenin ne meqbûl in. **Ji aliyekî ve ew jî ne neheq in ku gotine:* ***"Nebînim hespa loqloqo, nebînim qîza lîqlîqo, nebînim kulfeta tîrqtîrqo."***

Nebînim kalê kezî, nebînim hurmeta daw û deling rizî, nebînim keçê bang bezî.

Kalên wekî ciwanan xwe dixemilînin, jinên ku ser û guhên wan netêkûz in û keçên ku negiran in, nemexpûl in. **Ma min gotiye:* ***"Nebînim kalê kezî, nebînim hurmeta daw û deling rizî, nebînim keçê bang bezî."***

Nebûn şekala (yekî) (Negihîştina şekala (yekî))

Ji yekî pir kêmtir bûn. ** "Eger gavanek ji we re lazim be, bawer bikî ez* ***nayêm (nabim) şekala haziran****, lê yekî mîna min zehmet tê dîtin."* Zinar Soran

Neçûn serî

Bi têkûzî pêk nehatin. ** "Bi yekê razî nabe / Bi duduyan qaîl nabe / Bi sisêyan* ***nayê sero."*** Edip Karahan

Nedî nedî gonê bavê xwe dî, ew jî kir şevnimêj (leyletul qedr) û eydî.
Yên nedîtek tiştên ecêb dikin. **Ma tu dê ji nedîtekan re çi bibêjî?* ***Nedî nedî, gonê bavê xwe dî, ew jî kir şevnimêj û eydî.***

Nediçû dawetê, dema diçû digot: "Lot ha lot."
Nake dema ku dike jî zêde tund dike. **Jixwe ew wisa ne.* ***Nediçû dawetê, dema diçû digot: "Lot ha lot."***

Nediçû têran, îro dikeve torbeyan.
Rewş xerab bûn. **Kê tiştekî wer hêvî dikir? Berê* ***nediçû têran, îro dikeve torbeyan.***

Nedîtî û nebînayî bûn
Pir nezan bûn. Hay ji rewşê nebûn. **Dev ji wê keçikê berdin lo! Ew yeke* ***nedîtî û nebînayî ye.***

Nedîtî, tu çima dibêjî heft û nîv?!
Tu haj pê tune yî, tu çima dipeyivî û dinirxînî? **Tu li min û li vî lafekî binêre. Bê* ***nedîtî, tu çima dibêjî heft û nîv?!***

Neditiyan dît, bi xwe de rît.
bnr. Nedî nedî gonê bavê xwe dî, ew jî kir şevnimêj û eydî.

Needilî û nesitirî
Pir çalak, bêsebr û biteşqele bûn. **Lawê te, ev ê* ***needilî û nesitirî*** *ji ku anî û kir belaya serê min?*

Nefspaqij bûn (Nefstemîz bûn)
1. Nefsa xwe ji temahên xerab parastin, binamûs bûn. **2.** Çilek nebûn. **Mirov ku* ***nefspaqij nebe,*** *dibe koleyê şeytên. *Gevez pir* ***nefspaqij e,*** *heya tu bi xwe nediyê, devê xwe bi tiştekî nake.*

Nefspiçûk bûn
Dilnizm bûn. Bi xwe bawer bûn. **Ew jineke* ***nefspiçûk e,*** *çiqas nezan bin jî kesî piçûk nabîne.*

Nefstenik bûn
1. Li vîna xwe hakim nebûn. **2.** Çilek bûn. **Emir mirovekî* ***nefstenik e,*** *çi bêjî ji wî tê, dikare dest biavêje qîza cîranê xwe jî. *Miraz zarokekî* ***nefstenik e,*** *ew sîrerûn hemû qedand.*

Nefsa xwe kor kirin
1. Bija xwe şikênandin. Hindik be jî xwarin û vexwarin. **2.** Hakimî vîna xwe bûn. **Me hinek goşt da wî, wî jî* ***nefsa xwe pê kor kir.*** **Xecêya Weysiyê Kor,* ***nefsa xwe kor kir,*** *li ser zarokên xwe rûnişt û neçû mêr.*

Nefsa xwe terbiye kirin
Li hemberî bîrdozên xerab û tiştên nebaş vîna xwe perwerde kirin. **"Zerdeşt di Çiyayê Sabalan de xwe diafirîne û* ***nefsa xwe terbiye dike."*** Ehmed Huseynî

Nefsa xwe zeft kirin

Li hember hinek dozînên xwezayî yan jî nefsa xwe, li ber xwe dan. **Erê, ji bo wê jî zor bû, lê dîsa jî wê **nefsa xwe zeft kir**.*

Negihîştin neynoka (yekî)

bnr. Nebûn şekala (yekî)

Negotin "viq"

Qet dengê xwe nekirin. Tu helwest nîşan nedan. **Min jê re çi qas gotinên giran gotin jî, wî qet li hemberî min **negot "viq"**.*

Nehat qiyamet, ku hat xêr û silamet.

Neyînî be, pir xerab; erênî be, pir baş. **Jixwe karên me wer tûj in; **nehat qiyamet, ku hat xêr û silamet**.*

Nehatin ber çavên (yekî)

Girîng negirtin. **Xwedê dizane tu jê re çi bikî **nayê ber çavên Hemdem**.*

Nehanîn ser barê xwe

Tiştê ku dizane yan jî bi xwe kiriye, wekî nezan û nekirî dan xuyandin. **Rostem wekî ku qet haj pê tune ye, tiştek **neanî ser barê xwe**.*

Nehatin hemêzan

Ji bo kesên pir binaz û bimesref ku ezimandina wan zor e tê gotin. **Heyran min ji te re negot, ew ji mala Gerdenxala ye, **nayê hemêzan**.*

Nehatin rayê

Îkna nebûn. Nepejirandin. **Di hilbijartinê de me ji bo partiya xwe çiqasî jê re tika kir jî, Apê Zekî **nehate rayê**.*

Nehedilî bûn

Pir çalak bûn. **Ev kurê te zarokekî **nehedilî ye**.*

Nehedilîn

Li derekê demeke dirêj bi cih nebûn. Sitar nebûn. **Belengaza Zeynebê di jiyana xwe de li derekî **nehedilî**.*

Nekarîn derkevin nav meriyan

Di bin tawaneke fedîkar de bûn. **Piştî wê bûyerê, Nûman **nikaribû derkeve nav meriyan**.*

Nekero, dil kesero

Yê ku daxwaza dilê xwe ya herî girîng neyîne cih, ew yek di dil de dibe derd. *****Nekero, dil kesero.** Ji dest bihata ew qasî pê şirîn nedibû.*

Neketin bin dergê tengiyê

Neketin rewşa xerab. **Ew hê **neketiye bin dergê tengiyê**.*

Neketin serê (yekî)
Tênegihîştin. **Ez wê baş nas dikim, di wê derbarê de tu çi bibêjî,* ***nakeve serê wê.***

Neketin hişê (yekî)
bnr. Neketin serê (yekî)

Neketin rezê bavê tu kesî
Ziyan nedana tu kesî. **Ma lawê min* ***ketiye rezê bavê kê?***

Nemete Xwedê ne ew e, ev e!
A rasteqînî ne ew e, va ye ev e. **Erê, tu xwe, bi wê dixapînî, lê mêze bike,* ***nemetê Xwedê ne ew e, ev e.*** (bnr. çîrok)

Nemir, heyfa te, tu mirî ji şûn ve kêfa te.
Tu baş î lê ku tu li xwe mêze nekî kes talaşa te nake. **Hema ez a rast ji te re bibêjim* ***nemir, heyfa te, tu mirî ji şûn ve kêfa te.*** (argo)

Nener kirin
Fêl fistik û dekbazî kirin. **Tu bi Xwedê, serê me* ***neneran meke****, em dizanin rewş çi ye.*

Nerm bûn
Der barê mijara ku nedipejirand de ber bi pejirandinê ve çûn. **Me şeş mirovan ew da hemberî xwe û got ancax* ***nerm bû****.*

Nerm kirin
1. Îkna kirin. **2.** Gelekî li yekî xistin, lêdan. **Gelekî hêrs bûbû, heta bavo ew* ***nerm kir****, xwelidanê di ser re avêt. *Baran wisa* ***nerm kiribûn*** *ku reş hêşîn bûbû.*

Nermetîngî kirin (Bi nermetîngî nêzîk girtin)
Zexelî û pînî kirin. **Serkar ew kar* ***bi nermetîgî girt****, ji ber wê helwesta xwe jî kete telê.*

Nermopistî bûn
bnr. Melomestoyî bûn

"Nemete Xwedê ne ew e, ev e!"

Berê ji ber ku kar û bar zêde tune bû, binecîhi jî hindik bû. Wê demê ne wekî niha bû, çandinî jî kêm bû. Ji ber wê jî bi tayberî kurdên Serhedê gelekî dizî dikirin. Li hêla Îdirê mirovekî diz, towbe dike û dev ji diziyê berdide. Diçe çarşiyê ji xwe re tizbiyeke dirêj jî dikire û dest bi nimêj û taetê dike. Jixwe wê demê tunebûn zêde bûye, roj bi roj hê rewş xerabtir dibe. Rojekê mêrik tê mal, lê mêze dike ku jina wî hevîrekî dike ku naşibe hêvîr. Dibêje:
"Jinik ev çi ye tu çêdikî?" Jinik dibêje:
"Hevîrê nanê garis e." Mêrik mêze dike ku tiştekî pir xerab tê xuyan. Bîzê wî vediçe û dibêje:
"Jinik hevîrê wisa çet dibe? Ev çito hevîr e? Ev tiştekî pir xirab tê xuyan, em nikarin nanê vî hevîrî bixwin." Jinik dibêje:
"Mêrik estexfera xwe bîne ev nemetê Xwedê ye, tu çawa wisa dibêjî? Wa ye der û ciran ji birçînan dimirin ev nanê garis jî bi dest wan nakeve." Mêrik hema radibe tizbiya xwe ya dirêj dike rex û deriyê xwe û bi wî hevîrê teştê jî ser siwax dike û derdikeve diçe. Nîvê şevê bi miyeke kok vedigere mala xwe. Jin û zarokên wî razayî bûne. Mêrik di xaniyê tendûrê de miyê şerjê dike, post dike, goştê wê hûr dike. Di beroşeke mezin de goşt diqelîne, amade dike û bang dike jin û zarokên xwe. Malbat tev wekî gurê birçî xwe digihînin goştê qeliyayî, bi tahmek bêhempa dixwin. Mêrik dizivire ser jina xwe û jê re dibêje:
"Jinik, mêze bike! Nemete Xwedê ne ew e, ev e!"

Nermovingo
Ji binî ve û xinisî bûn. **Divê mirov xwe ji yê wekî wî* ***nermovingo*** *biparêze.*

Nesîb hatin ber piyên (yekî)
Kar baş meşîn. Qismet zêde bûn. **Zêde ked jî neda, hema* ***nesîbê wê hate ber piyên wê****.*

Nesîbê (yekî) birîn
Ji debara kesekî re astengî derxistin. **Ez dizanim, wê jinikê* ***nesîbê min birî****.*

Nesîbê xwe bi destê xwe defandin
Bi xwe ji debara xwe re astengî derxistin. **Wê bi xwe* ***nesîbê xwe bi destê xwe defand****.*

Nesitirî bûn
bnr. Nehedilî bûn

Neşibandin tiştekî
Bedcure bûn. Bi kêrî tu tiştekî nehatin. **Ezbenî,* ***naşibîne tu tiştekî*** *ku mirov nav lê bike û bibêje, filan an jî bêvan.*

Neterelaştî bûn
Ji bo kesên ku pir hov û nezan in tê bikaranîn. **Ev Xelîl jî wek hunermend tê bi nav kirin, lê tu bawer be ku wekî darekî* ***neterelaştî ye****.*

Netika xwe dayîn netika (yekî)
Bi yekî re têkoşîn kirin. **Lawê min, wekî yê te ji bo doza eşîrê neketiye zindanê, wî* ***netika xwe daye netika dewletê****.*

Netika xwe kirin gilê
Hêrs bûn. Moral xera bûn. **Dîsa Arîn* ***netika xwe kiriye gilê****, gelo vê carê derdê wî çi ye?*

Newal xalî ye, rovî walî ye.
Yên bêhêz ku li hember wan kes tune be, xwe tiştekî zêde dihesibînin. ****Newal xalî ye, rovî walî ye.*** *Cihê ku kes lê tune be, di ser wî re tu kes tune ye.*

Newêret kerî, hilderte paliyê.
bnr. Nikaribûn bi yên beredayî, çûn yên girêdayî.

Newroz,[*] ecêb roj
Gelek taybetî û cudatiya Newrozê hene. ****Newroz, ecêb roj!*** *Yên ku wateya Newrozê dizanin, dizanin bê çi qas girîng e.*

---

[*] **Newroz:** Bi rastî jî Newroz rojeke pir balkêş e. Di biwêjên ku peyva *"Newroz"*, *"adar"* û *"bist û yekê adarê"* tê de derbas dibin jî didin xuyandin ku gelek taybetiyên meha adarê û bi taybetî roja Newrozê hene. Mirov dikare hinek taybetiyên Newrozê wiha rêz bike:
- 21'ê Adarê ango di şeva Newrozê de şev û roj wekî hev dibin.
- Rewşa av û hewayê ji 21'ê Adarê bi şûn de tê guherandin.
- Newroz, di heman demê de dawiya zivistanê û despêka biharê ye.

Newroz, xelas bû dew û doz, me dibît herî, nedibît toz.
Di meha adarê, ango di newrozê pê de gelek pirsgirêk berê berê çareser dibin. ***Newroz, xelas bû dew û doz, me dibît herî, nedibît toz.** Êdî hûn jî hinekî xwe ragirin.*

Newroza siltanî, dar gopalê xwe hilanî, bihar û zivistan ji hev deranî.
bnr: Newroza siltanî, dar û gopalê xwe hilanî, sala kevn û teze ji hev deranî.

Newroza siltanî, dar û gopalê xwe hilanî, sala kevn û teze ji hev deranî.
Ev hemû taybetiyên meha Newrozê ne. ***Newroza siltanî, dar û gopalê xwe hilanî, sala kevn û teze ji hev deranî.** Gelek taybetiyên Newrozê hene.*

Newroza siltanî, lahindika sava bibe ser banî, çû êş nagihên leşê xudanî.
bnr: Newroz, xelas bû dew û doz, me dibît herî, nedibît toz.

Nexeritandî bûn
bnr: Neterelaştî bûn

Nexş lê danîn
Girîng girtin. **Ma makîna te gelekî tiştekî bimatah e? Qey ez ê **nexş lê daynim**?*

Nexweş e, parî pê xweş e. (Nexweşê parîxweş e.)
bnr: Nexweşê şekşekê, dozden nan avêtin bin kêlekê.

Nexweşê li nav ciyan bûn
Kûr û giran nexweş ketin. **Piştî wê barana ku me xwar, ez û Şêxmûs **bûn nexweşên nav ciyan**.*

Nexweşê me helak e, tûrê nan di ber serî de bi dar ve ke, heta sibê ne nan, ne pariyek e.
bnr: Nexweşê şekşekê, dozdeh nan avêtin bin kêlekê.

Nexweşê me nalenal e, tûrê nan di ber serî de bi dar ve ke, heta sibê pariyê betal nake.
bnr: Nexweşê şekşekê, dozdeh nan avêtin bin kêlekê.

Nexweşê şekşekê, dozdeh nan avêtin bin kêlekê.
Ji bo kesên ku xwe li nexweşiyê datînin, lê zêdetir dixwin û vedixwin tê gotin. ***Nexweşê şekşekê, dozdeh nan avêtin bin kêlekê.** Ew jî dibêje, ez nexweş im, lê maşelah em nikarin xwarinê pê re bigihînin.*

Nexweşê tiştên xweş bûn
1. Bi tiştên xweşik, bedew, binirx û qalîte re mijûl bûn. **2.** Pir çilek bûn. **Dilcan wisa ye, mêrikî **nexweşê tiştên xweş e**. **Ez ji nexweşiya wî bawer nakim, ew **nexweşê tiştên xweş e**.*

- Salvegera sala nû û kevn e.
- Ji ber ku av û hewaya dinyayê xweş dibe, sar û seqema zivistanê bi dawî dibe, dinya germ dibe, baran dibare erd hêşîn dibe, sewal dizên, bêhn û bereket ji her derê difûre.
- Di nav gelên rojhilata navîn de, bi taybetî di nav kurdan de Newroz roja serhildan û azadiyê ye. Ji bo wê jî Newroz rojeke pîroz e.
- Di hêla olî de ecem û şiî jî bi gelek wateyan roja Newrozê pîroz dibînin û girîng digirin. (Wekî roja bûyîna Hz. Elî û hwd.

Nexweşê bedhal bûn

Kûr nexweş ketin. **Dibêjin Riza* ***nexweşê bedhal e****, divê em jî serîkî bidinê.*

Nexweşo belawêr (bedhal) e, gava xwarinê ber bi xêr e.

bnr. Nexweşê şekşekê, dozdeh nan avêtin bin kêlekê.

Neyarê xwe nas kirin

Rewşa xwe û yên li dijî xwe baş nasîn. **"Îro ommet* ***neyarê xwe nas nake****. Xwînmijên xwe heval û hogirên xwe neyar dibîne."* Mucteba Baravî

Neynok di hev dan

Ji bo pevçûn û lihevsorkirinê tê gotin. **Wa ye ew dîsa* ***neynokan di hev didin****, Xwedê dawiyê xêr bike.*

Neynok nemaye ku xwe pê bixurîne.

Rewşa aborî pir xerab e. **Bahadînê Reşît ketiye rewşek wisa ku* ***neynok nemaye ku xwe pê bixurîne****.*

Nezan e, sergirdan e.

Kesên nezan, ji ber ku çareseriyê nizanin, di nav pirsgirêkan de gêj dibin û li xwe diheyirin. ****Nezan e, sergirdan e****, dev ji çareserkirinê berde, bi ser de xwe rezîl jî kirine.*

Nizanim, rehetcan im

Yên ku nizanin an jî xwe li nezaniyê datînin, ji ber ku ji pirsgirêkan dûr in, rehet in û xwe ji gelek xeteriyan diparêzin. ****Nizanim, rehetcan im.*** *Ew yekî çavbel e, xwe li nezaniyê datîne, loma jî xwe ji gelek tiştan diparêze.*

Nêrî, rehet bisekine, binêre ez ê du rikat nimêj bikim, te jî bişînim wê dinê ha.

Tu ku zêde bi pêş de herî û rehet nesekinî, ez ê te jî bi wê azîneyê ceza bikim ha. ****Nêrî, rehet bisekine, binêre ez ê du rikat nimêj bikim, te jî bişînim wê dinê ha****. Li gorî wê tevbigere.* (bnr. çîrok)

Nêçîrvano, rabe kêrê tûj ke, di bintara te de hem xezal e, hem kêrgûşk e.

Li ser miriyên ciwan ji bo Ezraîl tê gotin. Ango çi karê te bi vî ciwan û delalê me heye? Dev ji me berde. **Tu çi ji lawê min î tuncik zer dixwazî?* ***Nêçîrvano, rabe kêrê tûj ke, di bintara te de hem xezal e, hem kêrgûşk e.***

Nêzenêz kirin (Nêzenêz jê hatin)

1. Di hêla tenduristiyê de di nav rewşeke xerab de bûn. **2.** Ji birçînan nalenal kirin. **Wê*

"Nêrî, rehet bisekine, binêre ez ê du rikat nimêj bikim, te jî bişînim wê dinê ha."

Gundiyek pazdeh-pîst bizinên wî hebûne. Nexweşiyek dikeve nav bizinan, çiqas dermanan bi kar tîne jî kêr nake. Di dawiyê de diçe bal melayê gund. Derdê xwe jê re dibêje. Mela niviştan dike û dibêje:

"Divê tu rojê du rukaet jî nimêj bikî ji bo bizinan, wê demê bizinên te namirin." Gundî dest pê dike rojê du rukaet nimêj dike. Lê vê carê her roj du heb bizinên gundî dimirin. Rojê du rukaet nimêj du bizin; du rukaet nimêj û du bizin. Di dawiyê de hemû bizinên gundî dimirin, tenê nêriyekî wî dimîne. Gundî rojekê nêriyê xwe berî çayirê daye diçêrîne, lê dinêhire ku li dor xwediyê xwe tê û diçe, bi quloçeyên xwe pê şad dibe û wî gelekî aciz dike. Gundî di dawiyê de hêrs dibe û dibêje: *"Nêrî, rehet bisekine, binêre ez ê du rikat nimêj bikim, te jî bişînim wê dinê ha."*

*nexweşiyê wisa kiriye ku **nêzenêz ji Meqbûleyê tê**. *Dema ku min xwe gihandiyê, ji birçînan **nêzenêz dikir**.*

Nêzîkayî nîşanî hev dan
Têkiliyên germ jê renîşan dan. **Ji ber heman mantiq û ramanê çand û ponijandina gelan **nêzîkayiyê nîşanî hev didin**.*

Nêzîkayî lê kirin
bnr. Nêzîkayî nîşanî hev dan

Nêzîkayî pê dan
bnr. Nêzîkayî lê kirin

Nêzîkî aqilan bûn
Bimantiqî bûn. Nêzîkî rasteqîniyê bûn. **Gotina Zilfo ji ya Zerîfeyê zêdetir **nêzîkî aqilan e**.*

Nêzîkî hev bûn
bnr. Nêzîkayî lê kirin

Nêzîkî rehma Xwedê, dûrî aqilan bûn
Bêîmkan bûn. Ji rasteqîniyê dûr bûn. **Welehî ev gotinên te, nêzîkî **rehma Xwedê, lê dûrî aqilan in**.*

Niçandin (yekî)
Yek şiyar kirin, îşaret dayîn. *Heke Remezan **neniçanda wê**, wê wisa zû xwe top nedikir.*

Nikare bi kerê, dibeze kurtan.
bnr. Nikaribûn bi yên beredayî, çûn yên girêdayî.

Nikare di bin histêrkan de bimeşe.
Xwe zehf zêde dîtin. **Eliyê Nesîfa Hecî Mehmedê Kem, xwe wisa dinepixîne ku mêrikî **nikare di bin histêrkan de bimeşe**.*

Nikare kerekê biajo.
Ji bo kesên bêzereng û pêk nehatî tê gotin. **Kuro tu çawa bi wî bawer bûyî? Ew reben **nikare kerekî biajo**.*

Nikare pelûrekê ji xwe re çêke, jajerûnê ji hevalê xwe re çêdike.
Ji bo kesên bêdenge tê bikaranîn. **Ew qas jî nabe lo! **Nikare pelûrekê ji xwe re çêke, jajerûnê ji hevalê xwe re çêdike.***

Nikare bi yekê; dibêje, dudu werin.
Ji bo kesên lafek tê bikaranîn. **Hela tu li vî derewînî binêre. **Nikare bi yekê; dibêje, dudu werin.***

Nikaribûn bi yên beredayî, çûn yên girêdayî
Ji bo kesên ku hempayê xwe na, lê yên bêhêz û ji xwe qelstir didin hemberî xwe tê gotin. **Ew ne mirovê tekoşînê ye, **nikaribû bi yên beredayî, çû yên girêdayî**.*

Nikul avêtin

Paşgotiniya yekî kirin. **Ew nikare li hemberî wê tiştekî bibêje, lê hema wiha* ***nikul diavêje wê.***

Nikulbigû bûn

Bi karên xirab re mijûl bûn. **Ew jî dizane ku kirinên wî* ***nikulbigû ne,*** *dê wan bedelan jî bide.*

Nikulê (yekî) ketin nava gû

Têk çûn, bi şermiyê ketin. **Kengê ku keçika wî boxçeyê xwe hilda û bi leşkerekî biyanî re revî,* ***nikulê Sedo wê çaxê kete nava gû.***

Nimêj e, xewlekî dûr û dirêj e, her kes nikare bibêje.

Karê zor û bizehmet her kes nikare bike. **Her tişt bedel divê.* ***Nimêj e, xewlekî dûr dirêj e, her kes nikare bibêje.***

Nimêja deman deman, wahşê devê çeman

Ji bo karên bêistîkrar tê gotin. *****Nimêja deman deman, wahşê devê çeman.*** *Çiyê wê rast e?*

Nimêja xwe ji stûyê xwe derxistin

Binbariya xwe bi awayekî ji bêgavî û bêyî dil pêk anîn. **".. hema em* ***nimêja xwe ji stûyê xwe derdixin,*** *em dikevin dinya biqirêj, dîsa gunehan dikin."* Ridwanê Elî

Nirx tê dan

Rûmet dan. Bi bihayekî zêde nirxandin. **Dibe jî me ew qas* ***nirx tê neda,*** *belkê ew ê jî ew qas heq nekiribû.*

Niviştа bêtişt, te mele kuşt.

bnr: Niviştа bêtişt, xwediyê xwe kuşt.

Niviştа bêtişt, xwediyê xwe kuşt.

Karên nerast, ziyanê jî digihîne mirov. **Jixwe dawiyê karê wisa jî wisa dibin.* ***Niviştа bêtişt, xwediyê xwe kuşt.***

Niviştek çêkir ji qîzê re, gû hat bi mîzê re.

Ji bo karê xerabtir tê gotin. **Ev çi karê çiloçepî ye,* ***niviştek çêkir ji qîzê re, gû hat bi mîzê re.***

Nivîsa li ser avê bûn

Ji bo karên vala û bêkêr tê gotin. **Ya ku ew dibêje,* ***nivîsa li ser avê ye.***

Niyet hasil bûn

Daxwaz bi cih hatin. **Xaltiya Almast, te gelekî hez dikir ku lawê te azmûna konservatûarê qezenc bike, çavê te ronî, wa ye* ***niyeta te hasil bû.***

Niyeta dil, qeda serî

Mirov çi niyet bike û xwe bi çi bigire bi gelemperî ew tê serî. *****Niyeta dil, qeda serî.*** *Heke ew qasî li ser wan nesekiniyayî, ew pêk nedihat.*

Niyeta xwe xera kirin

Di armanca pêkanîna karekî de bûn. **Min lê mêze kir ku wî **niyeta xwe xera kiriye**, wê li min bixe, min berî wî ew li erdê dirêj kir.*

Nizane bi mala dawetê, dest diavêje kevçî û diçe.

Ji bo kesên nefsek (çilek) tê gotin. **Tenê derdê wî xwarin e. **Nizane bi mala dawetê, dest diavêje kevçî û diçe.***

Nizane dinya ji ku hatiye û bi ku de diçe

Hay ji rewşa dinyayê tune bûn. **Ew zarokê duh na pêr e, ma ew çi **zane dinya ji ku hatiye û bi ku de diçe**?*

Nizane kî miriye, dibêje: "Heylo birawo!"

Ji bo kesên ji bo berjewendiyan tevdigerin tê bikaranîn. **Maşelah çiqasî li ber xwe dikeve. **Nizane kî miriye, dibêje: "Heylo birawo!"***

Nizane mala dawetê kîjan e, vartan vartana wî ye.

Ji bo berjewendiyên xwe, xwe bi awayekî nêzîk û germ nîşan dan. **Ev sextekar **nizane mala dawetê kîjan e, lê hema vartan vartana wî ye**.*

Nizane ser çi ye, ber çi ye.

Bêîstîkrar û bêdenge bûn. **"Dema ne ser av û axa xwe be, dilê merivan ji her tiştî sar e, wekî dibêjin, **nizane ser çi ye, ber çi ye**.* Rizaliyê Reşît

Nizane serê wî li ser çi kevirî ye.

Hay ji xwe û ji xeteriya ku di nav de nebûn. **Bila ew wisa xwe li ba bike, ew hê **nizane serê wî li ser çi kevirî ye**.*

Nizane quzê kerê çend parçe ye.

Bi awayekî argo wekî tirane di wateya nezaniyê tê bikaranîn. **Ew kî ye kuro, ew **nizane quzê kerê çend parçe ye**.* (argo)

Nîn e bixwe nan û jajî, xwedî dike tol û tajî.

Ji bo jiyan, tevger an jî helwesta bi nakokî tê bikaranîn. ****Nîn e bixwe nan û jajî, xwedî dike tol û tajî**. Li mal keriyek nan tune, tu li der ve forsa wî û telefona wî ya destan binêre.*

Nîr neketin (ser) stûyê (yekî)

Binbarî parê neketin. **Çawa hebe **nîr neketiye stûyê wê**, ji xwe re mezin mezin dipeyîve.*

Nîrê ... şikandin

Rewş guherandin. **"Tevgera Demokratîk a Gelê Kurd **nîrê diyalektîka raperîn û tepeserkirinê şikand**..."* Samî Berbang

Nîska min firiya, girara min rijiya.

Karê min baş nameşe. Ez bêşans im. **"... hema ev bextreşî bi serê min pepûkê de teqiya. Çi **nîska min fûriya û girara min rijiya**.* Qado Şêrîn

Nîsika pîrê, nadım bi birincê mîrê.
Malê mirov bi xwe, ji minetan çêtir e. **Nîska pîrê, nadim bi birincê mîrê.* *Bila ne biminet be, çi dibe bila bibe.*

Nîsikek di nav gûyê xwe de dîtin
Bêdengetî kirin, xwe winda kirin, bitrî bûn. **Mecît zelıf ıar bûye, tu dibêjî* ***nîskek di nav gûyê xwe de dîtiye.***

Nîvê nokê tê de neçûn
Gelekî bêhnteng bûn. **Her hal ji ber azmûnên beşa dersa obûayê ye,* ***nîvê nokê di Serkarê Celadet de naçe.***

Nîvkarê salê; yekî ka bir, yekî ga bir.
Di karên nîvekarî de hinek bi pêş ve diçin, hinek jî ziyanê dibînin. **Ka çend kes di karên nîvekarî de tevde bi pêş ve çûne?* ***Nîvkarê salê; yekî ka bir, yekî ga bir.***

Nîvxendî kirin
Nîvxeniqandî kirin. Anîn radeya xeniqandinê. **Mêrik hema Seyran* ***nîvxendî kir,*** *dû re berda.*

Nîzenîz kirin (Nizeniz kirin)
1. Ji bo kesên nexweş an jî bêçare ku dinalin tê gotin. **2.** Ji bo kesên nuxs û bêbiryar ku bersiveke zelal nadin jî tê bikaranîn. **Xalê Fazil di bin lihêfê de* ***dikire nizeniz.*** **Jixwe min di serî de dizanibû ku ew ê* ***bike nîzenîz*** *û nakeve nava wê tifaqê.*

Nok hat bajêr, bû leblebî.
bnr. Noka genî çû bajêr, bû leblebî.

Nok heye diran tune ye, diran heye, nok tune ye.
Bêşans e. Rewşa wî berevajî ye. **Ew jî karekî ecêb e.* ***Nok heye diran tune ye, diran heye, nok tune ye.***

Noka genî çû bajêr, bû leblebî.
Ji bo kesên ku diçin devereke din û xwe bi awayekî din nîşan didin tê gotin. **Erê dayê, ma em Nezo nas nakin?* ***Noka genî çû bajêr, bû leblebî.***

Nokê, dê bê li kokê.
Her tişt û her kes, di dawiya dawî de nikare ji esil û esasê xwe biqete. **Çiqas bê guherandin jî,* ***nokê, dê bê li kokê.***

Nokê, herî li kokê.
bnr. Nokê, dê bê li kokê.

Nokê, radibe ser kokê.
bnr. Nokê, dê bê li kokê.

Nokên me, bûn leblebî.

Tiştên kevin û bêrûmet ji nişkan ve birûmet bûn. **Bi rastî em jî ecêb man. Me her dît ku **nokên me bûne leblebî**.*

Nokên sor ên Amedê, çûn bajêr bûn leblebî.
bnr: Noka genî çû bajêr, bû leblebî.

Nola bûkeke rûbixêlî bûn
Pir ciwan û bedew bûn. **Welehî Melîkcan niha hê jî **nola bûkeke rûbixêlî ye**.*

Nola goşt û hestî bûn
Gelekî nêzîkî hev û din bûn. **Ew **nola goşt û hestî bûne**. Tu çiqas dikî bike, nikarî wan tam ji hev û din biqetînî.*

Nola heft beraşên aşan bûn
Gelekî mezin û giran bûn. **Ew **nola heft beraşên aşan e**, ma kî dikare pişta wî dayîne erdê?*

Nola hespê ji xamê derketî
Ji bo kesên xurt, ziringî û qoçax tê gotin. **Çi ye heyran, te ev lawê xwe **nola hespê ji xamê derketî** berî nav meydanê daye.*

Nola kapê çik bûn
Kone, çapik û çeleng bûn. **Maşelah Azad **nola kapê çik e**.*

Nola meytê marê reş bûn
Giran û bêtevger bûn. ***Nola meytê marê reş** li ortê dirêj bûbû.*

Nola qencelîskên bin bêjingê bûn
Pir hûr, kêrnehatî û bêemel bûn. **Keçê porkurê, tu yê çi bikî wî mêrikê **nola qencelîskê bin bêjingê**?*

Nola qijika reş bûn
Bêşans, perîşan û belengaz bûn. **Servet **nola qijikeke reş** li benda xalê xwe ye.*

Nola qîzeke (bûkeke) destbihene bûn
bnr: Nola bûkeke rûbixêlî bûn

Nola qîzeke kezî
Ji bo kesên milayîm û baş tê gotin. **Lawê Osê Xelîl, **nola qîzeke kezî** li ber destê diya xwe diçe û tê.*

Nola rûnê li qûna segan (kûçikan) dayî
Ji bo xêr û qenciya valaçûyî tê bikaranîn. **Ew kirinên min, hemû **nola rûnê li qûna segan dayî** badilhewa çûn.*

Nola sîr û pîvazê bûn
Pir zingirî bûn. **Rast e, bavê min heftê û çar salî ye, lê maşelah **nola sîr û pîvazê ye**.*

Nola sola bênelçe

Bêpergal û bêsazûman bûn. **Nado,* ***nola sola bênelçe****, nikare pariyê xwe bixwe.*

Nola şêrê bêboçik

Erê, boçika wî tune lê pir xurt û jêhatî ye. **Ew jî* ***nola şêrê bêboçik****, dixwaze, bikeve taldê wan û rehet bijî.*

Nola şêrê serê çiyayan bûn

Xurt, egîd û qoçax bûn. **Gerîlayên wan* ***nola şêrên serê çiyayan****, hêdî hêdî dijmin ji welatên xwe derxistin.*

Nuqutîn dilê (yekî)

Der barê tiştekî de rasteqînî hîs kirin. Pê ve eyan bûn. **Hema çawa ku min ew li wir dît, ew yek di heman demê de* ***niqutî dilê min****.*

Nûh gotin, nebî negotin

Pir biinyat bûn. **Me kir û nekir, mêrik nehate rê.* ***Nûh got nebî negot.***

Nûmalan rahiştin koremaran, gotin: "Ev e, werîsê şahran, em ê mala xwe pê bigîhînin kevnemalan."

Ji bo kesên bêfem, û nezan tê gotin. *****"Nûmalan rahiştin koremaran, gotin: "Ev e, werîsê şahran, em ê mala xwe pê bigihînin kevnemalan."*** *Yên nexwendî ji wan zêde kêmtir nîn in.*

Nûr ji rûyan barîn (Nûr jê barîn.)

Xuyangeke erênî û xweş xuyandin. **"Dibişirî, şewq û* ***nûr jê dibarî****. Hinekan jî digotin ew dîtine ..."* Ridwanê Elî

Nûra çavên xwe rijandin

Gelekî ked dan. **Xalê Bawa* ***nûra çavên xwe rijand****, lê heya îro jî tu bersiveke baş negirtiye.*

"Nûh gotin, nebî negotin"

Ji ber rewşa dinyayê ku ber bi xerabûnê ve diçe, Xwedê Teala Nûh Nebî dişîne dinyayê. Pêxemberê çaremîn Nûh, ji bo ku însanan bîne ser riya rast gelekî hewl dide, lê tenê malbata wî û çend kesên exrebe û nêzîkên wî jê bawer dikin. Ji ber wê Xwedê Teala fermanê dide Nûh Nebî ku ji ber xirabiya wan kesên xerab wê tufanê rake. Ji bo wê jî divê Nûh Nebî gemiyeke mezin (sê qat) çêke ku mirovên bawermend û ji her nêr û mêyên jîndaran jî cotekî têke wê gemiyê û wan ji tûfanê rizgar bike. Çêkirina gemiyê demeke gelek dirêj digire (wekî 600 sal), lê dî vê demê de jî qewmê Nûh ji wî bawer nake û ji wî re nabêje "nebî" ango pêxember. Bi destpêka barana gur re Nûh Nebî ji hemû jandarên nêr û mê yek û mirovên bawermend dike gemiyê. Çil roj û çil şevî baran dibare, ser rûyê erdê dibe lîç. Nûh nebî her çiqas israr dike jî lê kurê Nûh Yam û ên din li hember wî disekinin, çok dikutin erdê, dikin inyat û ji Nûh re nabêjin Nebî. Ji ber wê jî hemû li ber wê tûfanê telef dibin. Gemiya nûh jî derdikeve ser serê Çiyayê Cûdî (di hinek dîtinan de li ser serê Agiriyê) bi vî awayî ji ber tûfanê difilite. Ew jandarên di hundirê gemiyê de jî bi vî awayî rizgar dibin. Dibêjin ev biwêj jî ji bo mînaka inyata yên ku digel wê tofana mezin ji Nûh pêxember re nabêjin Nebî hatiye afirandin. Loma ji kesên pir biinyat re dibêjin: *"Nûh dibêje, nebî nabêje"*

O

Ocax girtin(*)
Bîn û bereket pêk hatin. **Maşelah karê mala Taharê Heydo baş e, zeviya wan* ***ocax girtiye****.*

Ocax qelandin (ocax qelîn)
bnr: Ûrt qelandin

Ocax temirîn
bnr: Ocaxa (yekî) tûrtewas bûn

Ocaxa Cin Teyar hewra ocaxa te bê.
Keça min* ***ocaxa Cin Teyar hewra ocaxa te bê**.* (dia)

Ocaxa (yekî) damirandin (temirandin)
bnr: Ocaxa (yekî) kor kirin

Ocaxa Eto lê xistin
Ji Xwedê Teala dixwazim,* ***ocaxa Eto li te xe**.* (nifir)

Ocaxa (yekî) kor bûn
Ketin rewşeke xeter, malwêran bûn. **"Pehe, çavê me birije, mala me xerab be,* ***ocaxa me kor be****. Seydayê me çiqas reng avêtiye."* Celîlê Celîl

Ocaxa (yekî) şên bûn
Rewşa malbata yekî xweş bûn. **Maşelah* ***ocaxa Azad şên e****.*

Ocaxa (yekî) tûrtewas bûn
Rewş pir xeter bûn. Mal xera bûn. ****Ocaxa rebenê Resûl ji rûyê çavçiliya wî hema ji nişkan ve tûrtewas bû*** *û çû.*

(*) **Ocax girtin:** Carinan di nava zeviyên ceh an jî genim de li cihnan wekî du-sê metreqereyan berhem ji yên din bilindtir û geştir dibe. Simbil û doxa wir wisa gir û gumreh dibe ku di ser hev du de ditewe. Ji wê re *"ocax girtin"* tê gotin. Dema ku di zeviyan de tiştekî wer pêk bê, ango ocax bigire, ew dibe nîşaneya yan jî mizgîniya bîn û bereketê. Ji bo wê jî edet e ku yê ceh an jî genimê wî ocax digire divê qurbanekê serjê bike.

Ocaxa xwe kor kirin

Ziyan û xeteriyek gihandin malbat û kozî kulfetê xwe. **Weysî **ocaxa xwe kor kir**, ji ber ku kurê xwe nedît, kire bin erebeya xwe.*

Oda belek, nan lê tune, lê av lê gelek.

Ji bo kar û sazûmana berevajî tê bikaranîn. **Karên me jî wisa çiloçepî ne. **Oda belek, nan lê tune, lê av lê gelek.***

Ofînî pofînî kirin

Di nav rewşeke teng de bûn. **Wa ye dîsa **ofînî pofîniya Celîl e**, gelo îro çi bûye?*

Olamê xelkê kirin (olamtiya xelkê kirin)

Ji xelkê re xizmet kirin. Ji bo hinekên din xebitîn. **Ew qas salan Emîn **olamê xelkê kir**, ka encam hû çi?*

Omerî[1] ye, bimewij û tirî ye.

Omerî bi tirî û mewijan mezin dibin. **Helbet wê wisa be, ma tu nizanî, ew **Omerî ye, bimewij û tirî ye**?*

Ortekê ruh û canê, kinikê simşeytanê

Keçikên bejnnîvçe xweş û şirîn in, ên kinik jî pir zana û şeytan in. **Weleh birako karê te zor e. Çi gotine: **"Ortekê ruh û canê, kinikê simşeytanê."***

Osê maldawo, Şewêşo malavawo

Hinek didin, hinek jî wê kirinê dixin navê xwe. ****Osê maldawo, Şewêşo malavawo.** Mixabin her kes berê keda xwe naxwe, hinek qenciyan dikin lê dibe navê hinekên din.*

Oxir oxira Hezretî Xizir bûn

bnr: Oxira Hezretî Elî bûn

Oxira (yekî) oxira Hezretî Elî bûn

Lawo lawo! **Oxira te oxira Hezretî Elî be, piyê te li keviran nekeve.* (dia)

Oxira (yekî) oxira Mele Avdel bûn

Tu herî qet nezivirî. ****Oxira wî oxira Mele Avdel be**, baş bû ku çû, em ji wî zilmkarî xelas bûn.* (nifir)

Oxira (yekî) reş gerîn

****Oxira te reş bigere**, tu ji ku derketî pêşiya min?* (Nifir)

Oxira xêrê bûn

bnr: Oxira Hezretî Elî bûn

---

[1] **Omerî**: Navê herêmeke Mêrdînê ye. di heman demê de navê eşîreke heman herêmê ye.

P

Padîşahê bêbext, ket ji text.

Kesên bêedalet û xayîn, nikarin demeke dirêj bi xweşikayî bijîn. ***Padîşahê bêbext, ket ji text.*** *Gelek caran dereng dibe, lê dîsa jî bi gelemperî neheqî bersiva xwe ya layîq digire.*

Padîşahê min, tu di riya heq de here, xerab dê ji Xwedê bibînin.

Tu li pey a rast be, xerab dê di dawiyê de bi ser belaya xwe ve bibin. **Mêrik rast gotiye,* ***Padîşahê min, tu di riya heq de here, xerab dê ji Xwedê bibînin.*** (bnr. çîrok)

"Padîşahê min, tu di riya heq de here, xerab dê ji Xwedê bibînin."

Mirovekî pir xizan hebûye. Her roj sibehê diçe cem padîşah û jê re dibêje:
"Padişahê min, tu di riya heq de here, xerab dê ji Xwedê de bibînin." Dema ku vê gotinê jê re dibêje, padîşah zêrekî didiyê, ew jî diçe mala xwe û pêdiviyên xwe dibîne. Rojek wisa, dudu wisa; camêr her roj zêrekî hildigire û diçe. Ev yek gelekî bala serokê aşpêjên (aşçi) padîşah dikişîne. Mêze dike ku mêrik her roj tê ji xwe re zêrekî digire û diçe. Ji wî feqîrî paxiliyê dike. Di xwe hundirê xwe de dibêje, tu li vî segbavî mêze bike, em mehê nikarin çend zêran bistînin, ew bê ked û bê zehmet rojê zêrekî ji xwe re digire, destê xwe li ba dike û diçe. Rojekê dîsa dema ku yê xizan diçe bal padîşêh, aşpêj pêşiya wî digire û jê re dibêje:
"Tu her roj tiştî lê te rojekê ji xwarina min nexwariye. Kerem bike îro ji xwarina min bixwe paşê here cem padişêh." Yê xizan her çiqas naxwaze jî, lê ew bi zorê û bi sondan wî tîne ser sifreyê, xwarinê didiyê. Lê xwarineke wer dide ber ku ji nîvî zêdetir sîr tê de ye. Mêrik ji ber sondan û ji bêgavî xwarinê dixwe. Dema ku derdikeve hizûra padîşêh, ji bo ku bêhn neçe padîşêh, destê xwe dide ber devê xwe û dîsa dibêje: "Padişahê min, tu di riya heq de here, xerab dê ji Xwedê bibînin." Dîsa padîşah zêrekî didiyê û vedigere diçe. Serokê aşpêjan dîsa pêşî digire û jê dipirse:
"Padîşah qet çi got?" Yê xizan dibêje:
"Qet tiştek negot." Aşpêj piştî çûyîna wî derdikeve hizûra padîşêh û jê re dibêje:
"Padîşahî xweş be, tu dizanî wî mirovî çima destê xwe dabû ber devê xwe?" Padîşah dibêje:
"Na, ez nizanim. Çima?"
"Padîşahî xweş be, derve ji her kesî re û ji min re jî got: 'Wisa bêhn ji padîşah tê ku min ji dest bêhna wî destê xwe da ber devê xwe.'" Padîşah dengê xwe nake. Dema ku sibehê dîsa yê xizan tê û jê re dibêje:
"Padişahê min, tu di riya heq de here, xerab dê ji Xwedê bibînin." Padîşah zerfeke morkirî ku tê de nivîsiye: *"Yê ku vê zerfê dide we, çawa ku gihîşte wir, bigirin û serê wî lêxin."* didiyê û jê re dibêje:
"Îro bi şûn de neyê bal min. Vê zerfê bibe bide wekîlê min î filan bajarî bila mizekê (maeş) ji te re girê bide, tu û zarokên xwe heya mirinê bixwin, tu jî her roj aciz nebe û neyê bal min." Dema mêrikê xizan derdikeve ber dêrî, aşpêj dîsa pêşiyê lê digire û jê dipirse:
"Ev çi ferman e, di destê te de?" Yê feqîr a ku padîşah jê re gotiye dibêje. Aşpêj dibe xeta dikeve pêsîra mêrik û dibêje:
"Çi pereyên min, mal û milkê min heye ez ê bidim te, tu jî vê zerfê bide min." Yê feqîr ji ber sond û lavahiyên wî çi ku dabe jê digire û zerfê dide wî. Sibetirê padîşah mêze dike ku wa ye mêrikê feqîr dîsa hat hizûra wî û got:
"Padişahê min, tu di riya heq de here, xerab dê ji Xwedê bibînin." Padîşah jê dipirse:

Pakî û xirabî ji hev du derxistin
Rasteqînî fêm kirin. *Êdî ew mezin bû, dikare ***pakî û xirabiyê ji hev û din derxe***.

Pakî û xirabî ji hev cuda kirin
bnr: Pakî û xirabî ji hev du derxistin

Pala xwe dayîn ...
1. Xwe spartina kesekî yan jî hêzekê. **2.** Rehet bûn, cihê xwe xweş kirin. **Wî* ***pala xwe daye xalê xwe*** *yê dewlemend, kî bi wî dikare? *Min* ***pala xwe da balgî***, *dû re hinekî îşiq hat ber çavên min.*

Palan avêtin
Dev ji têkoşîn û pêşbaziyê berdan. **Berê baş berdewam kirin, lê dû re* ***palan avêtin***.

Palan pişt li (yekî) kutan
Ji tiştekî êşîn, ziyan dîtin. **Ev çend sal in ku vî* ***palanî pişt li min kuta***, *êdî bes e, ez ji karê we derdikevim.*

Palan qelaptin
Serî hildan, li hember derketin. **Di dawiyê de wan jî* ***palan qelaptin***.

Pale qels e, hacet (hincet) das e
Yên ku nikarin kar pêk bînin, ji nekarîna xwe re hincetan diafirînin. ****Pale qels e, hacet das e.*** *Bi xwe nikare bike, wê ji ji xwe re dike mehne.*

Paleyên çê, berdan cê.
Ji bo rewşa erênî tê gotin. ****Paleyên çê, berdan cê.*** *Çawa pêk neyê?*

Panî quleynî, hêdî hêdî kişeynî, nayîne ser eynê.
Ji bo kesên tiştan bi dizî û ji bin ve dikin, lê kirina xwe jî înkar dikin tê gotin. ****Panî quleynî, hêdî hêdî kişeynî, nayîne ser eynê.*** *Bi van fêl û fîstikan nizanim, Refîqe dê heta ku derê bimeşe.*

Paqreş di ser xwe re nedîtin
Xwe zehf zêde hesibandin. **Maşelah ew jî* ***tu paqreşan di ser xwe re nabînê***.

Par li me dida bi daran, îsal xwe nagire li ser çardaran.

"Ka min zerfek da te, min got here cem filankesî, tu çima neçûyî?" Yê feqîr dibêje:
"Padîşahî xweş be, çi ji te veşêrim, çi ji Xwedê veşêrim. Te ew zerf da min, lê dema ku derketim ber dêrî, serokê aşpêjên te pêşî li min girt ji min pirsî. Min jî ya ku te ji min re gotibû ji wî re got. Ew kete qirika min û hinek pere jî dan min, ez jî mecbûr mam û min ew zerf da wî." Padîşah dîsa jê pirsî:
"Baş e, çima dema tu duh na pêr hati bal min te devê xwe girtibû?" Yê feqîr got:
"Padîşahî xweş be, dîsa ez dihatim bal te, wî aşpêjê te pêşî li min girt û bi sond û qesem xwarin da min, lê xwarina wî geleki bisir bû, ji bo ku bêhn neyê we û we aciz nekim min destê xwe da ber devê xwe." Padîşah fêm dike ku wa ye hemû moçik aşpêjê wî çêkirine. Jixwe yê ku serê wî hatiye xwarin jî ew bi xwe ye. Ji mêrik ra dibêje:
"Evdê Xwedê, eşhedibilah tu rast dibêjî. Tu di riya heq de here, xerab dê ji Xwedê bibînin." Dîsa zêrê wî didiyê û wî dişîne mala wî. Ew dîsa karê xwe yê berê berdewam dike.

*Ev biwêj bi awayê, *"Rasta salox û sewal tune, xwar dê belaya xwe bibînin."* jî tê gotin.

Rewş gelek caran berevajî û bi awayekî neyînî tê guherandin. **Tu li karê dinyayê mêze bike.* ***Par li me dida bi daran, îsal xwe nagire li ser çardaran.***

Par ınirdî, pêrar mirdî, kefen zerdî, îsal dibêjî: "Şîrdî birdî."
Berê rewş pir xerab bû, rewş rast bûye, vê carê hê di ser de zorbetiyê jî dike. **Ew jî tiştekî eletewş e.* ***Par mirdî, pêrar mirdî, kefen zerdî, îsal dibêjî: "Şîrdî birdî."***

Para gerokan, çû ber balisokan.
bnr. Pariyê gerokan, xwar pîsokan.

Pareza devê xwe nezanîn
Ji bo kesên hay ji gotina xwe û encamên wê nîn in tê gotin. ****Mirov ku pareza devê xwe baş bizanibe**, serê wî zû bi zû naêşe.*

Pariyek nan hatin ber çavan
Dexesî kirin an jî xesîsî kirin. **"Îcar mirov çima ew qasî bextreş bûn? Ma qey **pariyek nanê wî dihat çavên wan**?"* Yaqûb Tilermenî

Pariyek piçûk nebûn
Mirovekî girîng û birûmet bûn. **Tu wisa li bejn û bala wî menêre, bi rastî jî ew **ne pariyekî piçûk e**.*

Pariyê devê (yekî) revandin
Zêde nêzîk û samîmî bûn. **Emîne yeke bêar e, **pariyê devê Baran direvîne**.*

Pariyê gerokan, xwar pîsokan.
Yên ku li kar û barê xwe xwedî dernakevin, li vir û li wir digerin, keda wan ji yên xerab re dimîne. ****Pariyê gerokan, xwar pîsokan.** Tu ku ew qas bigerî, nikarî bibî hakimê kar û berhemên xwe.*

Pariyê xwe xweş kir, rûyê xwe reş kir.
Ji bo pariyek xwarin, xwe xistin rewşeke fedîkar. ****Pariyê xwe xweş kir, lê rûyê xwe reş kir.** Divê mirov ji bo tiştên wer xwe bi şermiyê nexe.*

Pariyên (yekî) jimartin
Pir çikûs bûn. **Axayê wî rebenî tim **pariyên wî dijmartin**.*

Parî di ber (yekî) de neçûn
Di xem û tatêla tiştekî de bûn. **Heta ku lawê wê di wê zindanê de birize, **parî dê çawa di ber Helîmê de here**?*

Parî di dev de gir bûn
bnr. Parî di ber (yekî) de neçûn

Parî di gewriyê de man
bnr. Parî di ber (yekî) de neçûn

Parî xweş bûn

Çilek bûn, ji xwarinê zêde hez kirin. **Erê, ew xwe bi awayekî din nîşan dide, lê ew çi **parî xweş e**.*

Pars kir li ber deriyan, da xêra miriyan.

bnr. Anî ji deriyan, da xera miriyan.

Parsa vî welatî nebe, bila parsa welatekî din be.

Ez ku vî karî dikim, derka wê nîn e, ha li vir, ha li cihekî din. **Heta ku qeweta min hebe ez ê bixebitim, **parsa vî welatî nebe, bila parsa welatekî din be**.*

Parsek e, bişûr (dar) û qetek e.

Hem xizan e, hem jî bifors û kulzik e. ****Parsek e, bişûr û qetek e.** A ku ew dike jixwe ne karê mirovên bimantiq e.*

Parsûgir bûn (Parsûyên (yekî) qalind bûn)

1. Xurt û qure bûn. **2.** Zengîn bûn. **Maşelah wisa **parsûgir e** ku mirov nikare di rex re derbas bibe. *Ji wê re çi? **Parsûyên malbata wê qalind in** kî dikare bi wê re kapan biavêje?*

Pasa mirinê xwe avêtin dev û lêvên (yekî)

Di hêla tenduristî de di nav rewşeke xeter de bûn. **Bi rastî jî ez vê carê ji xalê Cemşît tirsiyam, çimkî **pasa mirinê xwe avêtiye dev û lêvên wî**.*

Pasinbarê[1] barî, kerê şixrê nalî, (û) got: "Aaax li min, vî halî!"

Tiştên baş û bibereket, pêdiviya hinek bedelan jî bi xwe re tînin. **Dîlan tenê li dijwariya wî karî difikire, lê destkeftin û sûda wî nayîne bîra xwe. **Pasinbarê barî, kerê şixrê nalî, got: "Aaax li min, vî halî."***

Paş de anî manî, pêş de kor poşmanî

bnr. Ji paş ve xwezî ya minê, ji pêş ve xwelî li serê minê

Paşepêlo li kerê siwar kirin

Rezîl û riswa kirin. **Leylayê li nav kolanê Bihar **paşepêlo li kerê siwar kir**.*

Paşiya (yekî) çirteçirt kirin

Tirsîn. **Erê, ew wisa diaxive, lê ez baş dizanim ku **paşiya wî jî çirteçirt dike**.* (argo)

Paşiya (yekî) şil bûn

Xwedî tawan an jî kêmasıyekê bûn. ****Paşiya wî şil nebûya**, niha me nikaribû xwe ji zimanê wî xelas bikira.* (argo)

Paşiya xwe bi xwe re anîn

bnr. Axirî bi xêr hatin

---

[1] **Pasinbar:** Ji bo bîst û pêncê adarê tê gotin. Taybetiya wê rojê ev e ku heke vê rojê baran bibare, ji bo erd, zevî û rezan gelekî sûdewar dibe. Di encama vê baranê de zad zede pir dibe. Lê helbet îcar kişandina ew qas zadî jî zor û zehmet dibe.

Paşiya xwe şil kirin
Tawanek pêk anîn. **Wî **paşiya xwe şil kiriye**, nikare bê vir.* (argo)

Paşiyê pê re negirtin (Paşiyê negirtin)
Cesaret nekirin. **Wî jî ew dixwest, lê **paşiyê negirt** ku xwe biavêje pêsîra wan û ji wan bistîne.* (argo)

Paşî jê stendin
Ji bo serketinê mevziyeke pir girîng girtin. **Bi alîkariya Emerîkayê, leşkerên Îsraîl **paşî ji Ereban stendin**.*

Paşî ji dêst çûn
1. Têk çûn. Erk winda kirin. **2.** Bêhn bi ser ketin. Tir kirin. **Wî jî wer hêvî nedikir, lê hew dît ku **paşî ji dêst çûye** jî. *Çima ku li cem jinikê **paşî ji dêst çû**, Eledîn gelekî bi şermiyê ket.* (argo)

Paşkoxî kirin
Îxanet kirin. **Heke qoriciyên wî gundî **paşkoxî nekirina** ew ê rizgar bibûna.*

Pate lê xistin
Tirsîn, vekişîn, melisîn, dev ji gotin û daxwazên xwe berdan. **"... nobedar li ber derî bûn, gotin: "dûr[*]!" Ez li wan fetilîm û min got: "Parola!" wele **pate lê xistin**."* Rojen Barnas

Patika stûyê xwe xurandin
Keys revandin. Poşman bûn. **Tahar dît ku wan ên din ji sibe zû de hatine cihê xwe girtine jî, **patika stûyê xwe xurand**, dagêr kir û çû.*

Paxav nekirin
Kesek bi tiştekî hesab nekirin. **Kê çi got, wê dîsa jî qet **paxav nekir**.*

Payîzê gote çiya: "Bila rêwî ranewestin li ser riya."
Werza payîzê, werzeyeke demborî û guherbar e, divê mirov bitedbîr be û li ser xwe serwext be. ****Payîzê gote çiya: "Bila rêwî ranewestin li ser riya."** Divê hûn jî li ser xwe baldar bin, bi demsala payîzê bawerî nabe.*

Payîzê li me kir gazî, dar man rût û tazî.
Di werza payîzê de xweza wekî taybetiya xwe tê guherandin. **Ma tu bi payîzê nizanî? **Payîzê li me kir gazî, dar man rût û tazî.***

Pel[**] anîn bîra dizan
Çareseriya ku yê li hember nafikire, bi bîra wî xistin. **Kuro tu tênagihîjî ku tu bi wan gotinên xwe **pelan tînî bîra dizan**?*

Pel ji darê ketin

---

[*] **Dûr**: Raweste (tirkî)

[**] **Pel:** Kevirên ne zêde mezin, lê ne jî zêde piçûk ku mirov dikare bi destan biavêje.

Mirin, têkçûn. **Pel ku ji darê ketin bi şûn de, tu çi bibêjî, kêr nake.*

Pel lê weşîn (Pelê dara (yekî) weşîn)
Rewş xera bûn. Ji hêz ketin, pîr bûn. **Berê çi hunermendeke spehî bû, lê îro **pel li wê weşîne**.*

Pel avêtin (yekî) (Kevir avêtin (yekî))
Paşgotiniya yekî kirin. **Di wê civînê de jî, Tahar hema **pel diavêtin Reso**, lê kesî guh nedidayê.*

Pel lê xistin, gilî jê derxistin
Bi zorê yan jî bi konevanî armanc û raza kesekî hîn bûn. **Armanca wê tiştekî din e. Ew bi zanahî **pelan li Henîfeyê dixe, giliya jê derdixe**.*

Pelteyek goşt bûn
Piçûk, lawaz û jar bûn. **Ew hê **pelteyek goşt e**, ma mirov qet ji wê dixeyîde, porkurê?*

Pepik cot kirin
bnr. Ling pîj kirin

Pepûk li ber deriyê (yekî) xwendin
Ji bo nîşana bûyerên ne bi xêr û malkanbaxî tê gotin. **Pepûk li ber deriyê wê de dixwîne, Xwedê axiriyê xêr bike.*

Pepûk li ser xwendin
bnr. Pepûk li ber deriyê (yekî) xwendin

Pepûka Xwedê bûn
bnr. Belengazê Xwedê bûn

Per tune ku pê bifire
Pir kêfxweş bûn. Şad bûn. **Ji ber ku lawê wê bûye doxtor, **per tune ku meta Hacê pê bifire**.*

Per û bask di ber de hatin xwarê
bnr. Per û bask şikestin

Per û bask pê ve hatin
1. Zingirî bûn, ji nû ve hêz û quwet girtin. **2.** Moral xweş bûn. **3.** Dewlemend bûn. **Pişti dermanên wî bijişkî **per û bask bi Osê ve hatin**. *"Tu **per û bask bi min ve nehatin**."* Sedat Yurtaş **Van salên dawîn **per û bask bi Cindî ve hatin**, êdî tu çi bibêjî, li ser sifra wî heye.*

Per û bask şikestin
Sênc şikestin. Moral xerab bûn. **"Bûyerên neyînî û ne li ra per **û baskên me zû dişkînin**."*

Perça dilê (yekî) danîn
Hêrs derbas bûn. **Kes nêzîkî Rihanê nebû, heta ku **perça dilê wê danî**.*

Perde ji ser ... hildan
Ya rastî derxistin holê. *_Heya serokê wan **perde ji ser rewşa welat hilneda**, haya wan ji tiştekî tune bû._

Perde li ber çavên (yekî) tune bûn
Merd û destvekirî bûn. *_Di hêla malê dinê de **perde li ber çavê wî tune ye**._

Perdeya ber devê (yekî) rabûn
Çi bê ber dêv gotin. *_Ji wê radeyê bi şûn de **perdeya ber devê Rifat rabû**._

Perdeya dêv qetîn
bnr: Perda devê (yekî) rabûn

Perdeya li ber çavên (yekî) reş bûn
1. Pir hêrs bûn. **2.** Di hêla tenduristiyê de ji nişka ve ketin rewşeke xerab. ***Perdeya li ber çavên bavê min ku reş dibe**, tu kesî li ber xwe nabîne. *_Ji nişkê ve, **perdeya li ber çavên min reş bû** û ji wê şûn de çi bû, ez nizanim._

Perdeya reş hatin ser çavên (yekî)
1. Ya rastî nedîtin. **2.** Kor bûn. ***Perdeya reş hatiye ser çavên Seydo**, ew halê me feqîran nabîne. *_Di şêst salî de **perdeya reş hate ser çavên diya min** ê rastê._

Perdeya rû çirandin
bnr: Perdeya rûyê (yekî) rabûn

Perdeya rû qetîn
bnr: Bêrû bûn

Perdeya rûyê (yekî) rabûn
Fedî nekirin, bêar bûn. *_Na lo! **Perdeya rûyê wê rabûye**, qet talaşa wê nîn e._

Pere di quzê dêlikê de bûn
Debara aborî zor bûn. *_Qezenckirin wisa hêsan nîn e, **pere di quzê dêlikê de ne**._ (argo)

Pere jimartin destê (yekî)
Pereyên pêşîn dayîn kesekî. *_Ezbenî, min **pereyên xwe jimartin destê wî**._

Pere ketin dêst
Xwedî pere bûn. *_Kengê ku hinek **pere têkevin dêst**, ji xwe re navmalê distîne._

Pere kirin gewriya (yekî)
1. Ji ber sedemekê pereyên ku hatine dayîn di jê girtinê de astengî kişandin. **2.** Ji bo bertîl dayînê jî tê gotin. *_Lawê min ji safîya xwe **pereyên ku kirine gewriya Ferzende**, îro jî nikare bistîne. *Heta ku me **pere nexistine gewriya wî**, karê me çênekir._

Pere nekirin
1. Feyde nekirin. Bêkêr bûn. **2.** Biha nekirin, erzan bûn. *_Wisa serê wê tijî kiribûn ku min_

çi kir û çi got ***pere nekir***. **Her çiqas ew erebe modeleke nû be jî, lê di nav gel de* ***pere nake***.

Pere xwarin

1. Bertîl girtin. **2.** Zêde pere xerc kirin. *Ew ên çavbel, pereyên gel xwarin û revîn Emerîkayê. **Bahadînê lawê min gelekî* ***pereyan dixwe***, *nizanim çawa bikim?*

Perem perem kirin

Xistin rewşek xerab. Parçe parçe kirin. **Xebûr çawa ku kete nav wan ên qûnxwar, ew* ***perem perem kirin***.

Perên Xwedê li ser (yekî) bûn

Xwedê parastin. **Belkê* ***perrê Xwedê li ser wê be***, *ew nebûya halê me perîşan bûbû.*

Pereyên xwîna xwe xwestin

Pir biha gotin. **Hecî Farûq ji bo wê mala xwe ya xerabe* ***perê xwîna xwe dixwaze***.

Pergala (yekî) xera bûn

Sazûmanî tevlihev bûn. **Êdî* ***pergala wan xera bûye***, *ew kar û bar û ew qezenca berê nemaye.*

Pergala (yekî) xera kirin

Sazumaniya yekî xera kirin. **Ez baş dizanim ku wê jinikê ji bin ve* ***pergala wî xera kir***.

Pero, here were wekî kero.

bnr. Kero kero, weke hero

Pertav danîn

1. Teslîm bûn. **2.** Rewş xera bûn. **Ew qas sal revî, lê di dawiyê de hat* ***pertav da***. **Berê halê wan baş bû, lê ev çendek e ku* ***pertav danîne***.

Pesepûsê (yekî) di ser de avêtin

Tiştên kesekî bi paş de dan. **Me* ***pesepûsên wan di ser de*** *avêt û keçika xwe ji belayeke mezin rizgar kir.*

Pesepûsê xwe top kirin

Li derekê bi awayekî ne asahî derketin. **Lê mêze kir ku, tu berjewendiyeke wî nîn e,* ***pesepûsê xwe top kir*** *û ji wir teyisî çû.*

Peşk lê ketin

Çavînokî bûn. **Xwedê dizane,* ***peşk li xwarziyê min ketiye***, *serê wî ji qeza û belayan xelas nabe.*

Peşka tarîzalimekî, belav bû welatekî.

Qencî û xirabî jî wekî gelek tiştan kelîjê dide ser hawirdora xwe. **Helbet me hemûyan tëkildar dike. Çi gotine:* ***"Peşka tarîzalimekî, belav bû welatekî."***

Peşka xwe tê gerandin

bnr. Peşk lê ketin

Petya mêran e, navê kitikê Evdirehman e.
bnr: Di xelaya mêran de navê dîkan danîn Evdirehman.

Peyayê sivik bûn
Ji kesên çapik û çeleng re tê gotin. **Maşelah Yezdan **peyayê sivik e**, jixwe hema gumana Fatimê jî tenê ew e.*

Peyman girê dan
bnr: Peymana xwe danîn

Peymana xwe danîn
Ji hev du re soz dan, tiştek plan kirin. **Wan **peymana xwe ji zû de danîne**, hûn dereng man.*

Peyn belav kirin
Ji bo kesên ku tiştek ji dest nayê tê gotin. **Wî **peyn belav kiriye**, ma ew dikare li hemberî te derkeve û tiştekî bibêje?* (qerf)

Peyva li rû, guneh efû
Yên ku eşkere û rû bi rû bibêjin zêde nayên tawanbar kirin. **Ma min tu derew kirine, çi hebe min li rûyê wê got.* ***Peyva li rû, guneh efû.***

Pez tune, rûn difroşe.
Ji bo hewldana berevajî tê gotin. **Min tiştek ji vî Dewrêşê Çetoyê Sîdo fêm nekir.* ***Pez tune, rûn difroşe.***

Pezkeguro (pezkoguro) lîstin
Li serê kesekî fend û fûnd çêkirin. **Serwêr li dor wî **pezkoguro dilîze**, ka dawî çawa dibe.*

Pê avêtin ser pê
Rehet û bêxem bûn. **Ji wî re çi? Ew **pê diavêje ser pê** û tenê fermanan dide.*

Pê bi pê li pey çûn
Her gav şopandin. **Gondor **pê bi pê li pey ket** û di dawiyê de ew anî mal.*

Pê bilî bûn
Ji nav kar an jî têkiliyekê derneketin. **Ez çiqas bi wî pîşeyî re pê bilî bûm jî min jê serederî nekir.*

Pê bihurîn
Hemîle man. **Ev sê meh in ku **pê bihuriye**, wer tê xuyan ku, divê hûn amadekariya zarokeke nû bikin.*

Pê çaxê xwe bihartin
bnr: Pê wexta xwe derbas kirin

Pê dan erdê
bnr: Ling dayîn erdê

Pê dan ser
bnr: Ling kutan ser (yekî)

Pê de barîn
Ji bo bêhn û bereket û bişansbûnê tê bikaranîn. **Maşelah Xwedê bidiyê, mêrikî hema* ***pê de dibare****.*

Pê de çûn
Li ser tiştekî yan jî kesekî bêhtir sekinîn. **Erê, tu mafdar î, lê dîsa jî divê tu ew qas* ***pê de neçî****.*

Pê de darda bûn
Gelekî israr kirin. Ji bo tiştekî pê ve zeliqîn. **Mêvanê reben çiqasî got ez naxwim jî, ji bo ku hinekî din jî bixwe Berfo* ***pê de darda bû****.*

Pê de der bûn
Hêrs û eksa xwe di yekî de rijandin. **Jixwe Azad ji ber lawê xwe tije bibû, hema* ***bi jina xwe de der bû****.*

Pê de ketin
1. Ji bo pêkanîna karekî, gelekî mijûl bûn. **2.** Bi awayekî zêde bi kesekî re mijûl bûn û pêwendî danîn. **Bi rastî jî Xeyal gelekî* ***pê de ket*** *ku sazê hîn bibe, lê pêk neanî. *Tu ku ew qasî* ***pê de nekeve****, naxwe tu yê rûmeta xwe kêm bikî.*

Pê derxistin
Fêm kirin, têgihîştin. **Çawa ku çavên min li wî ket, min* ***pê derxist*** *ku ew ne mirovekî xalî ye.*

Pê dilmînî bûn
Bi tiştekî aramî dîtin, teselî dîtin. **Heke ew keçika wê jî nîn bûya, Almastê dê* ***bi çi dilmînî bibûya****?*

Pê ebûra (yekî) nebûn
Îdara xwe pê nekirin. **Erê, wekî karekî ne xerab tê xuyan, lê mixabin* ***pê ebûra min nabe****.*

Pê fîrîn
Pê şanaz bûn. Ji bo tiştekî yan jî kesekî serbilind bûn. **Evdile ew qas* ***pê difire****, lê Xwedê dizane ku ew ne layîqî wan pesnan e.*

Pê guman bûn
Jê tiştên erênî hêvî kirin. **Ez gelekî* ***pê guman bûm****, lê wî hemû hêviyên min pûç derxistin.*

Pê hêstrî gêre kirin
Heyf û tola xwe jê girtin. **Wê malbatê jî bi wî awayî,* ***bi wan hêstrî gêla kirin****.*

Pê karê xwe dîtin
Pê hewcedariyên xwe dîtin. **Ew jî ne ji hez kirinê ye, tenê* ***pê karê xwe dibînin****.*

Pê ketin (Bi ... ketin)
1. Ji ber zêdexwarinê aciz bûn. **2.** Ji dola yekî bûn. **Ew qas xwarinê kî dê bixwe, em dê **pê bikevin**. *Ew **pê ketiye**, lê ew nesîhetan lê dike.*

Pê kutan erdê
bnr: Ling dayîn erdê

Pê lê danîn
bnr: Ling dayîn erdê

Pê lê hildan
bnr: Ling lê hildan

Pê lê kirin
bnr: Pêpez kirin.

Pê li ber pê nexistin
Nelipitîn, firsenda hewldanê nedîtin. **Wan nehişt ku ez **pê li ber pê bixim**, hema min dît ku bi çepilê min girtin û ez xistim erebeyê.*

Pê li cihê şil nekirin
Xwe ji karên xeter û bi rîsk dûr girtin. **Hay lo lo! Ew mirovekî wisa çavbel e ku ew qet **pê li cihê şil dike**?*

Pê li dêla (boçika) hev û din nekirin
Hev û din neêşandin. **Erê, ew çiqasî bi hev du nekin jî, lê zû bi zû **pê li boçika hev û din jî nakin**.*

Pê li guhê xwe kirin
Ji maf û zerengiya xwe zêdetir pêşde çûn. **Lawo min ji te re rûmet nîşan da, lê mêze dikim ku tu **pê li guhê xwe dikî**.*

Pê li hafa gorê bûn
Ji bo kal û pîrên ku mirina wan nêzîk e tê gotin. **Êdî **pê li hafa gorê bûye**, Xaltiya Besê wa ye ji hev hurşiyaye.*

Pê li mala cunan kirin
Rastî bela û qotikeke dijwar hatin. Çewtiyeke mezin kirin. **Weydoyê Çavqelişî **pê li mala cunan kiriye**, lê hê haj xwe tune ye.*

Pê li min nexe, gotinan ji devê min dernexe. (Pihînan li min nexwe, giliyan ji devê min dernexe.)
Ji bo razgotinê yek tahrîk kirin. **Qet li qisûrê menêre, **pînan li min nexwe, giliyan ji devê min dernexe**, ez nabêjim.*

Pê li serê xwe kirin
bnr: Pê li guhê xwe kirin

Pê li zimanê hev û din kirin
Gelekî qelebalix bûn. **Ji bo doza aştiyê ew qas mirov hatibûn ku* ***pê li zimanê hev û din dikirin****.*

Pê lîstin
1. Ji bo berjewendiyên xwe bi kar anîn. **2.** Tirane û tinazên xwe pê kirin. **Tenê ji bo hatina wê dereceyê* ***bi wî lîstin****, bilî wê ne tu tişt. *Heya êvarê* ***bi belengazê Faro dilîstin****, bi vî awayî rojên xwe derbas dikirin.*

Pê nebûn
Di zerengiya tiştek pêkanînê de nebûn. **Erê, navê wî hoste ye, lê bawer bike* ***pê nabe*** *ku civateyekê derxîne yan jî bi cih bike.*

Pê nehatin
bnr. Pê nebûn

Pê nesekinîn (sekinîn)
Tu alîkarî jê nedîtin. Guman pê nebûn. **Ne tu mirov e, mirov bi çopekî* ***pê nasekine****.*

Pê papo kirin
Xapandin, heyirandin, dem bi dest xistin. **Belê, soz dabû lê wa ye niha jî* ***pê papo dike****.*

Pê qeliya mişkan çêkirin
Ji bo tiştên hindik tê gotin. **Eman lherin* ***bi wî goştên xwe qeliya mişkan çê bikin****.*

Pê re canê canê bûn
Bi kesekî re zêde nêzîkayê nîşan dan. **Ev çend roj in Gulan* ***bi Siltanê re canê canê dike****, ka hela di bin wê de dê çi derkeve.*

Pê re eleqeder bûn
Pê re mijûl bûn, pêwendî nîşan dan. **Mamoste gelekî bi* ***min re eleqeder bû****, lê ew dibistan bi min xweş nehat.*

Pê re etirîn
Jê re pûte nîşan dan, girîng girtin. **Ez çiqasî* ***pê re etirîm*** *jî, wî ew pîşe nepejirand.*

Pê re îdare kirin (kudandin)
Bi kesekî zêde nebaş re debara xwe bi zorê be jî pêk anîn. **Ji bilî wê tu riya min tune bû, ez bêgav bûm ku* ***pê re îdare bikim****.*

Pê re kap avêtin
Jê re serederî kirin, hempa bûn. **Erê, Pelîn pê nikare, lê Feleknas dikare* ***ji wê re kap biavêje****.*

Pê re kiras (sol) neqetandin
Pê nekarîn. Pê re serederî nekirin. **Heçiya Xecê ye, belayeke Xwedê ye. Kes nikare* ***pê re solan biqetîne****.*

Pê re kîn ajotin
Li hemberî kesekî hestên neyînî sêwirandin. *Şeş sal di navberê re derbas bûn, diya min hê jî **bi wê jinikê re kînê diajo**.

Pê re nayê xeberdan.
Ji kesên qure û poz bilind re tê gotin. *Piştî wan pereyan **bi wî re nayê xeberdan**.

Pê re qayîş nayê kişandin
Pê re serederî nayê kirin. *"Lê kîjan pelewan, na kîjan qafsar, kîjan qafsar ê vê yekê li xwe dayne û **bi sofî re qayîşê bikişîne**." Musa Vazgali

Pê re qedandin
1. Pê re serederî kirin. **2.** Pê re debar kirin. *Helal be! Wa ye dîsa Zeynebê **bi wî re qedand**. *Çawa bike ew jî bi wî awayî **pê re diqedîne**.

Pê re rabûn û rûniştin
Têkilî pê re danîn. *Heke ez **pê re ranebûma, rûneniştama**, min ê jî bawer bikira ku wî ev yek kiriye.

Pê re raketin
1. Ji bo têkiliya cinsî tê gotin. **2.** Digel kesekî razan. *Heke ew ê bîj **pê re raneketa**, ew ê çima wisa dest biavêta pêsîra wî? *Ji ber ku nivîn zêde tune bûn, her du keçikên me **bi diya xwe re raketin**.

Pê re razan
bnr. Pê re raketin

Pê re rêstin
Pê re debar kirin. *Rewşen ku **pê re nerêse**, jixwe tu kes nikare.

Pê re riciflîn
bnr. Pê re etirîn

Pê re serederî kirin
Ji heq yekî derketin, pê karibûn. *Tu nekeve tatêla wê, ew dikare **bi wî re serederî re bike**.

Pê re serî kirin
bnr. Pê re serederî kirin

Pê re serî yek kirin
Pê re têkiliya zayendî pêk anîn. *Berê jinikê xwe nazî xist, lê dû re **pê re serî yek kir**. (argo)

Pê sebra xwe anîn
Bi kesekî yan jî tiştekî aramî û hizûr dîtin. *Evîn jî nebe, wê bibelhece. Tenê **bi wê sebra xwe tîne**.

Pê sekinîn

Jê alîkarî dîtin. **Ew ne mirovekî wisa ye ku yekî hewcedar* ***pê bisekine***.

Pê serbilind bûn

Pê şanaz bûn. **"Gelo ew dê parastineke baş bike ku dost û hevalên wî tevek* ***pê serbilind bin*** *..."* Zeynelabidîn Zinar

Pê sitar bûn

Jê alîkarî dîtin. **Heke Kahar Axa jî* ***pê sitar nebûya****, rewşa Şero wê xerab bûya.*

Pê şad bûn

Pê kêfxweş bûn. Jê hez kirin. **Karê Gulistanê jî heya êvarê* ***bi wan her du zarokên cêwî şad bûn bû***.

Pê şanaz bûn

bnr: Pê serbilind bûn

Pê şerma xwe revandin

Ji bo ceribandinê bi kar anîn. **Jixwe armanca wan jî ew bû ku* ***pê şerma xwe birevînin***.

Pê şirîn bûn

Li ber çavan xweş û girîng bûn. **Bengîn çi xirabiyê bike, dîsa jî* ***pê şirîn e***.

Pê ve danîn (Pê ve kirin)

1. Nav, nûçik an jî tawanek pê ve zeliqandin. **2.** Tiştek pê ve darda kirin an jî danîn derekê. **Wî tiştekî wer nekiribû jî, lê hema ew yek* ***pê ve danîn***. **"Kî lewhe* ***bi dîwar ve daniye****?"* Zana Farqînî

Pê ve girê dan

1. Bi neheqî yek tawanbar kirin. **2.** Derew kirin. **Rebenê Faysal qet haj pê tune bû, lê ew keçik* ***pê ve girê dan***. **Jixwe karê wî ew e, heya Roder* ***pê ve girê nede*** *tu carî rehet nabe.*

Pê ve kirin

bnr: Bi ser ve kirin

Pê ve zeliqîn

Ji bo tiştekî gelekî israr kirin. **Min kir û nekir* ***pê ve zeliqî*** *û ew bi zorê anî malê.*

Pê ve zeliqandin

bnr: Pê ve girê dan

Pê ve girêdayî man

Pê re dilsoz bûn, dev jê bernedan, bêbextî nekirin. **"Ez sond dixwim ku ez dê* ***bi rêzikên vê peymanê ve girêdayî bimînim****."* Zana Farqînî

Pê wexta xwe derbas kirin

Ji bo aciznebûn û bêhnvedanê pê re mijûl bûn. **Çawa dikin roj derbas nabin, ew jî* ***bi wan kaxizan wexta xwe derbas dikin***.

Pê xemên xwe revandin
bnr: Pê sebra xwe anîn

Pê xemgîn bûn
Ji ber tiştekî li ber xwe ketin. Dil pê êşîn. **Ka bi rastî jî em Kurdên Bakûr çiqasî **bi Helepçeyê xemgîn bûn**.*

Pê xwîn vereşîn
Gelekî jê aciz bûn. **Ji wê re qet qala Mexsût meke, jixwe **pê xwîn vedireşe**.*

Pêçî di nav re kirin
bnr: Bi pêçiya xwe tev dan

Pêçî lê xistin
bnr: Bi pêçiya xwe tev dan

Pêçiya xwe bi ser de hejandin
Gef lê xwarin. **Jinikê dulı wisa **pêçiya xwe bi ser de hejand** ku bawer im îşev xewa Farqîn nehatiye.*

Pêga xwe girtin (meşandin)
Sazûmana xwe domandin. **Heya îro wan **pêga xwe wer girtiye**, zêde jî dest medinê.*

Pêgermok gerandin
Bi meraq û guman li ortê çûn û hatin. **Êdî, bes van **pêgermokan bigerîne** te em gêj kirin.*

Pêgiran
Sist û teral bûn. **Mehmût wisa bi wî **pêgiranî** bawer dike, lê înşelalı poşman nabe.*

Pêgiranî lê ketin
Ji bo kesên ku mirovekî dikujin, şoke dibin tê gotin. **Di mêrkuştina Cefoyê Cindî ya cara pêşîn de, **pêgiranî lê ketibû**.*

Pêkol kirin
Vedan. Ji bo eşkerebûna tiştan di nav hewldanê de bûn. **Wa ye, Remo wê meseleya Xecê û Baran **pêkol dike**, ka dê çi ji binî derkeve.*

Pêkolî (pîkolî) kirin
Xwe zêde şîrîn kirin. Şalûşî kirin. **Bi wan **pêkoliyan** Fatimê aqilê Zubêd ji sêrî bir.*

Pêlepêl (çûn)
Fedîkar, poşman û pozîde bûn. **Rebenî wî jî rewş fêm kir û hema **pêlepêl** ji wir dûr ket.*

Pêlî aqilê xwe kirin
Aqil tevlihev kirin. **Tu çi ji wî hêvî dikî? Ma tu nizanî wî **pêlî aqilê xwe kiriye**?*

Pêlî darê rizî dike, di binî de naşikê.

Ji bo kesên pir kone tê bikaranîn. **Hay lo lo! Ew çi roviyek e,* ***pêlî darê rizî dike, dar di binî de naşikê.***

Pêlî darê riziyayî dike, bi xwe dernaxe.
bnr. Pêlî darê rizî dike, di binî de naşikê.

Pêlî hêkan kirin
Zehf hêdî meşîn. **Malwêranî wisa dimeşe ku tu dibêjî* ***pêlî hêkan dike.***

Pêlî nesîbê xwe kirin
Qismetê xwe birîn. Derfetên debara xwe xistin astengiyê. **Wî bi wê helwesta xwe tenê* ***pêlî nesîbê xwe kir.***

Pêlî zik dikim, dibêje: "Ax pişta min!"
bnr. Got:"Ez li zikê te dixim, tu dibêjî, wey pişta min!" Got: "Wekî kesek li pişta min hebûya te nikaribû li zikê min bixista."

Pêpar lê hatin
Bi destpêk an jî têkildariya kesekî kar baş meşîn. **Şikir* ***pêparê vê bûka me ya piçûk baş li me hat,*** *dan û standina me zêde bû.*

Pêpara ... xera kirin
Rewşa erênî herimandin. **Wî kûçikê heram,* ***pêpara mala me xera kir.***

Pêpaşk avêtin ber
Li pêşiyê astengî derxistin. **Wan çiqasî* ***pêpaşk avêtin ber*** *jî Loqman ew doza xwe bire serî.*

Pêsîra xwe jê daweşandin
Jê aciz bûn. **Xasê* ***pêsîra xwe ji xesûya xwe dadiweşand.***

Pêsîra xwe jê xelas kirin
Ji dest kesên nebaş rizgar bûn. **Heya min* ***pêsîra xwe ji dest wê xelas kir,*** *xwehdanê di ser min re avêt.*

Pêşa (yekî) bernedan
Ji pey yekî neqetîn. **Kuro lawo ev çi bela ye? Dikim û nakim* ***pêşa min bernade heyran!***

Pêşa (yekî) hejandin
Ji kesekî tiştek daxwaz kirin. **Diya Ciwanmerd ji bo zewaca wî, tim* ***pêşa lawê xwe dihejîne.***

Pêşdetir bûn
Hê nêzîk û girîngtir bûn. **Helbet bira pir girîng in, lê ewled* ***pêşdetir in.***

Pêşgarî (yekî) bûn
Belaya xwe ji yekî venedan. **Ev ne tutişt* ***pêşgarî min dibe,*** *ez ê lêxim, wê bi bihayê mirovekî li ser min bibe mal.*

Pêşiya (yekî) girtin
Ji bo alîkarî û piştgiriyê xwe spartin kesekî. **Wê jinikê Xwedê got û tu gotî, hat* ***pêşiya te girt****, ma divê te wisa bikira?*

Pêşiya pozê xwe nedîtin
1. Xwe qure kirin, ling ji erdê qetîn. **2.** Rewş fêm nekirin. **Nado dema ku li erebaya reş siwar dibe,* ***pêşiya pozê xwe nabîne****. *Ew ketiye bin kelîjeke wer ku* ***pêşiya pozê xwe jî nabîne****.*

Pêşiya xanî, pişta xanî di gû de hiştin
Rewş tam xerab kirin, lewitandin. **Ka çi maye? Zeynedîn* ***pêşiya xanî, jî pişta xanî jî di gû de hiştiye****.*

Pêşiya xwe nedîtin
Di derka pêşerojê de nebûn. Rewş baş fêm nekirin. **Me jî dixwest em hin tiştan pêk bînin, lê ya rastî me* ***pêşiya xwe nedidît****.*

Pêşiyê diçim gezok e, paşiyê (pişt re) diçim tîzok e.
Çawa dikim, helwesteke erênî nîşan nade. Tu rêyeke çareseriyê tune ye. **Ez çawa bikim nizanim.* ***Pêşiyê diçim gezok e, paşiyê diçim tîzok e.***

Pêşiyê diçim pê li peniya min dike, piştre diçim pihînan diavêje min.
bnr. Pêşiyê diçim gezok e, paşiyê diçim tîzok e.

Pêşî berdan
Bi serê xwe berdan. Serbest hiştin. **Ji wî tê hêvîkirin. Çawa hebe jina wî jî* ***pêşî berdaye****.*

Pêşî eçî dike, paşê maçî dike.
Ji bo kesên bêdenge tê bikaranîn. **Ev xalê min mirovekî ecêb e lo, jina xwe* ***pêşî eçî dike, paşê maçî dike****.*

Pêşî ked, paşê dêmek
Berê ked, dû re xeberdan û kêf pêwîst e. ****Pêşî ked, paşê dêmek.*** *Divê berê em ked û xebata pêwîst bidin, dû re wê kêfê bikin.*

Pêşî lê birîn
1. Jê re astengî derxistin. **2.** Bi her awayî mafdar bûn û pêdiviya tu tiştekî nehiştin. **3.** Tedbîr hildan. **4.** Ji bo lêdanê hewl dan. **Me dixwest projeyek baş pêk bînin, lê mixabin ên jor* ***pêşî li me birîn****. *Cindî dixwest xwe mafdar derxîne, lê Baran bi delîlan* ***pêşî lê birî****. *Divê berê* ***pêşî li vebijarkên din bê birîn****. *Wan tev* ***pêşî li Eşef birîn****, lê wî wekî şêrekî ew gişt belav kirin.*

Pêşî lê girtin
bnr. Pêşî lê birîn

Pêşî nedan kesî
Zêde daxwazkar bûn. Tim xwe û bandora xwe li pêş girtin. **Ew ne mirovekî wer demoqrat e, bawer im ko* ***pêşiyê nade kesekî****.*

Pêşî û paşiya xwe nas nekirin
Hesabê xwe nezanîn. Hay ji xwe û rewşê nebûn. **Tu çi ji wî dixeyidî? Ew hê **pêşî û paşiya xwe nas nake**.*

Pêşî vekirin
bnr: Pêşî berdan

Pêşî xweş kirin, paşî reş kirin
Karên bêîstikrar û bêdenge kirin. **Ew jî mirovekî wer ecêb e, **pêşiyê xweş dike, dawiyê reş dike**.*

Pêşî xweş, dawî reş bûn
Dawî pê re nehatin. **Niha baş tê xuyan, lê înşelah **pêşî xweş, dawî reş nabe**.*

Pêt ketin mala (yekî)
Mal şewitîn. Agir bi malê ketin. **"Ger ev kur were girtin / **Pêt dikeve mala min**."* Firet Cewerî

Pêt lê sist bûn
Tirsîn. **"Wextê Mistoy her du tirempêl dîtin, **pêt li wî sist bûn**, her wekî xwîn tê neman, ji tirsê rihê, hemû bêdeng bûn."* Salimê Casim

Pêxember jî berê dua li xwe kiriye.
Her kes berê li xwe difikire. **Bi min ew jî rewşeke asahî ye. **Pêxember jî berê dua li xwe kiriye.***

Pêyekî pêşde
Demek hê zûtir pêk anîn. **"Bajarên ku ez lê dijîm jî her wekî dixwaze min **pêyekî pêşde** ji nav xwe bivirvirîne û biavêje."* Musa Vazgali

Piç bi piç, xwe gihand qunc.
bnr: Piçik piçik, digihe kuçik.

Piçik piçik çû binê kuçik
bnr: Piçik piçik, digihe kuçik.

Piçûk dîtin
Kêm dîtin, rûmet nedan. **"Dibe ku hin kes qîmet nedin vî karî û **piçûk bibînin**, lê bi ya min ev karekî giranbiha bû."* Naci Kutlay

Piçûk xistin
Bi gotin an jî kirinê yek bi şermiyê xistin, an jî rûmet û şanaziya kesekî qels kirin. **Wî kurmetê min tim dixwest ku di nav civatê de min **piçûk bixe**, lê tu car di wê armanca xwe de bi ser neket.*

Pifî aqilê hev kirin
Li ser mijarekê hev du îkna kirin. **Wan herduyan **pifî aqilên hev kirine**, hûn çi bibêjin jî ew dê wekî gotina xwe bikin.*

Pifî esmanan kirin

Xwe zehf zêde hesibandin, xwe qure kirin. **Na lo! Xêr ji rûyê wî nayê. Piyên wî ji erdê quloz hûne û* ***pifî esmanan dike****.*

Pihîn li qûna (yekî) xistin

Qewirandin. **Karê xwe pê da kirin, di dawiyê de jî* ***pihînek li qûna wî xist****.*

Pilîndar avêtin (yekî)

Ne rasterast yek rexne kirin. **"Îca te ev* ***pilîndar avête min****."* Qahir Bateyî

Piloz bûn

bnr: Mozan pê girtin

Pinde kirin

bnr: Çîroz kirin

Pir bidendik bûn

Gelekî ecêb û zexel bûn. **Tu wisa li bêdengrûniştina wî menêre, ew yekî* ***pir bidendik e****.*

Pirgotin, cigersotin

Yên ku tiştan pir dibêjin û xwe diqehirînin, di dawiyê de ziyanê didin xwe. **Ji te re dibêjim zehf xwe neqehirîne,* ***pirgotin cigersotin****.*

Pirkirê, hindikxwarê

Ji bo kedavala çûyî tê gotin. **Weyla li min a* ***pirkirê, hindikxwarê****! Piştî ew qas ked û xebatê, min got ez ê êdî rehet bim, vêca vê nexweşiya bêbext bi qirika min girt.*

Pira selawatê weke derzî, salih di ser re bezî, fasiqan çok lê lerizî.

Ji mirovên baş û durist re zêde pirsgirêk dernakeve, lê yên xirab wê rojekê hesab bidin. **Yên gunehkar in bila bifikirin.* ***Pira selawatê weke derzî, salih di ser re bezî, fasiqan çok lê lerizî.***

Piranî, betal kir mêranî.

Karên ku bi tenê tên kirin de huner û zerengiya mirovan dertê holê. ****Piranî, betal kir mêranî****. Jixwe piranî wisa bênavî ye.*

Pirç bi zimanê (yekî) ve hatin

Qala mijarekê zehf zêde kirin, gelekî dubare kirin. **Min jê re ew qasî got ku* ***pirç bi zimanê min ve hat*** *lê tu kêrek jî çênebû.*

Pirça canê (yekî) bizî bizî bûn

Di bin bandora xuyangekê yan jî bûyerekê de man. **Dema ku min ew cenazeyên gerîlayan, yên parçekirî ditin,* ***pirça canê min bizî bizî bû****.*

Pirça kerê dan ser deşikê

Karê çiloçepoyî kirin. **Wê çi bikin?* ***Pirça kerê dan ser deşikê.***

Pirça (yekî) lê gij bûn
Pir biheyecan bûn. *"***Pirça wî li wî gij bû** / *Çavên serî lê gir bûn."* Firat Cewerî

Pirça qûna (yekî) spî bûn
Pir pîr bûn. ***Pirça qûna wî spî bûye**, hê jî li pey keçikan digere.* (argo)

Pirça serê (yekî) spî bûn
Li hember tiştekî ecêb û pir balkêş matmayî man. *Ezbenî, dema min ew xeberdana wê zarokê bihîst, **pirça serê min spî bû**.*

Pirçiyeke tal lê ketin
bnr: Lêvek li erdê, yek li esmên bûn

Pirçiyê xwe kirin
bnr: Lêvek li erdê, yek li esmên bûn

Pirepir lê ketin
Di nav zor û zerpeke dijwar de bûn. *Heya ew pirsgirêk çareser kir, **pirepir lê ket**.* (argo)

Pirepir pê xistin
Di nav zor û astengiyê de hiştin. *Elo wisa kir ku **pirepir bi Kamûran xist**.* (argo)

Pirêza me bisap e, kera me bixal û ap e.
Derfet û hebûna mirov ku hebe, yên li der û dor jî jê kêrekê dibînin. *Ji hebûnê zirar nayê, çi gotine: **"Pirêza me bisap e, kera me bixal û ap e."***

Pirkepirk kirin
Ji bo kesên ku bi armanca têkiliya zayendî hewl didin tê bikaranîn. *Dîsa **pirkepirka** Mehemed e, li dora jinên taxê diçe û tê.*

Pirsa (yekî) dayîn ser pirêzê
Gotin bi tiştekî nehesibandin. *Min ew qasî jê re got, lê wer xuya ye ku jinikê **pirsa min daye ser pirêzê**.*

Pirsên axretê ji (yekî) pirs kirin
Pirsên zor pirs kirin. *Kuro te ez gêj kirim, çi ye tu **pirsên axretê ji min pirs dikî**?*

Pirsyar di mêjiyê (yekî) de xulxulîn
Serî tevlihev bûn. *"Kuna li ber sîngê dayîka xwe rawesta û hezar **pirsyar di mêjiyê wî de xulxulîn** û berî bêjît: "Xêr e dayê, çi qewimîye?"* Fazil Umer

Pirtepirt kirin
Ketin rewşek teng, bêhêz û bêderfet bûn. *Çawa ku min ew xiste bin xwe, bû **pirtepirta** wê.*

Pirtepirt bi dilê (yekî) ketin
Tirsîn, di tatêlê de man. *Wexta ku pûanên xwendekaran dixwendin, **pirtepirt bi dilê Şermînê ket**.*

Pirtî pirtî bûn
bnr: Parçe parçe bûn

Pirtî pirtî kirin
Wekî parçeyên piçûk ji hev qetandin. **Heke Nesîmê Paşayê Cunan te bigire, wê te **pirtî pirtî bike**.*

Pirtik bi hev û din xistin
bnr: Hev û din zêl zêlî kirin

Pirtik li esmanan xistin
Pir hêrs bûn. **Min jî ew qas jê hêvî nedikir, dema ku ew yek bihîst, **pirtik li esmanan xist**.*

Pirtûka reş xwendin
Bi karên çiloçepî re mijûl bûn. **Dev ji wî berdin, wî **pirtûka reş xwendiye**.*

Pirza (yekî) derman kirin
Kêşe çareser kirin. **Rast e, wê xera kir, lê dîsa jî wê **pirza wî derman kir**.*

Pirza (yekî) herişandin
Pirsgirêk hê xerabtir kirin. **Bê kê ji te re got wisa bifikire û **pirza wê keçikê biherişîne**?*

Pisîk (kitik) ne li mal e, navê mişk Evdirehman e.
bnr: Di xelaya mêran de navê dîkan danîn Evdirehman.

Pisîka heft malan bûn
Serê carê li derekê debara xwe kirin. **Rewşa wê cuda ye, ew **pisîka heft malan e**.*

Pisîkê kifteya para (yekî) xwarin
Ji kesên ku xwe ji bo tiştên hêsan dixeyîdinin re tê gotin. **Tu dibêjî **pisîkê kifteya para te xwariye**, pozê xwe daxistiye jêr.*

Pistepista (yekî) kirin
Bi dengekî nizm galgala tiştên bi dizî kirin. "*Reşoyê hevalê wî ne, bi şev û roj **pistepista wan e û behsî hizban dikin**.*" Salimê Casim

Pişik gir kirin
bnr: Pişika xwe mezin kirin

Pişikqetiyayî
Newêrek û bêzirav bûn. **Kuro ew ê **pişikqetyayî** nikare wî karî bike.*

Pişiksivik
Newêrek û sil bûn. **Çavê felekê kor be, kuro tu çawa Erez û ew ê **pişiksivik** dikî tayê terezîyekê?*

Pişik werimîn (Di pişika xwe de werimîn)

Xwe qure kirin, xwe pesinandin. *"*Min serê xwe kire ber xwe,* ***di pişika xwe de hevekî werimîm****. Cara ewilîn bû ku bavê min ez dewsa meriyê mezin datanîm."* Emerîkê Serdar

Pişika xwe mezin kirin
1. Xwe qure kirin. **2.** Cesaret kirin. **Mêrikî wisa* ***pişika xwe mezin dike*** *ku tu dibêjî tu kurê Korê Kor Huseyîn Paşa yî. *Jixwe heke wî* ***pişika xwe mezin nekira****, her tişt dê ji dest biçûya.*

Pişika (yekî) ba girtin
Xwe zêde hesab kirin, xwe nepixandin. **Ew qas pesin danê ku* ***pişika Mecît ba girt*** *û di ji wê bi şûn de kes li pêşiya xwe nedît.*

Pişk gotiye, ji pozê wî ketiye.
Ji bo kesên ku gelekî dişibin yekî tê gotin. **Ew lawê wî yê piçûk, hema tu dibêjî* ***pişk gotiye, ji pozê wî ketiye****.*

Pişo pişo kirin
Ji bo berjewendiyan, li hemberî yekî xwe şirîn kirin. **Nazîme ji bo ku keçika xwe bide lawê Meqhûleyê tim jê re* ***pişo pişo dike****.*

Pişt bi zik dayîn
Bi yê ku piştgirî kiriye re xayîntî kirin. **Ji wî yê ku* ***pişt bi zik da ye****, kî dê bawer bike?*

Pişt dayîn (yekî)
Desteg û alîkarî kirin. **"Tewerê çend ji wan jî bi kar û barên di nav gel de dadiketin û mêrê wan jî* ***pişt didanê****."* Dilawer Zeraq

Pişt dayîn hev
bnr. Pişt kutan hev

Pişt du ta bûn
bnr. Pişta (yekî) gihîştin erdê

Pişt jê standin
Li hemberî yekî firsend bi dest xistin. **Hesabê wî jî tiştekî din bû, lê Celîl* ***pişt jê stend****.*

Pişt lê birîn
bnr. Pişt jê standin

Pişt lê girtin
bnr. Pişt jê standin

Pişt lê kun kirin
Lezandin, bi lezandinê aciz kirin. **Wê keçikê wer kir ku* ***pişt li bavê xwe kun kir****.*

Pişt lê rast nebûn
Ji rewşa xerab rizgar nebûn. Firsenda çareseriyê nedîtin. **Hinek ji nezanî, hinek jî ji bêşansî, Ûsiv çawa kir* ***pişt lê rast nebû****.*

Pişt lê şikandin.
Têk birin. **Di wî şerî de Selîmo **pişt li Sîdar şikand**.*

Pişt pê girê dan
Pê bawer bûn. **Wî **pişt bi Hogir girê da**, lê mixabin Hogir xayîn derket.*

Pişt pê qewîn bûn
bnr. Pişta (yekî) pê germ bûn

Pişt tê dan
Paşgotiniya kesekî kirin. **Rewşenê ew qas **pişt tê da**, karê wê hê xerabtir bû.*

Pişta (yekî) gihîştin erdê
Di nav zerp û zorê de bûn. *****Pişta rebenê Bedir di bin wî barî de gilûşte erdê**, lê di çavê wan de jî nebû bihayê misqalekê.*

Pişta (yekî) nehatin erdê
Têk neçûn. **Ew qas pehlewanan berê xwe dane kalikê min î Medet, lê tu carî **pişta wî nehate erdê**.*

Pişta (yekî) hol bûn
Ji hêz û quwet ketin. **Piştî mirina lawê wî yê xort, **pişta Seydo hol bû**.*

Pişta (yekî) ketin ber
Ji ber rakirina barekî yan jî tiştekî giran pişt êşîn. **"Heta Serhad bi serê xwe barê wî rast dikir û ew radikir ser lingan, **pişta wî diket ber wî**." Zinar Soran*

Pişta (yekî) li erdê ketin
Têk çûn. **Jixwe roja ku bi wê jinikê re zewicî **pişta wî li erdê ket**.*

Pişta (yekî) miz dan
Hadandin. Kişkiş kirin. **Heke Kerem Axayê Milî **pişta wî miz neda**, ew jî wisa zêde pêş de nediçû.*

Pişta (yekî) pê germ bûn
Pê bawer bûn. **Heke **pişta Simko bi qîza wî germ bûya**, wî nedipejirand, lê bi qîza xwe nikaribû.*

Pişta (yekî) qalind bûn
Dost, lêzim, destek û alîkariya yekî zêde bûn. **Em jî dizanin **pişta wî qalind e**, jixwe loma jî wisa pozê wî bilind e.*

Pişta (...) reş kirin
Ser nixamtin, veşartin. **Gelek pirsgirêk hebûn, lê wê **pişta hemûyan reş kir**.*

Pişta (yekî) şikandin
Têk birin, zor lê birin. **Serdar gelekî li ber xwe da, lê di dawiyê de dijmin **pişta wî jî şikand**.*

Pişta (yekî) tenik bûn
Bêhêz û bêdesteg bûn. **Ger **pişta Reşît tenik nebûya**, ew qasî bi ser de nediçûn.*

Pişta ... tune bûn
1. Alîgir û destek tune bûn. **2.** Bingeh vala bûn. **Bila ew wilo gefan bixwe, **pişta wî tune ye**. *Erê, te dest avêtiye wî karî, lê ka **pişta wê tune ye**.*

Pişta (yekî) xwar bûn
Kal bûn, pîr bûn. **2.** Di bin zor û zerpekê de bûn. **Min ji zû de ew nedîtibû, vê carê min dît ku êdî **pişta wî xwar bûye**. *Pişta rebenê Misto di bin wî barî de xwar bûbû.*

Pişta (yekî) danîn erdê
Têk birin. ** "Ez ji te re bibêjim: tu kesî ta niha **pişta me –ne mêrên me û ne jî jinên me-nedaniye erdê**."* Eladdîn Secadî

Pişta destê xwe bêhn kirin
bnr. Kefa destê xwe bêhn kirin

Pişta destê xwe şewitandin
Tobe kirin, ji sedema hin bûyerên berê yên nebaş, devê yekî şewitîn. **Wê **pişta destê xwe şewitandiye**, ew êdî zû bi zû têkildarî wan karan nabe.*

Pişta hev û din kirin
Ji hev û din re alîkarî kirin. **Jixwe wan her sê eşîran **pişta hev û din nekirana**, her sê jî dê têk biçûna û tune bûna.*

Pişta hev girtin
bnr. Pişta hev û din kirin

Pişta (yekî) girtin
bnr. Pişta (yekî) kirin

Pişta (yekî) hatin
Orgazm bûn, kêfa zayendî pêk hatin. ****Heta pişta wî neyê**, rehet nabe.*

Pişta (yekî) kirin
Alîkariya yekî kirin. **Heke Cesîm Axa **pişta wî nekira**, wî ew yek nikaribû.*

Pişta xwe bi destê xwe xurandin
bnr. Girê xwe bi destê xwe vemirandin

Pişta xwe bi hev du de kirin
Ji hev û din xeyidîn, têkilî birîn. **Niha ne wekî berê ne, ev demeke dirêj e ku **pişta xwe bi hev du de kirine**.*

Pişta xwe dan dîwêr
Teralî û bêxemî kirin, ji ber binbariyê revîn. ** "Yek jî ez ji niha de dibilûzim ku hin kes*

dibêjin, dema her tiştî heye. Na! ***Pişta xwe nedin dîwêr*** *ji ber ku hûn bi vî hawî pişta gelê kurd didin dîwêr."* Kawa Nemir

Pişta xwe dayîn ...

Pê bawer bûn, xwe spartin. **"**Pişta xwe dane dewletên dora xwe** ku ew dewletan bi qasî qirşekî xêra wan naxwazin."* Süleyman Çevik

Pişta xwe dan hev (Pişt kutan pişta hev)

Bi hev û din re alîkarî kirin, tifaq kirin. **Wan ku **pişta xwe dabe hev**, kes bi wan nikare.*

Pişta xwe jê re vekirin

1. Bi taybetî ji bo destûrdana jinan a têkiliya zayendî tê gotin. **2.** Sir û raza xwe jê re gotin, baweriya xwe pê anîn. **Min ji wî hez kir, **pişta xwe jê re vekir**, lê wî di demeke kurt de ez firotim. *Min jê re **pişta xwe vekir**, her tişt got, wê jî ew parast.*

Pişta xwe kutan çiyayê bilind

Alîkariya kesek an jî hêzeke mezin girtin. **Helbet wê ew qasî xeber bide, wê **pişta xwe daye çiyayê bilind**.*

Pişta xwe kutan hev

Bi hev û du re alîkarî û tifaq kirin. **Wan herduyan **pişta xwe kutane hev**, êdî zû bi zû kes bi wan nikare.*

Pişta xwe lê zivirandin

bnr. Pişta xwe pê de kirin.

Pişta xwe nerm kirin

Bi têkiliya zayendî xwe rehet kirin. **Wî **pişta xwe nerm kir**, dû re jî li rûyê jinikê nenêrî.*

Pişta xwe pê girê dan

Pê bawer bûn. **Bi ya min be, tu dîsa jî **pişta xwe bi wî girê nedle**.*

Pişta xwe pê de kirin

1. Ji kesekî xeyidîn, têkilî birîn. **2.** Ji kesekî re alîkarî nekirin. **Heta ku **pişta xwe bi min de nekir**, min nizanibû ji min xeyîdiye. *Ez ji te bawer dikim, nema ez **pişta xwe bi te de dikim**.*

Pişta xwe pê germ kirin

Pê bawer bûn. **Çi dibe bila bibe, divê mirov **pişta xwe zêde bi xelkê xerîb germ neke**.*

Pişta xwe pê girê dan

Pê bawer bûn. **Heke Ebas **pişta xwe bi xwediyê malê girê nedaya**, ew qas tişt nedihatin serê me jî.*

Pişta xwe rast nekirin

1. Tim xebitîn. **2.** Di hêla aborî de tengasî kişandin. **Ji serê sibê heya êvarê wî rebenê Kazim **pişta xwe rast nekir**. *Zubêd ev çend sal in dicedîne, lê hê jî **pişta xwe rast nekiriye**.*

Pişta xwe xwar kirin

Ji bar û berpirsyariyê re amade bûn. **Jixwe wî **pişta xwe xwar kiriye** û li bendê ye, lê ew ên din qûna xwe metah dixin.*

Piştgiriya (yekî) kirin

Alîkarî kirin, ji hêlekê yan jî kesekî re desteg bûn. **Heke wan **piştgiriya me nekira**, karê me zor bû.*

Piştgorê (yekî) bûn

Fedakar û dilsoz bûn. **"Bi henek û devbiken bû. Mêrê soza xwe û **piştgorê hevalê xwe bû**. Ji her vê yekê jî gel pir jê hez dikir."* Çiya Mazî

Piştguh kirin

Guh nedan, girîng negirtin. **"...hemû saziyên Kurdan, ku ji bo rizgarkirina mafên neteweyî hatibûn sazkirin, di pratîka xwe de di nava nakokiyeke sosret de bûn, ku di vê kêşeya zimanê xwe de gelekî sersar bûn, çanda xwe **piştguh dikirin**."* Rojan Lezgîn

Piştî baranê ga (bi) cil kirin

Piştî qedînê yan jî kar xelasbûnê bi şûn de tedbîr girtin. **Mixabin ev bûka me hinekî famkor e, **baran disekine pişt re ga bi cil dike.***

Piştî baranê kerê xwe bi cil kirin (Piştî baranê ga cil kirin)

Ji bo kesên ku nepêkhatî ne û karê çiloçepo dikin tê gotin. **Ji wê re çi? Her kes dizane ku ew mirovekî wisa ye, **piştî baranê kerê xwe bi cil dike**.*

Piştî kêfê kêferat e.

Piştî kêf û zewqê xirabî û neyînî ye. **Tu wisa bi kêf û eşqa wan nexape keça min, **piştî kêfê kêferat e**.* (bnr. çîrok)

Piştî kurî, pir vedibirî.

Bi saya lawê xwe derfet bi kar anîn. **Ew jî dayîneke Xwedê ye, Xalê Yûsiv, **piştî kurî pir vedebirî**.*

Piştî tirê, li min kezîkurê

Ji bo karên derengmayî tê gotin. ****Piştî tirê, li min kezîkurê.** Zarokên wî bûn xwedî nevî, ew ji nû ve qala zewacê dike.*

Piştiyê xwe şidandin

Bi biryar li karê xwe xwedî derketin. **Wa ye, nû **piştiyê xwe dişidîne** ku xwe bigihîne hevalan.*

"Piştî kêfê kêferat e."

Payîza derengî ku çêre gewr bûye û nayê xwarin, ker û cehşa xwe pir birçî bûne, ji bo çêrê digerin. Dema ku diçin ser girekî mêze dikin ku şivan pez berî ser onceyê daye û diçêrîne. Dilê cehşê gelekî diavêje serfiraziya pêz û ji diya xwe re dibêje: *"Dayê ev çima wilo ye? Ev însan çima ew qas endatiyê dixin navbera me? Tu mêze dikî wa ye çiqasî bi taybetî li pêz dinêrin û wan xwey xwedî dikin? Em ji bo wan ew qasî kedê jî didin, lê qet guh nadin me."* Ker bi awayekî zane û pispor çavên xwe dimiçiqîne û ji cehşa xwe re dibêje:

"Lawê min her tiştek sedemek û bedeleke wê heye. Piştî çend rojan bi şûn de cejna qurbanê ye. Tu wê demê bibîne rewşa pêz. Ji bîr neke lawê min, piştî kêfê, kêferat e."

Piştrast bûn

Teral bûn. **Ew yekî **piştrast e**, bawer nakim ku wî karê piçûk jî pêk bîne.*

Piştteniк bûn

Ji bo zarokên ku bi şev bi ciyê xwe de dimîzin tê gotin. **Nizanim ji çi ye, ev lawê min î piçûk gelekî **piştteniк e**.*

Pit û pen bûn

Gelekî qelew bûn. **Erê, Gulçîn **pit û pen bûye**, lê di hêla xîretê de tu çiqasî bibêjî lawaz e.*

Pito ye, beranê qor e, sîng vedaye xwedaye ber e.

Xwe dayîn ber kar û barên ji hêz û quweta xwe zêdetir. ****Pito ye, beranê qor e, sîng vedaye xwe daye ber e.** Hela hê haj ji zora dawîn nîn e.*

Pitpit kirin (pitepit kirin)

1. Ji ber nerazîbûnekê mizezemiz kirin. **2.** Gelekî xeber dan. **Ev xwarziyê min hema **dike pitpit**, lê ez tu tiştekî jê fêm nakim. *"...hemû rojê **pitpita** Fata jina wî bû: '...nê te ji ber van simbêlan hay ji me kesî nîn e. ...ma ev simbêl bûne çi, tu sibê dê heta êvarî ba didî û reş dikî!'"* Salimê Casim

Pixî (yekî) kirin

1. Yek tirsandin. **2.** Qerf û tinazên xwe bi yekî kirin. **Ma ew jî mêr e? Tu **pixî wî bikî**, hundirê wî dê biqete. *Heke sibe heta êvarê wisa **pixî te bikin**, bawer im ku tu yê bêhtir dîn bibî.* (qerf)

Piyê (yekî) av daniştin

Gelekî westîn, zêde li ser piyan man. **Ez wisa lê gerîm ku **piyê min av danişt**.*

Piyê wî bisekine, qûna wî nasekine.

Ji bo kesên pir çalak tê gotin. **Ka ew çi bela ye, **piyê wê bisekinin jî, qûna wê nasekine**.*

Piyê xwe di şêmîga (yekî) de neavêtin

Qet neçûn derekê. **Jixwe min tu carî piyê xwe **di wê şêmîga wan de neavêtiye**.*

Piyê xwe li ber firaqa (yekî) xistin

Ji kar û debara kesekî re astengî derxistin. **Yê ku **piyê xwe li firaqa hinekên din bixe**, ew bi xwe jî rehet namîne.*

Piyê xwe li gorî bera xwe dirêj kirin

Wekî rewş, hêz û derfeta xwe tev bigerin. **Lawo, tu rewşa me dizanî, divê tu **piyê xwe li gorî bera xwe dirêj bikî**.*

Piyê xwe neavêtin cihekî

Neçûna tu derê. **Ev bû du meh ku hatiye, lê hê jî **piyê xwe neavêtiye cihekî**.*

Piyê xwe sivik girtin

Hinekî lezandin. **Heke tu **piyê xwe sivik bigirî**, tu dikarî xwe bigihînî wan.*

Piyên (yekî) li erdê neketin

1. Şad bûn, coşîn. **2.** Ji rasteqîniyê dûr ketin, xwe winda kirin. **Ji ber qezenckirina wê azmûnê,* ***piyên Nermînê li erdê nediket.*** **Dev ji wî berde, ew li dinyayeke din dijî,* ***piyên wî li erdê nakevin.***

Pizika çavan bûn

bnr. Pizika li ser zimanê (yekî) bûn

Pizika li ser zimanê (yekî) bûn

Gelekî delalî bûn. **Hêlîn* ***pizika li ser zimanê pîrika xwe ye.***

Pîneyê kevn bûn

Pir temen dirêj bûn. **Tu wisa li zingirîbûna wê mêze meke, ew* ***pîneyê kevn e.***

Pîneyê (yekî) şewitîn

Bêşans bûn. **Jixwe* ***pîneyê min şewitiye,*** *çi bikim, li ber çavên wan nayê.*

Pîpîk xistin qûna (yekî)

Pir nepixandin zêde mezin kirin. **Kuro çi ye, we* ***pîpikek xistiye qûna wî,*** *ma ew ji esmanan hatiye xwarê, çi ye?* (argo)

Pîqînî (tîrqînî) pê ketin

Bi dengekî bilind kenîn. **"Tevî ku ev gotin ne yên pêkenînê jî bûn, lê* ***pîqînî bi civatê diket*** *û Şêxmûsko dom nedikir..."* Bavê Nazê

Pîra pisyayî, navran qusiyayî, hîn bi xwe hisiyayî.

Piştî ku kar qediya bi şûn de bi xwe hesîn. ****Pîra pisyayî, navran qusiyayî, hîn bi xwe hisiyayî.*** *Ew jî dû re bi xwe hesî, lê dereng mabû.*

Pîra sibatê, wê ji nû ve biçe liqatê.

Ji bo kar û rewşa derengmayî tê gotin. **Maşelah ev çi ecêb e lo?* ***Pîra sibatê, wê ji nû ve biçe liqatê.***

Pîra Şamê, tevî amê

Her kes çawa ne, em jî wisa. **Çi ye, tu ew qas li ber xwe dikevî?* ***Pîra Şamê, tevî amê.***

Pirepir lê xistin

Zor lê xistin. **Rodîcan di wê gengeşiyê de* ***pirepir li Yezdan xist.*** (argo)

Pîre têr bû ji kîre, du re sêwî hatin bîrê.

Ji xiroşê xwe şaş kirin. **Çawa bike, qijikê ji tatêla wî karî, her tişt ji bîrê çûye. Got,* ***pîre têr bû ji kîre, du re sêwî hatin bîrê.***

Pîrê bawer nedikir mêr bike, mêr kir, pê li heyştokan dike.

bnr. Pîrê bawer nedikir mêr bike, doza mehr û heyştekê dike.

Pîrê bawer nedikir mêr bike, doza mehr û heyştekê dike.

Piştî hinek derfet bi destxistinê bi şûn de, tiştên hê zêdetir xwestin. *Te ev dîtiye, şikiriya xwe bi Xwedê bîne heyran. ***Pîrê bawer nedikir mêr bike, mêr dike pê li heyştokan dike.***

Pîrê ji tendûrê çû ber kulfikê got: "Xwedê xera bike, ez çiqas erd geriyam."
Kesên bêhêz, tiştên pir piçûk jî mezin dibînin. *Ew jî tiştekî sirûştî ye. ***Pîrê ji tendûrê çû ber kulfikê got: "Xwedê xera bike ez çiqas erd geriyam."***

Pîrê ket govendê, govend berneda.
Ji bo karên çiloçepî tê bikaranîn. *Mirov ku dengeya xwe şaş bike wisa dibe. ***Pîrê ket govendê, govend berneda.***

Pîrê mîz kir hindik bû, bi ser de jî gû kir.
Kar hê xerabtir kir. *Me got, bila hinekî baştir be, lê ***pîrê mîz kir hindik bû, bi ser de jî gû kir***.

Pîrê nemir bihar tê, kero nemir qîwar (pincar) tê.
Hêviyeke lawaz û pir dûr dayîn. *Ya ku tu dibêjî mirî pê dikenin û bersiva wê jî ev e: ***"Pîrê nemir bihar tê, kero nemir qîwar tê."***

Pîrê payîzê çû liqatê.
bnr: Pîra pisyayî, navran qusiyayî, hîn bi xwe hisiyayî.

Pîrê tir kir adarê gîsik filîtin biharê.
Ji meha adarê bi şûn de rewşa hewayê xweş dibe. *Ji adarê pê de rewş hêdî hêdî baş dibe. ***Pîrê tir kir adarê gîsik filîtin biharê.***

Pîrê tir kiriye, pîr ne razî ye.
bnr: Mendê tir kiriye, Mend a naz e.

Pîrhevokê di ser ... re tevna xwe ristin.
Ji bo tiştên demeke dirêj destpêneketî tê gotin. *"Kî zane ji kengê ve min ew nekiriye destê xwe. Pîrhevokên mezela min di ser wê re tevnên xwe ristine." Celadet Alî Bedirxan

Pîrî ye, sed qesî xwariye.
Yên temenê wan dirêj in, di jiyanê de gelek tişt bi serê wan de derbas bûne. *Ma te çawa hesab dikir? Helbet ***pîrî ye, sed qesî xwariye***.

Pîsî ji wech barîn
bnr: Gû ji rûyan barîn

Pîvaz tûj e, çi serî, çi binî.
bnr: Pîvaz pîvaz e, çi sor, e çi spî.

Pîxem lê xistin
Karê yekî xera kirin. *Hema hindik mabû ku karê me biqede, lê Bekoyê Silo ***pîxem lê xist*** û di cih de xera kir.

Polan hişk û sar, kadîn tar û mar.
Rewş tev xerabe ye. **Polan hişk û sar, kadîn tar û mar.* *Tu çi ji vê rewşê hêvî dikî?*

Polê sor
Gelekî kifş û berbiçav bûn. **Jixwe hema ez çi bikim,wekî **polê sor** tê ber çavan.*

Por poşman bûn
Ji ber kirinek an jî gotinekê çewtiya xwe pejirandin. **Dû re ew jî ji ber wê kirina xwe **por poşman bû**, lê gelekî dereng mabû.*

Porê (yekî) di êş de gewr nebûn (Porê xwe di aş de spî nekirin)
Gelek tecrube derbas kirin, ji jiyanê fêm kirin. **"Lo birazî, **porê min ne di êş de gewr bûye**. Nexweşiya sergêjekê ne wilo ye. Ma tu dê ji min re bibêjî?"* Hesen Zinar

Porê hev û din verûn (rûçikandin)
bnr. Hev û din zêl zêlî kirin

Porê şûştî, guliyên hûnayî
Her tiştê amade û beleş bûn. **Porê şûştî, guliyên hûnayî.* *Êdî ji Xwedê çi dixwaze?*

Porê xwe di aşê Mîrze de spî kirin
Temenê xwe bi awayekî vala derbas kirin. **Wî **porê xwe di aşê Mîrze de spî kiriye**, kî wî çi dihesibîne?*

Porê xwe bi ser xwe de kur kirin(*)
Karekî xerab kirin. **Belê wê jî **porê xwe bi ser xwe de kur kiriye** û serê xwe bi wî re kiriye yek.*

Porê xwe li ber tavê spî kirin (nekirin)
bnr. Porê xwe di aşê Mîrze de spî kirin

Porê xwe bi ser bav û birayê xwe de kur kirin
1. Tiştekî xerab û şermî kirin. **2.** Wekî nifiran ji bo mirin an jî felaket hatin serê bav û birayan jî tê bikaranîn. **Min çi zanibû wê **porê xwe li ser bav û birayê xwe de kur bike** û here bi wan karên bênamûsiyê re mijûl bibe.* **Jixwe di wê qirikê de çi ma? Di navîna salekê de **porê xwe bi ser bav û birayê xwe de kur kir**.*

Porê xwe spî kirin
Kal û pîr bûn. **Min êdî **porê xwe spî kiriye**, min nekin nav wan meseleyan.*

Porteport kirin
Xwe bi xwe yan jî bi hinekên din re kutekut kirin. **"Tiştê ji destê wê dihat bi tenê di canê*

(*) **Porê xwe bi ser xwe de kur kirin:** Di çanda Kurdan de, dema bav, bira mêr an jî ewledekî ciwan û delalî dimire, xweh jin an jî dê porê xwe jê dikin. Ne tenê di bûyera mirinê de, lê di tawanbariya namûsê de jî dîsa wekî cezayekî mezin jina ku tawan kiriye, porê wê ji hêla xwediyên wê ve tê jêkirin. Jixwe di çanda kurdan de porê jinê û dirêjbûna wê gelekî girîng e. Por jêkirin tê wateya qederreşî, bênamûsî, êş û kedereke mezin.

xwe de ***dixiste porteport*** *û çûkeçûk."* Musa Vazgali

Postê (yekî) bi erdê re kişandin
Hinciqandin. **Leşkeran* ***postê belengazê Ferhat bi erdê re kişand.***

Postê (yekî) ji serê (wî) de şiqitandin (kişandin)
Eziyet li yekî kirin, lê dan. **Gundiyan Zaxros girtibûn û* ***postê wî ji serê wî de şiqitandibûn.***

Postê (yekî) nerm kirin
Li yekî xistin, li yekî dan. **Lawê Zezê wisa lê xistiye,* ***postê lawê Ciwanmerd nerm kiriye.***

Poşman bûn, hezarî û du quriş.
Poşmanî di dawiyê de kêr nake. **Me got wer meke, dû re* ***poşman bûn, hezar û du quriş.***

Poşmaniyê pere nekirin
Kar ji karan derbas bûn. **Ez ji niha ve ji te re dibêjim, dev ji vê xuya xwe ya xerab berde, dû re* ***poşmanî pere nake.***

Poxê (yekî) derketin
Sûcê yekî derketin holê. **Min dizanibû tiştek heye, lê jixwe zelîf nekişand,* ***poxê wî derket.***

Poz bigirî, ruhê (yekî) dê bikişe.
Pir jar û lawaz bûn. **Zînê ketiye rewşeke wisa ku tu* ***poz bigirî, ruhê wê dê bikişe.***

Poz bixîtik bûn
Kêrnehatî û bêzereng bûn. **Xwedê kiriye te nedîtiye, yekî* ***poz bixîtik e.***

Poz cixcixe bûn
bnr. Poz lê neşewitîn

Poz jêbikin kemo ye, guh jêbikin kero ye, ziman jêbikin lalo ye, dîsa li ser banga hero ye.
Çi dibe bila bibe, tu car ew dev ji gotina xwe, ango inga xwe bernade. **Hûn guherandinê ji wî hêvî nekin.* ***Poz jê bikin kemo ye, guh jê bikin kero ye, ziman jê bikin lalo ye, dîsa li ser benga hero ye.***

Poz lê mezin bûn
Xwe zêde hesibandin, xwe qure kirin. **Bi endazyariya lawê xwe,* ***poz li Osê mezin bûye.***

Poz lê pelixandin
Li yekî xistin. **Kesî jê wer hêvî nedikir, Resûl hema bi kulmekê* ***poz li Nesîm pelixand.***

Poz lê pehn kirin
bnr. Poz lê pelixandin

Poz lê şikandin
bnr. Poz lê pelixandin

Poz pê nekirin
Nehecibandin. **Toreman gelekî li pey Şermînê digere, lê keçik **poz pê nake**.*

Poza jêke quto ye, guha jêke kemo ye, bêarê hero diro ye.
bnr. Poz jêbikin kemo ye, guh jêbikin kero ye, ziman jêbikin lalo ye, dîsa li ser benga hero ye.

Pozbilind bûn
bnr. Poz lê mezin bûn

Pozdirêj bûn
Tevlî her karî bûn. **Maşelah Xanemîr wisa **pozdirêj e** ku xwe dixe nav karê her kesî.*

Pozdirêjî kirin
Karên pêwîst an jî nepêwîst bi hemûyan re têkildar bûn, tiliya xwe xistin nav her karî. **Ji dest vê **pozdirêjiya** te, tiştê ku nehate serê me nema.*

Pozê (yekî) bûn afirê gayê kilo
Bigemar û pejmûrde bûn. **Qilêr jî te got xelas bû, **pozê wî bûye afirê gayê kilo**.*

Pozê (yekî) ketin nava rêxê (Poz ketin nava gû)
Ketin nav rewşeke gelekî fedîkar. **Bi vê têkiliya dawî re **pozê Ferec tam kete nava gû** û jiyana wî reş bû.*

Pozê (yekî) neşewitîn
Bêxîret bûn, şerm nekirin. **"Lewra bêxîret in, pozê wan naşewite. Ji bo menfeet û rehetiya wan xera nebe, kumê rezîltiyê kişandine serê xwe."* M. Rauf Çiçek

Pozê wê jêdikin, dibêje: "Sûcê zimanê min e."
Mirov gelek tawanan bi zimanê xwe pêk tîne. **Eman lawo, eman! Li ser zimanê xwe ser-wext bin, çi gotine? **"Pozê wê jêdikin, dibêje: "Sûcê zimanê min e."***

Pozê xwe daliqandin
Pirçiyê xwe kirin. **Heyfa wê, pir baş bû, lê ji ber ku **pozê xwe dadiliqand**, min jê hez nedikir.*

Pozê xwe daxistin
bnr. Lêvek li erdê, lêvek li esman bûn

Pozê xwe ji (yekî) girtin
Ji yekî xeyîdîn. **Îro çend e, Rostemê Silo **pozê xwe ji min girtiye**, lê nizanim çima.*

Pozê xwe rakirin
bnr. Bêvila xwe hildan

Pozê xwe xistin her zixtikê
bnr. Pozê xwe xistin nav hemû karî

Pozê xwe xistin nav hemû karî

Karên pêwîst an jî ne pêwîst, bi hemûyan re têkildar bûn. **Edeta wî ye, heya ew **pozê xwe nexe nav hemû karî** rehet nake.*

Pozika sola (yekî) di bin paniya (yekî) de man

Ji dest kesekî xelas nebûn, ketina bin kelîja yekî. **Ev demeke dirêj e ku lê digeriya, ancax **pozika sola Erez di bin paniya Serfiraz de maye**, êdî qet wî berdide?*

Pozmezinî kirin

bnr: Poz lê mezin bûn

Pozpirçî bûn

Moral xera bûn, tingijîn. **Wa ye, Zerîcana qîza Dewrêş Begê dîsa **pozpirçî ye**, xuya ye ku dîsa ew û mêrê xwe pev çûne.*

Pozqulozî kirin (Pozbilindî kirin)

Xwe qure kirin, xwe zêde hesibandin. **Heya ku ew wisa pozquloziyê bike, ew bi xwe jî nikare serfiraz bibe.*

Pûç kutan

Karek an jî gotineke çewt kirin. **Bêhemd ji devê wî derket, lê wî jî dû re fêm kir ku **pûç kutaye**.*

Pûçê (yekî) dayîn der

Xeta û çewtiyên yekî eşkere kirin. **Bawer im ku ne bi nezanî, lê bi zanetî Seydo **pûçê Hesen dane der**.*

Pûçên ... derketin

Çewtî û gunehên yekî derketin. **"Li aliyekî jî Kizilaya Tirkiyeyê her rojê **pûçên wê derdikevin**."* Süleyman Çevik

Pûkepûk kirin

Tim bi girîn û bi gotinan mirov aciz kirin. **Eman **pûkepûka** vê amojna min ez dabarandim.*

Pûrt dayîn bê

bnr: Pûrta (yekî) li esmanan xistin

Pûrt dayîn hewa

bnr: Pûrta (yekî) li esmanan xistin

Pûrt li hewa xistin

bnr: Pûrta (yekî) li esmanan xistin

Pûrt pê ve hatin

Hal xweş bûn. **Berê rewşa wî xerab bû, lê ev çend sal in ku **pûrt pê ve hatiye**.*

Pûrta (yekî) li esmanan xistin
Bi lêdanê yek gelekî êşandin. **Wî lêdan heq kiribû belkî, lê van bêbavan jî* ***pûrta wî li esmanan xistine****.*

Pûrta sêrî verûn
Rezîl kirin, eman birin, zivêr kirin. **Ew jinika rezîl heya êvarê* ***pûrta serê wî mêrikî vedirû****.*

Pûş avêtin ser ...
Veşartin. **Eşkere kirin, ji bo wan jî ne baş bû, ji ber wê* ***pûş avêtin ser wê pirsgirêkê****.*

Pûş xistin eyarê (yekî)
bm: Pûrta (yekî) li esmanan xistin

Pûş xistin serê (yekî)
Li yekî eziyet kirin. **Ew jî dizane ku heke bi ya wan neke, ew ê* ***pûş bixine serê wî****.*

Pûte pê dan
Girîng girtin. **Heke me* ***pûte pê neda*** *helbet ew qasî xweşik nedibû.*

Pûte pê kirin
bm: Pûte pê dan

Q

Qafçivîk (bûn)
1. Serî zêde nexebitîn. **2.** Serî pir piçûk bûn. **Tu bawer dikî ku ev **qafçivîk** dê bikaribe tiştekî pêk bîne? *Ev ê **qafçivîk** ka wê çawa te biparêze?*

Qafdaxkirî (bûn)
Bindest, sist û kole bûn. **Wê rêxistinê endamên wisa **qafdaxdikirî** diafirandin ku kes li hemberî serokê wan dernediket.*

Qafê (yekî) dax kirin
Yek bi her awayî xistin bin erka xwe. **Jinikê **qafê wî dax kiriye**, li wî siwar dibe.*

Qafê (yekî) qalind bûn
Di hêla têgihîştinê de zerengî qels bûn. ****Qafê wî qalind e**, ji carekê du caran fêm nake.*

Qafteneke bûn
bnr. Qafê (yekî) qalind bûn

Qaf tijî ka bûn
bnr. Qafê (yekî) qalind bûn

Qaf xebitîn (şixulîn)
bnr. Serê (yekî) xebitîn

Qaflişk bûn
Li hemberî her tiştî tund û dijwar bûn, asê bûn. **Ji bo hevalên ku bi zaravayê zazakî dipeyîvin, dibêjin gelekî **qaflişk in**, lê ez bawer nakim.*

Qafsar bûn
1. Pir biinyat bûn. **2.** Tiştek di serî de rûneniştin. **Ew yekî **qafsar e**, tu çi bibêjî îleh wê bi gotina xwe bike. *Rewşen zelî **qafsar e**, dikim û nakim tênagihîje.*

Qafsarî kirin
Inyat kirin. **Heke Welat ew qasî **qafsarî nekira**, nika em gihîştibûn wê armancê.*

Qala meseleya ker di tê de kirin
bnr: Bavo hûn çima ker ker xeber nadin? (*bnr. çîrok)

Qalib qalibê mêşan e, deng dengê şeşan e.
bnr: Qam qama mêşan e, deng dengê gamêşan e.

Qalibê mêşan e, dengê şeşan e.
bnr: Qam qama mêşan e, deng dengê gamêşan e.

Qalibê vala bûn
Ji bo kesên kêrnehatî tê bikaranîn. **Mirov ku lê dinêre, jê xof digire, lê mixabin **qalibekî vala ye**.*

Qalik avêtin
Mezin bûn. Xwe nû kirin. **Berê min jî got, ev şewitiye û mezin nabe, lê şikir **qalik avêt** û gilûşt hevalên xwe.*

Qalikê hêkê tije nekirin
Tiştekî giring nebûn. **Ya ku dibêje qet **qalikê hêkê tije nake**, lê tu ku ji wî bipirsî, gotineke zêde girîng û maqûl e.*

Qalikê qûnxwaran bûn
Ji bo kesên ên bi xwedî derd re mijûl dibe û alîkarî dike tê gotin. **Mirovên wekî wî zêde bi dest nakevin. Ew her tim **qalikê qûnxwaran e**.*

Qalikê xwe şikandin
Xwe guherandin, xwe li gorî rewşê nûjen kirin. **"Min **qalikê xwe yê gemar bi saya serê te şikandibûn**. Êdî min ji ziman, cil û berg û sola piyê dayîka xwe Fatîmeyê şerm nedikir."* Salih Kevirbirî

Qam qama mêşan e, deng dengê gamêşan e.
Bi xwe piçûk e, lê bandor mezin e. **Tu wisa li hûrikbûna wê menêre. **Qam qama mêşan e, deng dengê gamêşan e.***

Qapiyê (yekî) deverû bûn
Mêriko, ji Xwedê dixwazim, **qapiyê te deverû be.* (nifir)

Qapiyê (yekî) şên bûn
1. Mal têr û tijî bûn. **2.** Çûn û hatina malekê zêde bûn. **Maşelah **qapiyê wî şên e** û dilê wî rehet e. **Maşelah **qapiyê wî şên e**, qeflek radibe, qeflek rûdinê.*

Qaqibo kirin
bnr: Destê xwe li devê xwe xistin

Qareqar kirin

(*) **Qapî:** Derî (tirkî)

Ji ber bûyerek an jî pirsgirêkekê zêde teşqele derxistin. **Jixwe edeta Serto ye, ew heya* ***neke qareqar****, rehet nabe.*

Qasidê qorfelekê li ser canê (yekî) peya bûn

Ji bo ruh qebzkirina Ezraîl tê gotin. **Înşelah* ***qasidê qorfelekê li ser canê wî peya bibe****.*

Qaşa kembera (yekî) şikestin

Ziyan dîtin. **Ma ku tu herî serlêdana wê,* ***qaşa kembera te wê bişikê****?* (argo)

Qaz bi meşa werdekê çû, ket; qalç(ey)a wê ji hev derket.

1. Divê mirov hedê xwe û zerengiya xwe bizanibe, naxwe wê ziyanê bibîne. **2.** Di heman demê de ji bo dexesî û çavnebarbûnê de jî tê bikaranîn. **Divê her kes li gorî hêza xwe tev bigere.* ***Qaz bi meşa wardekê çû, ket; qalça wê ji hev derket.*** ****Qaz bi meşa werdekê çû, ket; qalça wê ji hev derket.*** *Dawiya çavnebariyê jî ew e.*

Qaz bi qaz re, baz bi baz re

Her kes li gorî hempa û hunkufê xwe. **Lawo, zelıf bilind nefire, tu dê nizm bikevî.* ***Qaz bi qaz re, baz bi baz re.***

Qaz bi qaz re, baz bi baz re, mirîşka kor bi dîkê kulek re

bnr. Qaz bi qaz re, baz bi baz re

Qazixê di qûna xwe de derxistin

Pirsgirêka xwe çareser kirin. **Lawê min berê tu* ***qazixê di qûna xwe de derxe****, dû re pêşniyarên xwe pêşkêş bike.*

Qaziyê zarokan xwe xeniqand.

Karên ne li rê ziyanê didin mirov. **Her tişt wekî zerengî û radeya xwe divê. Çi gotine?* ***"Qaziyê zarokan xwe xeniqand."***

Qazî bi xwe çû, pêk neanî; mûyek ji rûyê xwe bi rê kir.

A girîng, ne kes in, lê sazî ne. **Nav û deng û giraniya saziyan ji ya kesan pêşdetir e.* ***Qazî bi xwe çû pêk neanî, mûyek ji rûyê xwe bi rê kir.***

Qazî rabû, miftî şad bû.

Berjewendî pêk hatin, mirovan serfiraz dikin. **Her kes li berjewendiyên xwe difikire.* ***Qazî rabû, miftî şad bû.***

Qazî ye, bi xwe razî ye.

Xwe bi xwe ecibandin. **Tu kesî gulıdarî nake;* ***qazî ye, bi xwe razî ye****.*

Qeda bê malê dinyayê

bnr. Qeda bi destengiyê ketin

Qeda bi destengiyê ketin

Xwezî xizanî tune bûya. **"...çinkî wan ho hêviyeke mezintir a xwe kire qurban, lê* ***qeda bi destengiyê bikevin****."* Hesen Îbrahîm Ebdulla

Qeda xelkê ji serê çiyan tê, ya me ji ber lingên me tê.
Ez mirovekî bêşans im. **Bela ji min dûr nakeve.* ***Qeda xelkê ji serê çiyan tê, ya min ji ber lingên min tê.***

Qeder reş bûn
bnr. Qedera (yekî) reş hatin

Qedera (yekî) reş hatin
Rewş xera bûn. **Carekê **qedera wê reş hatiye**, çi bike kêr nake.*

Qeder reş vegerîn
bnr. Qedera (yekî) reş hatin

Qedrê (yekî) girtin
Rûmet dan. **Li wî welatî **qedrê kekê min gelekî tê girtin**.*

Qefseng (qefes) lê teng bûn
Bêhn çikîn, sebr qedîn, aramî winda kirin. **"Tezînê sar ji binê lingan heya qotê sêrî diçûn. **Qefseng li min teng bûbû** û têra dilê min nedikir."* Osman Sebrî

Qefil (kilîl) li devê xwe xistin
Nepeyivîn, dengê xwe nekirin. **Cemal wisa ker bûbû ku te digot **qefil li devê xwe xistiye**.*

Qelaya beroşê rakirin
Zêde xwarin xwarin. **Maşelah **qelaya beroşê rakir**, hê hindik xwariye?* (qerf)

Qelema xwe tûj kirin
bnr. Kêra xwe tûj kirin

Qelenê diya xwe xwestin
Zehf zêde xwestin. **Na lo, min dest ji wê erebeyê berda, mêrik **qelenê diya xwe dixwaze**.*

Qelenê mirtiban dide, qîza eşîran dixwaze.
Hem tiştên baş dixwaze, hem jî naxwaze bedela wê bide. **Ya ku ew dike jî qet nabe.* ***Qelenê mirtiban dide, qîza eşîran dixwaze.***

Qeletî kirin
Çewtî û bêrêtî kirin. **Wî **qeletî kiriye**, çi mafê wî heye ku ji te re wan gilî û pirsan bibêje?*

Qeliya mişkan xwarin
Xwe bi dînîtî danîn. **Xanemîr: **qeliya mişkan dixwe û dixwaze** bi vî awayî çavê me bitirsîne.*

Qelma (kama) îsotan jî bikin, poz naşewite.
Ji bo kesên bêxîret tê gotin. **Dev ji wî berde lo, **qelma îsotan jî bikin, pozê wî naşewite**.*

Qemça xwe dayîn ser milê xwe
bnr. Dêla xwe dayîn ser milê xwe

Qemça xwe kirin nav piyên xwe

Melisîn, tirsîn, vekişîn. **Dema ku mêze kir ên li hember wî zêde ne,* ***qemça xwe kire nav piyên xwe*** *û ji wir winda bû.*

Qenc kiro bi xwe kiro, xerab kiro bi xwe kiro.

Her çi hebe wî bi xwe kiriye ji ber wê jî ew bi xwe berpirsyar e. **Wî bi xwe kiriye, tu mafê wî yê gazinan tune ye.* ***Qenc kiro bi xwe kiro, xerab kiro bi xwe kiro.***

Qenc li me rast nayên, pîs li me danayên.

Yên baş rastî me nayên, yên pîs jî dev ji me bernadin. **Ew jî şansê me ye.* ***Qenc li me rast nayên, pîs li me danayên.***

Qencan ez xwestim, pîsan ez birim.

Ez bêşans im. **Qedera min wisa reş e.* ***Qencan ez xwestim, pîsan ez birim.***

Qencê Xwedê bûn

Ji bo kesên niyetpak û durist tê gotin. **Ji rûyê wî kifş e ku ew* ***qencê Xwedê ye****.*

Qenciya (yekî) cihê xwe nedîtîn

Ji bo xêr û qenciya valaçûyî tê gotin. **Mixabin wê* ***qenciya min cihê xwe nedît****, hema nola rûnê li qûna kûçikan dayî vala çû.*

Qenciya te nagihîje me, qet nebe bila xirabiya te jî negihîje me.

Tenê dev ji me berde, ew jî bes e. **Ez qurban, hema* ***qenciya te nagihîje me, qet nebe bila xirabiya te jî negihîje me****.*

Qenciya xwe li serî xistîn

Qenciya ku kiriye li rûyê yekî dubare kirin, anîna bîrê. **Çima carekê çend qurîş bi deynî daniyê, hema wisa wê* ***qenciya xwe li serî dixe****.*

Qenciya (yekî) dîtin

Alîkarî û destega yekî dîtin. *****Qenciya ku min ji wê jinikê dît****, ez tu caran ji bîr nakim.*

Qencî herimîn

bnr: Qencî li sereqêt hosa kirin

Qencî li sereqêt hosa kirin

Qencî vala çûn. **"...cehenem ne lûnda germ e, wekî jê dibêjin! -De vêca were* ***qenciyê li sereqêt hosa bike****."* Nizar Mehmed Seîd

Qenciya bi dînan, çira li ber koran

Ji bo hewldanên vala tê gotin. **Ya ku tu dikî,* ***qenciya bi dînan, çira li ber koran*** *e.*

Qend kirin, bend kirin

Bi dek û dolab û bi dalevêreyan li serê yekî tele çêkirin. **Qet armanceke Riza ya wisa tune bû, lê wan* ***qend kir, bend kir*** *ew jî kişandine nav wê lîstikê.*

Qendê xwe nedan ser bendê (yekî)
Bi yekî bawer nebûn. **Devê min çend caran şewitî? Êdî ez* ***qendê xwe nadim ser bendê Maryetê*** *jî.*

Qeqere bi stûyê bavê ve bûn
Mirin. *Qeqere bi stûyê bavê ve bû, dû re wî fêm kir.

Qerepere dîtin
Ji ber tirsê yan jî nexweşiyê xewn û xeyalên xerab dîtin. **Di wê nexweşiyê de, ji ber germaya laşê xwe, min* ***qerepere didîtin***.

Qerepere hatin ber çavan
bnr: Qerepere dîtin

Qerepere kirin (Xerepere kirin)
Qelebalix û dengî kirin, teşqele derxistin. **"Bûboyê mêrê wê pê re xeyîdîbû û gotibû ku dive hevaleke wê keçikê hebe, ka em wê bibin cem doxtor moxtorekî! Tu çi* ***dikî xerepere.***"
Enver Karahan

Qermiçokên (yekî) ne yê van salan bûn
Gelek bûyer û qewimîn di serî re derbas bûn. Kone û bi tecrube bûn. **Tu wisa bi çavekî li wî mêze meke. Ew* ***qermîçokên wî ne yê van salan in***.

Qesem navê Xwedê ye.
Sond xwarin. *****Qesem navê Xwedê ye****, ez çawa guhê wî bigirim, ez ê hildim, li erdê bixim.*

Qesra Elî, çardeh derî
Yê ku dikevinê û derdikevin kifş nebûn. Gelek çûn û hatin lê çêbûn. *****Qesra Elî çardeh derî.*** *Ez rebenê Xwedê, ji ku dizanim çend kes hatin û çend çûn?*

Qesta canê (yekî) kirin
Daxwaza kuştina kesekî kirin. **Wisa tê xuya ku wan* ***qesta canê wî kirine***.

Qeşmerî kirin
Di nav helwesteke nebaş de bûn. **Rizgar gelekî* ***qeşmeriyan dike****, wê li ser belaya xwe ve jî bibe.*

Qet destê xwe neşo û tev apê xwe nan nexwe.
Ya ku tu difikirî ez napejirînim, qet nekeve nav wê hewldanê. **Resûl, ez armanca te fêm dikim, lê li qisûrê menêre,* ***qet destê xwe neşo û tev apê xwe nan nexwe***.

Qetla (yekî) helal bûn
Kuştina yekî heq bûn. **Yê ku wê yekê bike, jixwe* ***qetla wî helal e***.

Qetla (yekî) helal kirin
Kuştina yekî helal kirin. **Dînê me jî* ***qetla yê wisa helal kiriye****, melayê gundê me wisa digot.*

Qetla (yekî) kirin stûyê xwe
Gunehê kuştin yekî hildan. **Wî hureme **qetla Evdileyê belengaz xiste stûyê xwe**.*

Qetiyayî
Bitecrube, bêşerm û zana bûn. **Emirê Dilaver ev çend sal in li Stenbolê di wan karan de **qetiyaye**, bike bike her dikare vê pirsgirêkê çareser bike.*

Qewl û qirar dan
Bipeyman, bisoz û bext biryar dan. **Me **qewl û qirar daye**, em ê çawa dev jê berdin?*

Qewl û qirar, bû girar.
Soz û biryar vala derketin. **Wan soz da lê **qewl û qirar, bû girar**.* (argo)

Qewlik gotin
Derew kirin. **Tu li wan gotinên Misto menêre, ew tenê **qewlikan dibêje**.*

Qey destê min bi doxîna diya wî ve ye?!
Ma ez seqet im? Her hal ez jî dikarim hin tiştan bikim. **Ew min çi dihesibîne? **Qey destê min bi doxîna diya wî ve ye?!*** Dilawer Zeraq

Qey dîk nebe, sibe nabe?!
Ew nebe jî dê pêk bê, tenê bi wî ve girêdayî nîn e. **Tu li wan gotinên wê menêre, **qey dîk nebe, sibe nabe**?*

Qey hêk vebûye, jê derketiye?!
Pir bedew û xweşik bûn. **Keçikeke wisan e ku tu dibêjî **qey hêk vebûye, jê derketiye**.*

Qey mişkan dafik xwarine?!
Ma dawiya dafik û dekan hatiye? Em dikarin gelek dafikan pêk bînin. *"Kekê te wê ji te re çûkekî din bi dafikan bigire; heyfa te. ***Qey dafikên kekê te mişkan xwarine?!*** (qerf) Berhîm Paşa

Qey te jî azan daye?!
Qey tu dîn bûyî? Qey te xwe şaş kiriye? **Çi bi serê te hatiye ku tu xwe dixî hevalê wan dînan? **Qey te jî azan daye?***

Qibla xwe şaş kirin
1. Ketin nav rewşek zor. **2.** Ji riya rast derketin. **Wê jinika rezîl wisa kir ku Şêxmûs **qibla xwe şaş kir**. *Mixabin wî **qibla xwe şaş kiriye**, êdî ji bo wî derseke bi bandor pêwîst e.*

Qiçeqiç ji (dil) hinavên (yekî) hatin
Pir xemgîn bûn, li ber xwe ketin. **"Lê vêca **qiçeqiç ji hinavên min tê** çunkî xewn û xeyalên me koçerên Xwedê hemû her pez û mêrg û pawan û çêre ye ezbenî..."* Sebrî Botanî

Qifla devê (yekî) vebûn
Dest bi axaftinê kirin. **"Ji nû ve bi dest û pên şêrzadî ve hat û **qifla devê wî vebû**." Fazil Umer*

Qijik nikulê xwe lê xe, piçikek goşt bi dêv ve nayê.
Ji bo kesên jar û lawaz tê gotin. **Arîmed ketiye rewşeke wisa ku **qijik nikulê xwe lê xe, piçikek goşt bi dêv ve nayê**.*

Qijika Xwedê
Belengaz, bêxwedî û di rewşek neyînî de bûn. **Ez **qijika Xwedê** çi dikarim ji nav wan karên fermî derkevim.*

Qijikê xwest meşa werdekê hîn bibe, cotkê xwe jî bîr kir.
bnr. Qaz bi meşa werdekê çû ket, qalç(ey)a wê ji hev derket.

Qilêra darê bûn
Ne girîng bûn. **Lawo, ma ew kirinên min hemû **bûn qilêra darê**?*

Qilincê xwe kirin
Ji bo kesên ku xwe belengaz tune û feqîrokî nîşan didin tê bikaranîn. **Mirovên ku **qilincê xwe bikin**, nikarin di jiyanê de serkeftî bibin.*

Qilqilokî bûn
Biheyecan û fikar bûn. **Ji ber keça xwe ya ku dixwîne, Azad **qilqilokî dibe**.*

Qinyat nekirin
Ji kirina karekî re taqet nedîtin. **Min **qinyat nekir** ku li wir seriyekî jî bidim mala meta xwe.*

Qir kirin, pir kirin
Lafekî kirin. **Jixwe edeta wî ye, ew wisa **qir dike, pir dike** û yên ku wî nasna kin dibêjin, her hal kes di ser vî re nîn e.*

Qirçeqirç kirin
Ji ber pirsgirêkekê zehf li ber xwe ketin. **Çima ku di hilbijartinê de muxtarî winda kiribû, **qirçeqirç bi Misto ketibû**, dibehecî.*

Qirdê me kor, bextê me reş bûn
Bêşans û bêrozgar bûn. **Em çi bikin nabe tiştekî lawo, **qirdê me kor, bextê me reş e**.*

Qirdê (yekî) xera bûn
Şansê yekî xera bûn, rewş û rehetî xera bûn. **Armanca wê jî ne ew bû, lê **qirdê wê xera bû**.*

Qirik pişo bûn
bnr. Qiloçeyên (yekî) şikestin

Qirika xwe şil kirin
Araq vexwarin. **Me jî tiştekî wisa zêde nekir, tenê hinekî **qirika xwe şil kir**, hûn çi ji me dixwazin heyran?* (argo)

Qiriktala Xwedê
bnr. Qijika Xwedê

Qirpînî jê hatin

Di nav zor û dijwariyê de bûn. *"***Qirpînî ji qiloçan dihat***. Hev û din didan ber boçan, heta her du berx sist dibûn."* Helîm Yûsiv

Qirşê xwe nedan ser bendê (yekî)

bnr. Qendê xwe nedan ser bendê (yekî)

Qirt lê xistin

Ji tiştekî hinek hildan. **Edeta wî zavayê min e, eşkere yan jî bi dizî, heta ku* ***qirtan lê nexe****, nikare bisekine.*

Qirteqirt kirin

Ji bo dozîna zayendî, di nav hewldanê de bûn. **Dîsa wa ye Reşît Axa* ***qirteqirt dike****, gelo vê carê li pey kê ye?*

Qirtînî jê hatin

bnr. Qirteqirt kirin

Qisasê serê (yekî) bûn

Belaya serê yekî bûn. **Ez baş dizanim ku ew* ***qesasê serê min e****, mirina min wê ji dest wî be.*

Qiseya (yekî) di dêv de hiştin

Ji bo axaftinê firsend nedan. **Ew ê bêmeymenet,* ***qiseya min di devê min de lişt****.*

Qismet hatin ber lingan

Şans yekî vebûn, kar baş meşîn, derfetên girîng jê re amade bûn. **Rewşa wî gelekî xerab bû, lê hema ji nişkan ve* ***qismet hate ber lingan*** *û ev karê baş bi dest xist.*

Qismet hatin girêdan

Bext û qird baş neçûn, di hêla aborî de astengî kişandin. **Her hal* ***qismetê min hatiye girêdan****, naxwe ev çi ne, tên serê min?*

Qismetê (yekî) vebûn

Şans û bext vebûn. **Vê gavê* ***qismetê wê vebûye****, ka dawî çawa tê?*

Qismetê xwe birîn

bnr. Pê li nesîbê xwe kirin

Qismetê xwe xwarin

Her kes bi tenê dikare li gorî derfetên xwe yên heyî sûd wergire. **Qismetê her kesî li gorî zerengî û derfetên wan pêk tê û loma jî her kes tenê dikare* ***qismetê xwe bixwe****.*

Qiyame dayîn ber

Astengî derxistin. **Heke Tefo* ***qiyame neda ber****, ew kar wê çareser bibûya.*

Qiyamet derxistin

bnr. Qiyamet rakirin

Qiyamet qetandin
bnr: Qiyamet rakirin

Qiyamet (a reş) rakirin
1. Şer û dozeke mezin kirin, xilaport rakirin. **2.** Alîkarî nekirin. **3.** Çikusî kirin. **Nado ji her reva qîza xwe, li ser serê mala Zal **qiyamet rakir**. **Bazirganan hemûyan ji bo xwendekaran, dest avête bêrîka xwe, lê Hecî Vahab **qiyamet rakir**. **Me kir û û nekir, Cimşît **qiyamet rakir**, ji bo karê me, xwîn ji xwe berneda.*

Qîjeqîj kirin
bnr: Barebar kirin

Qîl[*] beş kirin
Bişirîn, kenîn. **Min jê re çi digot, wê tenê **qîl beş dikirin**. (argo)*

Qîl derbasî canên hev du kirin
Kîn û buxz bi hev û din re ajotin. ***"Awirên heta wê kêlikê jî, bi evînî di nava hev de kutkutî bûn, êdî di bin nîr û kulebiyan re **qîl derbasî canên hev yên lexrikî kiribûn**."* Serkan Birûsk

Qîle lê kirin
Ji kesekî re kêmasî dîtin. **Di wê geştê de jî, Janya û Kejê hema **qîle li Xezalê dikirin.***

Qîloçeyên (yekî) şikestin
Ji hêz ketin, moral xera bûn, têk çûn. **Êdî **quloçeyên Nado şikestine**, ne Nadoyê berê ye.*

Qîma xwe pê anîn (neanîn)
Pê bawer bûn. **Heke min di serê serî de **qîma xwe pê bianiya**, min ê xwe tawanbar bikira.*

Qîr û qetran bûn
bnr: Qîra bisîr bûn

Qîra bisîr
Pê ve zeliqîn, dev jê bernedan, zêde israr kirin. ***"Mîna teniya bidon û **qîra bisîr** bi min ve zeliqiye bi ku de diçim li pey min e."* Musa Vazgali

Qîra qiyametê bûn
bnr: Qîra bisîr

Qîra xwe tê dan
Bûna belaya serî, bela xwe bi kesekî dan. **Ez çi qasî jê revîm jî, îleh wê di dawiyê de **qîra xwe di min da**.*

Qîrîn pê ketin
Gazî û hewar kirin, bi dengekî bilind êşa xwe diyar kirin. **Bi destpêka şerê wan re **qîrîn bi Şefîqeyê ket**.*

---

[*] **Qîl**: Diran

Qîreqîr kirin

bnr: Barebar kirin

Qîz be tu dizanî, jinebî be ez dizanim, jina berdayî be serê hespê min berde, ez herim.

Qîz ji perwerdehiyê re amade ne û dibêjin: "Tu dizanî." Jinebî, ji ber ku berê jî jiyîne, dibêjin: "Ez her tiştî dizanim." Jinên berdayî jî ji berdanê re amade ne û dibêjin: "Min berde ez herim." *Wekî Behlûl Zana jî gotiye: "***Qîz be tu dizanî, jinebî be ez dizanim, jina berdayî be serê hespê min berde, ez herim."** (bnr. çîrok)

Qîza (kurê) Qurqur Begê[*] bûn

Pir cuda û zêde bûn. **Erê dayê, ew **qîza qurqur begê ye**, ew qet dest diavêje karên wisa hêsan?* (qerf)

Qîza Çarsim Axa[**] bûn

Di wateya "Ma tu gelekî mezin bûyî?" de tê gotin. **Na lo! Ew **qîza çarsim axa ye** qet tê cihê wer piçûk?* (qerf)

Qîza kerê ye, jina mêrê çê ye.

Jin ku bû jina mêrê çê, kî be û çiqas xirab be jî disitire û birûmet dibe. ***Qîza kerê ye, jina mêrê çê ye.** *Mêr ku xurt bûn bi şûn de qet ne xem e.*

Qîza Kor Huseyîn paşa bûn

Cuda û zêde bûn. **Çima ew **qîza Kor Huseyîn Paşa ye** ku em gişk bixebitin, ew li mal rûne?*

"Qîz be tu dizanî, jinebî be ez dizanim, jina berdayî be serê hespê min berde, ez herim."

Rojekê ciwanek tê qehweyê dipirse û dibêje:

"Ez dixwazim tiştekî bi we bişêwirim, gelo li vir kesekî wisa zana heye?" Yê li wir mala Behlûl Zana nîşan didin. Xort diçe li derê Behlûl dide. Ji hundir, dengê Behlûl Zana tê:

"Kerem bike, were hundir, derî vekiriye." Xort derî vedike, dikeve hundir, dinêre ku Behlûl li şivekê siwar bûye û wekî hespan di nav malê de dizivire û nola zarokan wê şivê wekî hespan diajo. Xort dimîne li nîvê malê, Behlûl jî wekî siwaran hema li dora wî diçe û tê. Lawik dixwaze tiştinan bibêje, lê ji wê dîmenê zimanê wî lê nagere. Di dawiyê de Behlûl dibêje: *"Heke tu dixwazî tiştekî bibêjî? Berê serê hespê min bigire."* Lawik bêyî hemdî xwe serê darikê ku di nav şeqa Behlûl de ye digire. Behlûl dipirse:

"Tu çi dixwazî?" Lawik ji kerban diwaqe:

"Ez dixwazim bizewicim, ji bo wê dikim ku bi we bişêwirim." Behlûl hinekî difikire, rûdêna xwe miz dide û dibêje:

"Qîz be tu dizanî, jinebî be ez dizanim, jina berdeyî be, serê hespê min berde, ez herim!" Xort serê hespê wî ber dide, ew dîsa darik wekî hespan diajo û li orta malê dizivire. Lawik tiştekî ji gotinên wî fêm nake. Dizivire û dîsa tê qehweyê. Li qehweyê kalê ku ew şandiye mala Behlûl, ji xort dipirse:

"Çawa bû xwarzê, Behlûl çi ji te re got?" Xort hê jî şaşwazî ji ser xwe neavêtiye, wekî serxweşan diaxive:

"Xalo, weleh min tiştek ji wî fêm nekir. Ez çûm min nihêrî ku di nîvê malê de darikek ji xwe re kiriye hesp û dizivire. Ji min re jî got: 'Qîz be tu dizanî, jinebî be ez dizanim, jina berdayî be serê hespê min berde ez herim û hew!..'" Kalo ji xort re dibêje:

"Wî tam bersiva te daye xwarzê. Qîz ji perwerdehiyê re amade ne, tu çi bibêjî wê bibêje: 'Tu dizanî.' Jinebî ji ber ku berê jî zewicîne û bi taqî ne, tim dibêjin: 'Ez dizanim.' Jinên berdayî jî hîn hûne û ji berdanê re amade ne, dibêjin: 'Min berde ez herim.'" Kalo gotina xwe bi vî awayî didomîne:

"Êdî wekî wê tu bi xwe biryara xwe bide."

* Behlûl Zana (Dana): Birayê xelîfeyê Ebasiyan Harûn Reşît e. Bi zanebûn, pesqelyar û nuktebaziya xwe navdar e. Di nav faris, kurd û gelên rojhilata navîn de wekî Mele Nesredîn, çîrok û serpêhatiyên wî li gelek cihan tên gotin. Ji ber zêde biaqilbûnê hinek helwestên wî yên awarte û balkêş jî hene.

[*] **Qurqur Beg**: Ji bo beqan tê gotin.

[**] **Çarsim Axa:** Ji bo keran tê gotin.

Qîza wî ya keçel mir, got: "Wey li min gulîdirêjê!"
Piştî mirinê mirov birûmetir dibin. **Gelek mirov wisan in, nizanim ji çi ye.* ***Qîza wî ya keçel mir, got: "Wey li min gulîdirêjê!"***

Qîza xama bûn
Qîza gihîştî û eke bûn. **Du* ***qîzên wî yên xama*** *li mal in, helbet wê li ser serwext be.*

Qîzek nazand, gundek bezand.
Ji bo kesên tiştan pir mezin dikin û hawirdor zêde aciz dikin tê gotin. ****Qîzek nazand, gundek bezand.*** *Ku wisa zêde zivir ba de, helbet wê wiha jî encamê hilde.*

Qîzikê mêr kir, kofiya xwe xwar kir.
Serkeftin û serfiraziya xwe nîşan dan. **Ma tiştekî hindik pêk aniye?* ***Qîzikê mêr kir, kofiya xwe xwar kir.***

Qoç li hev xistin
Bi hev du ketin, li hemberî hev û din doz ajotin. **Ew ji wan re bûye cir, heya* ***qoç li hev nexin****, rehet nabin.*

Qoçê xwe li dîwaran xistin
Bitrî bûn. **Ji ber wan derfetên ku xezûrê wî jê re amade kirine, Evdilrezaq* ***qoçê xwe li dîwaran dixe****.*

Qoçê xwe li qoçê beranan xistin
Li hemberî yê ji xwe bihêztir û nehempa sekinîn. **Sebrî jî ne hindik e,* ***qoçê xwe li qoçê beranan dixe****.*

Qolinca rûviyê reş (yekî) girtin
İnşelah* ***qolinca rûviyê reş te bigire**, tu li dor hev bizivirî.* (nifir)

Qoqê vala bûn
Ji der ve mezin xuyandin, lê naverok vala bûn. **Tu ji dûr ve bi mezinahiya wê nexape, ew hema tenê* ***qoqê vala ye****.*

Qorîn pê ketin
Hewar û gazîn kirin. **Ji nişkan ve wisa* ***qorîn pê ket*** *ku em tev tirsiyan.*

Qudûm (yekî) şikestin (Qudûm sist bûn)
1. Taqet kêm bûn, ji hêz ketin. **2.** Tirsîn **3.** Hêvî û guman birîn. **Zimanê Babîr lal bû, hate girtin. Çav pê ket,* ***qudûmên wî sist bûn****, milên wî kişiyan."* Celîlê Celîl **"Li gorî ku wî hesab dikir û didît, kambaxî bû.* ***Qudûm ji tirsan lê dişikestin.*** Süleyman Demir **"**Qudûmên min şikestin.*** *Hestiyên çavên min bi ser bextreşiya min de heliyan. Lê tu nehatî."* Evdile Koçer

Qudûmê çokên (yekî) birîn
Gelekî tirsandin an jî xemgîn kirin. **Bi wê tivingê Qasimlo* ***qudûmê çokên wî birî****.*

Qul bi qul gerîn
Li her derê baş nêrin. **Em li malê **qul bi qul gerîn**, lê me tu tiştek nedît.*

Qul bi qul zanîn
Baş pê beled bûn. **Rêberekî wekî wî tu nikarî bibînî, çimkî ew her derên wê deverê **qul bi qul dizane**.*

Qul mezin, pîne piçûk bûn
Çareseriya ku tê fikrandin, an jî tê bikaranîn, têra pirsgirêkê nekirrin. **Erê, ew jî dixwaze azînekê bibîne, lê belê **qul mezin e, pîne piçûk e**.*

Qul û qawêr jî bi dest (yekî) neketin
Riya revê nedîtin. **Toreman wisa lê kiribû ku **qul û qawêr jî bi dest Reşat nediketin**.*

Qul û qewar girtin
Pêdivî û hewcedarî çareser kirin. **Heya ku ji destên min tê ez jî **qul û qewaran digirim**.*

Qula ku, tiliya (yekî) tê de tune be nîn e.
Ji bo kesên ku bi her karî re mijûl dibin û fesadiyê dikin tê bikaranîn. **Şeytan jî bi wî nikare, **qula ku tiliya wî tê da tune be nîn e**.*

Qulba xwe şaş kirin
bnr: Riya mala xwe şaş kirin

Qulba (yekî) kifş nebûn
bnr: Qulba (yekî) tune bûn

Qulba (yekî) tune bûn
Ji bo kesên ku bêbawer in û rewşa wan nezelal e tê bikaranîn. **Tu **qulba Felemez tune ye**, ew bibêje sibeh e, hûn bibêjin êvar e.*

Quldirî kirin
Serserîtî û tolazî kirin. **Serkar ne xortekî giran e, heya êvarê **quldiriyê dike**.*

Qulek bi destê (yekî) neketin
Ji bo kesên ji tirsan dixwazin xwe veşêrin tê gotin. **Dema ku kûçikê me çav bi segê Ferzende diket, **qulek bi destê wî nediket ku xwe veşêre**.*

Qulek di qûna xwe de danîn (kirin)
Tiştekî metah nekirin. **Çima hema Nûro ew bizina îşkolekî anî, **qulek di qûna xwe de danî**?* (argo)

Qulek girtin, yeke din derketin
Pê re serederî nekirin. **Ez rebenê Xwedê nizanim çawa bikim, **qulekê digirim, yeke din derdikeve**.*

Qulek jê re bûn heft pere

Ketin rewşeke zor ku xweveşartin jî bi dest neketin. **Rewşen ketibû rewşek wisa ku* ***qulek jê re bûbû heft pere****.*

Qulcke ku serê xwe bixiyê tunc bûn

Bêmal û bêhal bûn. *****Quleka ku serê xwe bixiyê tune ye****, hatiye gotinên ji serê xwe mezintir jî dibêje.*

Qulo pilo di nav ... de bûn

Fen û fistik di nav de bûn. **Aqilê min ji vî karî nabire, ji ber ku bi dîtina min gelek* ***qulo pilo di nav de ne****.*

Qulopanî avêtin

Kêfxweş bûn. **"Îşev jî holhola wan e. Qad bêhtir ji wan re fireh bûye.* ***Qulopaniyan diavêjin.*** *A nedîtî dîtine."* (argo) Musa Vazgali

Qulp pê ve girê dan (kirin)

1. Îftira kirin, êtxî tê de anîn. **2.** Li mehneyan gerîn. **Çima ku ji dil naxwaze û dexesiyê jî dike, loma ew qas* ***qulp pê ve girê dan****. *Armanca wê ne kirîn bû, ji ber wê jî* ***deh qulp pê ve girê dan****.*

Quran hişk kirin

Quran ji bîr kirin. **Piştî ku diya wê mir, Fadîmê jî* ***Quran hişk kir****.*

Qurbana wî cihî bim ku tirs lê hebe.

Gelek tişt bi tirs, xof û sehmê pêk tên. **Ez* ***qurbana wî cihî bim ku, tirs lê hebe****, Mendo nebûya, niha Werdekê gelek tişt anîbûn serê me.*

Qurbana Xwedê me, qirş û qalê çolê me.

Ev biwêj li hêla yên ku tên şibandina hinekên ne hempayê wan tê gotin. *****Qurbana Xwedê me, qirş û qalê çolê me****, tu çawa min dixî hevalê wî melomestoyî?* (qerf)

Qurçek avêtin devê yekî

Bertîl dan. **Ew qas astengî derxistina wî ew e, ku tu* ***qurçekê biavêjî devê wî****.*

Qureyê zikbirçî bûn

Ji bo kesên rewşa wan ya aborî nebaş e, lê xwe zêde qure dikin tê gotin. **Ew teres jî* ***qureyê zikbirçî ye****.*

Qurqurîk xwendin

Der barê karê ku ne têkildar de peyivîn, vala û pûç axaftin. **Erê, ew ji dûr ve* ***qurqurîk dixwîne****, li di nav kar de çi dibe, çi diqewime nizane.*

Qut qutî kirin (Qutî qutî kirin)

bnr. Hev û din zêl zêlî kirin

Qutiya dilê (yekî) vekirin

Xwe gihandin hestên kesekî yên kûr. **"Ma dengê wî yê mîna qedîfe,* ***qutiyê dilê kîjan***

keç û jina bedew venedikir?" Mehmed Uzun

Quwet gihîştin (yekî)
Ji yekî bihêztir bûn. Bi yekî karibûn. **Ew ne di qeda te de ye, bi hêsanî **quweta te dê bigihîje wî**.*

Quzê dêlegurê pê ve bûn
Bişans bûn. **Bextewarî **quzê dêlegurê pê ve ye**, li ku hebe karê wî bi rê ve diçe.*
Quzê gur pê ve bûn
bnr. Quzê dêlegurê pê ve bûn

Quzê kurkirî, kîrê li ber repkirî
Ji bo rewşa zêde lihevhatî û erênî tê gotin. ***Quzê kurkirî, kîrê li ber repkirî.** Rewş ji hê baştir dê çawa be?* (argo)

Quzê par rewisî, îsal bêhn daye.
bnr. Piştî tirê, min kezîkurê

Qûç danîn
Eşkere kirin, daxuyandin. **Wan jixwe **qûç danîne**, êdî tiştekî veşartî tune ye.*

Qûl û kole bûn
Bi seranser ketin bin bandora kesekî şan jî tiştekî. **Mehemed û Sedat ji wê sazûmanê re **bûne qûl û kole**.*

Qûn bi erdê re bûn
Ji bo kesên bejnkinik tê gotin. **Ew serê xwe di nav perên esmanan de dibîne lê nizane ku yekî **qûn bi erdê re ye**.*

Qûn bû, qûn jî çû.
Jixwe tenê ew mabû, ew jî ji dest çû. ***Qûn bû, qûn jî çû.** Êdî tu çi dixwazî?*

Qûn lê çirandin
Zor pê xistin. **Evdilwehab neheqiyê napejirîne, ji bo wê heqeretiyê wisa kir ku **qûn li Zeydan çirand**.*

Qûn lê qetandin
Di nav astengî û zorê de hiştin. **Zeydan **qûn li Sercan qetand**. (argo)*

Qûn lê teng bûn
Di nav zor û astengiyê de man. **Li wir **qûn li Seyda teng bûbû**, lê Laleş zû gihişte hewariya wî.* (argo)

Qûn nekirin
Li derekê rehet nesekinîn. **Ez wî dizanim, ew li tu derê **qûn nake**.*

Qûn paç kirin
bnr. Qûna (yekî) dalistin

Qûn pehn kirin

1. Teralî kirin, li serê serî rûniştin. **2.** Qelew û kok bûn. **Ew encex dikare **qûnê pehn bike**, wekî din ew ji çi fêm dike? *Maşelah wisa **qûn pehn kiriye** ku bi zorê bi rê ve diçe.*

Qûn qûna mirîşkê ye, dixwaze (dike ku) hêkên qazan bike.

Ji bo helwest û hewldana ji hêza xwe zêdetir nîşandanê tê bikaranîn. *****Qûn qûna mirîşkê ye, dixwaze hêkên qazan bike.*** *Her kesek û her tiştek hêz û radeyeke wê heye.*

Qûn qûna mirîşkê ye, hêk hêka qazê ye.

Ji bo kesên ku ji hêza xwe zêdetir huner û zerengiyê nîşan didin tê gotin. **Jixwe kifş bû, min zanibû ew ne xalî ye. Tu nanêrî,* ***qûn qûna mirîşkê ye, hêk hêka qazê ye?***

Qûn xurîn

bnr. Qûna (yekî) rabûn

Qûna bêaran, benîştên daran

Ji bo kesên ji lêdanê jî şerm nakin tê gotin. **Malavawo tu çawa bikî çare nîn e,* ***qûna bêaran, benîştê daran****.*

Qûna (yekî) bisekine, serî nasekine

Ji bo kesên pir çalak tê bikaranîn. **Ew çi ecêb e,* ***qûna wî bisekine, serê wî nasekine****.* (argo)

Qûna (yekî) çarderî avêtin

Zêde tirsîn. **Dema ku çavên wî li çavên Fêris dikevin,* ***qûna Selîm çarderî diavêje****.*

Qûna (yekî) dalistin

Ji kesekî re şîlafî û riyakarî kirin. **Heke wî jî ew* ***qasî qûna wê danelista,*** *wî jî tiştek bi dest nedixist.*

Qûna (yekî) erd negirtin

Ji bo yên ku cihê xwe zû diguherin û li derekî nasekinin tê gotin. *****Qûna Mazlûm derekê nagire****, tu nanêrî di navîna salekê de çend mal guherandin?*

Qûna (yekî) giranî li serî kirin

1. Pir teral, sist û pêgiran bûn. **2.** Kêmaqil bûn. *****Qûna wî giranî li serê wî dike****, heya ew bê, ya felek. ****Qûna wî giranî li serê wî dike****, ew nikare di wê azmûnê de bi ser bikeve.*

Qûna hev du bêhn kirin

Bi hev û din re têkiliyên germ danîn. **Tu menêre niha ew dikin şer, lê wê sibehê dîsa* ***qûna hev û din bêhn bikin****.*

Qûna hev û din dîtin

Hay ji barê hev hebûn, hev du ceribandin. **Me* ***qûna hev û din dîtiye****, em baş bi hev beled in, ne pêwîst e ku hûn bipeyivin.*

Qûna (yekî) pê re negirtin

Tirsîn, cesaret nekirin. **Bawer nakim ku* ***qûna wî pê re bigire*** *û bê wir.*

Qûna pîrikên wan li ser pira Batmanê li hev ketiye.
Di hêla lêzimtiyê de pir dûrî hev bûn. **Dê çawa pê bawer be, ma **qûna pîrikên wan li ser pira Batmanê li hev ketiye**?* (argo)

Qûna (yekî) rabûn
1. Bitrî bûn. **2.** Daxwaza têkiliya zayendî kirin. **Çavê Oro hinek pere dîtin, **qûna wî rabû**, ma tu nabînî ketiye, qilixekî çawa? ***Qûna wê rabûye**, êdî bi şev jî nayê mala xwe.* (argo)

Qûna reş û spî ji hev kifş bûn
Rewş bi zelalî xuya bûn. **Hela bila ew roj bê, wê demê **qûna reş û spî wê ji hev û din kifş bibe**.*

Qûna (yekî) şeşferaş avêtin
Tirsîn. **Kuro **qûna Fêris şeşferaş diavêje**, qet diwêre di wir re derbas bibe.* (argo)

Qûna şil û zuha ji hev û din kifş kirin
Heqî û neheqî, xurtbûn an jî nebûn ji hev du cuda kirin. **Tu mêrî were em dakevin Geliyê Şîlanan, wê demê **qûna şil û zuha dê ji hev û din kifş bibe**.*

Qûna (yekî) şonik kirin
Bi lêdanê yek anîn rê. **Wan gelek zehmet kişandin, lê di dawiyê de **qûna Xelo şonik kirin**.*

Qûna (yekî) şûştin û dan ser pûngê
Sûc û gunehên yekî veşartin, paqij û durist dan xuyandin. **Erê, wan **qûna wî şûşt û dane ser pûngê**, lê xûyê skurê dîsa jî ya bûyî ji bîr nake.*

Qûna tûtikan, hêka betan?!
Her tişt wekî hempayê xwe divê. **Helbet wer nabe birayê min. **Qûna tûtikan, hêka betan.***

Qûna wê ya çûkan e, li ser hêkên betê rûdine.
Di nav hewldana ne wekî zerengiya xwe de bûn. **Min fêm nekir, ew li pey çi ye. **Qûna wê ya çûkan e, li ser hêkên betê rûdine.***

Qûna xwe li ba kirin
1. Di hêla zayendî de daxwazkarbûna xwe nîşan dan. **2.** Di nav hewldana neecibandina tiştekî de bûn. **Wê gelekî li ber min **qûna xwe li ba kir**, lê min rû neda wê. *Ew çiqasî **qûna xwe li ba bike** jî nikare ji wê tawanê xelas bibe.*

Qûna xwe ba dan
Cixizî kirin. **Peymana me ne wisa bû, lê mixabin, Xelîl **qûna xwe ba da**.*

Qûna xwe bi xwe re nekişandin
Pir qelew û giran bûn. **Maşelah bi gewriya xwe nikare, wisa bûye ku, êdî nikare **qûna xwe bi xwe re bikişîne**.*

Qûna xwe çirandin
bnr. Qûna xwe qelişandin

Qûna xwe danîn erdê
Inyat kirin, dev ji gotina xwe bernedan. **Me kir û nekir wê **qûna xwe danî erdê** û bi ya me nekir.*

Qûna xwe kutan hev
Bi hev du re yekîtî û alîkarî kirin. **Li hemberî Zal wan hemûyan **qûna xwe kutabûn hev**, lê dîsa jî pê nikaribûn.*

Qûna xwe daneynîn erdê
Gelekî xebitîn. **Welehî îro Mîroya Osê deqeyekê jî **qûna xwe daneynî erdê**.*

Qûna xwe derxistin
Bêarî kirin. **Ji wî re çi? Aqilê wî nebire, wê **qûna xwe derxe** û bigere.*

Qûna xwe di ava sar de kirin
bnr: Qûna xwe qelişandin

Qûna xwe dirandin
bnr: Qûna xwe qelişandin

Qûna xwe germ kirin
1. Xwe di hawireke erênî de edilandin. **2.** Ji cih ranebûn, daxwaza rabûnê nebûn. **Fatimê li wir **qûna xwe germ kiriye**, wê bibe jina wê malê. *Welhdetîn ancax ku **qûna xwe germ kiriye**, qet ji wir radibe?*

Qûna xwe ji bin bar derxistin
Xwe ji berpirsyariyê xelas kirin, xwe ji pirsgirêkê rizgar kirin. **Heke ew wê makîneyê jî nestînin, **qûna xwe ji bin wî barî dê zor derxînin**.*

Qûna xwe ji derpê derxistin
Bêarî û bêşermiyê ji hed derbas kirin, ji çîzê derxistin. **Ew qas jî nabe lo, te bidîta Qaso **qûna xwe çawa ji derpê derxistibû**.*

Qûna xwe ji erdê ranekirin
Dest bi xebatê kirin. Ji bo kesên teral û sist tê gotin. **Heya êvarê Meco **qûna xwe ji erdê ranake** ku ew kar jî hinekî bi pêş de here.*

Qûna xwe ji erdê quloz kirin
bnr: Qûna xwe ji erdê ranekırin

Qûna xwe li avê xistin
Ji bo hewldana vala tê bikaranîn. Zêde zor dan xwe. **Ew **qûna xwe li avê bixe** jî êdî ew yek tu car nabe.*

Qûna xwe li ber (yekî) li ba kirin
Di hêla zayendî de daxwazkariya xwe bi cîlweyan nîşan dan. **Wê jinikê çiqasî **qûna xwe li ber wî li ba kir** jî, wî guh nedayê.*

Qûna xwe li erdê xistin
Tiştek zêde daxwaz kirin. **Îdoyê lawê min di piçûktiya xwe de jî heya gotina xwe bi cih dihanî,* ***qûna xwe li erdê dixist****.*

Qûna xwe metah girtin (xistin)
Ji bo pêkanîna tiştekî xwe giran girtin. **Ji salan mehan carekê karê me kete hêla wê, wê jî* ***qûna xwe gelekî metah girt****.*

Qûna xwe bi naziyê xistin
Xwe giran girtin. Xwe nazî xistin. **Wî jî lê mêze kir ku niyeta keçikê baş e, vê carê jî wî* ***qûna xwe bi naziyê xist****.*

Qûna xwe pê rast kirin
bnr: Qûna xwe pê şûştin

Qûna xwe pê şûştin
Karê xwe pê qedadin, dû re jî bi tiştekî hesab nekirin. **Ez bûm navgîna wan,* ***qûna xwe bi min şûştin*** *û gotin, "Kulavgûyo malî ava." û çûn.*

Qûna xwe pê de kirin
1. Tenezûlî yekî nekirin. **2.** Ji kesekî xeyîdîn. **3.** Têkiliya xwe birîn. **Mêrikî peyvek jî negot, hema* ***qûna xwe bi min de kir*** *û çû. *Nizanim Zarçînê çi ji min bihîstibû,* ***qûna xwe bi min de kir****. *Madem ew* ***qûna xwe bi min de dike****, ez jî bi wê re têkildar nabim.*

Qûna xwe qelişandin
Ji bo pêkanîna tiştekî gelekî xwe êşandin. **Mistoyê belengaz* ***qûna xwe qelişand****, lê dîsa jî nikaribû kurê xwe ji wê hezeka xerabe de derxe.*

Qûna xwe qetandin
bnr: Qûna xwe qelişandin

Qûna xwe qîş kirin
bnr: Qûna xwe qelişandin

Qûna xwe rast nekirin
bnr: Pêgiran

Qûna xwe şûştin
Xwe bê sûc û bê guneh nîşan dan. **Ew hew dikare bi wê helwestê* ***qûna xwe bişo****, em dizanin bê çi gunehkarî kirine.*

Qûna xwe vekirin
bnr: Qûna xwe derxistin

Qûna xwe bi vî alî, wî alî de avêtin (Qûna xwe bi vir de, wê de avêtin)
Li hincetan gerîn. **Em dizanin ku tu dikarî vî karî bibî serî, qet* ***qûna xwe bi vir de, wê de neavêje****.*

Qûna (yekî) danîn ber tavê
Kêmasî û tawanên yekî eşkere kirin. **Ew ji min vedikişe, çimkî dizane ku hema bilebite ez ê **qûna wî bidim ber tavê**.*

Qûna (yekî) rast kirin
Kêmasiyên yekî rast kirin. **Ew hevalekî pir baş e, tenê dixwaze, **qûna te hinekî rast bike**, ne tiştekî din.*

Qûna (yekî) şil bûn
Sucek kirin. **Ji ber ku **qûna wî şil e**, hatina wî ne gengaz e.*

Qûnbiagir bûn (Agirqûn bûn)
Di hêla zayendî (cinsî) de pir daxwazkar bûn. **Xezal jineke **qûnbiagir e**. Serê carê bi mêrekî re dizewice.*

Qûnbigû (bûn)
Nezan, qirêjok û bêferaset bûn. **"Lewre sedema vê ecêba giran ji Hesbilûrê **qûnbigû** pê ve ne kesekî din bû."* Dost Çiyayî

Qûnboş (bûn)
Bêxîret û bêxem bûn. **Kuro mala te neşewite, tu ji wî yê **qûnboş** çi hêvî dikî?*

Qûnde kirin
Kesek an jî tiştek xerabe kirin. **Wî beredayî di dawiyê de ew lawik jî **qûnde kir**.*

Qûnê (kunê) dixwazî, qalibek sabûn jî bi ser de dixwazî.
Ji ya asahî zêdetir tişt xwestin, ji hed derbas kirin. **Ya te jî qet nabe heyran. Tu **qûnê dixwazî, qalibek sabûn jî bi ser de dixwazî**.*

Qûnê vîtvîtk lê xistin
bnr. Qûna (yekî) şeşferaş avêtin

Qûnê wîtewît kirin
bnr. Qûna (yekî) şeşferaş avêtin

Qûnek kirin
Heman tişt zêde dubare kirin. **Ev erebeya min di dest van exrebeyan de **qûnek bû**.*

Qûngiran (bûn)
bnr. Pêgiran (bûn)

Qûnneşûştî (bûn)
bnr. Qûnbigû (bûn)

Qûnqelişandina (yekî) lê man
Qehirandin û zehmet dîtin, lê vala çûn. **Mehemed bi gotina me nekir, di dawiyê de **qûnqelişandina wî jî li wî ma**.*

Qûnqûçkî nebûn
Bêsebir û nesitirî bûn. **Ev lawikê min **qûnqûçkî nabe**, qet aqilê min jê nabire.*

Qûntazî bûn
Xizan, feqîr û bêsitar bûn. **Malava, ew belengaz yekî **qûntazî ye**, tu dê canê wî bistînî?*

Qûreqûr kirin
1. Hewarî û gazî kirin. **2.** *Teşqele û lêwirze derxistin. *Ma we nebihîst, jinikê di destê mêrê xwe de çawa **dikir qûreqûr**. *Zarokan wisa **qûreqûr dikirin** ku ez ji xewê şiyar bûm.*

Qûş lê qetandin
bnr. Qûş li diya (yekî) qetandin

Qûş li diya (yekî) qetandin
Yek xistin rewşeke xeter. **Bi wê hewldanê Xebûr, **qûş li diya Sêvdîn qetand**.*

Qûşa xwe lê nexistin
Bi tiştekî nehesibandin. **Êdî pozê wî bilind bûye, qet **qûşa xwe li me naxe**.*

Qûtê kewarê, heta biharê
Tedbîr mirov derdixe firaqetiyê. **Tu car ked û tedbîr vala naçe. **Qûtê kewarê, heta biharê.***

Qûtê nemirnejî bûn
Tenê ji bo debara jiyandina rojane bûn. **Ew miza (mayîşa) ku dide min jî, tenê **qûtê nemirnejî ye**.*

Qûtxwarê min e, hêkkiriyê xelkê ye.
Ez xwedî dikim, lê kêr digihîje hinekên din. **Ew jî şansê min e, seg bi keda min de birîn. Lawikê min, **qûtxwarê min e, hêkkiriyê xelkê ye**.*

R

Ra jê nebûn

Çare jê re tune bûn. **Resûl zêde pirsgirêkê dernaxe, lê* ***ra ji Teyro nabe****.*

Rabe, rûne bişikirîne.

Ji halê xwe memnûn be, şikir bike. **Min ji te re got,* ***rabe, rûne bişikirîne****. Heke wê ev firsenda neda te, gelo niha tu di kîjan qulikê de diriziyayî?*

Rabûn hev

Ji bo şer hewl dan. **Qet tiştek di navberê de tune bû, hema ji nişka ve Misto û Evdal* ***rabûne hev****.*

Rabûn ser piyan

1. Li hember dijmin û neyaran serî hildan. **2.** Ji nexweşiyê xelas bûn. **Ew ji bo ewladên xwe* ***rabûn ser piyan****. *Piştî du meh razanan li nav ciyan bi şûn de, Simko* ***rabû ser piyan****.*

Rabûn rûyê (yekî)

Li hemberî mezinekî xwe, bêterbiyetî kirin. **Bi rastî jî Celîl xwe şaş kiriye, di dawiyê de* ***rabû rûyê bavê xwe*** *jî.*

Rabûn ser şekan

Ji bo karekî vehindirîna ser xwe. **Serhat êdî ji bo dersan* ***rabûye şek****, bawer im ku wê pêk bîne. (di mînakê de peyva "ser" nîn e.)*

Radibe hût e, rûdine kût e.

Dema ku dike, baş pêk tîne, lê ku rûdine jî qet nalive. **Keleşê Cevdo, mirovekî ecêb e.* ***Radibe hût e, rûdinê kût e.***

Radorî (yekî) ketin

1. Yek aciz kirin, belaya xwe ji yekî venekirin. **2.** Bi yekî tiranê xwe kirin. **3.** Ji bo hewldana jin an jî mêrên ku di daxwaza zayendî dikin tê gotin. **Lawê Zekî yê mezin di dibistanê de tim* ***radorî lawê min î piçûk dikeve****. *Çima ku Xelîl xolî dibe, Şefîq jî tim* ***radorî wî dikeve****. *Ew bênamûs tim* ***radorî keçikên taxê dikeve****.*

Raket ro germ e, rabû ro serm e.
Ji bo kesên teral tê bikaranîn. **Heke tu bi ya wî pirs bikî, azîna wî wiha ye:* ***Raket ro germ e, rabû ro serm e.***

Rakirin helanan
Hadandin, ji bo kirina tiştekî kelîj dayîn ser kesekî. **Dildar li cihê sekinî lawê xwe* ***rakire helanan*** *û bi ser Şîno de şand.*

Rast gerîn
Pêk hatin, qewimîn, ya ku qal dibe rast derketin. **Wî wisa dixwest, Xwedê jî hema wekî gotina wî* ***rast gerand****.*

Rast û çep lê xistin
Bi têkûzî pêkneanîn, sererast nekirin. **Wî* ***rast û çep lê xist****, lê sererast jî nekir.*

Rast û çep tune bûn
bnr. Heke peke tune bûn

Rast û çepê xwe nas nekirin (nezanîn)
Jîr nebûn, hesabê xwe nezanîn. **Keçê çawa ez bi hêviya wê ve bihêlim, ew hê* ***rast û çepê xwe nas nake****.*

Rast û çepê xwe şaş kirin
bnr. Riya mala xwe şaş kirin

Rast û çepê (yekî) kifş nebûn
Ji bo kesên bêdenge û bêîstikrar tê bikaranîn. **Bi wî qet bawer nebe,* ***rast û çepê wî kifş nabe****.*

Rast, xelas!
Kesên ku rast û durist bin, zêde tengasiyê nakişînin. ****Rast, xelas!*** *Heke ku Rojhilat berê a rastî bigota, ew qas zelumet jî nedikişand.*

Rasta salox û sewal tune, xwara belaya xwe bibînin.
bnr. Padişahê min, tu di riya heq de here, xerab dê ji Xwedê bibînîn. **(* bnr. çîrok)**

Rastan rast, xeraban xerab!
A rasteqînî çi be, tenê ew. **Li ba me sextekarî tune.* ***Rastan rast, xeraban xerab.***

Rastiyê pere nekirin
Rastî nepejirandin. **Tu qala rastiyê dikî, lê li bal wan* ***rastî pere nake****.*

Rastiyê xuya kirin
bnr. Bi ser avê ketin

Rastî dîtin
Rasteqînî fêm kirin. **Şehabedîn heta ya* ***rastî dît****, gelek bedel dan.*

Razana te hebe, rabûna te tune be!
*Înşelah razana te hebe, lê rabûna te tune be! (nifir)

Refes avêtin
Nexwestin, xolî bûn, têkilî sar kirin. **Berê navbera wan pir xweş dihat xuyan, lê di vê dawiyê de keçik **refesan diavêje** wî.*

Rehet nesekinîn
1. Bi karên xeter re, bi şer û belayê re mijûl bûn. **2.** Di hêla zayendî de dest û pê nesekinîn. **Ev biraziyê min **rehet nasekine**, wê rojekê me hemûyan jî têxe demana xwe. *Zavayê Cemîleyê **rehet nasekine**, heke dest neavêje baltûz (diş) xwe jî baş e.*

Rehetiya xwe xera nekirin
Ji bo karên pêwîst jî xwe aciz nekirin. **Dinya xera bibe jî, ew **rehetiya xwe xera nake**.*

Rehetî nedan (yekî)
Yek aciz kirin, hizûr nedan. **Wî bêbavî di wê malê de tu car **rehetî neda min**.*

Rehetî xera bûn
bnr: Rehetiya (yekî) revîn

Rehm ketin dilê (yekî)
Însaf û merhemet kirin. **Ji Xwedê re îsal **rehm ketiye dilê Smayîl**, naxwe rewş dê xerabtir bûya.*

Rehme lê anîn
Ji bo yekî mirî tiştên baş gotin. **Kifş e mirovekî baş bûye ku her kes **rehme lê tîne**.*

Rehmet lê xwendin
bnr: Rehme lê anîn

Rende lê ketin
Perwerde bûn. **Tu metirse, keçik ew qas jî cahil û nezan nîn e, hinekî **rende lê ketiye**.*

Reng avêtin
1. Ji ber tirs, tatêl an jî tiştekî din rewş guherîn. **2.** Ji nişkê ve rewşa tenduristî xera bûn. **Çawa ku qala Faysal bû, Rewşenê ji tirsan **reng avêt**. *Piştî ku Cemal ew xwarin hema ji nişka ve **reng avêt**.*

Rengê ... guherîn
Rewş cuda bûn. **Heke **rengê wê bûyerê wer neguheriya**, te bidîta dê çi bibûya.*

Rengê (yekî) guherîn
Ji ber tiştekî fedî kirin, xiroş bûn an jî tirsîn. **Çawa ku mamoste ew name ji çenteyê xwe derxist, **rengê Qiyas guherî**.*

Reng jê çûn
bnr: Reng avêtin

Reng lê neman
bnr: Reng avêtin

Reng qelibîn
bnr: Reng ... guherîn

Reng rengê mêşê ye, deng dengê gamêşê ye.
bnr: Qam qama mêşan e, deng dengê gamêşan e.

Reng û rû çilmisîn
bnr: Reng û rû pê ve neman

Reng û rû çûn
bnr: Reng û rû pê ve neman

Reng û rû miçiqîn
bnr: Reng û rû pê ve neman

Reng û rû pê ve neman
1. Jar û lawaz bûn. **2.** Ji tirsan reng guherîn. **Vê nexweşiyê wisa kir ku,* ***reng û rû bi Selîm ve nema.*** **Bi dengê tivingê re,* ***reng û rû bi Kubarê ve nema.***

Reng û rûyê (yekî) qirqisîn
Ji bo kesên jar, moralxerab û negeş tê gotin. ****Reng û rûyê Rewşenê wisa qirqisîbû*** *ku te digot dinya bi ser de tep bûye.*

Reng û rûçik (lê) hatin
Rewşa tenduristî xweş bûn. **Hingî hatiye mala we,* ***reng û rûçik li Nazenînê hatiye.***

Rengê (yekî) xerab bûn
Moral xera bûn, rûçik guherîn, ketina tatêlê. **"Wê çaxê* ***rengê Yaser xerab bû****, rûçikê wî zer bû."* Kerem Soylu

Reng zer bûn
bnr: Reng avêtin

Rengê miriyan pê ketin
bnr: Reng û rû pê ve neman

Rengizkotî
Ji bo kesên rûtal û sikûmreş tê bikaranîn. **Kuro, tu bi wê ya* ***rengizkotî*** *re çawa dijî?*

Rengiz xerab bûn
bnr: Reng û rû pê ve neman

Rengizê (yekî) xweş bûn
Ji hêla tenduristiyê ve rewş baş bûn, moral xweş û geş bûn. **Li gorî berê, maşelalı van rojan* ***rengizê Rewşenê xweş bûye.***

Rengizê xwe tal kirin
bnr. Rûyê xwe tirş kirin

Rengizê xwe xera kirin
bnr. Rûyê xwe tirş kirin

Req ketine avê, xwe dane ber tavê.
Xwe ji tiştên xeter dûr girtin û li kêfa xwe nêrîn. **Ji wan re çi, bextewar li serê wan be, req ketine avê, xwe dane ber tavê.*

Req û rût bûn
Tu tiştek tune bûn, feqîr û xizan bûn. **"**Req û rût û birçî bûn** / Bêerd û bêxanî bûn."* Firat Cewerî

Reqereq kirin
Dengê reqîniyê jê derketin. **Heke wî wisa **reqereq nekira**, em şiyar nedibûn.*

Reqînî jê anîn
Dengê reqînî jê derxistin. **Rêber bi destên xwe **reqînî ji deriyê wî anî**.*

Reqînî jê hatin
bnr. Reqereq kirin

Resen û pesen bûn
Pir meqbûl û binirx bûn. **"Tebîreke wî hebû, eynî wiha digot: 'Ev gel ji dewra eshaban de gelekî **resen û pesen e**.'"* Mele Silêman Şoreş

Reş bi reş keniya, reş çû bi eletewş keniya.
Her kes li yê ji xwe xerabtir dinêre û rehet dibe. **Ji bo aramiyê rê gelek in. **Reş bi reş keniya, reş çû bi eletewş keniya.***

Reş e, reş e, qawik e jî.
Ji bilî wê neyîniyê ya hê xerabtir jî heye. **Kuro, min ew qas jî nizanibû, **reş e, reş e, qawik e jî**.*

Reş e weke qîrê, rast e weke tîrê.
Her du alî jî tund û dijwar in. ****Reş e weke qîrê, rast e weke tîrê.** Min çiqas daxwaz kir jî tiştekî bi asahî rastî min nehat.*

Reş e, mewija xweş e.
Keçên qemer, şirîntir in. **Reşbûna wê ji bo min hê baştir e. **Reş e, mewija xweş e.***

Reş girê dan
Ji ber mirin an jî tiştekî pir xemgîn kincên reş li xwe kirin û xemgîniya xwe nîşan dan. **Ji bo serokên xwe wan mehekê **reş girê dan**.*

Reş û beş bûn
Pir kifş bûn. **Em **reş û beş in**, herin ku derê kifş in.*

Reş û hêşîn bûn (Reşhêşîn bûn)
Pir bi şermiyê ketin. **Piştî wan gotinên Mistoyê apê wê, Zerîcan* ***reş û hêşîn bû****.*

Reş û hêşîn kirin
1. Bi şermiyê xistin. **2.** Bi awayekî zêde li yekî xistin. **Cewdet ew qas hêvî nedikir, Rizgar ew bi gotinên xwe* ***reş û hêşîn kir****. *Rizgar û Gebar wisa li Zubêd xistine ku* ***reş û hêşîn kirine****.*

Reş û rût bûn
bnr. Qûntazî bûn

Reş û spî ji hev qetandin
bnr. Qûna reş û spî ji hev kifş kirin

Reşê tu li vir bisekine, ez ê li gewran bigerim; ku min gewr nedîtin tu dîsa reşa min î.
bnr. Koro li vir be ez ê bigerim, heke min ji korê xwe çêtir dît baş e, hey ne, ez ê li korê xwe vegerim.

Revî revî ji dest xelas bûn
Zor ji xeteriyekê xelas bûn. **Bahadîn* ***revî revî ji destê Mehemed xelas bû****.*

Rewan e, serê malê yek nan e.
Dema ji yekê zêdetir par nakeve bi awayekî tirane tê gotin. **Na heyran, qet li qusûrê menêre, zêde tune.* ***Rewan e, serê malê yek nan e.*** (qerf)

Rewş bi rewş kenî, beş çû li newala tewş kenî.
Ji bo rewşa berevajî tê bikaranîn. **Ew jî serbarê ser bû.* ***Rewş bi rewş kenî, beş çû li newala tewş kenî.***

Rewşo mewşo axaftin
Gotinên bêrê kirin. **Cimo xwe şaş kiriye,* ***rewşo mewşo diaxive****.*

Rextê bêfîşek dan milên xwe
Bi karên vala re mijûl bûn. *****Rextê bêfîşek daye milên xwe****, hema tenê xwe dixapîne.*

Rez baş bû, teyrok jî lê hat.
Jixwe reş xerabe bû, vêca bi vê derbê jî, hê xerabtir bû. **Maşelah teze serî girt,* ***rez baş bû, teyrokê jî lê xist****.* (qerf)

Rezîl û riswa bûn
Ketin rewşek fedîkarî. **"Heger em heywanekî tenê bigirin, em ê ji edetên mezinên xwe derkevin û* ***rezîl û riswa bibin****."* Feqî Huseyn Sağnıç

Rezîl û riswa kirin
Xistin rewşeke fedîkar û zor. **Hema li cihê sekinî Yektayê Rewşen* ***rezîl û riswa kir****.*

Rezîltayî derxistin

Xilaport û pirsgirêk derxistin. *Erê, Zezê wisa bêdeng tê xuyan, lê hela we bidîta li wir **rezîltayiyeke çawa derxist**.

Rê li (yekî) birîn

Astengî derxistin, li pêş sekinîn. *Kengê ku min hewl da ez tiştekî bikim, wan **rê li min birîn**.

Rê dan

1. Destûr dan. **2.** Ji kar derxistin, berî yekî dan. *Heke bavê wî bizanibûya **rê nedida** Hesen tiştekî wer bike. *Patron vê mehê jî **rê da** sê karkêran.

Rê dayîn ber xwe

1. Ji bo plan û bernameyekê biryar girtin. **2.** Ji bo çûyînê xwe amade kirin. *Bêrîvanê **rêya bernameyeke din da ber xwe**. *"Wan pir **rê didan ber xwe** / Da ku bibin serbixwe." Firat Cewerî

Rê dayîn ber (yekî)

Aqil hînî yekî kirin, ji bo çareseriyê rêbazî hînî hinekên din kirin. *Heke Rozerê ew **rê nedaba ber wê**, ew ê ew biryar nedigirt.

Rê derxistin

Bi rê beled bûn. *"Piştre bi dengekî hêrsok, digel ferzaneyeke quretî mirmirî: Ger xayîn û cehş rêberiyê nekin, leşker nikarin **rê derxin**." Edîp Polat

Rê dîtin

Rêbaz û çareserî pêk anîn. *"Gişkan jî zanibû, wekî wiha here, kurikê ji destê wan here û her yekî dixwest ji aliyê xwe de **rêyekê bibînin**. Tosinê Reşît

Rê dûr e, keser kûr e.

Rewş xirab û girîng e. *Kes zêde nikare tiştekî bibêje; **rê dûr e, keser kûr e.**

Rê hînî dizan kirin

Ji bo kesên ku alîkariya wan dibe sedema neyîniyan tê bikaranîn. *Malavawo, tu çi dikî? Tu bi wî awayî tenê **rê hînî dizan dikî**.

Rê tê (jê) re çûn

1. Jê re çareserî peyde bûn. **2.** Bûn mijara axaftinan. *Tu qet meraqan meke, gotina ku dibêjin **rêyeke jê re here**. *Ku ew qas bi nav û deng be, helbet dê gelek **rê tê re biçin**.

Rê jê narê.

Ji bo kesên pir baş û pêkhatî û bêqisûr tê gotin. *Dozdar keçek wisan e, ku **rê jê narê**.

Rê jê re hiştin

Hinek vebijark dan ber, rê tam li ber nebirîn. *Wê dîsa jî **rê jê re hişt**, êdî ew dizane.

Rê jê re vebûn

Ji pirsgirêkan re çareserî dîtin, derfet pêk anîn. *"Van hemû şîretan lê bike û bila **rê jê re vekirî be**." Husein Muhammed

Rê jê standin

1. Dora yekî jê girtin. **2.** Asteng kirin. **Zerîfa reben ew qas dem ket dora bijişk, Serdayê hat bi fêlbazî* ***rê jê stend*** *û ket pêşiyê. *Baro di dawiyê de* ***rê jê stand*** *û ew mecbûr kir ku dest ber xwe hilde.*

Rê ji xwe re vekirin

Bi hinek helwestan ji xwe re derfet amade kirin. **Wî bi wê xelatê* ***rê ji xwe re vekir*** *ku here mala wan.*

Rê kirin riya avê

Tim lê çûn û hatin. **Ji ber ku hezkiriya wî li vê taxê ye, Misto ev* ***rê kiriye riya avê****.*

Rê lê birîn

1. Astengî jê re derxistin. **2.** Li hemberî yekî mafdar derketin. **Ev her roj* ***rê li min dibirin****, êdî ez nikarim li ber xwe bidim. *Reşat çi got Nesîmî* ***rê li ber birî****.*

Rê lê şaş kirin

Di nav rewşeke zor de hiştin. **Şikak wisa kiribû ku* ***rê li Cegerxwîn şaş kiribû****.*

Rê lê girtin

bnr. Rê lê birîn

Rê li ber dirêj bûn

Kar lê zor hatin. **Yargul çiqasî aciz dibû,* ***rê jî li ber dirêj dibû****.*

Rê li ber (yekî) dirêj kirin

Kar jê re dijwar kirin. **Wan bi zanetî* ***rê li ber me dirêj kirin****.*

Rê li ber girtin

Jê re astengî derxistin. **"...em hev du pîs dikin, yekê ku pêş de here em* ***rê li ber wî digirin****."* Süleyman Çevik

Rê li ber vebûn

Ji bo encamgirtinê jê re alîkarî kirin. **"...ewrekî spî/çîl û qerqaş xwe diavêje ser asîmanên mirovahiyê û* ***rê li ber evîniyê, rê li ber azadiyê û afirandinê vedibe****."* M. Zahîr Kayan

Rê li ber winda bûn

bnr. Riya xwe şaş kirin

Rê li ber xistin

Ji bo çareseriya derd û pirsgirêkan rê û rêbaz hînî yekî kirin. **Heke Zerîfe Xanimê* ***rê li ber wê nexista****, dîsa jî wê nikaribû pêk bianiya.*

Rê li derekê xistin

Bi zanetî çûna derekê. Mingot hemi ez nêzîk bûme, hema riya xwe carekê jî li mala xalê xwe xim.

Rê li pêş xistin
bnr: Rê li ber xistin

Rê nedan
Ji bo pêkanîna tiştekî astengî derxistin, nehiştin. **Dibe ku şerekî mezin biqewimiya, lê mamosteyê gund **rê neda** ku ew li hev bikevin.*

Rê nîşanî (yekî) dan
Ji kesekî re alîkariya raman û ponijandinê kirin. **"Tekoşîna dayîkên Arjantînê bawerî da dayîkên me, **rê nîşanî wan da**..."* Samî Tan

Rê pê ketin
Her dem ji bo çûnê destdayî (musaît) bûn. **Mala wî ne li serê çiyê ye, her dem **rê pê dikeve**.*

Rê tê re derxistin
Çareseriyek dîtin. **Ez ketibûm rewşeke wisa ku min nikaribû **rêyekê ji wê pirsgirêkê re derxista**.*

Rê tê re nedîtin
Çareyek an jî firsendek bi dest nexistin. **Heke **rê tê re bidîta**, Xwedê dizane xwîşka xwe nedida Fêris.*

Rê û dirb nîşanî (yekî) dan
Rêveberî kirin. **Yê ku **rê û dirban nîşanî wan dide** jî Siloyê Heydo ye.*

Rê û dirb zane bûn
Zana, rêber û pispor bûn. **Hûn qet meraq nekin, ew ne mirovekî hindik e, ew **rê û dirban dizane**, ew me rûreş dernaxe.*

Rê û rêbar lê teng kirin
Xistin rewşeke dijwar. **Şefiq wisa bi ser wê de çû ku **rê û rêbar lê teng kirin**.*

Rê û tore zane bûn
bnr: Rê û dirb zane bûn

Rê û rêzikê ... zane bûn
Li gorî edet, tore û zagonê tev gerîn. **Ew ne mirovekî wer nedîtî û bêtore ye, **rê û rêzikên eşîrê baş dizane**.*

Rê ve, pê ve
Karê li ser rê, ji bo karê ne miqîmî. **Karê **rê ve, pê ve** jî ancax ew qasî têkûz dibe.*

Rêbiro, kurpiro
1. Yên ku zilmê dikin Xwedê hê derfetên zêde dide wan. **2.** Yên ku hêza wan zêde ne, dikarin zilm û neheqiyê bikin. ***Rêbiro, kurpiro.** Ez qurbana Xwedê me, Çeto çiqas zilmê dike, Xwedê jî ew qas didê. **Ew qas lawên min hebûna min ê jî wer bikira, çi gotine: **"Rêbiro, kurpiro."***

Rêç rêça kera cun e, sûc sûcên bûka nû ne.
bnr. Sim sima kerê ye, fêl fêlê Perê ye. (*bnr. çîrok)

Rêwîtî xweş tişt e, lê çirteçirt li pişt e.
Tiştên xweş, hin bedelan jî dixwazin. ***Rêwîtî xweş tişt e, lê çirteçirt li pişt e.** Belê karekî xweş e, lê rizîkoya wê jî zehf zêde ye.*

Rêwiyo carekê hatî rehme li te be; du caran hatî li rehme te be, cara sisiyan, gû di gora te be.
Di heman derbarê de xeta û çewtî carekê yan jî du caran asahî ye, lê ku zêde bibe ew nayê bexişandin. *Carek du car bûya ne xem bû. Got: ***"Rêwiyo, carekê hatî rehme li te be; du caran hatî li rehme te be, cara sisiyan, gû di gora te be."***

Rêx xwarin
Xeta kirin. *Ew jî hê piçûk e, ***rêxek xwariye**, tu mezinî, divê tu bibexşînî.*

Rêxek belav nekirin
Tiştek pêk neanîn, ji dêst tiştek nehatin. *Tu li wan gotinên wî, gefxwarina wî menêre, ew qet nikare ***rêxekê jî belav bike**.*

Rêxwazî bûn
1. Ji bo kesên cahil, dînik û nezan tê gotin. **2.** Ji bo heywanên, emelbûyî tê gotin. *Ew gedeyek ***rêxwazî ye**, tu wî çi dihesibînî? *Çêleka me ya sor ev çend roj in ku ***rêxwazî bûye**.* (argo)

Rih dirêj, dil qirêj bûn
Bi xwe di dilqê oldar û başan de bûn, lê di dil de jî xayînî û xerabî sêwirîn. *Tu wisa li şaşika wî ya kesk û riha wî ya dirêj menêre, ew ***yekî rih dirêj û dil qirêj e**.*

Rih li aşê spî kirin (nekirin)
bnr. Porê xwe di aşê Mîrze de spî kirin

Rihê (yekî) pê re kişîn
Zehf jê aciz bûn, ji destê yekî eziyet kişandin. *"Bavê min jî digot ez nahêlim, lê ez û diya xwe bi lavan, bi ricayan hatinê, bi qurban, bi heyran, heta ew qayîl bû. ***Rihê me pê re kişiya.**"* Sîma Semend

Rih û îmana xwe di ber ... de qetandin
Ji bo tiştekî gelekî hewl dan. *Fêrisê reben ***rih û îmana xwe di ber de qetand**, lê bi tiştekî jî nehate hesibandin.*

Rihê xwe diqusîne, dû re eynikê tîne.
Ji bo karên çiloçepî tê gotin. *Jixwe ew jî yekî çiloçepî ye. ***Rihê xwe diqusîne, dû re eynikê tîne.***

Rihe xwe xelas kirin
Xwe ji xeteriyekê rizgar kirin. *"Yanê aliyek direviya ku ***rihê xwe xelas bike**, aliyek jî dihezî ku zikê xwe têr bike."* Zeynelabidîn Zinar

Rihet rûniştin
Çalak nebûn, zêde neshî kirin. *Baş e ku di dema wê axaftinê de Rêzan ***rihet rûnişt***.

Rihê (yekî) ketin serê poz
Gelekî jar bûn. *Qudret wisa bûye ku, ***rihê wê ketiye serê poz***.

Rihê (yekî) pere bûn
Pir temahkar û xesîs bûn. ****Rihê Ferzende pere ye****, ew tenê li pereyan difikire.*

Rik jê çûn
bnr: Îlet jê çûn

Rik kutan (yekî)
bnr: Kîn kirin (yekî)

Rik lê girê dan
bnr: Kîn kirin (yekî)

Rika xwe kutan hev
Ji hev û din re dijminayî kirin. *Herduyan ***rika xwe kutan hev****, kes nikare wan li hev bîne.*

Rim li tûr hilnehatin
Êdî derew û sextekarî wisa zêde bûye ku nayê veşartin. *Rewş hate wê radeyê ku ***rim li tûr hilnayê***.

Rinda li ber çira bûn
Bedewa sexte bûn. *Min ji te re got, bi wê bawer nebe, ew ***rinda li ber çira ye***.

Rindî rindî, geroka li nava gundî (Rind e, geroka li nava gund e.)
Baş e lê kêmasiyeke wê heye. *Erê Zelal ***rind e, lê geroka li nava gund e***.

Ringînî jê anîn
Bandoreke mezin lê kirin. *Li hemberî bêperdetiya wî Gemşo ***ringiniyeke wisa jê anî*** *ku her kes zivirî li wan nihêrî.*

Risqê (yekî) qut bûn
Nesîbê yekî qut bûn. *Êdî ***risqê min li vî welatî qut bû***.

Rişkên (yekî) bûtik bûn
Rewşa yekî ya aborî xweş bûn, ji ber wê jî bitrî bûn. *Bi awayekî vekirî dixuye ku ***rişkên Fatimê bûtik bûne***.

Rişk fetiqîn
bnr: Rişkên (yekî) bûtik bûn

Rişkê (yekî) bûne spî (speh)
Rewşa yekî zêdetir jî ya aborî pêş ve çûn, hal xweş bûn. *Êdî ev çend sal in ku, ***rişkên Bekirê Cindî bûne spî***.

Riya (yekî) bi ... ketin
Ji bêgavî çûn derekê. **Min hêvî nedikir ku van deran bibînim, lê* ***riya min bi wan deran jî ket.***

Riya çar rojan jê revîn
1. Tirsîn. **2.** Jê nefret kirin, bîz jê çûn. **Piştî wê lêdana ku wî xwar li ku Fewzî bibîne,* ***riya çar rojan jê direve.*** **Qala wê nekin, ji ber zimanê wê ez* ***riya çar rojan jê direvîm.***

Riya deriyekî kirin çirik
Zêde çûn û hatina derekê. **Mirov ku* ***riya deriyekî kire çirik,*** *ne elemetê xêrê ye.*

Riya ku tu yê biçî, ez jê zivirîme.
bnr. Ew riya ku tu yê heriyê, ez jê têm.

Riya mala xwe şaş kirin
Ketin nav rewşeke pir dijwar. **Fêris wisa kir ku Celal* ***riya mala xwe şaş kir.***

Riya malê dan (yekî)
Ji bo hatina malê destûra yekî dan. **Hêrsa apê min ancax piştî du salan danî û dû re* ***riya malê da zavayê xwe.***

Riya mala xwe vekirin
bnr. Riya malê dan (yekî)

Riya rast bernedan
Dev ji heqî û rasteqîniyê bernedan. **Wan çiqas tedayî pê kirin jî, wî* ***riya rast berneda.***

Riya rast dan ber
bnr. Riya rast li ber (yekî) xistin

Riya rast dîtin
bnr. Hatin ser riya heq

Riya rast li ber (yekî) xistin
Ji bo tiştên erênî şîret û qewêtî kirin. **Ez bi Serhat bawer im, dizanim ku ew her tim* ***riya rast li ber lawê min dixe.***

Riya revê tune bûn
Bêçare û bêgav bûn. **Bernayê jî wisa nedixwest, lê ji bo wê tu* ***riya revê tune bû,*** *ji bêgavî ew yek pejirand.*

Riya rêwiyan vekirî ye.
Ji bo kesên ku naxwazin mêvanan bihebînin tê bikaranîn. **Ez fêm dikim ku tu dibêjî:* ***"Riya rêwiyan vekirî ye."*** *Lê jixwe ez jî namînim.* (bnr. çîrok)

"Riya rêwiyan vekirî ye."
Wekî ku tê zanîn, li hêla Serhedê zivistan pir dirêj û dijwar derbas dibin. Ji ber ku berê erebe tune bûn, rêwîtiyan car caran bi rojan dikişand. Li vê hêlê rêwiyekî ji ber ku hewa pir sar dibe, li malekê dibe mêvan. Çend roj derbas dibin lê hewa xweş

Riya (yekî) ronî kirin

Di hêla fikir û ramanê de alîkarî kirin. **Xwedê jê razî be Zeynebê di wê derbarê de **riya min ronî kir**.*

Riya vegerê tune bûn

Ji bêgavî berdewam kirin. **"Ev yek jî wan zêdetir tengav dike. Ji hêzên olîgarşîk re **riya vegerê nîn e**."* Samî Berbang

Riya xwar û rast ji hev veqetandin

A baş û xerab zane bûn. **Yûsiv ne zarok e, dikare **riya xwar û rast ji hev veqetîne**.*

Riya xwe dîtin

Ji bo kêşeya xwe azîne û çare kifş kirin. **"... bi fanosa wê Quranê **riya xwe dibîne** û medeniyeta xwe bi pêş ve dibe."* Mela Seîd

Riya xwe girtin

1. Dest bi çûna derekê kirin. **2.** Di derbarekê de azîneyeke statîk pêk anîn. **Lê mêze kir ku Tefîq Beg tu xwînê ji xwe bernade, riya xwe girt û çû. *Êdî dev ji wî berdin, mêrikî **riya xwe girtiye** û karê xwe bi wî awayî dimeşîne.*

Riya xwe guherandin

1. Azîn û ramana xwe guherandin. **2.** Daxwaznekirina dîtina yekî. **Serbaz Harûn jî berê nijadperest bû, lê dû re **riya xwe guherand** û bû şervanê azadiyê. *Dilgeş dema ku zavayê xwe dibîne **riya xwe diguherîne**.*

Riya xwe pê xistin

Serî lê dan, serdana yekî kirin. **Jixwe ez ji wir re derbas dibûm, min riya xwe **bi mala qîzxaltiya xwe jî xist**.*

Riya xwe rast kirin

bnr: Riya xwe dîtin

Riya xwe şaş kirin

1. Di nav çewtî û kêmasiyekê de bûn. **2.** Ji ber zor û bandorekê xwe şaş kirin. **Her kes dibêje ku Kazim **riya xwe şaş kiriye**. *Evînê wisa kir ku Xalid **riya xwe şaş kir**.*

Riya xwe vejibartin

Biryara xwe dan, rewşa xwe zelal kirin. **Piştî van bûyeran, divê êdî em jî **riya xwe vejibêrin**.*

Riya xwe winda kirin

bnr: Riya xwe şaş kirin

---

nabe. Xwediyê malê, yê ku jixwe ji mêvanan zêde hez nake, ji mayîna wî mêvanî jî pir aciz dibe. Dîsa sibehekê dema ku xwediyê malê derdikeve derve, mêvan jê dipirse:

"Rewşa hewşê çet çawa ye?" Xwediyê malê, bêyî ku bifikire yan jî ya rastî bîne ber çavê xwe, hema zû wî dibersivîne: *"Riya rêwiyan vekirî ye."*

Riya Xwedê lê birîn
bnr. Riya Xwedê jê stendin

Riya Xwedê jê stendin
Bi her awayî mafdar bûn. **Kawê çiqasî fêlfistikî jî kirin, Xezalê her tim* ***riya Xwedê jê stend****.*

Riyek dayîn ber xwe
Bi azîn û rêbazekê, bi plan û pêşnûmeyekê meşîn. **Wan jî li gorî xwe* ***riyek dane ber xwe****, înşalah dê niyaser bibin.*

Riyek dîtin
Çareseriyek dîtin. **Me* ***riyek dîtiye****, înşelah em ê vê carê bi ser bikevin.*

Riyê xwe di aşê Mîrzo de spî kirin
Ji dinyayê tiştek fem nekirin. **Erê, ew jî rûspî ye, lê wer tê xuyan ku wî* ***riyê xwe di aşê Mîrzo de spî kiriye****.*

Rîtin û reşandin
Gelekî hêrs bûn û xeberên nebaş gotin. **Çima ku zarokên wan li lawê wê xistibûn, Guharê ji malbata Remo re* ***rî û reşand****.*

Ro bi ro, xwezî bi do.
Duh ji îro çêtir e. **Me got ev ê ku nû hatiye, ji me ye û dê baştir be, lê* ***ro bi ro, xwezî bi do****.*

Ro çû ava, şivan û gavan bûn zava.
Ji ber ku karê şivan û gavanan piştî ro diçe ava diqede, ji bo wan ew dem girîng û xweştir e. **Êdî dema bêhnvedanê ye,* ***ro çû ava, şivan û gavan bûn zava****.*

Ro çû, bû fîtara qîzan.
Qîz di malan de gelek zehmetî dikişînin. **Xwedê alîkarê qîzan be,* ***ro çû, bû fitara qîzan****.*

Ro li me bû dereng.
bnr. Ro li me çû ava.

Ro li me bû êvar.
bnr. Ro li me çû ava.

Ro li me bû şev.
bnr. Ro li me çû ava.

Ro li me çû ava.
Dem dereng man. **Hevalno, hinekî zû bilivin, hûn nabînin, wa ye* ***ro li me çû ava****?*

Ro li me bû esir.
bnr. Ro li me çû ava.

Ro li me tarî bû.
bnr. Ro li me çû ava.

Ro li qametê esrê bûn
Dema piştî nîvro û ber bi esrê ve bûn. **Dema ku wan dest pê kir in,* ***ro li qametê esrê bû.***

Ro li taştiyan bûn
Serê sibehê bûn. **"Hingê* ***ro li taştiyan bû.*** *Wexta çûyînê hatibû. Ji zarokan pê ve tu kes ranezabû û her kes li meydana gund bû."* Mehmed Uzun

Ro rehn bûn
bnr. Ro zer bûn

Ro zer bûn
Ronayî bûn, serê sibehê bûn. (Carinan ji bo dema berî mexrebê jî tê gotin.) **Zêde ne zû ye, ma tu nabînî wa ye* ***ro zer bûye?***

Roj bû sal, kebanî bû beqal.
Ji ber ku di rojên dirêj de kar hê zêdetir dibin, eziyeta kebaniyan jî zêdetir dibe. ****Roj bû sal, kebanî bû beqal.*** *Rojên dirêj ji bo kebaniyan zortir in.*

Roj bûne sal, zik bûne çuwal.
Di rojên dirêj de xwarin hê zêdetir tê xwarin. ****Roj bûne sal, zik bûne çuwal.*** *Kuro ez êdî nikarim xwarinê bi van re bigihînim.*

Roj di zerahiyan de bûn
bnr. Ro zer bûn

Roj dûman e, kêfa guran e.
Rojên ku mij û dûman û nezelal bin, ji bo kesên ziyankar derfet dertên. ****Roj dûman e, kêfa guran e.*** *Divê em îro li ser xwe baldar bin.*

Roja xweş nedîtin
Jiyaneke baş û geş derbas nekirin. **Jixwe ew yeke bedûm bû, loma* ***rojeke xweş jî nedît.***

Roj hatiye delavan, maye dewê xeraban.
Çiqas dem derbas be jî karên teralan nagihîjin encamê. **Ew jî ji bo ew ê sist encameke xwezahî ye,* ***roj hatiye delavan, maye dewê xeraban.***

Roj hilat, mirina gavan û şivan(an) hat.
Ji ber ku karê şivan û gavanan, di şefeqê de dest pê dike, ew dem ji bo wan zor e. ****Roj hilat, mirina gavan û şivan hat.*** *Jiyan ne hêsan e, her karek çetinayeke wê heye.*

Roj kirin şev
Ji bo kesên teral tê gotin. **Camêrî tim radize, hema* ***roj kirine şev.***

Roj kirin xev
Şev û roj xebitîn. **Ew çi hixwazin mafdar in. Ya rastî wan* ***roj kirin xev*** *û ew kar birin serî.*

Roj lê bûn şev

Pêvajoyeke zor derbas kirin. *Wê çaxê **roj li min bûne şev**, tebata min nedihat.

Roj lê çep zivirîn
bnr. Roj li cihekî teng êvar bûn

Roj lê hatin nîvro
Bi derengiyê ketin. ***Roj lê hatiye nîvro**, hê ew ji xewê ranebûye.*

Roj li cihekî teng lê bûn êvar
Di demeke nebaş de û di nav rewşek xeter de bûn. *Bila ew here ji felekê re dua bike, wisa nedibû, lê **roj li cihekî teng li min bû êvar**.*

Roj li hikmê nîvro bûn
Ji bo dema nêzîkî nîvro tê gotin. *Wexta ku ew hat, **roj ketibû hikmê nîvro**.*

Roj xerab lê çûn ava
Karê me xerab bû. *Wekî her kesî min jî tiştekî din hêvî dikir, lê **ro xerab li min çû ava.***

Roj li xwe birin ava
Xwe bi derengiyê xistin. *Karê wî ew qas nedikişand, lê wî bi zanetî **roj li xwe bir ava**.*

Roj nedîtin
Jiyaneke baş nejîn. *Ne tenê îro, lê di jiyana xwe de wê tu **roj nedît**.*

Roj tewilandin
Ji bo kesên ku xurt in û zehf dixebitin tê bikaranîn. *Rehmetiyê bavê min wer xurt bû, wer dixebitî ku te digot **roj ditewiland**, karê dinyayekê dikir.*

Roj wekî şîmaqan derbas bûn
Ji bo rojên pir kin tê bikaranîn. *Di hepsê de jî **roj wekî şîmaqan derbas dibûn**.*

Roja heq û hesaban hatin
Roja qiyametê yan jî roja dadê hatin. *Kengê ku **roja heq û hesaban hat**, em ê wê rojê dest biavêjin pêsîra hev.*

Roja (yekî) reş û heş bûn
Rewş pir xerab bûn. *Înşalah **roja wê reş û heş be** ku pişta xwe rast neke.*

Roja ku gotin alha
Roja doz û tîkoşînê dest pê kir. *Îro ne xem e, lê **roja ku gotin alha**, ka wê rojê hûn ê çawa bikin?*

Roja mirin û mayînê bûn
Roja girîng bûn. *Şêrên min, li ber xwe bidin! Ev roj **roja mirin û mayînê ye**.*

Roja nehemîn
Ji bo tiştên ku dê qet pêk neyên tê bikaranîn. *Erê erê, mirovekî pir bibawer e lo (!), wê wan pereyên te **roja nehemîn** bide.* (qerf)

Roja xêr û gunehan
Roja hesab dayînê. **Tu wisa bike. Ka tu yê* ***roja xêr û gunehan*** *çawa bikî?*

Roja xêr û şeran
bnr. Roja xêr û gunehan

Roja (yekî) tarî kirin
Yek xistin rewşeke xerab. **"**Roja min tarî kir** û tofan li min rabû. Gule li serê evîna dilê min ket û mirada min di ber min de lişt."* Muhemmed Garsî

Rojê gûzek, bû dîzek.
Hindik hindik tê hev û zêde dibe. ****Rojê gûzek, bû dîzek.*** *Tenê tu kedê bide, bide ber hev, tu yê demekê bi şûn de bibînî ku çiqas zêde bûye.*

Rojê heft xesûyan dixeniqîne, bi şev ji qurquroneka derî ditirse.
bnr. Bi roj ji qulika misînan ditirse, êvarê kefenê miriyan datîne.

Rojek berî rojekê
Demek pêşdetir, gavek zûtir. **"Tu dizanî gelek kar li ser min heye û ez jî dixwazim* ***rojek berî rojekê*** *dergûşa te biqedînim."* Zinar Soran

Rojek rijiya, rojek pijiya û bihar qediya.
Geh baş, geh xerab dem derbas bûn. **Karê dinyayê ye,* ***rojek rijiya, rojek pijiya û bihar qediya****.*

Rojên giran derbas kirin
Rojên dijwar derbas kirin. **Di wan rojên ku keça wan tevlî refên gerîlayan bû de, wan* ***rojên pir giran derbas kirin****.*

Rojên xwe pê derbas kirin
Ji xwe re ji bo demderbaskirinê mijûl bûn. **Derdê wî ne ew bû, tenê wî* ***rojên xwe pê derbas dikirin****.*

Rojhilat û rojava, gû di devê zava
Çi dibe û li ku derê dibe bila bibe, yê sûckar, neheq û di ziyanê de dîsa zava ye. ****Rojhilat û rojava, gû di devê zava.*** *Wa ye dîsa bar kete stûyê zavayê min î reben.*

Rojiya bin teştê girtin
Rojî negirtin. **Na lo, Îso rojî girtiye, girtiye, lê* ***rojiya bin teştê girtiye****.* (qerf)

Rojiya xwe xwarin
Tawanek kirin, karekî ne li rê kirin. **Tu wisa li rast peyivandina wê menêre, wê jî di wê mijarê de* ***rojiya xwe xwariye****.*

Rojnîvro xewnerojk dîtin
Hay ji xwe tune bûn. Qala tiştên nebûyî kirin. **Ez ji te re çi bibêjim? Tu* ***rojnîvro xewnerojkan dibînî****.*

Rojreş bûn

Jiyan xerab bûn. **Jixwe ew yeke **rojreş bû**, tiştekî baş li vê dinê nedît.*

Rokê riziya, rokê qetiya, bihar qediya.

bnr: Rojek rijiya, rojek pijiya û bihar qediya.

Romî ne tişt e, lê xopana Enqereyê li pişt e.

bnr: Zoq ne tişt e, lê kevirê Hemo li pişt e.

Roniya çavan bûn

Li balê gelekî birûmet bûn. **Rast e, ez ji hemû zarokên xwe hez dikim lê Hozan **roniya çavan e**.*

Rondik barandin

Girîn. **Ji bo wê hevala xwe Xezalê wê rojê heya êvarê **rondik barandin**.*

Rovî kirine şahê mirîşkan gotiye: "Kenê min tê, aqilê min nabire."

bnr: Gotin rovî: "Me tu kirî mîrê mirîşkan." Got: "Ez ji siûda xwe ne bawer im."

Rovî naçe qulê, hejekî jî bi dûvikê xwe ve dike.

bnr: Rovî nediçû qulê, hejek jî bi boçika xwe ve girê dida.

Rovî naçe qulê, hejekê jî bi xwe re kaş dike.

bnr: Rovî nediçû qulê, hejek jî bi boçika xwe ve girê dida.

Rovî nediçû qulê, şeltekek strî jî bi bi dûvê xwe datanî.

bnr: Rovî nediçû qulê, hejek jî bi boçika xwe ve girê dida.

Rovî nediçû qulê, hejek jî bi boçika xwe ve girê dida.

Jixwe nikare karê xwe yê bingehîn pêk bîne, hê dike ku tiştinên din ên zêde jî bide ser. **Got, **rovî nediçû qulê, hejek jî bi dûvê xwe ve girê dida**. Nikare serê xwe xwedî bike, vêca çûye jineke bî tevlî du zarokan jî aniye.*

Rovî negihîştiye darê, gotiye kerik e.

bnr: Rovî têr e, tirî tirş e.

Rovî ji rê revî, rê ji rovî revî.

Her du alî jî ji hev û din tirsîn, ji hev û din fêm nekirin. ****Rovî ji rê revî, rê ji rovî revî.** Ez ji wî vedikişîm, ew jî ji min.*

Rovî têr e, tirî tirş e

Kesên ku pêdiviya wan tune bin, ji xwe re li hincetan digerin. **Erê lawo, ez quurbana Xwedê me, niha rewşa te baş e, wisa dibêjî. **Rovî têr e, tirî tirş e.***

Rovî tu çima xwe dihejînî? Got: "Li min tê û ji min tê."

Yên ku pêk tînin, bi xwe bawer in, serê wan bilind e. **Yên ku serkeftî ne, bişanaz in. **Rovî tu çima xwe dihejînî? Got: "Li min tê û ji min tê."***

Rovî û nava gund?!

Ji bo tiştên ne guncan tê bikaranîn. **Malavawo tiştekî wer bibêje ku bila aqilê mirov jê bibire.* ***Rovî û nava gund?!***

Rovî û seyran?!

bnr. Rovî û nav gund?!

Rovî û sûk?!

bnr. Rovî û nav gund?!

Roviyê newalan, bû xwediyê malan.

Ji bo kesên heqnekirî dibin xwediyê tiştekî tê gotin. **Hela tu li îşên Xwedê binêre,* ***roviyê newalan, bû xwediyê malan.***

Roviyê reş derketin pêşiya (yekî)

Înşelah* ***roviyê reş derkeve pêşiya te.* (nifir)

Roviyê şekalan, digere li dora malan.

Mirov bi çi pîşeyî re mijûl be, li gor wê tev digere. **Çima bi we ecêb tê? Ma hûn nizanin* ***roviyê şekalan, digere li dora malan?***

Rovî tu îşev cawê (qula) xwe bide min, ez ê sibê mirîşkekê bidim te.

Ji bo rewşa zor û di nav xeteriyê de tê bikaranîn. **Weleh Tefîq ketibû rewşeke wisa ku wî jî hema digot* ***rovî tu îşev cawê xwe bide min , ez ê sibe mirîşkekê bidim te.*** (bnr. çîrok)

Rozgara (yekî) reş bûn (Rozgar reş hatin)

Bêşans bûn. **Tam dê pişta xwe rast bikira, bi wê nexweşiyê* ***rozgara wî reş bû.***

Ruh bi qasî çivîkekê bûn

bnr. Ruhê çivîkekê tê de tune bûn

Ruh dayîn ...

Xweşik û dagirtî têkûz kirin. **"Yanê şairê ku nikaribe ziman têxe destê xwe, nikaribe* ***ruh bide wî zimanî*** *di vî şerî de bi ser nakeve..."* Jan Dost

Ruh hatin ber (yekî)

1. Şad bûn, kêfxweş bûn. **2.** Ji mirinê xelas bûn. **3.** Hinek goşt girtin û bi ser xwe de hatin. **Bi derketina kurê wê yê zindanê re* ***ruh hate ber Xaltîka Gevezê.*** **Me gişkan destê xwe jê şûştibû, lê du hefteyan bi şûn de* ***ruh hate ber Xidir.*** **Bi nêrîn û xwarinên bûka wî ya nû* ***ruh hate ber xalê Evdirehman.***

"Rovî tu îşev cawê (qula) xwe bide min, ez ê sibê mirîşkekê bidim te."

Rojekê dîsa leşkerê dewleta Romê bi ser gundekî hêla Çêwlikê de digirin. Wekî her car, dîsa mêrên gund direvin ku xwe veşêrin. Heya ku leşker ji gund herin. Di dema bazdanê de ji gundiyan zilamekî tirsonek xwe zor digihîjîne çiyayê hemberî gund. Li wir ji xwe re li cihekî yan jî qulekê digere ku xwe tê de veşêre. Dema ku ji xwe re li cihekî veşartinê digere mêze dike ku roviyek li ber qula xwe sekiniye, li wî dinêhêre. Zilam bi awayekî bêgunan û lavayî, bi hilkehilk û bi tatêl ji rovî re dibêje:

"Rovî tu îşev cawê (qula) xwe bide min, ez ê sibê mirîşkekê bidim te."

Ruh jê çûn
bnr: Ruh tê de neman

Ruh ji gewriyê kişandin
bnr: Ruh tê de neman

Ruh kişîn
bnr: Canê xwe teslîmî rehma Xwedê kirin

Ruh pê de hatin
bnr: Ruh hatin ber

Ruh tê de neman
1. Pir jar bûn. **2.** Giran nexweş ketin. **Wan derd û kulan wisa kir ku **ruh di Temarê de nema**. **Wê emeliyatê wer kir ku **ruh di Delîl de nema**.*

Ruh pê de hatin
1. Ji nexweşî yan jî jarbûnê xelas bûn. **2.** Ji tirs an jî xeteriyekê rizgar bûn. **Yekta hema li ber mirinê bû, lê wa ye hinekî **ruh pê de hatiye**. **Gumana xwe ji Xwedê birîbû, dema ku dît wa ye Rûşen hate hewara wî, **ruh pê de hat**.*

Ruhê çivîkekê tê de tune bûn
Pir jar, lawaz û bêhêz bûn. **Tu çi ji wê belengazê dixwazî? Jixwe **ruhê çivîkekê tê de tune ye**.*

Ruhê (yekî) di qûna (yekî) de bûn
Bi yekî ve gelekî girêdayî bûn, jê hez kirin. **Ka çawan e, **ruhê wê di qûna Serhat de ye**.*

Ruhê (yekî) hatin serê poz
1. Gelekî jar bûn. **2.** Zêde xemgîn bûn. **Wê nexweşiyê wisa kiriye ku **ruhê Mehmûd hatiye serê poz**. **"Wexta name derengî diketin, qudûmêd pîrka min dişkestin. **Ruhê wê dihate serê poz**. Çavê wê hema wisa li rê bû."* Emerîkê Serdar

Ruhê (yekî) kirîn
Ji kesekî re alîkarî û tiştekî pir kêrhatî kirin. **Lawo Xwedê ji te razî be, bi van mehsên ku te ji min re anîn, te rihê min kirî.*

Ruhê (yekî) qebz kirin
Canê yekî stendin, kuştin. (Ji bo canhildana Ezraîl tê gotin.) **Dibêjin Ezraîl **ruhê gunehkaran bi eziyet qebz dike**.*

Ruhê (yekî) qela kirin
Zilm û zext kirin. **"Min wisa kiribû, **ruhê wan şagirtan qela kiribû**."* Celîlê Celîl

Ruhê (yekî) standin
Yek gelekî aciz kirin. **Lawo tu çi ji min dixwazî? Te bi wan xerabiyên xwe **ruhê min stend**.*

Ruhê (yekî) teze bûn
Di jiyanê de radeyeke xweş dest pê kirin. **Misto hingî ew jina nû anî* ***ruhê wî teze bû.***

Ruhê (yekî) xwarin
Yek gelekî aciz kirin. **Heyran hûn çi ji min dixwazin? Bes e!.. Êdî we* ***ruhê min xwar.***

Ruhê xwe danîn ber çavê xwe
Xwe ji mirinê re amade kirin. **Ji bo wê dozê me* ***ruhê xwe danî ber çavê xwe.***

Ruhê xwe di ber (yekî) de dan
Ji bo kesekî yan jî dozekê xwe feda kirin. **Wê* ***ruhê xwe di ber hezkiriyê xwe de da.***

Ruhê xwe xelas kirin (Ruhê xwe ji destê (yekî) xelas kirin)
1. Ji mirinê rizgar bûn. **2.** Di hêla derûnî de aramî bi dest xistin. **Wî* ***ruhê xwe bi zorê ji destê wan sadîstan xelas kir.*** **Arjîn zêde xwe da kar û barê xwe, bi wî awayî* ***ruhê xwe xelas kir.***

Ruhistînê (yekî) bûn
Çavtirsiyê yekî bûn, çavê yekî zehf tirsandin. **Cengo* ***ruhîstînê wê ye.*** *Hûn wê hewaleyî Cengo bikin û têkildar nebin.*

Rû badan
Têkilî nexwestin, rûyê xwe guherîn. **Dergistiya min a kevn, dema ku min dibîne,* ***rû ba dide.***

Rû bi rû, guneh efû.
Ku em bên bal hev kî sûckar e, kî bêsûc e dê kifş bibe. **Kî çi dibêje bila bibêje,* ***rû bi rû, guneh efû.***

Rû bi rû kirin
bnr. Rûbarî hev û din kirin

Rû bi rû man
Li hemberî hev man. **Di dawiyê de ew dê* ***rû bi rû bimûnin,*** *divê ew li dawiyê bifikirin.*

Rû bi rûyê hev bûn
Hatin hemberî hev. **Kengê ku ew* ***rû bi rûyê hev bûn,*** *wê çaxê rûyê reş û spî wê ji hev kifş bibe.*

Rû da, cih da
bnr. Rû dayê, derkete ser ser.

Rû dayê, derkete ser serî.
Ji bo kesên li hemberî qencî û xweşbîniyê xerabiyê dikin û şeqizî dibin tê gotin. *****Rû da, derkete ser serî.*** *Rebenê Xidir çi zanibû wê wisa neneran bîne serê wî?*

Rû dayê, gû dayê.
bnr. Rû dayê, derkete ser serî.

Rû dayîn

Ji yekî re tolerans nîşan dan, yek bitrî kirin, deliqandin. **"Ne lazim e **rû bidine** wan kelhan."* Eliyê Ebdilrehman

Rû di bin pê de bûn

Ji yekî fedî kirin, di bin bandora yekî de bûn. ***Rûyê min di bin piyê te de**, du heb zarokên me jî çêbûn.*

Rû di (yekî) de dîtin

Xeşbînî û tolerans dîtin. **"Belê piştî van hemû tiştan, Nayîl heke **rû di Bavo de bidîta**, dihat ser pirsa rastîn."* Felat Dilgeş

Rû geş bûn

bnr: Mehdê (yekî) geş bûn

Rû guherîn

bnr: Rû jê vegerandin

Rû hildan

Li hemberî niyet û helwesta baş, hewldaneke neyînî nîşan dan. Ji hed derbas kirin. **Me got guneh e, belengaz e, me jê re alîkarî kir, lê wê jî gelekî **rû hilda**.*

Rû jê guhezîin

bnr: Rû jê vegerandin

Rû kirin çermê kerê

Bêar û bêfedî bûn. **Kuro, ya wî êdî ji edetan der e, wî **rû kiriye çermê kerê**.*

Rû lê tunebûn

bnr: Rû neêşîn

Rû jê vegerandin

Ji yekî xeyîdîn, têkilî birîn. **Nizanim Gebar çi jê bihîstiye, ev demek e ku **rû ji Felat vegerandiye**.*

Rû li bal kesekî neman

Li her derê bêrûmet bûn. ***Piştî wê îxbara wî rûyê Sedo **li bal kesekî nema**.*

Rû maç e, dil xaç e.

Bi rûyê xwe wekî dostan tê xuyan, lê di hundirê xwe de dijminatiyê disêwirîne. **Tu wisa bi rûyê wî yê biken nexape, ew yekî **rû maç e, dil xaç e**.*

Rû pê ve neman

1. Qedir û rûmet neman. **2.** Bêşerm û bêheya bûn. ***Wê jinikê wisa kir ku **rû bi mêrik ve nema** ku here bal mirovên xwe jî. ***Rû bi Seyad ve nemaye** ku li hember wan gotinên şelişî fedî bike.*

Rû û simbêlên (yekî) tevlihev bûn
Perîşan û pejmûrde bûn. **Te bidîta di bin çav de* ***rû û simbêlên Delîl çawa tevlihev bûbûn.***

Rû vegerandin
bnr: Rûyê xwe guherandin

Rû xwestin
Ji bo xweşbînî û çavgirtinê boçika xwe li ba kirin. **Çima ku xalê min li rûyê wî keniya, hema wê gavê* ***rû xwest.***

Rû xweş e, dil reş e
bnr: Rû maç e, dil xaç e.

Rûbarî hev û din kirin
Ji bo çareserkirina tiştekî hatina li hemberî hev. **Ji bo wî deynê min, me ew* ***rûbarî hev û din kirin****, êdî têkiliya min bi wê pirsgirêkê re nema.*

Rûçikê xwe eşkera kirin
Niyet û armanca xwe ya rasteqîn nîşan dan. **Berê xwe bi awayekî din dida nîşandan, lê mêze kir ku nabe, ji bêgaviyê* ***rûçikê xwe eşkera kir****.*

Rûmertal bûn
Bêşerm û bêar bûn. **Ew yekî* ***rû mertal e****, kî çi bike lê bandor nake.*

Rûmet dayîn
Girîng girtin, hurmet nîşan dan. ** "Ma gelo yekî ku ewqas qencî bi me kiriye û* ***rûmet daye*** *me, ne layiqê îbadet û perestiyê be, kî dê layîqî îbadetkirinê be?"* Mucteba Baravî

Rûmet girtin
bnr: Qedrê (yekî) girtin

Rûmet nîşan dan
bnr: Qedrê (yekî) girtin

Rûn e, di eyarê segan (donxiz) da ye.
bnr: Şîrê şêr e, di eyarê donxiz de ye.

Rûn li simbêlên xwe dan
1. Xwe ji rewşa xwe ya rasteqînî cudatir nîşan dan. **2.** Fîtozî bûn. **Bila ew loqek* ***rûn li simbêlên xwe de****, lê her kes dizane, kî çi ye û çi nîn e. *Dîsa Mehmûd* ***rûn li simbêlên xwe daye*** *û li orta sûkê de xwe qure dike.*

Rûn xistiye kade, kade jî xistiye hevrîşk.
Karê xwe ji pêdiviyê zêdetir pêk anîn. **Heyran çi karê we bi Zal ketiye, wî mêrikî* ***rûn xistiye kade, kade jî xistiye hevrîşk****.*

Rûnerm bûn

Milayîm û ji kirina karan re xwe aciz nekirin. Li hemberî kesekî na negotin. **Ew yekî **rûnerm e**, tu bi ku de bişînî canê xwe zer nake.*

Rûnê genî, li ser nanê xwedî

Yên ku kêmasî û xetayên wan hebin, berî her kesî ew bi xwe bedela wê didin. **Helbet ew ê bike, ma tu nizanî ku dibêjin: **"Rûnê genî, li ser nanê xwedî."***

Rûnê me bi ser germiya(*) me de rijiya.

Ji bereketê zêdetir ziyana me çênebû. **Erê, me wer nedixwest, lê dîsa jî **rûnê me bi ser germiya me de rijiya**.*

Rûnê me di dewê me de

Çi derd û kêmasiyên me hebin divê tenê em pê bizanibin. ****Rûnê me di dewê me da.** Çi hewce ye xelk bi sira me bihese?*

Rûnişt li germa, rabû li serma.

Ji bo kesên li berjewendiyên xwe zêde difikirin û rehetiya xwe digerin tê gotin. **Ew karê xwe dizane. **Rûdinê li germa, radibe li serma.***

Rûniştin xwîşk û bira, ker dane guran.

bnr. Xeberxweşan, ker dan guran.

Rûreşî kirin

1. Ji bo kirina karan dilxwaz nebûn. **2.** Karekî fedîkarî kirin. **Ev lawê min î piçûk wisa **rûreşiyan dike** ku mirov nikare bişîne derekê. *Ew **rûreşiya ku wî kiriye**, me hemiyan fedîkar dike.*

Rût û pût kirin

Tiştek li balê nehiştin. **Kalo **rût û pût kirine**.*

Rût û repal bûn (man)

Bêpere û bêmiz û bêmal bûn. **Heyran, lûn çi ji wî pêxwasî dixwazin? Ma qey ew jî nizanin ku ev yekî **rût û repal e**?*

Rût û tazî bûn

bnr. Qûntazî bûn

Rûqalind bûn

bnr. Rûyê (yekî) neêşîn

Rûqazok bûn

Bêşerm û bêheya bûn. **Ew yekî **rûqazok e**, tu jê re çi bibêjî bêkêr e.*

Rûqetyayî bûn

bnr. Rûqazok bûn

(*) **Germî:** Li hêla Riha û hawirdora wê ji bo xwarinên pijiyayî yan jî kelandî tê gotin. Zêdetir ji bo şorbe û pêlavê tê bikaranîn.

Rûqewîn bûn
bnr: Rûyê (yekî) neêşîn

Rûreş bûn
Tawaneke fedîkarî kirin. **Bi îxbara Dozdarê bi şûn de Tefîq* ***rûreş bû***.

Rûreş derketin
Di encama karekî de yan jî tawanbariyekê de tawankar û şermezar bûn. **Piştî ku ew mesele kolan di dawiyê de Reso* ***rûreş derket***.

Rûreş derxistin
Li cihê neheq yek tawanbar nîşan dan. **Yê ku bertîl xwaribû, Zeynel bû, lê rebenê Paşo di navberê de* ***rûreş derxistin***.

Rûreşo, parîxweşo
Ji bo kesên ku hem sûckar in lê hem jî bêar in, dixwin û vedixwin tê gotin. **Got,* ***rûreşo, parîxweşo****, tu dibêjî yê ku ew gû xwariye, ne ew e.*

Rûsar bûn
Sikûm nexweş, mehd û mirûz tirş bûn. Di têkiliyan de germ nebûn. **Bûka Rahşanê ya teze wisa* ***rûsar e*** *ku hurmeta ku dike jî bi mirov xweş nayê.*

Rûtenik bûn
bnr: Rûnerm bûn

Rûtenî bûn
bnr: Rûreş bûn

Rûtirş bûn
Cirnexweş bûn, moral xera bûn. **Ez tu car nikarim pê re hevaltiyê bikim. Ji ber ku ew yekî* ***rûtirş e***.

Rûto ha li vî alî avê, ha li wî alî avê (Rûto çi li vî aliyê avê, çi li wî aliyê avê)
Jixwe tiştekî wî nîn e, bi çi awayî be ne xem e. *****Rûto ha li vî alî avê, ha li wî alî avê.*** *Dilê wan çawa dike bila wisa bifikirin, ji bo min qet ne xem e.*

Rûto, xeberpûto
Mirovên feqîr bêhtir gotegot û xeyban dikin. **Ma ji bilî wê dê çi bike?* ***Rûto, xeberpûto.***

Rûvekirî bûn
Şermnekirî û diryayî bûn. **Ji Rosto re çi, ew yekî* ***rûvekirî ye****, dikare ji her kesî bixwaze, lê tu?*

Rûxweş bûn
Di nav helwesteke xweşbînî û geş de bûn. **"Rast e, mêvan in û divê mirov* ***rûxweş be.***"
Kerîm Cemîl Biyanî

Rûyê beqê ji ava golê şil nabe, çima wê bi tifa te şil bibe.
bnr. Rûyê ku ji ava behran şil nebe, wê çawa ji tifê şil bibe.

Rûyê (yekî) çûn erdê
Gelekî fedî kirin. **Dema ku wê ez di wî halî de dîtim,* ***rûyê min çû erdê.***

Rûyê (yekî) di bin erdê de çûn
Pir fedî kirin. **Ji wê bûyerê bi vir de kengê ku wê dibînim,* ***rûyê min di bin erdê de diçe*** *xwarê.*

Rûyê (yekî) heram kirin
Têkiliya xwe birîn. **Min ji te re got, carek din* ***rûyê wê dêlê heram bike*** *û lê menêre, lê te hi xwe nikaribû.*

Rûyê (yekî) hesret kirin
Carek din nedîtin, têkiliya xwe birîn. **Min carekê sond xwar û ji wê bi vir de rûyê wê hesret kir.*

Rûyê hev û din şûştin
Hev û din desteg kirin, hev û din mafdar derxistin. **Herduyan a xwe dikin yek û* ***rûyê hev û din dişon****, ji bo wê jî ya rastî nayê fêmkirin.*

Rûyê (yekî) kenandin
Serfiraz û dilxweş kirin. **Wê jinikê* ***rûyê min tim kenand****, Xwedê jî li dinyaya din* ***rûyê wê bikenîne****.*

Rûyê (yekî) kenîn
Serfiraz bûn, rewş baş bûn. **"... dilgeş bû, rûyê wê dikeniya."* Murat Batgi

Rûyê (yekî) li ber (yekî) çûn erdê
Li pêş kesekî fedî kirin. **Dema ku min ew dît,* ***rûyê min li ber wî çû erdê****.*

Rûyê min li bin piyê te
Ji bo rûmetdayîna ji mezinan re, di dema qala gotinên zayendî û her wekî wê de tê bikaranîn. **Axayê min* ***rûyê min li bin piyê te****, ez keçika Gemşoyê Ferzende dixwazim.*

Rûyê (yekî) ne rûyê xêrê bûn
Rewş xerab xuyandin. **Welehî* ***rûyê Medîneyê ne rûyê xêrê ye****, tiştek di vî karî de heye.*

Rûyê (yekî) neêşîn
Fedî nekirin. **Heke hinekî* ***rûyê wî biêşiya****, ew yek nedianî serê wan belengazan.*

Rûyê (yekî) negirtin
Fedî kirin. ****Rûyê min negirt*** *ku ji bo wê ji bavê xwe pereyan bixwazim.*

Rûyê reş çi bike bi teniyê?!
bnr. Rûyê reş çi hewceyî teniyê ye?

Rûyê reş çi hewceyî teniyê ye?!
Jixwe kifş e ku fedîkar e, ne hewceyî şanîdanê ye. **Rûyê reş çi hewceyî teniyê ye?* *Her tişt wa ye li meydanê xuya ye.*

Rûyê reş û spî ji hev kifş bûn
Neheq û mafdar ji hev û din derk bûn. **A di wê demê de* ***rûyê reş û spî ji hev kifş bûn.***

Rûyê (yekî) spî bûn
1. Di tawanbariyek an jî di darizandinekê de paqij derketin. **2.** Kal bûn. **"Şikir ji Xwedê re di vî warî de* ***rûyê me spî ye.*** Süleyman Çevik **Piştî ew qas tirholka jiyanê, êdî* ***rûyê hogir jî spî bû.***

Rûyê (yekî) şûştin
Tawama yekî veşartin û paqij nîşan dan. **Xaltiya Besê, bibore lê qet* ***rûyê kurê xwe neşo,*** *em dizanin wî çi kiriye û çi nekiriye.*

Rûyê (yekî) tune bûn
Bêqedir û bêqiymet bûn. **Min ê bigota, lê ku* ***rûyê min li bal wan bênamûsan tune ye.***

Rûyê xwe bi gûyê xwe şûştin (Rûyê xwe bi av û gû şûştin)
Rûreşî kirin, ji bo daxwaza kirina karên piçûk jî dilnexwaz bûn. **Ji wî re qala kirina karekî meke, wî* ***rûyê xwe bi gûyê xwe şûştiye.*** *Ku tu bibêjiyê nake, wê te jî bêrûmet bike.*

Rûyê xwe bi mîza xwe şûştin
bnr. Rûyê xwe bi gûyê xwe şûştin

Rûyê xwe birin binê nigê xwe
Bêar û bêfedî bûn. **Wî* ***rûyê xwe biriye binê nigê xwe.*** *Ez ji wî tiştekî bişanaz guman nakim.*

Rûyê xwe dayîn bin piyê xwe
Ji bêgavî şerm û fedî danîn aliyekî. **Min lê mêze kir ku bi vî awayî nameşe, min* ***rûyê xwe da bin piyê xwe*** *û ji bo ku jê pere bixwazim, min li derê Evdal Axa jî xist.*

Rûyê xwe dan erdê
Gelekî israr kirin. **Çawa bikim wê wisa* ***rûyê xwe da erdê*** *ku min nikaribû bigota, na.*

Rûyê xwe di êş de spî kirin
Ji dinyayê tiştek fêm nekirin. **Ma min* ***rûyê xwe di êş de spî kiriye*** *ku bibim lîstokên wan gede û gûdeyan?*

Rûyê xwe êşandin
Ji bo kirina karekî xwe aciz kirin. **Ew ku careke din ji wisa* ***rûyê xwe biêşîne,*** *helbet ez jî careke din jê re nabêjim.*

Rûyê xwe guherandin
bnr. Rûyê xwe jê zivirandin

Rûyê xwe hurşandin
Pirçiyê xwe kirin. **Nizanim çi jê girt, wa ye Almastê dîsa **rûyê xwe hurşandiye**.*

Rûyê xwe jê zivirandin
Ji yekî têkiliyên xwe sar kirin, jê xeyîdîn. **"Vêga ez bala xwe didimê tu ev çend meh in **rûyê xwe ji min dizivirînî**. Ma ev hevaltî ye."* Berhîm Paşa

Rûyê xwe kirin devê xwe
Fedî kirin. **Wê **rûyê xwe kir devê xwe** û wisa ew kar qedand.*

Rûyê xwe kiriye çerm û xistiye pê.
Bêar û bêşerm bûn. **Ji Silto re çi, wê **rûyê xwe kiriye çerm û xistiye pê**.*

Rûyê xwe jê ba dan
bnr: Rûyê xwe guherandin

Rûyê xwe li ber tavê spî kirin
bnr: Rûyê xwe di aşê Mîrzo de spî kirin

Rûyê xwe pûç kirin
Ji bo tiştekî ku ku lê xweş neyê yan jî nexwaze bike xwe aciz kirin. **Wê fêm kir ku ez ê çi bibêjim, **rûyê xwe pûç kir**, ji ber wê min jî qet negot.*

Rûyê xwe qaîm kirin
bnr: Rûyê xwe qalind kirin

Rûyê xwe qalind kirin
Ji şerm û fedîkariyê dûr ketin. **"...me biryar dabû ku em ê **rûyê xwe qalind bikin** û ji Bawer çend kevokan bixwazin."* Felat Dilgeş

Rûyê xwe qurmiçandin
Rûyê xwe tirş kirin, ji rewşê memnûn nebûn. **Çawa ku wê **rûyê xwe qurmiçand**, min rewş fêm kir, lê ez bi derengiyê ketibûm.*

Rûyê xwe reş kirin
1. Tawaneke fedîkarî kirin. **2.** Bêbextî li yekî kirin, derew kirin **Zerga wisa **rûyê xwe reş kiriye**, tiştekî wer kiriye ku cihê wê ne erd e, ne jî esman e. *"Dibêjin 'dengê daholê ji dûr ve xweş tê.' Na na! Ew ên ku wisa dibêjin **rûyê xwe reş dikin**."* Adnan Alp

Rûyê xwe şûştin
Xwe mafdar û bê tawan derxistin. **Piştî ew qas kirinan hê jî, **rûyê xwe dişo**.*

Rûyê xwe tal kirin
bnr: Rûyê xwe pûç kirin

Rûyê xwe tirş kirin
Ji ber tiştekî acizbûn û nerehetiya xwe dan xuyandin. **"Qoço **rûyê xwe tirş kiribû**; bir-*

ihên wî lê gijgijîn, kûr li pêş xwe dinêrî." Nuredîn Zaza

Rûyê (yekî) weke çiyayê berflêbarî bûn

Ji bo kesên sikûmên wan nexweş in, rûsar in û mehd û mirûzên wan tirş in tê gotin. **Ka heyran **rûyê wê weke çiyayê berflêbarî ye**, wisa sar e ku mirov nikare tiştekî jî jê pirs bike.*

Rûyê (yekî) wekî yê mirîşkan bûn

Bêar bûn. ***Rûyê vê Zeyneba qîzxala min maşelah wekî yê mirîşkan e**.*

Rûyê (yekî) vebûn

Şerm şikandin. **Berê ne mimkun bû di nav civatê de wer bipeyîve, lê wa ye **rûyê wê jî vebûye**.*

Rûyê (yekî) vekirin

Yek ji şermê dûr xistin. **Ew berê ne jinek wisa bû, lê xesûya wê wisa **rûyê wê vekir.***

S

Sa (seg) riyîn, ga cûyîn
Gelekî perîşan û jihevdeketî bûn, ne xweşik bûn. **Kincên li ser Ruhanê wisa bûbûn ku te digot* ***sa riye, ga cûye****.*

Sabûn di ser ... dan
Veşartin, tawan û kêmasiya yekî nixamtin, wekî paqij nîşan dan. **Maşelah wê sabûn* ***di ser wê meseleyê da*** *û çû.*

Sabûn xistin bin lingên (yekî)
Li serê yekî dek û dolab gerandin. **Wan dixwest* ***sabûnê têxin bin lingên min****, lê ew bi xwe ketine tela xwe.*

Sabûnê bînî ji erş, dîsa ji te naçe qalikê reş.
Mirov ku çi be ew e, zû bi zû nayê guherandin. ****Sabûnê bînî ji erş, dîsa ji te naçe qalikê reş.*** *Dibe ku raman bê guherandin, lê cira mirov, ango xisletê mirov ne guncan e, ku bê guherandin.*

Sal wekî bawîşkan hatin û çûn
Dem zû derbas bûn. ****Sal wekî bawîşkan hatin û çûn.*** *Mêze bike ew zarokên duh na pêr bûne keç û xort.*

Sal bi sal, heft xwezî bi sala par. (Sal bi sal, xwezî bi par.)
bnr. Ro bi ro, xwezî bi do.

Sal di ser re derbas bûn
Gelek dem derbas bûn. **Tu çi dibêjî kuro, heya niha tu li ku bûyî?* ***Sal di ser wê meseleyê re debas bûn*** *lawo.*

Sal heye dozdeh meh e.
bnr. Salê dozdeh meh

Sal ew sal e lê bihar ne ew bihar e.
Rewş cuda ye. **Qet nexape hevalo,* ***sal ew sal e lê bihar ne ew bihar e****.*

Sal mij e, kodik tije.
Sala ku baran û şilî hebe wê salê bêhn û bereket jî heye, zad û zêdehî jî zêde ye. ***Sal mij e, kodik tije.** Şikir îsal rewşa me baş e.*

Sal nû, gotegot nû
Hê ev destpêk e. **Va ye maşelalı dest pê kir jî **sal nû gotegot nû**.*

Sal weke avê herikîn
bnr. Sal wekî bawîşkan hatin û çûn

Salê dozdeh meh
Di wateya her demê yan jî demeke pir dirêj de tê bikaranîn. **"Guman nabe ku em dikarin **salê dozdeh mehan** li ser îxanet û birakujiya kurdan binivisînin û civînan çêbikin."* Süleyman Çevik

Salê mehê carek
Zehf hindik. ***Salê mehê carekê** em diçin ber behrê, ew jî ji zarokan re dibe astengî.*

Salox bi dest xistin
Der barê rewşê de hin tiştan hîn bûn. **Berê min der barê wî de tu tiştek nizanibû, lê dû re min hinek **salox bi dest xistin**.*

Salox hilanîn (hildan)
bnr. Salox bi dest xistin

Sanoyê Izîr, ga daye gizîr.
Ji kesên bêmêzîn û bêhesab re tê gotin. **Tu yê çi bibêjî ji yên wiha re? **Sanoyê Izîr, ga daye gizîr.***

Saq e, goreyî laq e.
Ew jî layiqî wî ye. **Qet bila kes tiştekî nebêje. **Saq e, goreyî laq e.***

Saq e, laq e.
bnr. Saq e, goreyî laq e.

Sar sekinîn
Di têkiliyê de navber hiştin. Samîmî û germ nebûn. **Jixwe ew gelekî **sar disekînî**, ez têgihîştim ku tiştekî li kêleka wê girtiye.*

Saresar xeber dan
Tiştên neyînî û ne di cih de xeber dan. **Wî wisa **saresar xeber da** ku dilê her kesî pê li hev ket.*

Sarobaro(yî) bûn
Ketin rewşeke ecêb. Moral xerab bûn. **Ji wan gotinên Celaledîn bi şûn de Remo ji nişka ve **sarobaroyî bû**.*

Savar pehtin, tirşik dane berê.
Gava ku tiştek bêyî yekî hatibe kirin tê bikaranîn. ***Savar pehtin, tirşik dane berê.** *Camêran karê xwe kirine qedandine, dû re lûn wan agahdar dikin ...*

Saw kirin zik
bnr: Saw xistin ser (yekî)

Saw xistin ser
Tirsandin. **"Gurî her şeqamekê li zarokan dide, **sawa xwe xistiye ser zarokên gund**.* Celîlê Celîl, Ordîxanê Celîl

Saxiya can xwestin
Ji bilî xweşiyê tiştek daxwaz nekirin. **Ez ê çi bibêjim, **her saxiya canê te dixwazim**.*

Se ne, hay ji hev hene.
Her çiqas xerab bin jî li ser hev û din serwext in. **Tu wisa li serserîtiya wan menêre. Erê **se ne, lê hay ji hev hene**.*

Sebir dan ber dil
Li ber dilê yekî çûn û hatin, yek sakîn kirin. **Rewşa Zelalê gelekî xerab bû, min hinekî **sebir da ber dil**, lê ka dawî çawa be.*

Sebra (yekî) pê derketin
Ji kesekî yan jî ji tiştekî aramî û bêhnxweşî girtin. **Tenê **sebra wê bi qîza wê derdiket**, hema dixwest tim li ber serî be.*

Sebra xwe pê anîn
Jê aramî û rehetî girtin, li balê rehet bûn. **"Şahiya dilê min a paşîn Perîxan bû, ew min nas dike, hez ji min dike û dikare **sebra xwe bi min bîne**."* Kamîran Bedirxan

Sebriyo, debriyo
Yên ku sebir dikin, di dawiyê de debara xwe baştir dikin û digihîjin armanca xwe. **Sebir lawo hinekî dîsa sebir, çi gotine? **Sebriyo, debriyo.***

Sed car korayî
Pir heyf, mixabin. ***Sed car korayî** wê keça xweşik ku dane wî hopedewarî.*

Sed çakûç û yek zindan
Ya girîng bingeh e. **Her kes dizane ku **sed çakûç û yek zindan**.*

Sed tebarek bibîne li ber serê fewarek, tu car nake hewl û karek.
Ji bo kesên teral tê gotin. **Qet qala wî bixwerenedîtî mekin. **Sed tebarek bibîne li ber serê fewarek, ew tu car nake hewl û karek.***

Sed û bîst car
Ji sedî sed, eseh, bêşik û bêguman. ***Sed û bîst car** kifş e ku yên bihêz û biderfet, bi her awayî xwe mafdar didin xuyandin.*

Sed yasîn û tebarek, bide ber guhê dewarek, wê çi fêm bike?!

Ji yên tênegihîştî re tu çi bikî, bêkêr e. **Ku bingehek tune be zor e, ezbenî.* ***Sed yasîn û tebarek, bide ber guhê dewarek, wê çi fêm bike?!***

Sedeqeyek ji bo Xwedê dan

Ji belayekê rizgar bûn. **Wê* ***sedeqeyek ji bo Xwedê dabû****, naxwe ji wê qezayê xelasbûn, bi rastî jî mûcîze bû.*

Sefik girtin

Tê de edilîn, bingeh girtin. **"...yan ez ê bi riya bavê xwe de biçim, an ez ê nehêlim ku lingê Osmaniyan li herêmê* ***sefik bigire****."* Medenî Ferho

Seg da pey seg, nan ji pisîkê re nema.

Yên ji hev in ku hev û din desteg bikin, karê yên din zortir dibe. ****Seg da pey seg, nan ji pisîkê re nema.*** *Hemû jî mirovê hev bûn, ji ber ku ez xerîb bûm, gotina min pere nekir.*

Seg ji seg re got, ew jî zivirî ji dêla xwe re got.

Her kes gotin û hêza xwe yê ji xwe bêhêztir derbas dike. ****Seg ji seg re got, ew jî zivirî ji dêla xwe re got.*** *Ew ji wî zorê dibîne, îja tê zorê dide ser min.*

Seg berî hev du dan

Fesadî kirin. **Karê wî mêrikê Ecem ji hema ew e ku* ***segan berî hev du bide****.*

Seg dir(ey)ê, kerwan li rê

Karê me ku dimeşe, kî çi dibêje bila bibêje. **"Gava ku me bi dehan kovar û rojname, bi hezaran kitêb çap kirin û bi sed hezaran, bi milyonan xwendevanên kurdî çêkirin, hingê bila bibêjin, kurdî tune. Xem nîn e, çimkî* ***'Seg dirê, karwan li rê'*** *ye."* Dr. Alan Merwanî

Seg li ber siya ereb(ey)ê de vedikeve, hew dizane siya dêla wî ye.

Hinek bi alikariya hinekên din karên xwe dimeşînin, lê hew dizanin her tişt bi bandora wan pêk tê. ****Seg li ber siya erebê de vedikeve, hew dizane siya dêla wî ye.*** *Ev sefêk jî hew dizane bi merîfeta wî ye.*

Seg xatir tune, xwedî xatir heye.

Carinan ji bo xatirê hinekên din kar tên meşandin û rûmet tên dayîn. **Weleh ew bi xwe ne tiştek e, lê bila bibe qurbana xatirê Gulanê be.* ***Seg xatir tune, xwedî xatir heye.***

Seg xwê kirin (Seg xwê dan)

Ji bo mirovên bêkar û bêemel wekî eks û tirane tê gotin. **"-Sîdar quwet be, tu çi dikî? Ez* ***segan xwê dikim****!"* Qahir Bateyî

Segan di keda (yekî) de rîtin

Ked vala çûn. ****Seg di keda min de de birîn****, ew pereyên min winda bûn û ew keda min a şeş mehan ji xwe re çû.*

Segan nan ji destê (yekî) negirtin

Ketin rewşeke pir xerab. **Fazil ketiye rewşeke wisa ku* ***seg nan ji destê wî nagirin****.*

Segan bi şansê (yekî) de rîtin

Bêşans û rozgar bûn. **Seg bi şansê min de birîn, helbet min xerabiyek kiribû ku ew qas keda min bi ba de çû.*

Segbavî kirin

Xerabî kirin. **Heke Kemal **segbavî nekira** ew karê me wê biqediya.* (argo)

Segê me ye, li ber derê xelkê direyê.

bnr. Dîkê min e, li ser kulîkê xelkê bang dide.

Segê nano nano bûn

Tenê ji bo berjewendiyên xwe yên rojane xebitîn. **Ew **segê nano nano ye**, girêdayî derekê nîn e, hema zikê wî têr bibe, temam e.* (argo)

Segê soro, gurî va ye!

Fesadî kirin, hadandin. **Ya ku ew dike ew e ku dibêje **segê soro, gurî va ye!***

Segê sor, ha gurê pişt hêşîn li ha ye!

bnr. Segê soro, gurî va ye!

Segê xwe zexm bike, da te bixwe.

Yê ku tu qenciyê pê bikî, herî zêdetir ew ziyanê didin te. **Erê ezbenî, rast gotine: **"Segê xwe zexm bike, da te bixwe."***

Segên belek maqûlê segan in.

Qaşo ew zêde ye. **Tu wisa nakokiyê dikî nav, ma **segên belek maqûlê segan in**?* (argo)

Sehet di ser re derbas bûn

1. Di hêla tenduristî de aciz bûn, xewirîn. **2.** Demeke dirêj derbas bûn. **Min jî fêm nekir, hema ji nişka ve wekî **sehet di ser re derbas bin** ji xwe ve çû. *Ew qas **sehet di ser re derbas bûn**, hê jî tu cawek derneket.*

Sehma gur bi ser (yekî) de girtin

Gelekî tirsîn, xof girtin. **Dema ku wî dibînim, wekî ku **sehma gur bi ser min de bigire**, pirça canê min bizî bizî dibe.*

Sehmê bi ser (yekî) de girtin

Tirsîn, xof girtin. **Di wê newalê de ji nişka ve **sehmê wisa bi ser min de girt** ku çokên min lerizîn.*

Sekna Xwedê pê neketin

bnr. Sekin jê re tune bûn

Sekin jê re tune bûn

Ranewestîn, tim xebitîn. **Sekin ji rebenê Smayîl re tune ye. Ji karê dewletê derdikeve, di heman saetê de diçe karê miteyîd.*

Selayet ji destê (yekî) derketin
Ray û bandor di dest de neman. **Ji wê tu hêviyan meke, çimkî êdî* ***selayet ji destê wê derketiye***.

Selemtî selemtî gerîn
Bêkar û bêemel, terxan û beredayî gerîn. **Heta tu heya êvarê* ***selemtî selemtî digerî,*** *were, hinekî alîkariyê bide xalê xwe.*

Semerê (yekî) li piştê bûn
Ji bo xebatê amade bûn. **Ez bi vê, bi wê nizanim,* ***semerê min li pişta min e***.

Semerê min li pişta min e, li vî welatî nebe bila li welatekî din be.
Mirov ku xebatkar û xurt be, li ku hebe dikare debara xwe bike, cih ne xem e. **Jinik tu qet nekeve tatêlê.* ***Semerê min li pişta min e, li vî welatî nebe bila li welatekî din be.***

Semta kar zanîn
Pêkanîna kar, rê û azîna kar zanîn. **Ew zehf zû pêk tîne, ji ber ku ew* ***semta kar baş dizane***.

Seqa[*], li gorî heqa
Kar wekî buhayê xwe tê kirin. **Rast e, ya min xweşiktir bûye, lê* ***seqa, li gorî heqa****, te çiqas dayê, min çiqas dayê?*

Seqet sûqet kirin
1. Karek bi têkûzî pêk nehanîn. **2.** Yek perîşan û birîndar kirin. **Ez bawer im ku wî niha ew dolab* ***seqet sûqet kiriye***. **Kawa ew lawikê reben* ***seqet sûqet kiriye***.

Ser cîcî, bin gincî (Ji ser ve cîcî, ji bin ve gincî bûn)
bnr: Ji ser ve tûtik û şûtik, ji bin ve rişk û nûtik

Ser guhê hev du pelixandin
Li hev xistin. **Wan herduyan ji bo tiştekî tune* ***ser guhê hev du pelixandine***.

Ser ne temîz gerîn
bnr: Cunobet gerîn

Ser pepûk, bin pepûk, Xweda bike bûk.
Baş nayê xuyan, lê Xwedê bibe alîkar. **Weleh qet aqilê min jê nabire, lê çi bibêjim,* ***ser pepûk, bin pepûk, Xweda bike bûk***.

Ser serê xwe û heft bavê xwe razî bûn
Bi dilekî germ ecibandin. **Ma dê çawa nepejirîne?* ***Ser serê xwe û heft bavê xwe razî bû.***

Ser serî û çavên xwe qebûl kirin
bnr: Ser serê xwe û heft bavê xwe razî bûn

---

[*] **Seqa:** Ji kesên ku kêr, satir, bivir û hwd. tûj dikin re tê gotin.

Ser û guhên hev hûr kirin
bnr: Ser guhên hev û din pelixandin

Ser û guhên xwe çêkirin
bnr: Ser û sîçên xwe rast kirin

Ser û guhên xwe dan hev
bnr: Ser û sîçên xwe rast kirin

Ser û guhên xwe li ba kirin
Ji bo şer û dozekê xwe çireve kirin. Xwe li gemê xistin. **Di wê demê de wî jî gelekî **ser û guhên xwe li ba dikir**, lê bi qûna zuha filitî.*

Ser û guhên xwe rast kirin
bnr: Li ser û sîçên xwe nihêrîn

Ser û sîçên xwe rast kirin
Kinc û cilên xwe, timtêl û bejna xwe têkûz û sererast kirin. **Hingî têkilî bi wê jinikê re daniye, **ser û sîçên xwe rast kirine**.*

Ser xiştî, binî devî bûn
Naverok û xuyang ne wekî hev bûn. **Ez jî dizanim ku ew **ser xiştî binî devî ye**, lê çawa bikim?*

Sera pîran, zengilê keran
bnr: Seran pîran, hîna ecêbên giran

Seran pîran, hîna ecêbên giran
Ji bo kal û pîrên ku tiştên ne layîqî xwe dikin tê gotin. **Qurban, **seran pîran, hîna ecêbên giran**. Xalê Hemîd piştî pêncî salî, ji nû ve tevî keçikan diçe dîskoyan.*

Serbarê ser bûn
bnr: Ew jî donê li ser helîsê ye.

Serberjêr, qûnhevraz
Ji bo kesên bêdenge û di rewşa xerab de tê bikaranîn. **Nizanim tu ji wî **serberjêr, qûn hevrazî** çi hêvî dikî.*

Serberjêr bûn
Fedîkar bûn. **Mirov ku bi karên ew qas xerab re mijûl bibe, helbet wê di dawiya dawî de jî ew qasî **serberjêr be**.*

Serçêlek bûn
Bêxîret, bindest û nuxs bûn. **Jixwe ew yekî **serçêlek e**, tiştekî ji wî hêvî mekin.*

Serdar daketin, bindar rabûn
Ku yên bihêz bikevin, dê bandorê li yên bêhêz bike. ****Serdar daketin, bindar rabûn.** Ew jî zagona civakê ya xwazalî ye.*

Serekê mêran bûn
Ji bo mêrên pêkhatî û mêrxwas tê gotin. **Heyfa wî lawê Tajdîn, bi rastî jî mêrekî **serekê mêran bû**.*

Serê avê girtin
bnr. Serê kaniyê girtin.

Serê bavê xwe berjêr kirin
Karekî şermî kirin. (Zêdetir ji bo keçikên ku zikê xwe tijî dikin, ango ji yê ku bêmehr û bênikah hemile dimînin tê gotin.) **Maharê Wardê ew qasî bi keçika xwe dipesinî, lê keçika wî **serê bavê xwe berjêr kir**.*

Serê bend berdan
Erk winda kirin, kar sist kirin. **Te ku carekê **serê bend berda**, êdî zor dibe.*

Serê (yekê) berdan
Ji bo mêrên ku jina xwe berdidin tê bikaranîn. **Mêrik mêze kir ku tim di jiyana xwe de nikare rezîliya wê bikişîne, **serê wê berda**.*

Serê (yekî) berjêr bûn
1. Têk çûn. **2.** Şermî ketin. (Zêdetir ji bo tiştên girêdayî mijara namûsê tê bikaranîn.) **Ji wî şerî bi şûn de **serê wan berjêr bû**. *Ji ber meseleya namûsê nebûya, **serê wan tu caran berjêr nedibû**.*

Serê (yekî) berjêr kirin
Têk birin. Bi şermiyê xistin. **Jinik, ez dizanim ev keçik heya di nav xelkê de **serê min berjêr neke** nasekine.*

Serê (yekî) bi hevsar kirin
Xistin bin bandora xwe. **Jinika çi ye şeytanek e, di navbera du salan de **serê yekî wekî Qadirê Tircunî bi hevsar kir**.*

Serê (yekî) bidewlet bûn
Bixêr û bereket bûn. **Şikir **serê vî lawê min bidewlet e**, hingî ku hatiye dinyayê, kar û barê me pir bi pêş de diçe.*

Serê (yekî) bi ... bilind bûn
Şanaz bûn. ***Serê min û jina min, tim bi zarokên me bilind bû.***

Serê (yekî) bimij û dûman bûn
Di serê yekî de gelek derd û pirsgirêk hebûn. **Divê hûn qet ji Farisê Mordem nexeyîdin, çimkî, van rojan **serê wî gelekî bimij û dûman e**.*

Serê (yekî) birin
Bi qelebalixê yan jî bi pir axaftinê serê yekî gêj kirin. Serî werimandin. **Wê şevê wî wisa xeber da ku **serê me bir**.*

Serê (yekî) birîn

Astengî derxistin, ji derfetekê yek mehrûm kirin. **Ez ê garsonekî wekî Baran zor bibînim, çûna wî* ***serê min birî****.*

Serê ço bigemar, binê ço bigemar

Di her hêlê de di nav rewşeke zor û bêçare de bûn. **Ez ketime nav derdekî wisa ku* ***serê ço bigemar, binê ço bigemar*** *e.*

Serê ço bigû ye, binê ço bigû ye.

bnr. Serê ço bigemar, binê ço bigemar

Serê (yekî) çûn

Ji ber xelebalixî yan jî deng, serî êşîn aciz bûn. **Ji ber dengê defa wan* ***serê me çî****.*

Serê (yekî) dagirtin

Raman û dîtina yekî wekî daxwaza xwe guherandin. **Keçika min berê wer nedifikirî, lê wî lawikî nizanim çawa kir û* ***serê wê wer dagirt****.*

Serê darik di erdê dan (Serê darê xwe li erdê dan)

Kûr kûr ponijîn. **Kuro çi ye, hema tu* ***serê darik di erdê didî****, nekeve tatêlê, çend rojan bi şûn de rewş dê baş bibe.*

Serê (yekî) di belayê de hiştin

Yek xistin nav rewşeke xeternak. **Ez çûm alîkariya wan, lê wan* ***serê min di belayê de hiştin*** *û ji wir baz dan.*

Serê (yekî) di ber de ketin

Ji xwe ve çûn. **Ji çi bû nizanim, me hew nihêrî ku* ***serê Perîxanê di ber de ket****, me bi zorê ew gihand nexweşxaneyê.*

Serê (yekî) êşandin

1. Rastî derd û pirsgirêkan hatin. **2.** Bi gelekî axaftinê yek aciz kirin. **Ji ber wê meseleya jinikê* ***serê min gelekî êşandin****. *Vî kutkutoyî ji êvar de* ***serê me êşand****.*

Serê (yekî) firandin

Serê yekî jêkirin. **Wezîr got, heke tu çareyekê ji keça padîşêh re nebînî, ez ê* ***serê te bifirînim****.*

Serê (yekî) genî kirin

bnr. Serî lê kirin dew

Serê (yekî) gihîştin perê esmanan

1. Ji bo serbilindî, şanazî û kêfxweşiyê tê gotin. **2.** Xwe qure kirin. Xwe zehf mezin hesabandin. **"****Serê Stalîn gihîştiye perê esmanan.*** *Navê wî li çol û çiya û li gund û bajaran tê gotinê: 'simbêl palik.'"* Veysel Çamlıbel **Enîs hingî bûye rêveberê wê saziyê* ***serê wî digihîje perê esmanan****.*

Serê (yekî) giranî cendekî wî kirin

1. Ji bo kesên ku li ecelê xwe digerin û çewtiyên mezin dikin tê gotin. **2.** Wekî qerf ji bo kesên ku serê wan naşixule û nejîr in tê gotin. **Baran avrûyên wekî tîrê li Serdar vena û got: "Wer dixuye ku **serê te giranî li cendekê te dike**, ez ê niha hesabê te bibînim." *Helbet ew nikare bixwîne, ma tu nabînî, **serê wî giranî li cendekê wî dike**.*

Serê (yekî) girê dan

Zewicandin. Kirin xwedî mal û hal. **Ji ber ku kesekî wî jî tune bû, Celîlê Xanimê bere-dayî mabû, lê kirîvê wî **serê wî girê da** û da ber malekê.*

Serê ... girtin

Bi kar anîn, qedandin. **Bi wan gotinan Rizgar **serê mijarê girt**.*

Serê hespê xwe berdan

Wekî dilê xwe tev gerîn. **Ji wê bûyerê bi şûn de, Hesen **serê hespê xwe berda**.*

Serê hev û din birin

Hev û din serwext nekirin. Hev û din gêj kirin. **Di nava ew qas saetan de wan tiştek nexiste serê hev, lê bi tenê **serê hev û din birin**.*

Serê hev û din xwarin

1. Bûn sedema mirina hev û din. **2.** Bi axaftin an jî teşqeleyekê hev û din aciz kirin. **Ew ew qasî bi hev ketin, heta ku **serê hev û din xwarin**. *Ji êvarê ve bi wê gengeşiyê Resûl û Celadet **serê hev û din xwarin**.*

Serê (yekî) ji ber ranebûn

1. Ketin nav rewşek pir fedîkar. **2.** Pir tirsîn, vekişîn. ***Dema ku derdiketim pêş xezûrê xwe, serê min ji ber min ranedibû**. **Faysal wer kiribû ku **serê jina wî li pêş wî ji ber ranedibû**.*

Serê (yekî) ji cih û balgiyan (nivînan) ranebûn

Tim nexweş bûn. **Heke **serê min ji cih û balgiyan rabûya**, jixwe wisa nedibû.*

Serê (yekî) ji ser kar ranebûn

Gelekî xebitîn. Pir xebatkar bûn. **Maşelalı **serê Bêrîvanê ji ser kar ranabe**.*

Serê (yekî) ji teq û reqê xelas nebûn

Ji derd û pirsgirêkan xelas nebûn. **Ew qirika Horîyê jî **serê wê tu caran ji teqe û reqê xelas nabe**.*

Serê (yekî) ji xaxê giran xelas nebûn

Serî di derd û belayên mezin de bûn. **"Gava ji zirîna te re çarekê bête dîtin, dibe ku **serê me jî ji xaxê giran rizgar bibe**." Feqî Huseyn Sağnıç*

Serê jina xwe girtin

Pêzewengî û qebraxî kirin. **A rastî heta wisa dike, bila here **serê jina xwe bigire**, hê baştir e.*

Serê kaniyê girtin

Li cihê girîng xwedî biryar bûn. **Wî **serê kaniyê girtiye**, kî dikare li pêş wî bisekine.*

Serê (yekî) ketin belayê

Rastî qeza yan jî belayekê hatin. **Ez kengê diçim mala wan, **serê min dikeve belayê**.*

Serê (yekî) ketin ser sîngê wî

Xemgîn bûn, moral xera bûn. ***"Mîr got: Ez tiştekî naxwazim û **serê wî ket ser sîngê wî**."*
Kamîran Bedirxan

Serê kêrê zikê zebeş

Di cehnema wan de, çawa dikin bila bikin. **Ji me re çi, wan bi xwe kiriye û ew bi xwe di demanê de ne. **Serê kerê zikê zebeş.***

Serê (yekî) kirin belayê

Yek di rewşeke zor de hiştin. **Wan di dawiya dawiyê de **serê Mehemed kirin belayê**.*

Serê ku naêşe girê dan

bnr: Serê ku neêşe, çima bendan lê girê bidim?!

Serê ku neêşe, çima bendan lê girê bidim?!

Li cihê tune çima pirsgirêkan derxînim? **Heyran, ma karê min tune ye ku ez **serê xwe yî neêşandî bendan lê girê bidim**?!*

Serê (yekî) li hev xistin

bnr: Mêjiyê (yekî) tevlihev kirin

Serê (yekî) li kevirê selînê neketin

Tê dernexistin. Aqil nehatin sêrî. Tênegîhiştin. **Bila ew niha wisa rehet rehet bipeyîve, hê **serê wî li kevirê selînê neketiye**.* (bnr. çîrok)

Serê (yekî) li şel û pelan ketin

Serî ketin derd û kulan. **Wê çaxê **serê me jî hema tim li şel û pelan diket**, lê me dîsa jî dev jê bernedida..*

"Serê (yekî) li kevirê selînê neketin"

Ew kevirê ku di merzel de datînin ser aliyê serê mirî. Li gorî dîtinên olî, dema ku yek dimire ew bi xwe nizane yê mirî ew e. Dibêjin yek miriye, yê mirî jî tevî civatê ji bo defnê û tiştên din mijûl dibe. Di dawiyê de ji bo qeysa gora ku vedane bipîvin çavê xwe digerînin ku ka kî di bejna yê mirî de ye. Ji yê mirî re dibêjin:
"Bejna yê mirî hema wekî ya te ye. Kerem bike werê xwe tê de dirêj bike em binêrin ka qeysa wê tam e yan na." Yê mirî xwe di gorê de dirêj dike û hema wê demê kevirê selînê didin hêla sêrî û piştre ji xesîlê û xweliyê diavêjin ser. Yê mirî hewl dide xwe ku rabe û xwe ji wê rewşa xeter xelas bike. lê serê wî li kevirê selînê dikeve. Wê demê ew têdigihîje ku yê mirî ew bi xwe ye. Ji ber wê jî dibêjin, heya ku serê miriyan li kevirê selînê nekevin, nizanin ku yê mirî ew bi xwe ne.

* Di guhertokeke din de mêvanek tê mala yê ku dimire. Piştî çend rojan bi şûn de mêvan dimire. Mêze dike ku jina wî gelekî ji bo mêvan digirî, ji jina xwe dikeve şikê ku têkiliyeke wê ya zayendî bi mêvan re di nav malê de çêbûye. Hê jî ew hay ji mirina xwe nîn e. Dema ku cinaet ji ser merzel diçe, tenê jina wî li ser merzel dimîne û bi şewat li ser de digirî. Wê demê zêdetir hêrsa wî tê, lê ji hêrsan çawa ku hewl dide ku rabe û di heqê jina xwe de bê, serê wî li kevirê selînê dikeve. Wê çaxê têdigihîje ku yê mirî hema ew bi xwe ye û jina wî jî loma wisa bi şewat giriyaye.

Serê lodê girtin

Gotina dawîn gotin. Dawî lê anîn, pirsgirêk qedandin. *"*Ev kar yeqîn ê kutabe û* ***serê lodê wê bê girtin****."* Musa Vazgali

Serê me serê xêrnediyan ji qirşika hatin; çûn zeregûniyan.

Em mirovinên bêşans in, tim dixebitin, tu caran vala namînin. **Ma ev jî jiyan e?* ***Serê me serê xêrnediyan ji qirşika hatin; çûn zeregûniyan.***

Serê min bi ard dîtiye, hew dizane ez qeraş im.

Hay ji rewş û hunera min a rasteqîn nîn e. **Ez çi bibêjim, kîloya wî ew qas e, ew jî ew qasî fêm dike.* ***Serê min bi ard dîtiye, hew dizane qeraş im.***

Serê min bikitan e, dilê min biqetran e.

bnr. Serê min bizêr e, bejna min bişehr e, dilê min bijehr e.

Serê min bizêr e, bejna min bişehr e, dilê min bijehr e.

Ji der ve zehf xweş xuyandin, lê di hundir de derd û kul û êş jiyîn. **Belê, dibe ku gelek di-xwazin li şûna min bin, lê nixabin* ***serê min bizêr e, bejna min bişehr e, dilê min bijehr e****.*

Serê min serê babelotê ye.

Serê min tim ji derd, kul û şeran rizgar nabe. **Nizanim sedema wê çi ye, lê her wê dizan-im,* ***serê min serê babelotê ye****.*

Serê min serê meşkduriyan e.

Ez herim ku derê, ez ji vê belayê xelas nabim. ****Serê min serê meşk duriyan e****, herime kîjan welatî her wê karekî li min bar bikin.* (bnr. çîrok)

Serê min serê qijika reş e.

bnr. Serê me serê xêrnediyan ji qirşikan hatin; çûn zeregûniyan.

Serê min şehkirî ye, derziya min jî di ber de ye.

Ez amade me. **Ji min re tu asteng nîn in.* ***Serê min şehkirî ye, derziya min jî di ber de ye.***

Serê mirov bi tayê xav girê dan

Bi derewan xapandin. **Ew heya ku* ***serê mirov bi tayê xav girê nede****, nikare bisekine.*

Serê nanekî şikandin

Zehf hindik xwarin xwarin. **Ka te çi xwar ezbenî? Te* ***serê nanekî neşikand****.*

"Serê min serê meşkduriyan e."

Mêrikekî kal, bê kar û bê bar li ber derê xwe rûdine. Jinekeke cîran tê bal wî û dibêje:
"Apo meşka min a dewkêyanê diriyaye, bi xêra xwe gelo tu dikarî bidirûyî?" Mêrik dibêje:
"Lawo ka bîne hela ez lê binêrim. Heke ku bikaribim, ez ê ji te re bibim alîkar." Jinik meşkê tîne, kalo wê hevraz û berjêr dike, diceđîne lê di dawiyê de meşkê didirû. Piştî dirûna wê meşkê, jinên derdor pê dihesin ku filan kalî meşka filan kesê dirûye, hema meşka kê ku kêmasiyeke wê hebe, tînin diavêjin ber kalo. (Jixwe li Kurdistanê ji bo karên wisa pere xwestin jî pir şerm e.) Rewş wisa dibe ku ji acizbûnê di dawiyê de kalo mala xwe dibe herêmeke pir dûr ku hinekî rehet bibe. Li wê herêmê kalo dîsa rojekê li ber derê xwe rûdine. Jinikek tê cem û dibêje:
"Apo meşka min a dewkêyanê diriyaye, serê te dişibîne serê meşkduriyan, bi xêra xwe tu dikarî meşka min bidirûyî?"

Serê (yekî) neçûn ser balifê
Qet ranezan. **Îşev mîşeva Xwedê, qundaxê nelişt* ***serê bûkê here ser balifê.***

Serê (yekî) pehn kirin
Zilm û tadeyî li yekî kirin. **Şakir* ***serê Aso pehn kir,*** *lê wê dîsa jî dev ji wî karî berneda.*

Serê (yekî) pekandin
Serî jê kirin. **Kesên ku nebûne misliman, wî serbazî* ***serê wan pekandiye.***

Serê (yekî) perçiqandin
Zilm û tadeyî kirin, ji holê rakirin. **Min ji te re got, heya ku* ***serê wî bêbavî neyê perçiqandin,*** *em nikarin bi rehetî bimeşin.*

Serê (yekî) pê ve girêdayî bûn
Di bi bandora kesekî yan jî tiştekî de bûn. Jêqetîn neguncan bûn. ****Serê me bi Quranê ve girêdayî ye,*** *şerîeta me çawa emir bike em ê wer bikin.*

Serê pîran, kîrê keran
Ji bo kal û pîrên ku karên ne layîq dikin û di rewşa ne li cih de ne tê gotin. ****Serê pîran, kîrê keran.*** *Ji vî temenî bi şûn de ev helwesta han a eletewş, Xwedê me biparêze.*

Serê (yekî) ranebûn
Fedî kirin, sûckar bûn. **Hingî qîza wî wisa kiriye,* ***serê Cindo di nav gel de ranabe.***

Serê (yekî) rehet bûn
Zêde pirsgirêk tune bûn. **Hingî me li ser xaniyê xwe çêkiriye,* ***serê me rehet bûye.***

Serê (yekî) rehet nehîştin
Yek aciz kirin. **Min got ez çend rojan hinekî bêhna xwe berdim, lê Gevezê* ***serê min rehet nehişt.***

Serê (yekî) serê Filîtê Quto bûn
Ji bo kesên xurt ku serê wan ji derd belayan naqetin tê gotin. ****Serê vî lawê min serê Filîtê Quto ye,*** *ji belayan xalî nabe.*

Serê (yekî) serê şeq û deqan bûn
Serî ji bela û qotikan, ji derd û kulan xelas nebûn. ****Serê min serê şeq û deqan e,*** *ji min re rehetî xeyal e.*

Serê (yekî) seriyê xêrnediyan bûn
Tim li rastî tiştên neyînî hatin. **"Di nav deh salan de ev jî cara sêyemîn e ku em weha koçber dibin. ...* ***Serê me serê xêrnediyan e,*** *xêrnediyan!"* Tosinê Reşît

Serê sihir (yek) bûn
Biesl û bingeh bûn. **Belê, gelek di nav wî karî de ne, lê esas* ***serê sihir Şîrîn Xanim e.***

Serê (yekî) sincirîn
Hêrs bûn. **Egît wilo ye, dema ku* ***serê wî sincirî,*** *divê kes xwe nexe hevalê wî.*

Serê (yekî) şûştin

1. Kuştin. Ji holê rakirin. **2.** Dek û dolabek anîn serê yekî. **Jinik û yarê xwe bûne yek û **serê mêrikê reben şûştin**. **Hevraz kirin, berjêr kirin, di dawiyê de **serê Ferzende şûştin** û ew televîzyon bi ser ve kirin.*

Serê (yekî) tevlihev bûn

Bi têkûzî nefikirîn. Der barê mijarekê de biryareke zelal nedan. **"**Serê wê tevlihev**, mîna lesareke şolî xwe avêtibû bextê bircan."* Fevzi Bilge

Serê (yekî) tijî kirin

bnr. Serê (yekî) dagirtin

Serê (yekî) wekî tara bêjingê bûn

Şaşwazî û metel bûn. **Ez qijikê Xwedê li hemberî dîmeneke wisa mame ku **serê min wekî tara bêjingê bûye**, nizanim çawa bikim.*

Serê (yekî) winda kirin

1. Yek kuştin. **2.** Bandora kesekî ji bo demekê hîs nekirin. **Mêrik xiste serê xwe, di dawiyê de **serê jina xwe winda kir**. **"Cemoya bûka piştperdeyê **serê mêrê xwe winda kiriye**, bûye benîştekî qanûkê yê qirçqirço, ketiye devê xelkê."* Musa Vazgali

Serê wî biard ji êş bê, kes jê bawer nake.

Ji bo kesên derewîn û sextekar tê bikaranîn. **Xebûr wisa kiriye, ku **serê wî biard ji êş bê kes jê bawer nake**.*

Serê (yekî) xebitîn

Biaqil bûn. ***Serê wê dixebite**, ma tu nanihêrî bê kete kîjan azmûnê bi ser ket.*

Serê (yekî) xistin tûr

1. Yek anîna ser rê, nerm kirin. **2.** Zewicandin. **3.** Li serê yekî dek û dolap çêkirin. **Rêzan gelekî serê xwe û qûna xwe li ba dikir, lê partiyê di dawiyê de **serê wî xiste tûr**. **Êdî rewşa wê dê bê guherandin, wan xwezgîniyan **serê wê xistine tûr**. **Wî sextekarî **serê Bahadînê belengaz xiste tûr**, pereyên wî jê girtin.*

Serê (yekî) xistin xaxan (Serî xistin xaxên giran)

Serî xistin derd û belayê. **Min çi zanibû ku ew qebrax dê **serê me têxe wan xaxên giran**?*

Serê (yekî) xistin bin çoka xwe

Yek xistin bin bamdora xwe. **A rastî heke bibêjin **serê Kawa xistine bin çoka xwe** ez tu car bawer nakim.*

Serê (yekî) xwarin

1. Bûn baysê mirina yekî. **2.** Gelek zor û zilm li kesekî kirin. **Jinikê ew qasî kire kûkekûk, di dawiyê de **serê mêrê xwe jî xwar**. **Heke ew pez neyê dîtin, axa dê **serê şivan bixwe**.*

Serê xwe berdan ber xwe

Fedîkar bûn. Bi şermiyê ketin. **"-Ez ji te hez dikim. Bi gotina wî re lemên çolan şax dan. Dar pişkivîn, ber dan, heta bi lawiran **serê xwe berdan ber xwe**."* Helîm Yûsiv

Serê xwe berjêr kirin
bnr: Serê xwe di ber xwe de berdan

Serê xwe ber xwe de kirin
bnr: Serê xwe di ber xwe de berdan

Serê xwe bi hev re yek kirin (Serî yek kirin)
Ji bo têkiliya jin û mêran a zayendî tê gotin. **Piştî wê têkiliya germ bi şûn de jinik û mêrik **serê xwe yek dikin***. (argo)

Serê xwe bilind girtin
Bişanaz bûn. Serê xwe netewandin. **Mirovên ku di rojên teng de jî **serê xwe bilind bigire**, mirovên hêja ne.*

Serê xwe bilind kirin
Li hemberî zor û çewisandinê li ber xwe dan, têkoşîn kirin. **"Lê îro vî gelê stûxwar û xalqela **serê xwe bilind kiriye**, dest daye hev. Li hember belavbûnê sekiniye."* Ehmed Kaya

Serê xwe danîn
1. Têk çûn. Teslîm bûn. **2.** Hemla xwe danîn. **3.** Mirin. **4.** Xwe dirêj kirin an jî razan. **Di wî şerê dijwar de wan ji bêgavî **serê xwe danîn** û malên xwe ji gund bar kirin. *Çavên te ronî, wa ye şikir bûka te **serê xwe daniye**. *Piştî wê nexweşiya giran Zelalê hêj di temenê xwe yê ciwan de **serê xwe danî**. *Min got ez hinekî **serê xwe daynim**, lê zarokan nelişt ku ez piçekî çavên xwe bidim ser hev.*

Serê xwe danîn erdê
bnr: Serê xwe danîn ser axa sar

Serê xwe danîn ser axa sar
Mirin. Çûyîna bal dilovanê xwe. **Ji yên berê ew mabû, wî jî **serê xwe danî ser axa sar**.*

Serê xwe dan
Canê xwe feda kirin. **Evdile ji bo wê dozê **serê xwe dide**.*

Serê xwe dayîn ber lingê (yekî)
Rûmet û nirxekî pir giran dayîn yekî. **Ez bi xwe jî bi wî ecêb mam, wisa dike ku **serê xwe dide ber lingê Perîxanê**.*

Serê xwe di ber ... de danîn
1. Serê xwe li ber tewandin. **2.** Xwe jê re feda kirin. **Wê bandoreka wisa da ser Xêro ku bû heyrana wê û **serê xwe di ber de danî**. *Wan gerîlayan **serê xwe di ber serxwebûn û azadiya welatên xwe de danîn**.*

Serê xwe di ber xelkê de şikênandin
Ji bo hinekên din, xwe êşandin. **Sebrî yekî bêaqil e, tim **serê xwe di ber xelkê de dişikêne**.*

Serê xwe di ber xwe de berdan

Fedî kirin, bi tawanbarî stûyê xwe xwar kirin. *"*Dilbiêş **min serê xwe berdida ber xwe.**"* Helîm Yûsiv

Serê xwe di kadîna kayê de dîtin
Rûmeta xwe nezanîn. **Jixwe ew belengaz wisan e, tu dibêjî **serê xwe di kadîna kayê de dîtiye**, heya êvarê qûna xwe danayne erdê.*

Serê xwe di riya hev du de danîn
Ji bo hev û din fedakarî kirin. **Ew her du tu car ji hev û din derbas nabin, çimkî wan **serê xwe di riya hev û din de danîne**.*

Serê xwe di (wê) oxirê de dan
Ji bo dozekê xwe feda kirin an jî ji fedakirinê re amade bûn. **Ji bo wê dozê pêşmergeyên Kurdan **serê xwe di wê oxirê de dan**.*

Serê xwe êşandin
Ji bo fêrbûn an jî çareseriya pirsgirêkekê di nav hewldanê de bûn. **"Lazim e em berê averûya dewletê fam bikin, li ser wan têgeyan **serê xwe biêşînin** ..."* Süleyman Çevik

Serê xwe girtin
Pêkhatin, çareser bûn. Tiştek an jî kêşeyek bi ser ketin. **Me jî bawer nedikir, lê me hew mêze kir ku wa ye wê doza wan **serê xwe girtiye** jî.*

Serê xwe, guhê xwe li ba kirin
bnr. Serê xwe, qûna xwe li ba kirin

Serê xwe hildan
Li hember derketin. **Heya yan **serê xwe lilnedan**, tu kesî qala wan nedikir.*

Serê xwe hildan û çûn
Bêserî û bêberî li çol û beseran ketin. **Jixwe lingê wî li hewa li ba dibûn, ji ber wan gotinên bavê xwe hêrs ket, **serê xwe lilda û çû**.*

Serê xwe jê filitandin
Xwe ji neyîniyekê rizgar kirin. **Dev jê berde lo, ancax ku min **serê xwe jê filitandiye**.*

Serê xwe jê re hejandin
bnr. Tiliya xwe li ba kirin

Serê xwe ji gorê rakirin
Ji bo tiştên bêguncan tê bikaranîn. **Xwezî bavê wî **serê xwe ji gorê rakira** û lê binêriya bê lawê wî çi bi serê gundiyan dike.*

Serê xwe kirin ber xwe
Têkildarî kesî nebûn, dengê xwe dernexistin. **"Law ji xwe re **serê xwe têxe ber xwe** û bi rehetî nanê xwe bixwe."* Fêrgîn Melîk Aykoç

Serê xwe kur kirin
Tawaneke fedîkar kirin. **Wê matoşqeyê **serê xwe kur kir**, çû li ser mêrik rûnişt.*

Serê xwe lê alandin
Ketin nav karekî nejidil û jê xelas nebûn. **Min **serê xwe li vî karê ajalan alandiye** û nikarim xwe jê xelas bikim.*

Serê xwe li ber (yekî) danîn (Serê xwe li ber danîn)
1. Têkçûn. **2.** Ji bo kesekî yan jî dozekê xwe feda kirin. **Wan jî mêze kirin ku pê re serederî nakin, di dawiyê de **serê xwe li ber danîn**. *Bi hezaran Kurdan **serê xwe li ber serokê xwe danîn**.*

Serê xwe li ber tu kesî netewandin
Li hemberî tu kesî dev ji gotina xwe bernedan. **Belê tu rast dibêjî, lê yê ku gotine derew kirine. Xelîlê ku ez dizanim, **serê xwe li ber tu kesî natewîne**.*

Serê xwe li dîwaran (keviran, zinaran) xistin
1. Poşman bûn, keys ji dêst çûn. **2.** Pir hêrs ketin. **Ew îro **serê xwe li dîwaran dixe**, lê her tişt demeke wê heye. *"Halıo, halıo!.. Ez ê **serê xwe li dîwar xim**!"* Sedat Yurtdaş

Serê xwe li kevirê mezin xistin
Ketin bin rîskeke mezin. **...çû **serê xwe li kevirê herî mezin xist**, lê di encamê de tu tiştek jî bi dest nexist.*

Serê xwe li qaqa reş asê kirin
Serê xwe kirin belayeke mezin. **Me kir û nekir Mendo bi gotina me nekir; di dawiyê de çû **serê xwe li qaqa reş asê kir**.*

Serî li ser xwe girtin
Pêkhatî, serbixwe û jîr bûn. **"Êdî nêçîrvanên pispor nêzîkî nêçîrên xwe yên ku êdî nikarin **serî li ser xwe bigirin** dibûn."* Nurettin Basut

Serê xwe li şel û pelan xistin
Ji bo pêkanîna tiştekî ketin nav her cure dijwariyê. **Zubêdê Hecî Mendo hevraz kir, berjêr kir, **serê xwe li şel û pelan xist**, lê di dawiyê de ew armanca xwe anî cih.*

Serê xwe li zinarekî xistin
Xwe li belayekê asê kirin. **Evîn ew qasî bitrî bûbû ku min dizanibû wê **serê xwe li zinarekî bixe**.*

Serê xwe netewandin
bnr: Serê xwe li ber tu kesî netewandin

Serê xwe pê (re) êşandin
Girîng girtin, pê re zêde mijûl bûn. **Tu ji bo çi ew qasî **serê xwe pê re diêşînî**. Dev jê berde.*

Serê xwe pê xwedî kirin

Pê debara xwe kirin. *"*Bavê min havînê diçû ber dewêr, lê zivistanê dibû xulamê wan, çimku zaro hûr bûn, heqê havînê têra me nedikir ku me **serê xwe pê xweyî kira**."* Erebê Şemo

Serê xwe pê mezin kirin

Xwe pê westandin, hetikandin. Serê xwe werimandin. **"*Ez ê **bi çi serê xwe mezin bikim**, rahêlim hevokên kê û di çavên şevşevokan de bigilçînim!"* Merdan Newayî

Serê xwe, qûna xwe li ba kirin

1. Nehatin ser riya rast. Astengî derxistin. **2.** Li hemberî kesekî gef xwarin. Xwe çireve kirin. **Ji ber berjewendiyên xwe wî jî hinekî **serê xwe, qûna xwe li ba kir**, lê di dawiyê de pejirnd. **Bila **serê xwe, qûna xwe li ba bike**, kes ji wî natirse.*

Serê xwe rakirin

Asê bûn, li hember derketin. **Piştî ew qas salan gel **serê xwe rakir**, her der tûr û tewas kir.*

Serê xwe ranekirin

bnr. Ji qalikê xwe derneketin

Serê xwe rehet kirin

Ketin rewşeke biaram. **Welat ew erebeya teqeze firot, **serê xwe rehet kir**.*

Serê xwe seqirandin

Bêhnvedan, serê xwe rehet kirin. **Ev sala şazdehan e, ku tenê min îsal li ber behrê çend rojan **serê xwe seqirand**.*

Serê xwe şikênandin

Xwe xistin nav zor û zerpê. **"*Em her roj dibe ku bi hezaran caran li ser zayenda peyvan (nêrtî û mêrtî) û tewangbariya kurdî **serê xwe didin şikênandin** ..."* Kawa Nemir

Serê xwe şûştin

1. Av li xwe kirin. Ser û sîçên xwe paqij kirin. **2.** Kincê jinan hatin. (Ji bo zarokanînê, xwîna peryodîk ji jinan hatin) **Min jî wê rojê **serê xwe şûştibû**, dorhêla xwe paqij kiribû. **Şikur ji Xwedê re ev du meh in ku keçika min **serê xwe şûştiye**, êdî em li benda zarokeke xweşik in.*

Serê xwe şûştiye, hena (hinc) xwe helmaştiye.

Karê xwe qedandiye. **Min li wê canikê nihêrî, ji zû de **serê xwe şûştiye, hena xwe hilmaştiye** jî.*

Serê xwe talde kirin

1. Têkildarî kesî nebûn. Bi xwe debara xwe kirin. **2.** Xwe ji hinekan veşartin. **Ew tenê **serê xwe talde dike** û li debara xwe dinêre. **Bi **serê xwe talde kirinê**, tu tenê xwe dixapînî, ezbenî.*

Serê xwe veke, deyl li bextê xwe ke.

Xwe bi gumaneke erênî bigire û têkeve nav. **Çi ye tu ew qasî vedikişî, **hema serê xwe veke, deyl li bextê xwe ke**.*

Serê xwe veke, li bextê xwe mêze ke.
bnr: Serê xwe veke, deyl li bextê xwe ke.

Serê xwe xistin belayê
Bi karên xeternak re mijûl bûn. **Bi têkiliya wan serseriyan re wî **serê xwe xiste belayê**.*

Serê xwe xistin ber xwe
bnr: Serê xwe kirin ber xwe

Serê xwe xistin bin cila xwe
bnr: Serê xwe talde kirin

Serê xwe xistin bin piçenga xwe
bnr: Serê xwe xistin nav pîlên xwe

Serê xwe xistin bin xopana xwe
Têkildarî kesî nebûn. **Lawo çi karê te bi wan ketiye, tu here **serê xwe têxe bin xopana xwe** û di cihê xwe de rûne.*

Serê xwe xistin curnekî (cuhurekî) vala
Bi karê pûç re mijûl bûn. **Lawo bi ya min be, te **serê xwe xistiye cuhurekî vala**, gavekî bi pêş de dev ji wî karî berde.*

Serê xwe xistin geremolê
bnr: Serê xwe xistin xaxên giran

Serê xwe xistin nav pîlên xwe
Miskîn, rûreş û fedîkar bûn. **Ji ber ku ya rastî derket holê Gemşoyê Ûsiv **serê xwe xiste nav pîlê xwe** û ji wir dûr ket.*

Serê xwe xistin xaxên giran
Serê xwe xistin qeza û belayên mezin. **Ev lawê min heta **serê xwe nexe xaxê giran**, rehet nabe.*

Serê xwe xwar kirin
bnr: Serê xwe tewandin

Serê xwe xwarin
Bi xwe ziyan dan xwe. **Wê çi kir bi xwe kir. Tenê **serê xwe xwar**.*

Serê xwe xwedî kirin
Bi xwe debara xwe kirin. **Heyran ka wî **serê xwe xwedî kiriye** ku jinekê jî bîne?*

Serê xwediyê berjêr kirin
bnr: Serê bavê xwe berjêr kirin

Serê Xuço, serê Niço, bi vî destî hat, bi vî devî çû, gurgumana min neçû.

Bi awayekî sextekarî û bi dek u dolaban xwe wekî bêsûc û paqij nîşan dan. *_Te dît bi gotina,_ ***"Serê Xuço, serê Niço, bi vî destî hat, bi vî devî çû, gurgumana min neçû."*** _got û ew jî xapand._

Serê du bendan negihandin hev

Karek baş pêk neanîn. Bêzereng bûn. *_"Tim difikirî. Li gorî xwe dixwest navekî li vê bûyerê bike, lê belê_ ***serê du bendan negihandibûn hev.*** _"_ Talip Kalın

Serên xwe danîn ser hev

Li hev û din xwedî derketin. *_Jixwe tenê ew mabûn, wan jî_ ***serên xwe danîn ser hev*** _û jiyana xwe wisa domandin._

Serên xwe kutan hev

Pev re tifaq kirin, pev re fikirîn. *_Wan herduyan_ ***serê xwe kutane hev,*** _di dawiyê de çareseriyek ji wê pirsgirêkê re dîtin._

Serêşî derxistin

Pirsgirêk derxistin. *_Farisê Evdileh hema tenê ji_ ***serêşî derxistinê*** _re xurt e._

Sergirtî gotin

bnr. Sergirtî xeber dan

Sergirtî xeber dan

Gotina xwe rasterast negotin. Bi pêyaman peyivîn. Bi dizî gotin. *_Erê, Rozerînê bi awayekî_ ***sergirtî xeber dida,*** _lê her kesî dizanibû ku ew keviran diavêje kê._

Serhev û binhev kirin

bnr. Serobino kirin

Serhevde dayîn serê (yekî)

Kêmasî û çewtiyên yekî li rûyê wî/ê xistin. *_Dedêya Çîlê_ ***serhevdeyên wisa dane serê Zezê*** _ku me ji ber wan ve şerm kir._

Serhingî di barê kerê de ye. (Serhing di barê kerê de, di tayê tûlê de ye.)

Hay ji xwe hebin! Li dor we yên ku van gotinên we ji mixataban bibin hene. *_Oro hevalo, hay ji xwe hebe!.._ ***Serhingî di barê kerê de ye*** _ha!_ (bnr. çîrok)

"Serhingî di barê kerê de ye."

Li parêzgeha Îdirê, li navçeya wê ya Qulpê (Tuzluca) kurd her sal biharê dertên zozanan û heya payîza dereng li wir dimînin. Pênc mehan zêdetir debara ajalan li wir dikin, dû re dîsa tên bajêr. Ji van eşîrên kurdan a Kûloyan jî her sal dertên zozana bi navê Deholê. Dema êlat koça xwe bar dike gelek xirecir çêdibe. Firaq, zarok, mirîşk, kûçik, hinek heywanên nexwaş, kor û topal, kal û pîr tev de dibin sedema xirecireke mezin. Tevî zozanvanan hesp, ker û gayên ku baran dibin, zor, tatêl û xiroşa warekî nû û jiyanek cuda tevlî hev dibin. Carekê dîsa êlata Kûloyiyan koça xwe bar dike. Baran jî hûr hûr dibare. Malbatek ji wan jî di nav vê xirecirê de kon, çît, zed û firaqên xwe li ga û keran kirine û bi dijwarî koça xwe diajon. Bûka malê ya herî mezin ango Perê, lawê xwe yê herî piçûk ê bi navê Serhing û tûleyê dêlika belek, her yek xistiye tayekî têrê û avêtiye ser pişta kerê. Ji ber ku baran jî dibare, ji bo ku şil nebin, cileke piçûk û zirav jî avêtiye ser wan. Koç li rê rêz bûye. Ji ber ku barê wê sivik e, ker zû diçe. Wisa zû diçe ku ji koça herî paşîn diqete, diçe xwe digihîne koça pêşîn. Koça pêşîn jî, her du jintiyên Perê diajon. Ji ber ku kes li dor wan tune, her du jintî, him koçê diajon, him jî xeybê Perê dikin. (Çimkî di wê demê bandora jintiyên mezin û tahdeya wan gelek caran ji ya xesûyan xerabtir bû.) Ew kera ku di barê

Serhişk bûn

Asê bûn, bi zorê îkna bûn, biink bûn. **Ew yekî pir **serhişk e**, tu nikarî çend rojan tenê wî serwext bikî.*

Serhişkî kirin

Inyad kirin. **"Gava ew hatin, ez ê tiştekî ji te bixwazim. Lê tê **serhişkiyan bikî** û wê daxwaza min pêk neyînî."* Zinar Soran

Seriyek çortan e û birek xizan e.

Ji bo tiştên têrnekirî û hindik, lê daxwazî zêde be tê bikaranîn. **"Ez jî şaş mame ku ez alîkariya kê bikim, **seriyek çortan e, û birek xizan e**."* Bozan Yaman

Seriyekî bêdeng bûn

Zêde nepeyivîn, sefîl bûn. **Ew lawê wî yê navîn, hema **seriyekî bêdeng e**.*

Seriyê hespê (yekî) nerm bûn

Milayîm û sist bûn, sernerm û bêink bûn. **"**Serê hespê wî yî nerm e**, ew bi ya mirov dike."* Bozan Yaman

Seriyo tu bi qurbana lingan bî.

Ji bo karê rêveçûnê tê gotin. **Divê min di demeke kurt de xwe bigihanda wir, min got, **seriyo tu bi qurbana lingan bî** û ez meşîm, meşîm...*

Serî bi aliyekî, qûn bi aliyekî de çûn

Tevlihev û bêsazûman bûn. **Kuro tu çi ji wî hêvî dikî? Ma tu nabînî, wa ye **serî bi aliyekî, qûn bi aliyekî de diçe**?*

Serî li xwe nemzin kirin

Gelekî fikar kirin, xem xwarin, çareserî nedîtin. **Rebenê Mehmûd di derbarê meseleya Rohat de bi tenê **serî li xwe mezin kir**, lê tu çareseriyek jî nedît.*

Serî dan

1. Pişkivandin, gihandin, ber dan. **2.** Canê xwe feda kirin. **Îsal genimê me zû **serî da**. *Wan ciwanan, di wê oxirê de **serî dan**.*

Serî di ber de bûn

1. Bêdeng bûn. **2.** Fedî kirin. **3.** Pir zana, xinîs û ji bin ve bûn. **Xidir mirovekî **serî di ber de ye**, karê wî bi kesî tune. *Ji jinan vedikişe. Tu çi bibêjî, **serî di ber de ye**, çavên xwe jî ji wan diguhere. *Hay lo lo! **Serî di ber de ye**, lê ez dizanim bê ew çi segbav e.*

---

wê de Serhingê kurê Perê û tûleyê dêla belek heye jî hema li pêş wan dimeşe. Lê ji ber ku cil li ser wan e, her du jintî lawik nabinin. Ango haya jintiyan ji Serhing tune. Tim xeybê Perê dikin. Çi tê ber devê wan ji Perê re dibêjin. Serhingê lawê Perê yê ku di tayê têrê de ye jî wan gotinên wan yek bi yek dibihîze. Koç tên warên nû, barê heywanan datînin, kon û çîtên xwe vedigirin. Serhing xwe digihîne diya xwe û tiştên ku bihîstine yek bi yek ji diya xwe re dibêje. Perê diçe ser her du jintiyên xwe, bi wan re dike şer û dipirse:

"Hûn şerm nakin xeybê min dikin?" Jintî ji ber ku bi xwe bawer in ku kes li wir tune bûye. Înkar dikin û dibêjin:

"Ka me li bal kê gotiye, bîne bila li rûyê me bisekine." Perê jî bi xwe gerah qirika xwe diwerimîne û dibêje:

"Serhingî di barê kerê de, di tayê tûlê de bû!.."

Serî bi erdê de bûn

1. Şermok û bêdeng bûn. **2.** Xemgîn û dilşikestî bûn. **Tu ziyan ji wî nayê, ew mirovek **serî bi erdê de ye**. **Ji ber derd û kulan hema **serî bi erdê de ye**.*

Serî germ bûn

bnr. Serê (yekî) sincirîn

Serî gihîştin esmanan

bnr. Serê (yekî) gihîştin perê esmanan

Serî hebûn, binî tune bûn

Ji bo tiştên pir mezin û dirêj tê bikaranîn. **Maşelah baxçeyekî wî yî wisa heye ku **serî heye, binî tune ye**.*

Serî jê standin

1. Xistin bin bandora xwe. **2.** Zêde bi pêş de çûn. **Me Rêzan sparte wî, lê Rêzanê **serî ji wî stand** û ew xiste bi bandora xwe. **Zubeyde lê xwedî derket, ew perwerde kir, Cindî **serî jê stend** û kar bire radeyek hê bilindtir.*

Serî ji belayê xelas nebûn

bnr. Serê (yekî) ji teq û reqê xelas nebûn

Serî ji derd û kulan xelas nebûn

bnr. Serê (yekî) ji teq û reqê xelas nebûn

Serî ji êqil êşîn

Ji bo kesên gêj û bêaqil tê gotin. **Maşelah Ferhat wisa biaqil e ku **serî ji êqil diêşe**.* (qerf)

Serî ji felekê re daneynîn

bnr. Serê xwe li ber tu kesî netewandin

Serî ji kesî re daneynîn

bnr. Serê xwe li ber tu kesî netewandin

Serî ji teşqeleyan qut nebûn (Serî ji teşqela xelas nebûn)

bnr. Serê (yekî) ji teq û reqê xelas nebûn

Serî ketin ber

Bi şermiyê ketin, pozîde bûn. **Wî jî dema ku ya rastî û wateya kirina xwe fêm kir, **serî kete ber**.*

Serî ketin gerînekê

Di nav bela û qotikê de xeriqîn. **"Êş ket hestiyan. Gelek **serî ketin gerînekê**, gelek dilan bi destê hev û din girtin û govend gerandin."* Helîm Yûsiv

Serî ketin nav teşqeleyê

bnr. Serê (yekî) ji teq û reqê xelas nebûn

Serî ketin teq û reqan
bnr. Serê (yekî) ji teq û reqê xelas nebûn

Serî kişandin
Pêşengî kirin, rêveberî kirin. **Di yên din de ne ew wêrektî, ne jî ew aqil heye, yê ku **serî dikişîne** Bawerê Medînê ye.*

Serî lê bûn beroş
bnr. Serî lê bûn tevnî

Serî lê bûn dew
bnr. Serî lê bûn tevnî

Serî lê bûn dolab
Serî lê gêj bûn. **Heyran ji we tika dikim, **serî li min bû dolab**, bes e êdî.*

Serî lê bûn kewara mêşan
bnr. Serî lê bûn tevnî

Serî lê bûn tevnî
Gelekî aciz bûn, betilîn, serî werimîn, mêjî baş neşixulîn. **Heya min ew pirsên wê pirtûkê bersivandin û ew vatinî çêkir, **serî li min bû tevnî**.*

Serî lê dan
1. Di nav re bihurîn, dîtin, li rewşê nihêrîn. **2.** Ji bo daxwazekê xwe gihandin sazî, rayedar an jî derekê. **3.** Nexweş an jî hin kes ziyaret kirin, li hal û wextê wan pirsîn. **Dema ez çûm welat, min **serî li şaredariya Bazîdê jî da**. *Ji bo dersên ziman em ê **serî li şalyariya perwerdehiyê bidin**. *Dibêjin Xunav nexweş e, divê em **serî lê bidin**.*

Serî lê doç bûn
1. Serî lê zivirîn, di hêla tenduristî de demeke nebaş derbas kirin. **2.** Ji ber bûyereke pir erênî yan jî neyînî biheyecan û xiroş bûn. **Piştî xwarinê, ji nişka ve **serî li Zînê doç bû**. *Wê çawa keça xwe ya windakirî li pêş xwe dît, **serî lê doç bû**.*

Serî lê doç kirin
Yek di bin bandora xwe de hiştin. **Bi evîna xwe jinikê **serî li Xalid doç dikir**.*

Serî lê gêj bûn
bnr. Serî lê doç bûn

Serî lê gêj kirin
Bi axaftin û gotinan yek aciz kirin. **Îşev êvar de Silêman **serî li min gêj kir**.*

Serî lê gerîn
bnr. Serî lê doç bûn

Serî lê giran bûn
bnr. Serî lê bûn tevnî

Serî lê kirin dew
Zêde axaftin, yek aciz kirin. **Çend rojan li wir mam lê Xwedê dizane ku Zerdê **serî li min kire dew**.*

Serî lê mezin bûn
bnr. Serî lê bûn tevnî

Serî lê werimandin
bnr. Serê (yekî) birin

Serî lê werimîn
bnr. Serî lê bûn tevnî

Serî li ber (yekî) çemandin
Li pêş kesekî şêlafî kirin. **Ku mirov **serî li ber kesekî biçemîne**, bi tenê mirov rûmet û rêza xwe kêm dike.*

Serî li kevirê hedê ketin
bnr. Serê (yekî) li kevirê selînê neketin

Serî li qûnê, qûnê li sêrî xistin
Karekî netêkûz û bêpergal kirin. **Tu xêr ji wî nayê, ew **serî li qûnê, qûnê li sêrî dixe**.*

Serî li ser balgiyekî danîn
1. Zewicîn. **2.** Ked dan hev û din, bi hev û din re rojên qenc û xerab derbas kirin. **Divê tu baş binirxînî, çimkî hûnê **serî li ser balgiyekî daynin**. *Wisa ji hev du re gotinên xerab digotin ku; te digot ew ên ku deh salan **serî li balgiyekî danîne ne ew bûn**.*

Serî li ser hejîn
1. Ji ber nexweşî yan jî zêde jarbûnê di nav rewşeke xerab de bûn. **2.** Ji bo xirabî û fesadiyê di nav hewldanê de bûn. **Belengazê Xalê Fêris êdî **serî li ser diheje**. *Serê **Zekoyê Qeşmer li ser diheje**, gelo dîsa ji bo kê li dek û dolaban digere?*

Serî li ser nesekinîn
bnr. Serî li ser hejîn

Serî li ser lîstin
Çavbel û di cihê xwe de nesekinîn. **Ew çi Şeytan e, tu nabînî, çawa **serî li ser dilîze**?*

Serî li ser rehekê man
Gelekî jar û lawaz bûn. **Leyla ketiye rewşeke wisa ku **serî li ser rehekê maye**.*

Serî li teht ketin
Aqil hatin sêrî. **Heya **serî li text ket**, jixwe, derengî ketibû.*

Serî pê re dernexistin
Pê nikaribûn. Pê re serederî nekirin. **"Paşê min lê nihêrî ku ez **serî pê re dernaxim**, min dev ji tapû û qoçanan jî berda, dîsa ez rizgar nebûm."* Feqî Huseyn Sağnıç

Serî pê re neçûn

Bêpergal, bêdenge û netêkûz bûn. **Karên ku **serî pê re neçe** jî ew qas dibe, jixwe zêde kêr jê nayê.*

Serî pê re nekirin der

bnr: Serî pê re dernexistin

Serî pê ve neman

Ji ber êş an jî deng û teşqeleyê aciz bûn. **Îşev ji êvarê de di dest defa van mirtivan, **serî bi min ve nema**.*

Serî qûç e, binî pûç e.

1. Xuyangê baş xuyandin, lê bingeh û naverok vala bûn. **2.** Bêsexbêr bûn, kom nekirin. **Ez bi şev û roj dixebitim, ew qas pereyan qezenc dikim, lê mixabin **serî qûç e, binî pûç e**.*

Serî sabûn kirin

bnr: Serê (yekî) şûştin

Serîserteşî, qûndoxteşî

Ji mirovên bedcure û rewşa eletewş, ecêb û sosret re tê gotin. **Na heyran na, ji rûyê vê **serîserteşî, qûndoxteşî** tu xêr nayê.*

Serî şahîtok e, binî tijc buhok e.

bnr: Ji ser ve tûtik û şûtik, ji bin ve rişk û nûtik

Serî şarîn e, binî behrîn e.

Ji bo tiştên lihevnehatî û eletewş tê bikaranîn. **Tu li xuyanga wê ya xweşik mêze neke, **serî şarîn e, binî behrîn e**.*

Serî şixulîn

bnr: Serê (yekî) xebitîn

Serî û guh lê miz dan

Li yekî xistin. **Zarokên taxa me **serî û guh li wî axozî miz dane**.*

Serî tevlihev kirin

bnr: Mêjiyê (yekî) tevlihev kirin

Serî tewlo mewlo bûn

bnr: Serî lê bûn tevnî

Serî tijî kirin

bnr: Mêjiyê (yekî) şûştin

Serî û çav nezanîn

bnr: Heke peke tune bûn

Serî wekî gerînekê bûn
bnr: Serî lê doç bûn

Serî xişt e, binî devî
Xuyang xweş tê xuyan lê binî ezûmeta reş û giran e. ***Serî xişt e, binî devî.** *Erê bavo, ji der ve xelkê dişewitîne, ji bin ve jî min dişewitîne.*

Serî xweş kirin
bnr: Serê (yekî) xwarin

Serî yek e, pê çar in, bihejmar in.
Kifş û belî ne, xuya ne. **Hûn hesabê çi dikin? Jixwe her tişt li meydanê ye. **Serî yek e, pê çar in, bihejmar in.** (qerf)

Serîgir e, barnebir e.
Li gorî qalibê xwe nebûn. **Tu wisa li xuyanga wî menêre, ew yekî **serîgir e, barnebir e**.

Serîkî çortan e, binikî mêvan e.
bnr: Serî şarîn e, binî behrîn e.

Serîşûştî, kezîvegirtî bûn
Pîr û pêşk û di nav rewşeke erênî de bûn. ***Serîşûştî, kezîvegirtî ye**, ma êdî ji wê pê ve çi ji Xedê dixwaze?*

Serjêkirî man
Ji derfeteke girîng mehrûm man. **Jixwe debara wê bi wan dibû, zarokên wê çûn, rebena Rewşenê **serjêkirî ma** li holê.*

Serjêr çakûç, berjêr çakûç
Tenê bi hêviya kesekî yan jî tiştekî ve man. Bêvebijark bûn. ***Serjêr çakûç, berjêr çakûç.** *Ma ji bilî min kes tune li vî welatî ku xizmeta we bike?*

Serjinikî
Wekî jinan tevgerîn. **Bi mêrê weke wî **serjinikî** re ez tu car nazewicim.*

Serkele bû, îro bûye qûş.
Bi awayekî tinaz ji bo kesên ku her diçe rewşa wî xera dibe û qedrê wî namîne tê gotin. **Ev jî îşê dinyayê ne. Hogir **serkele bû, îro bûye qûş**. (qerf)*

Serkele sîrebend qetandin (Serkele sîrebend di ser xwe re avêtin)
Ji rê û diraban derketin. Zehf zêde bi pêş de çûn. **Lawê wî ku şehîd ket, Beko jî **serkele sîrebend qetand** û çû nav refên gerîlayan.*

Serkut berkut kirin
Tevlihev kirin, hewlo gewloyî kirin. **Me got wê xweşik çêke, lê mixabin hema **serkut berkut kiriye** û avêtiye wir.*

Serkut kirin
Hesab pirsîn, îfade girtin. **Dibêjin, Eledîn Şêxmûs **serkut kiriye**.*

Sermezin a lingpiçûk, wê li malê bikin bûk.
bnr. Ser mezin a pêpiçûk, xwezil li wê malê tu lê bibî bûk.

Sermezin a pêpiçûk, xwezil li wê malê tu lê bibî bûk.
Yên sermezin û pêpiçûk meqbûl in. **Di piçûktiya min de pîrika min ji min re digot: **"Sermezin a pêpiçûk, xwezil li wê malê tu lê bibî bûk."***

Sermit e, qûnrût e.
Ji bo rewşa çiloçepî tê bikaranîn. **Min tu tişt ji wê fêm nekir. Ew yeke **sermit e, qûnrût e**.*

Sernerm
Milayîm û rûnerm bûn. **Zavayê me mirovekî **sernerm** û baş e.*

Serpiçûk a pêmezinê, ne xwezî li wê malê tu lê bibî jinê.
Jinên serpiçûk û pêmezin ne meqbûl in. **Divê tu vê biwêjê jî ji bîr nekî: **Serpiçûk a pêmezinê, ne xwezî li wê malê tu lê bibî jinê.***

Sero neêşe, dersûkê neavêje.
Bingeh û rewş çawa be dê wekî wê encam bide. **Qet bila kesek gazinên xwe neke. **Sero neêşe, dersûkê neavêje.***

Sero sero, te çi xwaro?!
bnr. Ava sarê, di ser çi de diçî xwarê? (**bnr. çîrok**)

Serobino bûn
Tevlihev bûn. Rewş hatin guherandin. ** *"Agir di celebekî din digilurî. Biryara dilê wî jî hêdîka **serobino dibû**."* Musa Vazgali

Serpê pelıtin, pê li hev hatin.
Bi sedema tiştekî pir piçûk helwest guherîn. ****Serpê petin, pê hev hatin.** Tu li wan menêre, ew mirovnên wilo ne.*

Serqot û pêxwas
Feqîr û xizan bûn. **Ew **serqot û pêxwas**, çawa dewa qîza Nacî Begê dike?*

Serqoto ber baranê, pêxwaso ber garanê
Ji bo rewşa xizanî û perîşaniyê tê gotin. **Ma we çi ji wê rewşa belengaziyê hêvî dikir? **Serqoto ber baranê, pêxwaso ber garanê.***

Sersarî kirin
Girîng negirtin, guh nedan, bi awayekî germ nêzîk nebûn. **Ew mesele ji bo xaltiya Fatê pir girîng e lê Hozan **sersariyê dike**.*

Sersoîî, dilkafir bûn

Ji bo kesên bi xwe xerab in lê xwe wekî mirovên baş, oldar û paqij didin xuyandin tê bikaranîn. **Hay hûn nizanin ew çi* ***sersofî û dilkafir e.***

Serwext kirin
Îkna kirin. Dan fêrkirin. **Ya Xwedatî bi çend gotinan wê em* ***serwext dikirin***.

Sewaba (...) li hev ketin
Şibandin hev. ****Sewaba wan li hev dikeve,*** *çawa ku min ew dîtin, min zanibû ku birayên hev in.*

Sewdeserî bûn
Bi çol û beyaran ketin. **Di dawiyê de ew jî* ***sewdeserî bû*** *û ji holê winda bû.*

Sewt bi ser neketin
Nepeyivîn. **Ew qas saet em li bal hev man, qet* ***sewt bi ser wî neket***.

Seyda xwe nake ji her du eydan
Ji bo kesên zêde çavçil û kone tê bikaranîn. **Hay lo lo! Ew çi zane ye,* ***seyda xwe nake ji her du eydan***.

Seyrê rebenê hat li me kernemût, ez mam û kerê gewrîrût. (Seyrê rebenê hat li me Newroz, ez mam û gewrîboz.)
Mala min wêran bû û tiştekî min nema. **Êdî ez çi bibêjim?* ***Seyrê rebenê hat li me kernemût, ez mam û kerê gewrîrût.***

Sê kêl bi kevirekî walgerandin
Bi hewldanekê, çend kar bi hev du re hel kirin. **Hay ew çi pêk hatiye haa! Wî* ***sê kêl bi kevirekî walgerandin***.

Sê telaqê xwe avêtin
1. Sonda mezin xwarin. **2.** Jina xwe berdan. **Cevzet* ***sê telaqên xwe diavêje****, lê dîsa jî kes jê bawer nake. *Hema li cihê sekinî* ***sê telaqên xwe avêtin*** *û jina xwe avêt ber dêrî.*

Sê zebeş bi hev du re hildan (Sê kal bi hev û din re hembêz kirin)
Dest avêtin karên ji hêza xwe mezintir. **Niyeta wî ne cidî ye. Çimkî* ***sê zebeşan bi hev du re hildide***.

Sêla min kevir e, ji minetan çêtir e.
Malê mirov çiqasî kevin an jî xerabe be jî, disa ji mineta xelkê çêtir e. **Dilê min çawa dixwaze wisa dikim.* ***Sêla min kevir e, ji minetan çêtir e.***

Sêlê nanê (yekî) nepehtin
Ji bo kesên neheq û tawanbar tê bikaranîn. **Heke tu wan qenciyên Ciwanazê neşikirînî,* ***sêl nanê te napêje***.

Sênca (yekî) şikandin
Moral û şewqa kesekî xera kirin. **Gelek pêşnûma û hernemayên wê hebûn, lê Hemidya bi zanetî astengî jê re derxistin û* ***sênca wê şikand***.

Sênca (yekî) şikestin

Moral û şewq xerab bûn. **Heke **sênca Azad neşikesta**, heya dawî kes nikaribû li pêş wî biketa.*

Sêrî têxî kolika (kodika) qêtix, spî dernaye.

Ji bo mirovên pir kone û qurnaz tê gotin. **Çem, mirovekî wisan e, ku tu **sêrî têxî kodika qêtix, spî dernaye**.*

Sêv sor e, lê kụ kurmî nebe.

Bedew bûn, heya tenduristiya baş, ango kêmasî û nexweşî tune be didome. **Baş li xwe miqate be, **sêv sor e, lê ku kurmî nebe**.*

Sêva sor e, her kes keviran diavêjiyê.

Çavê her kesî li ya xweşik e. **Wisa zehf xwe aciz neke lawo, **sêva sor e, her kes keviran diavêjiyê**.*

Sêvek li darê ye, çavê her kesî lê ye, kes nizane qismetê kê ye.

Gelek kes dikarin tiştekî yan jî kesekî (bi taybetî keçikan) daxwaz bikin, lê yek kes lê dibe xwedî. **Ew jî nesîb e ezbenî, **sêvek li darê ye, çavê her kesî lê ye, kes nizane qismetê kê ye**.*

Sêvek û gayek li cem (yekî) yek bûn

Ji bo kesên merd û destvekirî tê bikaranîn. **Zahar mirovekî wisan e ku, **sêvek û gayek li cem wî yek e**.*

Sêwiya/ê ser qumatkê˙ (bûn)

Sêwiyên piçûk û virnî bûn. **Bêbav, tu çawa gunehê vê **sêwiya ser qumatkê** hildidî?*

Sêwiyên li ber dîwaran bûn

Di nav rewşek xerab de bûn. **Keleş wekî **sêwiyên li ber dîwaran**, li holê mabû.*

Sî xwar bû, pale har bû.

Mirov di nav hawira rehet de baştir dixebite û diafirîne. *****Sî xwar bû, pale har bû.** Hawir di afirandinê de girîng e.*

Sibat dibêje: "Xwîşka adar, bide min sê rojê xedar, ez lingê gîsikê bigirim, ji sergeh bikime xwar."

bnr: Sibatê bang kir adarê, got: "Sê rojan bide min bi deyn, ez ê gîsikan ji tehtan bînim xwarê.

Sibat e, selewat e.

bnr: Sibat e, libat e.

Sibat hat û bihurtî, nav dilê gîsikan bezgirtî.

Piştî meha sibatê zêde xeterî namîne. **Jixwe ji **sibatê bi şûn de Newroz e, sibat hat û bihurtî, nav dilê gîsikan bezgirtî**.*

Sibat tiro viro, adar ma bîst û du ro.

Meha sibatê kin e û bi awayekî derbas dibe, ya girîng heya xwe gihandina bîst û duduyê adarê, ango Newrozê ye. **Rewşa wê demê wiha tê ziman.* ***Sibat tiro viro, adar ma bîst û du ro.***

Sibatê bang kir adarê, got: "Sê rojan bide min bi deyn, ez ê gîsikan ji tehtan bînim xwarê."

Li herêma Tor û Botan ji bo xedarî û zora meha sibatê tê gotin. **Ma te nebihîstiye ku dibêjin: "Sibatê bang kir adarê, got: "Sê rojan bide min bi deyn, ez ê gîsikan ji tehtan bînim xwarê."* (bnr. çîrok)

Sibatê bang kir adarê, got: "Xwîşka min adarê, bide min çend rojê xedarê, ez ê gîskê ji tehtê bînim xwarê.

bnr. Sibatê bang kir adarê, got: "Sê rojan bide min bi deyn, ez ê gîsikan ji tehtan bînim xwarê.

Sibatê gote adarê: "Xwehka min adar, tu bide min du rojên xedar, da ez gîskê di ting ve bikime xwar."

bnr. Sibatê bang kir adarê, got: "Sê rojan bide min bi deyn, ez ê gîsikan ji tehtan bînim xwarê.

Sibe li ku, êvar li ku?!

Ji bo kesên derengmayî re tê bikaranîn. **Lawo xwedigiravî tu yê sibe zû bihatayî ser kar,* ***sibe li ku, êvar li ku****?*

"Sibatê bang kir adarê, got: 'Sê rojan bide min bi deyn, ez ê gîsikan ji tehtan bînim xwarê.'"

Wekî hûn jî dibînin di van hemû biwêjan de meha Sibatê ji adarê rojan dixwaze ku gîskê perîşan bike. Di nivîseke xwe de Birêz M. Emîn Bozarslan li ser mîtolojiya mehan vê bûyerê bi vî awayê jêrîn tîne ziman:

"Li gor baweriyeke berê a kurdan, di demên berê (her yek ji) -meha- Kanûna Paşîn û Sibatê û adarê 30 roj bûye. Meha adarê zordestî li sibatê kiriye û rojeke wê bi zorê jê standiye. Bi vî awayî rojên wê bûne 31, ji sibatê re jî 29 roj mane. Salekê di roja 30'ê kanûna paşîn da hewa gernn û xweş bûye (dibe). Hingê gîskek ji axûra xwediyê xwe derketiye û çûye li ser sergoyekê li wir bi kêf lotik dane xwe, qîriyaye û gotiye:

'Kanûn bihurîn bi lez e,
Gurçikên min girtin beze.
Kanûn hatin û buhirîn,
Gurçikên min di bez de ficirîn.'

Li ser vê yekê kanûna paşîn pir hêrs bûye, li gîsikê hatiye xişmê; xwestiye ku bapûkek rake, virtoneyekê derxe û bi vî awayî ceza bide gîskê û wê bifetisîne. Lê ji ber ku ew roj roja wê ya paşîn bûye nekariye wê daxwaza xwe bîne cih. Ji neçarî deng li cîrana xwe Sibatê kiriye û jê xwestiye ku rojek ji rojên xwe bide wê, da ku bikaribe bapûk û virtone li gîsk çêke. Lê ji ber ku Sibat 29 roj bûye, nekariye daxwaza Kanûna Paşîn bîne cih. Jê re gotiye:

'Rojên min jixwe kêm in; ez nikarim rojek jî bidim te û rojên xwe kêmtir bikim. Lê rojeke Adarê zêde ye ji wê bixwaze, bila ew rojekê bide te.' Hingê Kanûna Paşîn deng li Adarê kiriye û gotiye:

'Xwîşka Adar,
Bide min rojeke dijwar,
Ez gîsk di sergo de bikim xwar.'

Lê Adarê daxwaza wê qebûl nekiriye. Li ser wê yekê Sibat neçar maye û daxwaza wê qebûl kiriye. Digel rojeke wê kêm bûye jî rojeke xwe jî daye Kanûna Paşîn. Bi vî awayî Sibat rojek din jî kêm bûye û bûye 28 roj. Kanûna Paşîn jî bûye 31 roj. Vêca Kanûna Paşîn keys li gîskê aniye; di bermahiya roja 30'yî û roja 31'ê da gelek berf barandiye, virtone û bapûkeka dijwar çêkiriye û gîsk fetisandiye. Aha bapûka wan her du rojan bi wî awayî bûye gît û her car di wan her du rojan de gît çêdibe. Ji ber ku ew bapûk li dijî wê gîskê çêbûye, navê wê gîtê bûye gîskok û bûye çîvanokeke Kurdî.

***Gît**: Ji bo bûyera ku mirov nikare pêşiyê bigire û bisekinîne tê gotin.

Sibehê mirina kedkaran hat, êvarê mirina axayan hat.
Ku kedkar nebin, serdest nikarin wer rehet bijîn. ***Sibehê mirina kedkaran hat, êvarê mirina axayan hat.*** *Yên ku vê yekê napejirînin, an bêfem in an jî bi zanetî wer dikin.*

Sibê çêkirin, êvarê xera kirin
Bêbiryar û bêîstikrar bûn. **Min tu tişt ji ya wî fêm nekir,* ***sibê çêdike, êvarê xera dike.***

Sibê rovî, êvarê kovî bûn
Demdemî bûn, bêdenge bûn. **Kes nizane ev jinika li ser çi ye û li ber çi ye?* ***Sibê rovî, êvarê jî kovî ye.***

Sibeh û êvar pizika li ser zimanê (yekî) bûn
Ji hêla yekî ve gelekî hatin hez kirin. **Min evîneke wisa nedît, navê wê keçikê* ***sibeh û êvar pizika li ser zimanê Nûro ye.***

Sibhan ji wî xaliqî, dudo li hev aliqîn, yek kor, yek çavşiliqî.
Ji bo kesên layiqî hev tê gotin. **Wan çawa baş hev û din dîtine.* ***Sibhan ji wî xaliqî, dudo li hev aliqîn, yek kor, yek çavşiliqî.*** (qerf)

Sidê avêtin tevnê
Pirsgirêka xwe çareser kirin. **Di dawiyê de Aryan jî* ***sidê avête tevnê*** *û xwe ji vî barê giran rizgar kir.*

Sifto û genî bûn
Xerab bûn. Dema wê derbas bûn. **"Bibore, lê ev xeberdana te, xeberdaneke* ***sifto û genî ye."*** Evdile Koçer

Sikûmê xwe xera kirin
Rengizê xwe tal kirin. **Ew ku wisa* ***sikûmê xwe xera dike,*** *moralê me hemûyan xera dibe.*

Sil bû, şil bû.
Yên ku ditirsin, di dawiyê de ziyanê dibînin. **Ji xwe re berk bisekine heyran. Çi gotine:* ***"Sil bû, şil bû."***

Silav li bilxurê nekirin
1. Xwe zêde hesibandin. **2.** Teralî kirin, bi xwe re nedîtin. **Çima ku hinekî dewlemend bû, êdî* ***silavê li bixurê nake.*** **Ew ketiye rewşeke wisa ku* ***silavê li bilxurê nake.***

Silav li Hesenê Mûsa bike.
Ji kesekî nenas û nekifş re silav şandin. **Silav li* ***Hesenê Mûsa bike.*** *Qewêtiyan dike û silav dike lê nizane kî ye, û çi ye.*

Silav ne li rûyan e, silav li mûyan e.
Rêz û hurmet ne ji xuyangê re, lê ji zanebûn û tecrubeyê re ye. **Ma tu çi dihesibînî?* ***Silav ne li rûyan e, silav li mûyan e.***

Silto bû kevanî, golikan werîs hilanî.

Ji bo kesên pêknehatî û bêzereng tê bikaranîn. **Erê dayê. maşelah,* ***Silto bû kevanî, golikan werîs hilanî***.

Sim sima kerê ye, fêl fêlê Perê ye. (Rêç rêça kerê ye, fêl fêlê Perê ye.)

Xwestine ku min bixapînin lê, ez dizanim ku kê ev yek ji hêla kê ve hatiye plankirin. **Hûn nikarin min bixapînin. Erê,* ***sim sima kerê ye, fêl fêlê Perê ye***. (bnr. çîrok)

Simbêl badan

Ji rewşa xwe kêfxweş bûn. **"Bîst mêvanan derê wî vekira xema Silê Kelo nîn bû. Ew ê li rex mêvanan rûnişta û* ***simbêl badana.***" Tosinê Reşît

Simbêl bi pisîkan ve jî hene.

Tenê bi zayenda nêrbûnê yan jî bi simbêl û nîşanên wekî wê mêranî nabe. **Bi mêraniya xwe ew qasî nefire,* ***simbêl bi pisîkan ve jî hene***.

Simbêlpoşeyî, mal mirtib bûn

Rewşa aborî xerab bûn, lê forsa xwe kirin. **Ji wî re ne xem e, ew mirovekî* ***simbêlpoşeyî, mal mirtib e***.

Simbêlqeytan bûn

Bedew û mêrxwas bûn. **Zerîfeya me Maşelah lawinên wisa mezin kirine ku hemû jî çavreş û* ***simbêlqeytan in***.

Simbêlên (yekî) refên elokan bûn

Simbêlpal, lê bêzereng bûn. **Tu wisa li gevdeyê wî yê mezin û simbêlên wî yên badayî menêre, ew* ***simbêlên wî hema refên elokan e***.

Simbêlên xwe di qûna segan re kirin (Simêlên xwe xistin qûna segan)

Sond xwarin. Soz dan. Wekî merc tê gotin. **Heke gotina min nebe, ez ê* ***simbêlên xwe têxim qûna segan***. (argo)

Simbêlên garis, nanê genim?!

"Sim sima kerê ye, fêl fêlê Perê ye."

Xesûyeke pir xerab û temahkar hebûye. Sê heb jî bûkên wê hebûne. Navê bûka herî piçûk Perê bûye. Perê jineke biaqil zana û jîr bûye. Xesûya wan nanê tisî jî bi hejmar dide bûkên xwe. Lê ji ber ku zehf hindikî dide, bûk tim birçî dimînin. Ji ber wê jî gelek caran nan ji teşta nan didizin û hinekî pê birçîbûna xwe derbas dikin. Xesûya wan mêze dike ku nan tê dizîn, teşta nên dibe datîne serê xênî yê jor. Dema ku wê biçe der cînaran, ji teştê heyanî devê dêrî ard direşîne ku heke hinek bixwazin nan bidizin, bila rêça wan bê xuyan û ew hesab ji wan pirs bike. Rojekê her sê bûk jî pir birçî dibin. Nizanin bê ka çawa bikin. Xesû çûye derve lê ji ber ku ard li dor teştê reşandiye bûk nikarin nêzîkî teştê bibin. Di dawiyê de Perê ji jintiyên xwe re dibêje:

"Min çareyek dit.Hûn herin ji min re ji tewlê kerê derxînin û bînin." Her du bûk kerê tînin, Perê li kerê siwar dibe, heya ber teştê diçe û xwar dibe ji teştê nan derdixe û dîsa li ser pişta kerê heya ber dêrî tê û peya dibe. Ew û jintiyên xwe têr nan dixwin. Perê dibêje:

"Qîzikno, kerê li ber dêrî bihêlin, bila xesûya me hew bizanibe ku kerê nan xwariye." Demekê bi şûn de xesû tê teştê tesele dike ku nan kêm bûye bang dike bûkên xwe û dibêje:

"Keçê qîzên keran, ka bibêjin kê ev xwariye?" Bûk sond dixwin û dibêjin:

"Me nexwariye, va ye şopa kerê ye, xuya ye ku kerê nan xwariye." Xesû li şopa kerê mêze dike, li bûkan mêze dike û di dawiyê de dibêje:

"Sim sima kerê ye, fêl fêlê Perê ye."

Ji bo rewşa lihevnehatî tê gotin. **Welehî qet aqilê min jî ji vî karî nabire,* ***simbêlên garis, nanê genim****?!*

Simbêlên xwe qut (kur) kirin
bnr. Simbêlên xwe di qûna segan re kirin

Simbêlan nebadî!
Ji bo zarokên nehs tê bikaranîn. **"Înşeleh Seyîdxan tu* ***simbêlan ji bo bavê xwe nebadî****!"* Qahir Bateyî (nifir)

Simbêlên nû avêtin ber devan
bnr. Simbêlê (yekî) nû bûtik bûn

Simbêlên teze xweh dan (Simbêl nû hêşîn bûn)
bnr. Simbêlê (yekî) nû bûtik bûn

Simbêlên (yekî) melûl bûn
Pozîde bûn. Moral xerab bûn. **"Hesen Axa dinêre ku çi ecêb çêbû li dinê ye, ziravê wî qetiya,* ***simbêlê wî melûl bûn****..."* Celîlê Celîl, Ordîxanê Celîl

Simbêlên (yekî) nû bûtik bûn
Nû gihîştin. Simbêl nû hêşîn bûn. **Na lo, ne qert e! Ew ê ku qalê dikin lawikekî ciwan e,* ***simbêlên wî nû bûtik bûne****.*

Simbêlsor î, malxerab bûn
bnr. Simbêlpoşeyî, malmirtib bûn.

Sing ji binî ve rakirin
Hemû têkilî birîn. Di têkiliyê de xala dawîn danîn. **Qet kesî ji wî tiştekî wisa hêvî nedikir, lê wî hema ji nişka ve* ***sing ji binî ve rakir****.*

Singê (yekî) rakirin
Zêde bi ser yekî de çûn. Bêhna yekî teng kirin. **Mêrik wisa zêde bi ser de çû ku* ***singê Riza rakir****.*

Sistopisto bûn (Sist û pist bûn)
Bêhêz û xav bûn. **"-Camêr, tu merivên herê û yên niha dikî yek? Xortên zemanê me şipil bûn, bi destekî ban geran radikirin. Yên niha* ***sistopisto ne****, zilhimokî ne."* Rojen Barnas

Sitûna dil şikestin
Ji tiştekî gelekî êşîn. **Tu bawer bike,* ***sitûna dilê Asê şikestiye****, ew dê zor xwe rast bike.*

Siûd çep gerîn
bnr. Siûda (yekî) reş wergerîn

Siûda (yekî) reş wergerîn
Rewş xerab bûn. **Xwedê neyîne serê tu kesî,* ***siûda wê reş vegerî****.*

Sivik filitîn

Bi hêsanî xelas bûn. *"*Deng û hêrsa havo rabû. Bextê min vê carê lê xist ez **sivik filitîm**."* Veysel Çamlıbel

Siwar e, durê tê, serê sibê diçe, êvarê zû tê.

bnr: Siwarê dêlrûtê, sibehê diçe, êvarê zû tê.

Siwar ji me qeda ji Xwedê

Êdî ma bi hêviya Xwedê. **Ji me ew qas, **siwar ji me, qeda ji Xwedê**.*

Siwar peya kirin

Gelekî dir û yeman bûn. **Tenê keçikeke Silêman heye, lê ew jî **siwaran peya dike**.*

Siwar siwarê tirkan, qeda ji Xwedê

Ji ber ku siwarê tirkan bi karên xeter re mijûl dibin, her dem îhtimala qeda û qodikan li pêşiyê ye. **Pîrika min her tim digot: **"Siwar siwarê tirkan, qeda ji Xwedê."***

Siwaran siwar leqandin, xalkotiyan xwe bi qûşa hespan xapandin.

Xwarzî li xalan diçin. (Yên ku xalên wan nebaş û nemêrxwas bin, newêrek in.) **Ma ji tirsonekan re mehne tune ne? **Siwaran siwar leqandin, xalkotiyan xwe bi qûşa hespan xapandin.***

Siwarê dêlrûtê, sibehê diçe, êvarê zû tê.

Ji bo kesên çapik û çeleng tê gotin. **Egît mirovekî çak e, bûye **siwarê dêlerûtê, sibehê diçe, êvarê zû tê**.*

Siwarê hespê boz bûn

Ji bo kesên kifş û navdar tê gotin. **Ka kî wî nas nake? Ew **bûye siwarê hespê boz**.*

Siwarê kerê, gû li berê

Yên ku xuyang û derfetên wan hindik bin, rêz û pêşwaziya wan jî qels e. ***Siwarê kerê, gû li berê.** Heke tu wisa na, lê bi forseke mezin biçûyayî, rewşa pêşwaziya wan wê cuda bûya.*

Siwarê qîtê, sibê diçe êvarê zû tê. (Siyarê sûtê, sibê zû diçe êvarê zû tê.)

bnr: Siwarê dêlrûtê, sibehê diçe, êvarê zû tê.

Siwaran dayîn ser (yekî)

Lez kirin. **Kuro hêdî here lawo. Ma **siwaran daye ser te**, tu ew qasî dilezînî?*

Siwaran dayîn ser pişta (yekî)

bnr: Siwaran dayîn ser

Siwaro Xwedê riya te dirêj bike. Got: "Bi destê min e."

Mirov ku bitedbîr û serwext be, zêde qeza û bela nayên serî. ***Siwaro Xwedê riya te dirêj bike. Got: "Bi destê min e."** Lawo erebeya xwe zelîf bi lezgînî neajo.*

Siwaro, tu hespa xwe bide min, tu peya here.

Ji bo helwest û daxwazên eletewş tê bikaranîn. *Got: ***"Siwaro, tu hespa xwe bide min, tu peya here."*** *Bi vê pêşniyaza xwe Nazîme jî her hal min ker dihesibîne.*

Siya darê bûn

Ji bo tiştên demborî tê gotin. **Jiyan û tenduristiya mirovan jî **siya darê ye**, geh heye, geh tune ye.*

Siya pelkê ye, ne li xwe ye, ne li xelkê ye.

Ji bo tiştên bêbandor tê bikaranîn. **Emaaan lawo! Tu çi ji wê hêvî dikî? Ew **siya pelkê ye, ne li xwe ye, ne li xelkê ye**.*

Sî li ser xwe nedîtin

Rehetî û hizûr nedîtin. **"Înşelah tu **siyê li ser xwe nebînî**." Celîlê Celîl, Ordîxanê Celîl*

Sîngê xwe ji guleyan re neguhastin

Netirsîn, venekişîn. **Evdilbaqî xweşmêrekî wisan e ku **sîngê xwe ji guleyan venagulize**.*

Sînor dan ber

Şert û merc danîn navberê. **Jixwe wan jî **sînor dane ber**, lê ew zêde jî bi ya wan nake.*

Sîr li ser serê (yekî) heftserî firotin

Eziyet li yekî kirin. Aciz kirin. **Ev lawê me yê piçûk, **sîran li ser serê me heftserî difroşe**.*

Sîra xwe sêser kirin

Ya xwe zêdetir kirin. **Erê, Zînê gelek zehmet dît, lê di dawiyê de **sîra xwe sêser kir**.*

Sîrek dayîn (tê dan), bi deh pîvazan jê xelas nebûn

Ji bo kesên rezîl û şerxeta tê bikaranîn. **Ez naxwazim bi wî re têkevim têkiliyekê. Mirov **sîrekî tê dide, nikare bi deh pîvazan jê xelas bibe**.*

Sîrek tê de neçûn

Pir teng bûn. Li ber tu gotinekê li ber xwe nedan. **Rastî jî ji Bedir re nayê xeberdan, mêrikî wisan e ku **sîrek tê de naçe**.*

Sîrikê serê keçel bûn

Eyba veşartî bûn. **Erê bavo, ew jî **bûye sîrikê serê keçel**.*

Sîrikê serê keçel veşartin

Eyb veşartin. Qisûr tepisandin. **Bila li qisûrê mêze nekc, ew çiqasî **sîrikê serê keçel veşêre** jî nikare rastiyê tune bike.*

Sîrikê serê keçel xuya kirin

Eyb û qisûr derketin holê. **Qet xwe neêşîne, êdî **sîrikê serê keçel xuya kir**.*

Sîsikek li heft mehseran gerandin

Bi her awayî li hincetan gerîn. Pirsgirêk zêde mezin kirin. **Ma tu nizanî ku ji xwe karê wî jî hema **sîsikek li heft mehseran gerandin** e.*

Sîtilek ava sar bi ser de kirin

Pozîde û perîşan bûn. *"*Her wekî **sîtileka ava sar bi ser wî de kiribin**, ker û lal bû û neaxift. Gund her wekî kavilekê hate pêş çav."* Enwer Mehemed Tahir

Sîtilê got binê min zêr e, hesê got, ez ji binê te têm.

Belê tu pensên xwe didî, lê ez baş te dizanim ku tu kî yî û rewşa te çi ye. ***Sîtilê got binê min zêr e, hesê got, ez ji binê te têm.** Lawo em baş hev û din beled in, zêde nepeyîve.*

Sofî Remezan e, ga û golik tev dane, ew maye, ev xeberdan e.

Ji bilî axaftinê tiştekî wî nemaye. *Êdî çi hiştiye ku çi jî bike? ***Sofî Remezan e, ga û golik tev dane, ew maye, ev xeberdan e.***

Sofiyê remezanan, mîna kerê garanan

Ji ber ku di meha remezanê de xêr û bêr zêde tên dayîn, Sofî li her derê û li ser her sifreyê ne. ***Sofiyê remezanan, mîna kerê garanan.** Bi vê meşê melayê me dê barê xwe baş bigire.*

Sol di paceyê re avêtin (Sol di taqê re avêtin)

Hê pêştir û zêdetir birin. Çirax ji hoste derbastir bûn. *Bi rastî min jî wisa hêvî nedikir. Wî teresî **sola Remezan di pacê re avêt**.*

Sola ku nebû mirov ji lingê xwe derxistin

Jina ku nebaş be berdan. *Erê rast e, bi her awayî baş nayê dîtin, lê dîsa jî divê **sola ku nebe, mirov ji lingê xwe derxîne**.*

Sola xwe di wê riyê de qetandin

Tim bi wî karî re mijûl bûn. *Wî **sola xwe di wê riyê de qetand**, bawer im ku mirina wî jî dê li ser wê dozê be.*

Solên bênalçe çêkirin

Bi karên nesaxlem û derew re mijûl bûn. *Karê wî jî wisan e, **solên bênalçe çêdike**.*

Solên şeytên çep xistin lingên wî

Pir kone bûn. *Hay lo lo! Ew yekî wisan e ku **sola şeytên çep dixe lingan**.*

Sond bixwe, serî naêşe.

Mehneya wî di cih de ye. *Wî karê xwe wisa eyar kiriye, ku **sond bixwe, serî naêşe**.*

Sond lê nebûn

Ne mecbûrî sond xwarin. *Helbet **sond lê nabe**, lê heqê Xwedê çi ye ew.*

Sonda mezin xwarin

bnr: Sonda qesem li canê xwe dan

Sonda qesem li canê xwe dan

Gelekî sond xwarin. *"**Sonda qesem li canê xwe da** û got, yan ez ê bi riya bavê xwe de biçim,yan ez ê nehêlim ku lingê Osmaniyan li herêmê sefîk bigire."* Medenî Ferho

Soqa xwe, li noqa xwe xistin
Xwe tiştek hesibandin. **Maşelalı wê jî **soqa xwe li noqa xwe xistiye**, dixwaze bi zorê xwe têxe dora mirovan.* (qerf)

Sor in hinarikên rû, ji karê comerdê şû.(*)
Zewac li ciwanan tê. ****Sor in hinarikên rû, ji karê comerdê şû.** Jixwe keç û xortên ku dema zewaca wan derbas dibe, psîkolojiya wan xera dibe.*

Sor kir, zer kir, her da bi heqê xwe.
Heq û buhayê rasteqîn çi be ew derbas dibe. Bi xuyangê tiştek zêde nayê guherandin. ****Sor kir, zer kir, her da bi heqê xwe.** Ew hewldan û mesrefa zêde jî ji wî çû.*

Sor kirin
Hadandin, bi hestên dijminahî tije kirin. **Xezalê Zozan wisa **sor kiribû** ku çawa mêrê wê hat dest bi sixêfan kir.*

Sor û zer kirin
Kok (qelew) û bedew bûn. **Hingî Zerî hatiye mala bavê xwe **sor û zer dike**.*

Sorayî ketin canê (yekî)
Di hêla tenduristî de beşerxweş bûn. **Şikir wa ye îsal **sorahî ketiye canê te**.*

Soromoro bûn
Ji ber eşkerebûna razekê yan jî ji ber tawanekê fedî kirin, bi şermiyê ketin. **"Lê wextê wê ez dîtim **soromoro bû**, madê xwe telil kir û serê xwe kire ber xwe ..."* Xelîlê Çaçan

Sotik vênexistin
War reş man, bêziruyet man. **Wî belengazî jî di vê dinyayê de **sotikek vênexist**.*

Sotikteflnê civakan bûn
Fesad û şeytan bûn. **Zekî **sotikteflnê civakan e**.*

Soz bûne toz
Li soza xwe xwedî derneketin. **Soza çi lo, soza çi? **Soz bûne toz.*** (argo)

Soz jê girtin
Ji bo tiştekî bersiva erênî hildan. **Me **soz ji wî girtiye**, lûn meraq mekin.*

Soz û bextê bêfita
bnr. Bi qewl û qirarê mêrên berê

Soz û peyman dan
bnr. Soz û qerar dan

Soza (yekî) lê derbas bûn

(*) **Şû kirin:** Li herêma Behdînan di wateya zewacê de tê bikaranîn.

Gotinê lê bandor nekirin. **Bila Serkar bibêje, tenê* ***soza wî lê derbas dibe.***

Soza xwe bi cih anîn
bnr. Li soza xwe xwedî derketin

Soza xwe girtin
bnr. Li soza xwe xwedî derketin

Soza xwe xwarin
Li soz û peymana xwe xwedî derneketin. **Wê soz dabû min, lê dûre* ***soza xwe xwar.***

Soza (yekî) yek bûn
Li ser soza xwe sekinîn. **Ew mirovekî durist e,* ***soza wî yek e****, nabe dudu.*

Spartin axa sar
Mirin. Çûna li bal dilovanê xwe. **"Mihemedko bi xuriyê ket û mîna gelek zarokên gund, ew* ***spartî axa sar*** *bû."* Bavê Nazê

Spiya (yekî) beloq bûn
Kar û rewşa yekî xuya bûn. **Wê çi veşêre, wa ye jixwe* ***spiya wî beloq bûye.***

Spî fetiqîn
Yek bitrî bûn. **Çima ku hinekî malê dinyayê kete destê Dilawêr* ***spiyên wî fetiqîn*** *êdî bavê xwe jî naz nake.*

Stamî kirin (Sitarî lê kirin)
Lê xwedî derketin. **Xwedê ji wê jinikê razî be, heke wê* ***stamî li min nekira****, Xwedê dizane ez niha li ku bûm?*

Star lê kirin
Bi kesekî re alîkarî kirin, xwedî lê derketin. **Heke Aras jî* ***star lê nekira****, gelo halê wê dê çawa bûya?*

Star tê de nehiştin
Xera kirin, perîşan kirin. **Bavê keçikê qelenekî wisa ji Siyaro stand ku* ***star tê de nehişt.***

Star tê de neman
1. Rewşa aborî xerab bûn. **2.** Ji bo xerabbûna tenduristiyê jî tê gotin. **Ka* ***tê de star nemaye*** *ku carekê jî bi kêrî we bê. *Wê nexweşiyê wisa kir ku* ***star di hestiyê wî de jî nema.***

Stêrk barandin
Girîn. **Zarçînê wisa* ***stêrk dibarandin*** *ku her Xwedê bê bes.*

Stêrk bi roj dîtin
Ji bo karên pir çetin, dijwar û pêkhatî tê gotin. **"Heta min ew kar qedand, min* ***stêrk bi roj dîtin****."* Zana Farqînî

Stêrk hatin xwarê
bnr: Stêrk barandin

Stêrk ji ezmên anîn xwar
Karên pir dijwar pêk anîn. Pêkhatî bûn. *"*Ez bi te zanim ku ez **stêrkan jî ji ezmên bînim xwar**, dîsa li ber çavên te ne hêja ye du qurişên biqul."* Abbas Alkan

Stêrka (yekî) çûn ava
bnr: Stêrka (yekî) xuricîn

Stêrka (yekî) li esmanê heftan tune bûn
Bêşans bûn. **Rebenî **stêrka wî li esmanê heftan jî tune ye**, ka ez çi bibêjim ku dilê wî pê hênik bikim?*

Stêrka (yekî) sor bûn
Bêşans û bêrozgar bûn. **Ew hingî ji diya xwe bûye, wisa **stêrka wî sor e**.*

Stêrka (yekî) mê bûn
Bişans bûn. ***Stêrika Xoşnav mê ye**, dest diavêje çi karî, baş dimeşe.*

Stêrka (yekî) xuricîn
Coş, fors û hêza yekî bi dawî bûn. **Berê ji forsa wê jê nedihat xeberdan, lê ev demek e ku **stêrka wê xuriciye**.*

Stexfara xwe anîn (Estexfera xwe anîn)
Poşman bûn. *"*Mele şevekê tenê tevlî me bû, **stexfara xwe anî** û nema hat cem me."* Helîm Yûsiv

Striyê çavê (yekî) bûn
Li ber çavên xelkê gelekî mezin bûn. **Jixwe **striyê me yê li ber çavê dijminan** jî hema ew e.*

Strî tê de şîn bûn
Rewş baş bûn, serfiraz bûn. **Eman ha eman! Tu ku wan kincên antîke li xwe bikî, **strî wê di te de şîn bibin ha**.* (qerf)

Stû li ser rehekî man
Gelekî jar bûn. **Faris di navîna du mehan de wisa bû ku, **stû li ser rehekî ma**.*

Stû wekî leglegê dirêj bûn
bnr: Stû li ser rehekî man

Stûna dil şikestin
bnr: Şûşa dilê (yekî) şikestin

Stûna (yekî) zêr bûn
Rewş pir baş bûn. **Heke wî gotina jina xwe bikira, niha **stûna wî zêr bûbû**.*

Stûxwar bûn (stûxwar man)
Bê çare li holê man. **Ew qas ewledê wî jî hebûn, lê jina wî ku mir, mêrik* ***stûxwar bû*** *û li holê ma.*

Stûyê (yekî) bi ser (yekî) de xwar bûn
Ji bo kesekî perîşan û derdegan bûn. **Ev çend sal in ku* ***stûyê Osêyê reben bi ser jina wî de xwar e****.*

Stûyê (yekî) di ber de man
Înşelah* ***stûyê wî di ber de bimîne**.* (nifir)

Stûyê xwe di bin nîr de dirêj kirin
1. Bar û berpirsyarî pejirandin. **2.** Ketin bi bindestiyê. **Berê yekî serserî bû, lê piştî zewacê,* ***stûyê xwe di bin nîr de dirêj kir****. *Piştî dagiriya dewleta Îranê, Mehabatê* ***stûyê xwe di bin nîr de dirêj kir****.*

Stûyê xwe kirin kindir
Binbarî pejirandin. **Jixwe heta hinek* ***stûyê xwe nexin kindir****, ev kar tu car nameşe.*

Stûyê xwe li ber barê xwe dirêj kirin
Binbariya xwe pejirandin. **Min ji we re negot, wê niha bê û* ***stûyê xwe li ber barê xwe dirêj bike****?*

Stûyê xwe li ber dirêj kirin
bnr. Stûyê xwe li ber xwar kirin

Stûyê xwe li ber xwar kirin
Ji daxwaza yekî re amade bûn. Teslîmî yekî bûn. **Îro ez di rewşeke xeter de me, ew çi bibêje min* ***stûyê xwe li ber xwar kiriye****.*

Stûyê xwe qalind kirin
1. Bi awayekî wareste û bê berpirsane tevgerîn. **2.** Ḳok û qelew bûn. **Xwedê dizane, ji ber bêxîretiyê Ûsiv ew qas* ***stûyê xwe qalind kiriye****. *Li her derê dikilije, loma wisa* ***stûyê xwe qalind kiriye****.*

Stûyê xwe xwar kirin
1. Ji ber rewşa zor û xerab perîşan bûn. **2.** Ji ber bêçaretiyê, bi awayekî nerasterast daxwaza alîkariyê kirin. **Li hemberê serdestan* ***stûyê xwe xwar kiriye*** *û destê xwe daye ber hev."* Ehmed Kaya **Wa ye xaltiya Şuretê dîsa li ber derî* ***stûyê xwe xwar kiriye****, divê ez jê re alîkariyekê bikim.*

Stûyê (yekî) zirav kirin
Lawaz û jar bûn. **Piştî wê bûyerê,* ***stûyê Xembar zirav bû****.*

Sir lê ketin
Ji bo kesên ku ji nişkê ve dibin ewliya (welî) û tiştên nepenî pê eyan dibin tê gotin. **Dibêjin* ***sir li Şirîna Mele Resûl ketiye*** *û her tiştî dizane.*

Sira xwe dayê, bawerî pê anî, wî jî bi siwarî da ser xanî.
Pê bawer bû, jê re sira xwe got wî jî ji her kesî re got. **Wî rebenî çi zanibû ku wê wisa bike?* ***Sira xwe dayê, bawerî pê anî, wî jî bi siwarî da ser xanî.***

Sûc ji stû derketin
Ji tawanbariyê xelas bûn. **Ji ber ku* ***sûc ji stû derket*** *ew berdan.*

Sûc tê de cemidandin
bnr: Sûc bi ser (yekî) de tehm kirin

Sûcê xwe bi ser (yekî) de tehm kirin
Sûcê xwe di ser hinekên din de wer kirin. **Wî koneyî dixwest* ***sûcê xwe bi ser Sefkan de tehm bike****, lê nebû.*

Sûk tijî qumaş e, lê mele bêşaş e.
Di nav heyînê de derfet bi dest nexistin. **Ev çi karekî ecêb e,* ***sûk tijî qumaş e, lê mele bêşaş e****.*

Sûk û yasûk, şok û berşok tev de ev e.
Hemû ev in. **Mixabin ji bilî wê vebijarkeke min nîn e, ya rastî,* ***sûk û yasûk, şok û berşok tev de ev e****.*

Sûka sar bûn
Rewşa bazirganiyê xerab bûn. **Erê, min dikan vekiribû, lê rewş* ***sûka sar bû****.*

Sûravka xwe jê xwarin
Ji kesekî xerabî dîtin, ji hêla kesekî ve xapîn. **Rebenî bi Mehmedşalı bawer bû,* ***sûravka xwe jî ji wî xwar****.*

Sûret paç e, ya ji dil naçe.
Her çiqas bêkîn û bêbuxz bê xuyan jî lê ew yek di dil de berdewam dike. **Tu wisa li ruyê wî yê biken mêze neke, ez baş dizanim ku* ***sûret paç e, ya ji dil naçe****.*

Ş

Şahê, di kerê de dayê

Ji bo karên ecele û bi çewtî tên kirin tê gotin. **Şahê di kerê de dayê.* *Hê dema wê nehatî pê kuta ser me, got îleh ez ê bibim mudir:..*

Şahid ji malê ye, xazok li serê darê ye.

Ku xerabî naveroka tifaqê, yan jî malbat û exrebeyan xeterî hê dijwartir dibe. ****Şahid ji malê ye, Xazok li serê darê ye**, li gorî wê bingehê ev jî zêde ye.*

Şahî şahî gotî, şîn şîn gotî

Divê her tişt li gorî taybetî û naveroka xwe be. **Di vê şînê de ya ku ev dikin, ne durist e, **şahî şahî gotî, şîn şîn gotî**.*

Şal hêşîn e, tiştek di mal de nîn e.

Li derve, ser û guhê xwe baş dide xuyandin, lê li malê de jî tu debar nîn e. **Ka xêncî qatek kinc, çiyê wî heye? **Şal hêşîn e, tiştek di mal de nîn e.***

Şalte balte lê xistin

Bê mantiq û bê rê peyivîn. **Wa ye Xaltîka Kewo dîsa **şalte balte lê dixe**.*

Şam dûr e, ma mişar jî dûr e?!

Heke tu dixwazî, em dikarin bipîvin û li vir jî bibînin. **Çi ye tu wisa dûr diavêjî? Belê rast e, **Şam dûr e, ma mişar jî dûr e?**"* (bnr. çîrok)

Şam xweş e, lê ji Şamiyan re.

Her tişt xweş e, bi ya layiqî xwe. **Tu rast dibêjî, belê **Şam xweş e, lê ji Şamiyan re**.*

"Şam dûr e, ma mişar jî dûr e?!"

Mirovek diçe demekê li Şamê dimîne. Piştî ku tê, tim qala Şamê û kirinên xwe yên li wir dike. Bi vî awayî li vir û wir tim pesnê xwe dide. Rojekê li qehweyê dîsa pesnê xwe dide û dibêje:

"Min li Şamê di ser deh mişaran re gav dikir!" Yên li wir rûniştî bawer nakin û dibêjin tu derewan dikî. Ew çiqasî dibêje: *"Belê, min li Şamê di ser deh mişaran re gav dikir."* Yên din jî ewqasî li hember wî derdikevin. Gotin êpêcekî mezin dibe. Di wê navberê de yekî zana dibêje:

"Heyran hûn çima dikevine qirika hev? Belê, Şam dûr e, ma mişar jî dûr e? Kerem bikin, herin bal rezê me ka em mêze bikin ku camêrî di ser çend mişaran re gav dike."

Şanê mêran nebûn

Ne bi awa û azîna mêranî û merdane bûn. **Bager a ku te kir ma **şanê mêran e**?*

Şansê (yekî) lê xistin

Kar baş meşîn. ****Şansê min lê xist** ku ez çûm wir. Naxwe niha rewşa min xeter bû.*

Şara jina xwe dan serê xwe

Ji bo mêrên newêrek an jî pêdiviyên mêran yên li gorî civakê nakin tê gotin. **Tu ji heqê wê pîlrişkê nehatî, tu here **şara jina xwe bide serê xwe**.*

Şaş û metel man (Şaşwazî man)

Li ber tiştekî ku qet hêvînekirî û pir balkêş, ecêb û heyirî man. **"Leyla di ciyê xwe de **şaş û metel ma**, lerizî. Nema dizanibû çawa bikira."* Yaqûb Tilermenî

Şaşofaşoyî (şaşomaşoyî) bûn

Xwe şaş kirin. Li hev du piçikîn. **Dema ku me ew di wî halî de dît, dest û piyên wî lerizîn û **şaşofaşoyî bû**.*

Şatirşûmanî bûn

Zêdetir ji bo zarokên zana, jîr û xweşaxêv tê gotin. **Neviya min maşelah zarokek wisa **şatirşûmanî ye** ku nayê gotin.*

Şeb û şekir çûn Diyarbekir, şekir rûniştdengê xwe nekir, şeb rabû pesnê xwe kir.

Yên çê, leheng û bedew zêde pesnê xwe nadin û dilnizm in, lê yên bêzereng gelekî pesnê xwe didin û xwe zêdetirîn didin nîşan dan. **Ji xwe yên ji dilê xwe têr jî wisa kifş dibin. **Şeb û şekir çûn Diyarbekir, şekir rûniştdengê xwe nekir, şeb rabû pesnê xwe kir.***

Şeb û şekir ji hev du nas nekirin

Ji tiştekî fêm nekirin. **Ew ji çi dizane? **Şeb û şekir ji hev du nas nake**.*

Şeb û şekir li cem (yekî) yek bûn

Cudatiya tiştên baş û nebaş fêm nekirin. **Wisa jî ne tu kar e lo, **şeb û şekir li cem wî mêrikî yek e**.*

Şebeş bi dengê xwe, hinar bi rengê xwe

Her tişt û her kes li gorî taybetiyên xwe. **Jixwe heke her tişt û her kes wekî hev bûya, çi tema jiyanê dima? **Şebeş bi dengê xwe, hinar bi rengê xwe.***

Şefeq gewr kirin

Dinya hêdî hêdî ronî bûn. **"Hişyarî di destê min de tune bû. **Şefeq hîn nuh gewr kiribû**."* Osman Sebrî

Şeh û mirak (eynik) eyweleh, kar û şixul na weleh.

Ji bo kesên tenê li forsa xwe dinêrin, lê naxwazin ked û zehmetê bibînin tê bikaranîn. **Rêbaza wê tenê ev e: **Şeh û mirak eyweleh, kar û şixul na weleh.***

Şekê (yekî) şikandin

Moralê yekî xerab bûn. *Ez bawer im ku heke wan **şekê Heqî neşikandina**, wê gelekî bi pêş de biçûya.*

Şekala xwe avêtin nav a zilaman (mêran)
Xwe zilam (mezin) hesibandin. *Belengazî ew jî xwe tiştekî dihesibîne û **şekala xwe diavêje nav a zilaman**.*

Şekir naxwim, pîvaz dixwim.
Ji bo kesên a xweşik fêm nakin tê gotin. *Ji wî re çi? Ew dibêje **şekir naxwim, pîvaz dixwim**.*

Şekir û pincar ev car
Her dem tiştên xweşik bi dest nakevin. *Rûmeta wê bizanibe, **şekir û pincar, ev car**.*

Şekopeko, navê xwe li hevalê xwe ko.
Ji bo kesên ku tawan û kirinên xwe dikin stûyê hinekên din tê gotin. *Ez çi bibêjim? Hinekî biînsaf! **Şekopeko, navê xwe li hevalê xwe ko.***

Şeko, navê xwe li xelkê ko.
bnr: Şekopeko, navê xwe li hevalê xwe ko.

Şeqşeqî kirin
bnr: Zêlzêlî kirin

Şems piştevanê te be.
*Lawo înşelah **Şems piştevaniya te be**, tu têk neçî.* (dia)

Şeqa xwe ji hev kirin (Şeqa xwe vekirin)
1. Ji bo kesên ku bi niyeta ji baş mirovan bawer dikin û derfetan didin hinekên din û dû re dixapin tê gotin. **2.** Ji bo têkiliya zayendî amade bûn. *Ev hevalê min hema li ber her kesî **şeqa xwe ji hev dike**, bi vî awayî di demeke kin de em ê îflas bikin. *Dibêjin ew jinika ku pe re dibîne, **şeqa xwe ji hev dike**.* (argo)

Şeqam xwarin
Lêdan xwarin. *Bi rastî ew **şeqamên ku wî xwarin**, wî heq kiribûn.*

Şeqî, deqî bûn
Pir zehmet kişandin. *Ev qas sal in, ez **şeqî, deqî bûme**. Ew jî hatiye dixwaze li ser keda min rûnê.*

Şeqînî jê anîn
Dengê şeqîniyê ji tiştekî yan jî kesekî derxistin. Lê dan. *Adar **şeqînî ji pelegoşka Xelîl anî**.*

Şeqopîlo kirin
Wekî parçeyan hûr kirin. *Di wê hêrsê de heke min ew bigirta, min ê ew **şeqopîlo bikira**.*

Şer di ber neynûka xwe de derxistin
Ji bo kesên fesad tê bikaranîn. *Qet qala wî bêbavî meke, wî ew **şer jî di ber neynûka xwe de derxist**.*

Şer gewz kirin
Şer gur kirin. **Ya ku wî kir hema ew bû ku* ***şer hê jî gewz kir****.*

Şer û şiltax tê de anîn
Êtxî û îftira li yekî kirin. **Çîlê* ***şer û şiltaxnên wisa di Gogê de anîn*** *ku li ser mêr bêne kuştin.*

Şerê hebûn û tunebûnê kirin
bnr. Şerê man û nemanê kirin

Şerê li şovê, ne gengeşa bênderê
Divê mirov berê şert û şuridên xwe di serê serî de bi zelalî kifş bike ku dû re gengeşî dernekeve. ****Şerê li şovê, ne gengeşa bênderê****. Divê di serê serî de her tişt baş bê xuyandin.*

Şerê man û nemanê kirin
Têkoşîna dozeke mezin kirin. **Hevalno xwe bidinê, ev* ***şer şerê man û nemanê ye****.*

Şerê te li ber deriyê te be.
Qeda û belaya te bila li te bigere. **Înşelah* ***şerê te li ber deriyê te be****.* (Nifir)

Şerm li rûyê (yekî) neman
Bêşerm û bêheya bûn. **Metropolê wisa kiriye ku* ***şermı li rûyê Şermînê nemaye****.*

Şerm şikandin
Şerm winda kirin, êdî şerm nekirin. **Wan êdî* ***şerm şikandine****, ji bo wan ew karekî asalî û rojane ye.*

Şerma xwe avêtin
bnr. Şerma xwe winda kirin

Şerma xwe revandin
bnr. Şerma xwe winda kirin

Şerma xwe winda kirin
Bêşerm û bêfedî bûn. **Berê mirovatî û şerm ji rûyê wê dihat xwendin, lê di metropolê de ew* ***şerma xwe jî winda kir****.*

Şeşek nan û dîzek dan xwarin
Ji bo kesên ku zêde xwarinê dixwin tê gotin. **Rebenî tiştek nexwariye, tenê* ***şeşek nan û dîzek dan xwariye****.*

Şetele bi ser (yekî) de hatin
Li rastî qeza û belayê hatin. **Hey bê* ***şetele bi ser te de hato****, tu çawa ew qas fesadiyê pêk tînî?* (nifir)

Şetele bûn (û ketin riya yekî)
Belaya serî bûn. **"We navê min bihîstiye? Ez Elî pehlewan im. Min seh kiriye ku dijmin li we* ***bûne şetele****, hatim alîkariya we."* Newzat Nurullah

Şeteleyê bi ser de girtin
bnr: Şetele bi ser (yekî) de hatin

Şev bi ser (yekî) de hatin
Bi derengiyê ketin. **Heya me xwe tev da,* ***şev bi ser me de hat*** *jî.*

Şev bû, şeva reş bû, miya qer bû, berxek li ber bû, li ser berxê çilkek xwîn bû, gur ew tev de dîbû.
bnr: Gur dibêje: "Şeva reş, şûva reş, mîha qer, berx li ber, ji hev dikim der.

Şev ketin ser (yekî)
Bi derengiyê ketin. **Heta ku ew bilivin û qûna xwe rast bikin,* ***şev ê bikeve ser wan****.*

Şev kirin roj, roj kirin şev.
bnr: Şev û roj kirin yek

Şev lê gerîn
bnr: Şev bi ser (yekî) de hatin

Şev lê giran bûn
bnr: Şev bi ser (yekî) de hatin

Şev lê tarî bûn
bnr: Şev bi ser (yekî) de hatin

Şev û roj kirin yek
Gelekî xebitîn. **Wan heke* ***şev û roj nekirina yek****, nikaribûn bigihîştina vê radeyê?*

Şev zîz bûn
Şev dirêj bûn. **Em wisa ketibûn xeberdanan ku me hew dît ku* ***şev bi ser me de zîz bûye****.*

Şeva leyletilqedrê ji diya xwe bûn
Bişans bûn. **Kes ji wê derbê xelas nedibû, lê her hal Bedrî* ***şeva leyletilqedrê ji diya xwe bûye****.*

Şeva pisîkkuştinê bihurandin
Firsend ji dêst derketin. Firsenda heyî bi kar neanîn. **Mixabin divê te di serê serî de bikira, te* ***şeva pisîkê bilurandiye.*** (bnr. çîrok)

"Şeva pisîkkuştinê buhirandin"

Du heval hebûne. Jina yekî pir baş û di gotina mêrê xwe de bûye. Lê jina yê din, sîra heft serî li ser serê mêrê xwe difroşe û jiyana wî reş kiriye. Rojekê yê ku jina wî zehf rezîl e, ji yê din dipirse:
"Hevalo, tu çawa dikî ku jina te ew qas di gotina te de ye?" Hevalê wî, wî dibersivîne û dibêje:
"Hevalo, ez îro zêde tiştekî nakim. Dema ku em zewicîn şeva gerdekê min wisa xwe nîşanî wê da ku ew hû xîmê têkiliya me." Yê din dipirse:
"Te çawa kir?"
"Şeva pêşîn dema ku ji me re sifre anîn, mêşekê li ser sifrê danî, min ew girt û li ber çavên jina xwe perçiqand. Dû re pisîkê çuna ku hinek nan xwar, min girt û her du şeqên wê ji hev qelişandin. Hema di wê rojê de jina min çavên wê tirsyan û ji gotina min derneket. Hevalê wî dipirse:

Şeva xwe xistin roj

Zêde xebitîn. **Ji bo ku li ser erseyê xwe ji xwe re malekê çêbike, Kemal* ***şeva xwe xiste roj****, di dawiyê de jî çêkir.*

Şewaşa şevereşan bûn

Ji bo qenciya nepenî, ango veşartî tê gotin. **Erê, tu wan tiştan ji bûka xwe re dikirî, lê kes pê nizane, ji bo wê jî tenê dibe,* ***şewaşa şevereşan****.*

Şewqa (yekî) dayîn newqê

Bi tirane ji yên nebedew re tê gotin. **Erê canim, Qîza Fazil Axa maşelah wisa bedew e ku,* ***şewqa wê daye newqê****.* (argo)

Şewqeyê xwe danîn tel

Kêfxweş bûn. **Karê Xelef baş dimeşe,* ***şewqeyê xwe dide tel****, ma xema wî ye?*

Şewqeyê xwe xwar kirin

bnr. Şewqeyê xwe dayîn tel

Şexte bi ser de hatin

Nifir. **Bê* ***şexte bi ser de hato****, zimanê xwe zeft bike ku bila serê te nekeve belayê.*

Şextê lê xistin

bnr. Şexte di ser de hatin

Şeytan tî birin ser kaniyê, tî vegerandin

Pir zana û qurnaz bûn. **Hay lo lo! Ew* ***şeytan tî dibe ser kaniyê, dîn vedigerîne****.*

Şetyan tî birin ser kaniyê, dîn vegerandin

bnr. Şeytan tî birin ser kaniyê, tî vegerandin

Şeyê (yekî) nexebitîn (xebitîn)

Bandora yekî kêm bûn. **Êdî rewş ne rewşa berê ye,* ***şeyê xalojina min wekî berê naxebite****.*

Şeytan xapandin

Pir kone bûn. **Tu wisa bi çavekî li wî menêre, ew* ***şeytên dixapîne****.*

Şeytan aqil kirin

bnr. Şeyan tî birin ser kaniyê, dîn vegerandin

Şeytan bi ricaya giran çû, toqa nalet ket stû.

Yên ku di nav daxwaz û armancên zehf zêde de ne û xwe zehf zêde dihesibînin, gelek

---

"Hevalo, hema ez jî wekî te nekim?" Yê din dibêje :
"Hevalo, te roja pisîkkuştinê bihurandiye! Divê te di serê sêrî de bikira."

*Di guhertokeke din de piştî vê axaftina jorîn, ê ku jina wî qet bi gotina wî nake, pêşniyaz dike ku ji bo demeke kurt her du jinên xwe bi hev du biguherin. Yê din jî dipejirîne. Yê ku jina wî rezîltiyê dike şeva pêşîn wekî ku hevalê wî gotiye, mêşekê diperçiqîne û pisîkê şeqşeqî dike, lê jinik jê re dibêje:
"Qurban, te şeva pisîkkuştinê bihurandiye!"

caran xisarê dibînin. *_Lawo qet mezin xeber nede._ ***Şeytan bi ricaya giran çû, toqa nalet ket stû.***

Şeytan jê heyirî man

Ji bo kesên ku karên pir kirêt û çepel dikin tê bikaranîn. *_Malik neşewitiyo, tiştinên wisa dike ku **şeytan jê heyirî dimîne**._

Şeytan jî pir zana bû, toqa nalet kete stû.

bnr: Şeytan bi ricaya giran çû, toqa nalet ket stû.

Şeytan jî riha xwe berdabû.

Bi xuyangê nabe, ya girîng naverok e. ***Şeytan jî riha xwe berdabû.** Bi rihberdanê bibûya, pirsgirêk nedima._

Şeytan ketin binê (yekî)

Xapîn, bi wesweseyên xerab re mijûl bûn. *_"Ev çi xew e, niha te rojeke din jî wiha kiribûya, derd nebû! Rabe, çi **şeytan ketiye binê te**?!"_ Mehmet Dicle

Şeytan ku şeytan e, nikare wî bixirîne.

Ji bo kesên pir kone tê bikaranîn. *_Tu çi dibêjî kuro?_ ***Şeytan ku şeytan e, nikare wî bixirîne.***

Şeytan pê kenîn

1. Ji bo tiştên bêbereket û wekî xewnan diborin tê gotin. **2.** Ji kesên ku di xewna xwe de dikevin têkiliya zayendî re tê gotin. Cunobet bûn. *_Ev fêkiyên ku vê hefteyê min anîn hema tu dibêjî **şeytan pê kenî** di navîna du rojan de xelas bû. *Îşev **şeytan bi min keniya, divê ez avekê li xwe bikim**._

Şeytanî kirin

Fesadî kirin. *_Heyfa wê keçikê ku hê ji niha de **şeytaniyê dike**._

Şeytên belî rûyê (yekî) kirin

Di bin bandora xirabiyê de man. *_Lawo bila kes xwe nexe hevalê wî, jixwe **şeytên belî rûyê wî kiriye**._

Şeytên bi ser serî de mîz kirin

bnr: Şeytên belî rûyê (yekî) kirin

Şeytên gotiye: "Yê ku li xwe biheyire, ez di wî nim."

Divê mirov zêde li xwe neheyîre. *_Kuro **şeytên gotiye: "Yê ku li xwe biheyire ez di wî nim."**_

Şeytên rûyê (yekî) dîtin

Yek lanet kirin. Ji bo dîtina yekî daxwaza nekirinê tê gotin. ***Şeytan rûyê wî bibîne**, çiqasî ji me dûr be, ew qas baş e._

Şeytên zor dan (yekî)

Pêkanîna karên kirêt di hundirê xwe de sêwirandin. ***Şeytan zor dide Remezan** ka dê çawa bibe._

Şêla xwe xerab nekirin

Rewş û teşeyê xwe bi eynî hawî berdewam kirin. **"Paşê jî awirên xwe vegerandin ser lawikê golikvan. Lêwik **şêla xwe qet xera nekiribû** û dîsa tim li Asê temaşe bû."* Talip Kalın

Şêr bi lepê xwe, Şêx Hadî nayê hewara te.

Çi ji destê te tê bike, bi hêviya hinekên din nemîne. **Bi hêviya hinekên din mabûnê ve mirov nikare tiştekî bibe sêrî. **Şêr bi lepê xwe, Şêx Hadî nayê hewara te.***

Şêr gotiye: "Ku girêdana min bi destê rovî be, berdana min bi destê mişkê heram be, bila nan û ava vî welatî li min heram be."

Heke ku ez ew qasî bikevim, dawiya min xeter e. Ev rewş ne layiqî min e. ***Şêr gotiye: "Ku girêdana min bi destê rovî be, berdana min bi destê mişkê heram be, bila nan û ava vî welatî li min heram be.** Ez nikarim bi vê eybê ve li vir bisekinim.* (bnr. çîrok)

Şêr li diyar ket, rovî bi şekalan ket.

Yên nedurist in, di roja heq û hesaban de dikevin rewşeke teng. ***Şêr li diyar ket, rovî bi şekalan ket.** Yên neheq nerehet in.*

Şêweşêw kirin

Lafekî kirin. Bi awayekî bitrî bicoş û geş bûn. **Keçika Seyranê hingî ku hatiye destnîşan kirin, **şêweşêw dike** û xwe li ba dike.*

Şêwr xweş kirin

Sohbetek kûr û dirêj domandin. **Îro diya min û xalojina min, yeman **şêwr xweş kirine**.*

Şêxşims cidê pê re bûn

Ew ew qasî baş e, bawer im ku **Şêxşîms cidê wê pê re be.* (dia)

Şibûk bi ser de hatin

Perîşan û belengaz bûn. **Malavawo te jî lap dinê xera kir, ma **şibûk bi ser wî de hatiye**?*

Şika (yekî) tê de çûn

"Şêr gotiye: 'Ku girêdana min bi destê rovî be, berdana min bi destê mişkê heram be, bila nan û ava vî welatî li min heram be.'"

Bi kurtasî şêr û rovî demeke dirêj bi hev û din re hevaltiyê dikin. Rovî li pey e ku raza hêza şêr hîn bibe. Tim jê re dibêje: "Şêrê min, tu ew qas bihêz û xurt î ku bawer nakim tu kesek an jî tu tiştek bikaribe te bide sekinandin?" Bi vî awayî tim li devê şêr digere. Lê şêr naxwaze raza hêza xwe yan jî azîneya astengkirina hêza xwe jê re bibêje. Tim bi derewan wî dixapîne. Rojekê şêr dikeve valahiyekê û raza hêza xwe jê re dibêje:

"Roviyê delal, tenê bi awayeki dikarin hêza min biburînin. Ew jî ew e; ku heke her du pêçiyê lingên min, yên mezin bi mûyekî gire bidin, ez nikarim hereket bikim û xwe ji wê tengasiyê bifilitînim." Rovî rojekê bal lê tîne, dema ku şêr radizê, bi mûyekî qewîm her du tiliyên lingê wî yên pêşîn hişkehişk girê dide. Şêr heta ku şiyar dibe, rovî karê xwe xelas dike û şêr di wî halî de li wir dihêle û diçe. Şêr gelekî hewl dide ku bifilite, lê dike nake nikare mû biqetîne. Mû goştê wî jê dike tê li hestî diskine. Şêr hema li wir bi zarezar û bi fîgan dimîne. Piştî demeke dirêj bi şîn de mişkek di wir re derbas dibe. Qîrîn û zarîna şêr dibihîze û diçe cem wî. Rewşa şêr dibîne, gunehê wî pê tê. Dibêje:

"Şêrê min tu meraqan meke, ez ê te xelas bikim." Mişk bi diranên xwe yên tûj mû qut dike û şêr rizgar dike. Piştî ku spasdariya xwe pêşkêşî mişk dike, şêr demekê difikire li ser vê ecêba reş û dibêje :

"Ku girêdana min bi destê rovî be, berdana min bi destê mişkê heram be, bila nan û ava vî welatî li min heram be."

*Ev biwêj bi vî awayî jî tê gotin: *"Şêr gotiye: 'Ku girêdana min bi destê rovî be, berdana min bi destê mişkê heram be, wê delîl li halê min be.'"*

Ji yekî guman kirin. **Ji bo wê telefonê* ***şika di Reso de diçe****.*

Şikeste xwarin

Têk çûn, bin ketin. **"Şerên giran û demdirêj derketin. Lê hêzên Mîrzayê Cengelî bi giranî* ***şikeste xwarin****."* Şiyar C. Oremar

Şikir wa ye hewa xweş bû.

Her kes li gorî derfet û hawirê xwe difikire û dinirxîne. ****Şikir wa ye hewa xweş bû.*** *Wekî meseleya jina şivan, tu jî wekî şert û mercên xwe difikirî qurban.* (bnr. çîrok)

Şikirîna xwe neanîn

Li hemberî derfet û firsendan neşikirandî bûn. **Ew heta ku wer* ***şikirîna xwe neyîne****, rehetî û aramiyê jî zû bi zû nabîne.*

Şil û şet bûn

Sist û nuxs bûn. Seqet bûn. **Ew yekî* ***şil û şet e****, ew ê çawa ew qas tiştan di ew qas demeke kurt de pêk bîne?*

Şindokê mêran bûn

Bindest û tune bûn. **Mêrê çi lo? Bi Xwedê hema tenê* ***şindokê mêran e****.*

Şirtovirto kirin

Bi rêkûpêk û sazûmanî nekirin. **Jixwe ew jinika hema karên* ***şirtovirto dike****.* (argo)

Şiv li xwe nexistin

Hewcedariya rexne û şiyarkirinê nehiştin. **Kawê jineke wisa mikemel û têgihîştî ye ku tu car* ***şivê li xwe naxe****.*

Şiv xistin qula mêşan

Fesadî kirin. Rewş tevlihev kirin. **Ew mirovekî fesad e, karê wî* ***şiv xistin qula mêşan*** *e.*

Şiva koran li çavê (yekî) ketin

Ketin rewşek xerab. **Jixwe waye* ***şiva koran li çavê wî ketiye****. Bi Xwedê xwe şaş kiriye, tu karekî wî jî baş nameşe.*

Şivan û gavanan li hev dan, golikvan cirm dan.

Yên ku hêza wan qels in, gelek caran ziyanê dibînin û neheq jî tên nîşandan. **Vê gavê ev dinyaya wisa bêdad e.* ***Şivan û gavanan li hev dan, golikvan cirm dan.***

"Şikir wa ye hewa xweş bû."

Jina şivanê gundekî dema hewa zehf xera dibe, ba û bahoz radibe û baran tê; ji bo mêrê xwe gelekî li ber xwe dikeve, dikeve lîkaran û dibêje:

"Gelo niha di vê sir û sermayê de mêrê min çawa dike? Niha halê wî perîşan e. Ka ez çawa bikim. Nikarim herim halê jî. Çavên min kor bibin ji bo wî. Ew ji bo me ew qas zehmetî dikişîne. Gelo halê wî çawa ye?" Jinik hema ji xwe re dibêje û dilorîne. Ji ber sermê jî xwe digihîne ser tendûrê. Pêşên dêreyê xwe vedike, germaya agirê tendûrê yê kozan hêdî hêdî wê germ dike. Li der ve ew sir û serma didome û ji hêza xwe tiştekî winda nake. Lê piştî demekê germahiya tendûrê ji çip û hêtên jinikê xwe digihîne hemû laşê wê. Jinik hêdî hêdî germ dibe, rehet dibe, aramiyek bi ser de digire. Ji ber germbûna laşê xwe bi aramî dibêje:

"Şikir wa ye hewa xweş bû."

Şivan û gavanan horehor e, bi wan watrê dinya kor e.
Hin kes hew dizanin ku ji bilî wan û karên wan tiştekî girîng nîn e. ***Şivan û gavanan horehor e, ewan watrê dinya kor e.*** *Gelek kes ji bilî xwe, zêde kesî nabînin.*

Şixulê rovî çi li sûkê heye ku postê wî were pênc pereyan?!
Mirov ku bi tiştên xeter û nepêwîst re mijûl bibe, wê bedelên wê jî hilgire. **Ma te çi encam ji wê helwestê hêvî dikir?* ***Şixulê rovî çi li sûkê heye ku postê wî were pênc pereyan?***

Şixulê (yekî) rast neçûn
Bêşansiyê dev ji pêsîra yekî bernedan. **Xwedê axiriyê xêr bike, lê îsal mîsala Xwedê* ***şixulê lawê min î piçûk qet rast neçû****.*

Şîn girê dan
Şîn kirin. **Wan ji bo şehîdê xwe* ***şîneke wisa girêdan*** *ku hemû alem li ser kete hev.*

Şîn jî ya me ye, şahî jî ya me ye.
1. Em mirovên hev in, di başiyê de jî, di xirabiyê de jî em şirîk in. **2.** Şîn jî şahî jî, ji bo mirovan pêdivî û encamên siruşt in. **Her çi hebe em ê tev bikişînin.* ***Şîn jî ya me ye, şahî jî ya me ye.*** ***Şîn jî ya me ye, şahî jî ya me ye.*** *Di jiyanê de ew her du jî xwezahî ne. Dinya bêyî wan nameşe.*

Şîn pê de hatin
Nêzîkekî yekî mirin. **Tam jî di dema betlaneya wan de* ***şîn pê de hat****.*

Şîna reş bi ser (yekî) de hatin
Bela û tofanek lê rast hatin. **Xwedê kesî nexe rewşa wî, îro* ***şîna reş bi ser wî de hatiye****.*

Şîna şîpûkê, dena Dihokê (bi) ser (yekî) de hatin
Belkî* ***şîna şîpûkê, dena Dihokê bi ser wê de bê**.* (nifir)

Şînê negotiye sîngê kor bikute.
Her tişt ûsilekî wê heye, bi taybetî ya şînê jî. ***Şînê negotiye sîngê kor bikute****, lê mixabin di çanda kurdan de şîn rêgezeke pir giran e.*

Şîr dot seradê, bêjîng da binî.
Ji bo karên çiloçepî tê gotin. **Maşelah Ronak pir bipêşk e lo, (!)* ***şîr didoşe seradê, bêjîngê jî dide binî****.* (qerf)

Şîr lê heram bûn
Ji ber neheqî û bêdadiyê rastî cezayekê hatin, belaya xwe dîtin. **Heke wî ew neheqî nekira,* ***şîr wisa lê heram nedibû****.*

Şîr vedixwe şivan, to dixwe berxvan.
Her kes li gorî rewş û pileya xwe. ***Şîr vedixwe şivan, to dixwe berxvan.*** *Ma berxvan û şivan dibin yek?*

Şîr xenim bûn
bnr. Şîrê (yekî) li çavên (yekî) girtin

Şîrê (yekî) li çavên (yekî) girtin

Li hemberî ewledên xerab, ji bo ked û zehmeta dayikan tê gotin. **Şîrê wê jinikê wê di dawiyê de li çavê wî yê pîs bigire.* (nifir)

Şîret li gur dikirin, gur got: "Zû bibêjin, ez nema digihîjim dawiya kerî."

Ji bo gotin û şîretên pûç û bêbandor tê bikaranîn. **Heyran lişê wî li cihekî din e. **Şîret li gur dikirin, digot: "Zû bibêjin, ez nema digihîjim dawiya kerî."***

Şîrê berê xwe dan (yekî)

Gelek qenciyên girîng kirin. **Li çavên wê bigire, min **şîrê berê xwe da wê.***

Şîrê çilînî (çilîtiyê) di poz re hatin

bnr: Şîrê ku ji diya xwe mêtî di firnikan re hatin

Şîrê dê bi hewariya (yekî) ve hatin

Di tengasiyê de neman. **Ew **şîrê diya wê ya dilovan bi hewariya wê ve hat.** Naxwe, xelasbûna wê neguncav bû.*

Şîrê helal mêtin

Rast û durist bûn. **Hesen **şîrê helal mêtibû** ku ew keçika pêkhatî rastî wî hat.*

Şîrê keran mêtin

bnr: Şîrê xav mêtin

Şîrê kerê pir e, ji dehşika kerê re.

Kêra her kesî digihîje nêzîkên wan. **Rast e, rewşa aboriya wî pir baş e, lê ji me re çi? **Şîrê kerê pir e, ji dehşika kerê re.***

Şîrê ku ji diya xwe mêtî di firnikan re anîn.

Di bin zor û zerpeke mezin de hiştin. **Wî bêbavî wisa kir; **şîrê ku Siltanê ji diya xwe mêtibû di firnikan re anî.***

Şîrê ku ji diya xwe mêtî di firnikan re hatin

Di bin zor û zerpeke mezin de bûn. **Heya Fazil ew yek pêk anî, **şîrê ku ji diya xwe mêtibû, di firnikan re hat.***

Şîrê min bila çê be, toyê min bila pak be.

Her tiştê xwe ji yê baş û xweş daxwaz kirin. **Zîrek dibêje, **şîrê min bila çê be, toyê min bila pak be**, lê ew qas erênî zû bi zû guncan nabe.*

Şîrê şêr e, di eyarê donxiz (beraz) de ye.

Bi xwe pir spehî û hêja ye, lê mixabin di nav hawireke xerab de ye. **Heyfa wê bûkê, sed car heyf ku **şîrê şêr e, di eyarê donxiz de ye.***

Şîrê şêr e, di eyarê segan da ye.

bnr: Şîrê şêr e, di eyarê donxiz de ye.

Şîrê şêr, di eyarê şêr de
Divê her tişt wekî xwe û layîqî xwe be. **A rastî divê **şîrê şêr, di eyarê şêr de be**.*

Şîrê xav mêtin
Xerab û bêbawer bûn. **Mirov ku rastî yê **şîrê xav mêti** bê, pir zor e.*

Şîrê xwe lê heram kirin
Heqê xwe li ewledê xwe heram kirin. **Lawo heke tu bi zimanê me, ango bi zimanê xwe yê zikmakî nepeyîvî, ez **şîrê xwe li te helal nakim**.*

Şîrqînî jê anîn
Bi hêz û zerp lê xistin, an jî deng jê derxistin. **Çeto wisa **şîrqînî ji peleguha Zerîfeyê anî** ku agir ji ber çavên rebenê pekiya.*

Şîş li nav dilê (yekî) ketin
Belkî **şîş li nava dilê wê keve, heke ew nîn bûya, wisa nedibû.* (nifir)

Şîşa sor li guhê (yekî) ketin
**Belkî şîşa sor li guhê wî keve! Ma guhê wî qet nebihîze?* (nifir)

Şîva miriyan lê çûn
Pir xizan bûn. **Hewcedariyên wê gelekî hene, **şîva miriyan lê diçe**.*

Şonik li dewsa (yekî) kutan
Paşgotina yekî kirin. **Erê, ez jî dizanim ew tim **şonikan li dewsa Zerîfeyê dikute**, lê ya wê hewldaneke pûç e.*

Şopa kerê cun e, şanên bûka nû ne.
bnr. Sim sima kerê ye, fêl fêlê Perê ye. **(* bnr. çîrok)**

Şor germ kirin
bnr. Şêwr xweş kirin

Şorbeya nexweşan bûn
Gelekî li xwe nihêrîn, pir nazik û nazenîn bûn. **Teresî wisa xwe xwazî vedike ku tu dibêjî **şorbeya nexweşan e**.*

Şorika xwe jê xwarin
Derbe xwarin. Ji kesekî ziyan dîtin. **Ez zêde bi wê bawer bûm, lê mixabin min **şorika xwe ji wê jî xwar**.*

Şorika xwe xwarin
bnr. Pişta destê xwe şewitandin

Şortika qûna (yekî) derketin
Di bin zor û zerpeke dijwar de bûn. **Mihoyê Şerîf wisa xebitî ku **şortika qûna wî derket**.*

Şov reş kir, dilê xwedî xweş kir.

Bi hinek xebat û sextekariyê hin kes xapandin. **Şov reş kir, dilê xwedî xweş kir.* *Yê ku dizane, dizane ew çi ecêb e.*

Şox û şeng e, binav û deng e.

Yên bedew û xweşik zêdetir deng vedidin. **Ez çi bikim qurban? Ew jî dayîneke Xwedê ye.* ***Şox û şeng e, binav û deng e.***

Şox û şeng

Pir bedew û birewş bûn. **Tu yê careke din jineke wiha* ***şox û şeng*** *ji ku bibînî?*

Şixul anîn serê (yekî)

Dek. dolab an jî tiştekî xerab bi yekî kirin. **"...eger ew merî hela sax bûya, qemê xulaman dewsa diranêd deba digirt û ew* ***şixul dianîne serê wan.***" Eliyê Ebdilrehman

Şixul bû dor, ocax bû kor.

Karên nejidil bê kirin, ziyanê dide xwediyan jî. *****Şixul bû dor, ocax bû kor.*** *Divê her kes di tanga xwe de çi ji dest tê, ji dil bike.*

Şixul ji min re bike, ji xwe re hîn be.

Gotara mirovên kone ye, ku dixwaze karê xwe bide meşandin. **Ew çi çavbel e, dibêje:* ***"Şixul ji min re bike, ji xwe re hîn be."***

Şixulê havînê, zivistanê kirin

Karên çiloçepî kirin. **Loma karê wî baş nameşe. Çimkî ew* ***şixulê havînê, zivistanê dike.***

Şixulkarê mala xweyo, ezîzê li ber dilê evdawo.

bnr. Xebatkarê xweyo, şîrînê li ber dilê xelkêyo.

Şûjina di çavê xwe de nabîne, derziya çavê xelkê de dibîne.

Xetaya xwe na lê ya xelkê ditin. **Ji bo yên din dinyayê xera dike, lê li ya xwe jî qet nanihêre.* ***Şûjina di çavê xwe de nabîne, derziya çavê xelkê de dibîne.***

Şûna (yekî) dagirtin

Cihê yekî girtin. **Tu kes bawer nake ku mamosteyekî din* ***şûna Mamoste Loqman bigire.***

Şûna (yekî) şehitandin

Bûn sedema ji kar û cihê xwe dûrketina yekî. **Wê keçikê hêdî hêdî xwe xiste çavê patron, heta ku* ***şûna Siltanê şehitand.***

Şûna xwe dan xuya kirin

Bandora tunebûna kesekî xuya bûn. **Pir taybetmendiyên wê keçikê hebûn, ji bo wê jî* ***şûna xwe zelîf dide xuya kirin.***

Şûpik bi ser mala (yekî) de barîn

Ketin rewşek xeter, tofan bi ser de hatin. **Jixwe* ***şûpik bi ser mala wî de bariye****, ka çi maye?*

Şûr simbêlên (yekî) nebirîn

Ji bo yê lafezan û qure tê gotin. **"Çokên wan dilerizîn, xwîna hinekan dikeliya. Kef bi devê hinekan diket. **Şûr simbêlên hinekan nedibirî**." Helîm Yûsiv*

Şûrê dudev bûn

Hem kar, hem jî ziyan pêkanîn. **Sond heye **şûrê dudev e**, carinan jî ziyanê dide xwediyê xwe.*

Şûrê mirinê li milê te be, lê bila tirsa Xwedê di dilê te de be.

bnr: Şûrê qetlê li destê te, rehma Xwedê li dilê te be.

Şûrê qetlê li destê te, rehma Xwedê li dilê te be.

Divê mirov derfetên xwe bi dadiyane bi kar bîne. **Berî her tiştî dad û mirovahî divê ezbenî. **Şûrê qetlê li destê te, lê bila rehma Xwedê li dilê te be**.*

Şûrê rastiyê di destê (yekî) de bûn

Mafdar û dadyar bûn. **Ez pir ji wî bawer im. Çimkî, **şûrê rastiyê di destê wî de ye**.*

Şûrê Şems li stû ketin

Ji Xwedê dixwazim **şûrê Şems li stûyê te bikeve. (nifir)*

Şûrê şêr, ketiyê destê kundê kor.

Derfetên baş ketin destê yên nehêja. **Belê, meqama wî pir bilind e, lê **şûrê şêr ketiye destê kundê kor**.*

Şurê tazî, xwîn dixwazî.

Mirov ku bi karên xeter re mijûl bibe, her dem dibe ku bikeve nav xeteriyê. **Lawo ma tu nizanî, **şûrê tazî, xwîn dixwazî.***

Şûrê (yekî) tûj bûn

Bibandor bûn. ***Şûrê wî çiqasî tûj be** jî qet talaşa min nîn e.*

Şûrê xwe kişandin

Ji şer û tekoşînê re amade bûn. An jî dest bi şer kirin. **Wê **şûrê xwe kişandiye** lê niyeta min a şerkirinê nîn e.*

Şûrkêşî

Ji bo hinekên din xebitîn. **Ji ber **şûrkêşiya** Faris ew ê rojekê poşman bibe, lê ka kingê?*

Şûşa dilê (yekî) şikestin

Şekê yekî şikestin. Hêvî vemirîn. **"Lawo gunehê te tifalî çi ye? Wekî ji niha de **şûşa dilê te dişikê**, toqa malê giran dikeve stûkura te." Xelîl Mûradov*

T

Ta ba dan
Pêk anîn, serederî kirin, ji heq derketin. **"...porekî reş î qîr, te digot teniya sêlê ye, na ne tenî, ji teniyê jî reştir tiştekî din e ku teniyê jê re **ta ba dida**."* Musa Vazgali

Ta bi derziyê ve kirin
Her tişt yek bi yek gotin. **"Keko baş e hinekî qala estetîk – mestetîkê jî bike da ku em baş têbigihîjin. Min hinekî din jî **ta bi derziyê ve kir**."* Fevzi Bilge

Taba xwe (bi hev) anîn
Tehemûl kirin. **Serok û rêxistinên kurdan zêde **taba xwe bi hev nayînin**.*

Taba (tehb) Xelef, çû ber telef.
Ked û zehmet vala çûn. **Me wisa hêvî nedikir, lê mixabin **taba Xelef çû ber telef**.*

Taca serê (yekî) bûn
Li balê gelekî biqedir û qîmet bûn. **Ew ne jina wî ye, lo **taca serê wî ye**.*

Tajî jî dibêje: "Ya Elah!", kîvroşk jî dibêje: "Ya Elah!"
Her kes dicedîne ku ya xwe pêk bîne û bi ser bikeve. ****Tajî jî dibêje: "Ya Elah!", kîvroşk jî dibêje: "Ya Elah!"** Helbet her kes ji bo serkeftina xwe dixebite, lê dawî girêdayî ked û zerengiyê ye.*

Tajiyê ji gundan Beytîlok ecibandiye.
Li gorî wî jî jixwe ew girîng e. **Ma çi ji destê me tê? **Tajiyê ji gundan Beytîlok ecibandiye.***

Talanê mêrû ye, liva cehî ye.
Kar û qezenca her kesî li gorî zerengî û hêza wî ye. **Ez çi bikim, ew qas ji dest min hat, **talanê mêrûyê, liva cehî ye**.*

Talaşa qûnê nebûn
bnr. Talaşa xwe negirtin

Talaşa xwe negirtin

1. Girîng û wekî pirsgirêk negirtin. **2.** Jê netirsîn. **Wî ji bo kêrhatinên wê alavê gelek pesin dan, lê Osê* ***talaşa xwe negirt*** *û li rûyê wî jî nenêrî. *"Wî carekê bêhna xwînê hilkiribû û* ***talaşa xwe tu kesî nedigirt.***" Musa Vazgali

Taliya tirê, li min kezîkurê
bnr. Piştî tirê, li min kezîkurê

Tam hildan
Lê xweş hatin. **Tu qet meraqan meke ez bawer im ku ew ê carek din bê, çimkî wî* ***tam hildaye.***

Tam jê girtin
bnr. Tam hildan

Tam jê stendin
bnr. Tam hildan

Tam revandin
bnr. Ji şorê derxistin

Tam tê de nehiştin
Erêniya karekî xera kirin. **Wê bi ser hev de wisa kir ku* ***tam di wî karê xweş de jî nehişt.***

Tama devê (yekî) revîn
Rehetî û aramî winda bûn. **Hingî ev bûk hat,* ***tama devê me revî.***

Tama devê (yekî) xera bûn
bnr. Tama devê (yekî) revîn

Tama devê xwe xera kirin
Aramî û hizûr nehiştin. **Bi jina xwe ya di vê dawiyê de, Heyder* ***tama devê xwe xera kir.***

Tama devê xwe zanîn
Ji tiştên xweş û biqalîte fêm kirin. **Hay lo lo! Ew* ***tama devê xwe baş dizane,*** *ma tu nabînî, jinika li cem rûniştî çawa ye.*

Tama devê (yekî) xweş bûn
Rewş xweş bûn. **Şikir niha* ***tama devê me xweş e,*** *Xwedê xera neke înşelah.*

Tama ... di devê (yekî) de man
Tam gelekî xweş bûn. ****Tama wê donera Amedê hê jî di devê min de maye.***

Tamar tê de tune bûn
Bêhêz bûn. **Tu zêde tiştekî ji wî hêvî meke, kifş e ku* ***tamar di wî de tune.***

Tamara (yekî) rabûn
1. Hêrs bûn. **2.** Hatina rehmê, însaf kirin. **Ma hûn nizanin gava ku* ***tamara Eşref rabû,*** *qet bavê xwe jî nas nake. *Wa ye hêkî* ***tamara Rizgo rabûye,*** *jê bixwaze.*

Tamara roviyan ji qûnê kişîn
Pir jar û lawaz bûn. **Xêredîn wisa jar bûye ku tu dibêjî **tamara roviyan ji qûnê kişandine**.*

Tamê dayîna bin boçika (yekî)
Hînî tiştekî baş û xweş bûn. *Kifş e, bi saya wî karî, **tamê daye bin boçika Xelîl**. Ez bim ez jî bernadim.*

Tamê dan dêv
bnr: Tamê dan bin boçika (yekî)

Tamsarkî bûn
Tam xera bûn. ***Piştî ku ew kar **tamsarkî bûn**, wan jî dev jê berdan.*

Tane û tolik bûn
bnr: Gede, gûde bûn

Tapan kirin
Bi zorê rêç kirin, ji wir birin. ***Çepgiran na, lê rastgiran ew ji wir **tapan kirin**.*

Taqeta (yekî) birîn
Bêhêz hiştin. ***Ez baş dimeşiyam, lê wî hevrazê Kaniya Qaçaxan **taqeta min dibirî**.*

Tar û mar kirin
Belewela kirin, têkbirin, xisar dayîn. ***"Êdî bi parvekirina welatê wî re çand û hunera wî jî ji aliyê dagirkeran ve hatiye lewitandin an jî **tar û mar kirin**."** Adar Jiyan

Tarî lê ketin erdê
bnr Şev bi ser de hatin

Tasek ava sar bi serî de kirin
Ecêb û mat hiştin. ***"Camêr dema ku navê Behiya selı kir, wekî tu **tasek ava sar bi serî de bikî..."** Îbrahîm Ehmed

Tasek ava sar bi ser ... de vexwarin
Xisir în, ziyan dîtin û tiştek ji dêst nehatin. ***Tu çiqas destê xwe li çoka xwe bixî jî bê feyde ye, hema bi ya min dikî, tu **tasek ava sar bi ser wan pereyan de vexwe**.*

Tasek dew, nanekî cehîn ne tiştek e, ba li pişta mêrê xerab bikeve.
Mirov ku pêkhatî nebe, derfetên herî hêsan jî bi dest nakevin. ***Ez çi bibêjim, çavê felekê kor be? **Tasek dew, nanekî cehîn ne tiştek e, lê ba li pişta mêrê xerab bikeve.***

Tasê gotc leganê, "Pîsa reş a devpehnê, lawikê min bû, tu danê."
Yên ku di heman astê û di heman hawirî de ne, bi hev û din re dikevin pêşbazî û dozê. ***Tasê gote leganê, "Pîsa reş a devpelınê, lawikê min bû, tu danê."** Yên ku zehf nêzîkî hev in tim wer hev û din dixwin.*

Taştiya ewran birin

Ji yê bejna wan gelekî dirêj re tê gotin. *Maşelah Eşref wisa bûye ku **taştiya ewran dibe**.*

Taştiya (yekî) li ser pişta kêrgûşkê bûn

Zû û bi lezgînî pêk anîn. *Maşelah **taştiya wî li ser pişta kêrgûşkê ye**, hema tu hew dibînî ku karê dinyayekî qediyaye, çûye jî hatiye jî.*

Tat û lat bûn

Bêfêm û bêrê bûn. **Ew mirovekî **tat û lat e**, ew der ne cihê wî ye.*

Tatik û qutik di qûna (yekî) re avêtin

Mêriko belkî **tatik û qutik di qûna te re biavêjin, ma tu dizanî min bi çi kedê ew mezin kiriye?* (nifir)

Tav firîkîn

Xeterî û dibetiya (îhtimala) xerabiyê derbas kirin. Ji xeterî û belayê rizgar bûn. **Heke ew **tav nefirikiya**, min ê bidîta rewşa wê.*

Tavê dan qama nîvro

Dereng bûn. ***Tavê da qama nîvro**, ew hê jî radizê.*

Tayê hev bûn

1. Di heman temenî de bûn. **2.** Hempa û di denga hev de bûn. **Zelal û Celîl **tayê hev in**, di navbera wan de bi tenê roj hene. **Her du partî jî **tayê hev in**, lê zêdetir dengê partiya liberal derdikeve.*

Tayê tenê bûn

1. Bêpişt û bêkes bûn. **2.** Yekane, bijarte û awarte bûn. **Lawê min **tayê tenê ye**, Xwedê jê re alîkar be. **"Wî bi çavên xwe didît, Memê **tayê tenê**, ku dewsa warê bavê xwe mabû, çawa roj bi roj ditemire."* Tosinê Reşît

Tayekî helal tê de tune bûn

Tu hereket û karekî baş pêk neanîn. **Ka tu **tayekî helal tê de tune ye** ku dilê min jî hinekî li ser bişewite.*

Tayekî jê bikişînî wê sed pîne jê bikevin.

Ji bo kesên feqîr tê gotin. **Xeyrî ketiye rewşeke wisa ku tu **tayekî jê bikişînî, wê sed pîne jê bikevin**.*

Tazî ji jina xwe re got: "Zirav birêse."

bnr: Yekî tazî di kuwarê de rûniştû gote jina xwe. "Zirav birêse.

Tazî rûniştiye ji bo kevir digirî û dibêje: "Ku baran hat kevirê belengaz wê çawa bike?"

Ji bo kesên bêdenge tê gotin. **Xwedê aqil bide vî biraziyê min. **Tazî rûniştiye ji bo kevir digirî û dibêje: "Ku baran hat, kevirê belengaz wê çawa bike?"***

Te beran gurand, (lê) birayê beran nîn e.

Heke ku piştgirî û desteg tune be, têkçûn pêk tê. ***Te beran gurand, lê birayê beran nîn e.** Divê tu li dawiya wê jî bifikirî.*

Te çi çand ku tu çi biçînî?!
Te çi ked û zehmet da ku tu hêviyekê jê bikî? **Tu tişt bêbedel nabe,* ***te çi çand ku tu çi biçînî?***

Te çi devê deriyê xwe paqij kiriye, dora deriyê xelkê maye.
Berê karê xwe yê bingehîn bike, dû re yên din. **Tu çi mirovekî bêpêşk î kuro?* ***Te çi devê deriyê xwe paqij kiriye, dora deriyê xelkê maye.***

Te deve nedît li fêzê, (ma) te pişkul jî nedît li pirêzê.
Ma te qet rewş fêmnekir? **Ma tu qet neketî derkê?* ***Te deve nedît li fêzê, ma te pişkul jî nedît li pirêzê?***

Te deve nedît, ma te pişkul jî nedît?!
bnr: Ma te deve nedît li rêzê, te pişkul jî nedît li fêzê?!

Te Dêrik qedand, ma Dêrûn.
Te her tişt qedand, ma ew. **Maşelalı, tenê ew mabû.* ***Te Dêrik qedand, ma Dêrûn.*** (qerf)

Te ez li ber aş dîtime, lê ez ne aşvan im.
Wekî xuyangê nenirxîne, rewş cuda ye. **Ezbenî, rast e,* ***te ez li ber aş dîtime, lê ez ne aşvan im.***

Te jî got, deve hup?
Ji bo axaftinê axaftin. **Jixwe hema tu mabûyî,* ***te jî got, deve hup?***

Te ku da avê, ha li çokê, ha li navê.
bnr: Avê ku da serî, çi bihostek, çi çar tilî.

Te şilk jî divêt, kutilk jî divêt.
Her du jî ji te re pêwîst in. **Ma ne wisan e?* ***Te şilik jî divêt, kutilk jî divêt.***

Te şûşt ava bigû, ez çi bikin qenciya bi dû?!
Li bal tiştên baş, tiştên xerabtir kirin. **Min çi fêm kir ji vî karî?* ***Te şûşt ava bigû, ez çi bikim qenciya bi dû?!***

Tebata (yekî) nehatin
Bêaram bûn, bixiroş û heyecan bûn. **Heya ku min bi xwe dengê bavê xwe nebihîst,* ***tebata min nehat.***

Tebax e, tirî bûye laxe.
Di meha tebaxê de tirî zehf zêde ye. **Bixwe bavo bixwe,* ***tebax e, tirî bûye laxe.***

Tehba Xelef, çû bal telef.
Ked û zehmet bi ba de çûn. **"Tew felekê! Bilûra ber gê ve. Tu dizanî gotinek heye dibê:* ***'Tehba Xelef, çû bal telef.'*** *Îja ev jî ez im."* Abbas Alkan

Tehl bûn
Ji tiştekî êşîn, pozîde bûn. **Bi wan gotinên Bawer keçik gelekî* ***tehl bû.***

Tehl nexweş bûn

Bi nexweşiyeke giran ketin. **Dihêjin Husoyê Mistê kûr* ***tehl nexweş e****, divê em seriyekî bidinê.*

Tehl xeber dan

Peyvên giran gotin. **Rast e, ew ê din hinekî xwe çiroviroyî kir, lê Şêxmûs jî gelekî* ***tehl xeber da****.*

Tehn û niç lê xistin (Tehn û niç avêtin)

Niyeta xwe ya nebaş bi awayekî ne rasterast, lê bi peyaman (mesajan) ragihandin. **Di serxweşiya mala Dewrêş de jî Riza hema* ***ten û niç li min dixistin****, lê min guh nedayê.*

Tehtê te lê rî, baranê şûşt.

Rewş ne ya berê ye. **Hesabê te çewt e, hevalo! Ew* ***tehtê te lê rî, baranê şûşt****.*

Tekepeke pê kirin

Girîng girtin. Rûmet nîşan dan. **Heke wan* ***tekepeke pê nekirana****, malê xwe wer nedidanê.*

Telaqê (yekê) xistin qûnê

Ji bo berdana jinan tê gotin. **Ma piştî ew qas tiştan, te hê jî* ***telaqê wê nexistiye qûnê****?* (argo)

Telaqreş bûn

Bêbext, bêînsaf û sextekar bûn. **Seydo mirovekî* ***telaqreş e****, ne ji qûlan ne jî ji Xwedê vedikişe, her xirabî ji wî tê.*

Tele li serê (yekî) çêkirin

Dek û dolab anîn serê kesekî. **Wî mêrikî* ***teleyeke wisa li serê min çêkir*** *ku ez nikarim tu car ji bîr bikim.*

Tema xwe girtin

Dersa xwe girtin. Ji ber serpêhatin û taqiyê baş têgihîştin. Qewêtî girtin. **Wê tiştinên wisa anîn serê min ku devê min şewitî û di dawiyê de min* ***tema xwe baş girt****.*

Temahkaro (timakaro), gunehkaro

Mirovên temahkar gelek caran ji ber temahkariya xwe ziyanê jî dibînin. **Bi dîtina min mirovên temahkar ji derdorên xwe zêdetir; ziyanê didin xwe. Lewma gotine:* ***"Temahkaro, gunehkaro."***

Tena kiras û derpê hiştin

Yek şêlandin. Her tiştê yekî jê stendin. **Xinamiyê Hesen qelenekî wisa jê stend ku ew* ***tena kiras û derpê hişt****.*

Tenê, xenê

Kesên ku tenê û bi serê xwe ne, zêdetir rehet û bextewar in. **Mirovên* ***tenê, xenê****. Gelek wer dixwazin, lê jiyan zêde derfetê nade mirov.*

Teng û qûşên xwe şidandin
Xwe amade kirin. **Wê jî **teng û qûşên xwe şidandibûn** lê ya ku wê hêvî dikir nebû.*

Tengê (yekî) sist bûn
1. Timtêl û livbaziya xwe winda kirin. **2.** Moral xera bûn. **Êdî **tengê Bender Begê sist bûye**, tu performansa berê jê hêvî meke. *Dema ku wî ew nûçe bihîst, **tengê wî sist bû** û milên wî di ber de hatin.*

Tengê (yekî) sist kirin
Rehet bûn. Gihîştina serfîraziyê. **Gelekî dixebitî, lê hingî lawê wî xwe gihandê, **tengê wî hinekî sist kir**.*

Teniya bidon bûn
bnr. Qîra bisîr bûn

Teniya ecem bûn
bnr. Qîra bisîr bûn

Teniya xwe tê dan
bnr. Belaya xwe tê dan

Tepeqûn kirin
Qewirandin. **Mêrik mêze dike ku niyeta wî nebaş e, ji mala xwe **tepeqûn dike** û hew.* (argo)

Teptepî bûn
Demdemî bûn. Bêîstikrar bûn. **Cemîle jineke **teptepî ye**, rast û çepê wê kifş nabe.*

Teq teq sitûnê, yek çû, yek kete şûnê.
Dinya wisan e, yek tê û yek diçe. **Qet xeman nekişîne, ev jî zagoneke civakê ye, **teq teq sitûnê, yek çû, yek kete şûnê**.*

Teqeteq kirin
Bi qelebalixî û deng hawirdor aciz kirin. **Hingî **teqeteq dike** ji êvarî de serê me çû.*

Teqereq kirin
Bi awayekî asahî jiyana xwe berdewam kirin. **Karê wî bi tu kesî nîn e, hema **teqereqa** wî ye, karê dinyayê ye, dimeşîne.*

Teqînî bi binê beroşê (teştê) xistin
Xwarin qedandin. **Heta em li xwe zivirîn, wî **teqînî bi binê beroşê xist** jî.*

Teqînî jê anîn
Lê xistin, zêdetir ji derblêdana tiştên madenî re tê gotin. **Lawê Cindî bi wî kevirê piçûk **teqîniyeke wisa ji erebeya Sêvdîn anî**, deng çû esmanan.*

Ter û can
Ciwan û zingirî bûn. **Jinika **ter û can** di wî temenî de bî ma.*

Ter û teze
bnr: Ter û can

Teralê Bexdayê
Gelekî sist û bixwerenedîtî bûn. **Rêzdar tu karekî nake, hema wekî **teralê Bexdayê** heya êvarê li ser pişte vedileze.*

Teraziya (yekî) li cem (yekî) giran bûn
Li bal yekî pir birûmet bûn. **Tu jî dizanî ku **teraziya te li cem min pir giran e**.*

Teretûre xeber dan
Bêmantiq û bêdenge peyivîn. **Tu çima li wî yê ku **teretûre xeber dide** guhdarî dikî?*

Teriya (yekî) bi heft biviran qut nebûn
Ji bo kesên qure û lafek tê bikaranîn. **Maşelalı rewşa wî çiqasî xerab bibe jî **teriya wî bi heft biviran qut nabe**.*

Teriya qut û quba spî
bnr: Heya ez li dûvê xwe yê qut binêrim û tu jî li kêla spî, em nikarin bibin dost.

Teriya xwe bilind kirin
bnr: Boçika xwe dayîn ser milê xwe

Terî kirin gurz
Tirsîn, ji tirsan baz dan. **Wan hê erîşî me nekeribû, lê min nihêrî ku Ehmed **terî kire gurz** û ji wir windabû.*

Terî lê rep kirin
Ji heq de derketin an jî kuştin. **Wî gelekî serê xwe û qûna xwe li ba dikir, lê Gulistanê wisa **terî lê rep kir** ku ji wir revî.*

Terka dînê xwe dan
Dev ji dîtin û ramana xwe berdan. **Camêrî **terka dînê xwe da**, lê terka jinika gawir nekir.*

Terkîdinya bûn
Mirin, dinyaya xwe guherandin. **"Wê demê li Nazê nêrî. Nazê zîpzer bû. Nazê **terkîdinya bûbû**. Nazê gotin ji bîr kiribû."* Abidin Parıltı

Terkîselatî dinê bûn
Ji cihê xwe, ji welatê xwe dûr ketin. **Çima ku ew keçik nedanê, Rostem **terkîselatî dinê bû**, kes nizane bi ku de çûye.*

Terpînî jê anîn (Terpeterp lê xistin)
Lêdan, li kesekî yan jî tiştekî xistin. **Min hew dît ku Keremê Gelıxwar di nîvê kuçê de **terpînî ji jina xwe anî**.*

Teslîmî rehma Xwedê bûn

Xwe dan ber însaf û rehma Xwedê. *Mirov ku xwe **teslîmî rehma Xwedê bike**, helbet wê hê rehetir be.*

Teslîmî Xwedê kirin
Yek spartin dada (edeleta) Xwedê. Bi hêviya cezakirina Xwedê ve hiştin. *Ez ji wî re çi bibêjim? Her min ew **teslîmî Xwedê kiriye**.*

Teşîben e, gilokfen e.
Ew hemû hincet, ji bo armancekê ne. ***Teşîben e, gilokfen e**. Ez dizanim armanca wî çi ye û ew teres çima wer dike.*

Teşiya bavê xwe ristin
Ji bo berjewendiyên xwe xebitîn. *Ma ew jî ew qasî fêm nake? Helbet ew jî dê **teşiya bavê xwe birêse**.*

Teşiya (yekî) ristin
Alîgiriya yekî kirin. *Heke Reso **teşiya Xelîl nerista**, nikaribû ji wir derketa.*

Teşiya zirav, barek dirav
Yên bimerîfet û biqalîte ne, di heman demê de binirx û giranbuha ne jî. *Helbet dê wisa bibe. ***Teşiya zirav, barek dirav.***

Teşqele derxistin
Tevlîhevî û qerebalixî pêk anîn, pirsgirêk deranîn. Qerepere kirin. *Li cihê sekinî Gebarê Mecoyê Kor **teşqeleyeke wisa derxist** ku hemû tax derkete sêra me.*

Tev(lî) xêr û şerên (yekî) nebûn
Têkildarî tu tiştekî nebûn. *Ew ne mirovekî wisa ye ku, **tev xêr û şerên wî bibe**.*

Tevir got darê: "Ez hatim te! Darê got: "Ez çi bikim (ku) destiyê te ji min e!"
Yên ku nêzîkî hev in, ji ber ku baş hev û din nas dikin, zêdetir dikarin ziyanê bidin hev. *Yên xerîb ew qasî pê nikarin. ***Tevir got darê: "Ez hatim te! Darê got: "Ez çi bikim destiyê te ji min e!"***

Tevî bend û çarixan
Bi awayekî pejmûrde û perîşan bûn. ***Tevî bend û çarixan tu xwe didêyî**, lê bi wî awayî nabe.*

Tevî gotinê bûn
bnr. Têkilî gotinê bûn

Tevî îmana xwe ... filitîn
Ji derd û belayekê rizgar bûn. *Baş bû Şakir **tevî îmana xwe ji wê belayê filitî**.*

Tevî qîç û pîleyan ketin (nav)
Ketin bela û qotikekê û jê xelas nebûn. *Rebenê Mehemed **tevî qîç û pîlyan ketiye nav** nizane çawa rizgar bibe.*

Tevî şekalan raketin

Rehet nebûn, rehet ranezan. **Rewşa wan jî nebaş e, feqîran* ***tevî şekalan radikevin.***

Tevî şeytên nan xwarin

Pir kone û ziyankar bûn. **Tu çi ji wî hêvî dikî? Ma tu nizanî ku wî* ***tevî şeytên nan xwariye****, tiştekî baş ji wî nayê.*

Tevn birî, êşa serî fîrî.

Derdê mezin ku diqede, mirov pê rehet dibe. *****Êdî tevn birî, êşa serî fîrî.*** *Jinik te emana min bir, min erebe firot, de êdî serê min rehet bihêle.*

Tevn û teşî dilê min diêşî, diçe avê çirtik diavê.

Ji bo kesên ku ji kar û xebatê na lê tenê ji teraliyê hez dikin tê bikaranîn. **Derdê wê jî tenê lîstik e.* ***Tevn û teşî dilê min diêşî, diçe avê çirtik diavê.***

Tevnik biriye, taya min firiye.

Min karê xwe qedandiye, ez rehet im. *****Tevnik biriye, taya min firiye.*** *Êdî ez dikarim hinekî bêhna xwe berdim.*

Tevnik li dar e, taya min sar e.

Heta ku karekî mirov ê girîng berdewam bike, mirov nikare rehet bibe. **Ez çawa bikim, ez bi xwe nikarim.* ***Tevnik li dar e, taya min sar e.***

Tevnkirê, bê kiras mirê

bnr. Tevnkirê, di cila kerê de mirê

Tevnkirê, di cila kerê de mirê

Ji bo kesên ji keda xwe kêrekê nabînin tê bikaranîn. *****Tevnkirê, di cila kerê de mirê.*** *Rebena Almastê ji hemû kesî re kinc dirûn, lê bi xwe kinceke baş li xwe nekir.*

Tew Gulê narê

Ji bo rewşa ku wekî xuyangê nîn e û di bin de tiştên balkêştir hene tê bikaranîn. *****Tew Gulê narê****, ew jî teze rabûye doza salan hingê dike.*

Tewekel Xwedê, devê bavê te jî diya te jî

Ez ê dilê xwe rehet bikim, lê înşalah tiştek nabe. *****Tewekel Xwedê, devê bavê te jî diya te jî.*** *Ez behecîm lo!..* (bnr. çîrok)

Tewl avêtin lingê (yekî)

"Tewekel Xwedê, devê bavê te jî diya te jî"

Mirovek bi qîza şêxan re zewiciye. Ji ber ku dê û bavên jinikê şêx bûne, her kes ji mêrê jinikê re dibêje: *"Eman ha! Nebe tu ji dê û bavê jina xwe re bidî xeberan. Welehî wê xenimî te bibin, çavê te kor û devê te xwar bikin."* Mêrik ji tirsan ji jina xwe re nikare tiştekî bibêje. lê jinik jî ji ber ku dizane mêrik newêre ji dê û bavê wê re tiştekî xerab bibêje û destê xwe bidiyê, bitrî dibe û vêca ew ji dê û bavê mêrik re dide xeberan. Ev yek gelekî bi mêrik zor tê, lê ji tirsa keramet û xezaba şêxan jî nikare tiştekî bike. Rojekê dîsa jina wî jê re bi rehetî dide xeberan, lê ew ji ber ku nikare tiştekî bibêje, pir hêrs dibe. Ji nişkê ve direve derve, him direve, him jî dibêje:
"Tewekel Xwedê, devê bavê te jî diya te jî"

Bi cihekî ve girê dan. *Wê jinikê wisa **tewl avêtiye lingê Mêralî** ku bi zorê jê xelas bibe.

Tewl lê ketin
Bêhal û bêquwet bûn. *Ketibû rewşeke wisa ku **tewl lê diketin**.

Tewna (xwe) girtin
Di cihê xwe yê siruşt de rûniştin. Qalibê xwe girtin. *Doşegê **tewna xwe girt**, nema curde (dihêrife) dibe.* Dilawer Zeraq

Tewşa xwe girtin
Cihê xwe girtin. *Wê jî di dawiyê de **tewşa xwe girt**.

Tewşomewşo xeber dan
Bê wate axaftin. *Hema wî **tewşomewşo xeber dide**, qet nizanibû gotina wî çawa bê.

Text(ey)ê min gelek mîxan hilnade.
Zêde tehemul nekirin, bihêrs û dînik bûn. *Wisa gelekî bi ser min de neyê, **textê min gelek mîxan hilnade** ha!*

Textikê şeytên bûn
Fesad, nehs û xerab bûn. *"Hey pêxember lêxistno, hûn çi ji pisîkê dixwazin. Bê hey hûn **textikê şeytan in**, çi ne?"* Felat Dilgeş

Teyr û tilûran garis xwar, bextê Elîkê reben reş.
Hinek ji xwe re kêf dikin, hinek jî dikevin nav derd û kulan. *Ez çi bibêjim, keko? **Teyr û tilûran garis xwar, bextê Elîkê reben reş.***

Teyrek hebû, hemû teyran bi ser wî de zîrç dikir, wî jî bi ser cûcikên xwe de zîrç dikir.
Ji bo kesên li hemberî her kesî nuxs û binketî ne, lê tenê hêza wan digihîje nêzîkên wan ên bêhêz tê gotin. *Ew jî psîkolojiya bindestan e, ew jî erka xwe li ser malbata xwe diajo. ***Teyrek hebû, hemû teyran bi ser wî de zîrç dikir, wî jî bi ser çêlikên xwe de zîrç dikir.***

Teyrek hebû, gişka dina wî, wî jî dina çêlikên xwe.
bnr. Teyrek hebû, hemû teyran bi ser wî de zîrç dikir, wî jî bi ser çêlikên xwe de zîrç dikir.

Teyrikê (teyrokê) li rezê (yekî) xistin
Rewş xerab bûn. Li rastî qeza yan jî belayekê hatin. *Karê wî baş diçû, lê ji nişka ve vê **teyrokê li rezê wî xist** û tar û mar kir.*

Teyrok bi ser (yekî) de barîn
*Ji Xwedê dixwazim, **teyrok bi ser wê de bibare**.* (nifir)

Teyrokê lê xistin
bnr. Teyrok di ser (yekî) de barîn

Teyrokê tim li rezê (yekî) xistin
Xerabî, bêşansî û qederreşî tim li parê ketin. *Wê belengazê jî tu rojeke xweş nedît.*

Teyrokê tim li rezê wê xist.

Teze diya min ê çoka xwe dayne erdê û ji min re birayekî bîne.
Bira zû bi zû bi dest nakevin. **Êdî derbas bû, ma **teze diya min ê çoka xwe dayne erdê û ji min re birayekî bîne**?*

Teze hat, kevn xelat.
Ji bo kesên ku bi rûmeta nirxên kevn û qedîm nizanin û bêhtir bi tiştên nû re mijûl dibin tê bikaranîn. **Dinya niha wisa ye. Hema **teze hat, kevn xelat**.*

Teze ji diya xwe bûn
Ketin rewşek xweş û rehet. **Dema ku min ew nûçeya pîroz û xweş bihîst, te digot ez **teze ji diya xwe bûm**.*

Teze ji xamê derxistin (derketin)
Nû ji hawirekî xweş, awarte û pûtepêdanê (bi îhtîmam) derketin. Xurt, bihêz û bedew bûn. **Keçika Kazim a nû ji Stenbolê hatî wisa xweşik e ku tu dibêjî **teze ji xamê derketiye**, xortên gund hemû bi pey ketine.*

Teze malan danîn Bexdedûzê[*]
Ji niha pê ve kar xerab bû, tevlihev bû. **Dibêjîn Cindoyê Virek jî tê cînariya me, **teze malan danîn Bexdedûzê**.*

Tê bihurîn
Dev jê berdan, berdewam nekirin. **Camêr çawa ku serê zompe dît, **tê bihurî**.*

Tê de bi cih bûn
Ketin derkê. Tê de cihê xwe girtin. ** "Em şêst kes **di erebeyê de bi cih bûn**." Zana Farqînî

Tê de gûyê xwe kirin
bnr. Tê de rîtin

Tê de hok kirin
Zêde sixêf kirin, dan xeberan. **Zeydan wer **tê de hok kir** ku min ji pêş wî ve fedî kir.*

Tê de kutekut kirin
bnr. Goştê canê (yekî) xwarin

Tê de man
Çareserî nedîtin. Di nav de gut bûn. **Dilîn gelekî li ber xwe dide, lê mixabin nikare pêk bîne, hema **tê de maye**, nizane ku çawa bike.*

Tê de pişt rast kirin
Bi saya karekî yan jî tiştekî rewşa xwe ya aborî xweş kirin. **Seyîdê Celal **di wê dikana Hecî Topalê Dêrikî de pişta xwe rast kir**.*

---

[*] **Bexdedûz:** Li Qulpa navçeya Îdirê şûna warê konên zozanvanên bajêr e.

Tê de rêx kirin
bnr. Tê de rîtin

Tê de rîtin
Kar xera kirin. Rewş lewitandin. **Me got her ew dikare wê pirsgirêkê rast bike, lê mix-abin wî lap* ***tê de rît****.*

Tê de simbêl ba dan
Di derbarekê de ketin nav rewşeke erênî. **Welehî Zagros* ***di wî karê mermeran de sim-bêl ba dan****.*

Tê re çûn
Yek pê êşîn, li yekî xweş nehatin. Çavnebarî kirin. **Zarokên Seyadê Şivan di zanîngehan dixwînin, lê* ***di wî re diçe****.* (argo)

Tê re rê nedîtin
Çareseriyek jê re peyde nekirin. **A rastî, min gelekî dixwest bi wê jinika bedew re têkiliyekê deynim, lê min tu* ***rê tê re nedît****.*

Tê sotin, lê nayê gotin.
Mirov gelek caran nikare derdê xwe bîne ziman, lê ew derd hundirê wan dişewitîne. *****Tê sotin, lê nayê gotin.*** *Ax ez çawa bikim, derdê min e, ez pê dizanim.*

Têkeve zikê diya xwe xelas nabe.
Xelasbûna wî/ê nîn e. **Ew* ***têkeve zikê diya xwe ji destê min xelas nabe****.*

Têkil û pêkil bûn
Tevlihev bûn. **Min tiştek ji wan fêm nekir, hema* ***têkil û pêkil bûne****, kî çi dike jî nexuya ye.*

Têkiliya xwe jê birîn
Di navberê de tu hevbendî û têkiliyek nehiştin. **Min ku ew kirinên wî bi çavên xwe dîtin, min* ***têkiliya xwe jê birî****.*

Têkiliyên (...) germ bûn
Navber xweş bûn. **Heta ku* ***têkiliyên me germ bûn*** *wê berdewam kir.*

Têkilî gotinê bûn
Ketin nav axaftinê. Tevlî gotinê bûn. **Heke wisa negotana, jixwe ez* ***têkilî gotinê nedibûm****.*

Têkiliyên (...) sar bûn
Navber xera bûn, hêdî hêdî têkilî qels bûn. **Di demeke xerab de* ***têkiliyên me sar bûn****.*

Têkilî tehl û tirş nebûn
Xwe xerab nekirin, têkildarî tiştekî ku ziyan û binbarî tê de heye nebûn. **Ji wan re çi? Ew tim wer dikin,* ***têkilî tehl û tirşan nabin****.*

Têr nedixwar nan û jajî, xwedî dikir tole û tajî. (Têr nedixwar nan û jajî, radikirin tole û tajî.)

Ji bo karên çiloçepî tê bikaranîn. **Kenê guran bi wî dihat.* ***Têr nedixwar nan û jajî, xwedî dikir tole û tajî.***

Têr û tijî bûn

Dewlemend bûn. **Maşelah mala xezûrê keçika min, maleke* ***têr û tijî ye.***

Têra kayê bûn

Ji bo kesên sist, teral û bêxîret tê gotin. **Na lo, wekî* ***têra kayê ye,*** *nikare qûna xwe ji erdê rake.*

Têra xwe hebûn

Bi rehetî li çareya serê xwe nihêrîn. Zerengî di asta pêwîst an jî pêkanînê de bûn. **Tu ji bo wî nekeve tatêlan, ew* ***têra xwe heye.***

Têra xewê bûn

Zêde xewar bûn. **Maşelalı lawê min î herî piçûk hema* ***têra xewê ye.***

Tif kirin beqê, beq bi wan keniya û got: "Rûyê min bi ava behrê şil nabe, wê ji tifa we şil bibe?"

Ji bo kesên bêar ku ji tu tiştî fedî nakin tê gotin. **Tu ji kê re çi dibêjî? Got,* ***tif kirine beqê, beq bi wan keniya û got: "Rûyê min bi ava behrê şil nabe, wê ji tifa we şil bibe?"***

Tij û tîr avêtin

Tûj û tund tevgerîn. **Tu bi ya min bikî, bes van* ***tij û tîran biavêje,*** *ew ne çareserî ye.*

Tileqûn kirin

1. Tiştek tim seridandin. Heya ku bê xerakirin pê re mijûl bûn. **2.** Bi hev û din re henekên neyînî kirin. **Te ew qas ew radyo* ***tileqûn kir,*** *heya ku xera bû. *Ew bi şermê nizanin, heya êvarê hev û din* ***tileqûn dikin.*** (argo)

Tilî avêtin (yekî)

Bi yekî re henekên neyînî kirin. **Çeto jî di nav wan de wekî wan bûbû, wî jî* ***tilî diavête wan.*** (argo)

Tilî derman be, di çavê mirov re nake.

Ji bo kesên cirnexweş û temahkar tê gotin. **Hûn bi Xwedê qala wî nekin.* ***Tiliya wî derman be, di çavê mirov re nake.***

Tiliya (yekî) di ... hebûn

Di nav karekî de bi awayekî dizî cih girtin. Pê re têkildar bûn. **"****Tiliya wî di mirina Ahmed de heye.****"* Zana Farqînî

Tilî û pêçiyên (yekî) mîna mûmê rêtî bûn

Tilî û pêçî pir bedew û xweşik bûn. **Maşelalı tilî û* ***pêçiyên Xasxana bûka Gogê, mîna mûmê rêtî ne.***

Tilî û pêçiyên (yekî) zêr birîn

Pir bimaharet û bihuner bûn. **Maşelah, Xosrovê mala Mecîd Axa hosteyek wisa bihuner e ku **tilî û pêçiyên wî zêran dibirin**.*

Tiliya xwe pê re alastin
Gelekî lê xweş hatin. **Xwarinên Pêşgulê ew qas xweş bûn ku me **tiliya xwe pê re alast**.*

Tiliya xwe di çavên hev du re kirin
Bi hev û din re baş debar nekirin. Dexesî kirin. **Na lo ne wisa ye, her du jî heya êvarê **tiliya xwe di çavê hev du re dikin**.*

Tiliya xwe di çavê (yekî) re kirin (Tiliya xwe xistin çavê (yekî))
1. Qencî û alikariya ku kiriye li rûyê yekî xistin. **2.** Zilm û zor li yekî kirin. **3.** Ji kesekî dexesî kirin. **Ka te çi kiriye, **tiliya xwe têxe çavê** min û yek bi yek bibêje. *Ew mirovinên bêdad in, **tiliya xwe dixin çavê wê jinikê**. *Çima lawê Leylayê zanîngeha tibê qezenc kiriye, jintiya wê **tiliya xwe di çavê wan re dike**.*

Tiliya xwe dirêjî (yekî) kirin
Yęk tawanbar kirin. **Te çawa ji Xwedê taqet kir ku **tiliya xwe dirêjî wî amı û tamî kir**?*

Tiliya xwe ji (yekî) re li ba kirin (Tiliya xwe hejandin)
Gef xwarin. **Na heyran, min çi qas **tiliya xwe jê re li ba kir** jî wê talaşa xwe negirt.*

Tiliya xwe li qûna (yekî) hildan
Qerf û tinazên xwe bi yekî kirin. **Ew ên beredayî heya êvarê **tiliya xwe li qûna Yektayê reben hildikin**.*

Tiliya xwe pê re xwarin
Gelekî lê xweş hatin. Bi îştah xwarin. **Xanimê xwarineke wer xweş çêkiribû ku mirov **tiliya xwe pê re dixwar**.*

Tiliya xwe tê re kirin
Karê hinekan xera kirin. Bi niyetek neyînî nêzîk bûn. **Jixwe edeta wî ye, heta ku **tiliya xwe tê re neke** nikare bisekine.*

Tiliya xwe xistin çavê xwe
Xeta û çewtiyeke mezin kirin. **"Qey em kor bûne **tiliya xwe têxine çavê xwe**, yekî weke Memo em ji dinyayê wenda bikin."* Celîlê Celîl, Ordîxanê Celîl

Tiliya xwe xistin nav hemû tiştî
bnr. Pozê xwe xistin nav hemû tiştî

Tiliya xwe xistin qula mêşan
1. Her tişt tevlihev kirin. **2.** Fesadî kirin. **3.** Bi pirsgirêkên xeter û dijwar re mijûl bûn. **Laleş li cihê sekinî **tiliya xwe kire qula mêşan** û ji nû ve her tişt serobino kir. *Gund baş edilî bû, lê wî kûçikî dîsa çû **tiliya xwe kire qula mêşan**. *Bê lawo, tu li ecelê xwe digerî te çû **tiliya xwe kire qula mêşan**.*

Tiliya xwe xistin qulpê
Firsendeke lêhatî bi dest xistin. **Cindî ancax ku **tiliya xwe xistiye qulpê**, êdî kî dikare wî bide sekinandin?*

Tim li ser zimanê (yekî) bûn
Tim qal kirin. **Şev û roj, **tim neviya me li ser zimanê me ye**.*

Timaya çarixan kir, gore qetand.
Mirov ku di derbarekê de zêde temahiyê bike, di derbareke din de ziyanê dibîne. **Apê Koçero **timahiya çarixan kir, gore qetand**.*

Tim berê kevçî ber bi xwe ve kirin
Tim berjewendiyên xwe li pêş girtin. **Mirovên ku **tim berê kevçî ber bi xwe ve kir**, xêr jê nayê.*

Tingeting
1. Tim kutekut kirin. **2.** Ji bo yên ku nikarin saz an jî alavên wekî wê baş lêxin, lê dev jê bernadin jî tê gotin. **Ev jinik hingî **tingeting dike**, jiyana min reş kir. *Sîdar ji sibehê de saza xwe xistiye destê xwe û **tingeting dike**, guhê me bir.*

Tir di dêv de nesekinîn
bnr. Tir di qûna (yekî) de nesekinîn

Tir di qûna (yekî) de nesekinîn
Ji bo kesên ku nikarin sir û razan bigirin tê gotin. **Bi wê bawer neke û li cem tiştên tayhet nebêje, **tir di qûna wê de nasekine**.*

Tir jê berdan
bnr. Tiretir pê xistin

Tir jê safî kirin
bnr. Tiretir pê xistin

Tir ji Qeyso re kir eyb.
Halbûkî tam jî mirovê wî karî ye. **Oro, qey ew nas nake, loma **tir ji Qeyso re kire eyb**.*

Tir li ku, das li ku?!
Tu têkilî bi hev û din re tune bûn. **Ya ku tu dibêjî tu têkiliyeke wê nîn e. **Tir li ku, das li ku?*** (bnr. çîrok)

"Tir li ku, das li ku?!"
Di nîvê werza zivistanê jinik li mal hevîr distirê. Mêrê wê jî li balê rûniştiye. Ji ber zora hasilkirina hêvîr, ba bi ber jinikê dikeve. Jinik ji şerman xwe şaş dike nizane çi bibêje ku balê bikişîne cihekî din. Herna ew dasa wan a ku havîna derbasbûyî winda bûye dikeve bîrê. Bi lez ji mêrê xwe dipirse:
"Mêrik, ka te ew das nedît?" Mêrik rewşê baş dişopîne, di derka şerm û tewata jina xwe de ye, bi awayekî pir rehet jina xwe dibersivîne:
"Jinik, tir li ku, das li ku?"

Tir tê de nesekinîn
bnr.Tir di qûnê de nesekinîn.

Tira (yekî) bideng bûn
1. Bikelîj û bandor bûn. **2.** Em bêşans in; tiştên me yên piçûk jî tên mezinkirin. **Lawo tu wisa bi çavekî li vî menêre,* ***tira wî bideng e****. *Jixwe şansê me tim wilo ye,* ***tira me bideng e****.*

Tira par havînê, îro hatiye şînê.
Ji bo kar û barên di dema xwe de nebûyî, ango derengmayî tê bikaranîn. **Maşelah ev çi lezgînî ye lo?* ***Tira par havînê, îro hatiye şînê.***

Tira ser mîrkut bûn
Bêhnteng bûn. **Cemîl* ***bûye tira ser mîrkut****, di cihê xwe de nikare bisekine.*

Tiralê bin dara xurmeyê bûn
Hem teral, hem jî kone bûn. **Hay lo lo! Erê, ew teral e, lê* ***teralê bin dara xurmeyê ye****.*

Tirba dayê xweş çêkir lê bi kêlikê wê de rî.
Ji bo kesên bêdenge dipeyivin an jî dawiya kar xera dikin tê gotin. **Kerem bi ya xwe nizane,* ***tirba dayê xweş çêkir lê bi kêlikê wê de rî****.*

Tirba siwaran her kola(yî) ye.
Mirovên ku bi kar û pîşeyên xeter re mijûl bibin, zêdetir nêzîkî mirinê ne. **Helbet pîşeyên xeter wisa ne.* ***Tirba siwaran her kola ye.***

Tircunîtî kirin
Wekî dînan xwe çiroviro kirin. **Çeto çiqasî* ***tircunîtî kir*** *jî, nikaribû çavên Bawer bitirsîne.*

Tirek ji qûna (yekî) filitîn
Xem nekirin, talaş nekirin. **Qet wê meseleyê nabîne, tu dibêjî* ***tirek ji qûna wî filitiye****.*

Tirek kirin
1. Xerabe û teqeze kirin (ji bo alavan.) **2.** Kesek bêar û bêrû kirin. **Şabedînê xwarziyê min ew qasî ew teyba tileqîn kir ku di dawiyê de ew* ***tirek kir*** *û êdî baş lê naxe. *"Hema ku sergundoro çav bi wî diket, dikişiya ser û ew* ***tirek dikir****."* Yaqûb Tilermenî

Tirek xelkê, tembûrek xelkê
Xeteyeke mirov a piçûk jî ji derdora mirov re dibe sedema gelek tirane û gotegotan. ****Tirek xelkê, tembûrek xelkê.*** *Xwedê kesî nexe devê derdor û cînaran.*

Tiretir
Zêde axaftin. **Ev jinik heya êvarê* ***tiretir dike*** *û bi min ve nahêle.*

Tiretir pê xistin
Zor û zerpeke zêde lê xistin. **Di wê gulaşê de Emir* ***tiretir bi Seyîdê Temo xist****.* (argo)

Tiretir pê ketin
Di nav zorê de man. **Her ez dizanim* ***tiretireke çawa bi Xanimê ketibû***.

Tirên hesinî kirin
Gelekî serma girtin. **Li serê çiyayê Zagros wisa ye ku mirov* ***tirên hesinî dikin***.

Tirên bûkiniyê kirin
Xwe xurt û qoçax nîşan dan. **Erê, Hubrê jî dixwaze wekî Gogerçînê* ***tirên bûkaniyê bike****, lê mîro borî.*

Tirên guran jê anîn (berdan)
Xistin rewşeke dijwar. **"Aqilekî ji min re got, Rabe giliyê Muhemed bike, Hecî Yaşar berdiyê, bila* ***tirên guran jê bîne****!"* Felat Dilgeş

Tirên ji serê xwe mezintir kirin
Bi karên şaş ên ji hêza xwe zêdetir re mijûl bûn. **Ka ew jî di halê xwe de namire ku diçe* ***tirên ji serê xwe mezintir dike***.

Tirên nav gamêşan kirin
Xwe xurt û dewlemend nîşan dan. **Zerengiyeke wî tune ye. Lê* ***tirên nav gamêşan dike***.

Tirên şidiyayî kirin
Ji bo kesên ku sist tên xuyan lê jêhatî ne tê bikaranîn. **Tu li wisa xuyanga wî menêre, ew* ***tirên şidiyayî dike***.

Tirholk rakirin
bnr. Teşqele derxistin

Tirika (yekî) çûn, virik man
Tê de tiştekî baş neman. **Ka we ew qas qala wê dikir, lê wa ye* ***tirika wê çûye, virik maye***.

Tirikî bûn
Xwe winda kirin. Li dû tiştekî yan jî kesekî zêde çûn û hatin. **Keçik zehf bedew e, loma Cemşît jî li ser* ***tirikî bûye****, ji dû qûna wê naqete.*

Tilisma xwe winda kirin
Giringî û bandor kêm bûn. **Berê wan hemûyan serî li wê dixist, lê êdî wê* ***tirisma xwe winda kiriye***.

Tirî tirî filitîn
Ji bela û xeteriyekê zor xelas bûn. **Dê gelek xerabî bianîna serê Diloyê Guro, lê wî fêm kir û hema* ***tirî tirî ji dest wan filitî***.

Tirk û qanûn, Ereb û paqijî?!
Ne tirk wekî zagon û yasaya xwe tevdigerin, ne jî têkiliya Ereban bi paqijiyê re heye. **Ma li cihê sekinî gotine:* ***"Tirk û qanûn, ereb û paqijî."***

Tirs ketin dilê (yekî)
Xof girtin. *"***Tirsa mezin ketibû dilê girtiyên bi me re.***"* Bavê Hêmin

Tirs lê firandin
Tehdît kirin. Gef lê xwarin. **Ew **tirsan li Rizgo difirîne**, lê Rizgo ne yekî wisa ye ku mineta xwe jê bigire.*

Tirs li balê tune bûn
Netirsîn, wêrek bûn. **Her kes dizane ku **tirs li balê tune**, lê tenê ew ji xwe şerm dike.*

Tirs şikandin
Ji tirsê xelas bûn. **Êdî ne wekî berê ye, Tahar ew **tirsa xwe şikandiye**.*

Tirsa mirinê ketin dilê (yekî)
Ji mirinê tirsîn. ***Tirsa mirinê ketiye dilê wê**, destê wê ji jiyanê sar bûye.*

Tirsa Xwedê di dil de tune bûn
Ji heramî û bêdadiyê netirsîn. Xêr û guneh nezanîn. **Mirovên ku **tirsa Xwedê di dil de tune bin**, divê mirov ji wan bitirse.*

Tirsê pê girtin
bnr. Tirs ketin dilê (yekî)

Tirşa bamyan, birinca spî, goştê şamiyan
Ji bo rewşa pir xweş tê bikaranîn. ***Tirşa bamyan, birinca spî, goştê şamiyan!** Hê tu çi dixwazî?*

Tirşo, dilê min diêşo.
Ji bo karên ne wekî daxwazê tê gotin. **Erê dayê, **tirşo, dilê min diêşo**. Heke dawet û lîstik bûya niha tu ji zû de çûbûyî jî.*

Tirtûvirt kirin
Zû bi zû eynî tişt kirin. **Çeto **tirtûvirt kir** ew qutiya kompîtorê girt vekir, girt û vekir, heya ku xerabe kir, dû re dev jê berda.* (argo)

Tirtovirtoyî kirin
Karên ne birêkûpêk û netêkûz kirin. Hewlogewloyî kirin. **Jixwe Canan hema wer karên **tirtovirtoyî dike**.* (argo)

Tirtiro bûn
Zehf xeber dan. **Heke ew wisa **tirtiro nebûya** ji kar dernedixistin.* (argo)

Tişt mezin kirin
1. Xem xwarin, weswese kirin. **2.** Têfirandin. **Ji ber ku **her tiştî mezin dike** ew ketiye wî halî. *Tajdîn heya **tiştan mezin neke** rehet nabe.*

Tiştek di bin barê (yekî) de nebûn

Tu niyetek xerab di dil de tune bûn. **Rast e, carinan wisa şeltepelte xeber dide, lê Xwedê dizane* ***tu tiştek di bin barê wî de nîn e.***

Tiştek di nav dilê (yekî) de qetîn

Ji nişkê ve xof girtin. **Nizanim çawa bû, lê çawa ku min dengê wê bihîst, te digot* ***tiştek di nav dilê min de qetiya.***

Tiştek di navbera (...) de tune bûn

Ji bo girêdan û pêwendiyê xalek tune bûn. **Tu meraqan meke,* ***tiştek di navbera wan de tune ye*** *ku mesele mezin bibe.*

Tiştek di zikê (yekî) de hebûn

Li xinisiyekê fikirîn. Bi dizî li pey hinek hesaban bûn. **Elî pêl bi pêl dinihêre, ez dizanim* ***tiştek di zikê wî de heye****, lê nizanim çi ye.*

Tiştek ji destê (yekî) nehatin

Ji bêgavî bê bandor man. **Min jî nedixwest wisa bibe, lê ez çi bikim* ***tiştek ji destê min nayê.***

Tiştek li ber çavên (yekî) nehatin

1. Merd û destvekirî bûn. **2.** Ji her fedekariyê re amade bûn, netirsîn. **Tîtal ji mesrefên wisa nareve,* ***tiştek li ber çavên wî nayê****. *Der barê zarokên xwe de* ***tiştek li ber çavên Cezayîr nayê****, dikare xwe biavêje nav her xeteriyê.*

Tiştek li ber çavên xwe nedîtin

Pir hêrs bûn. **Ew wisan e, dema ku hêrs dibe,* ***tiştekî li ber çavên xwe nabîne.***

Tiştek li ser dilê (yekî) tune bûn

Saf bûn, di dil de tu xerabî nesêwirîn. **Erê wer got, lê tu bawer bike ku* ***tiştek li ser dilê wî tune bû.***

Tiştek nexistin ser hev

Tiştek berhev nekirin. Tiştek kom nekirin. **Di ew qas demê de wê* ***tiştek nexiste ser hev.***

Tiştek nexistin serê hev û din

Hev û din qanix (îkna) nekirin. **Ew du hefte ne ku dipeyîvin, lê nikarin* ***tiştekî têxin serê hev û din.***

Tiştek xistin serê xwe

Ji bo tiştekî biryareke vebirî girtin. **Edeta wî ye ku* ***tiştek xiste serê xwe*** *île divê bike.*

Tiştê destan kir, kesan nekir.

Mirov ku bi xwe bi destê xwe hinek karan neke, rehet nabe. ****Tiştê destan kir, kesan nekir.*** *Ez bi xwe ku xwarina xwe çênekim, bi kirina hinekên din rehet nakim.*

Tiştê ku min kirî, ba û baranê birî, lê bendê li ser min hesab kirî.

Hem min ked daye û hem ji ez ketime ziyanê. **Ev çito kar e, ez tênegihîştim.* ***Tiştê ku min kirî, ba û baranê birî, lê bendê li ser min hesab kirî.***

Tiştê min ê daleqandî, çavên min lê beleqandî

Tiştên ku ked û pêwendiya mirov tê de hebe, bala mirov li ser naqete. **Ew jî xwezayî ye, **tiştê min ê daleqandî, çavên min lê beleqandî**.*

Tiştê nedîtî û nebînayî bûn

Pir ecêb û balkêş bûn. Tiştên neasahî (normal) awarte û pir ecêb kirin. **Ya ku ew dikin, **tiştekî nedîtî û nebînayî ye**.*

Tiştên nemayî gotin

Sixêf kirin. Xeberên ecêb gotin. **Biharê şerm nekir ji wê jinika pîr re **tiştên nemayî gotin**.*

Titî ku sar dibe, dibêje: "Ez ê xaniyekî ji xwe re bigirim."

Di dema tengasiya pêdiviyên girîng de mirov hinek caran tiştên negengaz jî dibêje. ***Titî ku sar dibe, dibêje: "Ez ê xaniyekî ji xwe re bigirim."** Çawa bikim? Di wê rewşa xeter de min jî wisa got.*

Tivêka filehan girtin

Tifaqeke tund pêk anîn. **Edeta wan e di tiştekî piçûk de jî hema **tivêka fila digirin**.*

Tiving bipaca bûn

Ji pevçûna biqest û necidî re tê gotin. **Wisa tê xuyan ku ew ji xwe re **tiving bipaca bûne**.*

Tivinga destê te, tu (ma) teşiya diya te ye?!

Ew ne tiştekî wisa hêsan e, te ku ew alav girt, divê tu heqê wê bidiyê. **Tu hê tênagihîjî kuro, tu çima wê bi xwe re digerînî? **Ma tivinga destê te, tu teşiya diya te ye?***

Tivinga xwe dagirtin

Xwe amade kirin. **Weleh ez ji te re bibêjim, wî **tivinga xwe dagirtiye** û li benda te ye.*

Tî birin avê, tî anîn

Ji bo kesên pir kone yan jî pêkhatî tê gotin. **Kuro tu çawa Elî û Silo dikî hevalê hev û din? Elî yên weke wî **tî dibe avê û tî tîne**.*

Tîketîkeyî kirin

bnr. Pirtîpirtî kirin

Tîrqetîrq jê çûn

bnr. Tîrqetîrq kirin

Tîrqetîrq kirin

Bi deng kenîn. **Yekbûnê wisa **tîrqetîrq dikir ku** heya mala me dihat.*

Tîr bike dan diçe, ron bike nan diçe.

Ji bo rewşa bêçareserî û bêalternatîf tê bikaranîn. **Weleh ew reben jî nizane çawa bike. **Tîr bike dan diçe, ron bike nan diçe.***

Tîra minê ji minê (Tîra ji minê, li minê)

Yê ku pirsgirêkê diafirîne ji min e. Dîsa derd derdê min bi xwe ye. **Ez çawa bikim? Got,* ***tîra minê, ji minê.***

Tîra reş li nava dilê (yekî) ketin

Weyla* ***tîra reş li nava dilê wî ketî**, ez dizanim ew çi fesadek e.* (nifir)

Tîştîşî kirin

bnr. Zêlzêlî kirin

Tîtozî bûn

Ji bo kesên gelekî guh didine rewş û rindbûna xwe, ser û guhê xwe paqij û rengîn dikin tê gotin. **Di mal de nanê ku zarokên wî bixwin nîn e, tu li* ***tîtozîbûna*** *wî binêre.*

Tîzokî bûn

Ji her tiştî xeyîdîn. **Keçika min tu dizanî, lê bi rastî ew* ***tîtozkî ye****, pê re debarkirin pir zor e.*

Toba xwe girtin

bnr. Dersa xwe girtin

Tobedarê Xwedê me, deyndarê te me.

Ya esasî, bandor û merîfeta te ye. **Ez tu carî ji bîr nakim.* ***Tobedarê Xwedê me, deyndarê te me.***

Tofan bûn

bnr. Bizot bûn

Tofan bi ser de hatin

bnr. Tofanê lê xistin

Tofanê lê xistin

Rastî belayê hatin. **Ji xwe* ***tofanê li wî xistiye****, ji wê zêdetir wê çi bibe?*

Top avêtin

Îflas kirin. **Di şerê azadiyê de tu dizanî çiqas karmendan* ***top avêtin****?*

Topa Şems lê ketin

İnşelah* ***topa Şems li Zerdê bikeve* *ku aqilê wê bê serî.* (nifir)

Topa Xwedê lê ketin

"Hey* ***topa Xwedê li te ketiyo**!"* (nifir) Qahir Bateyî

Toqa şeytên li stûyê (yekî) ketin (Toqa şeytên ketin stû)

Lenetî bûn. **Dev ji wî kûçikî berdin, jixwe* ***toqa şeytîn li stûyê wî ketiye****.*

Tor li serê (yekî) gerandin

Dek li serî çêkirin. **Wan wisa* ***tor li serê lawê min gerandine*** *ku heya xwîn nerije ev mesele dê çareser nebe.*

Toraqa (yekî) dan ser nanê wî
Qewirandin. Karê yekî xera kirin. **Robar lê nihêrî ku Bengîn baş naxebite, di dawiyê de **toraqa wî da ser nanê wî** û ew ji kar derxist.*

Totê totevingê, li te sêlê, li min bêjingê.
Divê her yek ji me karekî bike ku rewş bi dadî bê meşandin. **Divê dost û heval bi dad û bi însaf tev bigerin. **Totê totevingê, li te sêlê, li min bêjingê.***

Tovê (...) qelandin
Zuriyet birandin, tevde kuştin, komkujî (jenosîd) kirin. **"... talana wan rakirin, pez û dewarên wan bi xwe re birin û **tovê Ermenan qelandin**."* Mehmed Uzun

Tovê xwê ye, pîşê hestî ye.
bnr: Hevraz tû dikim, simbêl e, berjêr tû dikim, rû ye.

Toyê ser top kirin (Toyê ser xwarin)
A girîng hildan. **Jixwe heçî **toyê ser hebû wan top kiriye**, ka çi ji me re maye?*

Toz û dûman bi ser (yekî) xistin
Di nav rewşeke zor de hiştin. **Wan wisa kir ku **toz û dûman bi ser me xist**.*

Toz û dûman rakirin
bnr: Toz û dûman bi ser (yekî) xistin

Toz û dûman tevîhev kirin
Teşqele derxistin. Hêwirze kirin. **Wî bi zanetî ew **toz û dûman tevîhev kir** ku di wê navberê de keçikê birevîne.*

Toza (yekî) daşandin
Hinekî li yekî xistin. **Welehî min lê nexist, hema tenê hinekî **toza wê daşand**.* (argo)

Tu avahiyek ... nehiştin
Dan xeberan, sixêf kirin. **"Wele ez hatim hêrsê, min çavê xwe girt û devê xwe vekir ku **tu avahiyek ji wan re nehêlim**..."* Rojen Barnas

Tu benikê sor û zer bûyayî, tê bi derê hebana xwe ve bûyayî.
bnr: Heke beranê bisko ba, wê li nav pezê bavo ba.

Tu bi hirî ba, tê li nav kerî ba.
bnr: Heke beranê bisko ba, wê li nav pezê bavo ba.

Tu bi vê qûşê naçî Mûşê.
Bi vê meşê û bi vî awayî tu nagihîjî armanca xwe. **Ya ku te pê girtiye, ne tu rêbaz e. **Tu bi vê qûşê naçî Mûşê.***

Tu bi vî aqilî herî, tu yê keweke hêşîn ji xwe re bigirî.
Bi vê meşê tu yê rastî belayekê bêyî. **Dû re nebêje te negot, **tu bi vî aqilî herî, tu yê keweke hêşîn ji xwe re bigirî**.*

Tu bibî gerdî, tu nebînî wî erdî.
Çi dibe bila bibe, tu nagihîjî wê armanca xwe. **Weleh min ji te re got,* ***tu bibî gerdî, tu nebînî wî erdî.***

Tu bide min şivekê, ez bidim te êlekê.
Heke ku tu bi niyeteke erênî nêzîkî min bibî, ez ê zêdetir ji te re baş bim. **Min ji te re got.* ***Tu bide min şivekê, ez bidim te êlekê.***

Tu bidî zîtikan nedî zîtikan, tê bidî heqê dîzikan.
Çi dibe bila bibe ew yek wê pêk bê. **Tu bizanibe ku çare nîn e.* ***Tu bidî zîtikan nedî zîtikan, tê bidî heqê dîzikan.***

Tu dibêjî tîza û tu nabêjî çîza, dê tu bidî nerxe gûzan.
bnr. Tu bidî zîtikan nedî zîtikan, tê bidî heqê dîzikan.

Tu bikî nav qutiya pembû, dîsa jî pere nake.
Bingeha tenduristiya yekî ku xerab bû, tu çawa bikî çare nîn e. **Ku êş kete hestiyan,* ***tu bikî nav qutiya pembû, dîsa jî pere nake.***

Tu bikî, nekî Xwedê bide te.
Lawo, ez vê qenciy.. te ji bîr nakim.* ***Tu bikî, nekî Xwedê bide te.* (dia)

Tu can bî, tu xezan bî.
Bila mirov xizan be ê tenduristiya wî baş be. **Ez vê ji dil û can dibêjim, lawo* ***tu can bî, tu xezan bî.***

Tu çawa siwarê exteyî, te çawa nivînê xwe ji bazirgan re hiştiye?!
Ji bo tiştên derew û bêmantiq tê bikaranîn. **Min tiştek ji te fêm nekir.* ***Tu çawa siwarê exteyî, te çawa nivînê xwe ji bazirgan re hiştiye?!***

Tu çi bibêjî li bejna hespê min tê. (Tu çi bibêjî, li bejna heyran tê.)
Vê gavê ez neheq im, an jî bêhêz im, tu çi bibêjî ez ê bawer bikim? **Bibêje bavo bibêje, tu jî dizanî rewş çawa ye;* ***tu çi bibêjî, li bejna hespê min tê.***

Tu çi stûyê xwe wekî qazan dirêj dikî, camêrî wekî zêrê zer xeber dide.
Ji bo neheqî û bertîlê wekî qerf tê bikaranîn. **Tu yê çawa bikî heqî yan jî neheqiyê?* ***Tu çi stûyê xwe wekî qazan dirêj dikî, camêrî wa ye wekî zêr xeber dide.*** (bnr. çîrok)

Tu çi zû bûyî dîk, te çi zû bang da?!
bnr. Tu çi zû bûyî kundir, çi jî stûyê te dirêj bû**?!**

"Tu çi stûyê xwe wekî qazan dirêj dikî, camêrî wekî zêrê zer xeber dide."

Du kes ji bo pirsgirêka navbera xwe diçine hizûra qazî. Lê ji ber ku her du jî dizanin ku qazî bertîlan dixwe, her du jî destevala naçin. Dema ku her du îfadeya xwe didin; yekî ji qazî re qazek biriye. Qaz xistiye bin paltoyê xwe. Dema ku qazî îfadeya wî digire serê qazê ji paşila xwe derdixe û nîşanî qazî dide ku ango, *"Heke tu biryarê wekî daxwaza min bidî ez ê ve qazê bidim te."* Yê din fêm dike ku wa ye yê li hemberî wî, tiştek nîşanî qazî da, ku dozê qezenc bike; zêrê di bêrîka xwe de amada kiriye bi awayekî dizî derdixe û di piştê din re nîşanî qazî dide. Qazî mêze dike ku yekî qazek aniye, yê din jî zêr. Ji yê ku xeber dide û qaz aniye re dibêje:
"Tu çi stûyê xwe wekî qazan dirêj dikî, camêrî wekî zêrê zer xeber dide."

Tu çi zû bûyî kundir, çi jî stûyê te dirêj bû?!
Ji bo kesên ku karên bi xwe mezintir re mijûl dibin tê gotin. **Got,* ***tu çi zû bûyî kundir, çi jî stûyê te dirêj bû.*** *Di ew qas demete kurt de ew qas pêşveçûn, bi rastî jî ecêb e.*

Tu çi zû bûyî kundir, te çi zû şax veda?!
bnr. Tu çi zû bûyî kundir, çi jî stûyê te dirêj bû?!

Tu deka xwe bidêyî, wê deh toqleyan biavêje.
Ji bo kesên bêdenge tê bikaranîn. **Kuro ew çi rûmet e tu didî wê? Ma* ***tu nizanî tu deka xwe bidêyî, wê deh toqleyan biavêje.***

Tu derpiyê sor li ber serê xwe nebînî.
Ez ji Xwedê daxwaz dikim ku tu* ***derpiyê sor li ber serê xwe nebînî.* (nifir)

Tu dest di ser destê xwe re nedîtin
Xwe ji her kesî zêdetir hesibandin. **Ka ew mirovekî çawa ye.* ***Tu destî di ser destê xwe re nabîne.***

Tu dest li serê wî bide, ew ê tiran ji xwe berde.
Ji bo kesên bêdenge ku bi rûdanê re bitrî dibin tê gotin. **Eman çiqasî ji wî dûr herî ew qasî baş e.* ***Tu dest li serê wî bide, ew ê tiran ji xwe berde.***

Tu di beybanên bêdar û belg de li bîngolan digerî.
Ji bo hewldana pûç tê bikaranîn. **Tu hay ji xwe heyî?!* ***Tu di beybanên bêdar û belg de li bîngolan digerî.***

Tu bi poz bigirî, ruhê (yekî) dê bikişe.
Ji bo kesên pir jar tê gotin. **Fecrî ketiye rewşeke wisa ku,* ***tu poz bigirî, ruhê wî dê bikişe.***

Tu dixwî, li min digivire.
Xwarin û vexwarina te wekî ku ez dixwim, li min xweş tê. *******Ez rast dibêjim, dema ku* ***tu dixwî, ez hew dizanim li min digivire.***

Tu dizanî ew ji qirna çendan e?
Tu dizanî ew çiqasî zana û kone ye? **Bi çavekî piçûk li wî mêze neke.* ***Tu dizanî ew ji qirna çenda ye?***

Tu gîştî bi ser hev de bikutî, nabe sîr û pîvazek.
Zêde girîng û bizereng nebûn. **Pênc lawên Kemal in,* ***tu gîştî bi ser hev de bikutî, nabin sîr û pîvazek.***

Tu gotin jê re tune bûn
Her tişt baş û têkûz bûn. **Mêrikî wisa rast e ku* ***tu gotinek min a ku ez ji wî re bibêjim nîn e.***

Tu gotin neman
Her tişt temam bûn. **Di wê derbarê de* ***tu gotineke me nema.***

Tu gû belav nekirin
bnr: Tu gû ji dest nehatin

Tu gû ji destê (yekî) nehatin
Tu tiştek çareser nekirin. Pêknehatî û bêzereng bûn. **Qet hêviya xwe bi Celal meke, bawer be **tu gû ji destê wî nayê**.*

Tu hatiyî destmala min birevînî?
Ji bo kesên ku zû vedigerin, ango zêde li derekê nasekinin tê gotin. **Ma ecela te çi ye? Ca hinekî rûne, em ji xwe re sohbet bikin, ma **tu hatiyî destmala min birevînî**?*

Tu hemû riyan dizanî, riya bazarê nizanî.
Heke tu ew qas tiştan dizanî, divê tu vê jî bizanî. Ji bo kesên bi taybetî naxwazin karekî bikin tê gotin. **Kuro ev çi ecêb e? **Tu hemû riyan dizanî, çima riya bazarê nizanî?***

Tu herî, çiriya(*) te ji min re bê.
Tu bimirî. **Înşelah **tu herî, çiriya te ji min re bê**. Ya ku te anî serê min, tu kesî nehaniye serê kesî.* (nifir)

Tu herî erş, tu herî ferş, tu dê werî ber gunikê reş.
Çi dibe bila bibe, ew yek wê pêk bê û tu yê di dawiyê de hewcedarî min bibî, yan jî hesab bidî min. **Ji niha ve ji te re bibêjim. **Tu herî erş, tu herî ferş, tu dê werî ber gunikê reş.***

Tu hew dîn î, tu min dibînî?!
Tu tenê ji min re xurtî. **Ma ji bilî wê karê te nîn e? **Tu hew dîn î, tu min dibînî?!***

Tu ji çendan kêm nakî?
Tu dixwazî çi bibêjî, yan jî çi bikî? Derdê te çi ye? **Çi ye tu wisa serê xwe qûna xwe li ba dikî? Niha **tu ji çendan kêm nakî**?*

Tu ji gerê tê, ez ji gerafêtê têm.
bnr: Cihê ku tu diçiyê, ez jê têm.

Tu ji bîr bikî, Xwedê ji bîr nake.
Divê dadmendî pêk were û ya ku bûye neyê jibîrkirin. **Ez jî dev jê bernadim, lê **tu ji bîr bikî, Xwedê ji bîr nake**.*

Tu kes di ser xwe re nedîtin
Xwe zehf zêde hesibandin. **Nizanim Fazîle xwe çi dihesibîne? **Tu kesî di ser xwe re nabîne.***

Tu li beriya Mêrdînê li siwaran dipirsî.
Tu ya bingehîn û pêşdetir napirsî. **Ev çi kar e? **Tu li beriya Mêrdînê li siwaran dipirsî.***

Tu li ku, mala dawetê li ku?!

(*) **Çirî**: Cenaze, terin

Ji bo tiştên têkiliya wan bi hev re tune be tê bikaranîn. **Tu li pey çi yî kuro?* ***Tu li ku, mala dawetê li ku?***

Tu li Soro dixî, Moro ji xwe ditirse.
Ji bo kesên biweswese û xemxwar tê bikaranîn. **Tu li encamê binêre;* ***tu li Soro dixî, Moro ji xwe ditirse****.

Tu li vî aliyî bixî, aliyê din dide berê.
Ji bo kesên milayîm û rûnerm tê gotin. **Mehemed mirovekî wisan e ku* ***tu li vî alî bixî, aliyê din dide berê****.

Tu min bi çavekî bibîne, ez te bi duduyan.
Tu ji min re qenciyekê bikî, ez ê ji te re duduyan bikim. **Min berê jî got.* ***Tu min bi çavekî bibîne, ez te bi duduyan.***

Tu min bixurîne, ez jî te dialêsim.
bnr: Tu min bi çavekî bibîne, ez te bi duduyan.

Tu mûyekî jê bikişînî, don wê di şûnê de here.
Ji bo kesên gelekî qelew tê gotin. **Maşelah ka çawan e,* ***tu mûyekî jê bikişînî, don wê di şûnê de here.***

Tu ne mala hêhê ye ku her roj bê.
Her dem ew yeka xweş li vir pêk nayê. **Ez benî tu çi hêvî dikî?* ***Tu ne mala hêhê ye ku her roj bê.***

Tu nemirî, lê tûrê parsê her li milê te be.
Mêriko* ***tu nemirî, lê tûrê parsê her li milê te be**.* (nifir)

Tu pê re, qeda û qotik jî pê re
Cihê ku tu lê bî xêr jê nayê. **Eman lawo, têkiliya xwe ji lawê min bibire,* ***tu pê re qeda û qotik jî pê re****.*

Tu poz di ser pozê xwe re nedîtin
bnr: Tu kes di ser xwe re nedîtin

Tu qazî be, ez razî me.
Ez bi te bawer im. **Çawa dibêjî bila wisa be. Qet ne xem e, hema* ***tu qazî be, ez razî me****.*

Tu qetran birî û xwîn vereşî.
Ez her wê dibêjim ku Mêriko înşelah* ***tu qetran birî û xwîn vereşî**.* (nifir)

Tu qîzekî têxî paşilê, heta sibê nahêle pal bide.
Ji bo kalên zingirî yan jî lawikên nûgihîştî tê gotin. **Tu wisa li rûyê wî yê spî menêre,* ***tu qîzekî têxî paşilê, heta sibê nahêle pal bide****.*

Tu qulek nehiştin

Li her derê nihêrîn. *Di mal de min **tu qulek nehişt** ku min lê nenihêrî, lê dîsa jî min nedît.*

Tu rê tê re dernexistin

Ji rewşê fêm nekirin. Tu serederî pê nekirin. *Ez çiqas li ser wê meseleyê ponijîm jî, lê min **tu rê tê re dernexist**.*

Tu rê tê re nedîtin

bnr. Tu rê tê re dernexistin

Tu rê jê re nehiştin

Di hêla erênî de bi her awayî nêzîk bûn. Di hêla erênî de bi her awayî bêgav hiştin. *Mêrikê bî ew jinika xweşik dixwest, ji gotinên **jinikê re tu rê nedihişt**. *"Êdî dabû dilê wê. Hekîmo jî **tu rê jê re nehiştibû**."* Dilawer Zeraq

Tu sax, ez silamet

Her tişt ew qas e. Va ye qediya. *Tu zehf ditirsiyayî, mêze bike aha qediya jî, **tu sax, ez silamet**.*

Tu sed salî li ser pişta xwe bigerînî, gava ku daynî erdê, dike: "Ha ho!"

Ji bo kesên neşikirandî û rûmeta qenciyan nizanin tê bikaranîn. *Tu çi bikî bi tiştekî nayê hesibandin. **Tu sed salî li ser pişta xwe bigerînî, gava ku daynî erdê, dike: "Ha ho!"***

Tu û şîrê xwe

Wîjdan û bextê wî çawa be dê wisa bike. *Tu çawa dixwazî wisa bike, **tu û şîrê xwe**.*

Tu tajî yî, tu kîvroşkan rê hevalê xwe dide.

Ji bo kesên ku karên xwe yê bingehîn bi xwe pêk nayînin û bi hêviya hinekên din ve dihêlin tê gotin. *Ez çi bibêjim? **Tu tajî yî, tu kîvroşkan rê hevalê xwe dide.***

Tu têra xwe li tirî digerî yan, li kuştina nehtor digerî?!

Armanca te ya rasteqîn çi ye? ***Tu têra xwe li tirî digerî yan li kuştina nehtor digerî.** Bi rastî jî min fêm nekir.*

Tu teyr î, ez xak im; tu bi ku ve herî, tu yê li min vegerî.

A bingehîn û girîng ez im, tu hewcedarî min î. *Tu çi dibêjî bibêje, **tu teyr î, ez xak im; tu bi ku ve herî, tu yê li min vegerî**.*

Tu tif bikî (wî), wê bibêje: "Elhemdulilah!"

Ji bo kesên bêar û fedînekirî tê gotin. *Ji Armanc re çi, **tu tif bikî, wê bibêje: "Elhemdulilah!"***

Tu were dewê min bikê, ez jî yê mala mîr bikêm.

Ji bo helwest û fereseta berevajî û çewt tê bikaranîn. *Wesîle jineke wer ecêb e, dibêje: **"Tu were dewê min bikê, ez jî yê mala mîr bikêm."***

Tu xwe bidî tizdan nedî tizdan, divê tu bidî heqê gwîzan.

Çi dibe bila bibe, divê tu vî karî pêk bînî. *Qet qûna xwe li ba neke, **tu xwe bidî tizdan nedî tizdan, divê tu bidî heqê gwîzan**.*

Tu xweş mêvan e, lê ne tu mazuvan e.
Ji bo kesên zehmet û kedê nadin, lê bê zehmet û bê ked jiyan li wan xweş tê gotin. **Heke tu ya rastî ji min bixwazî,* ***tu xweş mêvan e, lê ne tu mazuvan e.***

Tûlê segan jê ketin
Di pêkanîna karekî de gelekî zor û zehmet dîtin. **Xaçoyê Perê, heya ew kar çareser kir,* ***tûlê segan jê ketin.***

Tune bûn
Bêzereng, nuxs û pêknehatî bûn. **Tu wî nas nakî, ew mirovekî* ***tune ye.***

Tunebûn nedîtin
Xizanî nekişandin. **Helbet wê wer biaxive, wî* ***tunebûn nedîtiye.***

Tunebûn tune bûn
Xizanî û feqîrî ji holê rabûn. **"Belê her çiqas mezinên me dibêjin; "Serê* ***tunebûnê tune be.****", lê belê wî digot; "Serê tunekaran tune be."* Gulcan Şirnexî

Tûrikê xwe vala kirin
1. Ya di dilê xwe de eşkera gotin. **2.** Zerengiya xwe nîşan dan. **Jixwe wê çi bihîstibû û çi zanibû,* ***tûrikê xwe ji min re vala kir****. *Hefzê* ***tûrikê xwe li dîkê vala kir****, çi merîfeta wê hebû nîşan da.*

Tu yê bi wan teşk û peşkan, herî acerê meşkan.
Bi vê timtêla xwe ya xerab tu nikarî zêde bi pêş ve herî. **Ez dîsa ji te re bibêjim,* ***tu yê bi wan teşk û peşkan, herî acerê meşkan****.*

Tûr û tewas kirin
Belawela kirin, mehf kirin, kok lê anîn. **Wê dewleta dagirker ew gel hemû* ***tûr û tewas kirin.***

Tûre bûn
Pir bihêrs bûn. **"Qolçî gelekî* ***tûre bû****. Tunemabû ji qehra biteqiya. Lê tişt ji destan nedihat."* Zinar Soran

Tûrê parsê hildan milê xwe
Di hêla aborî de ketin rewşeke xerab. **Piştî ew qas bêsexbêriyê, bi xwezayî* ***tûrê parsê hildane milên xwe.***

Tûrê xwe daweşandin ûrê xwe
Mal û milkê xwe hemû di oxira zikê xwe de xerc kirin. **Ka ew çawa bibe mal û hal? Ew* ***tûrê xwe dadiweşîne ûrê xwe.***

Tûrê xwe tijî kirin
Ji bo kesên ku bê ked û bê xebat dibin xwediyê gelek mal milk an jî pereyan tê gotin. **Waliyê bajarê me, mirovekî sextekar e, di demeke kurt de,* ***tûrê xwe tijî kir.***

Tûrek nan di pikê de dimîne, gotinek di dêv de namîne.

Ji bo kesên giliyan digerînin tê gotin. **Heyf ku **tûrek nan di pikê wî de dimîne, di devê wî de gotinek namîne**.*

Tûrikê xwe vala kirin

Çi sir û gotinên ku dizane tev gotin. **Hûn çawa bi wî bawer dibin? Ew ê du rojan bi şûn de **tûrikê xwe li ber her kesî vala bike**.*

Tûrqul bûn

Ji bo kesên bêsexbêr tê bikaranîn. **Ew yekî **tûrqul e**, bawer nakim ku bibe xwedî mal û hal.*

Tûrtûrî bûn

Belawela bûn. **Dema ku gur dikeve nav keriyê pêz, kerî **tûrtûrî dibe**.*

Tûtik sincirîn

bnr. Tûre bûn

Tûtik tê de hêk kirin

Ji bo cihê pir sar tê bikaranîn. **Ka çawa sar bû, bawer bike, **tûtikê tê de hêk dikir**.*

Tûtika bin derpê

Xwe tiştek hesibandin. **Ez çi dizanim heyran, ew jî xwe **tûtika bin derpê** dihesibîne.*

Tûyî destê xwe kirin (Tûyî kefa destê xwe kirin)

Dest pê kirin. **Hela tu **tûyî kefa destê xwe bike**, bawer im ku ew ê jî di demeke kin de bên.*

Tûyî devê hev kirin (nekirin)

Li ser mijarekê gotina xwe kirin yek. Tifaq kirin. **Wan hemûyan **tûyî devê hev kirine**, em bi wan nikarin, heyran.*

Tûyî devê (yekî) kirin

Yek wekî daxwaza xwe araste kirin. **Cebraîl çawa **tûyî devê wê kiriye**, ew jî eynî wisa dibêje.*

Tûyî rûyan kirin

A rastî û derew deranîn. **Min **tûyî rûyan kir** û ya rast û derew derxiste holê.*

Tûyî rûyê (yekî) kirin

Dev jê berdan. **Ez ê çi bikim, min **tûyî rûyê wê kir** û pişta xwe dayê.*

U

Urzê (yekî) birin

Ji kesekî re biçors bersiv dan, azar dan. **Nizanim wê çi kiribû ku mamoste wisa **urzê wê birî***.

Û

Ûfînî pûfînî kirin (Ûfeûf pûfepûf kirin)

Aciz bûn. Ji ber pirsgirêkekê bêhnteng bûn. **Ji ber derengmayînê, Zekî **ûfînî pûfînî kir**, lê me dilê wî vekir.*

Ûr e, ne tûr e.

Ji bo kesên pir qelew tê gotin. **Ma tu çi dihesibînî? Helbet **hûr e, ne tûr e**.*

Ûreûr e, agir ji dêv difûre?

Ji bo kesên pir hêrsbûyî tê bikaranîn. **Nizanim çi bûye, lê Xalê Cembelî wisa **ûreûr e, agir ji dêv dibare**.*

Ûrt lê qelandin

Malbatek an jî kom û civakek qetil kirin. ***"Tirsa ku mêran bi devê xwe digire ji kozikan derdixe û **ûrtê lê diqelîne**. Belê tirs û rev."* Musa Vazgali

Ûrt ji dinyayê birîn

bnr: Ûrt lê qelandin

V

Va dar, va birek!
Tu çawa dixwazî wisa bike. **Me tu tiştekî xerab negotiye bavo,* ***va dar, va birek****.*

Va ev ez, va ev jî kefenê min!
Va ez hatim, tu çawa dixwazî wisa bike, hez dikî, bikuje, hez dikî efû bike. **Min xwe avêtiye her bextê te,* ***va ev ez, va ev jî kefenê min****!*

Va ye dar, va ye mişar.
Her tişt li pêş çavan e, tu dikarî bipîvî. **Pêdiviya peyvandinê tune ye,* ***va ye dar, va ye mişar****.*

Va ye, goştê ga ye, li pêş çava ye.
Va ye çi qas baş e, li holê ye, eşkere ye. **Ne hewceyî gotin an jî pesnan e,* ***va ye, goştê ga ye, li pêş çava ye****.*

Vala xeber dan
Ji tiştên bêkêr û nepêwîst peyivîn. **Êvarê hingî Guldarê* ***vala xeber da****, serê min êşiya.*

Varik e, hêkên hesinî dike.
Ji bo kesên xwe ji hêza xwe zêdetir didin nîşandan tê gotin. **Maşelah bi xwe* ***varik e, lê hêkên hesinî dike****.*

Vedikeve laş e, radibe baş e.
bnr. Radibe hût e, rûdinê kût e.

Vemirî çira min, vêket çira te.
Ji bo min xerab, ji bo te baş bû. **Bi rastî ez ji te bawer nakim, ditirsim ku tu wekî çîroka,* ***"Vemirî çira min, vêket çira te."*** *bînî serê min?* (bnr. çîrok)

"Vemirî çiraya min, vêket çiraya te."

Mirovek hespê wî nexweş dikeve. Bi şev wekî sanciyekê ji nişka ve bi hêsp digire li erdê dirêj dike. Hesp lingê xwe li zikê xwe dixe, pir aciz dibe û heya sibehê bi canê xwe dikeve. Mêrik her şev diçe teseliya hêsp dike. Çiraya tewlê vêdixe û bi saetan li ber disekine. Ev nexweşiya hêsp demeke dirêj wer berdewam dike. Mêrik nikare jê re çareyekê bibîne. Difikire ku ka çawa pêsîra xwe ji vî hespê nexweş xelas bike. Di dawiyê de dibêje:
"Hema ya baş ew e ku ez vî miratî bibim li meydanê bifiroşim û jê xelas bim" Radibe hefsar dike serî û berê xwe dide bajêr.

Vê gotina xwe ne hilde, ne dayne.
Vê gotina xwe carek din dubare neke. **Te vê carê ji min re got, lê* ***vê gotina xwe ne hilde, ne dayne****.*

Vêsa xwe girtin
Westa xwe danîn. Bêhna xwe berdan. **Di wê demê de min* ***vêsa xwe girt*** *û ez rehet bûm.*

Vik û vala
Bêkar û bêemel bûn. **Heke tu* ***vik û vala*** *li van deran bigerî, helbet tiştek pêk nayê.*

Vilvil ketin qûna (yekî)
1. Di cihê xwe de nesekinîn, ecele kirin. **2.** Weswese ketin dil. **Na lo,* ***vilvil ketiye qûna wî****, êdî ew nasekine, wê îleh here. *Piştî ku îmze da,* ***vilvil kete qûna mêrik****, lê êdî tîr ji kevanê derketibû.*

Vir bi hev ve girê dan
Bi awayekî rêkûpêk û zêde derew pêk anîn. **Kuro wî kurê kerê di wê dema kurt de çawa ev qas* ***vir bi hev girê dan****.*

Vir de, wê de nizanim
Tu hincet û sedemek guhdarî nekirin. **Vê carê ez* ***vir de, wê de nizanim****. Tuyê deynê min hema vê gavê bidî.*

Vir de, wê de tune bûn
Hincet û gotinek tune bûn. Vebirî û zelal bûn. **Bibore, lê êdî* ***vir de, wê de tune ye****, divê îro her tişt bê zelalkirin.*

Vir e û tir e.
Tiştê vala û pûç e. **Min ji te re negot ev gotinên wî hemû* ***vir e û tir e****.*

Vir û viz kirin
Derew kirin. **Hûn bi Xwedê gulı nedin wî, ew çi dibêje, hemû* ***vir û viz e****.*

Virevira salan bûn
Ji bo zûderbasbûna demê tê gotin. *****Vîrevira salan e****, di ser me re derbas dibin, me hew nihêrî ku zarok hatine dema zewacê jî.*

Li meydanê mirovek dibe mişteriyê hêsp. Mêrik ji xwediyê hespê dipirse:
"Bira, ji min re rast bibêje, hespê te hespekî çawa ye?" Xwediyê hêsp jê re dibêje:
"Ezbenî, ez bawer nakim ku di vê meydanê de hespê wekî hespê min hebin. Bi serê pêxember heke tu vî hespî bikirî, tu baş bizanibe ku vemirî çiraya min, vêket çiraya te!" Mêrik bi van sozan bawer dibe. Bi destê hev û din digirin pir an jî zêde di dawiyê de li hev dikin. Mêrikê ku hêsp dikire, bi dilekî geş buhayê hespê didiyê, li hespê xwe siwar dibe, bi eşq û şad berê xwe dide mala xwe. Li mal zar û zêçên wî jî bi hêsp pir şad dibin. Hêsp dikişînin tewlê û alif dikin ber. Bi şev tebata mêrik nayê bi eşq radibe diçe teseliya hespê bike. Mêrik diçe ku çi bibîne, wa ye hesp li erdê dirêj bûye û bi simê xwe li zikê xwe dixe. Mêrik bang dike jina xwe jî bi saetan li ber hêsp disekinin. Wextekî lê dinihêrin bû pirtepirta çiraya wan ku wa ye nifta wê diqede. Mêrik ji jina xwe re dibêje:
"Jinik here hinek nift têve çirayê û bîne." Dema ku jinik diçe û mêrik di tariyê de dimîne, hingê gotina xwediyê hêsp tê bîrê: *"Vemirî çiraya min, vêket çiraya te!"* Wê çaxê dikeve derkê wan gotinên xwediyê hêsp ên biwate. Ji xwe re dibêje, wî segbavê malwêran hema ya rastî gotiye, wî pereyê xwe jî hildan, îşev çiraya xwe vemirand û ji xwe re rehet rehet radize, min jî çiraya xwe vêxistiye û li ber hêsp şêw sekinîme.

Vitrevirt kirin
Gevezetî kirin, vala peyivîn. **Ji êvarê de Emîn **vitrevirtê dike,** guhê me bir.*

Vizeviz kirin
Ji bo kesên mizmizo û zêde dipeyîvin tê gotin. **Lawê Nûredîn hingî **vizevizê dike**, ez îlet kirim.*

Vizînî jê hatin (çûn)
bnr. Vizeviz kirin

Viziniya kewkaniyan (bûn)
Şer gur bûn. **Di wî şerê zozanê de her **viziniya kewkiyan** tê bîra min.*

Viziniya meşkê vala bûn
Gotin û gefan tu bandor nekirin. **Wî jî berê zelıf serê xwe qûna, xwe li ba kir, lê dû re têgilûşt ku **viziniya meşkê vala ye**.*

Vizviz ji te, hingiv ji min
Tu hema hinekî ji min re bibe darinde, ez ê pêk bînim. **Tu qet meraqan meke, hema **vizeviz ji te, hingiv ji min**.*

W

Wan girtin heqê xwe, ez mam li reqê xwe.
Neheqî li min bû. **Yê ku ked dabû ez bûm, lê* ***wan girtin heqê xwe, ez mam li reqê xwe.***

War ew war e, lê bihar ne ew bihar e.
Rewş ne wekî berê ye. **Tu bi wî aqilî diçî, lê belê* ***war ew war e, lê bihar ne ew bihar e.***

War reş man
Bêewled bûn. **Xwedê kesî* ***war reş mehêle.*** *Mal û milkê Ordîxan hemû ji xelkê re ma.*

Warê (yekî) hêşîn bûn
Sulale û zuriyet (ziret) berdewam kirin. **Ji Xwedê re şikir ku* ***warê wî lawê min jî hêşîn bû.***

Warê sitarê ji (yekî) nehiştin
Bi helwestên neyînî prestîj qels kirin. **Ew dewletên ku* ***warê sitarê ji kurdan re nehiştine,*** *bûn xelaskarê miletê kurd.*

Warê şêran e, rûvî tê de rûdinin.
bnr. Şûna şêran, mane kundê dêran.

We çima ji min re negot ew birinc e, ku min bi maqûlî bixwara?
Tiştên ku zêde nayên peyde bûn birûmet in. **Di wê demê jî ew biqîmet bû. Ma tu meseleya wî yê ku gotiye:* ***"We çima ji min re negot ew birinc e, ku min bi maqûlî bixwara!"*** *nebihîstiye?* (bnr. çîrok)

Wech xerab bûn
bnr. Wechê (yekî) qelibîn

"We çima ji min re negot ew birinc e, ku min bi maqûlî bixwara?"
Dema berê birinc zêde bi dest nediket, pir bi rûmet bû ku tenê carinan li ser sifreya zengînan dihat dîtin. Wê demê mirovek rojekê li malekê dibe mêvan. Piştî xwarin û vexwarinê, qala wî birincê ku lehzek berê xwarine tê kirin. Mirovê ku qet di jiyana xwe de birinc nediye û nexwariye, bi gazin û hesret dibêje:

"Heyran, *We çima ji min re negot ew birinc e, ku min bi maqûlî bixwara?*"

Wechê xwe tal kirin
bnr. Rûyê xwe tirş kirin

Wechê (yekî) qelibîn
1. Reng û rû xera bûn. Nexweş ketin. **2.** Moral xerab bûn. **Ev çend roj in ku **wechê Laleş qelibiye**, dibe ku sermê jî lê xistibe. *Ji reva keçika wê bi şûn de **wechê Rûşenê qelibî**.*

Wekî agir û barûdê bûn
Di radeyeke pir xeter de bûn. **Rewşa her du hêlan jî **wekî agir û barûdê bû**, hema li bendî hincetên piçûk sekinîbûn.*

Wekî agirê bêdû (bûn)
Ji bo kesên pêkhatî û kone tê bikaranîn. **Karên Xelîlcan **wekî agirê bêdû**, piştî pêkhatinê tên xuyan.*

Wekî agirê bin kayê bûn
Ji bin ve bûn. Bi xinisî tevgerîn. **Xidir xwe wisa nîşan nade, lê Xwedê dizane, mirovekî **wekî agirê bin kayê ye**.*

Wekî agirê pûş (bûn)
Ji xwe re li hicetan gerîn. Ji bo pêkanînê amade bûn. **Bi salan bû ku bi wê armancê mezin bûbû, ango **wekî agirê pûş** li benda çirûskekê bû.*

Wekî ar (arvan) hûr kirin
Gelekî hûr kirin. **Me got lûr; wî jî **wekî ar hûr kiriye**.*

Wekî aşê av li ser hatibe birîn
Di nav rewşeke xeter de bûn. ****Wekî aşê av li ser hatibe birîn**, rewşa wê pir xeter e.*

Wekî aşê hewarê hêran(din)
bnr. Wekî aşê ker û lal hêrandin

Wekî aşê ker û lal hêrandin
Zehf zêde xwarin xwarin. **Maşelah Rojhilat ku li ser sifrê rûniştt, hema **wekî aşê ker û lal dihêre**.*

Wekî ava aravê bûn
Pir xerab û qilêr bûn. **Maşelah çayek çêkiriye ku **wekî ava aravê ye**.*

Wekî ava buhrekî (bûn)
Ji bo tiştên demborî ku zû tê û diçe tê bikaranîn. **Hêrsa Hevalê Felemez **wekî ava buherekî zû tê û zû diçe**.*

Wekî ava delavan bûn
Pir paqij û nazenîn bûn. **Maşelah **wekî ava delava bû**. Ku mirov lê hewas û hejmekar dima.*

Wekî ava golegeniyan bûn

Zêde di cihekî de man, genî bûn. **Mala wan **wekî ava golegeniyan e,** bêhn jê tê.*

Wekî ava qûna cêr (bûn)
Bi tiştekî hesab nebûn, tu rûmet û pûte pê nedan. **Min ew qas ked da, lê **wekî ava qûna cêr**, kesî guh nedayê.*

Wekî balçêmkan rûçikandin
Ji bo kesên ji hêla aborî ve hatine şêlandin tê gotin. **Rebenê Sîncar ji bo bazirganiyê çû bal wan, lê wan ew **wekî balçêmkan rûçikandin**.*

Wekî barana şêkelî (bûn)
Ji nişka ve derketin, bandorek demborî nîşan dan. (Xuya kirin û winda bûn.) **Min tiştek ji vê jinikê re negotibû jî, hema **wekî barana şêkelî** ji nişka ve barî û wisa jî zû sekinî.*

Wekî bayê li kêvir xistin
Tu kelîj û bandor lê nekirin. **Ew gotinên min **wekî bayê ku li kêvir xist**, tu kelîjekê nade ser vî lawê min î piçûk.*

Wekî behra bêbinî bûn
Mezin û bêdawî bûn. **Kuro tu bibînî tu yê ecêb bimînî, hema zeviyeke **wekî behra bêbinî ye**.*

Wekî bendçarixê li pey (yekî) dirêj bûn
Tim li pey bûn, pê ve girêdayî bûn. **Bi rastî tim **wekî bendçarixan li pey min dirêj dibe**, êdî ez jî aciz bûm.*

Wekî benîşt pê ve zeliqîn
bnr: Wekî benîştê mezeleqê (bûn)

Wekî benîştê ecem bûn
bnr: Wekî benîştê mezeleqê (bûn)

Wekî benîştê mezeleqê (bûn)
Bi zêde têkiliyê yek aciz kirin. **Ev jinik wisa ye ku **wekî benîştê mezleqê** bi mirov ve girt, zû bi zû bernade.*

Wekî benîştê qanûkê (qanka) bûn
Bêar bûn, zû bi zû dest jê venekişandin. (Benîştê qanûka zû bi zû pûç nabe.) ** *"Cemoya bûka piştperdeyê serê mêrê xwe winda kiriye, **bûye benîştekî qanûkê** yê qirçqirço, ketiye devê xelkê."* Musa Vazgali

Wekî beran berdanê[*] (bûn)
Ji bo rewşa mêr û jin an jî keç û xortên di nav têkiliyeke bêar an jî zayendî de ne tê bikaranîn. **Li vî welatî edet û namûs nemaye, hema **wekî beranberdanê** li hev li ba dikevin.*

---

[*] **Beran berdan**: Zêdetir li hêla Serhedê wekî cejneke heywanan tê pîrozkirin. Li zozanan beran havînê ji pêz tên veqetandin û ji keriyê miyan cihê tên çêrandin. Tu car nahêlin beran û mî bên bal hev û din. Di serê payîzê de roja beran berdanê heye. Wê rojê beran û mî tên xemilandin û rengereng tên boyaxkirin. Bi taybetî dûvê beranan hene dikin ku jê re rîşî tê

Wekî beranê li ber baranê (bûn)
Ketin rewşek xerab û pejmûrde. **Weleh a ku min dît, Rêzan* ***wekî beranê li ber baranê*** *ketiye rewşeke xerab.*

Wekî berbînekê bûn
Pir jar bûn. **Gulan jixwe berê jî lawaz bû, lê lingî çûye mêr, tam* ***wekî berbînekê bûye****.*

Wekî berfa belekiyan bûn
bnr. Weke kuliya berfê bûn

Wekî berfa spî bûn
bnr. Weke kuliya berfê bûn

Wekî berxa ber bizinê (bûn)
Ji bo karên berevajî tê gotin. **Ev kirin dişibîne,* ***wekî berxa li ber bizinê****.*

Wekî berxa ber du maka bûn
Ji bo derfetên zêde tê bikaranîn. **Heyran şans û derfetên wî zêde ne, ew* ***wekî berxa ber du makan e****.*

Wekî berxa li ber guran bûn
Di nav rewşeke xeter de bûn. **Rewşa Aryan* ***wekî berxa li ber guran e****, nizane xwe bixe kîjan qulê.*

Wekî bêjinga qul bûn
Di gotin û kirinê de bêîstikar bûn. **Kuro gotinên wan* ***wekî bêjinga qul bêbinî ne****, dev ji wan berde.*

Wekî bêndera bablîsokê lêxistî
Tar û mar bûn. **Ew jî dayîna Xwedê ye, ew dewleta Fêrgîn* ***wekî bêndera babîsokê lêxistî*** *belawela bû, çû.*

Wekî bilbilan axivîn
Zêde û xweşik peyivîn. **Mordem hê piçûk e, lê maşelah* ***wekî bilbilan diaxive****.*

Wekî binê bêjîngê bûn
Qulqulî bûn. **Kuro çadira çi ye,* ***wekî binê bêjingê ye****.*

Wekî birakoseyan rabûn hev û din

---

gotin. Rîşî bi dûvê beranan ve tên dardakirin. Neynikên piçûk û gilover bi hiriya wan ve tên girêdan. Wê rojê her kes kincên xwe yên herî xweşik li xwe dike, kade, bîşî, binsêl tên pehtin û xwarinên herî xweş tên çêkirin. Ev roj wek rojeke pîroz, rojeke cejn û mîhricanê tê pîrozkirin. Gelek keç û xortên ciwan wê rojê evîna xwe tînin ziman, kilam û stranan dibêjin û govendê digerînin. Di vê rojê de piştî pîrozbahiyên beran berdanê dayîk zeyiyan vedixwînîn mala xwe. Lê helbet ev yek jî bi awayekî xwezayî û pêwistiyeke hêsankirina jiyanê ye. Çimkî piştî beran berdanê di navîna pazdeh-bîst mehan de hema bigire hemû pez tê beran. Ji ber wê jî ji meha Adarê pê de pez dest pê dike dizê. Bi vî awayî xwedîkirina heywanan û kar û berxên wan jî zehf zor nabe. Çimkî ji ber vê tedbîrê pez hemû di heman demê de di dorhêla bîst rojan tev dizên. Heke bi wî awayî nebe, bi taybetî xwedîkirina berxan dê pir zor bibe. Çimkî her malek gelek pezî xwedî dikin, heke wisa nebe her pezek wê di demên pir cuda cuda de bizê û pê re serederîkirin gengaz nabe.

Zû bi zû û li cihê sekinî bi hev du ketin. *Ew her sê bira tim **wekî birakosayan radibin hev û din**.

Wekî birayê piçûk çûn

Birayên piçûk ji bêgavî û ji ber rêzgirtinê gotinên birayê mezin dikin. *Camêrî hema **wekî birayê piçûk, bê gotin diçe** her karê wî.

Wekî birayê Xiço gotin

Li xwe mukir hatin. Îkrar kirin. *Wî jî li ber xwe neda û di dawiyê de **wekî birayê Xiço çi hebû, yek bi yek got**.

Wekî birçiyê ku tu nan ji ber birevînî (bû)

bnr. Wekî bûka tu ji ber zavê birevînî (bûn)

Wekî bizina bel kifş bûn

Kifş û berbiçav bûn. *Ew li ku be, **wekî bizina bel kifş e**.

Wekî bizina beravêtî (bûn)

Jar, çilmisî û hişkelokî bûn. *Delav **wekî bizina beravêtî** li pey keçika xwe dikuliya.

Wekî bizina ber bi şaxî ketî (bûn)

Perîşan û belengaz bûn. ***Wekî bizina ber bi şaxî ketî**, li kuçeyan digere.

Wekî bizina ku ji ber ecelê xwe bireve

Di nav rewşeke xeter de bûn. *Wê çawa bike, rebenê **wekî bizina ji ber ecelê xwe bireve**, di nava gund de diçû û dihat.

Wekî bizina poşek bûn

Tim li hevalê xwe xistin. *Tu nikarî bi wî re debar bikî. Ew **wekî bizina poşek e**.

Wekî bîbika çavê xwe jê hez kirin

Zêde jê hez kirin. *Tu çi dibêjî lo? Rûşen **wekî bîbika çavên xwe ji wê hez dike**.

Wekî bîra bi derziyê kolayî

Ji bo karên pir bi zehmet tê bikaranîn. *Destpêka damezirandina tevgera azadiyê **wekî bîra bi derziyê kolayî** pir bi zehmet pêk hat.

Wekî bizûzê ... xwarin

Bi awayekî xerab ziyan dan. *Mirov ku dibîne kezeba mirov dişewite. Wî derdê lawê wê **wekî bizûzê hundirê Ezîzê xwar**.

Wekî bûka baranê bûn

Bêhêz, lawaz û piçûk bûn. *Bûka çi, halê çi?! Parçeyek zarok e ku **wekî bûka baranê ye**.

Wekî bûka paşperdeyê bûn

Ciwan, teze û xam bûn. *Hê zû ye, hê ew **wekî bûka paşperdê ye**.

Wekî bûka ku tu ji ber zavê birevînî (bûn)
Ji bo asteng kirina pêdiviyên herî girîng tê bikaranîn. **Wekî bûka ku tu ji ber zavê birevînî, rewşa wê dijwar e.*

Wekî bûkek kezî bûn
bnr. Wekî bûkeke rûbixêlî bûn

Wekî bûkeke rûbixêlî bûn
Xweşik, delal, kaw, kubar û nazik bûn. **"Te digot yarebî **bûkeke rûbixêlî ye**, ketiye nav govendê dileyize. Kela Belûl Paşa wusa bedew bû."* Veysel Çamlıbel

Wekî bûmê kor (bûn)
Bed û korevijî bûn. **Heyfa wê keçikê ku dane wî yê **wekî bûmê kor**.*

Wekî caniya tor bûn
Ji bo kesên xeşîm û xam tê bikaranîn. **Bêrîcan niha **wekî caniyek tor e**, lê di demekê şûn de ew ê jî bipije.*

Wekî caniya xwe kurtisandin
Ji xweçêkirin û xemilandina yên pîr re tê gotin. **Xaltiya Xunçegulê xwe **wekî caniya kurtisandiye**.*

Wekî cemeda nava avê bûn
Ji bo tiştên pûç û bêbingeh tê gotin. **Ew tiştê ku tu dibêjî, tenê **wekî cemeda nav avê ye**.*

Wekî cûmek benîşt bûn
Pir piçûk, lawaz û hindik bûn. **Xwezî min qet Yekta nedîta, ew xortê wekî bokeberan **bûye wekî cûmek benîşt**.*

Wekî çala bêbinî bûn
Bi tiştên nepenî ango veşartî re mijûl bûn. **Şirîna Sûtê **wekî çala bê binî ye**, tu nizanî bi çi re mijûl dibe.*

Wekî çavê di bin piyan de mayî
bnr. Wekî golika li bin piyan de perçiqî (bûn)

Wekî çengek ava ji behrê çûyî (Wekî çengek av ku ji behrê here)
Zehf hindik an jî piçûk bûn. **Ew mesref ji bo wî çi ye? Ancax **wekî çengek av ji behrê here**, kelîjê bide ser wî.*

Wekî çêleka ga bûn
Ji bo jinên di hêla zayendî de di nav helwesteke neyînî de ne û bi gelek mêran re têkildar in tê gotin. **Ji vê jinikê re qet heya û abûr tune, **wekî çêleka ga ye,** mêran topî ser serê xwe dike.*

Wekî çêleka ji ber golika xwe newan bûyî (bûn)
Ji bo kesên ji kar û vatiniya xwe dûr dikevin tê gotin. **Yezdan van rojan **wekî çêleka ji ber golika xwe newan bûyî**, ji jina xwe direve.*

Wekî çêleka pê li golika xwe kirî (bûn)
bnr. Wekî çêleka pê li pizdana xwe kirî (bûn)

Wekî çêleka pê li pizdana xwe kirî (bûn)
Di nav helwesteke pejmûrde û hewlogewlo de bûn. **Çarnewa **wekî çêleka pê li pizdana xwe kirî**, perîşan tê xuyan.*

Wekî çêlkewa çengokirî (bûn)
Lê eziyet û zilm kirin. **"Bavê min bû rêzanê Osmaniyan û **wekî çêlkewa çengokirî** Elîk kire ber şibaqa wan teresbavan, da kuştin."* Medenî Ferho

Wekî çilkek zêr bûn
Ji bo kesên durist û baş tê gotin. **Şikakê çi ye, **wekî çilkek zêr e**.*

Wekî çivîka per û bask rûçikandî bûn
bnr. Weke dara pelê xwe weşandî bûn

Wekî çivîkan xwarin xwarin
Zehf hindik xwarin xwarin. **Mesrefa wê ne xem e, jixwe **wekî çivîkan xwarin dixwe**.*

Wekî çivîkeka birîndar (bûn)
Biderd û keder bûn. **Bi ser wê de meçin, jixwe ew **wekî çivîkeke birîndar** bi derdê xwe dişewite.*

Wekî çîka agir bûn
Pir jîr û qoçax bûn. **Kurekî Zaxros heye, tu bawer bike **wekî çîka êgir e**.*

Wekî dara biyê bêkêr û bêbistan bûn
1. Ji bo kesên bêhilberîn tê gotin. **2.** Ji bo kesên nebedew û bêteşe jî tê bikaranîn. **Jinik **wekî dara biyê bêkêr e, bêbistan e**. Ev çend sal in zewiciye, hê zarokek neaniye. *Yeke **wekî dara biyê bêkêr û bêbistan e**, kuro te ku dera wê eciband?*

Wekî dara kêmê bûn
Pir bedew, direj û narîn bûn. **Bejna yara min **wekî dara kêmê ye**.*

Wekî dara pelên xwe weşandî (bûn)
Bêhêz, perîşan û kevnar bûn. **Yarcan **wekî dara pelê xwe weşandî**, li holê maye.*

Wekî daweta mirtiban bûn
Bi teşqele û tevlihev bûn. **Ev karê me jî hema **wekî daweta mirtiban bû**.*

Wekî defê werimîn
Gelekî werimîn. **Di navîna şeş mehan de zikê Gulçînê **wekî defê werimî**.*

Wekî dehşika ji dest gavanan filitî (bûn)
Ji rewşeke pir zor û xeter rizgar bûn. **Weleh ew jinika bî jî **wekî dehşika ji dest gavanan filitî**, zor ji destê Apê Sidîq filitî.*

Wekî dendika sîrê bûn
Zingirî û saxlem bûn. **Maşelah heftê û çar salî ye, lê hê jî **wekî dendika sîrê ye**.*

Wekî deriyê bi heft kilîtan girêdayî (bûn)
Saxlem û qewîn bûn. ***Wekî deriyê bi heft kilîtan girêdayî**, cihê wê zelîf saxlem e, lê dilê wê nerehet e.*

Wekî dermnê ku tu biavêjî çavê kor
1. Tam xercê wê bûn. Li hev hatin. **2.** Hindik bûn. ***Ew xwarin ji bo wî **wekî dermanê ku tu biavêjî çavê kor**, bi kêr hat. **Wisa dest lê dicirifîn, te digot ew pirtûk **wekî dermanê ku tu biavêjî çavê kor**, bi dest nakeve.*

Wekî destmala ser destan guherandin
Bi hêsanî û bêxem biryarek nû dayîn, an jî guherandin. ***Mîrxan ji evîn û hezkirinê tiştekî fêm nake. Ew keçikan **wekî destmala ser destan diguherîne**.*

Wekî deveya bi du cihî de serjêkirî bûn
Ji bo kesên di nav rewşeke teşqele û karên zêde de ne tê gotin. ***Qet halê min pirs nekin, ez **wekî deveya bi du cihî de serjêkirî me**, nizanim xwe bigihînime kîjan aliyî.*

Wekî deveya ku ji palanê xwe bixwe (bûn)
Tenê bi sermaya xwe debara xwe kirin. Hilberînek nû neafirandin, nexebitîn. ***Wê çi bike? Ne kar e, ne emel e, **wekî deveya ji ku palanê xwe bixwe**, hema malê ku heye jî xelas dike.*

Wekî devê çiranekê baran barîn
bnr. Wekî devê meşkê baran hatin xwarê

Wekî devê meşkê baran hatin xwarê
Baranek gur û zêde barîn. ***Maşelah îşev **wekî devê meşkê baran hate xwarê**.*

Wekî dewê sirsûmê bûn
Pir cuda û xweş bûn. ***Kî çi dibêje bila bibêje, ew **wekî dewê sirsûmê ye**, tama wê ji xwe re tiştekî din e.*

Wekî dêla li ser tûleyan bûn
Bihêrs û tatêl bûn. ***Nûbihar eynî **wekî dêla li ser tûleyan e**, dev diavêje her kesî.*

Wekî dêla ku tu tûleyên wê ji ber bigirî (bûn)
bnr. Wekî dêla li ser tûleyan bûn

Wekî diya bûkê (bûn)
Bêbiryar bûn. ***Keçê çi ye tu **wekî diya bûkê** naxwazî biryarê bidî, de êdî bes e, em li hêviya te ne.*

Wekî dîkê bêwext bang dan
Ji bo nûçeya ne di cih de tê gotin. ***Ne bi xêr, dîsa vê sibehê Zerdeşt **wekî dîkê bêwext** bang da.*

Wekî dîkê qoqo bi tenê man
Bi tena serê xwe man. **Piştî ew qas xirabiyan, di dawiyê de **wekî dîkê qoqo bi tenê ma**.*

Wekî dîke sibehê bûn
bnr. Wekî dîkê berbangê bûn

Wekî dîwarê li ser bûzê bûn
Saxlem nebûn. Demborî bûn. **Ew têkiliya wan **wekî dîwarê li ser bûzê ye,** hema li benda hincetekê ye.*

Wekî diya bûka bêcihêz, li hev çûn û hatin
Di nav şerm û tatêlê de bûn. **Rebena Seyranê, ji fedîkarî **wekî diya bûka bêcihêz, li hev diçe û tê**.*

Wekî diya bûka bêcihêz ketin mitaleyan
bnr. Wekî diya bûka bêcihêz, li hev çûn û hatin

Wekî doxa teşiyê bûn
bnr. Wekî tîrê bûn

Wekî Ecemê ku çav bi penêrê ter bikeve
Ji bo kesên nedîtî tê bikaranîn. **Belengazî nedî ye, loma wisa **wekî Ecemê ku çav bi penêrê ter bikeve** xwe li ber xistiye gilê.*

Wekî efara bênderê bûn
Ne orjînal. Ji bo bermayî, kopya yan jî musfedeyan tê bikaranîn. **Bi dîtina min ew ne karpêka rasteqîn e, **wekî efara bênderê ye**.*

Wekî ewrê biharê li hev kelîn
Tenê zêde peyivîn û lafezanî kirin. **Edeta wî ye hema **wekî ewrê biharê li hev dikele**, lê di karvaniyê de jî tiştek nîn e.*

Wekî eyarê genî ku bêhn jê bê (bûn)
Ji bo rewşa xerab tê bikaranîn. ****Wekî eyarekî genî, ku bêhn jê bê**, karê wan bixeter in, têkildar nebî baştir e.*

Wekî êtîmên çav bi hêkên sor ketî (bûn)
bnr. Wekî Ecemê ku çav bi penêrê ter bikeve

Wekî êtîmên li ber dîwaran (bûn)
Bêxwedî, perîşan û pejmûrde man. **Tu çi ji wî dixwazî, ma tu nabînî **wekî êtîmên li ber diwaran** wa ye li holê maye?*

Wekî feleka xapînok (xapxapok)
Ji bo rewşa neyînî yan jî kesên nebibawer û xayîn tê gotin. **Ev jinik **wekî feleka xapxapok** min vî alî wî alî digerîne.*

Wekî filehê sor (bûn)
Ji bo kesên zordest tê bikaranîn. **Xosrof **wekî filehê** sor, dest da ser jina wî belengazî.*

Wekî galika gavanan (bûn)
Bi awayekî bêpûte û hewlogewlo kar pêk anîn. **Ev çi fayke ye, te **wekî galika gavanan** ji min re çêkiriye?*

Wekî garana bêgavan (bûn)
bnr. Wekî mala bêsermiyan

Wekî garisê li ser defê (bûn)
Ji bo kesên helwest bitatêl in û ji gotinan zû bawer dikin û dikevin nav çalakiyan tê gotin. **Jixwe lawê min jî **wekî garisê li ser defê**, ji karê wisa re ji duh na pêr ve amade bû.*

Wekî gayê ku li kêrê binihêre.
Ji bo kesên dikevin derka xeteriyê tê bikaranîn. **Heke ya rastî bixwazî, ez di rewşeke zor de bûm, hema min **wekî gayê ku li kêrê binihêre**, bi tenê li wî dinihêrî.*

Wekî gayê Semo (bûn)
Ji bo kesên bêfêm û gêj tê gotin. **Dildar **wekî gayê Sermo** hema li çavê min dinêrî.*

Wekî gayê tapê bûn
Wekî qalibê xwe nebûn. **Na lo! Tu wisa li girbûna wî menêre, tu hunereke wî nîne, hema tenê **wekî gayê Tapê ye**.*

Wekî gayê Xemo bûn
Bêxem bûn. ** "Eyarê mirovên bênamûs fireh e. Ew **wekî gayê Xemo ne**, tu hezar galegal û gotinê ji wan re bike, ne xema wan e."* Abbas Alkan

Wekî golika di bin piyan de perçiqî (bûn)
Di nav rewşeke xerab de bûn. **Qet qala Zîvgînê meke, ew reben **wekî golika di bin piyan de perçiqî**, di bin zilmê de ye.*

Wekî goştê bêhestî (bûn)
Rewş pir erênî û lêhatî bûn. **Ew bûk ji bo wê malê **wekî goştê bêhestî ye**.*

Wekî gula bihelînî kêb
Ji bo gotin û kirinên ku tam cihê xwe digirin tê gotin. **Bi rastî jî pêkhatina wê yekê **wekî gula bihelînî kêb**, baş cihê xwe girt.*

Wekî guleya devê tivingê çûn
Zêde bi lezgînî tevgerîn. **Filît çawa ku bihîst, wekî **guleya devê tivingê çû**.*

Wekî gulê çûn
bnr. Wekî gula devê tivingê bûn.

Wekî gundê bêseg bûn

bnr. Wekî mala bêsermiyan **(bûn)**

Wekî gundê ker nedîtî
Ecêb man. **Çi ye, hûn **wekî gundê kernedîtî**, wisa mat mane?*

Wekî gundor bûn
bnr. Wekî kûpê araqê werimîn

Wekî guran dubêrî kirin
Bi taktîkên balkêş dek û dolab li ser serê yekî çêkirin. **Dibêjin wan li ser serê Xemgîn **wekî guran dubêrî kirine**.*

Wekî gurê birçî bûn
bnr. Wekî gurê çila erbayîn bûn

Wekî gurê çila erbayîn (bûn)
1. Ji bo kesên bihêrs, hov û çavsor tê bikaranîn. **2.** Gelekî birçî bûn. **Yezdan çawa ku ew dît, **wekî gurê çila erbayîn erîşî ser kir**. *"Lê me rikêfî hewla talûn kir, **nota (wekî) gurê çileyê erbayîn** di nav çend deqeyan de me şixulê xwe qedand."* Memed Serhedî

Wekî gurê devbixwîn (bûn)
Ji bo kesên bihêrs û buxz tê gotin. ****"Wekî refek gurên birçî û devbixwîn** erîşî keriyê pez bike û di xwînê de bilhêle, her der bûbû gola xwînê..."* Memed Serhedî

Wekî gurê di keviya mîhê de
Ji bo rewşa xeter tê gotin. ****Wekî gurê di keviya mîhê de**, hema çirtek mabû ji mirinê re.*

Wekî gurê har bûn
bnr. Wekî gurê çileyê erbayîn (bûn)

Wekî gurê serê çiyan bûn
bnr. Wekî gurê çileyê erbayîn (bûn)

Wekî gûza kor bûn
Pir temahkar û xesîs bûn. **Zerdeşt **wekî gûza kor e**, qet bawer nakim ku ew qas pereyî bide.*

Wekî gûzên bijimar bûn
Pir hindik bûn. **Helbet wê zêde li ser wan bietire, ma tu nizanî ew **wekî gûzên bijimar in**?*

Wekî hecacê ku li Erefayê hatibe şêlandin (bûn)
Ketin rewşeke xerab. **Remoyê reben **wekî hecacê ku li Erefayê hatibe şêlandin**, pozîde û perîşan bû.*

Wekî hesabê xwe kirin
Li gorî berjewendiyên xwe kirin. **Helbet wî jî dizanibû çawan e, lê wî **wekî hesabê xwe kir**.*

Wekî hespa bifehl bûn

Zêde daxwazkarê têkiliya cinsî bûn. **Ezbenî, ew jinik **wekî hespa bifehl e**, di cihê xwe de nikare hisekine.*

Weki hespan serê xwe hejandin

Bi awayekî bêwate, heman tişt dubare kirin. **Ez ji te nirxandinek cidî dixwazim, çi ye hema tu **wekî hespan serê xwe dihejînî**?* (argo)

Wekî hespê cehxwarî (bûn)

Çak, qoçax û liserxwe bûn. **Maşelah **wekî hespekî cehxwarî** di navîna du saetan de ew kar hemû xelas kirin.*

Wekî hespê destkêşî (bûn)

Ji gotina yekî derneketin. **Bernas **wekî hespê destkêş**, li pey jina xwe diçe, jina wî çawa dibêje, ew wisa dike.*

Wekî hespê Sidhanan(*) bi paş ve çûn

Ji bo karên çiloçepî tê gotin. **Kes tiştekî ji wan fêm nake, ew **wekî hespê Sidhanan bi paş ve diçin**.*

Wekî hevalê kimtê bayê

Ji bo kar û barê nekifş û mayînde tê gotin. **Aqilê min ji wî karê wan nabire, hema **wekî hevalê kimtê bayê**, dê çawa be nezelal e.*

Wekî heywanê bi her du lingên paşîn ve girêdayî (bûn)

Bêçare û bêderfet bûn. **Gazinên xwe li wê mekin, ew **wekî heywanê bi her du lingên paşîn ve girêdayî**, nizane bê çawa bike.*

Wekî hêlîna çigçigokê bûn

bnr. Wekî hêlîna hecheckê

Wekî hêlîna hecheckê bûn

Tevlihev, pejûrde û bêpergal bûn. **Welehî eynî **wekî hêlîna hecheckê ye**, mirov nikare ji nav wê meseleyê derkeve.*

Wekî hirç ji mêşe derket, çi nêr çi mê.

A girîng encam e, ew ên din ne xem in. **Bi tiştên pûç re mijûl nebin, **wekî hirç ji mêşe derket, çi nêr çi mê**.*

Wekî hirça binê lingê xwe alastî (bûn)

Bê xebat debara xwe kirin. **Qet nebe hewcedarî kesî nabe û **wekî hirça binê lingê xwe alastî** debara xwe dike, ew jî tiştek e.*

Wekî hirça birîndar bûn

Bihêrs û dilkeser bûn. **Zêde bi ser wî de neçin, ew vê gavê **wekî hirça birîndar e**.*

(*)**Sidhan:** Gundê Kalik (Kahta) ku girêdayî Semsûrê ye.

Wekî hirça devê geliyan bûn
bnr. Wekî hirça birîndar bûn.

Wekî hîva çardehşevî bûn
Pir bedew bûn. **Keçika çi ye,* ***wekî hîva çardehşevî ye.***

Wekî hîveke çilwilî bûn
Pir bedew bûn. **Zelal* ***wekî hîveke çilwîlî ye,*** *mirov qênîş nake ku lê binêre.*

Wekî hîzê don bûn
bnr. Wekî kûpê araqê werimîn

Wekî holika golikan bûn
Tevlihev û xerabe bûn. **Mala jinikê eynî* ***wekî holika golikan bû.***

Wekî horiyan bûn
Pir bedew bûn. **Qîza Meta Xanim* ***wekî horiyan e.***

Wekî hudhudkê (bûn)
Bilez bûn. Li cihekî nesekinîn. **De bes e, çi ye tu* ***wekî hudhudkê*** *li cihê xwe de nasekinî.*

Wekî jehrê bûn
1. Ji bo kesên pir hêrs tê gotin. **2.** Ji bo tiştên pir tûj jî tê bikaranîn. **Simbil,* ***wekî jehrê ye.*** *jê xeber nedin. *Tirpan* ***wekî jehrê bûye.***

Wekî ji sêvekê bûn
bnr. Wekî ji hêkekê bûn

Wekî kabê wîş bûn
Pir çalak û çapik bûn. **Maşelalı bûka wan* ***wekî kabê wîş e.***

Wekî kalê heftê salî bûn
Ji bo zarok an jî ciwanên pir zana, cezû û ji temenê xwe zêdetir diaxivin tê gotin. **Na lo, ne wekî zarokan e, wekî* ***kalekî heftê salî ye.***

Wekî kalê sêhrê bûn
bnr. Wekî kalê heftê salî bûn

Wekî kavira gêj (bûn)
Sist, pêknehatî û sersem bûn. **Wexta ku xwezgîniyên qîza wê hatibûn, Seyran* ***wekî kavira gêj*** *li dora xwe dizivirî.*

Wekî kefa destê xwe zanîn (ev biwêj bi tirkî ye. "Avucunun içi gibi bilmek")
Baş zanîn. **Ez* ***wekî kefa destê xwe dizanim*** *ku niyeta wî ne wisan e.*

Wekî kefa devê segê har bûn
Pir bihêrs û şerxeta bûn. **Ev mêrik* ***wekî kefa devê segê har e,*** *eman ji vî dûr bisekinin.*

Wekî kefa sabûnê herikîn

Ji bo tiştên demborî tê gotin. **Tu li wan menêre, ew hemû wê niha* ***wekî kefa sabûnê*** *biherikin û ji holê herin.*

Wekî kela miqilkê (bûn)

Ya dilê xwe yan jî raza xwe veneşartin, zû gotin. **Maşelah ew hevala te jî* ***wekî kela miqilkê*** *hema çi hebe wê gavê dibêje.*

Wekî kela şîr çûn

Ji nişkê ve winda bûn. Dereng mayîn. **Me qet tiştek jê fem nekir, hema* ***wekî ku kela şîr biçe****, ji holê winda bû.*

Wekî kelka li ser avê bûn

Demborî bûn. **Tu zêde li wê bawer nebe, karên wê hîç kifş nabin, ew* ***wekî kelka li ser avê ye****.*

Wekî keran zirînî (zirezir) kirin

Ji bo axaftina vala û bêkêr tê bikaranîn. **Tu guh mede wî, jixwe heta êvarê* ***wekî keran zirezir dike****.* (argo)

Wekî kerê ba bi ber guhan bikeve

Ji bo kesên bi xwe tiştan li hev tînin tê gotin. **Tu* ***wekî kerê ba bi ber guhan bikeve****, wan gotinan ji ku dertînî?*

Wekî kerê bi dorê bûn

Ji bo kesên tim karên xelkê, ango olaman dikin tê gotin. **Ez* ***bûme wekî kerê bi dorê****. Kî min dibîne, barekî dide ser pişta min.*

Wekî kerê bom çûn û hatin

Bêwate li dor hev zivirîn. **Ew nikare tiştekî bike, hema tenê* ***wekî kerê bom diçe û tê****.*

Wekî kerê guhsist (bûn)

Nerm, sist û xav bûn. **Dildar* ***wekî kerê guhsist****, li van deran digere.*

Wekî kerê guhên xwe darpêlî kirin

Sist bûn û guhdarî kirin. **Wê digot, Baro jî* ***wekî kerê guhên xwe darpêlî dikirin****.*

Wekî kerê ku ber bi gur ve bizire (bûn)

Bi xwe karê xwe xera kirin. **Sûcê tu kesî nîn e, wê bi xwe* ***wekî kera ku ber bi gur ve bizire****, serê xwe xiste belayê.*

Wekî kerê têrceh (bûn)

Kêfa yekî di cih de bûn. **Ma tu nabînî, çawa* ***wekî kerê têrceh*** *rûyê wî geş e?*

Wekî kerengê li ber bayê bûn

Ji bo tiştên bêbingeh, bêhêz û bêcih tê gotin. **Bawer bike, min jî ji rewşa xwe tiştek fêm nekir. Hema* ***wekî kerengê li ber bayê me****.*

Wekî kersela bûn

Mezin û bêteşe bûn. **Ew **wekî kerselekî ye**, min pê nikaribû.*

Wekî kevçiyê neşûştî xwe avêtin nav ...

Ji bo kesên dikevin nav karên ku tu têkildariya wan pê tune ye tê gotin. **Edeta wê ye, heya ew **wekî kevçiyê neşûştî nekeve nav karan** rehet nabe.*

Wekî kevirê binê bîra bêdeng (bûn)

Ji bo tiştên ku bi dizî tên kirin tê bikaranîn. **Ev karê we yê **wekî kevirê binê bîra bêdeng**, li min xweş nayê.*

Wekî kevirê binê bîrê bûn

Ji bo kesên dûrketî û ji bîrkirî tê gotin. **Ji xwe hema ew qijika jî **bûye kevirê binê bîrê**.*

Wekî kevirê delavan (bûn)

Eşkere û li holê bûn. **Ma tiştekî veşartî ye? Her tiştên wan **wekî kevirê delavan** tê xuyan.*

Wekî kevirê kewkaniyan (bûn)

1. Bêrûmet bûn. **2.** Bêserî û bêberî bûn. **Erê, ew diya keçikê ye, lê **wekî kevirê kewkaniyan e**, ka kî rûmetê dide wê. *Ya ku te çêkiriye **wekî kevirê kewkaniyan e**, naşibe tu tiştekî.*

Wekî kevirê takêşê bûn

Ji yên hewcedar re alîkarî kirin. Dilovan û durist bûn. **Ew tim **wekî kevirê takêşê bû**, tim alîkariya ketiyan dikir.*

Wekî kevoka ferxîn bûn

Ter, ciwan û piçûk bûn. **Keçika çi ye, **wekî kevoka ferxîn e**, teze av tê digere.*

Wekî kewê çîr (bûn)

Pir cirnexweş û kifş bûn. **Gulîzer **wekî kewa çîr** dîsa derket riya min.*

Wekî kewê lal bûn

Ji bo kesên leheng, xurt û pêkhatî tê bikaranîn. **Elî merekî **wekî kewê lal e**.*

Wekî kewên tiving li ser teqiyayî (bûn)

1. Belabelayî bûn. **2.** Tirsîn, xof girtin. **Hew me mêze kir ku wa ye **wekî kewên tiving li ser teqiyayî**, her yek bi aliyekî de reviyane jî. ***Wekî kewê tiving li ser teqiyayî** pertaf kirin û di cih de melisîn.*

Wekî kêça di nav lepê kor de bûn

Ji bo kesên dibêtiya xelasbûna wan nîn e tê gotin. **"Xwedê miînçiyê wê be, ya ku bikeve nav lepê Şêxko, ew ê **bibe wekî kêça di nav lepê koran de**."* Bavê Nazê

Wekî kêça ji ber destê kor fîlitî (bûn)

Ji bo kesên ji xeteriyeke mezin xelas bûne tê gotin. **Ketibû rewşeke wer ku **wekî kêça ji ber destê kor fîlitî** çilmisîbû.*

Wekî kitek gamêşê reş

Pir bihêz û quwet bûn. **Ka çawa bihêz e, maşelah* ***wekî kitek gamêşê reş e****.*

Wekî ku tu pifî çir(ay)ê bikî vemirîn

Ji nişkê ve rewşa tenduristiyê xerab bûn. **Em dipeyivîn, tiştekî wê tune bû, lê hema ji nişka ve* ***wekî ku tu pifî çirê bikî û vemirî****.*

Wekî kuliya berfê bûn

Paqij û saf bûn. **Tu gotineke min ji wê re nîn e, Xwedê jî dizane, ew* ***wekî kuliya berfê ye****.*

Wekî kûçikan, heft canên (yekî) hebûn

Pir qewîn û xurt bûn. **Tu mekeve tatêlê,* ***wekî kûçikan heft canên wî hene****, tiştek bi wî nayê.*

Wekî kûçikê ku bielime hestiyan (bûn)

Ji bo kesên ku hînî hin tiştan bûne û her dem dixwazin tê gotin. **Na lo, mêrikî* ***wekî kûçikê ku bielime hestiyan*** *ji xwe re xistiye cir.*

Wekî kîvroşka beş derketin riya (yekî)

Ji bo kesên bêom tê bikaranîn. **Dîsa ew ê bedûm* ***wekî kîvroşka beş derkete riya min****, Xwedê dawiyê xêr bike.*

Wekî kîvroşkan xwe telandin

Tirsîn, xof girtin. **Ew kar bi xwe* ***wekî kîroşkan xwe telandinê*** *nabe.*

Wekî kîsoyê lablabik li stû bigere (bûn)

Di rewşa zor de bûn. **Xwedê alîkariya te bike. Tu* ***wekî kîsoyê lablabik li stû bigere*** *nikarî xwe ji wê belayê rizgar bikî.*

Wekî koça nezanan (bûn)

Nezan, qels û bêzereng bûn. *****Wekî koça nezanan****, ew nikarin zêde rê herin.*

Wekî koçerên şîranî nedîtî (bûn)

Ji bo kesên çavên wan li pey tiştên li bal wan tune ye loma jî zêde daxwaz dikin tê bikaranîn. **Çi ye tu* ***wekî koçerên şîranî nedîtî*** *xwe winda dikî?*

Wekî korê kêç bidestketî (bûn)

Ji bo rewşa bibiryar û bêînsaf tê bikaranîn. *****Wekî korê kêç bi dêst ketî****, wî ancax ew xistiye destê xwe, qet berdide?*

Wekî korê riya kaniyê naskirî (bûn)

Tim eynî tişt kirin. **Qurban çi ye, hema tu* ***wekî korê ku riya kaniyê naskirî****, tenê li dor min diçî û têyî.*

Wekî ku ji hêkekê bûn

Pir şibandin hev. **Her du* ***wekî ku ji hêkekê bin****, dişibin hev.*

Wekî ku mû ji nav mast kişandin

Bi maharetî kar pêk anîn. *Zelîxanê ew kar **wekî ku mû ji nav mast bikişînî** pêk anî.

Wekî kundan hizinîn

Kûr kûr ponijîn. *Kuro çi ye tu **wekî kundan dihizinî**? Tu meraqan meke, em ê tev de wê meseleyê çareser bikin.

Wekî kurê jinbavê dîtin

Cuda, kêm û biyanî hesibandin. *Jixwe xuya bû ku encam dê wer bûya, çimkî wan ew **wekî kurê jinbavê didîtin**.

Wekî kûçikan hev û din vegevizandin

Bi hev du re baş debar nekirin. *Erê, her du di malekê de dimînin, lê **wekî kûçikan jî hev û din vedigevizînin**.

Wekî kûçikê ku bielime kurtêlan

bnr: Wekî korê riya kaniyê naskirî (bûn)

Wekî kûpê araqê werimîn

1. Zêdetir ji bo kesên bêxîret û pozneşewitî tê bikaranîn. **2.** Qelew û şîşman bûn. *Ji wî re çi welat, an jî aştî, ew tenê dixwe, vedixwe, **wekî kûpê araqê diwerime**. ***Wisa wekî kûpê araqê werimiye** ku di erebeyê de jî hilnayê.

Wekî kûpê şerabê bûn

bnr: Wekî kûpê araqê werimîn

Wekî kûsiyê di qalikê xwe de bûn

Ji bo kesên zêde bi kesî re têkildar nîn in û di halê xwe de ne tê gotin. *Ez wî baş dizanim ew mirovekî **wekî kûsiyê di qalikê xwe de ye**.

Wekî kûsiyê bi qalikê xwe qayîlnebûyî (bûn)

Esil û esasê xwe înkar kirin. *Ji mirovên wisa **wekî kûsiyê qalikê xwe qayîlnebûyî** tu xêr nayê, çimkî ew şîrheram in.

Wekî kûtê segan (bûn)

Pir xerabe, bêkêr û bêteşe bûn. *Nado ew destşo hema **wekî kûtê segan** hewlogewloyî çêkiriye.

Wekî lana moriyan qilqilîn

Zêde qelebalix bûn. *Maşelah mala Sofî Bedo **wekî lana moriyan diqilqile**.

Wekî liva (lib) nîskê (ye), ne ber e, ne pişt e.

Ji bo tiştên bêteşe û bed tê gotin. ***Wekî liva nîsikê, ne ber e, ne pişt e**, mirov tu tiştî jê fêm nake.

Wekî mala bêsermiyan (bûn)

Ji bo rewşa bêrêveber û bêserwêr tê gotin. *Jixwe heta ku ew **wekî mala bêsermiyan bimeşin**, wê hê perîşantir bin.

Wekî mala li ber piyan çûyî (bûn)
Tar û mar bûn, belawela bûn. **Dikana Melîkcanê* ***wekî mala li ber piyan çûyî*** *belav bû.*

Wekî malê sêwiyan bûn
Dest neçûn. Qêmîşî lê nekirin. **Rebenê tu dibêjî malê wê* ***wekî malê sêwiyan e****, dest naçê.*

Wekî mar e, ne cih e, ne war e.
Ji bo kesên bêxwedî û bêmal tê gotin. **Rewşa wê keçikê gelekî xerab e,* ***wekî mar e, ne cih e, ne war e****.*

Wekî maran pê vedan (bûn)
Ji bo kesên bi dizî xirabiya bibandor dikin tê bikaranîn. **Gelekî fîrsend gerand, lê di dawiyê de* ***wekî maran pê veda****.*

Wekî marê bi axê debirîn (bûn)
Bi xwe îdareya xwe zor kirin. **Rewşa Emîneyê wekî ku tê gotin nîn e, hema tenê* ***wekî maran bi axê didebire****.*

Wekî marê birîndar bûn
1. Pir hêrs û buxz bûn. **2.** Xwedî derdekî mezin bûn. **Zêde têkildarî wê nebin, ew* ***wekî marê birîndar e****. *Piştî mirina jina xwe, Amed* ***wekî marekî birîndar bû****, ew mal û milk, ew malbata xwe berda û çû Ewrûpayê.*

Wekî marê çêlikên xwe xwarî (bûn)
Ji bo kesên ziyana wan digihêje nêzîkên wan tê gotin. **Mamoste Rêzan jî* ***wekî marê çêlikên xwe xwarî****, mala xwe wêran kir.*

Wekî marê di tûr de bûn
Xinisî û xayîn bûn. Karê xwe ji bin ve meşandin. **Ew* ***wekî marê di tûr de ne****, dê kingê bi mirov vedin kifş nabe.*

Wekî marê tezî (bûn)
Ji bo kesên teral tê gotin. **Jixwe ew* ***wekî marê tezî*** *hama gopal dide û ji cihê xwe ranabe.*

Wekî marê xel (bûn)
Ji bo kesên zexel tê gotin. **Tu wisa bi çavekî li wî menêre, ew* ***wekî marê xêl*** *wisa li mirov dide ku mirov nizane derbe ji ku ve hat.*

Wekî masiyên av li ser zuhabûyî
bnr: Mîna masiyê ku av li ser bê birîn

Wekî melayê nexeritandî bûn
Ji bo kesên bêperwerde, nezan û netelaştî tê gotin. **Zêde bi wî bawer nebin, çimkî ew hê* ***wekî melayê nexeritandî ye****.*

Wekî meriv û însanan (bûn)

Rast durist û asahî bûn. *Heke ew **wekî meriv û însanan** nêzîkî min bibin, ma min jî şîrê keran mêtiye, ez ê jî bersiveke xweş bidim wan.*

Wekî mêşa ku li ser gamêşê daniye (bûn)

Ji bo rewşa berevajî û eletewş tê bikaranîn. *Ka ew ê çawa li hev bên? Ma tu nabînî, **rewşa wan eynî wekî mêşa li ser gamêşê daniye** dixuye.*

Wekî mêşan vizeviz kirin

Ji bo kesên vala û zêde diaxivin tê gotin. *Seyad îşev wisa **wekî mêşan vizeziz kir ku guhê me hemûyan bir**.*

Wekî mirîşka kurkê, bi ser (yekî) de kirtekirt kirin

Li tiştekî yan jî li kesekî xwedî derketin. Miqate bûn, parastin. *Zîver axa **wekî mirîşka kurkê bi ser wan de kirtekir kir**.*

Wekî mirîşka melisok bûn

Pir sist, nerm û bindest bûn. *Birayê min **wekî mirîşka melîsok e**, ev rewş min gelekî fedîkar dike.*

Wekî miriyê merzalan (goran) bûn

Bêtevger û bêdeng bûn. *Malxerabo, ca hinekî bixebite, çi ye tu **wekî miriyê merzelan** qet ji cihê xwe nalebitî?*

Wekî mirovên bêneynok bûn

Bêderfet û bêguman bûn. *"Ji ber ku peyayên bêçek **wekî mirovên bêneynok in**, kêç jî bi wan dikarin."* Celadet Alî Bedirxan

Wekî mişkê ku têkeve qula marê reş (bûn)

Ji bo rewşa xeter tê bikaranîn. ***Wekî mişkê ku têkeve qula marê reş**, kete wir û belaya xwe dît.*

Wekî mîza keran (bûn)

Zêdetir ji bo çayê yan jî ava sar tê gotin. *Çawa çi ye, eynî **wekî mûza keran e**.*

Weke morîstangan xebitîn

Pir xebatkar bûn. *Kes li ser apê Îsmaîl re tune, mêrikî digel wî temenê xwe wekî **morîstangan dixebite**.*

Wekî mozeqirtikê li pey (yekî) bûn

Tim li pey kesekî/ê bûn. *Keçik hema **wekî mozeqirtikê tim li pey lawik bû**.*

Wekî mûma helandî kirin

Bêdeng û sist bûn. *Koço keçik di navîna şeş mehan **kir wekî mûma helandî**.*

Wekî mûma rêtî (bûn)

Bêdeng, perîşan û têkçûyî bûn. *Hisoyê Elîqarxan wisa lê kiriye ku Zînê **wekî mûma rêtî** serî ji ber ranabe.*

Wekî mûmê zirav bûn

Pir jar bûn. **Çend rojan piştî wê bûyerê bi şûn de Şermîn* ***wekî mûmê zirav bû****.*

Wekî mûmê helîn

1. Zehf li ber xwe ketin, xemgîn bûn. **2.** Pir jar bûn. **Ji ber seqetbûna keça xwe Fêrgîn* ***wekî mûmê heliya****. *Rihan bi wê nexweşiyê* ***wekî mûmê heliya****.*

Wekî nal û bizmar bûn

Bi hev du re têkildar bûn. **Zêde têkildarî wan nebin, ew* ***wekî nal û bizmar in****, ji hev û din nabin.*

Wekî nanê bêxwê bûn

Bêrûmet, bêtam bûn. **Ew keçik bedew e jî lê mixabin* ***wekî nanê bêxwê ye****, çi bike jî, li kesî xweş nayê.*

Wekî nanê petî bûn

Amade û bidestxistî bûn. **Ezbenî, tu li gotinên wan mêze neke, li gorî min ew kar ji te re* ***wekî nanê petî ye****.*

Wekî navê xwe zanîn

Bi awayekî vebirî û bêguman zanîn. **"Ez* ***wekî navê xwe dizanim*** *ku niha ro li ber hilatinê ye."* Xalit Temlî

Wekî neynok û goşt (bûn)

Gelekî nêzîk, germ û bi hev ve bûn. **Jixwe her kes dizane ku ew her du gel* ***wekî neynok û goşt*** *bi hev ve girêdayî ne.*

Wekî nokên li ser defê reqisîn

bnr. Wekî nokên li ser tehtê bûn

Wekî nokên li ser teht bûn

Ji bo kesên bêîstikrar, xwîngerm û demdemî tê bikaranîn. **Jixwe ew* ***wekî nokên li ser teht e****, hema hincetek wer ji bo wê temam e.*

Wekî palasa Haliyan li erdê pehn bûn

Li derekê bi rehetî û bêxem rûniştin an jî xwe dirêj kirin. **Hecî Seyad hema li mala hevlingê xwe* ***wekî palasa Haliyan li erdê pehn bûbû****.*

Wekî pelên ço (çilo) lerizîn

1. Tirsîn, xof girtin. **2.** Serma kirin. **Lawik* ***wekî pelên ço dilerizî****. Dudiliyek pê re çêbû.* Mustafa Aydoğan **Di bin wan kincên tenik de Rihan* ***wekî pelên ço dilerizî****.*

Wekî pelê li nav gû ketî bûn

Xeberdana xwe nezanîn, bi peyvandina xwe bûn sedemê neyîniyan, bêdenge û bêûsil bûn. **Eman wî nedin xeberdanê, kî dizane wekî pelê li nav gû ketî wê çi bibêje.*

Wekî pelê sîrê (bûn)

Pir zirav û hesas bûn. **Bi van mirovên* ***wekî pelê sîrê****, ew zor wî karî pêk bîne.*

Wekî peramberê li ber bê ketî
Bêcih, bêwar û derbeder bûn. **Piştî derketina ji welêt, malbata me* ***wekî peramberê li ber bê ketî*** *bajar bi bajar geriya.*

Wekî periyan bûn
bnr. Wekî horiyan bûn

Wekî petîxê xerabûyî bûn
Perîşan, sist û pejmûrde bûn. **Belqis ne ya berê ye,* ***bûye wekî petîxê xerabûyî****.*

Wekî peza gêj li dor hev zivirîn
Bêbiryar, sist û bêarmanc, di nav helwesteke vala de bûn. **Wa ye dîsa Dîndar û Sevo* ***wekî peza gêj li dor hev dizivirin****.*

Wekî peza ji kerî qetiyayî (bûn)
1. Tenê man. Bi xeteriyekê re rû bi rû man. **2.** Ji zagon û edetan dûr ketin. **Êdî rewşa wê xeter e, çimkî li wir* ***wekî peza ji kerî qetiyayî*** *tenê maye. *Ku mirov* ***wekî peza ji kerî qetiyayî be****, helbet ne edet dimîne, ne jî zagon.*

Wekî peza li ser diranekî çêriyayî (bûn)
Pir jar û lawaz bûn. **Ev qîza Silêman* ***wekî peza li ser diranekî çêriyayî****, ku dimeşe dihujhuje.*

Wekî pezê bêşivan (bûn)
Bêxwedî, bêxwedan û bêserî bûn. **Ew eşîra piştî mirina Şemdîn Axa* ***wekî pezê bêşivan*** *li holê ma.*

Wekî pezkoviyan bûn
Sil û bazdanok bûn. **Jixwe ew* ***wekî pezkoviyan e****, hema ku dengek bi ser ket, temam e.*

Wekî pêlekana hilawistî[*] bûn
Ji bo karên neqewîm û bêîstikrar tê gotin. Ne qewîm. **Karên wê jixwe* ***wekî pêlekana hilawistî ne****.*

Wekî pisîka ku bi mişk bilîze (bûn)
1. Yek zêde hincirandin. **2.** Tiranê xwe bi yekî kirin. Bi yekî re lîstin. **"Mirinê destê xwe dirêjî min kiribû,* ***wekî pisîka ku bi mişk bilîze*** *bi min dilîst..."* Fawaz Husên

Wekî pisîkan li ser her çar lingan ketin
Zana û kone bûn. **Ew wisa ne, tim* ***wekî pisîkan li ser çar lingan dikeve****.*

Wekî pisîka lingşewitî bûn
bnr. Wekî pisîka pelûr bi ser de hirşiyayî bûn

---

[*] **Pêlekana Hilawistî:** Pêlekana bi bendan ve girêdayî

Wekî pisîka mala Bioş bûn

Ji bo rewşa di hêla zayendî de gelekî daxwazkarbûnê tê gotin. **"Ma hûn nabînin wek pisîka mala Bioş qirnewokî bûye! Heger jinek bi dest keve yan wê xwe bikuje, yan jî wê ..."* Bavê Nazê

Wekî pisîka pelûr bi ser de hurşiyayî bûn

Di nav rewşeke xerab de bûn. **Xwezî te rewşa wê bidîta, eynî* ***wekî pisîka pelûr bi ser de hurşiyayî bû***.

Wekî pisîkan, li ser piştê neketin

Ji bo kesên pir kone û pêkhatî ku zû bi zû têk naçin tê gotin. **Tu çi dikî bike, ew têk naçe,* ***wekî pisîkan li ser piştê nakeve***.

Wekî pîneyê vajî (bûn)

Karê çewt û çiloçepî kirin. **Ez belıecîm ji dest van karên te yên* ***wekî pîneyên vajî***.

Wekî pîra cezû bûn

bnr. Wekî pîra sêrê (bûn)

Wekî pîra kevir li qûnê ketî (bûn)

Bi tiştekî êşîn an jî ji ber derd û kulekê tim kutekut kirin. ***Wekî pîra kevir li qûnê ketî,*** *tim zarezara Fayzê bû.*

Wekî pîra li ber tendûrê (bûn)

Ji bo kesên bêtevger û sist tê gotin. **Hema Osê jî* ***wekî pîra li ber tendûrê*** *qet ji cihê xwe nalive.*

Wekî pîra sêrê (bûn)

Pir zana û kone bûn. **Dîsa qîza Gogê* ***wekî pîra sêrê***, *çi neneran dizivirîne gelo?*

Wekî pofa diya mar (bûn)

Ji bo kesên xerab tê gotin. **Çi ye te dîsa* ***wekî pofa diya mar***, *rûyê xwe tirş kiriye, tu ji bo kê, li çi xirabiyê difikirî?*

Wekî pola bûn

Pir qewîn bûn. **Maşelalı erê şêst û heft salî ye, lê hê jî* ***wekî pola ye***.

Wekî porê vepincirî (bûn)

Di nav rewşeke pir perîşan de bûn. **Rebenê Îsa bûye* ***wekî porê vepincirî***, *nizane xwe bigilûne pirsgirêka kîjan ewledê xwe.*

Wekî pûtan bûn

Tevnegerîn, di cihê xwe de sekinî man. **Zal li ber* ***wekî pûtan bû***, *Zerîcanê çi got, dengê xwe nekir.*

Wekî qelîneka li ser sêlê netebilîn

bnr. Wekî garisê li ser defê (bûn)

Wekî qirniyan pê ve zeliqîn
Ji bo kesên bêar ku mirov aciz dikin tê bikaranîn. **Kuro mêrik* ***wekî qirniyan bi min ve zeliqî*** *û pêşa min berneda.*

Wekî qîra sîr pê ve zeliqîn
bnr. Wekî benîştê mezeleqê (bûn)

Wekî qîtika kulê bûn
Pir çalak û qoçax bûn. **Hûn nekevin tatêla wî, maşelah ew* ***wekî qîtika kulê ye****, wê zû here û bê jî.*

Wekî qulinga ji refan qetiyayî (bûn)
Ji heval û hogir, qewm û lêzimên xwe dûr ketin. *****Wekî qulinga ji refan qetiyayî****, dest û piyên Mehmûd ji esmanan qetiyan.*

Wekî qulingê baskşikestî bûn
bnr. Wekî qulingekî birîndar bûn.

Wekî qulingekî birîndar bûn
Ji bo rewşa xerab tê bikaranîn. **"Kul li mala Edê Cizviz nekeve dengekî wisa delal û dilovan lê bû ku tu yê bêjî* ***wekî qulingekî birîndar e****, ji beriyê tê."* Veysel Çamlıbel

Wekî Quranê xetim kirin
Ji ber kirin, baş têgihîştin. **Di wê dersê de mayîna wê negengaz e, ji ber ku ew ders* ***wekî Quranê xetim kiriye****.*

Wekî qûrpika li ser hêkan rûniştin
Ji bo bi awayekî tund xwedî derketina li tiştan tê gotin. **"Oso* ***wekî qûrpika li ser hêkan rûdine****, li ser bîst û pênc quriş û banknotan rûniştibû."* Felat Dilgeş

Wekî roniya çavên xwe zanîn
Zêde girîng girtin. **Tu qet meraq meke, jixwe ew zavayê xwe* ***wekî roniya çavê xwe dizane****.*

Wekî roviyê bendî pûnda mirîşkan ketî (bûn)
Bi pey nêçîrekê ketin. **Xwezî te ew di wî halî de bidîta ku ka çawa* ***wekî roviyê bendî pûnda mirîşkan ketî*** *li pey keçikê bûbû virik.*

Wekî rûnê helandî (bûn)
Lê hatin. **Min jî wisa hêvî nedikir, lê bi rastî jî ew muzîk* ***wekî rûnê helandî*** *lê hat.*

Wekî seg û pisîkên bi hev du ve girêdayî bûn
bnr. Wekî seg û pisîkan bi hev û din ketin

Wekî segan girijîn
Ji ber têkiliyeke zayendî, yan jî ji bo tiştekî din xwe şirîn û nêzîk nîşan dan. **Heke ew* ***wekî segan negirijiya****, dibe ku ez jê bitirsiyama.*

Wekî segê bin avê bûyî

Di nav rewşeke perîşan de bûn. *Çeto wekî ***segê bin avê bûyî***, qirqisî û pejmûrde mabû.*

Wekî segê birçî (bûn)

Bêserî û beredayî li holê man. *Sedulah ***wekî segê birçî***, di wexta xwarinê de rojê xwe diavêje mala exrebeyekî.*

Wekî segê dermanxwarî (bûn)

Hay ji xwe tune bûn. Xwe şaş kirin. *Piştî ew qas xebat, çûn û hatinê, ez wekî ***segê dermanxwarî*** li ser qoltixê dirêj bûm.*

Wekî segê har (bûn)

Pir hêrs bûn. *"Xwedê xêr bike, Tefîqê casûs bi vê lez û bezê bi ku ve diçe? Yan ***wekî segê har*** pê kîjan nêçîrê xistine?"* Îbrhaîm Ehmed

Wekî segê xwe li ber baranê şilkirî (bûn)

Di nav rewşeke perîşan de bûn. ****Wekî segê xwe li ber baranê şil bike***, selemtî selemtî li wan deran digeriya.*

Wekî seriyê vepincirî bûn)

Gelekî eziyet dîtin. *Belengazê Xembar di dest wê jinikê de ***wekî seriyê vepincirî*** perîşan bû.*

Wekî sêwiyê binçengşewitî

Di nav rewşeke nebaş de bûn. *Rojhilat û Ordîxan ***wekî sêwiyê piçengşewitî***, li holê mabûn.*

Wekî sibatoka dînik bûn

Ji bo rewşên nekifş û tim tên guherandin tê gotin. *Bila kes bi wê bawer nebe. Ew ***wekî sibatoka dînik e***, kes nizane wê çi bike.*

Wekî sirsûmekê (bûn)

Ji bo kesên pir mezin, giran û stûr tê gotin. *Kuro tu yê çawa bi wê keçika ***wekî sirsûmekê*** re bizewicî?*

Wekî sûka seharê (bûn)

Gelekî sar û serma bûn. *Welatê wan ***wekî sûka seharê*** wisa sar bû ku nayê gotin.*

Wekî şimayê zer bûn

Nexweş û jar bûn. *Rojbîn ***wekî şimayê zer bûbû***, dema ku min ew dît, min nas nekir.*

Wekî şimayê bûn

Nerm û milayîm bûn, lihevhatî bûn. *Bi her sê navê Xwedê, hingî pîreka min ew tirsandiye, ***bûye wekî şimayê***, xwe jî şimaya helandî.*

Wekî şiva her du serî bigû bûn

Rewş bi her awayî xerab bûn. ****Wekî şiva her du serî bigû ye.*** *Ez nikarim ji nav vê meseleyê derkevim.*

Wekî şûşê bûn
Pir paqij û pak bûn. **Jinika çi ye,* ***wekî şûşê ye.***

Wekî tava teyrokê bûn
Ji bo tiştên zû derbas dibin, lê bibandor dibin tê bikaranîn. **Ew mirovekî wisa ne, hema* ***wekî tava teyrokê her dem bi awayekî ye.***

Wekî teberikê bûn
1. Zehf kêm bidest ketin, birûmet bûn. **2.** Paqij, durist û baş bûn. **Na lo!* ***Wekî teberikê ye*** *zû bi zû bi dest nakeve. *Lolan lawikekî wisan e ku tu dibêjî* ***wekî teberikê ye.***

Wekî teyrekî spî bûn
Bêsûc, bêguneh, bijare û bêxeta bûn. **Tu kes nikare tiştekî xerab ji bo Zerdeşt bibêje, ew* ***wekî teyrekî spî ye.***

Wekî teyrê baz (bûn)
Pir xurt û qoçax bûn. **Dema ku Têkoşer* ***wekî teyrê baz*** *xwe digihande kar, her tişt cuda dibû.*

Wekî teyrên ku di mij de berî kewan bide
Firsend bi kar anîn. **Ez wî baş dinasim, ew* ***wekî teyrên ku di mij de berî kewan bide,*** *li pey wan e.*

Wekî teyrê ecelê, li ser serê (yekî) bûn
Belaya xwe jê venekirin. Xeterî û ziyan tim ji bo kesekî amade kirin. **Bila ew hêvî neke ku wê rehet be. Em ê* ***wekî teyrê ecelê tim li ser serê wî bin.***

Wekî teyrên ji refên xwe qetiyayî bûn
bnr. Wekî peza ji kerî qetyayî (bûn)

Wekî teyrê pelşikestî (bûn)
Pozîde, poşman, têkçûyî û perîşan bûn. **Di wê azmûnê de Ralışan* ***wekî teyreke pelşikestî*** *ji hundir derket.*

Wekî têra kewarê bûn
Pir mezin bûn. **Maşelalı torbeyê te* ***wekî têra kewarê ye,*** *dikî nakî tijî nabe.*

Wekî tiliya kul pê re riciîn
Gelekî rûmet dan. Bi dilovanî nêzîk bûn. **Kesî tiştekî wisa nedîtiye, diya wî* ***wekî tiliya kul pêre diricifî.***

Wekî tira ji qûnê filitî (bûn)
Ji dest derketin, dereng mayîn. **Êdî qet li pey nekeve, ew kar jî* ***wekî tira ji qûnê filitî,*** *derbas bû û çû.*

Wekî tîra ji kevan veresiyayî
bnr. Wekî tîra ji qûnê filitî (bûn)

Wekî tîrê bûn
Rast û durist bûn. **Bêrîvan keçeke wer bidad e ku* ***wekî tîrê ye****.*

Wekî tûleyekî guhjênekirî bûn
Xam, nezan û xeşîm bûn. **Ew* ***wekî tûleyekî guhjênekirî ye****, ma ez ê xwe bixim hevalê wî?*

Wekî tûrê qul bûn
Destbelaş û bêsexbêr bûn. **Ezîz* ***wekî tûrê qul e****, dikî nakî tiştek di dêst de namîne.*

Wekî xewna şevan (bûn)
Xeyal, ji nişka ve winda bûn. **Min tiştek ji wê fêm nekir. Hema* ***wekî xewneke şevan*** *tê bîra min ku hat û çû.*

Wekî xilt bûn
Ji bo kesên ji bin ve û xinis tê gotin. **Ez bi wî dizanim ew mirovekî* ***wekî xilt e****.*

Wekî ximşê xezalan bûn
Pir bedew û spehî bûn. **Zelal* ***wekî ximşê xezalan e****.*

Wekî Xoce Xizir xwe gihandin (yekî)
Di demeke kurt de xwe gihandina yê di tengiyê de. **Bi rastî jî êdî min gumana xwe biribû, lê min hew nihêrî ku Zagros* ***wekî Xoce Xizir xwe gihande min****.*

Wekî Xoce Xizir bi hewarê ve hatin
bnr. Wekî Xoce Xizir xwe gihandin (yekî)

Wekî xortlaxan bûn
Pir jar bûn. **Wê nexweşiyê wisa kiriye ku Zagros* ***wekî xortlaxan bûye****.*

Wekî xuriya agir (bûn)
Zêde kelîn an jî şewitîn. **Ew dims wekî* ***xuriya agir*** *keliya.*

Wekî xwîşk û birayan bûn
1. Ji hev û din re pir baş bûn. **2.** Bi hev û din re neketin nav têkiliya zayendî. **Ji hev û din re wisa baş in* ***wekî xwîşk û birayan in****. *Erê, di nav cihekî de radizan, lê* ***wekî xwîşk û birayan bûn****.*

Wekî zarokan şad bûn
Pir kêfxweş bûn. **Bahîv bi wê xelata min* ***wekî zarokan şad bû****.*

Wekî zarokên çelinî (çileyî) bûn
Bêhêz, bêderfet û qels bûn. **Malxirabo, ma tu nabînî wa ye* ***bûye wekî zarokeke çilinî****, tu çi jê dixwazî?*

Wekî xweliyê bûn
Zehf zêde bûn. **Ezê tim ji te re bînim, ev li bal me* ***wekî xweliyê ne****.*

Wekî zerika hêkê bûn

Nexweş bûn. **Derdekî Cudayê heye herhal,* ***wekî zerika hêkê bûye****.*

Wekî zînê li çêlê (çêlekê) kirî (bûn)

Ji bo karên çiloçepî tê bikaranîn. **Heyran ew çakêtê mezin* ***wekî zînê li çêlê kirî*** *ji wî zarokî re nebûye.*

Wel axirî, wel aqûbet

A girîng dawî ye. Kes nizane kî wê bikeve rewşeke çawa. **Zelîf zêde mezin xeber nedin,* ***wel axirî, wel aqûbet****.*

Welato tu li min heram bî.

Êdî ez li vir namînim. **Hema dema ku min ew rewş dît, min got,* ***welato tu li min heram bî*** *û ez ji wir çûm.*

Weleh ku tu Osmanî, Çemê Pêrê.

Madem ku wisa ye, tu ji wan î, de vêca bibîne halê xwe. * **Weleh ku tu Osmanî, Çemê Perê.** *Madem ku tu kurê wê qelıpikê yî, de îja bigire xwe,* (bnr. çîrok)

Welehî serê bend di destê pûştekî de ye.

Yekî ku xirabiyê dike heye lê ka wê dawî çawa be. **Wekî ku mezinan gotiye,* ***welehî serê bend di destê pûştekî de ye****, vî karê min jî hinek tevlihev dikin, lê ka wê çawa be.* (bnr. çîrok)

"Weleh ku tu Osmanî, Çemê Pêrê."

Çend xortên elewî li dor Çemê Pêrê ji xwe re geştê dikin. Piştî demekê bi şûn de kalekî sunî di wir re derbas dibe. Divê kalo ji çem derbasî hêla din bibe. Lê ji ber ku kalo avjenî nizane û ji avê ditirse, ji xortên wir tika dike ku wî ji çêm derbas bikin. Ji xortan yek bi dil û can tê kalo dide pişta xwe, di cihekî nizm re derbas dike. Dema ku tam tê nîvê çem xort ji kalo dipirse:

"Xalo navê te çi ye?" Kalo dibêje:

"Xwarziyê navê min Osman e." Xortê elewî wekî kal û bavên xwe ji wî navî pir aciz dibe. Hêdî hêdî ber bi cihê çem ê kûr ve dimeşe û ji aliyekî ve jî ji kalo dipirse:

"Navê te Osman e he! Navê te Osman e!" Dû re serê kalo digire, dike nav avê û derdixe û dibêje:

"Weleh ku tu Osman î, Çemê Pêrê!"

* Di guhertoyek din de jî heman biwêj wiha tê gotin:

Yekî ji mezhebê sunî di qiraxê Çemê Perê re diçe. Di rê de li cihekî lê dinihêre ku çend xortên elewî li keviya rê ji xwe re rûniştine. Dema ku yê sunî di rex wan re derbas dibe û silavê dide wan, ew jî silava wî vedigirin. Lê ji yên rûniştî yek navê rêwî jê dipirse. Rêwî (ango mirovê sunî) dibêje:

"Navê min Osman e." Ji ber ku elewî ji navê Osman gelekî hêrs dibin, bi bihîstina wî navî re hêrs dibin û radibin mirovê rêwî digirin, tînin bal çêm. Piştî hinek teşqeleyê hema serê wî dikin nav avê û derdixin. Bi vî awayî eynî tiştî dubare dikin, dû re berdidin çem û dibêjin:

"De here ku tu Osmanî !" (Ango madem ku navê te Osman e, de bigire cezayê xwe.)

"Welehî serê bend di destê pûştekî de ye."

Meleyek nû tê gundekî. Li mizgeftê piştî ku muezîn sureyên Quranê dixwîne mela jê re dibêje:

"Heyalê delal, tu gelek cihan çewt dixwînî. Divê wer nebe, tu jî dizanî ku Quran çewt xwendin guneh e." Muezîn dipejirîne dibêje:

"Dibe ku wer be, lê ka em çawa bikin?" Mela dibêje:

"Em ê bendekî bi lingê te ve girê bidin. Dema ku te çewt xwend, ez ê bend kaş bikim, tu dê bizanibî ku çewt e, tu dê ji nû ve rast bikî." Muezîn dibêje temam. Dema ku muezîn derdikeve cihê xwe, dest bi xwendinê bike, dibêje:

"Gelî muminên delal, ez ê niha ji we re sureya Qafê bixwînim." Hema di wê demê de gundiyekî ku ji bo nimêjê derbasî pêş dibe lingê wî li bend dikeve û bend tê kişandin. Muezîn li dor xwe mêze dike û nizane ku çi bibêje. Vê carê diguhurîne û dibêje:

"Ez ê niha ji we re sureya Kef bixwînim." Ji ber ku şûna "qaf" dibêje "kef", vê carê jî mela bendê ling dikişîne. Muezîn lap xwe şaş dike, hêrs dibe û dipeqe:

"Welehî serê bend di destê pûştekî de ye."

Werdek derdikeve ser darê û dibêje: "Xwezî bi mehên biharê."
Her kes li gorî berjewendiyên xwe daxwazê dike. *Ew jî tiştekî asahî ye. ***Werdek derdikeve ser darê, dibêje: "Xwezî bi mehên biharê."***

Werdên xwe kişandin
Zikir kirin, bi awayekî rûtîn û rêkûpêk berdewam kirin. *"Te digot qey ***werdên xwe dikişîne***!.. Qet lê nedisekinî." Selman Dilovan

Were ji min bipirse.
Her ez dizanim çi ye an jî çi nîn e. Rasteqîniyê ez dizanim. *Erê, pêk hat lê tu ***were ji min bipirse*** ka çawa pêk hat.

Were mala me, bibîne rewşa me.
Mirov heya ku bi xwe rewşê nebîne û nejî, baş tênagihîje. *Ji dûr ve gotin hêsan e, tu ***were mala me, bibîne rewşa me***.

Werin dewê min bikên, ez jî herim dewê mîr bikêm, bila mîr kevnekirasekê bide min.
Ji bo kesên çavçil û zêde li xwe difikirin tê bikaranîn. *Keçê ew eletewş dibêje: ***"Warin dewê min bikên, ez jî herim dewê mîr bikêm, bila mîr kevnekirasekê bide min."***

Werîsek li zimanê (yekî) nehatin hev
Ji bo kesên lafek û pirbêj tê gotin. *Qurban ka ***werîsek li zimanê Şabedîn nayê hev***, tu yê çawa bi wî re gotinan bigihînî?

Werîsê kin û dirêj li hev girtin
Yên ne hempayê hev û din bi hev û din re qiyas kirin. *Wan jî her hal ***werîsê kin û dirêj li hev girtine***.

Werîsê xwe jê hilçandin
Têkiliya xwe jê birîn. *Aqilê min nebirî, min ***werîsê xwe jê hilçand***.

Westa xwe hildan (girtin, standin, danîn)
Bêhna xwe hildan. *Heya tu ***westa xwe hilnedî***, dest pê neke.

Wexta ciwan bû, ew bû çelengê siwaran; wexta ku kal bû, ma li dewsa waran.
Mirovên ciwan birûmet û rengîn in, yên kal û pîr jî bêqedir in. *Ew jî rewşeke xwezahî ye. ***Wexta ciwan bû, ew bû çelengê siwaran; wexta ku kal bû, ma li dewsa waran.***

Wexta gîha bû, kes ne xuya bû; dema bû fîrîk, Hemo û Heso bûn şirîk.
Mixabin ku mirov ne dema xebat û zehmet, lê di dema behrem girtin û xwarinê de xwe didin pêş. Mirov ji bo berjewendiyên xwe tevdigerin. *Sed car heyf ku gelek mirov wisan in. ***Wexta gîha bû, kes ne xuya bû; dema bû fîrîk, Hemo û Heso bûn şirîk.***

Wexta karan rû digerîne, wexta sifreyê kevçiyan tîne (digerîne).
Ji ked û xebatê re na, lê ji xwarinê re xurt bûn. *Ma tu wî nas nakî? ***Wexta karan rû digerîne, wexta sifreyê kevçiyan digerîne***.

Wexta ku ez ciwan bûm, bitîr û kevan bûm; ku ez kal bûm, bendewarê nanê şikeva bûm
bnr: Wexta ciwan bû, ew bû çelengê siwaran; wexta ku kal bû, ma li dewsa waran.

Wexta nêçîra min tê, gûyê tajiya min tê.
Hemû asteng û rasthatinên xerab tên, min dibînin. **Çi bikim, ew jî şansê min e.* ***Wexta nêçîra min tê, gûyê tajiya min tê.***

Wexta nêçîra min tê, xewa tajiya min tê.
bnr: Wexta nêçîra min tê, gûyê tajiya min tê.

Wexta qemika mexrebê bûn
Dema destpêka tarîbûna rojê bûn. **Hema* ***wexta qemika mexrebê bû*** *ku wî derî lê da.*

Wexta şer, xal û xwarzî; wexta kevçî, ap û birazî
bnr: Di şeran de xal û xwarzî, di şorbeyê da ap û birazî.

Wexta xêr û xêreta pîrê tê bîrê, wexta gûyê nebî Îsa û nebî Mûsa pîrê nayê bîrê
Li gorî rewşê ü berjewendiyan helwest nîşandan. * *Ew jî ne mirovekî dırust e.* ***Wexta xêr û xêreta pîrê tê bîrê, wexta gûyê nebî Îsa û nebî Mûsa pîrê nayê bîrê.***

Wexta xêran hat, gûyê sêwiyan hat.
Sêwî bêşans in. **Ancax ew qas bêsiûdî dibe,* ***wexta xêran hat, gûyê sêwiyan hat****.*

Wey tirmixa kurê kerê!
Ji bo kesên ku ji rewşa xwe ya berê, ji esil û esasê xwe û ji koka xwe dûr dikevin tê gotin. **Lolan duh na û pêr ji wir derket, tu dibêjî qet li vir nejiyaye, lê bawer im ku ew ê jî di demeke kurt de bibêje:* ***"Wey tirmixa kurê kerê."*** (bnr. çîrok)

Weyla min çav bi şûşeyek xwê ve miz dayî
Ma tu kor î, tu nabînî? *****Weyla min çavên te bi şûşeyek xwê ve miz dayê*** *ma tu nabînî çi dek ü dolaban ji bo te amade dikin?*

Weyla min nasnekirê/î!
Ji bo kesên xwe bi awayekî din nîşan didin tê gotin. *****Weyla min nasnekirê!*** *Hela xwe bi awayekî çawa kubar û nazik nîşan dide.*

"Wey tirmixa kurê kerê!"

Lawikekî ciwan ji bo alîkariya malbata xwe çûye bajarekî Tirkiyê ji bo xebatê. Karê wî baş çûye û wekî du yan jî sê salan demeke dirêj li wir maye. Piştî ku tê gundê xwe, ji ber ku li bajêr maye, zimanê tirkî hîn bûye û hinek pere jî bi dest xistine: xwe qure dike, naxwaze bi kurmancî bipeyîve û wekî biyaniyan xwe cuda û zêde dide xuyandin. Ew jiyana ku tê de kemiliye piçûk dibîne. Li bênderê tirmixek li erdê disekine, lawik wekî ku qet nizane ew çi ye ji bavê xwe re bi tirkî dipirse: *"Baba bu nedir?"* (Bavo ev çi ye?) Ji ber ku bav ji wê helwesta lawê xwe aciz e, jê re bi kurdî dibêje:
"Tu lingê xwe bide ser diranê wê tu yê fêm bikî bê ew çi ye." Lawik hema bêhemdî xwe, çawa ku lingê xwe bi hêrs radike û dide ser diranê tirmixê. Ji ber ku diranên tirmixa li ser piştê digihîjin erdê, destiyê wê radibe, dibê req û li serê lawik dikeve. Ji ber êşa serê xwe, lawik bêhemdî xwe dibêje:
"Wey tirmixa kurê kerê!" Bav dibêje:
"Lawo kê te digot ez navê wê nizanim, wa ye tu ji min baştir dizanî navê wê çi ye."

Wez wezê Mûsa ye, fêl fêlê Firewûn e.
Gotin û kirin wekî hev nebûn. **Ew mirovekî sextekar e,* ***wez wezê Mûsa ye, fêl fêlê Firewûn e.***

Wê demê ez te bibînim.
Wê demê merîfeta xwe nîşan bide. **Erê, ez ê te bibim heta wî cihê ku ew lê dimîne û nîşanî te bidim, lê* ***wê demê şûn de jî êdî ez te bibînim.***

Wêlewêl kirin
Ji xemgînî lorandin. **Çima ku lawê wê jî diçû leşkeriya Tirkan, Xatiya Siltan* ***wêlewêl dikir.***

Wiha dikim dê dimire, wiha dikim bav dimire.
Tu çareserî nedîtin. **Ez jî nizanim çawa bikim,* ***wiha dikim dê dimire, wiha dikim bav dimire.***

Wî li min daye (wî lê xistiye), ew digirî.
Hem neheq e, hem jî ew barebar dike. **Ev dinyayek wisa ye,* ***wî li min daye, bi ser de jî ew digirî.***

Wî tim dewê tirş vexwariye, çi haya wî ji dinê heye.
Ew mirovek bêperwerde ye. **Ew çi dizane?* ***Wî tim dewê tirş vexwariye, çi haya wî ji dinê heye?*** (argo)

Wîtewît bi qûna (yekî) ketin
Tirsîn, xof girtin. **Dema ku bihîst polês li wî digerin, rengizê wî di dest de guherî û* ***wîtewît bi qûna wî ket.***

X

Xaçeke fileyan di bin binçenga (yekî) de bûn
Di dil de xerabî sêwirîn. **Tu wisa li xweşxeberdana wî menêre,* ***xaçeke fileyan di bin binçenga wî de ye****.*

Xaçeke fileyan di paşila (yekî) de derketin
Xerabiya ku jê hêvînebûyî kirin. **Em ew qas bi wê bawer bûn, lê* ***xaçeke fileyan di paşila wê de derket****.*

Xal Xidiro, hero li viro (Xidiro hero li viro)
Tim eynî kar kirin. **Ma çi cudatî heye?* ***Xal Xidiro, hero li viro.***

Xala dawîn danîn (Ev biwêj bi tirkî ye, "Son noktayı koymak")
Gotin an jî kirina dawîn pêk anîn. *****Xala dawîn min danî****, êdî ji vir bi şûn de bar ketiye stûyê we.*

Xalê Remedan e, mal çûye maye ken û xeberdan e.
bnr: Apê Merdan, kerî surî tev berdan, di dêst de maye xeberdan.

Xalê xesî(s), ne dixwe, ne jî dide tu kesî.
bnr: Ne dixwe ne dide hevalan, genî dike diavêje newalan.

Xalişînga (yekî) zêde bûn
Dewlemend bûn. **Helbet em bi wan nikarin,* ***xalşînga wan zêde ye****.*

Xaltiya Biharê, te gilêya penêr xwarê, em tev derketin biharê.
Gelek caran yên biderfet û yên bêderfet, di dawiyê de digihîjin heman encamê. **Helbet zehmet û kêf cuda ye, lê encam girîngtir e. Gotiye,* ***Xaltiya biharê, te gilêya penêr xwarê, em tev derketin biharê****.*

Xaltîka min qantir e, bi her du lingên xwe dike virevir e, ji xwarziyê xwe yê gur re derdixe cotek tir e.
Gur bi qantirê nikare. ** Divê mirov herkesî bi çavekî mêze meke. Çi gotine,* ***xaltîka min***

qantir e, bi her du lingên xwe dike virevir e, ji xwarziyê xwe yê gur re derdixe cotek tir e.

Xam bûn

1. Ecemî û nezan bûn. **2.** Ji ber xebatê yan jî tiştekî din êşa tarîşkan (kas) kişandin. **Ew hê **xam e**, heya ku wan riyan hîn bibe, gelek dem divê. **Duh min hinekî alîkarî ji xalê xwe re kir, îro **xam bûme**, her dera min diêşe.*

Xamiya ... şikênandin (Xamiya xwe şikênandin)

1. Ji şermî û ecemîtiyê xelas bûn. **2.** Ji bo karekî yan jî bizavekê (tevgerekê) beden nerm kirin. **Balıoz **xamiya xwe şikênandiye**, êdî li bal bavo bi rehetî dipeyîve. **"Kesên ku beşdarî nêçîra guran bibûna, pêşî besiyeke taybetî ji bo hespên xwe bi kar dianîn, dem dem zîn dikin û direvandin û bi vî awayî **xamiya wan dişkênandin** ..."* Nurettin Basut

Xanika Xido, yek nebû, dora dudo.

Ew nebe ew ê din. **Tu qet meraqan meke, **xanika Xido, yek nebû, dora dudo**.*

Xap kirin (Xapînoskî kirin)

bnr. Xap û rîp kirin

Xap û rîp kirin

Hîle, sextekarî, dek û dolab kirin. **"Roja ku Haco II. ji çiyayê Mava, **bi xap û rîpan daxistin** û serê wî jêkirin, li ser cifniya zîvî kirin, pêşî birin **'muteserfiya'** Sêrtê, piştre birin Stenbolê, wan digot me ev cih û war safî kir."* Medenî Ferho

Xatê wisa dibêje, hela ka Fatê çi dibêje?!

Ka hela li hêla din rewş çawa ye. **Divê tu guh bidî her du hêlan jî. **Xatê wisa dibêje, hela ka Fatê çi dibêje?!**

Xatirê (yekî) girtin

Rûmet dan. **Ew ku here, ew yekê pêk bê, çimkî ew gelekî **xatirê Talıar digirin**.*

Xatir hiştin

Wekî daxwazê nekirin. Rûmet negirtin. **Min jî nedixwest, lê tiştekî wer ji min xwest ku ji bêgavî min **xatirê wî hişt**.*

Xatir neketin

bnr. Xatirê (yekî) neşikandin

Xatirê (yekî) neşikandin

Rûmet dan. **Hecî Xidir ku here wir, ew tu car **xatirê wî naşikîne**.*

Xatirê xwe xwestin

1. Li ber mirinê bûn. **2.** Ji cihekî veqetîn, çûn. **Me her ew dît ku mala xwe bar kiriye û hatiye ku **xatirê xwe ji me bixwaze**. **"...wî duh li wir ji jiyanê û şoreşê **xatirê xwe xwestibû**."* Bêmal Serhedî

Xatûn û qewraş ji hev kifş bûn

Xweşik û nexweşik, qenc û xirab ji hev xuya kirin. *_Tu qet nekeve tatêlê, di demeke kurt de **xatûn û qewraş dê ji hev û din kifş bibin**._

Xatûn Ferxan li ber rûniştin
Di nav rewşeke baş û xweş de bûn. ***Xatûn Ferxan li ber rûniştiye**, hê çi dixwaze?*

Xatûna Ferxan şek li bedena (yekî) xistin
Ziyan û derd dîtin. *_Jixwe **Xatûna Ferxan şek li bedena wî porkurê xistiye**, tu jê çi dixwazî?_

Xatûna Şam û şerqê, ne dixwe, ne dide xelkê.
bnr. Ne dixwe ne dide hevalan, genî dike diavêje newalan.

Xav xuya kirin
bnr. Beloq man

Xax anîn serê (yekî)
Xistin rewşeke dijwar û teng. *_"Bi Xwedê tu tiştekî derî edetan bikî, ez ê **xaxan bînim serê te**."_ Çiya Mazî

Xaxê nemayê
Ev çi halê xerab e. ***Xaxê nemayê!** Ez û ev rewş, dihate bîra kê?*

Xayîn û xizir, kûpê bizir
Dawiya xayîn û sextekaran pûç e. *_Bi vê meşê ew nikarin bibin xwedî tiştekî. Çi gotine **xayîn û xizir, kûpê bizir**._

Xebatkarê xweyo, şîrînê li ber dilê xelkêyo.
Mirovên ku karê xwe baş pêk bînin û jîr bin, her kes ji wan hez dike. ***Xebatkarê xweyo, şîrînê li ber dilê xelkêyo.** Mirovê ku karê xwe baş bike, Xwedê jî jê hez dike, qûl jî.*

Xeber jê stendin
Agahî jê girtin. ***Me xeber jê stend**, şikir piştî emeliyetê, dibêjin bi ser xwe ve hatiye.*

Xeber pê xistin
Agahdar kirin. *_Berî ku ez ji wir derkevim, min **xeber pê xist** û min got, ez ê herim._

Xeber xweş kirin
Sohbeteke xweş û dirêj berdewam kirin. *_Wan dîsa **xeber xweş kirine**, bi vê meşê wê bi hev û din re bizewicin._

Xebera reş anîn
Nûçeyên neyînî anîn. *_Jixwe ew **xebera reş jî Cezmiyê Cemîleyê dihanî**._

Xeberdanên sar kirin
Xeberdanên ne di cih de û neyînî kirin. *_Wê êvarê Nalîna Hecî Îsa **xeberdanên wisa sar kirin** ku hemû kes pê aciz bûn._

Xeberê tu xweş xeber î, xwezila Pîrexalan tu negotayî.
Ji bo mantiqa feodalî û dexesî tê gotin. *Celîl digot: ***"Xeberê tu xweş xeber î, lê xwezila Pîrexalan tu negotayî."***

Xeberxweşan, ker dan guran.
Yên ku ji xwe re dikevin sohbet û gotegotan dirêj û kûr dikin, hin ziyanan jî dibînin. ****Xeberxweşan, ker dan guran.*** *Heya li xwe zivirîn, nihêrîn ku xwarin şewitiye jî.*

Xebtûkoş kirin
Ji bo pêkanînê gelekî hewl dan. *Min çiqas ***xebtûkoş kir****, dîsa jî nebû.*

Xeftanê girogezo, va ye ezo, ne ezo.
bnr. Ezo ne ezo, destmala gulgevezo.

Xelaya mêran bûn
Mêrên çê bi dest neketin. **Tu jî dizanî rewş çawa ye. Ez çi bikim îro li min* ***xelaya mêran ne****.*

Xelayî hatiye, tu camêrî jî hilatiye.
Di nav her şert û mercan de mirovahî û camêrî divê. **Çi dibe bila bibe, divê mirovahî winda neke.* ***Xelayî hatiye, tu camêrî jî hilatiye?***

Xelk axê dikole, ew bi serê xwe de dike.
Di nav helwestek neyînî û sosret de bûn. **Em jî nizanin vî sosretî çawa bikin.* ***Xelk axê dikole, ew bi serê xwe de dike.***

Xelk bû beg, ez bûm legleg.
Ez bi pêş de neçûm. Ez nebûm tu tişt. **Ez jî nizanim çima wilo ye, lê* ***xelk bû beg, ez bûm legleg****.*

Xelk derketin temaşekirinê
Zêdetir ji bo rewşa rezîltayî tê gotin. **Axîn û Rojdayê hev û din wisa kirin ku* ***xelk derkete temaşekirinê****.*

Xelk dewletê çêdike, ez kolozê xwe tûj dikim. (Xelk mal û dewletê çêdike, ez androkolozê xwe tûj dikin.)
Karê min ne asahî ye. **Ew jî ne di dest min de ye.* ***Xelk dewletê çêdike, ez kolozê xwe tûj dikim.***

Xelk kêfa xwe dike, ew avê li xwe dike.
bnr. Xelk axê dikole, ew bi serê xwe de dike.

Xelk li mala Fatê ye, Fatê li mala xelkê ye.
Ji bo helwesta berevajî tê bikaranîn. **Gozê jî jineke wisa ye.* ***Xelk li mala Fatê ye, Fatê li mala xelkê ye.***

Xelk rast tê li fitiran, em rast tên li fiseguran.
Em mirovnên bêşans in. **Em çawa bikin, ew jî şansê me ye.* ***Xelk rast tê li fitiran , em rast tên li fiseguran.***

Xelkê giştî girtiye yare, bextê min rebenî tenê bûye hewar e.
Ez mirovekî bêşans im, hemû neyînî li rastî min tên. **Belkî ew jî ji kêmasiya min e, çi bikim nabe tiştekî,* ***xelkê giştî girtiye yare, bextê min rebenî tenê bûye hewar e.***

Xelkê mêr dikuştin, Bizgûriyan ûr dişûştin.
Ji bo rewşa bêxemî û bêfemiyê tê gotin. **Maşelalı ew balkêş in.* ***Xelkê mêr dikuştin, Bizgûriyan ûr dişûştin.***

Xelkê mêr kir, me mor kir.
Em tenê ji bo xelkê xebitîn. ****Xelkê mêr kir, me mor kir.*** *Dû re em têgihîştin lê gelekî bi derengiyê ketin.*

Xelkê sala çûnê (çûyî) niha Gozê, niha hatiye dozê.
Ji bo helwesta derengmayî tê gotin. **Xwedê êqil bide,* ***xelkê sala çûnê niha Gozê, niha hatiye dozê.***

Xelo xelas
Ji bo rizgarbûna ji xeteriyekê tê gotin. **Hema min go,* ***Xelo xelas*** *û ez ji wir revîm.*

Xem kirin dilê (yekî)
Xwe qehirandin, pê xwe xemgîn kirin. **"Sekinî, serê xwe berjêr kir, di ber xwe de nihêrî. Dengê xwe nekir. Min fêm kir, wekî min* ***xemeke mezin kire dilê diya xwe."*** Emerîkê Serdar

Xem nekişandin
bnr: Talaş nekirin

Xema qûnê nebûn
bnr. Talaş nekirin.

Xema Xidirê gavan benê çaroxê ye.
1. Yên ku derdê wan î zêde tune ye jî tiştên piçûk ji xwe re dikin derd. **2.** Derdê her kesî li gorî wan û rewşa wan e. **Ji bo we ne tiştek e, lê* ***xema Xidirê gavan jî benê çaroxê ye.*** ***Xema Xidirê gavan benê çaroxê ye****, yê Sadûn Axa jî dîrektorên nû ne.*

Xema xwe pê revandin
bnr: Pê sebra xwe anîn

Xemên me ne besî me ne, yên tirekan jî yarê serbar in.
Jixwe derdê me zêde ye, ya ku ev dikin jî, lap xerabtir dike. **Kuro ev çi ye?* ***Xemên me ne besî me ne, yên tirekan jî yarê serbar in?***

Xemên xwe danîn ber serê xwe
Bi mirazê xwe şad bûn. **Ji wî re êdî dinya xweş û geş e, çimkî mêrikî* ***xemên xwe danîne ber serê xwe.***

Xemên xwe daqurtandin

Derd û kulên xwe ji kesî re xuya nekirin. **Jixwe ew wisan e, tim* ***xemên xwe dadiqurtîne*** *hundirê xwe, loma wer jar bûye.*

Xemên xwe gilî kirin
Derdê xwe vegotin. **Ka kî yê wê heye ku* ***xemên xwe ji te re gilî bike****?*

Xemên xwe pê revandin
Ji ber derd û kulan, xwe bi tiştinên din rehet kirin. **Me xwest em hinekî* ***xemên xwe bi wê şevê birevînin****.*

Xemla xwe danîn
Xera bûn, bedewiya xwe winda kirin. **Dinya ji kesî re namîne, wê jî êdî* ***xemla xwe danî.***

Xemxwarin
Biweswese û tatêl bûn. ****Xem xwarin****, hundirê mirov dixwe.*

Xençera xwe bi zêr kirin
Dilê xwe rehet kirin. Ji bo xwe karekî bi kêr kirin. **Xêroyê Simko gelekî li pey wê ket, wa ye di dawiyê de jî* ***xençera xwe bi zêr kir****.*

Xeneqûtk bûn û ketin gewriya (yekî) (Xeneqûtk li qirikê ketin)
Dev ji mirov bernedan, rezîlî derxistin. **Kesî tiştekî wer ji Ûsiv hêvî nedikir, hema bû* ***xeneqûtk û kete gewriya mêrikê belengaz****.* (nifir)

Xercê (yekî) nebûn
Layiq û hempayê yekî nebûn. **Keçê însaf bikin, ma ew şindokê mêran* ***xercê min e****?*

Xerîbî kişandin
Li welatekî biyanî û dûr bêriya welat û xizmên xwe kirin. **Ma hûn nizanin min çend salan* ***xeribî kişand****?*

Xesû mir, cihê bûkê fireh kir (bû).
Tunebûn an jî mirina xesûyan bandora bûkan zêde dike. **Ew jî zagona dinyayê ye.* ***Xesû mir, cihê bûkê fireh kir.***

Xetaya (yekî) li rûyê wî xistin
Kêmasiya kesekî jê re eşkere gotin. **Jinik qet venekişî,* ***xetayên wî yek bi yek li rûyê wî xistin****.*

Xew bi çavan neketin
bnr: Xew lê firîn

Xew ji çavan hurşîn
bnr: Ji çavan xew barîn

Xew ji ser xwe avêtin
Şiyar bûn, rewş fêm kirin. **Wan ancax piştî silı salan* ***xew ji ser xwe avêtin****.*

Xew lê firîn
bnr. Xew lê heram bûn

Xew lê heram bûn (Xew lê herimîn)
1. Ranezan. Xew nehatin. **2.** Ji tiştekî aciz bûn, aramî xerab bûn. **Nizanim çima, lê wê şevê heya sibehê **xew li min heram bû**. **"**Xew li min herimîbû.** Hestên min serobin bûbûn û xewn û xeyalên min ketibûn nav hev."* Adar Jiyan

Xew li xwe heram kirin (Xewa şevan li xwe heram kirin)
Ji bo sedemekê ranezan. Zêdetir ji bo zêde xebatê tê gotin. **Wê jinikê **xew li xwe herimand**, bi şev û roj xebitî, wisa ew zarokên xwe xwedî kirin.*

Xew neketin çavên (yekî)
Xew nehatin. **"Wê şevê Gulê dîsa digirî, lê îcar ne ji êşa tajangiya Qoço ku wek marekî xwe li bejna wê ya zirav dipêçand. **Xew qet nediket çavên wê.** Dijmin dê biketa welêt..."* Nuredîn Zaza

Xewa mirinê ketin çavên (yekî)
Bi awayekî zêde ji dinê û rewşê dûr bûn. Hay ji xwe tunebûn. **Ma **xewa mirinê ketibû çavên wê** ku dizan mal malişt û ew pê nehesiya?*

Xewa (yekî) mîna xewa çivîkan bûn
Ji xewê zû hişyar bûn. ***Xewa neviya min, mîna xewa çivîkan e**, bi xiştiniyek piçûk jî hişyar dibe.*

Xewa (yekî) mîna xewa kîvroşkan bûn
bnr. Xewa (yekî) mîna xewa çivîkan bûn

Xewa (yekî) sivik bûn
bnr. Xewa (yekî) mîna xewa çivîkan bûn

Xewa (yekî) revîn
bnr. Xew lê firîn

Xewa şevan li xwe herimandin
Bi şev û roj xebitîn. **Mixabin kes rûmeta wê xebatê baş fêm nake, lê ez baş dizanim ku wî ji bo wê pirtûkê **xewa şevan li xwe herimand**.*

Xewa şevan lê herimîn
Ji ber sedemekê ranezan. **Ji her xebata dersê, **xewa şevan li Bêrîvanê herimî**.*

Xewa xwe girtin
bnr. Xewa xwe hildan

Xewa xwe hildan
Têr razan. **Heya Serdar **xewa xwe têr hilnede**, kes nikare zû bi zû wî rake.*

Xewa xwe stendin
bnr. Xewa xwe hildan

Xewê dike gavan, xeman dike golikvan.
Ji bo kesên bêxem tê gotin. **Belengazo tu bêaqil î, ew **xewê dike gavan, xeman dike golikvan**.*

Xewên kanûnan, tir û fisên xatûnan
Ew her du jî nayên kişandin. **Divê tu li ser herduyan jî baldar bî, **xewên kanûnan, tir û fisên xatûnan**.*

Xewle kirin
Kûlîs kirin. Bi dizî gotin. **Dîsa Hecî Mistefeyê Evdile **xewle kiribû**, jê re tiştinin digotin.*

Xewna te li ser wechê Yûsiv pêxember be.
Xewna te li ser xêrê be. ***Xewna te li ser wechê Yûsiv pêxember be**. Bêje hela te çi dît?*

Xewna xwe bi roj dîtin
Ji bo kesên ku tiştekî diceribînin, lê di encamê de ziyanê dibînin, ji ber wê jî tim xwe diparêzin tê gotin. **"Wî **xewna xwe bi roj dît**."* Bozan Yaman

Xewnerojk dîtin
Xeyal dîtin. **Mixabin wer tê xuyan ku keçika min van rojan **xewnerojkan dibîne**.*

Xeyîdî ji tira seyîdî.
Ji bo xeyîdandina yekî xem nekirin. **Ma talaşa Cezmî ye. **Xeyîdî ji tira seyîdî.***

Xezalê ji ber şikêvlatokê, zozan li xwe heram kir.
Ji bo tiştên piçûk û pûç, xwe ji gelek derfetan mehrûm kirin. **Ew jî ne tu aqil e. **Xezalê ji ber şikêvlatokê, zozan li xwe heram kir.***

Xezeb jê barîn
Ji bo kesên bi bela û şer re mijûl dibin tê gotin. **"Ji aliyê Çiyayê Bagokê nêzî 50 siwariyên biçek tên ber bi gund ve. **Xezeb ji wan dibare.**"* Gabar Çiyan

Xezeba Xwedê bi ser (yekî) de hatin
Ketin nav derd û belayê. **Ma ez ji wî re çi bibêjim? Jixwe **xezeba Xwedê bi ser wê de hatiye**.*

Xezeba (yekî) kişandin ser xwe
Bi awayekî inyad xwe xistin nav bela û pirsgirêkan. **"Loma min jî qet nedixwest ku ez wî hêrs bikim û **xezeba wî bikişînim ser xwe**."* Felat Dilgeş

Xêncî xwe tu kes negotin
bnr. Dibêje ez û ne kes.

Xêr be, berî pêşîn nêr be.

Nêr meqbûltir e. **Di dema berê de nêr bêhtir dihat ecibandin. Loma jî gotine:* ***"Xêr be, berî pêşîn nêr be."***

Xêr hatiye ber dêrî, xwediyê xêran tune.
Ji bo xêrpêkanînê derfet hene, lê kes naxwaze yan jî nikare pêk bîne. **Ez çi bibêjim,* ***xêr hatiye ber dêrî, lê xwediyê xêran tune****.*

Xêr ji rû nehatin
Jê tiştekî baş hêvî nekirin. **Eman lawo ji wî sextekarî dûr bisekinin,* ***xêr ji rûyê wî nayê****.*

Xêr ji xêran derbas bûn
Bûyereke xerab pêk hatin. **Şivan bi gef û gur ket odeyê, axê got: "Te xêr e?" Şivên got: "****Xêr ji xêran derbas bûye****, guran nîvê kerî telef kirin!"*

Xêr kirin, wayê nedîtin
Xêr û qencî vala çûn. **Bê, axayo tu* ***xêrê bikî, wayê qet nebînî****, ew çi zilm bû te li wan gundiyên reben dikir?* (nifir)

Xêr tê de nehiştin
Tiştên neyînî kirin. ***Xêra çi? Ka Ezîz **xêr tê de nehişt**.

Xêr û xweşî li te barî, kevir û kuçik li min barî.
Xwedê te biparêze, lê ez ketim rewşeke xerab. **Ez çawa ku ketim hundir,* ***xêr û xweşî li te barî, kevir û kuçik li min barî****.*

Xêra bavê çûn (çûn xêra bavê)
Ziyan bûn, vala çûn. **Ew pereyên wî jî wisa* ***çûn xêra bavê****.*

Xêr ji bazara (yekî) nehatin
Ji têkiliya yekî tiştekî erênî hêvî nekirin. Jê kêrek nehatin, **Qet jê hêvîdar nebin, ez wî nas dikim,* ***xêr ji bazara wî nayê****.*

Xêr ji nefsa canê xwe nedîtin
Rojeke xweş derbas nekirin. Rastî tiştekî baş nehatin. **Wê belengazê hê di zaroktiya xwe de* ***xêr ji nefsa canê xwe nedît****, ne îro tenê.*

Xêr lê çûn (Xêra miriyan lê çûn)
Hewcedarî sedeqe û xêrê bûn. **Zerêya ku berê wekî xaniman dijî, niha* ***xêr lê diçe****.*

Xêr tê de tune bûn
Kêrek jê nehatin. ****Xêr tê de tune ye****, tu qet dest neavêje wî karî.*

Xêr û bereket tê de neman
Ber û qezenc lê pêk nehatin. Kêrek neafirandin. **Erê, dîsa eynî wî karî dikim lê êdî* ***xêr û bereket tê de nemaye****.*

Xêr û guneh nezanîn
bnr. Tirsa Xwedê di dil de tune bûn

Xêr û xêrat dan (kirin)
Qencî û xêr pêk anîn. **Ew mirovekî wisa ye, tim* ***xêr û xêratan dide****.*

Xêra destê çepê ji yê rastê re nebûn
Xêra her mirovî tenê ji wî bi xwe re heye. **Ma te çi hêvî dikir? Tu mû lîn bûyî ku* ***xêra destê çepê ji yê rastê re nîn e****?*

Xêra ku ji (yekî) tê, bila ji Xwedê bê.
Xêra ku ji wî tê ji min re ne hewce ye. **Na qurban na, ez naxwazim,* ***xêra ku ji wê tê bila ji Xwedê bê****.*

Xêra xwe betal kirin
Piştî xêra ku kirî, xerabiyên girîngtir kirin. **Me got eferim ji wî re, wa ye çi karekî baş kir, lê wî bi wê helwesta xwe ya vê dawiyê jî ew* ***xêra xwe betal kir****.*

Xêra xwe bi serî kirin
Xêrek baş û têkûz kirin. **Mêrikî xêr kir,* ***xêra xwe jî bi serî kir****.*

Xêra xwe heta dawî birin
bnr. Xêra xwe bi serî kirin

Xêra Xwedê, çayira keran
Ji bo destxistina tiştên belaş, lihevhatî, baş û bêked tê bikaranîn. **Bextewar li serê wî be,* ***xêra Xwedê, çayira keran****.*

Xêra Xwedê, çêra kerê
bnr. Xêra Xwedê, çayira keran

Xil û xwar
Bêpergal û hewlogewlo bûn. **Tu bi navê Xwedê bikî, te ku dera ew ê* ***xil û xwar*** *eciband?*

Xilaport rakirin
bnr. Qerepere kirin

Xilta binî bûn
Ya herî bêkêr bûn. **Ew jî nedida, lê ji ber ku ev jî* ***xilta binî bû****, loma da.*

Ximşeke xezalan bûn
Pir bedew û xweşik bûn. **Keçikek ji wê malê derket, ne keçik bû,* ***ximşeke xezalan bû****.*

Xincî xincî kirin
1. Parçe parçeyî kirin, hûr kirin. **2.** Zehf li yekî xistin. **Wî ew goştê delal wisa* ***xincî xincî kir*** *ku nehate xwarin. *Lawê Heyder, Qasoyê Rustem* ***xincî xincî kiriye****.*

Xinisî kirin
Bi mebesteke binkol û xirab nêzîk bûn. **Ma kingê wê karekî baş kiriye? Karê wê tim* ***xinisî ye****.*

Xirecir kirin (derxistin)
Qelebalixî kirin. Teşqele û tevlihevî pêk anîn. *"*Xelk derketin nava gund û li çareyekê geriyan ku ji vê rewşê derkevin.* ***Bû xirecira gundiyan.***" Helîm Yûsiv

Xirmexirm kirin (Xirmînî lê xistin)
Zêde xwarin. **Xema wî ye ku şîn e yan jî xemgînî ye, ew* ***xirmînî li xwarinê dixe.***

Xistin bin lepê xwe
Xistin bin kelîja xwe. **"Dema min dît, min got: Weleh Semsam rast digot, dema ji min re diyar kir ku her kurmamek wî dikare çarên wek wî* ***bixe bin lepê xwe.***" Elaedîn Secadî

Xistin destê xwe (Xistin nav kefa destê xwe)
1. Kirin bin bandora xwe. **"... li melûneke spî û bi bask siwar bûye; hefsarê ramanê* ***xistiye destê xwe*** *..." Serdar Roşan

Xistin stûyê yekî
bnr: Avêtin stûyê (yekî)

Xistin roja reş
Yek xistin rewşeke xerab. **Min halê wê dît, mat mam. Zarokên wê bi xwe ew* ***xistine roja reş.***

Xistin serê xwe
1. Ji bo karekî yan jî tiştekî bibiryar bûn. **2.** Têgihîştin, fêm kirin. **Wê* ***xistiye serê xwe,*** *Xwedê ji esmanan bê, ew dev jê bernade.* ***Piştî du saet hînkirinê bi şûn de ancax Misto ew mijar* ***xiste serê xwe.***

Xistin şûna meriv û însanan
bnr: Danîn dewsa meriv û însanan

Xistin xamê (Ketin xamê)
Mirovek an jî sewalek bi taybetî xwedî kirin. Bi pûte lê nihêrîn. **Tu nanihêrî, Seyîd Tahar ew canegeyên xwe* ***xistine xamê,*** *loma wisa her yek wekî çiyayekî bûye.*

Xistin xwarê bi çend kulman
Bi çend lêdanan perîşan kirin. **Bila zehf serê xwe, qûna xwe li ba neke, ez ê wî* ***têxime xwarê bi çend kulman.***

Xişir bi xwe ve kirin
Xwe gelekî aciz kirin. **Wî jî* ***xişir bi xwe ve kir.***

Xişûş ketin dilê (yekî)
Weswese ketin dilê yekî. Şik û guman kirin. **Berê tiştekî wisa nedifikirîm, lê piştî wê bûyerê* ***xişûş kete dilê min*** *jî.*

Xizano, riya mala xwe nezano
Kesên xizan, baş azîna pêdivî û berjewendiyên xwe û malbata xwe jî nizanin. ***Xizano,***

riya mala xwe nezano. *Nezanî neyîniya herî mezin e, mirovên xizan gelek ji wan nezan in, loma jî tim ji tengasiyê zû bi zû rizgar nabin.*

Xizir birev(e) ker hat!

Êdî tu jî xwe biparêze, wa ye rewş xeter e. **Çawa bike wî jî mêze kir ku rewş xeter e, got, ***Xizir birev ker hat!***

Xizmet e, bêminet e

Mirov ku kedê bide û bixebite, serbilind û bêminet dibe. * ***Xizmet e, bğminet e.*** *Tu kes nikare tişteki ji wî re bibêje.*

Xîma li ser cemedê bûn

bnr. Asasê li ser berfê bûn

Xîma li ser avê bûn

bnr. Asasê li ser berfê bûn

Xîret avêtine ber segan, segan qebûl nekiriye (nexwariye).

Divê tu kes bêxîretiyê nepejirîne. **Kuro tu çawa vê bênamûsiyê dipejirînî? ***Xîret avêtine ber segan, segan qebûl nekiriye.***

Xîret û xareta (yekî) kirin pereyek

Namûs û xîret peymal kirin. **Wî bênamûsî ***xîret û xareta me kir pereyek.***

Xîretê bar nedan

bnr. Xîreta (yekî) qebûl nekirin

Xîreta (yekî) qebûl nekirin

Wijdanê yekî qebûl nekirin. ****Xîreta min qebûl nake*** *ku ez herim li ber destê wî bixebitim.*

Xîzexîz kirin

Nexweş bûn. **Wisa ***xîzexîz dikir*** *ku min taqet nekir, ez qala wê yekê bikim.*

Xof kirin zikê (yekê)

Tirsîn. **Mêrik wisa ***xof kiribû zikê Evdilcebar*** *ku bi şev newêribû li mala xwe razê.*

Xofkêşo, qeda li pêşo

Mirovên ku zehf ditirsin û xemxwar in, zêdetir li rastî qeda û belayê tên. **Tu çiqasî zelıf zêde jê vekişî, tu yê zêdetir çewtiyan bikî. Lewma gotine: ***"Xofkêşo, qeda li pêşo."***

---

*"**Xizir birev(e) ker hat!"***

Li hêla Dêrsimê mirovek kereke barê wê giran diajo. Dema ku ji cihekî xişir ku di binî de jî newaleke kûr û xeter heye re derbas dibin, lingê kerê diçerixe, li ser lêva zerê dikeve. Xwediyê kerê bi palomiya kerê digire ku ker berjêr hol nebe û ji aliyekî ve jî hewar dike Hezretî Xizir:

"Ya Hezretî Xizir!, Ha Hezretî Xizir! Tu alîkarî bikî! Ya Hezretî Xizir tu dest biavêjî barê min!" Demekê bi şûn de dema ku ker hêzê dide xwe ku rabe di serê zerê re wer dibe. Xwediyê kerê vê carê jî dikeve tatêl û heyra Hezretî Xizir ku heke ji bo hewarê hatibe û di serê zerê de dest avêtibe barê kerê, bila di bin cendek û barê kerê de nemîne dike qîrîn:

"Xizir birev ker hat!"

Xort revîne keran, qîzan gotin: "Ya me ma bi Xwedê."
Heke pêdivî li hêleke din bê dîtin, yên ku li hêviyê ne, bêguman dimînin. ***Xort revîne keran, qîzan gotin: "Ya me ma bi Xwedê."** Ka em ê çawa bikin?*

Xortê (qîza) destbihene (bûn)
Ciwan û spehî bûn. **Bê, gawiro te çawa qêmîşî wî **xortê destbihene** kir?*

Xulamê bavê (yekî) bûn
Her gotina yekî kirin. **Lawo, ma ez **xulamê bavê te me**, tu wisa li ser min ferman dikî?*

Xura ker tê, zira ker tê.
Yên ku ecela wan tên, ji xwe re sedemekê dibînin. **Carinan bi awayekî xwezayî sedem tê dîtin. **Xura ker tê, zira ker tê.***

Xuranedîtî bûn
Teral, sist, rûreş û caneza bûn. Ji xebatê aciz bûn. **Loqman wisa **xuranedîtek e** ku naxwaze here di dikana bin apartmanê de du nanan bistîne.*

Xursî, xwediyê xiyara helisî, ne dixwe, ne jî dide kesî.
bnr. Ne dixwe ne dide hevalan, genî dike diavêje newalan.

Xurtê ne bi malê xwe bûn
Ne bi malê xwe, lê bi malê xelkê qencî kirin. **Ya ku ew dike her kes dikare bike, çimkî **xurtê ne bi malê xwe ye**.*

Xurto tu xurtiya xwe dikî, qelso tu doza çi dikî?!
Yên qels nikarin zêde mafekî jî daxwaz bikin. ***Xurto tu xurtiya xwe dikî, qelso tu doza çi dikî?!** Her kes li gorî hêz û fedakariya xwe daxwaz dike.*

Xûyê şîrî, heta pîrî
Xûy, cir û xislet, ango kesayeta ku piçûkayî bi perwerdehiya dê û malbatê hatiye dayîn çi be, ew heya mirinê berdewam dike. ***Xûyê şîrî, heta pîrî.** Mirov piçûkayê çi be, di pêvajoya jiyana xwe de jî wisa berdewam dike.*

Xûyê sikurê bûn
Esas berpirsyar bûn. **Her kes ji xwe re tiştekî dibêje, lê ya girîng gotin û biryara **xûyê sikurê ye**.*

Xwediyê kela potikê, tu xwe biavêje ser jinikê; sibê rabe, bike şîna ga, çêlek û golikê.
Tu ketiyê heyra kêfa xwe, lê tu di axiriyê de bibînî bê ka çi bûye. **Mêrikê diz gotibû: **"Xûyê kela potikê, tu xwe biavêje ser jinikê; sibê rabe, bike şîna ga, çêlek û golikê."** Bedir jî dê sibehê bibîne bê ka çi bûye.* (bnr. çîrok)

"Xwediyê kela potikê, tu xwe biavêje ser jinikê; sibê rabe, bike şîna ga, çêlek û golikê."

Du heb diz diçin diziya malekê. Bi xwezayî berî ku têkevin tewlê û heywanan bibin, dixwazin hawirdorê malê seh bikin ka rewş çawa ye. Dema diçin ber pencereya oda xwediyê malê, di qulekê de dinêrin ku wa ye xwediyê malê û jina xwe di

Xûyê (yekî) şîrîn bûn
Cirxweş bûn. **Bi xwe wisa ne bedew e, lê **xûyê wê şîrîn e**.*

Xwarik rast kirin
bnr. Ji şîr birîn

Xwarin di pişta (yekî) de çûn
Bi rehetî û bi aramî nexwarin. **Çima ku wî sêwîyî li çavên min dinihêrî, te digot ew **xwarin di pişta min de çû**.*

Xwarin lê heram bûn
Di nav rewşeke xerab de bûn. **Di wan rojên dijwar de **xwarin jî li me heram bûbû**.*

Xwarin li ber kir, çov raserî ser kir.
Hem qencî kirin, hem jî xistin nav rewşeke zor. **Ev çawa qencî ye, min jê fêm nekir. **Xwarin li ber kir, çov raserî ser kir.***

Xwarin di devê (yekî) de bûn herî
Di xwarinê de astengî kişandin. **Ji ber emeliyeta mîdeya wî, **xwarin di dêvê Rebenê Fazil de dibû herî**.*

Xwarin tê de neçûn
1. Ji ber nexweşiyê tiştek nexwarin, îştah tune bûn. **2.** Ji ber nazandin û neecibandinê xwarin nexwarin. *Ji ber ku tu xwarin tê de nediçû bûbû ta û derzî. **Ezimandina Xalê Xelef pir zor e, zû bi zû **xwarin tê de naçe**.*

Xwaro genî, dawo kenî.
Ku tu bidî ji xwarinê bêhtir tu yê kêrê bibînî. **Lawo qencî û merdî pir xweş e, ji bîr meke; **xwaro genî, dawo kenî**.*

Xwe avêtin
Mezin bûn, geş bûn, gihîştin, bejndirêj bûn. **Îsal darên me yên baxçe baş **xwe avêtin**.*

Xwe avêtin ber bextê (yekî)
bnr. Xwe avêtin ber tor û bextê (yekî)

Xwe avêtin ber tor û bextê (yekî)

---

nav hewldana têkiliya zayendî de ne. Di qulê de dibînin ku wa ye mêrik derketiye ser jinikê ji aliyekî ve jî diaxivin. Mêrik ji jinikê re dibêje:
"Jinik tu dizanî ez derketime ser ku derê?" Jinik dibêje:
"Ku derê mêrik?" Mêrik berdewam dike û dibêje:
"Ez derketime ser kela potikê!" Ev yek ji bo dizan rewşeke lêhatîtir diafirîne. Her du diz jinik û mêrik di halê xwe de dihêlin, bê tirs diçin ga, çêlek û golika malikê ji tewlê derdixin didin pêşiya xwe û dibin. Lê ji dizan yek mirovekî pir miqelît bûye. Ji hevalê xwe re dibêje:
"Welehi heta ez neçim ji vî xwediyê malê çend peyvan nebêjim nikarim bisekinim. Tu dewêr biajo ez ê niha bêm." Diz diçe ber pencereya odeyê dinêre wa ye jinik û mêrik hê li ser hev û din têkiliya xwe berdewam dikin. Diz devê xwe dixe qula pencereyê û dibêje:
"Xwediyê kela potikê, tu xwe biavêje ser jinikê; sibê rabe, bike şîna ga, çêlek û golikê."

1. Ji kesekî baxişandin daxwaz kirin. **2.** Ji kesekî alîkarî xwestin. *Erê raste xeta û guneh ê min e, lê dîsa jî min xwe avêtiye ber tor û bextê te. *"...*eger ku bêdûv ez nikaribim bijîm, ez ê biçim cem pîrê,* ***xwe biavêjim tor û bextê wê****, ez ê bibêjim min bibexşîne ..."* Îsa Eskîn

Xwe avêtin çep û çûran

Xwe ji binbarî û vatiniyan dûr girtin. Li hincetan gerîn. *"*Bila tu kes* ***xwe neavêje çep û çûran****, bila tu kes tu kesî nexapîne."* Kemal Orgun

Xwe avêtin der û dawa (yekî)

bnr: Xwe avêtin dest û piyan

Xwe avêtina dest û lingên (yekî)

Lavayî kirin. *"*Pişt re bi hesret û vîneke wisa zêde çûm li berê sekinîm û min* ***xwe avête her du nigên (ling) wî****, da ez tiştên zêde jê bipirsim..."* Zeynelabidîn Zinar

Xwe avêtin der û dawa (yekî)

Lavayî kirin. **Zerîfeyê* ***xwe avête der û dawa Şalyar*** *jî lê mixabin qet guh nedayê.*

Xwe avêtin erdê

Inyat kirin. **Her kesî jî dizanibû, lê wî* ***xwe avête erdê*** *û bi ya xwe kir.*

Xwe avêtin kulînan (Wekî segên diz, xwe avêtin kulînan)

Dizî kirin. **Ew wisan e, heta* ***wekî segê diz xwe neavêje kulînan****, rehet nabe.*

Xwe avêtin nav êgir

Bi karên xeter re mijûl bûn. **Gunehê min bi wê keçikê tê, hema ji bêgavî* ***xwe avête nav êgir****.*

Xwe avêtin pêş

1. Ezîtî kirin. **2.** Ji bo kesekî xwe feda kirin. *Jixwe hema çi karekî xweş û kêrhatî hebe ew xwe diavêje pêş. **Ku Hemîd* ***xwe neavêta pêş wî****, Xwedê dizane, lê niha di mezel de radiza.*

Xwe avêtin ocaxa (yekî)

bnr: Xwe avêtin ber tor û bextê (yekî)

Xwe avêtin ser cila (yekî)

1. Ji kesekî yan jî malbatekê keça wan xwestin. **2.** Xwe avêtin ber tor û bextê yekî. **Heke me ji we hez nekira, me* ***xwe nediavêt ser cila we****. **Wî rebenî jî* ***xwe avêtibû ser cila wan****, helbet wê lê xwedî derketena.*

Xwe avêtin ser sêla sor

Gelekî israr kirin. Bi awayekî bêar pê ve zeliqîn. **Bi rastî jî ez bêgav mam ku bipejirînim, çimkî wê* ***xwe avête ser sêla sor****.*

Xwe avêtin ser siya piştê

Teral bûn, nexebitîn. **Xebata çi halê çi lo, camêrî hema heya êvarê tenê* ***xwe diavêje ser siya piştê****.*

Xwe avêtin (yekî)
Lavayî kirin. **Ji nişkê ve Xwedê deriyê fereca xwe vekir: Xelkê gundê Avsîra hatin cem, **xwe avêtinê** da ku melayekî ji wan re bişîne."* Ridwanê Elî

Xwe babax kirin
Pozbilindî kirin, xwe zêde hesibandin. **Van rojan Berfo wisa **xwe babax dike** ku jê nayê xeberdan.*

Xwe balgî kirin
Karê xwe saxlem kirin. Ewlekariya xwe pêk anîn. **Ew ne wisa hindik e, **xwe wer balgî kiriye** ku kes nikare wî ji cihê wî bileqîne.*

Xwe baweşandin
bnr. Xwe li ba kirin

Xwe belek kirin
bnr. Xwe dan xuyandin

Xwe belî kirin
bnr. Xwe dan xuyandin

Xwe bera nav dan
bnr. Xwe lê qerase kirin

Xwe berdan
1. Xwe sist kirin. Li ber xwe nedan. **2.** Rewşa xwe eşkere kirin. **3.** Cesaret dîtin û bi pêş de çûn. **Heke Zeynebê ew qasî **xwe bernedaya**, bawer im ku wê ew nexweşiya wê jî ew qasî bi pêş de nediçûya. *Min çi zanibû, Hesret wê di sohbetê de ew qasî **xwe berde** û wan tiştan jî bibêje. *Wî bi niyeta baş rû dayê, lê Dîdemê fêm nekir û **xwe zelıf zêde berda**.*

Xwe berdan nav êgir
bnr. Xwe avêtin nav êgir

Xwe bernedan
1. Sir û raza xwe ji kesî re negotin. **Min her tiştên xwe jê re got, lê wî qet **xwe berneda**.*

Xwe bê Xwedê kirin
bnr. Xwe ji Xwedê kirin

Xwe bi dara asê ve girtin
Inyat kirin, dev ji ya xwe bernedan. **Wî **xwe bi dara asê ve girtiye**, kes nikare wî îkna bike.*

Xwe bi dest (yekî) ve berdan
1. Xwe radest kirin. **2.** Ji bo jinên ku dikevin têkiliya zayendî tê gotin. **Qaçaxan mêze kirin ku xelasbûna wan tune, **xwe bi dest leşkeran ve berdan**. *Jinikê ji bo ji karê xwe dernekeve, **xwe bi dest mêrik ve berda**.*

Xwe bi heft avan şûştin
bnr: Xwe bi heft qalib sabûn şûştin

Xwe bi heft qalib sabûn şûştin
Xwe ji tawanbarî û gunehan dûr xistin. **Bi navê wî Xwedayê ku ez û tu tev xuliqandine, ew **xwe bi heft qalib sabûn jî bişo** ez ji wî bawer nakim.*

Xwe bi heft û nîvan girê dan
Xwe zêde xemilandin. **Gulbiharê **xwe bi heft û nîvan girê da** û çû geşta hemwelatiyan.*

Xwe bi kerî bihartin (buhurîn)
bnr: Xwe li kerîtiyê danîn

Xwe bi keyso meyso kirin
bnr: Ser û sîçên xwe rast kirin

Xwe bi mirîtî avêtin
Xwe wekî miriyan nîşan dan. **Digotin, heke meta min a Zeyneb **xwe mirîtî neavêta**, dijminan dê ew jî bikuştana.*

Xwe bi naziyê xistin
Naziyên xwe kirin, rasterast nepejirandin, xwe şîrîn kirin. **Ew ji min zêdetir dixwaze, lê teresê hinekî **xwe bi naziyê dixe**.*

Xwe bi paş de nedan
1. Wêrek bûn, ji şer û tiştên xeter netirsîn. **2.** Ji mesrefan an jî berpirsyariyê xwe nedan alî. **Tu dikarî bi Serfiraz bawer bî, ew tu car **xwe bi paş de nade**. *Çi hewce be bibêje, Adar **xwe bi paş de nade**.*

Xwe bi paş ve kişandin
Dev ji daxwaz û kirina tiştekî berdan. **"Lê demekê bi şûn de mirov hew dibîne, ku weke darikê ketibe nava gerîneka feratekê û mirov hew dikare **xwe bi paş ve bikişîne**."* Roşan Lezgîn

Xwe bi pêş xistin
Der barekê de xwe baş gîhandin. **Kesî ew qas ji Xezalê bawer nedikir, maşelah gelekî **xwe bi pêş xistiye**.*

Xwe bi pêş ve kişandin
Erîş kirin. **Erê, ew **xwe bi pêş ve dikişîne**, lê bawer im, newêre zehf zêde jî here.*

Xwe bi rê ve birin
Debara xwe kirin. Li ser lingê xwe sekinîn. **Gelekî sist û pist dihat xuyan, lê şikir ji Xwedê re, wa ye **xwe bi rê ve dibe**.*

Xwe bi ser (yekî) de dadan
Li stûyê kesekî bûn bar. **Wê jî mêze kir ku jiyan zor e, **xwe bi ser Bavê Xezalê de dada**.*

Xwe bi sîrekê tê dan, bi heft pîvazan jê xelas nekirin
Xwe jê xelas nekirin. Ji têkiliya xwe poşman bûn. **Ev çi bela ye kuro? Mirov **xwe bi sîrekê tê dide, bi heft pîvazan jê xelas nabe** qurban.*

Xwe bi şev û şîv kirin
Cihekî sêwirandinê ji xwe re dîtin. **Jinikê çi kir kir, di axiriyê de **xwe bi şev û şîv kir**.*

Xwe bi tamara qûnê ve dayîn
Bi hemû hêz û giraniya xwe, xwe dayîn ser. **Ne sucê wî bû ya rastî wî jî **xwe bi tamara qûnê ve dayê**, lê çi kir pêk neanî.*

Xwe bi (yekî) ve girê dan
Xwe spartin hêvî û gumana kesekî. **Xalit Begê heke tenê **xwe bi wê ve girê nedaya**, ew qas jî bêguman li holê nedima.*

Xwe bizdobado kirin
bnr. Badek li xwe kirin

Xwe bûl kirin
Xwe kêm kirin. **Mirov çiqasî **xwe bûl bike**, ew qasî dikeve binî.*

Xwe çarçek kirin
Ji serî heya binî xwe amade kirin. **Wan tam **xwe çarçek kiribûn**, lê derfet nedîtin.*

Xwe çêkirin
1. Tawan nepejirandin. **2.** Li ser û sîçê xwe nihêrîn. Ji bo bedewbûnê xwe xweşik kirin. **Tu menêre ew gelekî **xwe çêdike**, lê heke çewtî û kêmasiyên wî nebûna mesele nedihate wê radeyê. *Ew jinek wisa bedew e ku qet **xwe çêneke** jî ne xem e.*

Xwe çing kirin
Ji bo kirina karekî xwe amade kirin. **Qet destê xwe medinê, ancax ku wê **xwe çing kiriye**.*

Xwe dabarandin
Xwe gelekî aciz kirin. **Rebena Felknasê **xwe dabarand**, lê wan fêm nekirin, niha jî ax dikin, bendê pişta wan diqete.*

Xwe dagirtin
Ji bo xirabî yan jî şerekî xwe amade kirin. **Xecê ji bo Tefoyê Seyîd **xwe dagirtiye**, ku wî bigire, tu mêze bike xilaportê.*

Xwe dan nîşandan
Zerengî û erêniyeke xwe dan xuyandin. **Çima ku saz lê dixist, île **xwe da nîşandan** û her kes pê hesand ku li sazê dixe.*

Xwe dan banî
Astengî derxistin. Neyînî afirandin. **Diya keçikê baş bû, lê bavê wê **xwe dida banî**.*

Xwe dan ber çavan
Xuya kirin, xwe kifş kirin. *"*Lê paşê hêdî hêdî her tiştî **xwe da ber çavan**."* Nacî Kutlay

Xwe dan hev
1. Ji ber rêz û hurmetê yan jî ji bandorek din vekişîn, rêz nîşan dan. **2.** Hêz dan xwe. Xwe ragirtin. **Dema ku kalikê wî ket hundir, Xelîl **xwe da hev**. **"Gava ev dihat bîra wê, bi carekê de diteqiya, xwe bi pêş ve diavêt, dû re dîsa diket erdê, radibû, **xwe dida hev** ..."* Abidin Parıltı

Xwe dan hevrazan
Astengî derxistin. **Na lo! Armanca wî ne kirin e, tim **xwe dide hevrazan**.*

Xwe dan xuyandin (xuya kirin)
bnr. Xwe dan nîşandan

Xwe dayîn ser behran
Ketin nav xeyalan. Ji xwe çûn. **Xêr ji wî nayê wî **xwe daye ser behran**.*

Xwe dayîn aliyekî
1. Têkildar nebûn. **2.** Xwe ji ber hinekan veşartin. Li ber çavan neketin. **"Texmîna ku wê wilo bibe kiribû. Lê gotina "ez ê **xwe bidim alî**" dîsa jî ew hinekî din tirsand."* Süleyman Demir **Mendo wisa **xwe da aliyekî** ku dijminên wî çiqas lê gerîn jî tu car rûçikê wî nedîtin.*

Xwe dayîn ber ...
1. Ji kesekî yan jî ji karekî re kefîl û darinde bûn. **2.** Ji karekî yan jî tiştekî re amade bûn. Berpirsyarî pejirandin. **3.** Ji bo jina ku bi daxwaza xwe bi mêrekî re dikeve têkiliya zayendî jî tê bi kar anîn. **4.** Ji karekî re astengî derxistin. **Heke Fayze Xanimê **xwe neda ber deynê wî**, xelasbûna wî ne guncan bû. **Ûsivê Xelo xwe **daye ber wî karî**, çi dibe bila bibe, wê bibe serî. **Heke wê jinikê **xwe neda ber wî xortî**, îro ew qas xwîn jî nedirijî.* (argo) **Cezmî **xwe daye ber wî karî**, nahêle ku bê qedandin.*

Xwe dayîn ber agirê germ (xweş)
Li berjewendî û rehetiya xwe gerîn. **"Te hêz û bawerî xist dilê me tevan, ji bilî hevalê min î şoreşger ku **xwe dide ber agirê xweş** ..."* Bavê Hêmin

Xwe dayîn ber bar
Berpirsyarî hildana ser xwe. **Heke Reşoyê Huso **xwe bide ber wî barî** tu pirsgirêk namîne.*

Xwe dayîn ber berê reş
bnr. Xwe dayîn ber berê sar

Xwe dayîn ber berê sar
Gelekî feqîr bûn. **Bawer ji ber qelenê bûka xwe, îsal **xwe da ber berê sar**.*

Xwe dayîn ber keviran
bnr. Xwe dayîn ber berê sar

Xwe dayîn dest

1. Bêhemdî xwe, hinekên din bi kêmasî û gunehên xwe haydar kirin. **2.** Teslîm bûn. **Wî ji nedixwest, lê xwe şaş kir û bi wan gotinên xwe bêhemdî xwe, **xwe da dest**. *"Hema vê carê jî ji ber lepên wî bifelitim, bi Xwedê tu caran ez **xwe nadim dest**!"* Dr. Ciwan Batû

Xwe dayîn kirê Gewro

Gelekî inyad kirin. **Tu çi dibêjî, bibêje, wî **xwe daye kirê Gewro**, ji gotina xwe tu car venagere.*

Xwe dayîn kirê kewan

bnr: Xwe dayîna kirê Gewro

Xwe dayîn pês

1. Astengî derxistin. **2.** Berjewendiyên xwe girîngtir girtin. **Heke Hecî Cimoyê çavbeq **xwe nedaya pês**, tu bawer bike ew yek wê derketa mederê. *Hema çi tiştên xweş hebe, Hevalê Zoro **xwe dide pês**.*

Xwe dayîn pişt ...

Alîgirê hêlekê bûn. **Heke mala Rizgo **xwe nedaya pişt eşîra** Fesoliyan, ew bi ser nediketin.*

Xwe delîdûmanî kirin

bnr: Xwe çiroviroyî kirin

Xwe di ber çav re derbas kirin

Rewşa xwe ji nû ve, di serî de nirxandin. ***Xwe di ber çav re derbas kirin** wisa ne hêsan e, her kes nikare, pêk bîne.*

Xwe di ber re kirin

Bê dor, bê maf û bê destûr xwe xistin nav. **"Hemû zehmetî me kişand, lê Hejar hat **xwe di ber re kir** û bû nîvekarê me yê kedê."* Dilawer Zeraq

Xwe di kirasê xeletiyê de nedîtin

Çewtiya xwe nedîtin. **"... ez jî naxwazim **xwe di kirasê xeletiyê de bibînim** ..."* Sidqî Hirorî

Xwe di nav re kirin

Bi awayekî ne nazik ketin derekê. **Hew me dît ku wê jinikê **xwe di nav re kir** û ew revand jî.*

Xwe di ser guhekî re avêtin

Xem nekirin. Li pirsgirêkê xwedî nebûn. **Qet talaşa wî jî nîn e, welehî hema **xwe di ser guhekî re avêtiye**.*

Xwe di ser (yekî) re zer kirin (Xwe di ser re zer kirin)

1. Bi tiştekî hesab nekirin. **2.** Di ser re baz dan. **Bi rastî jî me bawer nedikir ku Zerîn **xwe di ser xwediyê xwe re xwe zer bike** û bi wî xortî re bireve. *Ji nişkê ve Bengînê **xwe di ser re zer kir** û derbasî wî alî bû.*

Xwe di ser re çeng kirin
bnr: Xwe di ser re zer kirin

Xwe dirêjî (yekî) kirin
Bi armanca lêdanê bi ser yekî de çûn. **Na lo, di nav destê cîranan de **xwe dirêjî min dikir**, lê Xwedê kir bernedan, naxwe, min ê serê wî pehn bikira.*

Xwe dînomîno kirin
bnr. Xwe li dînîtiyê danîn

Xwe eciqandin (heciqandin)
Xwe aciz kirin. **Ew qasî **xwe neeciqîne**, her tişt dê bi pêvajoya demê de çareser bibe.*

Xwe erzan kirin
Xwe bê rûmet kirin. **Bi wê helwestê Evînê **xwe erzan kir**.*

Xwe evdalokî kirin
Guneh bi xwe anîn. **Jixwe wî **xwe evdalokî kir** û wisa karê xwe pêk anî.*

Xwe ferz kirin
Bi awayekî xwe derxistin herî pêş. Ji bo berjewendiya xwe yê li hember bêgav hiştin. **Çîçekê çawa kir nizanim, lê me her dît ku jinikê **xwe ferz kir** ku Baro pê re zewicî.*

Xwe firikandin
bnr: Badek li xwe xistin

Xwe fisfisandin
Xwe bi derengiyê xistin. **Wê **xwe fisfisand** heya ku ew firsend ji destê me derket.*

Xwe gilê kirin
Ji bo berjewendiyekê xwe zêde hewcedar nîşan dan. **Baharê ji bo di wê saziyê de bixebite, bi rojan **xwe li ber derî kire gilê**, lê tu encam jî negirt.*

Xwe gunokî kirin
bnr: Xwe evdalokî kirin

Xwe gir frotin
bnr: Xwe gir kuştin

Xwe gir kuştin
Xwe zêde hesibandin. **Ew qasî **xwe gir dikuje**, lê Xwedê jî dizane ku barê wê jî vala ye.*

Xwe giran girtin
1. Îhmalî kirin. **2.** Xwe bi naziyê xistin. **Ji ber **xwe giran girtina** Evînê wî ew qas rê lilda. *Emîn wisa, **xwe giran digire** ku tu dibêjî, kurê Qurqur Begê ye.*

Xwe girê dan

1. Cil û berg wergirtin. **2.** Çek û pûsatên xwe hildan. **3.** Xwe amade kirin. **Dîba û Dengînê ji bo daweta biraziyê xwe,* ***xwe girê dan****. *Gerîlayan* ***xwe girê dan*** *û di sehera şibehê de xwe berdane ser baregeheke dijminên xwe. *Xasê ji bo axaftina li ser perwerdehiyê* ***xwe girê dabû****.*

Xwe herimandin

Bi karên nebaş re mijûl bûn. **Heyfa wî ku bi nefsa xwe nikaribû û di dawiyê de* ***xwe herimand****.*

Xwe jê girtin (Xwe jê dûr girtin)

Di daxwaza têkildariyê de nebûn. Xwe jê parastin. **Keçik gelekî li pey wî dikeve, lê ew tim* ***xwe jê dûr digire****.*

Xwe jê himet nekirin

Xwe jê neparastin. **Tu bi ya min bikî, dîsa jî* ***xwe jê himet neke****.*

Xwe jê nekirin

Têkiliya xwe nebirîn. Xwe ji berjewendî û derfetan nedan alî. **Ew jî karê xwe dizane, ew zû bi zû* ***xwe ji wê jinikê nake****.*

Xwe jê re amade kirin

1. Li hemberî her dibetiyê (îhtimalê) bergirî (tedbîr) hildan. **2.** Ji bo xirabî gihandina yekî xwe amade kirin. **Em nizanin dê çi derkeve pêşiya me, ji ber wê divê em* ***xwe ji her tiştî re amade bikin****. *Her du birayan* ***xwe ji wî re amade kirine****, çawa ku bibînin, wê birepîninê.*

Xwe jê re dayîn heft bar garis

Jê re minetdar bûn. **Divê tu* ***xwe ji bûka xwe re bidî heft bar garis****. Ma nabînî ji bo te çawa serê xwe li şel û pelan dixe.*

Xwe jê re dayîn pariyek nan

bnr. Xwe jê re dayîn heft bar garis

Xwe jê re kirin erd û xwelî

Zêde rûmet dayîn. **Ew qas jî nabe lo, jinikê* ***xwe jê re kir erd û xwelî****, lê dîsa jî kêrek jê nedît.*

Xwe jê re kirin qûl û kole

bnr. Xwe jê re kirin erd û xwelî

Xwe jê şûştin

Têkiliya xwe jê birîn. **Heta Gulanê* ***xwe ji wî karî şûşt****, me got, ya felek.*

Xwe jê vedizîn

Xwe pê nîşan nedan. **Nizanim ji her çi ye, lê Nûrî hema* ***xwe ji Loqman vedize****.*

Xwe jê vegirtin

1. Jê şerm kirin. **2.** Jê tirsîn. **3.** Têkilî nexwestin, xwe jê dûr girtin. **Ev çito bûke lo, qet* ***xwe ji kesî venagire****. ****Xwe jê vedigirt****, nola berê xwe nedispartê ..."* Fevzi Bilge

Xwe jê xelas kirin

Ji rewşek an jî kesekî xerab rizgar bûn. *Şikir ji Xwedê re, lawê min ***xwe ji wî hevalê xwe yê xerab xelas kir***.

Xwe ji ber çavan dayîn alî

Xwe nîşan nedan, nexuyandin. *Piştî kuştina Sercan lêzimên kujer ***xwe ji ber çavan dane alî***.

Xwe ji ber (yekî) dizîn

Ji tirsan an jî ji şerman xwe nîşan nedan. *"Xalan dît ku Kero nade wan firsend û eman e. ***Xwe ji ber wî dizîn***, di aliyê Kulik de li ba dane." Ahmet Aras

Xwe ji ber pozê (yekî) nedan alî

Ji dorhêla kesekî neqetîn. *Keçikê aqilê xwe xwaribû, abûr û heya danîbû aliyekî, qet ***xwe ji ber pozê lawik nedida alî***.

Xwe ji dîn û îman kirin

1. Derew kirin. **2.** Neheqiyek kirin. *Wan her du kalan jî ***xwe ji dîn û îman kirin*** û ya rast negotin. *Dê û bavên wê keçikê ***xwe ji dîn û îman kirin*** û ew keçika piçûk dane wî kalê lujlujî.

Xwe ji (yekî) re kin girê dan

Ji bo şerkirina bi kesekî re xwe amade kirin. *Hesenê Kopik ***xwe ji Cindî re kin girê dabû***, lê çi kir jî Cindî xwe nekir hevalê wî.

Xwe ji mirovan hesibandin

Ji bo kesên bi xwe ne tiştek in, lê xwe bi tiştekî dihesibînin tê bikaranîn. *Çawa bike, camêrî ew jî ***xwe ji mirovan dihesibîne***.

Xwe ji reha qûnê şidandin

Bi hemû hêza xwe kirin. *Wê ***xwe ji reha qûnê şidand***, lê dîsa jî pêk neanî. (argo)

Xwe ji Xwedê kirin

Heqî berdan. Ya rast negotin. *Zerîfe, tu çima ***xwe ji Xwedê dikî*** û ya rast nabêjî?

Xwe li keçbûkiyê danîn

Ji bo jinên pîr ku xwe ciwan dihesibînin û dikevin nav hewldanên eletewş tê bikaranîn. *Hingî mêrê wê berdaye, Xunav ***xwe li keçbûkiyê daniye***, bi şev û roj xwe dikurtisîne.

Xwe ker kirin

Li hemberî bûyer, daxwaz an jî dengekî bê helwest û bê pêjnker man. Deng nekirin. *"Dewlet ***xwe ji banga aştiyê re ker dike***." Adar Jiyan

Xwe kerî derbas kirin (rabartin)

Ji bo kesên tiştekî dibihîzin lê, wekî ku nebihîstine hereket dikin tê gotin. *Me gelek caran got, lê mixabin wan tim ***xwe kerî derbas kirin.***

Xwe kêm dîtin

Bi xwe bawer nebûn. *"*Mirovê ku bi meqamê xwe piçûk e, çavşikênandî dibe. Ew li ku be,* ***xwe kêm dibîne****. Loma jî Şêxmûsko bi rûniştina li odeya axê di nav şekalan de dima."* Bavê Nazê

Xwe kêm kirin
bnr. Xwe piçûk xistin

Xwe keyso meyso kirin
Xwe xemilandin. **Jinika navsere ku* ***xwe wisa keyso meyso bike*** *li wir baş nayê dîtin.*

Xwe kifş kirin
bnr. Xwe dan nîşandan

Xwe kin girê dan
Xwe amade kirin. **Lawikê min ji bo xebatê* ***xwe kin girê da*** *û çû.*

Xwe kirin çincîla (yekî)
bnr. Xwe spartin (yekî)

Xwe kirin hevalê (yekî)
Ketin asta kesekî. **Ez ji te tika dikim,* ***xwe neke hevalê wî kûçikê heram****.*

Xwe kirin hoko
1. Bi cihê xwe ve zeliqîn. Ji cihê xwe ranebûn. **2.** Bûn bela û ji ya xwe nehatin xwarê. **"Belê piştî her çûyîna xwe jî,* ***xwe li gund dikir hoko****."* Felat Dilgeş **Di wan rojan de wî* ***xwe kiribû hoko****, me xwe jê xelas nedikir.*

Xwe kirin reşê (yekî)
Bi navê yekî din xwe nîşan dan. **Dibêjin wî* ***xwe kiriye reşê exrebeyekî dûr*** *û ew yek aniye serê wê.*

Xwe kirin rûnê ser nan
bnr. Xwe kirin şorbeya nexweşan

Xwe kirin şorbeya nexweşan
Bi awayekî ne asahî xwe şîrîn û nazik nîşan dan. **Maşelah Zeynebê li ber çavên malbata lawik* ***xwe kire şorbeya nexweşan****, lê dîsa jî nebû.*

Xwe kirin tayê (yekî)
bnr. Xwe kirin (yekî)

Xwe kirîn
Lêborîna xwe xwestin. Xwe dan efûkirin. **"Piştî wê bûyera ku ez pê êşiyam re Elmed hat bal min,* ***xwe kirî****."* Bozan Yaman

Xwe kor kirin
Xeta û çewtiyeke mezin kirin. **Min çi zanibû ku wê wisa bibe, min* ***xwe kor*** *kir û li wê xwedî derneketim.*

Xwe kur û kem kirin
Ji bo bi şermiyê ketin û çewtiya jinan tê gotin. **Zozanê **xwe kur û kem kiriye**. Bi wî lawikî re razaye.*

Xwe kurtisandin
Zêdetir ji kal û pîrên ku dikevin dilqê ciwanan û xwe ji asahî zêdetir dixemilînin tê bikaranîn. **Serê pîran Xaltîka Sîdar **xwe kurtisandiye**, lê mixabin naşibîne tu tiştî û hê xerabtir jî bûye.*

Xwe kutan ber devê (yekî)
bnr. Xwe ji ber pozê (yekî) nedan alî

Xwe kutan hev
Bi hev du re tifaq û alîkarî kirin. **Berê goştê serê hev dixwarin, lê îro ji bêgavî **xwe kutane hev**.*

Xwe lewitandin
1. Tiştên nebaş pêkanîn. **2.** Bi xwe de rîtin. **Heyfa wî, di dawiya emrê xwe de **xwe lewitand**. **Bahozê neviyê min, bûye du salî hê jî **xwe dilewitîne**.* (argo)

Xwe lê asê kirin
Bê plan û bê hesab ketin nav. **Madem ku armanca wan ew qasî mezin bû, çima wisa bê serî û bê bername **xwe lê asê kirin**.*

Xwe lê danenîn
Lê xwedî derneketin. Têkiliyeke germ nîşan nedan. **Bi rastî min ew dît, lê min **xwe lê danenî**.*

Xwe lê hilkirin
Bi yekî re şer kirin. **Dilbirîn di dilê xwe de xwedî kir, heta ku di axiriyê de **xwe lê hil kir** û serê wî jî şikand.*

Xwe lê kirin teht
Xwe pê ve zeliqandin, gelekî tund li ser tiştekî sekinîn. **Heçî gava ku ez diçim mala bavê xwe, birayê min î piçûk **xwe li min dike teht**, ji bo ku ez ji bal ranebim.*

Xwe lê qerase kirin
1. Bi awayekî bê hesab ketin nav tiştekî yan jî karekî, bi cesaret, dest avêtin karekî. **Te ew mirov ji ku anîne? Hema **xwe wisa lê qerase dikin**, bi tu azîn û ûsila kar jî nizanin.*

Xwe lê qewimandin
bnr. Xwe lê qerase kirin

Xwe lê serqot kirin
Bi awayekî zexm û bi biryar karek kirin. **Wa ye Subhan **xwe lê serqot kiriye**, bawer im ku dê di demeke kurt de biqedîne.*

Xwe lê xistin
1. Bi awayekî nezan, bê bername û bê sazûmanî ketin nav karekî. **2.** Bi kesekî re pev çûn,

belaya xwe li yekî dan. *Xebûr hema **xwe lê xist**, kete nav wî karî, lê baş bû ku di dawiyê de xwe rast kir. *Di axiriyê de Ehmedê Genî **xwe li Seydo xist**, lê wî xwe nekir hevalê wî.

Xwe lê nekirin xwedî

Wekî xwediyan xwe nêzîk kirin an jî stamî kirin. *"*Wê ferq kiribû ku bavê wê li dû wê ye, lê wê **xwe lê nekiribû xwedî**."* Enver Karahan

Xwe li ba dan

1. Ji kar an jî gotina xwe revîn. Çiv dan xwe. **2.** Di birêveçûn û tevgerê de zêde çalak bûn. *Wî soz dabû, lê di dawiyê de **xwe li ba da**. *Keçikê wisa **xwe li ba da** ku lawikê reben heliya.

Xwe li ba kirin

1. Xwe qure kirin. **2.** Gef xwarin, xwe çiroviroyî kirin. **3.** Lîstin. *Zerîfe wisa **xwe li ba dike** ku tu dibêjî qîza Kor Hiseyîn Paşa ye. *Tu wisa **xwe li ba kirina** wî menêre, tiştek ji dest wî nayê. *Mirdêsiyê îşev di dawetê de wisa **xwe li ba kir** ku di nav xwehdanê de ma.

Xwe li belayê girtin (dan, xistin)

Bi karên xeter re mijûl bûn. *Delal **xwe li belayê girtiye**, wê rojekê bi ser belaya xwe ve bibe.

Xwe li ber baranê şil kirin

Karên nepêwîst û ne di cih de kirin. *Ya ku tu dikî hema ew e ku tenê tu **xwe li ber baranê şil dikî** û hew.

Xwe li ber girtin

Li pêş hêz û kelîjekê xwe ragirtin. *Wan çi anîn serê wê, wê dîsa jî **xwe li ber girt** û di axiriyê de bi ya xwe kir.

Xwe li ... bi cih kirin

Li derekê ji xwe re kar dîtin, debara xwe kirin. *Di dawiyê de Rojhilat **xwe li wir bi cih kir** û rûyê malbata wî geş bû.

Xwe li buhirê (yekî) xistin

Yek dilsoz û nêzîkî xwe dîtin. *Tefîq tenê **xwe li buhirê Nûro dixe**, naxwe nikare ji kesî bixwaze.

Xwe li dînîtiyê danîn

Xwe wekî dînan nîşan dan, rista dînan kirin. *Heke ew ku wisa **xwe li dînîtiyê dayne**, ez ê jî hê ji wî dîntir bim.

Xwe li eksê danîn

Inyad kirin. *Celîlê Faris **xwe li eksê danîbû**, gund hemû çûn ricayê, dîsa jî ji gotina xwe vagêr nebû.

Xwe li ingê danîn

bnr. Xwe li eksê danîn

Xwe li erdê xistin
Ji bo daxwazekê gelekî li ber xwe dan û rezîltayî derxistin. **Kuro ez çi bikim, wisa* ***xwe li erdê xist*** *ku ez bêgav mam û min bi xwe re anî.*

Xwe li gemê xistin
Xwe çireve kirin. Gef xwarin. **Te bidîta Welat ji bo keçikan xwe çawa* ***xwe li gemê dixist.***

Xwe li hev negirtin
Yekitî û tifaq nekirin. Li ber xwe nedan. **Wan* ***xwe li hev negirtin****, loma wisa zû têk çûn.*

Xwe li keleman xistin
Bi nav pirsgirêk û derdan ketin. Xwe li belayan asê kirin. **Wî jî wer hesab nedikir, lê hew dît ku* ***xwe li keleman xistiye*** *jî.*

Xwe li ser kuştin
Ji bo kesekî yan jî tiştekî mirin dan pêş çavên xwe. **Keçikê* ***xwe li ser gede dida kuştin.***

Xwe li nedîtiyê danîn
Xwe wekî nedîtî nîşan dan. **Baş dizanim wê ez dîtim, lê* ***xwe li nedîtiyê danî*** *û ji min derbas bû.*

Xwe li nenasiyê danîn
Wekî ku nas nake, nîşan dan. **Wî ez nas kirim jî lê* ***xwe li nenasiyê danî.***

Xwe li nexweşiyê danîn
Xwe wekî nexweşan nîşan dan. **Wê jinikê* ***xwe li nexwaşiyê danî*** *û bi wî awayî mêrê xwe xiste koleyê xwe.*

Xwe li nezaniyê danîn
Ligel zanebûnê, ji ber hinek sedeman xwe weke nezan nîşan dan. **"Min* ***xwe li nezaniyê datanî*** *û destên xwe di ser destên wê yên mîna du kevokên kedî re dibirin ... "* Jan Dost

Xwe li ser çardarê jî negirtin
Rewş xerabtirîn bûn. **Kuro erê me got, tu nexweş î, lê tu nikarî* ***xwe li ser çardarê jî bigirî****?*

Xwe li ser lingan girtin
Ji bo zarokên ku dest birêveçûn û çiksekinandinê dikin tê bikaranîn. **Şikir ev sê roj in ku neviya min* ***xwe li ser lingan digire****.*

Xwe li ser perê esmanan dîtin
Xwe zehf zêde dîtin. **Qet nizanim Xeydokê çi bihîstiye, van rojan* ***xwe li ser perê esmanan dibîne****.*

Xwe li ser piştê direj kirin
bnr. Xwe avêtin ser siya piştê

Xwe li ser siya pişta xwe de avêtin
bnr. Xwe avêtin ser siya piştê

Xwe li xamî(yê) danîn

Xwe wekî nezan û fêmnekirî nîşan dan. **Ew zelıf kone ye, mêze kir ku rewş ne hêsan e,* ***xwe li xamî danî****.*

Xwe li xirexavtiyê danîn

Xwe wekî gêj û bê fehm nîşan dan. **Wî* ***xwe li xirexavtiyê danî*** *û wisa li wir debara xwe kir.*

Xwe loşeve kirin

1. Lafezanî kirin. **2.** Bi rehetî tevgerîn. **Dîsa Faris* ***xwe loşeve dike****, dest bi çîrokên berê kiriye. *Teresê Hecî Misto* ***xwe li mala Evdal wisa loşeve kiriye*** *ku tu dibêjî, ev der mala wî ye.*

Xwe mezin kirin

Xwe zêde hesibandin. **Kuro* ***xwe wisa mezin meke****, Xwedê di ser te re heye.*

Xwe mizmizandin

Mizemiz kirin. Helwesteke zelal nîşan nedan. **Ji ber ku wê* ***xwe mizmizand****, a din di wê valahiyê de ew hilda û bir.*

Xwe mûr kirin

Mirûzê xwe kirin, pozpirçî bûn. **Wî wisa* ***xwe mûr kiribû*** *ku min taqet nekir ez sedema wê bipirsim.*

Xwe nas kirin

1. Di derka rewşa xwe ya rasteqîn de bûn. **2.** Kamil bûn, di hêla zayendî de gihîştin. **Hûn qet meraq mekin, ew* ***xwe nas dike****, dizane hêza wî çiqas e û digihîje heya ku derê. *Êdî lawikê wê* ***xwe baş nas dike****, hema hema dema zewaca wî ye.*

Xwe ne ji dêrê, ne jî ji vangê kirin

Dev ji her du vebijarkan jî bernedan, her du jî daxwaz kirin. **Xasê* ***xwe ne ji dêrê, ne jî ji vangê dike****, lê nikare wê rewşê zêde jî bidomîne.*

Xwe nebeledî avêtin

Xwe wekî hay jê tunebûyî nîşan dan. Yê nas dike, wekî nenas nîşan dan. **Nazîn* ***xwe nebeledî diavêje****, lê her kes dizane ku tiliya wê nav de ye.*

Xwe nedan alî

Ji binbariyê nerevîn. ** "Zelal keçikeke pir zîrek e. Wexta ku karek hebe,* ***xwe nade alî****.*

Xwe nedîtin

1. Ji xwe ve çûn, gemişîn, xeriqîn. Hay ji xwe tune bûn. **2.** Rewşa xwe rast nenirxandin. **" ... dabezîne ser laşê wî û wî êdî* ***xwe nedît****. Wî hindî kir qîrîn û hewar, lê ma dê bigihê ku derê."* Sidqiyê Hirorî **Ev çendek e, serê Sîdarê mij û dûman e,* ***xwe nabîne****.*

Xwe negirtin

Li ber xwe nedan, ji ber kirinek an jî gotinekê helwesta xwe nîşan dan. **Ez jî dizanim ku divê min tiştek negota, lê min* ***xwe negirt****.*

Xwe negihandin (yekî)

1. Negihîştin radeya yekî. **2.** Ji bo hevdîtina kesekî derfet nedîtin. **Zelıf zêde dexesî lê dikirin, lê dîsa jî nikaribûn **xwe bigîhînin wê**. *Ew rojnamevan sê hefteyan li pey ket, lê dîsa jî nikaribû **xwe bigihîne serokê rêxistina rizgariya gelê Kurd**.*

Xwe nepixandin

Xwe qureve kirin. **Zerda wisa **xwe dinepixîne**, ku tu dibêjî, bûye seriyekî keran.*

Xwe nêzîkî (yekî) dîtin

Li hemberî yekî di nav hestên germ û xweş de bûn. **Nizanim çima lê ez **xwe gelekî nêzîkî wê jinikê dibînim**.*

Xwe nêzîkî (yekî) kirin

Ji bo têkilî yan jî armancên din bi yekî re ketin diyalogê. **Ev zilam gelekî **xwe nêzîkî min dike**, lê nizanim armanca wî çi ye.*

Xwe pak kirin

bnr. Xwe çêkirin

Xwe papo kirin

Xwe bi derengiyê xistin. Xwe mijûl kirin.**Heke tu yê dîsa **xwe papo bikî**, qet neyê.*

Xwe paqij kirin

Xwe ji hinek pirsgirêk an jî cir û xisletên neyînî parastin. **Cindî êdî ne wekî berê ye, **xwe paqij kiriye**.*

Xwe paqij nîşan dan

Xwe wekî durist û mafdar nîşan dan. **Ew **xwe paqij dide nîşandan**, lê ez dizanim wî çi kir û çi nekir.*

Xwe parçe parçe kirin

bnr. Serê xwe li şel û pelan xistin

Xwe pê girtin

Pê bawer bûn. Xwe teslîmî parastin û hêza kesekî kirin. **Keçikê **xwe pê girt**, lê ew qeleş derket.*

Xwe pê de berdan

1. Bi kûrayî lêkolîn kirin û mijûl bûn. **2.** Ketin nav. Xwe lê qerase kirin. **Reşo **xwe bi wê projeyê de berdaye**, înşelah wê encamek baş jê bigire. *Xebûr bê serî û bê berî û bê plan hema **xwe pê de berda**.*

Xwe pê ve herimandin

Bi mijûlahiya tiştekî xerab prestîja xwe winda kirin. **Heyfa wê jinikê, çû xwe **bi wî rezîl û sextekarî ve herimand**.*

Xwe pê nîşan dan

1. Di heqê yekî de hatin. **2.** Merîfet û hunera xwe dan xuyakirin. **Ew gelekî bi pêş ve diçû, lê qurbana destê wî bim, Bawerê min* ***xwe pê nîşan da****. *Wan ew qas hêvî nedikir, lê Serhatê Mîrê Zirav bi hilûra xwe ya zelûl* ***xwe bi wan nîşan da*** *ku çi lawên xelkê hene.*

Xwe pê re hilxistin, daxistin

Bi kesekî re zêde gengeşî kirin û bi awayekî neyînî mijûl bûn. **Wê gelekî* ***xwe bi min re hilxist û daxist****, lê min xwe nekir hevalê wê.*

Xwe pê re gihandin

1. Bi hewara yekî ve gihîştin. **2.** Xwe gihandin ast û radeya kesekî yan jî tiştekî. **Heke wî jî* ***xwe pê re negihanda****, diviya ku keçika min xelas nebûya. *Ew jî zelîf li dersa xwe xebitî, lê dîsa jî* ***xwe bi Bêrîvanê re negihand.***

Xwe pê re winda kirin

Zêde mijûl bûn û di bin bandora kesekî yan jî tiştekî de man. **Remezan* ***xwe bi wî baxçeyê xwe yê xweşik re winda dike****.*

Xwe pê şîrîn kirin

Şêlavî kirin. Li hember kesekî di nav helwesta xwe erênî nîşandanê de bûn. **Ji bo li bal wî bixebite, Medenî zelîf zêde* ***xwe pê şîrîn dike****.*

Xwe pê ve girê dan

Xwe daxilî yekî kirin. **Rast e, Bego* ***xwe bi Zal Axa ve girê da*** *lê baweriya wî pûç derket.*

Xwe pê ve zeliqandin

1. Bi tiştekî re zêde mijûl bûn. **2.** Bi zorekê xwe nêzîkî yekî kirin. **Cewdet wisa xwe bi karê xwe ve zeliqand, di dawiyê di hemû azmûnan de bi ser ket. *Eyb e keça min,* ***xwe bi xortekî ve ew qasî zeliqandin*** *ne helwestek baş e.*

Xwe pê xapandin

1. Di nav helwesteke çewt de bûn. **2.** Pê mijûliya xwe kirin, bêhna xwe pê vekirin. **Heke Faysal* ***xwe bi wê ramanê nexapanda****, wê bi ser biketa. *Çawa bike, rebenî ew jî* ***xwe bi wan zarokan ve dixapîne****.*

Xwe pê xweş kirin

bnr: Xwe pê şîrîn kirin

Xwe piçûk xistin (kirin)

Ji ber helwesteke neyînî rûmeta xwe qels kirin. **Heyfa wî ku ji bo wê têkiliya rezîl* ***xwe ew qas piçûk xist****.*

Xwe pîs kirin

Ketin nav hewldaneke neyînî û navê xwe xera kirin. **Heyfa wî zilamî, bi wê jinikê ve* ***xwe pîs kir****.*

Xwe qîş kirin

Ji bo tiştekî zêde zor dayîn xwe. **Wî belengazî çiqasî* ***xwe qîş kir*** *jî, jê fêm nekirin, niha jî poşman bûne.*

Xwe qoncik kirin (Xwe quncifandin)
bnr: Xwe gilê kirin

Xwe quraftin
Xwe qure kirin. **Berfîn keça min bi **xwe quraftinê** ve mirov mezin nabe.*

Xwe qurban kirin
bnr: Xwe jê re kirin erd û xwelî

Xwe qurom kirin
bnr: Xwe gilê kirin

Xwe ranegirtin
Li hember tiştekî li ber xwe nedan. **"Lê îro nema dikarim **xwe ragirim**, tehemûla min êdî nemaye."* Musa Vazgali

Xwe rehet kirin
1. Derd û pirsgirêka xwe ji yekî re gotin. **2.** Bi gihîştina armanceke xwe re aramî dîtin. **3.** Bi têkiliya zayendî sist û rehet bûn. **Peşlînê heta derdê xwe ji hevala xwe re negot, **xwe rehet nekir**. **Zelalê azmûna xwe da û **xwe rehet kir**. **Mêrik heta **xwe di jinikê de rehet nekir** nesekinî.*

Xwe sist girtin
Biryarek vebirî nedan. Bêyî dilê xwe tevgerîn. **Heke berê min wisa **xwe sist negirta**, ew jî ew qas bi ser min de nedihat.*

Xwe spartin (yekî)
Pê bawer bûn û xwe avêtin ber bextê yekî. **Wan îro **xwe spartine wê**, divê ew jî wê baweriya wan vala dernexe.*

Xwe şaş kirin
Denga xwe winda kirin. Xeta û çewtî kirin. **Heke wê **xwe şaş nekira**, qet dikete nav rêxeke wisa?*

Xwe şehitandin
Karekî fedîkar kirin. Xwe xistin nav rewşeke neyînî. **Heke Rostem wisa **xwe neşehitanda**, niha hûbû serokê şaredariya me.*

Xwe şidandin
bnr: Xwe kin girê dan

Xwe şimşat kirin
Xwe xemilandin. **Wa ye dîsa Reso **xwe şimşat kiriye** û bi pey Şerîfeyê ketiye.*

Xwe şîrîn kirin
Xwe şîrîn xuyandin. **Ev neviya min wisa **xwe şirîn dike** ku nayê gotin.*

Xwe şivîle kirin
Ji rê derketin. **Heke wê wisa **xwe şivîle nekira**, bawer im ku niha ew yek qedandibû jî.*

Xwe bi şûn de dan (kişandin)
bnr. Xwe bi paş ve kişandin

Xwe şûtikî lûtikî kirin
Bi awayekî eletewş xwe xemilandin. **Xonçegulê **xwe şûtikî lûtikî kiriye**, hew dizane, tiştekî pir baş pêk tîne.*

Xwe ta kirin
Ji holê winda bûn, bi zanetî xwe veşartin, xwe vedizîn. **Ev biraziyê min î piçûk, kengê ku bizanibe ez ê jê kirina karekî bixwazim, **xwe ta dike**.* (argo)

Xwe tehlotirşo kirin
Mehdê xwe tirş kirin. **Bibore, lê ku tu **xwe wiha tehlotirşo bikî** em dê nikaribin bi ser bikevin.*

Xwe tehmsar kirin
Ketina nav hewldanên neyînî, cira xwe xera kirin. **Li bal wê keçikê jina wî gelekî **xwe tehmsar kir**.*

Xwe teslîmî (yekî) kirin
1. Bi yekî bawer bûn xwe pê ve girê dan. **2.** Ji ber tawanekê, xwe radestî yên tawanbar kirin. **3.** Ji bo têkiliya zayendî destûr dan. **Wî pê bawer kir û **xwe teslîm Xelîl Axa kir**, lê wî pê re xayîntî kir. *Delîl bi destê xwe, **xwe teslîmî leşkeran kir**. *Jinikê mêze kir ku ji wê re jî wisa pêwîst e, **xwe teslîmî mêrik kir**.*

Xwe tev dan
Di nav amadekarî û hewldana karekî de bûn. **Xwedê xêr bike, Xosrov **xwe tev dide**, înşelah dîsa me rastî belayekê nayîne.*

Xwe tê dan
Ketina nav karekî yan jî pirsgirêkekê. **Min jî **xwe bi vî karê eletewş daye**, nizanim wê çawa be.*

Xwe tê de edilandin
Ji bo berjewendiyên xwe, xwe di derekê de bi cih û war kirin. **Bêguman, ji bo ku **xwe di wir de biedilîne**, çi ji destê Azad hê wê bike.*

Xwe tê de rehet kirin
Ji ber daxwaza xwe bi cih anînê serfiraz bûn. **Êdî piştî wê bûyerê, Welat dê **xwe di wê dikanê de rehet bike**.*

Xwe tê re dîtin
Bitrî bûn. **Çima min dengê xwe nekir, Taharo **xwe tê re dît**.*

Xwe tiroviroyî kirin
Wekî qerf ji kesên ji bo tiştekî xwe zêde li ba dikin û dikevin nav hewldanên eletewş tê gotin. **Zubêt li wir **xwe hinekî tiroviroyî kir**, lê kesî guh nedayê.* (argo-qerf)

Xwe tiştek hesibandin
Bi xwe kesekî metah nebûn, lê xwe zêde hesibandin. **Teresî ew jî **xwe tiştek dihesibîne**.*

Xwe winda kirin
1. Xewirîn, ji xwe ve çûn. **2.** Pir hêrs bûn. **3.** Dengeya xwe winda kirin. Bitrî bûn. Wekî rasteqîniyê tevnegerîn. **Min **xwe winda kiribû**, ez hay ji hatina ambûlansê nebûm. *"Daristanê ku şewitîn tên ber çavê min, hişê min ji serê min diçe. **Xwe winda dikim** ..."* R. Karakaya **Xebûr xwe bi wê erebeyê **xwe winda kiriye**, li her kesî nîşan dide.*

Xwe xistin binê bar
Berpirsyarî girtin ser xwe. **Wê jî mêze kir ku wisa nabe, ji bêgavî **xwe xiste binê bar**.*

Xwe xwarin
Xwe qehirandin, bi awayekî tund ketin tatêlê. **" ... bi temamî hate ser hişê xwe û giraniya xwe ji ser xwe avêt û heta demekê ji qelıran **xwe xwar**."* Osman Mehmed

Xwe xef kirin
Xwe veşartin, vedizîn. **Ku tu wiha **xwe xef bikî** tu dê nikaribî tu çareseriyê bibîne.*

Xwe xera kirin
Ji bo kes an jî tiştên nehêja xwe xistin rewşa mirovên nebaş û neheq. Rewşa xwe ya aborî xera kirin. **Wî serseriyî ji ber wê jinika çûrik **xwe xera kir**.*

Xwe xewle kirin
Xwe vedizîn, xwe veşartin. **Ji bo wî karî em li benda wî bûn, lê wî jî **xwe xewle kir** û ji wir revî.*

Xwe xistin çavê (yekî)
Ji bo ecibandinê, di nav hewldaneke nesurişt de bûn. Şêlafî kirin. **Wê çiqasî hewl da ku **xwe têxe çavê Kerîm**, lê pêk neanî.*

Xwe xistin nav xeberdana (yekî)
Axaftina yekî birîn. **Edeta wî ye, hema **xwe dixe nav xeberdana min**.*

Xwe xistin qula mişkan
bnr. Li qula mişkan gerîn

Xwe xistin şûna (yekî)
1. Wekî rewş û mercên yekî din fikirîn an jî ji bo fêrbûna rewşa yekî din hew ldan. **2.** Cihê yekî din girtin. **Hela tu **xwe têxe şûna bavê wê**, bawer im ku tu yê jî wekî wî bifikirî. *Keçikê ken kir, fen kir, di axiriyê de Zînê ji kar derxist û **xwe xiste şûna wê**.*

Xwe bi xwazî ve kirin

Bi zanetî xwe wekî xewirî kirin. **Wa ye Asiya Mexpûlê dîsa bi çavên nîvkêşkî* ***xwe bi xwazî ve dike*** *ku mêrê xwe bide tobedar kirin.*

Xwe zêde dîtin

bnr. Xwe gir kuştin

Xwe zêde kirin

bnr. Xwe tiştek hesab kirin

Xwe zeft kirin

Li hemberî tiştekî xwe asteng kirin. Bi vîna xwe karibûn. **"Gava ku Xezalê ew yek bihîst, ... ricif hatê; çavên wê tijî hêsir bûn, lê* ***xwe zeft kir.***" Sîma Semend

Xwedê ayîk jê standin

Înşelah* ***Xwedê wê ayîkê min ji wî bistîne.* (nifir)

Xwedê bi dest û piyên (yekî) re bûn

Xwedê alîkariya yekî çeleng û pêkhatî kirin. ****Xwedê bi dest û piyên tere be,*** *tu nebûyayî ev cilşoya me nedixebitî.* (dia)

Xwedê bi destê xwe çêkirin

Xweşik bedew û têkûz bûn. **"Bejn, por, dev, lêv û gewde tu dibê* ***Xwedê bi destê xwe çêkirine.***" Ebdulbaqî Huseynî

Xwedê bi hev û din re kal û pîr kirin

Ji bo daxwaza demeke dirêj bi hev du re jiyandina jin û mêran tê gotin. **Înşelah* ***Xwedê we bi hev du re kal û pîr bike.*** (dia)

Xwedê bi rehma xwe şad kirin

Xwedê xêr û rehma xwe lê kirin. **Di nîvê emrê wê de* ***Xwedê bi rehma xwe şad kir*** *û lawek dayê.*

Xwedê bi xêr gerandin

Xwedê bi awayekî erênî bi encam kirin. ****Xwedê bi xêr bigerîne,*** *lê rewş vê gavê qet xweş nayê xuyan.*

Xwedê bibêje kanê, ez bibêjim hanê.

Ez hema wê dibêjim ku* ***Xwedê bibêje kanê, ez bibêjim hanê.* (nifir)

Xwedê bike, mele dikare çi bike?!

Her tişt di destê Xwedê de ye. **Tê xuyan ku ev qas e nesîbê me,* ***Xwedê bike, mele dikare çi bike?!***

Xwedê bike, şeytan tirekê bike.

Înşeleh mehneyek wê derkeve. Heke xetayekê bike, ez dizanim ez ê çi bînime sêrî. ****Xwedê bike, şeytan tirekê bike,*** *îja ew li dereke din jî yek peyvê bibêje, hûn ê wê demê bibînin...*

Xwedê cihê çûyî nede şermê

Xwedê gunehên wî efû bike ku rastî ceza û astengiyan neyê. **Em çi bibêjin,* ***Xwedê cihê çûyî nede şermê****.* (dia)

Xwedê çakûçê xwe lê xistin

Gelekî bedew bûn. **Maşelalı qîza Silto wisan e ku tu dibêjî* ***Xwedê çakûçê xwe lê xistiye****.*

Xwedê çavê (yekî) têr kirin

Ji bo kesên çavçil tê bikaranîn. **Ew şikirbûna xwe nayîne,* ***Xwedê çavên wî têr bike****.*

Xwedê daye, Edê zaye.

Di nav rewşeke beleş, bixêr û bêr de bûn. **"-... Lawo perê te em didin, zikê te em têr dikin, nivîn û ciyê te ji me ye. Ê Welleh ji bo te* ***Xwedê daye Edê zaye****."* Felat Dilgeş

Xwedê daye, Mirdê zaye

bnr. Xwedê daye, Edê zaye

Xwedê dayê, nizane (nikare) bixwe.

Ji bo kesên ku ji derfetên heyî nikarin sûdewarbin tê gotin. **Ax! Bila li şûna wî ez bûma,* ***Xwedê dayê, ew nikare bixwe****.*

Xwedê dayîn (yekî)

Her çiqas carinan ji bo tiştên neyînî jî bê gotin, lê zêdetir ji bo şans û tiştên erênî tê gotin. **Tuyê çi bikî* ***Xwedê dayê****, ew jî baş dixwe.*

Xwedê derî li rûyê (yekî) vekirin

Xwedê jê re alîkarî kirin. **"Tu îro li ciyê min mirovekî bişîne, ka* ***Xwedê çawa çêdike, çi derî li rûyê min vedike****.* Fûad Temo

Xwedê deriyê fereca xwe vekirin

Xwedê jê re alîkarî kirin. **"Ji nişkê ve* ***Xwedê deriyê fereca xwe vekir****: Xelkê gundê Avsîra hatin cem, xwe avêtinê da ku meleyekî ji wan re bişîne."* Ridwanê Elî

Xwedê di ser (yekî) re hebûn

Ji ya rastî û ji dadê dûr neketin. A rastî çi be, ew gotin. *****Xwedê di ser me re ye****, ez ê çawa rabim wê heqîqetê ji bîr bikim?*

Xwedê diya merivan dide ser zeregûniyan, kerê Şamê jî berî ser dide.

Xwedê dikare xirabiya herî mezin jî bike. **Qurbana Xwedê me, çi bibêjî dikare bike. Ku bixwaze,* ***Xwedê diya merivan dide ser zeregûniyan, kerê Şamê jî berî ser dide****.*

Xwedê emanetê xwe jê stendin

Mirin. **"Di dawiyê de ne* ***Xwedê emanetê xwe jê stand*** *û ne jî mêrê wê bi çardarê lê vegeriya ..."* Selman Dilovan

Xwedê emrê (yekî) qut kirin

Belkî* ***Xwedê emrê wî qut bike**, wî baxê me rûçikand.* (nifir)

Xwedê gir bide te, neynûka jî ji te bistîne.
Tu têkevî rewşeke xerab. **Belkî **Xwedê gir bide te, neynûka jî ji te bistîne**.* (nifir)

Xwedê got: "Xwe bisitirîne ku ez (jî) sitarekê li ser te bikim."
Divê mirov karên xwe bi hêviya Xwedê ve nehêle, berê bi xwe bike û miqate be. **Mêze bike, **Xwedê bi xwe gotiye: "Xwe bisitirîne ku ez sitarekê li ser te bikim."***

Xwedê gotiye: "Dewara xwe bi lingekî girê bide, bi sê lingan jî bispêre min.
Berê tu bi xwe tedbîra xwe pêk bîne, dû re bi hêviya ve Xwedê bihêle. **Bi dia û xweziyan nabe. **Xwedê gotiye: "Dewara xwe bi lingekî girê bide, bi sê lingan jî bispêre min.***

Xwedê gotiye ez qûlên xwe nas dikim, qûlen min ker in, hev du nas nakin.
Divê mirov hev û din baş nas bike. **Tu jî wan baş nas nakî. **Xwedê gotiye ez qûlên xwe nas dikim, qûlen min ker in, hev nas nakin.***

Xwedê gotiye: "Ka te eyba xwe veşartiye ku tu eyba hevalê xwe dibêjî?"
Divê mirov zû bi zû eyba kesekî nebêje. **Ma tu nizanî ku dibêjin, **Xwedê gotiye: "Ka te eyba xwe veşartiye ku tu eyba hevalê xwe dibêjî?"***

Xwedê heq şahid bun
Ji bo rewşa vebirî û ji sedî sed rast tê bikaranîn. *****Xwedê heq şahid e** ku tu sûc û guneheki min di vî karî de nîn e.*

Xwedê hiş jê stendin
bnr. Xwedê jê birîn

Xwedê jê birîn
Xwe şaş kirin, çewtiyeke girîng kirin. Karê yekî rast neçûn. **Heke **Xwedê ji Hêlînê nebiriya**, bi destê xwe, xwe nedixiste vê rewşa xerab.*

Xwedê jê derxistin
Ji ber neheqî yan jî tawankariyê Xwedê ceza dayîn. **Belkî **Xwedê ji wî derxe**, ev derdên ku ez dikişînim, gişt di rûyê wî de ne.* (nifir)

Xwedê jê re deriyek vekirin
bnr. Xwedê derî li rûyê (yekî) vekirin

Xwedê jê re nehiştin
Daxwaza tola kirinên yekî kirin. **Înşelah **Xwedê ji wê re nahêle**.* (nifir)

Xwedê jê stendin
bnr. Xwedê jê derxistin

Xwedê ji ber dest kêm nekirin
Tu tunebûnê nebînî. **Înşelah **Xwedê ji ber destê te kêm neke**, tu nebûyayî, min ê devê xwe li ber kê xwar bikira.* (dia)

Xwedê ji derge û dîwana xwe avêtin

Ji bo kesên pir xerab tê bikaranîn. **Qet qala wî nekin, jixwe **Xwedê ew ji dergeh û dîwana xwe avêtiye**, lûn jî bi ser de neçin.*

Xwedê ji devê (yekî) girtin

Xwedê pejirandin **Gozê got: "Ev keçika min a piçûk pir teral e, Xwedê bextekî baş bidiyê." Mêrê wê jî ew temam kir û got: **"Xwedê ji devê te bigire."***

Xwedê ji du deriyan deriyekî veke .

Bila bi awayekî pirsgirêk çareser bibe. **Bi vî awayî nabe, ew jî dixwaze ku **Xwedê ji du deriyan deriyekî jê re veke**.*

Xwedê ji esmanan hatin

Wekî sond û sozê ji bo rewşa vebirî tê bikaranîn. **Kî dibêje bila bibêje, **Xwedê jî ji esmanan hê**, dîsa jî ez tu car wê yekê napejirînim.*

Xwedê ji rastiyê hez kiriye.

Ya rast çi be divê ez wê bibêjim. ****Xwedê ji rastiyê hez kiriye**, bûyer çawa bû, ez ê wer bibêjim.*

Xwedê ji sêwiyan re gotiye: "Heke bavê we bimire, hûn dikarin xwe xwedî bikin?" Gotine: "Ûff! (Pehe!)"

Yên ku rasteqînî bi xwe nejîne, bi wan hêsan tê. **Helbet nehatiye serê te, tu tênagihîjî rewş çawa ye. **Xwedê ji sêwiyan re gotiye: "Heke bavê we bimire, hûn dikarin xwe xwedî bikin?" Gotine: "Pehe!"***

Xwedê jî dizane, pêxember jî dizane.

Bêşik û bêguman. ****Xwedê jî dizan e, pêxember jî dizane** ku ew ji bo me li tiştekî baş nafikirin.*

Xwedê karê (yekî) li hev anîn

Kar baş meşîn. **Wî ked da, **Xwedê jî karê wî li hev anî** û rewşa wî baş bû.*

Xwedê kesî neke tepûşa (yekî)

Ji bo mirovên kêmfersend û xerab tê gotin. **Evdilselam mirovekî pir kêmfirsend e, **Xwedê kesî neke tepûşa wî**.*

Xwedê kevirek (kevirê xwe) li devê (yekî) xistin

İnşelah **Xwedê kevirê xwe li devê wî quldirî bixe.* (nifir)

Xwedê kêmasiya (yekî) nedan

**Xwedê kêmasiya xortên me nede, ew çawa ku li çav wan ketin, riya xwe guherandin.* (dia)

Xwedê kor kirin

Li cihê sekinî çewtiyeke mezin kirin. ****Xwedê ez kor kirim** û min ew firsenda mezin nenirxand.*

Xwedê kor kiriye, pê li agirê sor kiriye.
Ji ber çewtiyeke mezin, ketiye rewşek xirab. **Xwedê Kazo kor kiriye, pê li agirê sor kiriye.*

Xwedê ku bike, qûlê çi bike?!
bnr. Xwedê bike, mele dikare çi bike?!

Xwedê lê xistin
Di nav rewşeke xerab de bûn. **Ma tu nabînî jixwe **Xwedê lê xistiye**, tu çi jê dixwazî?*

Xwedê li ber beravê dayîn
Ji bo kesên teral û bixwerenedîtî tê gotin. **Tu dibêjî **Xwedê li ber beravê daye**, ew jî naçe çend qurişan qezenc nake.*

Xwedê li dil û halê (yekî) pirsîn
Xwedê jê re alîkar bûn. **Xwedê li dil û halê me pirsî, em zû pê hesiyan, naxwe mal wê bibûya qijik.*

Xwedê li gorî dilê (yekî) dan
Xwedê wekî daxwaza yekî dan. **Ew bi xwe saf bû, **Xwedê jî li gorî dilê wî da**.*

Xwedê li hev anîn
bnr. Xwedê mirazê (yekî) kirin

Xwedê li rûyê (yekî) kenîn
Kar baş meşîn, rewş erênî bûn. **Xwedê li rûyê me kenî ku ew wê gavê ne li mal bû.*

Xwedê li rûyê (yekî) mêze kirin
bnr. Xwedê li rûyê (yekî) kenîn

Xwedê mala (yekî) ava kirin
Xwedê alîkarî kirin. **"-Babo **Xwedê mala şofêr ava bike**, ez bil ez im, kê haj te heye, dengê te di nav vê gêleşokê da berze dibe."* Enwer Mehemed Tahir (dia)

Xwedê mirazê (yekî) kirin
Armanca yekî ya girîng bi cih hatin. **Guncan nedihate xuyan, lê **Xwedê mirazê wî kir**.*

Xwedê miyaser kirin
Xwedê pêk anîn. **Xwedê miyaser bike ez ê saleke dinê ji xwe re malekê bistînim.*

Xwedê nede dijminê min. (Xwedê neyîne serê neyarê min)
Ji bo rewşa pir xerab tê gotin. **Hate serê min, **Xwedê neyîne serê dijminê min**.* (dia)

Xwedê nede şermê.
Xwedê nexe rewşa rûreş û neheq. **Xwedê me li hemberî wan nede şermê.* (dia)

Xwedê neke nav dest û piyan.

Ji bo zêde perîşan û hewcedarnebûna kal û pîran tê gotin. **Lawo, înşelah* ***Xwedê me neke nav dest û piyan****. Em bi ser xwe bimirin.*

Xwedê neyîne serê bavkuştiyê min.
Ji bo rewşa pir xerab tê bikaranîn. **Ya ku min kişand* ***Xwedê neyîne serê bavkuştiyê min*** *jî.*

Xwedê nîşan nede.
Înşelah tiştekî wisa xerab nabe. ****Xwedê nîşan nede****, lê heke ew agir têketa nava gund wê çawa bibûya gelo?*

Xwedê pê re bûn
Xwedê alîkar bûn. **"- Lawo,* ***Xwedê bi te re be****! Heke tu hebekî min şad bikî. Min rojên giran, derd û kul pir dîtine. Ez zelîf hatime zêrandin."* Sîma Semend (dia)

Xwedê qehra xwe lê kirin
Xwedê ceza dayîn. ****Xwedê qehra xwe li wî bike****, di rûyê wî de ez jî bi şermiyê ketim.* (nifir)

Xwedê ruhê (yekî) stendin
Mirin. ****Xwedê ruhê wî bistîne****, heke wî wisa nekira, ev bela nedihat serê me.* (nifir)

Xwedê (yek) rûspî nekirin
Şanaz, serkeftî û mafdar nebûn. **Lawo lawo, belkî* ***Xwedê te rûspî neke****.*

Xwedê tevî karê (yekî) bûn
Tu dizanî çawa dixwazî wisa bike. **Êdî ez çi bikim, tu bi ya min nakî, here bila* ***Xwedê tevî karê te be****.*

Xwedê topa xwe lê xistin (Xwedê topek lê xistin)
"Ku bi nifirê min bûya, niha ji zû de* ***Xwedê topek lê xistibû**."* (nifir) Selman Dilovan

Xwedê, tu ew Xweda yî, lê gavê tu ne ew gav î.
Rewş û dem hatiye guherandin. ****Xwedê, tu ew Xweda yî; lê gavê, tu ne ew gav î.*** *Şevekê, du parê şevê çûye, parek maye; carek bi deng û hêwirza gundiyan bi xwe şiyar bûm."* Rojen Barnas

Xwedê wekîl bûn
Ji bo biryarên vebirî tê bikaranîn. ****Xwedê wekîl e****, heke ew bihata min tu car nedida.*

Xwedê (yek) xelas kirin
Xwedê ji xeteriyekê rizgar kirin. **Bi wê derbê ez çûbûm, lê* ***Xwedê ez xelas kirim****.*

Xwedê xezeba xwe lê kirin
bnr. Xwedê qehra xwe lê kirin (nifir)

Xwedê (yek) xwedî kirin
Xwedê alîkarî kirin. **Di wê dema xeter de* ***Xwedê ew xwedî kir****. Naxwe, niha pirtikên wî nemabûn.*

Xwedê yan bide min, yan bide te.
Divê yek me bi serkeve. An ez an tu. *... *kafir were zêde xeber nede! Yan* ***Xwedê wê bide min, yan wê bide te.*** Sînem Îşler

Xwedê yaziya (yekî) rast kirin
Xwedê qeder baş kirin. **Înşelalı* ***Xwedê yaziya te rast bike.***

Xwedê zêde kirin
Xwedê bi bereket kirin. ****Xwedê zêde bike,*** *me li wê malê wisa goşt xwar nayê gotin.*

Xwedê zêde ye, ew zêde ye.
Ji bo me ew yê herî birûmet e. **Divê tu bizanibî ku* ***Xwedê zêde ye, li ba me Canyar zêde ye.***

Xwediyê goşt jî dizane goşt heram e, xwediyê pereyan jî zane pere qelp in.
Her du alî jî di derka rewşa xwe ya neyînî de ne. **Tu qet dest mediyê,* ***xwediyê goşt jî dizane goşt heram e, xwediyê pereyan jî zane pere qelp in.***

Xwediyê gotina xwe bûn
Li soza xwe xwedî bûn. **Fayzeya Zînê heke* ***ne xwediya gotina xwe bûya,*** *îro wê halê me perîşan bûya.*

Xwediyê karê xwe, şîrînê li ber dilê hevalê xwe
bnr. Xebatkarê xweyo, şîrînê li ber dilê xelkêwo

Xwediyê keda destê xwe (bûn)
Tenê bi ked û zehmeta xwe debara kirin. **"Hesbilûr mirovekî feqîr û belengaz, bêxwedî û bêxwedan bû.* ***Xwediyê keda destê xwe,*** *xwêdana eniya xwe û vê bilûra xwe bû."* Dost Çiyayî

Xwediyê kil û kildanê bûn
Şimşat, têkûz û xwe û bedewiya xwe girîng girtin. **Ew keçikek, baş li xwe mêze dike,* ***xwediya kil û kildanê ye.***

Xwediyê leyo, here peyo.
Divê her kes li ya xwe bibe xwedî. **Tu çi sekiniyî?* ***Xwediyê leyo, here peyo.***

Xwediyê mirîşkan, zîrç li enîşkan, de tu were malê, bixwe zerhevrîşkan.
Erê, te dest neavête min û xirabî li min kir, lê dîsa jî were mêze bike, min çawa xwe xelas kir. **Xwedê tu kesî nexe tengaliyê,* ***xwediyê mirîşkan, zîrç li enîşkan, were malê bixwe zerhevrîşkan.*** (bnr. çîrok)

"Xwediyê mirîşkan, zîrç li enîşkan, de tu were malê, bixwe zerhevrîşkan."

Mirovek pir dewlmend hebûye. Çaxa ku dimire, ji her du kurên wî re gelek mal û milk dimîne. Piştî mirina bav, demek derbas dibe, her du bira ji hev du cihê dibin. Çiqas mal û milkê wan heye li hev du par dikin. Birayê piçûk di nava çend salan de hemû hebûna xwe dixwe, ji hev belav dike û tenê zeviyên wî yên çîmenan û çend heb mirîşk li ber derê wî dimînin. Birayê mezin jî ji berê diçe hê dewlemendtir dibe. Birayê mezin, qîzeke wî ya pir kaw, kubar, biaqil û xweşik hebûye. Birayê piçûk jî kurekî wî yê sextekar, diz, lotî, qumarbaz û tolaz hebûye. Bavê lawik diçe ji birayê xwe qîza wî ya xweşik ji bo lawê xwe yê xerab dixwaze. Lê bavê keçikê qîza xwe nadiyê. Zivistana wê salê zehf zor û zerp derbas dibe. Di dest-

Xwediyê skurê bûn

Yê esas berpirsyar bûn. **Hûn hemû dikarin ramana xwe bibêjin, lê biryarara dawî ya Rojdayê ye, ji ber ku **xwediya skurê ew bi xwe ye**.*

Xwediyê soza xwe bûn

Li ser soza xwe sekinîn. **Bi xwe bawer bûn têr nake, **xwediya soza xwe bûn** jî pêwîst e.*

Xwediyê virê, kezîkurê

Yên ku derewîn in û bi karên sexte re mijûl bibin, wê di dawiyê de bi şermiyê bikevin û ziyanê bibînin. ****Xwediyê virê, kezîkurê.** Min ji te re negot, dawiya derewan tune, mêze bike di dawiyê de sextekariya te derkete holê.*

Xwediyê xanî deng nake, kirêcî lev nake.

Xwediyê skurê ango yê berpirsyar na, lê yên ne têkildar in, nasekinin. ****Xwediyê xanî deng nake, kirêcî lev nake.** Heyran ji vî Şemoyê Keçel re çi ye, ew çima li vir ewteewt dike?*

Xwediyê xiyarê çilmisî, ne dixwe, ne dide kesî.

bnr. Ne dixwe, ne dide hevalan, genî dike diavêje newalan.

Xwedî dam û dezgeh bûn

Xewdî kar û barekî bûn. Sîstema xwe edilandin. **Ya xwedatî mêrik **xwedî dam û dezgeh in**, loma jî di nav wî bajarî de birûmet û hurmet in.*

Xwedî erz û namûsa xwe bûn

Durist, paqij û bişanaz bûn. **Ez bawer nakim ew tiştekî wisa bike, her kes dizane ku ew mirovekî **xwedî erz û namûsa xwe ye**.*

Xwedî gotin bûn

Erka yekî derbas bûn. Gotinê bandor kirin. **Mamoste Mistefa di nav wan de **xwedî gotin bû**. Ji wan gelekan zêdetir guh didane wî.*

---

pêka biharê de tam dema ku pez wê bê berdan û li zozanan bê çêrandin berf dibare. Ji ber ku zivistan gelekî dirêj dibe û berf di ser çêrê de dibare, debara (alifê) pez û dewarê birayê mezin jî wekî ya gelekan xelas dibe. Pez û dewarê birayê mezin di hundir de birçî dimîne. Lê ji ber ku pez û dewarê birayê piçûk tune bûye, ka û gîhayê wî gelek hebûye. Birayê mezin bêgav dimîne, diçe cem birayê xwe yê piçûk û dibêje:

"Bira, tu dizanî vê berfê em perîşan kirin. Heywanên min di hundir de birçî ne. Debara te jî gelek heye. Tu dikarî ji debara xwe hineki bidî min? Heqê wê jî çi be ez ê bidim te." Birayê wî kêmfirsendiyê dike û dibêje:

"Kekê min, heke tu qîza xwe bidî kurê min, ez ê jî ji debara xwe bidime heywanê te. Naxwe tu debara ku ez bidim te tune." Bavê qîzikê tê cem keça xwe, rewşê jê re dide xuyandin û jê re dibêje:

"Lawo, wa ye dewleta min gişk ji dest min diçe. Ez mecbûr mame ku te bidim kurapê te." Qîza wî dibêje:

"Bavo, hela sebir bike. Te çi zarezar e, Xwedê yek e, derge hezar e. Hela heta sibehê bisekine, ka Xwedê wê çawa bike." Bav dibêje:

"Bila wekî gotina te be lawo." Diçe serê xwe datîne û radizê. Qîzik derdikeve derve, lê dinêre wa ye dîsa berf dibare. Diçe stûna kon derdixe, dibe ber dêrî di nav berfê de diçikîne. Tê hundir, li ber çirayê rûdine û dest pê dike gora xwe çêdike. Ji aliyekî ve digirî, ji aliyekî ve jî ji Xwedayê xwe lavayî dike. Carcaran jî derdikeve ber dêrî berfê tesele dike. Wê şevê berf dibare, heya nîvî stûnê derdikeve. Dû re hê gurtir dibe û bi ser stûnê de dikeve û stûn di nav berfê de winda dibe. Lê qîzik dîsa jî gumana xwe ji Xwedê nabire. Di nîvê şevê de ji der ve xuşexuşek tê. Keçik derdikeve ku çi bibîne? Wa ye şîlî (baran) dibare! Belê şilî, dibare û berfê dihelîne. Berf dihele, demekê bi şûn de serê stûn tê xuyan. Keçik bi sebir û bi hêvî li ber pencereyê rûdine. Piştre dinêre berf heya nîvê stûnê daket. Berf dihele, nêzîkî şefeqê ji nişkan ve dibe şirpîniya stûnê û dikeve erdê. Qîzik şad dibe, ji bi eşq direve cem bavê xwe; wî ji xewê radike û dibêje:

"Bavo rabe, berf heliya û dewleta te xelas bû!" Bav direve derve, lê dinêre berf çûye, erdekî reş û rût maye. Êdî dikare ji bêgavî pezê xwe li derve jî biçêrîne. Hema wê demê direve ber mala birayê xwe, bang dike birayê xwe û dibêje:

"Xwediyê mirîşkan, zîrç li enîşkan, de tu were malê, bixwe zerhevrîşkan."

Xwedî kir bi destê xwe, kir emelê serê xwe.
Lê qencî kir, lê bû belaya serê wî. **Ew jî bersiva qenciya wî bû.* ***Xwedî kir bi destê xwe, kir emelê serê xwe.***

Xwedî kir bi nanê xwe, berda canê xwe.
bnr. Xwedî kir bi destê xwe, kir emelê serê xwe.

Xwedî mal û hal bûn
Di hêla aborî de dewlemend bûn. **Maşelah* ***mirovek xwedî mal û hal e.***

Xwehdana zekeratê di ser re avêtin
Di nav zorê de bûn. **Li hember mêrik* ***xwehdana zekeratê di ser min re avêt,*** *lê dîsa jî me îstifa xwe xera nekir.*

Xwehdanê di ser re avêtin
Di nav rewşeke zor de bûn. **Te halê wî bidîta, çawa* ***xwehdanê di ser re avêtibû.***

Xweliya êrgûn bi serê (yekî) bûn
Di nav rewşeke xerab de bûn. *****Xweliya êrgûn bi serê Xeloyê Celîl de bûye,*** *ew û zarokên xwe tev perîşan bûne.*

Xweliya êrgûn bi ser serê (yekî) de eleg kirin
Perîşan û reben kirin. **Malbata jina wî bi wan kirinên xwe* ***xweliya êrgûn bi ser serê wî de eleg kirin.***

Xweliya sar bi ser serê (yekî) de kirin
bnr. Xweliya êrgûn bi ser serê (yekî) de eleg kirin

Xweliyê biavêjî li erdê nakeve.
Gelekî qelebalix bûn. **Gel ji bo Newrozê wisa hatibû, ku te* ***xwelî biavêta li erdê nediket.***

Xwelî bi serê xwe de kirin
Çewtî û kêmasiyeke mezin kirin. **Wî hew dizanibû wê tiştekî pak bike, lê di dawiyê de tenê* ***xwelî bi ser xwe de kir.***

Xwelî ketin çavên (yekî)
Mirin. **Rehma Xwedê lê be, lê ew qas timahkar û xesîs bû, ku qet nedifikirî rojekê* ***xwelî dê têkeve çavên wî*** *jî.*

Xwelî lê kirin
bnr. Xweliya sar bi ser serê (yekî) de kirin

Xwelî li axê, çaxê pişkul bû malxwê.
Ji bo rewşa berevajî û xerab tê bikaranîn. **Tu tiştê ku ez bibêjim nîn e.* ***Xwelî li axê, çaxê pişkul bû malxwê.***

Xwelî li ser sivik bûn
Ew mirovek baş bû, înşelah wê* ***xwelî li ser wî sivik be.* (dia)

Xwelî li serê xwe kirin

Mirin, an jî ketin rewşeke pir xeter. **Dema ku wî qîza Surme Axê ji xwe re kire bûk, a wê rojê wî **xwelî li serê xwe kir**.*

Xwelî li serê (yekî) kirin

Xirabiyeke mezin bi yekî kirin. **Jixwe ji çavên wê kifş bûn ku wê **xweliyê li serê Zeydan bike**.*

Xwelîliser, ma bavê te mezbete xwendiye, yan kalê te mezbete xwendiye?!

Ma ew tiştên ku tu jê fêm nakî û kal û bavên te nediye, çi karê te pê ketiye? **Wekî ku gur gotiye, **xwelîliser, ma bavê te mazbete xwendiye, yan kalê te mezbete xwendiye**? Ew jî kertiya min bû, min çima wisa safesaf ji wî bawer kir?* (bnr. çîrok)

Xwerê devê (yekî) bûn

Layiqî yekî bûn. **Ya Xwedatî Hîvê **ne xwerê devê wî dewarî bû** lê, çi bikim malê dinê hakimî gelek tiştan e.*

Xwerê guleyekê bûn

bnr. Xwerê kulmekê bûn

Xwerê kulmekê (sîleyekê) bûn

Qels bûn. **Xwedê dizane tenê **xwerê kulmekê ye**, lê çi bikim ku di navberê de Xalê Salih heye.*

Xweser man

Azad man. Bi serê xwe man. **Mirov ku ew qas sal **xweser bimîne**, wê wisa bibe.*

Xwesteka rûreş e, hevala parîxweş e.

Bi xwe pêk nayîne lê ji yên pêk tîne dixwaze û dixwe. **Ya ku ew dike ne rast e. **Xwesteka rûreş e, hevala parîxweş e.***

Xwelîliser, ma bavê te mezbete xwendiye, yan kalê te mezbete xwendiye?!

Rojekê rovî hema ji nişkê ve seqeseq di cihekî teng û asê de rastî gur tê. Cihekî wisan e ku rovî nikare bireve. Rovî dizane ku gur birçî ye û dê wî bixwe. Ji hewla canê şirîn çavên xwe li dor xwe digerîne, tenê li erdê kaxezekê dibîne, hema di wê navberê de kaxezê dixe devê xwe û li hêviya gur disekine. Gur dibêje:

"Rovî tu dizanî ez birçî bûme û ez ê te bixwim!" Rovî dibêje:

"Ezbenî bi rastî ez jî li te digeriyam. Ez xebera xwe ji te re bibêjim, dîsa tu dizanî heke dixwazî dîsa min bixwe." Gur bi awayekî ecêb lê dinêre û dipirse:

"Tu çima li min digeriyayî? Tu yê çi ji min re bibêjî?" Rovî bi şanazî qirika xwe diwerimîne û dibêje:

"Min ji serokên heft dewletan mezbeteyek ji te re aniye. Serokên heft dewletan ew mor kirine. Tê de dibêje: 'Kengê ku gur ev mezbete ji we reanî, hûn dê bê xirecir pezekê bidinê.' Çavê te ronî gurê bi rêz, êdî hê zehmet û hê teşqele ji yana te wê bikeve nav aramî û rehetiyê." Gur dikeve nav dubendiyê, hinekî difikire; dibîne ku ev yek derfeteke pir mezin e. Ji rovî dipirse:

"Ka ez ê çawa bikim? Ew yek dê çawa bibe?" Bi vê pirsê re ruh tê ber rovî, dibîne ku wa ye gur dixape; bi aramî wî dibersivîne:

"Gurê birêz, tu yê vê mezbetê bibî bidî şivên, ew ê jî bixwîne û pezekî bide te û tê bçyî, bi rehetî bixwî." Gur ji xwe re dibêje, welehî tiştekî baş e, ku wisa be, jiyana min dê pir hêsan be. Gur mezbetê jê dixwaze, rovî kaxeza di devê xwe de didiyê. Gur kaxezê digire û ber bi keriyê ku diçêre ve diçe. Rovî jî li serê gir bi kêf û eşq li wî temaşe dike. Çawa ku gur bi aramî û ji xwe bawer hêdî hêdî nêzîkî keriyê pêz dibe, segên şivan tev bi ser gur de erîş dikin. Gur dixwaze xwe ji wan xelas bike ku mezbeta xwe nîşanî şivên bide. Lê segên gurêx didine ser, wî asteng dikin. Di nav lepên segan de hinekî xwe nêzîkî şivan dike, lê şivan bi çoyê xwe yê zexm çend heban li serê gur dide. Gur mêze dike ku ji destê kûçikan xelas bibe jî nikare ji destê şivên xelas bibe. Hewl dide xwe ku ji wir dûr bikeve. Paşê birîn, xwîn û xwedanê zor xwe digihîne cihekî ewle. Di nav birînan de, di nav xwîn û xwedanê de dike hilkehilk û ji xwe re dibêje:

"Xwelîliser, ma bavê te mezbete xwendiye, yan kalê te mezbete xwendiye?!"

Xweş xeber e, lê min jê ne bawer e.
Bi guhê xwe bawer nekirin. **Ez çi bibêjim,* ***xweş xeber e, lê min jê ne bawer e.***

Xweşiyên xwe pê kirin
Henekên xweş bi kesekî kirin. **Dibe ku wê çewt fam kiribe, lê Xwedê dizane ku me tenê* ***xweşiyên xwe pê kirin.***

Xweşkelam bûn
Xweş sohbet û mijûlî bûn. **Mirov dikare demeke pir dirêj jî li wî guhdarî bike, ji ber ku ew mirovekî* ***xweşkelam e.***

Xweziya xwe daqurtandin
bnr. Xweziya xwe kirin xwarê

Xweziya xwe kirin xwarê
Dev ji daxwaza xwe berdan, nerazî bûn, armanca xwe avêtin hundirê xwe. **Min mêze kir ku ne mimkun e, min* ***xwaziya xwe kire xwarê.***

Xweziya xwe pê anîn
Dilê xwe avêtin tiştekî. **Ew ji dûr ve dibîne,* ***xweziya xwe pê tîne,*** *lê nizane di hundir de bê çi heye.*

Xwezî bi navê te, ne bi dîtina te.
Navê te pir mezin e, lê di barê te de tiştekî wisa zêde nîn e. **Bibore lê* ***xwezî bi navê te, ne bi dîtina te.***

Xwezî bi navê we, ne di nav we.
Navê we ji dûr ve pir mezin û xweş e, lê jiyan û karvaniya we ne wisa ye. **Gelek tişt ji dûr ve xweş in.* ***Xwezî bi navê we ne di nav we.***

Xwezî bûka xelkên xerîb bûma û min pesnê mala bavê xwe bida(ya).
Li nik yên hay ji rewşê heyî, derewkirin zor e. **Dizanim niha ez ji wê re bûme asteng. Niha ew dibêje:* ***"Xwezî bûka xelkên xerîb bûma û min pesnê mala bavê xwe bida."***

Xwezî di gewriyê de zuha man
Armanc û mirazê xwe bi cih neanîn. **"Bi rastî ez behitî mam. Ji kêf û eşqan êdî zimanê min negeriya û* ***xweziya min di gewriya min de zuha ma."*** Diljan

Xwezî virek bikira, tirek jî pê re bikira.
Xwezî rewş hê jî xerabtir bikira. **"Rehmetiyê Apê Mûsa digot:* ***"Xwezî virek bikira, tirek jî pê re bikira."*** Samî Berbang

Xwezî xesû nebûna, bûk bi dilê xwe bûna, qirçeqirç benîştê xwe bicûna.
Di vê biwêjê de bandor û tadeya xesûyan tê ziman. **Jina min jî tim digot:* ***"Xwezî xesû nebûna, bûk bi dilê xwe bûna, qirçeqirç benîştê xwe bicûna."***

Xweziya xwe pê anîn
bnr. Bextewariya xwe pê anîn

Xwê bi ziman ve hatin

Ji bo kesên zêde napeyivin tê bikaranîn. **Teresî, tu dibêjî **xwê bi ziman ve hatiye**, peyvek jî ji dêv dernakeve.*

Xwê li kara xwê de, ker di nav naxirê de, tu li vir qareqar dikî: "Ha werine xwê!.. Ha werine xwê!.."

Ji bo kesên xeyalprest tê bikaranîn. **Malavawo, hê tiştek tune, te xwe rezîl kir. **Xwê li kara xwê de, ker di nav naxirê de, tu li vir qareqar dikî: "Ha werine xwê!.. Ha werine xwê!.."*** (bnr. çîrok)

Xwêdan bi ser (yekî) ketin

Pir westîn. **Wî karê baxçeyî wisa kir ku **xwêdan bi ser Eşref ket**.*

Xwêdan bi ser (yekî) xistin

Pir westandin, aciz kirin. **Çalkirina wê kulîlkê **xwêdan bi ser min xist**.*

Xwêdan li ser bûn zîpik

Pir bi heyecan û xiroş bûn. **"**Xwêdan li ser bû zîpik** / Herikî ta binê ling / Wê şevê bi wî halî / Jê re nebû debarî."* Firat Cewerî

Xwêdan pê xistin

Zerp û zor lê xistin. Xistin astengiyê. **Wexta ku ji bo keça wî em çûn ser kulavê Eyibo, wî **xwêdan bi me xist**.*

Xwêdan rêtin (rijandin)

Ked dan, zehmet kişandin. **Min ew qas **xwêdan rêt**, helbet vala naçe.*

Xwêdana sar bi ser (yekî) ketin

1. Ji ber xerabûna rewşa tenduristî aciz bûn. **2.** Ketin nav helecanê. **3.** Pir tirsîn. **Hema ji nişka ve **xwêdana sar bi ser min ket**, min hew xwe dît. *Heya wê encam ji min re anî, **xwêdana sar bi ser min ketibû**. *"Tirs bi dilê min ket. Min got, ez ê li vir bim, wisa bimirim. Mirineke pir zor... **xwêdana sar bi ser min ket**."* R. Karakaya

Xwêdanê di ser (yekî) re avêtin

1. Pir betilîn. **2.** Ji ber êş û janê aciz bûn. **Faris heya ku ew dîwar çêkir, **xwêdanê di ser re avêt**. *"Dilê min li hev ket, canê min ricifî. **Xwêdanê di ser min re avêt.**"* Cemil Denli

---

"Xwê li kara xwê de, ker di nav naxirê de, tu li vir qareqar dikî: 'Ha werine xwê!.. Ha werine xwê!..'"

Li bajarê Îdirê li gundekî navçeya Qulpê camêrek bêyî kar dimîne. Difikire ka ez çi karî bike? Di dawiyê de biryara xwe dide û dibêje:

"Ez ê kera xwe bildim herim Qulpê... Ez ê li wir ji kara xwê, xwê bikirim, li kera xwe bikim, gund bi gund bigerînim û bifroşim. Bi vî awayî ez ê kareke baş bi dest bixim." Ji jina xwe re jî qala wî karî dike. Hema tim li vê mijarê difikire û dubare dike. Di vê xeyalê de ew qas kûr dibe û di serê xwe de mezin dike ku diçe nîvê meydana gund û dike qîrînî û dibêje:

"Ha werine xwê! Ha werine xwê!.." Jina wî mêze dike ku mêrê wê di nîvê meydana gund de dike gazîn û hewar. Tê cem mêrê xwe û jê dipirse:

"Mêrik tu çi dikî?" Mêrik dibêje:

"Ez xwê difroşim." Jinik dibêje:

"Mêrik, xwê li kara xwê de, ker di nav naxirê de, tu li vir qareqar dikî: 'Ha werine xwê!.. Ha werine xwê!..'"

Xwîn di dilê (yekî) de kelîn
Kîn ajotin. **Ez dizanim, çar sal di ser wê bûyerê re derbas bû, lê hê jî **xwîn di dilê Evdilselam de dikele**.*

Xwîn bi çokan de çûn
Jîndar bûn. Ruh hatin ber. **Piştî bêhna cixareyekê bi şûn de **xwîn bi çokan de çû**.*

Xwîn bi ser (yekî) de hatin
Bi neheqî, kuştin an jî birîndar kirina kesekî ketin stûyê yekî. **Xwedê nîşanî kesî mede, îro **xwîn bi ser wê malbatê de hatiye**.*

Xwîngerm bûn
Di têkiliyan de ji dil û germ bûn. Pir bixiroş bûn. **Çavmorî bûkeke **xwîngerm e**.*

Xwîn jê berdan
bnr. Xwîn bi ser (yekî) xistin

Xwîn ji bin guhan berdan (Xwîn ji belika guh berdan)
1. Jîr kirin, sax kirin. **2.** Di hin hêlan de jî berevajiyî wê, ji bo sedema sistbûn û teraliyê tê bikaranîn. **Wa ye çavên xwe vekirin, heke te **xwîn ji bin guhan bernedaya**, zor baş bûbûya. **"De hinekî bilive, ma **xwîn ji bin guhê te berdane**?"* Dilawer Zeraq

Xwîn ji dilê (yekî) çûn
Li ber xwe ketin, gelekî xemgîn bûn. **Îro **xwîn ji dilê wê diçe**, lê ez nikarim tiştekî bikim.*

Xwîn ji rûyê (yekî) kişîn
Mat man, ji xiroşê yan jî ji tirsê şok bûn. **"Dema efsûnbaz kire niçîn, Berçem û hezkiriyê wê zîq li çavên hev du nêrîn, **xwîn ji rûyê wan kişiya**, reng avêtin ..."* * Fevzi Bilge

Xwîn ji xwe bernedan
Ji bo çareseriya pirsgirêkê tu hewldan nîşan nedan. **Wan hemûyan erîşî ser min kirin, lê maşelah kurapê min qet **xwîn ji xwe berneda**.*

Xwîn ketin çavan
Gelekî hêrs bûn. **Wisa **xwîn ketibû çavan** ku tu kesî newêribû jê xeber bidaya.*

Xwîn lê miçiqîn
bnr. Xwîna (yekî) cemidîn

Xwîn li eniya (yekî) ketin
Ketin belayeke mezin. **Carekê ku **xwîn li eniya mirov ket**, ji wê bi şûn de jiyan dijwar dibe.*

Xwîn bi ser (yekî) xistin
Lê xistin, li yekî dan. **Di dawiya dawî de çûn **xwîn bi ser wî xistin**, dû re rehet bûn.*

Xwîn pê de hatin
1. Di hêla tenduristî de ber bi başbûnê ve çûn. **2.** Di hêla aborî de rewş baş bûn. **3.** Ji ber

kuştin an jî birîndarkirinê bûn xwedî dijmin. *Berê beşera wî zelîf xerab bû, lê wa ye van rojan **xwîn pê de hatiye**. *Par zarokên wî ji birçînan dimirin, lê wa ye îro **xwîn pê de hatiye**. *Piştî ku **xwîn pê de hat**, ji ber neyaran mala xwe bar kirine Îzmirê.

Xwîn rijîn dilê (yekî)

Gelekî xemgîn bûn, li ber xwe ketin. *Li zarokan dinihêrim, ***xwîn dirêje nav dilê min**." Rizaliyê Reşît

Xwînê (yek) girtin (Xwînê pê girtin)

1. Li bela û qotikê gerîn. **2.** Ji heyecana kujeran re tê gotin. *Heyran, ***xwînê Hecî Fayîq girtiye**, heya ku li ser belaya xwe ve nebe nasekine. *Dema Emerê Qaçax Ewlo kuşt, ***xwînê pê girtibû**, nikaribû bireve, Gozê mîntanê wî qelişand, dû re ji wir revî.

Xwînşirîn bûn

Cir û wech xweş bûn. *Ew keçik wisa ***xwînşîrîn e** ku mirov jê têr nabe.

Xwîn tê de nemaın

1. Pir tirsîn. Zêde peroş bûn. **2.** Gelekî jar û lawaz bûn. *"Sekinî, ***xwîn tê de nemabû**. Di cih de rûniştî." Çiya Mazî *Piştî ku ji nexweşxwaneyê derket min ew dît, ketibû rewşeke wisa ku ***xwîn tê de nemabû**.

Xwîn tê gerîn

Di hêla tenduristî de bi pêş de çûn. Bi ser xwe de hatin. *Şikir wa ye van rojan hinekî ***xwîn tê geriyaye**, rewşa Rizgo baş dixuyê.

Xwîn tijî çavên (yekî) bûn

Pir bihêrs bûn. *Xwîn tijî ***çavên Qaso bûbû**, tiştek nedidît û nedibihîst.

Xwîn û mêjî li hev qelibîn

Mantiq û hest bi hev du re tekoşîn kirin. *Ez wisa tevlihev bûm û wisa ponijîm ku xwîn û ***mêjî bi hev qelibîn** û ez mam di ortê de.

Xwîn weke avê çûn

Gelek xwîn rijîn. Şerekî dijwar pêk hatin. *Di wî şerê her du gundan de ***xwîn wekî avê çû**.

Xwîn xwestin

Tol xwestin. Doza kuştinê kirin. *Ew jinik ***xwînê dixwaze**, lê divê hûn bi ya wê mekin.

Xwîn xweşkirî bûn

Ji bo kesên ku di nav êl û eşîran de sulh û aştiya doza kuştin û birîndarkirinê dikin tê gotin. *Rehmetiyê Apê Feqî Hisêyn mirovekî ***xwînxweşkirî bû**.

Xwîna (...) yek bûn

Xwediyê eynî lêzim û silaleyê bûn. *Mu tu kesekî xerîb heye? ***Xwîna me yek e.**

Xwîna bavê xwe xwestin

Buhayê malê xwe yê ku difroşe gelekî biha gotin. *Mala bavê Bawa bişewite, ji bo her dolabekê ***xwîna bavê xwe dixwaze**.

Xwîna (yekî) bi ser (yekî) de kelîn
Jê hez kirin. **Xwîna min wisa bi ser wê keçikê de dikeliya ku te digot qîza min e.*

Xwîna (yekî) cemidîn
Ecêb man. Şok bûn. **Gava min ew nûçe bihîst, **xwîna min cemidî**.*

Xwîna (yekî) fir kirin
Bi kuştin an jî xwînrijandinê dilê xwe rehet kirin. **Ez baş dizanim, heke Zubêt ku Fetah bigire, wê **xwîna wî fir bike**.*

Xwîna (yekî) helal bûn
bm: Qetla (yekî) helal bûn

Xwîna (yekî) herikîn
1. Zêde kuştin û birîndarî çêbûn. **2.** Pir çalak û biperoş bûn. **Mixabin di wî şerê birakujiyê de jî gelek **xwîna kurdan herikî**. *Ji bo wî normal e, ew ciwan e, **xwîna wî diherike**.*

Xwîna hev du rijandin
Li hev du xistin, birîndar kirin an jî kuştin. **Ne tenê îro, wan tim wer **xwîna hev rijandine**.*

Xwîna hev du vexwarin
Ji hev du re dijminatî kirin. Bi hev û din re debar nekirin. **Ma tu Simayîlê Kewo nas nakî? Ew û birayê xwe **xwîna hev du vedxwin**.*

Xwîna (yekî) hevraz avêtin
Pir hêrs bûn. **"**Xwîna Silo hevraz avêt**, ji hêrsan ber çavên wî reş bûn ..."* Tosinê Reşît

Xwîna (yekî) ... hilnedan
Wîjdanê nepejirandin. **"...qebûl nekiriye, **xwîna wî ev yek hilnedaye** û bi şandilxwazî wî ev hildaye ser milê xwe."* Musa Vazgali

Xwîna (yekî) ji xwîna (yekî) sortir bûn
Jê birûmettir û girîngtir bûn.. **Çima **xwîna te ji ya min sortir e** ku tu xwe didî wî alî û min didî ber vê belaya han?*

Xwîna (yekî) kişandin
1. Ji bo şibandina exrebeyan tê gotin. **2.** Li hemberî kesekî nêzîkayî, germî û hezkirin hîs kirin. (Ji bo exrebeyan tê bikaranîn.) **3.** Xwe bi bela û xetayan girtin. ****Xwîna wan hev û din kişand** û di demeke kurt de hûne hevalên baş, piştre em pê hesiyan ku exrebeyên hev in. ***Xwîna wê gelekî min dikişîne**, bawer im ku tiştek di vî karî de heye. ***Xwîn Faris dikişîne**, bi vê meşê dê li ser belaya xwe ve bibe.*

Xwîna (yekî) li erdê nehiştin
Tol hildan. **Helal be, wan **xwîna wî xortê xwe du rojan jî li erdê nehiştin**.*

Xwîna (...) li hev kelîn (Xwîn bi ser hev de kelîn)
Ji hev û din hez kirin. **Nizanim çawa bû, lê hema me çawa ku hev û din dît, **xwîna me li hev kelî**.*

Xwîna (yekî) mijîn (mêtin)
Li keda yekî xwedî derketin. Dest dayîn ser ked û heyîna kesan. **Îro jî bi awayekî din ew dewlet* ***xwîna dewletên piçûk û xizan dimêjin****.*

Xwîna (yekî) ne hêjayî deh qurişan bûn
bnr. Cîgerê (yekî) pênc pere nekirin

Xwîna (yekî) qebûl nekirin
bnr. Xwîna (yekî) hilnedan

Xwîna (yekî) rijandin
Zilm û tadeyî kirin, kuştin. **Min gotê: "Kuro ev çi tu dibêjî? Yan ez ê* ***xwîna te birêjim,*** *an tu dê ya min. Ma tu li gel kê diaxivî? Bizane ku ez Tekş im, Tekş"* Elaedîn Secadî

Xwîna (yekî) stendin
1. Di berdêla kuştina kesekî de pez an jî pere stendin. **2.** Ji dêwla mirovekî xwe yê kuştî ji dijminên xwe mirovek kuştin. **Balıadîn ji ber birayê xwe ve* ***sed kavir xwîn stend****. *Di navbera du rojan de wan jî mêrek kuşt û* ***xwîna bavê xwe stendin****.*

Xwîna sor bûn
Dir û yeman bûn. **Almasta çi ye,* ***xwîna sor e****, kes pê nikare.*

Xwîna (...) tev herikîn
Ji bo exrebeyên nêzîk tê bikaranîn. **Kuro ma em xerîb in?* ***Xwîna me tev diherike****.*

Xwîna (yekî) vexwarin
bnr. Xwîna (yekî) rijandin

Xwîna (yekî) zuha bûn
Ecêb man. **Dema ku min ew bûyer bilîst,* ***xwîna min zuha bû****.*

Xwîna xwe dayîn ser ...
1. Ji bo kesekî yan jî dozekê mirin dayîn pêş çavên xwe. **2.** Bi buhayekî zehf zêde firotin. **Wê jinikê* ***xwîna xwe daye ser zarokên xwe****. *Pêşeng* ***xwîna xwe daye ser erebeya xwe****.*

Xwîna xwe di ber (yekî) de dan
Di ber de xwe feda kirin, canê xwe dan. **"Ez* ***xwîna xwe di ber te de didim****, ew xwîn a te ye, wê dilop dilop ji canê min bikêşe!"* Kamîran Bedirxan

Xwîna xwe kirin kevçî û raberî (yekî) kirin
Bûna belaya serê yekî. **Vî kurê kerê* ***xwîna xwe xistiye kevçî û raberî min dike****, êdî sebra min nemaye.*

Xwîna xwe paqij kirin
Heyfa xwe hildan. **Gelek dem derbas bû, lê wî di dawiyê de* ***xwîna xwe paqij kir****.*

Xwîna xwe pê re xwarin

Gelek ked û zehmet dan. **Welelû serê bavê wî bikim, min* ***pê de xwîna xwe xwariye****, ez wî karî nadim tu kesî.*

Xwîna xwe tê de rijandin
Gelek zehmet kişandin. **Rebenê Xalid* ***xwîna xwe di wê malê de rijand****.*

Xwîna xwe xistin tev ...
bnr: Xwîna xwe pê re xwarin

Xwînê cendek birin
Şerekî giran bûn. **Di şerê Selahedîn Eyûb û xaçperestan de* ***xwînê cendek birine****.*

Xwînê di ber neynûkan re avêtin
bnr: Xwîna xwe pê re xwarin

Xwînê gewde birin
bnr: Xwînê cendek birin

Xwînê (yek) girtin (Xwînê pê girtin)
1. Li bela û qotikê gerîn. **2.** Ji heyecana kujeran re tê gotin. **Heyran,* ***xwînê Hecî Fayîq girtiye****, heya ku li ser belaya xwe ve nebe, nasekine. *Dema Emerê qaçax Ewlo kuşt,* ***xwînê pê girtibû****, nikaribû bireve.*

Xwîniyên hev bûn
Dijminên hev bûn. **Çi ji dest wan bê, dê bikin, çimkî ew* ***xwîniyên hev in****.*

Xwînî bûn
Xwedî dijmin bûn. **Em mejbûr in bi çek bigerin, hûn jî dizanin ku em mirovên* ***xwînî ne****.*

Xwînsar bûn
Di têkiliyan de di nav rewşeke sar de bûn. **Bi xwe mirovekî baş e, lê ji ber ku hinekî* ***xwînsar e****, gelek kes jê vedikişin.*

Xwîşk û birayên axretê bûn
Dostên jidil bûn. **Bi rastî jî te digot* ***xwîşk û birayên axretê ne****, lê dû re me dît ku di bin wê de tiştekî din derket.*

Y

Ya dada adar, bide min rojeke sar, da gîskê pê bikime dar (xwar).
bnr: Sibatê bang kir adarê got: "Sê rojan bide min bi deyn, ez ê gîsikan ji tehtan bînim xwarê."

Ya rebî, tu bibêjî kanê, ez bibêjim hanê. (Xwedêyo, ez bibêjim hanê, tu bêjî kanê.)
Daxwaza mirina kesekî kirin. **Ez bi vê keçikê re nikarim serederî bikim.* ***Ya rebî tu bibêjî kanê, ez bibêjim hanê.*** (nifir)

Yarê diya min yek bana, min ê bi dendikên behîvan xwedî bikira.
Derd ne yek e, pir zêde ne û kûr in. ****Yarê diya min yek bana, min ê bi dendikên behîvan xwedî bikira.*** *Derdê min ne yek e, ne dudu ne.*

Yarê gula geş e, jina roja xweş e.
Yên ku ji hev û din re baş bin, jiyana hev û din xweş û geş dikin. **Ji rengizê wê û kenê wê xuya ye ku* ***yarê gula geş e, jina roja xweş e.***

Yarê ji yarê şerm kir, warreş ma.
bnr: Yarê ji yarê şerm kir, zarê kurîn di pêşa xwe de nedît.

Yarê ji yarê şerm kir, zarê kurîn di pêşa xwe de nedît.
Bi duristî û wekî edetan kir, lê di dawiyê de bi xwe xisirî. **Ew ji duristiya te bû qurban.* ***Yarê ji yarê şerm kir, zarê kurîn di pêşa xwe de nedît.***

Yarê neyarê, koç û barê
Kesên ku xwedî dijmin in, rehetiya wan tune ye. ****Yarê neyarê, koç û barê.*** *Jixwe xwedî dijminî, gelek bedelan dixwaze.*

Yek ajotin pêş
1. Ji bo serkêşiyê yek dan pêş. 2. Yek ji bo berjewendiyên xwe bikaranîn. **Ji bo ku doza me çareser bibe me* ***Hevind ajot pêş.*** **Heyran, ma ez fedaiyê we me, hûn* ***min diajon pêş?***

Yek berî canê (yekî) dan

Ji bo xerabî yan jî berjewendiyê yek berî kesekî din dan. **Cindî bi xwe nikaribû,* ***jina birayê xwe berî canê Yargulê da.***

Yek bi malê xwe yek bi canê xwe

Her kes li gorî ast û zerengiya xwe dikare alîkariyê bike. **Divê di doza neteweyî de her kes wekî hêz û zerengiya xwe tevbigere.* ***Hinek bi malê xwe hinek bi canê xwe.***

Yek birin (dibirin) buhiştê, digot: "Ma ji mirinê wê de çi heye?"

Ji bo helwesta eletewş û berevajî tê gotin. **Ew jî dayîna Xwedê ye, hinek ji qenciyê jî fêm nakin. Got,* ***yek dibirin buhiştê, digot: "Ma ji mirinê wê de çi heye?"***

Yek çarlepkî kirin

Yek xistin rewşek dijwar, têk birin. **Mûsa bi wan kirinên xwe* ***Rizgo çarlepkî kir.***

Yek çêrandin

Ji bo kesên pir zana û kone tê gotin. **Kuro tu çawa wan her duyan dikî tayê tereziyê? Merdan dikare* ***wî biçêrîne.*** (argo)

Yek dan leqandin

Li rewş û barê yekî nihêrîn, tesele kirin. **Min çawa ku* ***ew leqand,*** *min fêm kir ku dilê wê maye.*

Yek dayîn ber bêhna xwe

Li hemberî kesekî kîndar bûn. **Ji par ve Remo* ***Tajdîn daye ber bêlına xwe,*** *ka em ê bihînin wê dawî çawa bibe.*

Yek dayîn ber sîngê xwe

Yek parastin. **Lawik* ***keçik wer dabû ber sîngê xwe*** *ku ew ên din vekişîn.*

Yek dayîn ser serê xwe

Jê re gelekî giramî û û rûmet nîşan dan. **Welehî wan* ***zavayê xwe didane ser serê xwe.***

Yek derxistin ser serê xwe

Yek zêde delalî kirin (Zêdetir ji bo zarokan tê bikaranîn.) **Tu ku wisa* ***wî derxî ser serê xwe,*** *helbet dawî jî wê wilıa be.*

Yek dimire, yek dimîne.

Jiyan bi nakokî dimeşe. **Ew jî xwezaya dinyayê ye;* ***yek dimire, yek dijî.***

Yek dîn û yek biaqil

bnr: Yek dîn, yek jîr

Yek dîn, yek jîr

Çiqas berevajî hev bin jî divê her du serî hev û din îdare bikin. Yên baş û xerab hev û din temam dikin. *****Yek dîn, yek jîr*** *wê bi wî awayî bi hev du re debarê bikin, ma ji bilî wê rêyeke din heye?*

Yek dotin

Pere yan jî mal û milkê yekî bi zexelî xwarin. **Ew sextekar heya **Mazlûm baş nedoşe** dev jê bernade.* (argo)

Yek e, lê bidendik e.

Cirnexweş, berzeq, zexel û ecêb bûn. **Tu wisa li **melomesto** sekinandina wî menêre, **ew yek e, lê yekî bidendik e**.*

Yek ez dizanim, yek jî Xwedê dizane.

Ji bo karên zor pêkhatine tê gotin. **Erê, min lawê xwe ji kela Çanaqeleyê ji destê wan derxist, lê min çi kişand **yek ez dizanim, yek jî Xwedê dizane**.*

Yek girtin

Di eynî radeyê de rûmet dan. Wekî hev hesibandin. **Mixabin bavê me em her du jî tu car **yek negirtin**, tim birayê min î mezin ji min zêdetir hate hezkirin.*

Yek heft salan bê kiras ma, jê re kiras kirîn, got: "Zû bidirûn" Û revî ket tendûrê.

Hin kes ji nişkê ve ji ber hin sedeman raḃoriya xwe zehf zû ji bîr dikin. ****Yek heft salan bê kiras ma, jê re kiras kirîn, got: "Zû bidirûn" Û revî ket tendûrê.** Ya te jî bûye, ya wî.*

Yek hewaleyî şîrê wî kirin

Yek spartin bext û kesayeta wî. Bi hêviya wîjdana wî hiştin. **Êdî ez çi bibêjim, min **ew hewaleyî şîrê wî kiriye**.*

Yek ker hesibandin

Yek bêfêm û nezan hesibandin. **Heke **wê ez ker nehesibandama**, cesaret nedikir ku wê peyvê ji min re bibêje.*

Yek kirin binçenga xwe

bnr. Yek xistin bin çoka xwe

Yek kirin bin basikê xwe

Lê xwedî derketin, parastin. **Hingî Kemal **ew xistiye bin baskên xwe**, kes nikare nêzîkî wî bibe û jê re tiştekî xerab bibêje.*

Yek kirin çilkew

Bi lez dan ser yekî. **Reşît, **Baran kire çilkew**, heya mala xalê wî da pey û ew di nav xwê-danê de hişt.*

Yek kirin segê xwe

Yek kirin bin bandora xwe. **Jinikê zavayê xwe **kiriye segê xwe**.*

Yek kişandina canê xwe

Ji bo berjewendiyan ji yekî re têkiliyek gelekî germ û zêde nîşan dan. **Ji bo ku keça xwe bidiyê, Meqbûleyê **lawê Xelef wisa kişandiye canê xwe** ku her kes lê ecêb maye.*

Yek li ber xwe dîl girtin

Ji kesekî re bêyî dilê wî demeke pir dirêj axivîn. **Ka Nazdarê bi saetan wisa* ***ez dîl girtibûm*** *ku min nikaribû xwe ji dêst xelas bikira.*

Yek li hil e, yek li mil e, yek di zik de dilewile.

Ji bo jinên ku gelek zarokên wan hene tê gotin. **Maşeleh bûka Memê çar sal in hatiye, lê* ***yek li hil e, yek li mil e, yek jî di zik de dilewile****.*

Yek li mirinê, yek li kirinê

bnr. Yek li mirinê, yek li **têvekirinê**

Yek li mirinê, yek li têvekirinê

Hinek dikevin heyra derd û kulên xwe, hinek jî dikevin heyra kêf û zewqa xwe. **Ezbenî, tu li min û li halê min î perîşan binihêre û tu li kêfa vî segbavî binihêre. Bi rastî jî* ***yek li mirinê, yek li têvekirinê*** *ye.*

Yek li nal yek li mixê xistin

Rewş û helwesta xwe zelal nekirin. **Aqilê min ji wî û ji helwesta wî nebirî,* ***yekê li nal, yekê li mix dixe****.*

Yek li vir xistin, yek li wir xistin

bnr. Du gotinên (yekî) hev û din negirtin

Yek li xwe kirin didu

Çewtî û qebehetên xwe zêdetir kirin. **Wê jî xwest xetaya xwe rast bike, lê bi ser de* ***yek li xwe kire didu****.*

Yek li ya sor xistin

Karekî spehî û xweş kirin. **Min jî ew qasî hêvî nedikir, lê helal be, Fazîleyê* ***yek li ya sor xist****.*

Yek mê kirin

Yek di bin zor û zerpê de hiştin. **Vê keçika me bi van kirinê xwe ve* ***em mê kirin****.*

Yek nal kirin

Îşkence li yekî kirin. **Xortên mala Mecîd* ***Elo nal kirine****.*

Yek navê wî tune bû, çû ser kaniyê pîs kir.

Ji bo navdariyê île tiştên erênî na, lê yên neyînî jî dibin sedem. **Wî camêrî jî ji xwe re rêyeke wisa dîtiye. Got,* ***yekî navê wî tune bû, çû ser kaniyê pîs kir****.*

Yek nexistin didu

Gotin û daxwaz di heman demê de pêkanîn, pêdiviya gotina carek din nehiştin. **Tu çi jê re bibêjî wê gavê pêk tîne,* ***yekê naxe didu****.*

Yek pîj kirin

Yek hadandin, kişkiş kirin. **Berê dengê xwe nedikir, hingî meta wî hat,* ***ew wisa pîj kir*** *û xiste bizot li serê me aland.*

Yek posteve kirin
bnr. Postê (yekî) nerm kirin

Yek reş kirin
Xerab kirin, yek wekî xerab dan xuyandin. **Ew çiqasî **Şêndilê reş bike** jî nikare navê wê xera bike.*

Yek rêx kirin
Yek rezîl û riswa kirin. **Ji ber ku jinek dîsa anî ser jina xwe, Rihanê **lawê wê xwe rêx kir**.*

Yek rûçikandin
Mal û milkê yekî jê girtin. **Wê jinikê wisa kir ku **Rizgo rûçikand**.*

Yek pûrteve kirin
bnr. Pûrt li esmanan xistin

Yek teqilandin
bnr. Barê (yekî) teqilandin

Yek tijî bûn
Zêde xwedî derd û gazinc bûn. ****Ez gelekî tijî bûme**, min nedin xeberdanê, ez ê dilê we bihêlim.*

Yek tijî kirin
Ji bo armancekê yek areste û îkna kirin an jî xapandin. **Xalojna min a Zelîxanê, **Baroyê biraziyê xwe tijî kir** û bi ser keça min de şand.*

Yek tûj kirin
Ji bo bikaranînekê yek hadandin. **Diya wî **ew tûj kir** û bi ser bûka xwe de şand.*

Yek virek derxistin
Gotina kesekî vala derxistin, an jî wekî derew nîşan dan. **Wê keçikê bi zanetî di nav wê civatê de **ez virek derxistim**.*

Yek xistin bin çoka xwe
Yek kirin bin bandora xwe. **Tu li wan menêre, ev wekî wan mamosteyên din nîn e, tu nikarî **wî jî têxê bin çoka xwe**.*

Yek xistin kefa destê xwe
Yek di bin bandora xwe de girtin. **Na lo! Nûrê **ew xistiye kefa destê xwe**. Ew nikare bi serê xwe tu tiştî bike.*

Yek xurandin xwe
Yek bi têkiliyên germ yek hînî xwe kirin. **Zezê **wî lawikî dixurîne xwe**, bawer im ku dixwaze keça birayê xwe bidiyê.*

Yeka (yekî) nebûn didu (dido)

1. Zêdetir di hêla aborî de bi pêş ve neçûn. **Feqîrê Fazil ev çend sal in ku dixebite, lê mixabin* ***yeka wî nabe didu.***

Yeka xwe nekirin dudu

1. Tu car ji gotina xwe venegerîn. Bi biryar gotina xwe bi cih anîn. **2.** Di hêla aborî de û di hêlên din de bi pêş ve neçûn, bi ser neketin. **Ew tûka xwe danalêse û ji ya xwe veger nabe, tu car* ***yeka xwe nake dudu.*** **"Bi kinayî,* ***yeka me nebû dudu*** *û sûretê nav û nasnava me hat çirandin..."* Rênas Jiyan

Yekane bûn

bnr. Bi tilîkan rê hev dan

Bi yekalî lê nihêrîn

Tenê wekî armanc, berjewendî û dîtina aliyekî nirxandin. **Niha difikirim ku me berê çiqasî* ***bi yekalî li bûyer û kesan dinihêrî,*** *nû dibînim.*

Bi yekdevkî gotin

Gişkî eynî tişt gotin. **Dema ku wî qala efûyê kir, wan hemûya* ***bi yekdevkî gotin****: "Her bijî!"*

Yekî aqil, yekî dîn, xwe dan mûyekî, neqetandin.

Hin pirsgirêk pir piçûk tên xuyan lê çareserkirina wan gelekî zor e. **De were ji nav vî karî derkeve. Got,* ***yekî aqil, yekî dîn, xwe dan mûyekî, neqetandin.***

Yekî da yekî rezek, wî nedayê hebûbek.

Carinan qencî û keda mirov bersiva xwe ya layiq nabînin. **Min ji bo wî çi kir, wî li hemberî min çi kir? Got,* ***yekî da yekî rezek, wî nedayê hebûbek.***

Yekî darek da yekî bi gulîşkekê pê nesekinî.

Qencî carinan bersîva xwe ya erênî û layîq nabînin. **Erê, dayê piştî ew qas kirinên min bersiva te jî bû ev ha. Loma gotine,* ***yekî darek da yekî bi gulîşkekê pê nesekinî.***

Yekî digire, dehan dihejîne.

bnr. Darek girtin, hezar dar hejandin

Yekî digote yekî: "Were mala me." Yê din digot: "Ma ez şûr û mertalê xwe li ku daynim

Ji bo li hincetgerînê tê gotin. **Kuro tu li min û li vî binêre. Got,* ***yekî digote yekî: "Were mala me." Yê din digot: "Ma ez şûr û mertalê xwe li ku daynim?***

Yekî gotc yekî: "Were ez te bibim buhiştê," Yê din got: "Îro ne roja min e."

Hin caran şans û derfetên mezin dertên, lê mirov ji ber sedemên pir piçûk wî şansî winda dikin. **Ji mirovên bêaqil re ez çi bibêjim?* ***Yekî gote yekî: "Were ez te bibim buhiştê," Yê din got: "Îro ne roja min e."***

Yekî jê distinî bi dehan jê xelas nabî.

Ji bo kesên şerûd tê bikaranîn. **Eman ji destê vê jinikê, tu* ***yekî jê distinî bi dehan jê xelas nabî.***

Yekî ji yekî re got: "Ezê guhê te bigirim li dora dinê bigerînim." Yê din lê vegerand: "Ne destê te jî wê bi guhê min ve be?"

Tu yê jî wekî min zehmet bikişînî. *****Yekî ji yekî re got: "Ez ê guhê te bigirim li dora dinê bigerînim." Yê din lê vegerand: "Ne destê te jî wê bi guhê min ve be."*** *Gotina min û Eledîn jî hema nêzîkê wê bû.*

Yekî jina xwe berdida digot: "Were ji min re bibe yar."

Ji bo rewşa berevajî tê gotin. **Aqilê wî jî ew qasî dixebite. Got,* ***yekî jina xwe berdida digot: "Were ji min re bibe yar."***

Yekî li mirêkê nihêrî û got: "Ev pêşiya min e, lê ka paşiya min?"

Lê gelo hêla din çawan e? Divê mirov nakokiyên din jî hesab bike. *****Yekî li mirêkê nihêrî û got: "Ev pêşiya min e, lê ka paşiya min?"*** *Rasteqînî ne aliyek tenê ye.*

Yekî lingê xwe hilanîn, yê din lingê xwe li dewsê danîn.

Ji bo kesên ku bi her awayî zêde dişibin hev û din tê gotin. **Kemalê Seyrê zehf dişibîne kekê xwe, tu dibêjî hema* ***yekî lingê xwe hilaniye, yê din jî li dewsê daniye.***

Yekî nalek dît got: "Man sê nal û hespek."

Ji bo kesên ku bi tiştên pir piçûk hêvîdar dibin tê gotin. *****Yekî nalek dît got: "Man sê nal û hespek."*** *Mala wî neketo, meseleya wî jî hema eynî wekî wê biwêjê ye.*

Yekî nav tune bû, çû rît ser ferşê kaniyê.

bnr. Yek navê wî tune bû, çû ser kaniyê pîs kir.

Yekî qerazî, yekî berazî, ji hev û din re bûne xal û xwarzî.

Ji bo kesên zêde nenas in jî, lê ji bo hinek berjewendiyan bi hev û din re tifaqê dikin tê gotin. **Maşelah wan ji ku hev û din dîtin nizanim.* ***Yekî qerazî, yekî berazî, ji hev û din re bûne xal û xwarzî.***

Yekî rez nebû, radibû masle çêdikir.

Ji bo kesên bêdenge û bêhesab tê gotin. *****Yekî rez nebû, radibû masle çêdikir.*** *Ev lawê min jî saza wî nîn e, qilif didirû.*

Yekî rezek da yekî, yê din guşiyek tirî nedayê.

Ji bo kesên neşikirandî tê gotin. **Ew jî karê Xwedê ye.* ***Yekî rezek da yekî, yê din guşiyek tirî nedayê.***

Yekî şalê xwe da yekî, jê re got: "Pê neçe ser gû."

bnr. Hespa min siwar bibe, lê qûna xwe tê de danegire.

Yekî tazî di kuwarê de rûniştû gote jina xwe. "Zirav birêse."

Wekî rewşa xwe tev negerîn. **Ew jî berevajiya wê ye.* ***Yekî tazî di kuwarê de rûniştû gote jina xwe. "Zirav birêse."***

Yeko yeko gotin

bnr. Bi ta û derzî vekirin

Yekole, serî hindole

Belê yek e, lê mezin û bihêz e. **Yekole, serî hindole.* *Ya rastî yê te jî yek e lê hêjayî dehan e maşelah.* (bnr. çîrok)

Yekta (bûn)

1. Mêrxwas, jêhatî û leheng bûn. **2.** Jar, zirav û bêhêz bûn. **"...çima ez qala wan merivên mêrxwas û **yekta** dikim? Ji ber ku siûda min û wan bûye yek. Em bûne şirîkê qederekê."* Mehmed Uzun **Ew bûka navîn **yekta ye**, bawer nakim ji bin karê wê malê rabe.*

Yekta nabe, duta tê re nabe.

Di nava bêçaretiyê de bûn. **Ez jî nizanim çawa bikim, **yekta nabe, duta tê re nabe**.*

Yê baştir Belıdîn e, ew jî hîz e, diz e û derewîn e.

Yê wan ê herî baş jî xerab e. **Kuro lawo, hûnê çawa bi wan bawer bin? **Yê baştir Belıdîn e, ew jî hîz e, diz e û derewîn e.*** (bnr. çîrok)

Yê bêar avêtine cehenemê, gotiye: "Darên min şil in."

Ji mirovên bêar re tu tişt ne xem e. **Yê bêar avêtine cehenemê, gotiye darên min şil in. Ezbenî, tu çi bikî ew venakişe.*

Yê biar ji xwe fedî kir, ê bêar got, ji min ditirse.

Mirovên bêfêm û nezan, yê hemberî xwe jî çewt fêm dikin. **Min dengê xwe nekir, wî kûçikî hew dizanibû ez jê ditirsim. Lewma gotine: **"Yê biar ji xwe fedî, ê bêar got, ji min ditirse."***

Yê bidew çû bal ê bêdew, alîkarî xwest.

Ji bo kesên nikarin hêz û derfetên xwe bi kar bînin tê gotin. **Ew jî karekî ecêb e, **yê bidew çû bal ê bêdew alîkarî xwest**.*

Yê bixwe savarê, dê biçe hewarê.

bnr. Kî dixwe savarê, ew ê here hewarê.

"Yekole, serî hindole"

Ji du hêwiyan yekê helî, a din jî tenê yek kurê wê hebûye. Dema ji ya ku helî kurê hene dipirsin û bibêjin, çend kurê te hene? Bersiva wê wiha dibe:
"Lawên min heftone ne." (Ango heft lawên min hene) Dema ku bibêjin lê çend zaroyên hêwiya te hene? Jinik vê pirsê jî tim bi hêrs û hesûdî wer dibersivîne:
"Yê hêwiya min yekole ye, serî hindole ye."

"Yê baştir Belıdîn e, ew jî hîz e, diz e û derewîn e."

Riya gundiyekî bi gundekî dikeve. Li gund yek li gund û eşîra wî eşîrê dipirse. Yê gundî navê gundê xwe û eşîra xwe dibêje. Yê ku jê dipirse, dibêje:
"Ji wî gundî filankes nasê min û dostê min e. Ew qet çawa dike, sax e, silamet e? Ev demeke dirêj e ku min qet jê cawabek hilnedaye." Yê rêwî dibêje:
"Wekeh ew çû ber rehma Xwedê." Yê gundî dîsa dipirse:
"Zaroyên wî hene?"
"Belê, sê lawê wî hene." Dîsa yê gundî jê dipirse:
"Lawê wî çawan in? Baş in an jî başê wan kîjan e?" Yê rêwî dilîkire demekê, lê tu rê tê re nabîne ku ji wan re bibêje baş e, ji ber ku her sê lawên dostê yê ku dipirse jî hev û din xerabtir bûne. Mêrik di dawiyê de dipeqe û a rastî dibêje:
"Yê baştir Belıdîn e, ew jî hîz e, diz e û derewîn e."

Yê bûkê pê û pal, ê şivan co û gopal
bnr: Bûkê pê pêpar, şivano dar gopal

Yê der hat, ê hundir qewitand.
bnr: Hat ji newalê, bû xwediyê malê.

Yê derewîn vala hilda, yê rast tijî hilda.
Mirovên rastgo di dawiya dawî de bi ser dikevin. ***Yê derewîn vala hilda, yê rast tijî hilda.** Tu çi dikî bike ji rastiyê neqete keça min.*

Yê dewletî kerem bike malê, yê kesiv (feqîr) bimîne derê malê.
Yê dewlemend, zêdetir rûmetê dibînin. **Ma tu nizanî çi dibêjin?* ***Yê dewletî kerem bike malê, yê kesiv bimîne derê malê.***

Yê direve jî gazî Xwedê dike, yê dide pey jî gazî Xwedê dike.
bnr: Tajî jî dibêje: "Ya Elah!", kîvroşk jî dibêje: "Ya Elah!"

Yê ji me çêtir pê gihîştin
Pir hêrs bûn. Dîn û har bûn an jî bi cinan ketin. **Qet qala Asûdeyê meke,* ***yê ji me çêtir gilîştine wê****.*

Yê jinan hatin ber aran, ê mêran çûn ber dîwaran.
Di malbatan de rûmeta lêzimên jinan zêdetir e. **Tu çima dilê xwe dikî? Ma tu nizanî, pêşiyan jî gotine:* ***"Yê jinan hatin ber aran, ê mêran çûn ber dîwaran."***

Yê Kinisî çû bal ê Binisî û gotê: "Ka piçek nanê garisî."
Yên ku rewşa wan nêzîkî hev in zêdetir bi hev û din re têkildar in. ***Yê Kinisî çû bal ê Binisî û gotê: "Ka piçek nanê garisî."** Jixwe ew her du jî nêzîkî hev û din in.*

Yê ku bi xwe pesinî, tir tê de nesekinî.
Gelekî xwe pesinandin lê di karvaniyê de jî berevajî wê kirin. **Divê em bi lafekiya wî nexapiyana, loma gotine:* ***"Yê ku bi xwe pesinî, tir tê de nesekinî."***

Yê ku dizane jixwe dizane, yê ku nizane dibê qey (ji bo) baqê nîsikan e.
Yê ku ya rasteqînî nizanin, rewşê bi awayekî din dinirxînin. **Erê bavo erê,* ***yê ku dizane jixwe dizane, yê ku nizane, dibêje qey ji bo baqê nîsikan e****.* (bnr. çîrok)

"Yê ku dizane jixwe dizane, yê ku nizane dibê qey (ji bo) baqê nîsikan e."
Mirovekî kal, xortek jî xwe re pale girtiye û zeviya xwe ya nîskan diçine. Xort lawikekî nûgihîştî, bedew û berbiçav bûye. Kalo jî mirovekî mêrebî û pir çavşor bûye. Kalo çawa çav bi lawik dikeve niyeta xwe xera dike. Çiqas par ve li xort dinêre, dilê wî diavêje xort û hundirê wî bi agirê zayendî dişewite. Kalo çav berdide xort. Gav bi gav serî li kalo digere, ji ber vê daxwazê nikare di cihê xwe de bisekine. Di dawiyê de kalo vedigere ser xort û jê re dibêje:
"Were em hev du bikin!" Xort hinekî diponije, şeytaniyek tê bîrê, her tiştî dide ber çavên xwe û ji kalo re dibêje:
"Min jî qebûl e. Lê belê şertekî min heye. Divê pêşiyê ez bikim." Kalo ji xwe ji duh na pêr de razî ye. Di nav zeviya nîskan de xort xwe bi baqek nîsk digire û xwe rehet dike. Karê wî tam xelas dibe, bi tatêl tevî baqê nîskan ê ku xwe pê ragirtibu di dest de direve. Xort direve û kalo dide pey. Gundiyên ku ji dûr ve dibînin wa ye kalekî daye pey xortekî ku baqek nîsk di dêst de ye. Gundî hemû ecêb dimînin û kalo tawanbar dikin. Çend gundî bi dengekî bilind diqîrin û dibêjin:
"Kalo kalo! Tu ji wî rûyê xwe yî spî ji fedî nakî, ji bo baqek nîsk wisa didî pey wî xortî?" Kalo bi awayekî bêhnçikiyayî

Yê ku min hilnade terkiya hespê xwe, ez hilnadim terkiya segê xwe.
Divê yê ku rûmetê nede mirov, mirov jî rûmetê nede wî. **Ew kî ye?* ***Yê ku min hilnade terkiya hespê xwe, ez hilnadim terkiya segê xwe.***

Yê ku nav şeqa diya min şil neke, ne birayê min e.
Kî çiqasî nêzîk be jî wekî xwîşk û birayan nabe. **Erê, ew jî ji min re pir baş e, lê yê ku nav şeqa diya min şil neke, ne birayê min e.*

Yê li bin deng nake, yê li ser qareqar dike.
Carinan ê mafdar na, lê yê neheq zêdetir teşqeleyê derdixin. **Ew jî tiştekî ecêb e,* ***yê li bin deng nake, yê li ser qareqar dike****.*

Yê li hemberî xwe ker hesibandin
Yê li hemberî xwe bêfêm û nezan hesibandin. **Lawo ma tu* ***yê li hemberî xwe ker dihesibînî****? Her hal ez jî li gorî xwe hinek tiştan dizanim.*

Yê ku li hêviya yarê ma, heft salan bê jin ma.
Yê ku bi hêviya vala dimînin, di dawiyê de ziyanê dibînin. **Divê mirov hesabê xwe baş bibîne.* ***Yê ku li hêviya yarê ma, heft salan bê jin ma.***

Yê me qilepîz e, bûk stewr e, qîz avis e.
Ji bo tiştên ecêb û sosret tê bikaranîn. **Jixwe sosretî jî ew e,* ***yê me qilepîz e, bûk stewr e, qîz avis e****.*

Yê palê, hat û bû xwediyê malê.
Ji bo kesên bêked û bêmaf dest didin ser tiştan tê gotin. **Hela tu li vê qederê binêre,* ***yê palê, hat û bû xwediyê malê****.*

Yê li ser sekiniye, yê binî nasekine.
bnr: Yê li bin deng nake, yê li ser qareqar dike.

---

bersiva wan wer dide:
"Yê ku dizane jixwe dizane, yê ku nizane dibê qey (ji bo) baqê nîsikan e."

Di guhertokeke din de jî bi vî awayî tê gotin:
Wekî ku tê zanîn, li hêla Ruha, Mêrdîn û hawirdorê wê bi şev li ser banan ango li ser xaniyan radizin. Ji ber ku kuçe teng in û hin xanî jî bi hev û din ve girêdayîne, mirov dikare ji ser bankî bi hêsanî derbasî ser ê nêzîk ango yê cîranan bibe. Li vê hêlê havînê disa her kes li ser banan radizin. Mirovekî çavşor, çav berdaye jinika cîranê xwe yê ku xaniyê wan pir nêzîk e. Mêrik nîvê şevê diçe ser xaniyê jinikê û di xewê de bi jinikê re radize. Jinik ji sersemiya xewê hew dizane ku mêrê wê ye. Dema ku bi ro bi mêrê xwe re diaxive, tê xuyan ku ne mêrê wê, lê ew cîranê wan ê çavşor ew yek kiriye. Mêrê jinikê çawa ku vê yekê fêm dike, dide kêrê û bi pey wî dikeve. Yê ku tûşî jinikê bûye direve, mêrê jinikê jî dide ser. Der û dor bi pey wan dikevin û dibêjin :
"Çi bûye, çi qewimiye?"
Mêrê jinikê ya rastî bibêje qet nabe, wê zêdetir rezîl bibe. Jixwe tevlihev bûye, nizane çi li hev bîne û çi bibêje. Wê demê hema ji ber wê tatêlê ji dêv bersiva han dertê:
"Wî bênamûsî nîskên zeviya min rûçikandine!" Der û cînar bi wê bersivê aciz dibin û dibêjin:
"Kuro malmîrato mirov ji bo baqek nîsk wer dide ser mirov?" Mêrê jinikê nizane çi bibêje, him li pey mêrik direve him jî dibêje:
"Yê ku dizane jixwe dizane, yê ku nizane dibê qey (ji bo) baqê nîsikan e."

Yê te çilûl û milûl, ê min Xwedê û Resûl

Yên min ji yên te xweştir û bedewtir in. **Ma her kes nabîne?* ***Yê te çilûl û milûl, ê min Xwedê û Resûl.***

Yê xelkê biteps e, yê min bireqs e.

Tiştên min, gelekî têne ber çavan. **Nizanim ji çi ye, lê* ***yê xelkê biteps e, yê nin bireqs e***.

Yê xelkê sor û zer, ê me ji edetan der.

Kar û barê min û şansê min awarte ye, ne wekî yê xelkê ye. **Di min de tiştek heye, lê ez jî nizanim çi ye.* ***Yê xelkê sor û zer, ê me ji edetan der.***

Yên li ber bêjingê mayî bûn

Ji yên ku ji karekî re bi kêr nayên û xilta binî ne re tê gotin. **Ma tu wan jî ji mirovan hesab dikî? Ew* ***ên li ber bêjingê mayî ne***.

Yên xwînê tên ser şînê.

Yên ku bi rastî jî li ber xwe bikevin tenê exrebeyê nêzîk in. **Erê, her kes wer tê xuyan, lê* ***yên xwînê tên ser şînê***.

Z

Zad û ziwan tevlihev kirin
Kar baş pêk neanîn. Cudayetî nekirin. **Min jî ew qas ji wê hêvî nedikir. Mixabin wî **zad û ziwan tevlihev kirin**.*

Zad zadê miriyan e, goşt goştê segan e. (Got: "Xêvzank bixwe jî ji kîrê filan e.")
Tev de xerab û gemar e. ****Zad zadê miriyan e, goşt goştê segan e. Got: "Xêvzank bixwe jî ji kîrê filan e."** Êdî mirov ji bo kesên wekî van re çi bibêje?*

Zahiro lawo, tu Zahirê min î, ez te dizanim, ji te re çi cadek, çi du cad.
Ji bo kesên **gelimxwer** û çilek tê gotin. **Bixwe kurê min bixwe, têr bi xwe. Ez bi te dizanim, wekî ku dibêjin: **"Zahiro lawo, tu Zahirê min î, ez te dizanim, ji te re çi cadek, çi du cad?"*** (bnr. çîrok)

Zan zanc, baqê nîskan çend tene.
bnr. Yê ku dizane dizane, yê ku nizane dibê qey (ji bo) baqê nîsikan e. **(*çîrok)**

Zar û zêç
Bi gelemperî ji bo zarokan tê gotin. **Ew çû şer, **zar û zêçên** wî jî man li holê.*

Zar û zimanê (...) li hev ketin
Şer kirin. Gengeşî kirin. **Heya niha kesî nedîtibû ku **zar û zimanê wan li hev ketiye**, gelo çi bû ku rewş wer xirab bû?*

"Zahiro lawo, tu Zahirê min î, ez te dizanim, ji te re çi cadek, çi du cad."

Bûyer li Qulpa (Tuzluca) navçeya bajarê Îdirê derbas dibe. Bi navê Zahar mirovekî zehf gelimxwar hebûye. Rojekê li ser sifreya xwarineke civatî Zahar dixwaze li ber mezinên êlê hinekî xwe şîrîn bide xuyandin. Ji bo wê jî zêde xwarinê naxwe û ji ser sifreyê zû vedikişe. Lê ev yek wekî her kesî, ji ber çavên axayê êlê jî nareve. Zahir baş nas dike ku wa ye têr nexwar û ji ser sifreyê vekişî. Ji Zihar re dibêje:
"Zahiro lawo, tu Zahirê min î, ez te dizanim, ji te re çi cadek, çi du cad."

"Cad: Ji nanê tendûrê yên gilover û stûr re tê gotin ku wisa stur û mezin in ku mirov zû bi zû nikare yekî xelas bike.

Zar û zimanê (yekî) qerimîn
Zêde peyivîn. **Min jê re wisa got ku **zar û zimanê min qerimî**.*

Zar û zimanê (yekî) tune bûn
Deng nekirin, xeber nedan. **Jixwe heçiya jina wî ye, **zar û zimanê wê tune ye**?*

Zardost ê pişthişk bûn
Ziman şirîn bûn, lê di hesab û karvaniya xwe de qewîn bûn. **Tu wisa li zarê wê yê xweş menêre. Ew **zar dostê pişt hişk e**.*

Zarezar kirin (Zarezar pê ketin)
Ji ber rewşeke xerab ax û zar kirin, li ber gerîn, jê alîkarî hêvî kirin. **"Madem tu bi Xwedê bawer nakî, çima tu jê **zarezarê dikî**?"* Selman Dilovan

Zarê te (di) zikê te de here.
Belkî **zarê te di zikê te de here. (nifîr)*

Zarok ji ber çûn
bnr. Zarok ji ber ketin

Zarok ji ber xwe hildan
bnr. Zarok ji ber xwe kirin

Zarok ji ber (yekê) ketin
Ji ber nexweşî yan jî tiştekî din zarok di zikê diya xwe de mirin. **Bawer im ku ji xebata zêde û giran **zarok ji ber wê bûkê ket**.*

Zarok ji ber xwe kirin
Zaroka di hemla dê de hildan, tune kirin. **Dibêjin Zerêya qîza Seydo, **zarokek ji ber xwe kiriye** û di Newala Beko de veşartiye.*

Zarokê duh na pêr bûn
Temenpiçûk û bêtaqî (tecrube) bûn. **"- Lawo mala te neşewite, tu Zilfoyê daholvan û hunermend ji ku nas dikî, ma ne tu hê **zarokê duh na pêr î**."* Adnan Alp

Zarşekir bûn
bnr. Zarşirîn bûn

Zarşirîn bûn
Axaftin pir xweş bûn. **Çi dibe bila bibe, Gulîzer pir **zarşêrîn e**.*

Zarxweş bûn
bnr. Zarşirîn bûn

Zava hate ser malê, xezûr kete newalê.
Mal ku kete bin bandora zavayan, rûmeta bavê malê kêm dibe. **Jixwe kifş bû ku wê wisa bibûya. Çi gotine: **"Zava hate ser malê, xezûr kete newalê."***

Zavayê li ser mala xezûran, kûçikên li ser (ber) tendûran.
Ji herduyan jî xêr nayê. **Ji orta Quranê gotine:* ***"Zavayê li ser mala xezûran, kûçikên li ber tendûran."***

Zavayê me çi zava ye, qîra sîr e li me geriyaye. (Zavayê me çi zava ye, teniya don e li me geriyaye.)
Ji bo zavayên an jî kesên rezîl û bêar tê bikaranîn. **Maşelah* ***zavayê me çi zava ye, qîra sîr e, li me geriyaye****.*

Zelûlî dîtin
Zilm û zor dîtin. **Lê ku welatê me serbest bûya, cîranên bêbext em nav di hev de mîna gurê çile pîre-pîreyî nekirana, gelê me wê çima ev* ***zelûlî bidîta****."* Rizaliyê Reşît

Zend lê ketin
bnr. Zende li serê (yekî) ketin

Zend şidandin
bnr. Zend û bendên xwe hildan

Zend û bend badan
bnr. Zend û bendên xwe hildan

Zend û bendên xwe hildan
Ji bo pêkanîna karekî xwe amade kirin. **Bêrîvanê wa ye* ***zend û bendên xwe hildane****, tu mêze bike, ka nan çawa tê pehtin.*

Zend û bend hilkirin
bnr. Zend û bendên xwe hildan

Zende li serê (yekî) ketin
Şaş û metel man, şoq bûn. **Dema ku ew gotin min ji wî bihîstin,* ***zende li serê min ket****.*

Zendên xwe vemaliştin
bnr. Zend û bendên xwe hildan

Zenga mirinê xwe avêtin dev û lêvên (yekî).
Ji bo nexweşên giran tê bikaranîn. *****Zenga mirinê xwe avêtiye dev û lêvên Cezmî****, Xwedê dizane, lê xêra wî nîn e.*

Zengilek di stûyê xwe de darde kirin
1. Her kes bi xwe hesandin. **2.** Xwe bi xwe rezîl kirin. **Erê me got, bêje min zanîngeh qezenc kiriye, lê me negot here* ***zengilekî di stûyê xwe de darde bike*** *û li nav gund belav bike. *Ya ku wê kir eybeke giran bû.* ***Zengilek di stûyê Bêrîcanê de darde kir*** *û xiste pêşkeniya taxê.*

Zer da bi zer, kirkirk bi jor de da ser.
Ziyanek hê zêdetir kirin. **Êdî dê ji wê zêdetir çi bike? Mêrikî* ***zer da bi zer, kirikirk bi jor de da ser****.*

Zer e, lê ne zêr e.
Her xuyangên xweş, nayê wateya heman naverokê. **Erê **zer e, lê ne zêr e**. Heke tenê bi xuyangê pêk bihata wer nedibû.*

Zerga Şems lê ketin
Înşelalı **zerga Şems li Sîdarê bikeve.* (nifir)

Zerp û zor dîtin
Di nav astengî û dijwariyê de bûn. **Bi rastî heke wî ew **zerp û zor nedîtana** qet nedihate rê.*

Zevî tune ye, teyrik mane ye.
Ji bo kesên ji neyîniyên xwe re li hincetan digerin tê gotin. **Em dizanin rewş çawa ye. **Zevî tune ye, teyrik mane ye.***

Zeviya te hêşîn nebe.
Ji Xwedê dixwazim, **zeviya te hêşîn nebe.* (nifir)

Zeviya xwe ajotin
1. Tenê li karê xwe ango berjewendiyên xwe mêze kirin. **2.** Bi jina xwe re têkiliya zayendî danîn. **Bila ew **zeviya xwe bajo**. Çi karê wî bi me ketiye? *Bila berê ew bi xwe **zeviya xwe biajo**, dû re dev biavêje qîzên xelkê.*

Zewal nedîtin
Derd û kul nedîtin. **Tu **zewalê nebînî** lawo, te ez ji wê riya dirêj xelas kirim.* (dia)

Zext lê kirin (xistin)
1. Tadeyî û zilm kirin, çewisandin. **2.** Hadandin. **Hemû gelên qels, **zext lê tê kirin**. *Jinikê tim **zext li mêrê xwe xist**, heya ku ew ji exrebeyên wî qetand.*

Zê kişt e, ezkinî pişt e.
Jin ku tenduristiya wê baş be û di hêla zayendî de jî ku xurt be, mêr zêdetir pê ve dizeliqe. **Zê kişt e, ezkînî pişt e. Ma kê dikare dawa wê berde?*

Zêde bi pêş de çûn
bnr. Ji şorê derxistin

Zêde şidandin
Zêde bi ser de çûn. **Mixabin dema ku em ciwan bûn, me **zêde yên li hemberî xwe dişidan**.*

Zêdeyî (yekî) bûn
1. Ji qewet û zerengiya kesekî zêdetir bûn. **2.** Ne layiq û hunkufê yekî bûn. **Bi rastî jî ew faqûlte **zêdeyî min bû**, min nikaribû bixwenda. *Ew keçik bi rastî jî **zêdeyî ew ê gêj û nexeritandî ye**.*

Zêha (zuha) kirin
Ji bo zêdexerckirina diravan tê gotin. **Qurbana destê wan bim, baş **zêha kirin**.* (argo)

Zêhna (yekî) tijî kirin
Ji bo armancekê yek araste kirin. Yek xistin bin bandora xwe. **Heke jina wî wisa **zêhna wî tijî nekira**, wî bi xwe ew qas fêm nedikir.*

Zêhna (yekî) vekirin
bnr. Zêna yekî zelal kirin

Zêhna (yekî) zelal kirin
Bi hêsanî mijarek fêrî yekî kirin. **Bi rastî jî di wê mijarê de Mamoste Mehmed Elî **zêhna min zelal kir**.*

Zêhnkor bûn
Di fêrbûnê de astengî kişandin. Di hêla têgihîştinê de qels bûn. **Ew keçikeke **zêhnkor e**, tu çawa hînî wê dikî?*

Zêhnvekirî bûn
Jîr bûn, zû fêr bûn. **Ew keçikeke **zêhnvekirî ye**, tu carekê jê re bibêjî bes e.*

Zêl ji çermê piştê rakirin (Zêl ji piştê rakirin)
Zilm û zor û îşkence kirin. **Xwedê kesî nexe tepûşa wî zalimî, wisa kiribû ku **zêl ji pişta Vedoyê Cezmî rakiribû**.*

Zêl pê xistin
bnr. Zêl ji çermê piştê rakirin

Zêl zêlî kirin
Parçe parçeyî kirin. **Dara wisa kiriye, mîntanê xwe **zêl zêlî kiriye**.*

Zêr bûne palik
Tiştên binirx û girîng, bêrûmet û erzan bûn. **Îro rojeke wer hatiye ku **zêr bûne palik**.*

Zêr di dêst de bûn xwelî
Derfetên herî baş jî xerab bi kar anîn, ziyan dan, an jî tim ziyan pêk anîn. **Ew yeke wer bedûm e ku **zêr di dêst de dibe xwelî**.*

Zêr di dêst de bûn paxer
bnr. Zêr di dêst de bûn xwelî

Zêr jî piçûk e lê tu li bihayê wî binihêre.
Gelek caran tiştên piçûk hê zêdetir birûmet in. **Erê, tu dibêjî lawê te kinik û piçûçik e, **zêr jî piçûk e, lê tu li bihayê wî binihêre**.*

Zêr riyîn
Wekî tirane ji bo zêde bêmerifetê tê bikaranîn. **Maşelalı malbata Huso, hew dizanin ku zavayê wan heta êvarê **zêr dirî**.* (qerf)

Zêr zer e, gizêr zer e.

Xuyang eynî bûn, nayê wateya eynîbûna naverokê jî. **Ma tu nizanî ji bo wî gêjî derk nîn e,* ***zêr zer e, gizêr zer e.***

Zêretê min kirî, zêret dumahîk li min da (anî).
Min ew afirand, lê afrîna min xisarek mezin da min. **Keda min a ew qas pêvajoyê vala çû. Zêretê min kirî, zêret dumahîk li min anî.* Rêber Ronî

Zik afirê ga bûn
Ji bo kesên pir gelimxwer û çilek tê gotin. **Heyran ya te ji hesaban gelekî der e, maşelalı yê te* ***ne zik e, afirê ga ye.***

Zik berdan
Pir qelew bûn. **Mirov ku ew qasî bixwe, wê* ***zik jî wisa berde.***

Zik çûn ber dêv
bnr: Zik berdan

Zik hatin ber dêv
bnr: Zikê (yekê/î) hatin ber dêv

Zik mezin kirin
Ji bo kesên zêde xwarinê dixwin û qelew dibin tê gotin. **Hema karê Şabedîn jî ew e,* ***zik mezin dike.***

Zik têr bûye, stûyê xwe li kendalan dide.
Ji bo kesê ku piştî başbûna rewşa aborî, bitrî dibe û li belayan digere tê gotin. **Yê berê jî bi neheqî negotine, mêrê kurd ku* ***zik têr dibe, stûyê xwe li kendalan dide.***

Zik û pişt bûn yek
Pir qelew bûn. **Li metropolê wisa xwariye ku* ***zik û pişt bûne yek.***

Zik zikak e, dike û nake, tu namûsê nake.
Ji bo kesên çavbirçî û ji bo çila xwe ar û namûsê jî ji bîr dikin tê bikaranîn. **Ez çi bibêjim lawê min?* ***Zik zikak e, dike û nake, tu namûsê nake.***

Zikdirîn dan (yekî)
Yek dexisandin, pelikandin. Yek behecandin. **Çima lawê wî jê re erebeyeke xweşik kiriye, Şakir* ***zikdirînan dide Mûsayê Xecê.***

Zikê (yekî) berî erdê dan
Zikê yekî qelişandin. **Wî dînikî hema ji nişkê ve* ***zikê mêrik berî erdê da.***

Zikê (yekî) bi piştê ve girtin (zeliqîn)
bnr: Zikê (yekî) gihîştin piştê

Zikê (yekî) bi ser dêv ketin
1. Zêde xwarin xwarin. **2.** Ji bo jinên hemîle tê gotin. **Teresî wisa xwar ku* ***zikê wî bi ser dêv***

***ket**. *Hê çend meh di ser daweta wan re derbas nebûn, **zikê bûka Silêman bi ser dêv ket**.*

Zikê (yekî) bi ser piştê ketin
Ji bo kesên ku zêde xwarin xwarine, an jî pir qelew in tê gotin. *"*Kuriyê kumeyt pirî ji zeviyên şîn çêriyabû, **zikê wî bi ser pişta wî ketibû**."* Harbi Soylu

Zikê diya xwe qelaştiye û ketiye hundir.
Ji bo kesên ku jiyana wan xweş e tê bikaranîn. **Ka kî wekî wê rehet e? Welehî **zikê diya xwe qelaştiye û ketiye hundir**.*

Zikê (yekî) gihîştin piştê
Gelekî jar bûn. **Wê nexweşiyê wisa kir ku **Zikê Lelîcanê gihîşte piştê**.*

Zikê (yekê/î) hatin ber dêv
1. Hemîle bûn. **2.** Zêde qelew û kok bûn. ***Zikê Zezê hatiye ber dêv** hê jî dixebite. *Wekî tim wisa zêde nexwara, **zikê wî wisa nedihate ber dêv**.*

Zikê (yekî) li ber çûn
bnr. Zik berdan

Zikê (yekê) li ber dêv bûn
Hemîle bûn. **Maşelah bûka Mûsayê Temo her sal **zikê wê li ber dêv e**.*

Zikê (yekî) li pêşiyê çûn
Pir qelew bûn. ***Zikê wî li pêş wî diçe**, tu çawa ji wî wer diecibînî?*

Zikê (yekî) neşewitîn
bnr. Pozê (yekî) neşewitîn

Zikê (yekî) pê êşîn (şewitîn)
Guneh pê hatin. ***Zikê min bi wî halê wî êşî**.*

Zikê (yekî) qurequr kirin
Xizan û birçî bûn. **Çiyê wî heye kuro? Heya êvarê **zikê wî qurequr dike**.*

Zikê (yekî) şên bûn
1. Zik têr bûn. **2.** Rewşa aborî xweş bûn. **Ancax di wê sifreya dewlemend de dê **zikê Delîl şên bibe**. *Mala apê wî alîkarî dayê, êdî **zikê Kamil şên e**.*

Zikê (yekî) tije bûn
Zana û bizereng bûn. **Erê, rewşa wî wisa pejmûrde dixuye, lê **zikê wî tije ye**.*

Zikê (yekê) tije kirin
Bênikah jinek hemîle hiştin. **Wî bêbavî **zikê keçikê tije kir**, dû re jî revî, çû Stenbolê.*

Zikê xwe çêrandin
Li vir û wir, zêdetir ji bo xwarinê tevgerîn. **Karê wî çi ye?! Hema tenê **zikê xwe diçêrîne**.*

Zikê xwe dan ber ...
Zêde xwarin xwarin. **Maşelah di wê geştê de Rosto **zikê xwe da ber qeliyê** û xwar û xwar.* (qerf)

Zikê xwe jê êşandin
Dexesî kirin. **Kuro ew **zikê xwe ji birayê wî diêşîne**, ma dora ku tu.*

Zikê xwe ji heramiyê birandin
Tiştên heram nexwarin. **Bi rastî jî wê **zikê xwe ji heramiyê birandiye**. Bibihîze ku ev malê diziyê ye, naxwe.*

Zikê xwe tije derd û kul kirin
Ji xwe re derd û kul peyde kirin. Her tişt ji xwe re kirin pirsgirêk. **Maşelah ew wisa ne, niha li wir jî **zikê xwe tije derd û kul kirin**.*

Zikê xwe tije kirin
1. Ji bo keçikên bêmehr û bênikah hemîle dimînin tê gotin. **2.** Zehf zêde xwarin xwarin. **Heke qîza wî **zikê xwe tije nekira**, wan jî nedidan wî lawikî. *Xelîl heta **zikê xwe tije neke**, ji ser sifreyê ranabe.*

Zikê xwe zer kirin
Ji bo kesên ku ji kirina karan pir aciz dibin tê gotin. **Kingê ku ez ji Osê re daxwaza kirina karekî dikim, îleh **zikê xwe zer dike**.*

Zikê xwe zawo kirin
Zikê xwe têr kirin. **Êdî Arîmed **zikê xwe zawo kiriye**, jê re sekn tune ye.*

Ziko çalo embaro; dixwe, naxwe înkaro. (Ziko têro ambaro; dixwe, naxwe înkaro.)
Ji bo kesên xwarinê zêde dixwin, lê rewşa xwe jî napejirînin tê gotin. ****Ziko çalo embaro; dixwe, naxwe înkaro.** Mala wî wêran nebe, ne têrbûn jê re heye, ne jî qebûlkirin.*

Ziko têro, milo şêro
Yên ku rewşa wan a aborî baş e, derfet û moralên wan zêdetir û bihêztir in. ****Ziko têro, milo şêro.** Rewşa min wekî wî baş bûya min ê jî wisa bikira hurtehurt.*

Ziko ziko zikak î, her çi nikarî peyde (bi)kî, tu namûsê jî nakî.
bnr. Zik zikak e, dike û nake, tu namûsê nake.

Zikopişto kirin
Gelekî êşîn. **Wan gotinên wî kurxalê min, ez **zikopişto kirim**.*

Zikreşî kirin
Dexesî û hesûdî kirin. **Kifş e ku Yargul ji Çîmenê **zikreşiyê dike**.*

Ziktêr, çavbirçî bûn
Ji bo mirovên ji pêdiviya xwe zêdetir dixwazin tê gotin. **Çiqas mal û milkê wî hebe dîsa jî ew mirovekî **ziktêr î çavbirçî ye**.*

Ziktêr e, xew jê re xêr e.
Yên ku pirsgirêkên wan ê aborî nîn in, rehetir in. **Helbet tenê bi aboriyê nabe, lê dîsa jî **ziktêr e, xew jê re xêr e**.*

Zikvala bûn
Bêxîret û bêkêr bûn. **Tu çi ji wî hêvî dikî? Ew yekî **zikvala ye**.*

Zil zil berhev kirin, mil mil belav kirin (Zil zil top kirin, mil mil belav kirin)
bnr. Bi kevçiyan berhev kirin, bi hesikan belav kirin

Zilamek hebû, dema nanê wî hebû, dewê wî tune bû, dema dew hebû, nan tune bû; dema her du jî hebûn, ew ne li mal bû.
Ji bo kesên xizan û bêşans tê bikaranîn. **Ew jî dayîneke Xwedê ye. Dibêjin: "**Zilamek hebû, dema nanê wî hebû dewê wî tune bû, dema dew hebû nan tune bû; dema her du jî hebûn, ew ne li mal bû.**"*

Zilm zilma Xwedê ye, ferman fermana axê ye.
Sedema zilm û zelûletê axa ye. **Her tiştî nexin stûyê Xwedê, **zilm zilma Xwedê ye, ferman fermana axê ye**.*

Zilmkaro, dinya xwaro
Yên ku zilmê dikin, hê zêdetir dewlemend dibin û erka xwe qewîmtir dikin. ****Zilmkaro dinya xwaro.** Ma dewleta Osmanî çawa bû împaratoriyeke mezin.*

Zilût bûn
Ji bo kesên tu tiştekî wan tune be tê gotin. **Kuro ew mirovekî **zilût e**, hûn çawa bi wî bawer dikin?*

Ziman bi dora lêvê nexistin
Deng dernexistin, nepeyivîn. ** "Mêrik ew çend pê de qîriya û bariya, **ziman bi dora lêvê nexist**." Zana Farqînî*

Ziman bi qasî terikê kerê dirêj bûn
bnr. Ziman heft helebî bûn

Ziman di devê (yekî) de reş bûn
1. Lavayî kirin. ****Ziman di devê min de reş bû**, dîsa jî ew nerm nebû.*

Ziman di hifzê de bûn
Bi zimanê xwe karîn. **Têkoşer xortekî wisa ne ku **zimanê wî di hifzê de ye**.*

Zimandirêj bûn
Gelekî zêde axaftin. **Ew wisa **zimandirêj e** ku xelk jê aciz dibe.*

Zimandirêjî kirin
Bi gotinên neyînî yan jî bi xeberan aciz kirin. **Dema ku wan xortan li hember keçikên nenas **zimandirêjî dikirin**, ez dibehecîm.*

Ziman girtî, ser rehetî
bnr. Zimanê xwe jê kirin, cihê xwe çêkirin

Zimanhişk bûn
Ji bo kesên ku ji tiştên nebaş diaxivin tê gotin. **Ew jinikeke **zimanhişk e**, lewma kes jê hez nake.*

Ziman ji dêv kişîn
Di peyivînê de astengî kişandin. **Qirikê! Tu dibêjî **ziman ji dêv kişiyaye**, qet peyvek jî negot.*

Ziman lê aliqîn
bnr. Ziman neqelibîn

Ziman sor e, hereket kor e.
Bi xwe gelekî diaxive, lê tiştek jî ji dêst nayê. **Temara Besrayê yeke **zimansor e, hereketkor e**.*

Zimanê (yekî) şewitîn
Berê tecrubeyeke neyînî derbas kirin. **Jixwe **zimanê wê şewitiye**, tu jî diçî eynî tiştî jê dixwazî.*

Ziman xule xul kirin
bnr. Ziman li hev gerîn.

Ziman zêde ye, emel tune ye
bnr. Ziman sor e, hereket kor e.

Ziman e, nekaş e, ne kendal e
Sînorê axaftinê tune, dikare her tiştî bibêje. ** Ziman e, nekaş e, ne kendal e. Ji bo ziman çi erênî, çi neyînî her tişt mimkun e.

Zimançepel bûn
Zimanzor bûn. **Eman dev ji wî berde, ew yekî **zimançepel e**, tu pê nikarî.*

Zimanê (yekî) bi qûna wî ve kirin
Bi bersiveke çak û di cih de dersa yekî dan. **Wî tiştinên din hêvî dikirin, lê Wesîleyê **zimanê wî bi qûna wî ve kir**.* (argo)

Zimanê (yekî) bigû bûn
Ji bo kesên ku li zimanê xwe nabin xwedî û tiştên neyînî dipeyivin tê gotin. ****Zimanê Hesen bigû ye**, wî nedin xeberdan.* (argo)

Zimanê di dêv de reş bûn
Gelekî westîn. *Di wî hevrazî de zimanê Xalê Bekir di dêv de reş bû.

Zimanê (yekî) dirêj bûn

Ji ber mafdarî û derfetan zêde bi pêş ve çûn. *Çima ku di wê dozê de bi ser ket, êdî ***zimanê wê gelekî dirêj bûye***.

Zimanê (yekî) giran bûn

Ji ber tirs an jî nexweşiyê di axaftinê de astengî kişandin. *Îşev di wê newalê de qeraltiyek li ber çavên min ket, hema wê gavê ***zimanê min giran bû***, min nikaribû qîrînî jî bikara.

Zimanê (yekî) hatin girêdan (girtin)

1. Ji ber neheqbûnê li hemberî yê mafdar deng dernexistin. **2.** Ji ber tirs an jî heyecanê di xeberdanê de astengî kişandin. *"Vêca ***zimanê min hatibû girtin***, nizanibûm çi bibêjim." Osman Sebrî

Zimanê (yekî) heft helebî bûn

Ziman dirêj û xurt bûn. *Ezbenî tu bi wê re nikarî sereder bikî, ***zimanê wê heft helebî ye***.

Zimanê (yekî) kin bûn

Ji ber têkçûn an jî neheqiyê mafê axaftinê zêde di xwe de nedîtin. *Heke Cuda di wir de têk neçûya, ***zimanê wê ew qasî jî kin nedibû***.

Zimanê (yekî) li ber (yekî) kin bûn

Ji ber sedemekê li hember kesekî zêde nepeyivîn, vekişîn. *Ji ber ku deynê wî jê re gelek e, ***zimanê Seydo li ber Rizgo kin e***.

Zimanê ku bigere bê dor, dike lingê mirov gîzmên sîp û sor.

Yên ku bi zimanê xwe nikaribin, li cihê sekinî tiştên ne di cih de bipeyîvin, ew dê dawiyê de xisarê bibînin. *Heke wî ew tiştên ew qas xerab der bara wê de negotana, rastî wan zextan jî nedihat. Belasebeb ne gotine: ***"Zimanê ku bigere bê dor, dike lingê mirov gîzmên sîp û sor."*** (bnr. çîrok)

Zimanê (yekî) lal bûn

1. Ji bo zêde girîna zarokan tê gotin. **2.** Ji eşqan an jî ji kerban mat man. *Lawikê Zerînê yê piçûk wisa giriya ku ***zimanê wî lal bû***. *Dema ku Toreman ew li pêş xwe dît, ***zimanê wî lal bû***.

Zimanê (yekî) lê nesekinîn

1. Pirbêj, lafek û geveze bûn. **2.** Raz zû gotin. *Îşev ji êvarê de ***zimanê Gulderê lê nesek-***

Zimanê ku bigere bê dor, dike lingê mirov gîzmên sîp û sor."

Rojekê şêr nexweş dikeve. Endamên daristanê tev diçin serdana şêr. Bi tenê rovî naçe serdanê. Gur jî xulamê şêr e. Gur fesadiyê dike. Ji şêr re dibêje:

"Mîrê min, eger tu tola nehatina rovî ji rovî nestînî, rovî wê pir qure bibe." Şêr ji gur bawer dike û ji gur re dibêje:

"Herin rovî bînin cem min." Rovî fêm dike ku çi fen hebe ji gur e. Ji şêr re dibêje:

"Mîrê min ka ew ên ku hatin, wan çi kir? Yekî dermanek ji te re neanî. Destvala hatin serdana te çi? Ez nehatim. Lê min ji te re dermanek peyda kir." Kêfa şêr tê, ji rovî dipirse:

"De bibêje demanê min çi ye?" Rovî ji şêr re dibêje:

"Mîrê min, ez çûm cem gelek hekîman. Tevan jî yek derman got. Ew derman jî mêjiyê nav hestiyê çaqa gur e." Dema rovî qala derman û gur dike. Şêr dest diavêje çaqa gur û diqurêfe. Mêjiyê nav dimisîne. Gur zîq li rovî mêze dike û jê re dibêje:

"Hey roviyê bêmêjî. Ku min tu bi tenê girtî, ez ê ji te re bibêjim." Rovî bi kêf ji gur re dibêje:

"Mamê gur, zimanê ku bigere bê dor, dike lingê mirov gîzmên sîp û sor."

*inî, guhê me bir. *Min ji we re got, **zimanê wê lê nasekine**, wê di dawiyê de ji me re astengiyê derxîne.*

Zimanê (yekî) lê vebûn

Li hemberî kesekî gelek tişt gotin. ***Zimanê Fesîh li Dilgeş vebû**, hesreta dilê xwe ya deh salan der kir.*

Zimanê (yekî) li hev gerîn

Ji ber tirs an jî şadbûnê, di axaftinê de astengî çêbûn. **Dema ku diya min ji nişka ve ew li pêş xwe dît, **zimanê wê li hev gerî**.*

Zimanê maran li ber derxistin

Gelekî lavayî kirin. **Xwedê dizane, min **zimanê maran li ber derxist**, lê dîsa jî wê nepejirand.*

Zimanê (yekî) nebûya, qijikan wê çavên wî derxistina.

Ji bo kesên ziman bihêz tê bikaranîn. **Xwedê kiriye ew zimanê wî heye. Ew **zimanê wî nebûya, qijikan wê çavên wî derxistina**.*

Zimanê (yekî) negerîn

1. Qêmîş nekirin. **2.** Ji ber nexweşî yan jî sedemên din di axaftinê de astengî kişandin. **Xwedê dizane ew çi bike jî, **zimanê min nagere** ku ez ji wê re tiştekî xerab bibêjim. **Kamûran hema ji nişka ve kûr nexweş ket, **zimanê wî nedigerî ku xeber bide**.*

Zimanê (yekî) neqelibîn

Di axaftinê de çerixîn, terpilîn. **Nûro xweş dipeyive, lê nizanim çima wê rojê **zimanê wî wer neqelibî**.*

Zimanê (yekî) nesekinîn

Gotinên nelicih û bêrê gotin. Zêde axaftin. **Min dizanibû **zimanê wî nasekine**, loma min ew nebir wir.*

Zimanê sor e, hestî tê de nîn e.

bnr. Ziman e, ne kaş e ne kendal e.

Zimanê sor e, pêşiyê ne gelî ye ne zihor e.

bnr. Ziman e, ne kaş e ne kendal e.

Zimanê (yekî) têrê nekirin

Bi gotinê wekî ya pêwîst rewş neanîn ziman. **"Lê mixabin, tiştekî min î ku ez ji wan re bibêjim tune bû. Ne **zimanê min têrê dikir**, ne jî dilê min qîm dikir."* M. Ali K.

Zimanê xwe birîn

Dengê xwe nekirin. Neaxivîn. **"- Kuro liş be! Ji bona Xwedê hema kêliyekê be jî, **zimanê xwe bibire**."* Dilawer Zeraq

Zimanê xwe birî, cihê xwe kirî.

Yên ku zêde napeyîvin û gotinên xerab nabêjin, bêhtir bi îstikrar dijîn. **Wî ji wan bûyerên berê jî gelek ders hildabûn, li wir hema* ***zimanê xwe birî, cihê xwe kirî.***

Zimanê xwe didirînim, ji hevalên xwe namînim.
bnr: Bi zimanê xwe, xwe bi rê ve birin

Zimanê xwe dirêj kirin
1. Berzeq û bitrî bûn. Paşgotiniya yekî kirin. Di eleyhê yekî de axaftin. **Van rojan Xelîl zehf* ***zimanê xwe dirêj kiriye****, bawer im ku sedem jî hatina xalê wî yê ji Elmanyayê ye. *Ez ê gulhê te yê din jî jêkim eger tu careke din* ***zimanê xwe dirêj bikî.*** Helîm Yûsiv

Zimanê xwe gez kirin
Zêde tirsîn an jî fedî kirin. **Çima ku xezûrê wê ew serqot dît, Berhûvê* ***zimanê xwe gez kir.***

Zimanê xwe girtin
bnr: Zimanê xwe birîn

Zimanê xwe jê kirin, cihê xwe çêkirin
bnr: Zimanê xwe birî, cihê xwe kirî.

Zimanê xwe kin kirin
bnr: Zimanê xwe birîn

Zimanê xwe ragirtin
bnr: Bi zimanê xwe karibûn

Zimanê xwe xistin qûna xwe
Neheq bûn û ji ber neheqiyê jî mafê axaftinê neman. **Wî jî dixwest bi ser min de bê, lê pişti wan gotinên min,* ***zimanê xwe xiste qûna xwe.***

Zimanê xwe qut kirin
bnr: Zimanê xwe birîn

Zimanê xwe wekî zimanê segan derxistin
Lavayî kirin. **Evdilxebûr li ber Zelîhayê* ***zimanê xwe wekî zimanê segan derxist****, lê wê qet li rûyê wî nenihêrî.*

Zimanê xwe zeft kirin
Bi zimanê xwe karibûn. **Heke ew bikaribe* ***zimanê xwe zeft bike****, ji wî re zewal namîne.*

Zimanê (yekî) vebûn
1. Zehf zêde peyivîn. **2.** Tiştên nexweş gotin, sixêf kirin. **Carekê* ***zimanê Zenûrê vebû****, nehişt em razên jî. *Berê Zalîdeyê dengê xwe nekir lê pişti wê tawanbariyê* ***zimanê wê vebû.***

Zimano biriyo, seriyo seqeriyo (qiryayo)
bnr: Zimanê xwe birî, cihê xwe kirî.

Zimano kurto, sero vehesawo
bnr: Zimano leqleq, seriyo teqreq

Zimano leqleq, seriyo teqreq
Kesên ku zêde dipeyivin di dawiyê de serê wan diêşe, ango ziyanê dibînin. **Min ji te re çi digot lawo:* ***"Zimano leqleq, seriyo teqreq."***

Zimano leqo, seriyo teqo
bnr: Zimano leqleq, seriyo teqreq

Zimantûj bûn
bnr: Zimançors bûn

Zinar dilive, ew nalive.
Ji bo kesên teral û bêtevger tê gotin. **Tu qet nekeve tatêlê,* ***zinar dilive, ew nalive.***

Zincîr qetandin
Azad û serbest bûn. **Berê ez li tiştekî wisa nedifikirîm, lê piştî sê salan min* ***zincîr qetandin.***

Zingezing jê anîn (Zingînî jê anîn)
Di bin zor û zerpê de hiştin. **Faysal sîleyeke wisa li Asmînê da ku* ***zingînî jê anî.***

Zingînî pê xistin
bnr: Zingezing jê anîn

Ziq bi ziqê re zeliqîn
Parçe parçeyî bûn, peritîn. Tîştîşî bûn. **Wê wisa kir ku* ***ziq bi ziqê re zeliqî.***

Zirar du zirar, him diz, him girar.
Rewş hê xerabtir bûn. **A rastî ji vê xerabtir jî zor bibe. Çawa dibêjin:* ***"Zirar du zirar, him diz, him girar."***

Ziravê (yekî) anîn ber dêv
bnr: Ziravê (yekî) qetandin

Ziravê (yekî) qetandin
1. Tirsîn. **2.** Pir bixiroş û heyecan bûn. **Wê şevê wê qeraltiya hespê,* ***ziravê min qetand.*** **Wê azmûnê* ***ziravê lawê min qetand.***

Ziravê (yekî) ji jê qetîn
Ji yekî gelekî tirsîn. **Her kes dizane ku* ***ziravê Xanê ji Zal diqete.***

Zirav lê bizdandin
bnr: Ziravê (yekî) qetandin

Ziravê (yekî) qalind kirin
Cesaret dan kesekî. **Lingê Îbo nedigirtin lê Cemîleyê* ***ziravê wî qalind dikir.***

Ziravê (yekî) qetîn
Tirsîn. **Heta me ew ji wê buhirkê debas kir,* ***ziravê me qetiya****.*

Ziravqetyayî bûn
Tirsonek bûn. **Na lo! Ew yekî* ***ziravqetyayî ye****, bawer nakim ku wisa li ber xwe bide.*

Ziravqetandî kirin
bnr: Ziravê (yekî) qetandin

Zirezir kirin
1. Girîn. **2.** Gotinên nebaş gotin. Gef xwarin, çêr kirin. **Zarokên van cîranên me, hingî* ***zirezir dikin****, em dabarandin.*Lawê Wardekê pir* ***zirezir dike****, wê bi vê meşê bi ser belaya xwe ve bibe.* (argo)

Zirîniya kerê bûn
Ji bo kesên vala û bêbandor diaxivin tê gotin. **Dîsa* ***ziriniya kerê ye****, kes guh nadiyê, lê ew dîsa dipeyîve.*

Zirneya Enîsê mirtib li ber yasîna Hafîz Fethulah
Ji bo tiştên berevajî hev tê gotin. **Ez çi bibêjim ji vî karî re?* ***Zirneya Enîsê mirtib li ber yasîna Hafiz Fethulalı.***

Zirt avêtin
Pesin dan, lafekî kirin. **Ew ku wisa* ***zirtan biavêje****, helbet ew ê jî wisa bibêje.*

Zirt dan xwe
Pesnê xwe dan, lafekî kirin. **Wê hema* ***zirt dane xwe****, lê Siltanê jî rind cawa wê xiste dêst.*

Zirt lê xistin
Dawî lê anîn. Qedandin. **Me got, wa ye Rosto kar dibe sêrî, lê çend rojan bi şûn de* ***zirt lê xist*** *û ji wî karî jî derket.* (argo)

Zirt şikandin
bnr: Forsa (yekî) kirin qûnê

Zirt zirt şitexilîn
Gotinên çors û neyînî gotin. **Ma li hember* ***zirt zirt şitexilîna*** *wî min çi bigota?* (argo)

Zirtezirt kirin
Bi awayekî neyînî peyivîn. **Ev jinik pir* ***zirtezirt dike****, êdî emana min bir.* (argo)

Zirtezirt pê ketin
Di zerp û zoreke mezin de man. **Wî karî wisa kir ku* ***zirtezirt bi Zeynel ket****.* (argo)

Zirteboz bûn
Ne nazik, bêteşe û stûr bûn. **Însaf yaho! Ew* ***zirtebozeke e****. Hûn ê çawa wê keçika nazik û nazelîn bidin wî?* (argo)

Zirtone derketin (bûn)
Bêzereng bûn. Li herî dawiyê man. **Jixwe di serî de kifş bû ku ew ê di wê pêşbaziyê de **zirtone derkeve**.* (qerf)

Zivêr bûn
Bêzar bûn. Rehetî xera bûn. **Hero hero ji mêvaniya vî mêrikî em **zivêr bûn**.*

Zivir ba dan
Ji pêdiviyê zêdetir hewl dan ango ji ya asahî derbas kirin. **Min got bike, lê min negot ew qas jî **zivir ba de**.*

Zivir zivir, dîsa li vir
Di dawiyê de dîsa hatina ser eynî rewşê. ****Zivir zivir, dîsa li vir.** Tu qet nekeve tatêlê, wê dîsa bê bal te.*

Zivistan hat ber deriyan, cilika xizan(an) qetiya.
Ji ber tunebûnê, tedbîr û debara xizanan netêkûz û qewîn e. **Dê çi bibe? **Zivistan hat ber deriyan, cilika xizan qetiya.***

Zivistan hat, birka feqîran teqiya.
bnr. Zivistan hat ber deriyan, cilika xizan qetiya.

Zivistan kirin kundir
Hemû kar, pêwendî û tedbîra werzeya zivistanê amade kirin. **Helal be! Wê jinikê, wê bi keda xwe **zivistan kire kundir**.*

Zixtika (yekî) tê de hebûn
Bandor û rista yekî di karekî dizî û neyînî de çêbûn. **Erê, navê wî nayê ziman, lê ez dizanim ku **zixtika Resûl di wê de heye**.*

Ziyareta zer, min jê nekiriye bawer.
Aqilê min ji wî kar û rewşê nabire. **Dibe ku di çavên her kesî de pir rûmet be, lê **ziyareta zer, min jê nekiriye bawer**.*

Ziyaretê ji te bû, ne ji min bû.
bnr. Camiyê ji te bû, ne ji min bû. *(*bnr. çîrok)*

Ziyaretgeha ku min çêkir, biyanî hat û navê xwe lê kir.
Ked vala çûn. **Ew jî qedera min e, **ziyaretgeha ku min çêkir, biyanî hat û navê xwe lê kir**.*

Zîn û pûsat kirin
Amade kirin. **Min êvarê got, hew min mêze kir ku sibê zû mêrikî xwe **zîn û pûsat kiriye** û li ber derê min sekiniye jî.*

Zîlikê biharê, debara malê
Biharê mirov dikare bi hêsanî debara xwe bike. **Tu qet nekeve tatêlê, **zilikê biharê, debara malê**.*

Zîn kutan ser (yekî)

Daxwaza pêkanîna tiştekî hema wê gavê xwestin. **Vê keçikê **zîn kutaye ser min**, hema dibêje, îro were min ji dê û bavê min bixwaze.*

Zîn û pûsatên xwe şidandin (girêdan)

Xwe amade kirin. **Refîqeyê **zîn û pûsatên xwe şidandin**, hûn zor wê bidin sekinandin.*

Zîp hatin û xericîn, ava di golan de mewicîn, kewgêrî li kewan fericîn.

Li herêma Tor û Botan ji bo zor û zerpa rojên zîpan tê bikaranîn. **Ma tu nizanî ji bo van rojên zîp dibêjin: **Zîp hatin û xericîn, ava di golan de mewicîn, kewgêrî li kewan fericîn.***

Zîpik tê de avêtin

Gelek ked û zehmet kişandin, xwêdan rêtin. **Zerîfeyê **di wî karî de zîpik avêt**.*

Zîpikê lê xistin

Di nav rewşeke zor de bûn. **Kuro tu çi dibêjî, **zîpikê li wî xistiye**, zîpikê.*

Zîtik avêtin hev

Bi pehînan li hev li ba ketin. **Ev zarokên min heta ku sibehê zû **zîtikan neavêjin hev**, taştê naxwin.*

Zo û ferek diran di dêv de tune bûn

Gelekî kal an jî pîr bûn. **Hatiye keçikê dixwaze, lê **zo ferek diran di dêv de tune ye**.*

Zoq ne tişt e, lê kevirê Hemo li pişt e.

Heke ew asteng nebe, ew yek pir hêsan e. **Dîcle dibêje: **"Zoq ne tişt e, lê kevirê Hemo li pişt e."** Jixwe ya girîng jî ew e.*

Zor dan ser

Ji bo pêkanîna karekî yek asteng kirin. Ling kutan ser. **Heke me wisa **zor neda ser**, bawer nakim ku wî ew siwax xelas bikira.*

Zor dan xwe

Ji bo tiştekî ketin nav hewldanên dijwar. **"Ji rika wan re min **zor dida xwe** û xwe dilşad dida nîşandan."* Zana Farqînî

Zor dan (yekî)

bnr. Cih lê teng kirin

Zor gihîştin (yekî)

Bi hêz û zerengiya xwe ji yekî xurttir bûn. **Ew jî baş dizane bê **zor digihîje kê**, bi ser wê de diçe.*

Zor lê bûn

bnr. Zor lê hatin

Zor nagihîje kerê, palan dikute.

bnr: Bi kerê nikaribû, baz da deşikê.

Zor pê xistin
Yek xistin rewşeke zor. **Ew du kes bûn, lê Resûl* ***zor bi wan xist****.*

Zor tê de çûn
bnr: Zor gihîştin (yekî)

Zor û zerp pê ketin
Di nav rewşeke pir dijwar de bûn. **Min bi çavên xwe dît bê* ***zor û zerpeke çawa bi Reşo ketibû****.*

Zora (yekî) birin
Yek têk birin. **Me jî wer hêvî nedikir, lê Reso* ***zora Tahar bir****.*

Zora hev nebirin
Hêza herduyan jî di heman radeyê de bûn. **Wan herduyan du şev û du rojan li ber hev dan, lê* ***zora hev û din nebirin****.*

Zora kê gihîşte kê
Kê zor li kê kir. Kê ji kê bir. **Madem wisa ye hema* ***zora kê gilûşte kê****.*

Zora xwe dayîn ser ...
Girîng girtin. Giraniya xwe dayîn ser tiştekî. **Ji niha de ji te re dibêjim, heke tu* ***zora xwe nedî ser wî karî*** *ew fîrsend wê ji dest te derkeve.*

Zotik ji serê heftê û heft bavên (yekî) zêdetir bûn
Pir biinyat û bieks bûn. **Hey tu wê nas nakî,* ***zotik ji serê heftê heft bavê wê zêdetir e****.*

Zotika (yekî) derketin
Di bin zor û zerpeke mezin de bûn. **Tu bi wê pêvajoyê nizanî, heta ku wî rebenî ew mal ava kir,* ***zotika wî derket****.* (argo)

Zotika sibehê qul bûn
Şefeqê avêtin, ronahiya sibehê nû dest pê kirin. **Dema ku ew hat, li derê me xist, hê nû* ***zotika sibehê qul bûbû****.* (argo)

Zozan rind e, hema çiya bilind e.
Tiştên xweş û binirx bedelên wan ên giran jî hene. **Hema bigire her kes ji zozanan hez dike, lê* ***zozan rind e, lê çiya bilind e****.*

Zuha jê filitîn
Bi serkeftî ji neyîniyê xelas bûn. **A rastî zêde hêviya min tune bû lê eferim, wa ye Dilcan* ***zuha ji wê belayê filitiye****.*

Zuriyeta (...) qut kirin
Malbatek, eşîrek an jî neteweyek tune kirin. **Wan jî dixwest* ***zuriyeta me qut bikin****, lê pêk nehanîn.*

Zuriyet qelandin
bnr. Zuriyeta (...) qut kirin

Zû biajo, hûr biajo, kûr biajo dûr biajo, ga meêşîne.
Karê xwe bi awayekî pêşk, paqij û zaneyî bike. **Rehmetiyê kalikê min jî tim digot:* ***"Zû biajo, hûr biajo, kûr biajo dûr biajo, ga meêşîne."***

Zû diçim dibêjin bîj e, hêdî diçim dibêjin gêj e.
Bi çi awayî dibe bila bibe, jê re li hincetan gerîn. **Mêze dikim ku çawa bikim nabe.* ***Zû diçim dibêjin bîj e, hêdî diçim dibêjin gêj e.***

Zû dişkê û dereng dicebire.
Ji bo kar û kesên nazik, zirav û bipirsgirêk tê bikaranîn. **Ezbenî, ez jî nizanim çawa bikim.* ***Zû dişkê û dereng dicebire.***

Zûr kirin
Mirûzê xwe kirin, pozpirçî bûn. **Tu ku xwe ew qasî* ***zûr bikî****, ew ê jî wisa bike.*

Zûrînî pê ketin
bnr. Zûrezûr kirin


ENSTÎTUYA KURDÎ
STENBOL 1992